

# HEZAR Û YEK ŞEV



Wergera ji Erebt  
**Menaf Osman**

## HEZAR Û YEK ŞEV

Çirokên Gelerî

**Navê Kitêbê Ya Orjinal:** Elf Lêyle we Lêyle

Weşan: Darul Mearîf, Misir, Kahîre, 2004

**Ji Erebi Wegera Kurmancî:** Menaf Osman

**Çirok:** 2/11

## Gerinendeya Weşanê

Eslîxan Yildirim

## Sererastkirin

Eslîxan Yildirim

## Berg û Rûpelsazî

J&J

## Çapa Yekemîn

Weşanên Azad, 2018

## Çapxane

Berdan Matbaası

Davutpaşa Caddesi Güven İş Merkezi C . Blok No:215/216 Topkapı/İstanbul

Sertifika No:12491

**ISBN:** 978-605-81463-0-3

(Sertifika No: 27924)

## Navnîşan

AZAD YAYINEVÎ

Viranşehir Mah.

34330 Sk. No: 15 A/4

Mezitli/Mersin

© *Mafê wê parastî ye. Ji bilî danasînê bêyi destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.*

# HEZAR Û YEK ŞEV



Wergera ji Erebt  
**Menaf Osman**



**Menaf Osman [Wergêr]**, di sala 1965'an de li Hasekê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya seretayî, navîn û lîse li wir xwendîye. Piştî li zanîngeha Şamê, Beşa Jeolojiyê xwendîye. Ji ber xebata xwe ya siyasî di sala 1993'an de li Tirkî hatiye girtin û cezayê mûbed stendiye. Di 2003'yan de romana wî ya bi navê 'Girê Şêran: Serhildan' û 2012'yan de jî ya bi navê 'Namûsname' ji aliyê Weşanxaneyê Aramê ve hate weşandin. Kiteba wî ya çîrokan ya bi navê 'Şinok' di 2012'yan de ji aliyê Weşanxaneyê Lîse ve; kiteba Nîzar Qebbanî ya bi navê 'Helbestên Xezelêhatî' ya ku Menaf Osman wergerandiye Kurdî, ji aliyê Weşanxaneyê Azad(London) ve di 2013'an de hatin weşandin. Çîroka bi navê 'Silava Bajariyan' ji aliyê Weşanxaneyê Azad(Mersîn) ve, di 2013'an de; romana bi navê 'Piling, Şoreşname 1' ji aliyê Weşanxaneyê Ar ve di sala 2015'an de hatin weşandin.

# NAVEROK

PÊŞGOTINA WERGÊR | 9

WERGERÊN PIRTÛKÊ Û ŞÊWEYA WAN | 10

HEZAR Û YEK ŞEV | 10

NIVÎSKARÊ PIRTÛKÊ KÎ YE ? | 11

DEMA PIRTÛKÊ Û NAVÊ WÊ | 12

QALIBÊ PIRTÛKÊ | 13

JI WEŞANXANEYA AZAD | 15

## HEZAR Û YEK ŞEV CILD I

ÇÎROKA MELÎK ŞEHRIYAR Û BIRÊ WÎ ŞAHZEMAN | 19

(ÇÎROKA YÊ TACIR Û CINÎ) | 22

(Çîroka Şêxê Yekemîn û Xezala Wî) | 24

(Çîroka Şêxê Duyemîn û Du Tajiyên Wî) | 26

(Çîroka Şêxê Sêyemîn û Hespera Wî) | 28

(ÇÎROKA MASÎGIR Û EFRÎT) | 29

(Çîroka Melîk û Dûbanê Hekîm) | 32

(Çîroka Melîk Sendîbad û Bazê Wî) | 35

(Çîroka Kurê Melîk û Pîrebokê) | 36

(Çîroka Xortê Nivkevîrî û Masiyên Rengo Rengo) | 44

(ÇÎROKA HEMAL Û SÊ KEÇAN) | 50

(Çîroka Sakûleyê Yekemîn) | 60

(Çîroka Sakûleyê Duyemîn) | 65

- (Çîroka Sakûleyê Sisyan) | 76  
(Çîroka Keçîka Ciwan ya Yekemîn) | 81  
(Çîroka Keçîka Ciwan ya Duyemîn) | 86  
(ÇÎROKA KEÇA KUŞTÎ) | 92  
(Çîroka Şemseddînê Wezîrê Misrê û Nûreddînê Wezîrê Besrayê) | 97

## HEZAR Û YEK ŞEV CILD II

- (ÇÎROKA TERZÎ Û XÛZO Û YÊ CIHÛ Û YÊ FILEH) | 127  
(Çîroka Simsarê Fileh) | 131  
(Çîroka Seraşpêjê Şah) | 141  
(Çîroka Hekîmê Yahûdî) | 147  
(Çîroka Terzî) | 153  
(Çîroka Xortê Qop) | 154  
(Çîroka Berber) | 162  
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Beqbûq) | 164  
(Çîroka Birê Terzî Yê Bi Navê Hejar) | 166  
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Beqbeq) | 169  
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Kûz) | 171  
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Neşşar) | 174  
(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Şeqliq) | 180  
(ÇÎROKA HERDU WEZÎRAN Û WENSKARA CIVAKÊ) | 186  
(ÇÎROKA EYYÛB Û KURÊ WÎ GANIM Û KEÇA WÎ FITNE) | 215  
(Çîroka Reşîkê Xesandî yê Yekemîn ji Sûdanê) | 218  
(Çîroka Reşîkê Xesandî yê Duyemîn ji Sûdanê) | 219

**HEZAR Û YEK ŞEV**  
**CILD III**

(ÇÎROKA OMER EN-NÛMAN Û HERDU KURÊN WÎ ŞERKER Û  
ŞEWQA MEKAN) | 241

**HEZAR Û YEK ŞEV**  
**CILD IV**

(Çîroka Taca Milûkan û Ezîzê Ciwan ) | 393

(Çîroka Taca Milûkan û Dunya Xatûn) | 426

(Çîroka Şewqa Mekan û Dorpêça Qostantîniye) | 453

(Çîroka Hebû Tunebû û Qeza Bû) | 460

(Çîroka Efyonkêş) | 486

(Çîroka Hemmadê Bedewî) | 495

(ÇÎROKA TEYR Û TILÛRAN BÎ ÎNSANAN RE) | 504

(ÇÎROKA ŞIVAN Û ABÎD) | 512

(ÇÎROKA TEYRÊ AVÊ Û KÎSO) | 513

(ÇÎROKA ROVÎ Û GUR) | 516

(ÇÎROKA MIŞK Û SÎNCAB) | 525

(ÇÎROKA KITIK Û QIJAKÊ) | 526

(ÇÎROKA ROVÎ Û QIJAKÊ) | 527





## PÊŞGOTINA WERGÊR

Di dîroka wêjeya cîhanê de heger mirov hersê pirtûkên olî yên pîroz (Quran, Încîl û Tewrat) derveyî mijarê bigire, yekemîn pirtûkên ku di cîhanê tevî de belav bûye “Hezar û Yek Şev” e. A herî pir bela bûye, ya ku wergerî hema hema hemû zimanan bûye û ya ku bandora herî mezin li ser civatê kiriye jî ev pirtûk e. Yê ku hiştiye wisa bibe jî, piralîbûna vê pirtûkê ye. Li gorî mijarê, li gorî cûreyên naverokên çîrokên pirtûkê, li gorî tîpên qehreman û lehengên çîrokê û statûya wan î civatî û taybetmendiyên dem û devera wê civatê, mirov lêkolîn bike, mirov dê baş têbigihêje sedema vê bandora wê yî mezin û fireh li ser wêjevan, helbestkar, hunermend, rêvebir, siyasetmedar û hemû avahiyên kesayeta civatî. Belavbûna vê pirtûkê, bi vî şiklê fireh li temamê cîhanê jî, vê yekê piştrast dike.

Her berhemek wêjeyî hewceyî danasînê ye. Bi kêmanî di nav dever û kesên ku ew berhem nexwendibin, ev pêdivî heye. Lê ev berhema “Hezar û Yek Şev” ku bi Erebi jê re dibêjin “Elf Lêyle we Lêyle” qet ne bi hewceyî danasînê ye ji vê hêlê ve. Lew kesên ku navên wê nebihîstine tunene di nav mirovên xwende de. Heta piraniya mirovê nexwende jî ev nav bihîstine. Bêyî ku reklama wê bê kirin herkesî bihîstiyê. Lê belê li ser nivîskarê vê pirtûkê, li ser dema nivîsandina wê, li ser dîroka wê û gihastina wê ya roja îro mirov dikare gelek tiştan bêje, lew gelek xalên ne diyar di pirtûkê de hene ji vê hêlê ve.

Lêkolîn, lêgerîn û lêhûrbûnên ku li ser vê pirtûkê hatine kirin, bê hed û bê hesab in. Her lêkolînerê jî tişteki cûda dibêje di derheqê dem û dewra wê, di derheqê nivîskar û nivîsa wê de. Lê hemû li gel van cûdatiyên wan jî, di hinek mijaran de dibin yek. Yekemîn, ev pirtûka ku di Serdemên Navîn de hatiye nivîsandin, ne ji qîbel nivîskarekî tenê ve hatiye nivîsandin. Cûdabûna ziman û şeweyê di navbera çîrokan de, ji hev dûrbûna cih û demên ku di mijaran de derbas dibin, vê yekê bi zelalî piştrast dikin.

Duwemîn; mijar, naverok, navên cih û deveran, navên şah û xelîfe û mîr û emîrên ku tê de derbas dibin, xweş diyar dike ku ev berhem hemû ne di wextekê de hatiye nivîsandin û ne jî li deverêkê tenê. Pirtûk mîna mirovekî gerok, li gelek welatan geriyaye mîna seyahekî, li her derê jî hinan tiştin lê zêde kirine. Ne tenê çîrokin din, ‘urf û adetên xwe jî lê zêde kirine. Loma mirov kesên pirrengî tê de dibîne; Erebi, Faris, Çînî, Kurd, Tirk, Musulman, Fileh, Cuhû, Mecûsî û hema ji her rengî insan tê de hene.

## WERGERÊN PIRTÛKÊ Û ŞÊWEYA WAN

Gelek mirovan, bi gelek şeweyan ev pirtûk wergerandine zimanê xwe. Gelekan jê jî pir pê listine. Li gora xwe cihin jê derxistine, li gora xwe sererast kirine, cihên beşên wê veguhestine, kêr kirine, zêde kirine. Nivîsa wê ya orjînal bi Erebi ye û gelek helbestên klasîk yên bi wezîna tê de hene. Wergereke Frensî baş û Îngilîzî heye. Piraniya wergerên zimanên din jî ji wan herdu wergerên Frensî û Îngilîzî ne, ne ji ya orjînal in. Wergerê Tirkî jî ji ber ya Frensî hatiye çêkirin. Yê min ez ê vê wergera Kurdî ji ber orjînalê wê ya Erebi bigirim. Ev nixweya ku di destê min de, li Qahireyê hatiye çapkirin. Min li wergerên zimanên din meyzand, hema bêje tevan beşên helbestî jî pirtûkê, bê wezîna wergerandine û ji qalibê wê yê klasîkî derxistine. Gelek ji wan helbestan jî bê wate û bê aheng bûne piştî wergerê. Min hewl da ku ez wan qalibên helbesta klasîk ji Erebi derbasî Kurdî bikim, lew helbesta klasîk ya Kurdî jî ne kêrî ya Erebi ye. Çêjêke dîrokî jî çêja Serdemên Navîn dide nivîsê ku bi raya min, divê mirov li wê jî miqate be û wê tenê weke qalibekî şematîk nebîne.

Hinekan sererastkirina pirtûkê û cildên wê li gora mijaran çêkirine. Yê min min ew li gora hejmara şevan daye berhevkin. Dabeşkirina wê li gorî hejmara şevan çêkiriye, lê belê li gorî çîrok û mijaran jî min serenav dane navbera wan.

Em dîsa vegehin ser hêman, nav û danasîna vê pirtûka dîrokî û bi çend gotinan be jî, li gorî nerîna xwe, çend mijaran vebêjin dê baş be.

## HEZAR Û YEK ŞEV

Ya rastî navê wê tenê têra danasîna wê dike. Belavbûna vê berhemê li çar hêlên cihanê û daxwaza hemû weşanxaneyan di belakirina wê de li hemû paytextên welatan û pîrbûna wergeran, bi taybetî jî wergera Frensî û ya Îngilîzî vê yekê baş didine xwiyakirin.

“Hezar û Yek Şev” Çi Ye ?

Pirtûkek herî balkêş e ji pirtûkên wêjeyê yên Serdema Navîn di Rojhilata Navîn de ku di wê demê de paytexta wêjeya cihanê bû, çî bi zimanê Erebi û Farsî be, çî bi zimanê Kurdî be. Di vê pirtûkê de çîrokên reng bi reng ên ku adet û jiyan û çanda civatî ya di wê demê de hene.

Çîrok û agahiyên di derheqê şah û mîr û mîrekên wan demên kevn de, zarokên melîkan, wezîrên wan, sultanên navdar, mirovên ji rêzê, ên ins, ên cin, diz û kujer û xaper û bêbextên wê serdemê, abid û mele û şêx, tacir û

bijîşk û gerok, jinepîr, kalepîr, xort û keç û zarok û hemû rengên mirovan ya di wê civata wê çaxê de anîne ziman û agahiyên pir hêja di derheqê jiyana civatî û siyasî û ehlaqî ya wê serdemê di komeke çîrok de aniye ziman. Tu rengên civatî jibîr nekiriye. Biaqil, dîn, aşiq û evîndar, hakim û serdestên zalim, ên dadwir, durûtîya mirovan û hezkirina paşgotin û qalûqurtê.

Ji aliyekî din ve di van çîrokan de hemû rengên kesayeta jinan jî hene. Şahbanû, qiralîçe, dayikên dilbirehm, jinên pir biaqil, ên zana, ên fasiq, ên şermût, ên sahir, ên pîr, ên ciwan û dilpak.

Dîsa gelek agahî hene di derheqê ajalan de, jiyana ajalan de, xwedî-kirin û fêdeyên wana. Çîrokên welatan ên ecêb, çîrokên bajarên, ên çîyan, ên deriyan, ên deştan, ên newalan, ên daristanan, ên mixaran, ên gundan, serayan û bajarên efsûnî ku pêçayîne di nava xewn û xeyalên zêrîn de.

Ev avahiya ecêb û balkêş ji rengan, mirovan, ajalan, qesr û qonaxan, ins û cinan tenê tiştêki destnîşan dike, hêz û qeweta wêjeyê û xeyalê mirovahiyê.

## NIVÎSKARÊ PIRTÛKÊ KÎ YE ?

Di vî warî de jî pir çîrok û rîwayet hene. Berhemeke evqasî baldar, evqasî tijî efsûn û xeyal û aqil û dînbûn û jîyan û xuluqkarî, ne gengaz e ku ji serê mirovekî tenê derketibe. Fîkr û xeyalên mirovekî bi tenê nikare bêrhemêke evqasî kûr û fireh û baldar derxîne holê, mirov nikare wê yekê bawer bike, ji xwe lêkolîner û wêjevannas jî wê yekê qebûl dikin. Dibêjin, nivîskarekî wê pirtûkê nîne, yekî bi tenê nîne û nehatiye zanin jî. Ku ew wîlo be, wêca em ê çawa bizanibin ku ew berhem nehatiye guhertin û gelek tiştên qelî neketine nav de? Em ê çawa bikaribin wê yekî wêjeyî a naverok û rista wê yî çîrokî qebûl bikin?

Hineke wêjenas; tevî ku qebûl dikin eslê pirtûkê Farisî ye, dibêjin; nivîskarê “HEZAR Û YEK ŞEV”ê ne yek tenê ye. Lî gorî Muhammed Bîn Îshaq; ev bi Ebû Abdullah Muhammed Îbnû Abdes El Gehşiyarî; xwedîye pirtûka “WEZÎRAN” dest pê kiriye. Vî zilamî gelek dengbêj û çîrokbêj li xwe kom kirine, yek bi yek li wana guhdar kiriye û çîrokên herî balkêş, pêkenokên herî xweş ji nav hîlbijartine û pirtûkeke bi navê “Hezar Henek Şev Ji Henek Şevên Erebb û Ecem û Rûman û yên din de” civandine. Beş bi beş nivîsandîye bêtî ku girêdanekê di nava wan de çêbike. Nivîskar di wê xebata xwe de ji gelek pirtûkên pêkenokan jî (yên wî çaxî) sûd wergirtiye û bi wî hawî çarsê û heyştê henekşev (an jî çawa ku têde gotin şevîn) komî serhev kiriye. Her şevînek ji derdora pêncî rûpelî pêk hatiye. Lê belê nivîskar zû

miriye temenê wî têrê nekiriye ku hezar şevînan binivîse.

Hinek lêkolîner û dîroknasên wêjeyê dibêjin; xwedêgiravî eslê pirtûkê Hindî ye, lê belê keda Faris û Ereban jî tê de heye.

Lê çawa bibe bela bibe, tu kes nikare bibêje ku “Hezar û Yek Şev” ber-hema şexsekî bi tenê ye. Bêgûman ev berhem Rojhilatî ye, ji gelek çîrok û dûrikên gelerî hatiye berhevkerin. Her nivîskarekî, her çîrokbêjekî tiştek lê zêde kiriye, çêjek ji çêja civata xwe avêtiye nav û ew dewlemendtir kiriye, hetanî ku gîhaye ev qalibê niha di nav destê me de ye.

## DEMA PIRTÛKÊ Û NAVÊ WÊ

Di vê mijarê de jî nerîn û lekolinên cûda cûda hene, lê belê piraniya lêkolîner û lêhûrîneran dibêjin ku “Hezar û Yek Şev” di navbera qirnê sêz-dehan û yê çardehan de hatiye nivîsandin. Ev jî li gorî bûyer û der û deverên ku di pirtûkê de derbas dibin hatiye tespîtkirin.

Lêkolîner û wêjenas li ser dîroka pexşana pirtûkê û belavbûna wêyî di nav gel de jî li hevdu nakin, ji ber ku di pirtûkê de behsa qehwê û tûtînê qet nayê kirin ku ev herdu jî berî qirnê panzdehan nehatine nasîn, nakokiyekê derdixe di vî warî de. Hinek wêjenas jî dibêjin, ne durrî aqilane ku di her demekê de tiştekî nuh li vê pirtûkê hatibe zêdekirin û hin bi hin gîhabe vî şiklê niha.

Hinek jî dibêjin, ev pirtûka han di dema KELÎLA Û DUMNA de hatiye nivîsandin. Dibêjin, şeweya nivîsê ya basît û herikbar vî tiştî dide diyarkirin. Şeweyeke durrî asêbûnên edebî ku herkes baş jê fem dike û jê kêfxweş dibe.

Navê pirtûkê qet nehatiye zanîn. Belbî nehatiye bîra kesî ji nivîskaran an jî ew mirovên ku çîrok lê zedê kirine ku li ser nav bisekinin. Lê belê dîsa jî tê gotin ku navê pirtûkê di dema ewil de “Hezar Efsane” bûye ku ev nav di zimanê Farisî de, di yê Kurdî de jî têtê xebitandin. Ev jî tê wê wateyê ku nivîskarên pirtûkê ên ewilî Kurd û Faris bûne lê niha ji pirtûkê re dibêjin “HEZAR Û YEK ŞEV”. Vêca xelkê çima navê wê pirtûkê ji “HEZAR EFSANE”yê qulipandin “ELF LÊYLE” (ku ev tê maneya “Hezar Şev”î) û ji wê jî qulipandin “ELF LÊYLE WE LÊYLE” (ku ev tê wateya “Hezar û Yek Şev”ê) em nizanin. Belkî jî evên ku navê pirtûkê bi wî hawî guherandine, xwestine ku pirtûk ji efsaneyê Şehrezadê piştrast bikin.

## QALIBÊ PIRTÛKÊ

Qalibê pirtûkê çîrokî ye pir xweş e, sivik e, herikbar e û dûrî tevliheviyê ye. Heta ku tê de gotin xwerû û vekirî ye. Zimanê wê jî sivik û gelerî ye. Herkes jê fêhm dibe û tamê jê distîne, bêyî ku zehmetiye di fêmkirinê de bikişînin û bera dûv wateyên veşartî bidin. Lê di dema xwendinê de mirov di cî de tê derdixê ku ne ji qîbel nivîskarekî tenê ve hatiye nivîsandin; ji ber ku carinan herikbar, xweş û lezgîn e, carinan jî giran û kellê ye. Çîrokek mirov dorpêç dibe bi şeweya nivîsa xwe, ya li dûv mirov bêhteng dibe. Yanî ev cûdabûna di navbera çîrokan de zelal e û xweş dide xuyakirin ku bi gelek destan hatiye nivîsandin, her yekî jî şopeke xwe tê de hiştiye.

Lê belê uslûbê ku pirtûk pê hatiye nivîsandin gelerî ye û pir xweş û sivik e. Yê ku hiştiye ev pirtûk bi lez di nav gel de belav bibe jî ev e. Belavbûna wê bi vî firehbûnê rastiya vî şeweya nivîsandina wê diyar dibe.

Ez hêvîdarim ku em ê karîbin cewherê vî pirtûkê tev li hemû hîmen edebî bi serkeftinî wergerînin Kurdî û bigihînin xwendevanên zimanê Kurdî. Tu xebat bê kêmanî jî nabe, lewra ez baş dizanim ku dê kêmaniyên min jî hebin, tew di xebateke wiha giran de; ji vî alî de jî ez bexşandina xwe dixwazim.

*27ê Mijdarê 2009*

*Menaf Osman / Girtîgeha Semsûrê*



## JI WEŞANXANEYA AZAD

Kitêba “Hezar û Yek Şev”ê, wek ku wergêr Menaf Osman nivîsiye yek ji kitêbê herî navdar yê dinyayê ye û wergerî gelek zimanan bûye. Cara ewil di serê sedsala 18’an de ji aliyê Antoine Galland ve, di dawiya sedsala 19’an û destpêka sedsala 20’an de jî ji aliyê Joseph Charles Mardrus ve wergerên Frensî bûne. Di heman demê de di sedsala 19’an de wergerên Îngilîzî, Rûsî, Îspanyolî jî hatine kirin û li Ewrûpa tevî belav bûne. Hin wergêr di çîrokan de guhertin kirine, hin jê jî bêyî ku tu guhertina bikin werger kirine. Hîn jî li her derê dinyayê çapê nuh têne derxistin, axilbe ji bo zarokan bi şeweyên cuda cuda têne amadekirin û bi baldarî têne xwendin.

Çîrokên “Hezar û Yek Şev”ê ji alî fikir û sinet de gelek tesîr li dinyayê tevî kiriye. Bûye kanî û bingeh ji gelek mijarên roman, tîyatro, muzîk û filmê sînemaya. Gelek nivîskarên navdar, sûd ji vê berhemê girtine. Mirov kare bêje, tu berhem di dinyayê de bi qasî Çîrokên Hezar û Yek Şevê tesîr li sinet, edebiyat, sînema, tîyatro û hwd. nekiriye. Hîn jî navê lehengê wan li deran tê kirin û dibin navê merqeyan, resmê ku wan temsîl dikin li ser gelek cihan û amûran cih digre. Yanî tesîr li hemû aliyê jiyane kiriye; li jiyana civakî, li zarokan, li polîtîkayê, li edebiyatê, li tiyatroyê, li sînemayê...

Ev berhema bi Erebi jî aliyê kê ve û kengî hatiye nivîsandin ne zelal e, lê xweş tê zanîn ku xwediyê vê berhemê civata Rojhilata Navîn e, danheva çîrok û destan û efsaneyên vê civatê ne, bi demê re li her herêmekê lêzêdekirin hatine kirin û ji aliyê zanayên mijarê ve fikara herî li pêş ew e ku bingeha vê berhemê kitêba Îraniyan ya bi navê “Hezar Efsane” ye. Berhema Ebu Hasan el Mesudi ya bi navê Muruf el Dehab we Maadin el-Cawahîr ya sedsala 9’an û berhema Muhammed bin Îshak en-Nedîm ya bi navê Kîtab-ul Fihrist ya sedsala 10’an vêna piştrast dikin.<sup>1</sup>

Yek ji kaniya vê kitêbê welatê Kurdistan e û şopê kultura Kurdistan rasterast xwe di çîrokan de dide der. Li gel ku hîn jî hin ji van çîrokan di nav gel de têne gotin û di şevbuhêrkên berê de cihekî girîng digirtin, mixabin wek nivîskî ev kitêb bi tevahî hîn jî bi Kurdî nahetiye çapkirin. Li gor ku min hebekî lêkola heya niha wergerê Kurdî yê bi tîpên Latîni<sup>2</sup> ya vê kitêbê ev in: Wergera ji Swêdî Serdar Roşan, cild 1, Weşanxaneya Nûdem, Stockholm, 1998. Hesênê Bazîrgan (Ji Çîrokên Hezar û Şevêkê), Weşanxaneya Nîl,

1. *Binbir Gece Masalları (Wergêr: Alîm Şerîf Onaran), Cild 1, Weşanên YKY, rûpel 37*

2. *Ji ber ku di derbarê xebatê ku axilbe li rojhilat û başûrê Kurdistan yê bi tîpên Erebi hatibin kirin ez ne xwedî agahî me, min tenê behsa wergerên Kurdî yê bi tîpên Latîni kiriye.*

Stenbol, 2012. Hinek ji Çîrokên Hezar û Şevêkê, Wergêr Abdulkadir Ulumaskan, Yekîtiya Mamosteyên Kurd li Almaniyayê, 2013.

Em jî, wek Weşanxaneya Azad, di vê gava ewil de 4 cilda bi hev re di yek kitêbê de diweşînin. Menaf Osman ev kitêb ji Erebi wergerî Kurdî kiriye û tu guhertin tê de nekiriye. Wek ku tê zanîn wergerên ji zimanê berhemê bixwe her çêtir e ji yê ku wergera wergerê be. Menaf Osman wergera cilda yekemîn di sala 2009'an de li Girtîgeha Semsûrê qedandiye, bi dû de li gel gelek xebatê xwe yê din, wergera cildê din yê Hezar û Yek Şevê berdewam kiriye. Heya niha wergera 4 cildan xediyaye û hewl dide ku cildên din jî wergerîne. Ji ber ku wergêr li Tirkî di girtîgehê de ye, mixabin îmkana me û hevdiîtinê, îmkana me û bi hev re lêhûrbûna li ser xebatê Menaf Osman bi dest me nakeve. Dema redaksiyonê min wergera Kurmancî ya Serdar Roşan û wergerên Tirkî di ber çavan re derbas kirin, min ev xebat û wergerên ku min behs kir li ber hev xistin û bi hin rastkirinên biçûk ev şiklê dawî stend. Bi navê Weşanxaneya Azad, ji bo vê xebata pir hêja, ji bo ev berhema bêhempa wergerandiye Kurmancî ez gelekî spasî Menaf Osman dikim û ez hêvî dikim karibe wergera cildên din jî biqedîne.

*Gerîmendeya Weşanxaneya Azad*

*Eslîxan Yildirim*



HEZAR Ū YEK ŐEV

CILD I



## ÇIROKA MELİK ŞEHRIYAR Û BİRÊ WÎ ŞAHZEMAN

*Dibêjin, xwedêgiravî hatiye gotin ku di serdemên kevnezemanên berê de melîkek Sasaniyan hebû, du zarokên wî hebûn û herdu jî du mêrên çeleng bûn. Birayê mezin Şehriyar, ji yê biçûk çalaktir bûye, ewî hukum li welat kiriye, desthilatdariya xwe bi dadî daye meşandin û gel jê razî bûye. Navê birayê wîni biçûk Şahzeman bû, ew jî bûye melîkê Semerqendê. Herdu bira bîst salên wan bûn ku herdu welatên xwe bi dilovanî didane meşandin û xelq ji wana razî bû.*

*Rojekê yê mezin bêriya yê biçûk kir; bang li wezîrê xwe kir, peyamek da dest û şand dû birayê xwe. Wezîr giha bal Şahzeman, peyamek da dest, wî jî qebûl kir û gote: “Ser seran ser çavan.” Wezîrek danî şûna xwe û amadekariyên xwe kirin ji bo ku têkeve rê de. Nivrokî Şahzeman kete rê de, lê bi rê de hate bîrê ku tişteki xwe li malê jibîr kiriye. Vegeriya malê û bala xwe dayê ku jina wî bi evdekî reşîk re raketîye. Matmayî bû, dînya li ber çavên wîna reş bû; hema di cih de şûrê xwe kişand û serê herduyan firand, ew kuştin di nava nivîndê de. Dûvre bêderengî di cî de bi şûn de vegeriya û dîsa kete ser rê de. Meşiya û meşiya heta ku gihîşt cem kekê xwe.*

*Kekê wî pir kêfxweş bû bi hatina wî, emir da ku ji bo wî bajar tevde bê xemilandin û pêre rûnişt, axifî, bêhna wî fireh bû û pir jî pê şa bû. Lê hişê Şahzeman li ser wê jina wî bû, ji ber bobelata ku bi serê wî de hatibû pir xemgîn û matmayî bû; xwîn ji rûçkê wîna kişiyabû, zer bûbû û roj bi roj lawaz dibû. Ji kekê wî Şehriyar werê ku evaya ji ber dîrketina wî ji welatê wî û ji mal û milkê wî ye; loma nexwest sedema wî halê wî jê bipirse. Piştî çend rojan kekê Şehriyar jê re got: “Ka birawo em tevde bi hev re herin nêçîrê belkî hebekî bêhna te jî derkeve.” Lê Şahzeman ev jî nexwest û bi wan re neçû nêçîrê, kekê wî jî ji mecbûrî bi tena serê xwe çû nêçîrê. Zilamên xwe tev dane dûv xwe û berê hespên xwe dane çolan.*

*Şahzeman, li ber şibakê rûniştibû ji xwe re diponijî. Li raserî wî qesra kekê wî xwiya dikir. Carekê bala xwe dayê ku deriyê qesrê vebû û bîst heb carîye jê derketin. Bîst heb evd jî li dûv wana bûn, jinbira wî jî di nav wan de bû, pir xweşik û sipehî bû. Hatina heta cem fisqiyek avê, li wir rûniştin û kincên xwe ji xwe kirin. Dûvre jinbira wî li evdekî gazî kir, gotê “Mesûd!” evd jî hate balê, hevdû maçî kirin, dûvre xwe di ber hev re dirêj kirin; koleyên dîtirkê jî heman tişt bi cariyeyên din re kirin û heta êvarî bi hev şa bûn, kêf*

û henek kirin.

Gava Şahzeman ev dît, êşa wîna pê sivik bû, qehr û xemgîniya wî ji nerm bû; bêhna wî fireh bû, ji nû ve li xwarin û vexwarinê vegeyriya. Kekê wî ji nêçîrê vegeyriya, silav dan hevdû, guhertinên ku li ser Şahzeman çêbûn ji ber çavên kekê wî wenda nebû. Sorbûna hinarkên rûyê wî, xwarin û vexwarina wî ji dil, ew dida dest. Kekê wî lê mabû ecêbmayî. Berê xwe dayê, jê re got: “Tu bi Xwedêkî birawo ji min re bêje bê ev tiştê ku madê te xweş kiriye çîye?” Şahzeman got: “Wele keko gava ku te wezîrê xwe şandî dîv min ji bo ku ez bême balî te, min kar û barê xwe kir û bi lez ji bajêr derketim, ketim rê de. Lê dîvre ez lê hay bûm ku ew morîka te li qesrê dabû min, min li malê jîbîr kiriye. Rabû ez bi şûnde vegeyriyam malê, min bala xwe dayê ku jina min bi ebdekî reşik re raketiye. Rabû min herdu kuştin û bi wî halî ez ketim rê de, hatim cem te. Sebeba xemgîniya min ew bû. Lê sebeba bêhnfirehiya min î niha ez nikarim bêjim, min bibexşîne.”

Gava ku Şahzeman ew got, tiştêkî bigûman niqutî dilê Şehriyar û jê re got: “Birê min tu bi Xwedêkî sebeba vê ji min re bêje!” Şahzeman got: “Wê gavê ji bo tu bi xwe bi çavê xwe bibîne, dema ku roja nêçîrê hat, bihêle ez li şûna te herim nêçîrê, tu ji li vêdê, li şûna min bimîne, tu yê bi çavên xwe bibînî!”

Çaxê ku Şehriyar ev gotin bihîst, xiltexilt kete dilê wî de û nema xwe girt. Di cî de bang li wezîr û xulamên xwe kir û ji wan re got: “Amadekariyê bikin ez ê derkevim nêçîrê.” Şehriyar tevli xulam û wezîr û leşkeran ji bajêr derketin. Çadir û komên xwe vegirtin, dîvre kincên xwe guhertin, xwe ji wana vedizî û bi şûn de vegeyriya ew qesra ku birê wî lê dima. Di şibakê re li bexçeyê qesra xwe nerî, bala xwe dayê ku jina wî tevli bîst hep cariye û bîst hep ebîd ji xwe re dilîzin, bi hev şa dibin. Hişê wî ji serî wî çû, çavên wî sor bûn û têgihîşt bê çima birê wî nedixwest vê yekê jêre bêje.

Rabû ji birê xwe re got: “Ka birawo rabe em ji vir herin. Tu lazimiya me bi mal û milkan tuneye heta ku em hîn nebin ka ev tiştê hatiye serê me, hatiye serê kesî din an na. Heke na, mirîna me ji mana me çêtir e.” Birê wî got: “Bîla be.” Herdu rabûn milên xwe dane hev û bi dizî di deriyekî qesrê re derketin, çûn. Meşiyar û hey meşiyar heta ku gîhan kêleka behrekê. Li ser kaniyekê rawestiyan, av vexwarin û li bin siya darekê rûniştin bêhna xwe vedan. Derdora wan çayir bû, her der gul û gîha bû. Hîna ku katjimêrek têde neçûbû bahozekekê lê da û pêl bi deryayê ketin. Dîvre stûneke reş ji wan pêlan derket û ber bi asîmanan ve bilind bû. Çawa çavên wana lê ket û dîtin ku ew stûn ber bi wan ve tê, tirsîyan; çûne ser darê da ku xwe bisitirînin. Dar ji pir bilind bu. Li ser serê darê, bi tirs li derdora xwe temaşe dikirin ka dê çi bibe, çi nabe.

*Demek buhuri, bala xwe danê ku efrîtekî mezin î qamdirêj ji nava wê stûna reş derket û ber bi bejayê ve hat. Nava milên wîna fireh û sîng pêhn bû, sindoqek li ser serê wî bû û ber bi dora wan ve dihat. Dema gihîşt cem darê, sindoqa xwe danî erdê û li ber rûnişt, devê wê vekir qutîkek jê derxist, dûvre devê wê jî vekir; çawa devê qutîkê vekir keçek pir xweşik û sipehî jê derket, mîna rokê bi şewq bû. Efrît li keçikê nêrî û jê re got: “Xatûna xatûnan di roja daweta te de min tu revand, niha ji ez dixwazim hebekî bêhna xwe vekim.” Serê xwe danî ser çoga wê û raket.*

*Keçikê serê xwe berjor ve rakir, herdu melîk dîtin. Serê yê cinî ji ser çoga xwe rakir danî erdê û rabû ser xwe, ji wan re bi îşareta destan got “Ji vî Efrîtî netirsîn, dakevin werin jê cem min, ya na ez ê wî şiyar bikim û wê ew bi ecêbeke nedîtî we bikuje.” Herdu ji ser darê daketin, hatin cem; keçikê silav da wan, qedrê wana girt û bela xwe li wan xist. Dûvre tûrikek ji bêrika xwe derxist, ristikek ji pênsed û heftê hungilîskî jê derxist, pêş wana kir û got: “Hûn dizanin bê ev çi ne?” Gotin: “Na!” Keçikê gote wan: “Xwediyên van hungulîskan tevan bê xebera vî Efrîtî bi min re raketin, vêca ka hûn jî wan hungulîskê xwe bidin min.” Ku herduyan jî hungulîskên xwe danê, ji wan re got: “Evî Efrîtî di şeva daweta min de ez revandim û ez xistim vê qutîka han, dûvre qutîk jî xiste nava vê sindoqê û heft kilid lê dan û ez avêtim binê behrê, nava pêl û avan. Wîna qet nizanibû ku gava jinek tiştêkî bixwaze tu kes, tu tişt nikare pêşiyê bigire.”*

*Herdu bira li jinikê man ecêbmayî, hema di cî de rabûn ser xwe jê dûr ketin û her yekî berê xwe da bajarê xwe. Şehriyar bi şûn de vegeyriya, kete qesra xwe û derî li ser xwe girt. Destpêkê serê jina xwe firand, dûvre yên hemû carîye û ebîdan. Piştîre êdî her şev keçek ji xwe re tanî qesrê, pê şa dibû û dûvre ew dikuşt, berî ku lê bibe sibeh.*

*Sê sal tê derbas bûn, xelk tev perîşan bûn ji vê adeta Şehriyar û zulma wî, herkesî keçên xwe ji bajêr revandin, bi dûr xistin, tu keçê ku vê zulmê qebûl bike di bajêr de nema. Rojekê Şehriyar gazî wezîrê xwe kir da ku mîna her roj jê re keçekê bîne. Wezîr derket, çû nava bajêr geriya lê tu keç nedîtin. Bi qehr berê xwe da malê. Teperepa dilê wî bû, ditirsiya ku Melîk tiştêkî pê bike.*

*Du keçên wezîr hebûn. Ya mezin navê wê Şehrezad bû, weke heyva li çardan bû. Li gel wê sipehîbûna wê, gelekî jî xwende û zana bû, pir pirtûk xwendibûn di derheqê dîroka pêşiyar ya şah û melîk û axan de. Ya biçûk jî navê wê Dunyazad bû.*

*Rewşa wezîr ya nebaş bala Şehrezadê kişandibû, lê zivirî jê re got: “Te xêre babo, çima maîdê te wiha nexweşe? Çima tu hewqasî xemgînî?” Bavê wê*

çîroka xwe û Melik ji serî hetanî dawî jê re got. Şehrezadê got: “Tu bi heqê Xweda bikî babo min bi vî Melikî re bîzewîcîne, ya ez ê bijîm yan jî ez ê bibim qurbanek di ber hemû keçên di vî bajarî de û sebebek ji bo xelasiya wan.” Bavê wê lê veğerand û got: “Raweste keça min, xwe navêje nava vî agirî ji bo xatirê Xwedê.” Lê Şehrezad pir bi biryar bû, got: “Îlleh billeh wê wilo bibe, çi dibe bila bibe.” Bavê wê ji neçarî be jî rabû keça xwe amade kir, ew da kêleka xwe û berê xwe da cem Melik. Berî ku ji malê derkevin, Şehrezadê şîretek li xwişka xwenî biçûk kir û jêre got: “Ku min qasidek şand dû te û te anî cem Melik, tê ji min re bibêje ‘Xwişkê kanî ji min re çîrokekê bibêje da ku şeva me derbas bibe.’ Wê çaxê ez ê ji ji te re çîrokekê bibêjim ku xelasiya me tê de hebe bi izna Xwedê.”

Gava Şehrezad kete huzura Şehriyar, serê xwe jê re danî û giriya. Melik gotê: “Çiye, te xêr e?” Ewê got: “Ez dixwazim xwişka xwe bibînim.” Melik Şehriyar qasidek şand dû xwişka wê, ew anî qesrê. Hemû tevde bi hev re rûniştin, şevbuhêrka xwe kirin. Di wê navê de Dunyazadê ji xwişka xwe re got: “Xwişkê tu bi Xwedê ke ka ji me re çîrokekê bibêje da ku em şevbuhêrka xwe pê derbas bikin.” Şehrezadê jî got: “Ku cenabê Melikê min izinê bide, li ser seran û li ser çavan.”

## ŞEVA YEKEMÎN

### (ÇÎROKA YÊ TACIR Û CINÎ)

*Melik izin dayê, Şehrezadê xwe bipêş ve da û got:*

Serdar û Şahîşahê min î hêja; dibêjin xwedêgiravî carekê tacirekî pir maldar hebûye, ketiye gerekê dûdirêj û welat bi welat geriyaye, gelek kirîn û firotin kiriye. Rojekê germê ew tengezar kiriye, çûye li bin siya darekê rûniştiye. Destên xwe avêtiye xurcika xwe pariyek nan derxistiye, bi çend xurmeyan re xwariye, navkên xurma jî avêtiye wê derê. Di wê kêlikê de efrîtekî bejindirêj derketiye raserî wî. Şûrek di dest de, ber bi tacir ve hatiye û pê re gotiye “Ka rabe ser xwe da ku ez te bikujim, çawa ku bi avêtina wê navika xurmê te kurê min kuşt!” û di cî de destê xwe avêtêyê û ew li erdê rast kiriye. Tacir jî dest bi girî kiriye û ev helbest xwendiyê:

Felek du roj in; yek ewle û yek tirsî  
 Jiyan jî du beş in; yek keder û yek şahî  
 De ka bêje ew ên ku bi çerxa felekê t'ena didin me  
 Gelo felekê bi kê re qayîş kiriye ji xeynî me  
 Xeternakên mirovan tu tu dizanî  
 Qey tu nabîni ku yê bi ser avê dikeve kef e  
 Û yê ku di binê behrê de herdem sedef e

Vêca ku bi me listibe destên felekê  
 Û gihabe me ji rûreşiya wê zerar û kelekê  
 Ji bir nek ku li ezmanan bêjimar steyrik hene  
 Tenê rok û heyvê ji nav wan rûreş dibine  
 Li ser rûçkê erdê çiqas dar û ber hebin  
 Tenê yên berdêr raserî keviravêjan dibin  
 Ew ê gûmana te baş be ku baş biherikin roj  
 Ku tirsra te qet nebe ji qedera xerab û soj

Piştî ew helbest xwend, ji Efrît re got: “Binêr ciwanmêro, bi Xwedê gelek deyn li min hene. Malê min jî pir e. Jin û zarokên min jî hene. Zahf rehîn jî li mala min hene. Vêca ka bihêle ku ez biçim malê, da ku ez deynên xwe tevan bidim, rehînan li xwediyên wana vegehinim û karê xwe tevî sererast bikim, dûra ez ê dîsa li te vegehim, wê çaxê tu çi dixwazî bi min bike.”

Himber vê gotina wî, ê cinî jê yeqîn kir û ew berda. Ew jî rabû vegehiya welatê xwe, deynên xwe dan û sozên xwe bi cih anîn. Heqê herkesî da wan, bi jin û zarokên xwe re axivî û ji serî heta binî ew ji rewşê agahdar kirin. Heta dawiya salê bi wan re ma, dûra rahişt kefenê xwe xist bin çengê xwe, xatir ji jina xwe, ji zarok û cîranên xwe xwest û li Efrîtê xwe vegehiya.

Wê çaxê roja ewilî bû ji sala nûh, ji xwe re rûniştibû bi halê xwe digiriya. Di wê kêlikê de şêxek hate balê ku kezalek jî pêre bû. Silav lê kir û jê re got: “Çi karê te li vî warê cinan heye ku tu wilo bi tenê li vir rûniştiye?” Rabû tacir çi tiştê ku bi serê wî hatibû jê re got, ji serî heta binî ta bi derziyê vekir. Şêx li van gotinên wîna matmayî ma û jê re got: “Bi Xwedê birayê min ola te oleke saxlem e û çîroka te jî çîrokeke sosret e.” Li kêleka wî rûnişt, axaftina xwe berdewam kir û got: “Bi Xwedê heta ku ez nebînim bê wê çi bi serê te bê ji destên wî Efrîtî, ez ji vir naçim.” Gava Şêx li balê rûnişt û pêre axifî, sawek kete dilê tacir û xofek pêre çêbû; hîna xemgîntir bû, fikarên wî jî kûrtir bûn. Hîna ew di wî halî de bû, bala xwe dayê ku şêxekî din jî hate cem. Du dêlik û du tajiye reş jî pêre bûn. Piştî ku silav da wana, ji wan pirsî ka çima herdu rûniştîne li vê devera cinan. Çîrok ji serî hetanî binî jê re gotin. Hîna ku ew jî rûneniştibûn bala xwe danê ku şêxê sisiyan jî ji wê ve tê. Hespek pêre bû, wî jî silav da wan û li sebaba rûniştina wana pirsî, wan çîrok ji wî re jî gotin. Hîna ew di wî halî de bûn ji nişkê ve ‘ecacokek ber bi asîmanan ve bilind bû û toz û dûman rabû li wana. Piştî ku toz û ‘ecac ji hev bela bû, ciniyê ku li bendê bûn jî xwiya bû. Şûrê xwe ji kalanê wî kişandibû û tevî awirên dijwar ber bi wan ve dihat. Ku gihîşt cem wana, bi çêplê tacir girt, ew ji nav wana derxist û jê re got: “Ka were ez jî te bikujim çawa ku te kurê mîn, kezab û dilê min kuştî.” Rabû yê tacir dest bi girî kir, bû lavelava wî û xwe avête bextê wî Efrîtî. Hersî şêx jî pêre giriyan û bû kûrekûra wana. Piştî şêxê ewilî gotê: “Hey melekê cinan ê mehrîban, ku ez çîroka xwe û vê

xezalê ji te re bêjim gelo tê ji sê behra behrek ji xwîna vî mirovî bibexşîne?” Efrîr gotê: “Bila be.” Şêx gotê:

### (Çîroka Şêxê Yekemîn û Xezala Wî)

Efrîtê hêja baş bizane ku ev xezal dotmama min e. Hîna pir biçûk bû ez pêre zewicîbûm. Sîh salî zarok jê re çênebûn. Rabû min bi dizî ji xwe re yarek girt, kurekî min jê çêbû weke heyvê bû û roj bi roj mezin bû heta ku bû pazdeh salî. Rojekê bi mebesta ticaretê ez çûme welatekî dûr û gelekî geriyam. Ev dotmama min jî ji zaroktiya xwe ve hîni efsûnê bûbû, efsûnger bû; wê jî di tunebûna min de kurê min kiribû golikek, diya wî jî kiribû çêlekek û herdu dabûne ber şivên, berdabûn çolê. Gava ku ez vegeriyam malê û min li wan pirsî, ji min re got: “Willeh yarika te mir û kurê te jî terqiya çû, ez nizanîm bê bi ku ve çûye.” Ez jî bêçare li mal rûniştim û salekê sax di wê xemgîniya xwe de mam. Gava ku cejna qurbanê hat min gazî şivên kir û jê re got “Çêlekeke qelew ji min re bîne.” wî jî çû ji min re çêlekek ji nav garanê anî. Min çi zanîbû ku dê ew çêlek yara min be! Min kêr hilda dest xwe û zend û bendên xwe hildan da ku ez wêna serjê bikim, min dît ku dike girî û nalenal, destê min lê negeriya, ez ji ser dilê wê rabûm û min ji şivan re got “Tu wêna serjê bike.” Şivan serjê kir û gurand lê ji çerm û hestiyar pê ve tu goşt tê de tunebû. Ez li serjêkirina wêna pir poşman bûm, min ew da şivan û jê re got “Here ji min re golikeke qelew bîne.” Şivan çû, ew kurê minî efsûnkirî ê di teşa golik de, ji min re anî. Çawa ku golik çav li min ket, benê xwe qetand û dest bi girî kir. Dilê min pê şewitî, min ji şivên re got “Dev ji vî golikî berde, here çêlekeke din ji min re bîne.”

*Di wê navê re şeveqê lêda û Şehrezad gotina xwe birî. Xwişka wê jê re got: “Çîroka te çiqasî xweş bû û tu çiqasî xweş dipeyivî!” Şehrezadê lê vegerand û got: “Tew ku te bizanîbûya bê min ê şevêk din çi ji we re bigotana, heger Melîk min nekuje û bide jiyandin.” Melîk Şehriyar jî wê gavê di dil xwe de ji xwe re got “Bi Xwedê heta ku ez dawîya vê çîrokê hin nebim, ez wêna nakujim.”*

*Û her wiha herdu di himbêza hev de man heta sibê. Gava ku roj qamekê ji erdê bilind bû, Şehriyar rabû ser xwe û hate dîwana hukmê xwe. Wezîrê wî jî li wê derê bû, kefen jî di bin çengê wî de bû. Lê pir behetî ma, gava ku hin bû Melîk Şehrezad nekuştîye.*

### ŞEVA DUYEMÎN

*Gava ku êvar hat û dîsa bû şev, Dunyazadê ji xwişka xwe re got: “Xwişkêcan ez hêvidarim tu axaftina xweyî dohîn berdewam bike.” Şehrezadê lê vegerand û got: “Ku Melîkê min iznê bide, li ser serê min, li ser çavên min,*



*ez ê bêjim.” Dema Melik jê re got bibêje, Şehrezadê axîfî û got:*

Me gotibû gava wî şêxî dît ku golik digrî, ji şivên re got: “Wîna di nav dewaran de bihêle.” Efrît li çîroka vî şêxî mabû ecêbmayî. Şêx ji berdewam dikir û digot:

Eva tev li ber çavên dotmama min diqewimî, wê jî li me dinerî û hey ji min re digot “Vî golikî serjêke, pir gelew û bi goşt e.” Lê min dikir nedikir destê min lê nedigeriya. Û dawîya dawî jî çawa ku min got, min ji şivên xwest ku wîna bibe nav garanê, şivan jî ew bir.

Rojeke din di wextekî ku ez rûniştîbûm, şivan hate cem min û got: “Ezbenî ez ê tişteki xêrê ji te re bêjim, lê ez mizgîniya xwe dixwazim.” Min got: “Bila be.” Got: “Tacirê min, taca serê min, keçeke min heye ji biçûkaniya xwe de hînê efsûniyê bûye. Vêca gava ku te ew golik bi şûn de vegerand û min ew bi xwe re bir ez çûme malê, keça min çav lê ket, nuh ew dît destên xwe dane ber rûyê xwe, çavên xwe girtin, giriya, dûra jî keniya. Gote min ‘Bavo qey qedrê min li ba te ketiye ku îca tu zilamên biyan derbasî ba min dikî.’ Min got ‘Kanî zilamên biyan keça min û tu çima giriya û keniya?’ Got ‘Wele ev golikê bi te re kurê axayê me yî tacir e, lê efsûnkirîye. Dêmariya wî ew û diya wî efsûn kiriye. Sedema kenê min ev bû. Giriye min jî ji ber dê bû, min fem kir ku bavê wî, diya wî serjê kiriye.’ Vêca ez jî bi bêsebrî mam li bendî sibehê; çawa tavê da der ez hatim balî te, da ku ez te agahdar bikim.”

Efrîtê hêja, çawa ku ev gotin min ji şivên bihîst ez ji kêfan firiyam û bi lez min berê xwe da mala şivên, ez çûm cem keça wî. Ewê jî destên min ramûsa û ez derbasî hundir kirim. Min bala xwe dayê ku golik jî hat xwe di min da, keçikê got: “Belê ezbenî ev kurê te bi xwe ye, kezeba te ye.” Min jê re got: “Cîwanê, heger tu karibî wîna ji vê efsûnê rizgar bikî, ez ê xelateke giranbuha bidime te ji mal û milkan.” Keniya û ji min re got: “Axayê min, begê min, tu pêdiviya min bi mal û milkan nîne. Lê du şertên min hene, şertê ewil ku tu min pêre bizewicîni û yê duduyan jî ez wê sîhîrbaza ku ew efsûn kiriye bi destên xwe efsûn bikim û li cem te hêsîr bigirim da ku ez karibim di ewlehiyê de bijîm. Yana filitandina min ji destên wê nabin.”

Efrîtê hêja, ku min ev gotin jê bihîst min got: “Bila be, mal û ajalên minî di dest bavê te de jî bila li ser be û xwîna wê dotmama min î xayîn jî li te helal be.” Gava ev gotin ji devê min bihîst, rahişt taseke av li ser xwend û dûre bi ser golik de reşand û jê re got: “Ku Xwedê golik afirandibe wisa berdewam bike, lê ku tu efsûnkirîbe, vegere hebûna xwe yî ewilî bi izna Xwedê.” Golik xwe vegevizand û ji nişkê ve bû mirovek. Kurê min î wenda dîsa raber min bû! Min jê re got: “Tu bi navê Xwedê ke ji min re bêje, ka wê

dotmama min çi bi serê te û diya te kiriye.” Rabû kurik çîrok ji min re got, ji serî heta binî. Min got: “Kurê min Xwedê li te hate rehmê ku tu xelas kirî û tu vegeriya halê xwe yê berê.”

Vêca Efrîtê hêja, piştî wê min ew keçik bi kurê xwe re zewicand. Wê ji ew jin û dotmama min efsûn kir û xiste teşbîhê vê xezala han, ku ez wê bi xwe re digerinim. Îca ku min ev cemaet li vir dît ez rûniştim, min xwest ez li halê vî tacirî bimeyzînim bê ka dê çi bête serê wî. Çîroka min jî ev e.

Rabû yê cinî got: “Willeh ev çîrokeke pir ecêb e. Ji bo wê, ez jî ji sê behra behrek xwîna ê Tacir eda dikim û didime te.”

Di wê navberê de şêxê xwediyê herdu tajiyan xwe da pêş û got:

### **(Çîroka Şêxê Duyemîn û Du Tajiyan Wî)**

Mirê mirekên cinan, Efrîtê hêja! Bila tu baş bizanî ku ev herdu tajiyan han du birayê min in û ez jî yê sîsiya me. Gava bavê min miribû, sê hezar dînar ji me re hiştibûn. Yê min, min ji xwe re dikanek vekir. Birê min jî bû rêwî û dest bi ticaretê kir. Salekê wenda ma, dûre vegeriya û destvala hate malê. Min jê re got: “Birê min, ma min ji te re negot meçe.” Got: “Keko willeh qedera Xwedê ye û gotin jê re bêfêde ye. Xwedê ev yek li ser eniya min nivîsandibû û ew jî hate serê min. Eva ez destvala mam, êdî ji min re çareseriyekê bibîne.”

Rabû min ew bire dikana xwe û dûvre ew bire hemamê, baş şûst û kincên nuh lê kirin û min jê re got: “Birawo, binêre ez qezenca xwe ji salê heta salê dihesibînim. Sermayeya dikanê ya min be jî, ez ê qezencê li xwe û te bi nêvî bikim.” Dûvre min hesap kir, min dît ku qezenca dikanê du hezar dînar e, min ew jî li xwe û li wî behr kir û bi roja em bi hev re man.

Piştî careke dîtir herdu birayê min xwestin ku biçin bazirganiyê bikin û doz li min kirin ku ez jî tevî wana bibim, bi wan re herim gerê. Min qebûl nekir, pir rû li min danîn lê min qebûl nekir û min ji wan re got: “Ma ka we çi ji vê bazirganiyê bidest xistiye heta ku ez bidestxim!” Çiqasî bi ser min de hatin jî min bi ya wan nekir. Me kirîn û firotina di dikana xwe de berdewam kir. Lê belê herdu birê min jî ji ya xwe danediketin û pêşniyariya xwe ya bazirganiyê her car li ber guhê min dixistin. Dawiya dawî min bi ya wan kir û min got; bila be. Rabû me hesabê xwenî salê kir, şeş hezar dînar derketin. Min ji herdu birê xwe re got: “Ka em nivê van pereyan veşêrin ji rojê teng re û yê mayî jî em li hevdu parve bikin, her yekî ji me hezar dînar behra me dikeve.” Herdu tevî min bûn, gotin; fikreke rast e. Min her yekî hezar dînar

da wan, me ji xwe re gelek kelûpel kirîn, me keştiyek kirê kir û em derketin seferê. Em mehekê geriyân, me kelûpelê xwe firotin û serê her dînarêkî me neh deh dînar qezenc kir. Wê çaxê me xwest ku em bazirganiya xwe mestir bikin û herin deverên hîn dûrtir. Em hatin cem behrê, li qiraxa avê cariyekê bi destê min girt û got: “Mîrê min ma qencî li ba te tuneye da ku ez duayekê ji te re bikim.” Min got: “Belê.” Got: “Begê min bi min re bizewice û min bi xwe re bibe welatê xwe, mîna diyariyekê ez dixwazim xwe pêşkeş bikim ji te re. Ku tu xêrê bi min bike, dê Xwedê jî li te bête rehmê. Li vî halê min yê şerpeze nener begê min, ez miroveke baş im.” Ku min ev gotin jê bihistin, dilê min pê şewîtî û ez lê germ bûm. Min ew bi xwe re bir, cil û berg lê kirin. Di keştiyê de jî min xaliyên giranbuha jê re raxist û min pir qedr û qîmet jî dayê, dûvre em bi rê ketin.

Piştî min bala xwe dayê ku hezkirineke wê yî xurt ketiye dilê min de. Êdî şev û roj min ew ji xwe qut nedikir. Ez hewqasî pê ve hatibûm girêdan ku êdî herdu birayên min jî nema dihatin bîra min. Wana jî êdî zikreşî avêtin min, çavên xwe berdabûn malê min û kelûpelên ku min pir difirotin û gelek pere jê qezenc dikirin. Dûvre li ser kuştina min axifîn û li hev kirin; şeytan ber çavên wana reş kiribû. Rojekê ku ez di ber jina xwe de raketibûm ez di keştiyê werkirim, ez avêtim behrê. Di wê kêlikê de jina min ji xew şiyar dibe, xwe vedigevizîne dibe efrîtek û min ji nava avê derdixe, min xelas dike û dibe giravekê. Min li wir datîne, çend kêlikan wenda dibe û bi fecra sibê re dîsa li min vedigere. Gava ku çavên min vebûn û min lê nerî, got: “Ez jina te me, ew cariya ku te girt. Baş bizane ku ez cinî me, loma min tu ji mirinê xelas kir û bi emrê Xwedê anî vê derê. Ez cinî me lê ez jî bi Xwedê û resûlê wî bawer dikim. Ez bi qilixê feqîra hatibûm cem te dîsa jî tu bi min re zewicibû; va min jî dora xwe kir min tu ji mirinê xelas kir. Lê ez ji birayên te pir qeherîme û bêgûman divê ez wana bikujim.”

Li gotinên wê jî, li kiryarên wê jî ez behetî mabûm. Ez pir şad bûm bi wê kiryara wê ku ez ji mirinê xelas kirim. Min spasiya xwe bi minnetdarî jê re pêşkeş kir, lê min kuştina herdu birayên xwe pêwîst nedît û çîroka xwe û wan jê re got. Gava ku guh da gotinên min, got: “Eva aniha vê şevê ez ê bifirim, herim cem wana, gemiya wana binav bikim û wana bifetisînim.” Min jê re got: “Tu bi xatirê Xwedêkî dev ji wana berde, çawa ku dibêjin ‘xerabiya xeraban besî wa ye’ ji xwe dîsa jî birên min in.” Got: “Îlleh billêh divê ez wana bikujim.” Ez dîsa li ber geriyam, heta ku rawestiya. Dûre rahişte min, firiya bi hewa ket û ez anîm ser banê xaniyê min danîm. Min deriyê xwe vekir û ez ketime hundir, piştî min ew sêhezâr dînarê xweyî veşartî derxist û ji xwe re pê eşya kirîn, min dikana xwe dîsa dagirt û ji xwe re tîcaret kir. Gava bû şev û ez vegehiyam malê, min dît ku ev herdu tajî li ber deriyê min girêdayîne. Gava herduyan ez dîtîm, ji ber min rabûn, giriyân

û xwe avêtin hembêza min. Carekê ji nişkê ve jina min gazî min kir û got: “Ev herdu birayên te ne.” Min got: “Kê ew xistin vî halî?” Got: “Min xeber da xwişka xwe, ewê ev bi wan kiriye. Û heta deh salan jî dê nikaribin ji vê efsûnê rizgar bibin.” Min jî ew dane dû xwe û ez hatim da ku ez wê bibînim û herdu birayên min ji vî halî xelas bike. Min bala xwe dayê ku ev xort li vir rûniştiye, wî jî çîroka xwe ji min re got, ez rûniştim da ku ez bibînim bê çi gengeşî di nav te û wî de derbas dibe. Çîroka min jî ev e.

Yê cinî got: “Ev jî çîrokeke sosret e û pir ecêb e. Loma ji bo te jî, ez ji sêya yekê ji xwîna wî dibexşînim.”

Wê gavê şêxê sêyem, xwediyê hespê nêzikî wî bû û got: “Ez ê ji te re çîrokekê ji yê herduyan ecêptir bêjim û heger çîroka min ji ya herduyan xweştir û ecêbtir be, divê tu ji sê behra behrik ji xwîna wî ya mayî bide min û tu tê bibhure.” Ê cinî got: “Bila be.” Şêx gotê:

### (Çîroka Şêxê Sêyemîn û Hespa Wî)

Ey sultanê cinan! Ev hespa hanê berê jina min bû. Ez derketibûm rêwîtiyekê dût û piştî salekê gava ez vegeyriyam malê, min ebdekî reşik di ber de dît, di nav nivîna wê de. Ji xwe re kêf û henekên xwe dikirin. Çawa ku çav li min ket bi lez rabû ser xwe, rahişte kûzekî avê tişte li ser xwend û bi ser min de reşand û got “Bibe seh!” Hema ku wilo got, di cî de ez bûm kûçikek. Ewê jî bera min da ji malê. Ez ji malê derketim û çûme ber deriyê dikana goştîroşekî, da ku ji xwe re hestiyar bixwim. Gava goştîroş rewşa min dît, derî li min vekir û ez girtim, dûra jî ez bi xwe re birim mala xwe. Dema çavên keça wî li min ketin, destmala xwe da ber rûwê xwe û ji bavê xwe re got: “Ev çiyê babo, ma tu xerîban tîne balî min?” Bavê wê got: “Ka xerîb û ka mirov keça min, qey xeyal li ber çavên te çêbûne?” Keçikê got: “Yê xerîb ev kûçik bi xwe ye yabo, jinikekê ew efsûn kiriye û ez dikarim wîna jê xelas bikim.” Gava bavê wê ev gotin bihîstin, got: “De ka wîna ji vê belê xelas bike keça min.” Keçkê di cî de destên xwe avête kûzekî avê, li ser xwend û av bi ser min de reşand û got: “De ka vegere sûretê xweyî ewilî!” Ez jî pê re vegeyriyam ser xulqeta xwe yî berê. Rabû min destê wê keçikê maçî kir û xwe kir dexilê wê û jê xwest ku ew jî jina min efsûn bike, çawa ku wê bi min kiribû. Rabû çenek ji wê ava han da min û got: “Ku te ew raketî dît, vê avê bi ser de biresîn, tu dixwazî bibe çi ew ê jî wilo bibe.”

Ez çûm malê min dît ku jina min raketîye. Min ew av bi ser de reşand û got: “De ji vî sûretî derkeve, têkeve sûretê hespekê de.” Û vaye ew di vî sûretî de ye li hember te, mîrekê cinan ê hêja.

Gava ku çîroka xwe qedand, Efrît pir kêfxweş bû bi çîroka wî û xwîna Tacir a mayî jî diyarî wî kir û ew efû kir.

*Bi wê gotinê re, dîsa li Şehrezadê bû şeveq, wê jî gotina xwe birî û bêdeng ma.*

*Xwişka wê jê re got: “Axaftina te çiqasî xweş û rind e!” Ewê jî got: “Tew ku te zanîba bê ez ê sibê ji we re çî bêjim! Yê sibê ji yên îşev bi gelekî xweştirin. Îca ka ku Melîkê min min nekuje, ez ê ji we re bibêjim.” Melîk jî di dilê xwe de got “Bi Xwedê min ew nekuşt heta ku ez dûmahîya vê çîroka ecêb jê nebihîzim.” û her weha wê şevê jî di hembêza hev de man heta sibehê.*

## ŞEVA SÊYEMÎN

### (ÇÎROKA MASÎGIR Û EFRÎT)

*Gava ku dîsa şev hat Dunyazadê got: “Xwişka min xweska tu dîsa ji me re biaxîfiya.” Şehrezadê got “Li ser seran li ser çavan delaliya min.” û dest bi axaftinê kir: “Vêca Melîkê min î bextewar, ji min re hatibû gotin ku wî tacirî spasiya xwe pêşkêş kir ji hersî şêxan re li ser wê alîkariya ku pêre kirin û ew ji mirinê xelas kirin. Wan jî şadbûna xwe ya bi xelasiya wî anîn ziman û jê re gotin ‘derbasbûyî be.’ Dûra herkes ji wana vegeriya welatê xwe. Lê belê çîroka masîgir ji vana tevan bêhtir ecêb e.” Melîk jê re got: “Îca ka bêje bê ev çîroka masîgir çawaye, çiyê?”*

*Şehrezadê got:*

Melîkê min î bextewar, ji min re hatibû gotin ku zilamekî kal hebûye. Jinek û sê zarokên wî hebûne. Pir feqîr û jar bûye. Jê re bûbû adet ku ji bo masîya bigre rojê çar çaran dehfika xwe vede; tenê çar çaran, ne zêdetir. Rojekê nîvrokî ji malê derdikeve berbi keviya behrê ve. Tora xwe davêjê, li ber rûdinê û sebir dike heta ku av li ser torê zelal dibe. Piştî torê dikişîne û tê derdixe ku tor girane. Dike nake nikare tora xwe ji nav avê derxîne. Radibe diçe qiraxa avê singekî dikute û tora xwe pê ve girêdide. Dûra xwe bera binê avê dide û li dora tora xwe diçe û tê heta ku rêçekê dibîne û tora xwe ji nav avê derdixe. Lê dinêre ku kerekî mirî tê aliqîye. Gava ku çav li kera mirî dikeve, xemgîn dibe û dibêje:

Hey ew mirovê ku di tarîka şevê de bêhedan e  
Girtina rizq ne tenê bi liv û ger û bazdan e  
Qey tu nabîni bê çawa masîyan li ber behrê dizîze  
Bi hêviya rizq e û stêrk li ezmanan dilîze  
Li ber pêlên vê deryaya bi kef û mewc e ew

Û herdu çavên wî hergav li ser torê ye lew  
Çi gava ku dê kêfxweş bibe bi şeva qelew  
Kirrîna şevê bo wî pir erzane herdem  
Lew ku bê serma û seqem be li cem  
Subhan ji wî re ku têr dike yekî û yekî birçî  
Yek masî digire û birçî, yek jî dixwe ewî

Vêca gava ku Masîvan kerê mirî dît, ew ji tora xwe derxist, tora xwe guvaşt û ji nûve dîsa avête behrê, qasekî xwe ragirt dûra dîsa pê girt û tora xwe kişand. Wê carê ji cara ewil jî girantir bû. Di dilê xwe de got “Vê carê dê masî be.” Tor dîsa girêda, xwe tazî kir û bera binê avê da û tor kişkişand heta ku ji avê deranî. Lê nerî, bala xwe dayê ku denekî tijî kil û qûm têde ye. Pir xemgîn bû bi wê yekê. Îstîxfara xwe anî, tora xwe ji gemarê paqij kir û dîsa got “Bîsmîllah” û avête behrê. Xwe li bende ragirt heta ku av li ser zelal bû, dûra dîsa kişand, bala xwe dayê ku vê carê jî sênîk û mênîk tê de hatine. Bêhna wî pir teng bû, çend malik ji helbesta hozanekî xwend û got:

Rizq ewe ye, ne mîsoger û ne jî berdar  
Ne sûda pênûsê li te tê ne jî biryar  
Ji her mezhebî re rêç û rêbazek heye  
Mirovê ku qezenc dike herdem ne hêjaye  
Ka mirin tu were, eva jiyan pir bê eman e  
Baz û qertel ketne erdê û qaz li ezman e  
Teyrên ku şerq û xerb dibezin tev bê rizq in  
Ën ku bê xem rûniştine jî ziktêr û bi rizq in

Dûvre serê xwe ber bi ezmanan ve rakir û got: “Xwedêyo! Xwedêyo!  
Tu baş dizanî ku ez tora xwe tenê çar caran davêjim. Min sê caran avêtiye û ev jî cara çara ye.” Piştî navê xwe got û tora xwe dîsa avête behrê. Qasekî xwe ragirt heta ku tor gîha binê avê, dûvre dîsa kişand. Bala xwe dayê ku tor aliqiyê û nayê. Dîsa îstîxfara xwe anî da ku bêhna wî fireh bibe, kincên xwe di ser xwe re anî û careke din xwe bera binê avê da. Bi tora xwe lebikî heta ku derxiste der; vekir lê nerî, bala xwe dayê ku gumgumekî zer î jî baxir tê de ye. Devê gumgum bi risasê hatibû asêkirin û bi navê Hezretî Suleyman hatibû morkirin. Gumgum danî erdê, kêra xwe ji ber xwe derxist û hêdî hêdî risas ji ser devê wî da alî. Ku devê gumgum vebû dûmanek jê derket û dirêj bû heta ku gîha ber perê ezmanan. Masîvan li ser vê rewşê ma şaş. Dûman bi ser hev de kom bû, dûvre dîsa pijîqî ji hev bela bû, bû efrîtek serê wî di nav ewran de û lingên wî li erdê.

Masîvan pir tirsîya, çogên wîna fisîyan, derman tê de neman, qirik lê zûha bû û bû şerqe şerqa diranên wî yê li hev diketin. Behetî, rîya xwe şaş kir nema zanîbû bê wê bi kû ve biçê. Efrît ew dît, kete pêşiyê û jê re got: “Laîlahe îllallah û Suleyman nebîyullah.” Yanî got: “Xwedê bi tenê ye û

Suleyman nebiyê wî ye.” Masîvan pir şaş bû, jê re got: “Tu çi dibêji ey mirovê ji agir? Tu dibêji Suleyman nebi ye, ew jî berî hezar û heşsed salî ve miriye û niha em di dewraneke din de ne. Îca çîroka xwe ji min re bêje, ku tu dibêji çi û tu çima di wî gumgumî de bû?” Efrîr jê re got: “Xwedê bi tenê ye nêçîrvano û ez dixwazim mizgîniyekê bidime te.” Masîvan got: “Xêr e, tê çi mizgîniyê bide min?” Got: “Ez ê mizgîniya kuştina te bidime te, aniha ez ê te bikujim.” Masîvan got: “Ma çi gunehê min heye heta ku tu cezayekî wilo giran bide min?” Efrîr got: “Nêçîrvano, de ka çîroka min guhdar bike.” Masîvan got: “De ka zû bibêje berî ku ruhê min ji bedena min dûrkeve.”

Efrîr got: “Bizanibe ku ez yek ji wan cinên serbilind im. Min serî li hember Suleymanê kurê Dawid rakir wî jî wezîrê xwe Asif kurê Berxiya şande dût min, ez girtim, birim balê bi darê zorê. Ku Suleyman ez dîtîm serê xwe li min hejand û doz li min kir ku ez werim îmanê û têkevim rîya wî de. Min ew yek qebûl nekir. Rabû ev gumgumê han anî, ez xistime hundurê wî de û bi risasê devê wî girt mor kir; dûtve emir da cinîyên xwe, ewan jî rahişte min ez bi wî halî avêtîm binê deryayê. Ez sed salî mam, rabû min ji xwe re got ‘Ku yek min ji vî halî xelas bike ez ê wî di nav mal û mulk de bihêlim.’ Lê sed sal buhurî û kesî ez xelas nekirim. Ji bo sed salên dîtîr min ji xwe re got ‘Ku yek min ji vî halî xelas bike ez ê malê dinyê tevî bidim wî.’ Lê dîsa kesî ez xelas nekirim. Çarsed salên dîtîr derbas bûn; min di dilê xwe de got ‘Ku yek hebe min ji vî halî xelas bike ez ê wî bikujim.’ Ez mam heta vê gavê û niha jî tu hat, te ez xelas kirim.”

Gava Masîvan ew gotina Efrîr bihîst, matmayî ma û got: “Subhanallah! De binêr welleh incex van rojan ez karîbûm bihatima te xelas bikim. Tu jî min bibexşîne, min nekuj belkî Xwedê li te bê rehmê û ew jî te bibexşîne. Ku tu min bikujê dibe ku Xwedê yekî bi ser te jî de bişîne ku heq ji te derkeve.” Lê belê yê Efrîr ji ya xwe nehate xwarê û got: “Îlleh billeh divê ez te bikujim.” Ku Masîvan ji nêta wî yî xerab amin bû, ji Efrîr re got: “Hema min bide xatirê ku min tu xelas kirî, min efû bike.” Wî jî got: “Jixwe ji ber ku te ez xelas kirime ez ê te bikujim.” Rabû Masîvan jê re got:

Ey şêxê cinan! Min qenciyek bi te kir, tu jî bi xerabiyê bersiva min didî û Xwedêyê ku gotiye:

Ku me qencî kirî, bi xerabiyê bersiv dane  
 Û ev jî sosret û karekî ji karê bêsinca n e  
 Ê ku qenciyê bi nebaşan re bike  
 Dê mîna dêka Amir şerpeze û bi kul be

Rast gotiye, rast gotiye. Ku Efrîr ev gotin jê bihîst, got: “Qet xwe nexapîne, illeh ez ê te bikujim.” Yê Masîvan jî gotê: “Bi rastî jî tu xwedî biryarî ji bo

kuştina min?” Efrît got: “Belê.” Masîvan got: “Tu bi wî navê pîroz ke ew navê ku bi mora Suleyman hatîbû nivîsandin, ez ê pirsekê ji te bikim, tu jî bi rastî bersiva min bide.” Got: “Bila be.” Lê çawa ku Efrît gotina navê pîroz bihîstî, kete qelaqê de û hejiya. Lewma bê sebr bibû û jê re digot: “De zû bibêje dirêj neke!” Masîvan gotê: “Tu bi Xwedêkî tu çawa di vî gumgumî de dima û ev gumgum têra cihê destê te tenê nake?” Rabû Efrît jê re got: “Qey tu bawer nakî ku ez têde bûm?” Masîvan got: “Na, ez tucarî bawer nakim heta ku ez bi çavên serê xwe nebînim.”

*Wê kêlikê şev li Şehrezadê qediya, ewê jî dev ji gotinê berda.*

## ŞEVA ÇAREMÎN

*Şehrezadê got:*

Vêca melîkê min î bextewar, tête gotin ku wê gavê Efrît bû dûman û ber bi asîmanan ve bilind bû. Dûvre hêdî hêdî kete gumgum de. Masîvan jî ji nişkê ve rahişt qapaxa risasî, di cî de devê gumgum girt û bang li Efrît kir, gotê: “Ji xwe ji teşemirinan mirinekê bineqîne! Ez ê te bavêjime behrê û ji xwe re malekê çêbikim li vir, da ku ez nehêlim kes li vêde nêçirê bike. Kî bê, ez ê ji wan re bêjim dûrkevin, Efrît li vê derê hene û bila herkes ji bo te rengêkê mirinê pêşniyar bike.” Ku Efrît ev gotina Masîvan bihîst, da xwe ku ji gumgumê derkeve, lê nikaribû. Fam kir ku êdî mîna berê girtî-ye û mora Suleyman dîsa li devê gumgum e. Rabû gav bi şunde avêt, serê xwe li ber Masîvan xwar kir û li ber geriya got: “Gelo tu dixwazî çî bi min bikî?” Masîvan got: “Ez ê te bavêjim behrê, da ku heta roja qiyametê tu têde bimîni.” Efrît jê re got: “Ka derî li min veke da ku ez qencîyekê bi te bikim.” Masîvan gotê: “Tu derewan dikî hey mel’ûn, ev rewşa ku ez û tu tê de mîna ew rewşa Melîk û Dûbanê Hekîm e.” Efrît bi mereq jê pirsî: “Îca çîroka van herdu mirovan çawa bû?”

## (Çîroka Melîk û Dûbanê Hekîm)

Masîvan gotê:

Tê gotin ku di demboriyeke kevin de li welatê Eçeman melîkek hebû, jê re digotin Melîk Yûnan. Melîkekî xwedî şan, xwedî mal û mulk bû. Xwedî artêşeke mezin bû ku pir bi saw bû li ser xelkê. Birînek di laşê wî de hebû, tu hekîman nikaribûn ew derman bikirana. Û rojekê hekîmekî pîremêr ku jê re digotin Dûbanê Hekîm tête wî welatî. Dûban hekîmekî şareza bû ku bi Yûnanî û Romî û Farisî û Erebi û Suryanî zanîbû û hemû pirtûkên bi van zîmanan xwendibûn. Ew zanayê tibê û astrolojiyê bû jî. Rêç û rêbazên bijîşkîyê tev zanîbûn. Zerar û fêdeyên dermanan jî giş zanîbûn. Ji xeynî zaniya-



riya tib û felezkaniyê, ji felsefê ji pir agahdar bû û îcazeta van zanînan tevan girtibû. Vêca gava ku hate wî welatî û rewşa Melîk û nexweşiya wî bihîst û pê hesiya ku tu kesî pê nekarîbûye wîna derman bike, pir mereq kir, li ser mijarê ponijî û hişê wî ma li ser wê yekê.

Ku bû sibeh rabû xwe girêda û berê xwe da cem Melîk, hate dîwana wî, xwe pê da naskirin û jê re got: “Melîkê hêja ez ji nexweşiya te agahdar bûm û min bihîst ku tu hekîman nikarîbû wê birîna te derman bike. Eva ez jî hatime cem te da ku ez birîna te derman bikim bêyî ku ez tu îlacan bidime te, an jî melheman di canê te bidim.” Melîk behetî ma, got: “Çawa! De binêr, bi wî navê Xwedêyî şêrîn, ku tu min rehet bikî ez ê te di nav mal û mulk de bihêlim da ku zarok û torinên te jî di nava xweşiyê de bijîn. Û tu çi bixwazî ez ê bidime te û tê herdem dostê min bî.” Bêyî ku xwe li bende gotina wî rage, di cî de kincên xwe di ser xwe re anîn, birîna xwe nîşanî wîna da û got: “Bê derman û melhem tê bikaribî vê nexweşiya min derbas bikî?” Hekîm gotê: “Belê.” Melîk behetî ma. Jê re got: “De ka tê çawa bikî, bike.” Hekîm got: “Li ser seran, li ser çavan.”

Dûbane Hekîm ji cem Melîk radibe, diçe ji xwe re xaniyekî kirê dike. Derman û dermanokên xwe, gîha û kulîlk û pincar û çî tiştên ku li balê hebûn ji bo çêkirina dermanan têde danî, pirtûk û lîstîk û pêncên xwe jî anîn. Dûvre ji xwe re qaçilekî hişkolek çêkir, hundurê wî vala kir, zilek anî gogêke grover jî çêkir. Û gava amadekariyên xwe bi rêkûpêk kirin, roja dîtirkê dîsa derkete rûbarî Melîk û jê re got: “De kanî ji kerema xwe re were bi vê gogê û bi vî qaçilî bilîze.” Melîk derkete meydana lîskê û emîr û wezîr û navmalîyên wî jî pêre. Ku Melîk Yûnan cihê xwe girt, Dûbane Hekîm qaçil da destê wî û jê re got: “Halo pê bigre û bimeşe li meydana û ji xwe re li vê gogê bide heta ku tu di nava xwêdanê de bimîne. Wê gavê dermanê di destê te de, dê li laşê te belav bibe, piştê tê vegeerî qesrê, bikevî serşokê, xwe bişoyî û dê tiştê li te nemîne, tê rehet bibî.”

Melîk Yûnan rahişte qaçil ji destê hekîm girt, li hespekê siwar bû û bi dû gogê ket, lê da û lê da heta di nav xwêdanê de ma. Hekîmê Dûban têngişt ku derman li bedena wî tev bela bûye, jê xwest ku vegere qesrê û di cî de têkeve serşokê. Melîk vegeerî qesrê û bi şêweyek pir xwe şûst. Dûvre kincên xwe li xwe kirin û ji serşokê derket, hate hundur. Gava dîsa li bedena xwe nerî, bala xwe dayê ku birînen wîna rehet bûne û şop jî ji wan nemaye. Laşê wîna mîna zîv dibiriqand, şayîtokî û nerm bûbû. Bi vê yekê Melîk pir kêfxweş bû, bêhna wîna hate ber, spasiya xwe ji Xwedayê xwe re anî ziman û çû mala xwe raket da ku bêhna xwe berde. Ku bû sibeh, hate dîwana xwe û li ser textê xwe rûnişt, emîr û wezîr û gîzîrên wî jî li dorê.

Yê Melîk waha bû, îca em vegerin ser Hekîm Dûban. Ew jî rabû vege-riya mala xwe. Gava ku bû sibeh ji mala xwe derket, hate meqamê Melîk, serê xwe jê re danî, izna çûnê jê xwest û ev çend malik ji helbestekê jê re xwendin:

Başıya mezin ewe ku bang li mirov kirî neçe  
Qencî ewe ku mirov bi yekî başiyê bike  
Ey mirovê rûgeş î bişewq û nar û nûre  
Ew şewqa ku tarî û xerabiyê tune dike  
Hîna jî rûyê te bi şewq e di nav xêrê de  
Xwedê bike qet nebîne eş û xeman di wextê de  
Xweska min bi wan qenciyên başî bêminetî  
Ew ên ku mîna baranê bi ser zeviyan de dibarî  
Te pir pereyên xwe rijandin ji bo vê meznahiyê  
Lewra bi serbilindî tu gîha vê radeyê

Gawa Melîk ev gotin jê bihîstin, bi lez bi destê wîna girt û ew li kêlaka xwe da rûniştandin. Piştî xwarin û fêkî hatin ber wan. Bi hev re xwarin, vexwarin û tevaya rojê bi hev re goftûgo kirin. Êvarkî jî gava Dubanê Hekîm rabû ku here, Melîk du hezar dînar û gelek xelat û cil û berg danê, ew li hespê wî siwar kir û şande mala wî û di dil xwe de got “Vî zilamî bê derman û melhem ez rehet kirim ji vê nexweşiyê. Xwedê zane hikmetek mezin pê re heye. Ya rast ewe ku ez qenciya herî baş bi vî zilamî bikim û wîna hertim li kêleka xwe bigirim da ku şewirmend be ji min re.”

Melîk Yûnan, êdi pir kêfxweş û bextewar bûbû bi tenduristiya xwe û saxlamiya laşê xwe. Ku bu sibeh û çû ser textê xwe rûnişt, wezîr û mîr û gizîrên wî jî li derdorê rûniştin. Rabû ferman da ku Dûbanê Hekîm bînin balê. Dema Dûban hat, Melîk bi rêzdarî ji ber rabû û ew li kêleka xwe da rûniştandin. Cûbbeyê ku li ser wî bû ji xwe kir û da Dûban, lêkir û şevbuhêrka xwe bi hev re kirin heta derengî şevê. Dûvre emir da ku pênc taxim kinc û hezar dinarî bidinê, piştî rêbikin mala wî. Dûbanê Hekîm li ser vê yekê pir spasiyên xwe ji Melîk re nîşan da û vege-riya malê.

Roja dîtirkê Melîk dîsa çû dîwanê, li ser textê xwe runişt, wezîr û mîr û xîzmetkarên wî jî li dorê bûn. Wezîrekî wîna hebû zikreş û hesûd, bi awirin xerab li dora xwe dinêrî, gava ku wî wezîrî ew qencî û xelatên ku Melîk daye Dûban dît, dixsiyek dijwar pêre çêbû û buxzeke giran kete dilê wî himber Dûbanê Hekîm. Rabû xwe nêzî Melîk kir û jê re got: “Başî û qenciya te gihaye herkesî, ku tu iznê bidî min şireteke baş li ba min heye ji bo Melîkê min.” Melîk got: “Çiye ka bêje.” Wezîr got: “Melîkê min tu qedr û qîmetek mezin didî mirovekî ku dujminatîyê bi te re dike û dixwaze ku tu ji holê rabe.” Melîk pir qeherî, medê wî xerab bû û got: “Kî ye ewê ku tu dibêje duj-

minê te ye û ez qencyê pê dikim?” Got: “Melîkê min, ku tu raketî be, şîyar be çawa tu nizanî, ez behsa wî hekîmî dikim, Dûbanê Hekîm.” Melîk got: “Wîna ez ji nexweşiyekê rehet kirim ku tu bijîşkan nikarîbûn min jê xelas bikin. Mirovekî bi tenê ye ku kesî weke wî tuneye di vê heyamê de. Dostekî min î mezin e û tu van gotinên nebaş di derheqê wî de dibêje! De binêr bi navê Xwedêyi şêrin, tu van gotinan tenê ji zikreşîya xwe dibêjî çawa ku berê Melîk Sendîbad ji min re gotîbû.”

*Wê gavê şev qediya û Şehrezadê jî gotina xwe birî. Wê şevê jî ew û Şehriyar di himbêza hev de man heta sibehê.*

### ŞEVA PÛNCEMÎN

*Şehrezadê got:*

Melîkê min, dibêjin ku Yûnanê Melîk ji wezîrê xwe re gotiye: “Wezîro gizîro bi Xwedê tu zikreşîyan tavêje vî hekîmî û tu dixwazî ez wîna bikujim û piştê ez lê poşman bibim çawa ku Sendîbad poşman bû ji ber kuştina Bazî.” Wezîr gotê: “Ew çawa bû?”

(Çîroka Melîk Sendîbad û Bazê Wî)

Melîk Yûnan got:

Dibêjin di serdemê kevin de melîkekî Farîsan hebûye ku xwedî bazekî bû û tu carî ji xwe dûr nedixist. Gava diçû nêçîrê bi xwe re dibir, jê re taseke zêrîn çêkiribû avêtibû stûwê xwe û pê av didayê. Rojekê wekilê wîni ku li teyrê baz dinêrî jê re got: “Melîkê min êdî wextê me hat ku em biçin nêçîrê.” Melîk xwe amade kir, dûra teyrê xwenî baz hilda ser milê xwe û berê xwe da nêçîrê. Dema gihan newalekê, dahfika xwe vedan, xezalek jî hat û kete dahfikê. Melîk jî li leşkerên xwe zivîrî û ji wan re got: “Yê ku xezal di hinda wî re bireve dê bê kuştin.” Lêşkeran xelek li dora xezalê teng kirin. Xezal rabû ser herdu lingên xwe yî dawî û herdu lingên xwe yî pêşîn mîna destan di ser sînga Melîk re bir û anîn. Çawa ku bixwaze Melîk xwe bitewîne. Melîk jî wilo kir û xwe bi pêş de tewand. Di wê navberê de xezalê fersend dît û di ser serê Melîk re xwe çeng kir, reviya çû. Melîk li leşkeran zivîrî, bala xwe dayê ku çav li hev dîkin. Rabû ji wezîrê xwe re got: “Wezîro, ev leşker çî dibêjin?” Got: “Dibêjin te gotiye yê ku xezal di hinda wî re bireve dê bê kuştin.” Melîk got: “Bi tirba bavê min ez ê li dûv vê xezalê herim heta ku ez wêna bigirim.” Li hespê xwe siwar bû û bi tena serê xwe da dûv xezalê. Di devereke teng de bazê wî xwe dada xezalê û herdu çavên wêna kor kirin. Melîk jî gîhayê, şûrê xwe lêda ew serjê kir, çermê wê di ser re anî. Dinya pir germ bû û av li wê derê peyde nedibû. Lê Melîk tevli hespê xwe pir tî bûbû

û debara wî nedibû. Li derdora xwe nerî, bala xwe dayê ku darek li kêleka wî ye, tişteki rohn mîna avê jê dinisile. Tasika stûwê baz derxist, da ber heta ku tije bû, lê hîna ku venexwaribû bazî baskê xwe lêda, tasik rijand. Melîk got belkî baz pir tî bûye. Rabû tasik careke din dagirt û danî ber. Bazî dîsa baskê xwe lê da û rijand. Melîk qeherî, cara sisiyan jî dagirt û danî ber hespê xwe da ku vexwe. Lê belê wê carê jî baz baskê xwe lê da û rijand. Melîk hîn bêhtir qeherî û got: “Xwedê bela xwe bide te hey ajalê herî qudoş di nav teyran de.” Dûra şûrê xwe kişand û li baskên wîna da, birî. Baz di nava xwîne de bû lê dîsa jî bi serê xwe îşaret dikir da ku Melîk li jora xwe meyze bike. Melîk serê xwe berjor rakir, dît ku ew av ji devê marekî li ser serê darê dinisile. Av ne av bû, jehr bû. Melîk hem pir xemgîn bû, hem jî pir poşman bû li wê kiriyara xwe. Li hespa xwe siwar bû û bi şûn de vegeyriya cem leşkerên xwe; laşê xezalê bi ser aşpêj ve avêt û bi dilekî şikestî li cihê xwe rûnişt. Teyrê wî jî li ser destên wî bû. Baz çend carên din hilma xwe kişand û berda, dûre mir. Melîk jî pir pê êşiya.

Gava ku Wezîr ev çîrok ji devê Melîk Yûnan guhdar kir, jê re got:

Ey Melîkê Melîkan, kengî min tişteki ji te re gotiye û te zerar jê dîtiye? Baş bizane ku ez tenê ji dilşewatî vê qencyê bi te dikim. Û tê rastiya vê yekê bibîni. Vêca ku te bi ya min kir tê rizgar bibe yana dê encama te pir xirab be, mîna ew encama ku bi serê wezîrekî de hatibû, wezîrekî ku bêbextî bi kurê melîk re kiribû.

(Çîroka Kurê Melîk û Pîrebokê)

Kurê vî melîkê ku ez dibêjim, wî jî ji nêçîrê pir hez dikir. Wezîrekî melîk hebû, melîk jê re gotibû “Tu herdem bi kurê min re be, çû ku tu jî pêre be.” Rojekê kurik derket nêçîrê, wêzîrê bavê wî jî pêre bû. Bi hev re çûn, li berazekî rast hatin. Rabû wezîr ji kurik re got: “Li dû vî berazî biçe, wîna bigire.” Kurik bi dû beraz de çû heta ku ji ber çavan ket. Beraz jî ji ber çavên wî wîna bû. Kurik ma heyirî nizanibû bê wê bi kû ve herî. Li derdora xwe nerî dît ku cariyek li ber rêyekê rûniştiye, digirî. Kurê Melîk jê re got: “Tu kî ye?” Jinikê got: “Ez keça melîkekî ji melîkên Hîndîstanê me. Gava ku em di beriyê re derbas dibûn, xeweke giran ez girtim, ez ji ser piştê qantirê ketim erdê û şiyarbûna ku ez bi xwe şiyar bûm min dît ku ez bitenê me û min nema dizanî bê ez ê bi ku ve herim. Lewra ez jî li vir mame di vî halî de.” Dilê kurik pê şewitî, ew li qantira xwe kir û meşiya, heta ku gîha giravekê. Cariyeyê jê re got: “Ezbenî li vir raweste ez dixwazim destavekê bigirim.” Kurê Melîk rawestiya. Cariye jî peya bû çû nava giravê, lê pir dereng ket, ve-negeriya. Kurik li dû çû, lê wê pê nizanibû. Gava kurik gîha devera ku cariyê çûbûyê, bala xwe dayê ku ew jinik pîrebokeke, zarokên xwe li dora xwe kom

kiriye, ji wan re dibêje “Zarokno! Min îro ji we re nêçîrek baş aniyê, kurekî pir qelew e.” Wan jî jê re digot “Dayê ka wî zû bîne em zikên xwe têr bikin.” Gava kurê Melîk ev gotin bihistin çogên wî ricifin û fêm kir ku mirina wî hatiye. Bi tirs bi şûnde vegeriya. Gava ku pîrabok jî bi şûn de hat û ew dît, fêm kir ku kurik tirsiyaye. Gotê: “Xêr e, mirov dibêje qey tu tirsiyaye.” Ewî jî got: “Willehî dujminekî min heye û ez jê ditirsim.” Pîrabokê jê re got: “Ka te digot, ez kurê Melîk im?” Kurik got: “Rast e.” Ewê jî got: “Madem tu kurê Melîk e çima tu hinek pere nadî dujminê xwe û wîna ji ser çavên xwe nadî alî?” Kurik got: “Ew ne dujminekî ku qîma xwe bi mal û pereyan bîne. Ew tenê ruhê min dixwaze û ez jî jê ditirsim û Xwedê dizane ku ez mirovekî mazlûm im.” Ya pîrabokê jê re got: “Heger bi rastî jî tu mazlûm be çawa ku tu dibêji, wê çaxê alikariya xwe ji Xwedayê xwe bixwaz dê besî te be. Tê bikaribî xwe bisitirîne ji şerê dujminê xwe.” Rabû kurik serê xwe berjor hilda, destên xwe ber bi asîmanan vekirin û got: “Xwedêyo! Xwedêyo! Tu ye yê ku duayên koleyên xwe dibihîzî û wana ji tengasiyan rizgar dikî. Ka min jî ji vê belê rizgar bike û berê vî dujminî ji ser min biguherî. Tu ye ê ku bi her tiştî dikarî.” Gava ku pîrabok ew dua wîna bihist, piştî xwe dayê û ji wir çû. Kurik jî bi lez û bez li bavê xwe vegeya û çîroka wî wezîrî jî serî heta binî jê re got, bavê wî jî emir daye ku wezîr bikujin.

Vêca tu jî Melîkê min, kengî tu li vî hekimî ewle bibî, dê bi şiklekî pir pîs te bikujî. Rabû Yûnanê Melîk gote wezîr: “Wê çaxê divê em çawa bikin? Ka ji min re bêje.” Wezîr got: “Hema niha qasidekî bişîne pey, bila bê vir. Û çawa hat, bi bêbextî serê wîna bifirîne berî ku ew yê te bifirîne.” Melîk Yûnan got: “Tu rast dibêje wezîrê min.” Rabû şand dû Dûbanê Hekîm, ew anî huzûrê, çawa ku Dûbanê Hekîm kete raberî Melîk de, du malik ji helbestekê xwendin û got:

Berî ku ji min bipirsî te qedrê min girt  
 Te date min bê uzr û bê hîle û bê suxt  
 Dê herdem di bîra min de be qencyên te  
 Dê xeman sivik bike ji ser dil û cegerê min  
 Welew ku dê girantir bike barê ser piştî min

Dûre bi vê helbestê axaftina xwe berdewam kir:

Guh mede kul û derd û xeman  
 Lewra bi sebrê diborin êş û jan  
 Mizgîniya qencyê bigre zûtirîn  
 Belbî xêrek hebe ji te re lew  
 Her çiqasî bête ber te nexêr û ew  
 Li gorî xwe dike Xweda bi karan  
 Tu jî dernekeve li hember tu caran

Piştî wê bêhna xwe berda, dûre ev çend bend ji lê zêde kir û got:

Singa xwe veke ji bîr bike derd û xeman  
Derd û xem in yên ku dibin hişên mirovan  
Bo bendeyek lawaz, bêfêde ye qîr û tevdîr  
Berde, bila bimîne di bihuşta radestî û nîr

Melîk jê re got: “Hekîmê min, gelo tu dizanî bê çima min gazî te kiriye?” Hekîm got: “Ji Xwedê pê ve tu kes xeybê nizane.” Melîk jê re got: “Min gazî te kiriye da ku ez te bikujim.” Hekîm pir şaş bû bi vê pêşwaziya wî û got: “Tê çima min bikujî Melîkê min, qey te çi xerabî ji destê min ditiye?” Melîk jê re got: “Ji min re gotin, tu casusî û tu hatiyî min bikujî.” Dûvre di cî de li celad kire gazî û got: “Ka serê vî bêbextî bifirînin û me jê xelas bikin.” Hekîm gote: “Tu bi qedrê Xwedê û pêxemberan ke min nekuje. Li min were rehmê da ku Xwedê li te jî were rehmê.” Melîk got: “Bi Xwedê tu ewleya min tuneye heta ku ez te nekujim. Te darikek da destê min te ez pê rehet kirim. Tu dikarî bêhnekê, tiştêkî bide ber pozê min û tu min bikuje jî, ma ez ê çi bikim, ez nikarim tu tiştî bikim.” Hekîm gotê: “Melîkê min qey cezayê qenciya ku min bi te kir ev bû?” Melîk got: “Bêşik divê ez te bikujim, çare jê re tuneye.” Gava Hekîm ji vê nêta Melîk serwext bû û fêm kir ku dê wîna bikuje, giriya û poşman bû li wê qenciya ku bi Şah kir. Û fêm kir ku qencî ne bi xwediyê wê kiriye. Dûvre got:

Meymûnekî bêaqil e tu biner lê  
Welew ku bîaqil be bavê wî  
Ne li ser rêyeke zuha meşyaye ew  
Ne jî ji tirsan li ser rêçeheriyek bedew

Piştî van ristikan çend malikin din jî rêz kirin û got:

Min wenda kir bi gotin û şîretkarî û ger  
Wan jî qezenc kir herdem bê xem û ger  
Şîret û qenciya min bû ya ku ez rezîl kirim  
Heger nemrim ez ê bê şîret bim ji niha û pê da  
Heger mirim jî ez ê bi dijwarî lanet bikim  
Herkesê xwedî qencî bi her zimani

Piştî vê helbestê Hekîm ji Melîk re got: “Ev cezayê ku tu dê bidî min mîna cezayê ku dabûne tîmsahê.” Melîk got: “Îca ev çîroka cezayê tîmsahê çi ye?” Hekîm got: “Ez ê çawa bibêjim û ez di vî halî de, de ka bi xatirê Xwedê ke min nekuje ‘emir dirêjo!’ Û bû kûrekûra wî giriya û hey giriya. Li ser vê yekê hinekan ji şêwirmendên Melîk jê re gotin: “Ey Melîkê Ezîz, tu bi xatirê Xwedê ka xwîna vî Hekîmî nerjîne. Em ê bibin kefilên wî. Ji xwe ji qenciye pê ve tiştêk bi te nekiriye, tu ji nexweşiyekê rehet kir ku hemû hekîm û bijîşkên welat ji ber bêçare mabûn.” Lê belê ev lavlava şêwirmendan jî tu

bandor li ser Melîk nekir. Hekîm dît ku tu xelasiya wî ji destê Melîk tune, rabû jê re got: “Melîkê Ezîz, madem tu bi biryare û tê min bikujî, ka ji kerema xwe iznê bide min ez biçim wesiyeta xwe li malan û cîranê xwe bikim da ku min veşêrin û wan pirtûkên xwe jî li xêrxwazan bêla bikim. Ji xwe pirtûkeke taybet jî ez dixwazim diyarî te bikim, da ku bê parastin di xezîna te de.” Melîk got: “Ew çi pirtûk e?” Got: “Geleke sir û raz tê de hene. Gava ku te serê min jêkir pirtûkê veke, sê pelan biqulpîne, dûre sê xeta bixwîne ji rûpela çepê, piştî wê tu çi pîrsa ji wî serê min î jêkirî bikî dê bersiva te bide.” Melîk matmayî ma û got: “Hekîmo, ma ku min serê te jêkir û pê de jî tê bikarîbî biaxîfî?” Hekîm got: “Belê Şahînşahê min.” Rabû Melîk çend parêzvan dane rex wî û şande malê.

Hekîm di heman rojê de karên xwe qedandin û bi şûn ve vegeriya qesrê. Roja dîtirkê Melîk berî da dîwana xwe, dît ku Hekîm derbasî cem wîna dibe û di destên wî de pirtûkek perpitî, kevn û kildankek. Hekîm rûnişt û got: “Kanî sênîyekê bînin.” Sênîyek jê re anîn. Hekîm ji Melîk re got: “Ka vê pirtûkê bigre û tiştêkî pê neke heta ku tu serê min bifirîne. Gava ku te serê min jêkir, serî bixe vê sênîkê da ku xwîna wî bisekine. Ku xwîn sekinî tu pirtûkê veke.”

Melîk ferman da ku serê Hekîm jêkin. Pirtûk jî di destê wî de bû. Celad şûr li stûyê hekîm da û serê wîna jêkir, xiste sênîkê û danî ber Melîk. Hekîmê Dûban çavên xwe vekirin û ji Melîk re got: “Îca pirtûkê veke melîkê min. Melîk hewl da ku pelên pirtûkê biqulipîne, lê pel bi hevve zeliqîbûn. Melîk tiliya xwe bire ser zimanê xwe şil kir û pelê ewil qulipand, dûvre bi wî hawî rûpelê duduyan û yê sisyan jî qulupandin, lê dîsa tiştêk nedît. Got: “Hekîmo! Ka tiştêk tê de tune ye?” Hekîm got: “Hinek pelên din jî biqulipîne.” Melîk qulupandina rûpelan berdewam kir, lê jehra li ser rûpelan di bedena Melîk de êdî pir bela bûbû û ketibû taya mirinê, dilerizî. Hekîm jî bi stranî digot:

Bûne serdest û bi hukum serxweş ketin  
 Lê di çend kêlikan de her tişt serûbin bû  
 Ku dadwerî bikirana dê bidîtana jî  
 Lêbelê zulm kirin lew zulm jî dîtin  
 Felekê jî xezeb bi ser wan de anî  
 Ew jî matmayî man hember bûyeran  
 Yek bi yekê bû her wîsa ew  
 Çima ew gazin ji felekê lew?

Melîk di wê kêlikê de mir. Dawî Masîvan ji Efrît re dibêje: “Îca Efrîtê hêja, ku Melîk Hekîmê Dûban nekuşt, Xwedê ew nedikuşt. Gava ku ew kuşt, Xwedê jî ew kuşt. Niha tu jî Efrîtê min, ku tu li min bihata rehmê wê

çaxê dê Xwedê ji li te bihata rehmê û tu bisitiranda.”

*Û li Şehrezadê bûbû sibeh, wê jî dev ji gotin û axaftinê berda, bêdeng ma.*

## ŞEVA ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê got:*

Vêca Şahê min, tê gotin ku gava Masîvan ji Efrît re got ‘Ku tu li min bihata rehmê dê Xwedê ji li te bihata rehmê û tu bisitiranda, lê niha eva ez ê devê vê gungumê li ser te bigirim û te bavêjim binê vê deryayê.’ Efrît qîr da û got: “Masîvano! Tu bi xatirê Xwedê bike vêna bi min neke û min nekuje. Li min bibore û xwe neke mîna min. Ku ez xerabbim ê te tu qenc be û mîna ku Ûmame bi Atike kir tu jî bi min neki.” Masîvan got: “Îca çi eleqa wan û me heye?” Efrît got: “Di vê gungumê de bi vî halî ez ê çawa karibim biaxivim? Divê tu min ji vir derxîne heta ku ez karibim çiroka wan ji te re bibêjim.” Masîvan got: “Bi Xwedê eva ez ê te bavêjim behrê û kes jî tune ku te derxîne.” Lê gava ku hebekî ramiya û ponijî rehm kete dilê wî de, axaftina xwe berdewam kir û ji Efrît re got: “Ey Efrît divê tu bizanîbî ku Xwedê gotiye ‘Li ehd û peymanên xwe xwedî derkevin û bi berpirsîyar bin.’ Vêca te jî soz û peyman dan min ku tu bêbextiyê bi min re neki. Eva ez ê te berdîm lê belê jibîr neke, heger tu bêbextiyê bi min re biki Xwedê heyfa min ji te re nahêle. Xwedê Teala pir bêhnfireh e, lê bebextiyê tu caran efû nake. Û min ji te re got bê Hekîmê Dûban çi gotibû ji Yûnanê hukumdar re û çi hatibû serê wî.”

Efrît pir kêfxweş bû bi vê biryara Masîvan; beşîşî, kete pêşiyê û ji Masîvan re got “Bide dû min.” û meşîya. Heta ku ji bajêr bi dûr neketin ji Efrît bawer nedikir ku rizgar bûye. Ji bajar derketin û bi çiyayekî bilind ve hilkişîyan, dûvre xwe berjêr berdan ber bi deştê ve. Di nava wê deşta fireh de goleke avê hebû, hatin li ber sekinîn. Masîyên sor û spî û zer û şîn jî ji nava avê berz dibûn, xwe çeng dikirin vî alî wî alî. Yê Masîvan jî matmayî mabû himber vê dûmenê. Efrît got: “Masîvano ka tora xwe bavêje da ku Xwedê qismetê te ji te re bişîne. Ji ber wê bêwijdaniya xwe jî ez lêborîna xwe ji te dixwazim. Min bêaqilî kir ji ber ku demeke pir dirêj bû ez di binê avê de bûm û hezar û heştêsalî min rûyê dinyê nedîtîbû. Çaxê ku min dît jî min xwe şaş kir.” Masîvan tora xwe avêt û gava ku bi şûn ve kişand çar masî tê de hatin, her masiyek bi rengêkî bû. Efrît gotê: “Rahêje van masiyan û wana bibe cem sultan, jê re pêşkeş bike ku tera te pereyan bide te. Eva ez ê ji herim lê divê tu vê jî bizanîbî, hewl bid ku tu rojê carekê tenê nêçîrê biki ji golê, ne zêde. Bimîne di xêr û xweşiyê de. Bi xatirê te.”



Lingên xwe çend çaran li erdê da erd qelişî, ew daqurtand û di çend kêlikan de Efrît ji ber çavan wenda bû. Masîvan jî berê xwe da bajêr û meşîya. Hişê wîna serobino bibû, mabû behetî li çîroka xwe û wî Efrîtî.

Gava hate malê, denê xwe tijî av kir û her çar masiyên xwe berda nav de. Dûra denê xwe hilda ser milê xwe û berê xwe da qesra Sultan. Çawa ku Efrît şîret lê kiribû, wî jî wilo kir û masiyên xwe pêşkêşî Sultan kirin. Dema Sultan çav li wan masiyên rengîn ket ma ecêbmayî! Di emrê xwe de tu carî masiyên wilo nedîtibûn. Wezîrê wî rahişte masiyan, ew birin dane cariyekê da ku wana bipejîne û vegeriya cem Sultan. Sultan emir da wezîrê xwe da ku çarsed dînarî bide Masîvan. Wezîr jî pere danê. Masîvan pereyên xwe girtin û bi kêf berê xwe da malê da ku vê mizgîniya xweş bide jina xwe. Dema gîha malê jin û kuflet tev bi vê yekê dilxweş û şad bûn. Wî jî çî pêdiviyê malê yên ku hebûn kirin û bi dilekî rehet rûnişt.

Îca em ê vegerin ser ew cariya ku masî paqij dikir da ku wana bipejîne. Cariyeyê masiyên xwe danî ser agir heta ku hêleke wana qemirî sor bû, dûvre masiyên xwe qulpandin da ku hêla din jî biqemire. Di wê kêlikê de dîwarê kêlekê qelişî û keçeke nûhatî, pir sipehî û lihevhatî jê derket. Zend û bendên wêna tijî bazin û xelekên zêrîn bûn, tiliyên wê jî tijî hungulîsk bûn, kopalek jî di destên wê de bû. Serê kopalê xwe li masîkî pijandî xist û jê re got: “Masîko! Gelo tu hîna li ser wê soza xwe yî berê yî?” Gava ku cariyeyê ev dîmen dît, ber çavên wêna reş bû, gêj bû û ji ser hişê xwe çû, li erdê ket. Ew keçîka bedew jî pirsra ku ji masî kiribû dúbare û sêbare dikir. Masî serê xwe ji miqilkê rakir û got: “Belê belê belê! Ez li ser soza xwe me.” Dûvre hemû masîkan bi hev re gotin bi stranî: “Ku tu vegeryabe em ê ji vegerin, ku tu xwedî soz be em ê ji xwediyê soza xwe bin, lê ku tu koç bikî em ê ji koç bikin.” Wê gavê keçîka rindik masîkên pijandî di cihên wan de qulipandin û çawa hatibû wisa jî bi şûn de çû. Dîwarê qelişî jî li dû hate hev û bû mîna berê.

Gava ku cariya aşpêj bi ser hişê xwe hat, bala xwe dayê ku her çar masîkên wêna bûne arî di binê miqilkê de. Wezîr jî wê kêlikê hate cem û got: “Ka wan masiyan werîne ji Sultan re.” Cariye giriya, giriya û çîroka xwe ji serî heta binî ji wezîr re got. Wezîr behetî ma û got: “Evaya tiştêkî ecêb e.” Şande dû Masîvan, Masîvan hate balê, Wezîr jê re got: “Masîvano! Divê tu here çar masiyên din ji me re binî. Bila wekî ewên dîtirkê bin.” Masîvan dîsa çû ser wê golê û tora xwe avêtê, dûvre dîsa kişand, bala xwe dayê ku dîsa çar masiyên rengîn pêve hatin. Vegeriya qesrê, her çar masî dane Wezîr. Wezîr çû derbasî metbexê bû û ji cariyeyê re got: “Ka rabe li ber çavên min biqelîne, da ku ez jî bi çavên xwe bibînim ka ev tiştê ku tu dibêji çawa çêdibe.” Cariye rabû masî paqij kirin, xiste miqilkê û danî ser agir. Hindik mabû ku

masî tam bipijin gava ku ew dîwarê kêlekê dîsa qelişî û dîsa ew keçika sipehî bi wê bejna xweyî xweşik ji wir derket û kopalê wê jî di dest de. Mîna cara ewil dîsa serê kopalê xwe di masî rakir û jê re got: “Masîko! Ka bêje gelo tu hîna li ser wê soza xwe yî berê ye?” Her çar masiyan bi hev re serê xwe rakir û bi stranî ew gotina xweyî cara berê bi hev re gotin.

*Li Şehrezadê bû sibe, şefeqê lê da, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA HEFTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Hukumdarê min î hêja! Tête gotin ku, gava masiyê di miqilkê de axifi û ew keçika bedew jî kopalê xwe kişand û dîsa di wê qelşa dîwêr re bi şûn de çû, dîwar jî ji nû ve hate hev û bû mîna berê. Wezîr ji cihê xwe veciniqî rabû ser xwe û got: “Ev tiştaya nabe ku ji Sultan bêtê veşartin, divê di cih de jê haydar bibe.” Rabû çû ji Sultanê xwe re got, Sultan got: “Divê ez bi çavên xwe vê yekê bibînim.” Rabû Wezîr xeber ji Masîvan re şand da ku çar masiyên dîtir bîne û sê roj mohlet danê. Roja dîtir Masîvan çû ser golê tora xwe avêt, kişand çar masiyên rengîn mîna yên berê anîn û hat, bire cem Wezîr. Sultan jî ferman da ji bo ku çarsed dînarî di cih de bidênê. Dûvre li wezîrê xwe zivirî û jê re got: “Ka tu bi xwe van masiyan biqelîne li ber çavên min.” Wezîr got: “Li ser serê min, li ser herdu çavên min Sultanê min.” Miqilk anî, masî avêtênê û dane ser agir. Piştî demekê bala xwe dayê ku dîwarê kêlekê mîna berê dîsa qelişî, lê vê carê şûna wê keçika xweşik evdekî reşî girî mîna dêwekî jê derket, di destên wî de jî şaxê dareke şîn hebû. Ji masiyan re got: “Masîko masîko, gelo tu hîn li ser wê soz û peymanaya xwe yî berê ye an na?” Masîyan gotin “Belê belê!” û dûvre her çaran bi hev re bi helbestî ew gotinên xwe yî berê dûbare kirin. Wê gavê evd ew masiyana qulpandin vî alî wî alî heta ku bûne mîna komirê û çawa hatibû wilo jî çû. Gava evd ji ber çavan ket, Sultan got: “Mirov nikare hember vê yekê bêdeng bimîne û mîsoger dê çîrokeke van masiya hebe.” Rabû ferman da ji bo ku Masîvan binin cem. Di cih de ew anîn balê, Sultan jê re got: “Tu wan masiyan ji ku tîni?” Masîvan got: “Ji golekê ku di nava çar çîyan de ye. Ew jî li piştê vî çîyayê ku bajarê te pala xwe didêyê.” Sultan gotê: “Di çend rojan de mirov digihêyê?” Masîvan got: “Sultanê min, meşa niv saetê ye.” Sultan ma ecêbmayî û ferman da ji bo ku leşkerên wîna xwe amade bikin. Dema leşker amade bûn, Sultan Masîvan da kêleka xwe û kete rê de. Masîvan tirsîya û dest bi duayan kir û li wî Efrîtî jî pir nifir kirin. Dema çîya derbas kirin, ketin deştikeke biçûk de ku berê çavên kesî lê neketibûn, dûvre gihan ser wê gola ku masiyên sor û zer û spî û şîn tê de bûn. Hemû tevde li wê dîmenê ecêbmayî mabûn. Sultan li leşker û kesên derdora xwe zivirî û ji tevan pirsî û got:

“Kesî ji we berê ev gola avê ditibû an na?” Hemûçkan gotin: “Na.” Rabû Sultan sûnd xwar û got: “Bi wî navê Xwedê yê şêrîn, heta ku ez rastiya vê golê û van masiyan fêm nekim, ez ne vedigerim paytexta xwe û ne ji careke din li ser textê erşê xwe rûdinê.”

Piştî emir da ji bo ku li wir bi cih bibin û çadirên xwe li wir vegirin. Dûra gazî wezîrê xwe kir. Wezîr jî mirovekî zîrek bû û şewirmendekî baş bû. Ku Wezîr hat, Sultan jê re got: “Ez difikirim ku ez tişteki bikim lê berî her tiştî ez dixwazim ji te re bibêjim. Dikeve bîra min de ku îşev ez bi tena serê xwe biminim di çadira xwe de û ez li ser rastiya vê golê û van masikan bifikirim, belkî ez karibim xwe bi encamekê bigihînim. Vêca li devê deriyê çadira min rûnê û ji hemû mîr û mîrek û leşkeran re bêje, bila kes neyê balî min. Û divê tu kes jî mebesta min nizanibe.” Wezîr newêribû ji rêya Sultan derkeve. Çawa jê re gotibû wilo kir. Sultan jî di hundur de kincên xwe guhertin, şûrê xwe kişand û bi bêdengî xwe ji hundur vedizî, derket û heta ku lê bû sibeh meşiya. Bi ro jî meşa xwe berdewam kir heta ku dinya germ bû û tîbûnê ew bêhal xist. Hinekî bêhna xwe vekir, dûvre dîsa meşa xwe berdewam kir heta dotirî rojê. Gava ku ji dûranî ve reşahîk li ber çavên wî ket, kêfa wî hat û di dil xwe de got “Belkî mirovek be û tişteki zanibe di derheqê vê gola avê û van masiyan de.” Gava nêzîkî wê bû, bala xwe dayê ku reşahî qesreke kevirî ye, bi kevirên reş hatiye avakirin. Deriyên wêna hesinî û asê, aliyek jê vekirî yek girtî ye. Sultan bi vê yekê kêfxweş bû, li ber derî sekinî û bi hêdî li derî da. Lê kesî lê venegerand. Carek duduyan dîsa lê da, lê dîsa jî kesî bersiv neda. Cara çaran pir bi şidan li derî da lê dîsa jî kesî lê venegerand. Di dil xwe de got “Ev qesir vala ye.” Nav di xwe da, dilê xwe qewîn kir û di deriyê vekirî re derbasî qesrê bû, di dehlîzên wê de meşiya û qîr kir got: “Ey gelî xwediyê qesrê, ez rêwîyek im, mêvanekî Xwedê me, gelo gepek nan li cem we peyda dibe?” Sê caran ev gotina xwe dubare kir, lê tu bersiv nehat. Hinekî din nav di xwe da û di dehlîzê re bi pêş de çû heta ku gîha nava qesrê. Lê belê dîsa jî çavên wîna li kesî neket. Qesir vikîvala bû lê belê xweş raxistî bû. Fiskiyek di nivê hêwanê de hebû. Heft şêrên zêrîn jî li dorê bûn. Devên wana vekirî bûn, avê tê re davêt, mîna gewher diherikî. Teyr û tilûr jî li derdora wana diçûn û dihatin. Ser wan jî derabekirî bû da ku nikarîbin derkevin. Ji alîkî ve pir ecêbmayî mabû hember heybeta vê qesrê û ji alîkî ve jî pir xemgîn bûbû ku kes tê de tunebû da agahiyekê ji wana bigire di derheqê wan masiyan de. Sultan bi wî halê xwe li ber deriyê hêwanê rûnişt û ponijî. Di wê navberê de kalînek hate ber guhê wî û dengê ku bi zimanekî helbestî digot:

Ez êşa xwe vedişêrim lê bêrîkirin her diyar e  
Çav li min tim bê xew in, êşa dil her li dar e  
Him bi qîr im him bi gazin xem li min îro xedar e

Maldarê qewm feqîr bûye, bi destên şer'a evînê  
Tenê carekê rehmê bikin li serdarê qewm û jînê  
Çi gunehê nêçîrvan e lew ku qetiya di dest de kevan  
Kul û derd ku wisa pir bin, felat nîne ji xedra zeman

Gava Sultan ev gotin bihîstin, berê xwe da ew hêla ku deng jê dihat û bi çavdêri bipêş ve çû. Bala xwe dayê ku perdeyek mezin bi ser tiştêki de vegirtiye. Perde kişand, dît ku xortek di bin de ye; xort li ser nivînek ji erdê bilindbûyî rûniştibû. Xortekî ewqasî rind û lihevhatî bû ku ne bihewceyî pesindanê bû, çawa ku şairekî digot:

Poz bilind û por xelek e  
Xwîn şêrîn û çav belek e  
Di şevê de mûm û fener  
Xala di rû de jî li ser

Sultan bi dîtina wî pir kêfxweş bû û silavek lê kir, ew jî silava Sultan lê vegerand û got: “Mîrzayê min, min bibexşîne ku ez nikarim himber te rabim ser xwe. Sultan jê re got: “Xorto ka ji min re çîroka wê gola avê û wan masiyên rengîn bibêje, dîsa jî çîroka tenêtiya te li vir û vê qesra bedew û ev giriye te yî ku hinavên mirov disoje.” Ku wî xortî ev gotin ji Sultan bihîstin, hîn bêhtir giriya û hêsir bi ser hinarkên wî de hatin xwarê. Sultan jê re got: “Xêr e? Tu çima wan hêsrên dibarîne xorto?” Mirovê xort bi stranî got:

Evî karî bispêr Xwedan  
Kulan berde tevlî derdan  
Bêfêde ye fikir û raman  
Ne ‘çawa bû?’ ne ‘çilo bû?’  
Lew ku pirs jî xem e li dû  
Her tişt qeza û qeder e  
Dil meêşîne bi keder e

Piştî ku ev helbest bi stranî got, xorto axaftina xwe berdewam kir û got: “Ez ê çawa negirîm û ez di vî halî de!” Dûra destên xwe avêt ew şalê li ser milên xwe û ew hilda, pê re jî rastiya wî ji Sultan re xuya bû, ji navikê û berjêr kevir bû, bi erdê ve bû û jê berjor jî însan bû. Mirovê xort got:

### (Çîroka Xortê Nivkevîrî û Masiyên Rengo Rengo)

Mîrzayê min, ew masiyên ku tu behsa wan dikî çîrokeke wan î ecêb heye. Di wextekî de bavê min hukumdarê vî bajarî bû, navê wî Mehmûd bû, xwediyê van her çar çîyan û vê deştê bû. Heftê salî li vê derê serdest ma. Gava ku bavê min mir ez ketim şûna wî û ez bi keça apê xwe re zewicim. Keça apê min ewqasî ji min hez dikir ku rojekê ez neditama nan nedixwar. Em pênc salan di wî halê xweş de man. Rojekê ez çûme hemamê, li vege

min ji aşpêjê xwe re got ‘ji me re şîvekê amade bik’ û li ser vê nivîna ku niha ez li ser im min xwe dirêj kir da ku ez bêhna xwe berdîm û ta’bê ji ser xwe bavêjim. Du heb carîye jî li cem min bûn, yekê eniya min difirkand ya din jî lingên min. Xewa min dihat û çavên min jî çûbûne ser hev, lê ji ber ku ez li ser jina xwe bi qelaq bûm ez şiyar mabûm, ez li bendî hatina wê bûm. Di wê kêlikê de ji herdu carîyan werê ku ez razayîme, min bala xwe dayê ku ya ber serê min ji ya ber lingên min re dibêje: “Mesûde, tu ji xwe re li vî dilpakê şahê me binere, çiqasî bêşens e ku serê wî bi yê vê xatûna me yî bêbext û listok re diçe ser heman balîfê.” Ya dîtirkê jî lê vegerand û got: “Gunehe gunehkaran ji wan re ye, Xwedê jî vê jinika gerokî zinakar re nehêle, pepûkê jî zilaman têr nabe, her şev di hembêza yekî de ye. Ya herî xerab jî ew e ku şahê me qet lê napirse, nabêje ka çûye ku.” Ya mayî lê vegerand û got: “Huşbe pepûkê, ma em ji ku zanin bê ev jinik vî tiştî bi ilmê Şah dike an jî bê ilmê wî.” Ya din dîsa lê vegerand û got: “Ez baş dizanim ku hayê şahê me ji tevgera jina wîna tune ye. Min çend caran bi çavên xwe dît, jinik her şev dermanekî mîna bencê diavêje qedeha wîna şerabê û dide dest. Şah jî çawa vedixwe di xew re diçe. Ew jî radibe xwe girê dide, misk û emberan bi ser xwe dadike, dûre jî ji qesrê dertê. Gava ku berê sibehê bi şûn ve vedigere tê bixûrekê dide ber pozê wî, Şah jî ji nû ve bi ser hişê xwe ve tê, şiyar dibe.” Gava min ev goftugoya carîyeyan bihist ber çavên min tarî bû, hiş û sewdan di serê min de nema. Bi bêsebrîyek dijwar ez li bendî şevê mam. Piştî, mîna her şev min bala xwe dayê ku dotmama min hat. Em bi hev re li ser sifrê rûniştin, me bi hev re şîv xwar û sohbet kir. Berî razanê mîna her şev min dîsa qedehê şerabê jê xwest. Qedeh da destê min, min jî berê xwe jê guhert, bi dizîka min şerab bi kêlekê de berda û rijand bêyî ku ez vexum. Duvre wek ku ez ji ser hişê xwe çûbim di cih de min xwe dirêj kir û kire pixepix wek ku ez di xew re çûbim.

Di wê navberê de min dît ku dotmama min bi qehr dike pitepit û di ber xwe de ji min re dibêje “De bitemir û qet şiyar nebe, Xwedê dizane bê ez çiqasî ji te aciz bûme û çiqasî ji te diqeherim.” Dûra rabû kincên xwenî herî xweşik li xwe kirin, bêhn bi xwe dakirin û şûrek bi bejna xwe dakir û di derî re derket, çû. Ez jî rabûm, min xwe ji qesrê vedizî û da dû. Ji qesrê derket û kete nav bajêr de ez jî li dû bûm. Gava ku gîha ber deriyê sûra bajêr bi zimanekî xerîb tiştin gotin, min qet fêm nekirin, lê bi wan gotinên wê re xilqên derî yeko yeko vebûn, ew jî di derî re ji bajêr derket û meşa xwe berdewam kir. Ez jî bi dizî li dû derketim. Meşîya heta qontara çiyê, li wê derê kumbeteke ji heriyê hebû li ber sekinî û di derî re derbasî hundir bû. Ez jî hilkişiyam ser kumbetê û di qulka bixêrikê re min ji xwe re li hundir nerî. Min bala xwe dayê ku derbasî cem evdekî reşik bûye. Axa bin lingên wîna maçî dikir. Evdê reşik serê xwe radikir û jê re digot: “Tu li ku bû heta niha? Reşikan tevan her yekî şeraba xwe vexwar û bi destê dîlbera xwe girt û çû,

ê min bêyî ku ez şerabê vexwim ez wilo mam di cihê xwe de.” Ewê jî digot: “Mîrzayê min, ronîya çavên min û şêrînê ber dilê min, ma qey tu nizanî ku ez bi mêr im û mêrê min kurapê min be jî ez pir jê aciz im û ez dilnakim li ser çavên wî jî binerim. Û tu nizanî ku ne ji bo xatirê te baya min ê ew bajarê wîna serûbin bikira, min kevir li ser kevirê nedihîşt.” Evd lê vedigerand û digot: “Şermûtê, qehpikê... Wile tu derewan dikî. Ez sûnd dixwim bi mirweta mêrê reş -ku tu dizanî bê mêrê reş ji yê spî çiqasî bi rûmettir e- eger careke din mîna îşev tu dereng bikevî, ne cihê rûniştina te li vir heye û ne ji bedena min tê ser bedena te.”

Xortê nivkevirî axaftina xwe berdewam dikir û digot:

Vêca gava ku min ew gotin bi guhên xwe bihîstin û ew tiştê nebûyî min bi çavên serê xwe dîtî, ez har û dîn bûm. Dinya li ber çavên min reş û tarî bû, ez dikirim ku bipeqim tew gava ku dotmama min weke pepûkekê serê xwe li ber tewand û bi berjor lêborîna xwe jê dixwest û digot “Evîndarê min, kezeba min, ronîya herdu çavên min...” û digiriya û xwe davête dexlê wîna da ku lê bibuhure. Dawiyê Evd tê buhurî ew efû kir. Dotmama min jî kêfxweş bû, bêhna wê hate ber, dûra jê re got: “Mîrzayê min û taca serê min, gelo gepek nan li balî te heye da ku cariyeka te pê ber dilê xwe bigre?” Ê Evd jî jê re got: “Li wê firaxa hanê meyzêke tu dê xwarinê tede bibînî.” Rabû xwar û vexwar û dûra hate balê xwe tazî kir û kete pêxêla wî li ser hesîrê.

Gava ku min ev karên dotmama xwe dîtî û ew gotinên wêna bihîstin, ez ji ser hişê xwe çûm, ji qehra ez dikirim ku bibehcim. Dema ez ji ser kumbetê daketim xwarê û derbasî cem wana bûm, ketibûn xew de. Min rahişt şûrê dotmama xwe û hêl da xwe ku ez herduyan jî bikujim; destpêkê min şûr li stûwê Evd da, min got qey min ew kuşt.

*Û li Şehrezadê bû sibeh, wê jî axaftina xwe birî.*

ŞEVA HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Vêca Şahê min î bextewar, tete gotin ku wî xortê nivkevirî ji Sultan re got:

Gava min şûrê xwe li stûyê Evd xist, reh û çerm û zengelok tev qetiyar, min jî got belkî hatibe kuştin. Bi wê qinyatê jî ez ji wir derketim. Dotmama min jî dîsa şûrê xwe girtibû û bidizî vegeyriyabû qesrê û ketibû nav nivînê, xwe li xewê danîbû heta sibehê. Roja dîtirkê min bala xwe dayê ku dotma-

ma min porê xwe jêkiriye û kincên reş li xwe kiriye, şîne dikişîne. Çaxê tê derxist ku vê liv û tevgera wê bala min kişandiye, ji min re got: “Pismam li qusûrê nenêre wele min bihîstiye ku dêya min çû ser dilovaniya xwe û bavê min jî di cihadê de şehîd ketiye, birayekî min jî mar pê vedaye miriye.” Piştî demekê ji min re got: “Ez dixwazim di hundir qesrê de kumbetekê biçûk çêbikim da car caran ez karîbim di hundir wê de ji xwe re têkevim xelwetê bi xemgîniyên xwe re. Lew ku ez dixwazim navê wê kumbetê jî bikim Mala Xemgîniyê.” Min jî jê re got: “Tu çawa dixwazî wilo bike.” Rabû di hundir qesrê de ji xwe re ‘Maleke Xemgîniyê’ ava kir. Di hundir wê de jî mezelek û qubeyek çêkir. Dûre ew Evdê birîndar î hezhizî jî anî xiste mezê de; nemiribû lê ji tiştê re jî nedibû. Tenê şerab vedixwar. Ji roja ku min ew birîndar kiribû nedipeyivî, lê ecelê wî jî hîna nehatibû. Dotmama min jî êdî bi mehna xelwetê bi şev û bi roj dikete balê, dilê wî xweş dikir û şerab didayê. Ewêna wer dikir û min jî bêhna xwe lê fireh dikir da ku vê tevgera xweyî qudoş bi dawî bike. Rojekê min bala xwe dayê ku ketiyê cem ê Evd û vê helbestê jê re dixwîne:

Min xwe tune kir di tunebûna te de  
 Herdem tu tenê ye di dilê min de  
 Li ser qebrê ku tu vebêje navê min  
 Dê bide te bersiv nalîna hestiyê min

Gava ku wêna ev helbesta xwe qedand, min qîr kir û jê re got “Ev gotinên bêbext û dêlejinên nankor in” û min şûrê di destên xwe de hilda da ku ez wêna bikujim. Piştî fêm kir ku min Evd birîndar kiriye, ew jî di wê kêlikê de rabû ser xwe û bi zimanekî biyan çend gotin gotin ku min jê fêm nekirin, dûvre bi ser min de hat û got: “Xwedê bi vê efsûna min nivê te bike kevir û nivê mayî bedena însan bihêle!” Bi wê gotina wê ez jî hatim vî halê ku ez ne dikarim rabim, ne jî rûnim, ne bimirim ne jî bimînim.

Piştî ez ketim vî halî, bajarê me jî bi tevayî kete bin bandora wê efsûnê. Û ji ber ku gelên bajêr Musulman û Fileh û Cuhû û Mecûsî bûn, zîvirîn masiyên çar rengan; sipî, sor, zer û şîn. Musulman bûn masiyên sipî, Fileh bûn yên şîn, Cuhû bûn yên zer û Mecûsî bûn yên sor. Der û dorên bajêr tevde jî bûne çar çiya û navbera wan jî bû ew gola avê, masî jî di nav de. Êdî her roj jî tê sed qamçiyî li min dixê. Têra xwe îşkencê li min dike heta ku xwîn di nav milên min re davêje, dûvre vî kirasê ji rês bi ser min dadike û diçe.

Piştî vê gotina xwe xortê nivkevirî giriya û got:

Xwedêyo Xwedêyo ez qayilim bi vî hukmê te  
 Qedera min çi be ez qebûl dikim vî emrê te  
 Madem ku tu raziye ji vî halê min  
 Bêhteng bûme pir ez bi vê misîbetê

Bi vî halî bi vê qezê û bi vê qederê  
Hêviya min tenê maye Pêxemberê Ometê

Sultan jê re got: “Ey xortê xembar! Te bi van xeman derdin nûh li derdê min zêde kirin. Lê ya ku ez pir mereq dikim gelo ew jinik niha li ku ye?” Xort jê re got: “Li wî mezeli ye. Rojê carekê diçe kumbetê, evdê birindar ziyaret dike. Hertim jî berî ku biçê cem wî tê vêdê sed qamçî li min dide, dûre diçe cem wîna şerabê jê re dibe.” Rabû Sultan jê re got: “Hey xortê delal, divê tu zanibi ku ez ê qencyekê bi te bikim ji bo herdem ez pê bême bîra te û başiyekê ku ez pê têkevîm dîrokê.” Piştî li kêlekê rûnişt û pêre goftugo kir heta derengî şevê. Gava şefeqê lê da Sultan kincên xwe guhertin, şûrê xwe avête newqa xwe û berê xwe da cem wî Evdî. Lê nerî ku di nav mûm û qendîlan de ye. Bêhna bixûrê jî her der dagirtiye. Şûrê xwe ji kalanê wîna kişand û êrîş bire ser serê Evd, nava milên wîna firand, ew kuşt. Rabû kincên wîna di ser re anîn û meytê wî hilda ser piştê xwe bir, ew avêt bîreke qesrê. Dûvre vegeriya kincên Evd li xwe kirin, kete cihê wî de, xwe tê de dirêj kir û şûrê xwe di ber xwe rakir, veşart.

Bi şefeqê re jinka sihirbaz hat. Destpêkê kirasê pismamê xwe di ser re anî, ew tazî kir, paş re qamçiyek hilda destê xwe û bi nav piştê wî ket lêda heta ku xwîne di nav milên wî re avêt. Pismamê wê jî hey dikire qerîn û digot: “Bese bese... Êdî li min were rehmê, ji xwe ev halê min besî min e.” Wê jî lê vedigerand û digot: “Ma çima tu li min nehat rehmê, çima te evîndarê min ji dest min derxist?”

Piştî cilkên wîna avêtin ser, rahişt qedeha şerabê û berê xwe da cem evdê xwe yî evîndar. Çawa ku derbasî cem bû kûrekûr bi jinikê ket, giriya û bi lavan li ber evîndarê xwe geriya û got: “De ka peyvêkê, gotinekê, tiştêkî ji min re bibêje.” Piştî bi helbestî ev gotin gotin:

Heta kengî ev cewr û cefa?  
Ma ne bes e ev hêsirên dila  
Belkî bi qestî dikî tu weha  
Heger ev be mebesta te dilocan  
Bawer bike zulm e hêviya dilan

Û bi giriyeke pir bi şewat dîsa li ber geriya û got: “De ka tiştêkî bibêje ji min re, bipeyive ruhê min!” Sultan, devê xwe xwar kir, zimanê xwe li hev bada û bi zimanê reşikan axifî û got: “Ah ah, lahele û la quwete îllah billah.” Gava ku jinikê ev gotinê wîna bihistin pir dilşad bû û ji kêfan re baskên wê çêbûn, got: “Înşelleh mîrzayê min rehet bûye û dilê xwe ji min re vekirîye.” Ewî jî got: “Baş bizane ku tu hîna dêlika dera han î û tu ne ewa ku ez pêre biaxivim.” Jinik şaş bû, got: “Çima mîrzayê min, qey min çî guneh kirin?” Ewî got: “Gunehê te ew e ku her car tu bi qamçiyên li mêrê



xwe dixe û ez jî ji ber carecara wî nikarim rakevim. Ne ji vê ba belbî niha ez rehet bûbama; de ka wîna ji wî halî derxe û min jî rehet bike.” Jinikê got: “Li ser seran û li ser çavan.” Rabû çû hundirê qesrê, zerika xwe tijî av kir û bi zimanekî biyanî li ser xwend. Ava di zerikê de keliya, piştire ew ava kelandî bi ser mêrê xwe de reşand û got: “Bi heqê navê te û ew ayatên ku min xwendin, vî zilamî vegevine dirûvê wîni ewilî.” Bi vê gotinê re mêrê wê xwe vegevizand, dûvre mîna merşekî xwe dawîşand û rabû ser lingên xwe. Kêfa wî hat, bêhna wî fireh bû û got “Eşhedû enlailahe illallah we eşhedû enne Mûhemmeden resûllûllah.” Jinikê jê re got: “Êdî ji vir derkeve, bila careke din çavên min li te nekevin, yana ez ê te bikujim.” Mêrê wê derket, ew jî vegeyriya kumbetê û ji Evd re got: “Mîrzayê xewnên min, de ka ji wir derkeve da ku ez te bibînim û dilê min hinekî bi dîtina te şa bibe.” Ewî jî bi dengêkî lawaz lê vegevand û got: “Bi vî karê ku te niha kir, te hebekî ez rehet kirim lê êşa min hîna neçûye. Tiştêk maye, ku tu wî jî bikî ez ê rehet bibim.” Jinikê bi kêf got: “Çiye ronahiya çavan, çiye ew tişt ka bêje?” Wî jî got: “Ew her çar çiya û gola wan masiyên rengîn e. Ew masiyên ku her şev serê xwe radikî û nîfiran li min û te dikin, nahêlin ku ez bi ser xwe bêm û rehet bibim. Here wana jî ji wê eziyetê rizgar bike û were bi destên min bigire, min bibe cem xwe, bigre hembêza xwe.” Jinikê jî kêfa dikir ku bifire, got “Li ser serê min li ser çavên min, eva ez ê herim wana rizgar bikim” û di cih de rabû çû berê xwe da gola avê; ku gîha ser, jê rahişt hinek av.

*Û li Şehrezadê bû sibeh, wê jî dev ji axaftinê qerîya.*

## ŞEVA NEHEMÎN

*Şehrezadê got:*

Îca Şahê min î delal! Dibêjin, gava ku jinika sîhîrbaz rahişte hinek ava golê li ser xwend, masiyan tevan serên xwe rakir û di cih de zivîrin dirûvên mirovan û bûne insanên berê. Efsûn ji ser bajêr tevî rabû û her tişt dîsa bû mîna berê, zikak, kolan, sûkên bajêr tev vegeyriyan şûna xwe, karmend û karker û cotkar jî tev vegeyriyan karên xwe mîna berê. Çiya jî bûne deşt û gola avê jî ji holê rabû. Jinikê jî di cih de li Sultan vegeyriya û jê werê ku ew Evdê wê ye. Gava gîha cem jê re got: “Delalê dilê min, ka destê xwe bide min da ku ez maçîkim.” Sultan bi dengêkî lawaz got: “Ka xwe nêzî min bike.” Şûr jî di dest de xwe amade kiribû, gava ku jinikê xwe nêzî wîna kir, şûr di sîngê wê de çikand heta di piştê re da der. Piştî jinikê kuşt û pêve Sultan ji wir derket. Hate qesrê ku xortê berê efsûn bûbû hîna li wir e, li bende wî ye. Mirovê xort ew pîroz kir û spasiyên xwe diyarî wîna kir. Sultan jî jê re got: “Tê bi min re bê welatê min an tê li vir, li bajarê xwe bimîne?” Rabû ê xort jê re got: “Hey Şahê Zemanan, qey tu dizanî bê niha çiqase mesafê di navbera

te û welatê te de heye?” Sultan got: “Şevêk-dudu bi meşê ye.” Yê xort gotê: “Şiyar be Şahînşahê min, gava ku tu di şevêkê-dudan de hatî, bajarê min tev efsûnkirî bû, ya rastî tu salekê bi meşê dûrî welatê xwe ye. Ez ê jî ji vir heta wir li kêleka te bim, ez ê kêlikêkê ji te dûr nekevim.”

Herduyan bi dilxweşî hevdu hembêz kirin û bi hev re vegeyriyan qesra wî xortî. Xortê ku melîk bû, ji wezîr û hemû kesên derdora xwe re got: “Ka amadekariya bikin da ku em bi vî mêvanê xwe re herin heccê.” Hazîrî hatin kirin, pêncî heb mîr û mîrek girtin kêleka xwe û tevli xelat û pêdiviyên ku li ser piştê devan kiribûn bi rê ketin. Kerwanê wana hewqasî dirêj bû ku serî ji binî ve xuya nedikir. Sultan jî pir bêriya welatê xwe kiribû. Nuh lê hay bûbû ku ev saleke dûrî welat e. Salekê sax şev û roj meşiyar heta ku gîhan paytexta welatê Sultan. Dost û merivên wî ku hêviya xwe jê biribûn, tevli leşker û mîrekan bi çûş û kêfeke mezin ew pêşwazî kirin li ber deriyên bajêr. Hemûçkan dilşadiya xwe bi hatina wî anîn ziman û ew pîroz kirin bi saxî û selametiya wî. Sultan li ser textê xwe rûnişt û çîroka xwe û ew xortê efsûnbûyî ji serî heta binî ji wezîrê xwe re got. Wezîr kêfxweşiya xwe diyar kir û hêviya emrekî mezin jê re ji Xwedê xwest.

Piştî ku bêhna wan hate ber wan û rewş aram bû, Sultan gelek xêr û xêrat bi mîrovên derdora xwe kir. Dûvre gazî wezîrê xwe kir, jê re got: “Ka biçê gazî wî Masîvanî bike. Ew bû ê ku bi xêra wî, gelê wî welatî tev ji efsûnê rizgar bûn.” Ku Masîvan hate huzurê, Sultan silav lê da û li halê wî û li zarokên wî pirsî. Masîvan got: “Kurek û du keçên min hene.” Rabû Sultan keçeke wîna ji xwe re xwest, ya din jî ji wî xortê kêleka xwe re; herdu di şevêkê de zewicîn. Kurê Masîvan jî girte cem xwe, ew kire xeznedar, bû berpîrsiyarê mal û milkên Sultan.

Piştê Sultan wezîrê xwe jî şand welatê wî xortî da ku li wir bibe hukumdarê wê derê. Li gel wî jî pêncî heb mîrek û serleşker û kerwaneke bar-kirî bi mal û xelatan. Wezîrê wî jî destên wî maçî kir û kete rê de.

Masîvan jî bû mirovê herî maldar yê di wî wextî de. Herdu keçên wî bûbûn jinên du sultan, lê dîsa jî çîroka vî Masîvanî ne weke ya hemal e.

*Dunyazadê jê re got: “İca çîroka hemal çiyê Şehrezad?”*

## (ÇÎROKA HEMAL Û SÊ KEÇAN)

*Şehrezadê got:*

Dibêjin, mirovek ji Bexdê hebû azîb bû, hemaltî dikir. Rojekê li sûkê, pala xwe dabû selîka xwe û ji xwe re diponijî. Di wê kêlikê de, jineke ku

kirasekî ji herîr lê bû hat li ber sekinî. Berçavka hevrêşimî ji ber rûwê xwe da alî, rûçekî weke heyvê ji bin derket. Çavên wênî reşî mezin, burhuyên zirav û mijangên dirêj mirov dil digirt. Jinik hewqasî sipehî bû ku devê hemal ji hev mabû hember dîmena wê. Jinikê jê re got: “Ka selika xwe bigre û bi dû min de were.” Hemal ji guhê xwe bawer nedikir lê dîsa da dû çû. Li ber deriyê malekê rawestiyên jinkê li derî da, mirovekî Fileh derî vekir. Dînarek dayê û hinek zeytûn jê kirin avêtin selikê, dûra ji hemal re got “Bide dû min.” û meşa xwe berdewam kir. Hemal di dilê xwe de got “Bi Xwedê ev roj li min mûbarek e.” Dîsa selika xwe hilda ser pişta xwe û da dû jinekê. Li ber dikaneke ku fêkî û sewzan difroşe sekinîn, vê carê sêvin Şamî, kelemîn Osmanî, xoxin Ūmanî, yasemînî Helebî, limonîn Misrî û hinek xurme û gulîn sor û şîn kirin û hemû avêtin selikê û ji ê hemal re got: “Rahêjê û bide dû min.” Hemal rahişt selika xwe û da dû heta ku careke din sekinî. Vê carê li ber dikaneke ku şêranî difrot rawestiyabû. Tebsiyek jê kirî û hundurê wêna tije kir. Ji her teşeyî çend parî xistênê, dûra ji hemal re got: “Selika xwe hilgire û bide dû min.” Hinekî din çû û dîsa sekinî; vê carê li ber dikana goştîroşekî sekinibû. Deh ritil goşt kirin û dîsa da rê heta gîha cem dendikfiroş. Ji wîna jî çend kilo dendik û fisteq û bihiv kirin û dîsa kete rê de. Ku ê hemal got “Min bizaniya min ê gayek bi xwe re bianiya da ku karîba rahişt hevqase kel û pel.” jinek kenîya. Îca li hinda etarekî sekinî. Hinek misk û hinek ava gulên jê kirî, hinek jî mûmên Îskenderiyê û şekrok û şîr û hemûçik avêtin selikê û got: “Selikê hilgire û bide dû min.” Ku hate mala xwe û li derî da; keçeke nûhatî, pir xweşik derî vekir. Sîng girover û newq zirav bû, çavên wê yên xezala bûn, burhuyên wê mîna du heyvikên remezanê, hinarkên wê mîna du gulên sor bûn, devê wê mîna hungulîska Sulêman Pêxember bû; gava ku hemal çav lê ket hiş û sewdan di serî de nema, hindik mabû ku ji ser hişê xwe here û li erdê keve. Dûra got: “Min tu roj weke îro bi xêr û bereket nedîtine!” Keçikê ji hundir got: “Tu bi xêr hatî, ser seran hatî.” Çûne hundir, derbas bûn. Piştî hatin hêwaneke fireh û xemilandî bi gul û çiçekan. Erda wê bi sicade û berên Ecem hatibû raxistin, li kêleka jî kulav û mînderên Bexdadî. Di nava hêwanê de jî nivînek li ser textekî ji mermer hebû. Dêrdora textê nivînê bi dur û gewheran hatibû xemilandin. Sitareyêke ji etlesê sor jî bi ser de berdayibû. Dîwarên hêwanê jî bi perdeyên rengorengo hatibûn xemilandin. Keçik ji nava nivînê rabû, daket xwar û hat hetanî nava hêwanê cem xwişka xwe, jinekê ji xwişka xwe re got: “We xêr e, çima hûn wilo sekinîne? De ka zû barê vî feqîrî ji ser pişta wî deynin.” Ya ku qût kiribû ji pêşiyê ve û ya dergevan ji paşiyê ve, a sisiya jî alî wana kir, barê hemal ji ser pişta wîna danîn, selika wîna vala kirin. Her tişt bi cih kirin, jinekê du dînar dane yê hemal da ku here. Hemal di heyata xwe de tu keç, tu jin weke wana xweşik, rindik û bîaqil nedîtibû. Matmayî li wan dinerî, bi erdê ve çirîsibû û bê liv û tevger mabû. Ji xwe re digot “Çawa sê heb keçên wisa sipehî bi tena serê xwe ne û bê zilam dimînin.” Yekê ji

wan jê re got: “Çima tu naçî, qey te perê xwe kê m dîtin?” Dûra li xwişka xwe zîvirî û gotê: “Dînarekî dîtir bidê.” Hemal got: “Bi Xwedê xanima min, kirya min ne nivê vî perî bû jî, min pere qet kê m nedîtin lê belê rewşa we bala min kişand, mereq bi min re çêkir, gelo hûn bê zilam çawa îdare dikin, çawa sebra we tê û hûn dizanin ku her minare li ser çar linga ye. Hûn jî sê jinin û lingê wenî çaran tune ye. Lew ku jin ne bi zilaman be qismetên wan jî tamam nabe. Ez dibêjim madem ku hûn sisê ne, hewcebûna we bi yê çara heye, zilamekî zîrek, jêhatî, xurt û biaqil ku karibe surên we veşêre.” Wan jî lê vegerandin û gotin:

Wele em keçin û em naxwazin razên xwe têxin nav lepê yekî ku nika-ribe biparêze. Ristek ji helbestekê heye dibêje:

Razê biparêze qet mede kesî  
Raz û barê xwe ku te da kesî  
Mîsoger dê bela be li herkesî

Gava ku ê hemal ev ristek ji wan bihîst got:

Ez bi serî bikim sûnd û qesem ku ez zilamekî ewlekar û şareza me. Min gelek pirtûk xwendin û ez gelekî jî geriya me, duruşmeya min di jiyane de ev gotina helbestkare ku dibêje:

Tenê xwedî bext e ê ku diparêze sur  
Tenê hêjaye qewmê mirovê bi sur  
Raz û sur li cem min her bi kilît in  
Mifte jî wendane, deriyên min li dar in

Rabû ji hemal re gotin: “Bi Xwedê tiştê ku me dikişîne û em anîne vê derê mal û mulk e, vêca ka perên te hene ku tu karibe dilê me xweş bike? Bizanibe ku heta tu hinek pere nede, em nahêlin tu bi me re rûnê.” Xwediya malê lê zêde kir û got: “Heger çenikek pere jî bi te re tunebe nexwe tu jî nehêjaye tu tiştî.” A dergevan jî got: “Û heger tişteke bi te re tunebe tu jî rabe bê tişteke here.” Keçika ku çûbû bazarê li xwişka xwe zîvirî û got: “Xwişkê tu bi Xwedêkî hevqasî bi ser zilam de neçin. Rebeno çî ji destê wî ve hat ji bo me kir, teqşîr nekir û divê hûn baş bizanibin ku bêhna wîna ne fireh ba xwe li ber vê cîrnexweşiya we nedigirt.” Hemal bi vê gotina wê kêfxweş bû û got: “Bi navê Xwedê quruşek tenê jî bi min re nîne ji xeynî van herdu dînarên ku we dane min.” Rabû keçikan jê re gotin: “Ê de ka rûnê, li ser seran li ser çavan.” Keçika ku çûbû bazarê rabû derdor da ser hev, şûşeyên şerabê rêz kirin, piştî xwe şidand û çî ji şevbuhêrkê re lazim bû anî danî ber wana. Hemal pir hestiyar bû û got:

Ku tu ji hesl û fêslê wî ne serwext be  
Ku tu li hevalê xwe ne ewle be

Ne şerabê vexwe ne ji hilde qedeh  
Kêf û şahî weke ba tê ji sibeh  
Di ser gulan re bê ew ba misk û rîhan  
Di ser sergo re be geniya bêhnan

Hemal bêhnek kişand û dûre dîsa bi helbestî got:

Ka bide min bad û xemran  
Li ser hev bide kas û lalan  
Jiyan çiyê bê kêf û şahî  
Ne wate ye ne tam ne jî ahî

Piştî li hev rûniştin, şevbuhêrka xwe gerandin û hemal ji di nava wan de mîna ku di xewnê de be, ji rastiyên derdora xwe yeqîn nedikir. Yek pêre diaxifi, yekê henek û laqirdî pêre dikirin, qurîncek didanê, a mayî jî qedeha şerabê dida dest. Hemal ji ew di nava maç û ramûsanana de hiştibûn.

Her ku şerab vexwarin serê wana girantir bû. Di dawîya şevê de hemû tevde ketin bin hukmê şerabê. Keçika dergevan rabû ser xwe, xwe hejand û kincên li ser xwe yeko yeko ji ser xwe avêtin heta ku şifitazî bû, dûra xwe avête nava birka avê û bi avê list. Carnan ji devê xwe tijî av dikir û bi ser Hemal de dipijiqand.

*Şev bi dawî bû û Şehrezadê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA DEHEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahînaşahê min, tê gotin ku keçikan heta nivê şevê kêf û şahîya xwe bi wî hemalî kirin, têra dilê xwe henek û laqirdî kirin. Hemal ji bêrawestan ew maçî dikirin û ji hembêza yekê xwe davêt hembêza ya din.

Gava ku bû derengî şevê ji Hemal re gotin, rabe here. Hemal got: “Bi şeref û bi namûs derketine ruhê min ji vê bedena min hêsantir e ji derketina min ji cem we.” Li ser vê gotina wî, keçika ku ew bi xwe re anîbû xwe avête navê û li ber wana geriya, got: “Hûn bi Xwedê kin hûn ê bihêlin ku îşev li ba me be. Zilamekî şêrîn, ji dil û laqirdî hez e; em ê pê kêf bikin heta sibê.” Rabû jê re gotin: “Tu dikarî li cem me be heta sibê lê bi şertekî, divê bi temamî tu di bin hukmê me keve û çî bibe tu tiştêkî nepirse.” Hemal got: “Bila be, ez çî bibînim ez napirsim.” Rabû jê re gotin: “Rabe û meyzeke bê li ser derî çî nivîsandiye.” Hemal rabû çû li ser derî nerî, dît ku bi ava zêr li ser danîne “Tiştê ne karê te be pê nepeyiv, tu jî tiştêkî ku tu jê nerazî be nabihîzî.” Hemal vegeriya û ji wan re got: “Bila hûn tev şahidên min bin ku karê ne yê min be ez tiliya xwe tê ranekim, pê nepeyivim.”

Piştire, keçika ku çûbû bazarê rabû ji wan re şîvek amade kir û ji her xwarin û vexwarinê danî, ser sifrê tije kir. Mûmên xwe jî pêxistin, ûd û tembûr jî anîn û li hev kom bûn. Hîna ku ew di nava xwarin û vexwarinê de bûn dengê lêdana derî hat. Yek ji wana rabû çû li derî nerî û vegeyriya hat got: “Bi Xwedê îca niha nûh dawet kemilî û şahî tamam bû; sê Ecemên rîhkurkirî li devê derî ne. Her sê jî ji çavê çepê de kwîr in. Vêca ev hersî ecêb çawa wisa gîhane hev, min fêh nekir. Sê heb xerîb in, ji erdê Romê hatine. Her yek ji wan xwedî şekl û şemalekî sosret e ku mirov li wana dinêre, mirov nikare nekene.” Hîna ku wêna gotina xwe neqedandibû ya dîtirkê jê re got: “De ka iznê bide wana bila werin hundir lê ji bîr neke ku tu wî şertê me ji wan re bibêje, heger qebûl kirin ku tiştê ne karê wan be pê napeyivin, bila werin.” Keçik bi kêfxweşî li derî vegeyriya, hersî zilamên xerîb bi xwe re anîn û dîsa hat. Hersiya silav li wan kirin û derbas bûn. Tiştê destpêkê bala hersiyan kişand hemalê serxweş bû. Hersiyan bi hev re berê xwe danê û mîna ku wîna li bêjîngê xin, ew di nava awirên xwenî çep û rast de hiştin û gîhan gûmanekê ku ew jî mîna wana rêbirek be. Rabû gotin: “Ev jî eşqiyakî mîna me ye.” Ku hemal ew gotina wana bîhîst, bertek nişan da, rabû ser xwe çavên xwe pêl kirin, burhuyên xwe qermeçandin, bi awirên watedar li hersiya nerî û ji wana re got: “Rûnin û tiştêkî ku ne karê we ye mereq nekin. Ma qey we ew nivîsa li ser derî nexwend?” Keçik bi wê goftugoya wana hem kenîyan hem jî kêfxweş bûn. Xwarin dan ber hersî rêbiran û li dora wana rûniştin da ku kêf û henekên xwe berdewam bikin. Keçka dergevan jî şerab ji wan re tanî û hey tanî.

Gava ku qedeha meyê di destan de digeriya, ê hemal ji rêbiran ra got: “Birano gelo çirokin xweş an jî pêkenokin balkêş li ba we tunene ku hûn ji me re bêjin, da ku hûn sebra me bînin?” Bi vê gotinê re hersê rêbir fedîya xwe ji ser xwe avêtin, germ bûn û xwestin ku şahiyekê saz bikin. Dergevanê çû ji wan re amûrên mûzîkê anîn, yekî ji wana rahişt defê yê din rahişt ûdê û yê mayî jî rahişt çengê û bi hev re lêdan, keçikan jî stran gotin û dengê wan di hêwanê de olan da, hemû ji ser hiş birin.

Hîna ew di nava wê kêfê de bûn careke din derî lêdanê ew hişyar kirin, bala wana kişand; keçka dergevan rabû da ku binêre bê kî ne.

Di wê şevê de jî, Xelîfe Harûnê Reşîd mîna adeta xweyî her car, kinc û qiyafetên xwe guhertibûn û xwe bera nav bajêr dabû da ku hal û ehwalê gel ji nêz ve û bi çavên serê xwe bibîne. Li gel wî jî wezîrê wî Cafer û şûrkêşê wî Mesrûr hebûn. Xwe xistibû dirûvê tacîrekî û li nav kolan û sikakên Bexdê digeriyan. Gava ku di ber wê malê re çûn û qîrewîra hundir û dengê def û çengê hate wana, Xelîfe ji Cafer re got: “Ez dixwazim em derbasî vê malê bibin û xwediyên van dengên xweş bibînim.” Cafer got: “Evana serxweş in

û ez ditirsim ku eziyetekê bidine me.” Xelîfe got: “Çi dibe bela bibe divê em derbasî vê malê bibin. Rêyekê, rêbazekê bibîn û me derbasî hundur bike.” Cafer got: “Bila be rêzdarê min.” Çû ber derî lêda, keçka dergevan derî vekir, Cafer gotê: “Xanima min, em tacirin ji Taberiya ne, ev deh rojên me ne ku em li Bexdê ne li xana taciran e, ji ber ku em xerîb bûn me îşev rêya xwe şaş kir û bi ser xanê venebûn. Em hêvîdarin ku hûn derî li me vekin da ku em îşev li mala we bimînin, Xwedê xêra we binivîsîne.” Keçika dergevan dît ku mirovin giran, bi heybet in û dirûvên taciran bi wan dikevin, li hevma-liyên xwe vegeheriya bi wana şewirî, wan jî jê re gotin: “Bila werin hundur.” Keçik li wana vegeheriya derî ji wan re vekir û gote wan: “Kerem bikin hundur, fermo.”

Xelîfe Harûnê Reşîd, Cafer û Mesrûr bi spasdari derbasî hundur bûn. Gava ku çavên keçikan li wan ketin ji ber wana rabûn, kêfxweşiya xwe bi hatina wana diyar kirin û gotin: “Li ser seran li ser çavan mêvanên me yê ezîz, lê şertê qebûlkirina me ji were ew e ku hûn neaxivin bi tiştên ku ne karê we ye da hûn gotinên nexweş nebihîzin.” Wan jî gotin: “Me qebûl e.”

Piştê ew jî li ser sifrê rûniştin û tevî şevbuhêrkê bûn. Çavên Xelîfe li ser hersî rêbiran bû. Mabû ecêbmayî bê çawa hersî jî ji çavê çepê de kwîr in. Ji alîyekî din ve jî li hersî keçikan û spehîbûna wana dinerî û dixwest fêm bike bê çawa hatine cem hev bi van zilamên kor î beradayî re. Kêf û sohbeta wana berdewam kir. Ji Xelîfe re jî qedehêk şerab anîn, Xelîfe got “Ez hecî me, ez venaxum.” û xwe da hêlekê hebekî ji wan veqetiya. Keçka dergevan rabû ser xwe jê re sifreyeke dî anî, zerikeke çînî jî li ser, jê re tijî av kir û pêşkêşî wî kir piştî ku hinek berf jî xist nav de ku hênîk bike. Xelîfe spasîyên xwe diyar kirin û di dilê xwe de ji xwe re got “Misoger divê ez xelatekê bidim vê keçikê, ji ber vê qencî û ferasata wê.”

Piştî ku şerabê bandora xwe li ser tevan kir, jinika xwedîya malê bi destê navmaliya xwe girt û gazî li ya ku çûbû bazarê jî kir û ji wan re got: “Xuşkno, werin em deynên xwe bidin.” Keçika ku çûbû bazarê got: “Bila be.” Dûvre rabû çû hersîyên rêbir dûrî navenda hêwanê xist, navber vala kir. Bang li Hemal jî kir got: “Ka ê te tu were vir, ji xwe tu ne xerîbî.” Hemal rabû cilên xwe rast kirin, piştê xwe şidand û çû cem wana, got: “Ka ez çî bikim, hûn çî ji min dixwazin ez ê wê bikim.” Jê re gotin: “Tu li cihê xwe bisekine.” Piştê keçika ku çûbû bazarê gazî wî kir got “Ka alî min bike.” û çû bi hefsarê du heb dêlikên reşereng girt, anî ew derbasî nava hêwanê kirin. Jinika xwedîya malê rabû ser xwe, zend û bendên xwe hildan, qamçiyek girte destê xwe û ji ê Hemal re got: “Ka dêlikekê ji wana bîne vir, nêzîkî min bike.” Hemal bi zincîra stûyê wê girt û kişîşand ber bi jînikê ve. Dêlik jî bê rawestan digirîya û serê xwe ber bi keçika navmalî vedikir û dihejand. Jinik

bi qamçiya pê ket û lêda heta ku milên wêna ji êşa nema rabû. Dûvre dêlik himbêz kir û serê wêna maçî kir, hêsrên wêna paqij kirin. Piştêre ji Hemal re got: “Vêna bibe û ya din bine.” A din jî anî cem, bi ya ewil çî kiribû bi wê jî wilo kir.

Xelîfe li vê dimenê ma ecêbmayî û bêhna wî teng bû. Çav da Cafer da ku ji jinikê bipirse. Lê Cafer bi destan îşaret dayê, got: “Bêdeng be.” Xelîfe jî bêdeng ma. Jinika xwediya malê li keçîka dergevan zîvirî û jê re got: “De ka îca tu rabe deynê xwe bide.” Dergevanê got: “Bila be.” Jinik hilkişiya ser textekî ku dora wê bi zîv û zêr xemilandiye. Navmaliya dergevan jî çû hilkişiya ser textekî li kêleka wê. Ya ku çûbû bazarê jî kete bin kulînê de û torbakî mezin ji etlesê kesk î pûrtikdirêj ji wir derxist. Devê torbe vekir, ûdeke xweşik jê derxist, akorda wê ji nûve saz kir, li raserî xatûna xwe sekinî û ev gotinê ha bi helbestî gotin:

Xewa wendayî vegeerînin li mijangên min  
Çûna wîna jî bi min bidin qebûl kirin  
Gava ku ez razî bûm bi sekna li mala eşqê  
Ez têgiştîm ku xew xeyidiye ji min  
Gotin, me tu dinasî bi dîn û îmana li rê  
Çi bû gelo, kê tu derxistî ji wê rê  
Min got, qet nepirsîn vê yekê ji min  
Sebeb tevde di dûrbûna wî de ye ji min  
Şev û rojê ji min diçe, dirije ew xwîn  
Lê dîsa jî ez im a ku jê dixwaze lêborîn  
Ditirsîm ku bargiran bûbe bi xwînrijîya min  
Ditirsîm ku westiya be bi vî barê min  
Dêma wî şubhetê rojê di bîra min da  
Herdem raserî min tê di fikrê da  
Geh pê e geh jî agir di hişê min da  
Xweda ew jî ava jînê her afirandiye  
Tiştê mayî li ser lêvan her neqîşandiye  
Di nava simbêlan de bi cîh kiriye  
Tu dê çî di dildarekî de bibînî  
Ku bi her gotinê re bide girî  
Bi kêfxweşî bide gazin, bide bêrî  
Dildarekî ku serxweş be bê mey û abê  
Dema dibîne xeyalê te li ser av û abê!

Dema ku xatûnê ev gotinên wê bihîstin, jê re got: “Xwedê hekîm û bijîşkê te be.” Keçîka ku çûbû bazarê evqas bi dilşewatî û bi êş digot ku dawî kincên xwe çirandin û bêhiş kete erdê. Ku kincên wênî qetiyayî ji ser bedena wêna şemitîn, laşê wênî ku ji derbên qamçıyan sor û mor bûbû xuya kir.



Gava çavên Xelife li wê dimenê ket, şaş û behetî ma. Keçika dergevan rabû ser xwe, av bi ser rûçikê wê dakir, kincin nûh anîn, lê kirin. Xelife ji Cafer re got: “Ma qey te bedena vê jinekê nedît bê çî bi serê wê kirine! Ê min ez nema dikarim bêdeng bimînim himber vê meselê; heta ez rastiya vê jinekê û çîroka van herdu dêlikan hîn nebin ez ê nikaribim rehet bisekinim.”

Cafer ji Xelife re got: “Mîrzayê min, ronîya çavên min! Wana şert dane ber me, me jî şertên wana qebûl kirin û derbasî mala wana bûn. Êdî divê karê ku ne ê me be em pê nepeyivin da ku em gotinên tal nebihîzin.”

Keçika ku çûbû bazarê dîsa rahişte ûdê, danî ser singa xwe û tiliyên xwe bi nazdarî di ser têlên wêna re birin û anîn û pê re jî got:

Em ê çî bibêjin ku em li eşqê gilî bikin?  
Rêya xelasiyê di ku de ye ku em bêrî bikin?  
An ku em qasidekî rêbikin şûna xwe  
Gelo ew dê karibe derd û kulên me vebêje?  
Kê dîtiye ku qasidê şa dildar hilgirtiye?  
Kê dîtiye ku sebrê eş derman kiriye?  
Bêyî dildarê kê şûda bêhn firehiyê dîtiye?  
Tenê kul û derd û xem dimînin li pey wî  
Tenê hêsirên ser hinarkan dimînin li pey wî  
Ey ew ê ku ji ber çavan wenda bûye!  
Tu herdem di nava dilê min da ye  
Jibîr meke ku sozên dildaran her li dorin  
Ne jibîr dibin, ne qels dibin neji dimrin

Gava ku keçika dergevan ev gotin bihîstin, mîna ya din wê jî kire qîrîn, kirasê xwe çirand û bêhiş li erdê ket, veziliya bi bedena xweyî tazî ku bi şopa qamçiyên sor û mor bûbû. Keçika ku çûbû bazarê çû av bi ser çavên wê de reşand da ku bi ser hişê xwe bê, dûvre kincên nû lêkirin û ew ediland.

Xatûna wana derket ser textê xwe, li şûna xwe rûnişt û ji keçika ku çûbû bazarê re got: “Ka vê carê ne ji bo deynan bistirê, ji xwe ew dengê te ji me re maye.” Wê jî dîsa rahişte ûdê, cihê xwe xweş kir û stra, got:

Heta kengî ev fîraq û hicran  
Heta kengî ev rondikên ji çavan  
Hicrana te vê carê bi qesd e  
Heger qesda te zikreşê min be  
Ew jî sax bû ji derd û xemê  
Heger felek li xayinan bête rehmê  
Kesî dildar nagihêje mafê xwe ticarê  
Bêrîkirina te agir e di nava min de

Xweska carekê tu li ser soza xwe ba  
 Xweska carekê din sebra min heba  
 Dê şerîeta eşqê her waha be gelo  
 Dê stûxwarî herdem para min be gelo  
 Hezkirina te ji bo min sûcê Xweda bû  
 Hicrana min jî herdem sûcê te bixwe bû

Gava xatûnê ev helbest bihîst, dest bi qîran kir, cilên xwe qetandin û bê hiş li erdê dirêj bû, mina herduyên dîtirkê, şopa qamçiyên li ser laşê wê jî xuya kir. Himber wê dimenê hersiyên rêbir ên ji çavekî de kwir, ji hev re gotin: “Xweska em derbas nebana vê malê.” Ku Xelîfe Harûn ev gotina wana bihîst ji wan re got: “Ma qey hûn ne ji vê malê ne?” Gotin: “Na wele em ne ji vê malê ne. Me got belkî ev mala wî cwamêrê li kêleka we ye.” Hemal jî got: “Weleh ne mala min e jî, tenê vê şevê ez li vir bûme mêvan û xweska ez nebûma.” Rabû jihev re gotin: “Em heft zilamin ew jî sê jin in û kesî çaran tine ye ku em jê bipirsin, li ser halên van jinikan. Ka em ji wana bipirsin û heger bi xweşikahî bersiva me nedan, em bi zorê rewşa wana hîn bibin.” Hemû li ser vê gotinê bûne yek ji xeynî Caferê wezîr. Wîna got: “Ev ne fikreke rast e dev ji wana berdin, em mêvanên wana ne û wana em bi şertekî qebûl kirine hundurê xwe ku em bi karê wana nepeyivin. Divê em li ser soza xwe bin û bêbextiyê bi wan re nekin. Ji xwe katejimêrek maye ji sibehê re, dê her yek ji me bi rêya xwe de here.” Piştî çav kir ji Xelîfe re û jê re bi dizî got: “Tenê seetek maye, piştî fermanekê ji wan re rêbik. Wan derxe huzûra xwe û çîroka wana ji serî heta binî hîn bibe.” Xelîfe ev yek qebûl nekir û got: “Êdî sebir bi min re nemaye û ez nema dikarim xwe zêde ragirim himberî vê pistepista di nav wan de.”

Piştî bi hevdû şewîrîn û gotin, gelo kî dikare bi wan re xweşik bipeyive? Di encamê de gotin, bila Hemal be ê ku bi wan re bipeyive. Di wê kêlikê de jinan ji wana pirsîn û gotin: “Xêr e zilamno, çi qewimîye?” Hemal rabû çû cem xwedîya malê û jê re got: “Xatûna min, tu bi Xwedê kî ji me re bêje bê çima tu bi qamçiyên bi herdu dêlikan ket, te li wana da, dûvre te ew himbêz kirin, maçî kirin. Gelo çîroka wana çi ye? Û çima te bi mîrkuşt li wê xwişka xwe xist? Pirsên me evin û hew.” Jinika xwedîya malê li wana zîvirî û got: “Gelo ev tiştê ku Hemal dibêje rast e?” Tevan gotin ‘rast e’ ji xeynî Caferê ku bêdeng ma. Gava ku jinikê ev gotin ji devên wana bihîst, got: “Bi Xwedê mêvanino we tadeyeke mezin li me kir û me hîna ji destpêkê de ji we re gotibû ‘Divê tiştê ne karê we be hûn pê nepeyivin da ku hûn gotinên nexweş nebihîzin.’ Ma qey ne besî we bû ku me mala xwe ji we re vekir û rizqê xwe bi we re parvekir? Lê sûc ne yê we ye, sûc ê wî ye ewê ku hûn gihandine vir.” Dûvre zend û bendên xwe hildan û qamçiyê xwe sê carî bi şida li erdê xist. Derîyekî mezin ji nişkê ve di wir de vebû û heft heb ebîdên reş jê derketin, şûrên wan jî di destên wan de. Jinikê ji ebîdan re got: “Ka vana bi

hev ve girêdin da ku nema karibin pozê xwe xeyrî xwe ra rakin.”

Ebîdan ew girêdan û ji xatûnê re gotin: “Ka îznê bide ku em serê wana bifirînin.” Xatûnê got: “Berî em serê wana jêkin, ez ê moleta seetekê bidime wana da ku derdên xwe bêjin.” Hemal bi tirs û berger jê re got: “Xatûna min ez dexilê te me tu min bi gunehên ên dîtirkê neşewitîne. Hemûçikan guneh kirin, ketin şaşitiyê lê ez bêgunehim. Şeva me pir xweş derbas dibû ne ji van hersî rêbiran ba, dê wisa jî biqediya. Lê belê ez baş dizanim ku ev hersê rêbir têkevin bajêrekî dê xerabikin.” Û piştêre ji helbestekê ev ristik xwendin û got:

Lêborîn xweş e ku a yekî qadir be  
Mîrov ji yekî baş, dost û hogir be  
Sûcê minî bi tenê dildarî be her  
Yê pêşîn nede kuştin bi yê dawî dîlber  
Yê pêşîn bi yê dawî nede kuştin dîlber!  
Gava ku xatun ev gotin ji hemal bihîst, kenîya.

*Li Şehrezadê jî bû sibeh, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA YAZDEHEMÎN

*Şehrezad got:*

Mîrê minî bextewar, gava ciwanik kenîya piştî wê qehra xwe, berê xwe da cemaatê û ji wan re got: “Hela hûn dixwazin çi bêjin bêjin, ji xwe emrê we seetek tenê maye. Divê hûn baş bizanibin tehemula min ji ber feqîriya we ye, ku hûn mezinê qewmên xwe bana, min dê zûtirîn cezayê we bida we.” Li ser vê gotina ciwanikê Xelîfe li Cafer dizîvire û pêde dixeyide, dibêje: “Kuro ka me pê bide nasîn yana wê me bikuje!” Cafer jî dibêje: “Me ev heq kiribû.” Xelîfe lê vedigerîne dibêje: “Di rewşeke waha ciddî de rê ji laqirdiyan re nîne Cafer! Her tiştê û wextê wê heye.” Dûra ciwanikê berê xwe da sakûlan û ji wan re got: “Qey hûn birayê hev in?” Gotin: “Na weleh em feqîrin, belengazin, her yek ji me ji welatekî ye û her yek jî xwedî çîrokeke cuda ye.” Ciwanikê disa berê xwe da wan û got: “De her yek ji we çîroka xwe bibêjin û sebeba hatina vê derê bînin ziman, dûra jî destê xwe di ser serê xwe re bibin û bînin û herin mala xwe.”

Ewil hemal berbi ciwanikê ve hat û jê re got: “Xatûna min ez mirovekî hemal im. Ev jinika delal jî ez dîtîm, barê xwe li piştê min kir û bi wî hawî ez hatim vê derê.” Ciwanikê jê re got: “Destê xwe di ser serê xwe re bibe û rabe here ji vir.” Mîrovê hemal got: “Bi navê Xwedê heta ku ez çîrokên van hevalên xweyî din nebihîzim ez ji vir naçim.”

## (Çîroka Sakûleyê Yekemîn)

Sakûlek bi pêşde hat û got:

Xatûna min, ez ê sebeba kurkirina rîha min û korbûna min ji we re bêjim. Bavê min mîrek bû û birayê wî jî mîrê bajarekî din bû. Wisa li hevdû hat ku ez û kurapê xwe di heman rojê de hatin dinê. Gava ku ez mezin bûm, car caran ez diçûm mala apê xwe û bi mehan li cem wan dimam. Carekê dîsa ez çûbûm serdana wana. Kurapê min pir qedr û qîmetê min girtibû. Min jî xwe pêde berda û ez li cem mam, me bi hev re xwar û vexwar heta ku xemrê hişê me giran kir û avgermîkek di nava me de çû û hat. Wê kêlikê kurapê min ji min re got: “Pismam wele karekî min î girîng ketiye ser milê te û divê tu bikî.” Min jî got: “Ser seran, ser çavan.” Ewî piştî ku ez sûndxwarin dam û pê de rabû çû. Piştî demekê bi şun de vegeyriya. Jineke xweşik û sipehî pêre bû ku xeml û xêza wê bi barek dirav bû. Li min zîvirî, jinik li pey wî; jinik bi min da naskirin û got: “Vê jinikê bibe nava mezelan, ez ê li dût te bêm.” Ji ber ku min soz dabûyê riya nabûnê jî di dest min de tunebû, ez mecbûr bûm bi ya wî bikim. Min jinik bir û ez çûm nav tirban. Çawa em li wir rûniştin, min bala xwe dayê ku vayê ew jî hat. Misîneke avê, tûrek tijî kils û bêrek jî pêre bû. Rahîşte bêre û çû ser tîrbekê di nav mezela de. Kêleka wê kola û kevir dane aliyekî, heta ku deriyekî biçûçik xuya kir. Derî vekir, nêrdewaneke badayî ku bi jêr de dadiket xuya kir. Li jinikê zîvirî û jê re îşaret kir ku ji xwe re riyekê hilbijêre. Jinikê bi wê nêrdewanê xwe berda jêr. Kurapê min li min zîvirî û got: “Pismamo de êdî qencîya xwe bibe serî û gava ku ez jî daketim jêr, vî derîkî bi ser me de bigir û axê bi ser de vegeyriya, mîna berê bik. Piştê ew kilsa di wî çewalî de bi avê bistirê û kevirê ser tîrbê mîna berê bi cih bik da ku kes tê dernexe. Ev saleke min e ku ez vir dikolim û vî cihî amade dikim. Ji Xwedê pê ve tu kes pê nizane. Qencîya ku tu bi min bikî jî ev e!” Piştê paşîya xwe da min û bi nêrdewanê ve xwe bera jêr da û ji ber çavên min wenda bû. Min jî derî dîsa bi ser de girt û kevir lê anîn hev bi kilsê û tîrb dîsa kir mîna berê wek ku wîna dixwest. Piştê ez vegeyriyam qesra apê xwe. Ape min wê kêlikê li seyda û nêçîrê bû, ne li mala bû. Ez jî ji şev pê de ketim xewê. Lê gava ku li min bû sibeh û tiştê şeva buhurî hate bîra min ez pir xemgîn bûm, pir jî poşman.

*Û fecrê li Şehrezadê da, wê jî dev ji gotinê qerîya.*

ŞEVA DUWAZDEHEMÎN

*Şehrezad got:*

Melikê hêja, hate gotin ku sakûlek ji ciwanikê re got:

Gava bû sibeh, ez derketim nav mezelan û li wê tirba doh geriyam. Heta ku tarî kete erdê, min ew tirb tevde yeko yeko di ber çavan re derbas kirin, lê belê ez li wê tirba doh rast nehatim. Êvarê bêhal ez vegeriyam qesrê. Ji şev pêde sebr û hedana min nedihat ji kerb û xeman. Dilê min pir bi pismamê min ve bû û qolincên êşa poşmanîyeke dijwar hinavên min dihelandin. Min çawa tişteki wisa qebûl kiribû û gotinên wî guhdar kiribûn min jî nizanibû. Gava bu sibeh dîsa min berê xwe da nav mezelan. Rehetî ji min re tunebû, dilê min di nava xemgîniyeke dijwar de bû. Divîbû ez şopa pismamê xwe bibînim. Heft rojan li ser hev ez lê geriyam, min tirbên wî mezeli yeko yeko di ber çavan re derbas kirin. Lê dîsan jî min şopa wî nedît. Êdî tasiwasek bi min re çêbûbû, ez ditirsiyam ku ez dîn bibim. Rabû min dev ji bajarê apê xwe berda û ez vegeriyam cem bavê xwe. Di devê derîyê bajêr de birekê ez sekinandim, dest û lingên min girêdan, ez derdest kirim. Vê rewşa erjeng ez şaş û metal kiribûm. Ez lawê mîrê bajêr bûm û ew ê ez derdest kiribûm jî hemû xizmetkar û leşkerên bavê min bûn! Ez pir ji wan tirsiyam û min ji xwe ra got “Gelo çi bi serê bavê min hatiye?” Min ji wan mirovên dora xwe pirsî bê ka çi qewimîye, lê kesî ji wan tişteki ji min re negot. Piştî wê yekî ji wan ku berê xizmetkarê min bû, ji min re got: “Wele wezîr bêbextî bi bavê te re kir, leşker jî lê qulipîn û bi wî hawî ew kuştin. Em jî şandin vê derê da ku li bende te biminin, te bigrin.” Ez bi wan agahîyan ji serxwe çûbûm, wan jî ez biribûm cem wezîr. Ew wezîrê ku hem kujerê bavê min bû û hem jî ji kevn de dujminatî di nav min û wî de hebû. Lewre gava ku rojekê ez li ser qesrê bûm û tivinga min di destê min de bû, min bala xwe dayê ku balindeyekî li ser banê qesra wezîr danî li raserî min. Min jî berê tivinga xwe da balindeyê, min xwest ez lê biteqînim lê mîratê şaş kir û derba min şûna ku li balinde keve, çû li çavên wezîr ket ew kor kir. Qey qedera wî bû çawa ku helbestvan jî gotiye:

Qeder çawa bajo bi kêfa xwe ye  
 Nebêjin baş e xerab e encam çi ye  
 Qeder bi karê xwe her ew qencî ye  
 Ne bed bibe bi qederê ne şad bibe  
 Roja her tiştî tê ku bi dawî dibe  
 Man nîne ey dost, her tişt bi dawî dibe

Û çawa helbestvanekî din jî gotiye:

Em çend gavan meşîn ku li enîya me nivisibû  
 Qedera kê çi be li vê rê her ew diçe li dû  
 Xwedê li ku nivisibe ji mirov re qeder  
 Bêgûman li wir dê bimre misoger

Dema ku bi derba min çavê wezîr kor bû, rebenê wezîr nikaribû tişteki ji bi min bikira. Lew ez kurê mîr bûm û bûyer bê hemdê min rû dabû. Lê

wê kêlikê ez dest girêdayî li hember wî bûm. Çawa li min nerî, ferman da celadê xwe ji bo min bikuje. Min jê re got: “Tê çawa min bikujî bê sebeb û bê guneh?” Got “Ma qey guneh ji vî mestir heye.” û bi destê xwe çavên xwêyî kor nîşanî min da. Min got: “Tu jî dizanî ku ew bi şaşitî bû.” Got: “Heger te bi şaşitî kiribe jî ê min ez ê bi qesdî bikim.” Duvre ji zebaniyê xwe re got: “Ka wîna bînin vir.” Zebanî ez birim cem. Tiliya xwe di çavêkî min de rakir, rijande erdê, ez kwîr kirim. Ji wê gavê de ez bûm kwirê bi çavekî çawa ku hûn dibînin. Piştî ku çavekî min rijand, dest û lingên min girêdan, ez xistim sindoqekê û ji celadê xwe re got: “Wîna bibin derveyî bajêr, li wir bikujin û cendekê wî bavêjin ber ajalên dirinde bila wî bixun.” Celad ez birim, ji bajêr derxistim. Dest û lingên min hîna girêdayî bûn. Xwest ku çavên min jî girê bide da ku serê min bifirîne. Ez di wê kêlikê de giriyam û min ev çend rêzik gotin:

Ji bo xweparastinê min hûn kirin mertal  
 Lê hûn bûn tîrên kujer di devê kevanê lal  
 Min hêvî dikir hûn herdem çepilgirên min bin  
 Çi gava ku li xedrê rast bê rastedestê min  
 Êdî çîrokên dostaniyê deynin kêlekekê  
 Bila bibarin bi ser min de tîrên dujminê min  
 Heger hûn nikaribin bi yek bin bi halê min re  
 Ne dost bin ne jî dujmin bi dilê min re

Piştî min çend rêzîkin din jî xwendin, min got:

Min birayê xwe kiribûn mertal ji xwe'r  
 Lê ew ji dijminan re bûbûn koz û çeper  
 Min got di hinavên dujmin de dê bibin agir  
 Lê ew her dibûn tîr di dilê min da  
 Dizanin ku mirine di hinek dilan da  
 Ya rastî jî ew bû di nava çîrokan da  
 Sûnd dixwarin digotin, çi ji dest hat me kir  
 Ew jî wisa bû bêxîlaf lê bi bêbextî dikir

Gava ku celadê bavê min î kevn ev gotinên min bihîst, pir hestiyar bû û got: “Mirzayê min, roniya çavên min, ez ê çawa nekim bi fermanan û ez koleyekî ber destan im!” Hinekî ponijî dûvre ji min re got:

De ka ji vî welatî here û nema bi vir da were da ku ne tu bête kuştin ne jî serê min di belê keve, çawa ku şairekî gotiye:

Ku talûke hebe birev bi nefsa xwe  
 Bila mal jî bigrî li ser xwedîyê xwe  
 Ji xwe tu li vê erdê hatiye dinê  
 Ji bîr neke ku tu xwedî nefsek tenê ye tenê

Şaş û metal im ez, li van kesên stûxwar  
Çima narevin û erd hewqasî fireye bi dar

Gava ku min ev gotin jê bihîst, min ji guhên xwe yeqîn nekir. Bi coş û kêf min xwe avête destê wî, ramûsand. Ji kêfan min êşa çavê xwe yê rijyayî jî jibîr kiribû. Wek ku ez ji nûh ve hatibim dinyê, dilê min lê da û bi lez ketim rê meşiyam heta ku min xwe gihan cem apê xwe. Çi bi serê min û bavê min de hatibû û çawa wezîr çavê min rijandibû, ji serî heta binî min jê re rêz kir. Wî ji min re got: “Te keder û xemên min zêde kirin. Ji xwe ev çend rojin ku kurê apê te jî ji holê wenda bûye û kula wîna hîna di ser dilê min de nû ye. Kesî jî di derheqê wî de tu agahî nedane min.” Piştî xemgîn bû û giriya heta ku ji ser hişê xwe çû. Gava bi ser hişê xwe hat got: “Kurê min ez pir xemgîn bûbûm bi wendabûna kurê xwe. Vêca ev misîbeta ku bi ser serê te û bavê te de hatiye kerb û xemên min duqat kirin.” Gava ev gotinên wî hatin guhên min, ez pir hestiyar bûm û min xwe mecbûr dît ku ez rastîya wendabûna kurê wî jê re bibêjim. Ji serî heta binî min çîroka wî jê re got. Apê min bi vê agahîya min pir kêfxweş bû, ruh pê ve hat û got: “De ka rabe wî cihê han nişanî min bide!” Min got: “Apo weleh ez gelek caran çûm lê geriyam, lê min nedît, hemû tirbên mezêl weke hev in.” Min çî got apê min qebûl nekir û got “Îlehî em ê biçin nav wî mezêlî, li wê tirbê bigerin.”

Em bi hev re çûn lê gerîyan, min tirb naskir vê carê. Kêfa me hat, me axa ser da alî û me qapaxa wê vekir. Piştî li dû hev me xwe bera binerdkê da û em bi nêrdewanê ve daketin. Nêzî pêncî pêlikî em daketin, me xwe gihand binê dehlizê. Li wê derê dumanek li me rabû ber çavên me girt. Pifinik bi apê min ket, behna wî teng bû. Istixfara xwe anî, piştî em dîsa meşiyam heta ku em li hêwaneke tijî ard û genim û xwarin rast hatin. Di nava hewanê de jî nivînek raxistî û dor perdekirî hebû. Apê min ber bi nivînê ve çû, perde da alî ku çî bibîne? Kurê wî û ew jinika pêre di himbêza hev de bûne komir, hişk bûne mîna ku şewitîbin. Apê min çawa çav li wan ket, tif kir ser çavên wî û got: “Te heq kirîye bênamûso! Li vê dinyayê ev ezab, li wê dinyê jî tê ezabekî hîn diwartir bibîne îşallah!”

*Di vir de li Şehrezadê bû sibeh, wê jî dev ji axaftinê berda.*

ŞEVA SÊZDEHEMÎN

*Şehrezadê got:*

Mîrê min î bextewar, hate gotin ku sakûle ji wê ciwanikê re vedigot, Xelîfe Harûn Reşî û cemaetê jî lê guhdar dikir, sakûle berdewam dikir û digot:

Apê min xwe negirt, destê xwe avêt şimika xwe û bi qehr li bedena kurê xweyî komirî da heta ku mîna arîyê herifand. Ez jî lê behetî mabûm û dilê min bi ser kurê apê min ve bû ku ketibû wî halî de. Çi pê hatibû, çima ketibû vî halî gelo? Hîna min bersiv ji van pirsên xwe re nedîtibûn min ji apê xwe re got: “Tu bi qedrê Xwedêki rehmê li wan bike! Ma qey ev tiştê bi serên wan hatiye ne bes e heta ku tu şimikê li wan dixî?” Apê min got: “Kurê min tu nizanî, ev kurê min ji biçûkanîya xwe ve ji vê xuşka xwe hez dikir. Pir jê hez dikir. Min jî ew dûr xist, ez pê de dixeyidim û min ji xwe re digot ‘Jixwe hîna zarok in, tişt nabe.’ Lê gava ku mezin bûn, min bihîst ku ketine gunehên mezin de. Min bawer nekir. Lê dîsa jî ez pir pê de xeyidim û min jê re got ‘Biner ha kurê min, tu tiştêkê wilo neke! Yana willehî felata te ji destê min tune. Heta niha tu kesî tiştêkê wilo nekiriye û ji niha pê de jî kes nake. Loma eger tu tiştêkê sosret bikî, heta dinya hebe dê stûwê me li ber xelkê xwarkirî be û em ê herdem rezil bin di nava şêx û mîrekan de.’ Ji bo ku ez dilê xwe têxim cî de jî min herdu ji hev dûr xistin. Lê ne tenê wî ji xwişka xwe hez dikir, Xwedê nehiştê jî pir jê hez dikir û li ser diariya. Loma şeytan zora herduyan dibe, ew jî tîn vî cihên han, vê binerdê jî xwe re çêdikin bi dizî û ji xwe re ev nivîn û ev xwarin dixênê wek ku tu dibînî. Çawa ez derketime nêçîrê, ew jî hatine vê derê, lê Xwedê li wan daye ew kirine arî.”

Piştî girîya, ez jî pêre girîyam. Gote min: “Heta niha tu birazîyê min bû lê ji niha û wêde tu kurê min î li şûna wî.” Ez hinekî li ser rewşa xwe ponijim. Kuştina bavê min ji qîbel wezîrê wî bi bêbextî, derxistina çavê min û ew bûyerên sosretî ku bi serê min de hatin tev di ber çavên min re derbas bûn mîna kabûsekî.

Hêdî hêdî em ber bi jor ve, bi nêrdewanê ve hilkişiyam heta ku em derketin ser erdê. Me qapax dîsa bi cih kir û axa wê bi ser de kişand, tîrb dîsa mîna berê kir û em vegehiyan malê. Hîna me cihê xwe xweş nekiribû, gurmîn bi dahola cengê ket, şinge şinga şûr û mertala giha erşan û toz û eca-ca ku ji bin simên hespên siwara radibû erd û ezman dagirt. Em tevde şaş û metal man himber vê dîmenê! Hişên me li bin guhê hev ketin me nizanibû bê çî qewimîye, lewra em bê agah bûn. Apê min rabû ji çend xîzmetkaran pirsî, gotin: “Mîrê min wile wezîrê ku birê te kuştîye û bajarê wî xistiye dest xwe, niha jî çawa tu dibînî ew û leşkerên xwe bi dizî hatine dora bajarê me girtine, herkes xafil girtine, ketine bajêr, her tişt xistine destê xwe.” Çawa min ev bihîst, min ji xwe re got “Bi Xwedê ku ez careke din bikevim destên wî, filitandina min tune.” Kuştina dê û bavê min hate bîra min û ez fikirîm bê ka çawa ez ê xwe xelas bikim. Ez derketama nava bajêr, wê eskerê bavê min î kevn ez bidîtima, xelasiya min tunebû. Min tu çare nedît ji xeynî kurkirina rîha xwe û guhartina şeklê û şemalên xwe. Min kincên cihê li xwe kirin û xwe jî bajêr vedizî û ez hatim vî bajarî, da ku hinek bi xêra bavê xwe



min bigihînin cem mîrê bawermendan, cem xelîfê mezin da ez çîroka xwe jêre bibêjim. Vêca heta ku ez giham vir, tari kete erdê û ez mam heyirî bê ez ê herim ku û li ku bimînim vê şevê. Hîna ez di wî halî de ev sakûleyê han li min rast hat. Min jê re got: “Ez xerîbê vî bajarê me.” Wî got: “Ez jî xerîbim.” Hîna em di wî halê de ev hevalê meyî sisyan hate cem me, silavek li me kir û got: “Ez xerîbê vir im, gelo cihekî ez lê bimînim nîne?” Me got: “Wile em jî xerîbin weke te.” Rabû em hersî bi hev re meşîyan di sikakan re heta ku em li vir qelibîn. Çîroka hatina min û çavê min î kwir û rîha min î kurkirî ev e xatûna min!

Ciwankê jê re got: “Wê çaxê destê xwe deyne ser serê xwe û rabe bi riya xwe de here!” Ewî jî got: “Xatûnê wele ez naçim heta ku ez çîrokên yên dîtirkê jî nebihîzim.”

Xelîfe li wezîrê xwe Cafer zîvîrî û got: “Bi wî Xwedayê ku em afirandîne, di jiyana xwe tevî de min tu serpêhatî mîna ya vî sakûleyî nebihîstîye.”

### (Çîroka Sakûleyê Duyemîn)

Piştîre sakûleyê din hate ber ciwanikê, bejna xwe li ber tewand, erd li ber wê ramûsa û jê re got:

Xatûna min, ê min ez bi vî halê xwe wisa çeloxwarî nehatime dinyê. Çîrokek serpêhatiya min heye heger bi serê derziyê ez binivîsim li ser libên geniman dê bibe îbretê hîndar ji hemû nexweşan û kesên birîndar re, lew ez bi xwe mîr kurê mîr im. Min Qu’ran bi heft şêweyan xwendîye. Li ber destê zanist û mamosteyan min her cûre pirtûk xwendine û gelek lêkolîn kirine di derbarê astrolojiyê û bîyolojiyê û zanînên wêjeyî û helbestkariyê. Ez wisa pê de çûm heta ku min li pêşîya hemdemên xwe tevan xist û navê min li çar hêlên welat û temamê dinyayê belav bû. Gava ku şan û dengê vê zanebûna min gîha ber guhê qralê Hîndê, xeber şand ji bavê min re ez jê xwestim û gelek yadîgarên giranbûha ên di ‘eyara mîran de ji bavê min re şandin da vê daxwaza wî red neke. Bavê min jî negot na, rabû kar û barê min kir, pêdiviyên min li şeş keştiyan kirin û di deriyayê re em bi rê xistin.

Keştiyên me mehekê di avê de meşîyan heta ku em gîhan beriyê. Em li hespên xwe siwar bûn û em ji gemiyan peya bûn, meşîyan, deh heb barên yadîgarên me ji bi me re bûn. Di wê kêlikê de ‘ecacek li raser me rabû û mîna marekî bi ezmanan ket, bilind bû. Piştî saetekê ew ‘ecac ferikî û li şûna wê şêst siwarên sergirtî derketin holê. Her siwerek weke şêrekî bû. Me bala xwe da wan me nas kir ku Erebin, rêbir in. Gava dîtin ku em direvin û deh barên yadîgaran bi me re ne, pêşîya me girtin û berê rimên xwe dane me, bi

tiliyan û îşaretên destan me ji wan re got “Em qasîde Şahê Hindistanê ne.” da ku tadê li me nekin. Lê ewana jî gotin: “Em ne li ser erdê wî ne û ne jî di bin hukmê wî de.” Piştî her tişt li bin guhê hev ket. Hinek xulam kuştin ên mayîn jî bazdan, reviyên. Ez bi xwe jî reviyam, piştî ku ez bi giranî birîndar bûm. Ereben rêbir jî bi mal û baran ketibûn. Di wê navê re ez meşiyam min xwe ji wir dûr xist, lê min nizanibû ez ê bi ku ve herim bi wî halê xwe û bi wê perîşaniya xwe. Lê dîsa jî ez nesekinim û min meşa xwe berdewam kir heta ku ez gîham serê çiyayekî. Min şikeftê li wir dît, ez tê de mam heta ku li min bû sibeh.

Bi derketina tavê re ez dîsa ketim rêyekê heta ku ez hatim bajarekî abadî xweş, bajarekî ku kincên zivistanî ji xwe kiribûn û ên buhareke gul-gulî li xwe kiribûn. Ez pir kêfxweş dibûm ku ez gîhabûm bajarekî wilo. Ji ber meşa dirêj ez pir westiyabûm, min berê xwe da dikana terzîyekî silav lê kir. Cwamêro silava min vegerand, xerîbketina min pirsî, min çîroka xwe ji serî heta binî jê re vegot. Piştî ku ez guhdar kirim, devê xwe ber bi guhê min ve anî û bi dengê hêdî got: “Li xwe miqate be xorto û heta ku ji te tê vê çîroka xwe ji kesî re nebêje. Ez pir ji bo te ditirsim lawo. Ev emîrê vî bajarî dijminê bavê te ye, xwîniyê wî ye.” Piştî xwarin ji min re anî, min xwar û pêre sohbet kir heta derengî şevê. Ji min re qiraxeke dikanê vala kir, nivînek lê raxist û pêdiviya min bi çî hebû ji min re anî. Cwamêro pir li ser min diêşiya. Piştî sê rojan ji min re got: “Ka tu dikarî çî karî bikî da ku tu xwe bixwedî bikî.” Min jê re got: “Heyra wile ez mirovekî feqe me. Bi ilm û zanîne ve mijûl dibim û li gel vê ez dikarim karê nivîsê bikim.” Wî jî got: “Wile birako li vî bajarî cih ji zanîn û xwendin û nivîsandinê re nîn e. Xelkê wê tev bi peran û diravan daketine.” Min jî got: “Mixabin ji vî karî pê ve tiştê ji destê min nayê.” Rabû ji min re werîs û bivirek kirî û got: “De ka van bigire û ji xwe re here daristanê êzingan bîne bifiroşe, debara xwe pê bike heta ku Xwedê deriyekî xêrê li te veke. Divê tu jibîr neke ku tu rastiya xwe ji her kesî veşêre da ku tu bikarîbî bijî.” Piştî ez bi çend heb êzinganan dame naskirin û tenbiya min li wan kir da ku li min miqate bin. Min jî dest bi karê xwe kir, her roj min bareke êzing dida ser piştî xwe dianî bajêr difiroto bi nivî dînarî. Min pê xwarin û vexwarina xwe dikirî û ê ku ji ber dima jî min diavête qolana xwe ji xwe re hiltanî. Saleke min bi vî hawî derbas bû.

Rojekê dîsa mîna her car min rahişt werîsê xwe û ez çûme êzingan, li çolê ez li komek dar û ber rast hatim, bistanek jî di nêvî de. Ez ketim nava bistan de min çavên xwe lê gerandin, dareke kevnarî mezin bala min kişand. Min kêleka wêna kola, ax da alî; min dît ku devê bivirê min di toqek baxir de dialiqe. Careke din min axa dorê da alî, min dît ku deriyekî textînî xuya kir. Gava min ew derî da alî nêrdewanek xuya bû, di derî re min xwe bi nêrdewanê ve berda heta ez gîham deriyekî. Min derî vekir, min bala

xwe dayê ku qesrek li raber min e. Di hundirê qesrê de keçeke xweşik mîna perîyan hebû. Çawa ku çavên min lê ketin min got “Suphan ji xalikê te re!” Li min nerî û got: “Tu însan î an cinî yî?” Min got: “Ez insan im.” Got: “Kê tu aniye heta vir, ev bîst û pênc salên min in ku ez li vir im û çavên min bi insanan neketiye.” Min got: “Xatûna min, Xwedê ez anîme balî te da ku xem û kederên min bide revandin.” Piştîre çî bi serê min hatibû min jê re vegot. Pir xemgîn bû bi halê min û li ser min giriya. Dûvre got: “Ka îca ez jî serpêhatiya xwe ji te re bibêjim. Divê tu bizanî ku ez jî keça mîrekî me. Bavê min mîrekî Hindistana dûr bû. Xwediyê grava ku bi navê Ebenos tête nasîn. Bavê min ez bi kurapê min re zewicandibûm. Lê di şeva zewaca me yî ewilî de efrîtekî ez revandim û ez anîm vê derê, çî tişt ji min re lazim bû anî vê derê, cil, pêlav, zêr, zîv, firax, xwarin û vexwarin. Ew ji her deh rojan rojekê tê vir radikeve û sibê zû diçe. Gava ku pêwîstiyê min çêdibe jî ez destê xwe di ser van herdu ristikên nivîsa li ser vê qubeyê re dibim û tinim, efrîte min jî di cî de tê himberê min. Ev çar roj in ku ji vir çûye. Ji bo ku dîsa vege-re vir hîna şeş roj jê re mane. Gelo tu dê bikarîbî pênc rojan li vir bî û berî ku bê bi rojekê biçî?” Min got: “Dibe, çîma nabe.” Kêfa wê pir hat, rabû ser xwe, bi destên min girt û di nava dehlîzekê re ez birim serşokekê germî paqij. Me herduyan kincên xwe ji xwe kirin, serê xwe şuşt û nav piştîa hevdu firkand. Piştîre li ser kiraxa dikek biçûk rûnişt û ez ji li kêleka xwe dame rûniştandin. Li wê derê me bi hev re xwar û vexwar û têra xwe guftûgo kirin. Piştîre got: “Ê te tu betiliye, ka xwe dirêj ke û qasekî ji xwe re rakeve da tu bêhna xwe veke.” Min spasdariya wê kir û ez ketim xeweke giran de.

Gava ez ji xew şiyar bûm, min dît ku lingên min difirkîne. Careke din me mil da hev û em têra xwe axivîn. Carekê bi wan awirên xwe yî mêrkuj li nav çavên min meyzand û got: “Ev bîst û pênc sal in ku ez bi tena serê xwe bûm. Bêhna min pir teng bûbû û ji qehran min fikir ez biteqim. Vêca şikir ji Xwedê re ku tu ji min re şand.” Kêlîkekê bêdeng ma, dûvre ev çend ristîk gotin:

Me dê erd raxistana bi xewnên bêriyê  
 Lew em hayedar bûna ji hatina we  
 Hatifê dil û cergan çavreşe ew  
 Ka em raxînin bi maçan ruçikê xwe  
 Da ku meşa me jî bi lêvan be ew

Gava ew ristîk qedandin dilê min lê da, heskirineke kûr di dilê min de reh berdand, kul û kederên min çûn û li şûna wan evîna vê xweşikê cih girt. Me şevbûhêrka xwe bi hev re kir û me têra xwe ken û laqirdî kirin. Di temenê min tevî de şevê weke wê şevê nebû. Wê şevê em herdu jî pir dilşa bûbûn. Min jê re got: “Gelo tu naxwazî ku ez te ji bin vê erdê derxim û te ji vî efrîtî xelas bikim. Keniya û got: “Tu jî tumayê meke, neh şevên te ne yek

ya wî ye.” Xîretê da dilê min, min got: “Wille va ez ê vê neqş û nivîsa ser vê qubbeyê bişkinim da ku were, ez ê wî bikujim. Ji xwe ez ji kuştina efrîtan hez dikim.” Gava ku ev gotina min bihîst, dest bi helbestekê kir û got:

Bêhna xwe fireh bike ey talibê hicranê  
Bêrîkirinek bê hîle îro li dora min e  
Sebir ke lew felek îro şerxwazê min e  
Loma dizanim encama her danê hîcran e

Gava min ew helbesta wêna bihîst, bêyî ku ez li ser gotinên wêna bifikirim min pêhnek li qubeyê xist ew ji hev belawela kir.

*Bi berbanga sibehê re Şehrezadê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA ÇARDEHEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Melikê min î bextewar, tete gotin ku wî sakûleyê ji ciwanikê re got:

Gava ku min pêhna xwe li qubeyê da, keçikê qirek da û got: “Ewa efrîtê me hat jî, qey min ji te re negot destê xwe nede qubeyê?! Ewa te tehdeyek mezin li min kir, de êdî bilezîne û hewl bide tu zû derkevî di devera tu tê re hatiye ku tu xwe ji mirinê xelas bike.” Ji ber ku ez bi tirs bi nêrdewanê ve hilkişiyam, hîna ez çend pêlikan neçûbûm ez li dûv xwe zîvirîm min bala xwe daye ku min bivir û şekala xwe li wir jibîr kiriye. Tam di wê kêlikê de erda bin me qelişî û efrîtekî bêmirês jê derket û got: “Çi bi te hatiye, tu çima min aciz dikî.” Keçikê got: “Tiştêk nîn e, tenê bêhna min hinekî teng bûbû. Ez jî rabûm ser xwe da ku ez tiştêkî vexwûm û bêhna xwe berdim. Bêhemdî min lingê min li qubeyê ket.” Lê Efrît jê bawer nekir, qeherî û got: “Tu derewan dikî qehpikê, hela bêje bê te çi kiriye.” Çavên xwe li qesrê gerandin, awirên wî çûn ser bivir û şekala min. Lê zîvirî û axaftina xwe berdewam kir: “Ev eşya ên kê ne. Hebe tunebe ên însanan e. Ka bêje bê ên kê ne.” Got: “Bi Xwedê hayê min ji wan nîn e. Niha piştî te got çavên min li wan ketin, belkî bi te re hatibin hundir.” Efrît got “Qehpikê ev ne mumkun e.” û rabû kincên wê di ser re anîn ew tazî kir, her destekî wê bi darekê ve û her lingekî wê bi dareke dîtir ve girêdan û dest bi îşkencê û lêdanê kir da ku wêna bide axaftin. Êdî min nema dikaribû feryad û fixanên wêna guhdar bikim, bi tirs ez hatim jora nêrdewanê. Piştê di derîkî textikî re ez derketim min derî li dûv xwe girt, axa wî da ser, kir weka berê û ez çûm. Bi rê de sûretê wê keçika xweşik jiber çavên min neçû, ez pir xemgîn bûbûm, pir jî poşman li ser wî karê ku min kirî. Bîst û pênc sal bû ku rebenê pê re bû û niha tenê li ser min ezîyet didayê, îşkence lê dikir. Di wê kêlikê de tiştê hate serê min û bavê min jî hate bîra min, ez pir hestiyar bûm û min ji xwe re ev ristîk got:

Gava ku xezeba Xwedê li mirov tê  
Geh tengî ye ji mirov re geh firehî

Piştê min meşa xwe berdewam kir heta ku ez giham cem hevalê xwe yî terzî, min dît ku vaye bi qelaq li bendî min e. Çawa çavên wî li min ketin got: “Malneketo tu li ku bû, şeva borî heta niha xew bi çavên min nebû ji derdê te. Min got, Xwedê neke dirindeyek tiştêk lê rast hatiye, hemd û şikir ji Xwedê re ku va tu sax î.” Min spasiya hevalê xwe kir ji ber wê tenikbûn û dilêşiya wî û ez derbas bûm odeya xwe. Hîna çend salîse derbas nebûbû hevalê min li derî da û got: “Vaye zilamekî bîyan hatiye dikanê, bivir û şekala te pê re ye. Daxwaza dîtina te dikî. Dibêje ‘Gava ez çûm nimêja sibehê ez li wan rast hatime, ji ber ku min nedizani bê yên kê ne, min ji terziyên derdorê pirsî, ewan vê derê nîşani min dan.’ Va hîna li dikanê ye, êdî were bivir û şekala xwe bigire. Û spasiyên xwe ji zilêm re diyar ke.” Min çawa ev gotin bihîstin madê min zer bû û kabokên min ricifin. Hîna ez di wî halî de min dît ku erda odê qelişî û Efrît jê derket hate raserî min. Tevlî hemû şeweyên îşkencê û lêdanê keçik li xwe mikur nehatibû, wî jî jê re gotibû: “Ku tu keça şeytanan be jî ez ê herim xwediyê vî bivir û vê şekalê bînim raber te.” Piştê tê cem terziyan wê derewê li wan dike, cihê min fêr dibe û tê vir. Li vir jî bêyî ku bersiva min bigire, bi qemçika stûyê min girt û ez revandim birim.

Geh di ser erdê re geh di bin erdê re, di çend kêlikan de ez anim cem wê. Keçik tazî bû û di nav xwînê de bû. Çawa ku awirên min lê ketin hêsir ji çavên min bariyan. Efrît bi çepên wê girt ew anî raserî min û jê re got: “Qehpika şermût vaye min yarikê te jî anî ruyê te, de îca qebûl bike.” Keçikê li min meyzand, piştê got: “Ez vî zilamî qet nasnakim. Ev cara yekemîn e ku ez wî dibînim.” Efrît got: “Tu mikur neyê ez ê te bikûjim.” Keçikê got: “Di temenê xwe de çavên min li vî zilamî neketine. Guneh e, ji Xwedê malûm e, ez nikarim bêbextiyan lê bikim.” Efrît got: “Heger bi rastî tu wî nasnake wê çaxê ka rahêle vî şûrî û serê wî bifirîne.” Keçikê rahişt şûr û hate ser serê min, ez jî digiriyam û hêsrên min diherikîn. Çawa bi buhriyan min îşaret da, wê jî çav kir min ez haydar kirim. Piştê qîrek li min da û got: “Her tişt ji rûyê te hat serê me.” Ez jî li ber geriyam min got “Xatûna min niha wextê lêborînê ye” û min ev çend riste jê re xwendin:

Di sînga min de çi veşartîbe ew li der e niha  
Ricfa çogên min ew bi xwe ye lisanê hal niha  
Ew hêsrên ku bi şewat diherikîn ji dilên min  
Dengê eşqê ne lew ku bêdeng bimîne lisanê min  
Lehzeyên çîrokê baş vedibêjin dest û lingên min  
Ji bo ku çav têbigihêjin her vedibêjin burhûyên min

Gava ku keçikê armanca min fêm kir bi van gotinan, şûr ji destê xwe avête erdê û bêdeng ma. Efrît şûr da dest min û got: “Heger tu wêna bikujî

ez ê te azad bikim.” Min got “Bila be.” û min rahişt şûr. Ez ber pê ve çûm û min şûrê xwe hilda, ewê jî birhuyên xwe bir û anî û got: “Yê min ez di te bihurîbûm.” Hêsir ji çavên min bariyan, min şûrê xwe avête erdê, berê xwe da Efrît û jê re got: “Ey Efrîtê leheng û bêhempa, heger ev jinike kê mîn dîn û aqil be û serê min jênkiribe, çawa dê mafê min hebe ez serê wê jê bikim. De binêre bi hêrsî navê Xwedê ez serê wê jênakim lew ku tu min qetqetî bikî.” Efrît got: “Ez baş dizanim ku hûn herdu yarikên hev in.” Rahişte şûr û êriş kir keçikê; destekî wê jêkir, piştê yê din, dûvre lingê wê yî rastê jêkir, piştê jî yê çepê. Bi çar derban re çar hêlên wê birîn, ez jî di êş û elemê de lê dinêrim. Ew di wî halî de bi çavên xwe îşaret da min, Efrît ew dît, got: “Ey qehpîka bê şerm! Bi çavên xwe te zîna pê re kir niha.” Duvre li min zîvirî û got: “Ê me di şerîeta me de jina ku zînayê dike em wêna dikujin. Ev jin hîna duwazde salî bû min ew jî koza bûkaniyê revand û anî vir. Her deh rojan ez şevêkê tenê dihatim cem, ji min pê ve tu kes nas nedikir. Ji ber ez hîn bûm ku xayîntî bi min re kiriye min niha ew kuşt, lê ê te te xayîntî bi min re kiriye yan na ez wê baş nizanîm.”

Vêca xatûna min gava Efrît ew gotin got, bêhna min hate ber min û hêvî bi min re çêbû ku min nekuje. Bi wan hestan ez axivîm û min daxwaza efûya xwe jê kir. Efrît got: “Tu dikarî tenê ji min bixwazî gelo ez te têxim sûretê sehekî an kerekî an jî meymûnekî. Min xwe avêt ber lingen wî û heta ku ji min hat ez li ber geriyam da ku min efû bike. Min got: “Ez mirovekî Musulman im û tu tadeya min ne gihaye tu kesî, heger tu rehmê li min bikî û li min bibore wê Xwedê jî li te bê rehmê û li te bibore.” Efrît got: “Metirse ya kuştinê ez te nakujim, lê ya efûkirinê jî tê de nefikire. Zêde dirêj jî meke û baş bizane ku illeh ez ê te efûn bikim. Çare ji vê re tune.” Piştê rahişt min, qubbeya li ser serê me jî hev bela kir û ez bilind kirim bi ezmanan xistim heta ku erd di biniya me de weke zerikek av hate xuyakirin. Piştê ez birim danîm ser çiyakî, rahişt çengeke axê û himehim pê ket li ser xwend, tiştin gotin nedihatî fêmkirin. Dûvre ew çenga axê bi ser min de reşand û got: “Ji wî sûretî derkeve têkeve sûretê meymûnekî.” Wê gavê ez bûm meymûnekî sedsale. Çaxê ku min xwe di wî halê bêmirê de dît, ez li ser ruhê xwe giriyam û ez mecbur bûm bêhna xwe fireh bikim li ser vê xedra felekê. Min xwe ji serê çiyê berda jêr û ez qedere mehekê meşiyam heta ku ez gîham qiraxa behrekê, nêzî saetekê ez ji xwe re li wan deran geriyam. Min bala xwe dayê ku keştiyek ber bi bejayê vê tê, min xwe da ber talda latekê min xwe veşart. Heta keştî hat dûvre min xwe vedizî û ez ketim hundirê keştiyê, lê yekî ez dîtîm û li hevalên xwe kir gazî got “Vî bêmirêsi ji keştiyê biavêjin” yê din got “Na welleh em ê wî bikujin.” Şûr da dest wî û got: “De bikuje.” Min destê xwe da ber devê şûr û giriyam, gava ku çavên kaptan li hêsrên min ketin dilê wî bi min şewitî û ji yê dora xwe re got: “Tacirno! Vî meymûnî hewara xwe gîhand min. Bi Xwedê ji îro pê ve ew ê li kêleka min

be û ez nahêlim kes tu zerarê bidê.” Bi vê gotina kaptan ez xelas bûm.

Li bajarekî pir mezin keştiya me xwe da qeraxa avê. Çawa ku keştiya me rawestiya, qefleke mirovên bajarî hatin pêşiya me, xêrhatin di me dan û kêfxweşiya xwe bi silametyê dane xuyakirin û gotin silavên mîrê me jî li we hene, xêrhatina we dike û ev lênûsk jî ji we re şandiye da ku her yek ji we hest û ramanên xwe binivîse. We kêlikê ez ji cihê xwe çeng bûm û min destê xwe avêt lênûskê, lê ji ber ku ez di sûretên meymûn de bûm tirsîyan ku ez lênûskê biqetînim an jî bavêjim behrê. Ji ber vê yekê tev bi min de xeyîdîn û xwestin min bikujin. Gava min îşaret da wan ku ez dixwazim binivîsim tiştêkî din nakim, kaptan ji wan re got: “Rawestin bêhna xwe lê fireh bikin, heger xerabiyek kir em ê berdênê û heger başî kir jixwe ez ê wîna mîna kurekî xwe bigirim cem xwe, bi navê Xwedê ev cara yekê ye ez dibînim ku meymûnek ji min fêhm dike.” Kêfxweşiya min bi vê gotina xwediyê min hat, min destê xwe avêt pênuşê di hibrê dakir û ev rist nivîsandin bi xeta Ruqa<sup>3</sup>:

Nivîskarê qencyê dîrok e an Yezdan e ew  
Lew ku qencya teyî niha ne dîdar be ew  
Xwedê dê bide rojekê kurkî bedew  
Lew ku mezintirîn nav ‘bavê qencyê’ ye ew

Piştî wê bi xeta Rihanî min ev ristik nivîsandin:

Pênûseke wî heye nûrê dibarîne li çar hêlê dine  
Bawer bike nûr û fedla wê her bêhesab e li dinê  
Ka wê çî bendewariya Misrê hebe ji wan destan  
Ku bi her pênc tiliyan xwe dirêj dike her heft erşan

Dûvre bi nivîsa Sulsî min ev ristik jî lêkirin:

Her nivîskar dê rojekê bimre û here  
Ya dibe dîrok tenê nivîs e li dû nare  
Loma dibêmin nenivîse bi dest û dare  
Tu tiştî ji xeynê ku te şad ke li wê dinê

Piştî wê bi nivîsa Nesxî min ev ristik li bin nivîsandin:

Gava ku xeberên hicranê ghiştin me  
Bûyerên borî bariyan wek baranê li me  
Em jî li hibirdankan vedigeriyan bi gazin  
Bi zarê pênuşê me gilî dikir çî biçûk çî mezin

---

3. Ruqa: Şeweyek ji şeweyên nivîsa Erebi ye ku gelek şeweyên wê yî navdar hene mîna Rihanî, Farisî, Nesxî Sulsî, Dîwanî, Kofî û hwd.

Li dû van ristan, min çend ristên din bi Tomarî nivîsî:

Serweriya herî mezin jî heta rojkê ye  
Heger ne wer be ka ew serwerê yekê  
Biçîne şitlan bêhesab li her derê  
Zewal hebe jî bê zewalin şitlên başîye

Li dawî jî min ev çend rist bi xeta Muhaqiq nivîsandin:

Heger hibirdanka te ji izzet û serbilindiyê be  
Divê hibra te jî ji qenciyê û comerdîyê be  
Bi başî binivîse heke tu serwer û zana bî  
Bi wê bilind dibe incex esl û fêslê pênuşa ewî

Piştê min lênûsk li wana vegerand ku wan jî nivîsand û pê de lênûsk birin cem mîrê bajêr. Gava Mîr li lênûskê dinêre tenê nivîsa min diecibîne. Ji xulamên xwe re dibêje: “Herin cem xwediyê vê nivîsê, van kincên xweşik lêkin, wî li hespekê siwarkin û werînin vir.” Xulaman çawa ku ev gotin bihîstin kenîyan. Mîr qeherî û bi wan de xeyîdî li ser vê bêedebiya wana û got: “Ez fermaneke didim we hûn jî dikenin?” Êwan jî gotin: “Mîrê min em ne bi gotina te kenîyan, lê yê ku ev helbest nivîsandiye meymûn e ne insan e, loma em kenîyan, ew meymûn jî li ba kaptanê keştiyê ye.” Mîr jî çawa ku ev tişt bihîst ji kenan lerizî û got: “Ez dixwazim vî meymûnî bikirim.” Piştê di cî de çend qasidên xwe şandin cem wê keştiyê. Qeflek kinc û zêr û zîv jî bi wan re şandin da ku meymûn pê bixemilînin û wî li hespê siwar bikin û bînin. Gava qasidên mîr hatin cem me, ew kincên nû li min kirin. Toqên zîv û zêr bi stûwê min ve berdand, ez li hespê siwar kirim û berê min dan cem mîrê bajêr. Çawa ku ez derketim huzura Mîr, min sê caran erd ramûsa li ber lingên wî. Mîr îşaret da min ji bo ku ez rûnê, min çogên xwe şikandin, ez li ser çokên xwe rûniştim. Hemû tev li wê edeba min behetî man û di serî de jî Mîr bi xwe. Piştî çend kêlikan Mîr emir da, herkes ji wir rabû çû, ez û Mîr û xulamên wî tenê man. Xulam jî bi gotina Mîr re rabûn ji min re sifreyeke xwarina zengîn amade kirin ku çî tiştê dilê mirov biçwayê li ser hebû. Mîr got: “Kerem bike bixwe.” Dîsa min erd li ber destên wî heft caran maçî kir û dest bi xwarinê kir. Piştî ku me tevan bi hev re xwarina xwe qedand û rahiştin sifrê, min rahişt pênuş û lênûskê û ev çend ristîk nivîsandin:

Lalikên xweşgeliyê her rêzî li ber min  
Şekir û şorbeşîr û peqlewe li ber min  
Xweskam bi wî goştî her heba li cem min  
Kunafe bi nîvişkê buharê û ew hinguv

Piştî min nivîsa xwe qedand, ez çûm hêla din min xwe da qorzikekê û ez rûniştim. Mîr jî çû nivîsa min xwend lê ma behetî û got: “Gelo meymûnek dikare bi vê fesahetê û bi vê xeta xweşik binivîsîne?” Piştê kişik ji Mîr



re anîn, ewî jî ji min re got: “Ka tu dilîzi?” Bi serê xwe min jê re got “Erê.” Ez ketim raber Mîr de û min keviren xwe rêz kirin. Min du caran pê re lîst, herdu caran jî min zora wî bir. Mîr hîn bêhtir ma heyirî û got: “Ev meymûn zilamek ba dê serwerê xelkê xwe ba.” Duvre ji xulamê xwe re got: “Here bang li xatûna xwe ya biçûk bike, bê Mîr dibêje, bila bê li vî meymûnî temaşe bike.” Xulam çû keça Mîr bi xwe re anî û hat. Keçik çawa çav li min ket berê xwe ji min guhert û bi zimanekî gazinokî ji bavê xwe re got: “Bavo tu bi xatirê Xwedêkî çawa destê te li min digere tu bang li min dike da zilamên xerîb li min temaşe bikin.” Mîr şaş ma û got: “Keça min ka zilamên xerîb, jî xwe ez û tu û birayê te yî biçûk û xulamên ku tu mezin kirine bi tenêne. Îca ka mirovên xerîb û tu rûçkê xwe ji ber kê vedişêre?” Keçkê got: “Bavo ev meymûnê han zilamê biyan e, kurê mîrê girava Ebenos e. Efrîtekî bi navê Circîs ew efsun kiriye û jina xwe jî kuştiye. Jina wî jî keça mîre Eqnamûsê bûye. Lêw ew ê ku dibê meymûn e, insanekî zana û bîaqil e.”

Mîr li keça xwe ma ecêbmayî, li min zîvirî berê xwe da min û got: “Gelo ev tiştê ku di derheqê te de got rast in.” Min serê xwe hejand û jê re got “Erê.” û ez giriyam. Mîr jî keça xwe re got: “Çawa te tê derxist ku efsunkirî ye.” Keçkê got: “Bavo gava ku ez zarok bûm pîreke fenok û efsunger li ba min hebû, ez hînî efsunê kirim. Ez ji wê jinikê hînî sed û heftê derî ji deriyên sihrê bûn, deriyê herî biçûk jî wan ku ez bi kar bînim têrê dikê ji bo ku ez temamê kevîrên vî bajarê te bibim wîyalî çiyayên qaf û wan bikim deryayek, xelkê wê derê jî bikim masiyên wê deryayê.” Gava ku bavê wê ev gotin ji devê wê bihistin got: “Tu bi navê Xwedêke keça min, ka vî xortî jî vê efsunê xelaske da ku ez wîna ji xwe re bikim wezîrek. Çawa ev hunerê te hebû û hayê min jê tunebû. De ka vî xortê rindî bîaqil xelas ke da ku ez wî bikim wezîrê xwe.” Keçikê got: “Li ser seran û li ser çavan babiko.” Piştî rahişt kêrekê û groverkek çêkir.

*Şeveqê dîsa lê da Şehrezadê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA PANZDEHEMÎN

*Di wê şeva panzdehan de Şehrezad got:*

Mîrê min î bextewar, vêca wê kêlikê ê sakûle ji wê ciwanikê re got:

Keça Mîr wê gavê rahişt kêrekê ku nivîsin Îbranî li ser xuya dikirin. Di nava wan nivîsan de giroverkek hebû, di nava wê giroverkê de jî xêzk û mêzk û nav û îşaretin cûda hebûn. Wê jî bi zimanekî ku nayê fêmkirin ew nivîs û tilsim dixwendin. Piştî katjimêrekê her çar hêlên qesrê kete nav tariyeke giran de. Mirov digot qey dunya tev li me hatiye hev. Ew Efrîtê bêmirês jî di wê navberê de derket holê û ziravê me qetand. Keça Mîr jê

re got: “Tu ne bixêr û ne jî ser çavan hati!” Efrît kete şubhetê şêrekî û got: “Bêbexta heram! Tu çima li ser soza xwe nema? Ma me jihevne negotibû bila kes têkil yê din nebe?” Keçikê lê vegerand û got: “Bêbextê mezin tuyî, xayin! Ma qey tu sozê nasdike lanetlêhatiyê bêmirês!” Wê gavê Efrîtê ku di dirûvê şêr de bû, devê xwe ji hev vekir, got “Tê niha bela xwe bibîne.” û da xwe ku êrişke ser. Keçikê bi lez tayek ji porê xwe kişand û bû himhima wê li ser xwend. Mû di cî de bû şûrek û bi ser şêr de hat, ew kir du felqe. Serê şêr hat guhertin bû dûpişkekî har, keçik jî qulipî zîhayekî maran û herdu pev ketin, ketin şerekî giran de. Piştê Efrît bu başokeyekî çeleng, keçik jî veguhezî teyrekî baz û bera dûv da. Nêzî seetekê bi dûv hev ketin di zikê qesrê de. Piştê başoke bû pisîkek, baz jî bû gurek û bi dûv ket. Nêzî seetêke din bi hev re şer kirin. Pisîkê dît xelasîya wê tune ye, xwe qulupand hinareke sor, çawa ku gur xwe dadayê hinar bi hewa ket, bilind bû û paşre li erdê ket, perçe perçe bû û libên wê li her derê qesrê bela bûn. Gur jî di cî de veguherî dîkekî û bi dû libên hinarê ket. Yeko yeko ew neqandin. Lê libek tenê ji wan liban ketibû qiraxa birka avê de. Dîk jî qîr didan û baskên xwe ji me re li hev didan, lê me nizanibû bê çî dixwaze. Piştê dîk bi ser wê libê jî vebû û nikulê xwe lêda ku bixwe lê lib ji nikulên wî filitî û kete avê de. Dîk di heman demê de veguherî hûtekî mezin û xwe bera avê da, li dûv wê liba hinarê çû. Katjimêrekê nepenî ma, piştê gummin bi erd û ezman ket, em tev lerizîn ji tirsan. Dûvre Efrît dîsa xuya kir. Ji devê wî, ji herdu firnikên pozê wî, ji nav çavên wî agir dibariya. Di heman demê de keçik jî bû gulokek agir û bi ser de çû. Hindik mabû ku em tevde xwe biavêjin birka avê da ku em xwe ji agirê wan bisitirînin. Carekê ji nişkê ve qîrek bi Efrît ket, ji nav koma agir pengizî derket û bi agirê devê xwe pif kir ser çavên me. Keçikê bi heman şêweyê bersiva wî da û bi agir pif kire ser çavên wî. Rivînên agirê herduyan jî bi ser me de dihatin. Lê tenê rivînên agirê wî Efrîtê em têşandin. Peşkek jî agirê wî bi ser min de jî hat, li çavekî min ket, kor kir. Peşkek jî li çena Mîr ket, rîha wî şevitand û çend diranên wî xistin. Rivînek jî li xulamê Mîr ket, di cî de ew kuşt. Qudûmên me tevan şikest û hêviya me û xelasîyê nema.

Destên melkematê mirinê di qirka me de bûn, em kirî miribûna. Di wê navberê de dengê hat got ‘Xwedê mezin e, Xwedê mezin e!’ û pê re jî keçika Mîr xuya kir, hat û Efrîtê ku bûye çengeke xwelî jî di dest wê de. Got: “Ka zû taseke av ji min re bînin.” Av jê re anîn. Rahişt tasa avê û bi zimanekî biyan li ser xwend. Piştê ew av bi ser min de reşand û got: “De vegere sûretê xweyî ewil bi heqê navê Xwedê!” Bi wê gotina wê re ez dîsa vegeyriyam ser eslê xweyî berê û bûm insan. Lê çavekî min çûbû êdî. Di wê navberê de qîrek bi keçikê ketibû digot “Bavo agir, bavo agir!” Hîna ku em serwext nebûbûn bê ew hewara wê ji bo çîye, min dît ku rivîneke agir bi sînga wê ketiye û ber bi rûçkê wê ve hildiperike. Pêre jî bû komeke arî û li erdê ket, li rex ariya wî Efrîtî. Em tev li ser êşiyên û pir xemgîn bûn û bi piranî jî ez.

Lew li ser min ew bobelat hatibû serê wê. Min gelekî dixwest ku ez li şûna wê bibama arî. Heyfa min pir li wî dilê wênî bi rehm û wî rûçikê wênî xweşik hat. Lê heyfa min ji bêfedê bû.

Gava ku Mîr dît bê çi bi serê keça wî hat, hişê xwe wenda kir, kincên xwe qetandin, porê xwe kişand û beşê rîha xwenî mayî ji rakir û dest bi girî kir. Ez ji pêre giriyam û me herduyan bi hev re li çogên xwe dan hetta xulam bi me ve hatin. Xulamên Mîr tevde li ser serê wî kom bûn, behetî mabûn, nizanîbûn bê çi pê hatiye. Wîsa li dorê man heta bi ser hişê xwe hat. Wê çaxê çi bi serê keça wî hatibû, ji serî heta binî ji wan re got. Bi vê xeberê dilê hemûya êşiya, qîr û hewar bi wan ket, bû kûrekûra carîye û xulaman; heft roj û heft şevan şîn kişandin. Piştî Mîr ferman da ku qubeyekê li ser xwelîya keça wî bidin avakirin û find û mûman tê de pêxin û ariya cendekê wî Efrîtî ji li ber bayê berdîna da ku naleta Xwedê lê bibare heta roja qiyametê.

Piştî mirina keça wî, Mîrê bajar nexweş ket, mehekê di nav nivînê de ma. Piştî hêdî hêdî bi ser xwe ve hat. Ji min re got: “Xorto! Me heyameke baş bi hev re derbas kir heta roj hat û evqase qede û bele bi serê me de hatin. Xweska ne em li te rast bihatana û ne me ew rûwê teyî bêoxir bidîta! De biner di rûwê te de min ew keça xwe yî delal, a ku hêjabû sed mêrî ji dest xwe wenda kir. Di rûwê te de ez ji wîlo niv şewitî bûm, çena min çû û çend diranên min jî. Xulamekî min jî hate kuştin. Lê ez baş dizanim ku tu gunehên te tunebûn di vê meselê de. Qedera me bû, ma em ê çawa bikin? Kes nikare ji ber qedera xwe bireve. Dîsa hemd ji Xwedê re ku keça min bi mirina xwe be ji tu xelas kir. Êdî ev ji bo te jî bes e. Bes e kurê min, rabe ji vir here berî ku beleyin din ji bêne serê me.”

Vêca min bi ya Mîr kir û ez ji wir derketim xatûna min. Ji aliyekî ve ez pir kêfxweş bûbûm bi xelasbûna xwe û ji aliyekî ve jî dilêşiya mirina ew keça delalî ku ez ji meymûntiyê xelas kiribûm. Çiroka jiyana min tev dihate bîra min, êşên min tev yeko yeko dihatine ber çavên min, rê li min dirêj dibû, lê dîsa jî min meşa xwe berdewam dikir, heta ku ez giham bajarekî. Destpêkê ez çûm serşokê min xwe baş şûst. Piştî ez çûm cem berberekî, min rîh û porên xwe kur kirin û ez hatim vir xatûna min. Ji wê rojê ve herdem ez li ser wan beleyên ku bi serê min de hatin difikirim û digirîm û van ristan ji xwe re dibêjim:

Qesem bi navê Xwedê şaşwaz im ez  
Ji van kulan ji van derdan bêhal im ez  
Ji bo sebrê ez ê dîsa bêhnfireh bim  
Bê êş û gazin ez ê dîsa xwe ragirim  
Heta ku sebr zivêr bibe ji sebra min  
Heta ku êşa dil zivêr bibe ji êşa min

Ez ê bêhnfireh bim min ew tî û ew atşan  
 Li gel olê gel îman gelek başe sebra insan  
 Gelek baş e gelek rind e ev sebra min  
 Dê bidome bê êş û jan ev sebra min  
 Ta ku ew êş êşdar bibe ji êşa min  
 Bêhnfireh bim ez ê îro mîna atşan  
 Gelek baş e sebra mirovê bi îman  
 Sebir baş e lew ku herdem bibe derî  
 Bibe nivîn, bibe hêlîn û bawerî  
 Dê bidome dê bidome ew sebra min  
 Da ku herkes baş bibîne ew êşa min  
 Sebir baş e lew ku piştê bide Xwedê  
 Bide olê bide wê şewq û wê findê  
 Dê bidome û her bidome sebra min  
 Heta ku herkes baş bibîne vê êşa min  
 Şopa sirên min ziman e zimanê çê  
 Lew ku xewnên bi raz têne ji ba Xwedê  
 Taca sipehîbûnê ew e xewnê li çiyê  
 Lew ku b'avê vemrînin ew agrê ku lê  
 Kî bê xweşî heye li dinyê ew derew e  
 Lew dê rojek nêzîk ne dûr bibîne bi xwe

Bi wî hawî ez mehekê meşiyam, ji bajarekî çûm bajarekî din. Piştî wê min berê xwe da bajarê aşitî û xêrê, ez hatim vê derê, Bexdê, da ku ez xelîfê mezin, emîrê hemû bawermendan bibînim û vê serpêhatiya xweyî sosret jê re bibêjim. Ez îşev giham vir û min ev birayê xwe dît, silav lê kir. Hîna ku ez pêre diaxivîm min bala xwe dayê ev birakê meyî din jî hat cem me, silav li me kir û got: “Ez mirovekî xerîbim, alîkarî ji me xwest.” Me got: “Wile em jî xerîbê vir in.” Rabû em hersî bi hev re meşiyar bêyî ku kes çîroka yên dîtir bizanibe. Piştî qederê em anîn ber vî derî û em derbasî mala we bûn. Çîroka min ev e, çîroka çavrijandina min jî ev e.

Keçikê jê re got: “Wele çîroka te çîrokeke pir balkêş e. De ka destê xwe di ser serê xwe re bib û bîn û rabe bi riya xwe de here.” Sakûle got: “Wile heta ku ez çîroka vî hevalê xweyî din guhdar nekim, ez ji vir naçim!”

Sakûleyê sisyan xwe da pêş û got:

### (Çîroka Sakûleyê Sisyan)

Xatûna min, ê min serpêhatiya min ji ya herdu hevalên min jî sosrettir û balkêştir e. Lew evana herdu jî, qedera wan ew anîne vir. Lê yê min sebaba kurkirina rîha min û derketina çavekî min, ez bi xwe bûm. Ji ber ku ê min

ez mîr kurê mîran bûm. Gava ku bavê min çû ser dîlovaniya xwe, ez ketim şûna wî û min kar û barên welat dane meşandin. Tadeya min li kesî nebû, hemû karên welatî bi dadwerî min dane meşandin. Xelkên welat jî hemû ji min razîbûn. Paytexta welêt li qiraxa behrê bû. Min jî ji ger û seyrana di behrê de hez dikir. Vêca min xwest ez ji xwe re li giravan temaşe bikim. Ez rabûm bi refaqeta deh qayikan re derketim seyranê û me xwe bi avê de berda ber bi giravan ve. Kelûpelên lazimiya mehekê jî me bi xwe re biribû. Şevêkê bayekî ecêb li me rabû û pêlên avê bilind bûn, tirseke mezin kete dilê me. Heta ku li me bû sibeh, me hêkên hesinî kirin. Piştî ba sekini û pêlên avê jî vemirîn, rok derket. Em gîhan giravekê, me xwe da peravê, li qiraxê em peya bûn, daketin. Me ji xwe re xwarinin germ çêkir, du rojan me bêhna xwe berda, dûvre em dîsa bi rê ketin, me qeyikên xwe bi avê de berdand, em bîst rojan çûn. Piştî şev li kaptanê me geriya, her çar hêlên xwe li bin guhê hev xistin, nema dizanîbû bê wê bi ku ve biçê. Rabû ferman da çavê (klavuz) ji bo ku hilkişê ser serê darikê qayikê da ku çavdêriya rê bike. Çavdêr hilkişiya, çendakî ma û dûvre bi şûn ve hat û got: “Li hêla rastê masiyek li ser rûwê avê xuya diki. Di nivê behrê de jî reşahiyek hebû, geh reş dibû geh sipî.” Çawa ku kaptan ew gotinên çavdêr bihistin şaşika serê xwe li erdê xist û pûrtika serê xwe kişand û ji me tevan re got: “Bizanibin ku hûn ê hemû bimrin û dê filitandina kesî ji we tunebe!” Em tevde bi hev re giriyan û min ji kaptan re got: “Hela ka ji me re bibêj bê çavê çi dîtibû?” Got: “Ezbenî roja ku ew bayê xurt bi ser me de hatî me rê şaş kiribû. Dûvre gava ku me du rojan navber da meşê û em ji nûve bi rê ketin dîsa me berê xwe dabû hêleke din û em winda bûbûn û ji wê rojê ve heta niha em bi hêleke şaş ve diçin. Û tu bayê ku me bi şûn de vegeerîne ser riya me jî tuneye, sibê jî em ê bigihên hinda çiyayekî ku jê re dibêjin Çiyayê Magnatîs, lewra ku kevirên wîna tev ji magnatîs in, reş in û ji ber ku Xwedê Teala razeke xwe xistiye wan keviran de dê keştiyên me tev ber bi wî çiyayî ve here, ewê bizmarên keştiyên me tev ji cihê xwe derkevin û herin bi wî çiyayî ve bizeliqin. Keştî jî dê li bin guhê çiyê kevin û em ê tev têk biçin evdê bende ruh ji me xelas nabe, nafiye!”

Dûvre jî xatûna min, kaptan dest bi girî kir û li çogên xwe xist. Me jî êdî bawer kir ku felata kesî ji me tune. Rabû me xatir ji hev xwest û li hev helal kir. Çawa ku bû sibeh, me dît ewî çiyayî bi xezeb em ber bi xwe ve kişandin. Piştî hemû bizmarên keştiya me û çî tiştên hesinî ku tê de hebûn ji cihên xwe derketin û ber bi kevirên magnatîs ve çûn. Keştî jî tev belawela bûn û em jî li derdorê zîvirîn, zîz bûn. Heta êvarê textikek li ser textikekî nema. Keştiyên me tev xera bûn. Em tevde jî weke noka ku tu li kevirxê, ji hev belav bûn. Hinek fetîsîn, hinekan xwe bi perçeyên textikan ve girtin û xelas bûn. Lê kesî bi kesî nizanîbû, lewra pêlên avê pir xurt bû û her yek ji me bi hêlekê de biribû. Ez jî xatûna min, Xwedê li min hate rahmê û ez ji wê belayê rizgar kirim. Ba li min dabû, pêlan ez tevli textên ku min xwe pê

girtibû avêtibûn qiraxekê ji qiraxên çiyê. Min xaçerêkek dit, hemû pêlik bûn mîna nêrdevanê, ez pê ve hilkişyam heta serê çiyê.

*Li Şhrezadê bû sibe û wê ji dawî li gotina xwe anî.*

ŞEVA ŞANZDEHEMÎN

*Şhrezad got:*

Qiralê min î bextewar! Vêca tête gotin ku ew sakûleyê sisiyan ji wê xatûnê re got:

Ez bi wî çiyayî ve hilperikîm û min xwe kire dextê Xwedê û pêxemberan da kû qewetê bide min. Her ku min destê xwe davêt kevirêkî, min du-ayek dikir, heta ku Xwedê li min hate rehmê û ew firtoneya bayê sekinand. Ez jî bi saxî û silametî derketim serê çiyê. Ez xelas bûbûm û êdî ji kêfan ez dikirim bifirim. Qubeyek li wir xuya dikir, ez çûm min xwe avête bin û du rikêt nimêj ji Xwedê re kirin û spasiyên xwe jê re pêşkêş kirin û min serê xwe li wê derê danî ez hebekî raketim. Di wê navberê de dengê hate min, ji min re digot: “Ey kurê başan! Gava ku tu ji xew rabe axa bin lingên xwe bikole, tu dê kevanekî bibîne ji baxir û sê tîrên ji zîv ku neqşên tilsimî li ser wan heye. Rahêje wî tîr û kevanî û wî zilamê ber qubeyê bikuje da ku xelk tev ji belayê wî rizgar bibin. Gava te tîr avête siwêr dê têkeve avê de û kevanê te jî dê pê re bikeve. Lê tu rahêje wî kevanî û dîsa di cihê wî de veşêre. Heger te wilo kir, dê ava behrê rabe hatanî ku bigihêje radeya çiyê. Piştî wê keş-tiyek jê derkeve, zilamek jî tê de. Tu jî bêyî ku besmela xwe bîne pê re her. Ew zilam dê deh rojan te di behrê de bibe heta ku te bigihîne derya selamete û te bi xelasê bigihîne, ji wir jî dê hinek te bigihînin bajarê te. Evana tev dê bibin heke tu bi navê Xwedê neaxive û besmelaya xwe neyne.”

Ez ji xew şiyar bûm û çawa ku wî dengî di xew de ji min re gotibû, min binya lingên xwe kola, tîr û kevan derxistin û ez çûm min ew zilam jî kuşt. Çawa ku kevan ji destê min kete erdê, min rahiştê ew bir cihê berê, li wir veşart. Ava deryayê rabû heta giha radeya lûtakaya çiyê. Çend kêlik neçûn, keştiyek derket raber min, mirovekî ji baxir jî tê de. Sînga mirov ji zîv bû, gelek simbol û tilsim jî li ser xuya dikirin. Ez ketim keştiyê de bêyî ku ez biaxivim. Zilam jî ez birim û bi behrê de meşiya. Piştî deh rojan ji meşeke dirêj em gihan deryaya selamete ku gelek girav tê de bûn.

Ez bi rizgariya xwe pir kêfxweş û şanaz bûm û ji kêfan min spasiya xwe ji Xwedê re anî ziman, besmeleyek xwend û tekbîrek da. Gava min navê Xwedê anî ziman û tekbîr hilda, kelekê di cî de ez avêtim nav avê. Lê şensê min hebû ku min avjenî dizanî. Wê rojê heta êvarê min avjenî kir.

Destê min betilîn, milên min ji hevdû ketin û piyên min hişk bûn ji wê sobaniya bênavber. Êdî heviya min bi xelasiyê nemabû. Min eşheda xwe anî, lewra mirina min nêzik bibû. Carekê ji nişka ve pêleke wek dîwarekî hat li bin guhê min ket, ez pengizandim bi ser bejayê de. Ev tevde çawa bibû ez ji nizamim, lê çawa min xwe li ser rûyê erdê dît ez dîsa şanaz bûm bi xelasiya xwe û min şikir ji Xwedayê xwe re kir. Ku bû sibeh min kincên xwe guvaştin, zuha kirin û dîsa li xwe kirin; min li derdora xwe nerî û ez meşiyam heta ez giham serê timikekî bilind. Min çavên xwe li derdora xwe gerand, min bala xwe daye ku ez li ser giraveke biçûk im û derdora min tev av û behr e. Di wê navberê de min dît ku keştiyeke tiji mirov di wir re derbas dibe. Ez hilkişiyam ser darekê û bi bêdengî min ew temaşe kir. Keştiyê berê xwe da giravê û qiraxeke xwe da ber bejahiyê. Piştire deh heb ebîd jê peya bûn, bi giravê de meşiyam heta ku gihan nîve giravê. Li wir erd kolan heta ku gihan deriyekî. Derî vekirin piştire vegehiyan gemiyê, ard û nan û rûn, hunguv û bez û hemû tiştên ku ji bo jiyana mirovan lazim hildan ser milê xwe û anîn, birin hundur wê binerdkê. Ew deh ebîd bi seatan ew bar li ser piştê xwe kirin û di neqeba keşti û binerdkê de çûn û hatin. Di dawiyê de ji çûn keştiyê bi qeflan kinc û ebe û cilên bi ziv û zêr neqîşandî li ser milên xwe kirin û berê xwe dan deriyê wê binerdkê. Şêxekî kal î rihisipî û hejhijî jî di nav wan de bû; çawa ku çavên min li wî pîremêrî ket, gotina helbestvanekî hat bîra min ku dibêje:

Feleka bêbext çawa mirov dihejîne!  
 Çiqas temen direj evqasî diêşîne  
 Wexta ku li ser xwe bim ez kêma aqil bûm  
 Gava ku ez bûm xwedî hiş jî ji ser xwe çûm

Ê ku bi destê wî pîremêrî girtibû jî xortekî nûgihayî û şepal bû, bejin dirêj û lihevhatî bû. Bi wan ebîdan re meşiya heta ku hatin ser devê binerdkê, piştire xwe pê de berdand xwarê û yeka yeka ji ber çavên min wenda bûn. Wê gavê ez ji ser darê daketim xwarê û min berê xwe da wê deverê. Ez hatim ser û min ew ax ji ser da alî heta ku ez giham wî deriyê binerdkê. Min derî hilda vekir, nêrdevanekî kevirî ku dadiket derket holê. Ez bi nêrdevanê ve daketim heta binî, min dît ku cihekî pir paqij û fireh. Her der bax û bistan bûn. Ez yek bi yek li wan geryam, min ew hijmartin tam sîh û neh bistan derketin. Di her bistanî de hertişt hebû ji fêkî û av û çem û dar û beran.

Li kêlekê deriyek hebû, min ew vekir, min dît ku mihîneke kihêl tede ye. Zînek nûh û xurcikin bi gulik li ser piştê û rişmeyeke rengîn di serî de. Min bi hefsarê wî girt, ew ji tewlê derxist û ez lê siwar bûm. Mihînê ez bi hewa xistim û ez anîm li ser banekî danîm û bi teriya xwe li ser çavên min da, çavek kwîr kir û çû. Ez ji ser ban daketim xwarê min dît ku deh xortên delal li wir in. Hemû jî bi çavekî bûn çawa ku ez dîtîm, gotin: “Tu ne bi xêr

û ne bi ahla hatî!” Min ji wan re got: “Gelo hûn qebûl dikin ku ez bi we re rûnêm?” Gotin: “Wele em qebûl nakin.” Ez xemgîn û dilşikestî ji cem wana derketim derve û min di ber xwe de digot:

Xêrên veşirtî çiqas pir in li ba Xweda  
Çiqasî bi raz bin jî watedar in li ba zana  
Gelek tişt êşan tînin bi serê sibehê re  
Bi êvarkî re jî şahiyê tînin ji mirov re  
Herdem li dûv hev tîn şahî û êş  
Geh ew e geh jî ya dinê li pêş

Xwedê ji min rê çêkir ku qedara min ez gihadim heta Bexdê. Min riha xwe kur kir û ez bûme sakûleyek, ketim sikakan heta ku li van herdu sakûlan rast hatim. Min silav li wan kir û got: “Ez biyanê vir im.” Wan got: “Em jî biyan in.” Vêca çîroka min û kurkirina riha min û kwîrbûna çavekî min ev e xatûna min.

Ciwankê jê re got: “Destê xwe di ser serê xwe re bib û bîn û rabe bi riya xwe de here.” Sakûle jî got: “Weleh ez naçim heta ku ez serpêhatiya vanên din jî guhdar nekim.”

Ciwanik li Xelîfe û Cafer û Mesrûr vegeriya û ji wan re got: “Ka hûn çîroka xwe ji min re bêjin!” Cafer çend gavan bi pêş de hat û çîroka xwe û xelîfê xwe ji serî heta binî jê re rêz kir, got. Gava ku ciwanikê çîroka wan bihîst, ji wan re got: “Herin hûn azad in! Ez we tevan didim xatirê hev.”

Hemûçkan dan dû hev û di derî re derketin. Li sikakê Xelîfe ji sakûleyan re got: “Gelo hûn bi ku ve diçin?” Gotin: “Em nizanin bê em ê bi ku ve biçin.” Xelîfe ji wan re got: “Wê çaxê ka werin li cem me rakevin.” Dûvre Xelîfe li Cafer vegeriya û jê re got: “Wan bi xwe re bibe û sibê were dîwana min da ku em li ser çaraseriyekê bifikirin.” Cafer gotina Xelîfe pêkanî û çû.

Xelîfe jî çû qesra xwe lê wê şevê xew bi çavan neket. Qelaqa nava wî xew lê herimandibû. Sibehê çû meclîsa xwe rûnişt, mezin û karmendê dewletê hatin huzûrê. Piştî Cafer jî hat. Xelîfe dîwana xwe vala kir û ji Cafer re got: “Here wan hersî ciwanikan û herdu kûçikan û wan her sê sakûleyan bine vir!” Cafer çû ew anîn. Destpêke ciwanik derbasî cem Xelîfe kirin. Xelîfe ji wan re got: “We em nas nekirin û we qencî bi me kir. Lê eva ez we hersîyan nas dikim û ez we efû dikim. Niha jî bizanibin ku hûn di huzûra xelîfeyê Abasiyan ê pêncan Harûn Reşît de ne!” Ciwanka mezin ji herdu xwişkan bi pêş de hat û got: “Ey emîr û serkêşê bawermendan, serpêhatiyekê min heye, heger bi serê derziyan li ser reşîka çavan bête nivîsandin, dê bibe îbreteke mezin ji her kesî re.”



*Li Şehrezadê bû sibeh û wê ji navber da gotina xwe.*

ŞEVA HIVDEHEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Şahê min î şanaz û bextewar, tête gotin ku, gava ew keça mezin ji herdu xuşkan bi pêş de hat ji Xelîfe re got:

### **(Çîroka Keçika Ciwan ya Yekemîn)**

Emîrê bawermendan, dîvê tu bizanibî ku ev herdu xuşkên min ji bavê ne ne ji dê ne. Ez ji dêkê, ew ji diyeke din in. Gawa ku bavê me mir, ji me re pênc hezar dînar li dûv xwe hişt. Ez ji biçûka xuşkên xwe bûm. Herdu xuşkên min zewicîn û her yek bi zilamê xwe re çû û ez bi tenê hiştim. Herdu mêrên xuşkên min bi hev re şîrîkatî kirin û ji xwe re ticaretxaneyek vekirin. Her yekî ji wan hezar dînar ji jinên xwe stendin û dest bi tîcariyê kirin, çar-pênc salan me hevdû nedît, li welatên dûr kirin û firotin dikirin. Lê herduwan malên xwe wenda kirin, îflas kirin û jinên xwe jî li welatên biyan hiştin û çûn ji ber çavan wenda bûn. Xuşkên min jî piştî demekê mîna du parsekan li min vegehiyan. Gava ez çav li wan ketim, ez şaş û metal bûm, bi zor û heft belan min ew nas kirin. Min got: “Ev çiye, ev çi halê ku hûn têde ne?” Gotin: “Wele xuşkê, tu çi ji me re bibejî heqqê te heye lê em çi bikin ku qedera me ew bû. Qey Xwedê wilo dixwest û wilo bi sere me hat.” Min herdu şandin hemamê, seren wan da şuştin, her yekê cil û bergin nûh li wan kir û ew birin malê. Min ji wan re got: “Xwuşkino hûn herduyên mezin in, ez biçûka we me. Eva behra min î pera jî di kar de ye, Xwedê bereketa xwe xistêyê têra me tevan dike. Hûn jî bi min re bixun û vexun, xwe li mala xwe bihesibînin.”

Heta ku ji min hat min baş li wan nerî û ez li wan xwedî derketim. Salekê li ba min man, pereyên wan jî çêbûn lê dîsa jî sebra wana nema hat. Ji min re gotin: “Xuşkê wele bê zewac sebra me nema tê li vir, em ê ji vir herin û ji xwe re bizewicin.” Min ji wan re got: “Hûn tu xêrê ji zewacê nabînin, ji xwe mêrê baş nemane vê heyamê, we bi xwe jî ceribandîye.” Lêbelê guh nedan min û bêyî rîza min ji xwe re zewicîn. Dîsa jî destê min li wan negeriya ku ez wan bi tene bihêlim. Ez rabûm bi destê xwe min dawetên wan li dar xistin û bi malê xwe min ew xemilandin û bi rê xistin. Bi mêrên xwe re çûn demekê bi hev re man, piştî mêrên wana ew xapandin, pereyên wan ji wan stendin, dev ji wan berdan û çûn.

Rabu dîsa herdu kolipoşman li min vegehiyan, serên wan di ber wan de, tazî û birçî bûn. Gotin: “Çiqasî bi temenê xwe tu biçûka me be jî, ya

biaqil di me de tu yî, divê tu li me û vê bêaqiliya me negirî û tu me bihewinî cem xwe. Em soz didine te ku ji niha û pê de em careke din nema behsa zewacê bikin.” Min ew himbêz kirin û min got: “Hûn ser herdu çavên min re hatin, ma qey ji we pê ve kî ezizê ber dilê min e.”

Bi wî hawî nêzikî salekê li cem min man. Rojekê min xwest ku ez malê xwe bi keştiyekê bibim Besra. Min nivê malê xwe hişt û nivê mayî tev da bi cil û bergan, bi qumaş û herîran û min hemû li keştiyeke mezin kir. Piştî min ji herdu xuşkên xwe re got: “Va ez derdikevim bi keştiya xwe ber bi Besra ve, hûn dixwazin bi min re werin, an jî hûn dixwazin li mal bimînin.” Gotin: “Na welle xuşkê, em ê bi te re bîn seferê, sebra me bêyî te nayê.” Rabû min ew jî bi xwe re birin û ez ketim rê de.

Rêwîtiya me pir direj bû û di wê navberê de keştiya me riya xwe şaş kir, kete deryayeke nenas de. Heta demeke direj jî me nizanibû ku me rê şaş kiriye. Ba jî baş dihat, em xweş bi rê ve dibirin. Piştî deh rojan em meşiyân, bajarekî ji dûr ve xuya kir. Me ji kaptanê xwe pirsî, ewî jî got: “Ez vî bajarî nasnakim.” Lê madem ku em bi saxî û selametî gihane vir, ka hûn jî li vir peya bibin, bêhna xwe berdîn, tedarikên xwe bikin û ku we rê dît malê xwe jî bifroşin.” Piştî derket, çû nêzi seetekê ji ber çavan wenda bû û dîsa bi şûn de vegeriya û ji min re got: “De ka rabin derbasî vî bajarî bibin û bi çavên sere xwe bibinin bê xezeba Xwedê çi bi sere mirov dike!” Bi lez em tevde rabûn ser xwe û çûne bajar ku em çî bibînin! Xwedê Teala her tiştê di bajar de mesex kiribû, hemû mirovên wê bibûn kevirên reş û di cihê xwe de hişk mabûn. Em tevde şaş û metal mabûn himber vê dîmenê. Em di nav sûka bajêr re meşiyân, me bala xwe daye ku her tiştê wan jî di cihê xwe de maye. Qûmaşên rengareng, herîr û berên giranbuha, zîv û zêrên daliqandî, her tişt di cihê xwe de bû. Kêfa me hat û her yekî ji me bi hêleke sûkê de çû, zîv û zêr û mal kom kirin.

Ê min ez derketim hinda keleha bajêr. Kelehek pir asê bû. Qesra mîr di nava kelehê de bû. Ez derbas bûm hundurê qesrê ku ez çî bibînim! Kevçiyên zêrîn, sênik û miqilkên ji zîv, dîwarên neqîşandî, perdeyên herîr û her tiştên giranbuhayî ku peyde nabin. Mîr jî li ser textê xwe rûniştibû. Wezirên wî, xîzmetçî û navmalîyên wî jî li dorê bûn û hemû di nav wan cil û bergên xwe de tev bûbûn kevirên reş. Zêr û zîvê bi kincên mîr ve ji her hêlê ve diçûrûsand. Dur û heqîqên bi textê wî ve jî şewq didan, ronî bela dikirin li derdorê mîna steyrikan. Li derdora mîr jî wezirên wî hebûn. Hemû di nav cil û bergên bi zîv û zêr neqîşandî de bûn. Tevan şûrên xwe ji kalanên wan kişandibûn, hildabûn jor û wisa di cihê xwe de hişk bûbûn, bûbûn kevir. Dîmeneke pir ecêb bû. Min berê xwe da hêla heremê, devera mana jin û carîyan, min dît ku her der bi herîr û qeseb û zîv û zêr xemilandîye. Şahbanû jî di nav zêr

û zîv û duran de bû. Taceke ji cewheran li serê wê, beniyên enqûd û heqîqan di stûwê wê de. Û bi wî halê xwe mesex bûye, bûye kevir. Di kêleka wê odeyê de deriyekî vekirî hebû, ez tê re derbas bûm, min dît ku mêrdewanek heftpêlik tê de heye. Ez pê ve hilkişiyam heta derketim cihekî ji mermer ku her deverê wê bi merş û berên zêrneqîş hatibû raxistin. Nivîneke ku nûr jê dibariya jî di nêvî de li ser textekî mermerî bû. Min bere xwe dayê ez çûme cem, min dît ku dureke ronak bi qasî hêkeke qazan li mindereke biçûk e. Dêrdora wê jî rêzek ji mûm û findan pêketibû. Ez tê derbas bûm min dît ku li hela din jî ode hene. Bi wî halê xweyî matmayî ez ketim wan ode û rewaqan de yeko yeko ez li wan geriyam, mîna ku ez di xewneke efsûnî de bim min xwe jibîr kir. Gava ku li min bû êvar, min hewl da ku ez bi şûn de vegerim, lê ez nema bi ser rê vebûm. Ez dîsa vegeriyam hêla mûm û findên pêketî û ez ketim nav nivînê û min lihêf kişande ser xwe.

Dûvre min bêhnêkê Qur'an xwend. Piştî min hewl da ku ez rakevim lê xewa min nehat. Ez diqeliqîm viyalî û wiyalî, min nema zanîbû ez ê çi bikim. Nivê şevê dengê xwendina Qur'anê hate min. Min li wê hêla ku deng lê dihat nerî, min dît ku derîye mabedekê vekirîye. Ez rabûm çûm hundur, min dît ku mizgefteke raxistî ye. Mûm û findên bi dîwaran ve pêketî bûn, xortekî lihevhatî jî li ser sicadeyekê rûniştî bû, Qur'an dixwend. Ez pir şaşwaz û matmayî mam! Çawa gelê vî bajarî tevde mesex bibûn û ev xort tenê zindî mabû! Min silav lê kir, wî jî serê xwe rakir û silava min vegerand. Min jê re got: "Ku ez pîrsekê ji te bikim gelo tu dê bikaribî bersiveke rast bide min?" Di ber xwe de beşîşî û got: "Heger tu sedema hatina xwe ji min re bibêje, ez soz didim te ku ez ê jî bersiva te bidim." Rabû min çîroka xwe ji serî heta binî je re got. Şaşwaz bû. Piştî min pîrsa bajêr je kir, got: "Ew serpêhatiyeye dîvdîrej e, bêhna xwe fireh bike, ez ê ji te re bejim." Qurana ser çogên xwe girt, xist qalikê wê û ez li kêleka xwe dame runiştandin. Min bala xwe dayê ku rûwê wî mîna heyvê ye, çawa ku ozan gotiye:

Stêrikzan dîsa çavdêrê şevê ye  
 Lê stêra îşev her xortek li pê ye  
 Temberî reşbelek, bînh a miskê ye  
 Sorbûna hinarkan her ji Merîx e  
 Şewqa li dor rû her ji Merkûr e  
 Kevan ew mijankan wek tîrediz e  
 Kadiz jî ji şewqa dêm ronîdiz e  
 Stêrikzan bixwe matmayî û heyirî ye  
 Lew erdramûsgerê ber min bedir e

Mîna ku Xwedê Teala kincên cemala xwe bixwe lê kiribin, gotinên ozanekî din ew piştrast dikir, gava ku digot:

Sond û qesem bi nav û danê wî

Bi navê başî, qencî û şînasê wî  
 Ne misk misk e bêyî bîhna wî  
 Ne ember bihn e bêyî bayê wî  
 Ne rok rok e bêyî şewqa wî  
 Ne jî pêñûs binûs e bêyî tiliya wî

Çawa ku min nerînek lê kir, agir bi dil û hinavê min ket. Rabû min jê re got: “De ka bêje mîrzayê min, bersîva min bide!” Wî wextî got: “Divê tu zanîbi ku ev bajar yê bavê min bû, ew zilamê ku gava din te ew di wî halê kevirî de li ser erşê rûniştî dîtî. Ew keybanûya ku te dît jî, diya min bû. Dê û bavê min tevli qewmê xwe, hemû atesperest bûn. Bi agir û ronahîyê, bi sî û sîtavê her sond dixwarin. Bavê min jî kurdûnde bû, heta dawiyê gava yextiyar bû Xwedê ez damê. Di nav xêr û bêrê de ez mezin kirim, bi kêf û şahî. Pîreke baş û yextiyar hebû, di gotinê de ji dînê wan bû, lê di nava xwe de musulmaneke xwedî bawerî bû, ku qîniyata wê bi Xwedê û pêxemberê wî dihat. Ji ber başî û rastîya wê, bavê min pir pê bibawer bû. Loma gava ez piçekî mezin bûm, ez dame wê û jê re got ‘Wîna bibe cem xwe. Hem terbiya ola me pê bide hînkirin, hem jî xizmeta wî bike û lê miqatebe heta ku mezin bibe.’ Pîrê jî ez birim cem xwe û ez hîni ola Îslamê kirim. Ez hîni nimêj û rojîyê, hedîs û Qur’anê kirim û ji min re got ‘Kurê min vî tiştî ji bavê xwe veşêre da ku bavê te te nekuje.’ Piştî wê bi çend rojan pîrik mir. Gelê wê derê jî hîn bêhtir bi kufrê de çûn û ji rê derketin. Ew tev di wî halî de, rojekê dengik ji ezmanan hat mîna birq û birûskê, ji wan re digot ‘Ey xelkê vî bajarî, dev ji agir berdîn û werin ser riya heqiyê!’ Dest û lingê bajarîyan tev li hev geryan, şaş û metal man û jihev re gotin ‘Ew çi deng e û dengê kê ye wisa em tirsandin?’ Bavê min jî ji wan re got ‘Ne bitirsin ne jî li wîna guhdar bikin. Li xwe miqatebin û ola xwe bernedin.’ Dilê wan bi ser gotina bavê min de çû, li ser ola xwe man û agirperestiya xwe berdeham kirin, heta ku sala wana qediya û muhleta ku xwediyê wî dengî dabû wana bi dawî bû. Wê çaxê careke din ew deng bihîstin. Piştî saleke din cara sisiyan jî heman deng bihîstin, lê ewan guh nedanê û li ser ya xwe man. Roja piştî wê, bi şefeqê re meqta xwe bi ser wan de barand ji azmanan. Ew û zar û zêçên xwe, tev li ajal û majalên xwe hemû bûne kevir û di cihê xwe de xişk bûn. Ji min pê ve kes ji bajêr ne filitî. Hemû mesex bûn, bûn kevir. Ji wê rojê ve ez jî di vî halî de me. Tenê Qur’anê dixwînim, nimêja xwe dikim û rojîya xwe digirim. Û ji ber ku kes li cem min tune, ez ji tenêtiyê pir aciz bûme.” Rabû min jê re got: “Xorto, madem tu ewqasî aciz bûye, ka ez te bi xwe re bibim Bexdê. Li wir gelek alim û zaniyar hene, tê li ber destên wan gelek tiştan hîn bibe, ez ê jî ji te re navmalî û xizmetkar bim, tevli ku ez jî xwedî mal û mulk im, xwedî keştî û xulamim, keybanûyeke bi nav û dengim. Qederê keştîya me bi vir de anî û bû sebeb ku em rastî hev bîn û hevdu nas bikin.” Piştê min ew dawetkariya xwe jê re dúbare kir heta ku qebûl kir bi min re bê Bexdê.

*Şev li Şehrezadê ber bi dawî ve çû, ewê jî dîsa gotina xwe birî û kete bêdengiyê de...*

## ŞEVA HIJDEHEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min î bextewar, min bihîst ku gava wî xortê delal daxwaz û daweta keçxatûnê qebûl kir û pê de, xewa keçxatûnê tê û hema wisa li wir, li ber nigên wî xortî radikeve. Keçxatûnê dibê:

Ez bi kêf ketim xewê û çaxê kû sibehê ez ji xew rabûm, ez û wî tevde em çûn, ketin embaran de û çî tiştê sivik û bûha hebû di nava wan xezînan de me hilgirt û me xwe ji kelehê bera nava bajêr da. Li wir em rastî kapitanê xwe û xizmetkaran hatin ku ew bi xwe jî li me digeriyan wê kelîke. Çawa ku çavên wan li min ketin, dilşa bûn û ji min pirsîn bê ez bi ku ve çûbûm û li ku mabûm heta wê kêlikê. Min ji wan re hem çîroka xorte bi xwe re, hem jî çîroka bajêr ji serî heta binî vegot û sebaba derenghatina xwe ji wan re rave kir. Hemû tev şaş û metal man. Herdu xuşken min jî çawa ku xorte lihevhatî bi min re dîtin, zikreşî avêtin min, kîn û buxz ji min girtin û ketin dûv fen û fûtan de.

Em li keştîya xwe siwar bûn û man li benda bayê. Ez pir dilxweş û şa bûm. Bi taybetî jî bi hebûna wî xortê delal yê li kêleka min. Gava ba rabû em jî ketin rê de, herdu xuşkên min dest bi axaftinê kirin û ji min re gotin: “Xuşkêcan tê çî bikî ji vî xortê delal?” Min gote wan: “Wile armanca min ew e ku ez û wî bibin jin û mêrê hev.” Piştî ez li wî jî zîvirim û min je re got: “Mîrzayê min, ez ê tiştêkî ji te re dîyar bikim lê ez naxwazim ku tu min bişkîni.” Got: “Ser serê min, ser çavê min.” Rabû ez li herdu xuşken xwe vegeriya û min ji wan re got: “Ê min ev xortê hanê besî min e, hema bila ev malê min jî tevde ji we re be!” Gotin: “Tiştê herî baş ew e.” Razibûna xwe diyar kirin lê zikreşîya dilê xwe neavêtin.

Bayê me li gora dilê me dihat, di çend rojekî de me xwe bi saxî û selametî gihand deryaya xêrê û ewlehiyê, çend rojekî din jî me xwe gihand bajarê Besrayê. Çawa ku avahîyê bajêr ji me ve xuya kirin li me bû êvar û reşahî kete erdê. Gava ku em ketin xew de, herdu xuşkên min rahiştin min û wî xortê delal, em herdu tevli nivînê avêtin behrê. Xortê delal ji ber ku nizanibû avjenîyê, di avê de fetisî şehît ket. Ê min jî Xwedê ji min re çêkir, ez li textekî rast hatim, min xwe pê ve girt heta ku pêlên deryayê ez avêtim qiraxa giravekê, ji wir jî min meşa xwe berdawam kir heta ku li min bû sibe. Sibehê ez li xaçirêkekê qelibîm ku şopek li ser xuyadikir. Min da dû wê şopê heta ez gîham bejayê. Dîsa li min bû sibeh, min kincê xwe zuha kir û ez dîsa

li ser heman rêçê meşiyam heta ku min xwe nêzî bajêr kir. Li wê derê min bala xwe dayê ku marek li dû min tê û zîhayekî mezin jî daye dû, dixwaze mar buxwe. Dilê min bi wî marê betilî şewitî, min êrişî ser zîha kir û ji nav lepê wîna xelas kir.

Ez katjimêrekê li wir raketim; piştê ez şiyar bûm, min bala xwe dayê ku cariyek li ber lingên min rûniştiye, lingên min mist dide, difirkîne. Ez li ber xwe ketim, min jê fedî kir. Ez rabûm ser xwe û min jê pirsî: “Tu kî yî û çi karê te li vir heye?” Got: “Te çizû ez jibîr kirim, tu bû a ku te dujminê min kuşt û te ez jê xelas kirim. Ez bi xwe keçikeke cinî me û ew zîhayê hanê jî mirovekî cinî bû û dijminê min bû. Ne tu ba kesekî nikaribû ez ji nav lepê wîna xelas kiribama. Ez jî rabûm çûm, min ew keştiya ku herdu xwişkên te tu jê avêtibûn behrê, min hemû malên tê de ji wir bir mala te û keştî jî li wir binav kir. Min herdu xwişkên te jî efsûn kirin û kirin du kûçikên reşik û li wir danî, ji ber ku min dizanibû bê çi bi serê te kirin û ew xortên delal çawa fetisandin.”

Piştê wê mara han rahişte min û ez birim li ser banê xaniyê min danîm. Min bala xwe dayê ku her tiştên min î di keştiyê de, di nava mala min de daniye. Tu tişt jê kêm jî tune. Piştê marê ji min re got: “Tu bi heqê wê nexşa li ser mohra Silêman dikî, tê rojê sêsed kamçî li wan herdu dêlikan bixî. Heger tu nekî, min çi bi serê wan de aniye, ez ê wilo bi serê te de jî binim.” Min jî jê re got: “Ser seran, ser çavan.” Vêca ji wê rojê ve heta niha ez hem li wan didim, hem jî dilê min bi wan dişewite padîşahê min!

Xelîfe li wê gotina han ma ecêbmayî. Piştê li keçxatûna din zivîrî û jê re got: “Ê te çi derdê te heye, çima şopa lêxistinê li ser laşê te xûya dike?” Keçxatûnê got:

### (Çîroka Keçika Ciwan ya Duyemîn)

Ezbenî bavekî min î zengîn hebû mir û gelek mal li dû xwe hişt, piştî mirina bavê xwe bi demeke kurt ez bi zilamekî re zewicim ku dilşadê zemanê xwe dihate hesêb. Em nêzî salekê bi hev re man, dûvre çû ser dîlovanîya xwe, mir û ji min re heştê hezar dînar li dûv xwe hişt. Vêca rojekê ez rûniştibûm min dît pîrejineke madedayî, diran şikestî û stûxwar derbasî cem min bû. Dirûvê wê çawa ku şairekî gotiye:

Pîrejineke bê oxir ku îblîs li gel xwe dianî  
Bi bêdengî ew hînkara kesêd sax û kesê fanî  
Hezar hespî diçêrîne dilîzîne bi konevanî  
Çawa ku tev girêdabin bi tora pola û pîranî

Ew pîrejin hate cem min, got: “Keça min î sêwî heye, ez îro daweta wê dikim. Vêca min xwe avêtiye bextê te ji bo ku tu jî were dawata û tu xatirê wê keça reben neşikîne.” Bi ser vê gotina xwe de giriya jî û xwe avêt dest û lingên min ji bo ku ez nebê na. Wê gavê rehm ket dilê min, rabû min jê re got: “Bila be ez ê werim.” Ew jî kêfxweş bû, got: “Xwe amade bike, ez ê di wextê ‘êşa de werim te bibim.”

Ez jî rabûm, min xwe amade kir, piştî mixrûb min dît ku pîrê hat. Got: “Keçxatûna min, min xebera hatina te da zar û zêç û jinan, hemû pir kêfxweş bûn bi wê xeberê û niha jî tev li bendî te ne.” Ez rabûm min gazî cariyên xwe kir û em tevde ketin rê de. Em hatin sikakekê, surra bayekî xweş li me da. Piştî wê rewaqek fireh û li dûv wê jî deriyekî mezinî ji mermêr derket miqabil me. Di ser derî re qubeyeke pir xweşik hatibû avakirin. Sitûnin xemilandî bi neqşan qube hilgirtibû ser piştî xwe. Piştî deriyekî hîn biçûktir derket himberî me. Li piştî wî jî hewşeke mezin ku qesrek di nava wê de avakirî bû. Qesrek ji axê û bi ewran ve girêdayî bû. Em çawa gihan devê deriyê qesrê, pîrê li derî da. Derî vebû em derbas bûn. Me bala xwe dayê ku dehlîzeke bi beran raxistiye. Li herdu hêlan û di seranserê dehlîzê de mûm û fenerên pêxistî rêzkerî bûn. Li her derê jî tiştên ji gewher û madenên giranbuha li ber çavan diketin. Li hêwanekê serê dehlîzik dîtir vedibû. Hêwan pir xweş hatibû raxistin. Di zikê hêwanê de jî textekî ji mermêr hebû ku bi gewheran xemilandibû. Sitareyek ji etles jî li dorê girêdayî bû. Ji nişkê ve keçek ji bin wê sitareyê derket, mîna heyveke li çardan bû, ji min re got: “Tu bi xêr hatî, ser seran û ser çavan hatî xuşka min î ezîz. Ez pir xweşhal im bi hatina te!” Pêre jî helbestek xwend û got:

Dê pir dilşad ba ku malê bizaniya zair kî ye  
Mizgînî vegirta bi kêfan ramûsa şopa pî ye  
Sedhezar caran tu bi xêr hatî li ser çavan

Dûvre rûnişt, gote min: “Xwişkê, wile birayekî min heye, ji min bedewtir e. Di dawetekê de tu dîtiye û ji dil û can ji te hezkiriye. Gelek pere dan vê pîra han ji bo te bîne vir, ji bo ku te bibîne, bi xapandinê tu anî heta vir, lê ew pir ji te hez dike û dixwaze li ser suneta Xwedê û pêxemberê wî bi te re bizewice. Ez wer texmîn dikim ku tiştê helal be, fedî û eyb jî tede tune ye.” Gava min ew gotin bihîstin û min lê nerî ku desteser bûme, di wir de min got: “Bila be, ser seran ser çavan.” Keçik pir kêfxweş û şa bû, li çepikan da, derî vebû xortekî lihevhatî û sipehî mîna tava heyvê derbasî hundur bû. Pir şepal bû, çawa şaîr gotiye:

Xwedê wî pîrozke çî xortekî delal  
Supkan ji xaliqê wî re yê zulcelal  
Şepalî tenê, tenê ji bo wî daye  
Herkes li cemala wî matmayî maye

Ji nava rûçikan husnê bi xwe xwe der daye  
Sondê dixwim îro ji bo we bi Xweda ye  
Husnek hebe li dinya me eva ye

Min çawa lê nerî, dilê min bijiyayê. Hat li cem min rûnişt, qadî û çar heb şahid jî pêre bûn. Hemûçkan silav li min kirin, mehra me birîn û rabûn, derketin çûn. Xorto berê xwe da min û got: “Xatûna min, ev şeva me dê şeveke pîroz be lê şertekî min heye.” Min got: “Mîrzayê min şertê te çiyê?” Rabû ser xwe, çû Qur’anek anî, danî ber min û got: “Ka bi vê mishefê sond bixwe û bêje bi Xwedê ji te pê ve kesî nakim û ji te pê ve dilê min bi ser kesî ve naçe!” Bi wî hawê ku wî gotibû min sond xwar. Kêfa wî pir hat, şad û bextewar bû, ez himbêz kirim, ramûsam. Min jî bersiva evîna wî bi evînê da û ew di dilê xwe de girt.

Piştî, ji me re xwarin û vexwarin anîn, me têra xwe xwar û vexwar. Şev bihurî, ez birim ser nivînê. Em ketin himbêza hev û raketin heta sibê. Bi wî halî û di wê kêf û xweşiyê de me mehek derbas kir. Piştî mehekê min destûr jê xwest ji bo ku ez herim sûkê hinek qumaş bikirim. Îzin da min ji bo çûnê. Min kincên xwe li xwe kirin û ew pîrejin da kêleka xwe û ez çûm sûkê. Li cem dikana tacirekî ciwanî ku pîrê nas dikir ez rûniştim. Pîrê ew bi min da naskirin û got: “Ev ciwan kurekî biçûk bû gava bavê wî mir û malekî pir li dûv xwe jê re hişt.” Piştî ji wî ciwanî re got: “Ka ji malê xwe qumaşê herî baş ji vê ciwanikê re bîne.” Kurik got: “Ser seran, ser çavan û çû.” Pîrê jî bê rawestan pesnê wî dida. Malê ku me xwestibû ji me re anî. Me pereyê wîna danê. Lê wîna qebûl nekir û got: “Bila ev ji bo we diyariya min be îro.” Pîrê got: “Ku pereyan negire, qumaşê wî bi şûn de bidê.” Lê kurik sond xwar, got: “Ez tişteki nagirim. Lê madem tu rû li ser min datîni, bila hemû malê min bi maçekê be. Xwedê jî dizane ku maçek tenê li ba min, ji hemû malê di dikana min de bi nirxtir e.” Pîrê jê re got: “Ka wê ramûsanek çî fêdê bide te?” Li min jî vegeriya û got: “Keça min te jî bihîst bê ev xort çî dibêje. Ma qey wê çî ji te kêmbibe ku tu ramûsanakê bidêyî û evqase ji xwe re bibî, peran jî bavêji bêrika xwe!” Min got: “Pîrê ma qey tu nizanî ku ez bi mêmî, jineke bi mehr im?” Pîrê got: “Bê deng be, bila te maç bike û tu jî van perayan ji xwe re bibe!” Pîrê berdewam kir heta ku xiste serê min de û bi min da qebûlkirin. Ez jî bi vê yekê razî bûm, min destmala xwe da ber çavên xwe û berê xwe guhert da ku kes nebîne. Ewî jî devê xwe danî ser hinarkê ruwê, lê şûna ku ramûse gezeke xurt li rûçkê min da, goştê wî rakir. Êşeke dijwar her derê min dagir kir û ez ji ser hişê xwe çûm. Çaxê ku ez bi ser xwe ve hatim, min dît ku dikan girtiye, pîre ez girtime himbêza xwe û li ser min digirî û dibêje: “Xwedê hivza mirov ji bobelatin mestir bike.” Gava ku dît ez bi ser hişê xwe ve hatime, got: “Ka rabe keça min em herin malê. Tu jî xwe li nexweşiyê deyne, ez ê derman ji te re bînim da ku tu zû rehet bibe.”



Piştî katjimarekê ez ji cihê xwe rabûm, tev li xem û fikarên kûr. Tirsike nepenî ez dorpêç kiribûm, hişê min ji serê min biribû. Ez giham malê, min xwe li nexweşiyê danî. Mêrê min derbasî ba min bû, got: “Çi bi te hatiye xatûna min, tu saxlem ji mal derketibû!” Min got: “Tiştêk tune, ez başim.” Li min nerî û got: “Lê ev birîna li ser hinarkê rûyê te çiyê?” Min got: “Îro gava ku em çûn sûkê, deveyek barkirî ez tengav kirim di cihekî teng de, êzingek ji yên ser piştê wî boxçika min çirand, yekî ev birin di rûyê min de vekir, çawa ku tu dibînî.” Got: “Nexwe ez ê sibe herim cem walî giliyê wan bikim, bila hemû êzingvanên bajêr bi dar veke.” Ez tirsiyam, min got: “Tu bi Xwedêki gunehê kesî neke stûyê xwe, ya rastî di çûnê de ez li kerekî siwar bûm, tê werbûm darîkek di rûçkê min de rabû, birin tê vekir û wilo li serê min hat.” Got: “Ez ê sibê biçim cem Caferê Bermekî, çîrokê jê re bêjim, bila hemû kerên di vî bajarî de bikuje.” Min jê re got: “Ma qey tê li ser rûyê min herkesî bikujî? Tevdi qede û belak ji ba Xwedê bû û gunehê tu kesî tê de tunebû.” Ewî jî got: “Bêyî vêna çare tune.” Bi ser min de hat, bêhna wî teng bû; dûvre qîreke mezin kir, derî vebû, heft heb koleyên reş derbasî hundur bûn. Ez ji nav nivîna min kişkişandim û avêtim nava malê. Ji koleyekî ji wan re got: “Serê wê bigire.” Bi serê min girt. Ê din jî çawa ku jê re hatibû gotin, hat li ser çoga min rûnişt û bi lingê min girt. Yê sisiyan jî şûr di dest de, li ser serê min bû. Ji mêrê min re got: “Ezbenî ez vêna di nêvî de bikim dudo, bila her yek ji me parçeyekî bibe bavêje behrê da ku masî wê bixun.” Mêrê min jî li ser tamam kir û got: “Ji xwe cezayê bêbextan ji ev e.” Piştê jî ev çarîn ji helbestekê got:

Heger hevparekî min hebe di mala evîne  
 Li xwe heram dikim ez ewî dilê evîne  
 Heger hebe hevparekî min li gel wê yarê  
 Ji nefsê re bimre dibêjim ez bi qerarê  
 Lew tu xêr nîne di evîneke rikeber de

Piştê jî kolê xwe Sad re got: “Wê bikuje!” Sad şûrê xwe ji kalanê wî derxist û ji min re got: “Ev kêlika dawî ji heyata te ye. De êdî eşheda xwe bin û daxwaza xweyî dawî bîne ziman.” Min jê re got: “Bêhna xwe fireh bik ey ebdê xêrê. Rê bide min ji bo ku ez wesiyeta xwe bêjim.” Dûvre min serê xwe rakir û li wî halê xweyî perîşaniyê nerî, rojên xweşî û şahiyê hatin bîra min, ez kelogirî bûm û bi hestiyarî min ev rist gotin:

Mijankên min di xwîne de birîndar in  
 Çavên te jî di xewê de her bi naz in  
 Dil û çavên min her ew in welatê te  
 Ne dil te ji bîr dike ne jî hêsir di seknê de  
 Li ser wefaê te bi min re peyman dabû  
 Lê mixabin peymana dil ji wî xera bû

Ne dilêş e ne dilovan bi dilê min qet naêşe  
Ji bîr meke qeder heye lew dê carek ji te bêş e  
Heger bimrim îro bo te ez rîcakarim  
Li ser kêlam binivîs bêj ev ‘Evîndarek’  
Belkî carek rastbê li min hebîb canek  
Êşezan be tikan bike li ser tirbam duak rêk

Piştî ku min ev risteyên xwe qedandin ez dîsa giriyam. Ewî jî çawa ku helbesta min bihîst û li giriyê min nerî, hîn bêhtir qeherî û ev çarîna han got:

Ne ji bêhtengî min berdabû delala dil  
Ewê berda bi gunehkarî dilêm ji dil  
Ewê dixwest pê re hebe hevparê min  
Lê şîrîkan nabijêre qet dilê min

Gava ku ev riste xwendin, ez bi ser de giriyam û min xwe avêt bextê wî. Di wê kêlikê de ew pîrejin jî derbasî hundir bû û xwe avêt ber lingê mêrê min, ew maçî kirin û jê re got: “Kurê min tu bi heqe Xwedê ke vê ciwanikê efû bike. Ji xwe tu gunehkî ku cezayekî wisa heq bike nekiriye. Tu jî xortekî nûhatî ye, ez ditirsim ku tu di ber gunehê wê keve, tiştêk bê serê te.”

Pîrê hem digiriya û hem jî ew daxwaza xwe dúbare dikir li ber guhên wî, heta ku got: “Bila be ez ê wêna efû bikim lê piştî ku ez şopekê li ser bedena wê bihêlim da ku her dem di bîra wê de be.” Ferman da koleyên xwe, kincên min di ser min re anîn, ez tazî kirim. Dûvre şivek xêzeran da dest û wî jî pê li min xist, piştî min reş û şîn kir heta ku ez ji ser hişê xwe çûm. Tu hêviya min di jiyane de nemabû. Emir da koleyên xwe, çawa ku tarî kete erdê û bû şev rahiştin min û pîrê jî dane pêşiya xwe, ez birim avêtim mala min î kevn. Min xwe derman kir heta ku ez ji nû ve bi ser xwe ve hatim. Lê parsûyên min mîna ku bi çakûçan hatibin kutan, dijeniyên û êş didane min. Rabû min nêzî çar mehan dermankirina xwe berdewam kir heta ku ez baş bûm.

Rojekê min meraq kir ez çûm wê sikaka ku mala mêrê minî berê lê. Min dît ku sikak ji serî heta binî xerabûye, mal û avahiyên tê de jî hemû herifine. Lê min sedema wê jî fême nekir. Piştî ez hatim cem vê xuşka xwe yî ji bavê, min dît ku herdu dêlik jî li ba ne. Min çîroka xwe ji serî heta binî jê re got û ew agahdar kir bi hemû bûyerên ku bi serê min de hatin. Wê jî got: “Mitalan meke xwişkê, ma kî ji me xelas bûye ji dek û dolabên vê feleka xayîn! Spasiya xwe ji Xwedayê xwe re bike ku tu bi saxî û selameti xelas bûye.” Piştî jî ewê çîroka xwe ji min re vegot û ew agahdar kirim bi wan bûyerên ku bi serê wê û herdu xuşkên wê de hatibûn. Vêca em li cem hev man û milên xwe da hev û me qet behsa zewacê nekir. Ev ciwanika xwişka me jî

bermaliya me ye, her sibeh diçû sûkê pêdiviyên me dianîn û dihate mal. Wê gavê jî mîna her car pêdiviyên me kirîbûn û li ser pişta hemalekî kiribûn anîbûn mal. Piştê jî çawa ku hûn emîrê bawermendan, hersiyên kor û hûn jî di teşbiha bazirganan de derbasî mala me bûn û bûn şahidê her tiştî. Îro jî ji nişkê ve me xwe di nav lepên we de dît sultanê min, çîroka me jî ev e.

Xelîfe li wê çîroka wan matmayî ma. Dê ew çîroka wana bikira îbretnameyê û di xizana xwe de bi cih bikira.

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA NOZDEHEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Xelîfê bawermendan ferman da ku ji bo ew çîrok bête nivîsandin û dûvre bixin xezîneya saltanatê. Piştê jî ciwanika ewil re got: “Gelo hayê te ji wê efrîta ku herdu xûşkên te efsûn kirin heye? Ciwanikê got: “Emîrê bawermendan, ewê biskek ji porê xwe dabû min û gotibû ‘Çi gava ku tu bixwazî min bibînî vê biska porê min bişewitîne bes e, di cî de ez ê li cem te bim...’” Xelîfe got: “Ka wê biska por bînin.” Por anîn, Xelîfe hinek jê şewitand. Bihna porê şewitî bela bû, qesir hejiya, olana dengekî hat û li dûv wê jî ew efrîta cinnî hat hizûrê. Cinniyeke Musulman bû, got: “Silava Xwedê li ser we be ey xelîfeyê resûlê Xwedê.” Xelîfe got: “Silav û rehmeta wî li ser te be jî.” Efrîta cinnî got: “Evê ciwanika han qencyek bi min kir û ez ji mirinê xelas kirim, dujminê min jî kuşt. Min jî zanîbû bê herdu xwişkên wêna çî bi serê wê kirine. Min got, ez ê heyfa wê ji wan hilînim. Rabû min efsûna xwe li wan gerand û herdu kirin du dêlik. Ya rastî min dixwest wan bikujim, lê ez tirsiyam ku ew pir pê biêşe. Vêca heger tu bixwazî emîrê min, ji bo xatirê te û wê, ez ê herduyan ji wî halî xelas bikim, lew ez jî Musulman im, dil bi rehmin.” Xelîfe got: “Ka wan herdu xwişkên wêna xelas bike ji wî halî, heger gotina vê ciwanikê rast derkeve ez ê ji heyfa wê ji wî zilamê mêrê wêyî berê hilînim. Çiqas qamâ li pişta wê dabin ez ê ji ewqasan lê bidim.” Keçîka cinnî jê re got: “Emîrê bawermendan, ez dikarim wî zilamê ku ev tade li vê ciwanikê kiriye û pereyên wêna xwarine ji te re bibêjim bê kî ye. Ew zalim mirovekî nêzîktirînê te ye.” Piştê rahişt taseke avê, li ser xwend û bi ser herdu dêlikan dakir û ji wan re got: “Vegerin ser cibiliyeta xweyî beşerî ya ewilî!” Bi wê banga wê ve –subhan ji Xwedê re- herdu jî di cî de vegeriyan ser awayê xweyî ewil, bûn du keçikên spehî. Ya cinnî gotina xwe berdewam kir û got: “Ey emîrê bawermendan, divê tu zanîbi ku ewê zilm li wê ciwanikê kir kurê te Emîn bû. Berê jî spehîbûna keçikê bihîstibû û tora xwe avêtibû ber.”

Piştire Efrît çîroka wê ciwanikê ji serî heta binî jê re got. Xelîfe şaş û metel ma, got: “Şukur ji Xwedê re ku xelasbûna van herdu dêlikan li ser destên min pêkhat.” Piştî gazî kurê xwe Emîn kir û çîroka wê ciwanikê jê pirsî, ewî ji her tişt bi rastî jê re got. Rabû Xelîfe Harûn Reşîd gazî qadî, şahid û her sê sakûleyan kir, ew ciwanik û herdu xwişkên wênî ku ji sihrê xelas bûbûn ji anîn hizûrê. Hersê sakûle zewicandin û ew kirin navmaliyên xwe, hemû pêdiviyên wana pêk anîn û di qesra xwe yî li Bexdê de bi cih kirin. Ew ciwanika han jî li kurê xwe Emîn vegerand, malekî pir dayê û ferman da ku ew qesra wanî hilweşiyaye ji nûv de were avakirin û ji berê xweştir bête raxistin. Xelîfe bi xwe jî bi keçîka din re zewicî û wê şevê pê re raket. Roja din, çawa ku bû sibeh, malek jê re veqetand û têra wêna carîye û navmalî dane ber xizmeta wê. Mehmizeke baş jê re texsîs kir û qesrek jî da avakirin.

*Dunyazadê ji xwişka xwe Şehrezad re got: “Ev çîrok pir xweş bû, çîrok weke wê xweş nîn in.”*

*Şehrezadê got: “Ev çîrok li ber vê ya ku ez niha bêjim ne tu tişt e! Heger Melîk iznê bide min tê bibînî!” Melîk got: “Ka wê çîroka xweyî din jî bêje, bilezîne!” Şehrezadê dîsa berdewam kir û got:*

### (ÇÎROKA KEÇA KUŞTÎ)

Ey melîkê deman û welatan, tê gotin ku Xelîfe Harûn Reşîd di şevêkê ji şevan de Cafer anî hizûra xwe û jê re got: “Ez dixwazim em îşev dakevin bajêr.” Cafer jî dibêje: “Ser seran ser çavan.” Harûn Reşîd tevî Cafer û Mesrûr dikevin rê de û berê xwe didin bajêr. Çaxê ku li nav bajêr digerin, di sikakek teng de şêxekî pîr dibînin ku torek li ser serê wî ye û darek di destê wî de ye, hêdî hêdî dimeşe û ji xwe re dibêje:

Dibêjin min, tu çira ye bi ilmê xwe  
 Li şeva tarî tu fenerî bi ilmê xwe  
 Şaş e min got, ev nerîn û helwesta we  
 Zanîn bi xwe bê qewet ew ne zanîn e  
 Heger bigrin rojekê min li gel ilmî  
 Rehîn bigrin min tev zanîn û wî ilmî  
 Di ber kel û pela rokê m êsîr bigirin  
 Dê neyê bîra wan ew ilm û ne ew zanîn  
 Hal û demê xizana ew her wisa ye  
 Keder û êş û azar û kul û xem e  
 Li havînê ew bê qût û nan û av e  
 Li zivistanê bê sitar û cil û berg e  
 Çi gava ku bi lez diçe seh li dû ne

Sertewandî her ew jar û perîşan e  
 Ku gazinkar be rojekê ew ji derdê xwe  
 Bawer nake tu kes ji wî û gazinda wî  
 Ne lêborîn ne jî gazinc lê nayên rehmê  
 Heger ev be halê xizan û feqîran  
 Çêtir e ji wan re ew jiyana binê tirban

Wê gavê Xelîfe Harûn Reşîd ber pê ve çû û jê pirsî: “Ey şêxê delal, karê te çîye?” Ewî jî got: “Ezbenî ez neçîrvan im. Ji sibehê heta niha digirim, lê min tiştê bi dest nexistiye. Zar û zêçên min jî li benda min in ku ez tiştê jî wan re bibim. Ez jî weha bêçare me. Ez xweziya xwe bi mirinê jî tînim, lê xelasiya min ji vî halî tune.” Xelîfe jê re got: “Gelo tê bikaribî niha dîsa bi me re vegere ber ava Dicleyê û tora xwe careke din bavêje avê li ser bextê min? Çi bi tora te ve were jî, ez ê bi sed dînarî ji te bikirim.” Yextiyar bi vê gotinê kêfxweş bû, got: “Ser serê min, ez ê bi we re bêm.” Bi hev re vegeyriyan qiraxa avê, şêxê nêçîrvan tora xwe avêt û bi bêhnfirehî xwe li bende ragirt. Piştê tora xwe kişand, sindoqa devgirtî û kevnare pê re hat. Xelîfe destê xwe dayê, dît ku sindoq giran e. Sed dînarê şêxê nêçîrvan dayê, ew bi rê kir, ji Cafer û Mesrûr re got “Rahêjin sindoqê.” û hersêyan bi hev re berê xwe dan malê, vegeyriyan qesrê. Mûm û çira vexistin, sindoq jî danîn ber Xelîfe. Cafer û Mesrûr hatin sindoq şikandin. Têrekî bi nexekî sor dirûtî tê de derket. Ew dirûn verşandin, bereke pêçayî jî jê derket. Li nava berê nerîn, tûreke bi bişkokekê tê de hebû. Bişkokekê tûr vekirin, bala xwe danê ku keçeke kuştî tê de ye. Dest û lingên wê jî jêkirî bûn. Çawa ku Xelîfe çav li meytê wê ket, hêsir ji çavan bariyan. Li Cafer zivîrî û jê re got: “Kûçikê wezîran, çawa di desthilatdariya min de hinek mirovan dikujin û wan tavêjin behrê û gunehê wan di stûwê min de dimîne! Bi navê Xwedê divê ez tola vê keçikê hilînim û kujerên wêna bikujim.” Hinekî bêhna xwe berda û dîsa li Cafer zivîrî û berdewam kir: “Ez sond dixwim bi serê hemû xelîfeyên Abasiyan, heger tu kujerê vê keçikê negire û neyne ber destê min, ez ê te bi devê deriyê qesra xwe ve daliqînim, tu û çil heb kurapên te.” Xelîfe pir hêrs bûbû. Cafer got: “Sê rojan muhletê bide min.” Xelîfe got: “Min da te.”

Cafer ji cem Xelîfe derket, xwe bera bajêr da, pir xemgîn û dilbiş bû. Diponijî û ji xwe re digot: “Ez ê çawa bizanibim bê kê ev keçik kuştîye û ez ê çawa wî bibim ber destê Xelîfe? Heger ez yekî din li şûna wî kujerî bibim ber destê wî, wê çaxê dê gunehê wî di stûwê min keve. Êdî ez ê çawa bikim, çilo bikim?”

Cafer bi wê bêçaretiya xwe sê rojan li mala xwe rûnişt, roja çaran Xelîfe qasidek şand ba wî û ew xwest huzûrê. Çaxê ku Cafer çû, Xelîfe jê pirsî û got: “Ka kujerê keçikê?” Cafer got: “Ya emîrê bawermendan, ma qey ez bi xeybê dizanim heta ku ez kujer nas bikim?” Xelîfe hêrs bû û emir da ji bo

ku wî daliqînin bi devê deriyê qesrê ve. Delêlî erkdar kirin da ku li sikak û kolanên Bexdê yeko yeko bigere û bibêje ‘Kesê ku dixwaze were darvekirina wezîrê Xelîfe Cafer El-Bermekî û kurapên wî temaşe bike bila bê qesrê.’ Di wê navberê de Xelîfe emir dabû, xizmetkaran jî sêdar dabûn avakirin, Cafer û kurapên wî jî anîbûn li ber sêdaran dabûn rawestandî û li bendî fermana daliqandinê mabûn. Xelk jî hino hino dihatin wê derê û li ser wana didane girî. Di wê kêlikê de xortekî lihevhatî bi lez ji nava xelkê derket û ber bi wezîr ve hat. Cil û bergên paqij lêbûn, li ber Cafer rawestiya û jê re got: “Derbasbûyî be wezîrê min, emîrê emîran, şikeft û baregeha feqîran; yê ku ew keçik kuştiye ez im wezîrê min. Kujerê keça di wê sindoqê de ez im, min bi dar vekin, tola wê ji min hilînin.” Çaxê Cafer ev gotin jê bihîstin, kêfxweş bû bi xelasiya xwe, lê xemgîn bû ji bo wî xortî bi xwe. Hîna ew wilo diaxivîn, bala xwe danê ku yextiyarek xelkê ji riya xwe dide alî û bi lez ber bi wan ve tê. Gava giha cem wan, silav li herduyan kir, wan jî silava wî vegerandin, rabû got: “Wezîrê delal, ji vî xortî bawer neke, yê ku keçik kuştiye ez im ne ew e, heyfa wê ji min hilînin ne ji wî.” Xort got: “Wezîrê min, ev zîlam yextiyarekî xurufî ye, nizane bê çî dibêje, kujer ez im, heyfê ji min hilînin.” Mirovê pîremêr got: “Kurê min tu hîna ciwan î, dilê te dibije jiyane, ez jî yextiyar im, dilê min jê têr bûye. Ez dixwazim ku ez bibim fedayê te û wezîr herduwan û kurapên wî jî. Jixwe yê ku keçik kuştiye ez im. Vêca wezîrê min, tu bi Xwedêkî zû cezayê min bide min û min bi dar veke!”

Cafer şaş û metal ma himber vê rewşê. Xort û pîremêr herdu dane dûv xwe û derkete cem Xelîfe. Hate meqamê wî û jê re got: “Ey emîrê bawermendan, eva kujerê wê keçikê bi xwe hat. Xelîfe got: “Ka?” Cafer got: “Ev xort dibêje min kuştiye, lê ev pîremêr jî wî derewîn derdixe û dibêje na wille min kuştiye.” Xelîfe li herduyan nihêrî û got: “Kê ji we ev keçik kuştiye?” Yê xort got: “Min kuştiye.” Pîremêr jî got: “Kujer ez bi xwe me ne tu kesî din.” Xelîfe ji Cafer re got: “Herduyan bi dar veke.” Cafer jî got: “Heger kujer yek be, dê yê din bê guneh be û dê kuştina wî heram be.” Yê xort got: “Bi navê wî Xwedayê ku ev ezmanên hişîn rakirine û ev erd rast kiriye, ez kujerê vê keçikê me. Heger hûn dixwazin ez dikarim vê yekê ji we re bi cîh bikim û bikim ku hûn yeqîn bikin.” Piştî mesele ji Xelîfe re got, Xelîfe jî jê yeqîn kir û fêhm kir ku kujer ev xort bi xwe ye. Ecêbmayî ma û ji xort re got: “Te çima bi neheqî ev keçik kuşt û çima tu li xwe mukur hat ji ber xwe ve bêyî ku kes li te xe. Tew tu dibêji heyfa wê ji min hilînin?”

Yê xort got:

Emîrê bawermendan, ev keça han hem jina min bû, hem jî dotmama min. Ev pîremêrê han jî bavê wê ye, apê min e. Em bi hev re zewicîn û sê zarokên me çêbûn; hersê jî kur bûn. Ji min pir hez dikir û weke çavên xwe

li min dinerî, xizmeta min dikir. Carekê tenê ji min kêmaniyên wê nedîtin. Di serê mehê de bi nexweşiyek giran ket, min bijîşk anîn ser, ew derman kir heta ku ew bi ser xwe ve hat. Min xwest ez wê bibim serşokê ser û laşê wê bişom, wê paqij bikim, ji min re got: “Dilê min dibije tiştêkî, heger berî serşuştinê te ji min re bianiya wê baş ba.” Min got: “Çiye ew tişt?” Got: “Dilê min diçe sêvekê.” Di cî de ez daketim bajêr û li sêvan geriyam, yek bi dînarêkî ba jî min ê bistenda, lê peyde nebûn. Ez wê şevê li wir mam û bi xwe de ponijîm. Sibehê ez ber bi bostanan ve çûm û yeko yeko li wan geriyam, lê li wir jî min nedît. Bostanvanekî pîremêr li min rast hat, min jê pirsî, got: “Kurê min ev fêkî li van deran peyde nabe, tenê di nav bax û bostanên emîrê bawermendan de peyde dibe, ew jî li hêla Besrayê ne, yê ku bi navê emîr lê dinihêre jî Xûlî ye.

Ez hatim min ji jina xwe re got, amadekariya rêwîtiya panzdeh rojan kir û ez ketim ser rê de, min berê xwe da Besra. Ji cem Xûlî min sê sêv bi sê dînanan kirîn û ez vegeriyam malê, min danî ber jina xwe, lê qet pê kêfxweş nebû û ew dane kêlekekê. Nexweşiya wê ji lê har bûbû, laşê wê sincirîbû, roj bi roj diheliya, bedena wê lawaz dibû. Çend rojekî wisa dewam kir, piştê bi ser xwe ve hat û ji wê nexweşiya xwe xelas bû. Ez jî çûm dikana xwe, min karê xwe berdewam kir. Nava rojê gava ku ez li dikanê rûniştibûm ebdekî reş derbas bû cem min, sêvek jî di destê wî de bû, pê dilîst. Min jê re got: “Te ew sêv ji ku aniye gelo, belkî ez jî yekê ji xwe re bistînim?” Keniya û got: “Min ew ji yara xwe standiye. Demeke dirêj ez bi ser neketibûm, çaxê ku ez çûm, min dît ku pir bêhal e û sê sêv li balê ne. Got ‘Ew mirdarê mêrê min ji bo vana çû heta bi Besrayê û bi sê dînanan ew kirîn.’ Min jî ji xwe re rahişt sêvekê ji wan.” Vêca Emîrê Bawermendan, gava ku min ev gotin ji devê wî ebdî bihîst, dinya li ber çavên min reş bû. Min dikana xwe girt û ez hatim malê. Hişê min jî ji serê min çû ji qehran. Min çavên xwe li wan deran gerand, min sêva sisyan nedît. Min jê re got: “Ka sêva sisyan?” Got: “Ez nizanim li ku ye û bi ku ve çûye.” Bi vîna ez serwext bûm ku gotina wî ebdî rastbû. Min rahişt kêrekê û ez ketim ser dilê wê de. Min ew serjêkir, kuşt, piştê dest û lingên wê jî jêkir û laşê wê xist tûr de. Dûvre min merşek lê pêça û ew xist nava sindoqekê, deriyê wê kilît kir û ew avêt çemê Dicle bi destê xwe. Vêca ez dexilê te me emîrê bawermendan, tê serê min jêbikî û heyfa wê bêgunehê ji min hilîni, lew ez pir ditirsim ji wî hesabê roja qiyametê!

Îca piştî ku min laşê wê avêt Dîcleyê û kesî nedît, ez bi şûn de vegeriyam malê, min dît ku kurê min î mezin digirî. Hayê wî jê tunebû bê min çi bi serê diya wî kiriye, min jê re got: “Kurê min te xêr e, çima tu digirî?” Got: “Min sêvek ji diya xwe standibû û ez çûbûm sikakê, min bi birayê xwe re dilîst, ji nişka ve ebdekî reş ew ji destê min revand û got: “Te ew ji ku aniye?” Min got: “Ev yek ji wan sê sêvên ku bavê min çûbû ew ji Besrayê

kirîbûn bi sê dînanan, ji bo diya min î nexweş. Ew jî him li min xist û him jî sêva min bir û çû. Ez jî tirsyam ku diya min bi min de bixeyide û li min bide.” Gava min ev bihîst, ez têgihijtim ku yê ebîd derew li dotmama min kiriye û min ew reben bi neheqî kuştiye. Agir bi nava min ket û hêsir ji çavên min bariyan.

Hîna ez wisa digiriyam, min dît ew pîremêrê apê min jî hat cem min. Min çîroka bûyerê ji serî heta binî jê re got, wî jî dest bi girî kir. Heta nivê sevê em bi ser hev de giriyam. Me pênc rojan şîna wê kişand û em man di nava xemgîniyeke mezin de heta roja îro. Vêca ez dîsa dibêjim emîrê bawermendan! Tu bi heqê bapîr û kalên xwe ke tê min bikujî û heyfa wê ji min hilînî.

Gava Xelîfe ev gotinên wî xortî bihîstin ma behetî. Piştîre got: “Bi navê Xwedê yê şêrîn, ji wî ebdî pê ve ez tu kesî nakujim.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe bi şekir birî.*

## ŞEVA BÎSTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Xelîfe Harûn Reşîd li Cafer zîvirî û jê re got: “Wî ebdê hanê, evê ku bûye sebaba vê bûyerê ji min re bîne, yana ez ê te di şûna wî de ceze bikim.” Cafer kelogirî bû, çû û ji xwe re got: “Ez ê çî xwelîyê li serê xwe bikim û çawa vî zilamî bi dest xim. Ez ê çawa bikaribim ku tiştêkî ilmê min tê de nîne bikim. Ma hêviya min Xwedê! Ê ku zilamê ewil radestî min kir dê yê duduyan jî radest bike. Qesem bi navê Xwedê ez tiştêkî nakim ez ê sê rojan di mala xwe de bimînim û ez naçim bi tu derê de, Xwedê çawa dixwaze wê wisa bibe.” Sê rojan di mal de ma, roja çaran gazî qadî kir, wesiyeta xwe lê kir, xatir ji zarokên xwe xwest û giriya. Di wê kêlikê de qasidê Xelîfe hate cem û ew agahdar kir ku Xelîfe pîr qeheriye û sûnd xwariye ku îro tu wî ebdî neyne ber destê wî, dê te bikuje. Gava ku Cafer ev gotin bihîst dest bi girî kir, zarokên wî jî pê re. Careke din yeko yeko xatir ji wan xwest, çaxê ku giha keça xweyî biçûk ew kişand himbêza xwe û maçî kir. Ji zarokên xwe teva herî bêhtir ji wê hez dikir. Piştîre keça xwe ji himbêza xwe danî erdê lê destê wî li bêrika wê ket û tiştêkî bala wî kişand, jê re got: “Ev çî ye keça min? Keçikê got: “Ev sêvek e babacan. Xizmetkarê me Reyhan ev ji min re anîbû û ev çar rojin ku di bêrika min de ye. Bi du dînanan dabû min.” Gava ku çîroka xizmetkar û sêvê bihîst hilmeke kûr kişand nava xwe, kêfa wî hat û ji xwe re got: “Hey ewê rêya xelasiyê ji mirov re vedike!” Ferman da ku wî xizmetkarî binin di demekê kurt de. Evdê xizmetkar anîn raber wî, jê re got: “Te ev sêv ji ku aniye?” Got: “Begê min berî bi pênc rojan dema ku ez



ji xwe re li kolanên bajêr digeryam, wê gavê zarokan ji ji xwe re dilîstin. Zarokêkî ji wan bala min kişand, sêvek di destê wî de bû. Min sêva wî ji dest girt, got 'Ev sêv ji bo diya min î nexweş e.' Lê belê min guh nedayê, min çend şeqam pê wekirin û ev sêv ji xwe re bir. Piştî min ew firot vê xatûna te bi du dînanan."

Gava Cafer ev çîrok bihist behetî ma ji rûdanê vê fitneyê û kuştina jinikê û koleyê wî. Emrê girtina ebdê xizmetkar da û kêfxweş bû bi xelasiya xwe. Piştî ev herdu malik ji helbestekê gotin:

Yekî ku şika wî bi ser koleyekî de be  
Dê nefsekê jî bike feda di ber de  
Eva gelek xizmetkarên te her hene  
Lê dilê te tenê herdem wê dixwaze

Piştî bi destê koleyê xizmetkar girt û ew bi xwe re bir cem Xelîfe. Dema Xelîfe li meselê guhdar kir, xwest ev çîrok bibe îbret û bête zanîn di nav gel de. Cafer jê re got: "Hey Emîrê Bawermendan! Tu li vê çîrokê li vê bûyerê evqasî mayî ecêbmayî, vêca ku te çîroka Wezîr Nûreddîn û birayê wî Şemseddîn bibihîsta, te yê çawa bikira?" Xelîfe got: "Tu bûyer wek vê erjeng û sosret tunene!" Cafer got: "Lê eva ku ez dibêjim, dê vêya bi te bide jibîrkin." Wî jî got: "Wê çaxê ka ji min re bibêje." Cafer got: "Ez ê wê ji te re vebêjim lê bi şertê ku tu vî ebdê min berde." Xelîfe got: "Hema va ez wî didim xatirê te û efû dikim, berdidim."

### (Çîroka Şemseddînê Wezîrê Misrê û Nûreddînê Wezîrê Besrayê)

Cafer got:

Emîrê bawermendan! Tête gotin ku li Misrê şahekî dadwer û diltenik hebû. Wezîrekî wîyî zana, xwedî azmûn hebû ku hem kal bû û hem jî bi kar û tevdir bû. Du kurên wî hebû, navê yê mezin Şemseddîn bû, yê biçûk jî Nûreddîn bû. Yê biçûk ji yê mezin bêhtir li hevhatî û xweşik bû ku bi vê xesleta xwe nav û deng dabû di nav welatan de. Loma gelek caran, tenê ji bo dîtina wî xelk ji dûr dihatin balê.

Dema bavê wan çû ser dilovaniya xwe, Şah pir pê êşiya û xemgîn bû. Xwest ku hezkirina xwe jê re di herdu zarokên wî de berdewam bike. Gazî wan kir û ji wan re got: "Hûn herdu jî di cihê bavê xwe de ne û hezkirina min ji we re bi qasî ya wî ye." Kêfa herduyan pir hat, xwe daqûl kirin û erd ramûsandin di nav lepên wî de.

Mehekê sax şîna bavê xwe kişandin, piştire derbas bûn saraya Şah û li şûna bavê xwe bûn wezîr. Bi dorê dikirin û her înekê yek ji wan dibû wezîr. Her ku Şah derdiket seferê jî, yek ji wan bi xwe re dibir.

Şevêkê Şah diyar kir ku dê sibehê derkeve seferê, wê gavê jî dora wezîriyê ya yê mezin bû. Wê şevê herdu ji xwe re li hev rûniştibûn, derd û kulê xwe vedigotin. Yê mezin ji yê biçûk re got: “Ez dixwazim ku em herdu di şevêkê de bizewicin.” Yê biçûk got: “Bila keko, tu çawa dixwazî wisa bike.” Herduyan li hev kirin li ser vê mijarê, yê mezin berdeyam kir û ji yê biçûk re got: “Ku Xwedê kir û em herdu bi hev re di heman şevê de zewicin û di heman şevê de em bi wan şa bûn û Xwedê wisa li hev anî û herdu jinên me jî bi hev re bihemil bûn û bi hev re welidîn; Xwedê lawik da te û keçik da min, wê çaxê ez ê keça xwe bi kurê te re bizewicinim, ji xwe kurap û keçapê hev in.” Nûreddîn got: “Keko, tê çiqas qelen ji min bistînî di ber keça xwe de?” Yê dîtir got: “Ez ê sê hezar dînar, sê bistan û sê gundan ji te bixwazim; bêyî van ne mumkun e ku em mehra wan bibirin.” Gava Nûreddîn ev gotin bihîstin, got: “Ev çi qelen e keko? Ma qey em ne bira ne û em herdu bi hev re wezîr in li vir di heman qesrê de. Ya rast ew e ku tu keça xwe weke diyarîyekê bide kurê min, bê qelen. Tu baş dizanî kur ji keçan bi rûmettir in û serê mirov bi wan bilind dibe ne bi keçan.” Şemseddîn got: “Çi bi keça min hatiye?” Yê din lê vegerand û got: “Mêraniya emîran bi zarokên nêr e ne bi keçan e. Tu jî weke ku tu ji xwe re li mahneyekê digere ji bo ku tu keça xwe nedî kurê min.” Şemseddîn jê re got: “Ez bala xwe didême ku tu kêmaniyê dikî gava ku tu lawê xwe di ser keça min re dibînî. Xwedê zane tu kêmaqilî û tu bêexlaqiyê dikî gava ku tu dibêjî em şîrikê hev î wezîriyê ne. Halbûkî tenê ji ber ku dilê min bi te dişewitî min tu anî vê derê cem xwe da ku tu hebekî alîkariya min bikî ne tiştêkî din. Lê tu çawa dixwazî wisa biaxive, madem ku ev gotin ji devê te derketin niha, de bi navê Xwedê, tu bi qasî giraniya wê zêr û gewheran bide min jî, ez nema keça xwe didim te.” Gava ku Nureddîn ev gotinên kekê xwe bihîstin, qeherî û got: “Ez jî keça te ji kurê xwe re naxwazim.” Şemseddîn got: “Ji xwe ez jî wî naxwazim ku bibe mêr ji keça min re. Û baş bizanibe ku ez niha ne li ser rêya seferê bama min zanîbû bê ez ê çi bînim serê te. Ka bise bila ez bi xêr û selamet ji seferê vegerim, piştire dê diyar be bê Xwedê çawa dike.” Nûreddîn pir tengav bû bi vê gotina birê xwe û xwe da alîkî, yê din jî piştî xwe dayê jê dûr ket.

Gava ku bû sibeh Şah ket ser riya seferê û berê xwe da giravê, wezîrê wî Şemseddîn jî li gel wî bû. Birê wî Nureddîn jî li mal mabû, ji qehra xwe dixwar, heta sibehê xew bi çavan neket. Gava ku roj derket û bû sibeh, çû xurcikek ji kulîna xwe derxist û tijî zêr kir. Di wê kêlikê de gotinên birayê wî yê şeva borî hatin bîra wî, keserek veda û di ber xwe de ev çend rist xwendin:

Bi rê keve lez bêxem û serbilind be herdem  
 Çi wendakî tu şûna wî heye tişteke herdem  
 Jiyana xweş ew e ku mirov serbilind be  
 Bi aqilmendan rûmet ne di post û textan de ye  
 Cih û warê xwe berde bimeşe û her bi tevger be  
 Tenê ji ava sekinî bêhn tê tu jî her bi ger be  
 Heyv jî dê nexweşik ba ku neçûba ava  
 Xwe ranedigirt tu kesî li benda vedana heyva  
 Şêr jî dûr nekeve ji daristanê qet nake neçîr  
 Tîr jî veneqete heger ji kevanî nabe ew mir  
 Eva ax jî bêqîmet avêtiye li nav axa  
 Dar jî wisa bêxwedî ye bê kes e li nav baxa  
 Heger tu bi rê ket îro dê ew be îzza metleb  
 Lê ku bimînî tu her tê wekî xwe bî bêleb

Piştîre gazî xizmetkaran kir da ku jê re hêstireke jêhatî û xurt amade bi-  
 kin. Zîneke zêrîn û xurcikeke rengîn avêt ser piştî hêstire û ew weke bûkekê  
 xemiland. Sicadeyek ji bo limêjê û merşekî hevrêşimî jî avête ser. Dûvre li  
 xulamên xwe vegeriya û ji wan re got: “Ez ê derkevîm derveyî bajêr û heta  
 bi Qeylûbiyê ez ê biçim, hebekî bêhna xwe derxim û ji xwe re li xwezayê  
 temaşe bikim. Dibe ku ez sê şevan li derveyî bajêr rakevim.” Piştîre li hêstira  
 xwe siwar bû, hinek zad jî bi xwe re bir û ji Misirê derket, berê xwe da beriyê  
 û meşiya heta ku lê bû nîvro. Nîvrokî xwe gihand bajarê Belbîsê, ji hêstira  
 xwe daket, hem wî bêhna xwe berda, hem heywana wî. Hinek nan jî xwar û  
 ji wir rahişt pêdiviyên xwe, li hêstira xwe siwar bû û dîsa berê xwe da beriyê.  
 Piştî du rojan ji meşek dûvdirêj, dîsa di wextê nîvro de xwe gihand bajarê  
 Qudsê. Ji hêstira xwe peya bû, bêhna xwe berda, nanê xwe xwar, piştîre mer-  
 şika xwe derxist, xurcîk jî xist bin serê xwe û ji xwe re pal da da ku rakeve  
 û wê qehra nava xwe jibîr bike. Sibehê ji xew rabû li hêstira xwe siwar bû û  
 dîsa ket ser rê de heta ku xwe gihand Helebê. Li wir peya bû, çû xanekê da  
 ku bêhna xwe vede, sê rojan lê ma, îstîrahet kir. Dûvre dîsa li hêstira xwe  
 siwar bû û rêwîtiya xwe berdewam kir, bêtî ku bizanibe bê bi ku ve diçe.

Bi şev gava ku xwe gihand bajarê Besrayê rawestiya, ji hêstirê peya bû,  
 çû xwe li xanekê girt, derbas bû hundur, merşika xwe raxist, xurcîka xwe  
 jî ji ser piştî wê danî û hêstira xwe teslîmî yê dergevan kir da ku li cem wî  
 bimîne. Gava ku dergevan hêstira wî da pêşiya xwe û ew bir, wezîrê Besrayê  
 jî wê kêlikê li ber şibakeya qesra xwe bû, li wan deran temaşe dikir. Dema  
 ku çavê wezîr li wê hêstirê û zîna wê ya zêrîn ket, got belkî hêstira wezîrekî  
 be an jî şahekî ji şahan. Lê ma behetî, gazî xulamên xwe kir û ji wan re  
 got: “Herin wî dergevanî binin vir.” Xulaman çû dergevan anîn cem wezîr.  
 Dergevan hat balê, erda ber lingên wî maçî kir. Wezîr jî mirovek kal bû, ji  
 dergevan re got: “Kî ye xwediyê vê hêstirê û dirûvên wî çawa ne?” Dergevan

got: “Mîrê min, xwediyê vê hêstirê zilamekî biçûk î xwînşêrîn e, kurekî taci-rane.” Gava ku wezîr ev gotin ji devê dergevan bihîstin, rabû ser xwe li hêstirê siwar bû û berê xwe da wê xanê, çû cem wî xortê ciwan. Gava Nûreddîn dît ku wezîr ber bi wî ve tê, rabû ser xwe û bi rêzdarî ew pêşwazî kir. Wezîr jî ji ser hêstirê daket, hat silavek germ dayê û li cem rûnişt. Piştre jê re got: “Kurê min tu ji ku tê û tu çi dixwazî?” Nûreddîn got: “Begê min, ez ji Misrê tîm ku bavê min li wir wezîr bû...” Dûvre wefata bavê xwe û çîroka xwe û birê xwe ji serî heta binî jê re vegot. Di dawî de jî got: “Wê gavê min ji xwe re sûnd xwar ku ez venegerim welatê xwe heta ku ez li deverên din tevan negerim.” Gava wezîr ev gotin jê bihîstin lê vegevand û got: “Kurê min, bi ya nefsa xwe neke û xwe navêje nava agir, welat hemû xerabûne û zeman jî xerabûye, ez ji bo te ditirsim.”

Dûvre wezîr emir da xulamane, xurcîk û merşîk û sicade avêtin ser hêstirê û ew jî bi xwe re birin û çûn mala xwe. Li goşeya herî baş di qesrê de jêre cihêk çêkir û weke nûra çavê xwe lê meyzand, mazûbaniya wî kir. Piştre jê re got: “Binêr kurê min, ez mirovekî kal û bêdûnde me, tenê keçek minî weke te sipehî heye ku min hemû xwazgîniyên wê bi şûn de vegevandin da ku ez wê nezewicînim. Hezkirina te ketiye dilê min û ez dixwazim ku tu vê keça min ji xwe re bike carîye da ku xizmeta te bike û tu jî mêrê wê be. Heger tu vê yekê qebûl bike ez ê ji padîşah re bibêjim ku tu kurê birê min î û te bidim naskirin da ku li şûna min te bike wezîr û ez jî êdî herim li mala xwe rûnim.” Çaxê ku Nûreddîn ev gotinên wezîr bihîstin, got: “Ser sera ser çavan, min qebûl e.” Wezîr bi vê bersiva wî kêfxweş bû, ferman da xulamên xwe ji bo ku xwarineke baş bidin amadekirin û odeya mêvanan jî ji mezinên êlan re, ji mîr û mîrekan re hazir bikin.

Dûvre wezîrê Besrayê xelk û merivên xwe, mezinên dewletê û tacirên bi nav û deng tevde kom kirin û ji wan re got: “Bîrayekî min li diyarê Misrê hebû ku du kurên wî hebûn û yê min jî weke hûn dizanin Xwedê keçek tenê dabû min. Ji ber ku birê min dixwest ez keça xwe bidim kurekî wî, min jî ew agahdar kir bi mezinbûna keça xwe, wî jî kurekî xwe şand vir, ew kurê wî jî ev xortê raber we ye, min pir jê hezkiriye û ez dixwazim wî bi keça xwe re bidim zewicandin û di mala xwe de bi cih bikim.” Tevan gotin: “kkarê herî baş ev e, bila ser xêrê be.” Piştre tevan şîrûb vexwarin û gulav bi xwe dakirin, kêfa xwe kirin, dûvre bela bûn, ji wir çûn. Wezîr jî ji xulamên xwe xwest ku Nûreddîn bibin hemamê; bedlek ji kincên xwe, peşgîr û desmal û tas û bixûr jî danê. Piştî ku ji hemamê derket û ew kincên xweşîk li xwe kirin, bû weke heyva li çardehan. Li ser hêstira xwe siwar bû û dîsa vege-riya qesrê hat balê, derbas bû cem destê wî ramûsand; wezîr jî bi kêfxweşî pêşwaziya wî kir.

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotîna xwe birî.*

ŞEVA BÎST Û YEKEMÎN

*Şehrezad axaftina xwe berdewam kir û got:*

Belê şahê min î ezîz, tê gotin ku wezîrê kal xweşhaliya zavayê xweyî nû Nûreddîn kiriye û jê re gotiye: “Hema îşev derbasî cem jina xwe bibe, dûra jî bi xêr û selamet ez ê te derxînim balî padişah, ku Xwedê bêje erê dê her tişt bi rêk û pêk be û li gorî dilê te bimeşe.” Piştî Nûreddîn jî rabû ser xwe, çû derbasî cem jina xwe bû.

Vêca em ji cem Nûreddîn vejerin cem kekê wî Şemseddîn da ku em bibînin ka çi bi serê wî hatiye. Jixwe Şemseddîn ji bi şahê xwe re derketibû seferê. Piştî sefer qediya û vejeriya malê, bala xwe dayê ku birayê wî nexuyaye. Lê pirsî, xizmetkarên wî jê re gotin: “Wille ji roja ku tu derketî seferê, ew jî li hêstirekê siwar bû û ji bajêr derket, got ‘ez ber bi Qeylûbiyê ve diçim, ez ê du-sê rojan li wan deran bimînin da ku hebekî bêhna xwe berdîm.’ Ji ber ku gotibû bila kes bi dûv min de neyê, em ji bi dû de neçûn. Ji roja çûna wî ve heta niha me tu agahî di derbarê wî de negirtine.” Bi vê agahiyê hişê Şemseddîn tevlîhev bû, xemgîniyek mezin nava wî dagirkir, ji xwe re got: “Xwedê dizane ku di wê roja seferê de min gotinên nexweş ji birê xwe re got, xweska min wisa nekiriba. Misoger bi wan gotinên min pir êşiyayî û bi bêhtengî ji mal derketiye, divê ez hinekan li dû wî bişînim, da ku lê bigerin.”

Şemseddîn ji mal derket çû hizûra Şah û ew ji wê rewşa birê xwe agahdar kir. Şah jî ji hemû waliyê xwe re nîşe şandin da ku li şopa wî bigerin û agahiyekê jê bidin. Lê Nûreddîn pir dûr çûbû û ji hukmê serweriya Şah derketibû. Lewma waliyên wî jî tu agahî di derheqê Nûreddîn de bi dest nexistin. Şemseddîn hîn bêhtir xemgîn bû û gunehbariya vê mijarê tevde girt ser xwe. Ji xwe re got ku “Misoger ew gotinên min î di derbarê zewaca zarokan de ew êşandine. Hemû tev ji bêaqiliya min bû, ji xwe em herdu jî hîna azib bûn, tu zarok jî li holê tunebû. Tevde ji bêtevdîriya min bû!”

Piştî demekê Şemseddîn keça tacîrêkî Misrî ji xwe re xwest û mehra xwe lê birî, bûn jin û mêrê hev. Xwedê Teala wisa ji wan re li hev anî ku ew û birê xwe Nûreddîn di heman şevê de zewicîbûn û di heman şevê de bi jinên xwe re raketibûn. Herdu jinên wan bi hev re bihemil bûbûn û bi hev re welidîbûn. Jina Şemseddîn keçek, ya Nûreddîn jî kurekî pir spehî anîbû. Çawa ku di ciwaniya xwe de soz bi hev re dabûn eynen wisa bûbû. Ku Xwedê ji yekî re çê dike nabêje tu kurê kê ye, vêca yê van herdu biran jî wisa bû.

Kurê ku ji Nûreddîn re çêbûbû, xweşiktirîn kurê zemanê xwe bû.

Lewma navê wî kirin Hesên. Di hefteya wî de bi dahol û zûrne û welîmeyan ew weke zarokên şaha sunet kirin. Di wê navberê de xezûrê wî yê wezîr, Nûreddîn bi xwe re derxist hizûra padişahê xwe. Nûreddîn bi rêz çû ba, erda li ber maçî kir. Nûreddînê ku xwedî bejn û bal û qelafetekî gir bû, bi wî zimanê xweş yê fesîh çend rist ji helbestvanekî jê re xwend û got:

Ev e yê ku navê wî bi dadê belav bûye  
Li seranserên cihanê serweriya wî reh berdane  
Spasî herdem ji kar û kiryarên wî re ye  
Ewên ku wek nîşana berz û xûyayî ne  
Li ser singên me weke gul û çiçeka ne  
Tiliyên wî di destên min de ne tilî ne  
Lê belê mifeyên rist û debarê û dadê ne

Li ser vê gotina Nûreddîn, Şah jî pir qîmetê wî girt û spasiyên xwe jê re anîn ziman. Piştî ji wezîrê xwe re got: “Ev xort kî ye?” Wezîr çîroka jiyana Nûreddîn jê re vegot û ji Şah xwest ku wî jî nola wezîrekî qebûl bike. Şah bi erênî nêzîkî vê pêşniyariya wezîrê xwe bû û tevgera Nûreddîn jî eciband; pir alîkarî pê re kir, mal û milk danê, cariyeyên wî pir kirin û hal û wextê wî baş kir. Heta ku Nûreddîn bû xwediyê keştiyên mezin û dest bi bazirganiyeke giran kir, qesr û qonaxên wî çêbûn, bax û bistan û aş û aşvan ketin destê wî û li temamê derdorê hate naskirin.

Gava kurê wî Hesên bû çar salî, xezûrê wî yê wezîr çû ser dilovaniya xwe. Ji bo cenazeyê wî merasîmek mezin li dar xist, piştî li kurê xwe Hesên vegehiya û bi hemû hêza xwe li ser terbiyekirina wî sekinî. Wextê ku çend salên din jî mezin bû û hebekî bîrwer bû, jê re feqiyek anî da ku di mal de perwerdeya wî bidê; feqî ew fêrî Qûranê kir û gelek zanînen din jî danê. Hesên jî her ku mezin dibû hîn bêhtir kamil û biaqil dibû, bejn û bala wî jî bi ser ya bavê wî de diçû.

Nûreddîn kurê xwe Hesên qet ji qesra wezaretê dervedixist. Feqî jî hemû dersên kurik di hundirê qesrê de didanê, heta rojekê ku bavê wî hat ew bi xwe re bir, bedlekî xweşik ji kincan lê kir, ew li hespekê qihêl siwar kir û bi xwe re derxist raberî Şah. Gava Şah çav li Hesên ket, pir pê bandor bû, jê hezkir û ji bavê wî re got: “Divê tu herroj wîna bi xwe re bîne vir.” Nûreddîn got “Bila be ezbenî” û rabû ligel kurê xwe vegehiya malê. Nûreddîn herroj kurê xwe Hesên bi xwe re derxist hizûra Şah heta ku temenê wî bû panzdeh sal. Wê gavê Nûreddîn nexweş û bêhal ket û têgihîşt ku mirina wî nêzîk bûye. Gazî Hesênê xwe kir û jê re got: “Binêre kurê min, dinya ji kesî re namîne û roj tê herkes dimre û diçe wê dinyayê. Ez dixwazim çend wesiyetan li te bikim berî ku ez bimrim. Ez hêvîdarim ku tu ji dil û can van wesiyetên min guhdar bike.”

Destpêkê jê re behsa hezkirina mirovan û tevgera bi tevdîr kir. Di wê kêlikê de birê wî Şemeseddîn, dost û mirovên wî hatin birê û bêrîkirina warê bav û kalan li dilê wî xist, hişt ku hêsir di çavan re bidine der. Li kurê xwe zivirî û axiftina xwe berdewam kir, got: “Li min guhdar ke kurê min, birayekî min heye navê wî Şemseddîn e. Apê teyî bi tenê û wezîrê Misrê ye. Bê izn û daxwaza wî ez ji mal derçûm û di vê xerîbiyê re derketim. Vêca ka kaxezekê têxe destê xwe û min çî ji te re got tomar bike, da ku ji bîra te neçe.” Hesen çû pê nûs û kaxez anî û dîsa li ber serê bavê xwe rûnişt, çî tiştê ku bavê wî got wî nivîsand. Derketina wî ji Misrê, hatina Besrayê, roja zewaca wî, roja ku Xwedê Hesen dayê, çîroka jiyana xwe ji serî heta binî pê da nivîsandin. Di dawiyê de jî, wesiyeta xwe da tomarkirin. Di wê wesiyetê de got:

Van pênc şîretê min jibîr neke kurê min, ya yekê mirovê ku tu nikaribe xwe ji şerê wî bisitirîne, pê re ned û nestîne. Helbestkarek heye dibêje:

Kesî li gora te nîne ku dost be ji te re  
Ne zemanê dostaniyê ye ev jê der e  
Hişdar bî heger tu, ev şîret bo te bes e

Ya duduyan; zulm û cewrê li kesî meke da felek jî zulmê li te neke. Baş bizanibe ku çerxa felekê jî geh li jor e, geh li jêr. Helbestvanekî navdar di vê mijarê de dibêje:

Bêhnfireh be ‘ecele meke her dilovan be  
Ji xelkê re alîkar be lew tu baş rêzan be  
Jibîr meke destê herî bilind ew yê Xwedê ye  
Û yê ku zalim e di rojekê din de dê mezlûm be

Ya sisêyan; bédeng be û her tim bi eyb û qusûrên xwe meşxûl be, ne bi qusûrên xelkê ve. Dibêjin; xelasî di bédengiyê de ye, çawa ku helbestkar jî dibêje:

Zînet e ew bédengî, bédengmayîn jî aşî  
Heger axivî tu bila hindik bin ew gofte  
Hebe heger poşmaniyeye te ji ber bédengiyê  
Bi hezaran e ew poşmaniyên ji ber axaftinê

Ya çaran; hişyar be himber meyê û jê dûr keve, ji ber ku serê her tevliheviyê ew e û ya ku hişê mirov dibe jî ew e. Min bihîst ku helbestkarekî navdar digot:

Berda min mey û meyser û vexwar  
Aqilmendim êdî mînak mêr hişiyar  
Ne bêhiş ne serxweş û ne meyxûr  
Hemû deriyên şer in ji xwe bigre dûr

Ya pêncan jî; bitriyan meke û malê xwe bêpîvan xerc neke da ku tu muhtacî nebaşan nebî. Min bihîst ku şairekî digot:

Heger kême be malê min ne dost hene ne hogir  
Zêdebe heger mal û hebûn herkes hem dost hem hogir  
Bê hijmar in ewên ku xwe li malê min digirtin  
Bê hijmar in ewên ku piştî xwe dan feqîriya min

Hîna ku Nûreddîn wesiyet û şîret li Hesênê xwe dikir û jê re digot “Li hesil û feslê xwe miqate be û heger Xwedê neke musîbetek bi serê te de hat xwe li apê xwe bigre û here Misrê, silavên min lê bike û bêje bavê min li xerîbiyê û bi hesreta we çû rehmetê” êşa wî lê giran bû, qolincên nava wî şidiyan û çend kêlî şûn de laşê wî bi yek carê re xav û sist bû, dilê wî jî sekinî û ruhê wî ji bedena wî bar kir, mir.

Hesen ew kaxezên ku nivîsibûn li hev pêçan xistin qolana xwe, di nav paçekî de pêça xist ber piştî xwe û dest bi girî kir, hêsir li ser bavê xwe rijandin. Şîna wî li dar xistin, Şah pir xemgîn bû bi wefata wî, ew û hemû erkanên dewletê li ser êşiyên û bi merasîmekê ew binax kirin, veşartin.

Hesen du mehan şîna bavê xwe kişand, ne li hespekî siwar bû, ne rojekê çû dîwanê û ne çû dîtina Şahê ku hinek dergevan şandibûn mala wî û wezîrekî nû jî li şûna bavê wî erkdar kiribû û ferman dabû ku dest deyne ser hemû mal û milkê ku ji bavê Hesên jê re maye. Wezîrê nû çend dergevan dan dîv xwe û berê xwe da mala Hesên, da wî bigrin û mal û milkê wî jî musadere bikin, piştî wî derxin raberî Şah da ku bête darizandin. Di nav wan serleşkeran de yekî nêzikî Nûreddîn hebû ku wijdanê wî ew neheqî qebûl nedikir, bi lez çû xwe gihand Hesên û mijar jê re vegot, ew ji fen û fûtên wezîrê nû agahdar kir. Hesên jî pirsî û got: “Gelo wext heye ku ez hinek malê xwe kom bikim û bi xwe re bibim ji bo ku ez muhtacî nemerdan nebim?” Serleşker jê re got: “Zû bilezine, incex tu bikaribî xwe xelas bikî.” Çawa Hesên ew gotin bihîstin, di cî de rabû ser xwe, destmalek avêt ser serê xwe û bi lez ji bajêr derket. Hîna ku bi rê de diçû, dengê xelkê diket guhê wî ji hev re digotin “Şah wezîrê xwe şandiye mala wezîrê berê Nûreddîn da ku dest deyne ser malê wî û kurê wî Hesên jî bigre, bikuje.” Piştî jî dibû niçeniça wan, dilêşiya xwe bi vê yekê tanîn ziman.

Gava ew gotin li ber guhên wî ketin, bi lez meşîya bêyî ku li dîv xwe binêre. Çawa diçû û bi ku ve diçû wî jî nizanibû. Lê qederê berê wî dabû ser tirba bavê wî, carekê ji nişkê ve dît ku hatiye ser gora bavê xwe. Di nav goristanê de li ber kêla bavê xwe rûnişt, destmal ji ser çavên xwe da alî û ji xwe re ponijî. Di vê navberê de Cuhûyekî ji Besrayê hat cem wî û jê re got: “Biraziyê min çi qewimiye gelo tu wisa bê halî?” Hesên gote wî: “Ez



raketîbûm, bavê min hate xewna min, lome ji min kirin û got ‘tu çima nayê serdana min?’ Ez jî ji xew cefilîm û şiyar bûm, berî ku roj here ava ez hatim vir, serdana wî.” Mirovê Cuhû jê re got: “Begê min, bavê te gelek keştiyên xwe şandine ticaretê û hîn venegeryane, ez dixwazim ji niha ve wan keştiyan tevî malên wan ji te bikirim. Serê yekê ez dikarim hezar dînarî bidime te.” Hîna Hesên bersiv nedabûyê yê Cuhû kîsekî zêran ji bêrika xwe derxist û hezar dînar jê re hijmart jî. Piştî axaftina xwe berdewam kir û ji Hesên re got: “Vêca di vê derbarê de kaxezekê jî tu binivîsînî û bide min dê baş be.” Hesên rahişt kaxezekê û wiha li ser nivîsand: “Nivîskarê vê kaxezê ez Hesên Nûreddîn, kurê wezîrê berê, ez beyan dikim ku vî Cuhûyî hezar dînar daye min di ber keştiyên ticaretê de, yên ku bavê min ew bi rê xistibûn.” Mirovê Cuhû rahişt wê kaxezê û çû.

Hesên jî dest bi girî kir, hewl da ku xwe bi bîranînên wan rojên şad û bextewar haş bike. Piştî şevê baskên xwe lê anîn hev, ew jî li vir li ber tirba bavê xwe di xew re çû. Wisa raketî ma di cihê xwe de heta heyv derket. Gava heyv derket, serê wî ji ser tîrbê berjêr şemitî, ruyê wî ket ezmana û şevq da di bin wê tava heyvê de. Cinên bawermend jî cirîd diavêtin di nav goran de. Cineke jin di wir re derbas bû, çavên wê li ruyê Hesên ket, pir bala wê kişand û dilê wê bijayê. Hebekî lê meyzand, piştî weke her car bi ezmanan ket û firiya. Efrîtek li ezmanan dît, silavek lê kir û jê re got: “Tu ji ku tê xalo?” Efrît got: “Ez ji Misrê tîm.” Wê jî got: “Gelo tu dikarî bi min re were heta bi nava goristanê da ku tu li ruyê Hesên bimeyzîni?” Got: “Bila be.” Herduyan bi hev re xwe bi jêr ve berdand heta ku gihan cem tîrbê, jinika cinî jê re got: “Te di emrê xwe de kesî hewqasî spehî dîtiye?” Efrît lê meyzand û got: “Suphan ji wî re ku hinek mirov hewqasî weke hev dixuliqîne! Xuşka delal gelo ez dikarim tîştê ku min dîtiye ji te re rave bikim?” Jinika cinî got: “Bêje.” Efrît jê re got: “Min ruyê din weke yê vî ciwanî li welatê Misrê dît, ruyê keça wezîr bû. Şahê Misrê jî pê hesiya û keçik ji bavê wê yî wezîr Şemseddîn xwest ji kurê xwe re. Lê Şemseddîn wezîr lêborîna xwe ji şahê xwe xwest û jê re got ‘Li qusûrê menêre ezbenî, tu jî dizanî ku birê min Nûreddîn ji malê derket, terqîya bêyî ku min agahdar bike. Birê min bû, şîrikê min î wezîrtiyê bû û sedema derketina wî jî ez bi xwe bûm. Di mijara zewacê de me guftûgo dikir, gava ku min dilê wî şikenand û ew qeherand.’ Piştî çîroka xwe û birê xwe ji şahê xwe re got û di dawî de jî gotina xwe wisa bir serî ‘Lewma hîna ji roja ewil de, gava ku nuh ji diya xwe re bû, min sûnd xwariye ku ez wê bi kesî re nezewicînim ji xeynî kurê birê xwe Nûreddîn. Eva hîjde sal tê de buhurîne; wê dema han min bihîst ku birê min bi keça wezîrê Besrayê re zewicîye û Xwedê kurek dayêyê. Min jî ji bo xatîrê birê xwe, keça xwe li bendî kurê wî hiştiye û li ser navê wî qeyd kiriye. Ji xwe keç jî pir in axayê min.’ Gava ku şah ev gotin ji wezîrê xwe bihîstin, çavên wî sor bûn û hêrs bû. Bi ser hilbû û jê re got ‘Çawa tu mirovekî weke min ji devê deriyê xwe

diqewirîne bi sebebin beradayî! Qesem bi navê Xwedê, ez ê vê keça te bi zilamê herî ketî, yê herî belengaz re bizewicînim!...”

*Dîsa li Şehrezadê bû sibeh û wê jî gotina xwe bi şekir birî.*

## ŞEVA BÎST Û DUYEMÎN

*Şehrezad axaftina xwe berdewam kir û got:*

Em hatibûn heta gava ku mêrikê cinî ji jinika cinî re behsa çîroka keça wezîrê Misrê dikir. Gava Şah sûnd xwar ku bi zor keça wezîr bi sakoleyekî re bide zewicandin, çavê xwe li derdora xwe gerand. Seyisekî piştixûz û sing-nepixî li balê hebû, Şah ferman da ku wîna binin huzûrê. Bi zorê mehra keça wezîr li wî mirovê qop birî û jê xwest ku di heman şevê de daweta wî lidarxin. Herkes li derdora zavê kom bûbû, bi mûm û çîran ew derbasî hemamê dikirin û hemûçkan henekê xwe pê dikirin.

Mêrikê cinî vegotina çîroka xwe berdewam dikir û digot: “Xuşkêcan, ew zavayê piştixûzî qidoş mirovekî pir bêmirês bû û ew keçîka reben jî weke nêrgizekê bû. Keç di ser wê re tunebûn bi spehîbûnê.” Jinika cinî jê re got: “Tu derewan dikî, ew xort ji mirovê herî baş bû di dewr û zemanê xwe de.” Mêrikê cinî got: “Xuşkêcan, wilehî keçîk ji kurik çêtir bû, jê xweşiktir bû. Ez bi bawer im ku ev ciwanê di xew de tam li gora wê keçîkê ye. Jixwe herdu jî wek hev xweşikin, mîna ku xuşk û birayê hev bin, an jî kurap û dotmamê hev bin. Heyfa wê keçîkê ku bi ewê qop re bizewice.” Jinka cinî ji mêrikê cinî re got: “Wê gavê ka em vî ciwanê bedew hildin ser pišta xwe û wî bibin Misrê cem wê keçîka ku tu behsa wê dikî, em binêrin hela kîjan ji wan xweşiktire ji yê din.” Mêrikê cinî got: “Gotina herî rast ev e, ka bise ez ê wî hildim ser pišta xwe.”

Mêrikê cinî, Hesenê kurê Nûreddîn ê ku di xew de bû hilda ser pišta xwe û bi hewa ket firîya. Jinka cinî jî li gel wan bi wan re diçû. Ew anîn li nava bajarê Misrê danîn û ew ji xew şiyar kirin. Hesen ji xew rabû, bala xwe dayê ku ne li ser gora bavê xwe û ne jî li Besrayê ye. Li çep û rastê xwe meyzand, bajar nas nekir û xwest ku qîrekê bide. Mêrikê cinî ew haş kir, mûmek pêxist da dest û jê re got: “Guhdar bik! Min tu aniye vir û ez dixwazim qencyekê bi te bikim. Vê mûmê ji destê min bigre û biçe wê hemama hanê û têkeve nav xelkê. Meşa bi wan re berdewam bike heta ku tu bighêje hêwana bûkê. Li wir, here li kêleka zavayê xûzik bisekine. Gava ku dengbêj û reqase hatin gel te, destê xwe bavêje bêrikên xwe, tê bibîne ku bêrikên te tijî zêr in. Bi çengan li wan belav bik, bêyî ku tu bitirsî. Ev tevde ji bo Xwedê ye, ne kerametên te ne. Here û bila baweriya te bi Xwedayê te hebe.” Gava Hesen ew gotinên Efrît bihîstin, rahişt mûma pêketî û meşiya, çû hemamê. Li wir

rastî zavayê qop hat ku li ser hespekê bû, ew jî bi wan re meşiya. Bejn û bala Hesên pir xweşik bû, kofiyek bi zêr xemilandî û ebayek bi sîmê neqîşandî lê bû ku bala her kesî dikşand. Kijan reqase û jina dengbêj ku ber pê ve dihat jî, li wê bedewbûna wî matmayî dima. Wî her car destê xwe davêt bêrika xwe, çengek zêr û dînar berdida kefa destê wan. Devê tevan jî hev vekirî mabû û mereq dikirin ka ev ciwanê bedew î zengîn kî ye?

Wisa berdewam kirin meşa xwe heta ku gihiştin mala wezîr, li wê derê xizmetkaran zava tenê derbasî hundur kirin. Jinên dengbêj û reqaseyan qebûl nekirin û gotin: “Welehî ku ev xortê ciwan jî bi me re derbas nebe hundur em jî nayên. Ciwamêro hewqase qencî bi me kiriye û hewqase zêr dane me. Heta ku ew jî bi me re derbasî cem xêlyê bûkê nebe, em nayên wêna venaguhezînin.” Xizmetkaran bi ya wan kirin û Hesên jî bi wan re derbasî mala bûkê kirin, ligel ku ev tişt bédilî zavê bû. Hemû jinên qonaxê, bi xatûn, mîrbanû û cariyên ve ketibûn rêzê de, bûbûn du sef. Ser çavên tevan girtî bû û her yek jî wan mûmek pêketî di destê wan de bû. Di zikê hêwanê de, li dora dikê weke du baskan bûbûn rêz di raserî deriyê ku wê bûk jê derketa. Di wê rewşê de çavên hemû jinan li ser Hesênê lihevhatî bû ku ruyê wî weke heyvê şewq dida. Meyla tevan bi ser wî de bû. Reqaseyan bi dengê bilind gazî kirin û gotin: “Li vî ciwanî miqatebin û di xizmeta wî de qusûrê nekin, lew bêrikên me tevan tijî zêrê sor kir, çî jî we bixwaze jê re nebêjin na.” Bi vê gotinê re jin tev li ser serê wî kom bûn û mûmê xwe dan ber ruyê wî, têra xwe li bedewbûna wî nêrîn. Teva hişên xwe wenda kirin û xwestin ku xwe bavêjin hembêza wî. Berçavkên xwe rakirin û spehîbûna ruyên xwe eşkere kirin û jî hev re gotin: “Xweska bi wê ya ku ev xort bibe nesîbê wê!” Piştî tevan bi hev re nifir li qopo kirin û li ewên ku bûbûn sebaba zewaca wî bi keça wezîr re. Ji Hesên re duayê xêrê kirin. Piştî bûk anîn û tevde lê hatin hev, ew xemilandin; porê wê şeh kirin, toqên zêrîn û gewheran li dora stûyê wê anîn hev, bêhn û bêhnok pê dakirin û kincên bi zêr neqîşandî lê kirin. Ew kirin weke şahbanûyekê, xeftanê wê jî bi zêrên sor xemilandibû, sûretên teyr û tilûran, yên weş û ajalan li ser neqîşandibûn. Heqîqek jî di gerdena wê de bû ku buhaya wê nedihat hesêb. Êdî bûka wan bûbû weke horiyekê, suphan jî ewê ku ew afirandibû. Jinan tevan lê dinêrî û li dorê kom dibûn weke stêrkan, ew jî di nav wan de weke heyva li çardehan bû.

Hesên Bedreddîn jî li cihê xwe rûniştibû, bala xelkê jî li ser wî bû. Bûk jî bi meşa qitîkê hat û di ber wan re buhurî. Seyîsê xûzik pê ve rabû da ku wêna pêşwazî bike, lê bûkê xwe jî ser wî dagerand û çû cem kurapê xwe Hesên. Xelk hemû kenyan bi vê rewşê, dilê tevan li rex Hesên bû. Hesên destê xwe avêt bêrika xwe û çengek zêr derxist, bi ser reqasê û dengbêjan ve avêt. Ew jî pir kêfxweş bûn û jê re gotin: “Xweska ev bûk ya te baya!” Hesên kenya, zavayê xûzik jî bûbû weke meymûnekî di nav xelkê de. Her

ku mûmek jê re pêdixistin, wî vedimirand. Behetî mabû, di quncikeke tari de rûniştibû, xelkê jî lê temaşe dikir.

Bûkê jî herdu destên xwe ber bi jor ve vekiribûn, dua dikir û digot “Ya rebî tu vî ciwanî bikî para min û tu min ji tora vî seyîsê qop xelas kî!” Berbûyan li ser bûkê stran digotin, piştî jî qedandin û ji kesê hazir xwestin ku herkes bi riya mala xwe de here, herkes bi kêfxweşî rabû ser xwe û derket. Hesen bi tenê ma. Cariyên qesrê û reqasan jî bûk birin hundur da ku zîneta wê ji ser rakin û wê ji zavê re amade bikin. Seyîsê xûzik çu cem Hesen û jê re got: “Begê min, bi hatina we em serbilind bûn, lê êdî çima tu naçî malê? Berî ku hinek bera te din!” Hesen got “Bismîllah” û rabû ser xwe, derket. Di devê derî de mêrikê cinî derket pêşiya wî, ew sekinand û jê re got: “Bimeşe Hesen, here cem bûkê û jê re bibêje ‘mêrê teyî rastî ez im û Şah ev lîstik tevde çêkir ji bo ku kesek te çavîni neke û ev seyîs jî yek ji seyîsên me ye.’ Piştî perda ser ruyê wê bide alî û ji tu kesî metirse.” Hîna ew herdu wisa dipeyvîn seyîsê xûzik rabû ser xwe, çû hundurê din ji bo ku xwe rehet bike. Lê ji hewdikê avê yê li ber wî, efrîtekî di şiklê mişkêkî de derket raber wî û jê re got “Zebeq!” Seyîs got: “Kê tu anî vir?” Mişk mezin bû bû weke pisîkekê, piştî hîn mezintir bû heta ku bû bi qasî kûçîkekî û jê re got “Ewt ewt!” Seyîs jê tirsîya û got “Wê ve here belqityo!” Piştî kûçîk hîn bêhtir mezin bû, heta ku bû kerek û di ruyê wî de zirya û bû hîrehîra wî. Seyîs pir tirsîya û hewar kir xelkê malê, got: “Werin min xelaskin!” Ker hîn bêhtir nepixî, mezin bû heta ku bû gamêşek û derî lê girt û weke insan bi zimanê mirovan pê re axivî, got: “Kuro kurmiyo pişt qopo, qey keç li dinyayê nemane ku tu hatiye dergîstiya min ji xwe re biriye?” Seyîs, devê wî kete hev, bêdeng ma. Ewî berdewam kir: “Zû bersiva min bide yana ez ê te binerd bikim!” Seyîs got: “Bi navê Xwedê gunehê min tê de tune, wan ez mecbûr kirim. Min qet nizanîbû ku evîndarekî wêyî gamêşî heye. Vêca ez dexilê Xwedê û te me, li min bibore.” Efrît gotê: “Baş bizanibe heger tu biaxive, ango berî berbangê tu ji vir derkeve, ez ê te bikujim. Gava bû sibe tu jî here mala xwe û carekê din neyê vir.” Piştî, bi qerpka stûyê wî girt, cihê ling û serê wî veguhert û jê re got: “Tu li vir be, ez ê jî heta sibehê li vir nobeta te bigrim.”

Yê seyîs û mêrikê cinî pevçûna xwe berdewam kirin. Hesen dev ji wan berda û çû derbasî hundur bû, li ser textê zavatiyê rûnişt, ma li bendî bûkê. Çend kêlik buhurîn, bûk jî ligel pîrejînekê derbasî hundur bû. Pîrejî hat li devê derî sekinî û got: “Bavê Şehab, ka rabe û were bi destê bûka xwe bigre, bibe! Êdî bimînin di nav xêr û xweşiyê de, va ez jî diçim.” Pîrejî bi şûn de çû, bûk jî çû hundur, bi dilekî şikestî derbasî cem zavê bû. Di dilê xwe de ji xwe re digot “Bi hersê navê Xwedê, ruhê min jî derxîne ez nahêlim destê xwe bide min!”

Bûka ku jê re digotin ‘Mîreka Spehîbûnê’ çawa hat ser text, kêleka zavê û çavên wê li Hesên ketin, bêhna wê fireh bû û jê re got: “Naxwe heta niha ji tu li vir î dilocan? Min ji xwe re digot belkî tu û yê seyîs min di nav xwe de dabeş dikin, anku şîrikên hev in.” Hesên got: “Ew kî ye ku şîrikê min be û kê ew aniye bal te? Keçîkê got; naxwe mêrê min kî ye, tu ye an ew e? Hesên got: “Xanimcan, tenê ji bo ku em hebekî laqirdiyên xwe pê bikin me wisa kir. Gava ku reqaseyan, dengbêjan û berbûyan tevan bala xwe berdan ser bedewbûna te, bavê te li ser te tirsîya ku hinek te çavîni bikin, lewma çû ew seyîs kirê kir bi deh dînanan da ku awirên xelkê ji ser me bide alî.” Pêre ji Hesên beşîşî û dest bi ken kir. Gava Mîreka Spehîbûnê ev gotin ji Hesên bihistin, pir kêfa wê hat û dilê wê hênîk bû. Wê ji dest bi ken kir got “Îca te agirê nava min vemirand, de êdî min têxe himbêza xwe.” û çû balê. Piştî destmala ser çavên xwe da alî û qirika mircanî derxist holê. Gava ku Hesên çav li sîng û berê wê ket, ajoyên wî hişyar bû û xwîn di laşê wî de geriya. Rabû ser xwe, tûrikê xwe yê zêran yê ku ji wiyê Cuhû stendibû xist bêrika şerwalê xwe û ew li hev gerand, danî kêleka xwe. Kofiya serê xwe û xeftanê xwe jî danî û bi tena binkiraskê xwe ma. Mîreka Spehîbûnê pê ve rabû û ew ber bi xwe ve kişand, wî jî ew kişand û herduyan hevdû ramûsand û bi hev şabûn û di pêxêla hev de di xewre çûn, çawa ku helbestkar ji dibêje:

Dev ji zikreşiyê tu berdî biçê cem hezkiriyê xwe  
 Kerb û derdên nav muhibban herdem ji ew e  
 Wêneeşqa evîndaran sûretê herî bedew e  
 Kî bibêje nîne wek wê xweşik dîmen ew e  
 Ji hev weş bin hezkirî giş bê elem bin bê mawe  
 Dest di dest de rû li ser rû her bi hev re bin hewe  
 Dil bi yek bin kî çi bêje bêfêdeye ew

Rewşa Hesên Bedreddînê kurê Nûreddîn û keçapa wî Mîreka Spehîbûnê ev bû. Vêca em veşerî ser mêrikê cinî ku ji jinka cinî re digot: “Ka bikeve bin Hesên, wî hild ser piştî xwe da ku em wî veşerînin warê wî, berî ku bibe sibeh.” Hesên raketî bû, jinika cinî bi dizî û hêdîka ket bin wî de û bi tena wî binkiraskê wiyê spî ew bi hewa xist û firiya çû. Mêrikê cinî ji li kêleka wan diçû. Bi wê fira xwe tibabekî çûn, di wê navberê de Xwedê Teala emir da ferîşteyekî xwe, tîrek avêt mêrikê cinî, lêket, agir pêket û şewitî çû. Jinika cinî ji wan tîran rizgar bû, lê rîya xwe berdewam nekir, hema li wir xwe bera erdê da da ku bi saxî û selametî wî deyne erdê. Qedera wî bû ku bajarê Şamê li wir di binya wan re bû. Jinka cinî hema Hesên danî ber deriyekî bajêr û dîsa bi hewa ket çû.

Gava bû sibeh, deriyên bajêr vebûn û xelk jê derketin. Bala xwe danê ku ciwanekî lihevhatî, tena binkiraskê xwe, bê cil û bê kofî, li nava goristanê raketîye. Çawa çavên hina lêketin, gotin: “Xweziya me bi wêya ku şevê din

bi vî ciwanî re raketibû!” Hinekan jî gotin: “Xweska piçekî din jî sebir bikira heta ku kincên xwe li xwe bikira!” Hinekan jî got: “Xuyaye ku sakûleyekî hejar e, serxweş ketiye, dereng maye heta ku bi ser hişê xwe ve hatiye, dûvre gava hatiye vir û derî girtî ditiye, li vir raketiyê.”

Herkesî dewla xwe di gotinê dadikir û texmînek di derbarê wî de dida meşandin. Di wê navberê de ba rabû û binkiraskê Hesên jî ji ser da alî heta bi nafkê, çîmên wî, hêtên wî û laşê wî yê tazî mîna camê xuya kir, herkes li xweşikbûna wî ecêbmayî ma û li derdorê kom bûn. Gava Hesên ji xew şiyar bû û xwe li ber deriyê wî bajarî, di nav koma xelkê de dît, şaş û metal ma! Got: “Ez li ku me gidvano, çi bûye ku hûn wisa li min kom bûne? Çîroka min û we çawa ye?” Gotin: “Wele sibehê gava ku mele azan da û deriyê bajêr vebûn, me tu li vê navrastê raketî dît û ji vê pê ve em tiştêkî nizanin di derheqê te de. Vêca ew şeva borî tu li ku raketibû?” Hesên Bedreddînê kurê Nûreddîn got: “Xelkino wile şeva borî ez li Misrê raketibûm.” Yekî ji wan jê re got: “Qey te heşîş kişandiye kuro?” Yekî din jî ket nav gotinê û berdewam kir: “Kuro qey tu dîn bûyî lawo! Çawa tu doh li Misrê raketibû û vê sibehê tu li ber deriyê Şamê yî?” Hesên ji wan re got: “Bi navê Xwedê ez derewan li we nakim, şeva borî ez li Misrê bûm û ya berî wê jî ez li Besrayê bûm.” Yek ji wan got: “Ev tiştêkî ecêb e!” Yekî din got: “Ev mirov dînik e!” Tevde di derheqê wî de axifin û gotin: “Heyfa vî ciwanî û bedewbûna wî! Ji sedî sed dîn e ev kurik!” Piştî jê re gotin: “Were ser hişê xwe lawo!” Hesên got: “Şeva borî ez zava bûm li Misrê.” Gotin: “Kuro nabe ku te ev tişt di xew de dîtibel!” Hesên li xwe ma heyîrî û nema zanîbû ka wê çi bike. Ji wan re got: “Bi navê Xwedê ev tiştê ku ez ji we re dibêjim ne xewn e. Ka seyîsê xûzik çû ku? Ka tûrikê min î zêran, ka kincên min, hemû tev bi ku ve çûne?”

Piştî rabû ser xwe û derbasî bajêr bû, li nav sûk û kolanên wê geriya, xelk hemû lê hatin hev û pê şabûn. Hesên çû derbasî xwaringehêkê bû ku xelkê Şamê tev ji xwediyê wê ditirsiyan. Lewma çawa dîtî ku Hesên derbasî wir bû, xelkên dora wî tev belabûn û ji wir dûr ketin. Gava xwediyê xwaringehê çav li Hesên ket, jê hez kir û jê re got: “Tu ji ku ye ciwano? Hele çîroka xwe ji min re bêje, bi navê Xwedê tu ji nasên min jî ezîztirî li ber dilê min.” Hesên çîroka xwe ji serî heta binî jê re vegot. Mirovê xwarinpêj got: “Hesên Bedreddîn, wile ev çîroka te pir erjeng e û dûrî aqila ye. Lê divê tu bizanibî ku surê gelek kesa li ba min heye û Xwedê bê erê, ez ê vê sura te jî ji kesî re nebêjim heta ku Xwedê fereceke xêrê li te veke. Jixwe zarokên min tune ne, hema tu jî li vir be, li cem min be weke kurekî min.” Hesên got: “Bila wisa be apocan.” Wê gavê xwarinpêj çû sûkê jê re kincin xweşik anîn, lêkirin û ew bir cem qaziyê bajêr, di huzûra du şahidan de ew kir kurê xwe. Hesên jî weke kurê aşpêj hate nasîn, li Şamê ma, li cem wî.

Vêca em vegerin ser keçapa wî Mîreka Spehîbûnê. Gava sibehê ji xew şiyar bû û Hesên li kêleka xwe nedît, got belkî çûbe qedemgehê. Ew jî ma li bende wî. Di wê navberê de bavê wê ji cem Şah vegeyriya, mirûzê wî xera bibû, pir xemgîn bû. Çawa şahê wî wisa lê kiribû û keça wî bi zorê li seyîsekî xweyî pişturmî mehr kiribû? Di dilê xwe de got “Bi navê Xwedê ez ê vê keçikê bikujim, heger hiştibe ew pişturmî pê re rakeve.” û derbasî cem keça xwe bû. Mîreka Spehîbûnê got: “Keremke bavocan!” Kêfxweş û rûliken bû keçik. Gava bavê wê ew di wî halî de dît şaş bû, bi qehr got: “Dêlika şermot, qey tu bi wî seyîsî kêfxweş î?” Keçik bi vê gotina bavê xwe kenîya û got: “Bes e êdî bavocan, jixwe ji doh ve xelk henekê xwe bi min dikin, halbûkî tu dizanî ku ez neynûkek xwe nadim bi wî kundirî. Lê di temenê min tevî de, şeveke xweş weke şeva borî min nedît! Vêca çima tu hîna wî xûzîkî tînî bîra min.” Gava bavê wê ew gotin ji devê wê bihîst, hîn bêhtir qeherî û got: “Îca ev çi gotin e porkurê? Ma qey şeva borî seyîs nehatibû gel te?” Keçikê got: “Tu bi Xwedêkî ji min re behsa wî bêmirûzî meke, jixwe te ew bi deh dînan kirê kiribû, pereyên xwe girtin û çû. Ez ji hatim, min dît ku mêrê min li ser nivînê ye li bendî min e. Jixwe şev pê de bêrikên reqasan û dengbêjan tiji zêrên sor kiribû û dilê her kesî xweş kiribû. Ez ji heta sibehê di hebêza wî xwîşêrînê mêrê xwe de mam.” Gava bavê wê ew gotin bihîstin, ber çavê wî reş bû, jê re got: “Wey qehpîka porkur, qey te hişê xwe xwariye keçê?” Keçikê got: “Wisa nebêje bavocan, te kezeba min şewitand! Tu çima xwe li nezaniyê datîni, eva mêrê min çûye qedemgehê û dê niha were. Ev tevde min ji wî guhdar kir.” Bavê wê bi qehr berê xwe da qedemgehê, çû lê nerî, dît ku seyîsê xuzîk serberjêr daliqandiye ji nigê xwe ve. Behetî ma, qîrêk dayê û jê re got: “Ev çi ye lawoo!” Seyîsê qop jî digot belkî dîsa ew mirovê cinî ye. Loma deng nedikir, bersiva wî nedida.

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî gotina xwe bi şekir birî.*

## ŞEVA BÎST Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Wezîr li yê Seyîs dîsa kir qîrîn û jê re got: “Ya biaxiv yan ez ê bi vî şûrî serê te bifirînim!” Seyîs got: “Welehî şêxê efrîtan, ji gava ku te ez li vir daliqandime min serê xwe ranekiriye, xwe tevnedaye. Vêca tu bi Xwedêkî li min were rehmê û min ji vî halî rizgar bike.” Gava wezîr ew gotina wî bihîst, je re got: “Tu çi dibêji kurmiyo! Ez bavê bûkê me lawo, ez ne efrît im.” Wê gavê mirovê seyîs got: “Temenê min ne di destê te de ye û tu nikare ruhê min jî bistîni. De êdî bi riya xwe de here berî ku yê ez xistime vî halî bi ser te de bê. We ez bi keçekê re dame zewicandin ku destgirtiya gamêş û efrîta ye. Laneta Xwedê li kesê ku ez pê re zewicandim bê û li yê ku jê re bû sebeb.”

Wezîr got: “Ka rabe ji vir derkeve!” Seyîs dom kir û got: “Qey ez dîn bûme ku ez bi ya te bikim bê izna efrît? Ewî ji min re got, li vir be heta ku roj derkeve. Vêca ka di destpêkê de ji min re bibêje, roj derketiye an na? Ez nikarim ji vir derkevim heta roj dernekeve.” Wezîr jê re got: “Kê tu aniye vir?” “Doh ez hatim vir” got Seyîs “ji bo ku ez pêdiviya xwe bikim. Min dît ku mişkek ji nav avê derket û bang kir; piştî her ku çû mezin bû heta ku bû gamêşek, çend gotin di guhên min de got û ketin serê min. Îca dev ji min berde û here. Lanet li bûkê bê û li wî kesê ku ez pê re zewicandim.” Wezîr pê ve hat, ew ji qedemgehê derxist. Lê dîsa jî bawer nedikir ku roj derketibe. Piştî çû cem Şah û çiroka xwe û efrît ji serî heta binî jê re got.

Wezîrê bavê bûkê jî vegeyriya hundur, lê hişê wî tevlihev bûbû. Ji keça xwe re got: “Ka rastiya xwe ji min re bêje!” Keça wî got: “Ew ciwanê rind î ku min ji te re behsa wî kir, şeva borî li vir li cem min bû û bi min re raket. Heger tu bawer nake jî vaye kofiya wî li vir e, li ser dikê ye û waye kincê wî jî li ser nivînê ye û tiştêkî peçayî jî di nav de ye ku ez nizanîm bê çi ye.” Bavê wê di cî de xwe dada ser dikê û çawa ku çavên wî li kofiya Hesên Bedreddîn ê birê xwe ket, rahiştê û ew maçî kir û got: “Ev kofi ya wezîran e û malê Mûsilê ye, ji neqşê dora wê xuya dike.” Piştî çû rahişt kincên wî ji ser nivînê û tûrikê di nav de pêçayî derxist. Tûrikê ku hezar dînar tê de bû vekir, dît ku kaxetek di nav de ye, rahiştê lê nerî, xwend; dît ku bawernameya firotina malê Hesên Bedreddîn ê birayê wî û mêrikê Cuhû ye. Çawa ku Şemseddîn ew kaxet xwend qîrek da û li erdê ket, ji ser hişê xwe çû. Piştî ku rabû ser xwe û rastiya meseleyê fem kir, behetî ma û got “Subhan ji wî Xwedayê ku her tişt ji destê wî tê!” Piştî li keça xwe zivirî û jê re got: “Tu dizanî bê te kî himbêz kiriye?” Got: “Na!” Bavê wê got: “Ew kurê apê te bû û ev hezar dînar jî qelenê te ye. Subhan ji Xweda re, çawa ev çîrok wisa li hev hatiye?” Piştî beşa dirûti ji tûrik vekir, bala xwe dayê ku nivîsek bi destê birê wî Nûreddînê Misrî bavê Hesên tê de ye. Çaxê ku ew nivîsa birê xwe dît, çend ristên helbestekê di ber xwe de xwend û got:

Dihelim gava ku ez şopa wan dibînîm  
 Û li dûv wan hesîran her ez dirjînim  
 Dipirsim, gelo yê ku ez ji wan dûr xistim  
 Rojekê dê dîsa min li wan vegeyriye?

Piştî vê helbestê nivîsa xwe xwend û dît ku tede behsa çûna xwe ya Besrayê dike û dîroka zewaca xwe, roja çêbûna kurê xwe û emrê xwe yê ku derbas kiriye heta roja wefata xwe! Ma behetî û ji kêfa lerizî, jiyana xwe û ya birê xwe da ber hev, bala xwe dayê ku roja zewaca wan yek e, roja çêbûna keça wî û ya çêbûna kurê birê wî Hesên yek e û her tişt weke hev çêbûye. Rahişt herdu kaxezan û bi lez berê xwe da cem Şah, her tişt ji serî heta binî jê re got. Şah jî ma ecêbmayî li vê çîrokê û ferman da ku ev çîrok di cî de we-



re nivîsandin. Wezîr jî ma li bendî vegera kurê birê xwe, lê tu xeber jê negirt. Rabû got “Bi navê Xwedê ez ê tişteki bikim ku heta niha tu kesî nekiriye.”

*Dîsa li Şehrezadê bû sibeh, wê jî dev ji vegotinê berda.*

## ŞEVA BÎST Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê got:*

Wezîr rahişt periyekî, şûşeya hibrê danî ber xwe û çî tiştê ku di mal de hebû di kaxezekê de nivîsand û ferman da ku her tiştê di mal de were hilanîn û bê parastin. Kofi û şar û şerwal û tûrikê pereyan jî li ser, hemû tevde rakirin, birin xistin sindoqekê de, li ba xwe veşartin. Keça wezîr jî piştî ku neh mehên wê qediyar hemlê xwe danî û Xwedê Teala kurikek da di dirûvê Hesên de; weke wî bedew û lihevhatî bû. Navka wî jekirin, çavên wî kil kirin û navê wî kirin Ecêbo; ew teslîmî dayikên şirdanê kirin. Rojeke wî bi mehekê bû, meheke wî jî bi salekê bû, zû mezin dibû. Gava temenê wî bû heft sal, ew dane ber feqiyekî da ku wîna li ser sinc û terbiyeke baş bide mezinkirin û wî fêrî hemû zanînan bike. Dema ku sala xwe ya çaran di dibistanê de dixwend, carekê bi hevalên xwe re pevçû, sixêf jî wan re dan û jî wan re got: “Qey kî jî we weke min e, ez kurê wezîrê Mîsrê me!” Kuriken hevalên wî tewde li ser vê kom bûn û çûn cem berpirsiyarê polê, giliyên wî li cem kirin. Berpirsiyar jî wan re got: “Ez ê tişteki jî were bibêjim; sibe gava ku hat, tevde herin li derdorê rûnîn û jî hev re bibêjin ka berî her tiştî em navê dê û bavê xwe bibêjin, piştê bi hev re bilîzin. Ê ku navê dê û bavê xwe nizanibe, bêjin ew piç e û em naxwazin pêre bilîzin. Wê çaxê hûn ê jî şerê wî xelas bin.” Gava bû sibe û dîsa hatin li hev civiyan li dibistanê û Ecêbo jî hat cem wan, gotin: “Em ê listikek xweş bilîzin le yê ku navê dê û bavê xwe nebêje dê nikaribe bi me re bilîze.” Dest pê kirin yeko yeko navê dê û bavê xwe gotin heta dor hat ser Ecêbo. Wî jî got: “Navê min Ecêbo ye, diya min Mîreka Spehîbûnê ye û bavê min jî wezîrê Mîsrê Şemseddîn e.” Zarokên hevalên wî gotin: “Wî wezîr Şemseddîn kalkê te ye, ne bavê te ye.” Ecêbo got: “Na wele bavê min î rastî ew e.” Wê gavê zarok tevde pê kenîyan, li çepikan xistin û je re gotin: “Rabe jî cem me here, tu navê bavê xwe nizanê û yê bavê bavê xwe nizanibe nikare bi me re bilîze.”

Zarok jî derdora wî belabûn çûn û hemû bi hev re dikenîyan. Bêhna Ecêbo teng bû, kelogirî bû, hindik mabû ku bifetise. Berpirsiyarê polê jê re got: “Ne tu bavê xwe nas dikî ne jî em, jî ber ku diya te bi seyîsekî xûz re zewicandine û mirovekî cinî, yanî efrîtek hatiye pêre raketîye. Heger bavê te tunebe, dê zarok bi çavê bêjîtîyê li te binerin û tu nikari di nav wan de bilîzî. Ma qey tu nabînî ku kurê firoşker jî bavê xwe nas dike? Yê te ne tu bavê xwe nasdikî ne jî em, wezîrê ku tu dibêji ew bavê min î, kalkê te ye. Îca hişê xwe

werî serê xwe û xwe nexapîne.” Gava Ecêbo ev gotin bihîstin, bi lez çû cem diya xwe, bi ser de giriya û giliyê xwe li ba kir, mesele jê re vegot. Dema diya wî ev gotin jê bihîstin agir bi kezeba wê ket. Destê xwe di ser serê wî re bir û anî û jê re got: “Çi qewimîye kurê min, hela bibêje bê çi tu bi girî vekiriye? Ecêbo çi ji hevalên xwe bihîstibû jê re got û lê zêdekir: “Dayêcan, bavê min kî ye?” Diya wî got: “Wezîrê Misrê bavê te ye.” Ecêbo got: “Na ew ne bavê min e, derewan li min neke, wezîr bavê te ye. Vêca ji min re bêje bê kî bavê min e?” Piştî xincera xwe ji ber xwe kişand û got: “Heger tu rastiye ji min re nebêji, ez ê bi vê xincerê xwe bikûjim.” Gava ku ev hate ziman, diya wî giriya û kurapê wê Hesên hate bîra wê û pir hestiyar bû. Piştî ev çend rist gotin:

Bêrîkirinek mezin di nava min de çand û çû  
 War bi war geriya û sal û meh di ser re borî  
 Dilqewîniya min weke wî bû her bextewar  
 Çû ew bi çolan ket lê her bi qedr e ew dar  
 Bi sebrim ez ligel wan hêsrên xweyî pozbilind  
 Hicran jî didome lê dilê min her serbilind  
 Ger rojek were û ez bixwazim wî bibînim an  
 Piştî vê bendewariya roj û meh û salan û can  
 Ez ê wî di dil de vejînim weke peyke arî  
 Lew ez im her fikr û bêrî û xemgîne karî

Hîna ew wisa bi ser kurê xwe de digiriya, bavê wê yî wezîr derbasî hundur bû. Ku keça xwe di wî halî de dît, agir bi nava wî ket û got: “Çi dihêle ku hûn bigirîn?” Keça wî jê re behsa kurê xwe û tiştên ku zarokan jê re gotibûn anî ziman. Bi wan gotinan re birê wî û kurê birê wî dîsa hatin birê û wî jî dest bi girî kir. Bi wî halê xwe ji mal derket û berê xwe da dîwana Şah, çû huzûra wî; ev çîrok ji serî heta binî jê re anî ziman û izin jê xwest, ji bo ku mohletekê bide wî da ku ber bi Besrayê ve biçê û li kurê birê xwe bigere. Piştî di nav lepê Şah de giriya û jê xwest ku ji her welatekî re nameyekê binivîsîne da ku agahiyekê ji kurê birê xwe bigire. Dilê Şah pê şewitî, rabû ji her welatekî re nameyek nivîsand. Bi wê yekê dilê wî xweş bû, bi dilgermî xatir ji Şahê xwe xwest û di cî de çû karê rêwîtiya xwe kir. Pêdiviyên rê dane ser hev, piştî keça xwe û kûrê wê Ecêbo jî bi xwe re kar kirin û ket rê de. Di roja sisyan de xwe gihandin Şamê. Gava ku çavên wî bi Şamê ketin, helbesta hozanekî hat birê ku digot:

Piştî ku ez roj û şevê mam li Şamê  
 Tegihîştim ez ku qet xwe şaş nekiriye demê  
 Manek di bin baskê şevê de xewnek watedar  
 Bi şeveqa sibehê re jî zad û giha û dar  
 Berên rindik bi şaxan ve çîto dilewlihin

Û çawa ku ba silavê bike li wan her dikevin  
Teyr û tilûr û av û dar hemû tevde hevalin  
Rûpelên xwezayê bi hev re her dixwînin  
Ba jî herdem dinivîse ewr jî daîm dibarinin

Wezîr berê xwe da Şamê û hat çadira xwe li Meydana Hespa vegirt. Piştîre ji xulamên xwe re got: em ê “Bi qasî du rojan bêhna xwe vekin li vê derê.” Ecêbo jî xizmetkarekî xwe da dûv xwe û berê xwe da nav bajêr, ji xwe re geriyar. Qamçiyek di destê xizmetkar de hebû ku li deveyekî bida dê bi yek derbê ew bikûşt. Gava ku xelk li bejn û bala Ecêbo nêrin û çavên wan bi wê bedewbûna wî ketin, hemû behetî man û dan dûv wî ji bo ku ji xwe re lê meyze bikin. Ecêbo jî her bi wî halî gera xwe berdewam kir heta ku giha cem xwaringehê ku bavê wî Hesên têda dixebitî. Gava ku Xwedê ji yekî re li hev binê wisa ye! Hesên, Ecêbo derbasî hûndir kir û da rûniştandin. Gava ku Ecêbo li wir rûnişt, xizmetkarê wî jî pêre rûnişt. Gava ku Hesên lê nêrî, xwîna Ecêbo pê pir şêrîn hat û di cî de jê hez kir weke ku nasekî wîyî kevn be, ew pir nêzîkî xwe dît. Hesên wê keliyê şêrîniya bihîvên bi hinar çêkiribû, danî ber wî û bi hev re xwarin. Hesên ji wî û xulamên wî re got: “Nosîcan bê ji we re, em pir kêfxweş bûn bi hatina we.” Ecêbo li Hesên zivirî û got: “Wê gavê ka tu jî rûne, em bi hev re bixwin, belkî Xwedê Teala me bigihîne hezkirîyên me.” Hesên jê re got: “Kurê min, xuyaye ku hîna ji vî temenê biçûk de tu ji hezkirîyên xwe veqetîyaye?” Ecêbo got: “Belê apocan, ji niha ve dilê min şewitiye ji hîcrana hezkirîyê min ku ew hezkirîyê min jî bavê min e. Ez jî bi tena serê xwe ketime ser riyar û war bi war lê digirim. Xweska bi wê rojê ku ez wî bibînim!” Piştîre dest bi girî kir, bavê wî jî xwe li ber negirt bi wî re dest bi girî kir û hezkirîyên xwe bi bîr anin. Xizmetkarê wî ew haş kir, piştîre bi hev re xwarin xwarin heta ku têr bûn. Dûvre rabûn ser xwe, spasiyên xwe jê re diyar kirin û ji dikana Hesên derketin, çûn. Wê keliyê Hesên tê derxist ku rûhê wî jî bi wan re çû û janneke bi êş kete canê wî. Debara wî nebû, rabû wî jî dikana xwe girt û da dûv wan, li dû wan çû heta ku xwe gihand wan. Carekê yê xizmetkar li dûv xwe nerî, çavên wî li Hesên ketin, jê re got: “Tu çima li dûv me tê xwarinpêj?” Hesên got: “Gava ku hûn ji dikana min derketin, ruhê min jî bi we re hat û bêhna min teng bû. Vêca min got, ez jî bi we re bêm derveyî bajêr, pêdiviyeke xwe biqedînim û piştîre vegerim bajêr.” Xizmetkar qeherî û ji Ecêbo re got: “Ev xwarîna ku me li cem vî xwar wê di zikê me de bibe kerafî û mala me xera bike. Li me kir minet û dê gav bi gav li dûv me bê.” Ecêbo li paş xwe nerî, xwarinpêj dît, ew jî pê qeherî û rûyê wî sar bû. Ji xizmetkarê xwe re got: “Jê biqer! Bila di rê de werê. Gava ku em ji bajêr derketin û me di ku ew jî li dû me tê, em ê wî biqewirînin.” Xizmetkar serê xwe hejand, dûvre dîsa meşa xwe berdewam kirin. Hesên jî li dûv wan çû heta ku giha Meydana Hespa. Hatî nêzîkî konê xwe, dûvre li dûv xwe zivirîn, bala xwe danê ku ew jî li dû wa ye. Ecêbo qeherî û tirsîya ku hinek ji xizmetkaran kalkê wîna ji vê mijarê agahdar bikin û jêre bibêjin

ku ew çûye derbasî cem vî zilamî bûye û li dikana wî xwarin xwarîye, loma li dû wan hatiye. Gava çavên Ecêbo ketin yê Hesen de, ruh di laşê wî de nemabû, qet nizabû ku ew zilamê raber wî bavê wî ye, berevajî wê çavên Hesen jê re weke çavên xayînan hatin, heta weke çavên bêjîyan. Evê yekê ew hîn bêhtir qeherand, rahişt kevirêkî û tê werkir; li anîya wî ket, ji ser hişê xwe çû. Ecêbo û xizmetkarên xwe jî meşa xwe berdewam kirin, çûn bin çadira xwe. Gava ku Hesen bi ser hişên xwe ve hat, xwîna ser çavên xwe paqij kir, parçeyek ji şara serê xwe jêkir, li birîna xwe pêça û xwe ji xwe aciz kir ji ber vê mereqa xwe ya ku ew bi dûv wan de anî. Ji xwe re got “Hebe nebe min zilm li vî kurî kir, xweska ez li dûv nehatibama. Kî dizane, belkî niha wî ez weke yekî xayîn xesibandime.”

Piştê dîsa vegehiya dikana xwe û bi karê xwe ve mijûl bû. Bavê wî yê li Besrayê hat bîra wî; hestiyar bû, hêsrên wî herikîn û kelogirî bû, di wê navberê de ev ristên helbestê bi lêv kirin:

Nexwaze însafê ji feleka bêbext zilm e ew  
Loman jê meke lew ne ji bo însafê ye ew  
Çi bi destên te ve tê bibe besî te ye ew  
Tiştên mayî jî bavêje guh medê tew  
Bêgûman qeder heye herdem li pêşiya mirov

Hesen dîsa bi xwarin û karûbarê rojane mijûl bû.

Em werin ser rewşa wezîr û neviyê wî Ecêbo ku sê rojan li Şamê man, piştê ji wir bar kirin û berê xwe dan Humsê. Gihan wir, derbasî bajêr bûn, dûvre ji wir jî dan rê û hatin heta ku gihan Mêrdînê. Ji wir jî hatin Mûsilê, ji Mûsilê berjor hatin heta ku gihan Diyarbekirê; piştê dîsa berjêr daketin heta ku gihan Besrayê. Derbasî bajêr bûn, wê gavê birayê wî Nûreddîn hat bîra wî, mişextiya wî, mirina wî hate bîrê, pir pê êşiya, hestiyar bû û di ber xwe de ev çend risteyên helbestê gotin:

Diçim waran, warên dost û yaran  
Maç dikim her kevir dar û beran  
Ne evîna diyaran e ya di dilê min de  
Evîna kesên li nav wan diyaran e

Çiqasî birayê xwe bi bîra xwe dianî, ewqasî jî zêde dibû êşa dilê wî. Wî jî bi stranî her berdewam dikir û digot:

Her ku tav dertê agah dibim ji wê ez  
Her ku ewr derbas dibin jî bipirsim ez  
Bêrîkirin vediçirîne bedena min her roj  
Ji hev dixê perçe dike lew herdem bi soj  
Hezkiriyên min li ku ne ewqas dereng man?

Ji bo we li ser we min hêraye ev dil man  
Qet nebêjin ku bi kesî re mijûlim qet nîn e  
Dilê min dûr e ji xelkê cih tê de nîn e

Piştî li Besrayê bi cih bû bi çend rojan, çû derket hizûra Şahê ku pir qedr û qîmet daye û sebeba hatina wî jê pirsî. Wezîrê Misrê jî çîroka xwe ji serî heta binî jê re vegot û ew agahdar kir ji biratiya xwe û Nûreddîn. Şah got: “Rehma Xwedê lê be, wezîrê min bû min pir jê hez dikir lê mixabin ji berî pazde salan ve çû ser dilovaniya xwe. Zarokekî wî mabû li dû, me ew jî winda kir û heta niha me tu agahî jê negirtine, lê diya wî hîna li ba me ye, ji ber ku ew keça wezîrê min î mezin e.” Gava Şemseddîn bihîst ku diya kurê birê wî jineke êsil e, pir kêfa wî hat û ji Şah xwest ku izin bide wî da ku wê bibîne. Şah di cî de izin dayê, ew jî rabû û bi lez çû mala wê. Diya Hesên jî ji gava ku kurê xwe winda kiribû, di nava şîniyeke bêdawî de bû. Jê re goreke ji mermer di nava hewşê de çêkiribû û bi şev û roj li ser digiriya, hêsir dibarandin. Li ber wê gorê jî radiza. Gava ku Şemseddînê Wezîr hat ber deriyê wê, bala xwe dayê ku bi dilşewatî dibêje:

Tu bi Xwedêkî ey gora kurê min bibêje  
Gelo ew spehîbûna wî hîna jî wisa li cî ye?  
Hîna jî ciwanê weke berê hîna jî bedew e?  
Gorê tu ne bax î ne rez î ne werz î ne jî bostan  
Çawa ji te dertên ewqase gul û beybûn û rîhan?

Hîna ew di wî halî de bû Şemseddîn derbasî balê bû, silavek dayê û xwe pê da naskirin. Çîroka xwe jê re vegot, bûyera mana kurê wê Hesên, li cem keça wî, pevşabûna wan û wendabûna wî ya bi danê sibehê re. Piştî bihemilbûna keça wî ji kurê wê Hesên û zarokê ku Xwedê dayê û navê wî kirin ‘Ecêbo’ hemû jê re gotin. Gava jinikê bihîst ku kurê wê sax e û hîn bû ku ew zîlam tiyê wê ye, pê ve rabû û xwe avêt ber nigên wî ew maçî kir û bi dilxweşî di ber xwe de got:

Xwedê xeberek da min bi hatina we  
Mizgîniya herî xweş îro bo min ew e  
Heger ji min qebûl bikira minê dilek bidayê  
Ku ji roja çûna wî de her hilqetiya ye

Dûvre wezîr xeber ji Ecêbo re jî şand da ku were cem pîrika xwe. Ecêbo hat, dapîra wî ew himbêz kir, maçî kir û bi ser de giriya. Şemseddîn jê re got: “Ev ne dema girîye hurmet. Niha dema ku tu xwe amade bikî da ku tu bi me re were Misrê. Belkî Xwedê Teala li wir me tevan bigihîne hev û tu kurê xwe jî li wir bibîne.” Jinkê got: “Bilabe kekocan, va ez radibim, xwe amade dikim.” Gazî cariyeyên xwe kir. Ferman da wan ku amadekarîyê rêwîtiya wan bikin.

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA BÎST Û PÛNCEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Şemseddînê Wezîr, berî ku vegere warê xwe, çû cem Şahê Besrayê, xatirê xwe jê xwest û spasdariyên xwe jê re diyar kirin. Şah jî gelek diyarî û tiştên bi qîmet danê da ku bi xwe re bibe Misrê. Şemseddîn jî jinbira xwe da dût xwe, ligel neviyê xwe Ecêbo û xizmetkaran, dîsa bi şûn de vegeyriyan ber bi Misrê ve. Rê dirêj bû, li Şamê navber dan meşa xwe û konê xwe li Qabûnê vegirtin. Ji yê derdora xwe re jî got: “Em ê heftiyekê li vir bin da ku em hinek diyarî ji bo sultanê xwe bikirin, piştê em ê bi rê kevin.” Ecêbo jî li xizmetkarê xwe kir gazî û got: “Ka xwe amade bike, em biçin sûkê temaşê kin û binerin ka çi halê wî aşpêjê ku me xwarina wî xwar û serê wî şikand! Ciwamêro qenciyeke bi me kir, me jî serê wî şikenand.” Xizmetkar got: “Ser seran ser çavan begê min.” Rabû amedakarî kirin, piştê berê xwe dan nav bajêr û derbasî sûkê bûn. Bavê xwe nasnekira jî, dilê Ecêbo her bi ser Hesenê aşpêj ve bû, loma nigên wî jî ber xwe ve ew dibir dikana wî. Esra teng bû, Hesen jî li ser niga bû û wê rojê jî şêrîniya hinaran çekiribû. Çawa ku çavên Ecêbo lêket, hestiyar bû mîna ku mirovekî xweyî nêz dîtibe. Li ser çavên wî nihêrî, bala xwe dayê ku şopa birîna kevirê wî hîna di eniyê de xuyaye. Derbasî ba wî bu û jê re got: “Silav li we be! Ez zanim ku qedrê min li ba we heye!” Gava ku awirên Hesen bi Ecêbo ket, dilê wî lêda û kelecaniyeke mezin pêre çebû, xwe li ber tewand heta ku serê wî giha erdê. Xwest ku xêrtêhatinekê tê de bide lê devê wî negeriya. Piştî çend kêliyan serê xwe rakir û ev rist ji helbestekê xwendin:

Piştî xweragirtinek dirêj gava awir ketin çavan  
Şaş û matmayî mam zimansîkestî ez bê avan  
Bi dilgermî silav da, min ew pêşwaz kir bi çavan  
Û hewl da ku'z veşêrim her tiştî di xilcênavan  
Lê diyar e her tişt çawa dê veşêre ziman lalan?

Piştê ji herduyan re got: “Ka werin xwarina min bixwin û dilê min î birîndar bicebirînin, hûn bi Xwedê kin! Bi navê Xwedê yê şêrîn çiqasî ku ez li te dinêrim, ez ewqasî dilxweş dibim. Bawer bike ew cara ku ez li dût te hatim jî, bêhemdî min bû û ez ne li ser hişê xwe bûm.” Ecêbo got: “Rast e ku tu ji me hez dikî, lê me gepek nan li cem te xwar, hindik mabû ku tu me bihetikîne. Vêca tenê bi şertekî em ê bikaribin xwarina te bixwin. Sond bixwe ku tu li dût me dernakevî, wê çaxê em ê her roj bîn li ba te bixwin, heta ku heftêya me biqedê. Lew em ê heftiyekê li vir bin ji bo ku em hinek diyariyan ji sultanê xwe re bikirin.” Hesen got: “Bila weke we be, bi soz ez

nadim dîv we.” Ecêbo û xizmetkarê xwe derbas bûn cem, rûniştin. Her yekî ji wan taseke şêraniya hinaran da ber wan. Ecêbo jê re got: “Ka tu jî were bi me re bixwe, belkî Xwedê ferecakê xêrê li me veke.” Hesen pir kêfxweş bû û hersêyan tevde xwarin, heta ku têr xwarin û zikê xwe tijî kirin. Piştî rabûn ser xwe û bi lez vegeriya konê xwe.

Dayika Hesen çawa ku neviyê xwe dît ew himbêz kir û dîsa Hesen hate bîra wê, keserek veda û giriya. Piştî ji Ecêbo re got: “Tu li ku bû kurê min?” Got: “Ez li Şamê bûm.” Pîrika wî rabû ser xwe û jêre tasikek şêraniya hinaran anî danî ber. Ji xizmetkar re jî got: “Tu jî ligel begê xwe rûnê pêre bixwe.” Xizmetkar di dilê xwe de got “Ji xwe em têr in ez ê çawa bixwim!” Ecêbo jî têr bû û dilê wî nedîçû xwarinê, dîsa jî nanê xwe tê dakir û avêt devê xwe; dît ku şêraniya wê kême e neeciband û got: “Ev çi xwarin e qet nayê xwarin!” Dapîra wî got: “Ev çi ye kurê min, qey tu xwarina min naêcibîne? Ev xwarina ku ji bavê te pê ve tu kes nizane çêke weke min.” Ecêbo got: “Wile pîrkêcan xwarina te baş çênebûye, gava din li bajêr me heman şêraniya hinaran xwar, ji ya te xweştir bû. Bêhna wê dilê mirov lê vedikir ku mirov têr ba jî dilê mirov diçûyê, lê ya te bi ya wî re nayê qeyaskirin jî.” Gava ku dapîra wî ev gotin ji devê wî bîhist pir qeherî, li xizmetkarê wî meyzand û jê re got: “Naxwe te kurê min biriyê cem aşpêjên bajêr û te ew xera kiriyê.” Xizmetkar tirsîya û got: “Na welle em neçûne cem wan lê em di ber wan re derbas bûne.” Ecêbo got: “Na welle em derbasî cem wan bûn, me xwarin jî xwar û ji ya te jî çêtir bû.” Jinik rabû çû ji tiyê xwe re got û jê xwest ku bi xizmetkar de bixeyide. Wezîr gazî xizmetkar kir û jê re got: “Te çima kurê min biriyê cem aşpêj?” Rebeno hîn bêhtir tirsîya û got: “Na welle em derbasî cem aşpêj nebûne.” Ecêbo got: “Belê welle em çûn û me şêraniya hinaran xwar heta ku me têr xwar û me pê re vexwar jî heta ku em ji ser hişê xwe çûn.” Bêhna wezîr hîn bêhtir teng bû û ji xizmetkar re got: “Heger bi rastî jî hûn neçûbin cem aşpêj wê çaxê ka were bixwe.” Xizmetkar hat ser sifrê lê kir nekir nikarîbû bixwara. Gepa xwe ji dest xwe avêt, bi şûnde vekîşîya û got: “Begê min ez ji doh ve têr im û dilê min naçe xwarinê.”

Wezîr texmîn kir ku xizmetkar xwarin li cem aşpêj xwariye. Ferman da cariyên derdorê ku wî bavêjin erdê, piştî ew ket ser dilê wî û lêda heta ku qajeqaja wî gîha ezmanan. Dûvre navber dayê rawestîya û dîsa jê re got: “Rastiyê bibêje tê xelas bibî!” Got: “Ya rastî em derbasî dikana aşpêj bûn, me şêraniya hinaran li ba wî xwar heta ku em pê beêcîn. Xwedê jî dizane ku xwarin di ser wê re tunebûn. Ev xwarina han jî li gora wê pir xerab e.” Dayika Hesen bi vê gotina xizmetkar qeherî û got: “Misoger divê tu biçî cem wî aşpêjî û kasekê ji wê vexwarina wî bînî ji begê xwe re, da ku ew bi xwe bibîne bê kîjan xwarin xweş e.” Xizmetkar got: “Ez ê di cî de biçim bînim.” Zerikek xist destê xwe, rahişt nîv dînarî jî û bi lêz berê xwe da sûkê.

Hat cem aşpêj, jê re got: “Me şert avêt ber hev li ser xwarina te di mala begê min de, ji ber ku wan jî şêrînahiya hinaran çêkiribû weke te. Vêca ka ji me re bi niv dînarî kaseyekê tijî bike ez bibim da ku tam bikin. Xwedê zane bê min çiqase lêdan xwariye li ser vê xwarina te, îca tu me neke ber fediyê, bila baş be.” Hesên kenîya û got: “Bi navê Xwedê, ji min û diya min pê ve kes nizane xwarineke wisa çêbike.” Zerika wî ji dest girt, tijî kir û hinek gulav û misk jî bi ser dakir û da dest. Xizmetkar rahiştê û bi lêz berê xwe da malê. Çawa ku gîha malê, dayika Hesên zerik ji dest girt û tam kir, bi tam kirinê re di cî de tê derxist bê kê çêkiriye; qîrek da û bêhiş di cihê xwe de ket. Wezîr behetî ma ji wê rewşê. Av bi ser çavan de reşandin û rûyê wê firkandin, piştî qederekê bi ser hişê xwe ve hat û got: “Heger kurê min Hesên hîna li ser rûyê erdê be, wê gavê yê ku ev xwarin çêkiriye ew e. Lew ev xwarina wî ye û ji min û wî pê ve kes nizane wisa çêke. Lewre min bixwe ew ‘elimandiyê vê xwarinê.”

Gava wezîr ev gotina wê bihist pir kêfa wî hat û got: “Ax ji derdê dîtina wî! Gelo bextê me heye ku rojekê em wî bibînin? Hêviya me ji Xwedayê me ew e ku dîsa me bigihîne hev!” Piştî wezîr Şemseddîn di cî de gazî nobedarên xwe kir, bîst heb ji wan neqandin û ji wan re got: “Herin dikana wî aşpêjî serûbin bikin û wî bi şara wî girêdin û binin vir cem min, bêyî ku hûn tadeyekê bidênê.” Nobedarên wî gotin: “Em amadene begê min, hema em dikevin rê de.” Wezîr bi xwe jî xwe girêda, nameya ku berê sultanê Mîsrê jê re nivîsandibû xist destê xwe û berê xwe da cem hakimê Şamê, çû ew name xist destê wî de. Hakim rahişt kaxizê danî ser serê xwe, piştî maçî kir û jê re got: “Bêje mîrzayê min, kî ye ê ku tade li te kiriye.” Wezîr got: “Aşpêjek e.” Hakimê Şamê di cî de ferman da leşkerên xwe da biçin dikana wî aşpêjî û wî bigirin. Gava çûn dikana wî, bala xwe danê ku dikan xerakirîye û her tiştê tê de hatiye şikenandin. Berî ku wêzîr bigihêje cem hakim, zilamên wî xwe bi dikanê ve gîhandibûn, her tişt xera kiribûn û Hesên jî girêdabûn û bi xwe re biribûn bin kon, li benda vegera wî bûn. Hesên jî di dilê xwe de digot “Çi di wê şêraniya hinaran de dîtina ku ev tevde bi serê min de anîn gelo?”

Piştî ku wezîr izna girtina wî aşpêjî û birina wî bi xwe re ji hakimê Şamê stend, vegeriya malê û ji xizmetkaran re got: “Ka wî aşpêjî binin vir.” Gava Hesên anîn huzûra apê wî yî wezîr, giriya û lavlav li ber kir, got: “Ez dexilê te me mîrzayê min, qey çî gunehê min heye ku zilamê te ez girtime?” Wezîr jê re got: “Bi rastî jî tu ye yê ku ev şêrîniya hinaran çêkiriye?” Got: “Belê min çêkiriye, ma gelo tiştêkî serê mirov bide firandin tê de hebû?”

Wezîr gote wî: “Wê cezayê teyî sivik ew be.” Aşpêj got: “Begê min, qey ne ji ber sûcê min we ez girtime?” Wezîr got: “Belê û aniha ez ê cezayê te bidim te.” Piştî qîrek da xulamên xwe û ji wan re got: “Zû devan binin û



barê me barkin da ku em bi rê kevin.” Xulaman Hesên bi xwe re birin, ew xistin sindoqekê, deriye wê li ser girtin û ew avêtin ser piştê devê. Dûvre tiştên xwe tevde barkirin û ketin ser riya vegeerê. Gava li wan bû şev rawestîyan, bêhna xwe berdand, nan xwe xwarin û ava xwe vexwarin, ya Hesên jî danê, piştê ew dîsa xistin sindoqa wî de û rêwîtiya xwe berdeyam kirin. Gava ku careke din navber danê, Hesên jî sindoqa wî derxistin, anîn cem wezîr. Wezîr jê re got: “Yê ku ew xwarin çêkiribû tû bûyî?” Got: “Belê axayê min.” Wezîr got: “Wî dîsa girêdin û vegeerînin sindoqa wî.” Dîsa riya xwe berdeyam kirin heta ku gîhan Misrê. Li Zebedanîyê rawestîyan. Hesên jî sindoqa wî derxistin, wezîr jî ferman da got: “Herin necarekî binin! Bila listokeke textîkî çêbike.” Hesên got: “Hûn ê çi bikin ji listîka textîkî?” Wezîr got: “Ji bo ku ez te li çarmixê xim û pê ve bizmar bikim, piştê jî li nav bajêr tevî bigerînim.” Got: “Ji bo çi tê evqase bêwijdanî bi min re biki?” Wezîr got: “Ji ber ku te ew xwarina hinaran baş çênekiribû û te biharata wê kêmbû.” Hesên got: “Û ji ber ku biharata wê kêmbû tê vê bobelatê bi serê min de bîne? Qey girêdana di sindoqê de nebes e?” Wezîr got: “Ya rastî ji ber kêmaniya biharatê cezayê te divê kuştin be.”

Hesên ponijî, maðê wî xerabû, dile wî bi wî şewitî û li ser wan kêliyên dawîye yê jiyana xwe fikirî. Wezîr jê re got: “Tu li ser çi difikirê?” Got: “Ez li ser aqlê vala, mîna yê te difikirim. Heger aqil bi te re heba, ji ber kêmbûna biharatê te evqase zulm li min nedikir.” Wezîr got: “Divê em terbiyekê bidin te da ku careke din tu li vî karê xwe venegere.” Hesên got: “Tiştê tu bi min dikî tiştêk ji edebê tê de tune.” Wezîr got: “Misoger divê em te li çarmixê bixin.” Wisa di ber hev re avêtin heta ku şev kete erdê. Dîsa ew girêdan û birin xistin sindoqa wî de, Wezîr jê re got: “Sibe em ê te li çarmixê xin.” Piştê li ber wî ma heta ku di xew re çû. Dûvre sindoq bar kir, da pêşîya xwe û ketin nav bajêr, çûn heta ku gîhan mala xwe. Li wir ji keça xwe re got: “Subhan ji wî re yê ku em dîsa gîhandin hev! De ka rabe odeya xwe dîsa weke wê şeva ku kurê apê te ji cem te çû amade bike!”

Wezîr ew kaxeza ku berê ew tiştên wê odeyê tê de nivîsandibûn derxist û ferman da ku her tişt weke di kaxezê de hatiye nivîsandin dîsa bi cîh bibe, da ku yê bibîne bêje ev ode ya wê şevê bi xwe ye. Got: “Bila kofiya Hesên jî deynin wî cihê ku wî danîbû. Dîsa şerwal û destmal û tûrikê wî yê ku hezar dînar tê de, bila her tişt li cihê xwe be.” Ji keça xwe re jî got: “Xwe weke wê şevê girê bide û têkeve nav stareyê de, li ser textê bûkanîyê xwe palde. Gava ku kurapê te hat cem te, jê re bêje ‘Tu dereng ketî li qedemgehê canê min.’ û rê bidê bila ligel te rakeve heta serê sibehê.”

Piştê Wezîr çû Hesên jî sindoqî derxist û bêyî ku wî ji xew şiyar bike, qeyd û zîncîrên wî vekirin, kincên wî di ser re anîn û ew tena binkiraskê wî

hiştin û ew danîn qedemgehê. Gava bi ser hişê xwe ve hat û xwe di wî halî de dît, ji xwe re got “Gelo ev rastî ye, an kabûsên xewnan e?” Piştire rabû ser xwe meşiya heta bi deriyê duduyan, bala xwe dayê ku di wê mala dawetê de ye, ew mala ku Mîreka Spehîbûnê te de dîtibû û pê re raketibû. Li textê zavatiyê nerî, li kofiya xwe, şar û şerwalê xwe nerî, bala xwe dayê ku her tişt weke wê şevê bi xwe ye. Şaş û metal bibû, nema zanîbû bê wê çi bike çawa bike. Gavekê bi pêş de, yekê bi paş de diçû û xwêdana eniya xwe paqij dikir.

Çaxê gazî kir, bala xwe dayê ku qiraxa starê vebû û Mîreka Spehîbûnê xwîya kir! Keçikê got: “Begocan, tu pîr dereng ketî li qedemgehê.” Gava ev gotinên wê bihistin, li rûyê wê nerî û kenîya, di dilê xwe de got “Hebe nebe ev kabûsên xewnan e.” Dîsa jî ponijî û derbas bû balê, lê li wî halê xwe he-yirî mabû. Mîreka Spehîbûnê jê re got: “Tu çima ewqasî behetî maye, min fêm nekir. Tu roja ewilî qet ne wisa bû, gelo çi bi te hatiye?” Hesen kenîya û got: “Gelo tu dizanî bê ev çend sal in ez ji te dûr im?” Jinikê got: “Xwedê saxî û selametiyê bide dilocan, çi sal û çi hal, tu çûbû qedemgehê destavekê û vegere. Qey tişteke bi aqlê te hatiye Xwedê neke?” Hesen dîsa pê re kenîya û got: “Temam ez ji te bawer dikim lê gava ez ji cem te derketim, xewê zora min bir di qedemgê de, li wir min di xew de dît ku ez li Şamê bûme aşpêj û deh salan lê mame. Weke ku kurekî mezinan li wir hatibe cem min ligel xizmetkarê xwe...” û her wiha ew çîrok heta dawî jê re rave kir. Piştire destê xwe di ser eniya xwe re bir, destê wî li şûna birîna kevrê ku wî kurikî tê werkiribû ket. Wê gavê axaftina xwe berdewam kir û got: “Wille xanima min, weke ku ev tiştên ez dibêjim rasteqîn bin ne xewn, lew şûna kevirê wî zarokî, hîna di eniya min de ye.”

Hinekî bêdeng bû, piştire dîsa axivî û got: “Belkî gava me hevdû himbêz dikir, min ew xewn dîtibe ku ez tê de diçûm Şamê bê kofi û desmal, bê kinc û pêlav, tena binkiraskê xwe û li wir ez bûbûm aşpêj.” Demeke dirêj dîsa bêdeng bû, piştire berdewam kir û got: “Wille xanimcan, ji min re wisa tê weke ku min li wir şêrinîya hinaran a bê biharat çêkiribe.” Mîreka Spehîbûnê lê vegerand û got: “Tu bi Xwedê kî te çi dît di wê xewnê de?” Hesen çî dîtibû hemû jê re got, weke ku ta bi derziye veke ji serî heta binî anî ziman. Piştire got: “Bi Xwedê ku ew xewn neqediyaya, wê ez li çarmixê xistama û ez bikuştama.” Jinê got: “Ji bo çi?” Got: “Ji ber kêmaniya biharatê di şêranîya hinaran de. Hîna li ber çavên min e bê çawa êrişî dikana min kirin, xera kirin û her tiştê min şikenandin. Piştire jî ez xistim sindoqekê û ez bi xwe re birim. Carekê gazî necarekî kirin da ku çarmixekê lidarxin, min pê ve bizmar bikin û bikujin. Vêca Xwedê kir ku ew tevde di xew de bû û ne bi rastî bû.” Mîreka Spehîbûnê kenîya û bi herdu destan ew himbêz kir, wî ji ew himbêz kir, dûvre tişteke hate bîrê, got: “Bi navê Xwedê weke ku her tişt bi rasteqînî be qewimî, min tu tişt ji rastiya vê mijarê fêm nekir.” Hesen bi

wî hişê xwe yê tevlihev ket xew de. Heta ku di xew re çû jî ew gotinên xwe dúbare dikirin; geh dîgo xewn bû, geh dîgo rasteqînî bû.

Roja din sibehê Şemseddîn derbasî cem wî bû, silav lê kir û li halê wî pirsî. Hesen lê meyzand, piştîre got: “Tu bi Xwedêkî ne tu bûyî yê ku emrê xerakirina dikana min da û ez kelemçe kirim, avêtim nava sindoqekê ji ber kêmbûna biharatê di şêrîniya hinaran de!” Wezîr got: “Biner kurê min heqî û rastî derket holê û çî tiştê ku veşirtîbû derket ber çavan, xuya kir. Tu kurê birê min î û min jî ew tevde bi serê te de anî ji bo ku ez dilê xwe têxim cî de û baş bizanibim ku tu yê wê şeva daweta keça min bûyî. Gava ku te mal nas kir, kofîya xwe, şerwal û desmala xwe, zêr û dînar û kaxezên xwe yên ku te bi xwe nivîsandibûn tevde naskirin, min tê derxist ku tu ew zîlam bi xwe bûyî û dilê min jî ket cî de. Ji xwe min dîya te jî ji Besrayê bi xwe re anîye vir.” Piştîre xwe avêt birazîkê xwe û bi ser de girîya. Gava Hesen ev gotin ji devê apê xwe bihîstin, şaşomaşo bû, kelogirî bû û xwe avêt himbêza wî, ji kêfan hêsir barandin.

Wezîr jê re got: “Biner kurê min, sebeba wê eziyetê tevde gengeşîya ku di navbera min û bavê te de derketibû.” Çî tiştê ku di nav herduyan de derketibû ji birazîkê xwe re got. Sebeba çûna Nûreddînê birayê wî bo Besrayê jî jê re got. Piştîre gazî Ecêbo jî kir, ew anî gel bavê wî. Dema çavên Hesen lê ketin, got “Ev bû yê ku kevîr li serê min xistibû.” û pê re jî xwe bi ser de avêt bi hestiyarî û got:

Giriyam ez li ser firaqa sal û serdeman  
Ne hêsir man di çavan de ne rehê avan  
Dîsa jî hebû hêviya min bi Xwedan  
Lew vekir wî Yezdanî ji min re rêyek  
Ewqasî dilxweş im ez îro ku digirîm ji kêfan

Piştîre diya wî lê zîvirî, xwe bi ser de avêt, ew himbêz kir û wê jî ev çend beyt gotin:

Feleka xayîn herdem kaniya êşa ne ew  
Lehî rabû ji hêsrana dîsa bêfedî ye ew  
Lê şensê min lê tê ku hezkirî li virin îro  
De ka rabe kaniya kenê min serî rake îro

Dûvre, diya wî jî her tiştê ku piştî wî qewimîbû jê re vegot, Hesen jî yê xwe jê re vegot, êş û azarên ku dîtîbûn ji hev re anîn zîman û dawiyê jî spasiya xwe ji Xwedayê xwe re diyar kirin ku ew dîsa gihandin hev, piştî ewqase sal.

Roja dîtirkê wezîr çû cem sultanê xwe û çî hatîbû serê wî, hemû jê re

vegot. Sultan behetî ma li vê çîroka ecêb û ferman da bûyernûsan ku vê qewimînê binivîsin û bikin dîrok da ku bibe îbret ji hineke din re. Wezîr ji jiyana xwe bi bextewarî buhurand bi keça xwe re, bi kurê birê xwe re, neviyê xwe û jinbira xwe re, di nava xweşî û şahiyê de, heta ku xweşikuj û cûdakarê malbatan li wan rast hat.

Dawî gava Wezîr Cafer got: “Vêca mîrê bawermendan, tiştê ku bi serê Şemseddîn û Nûreddîn de hat ji ev bû.” Harûn Reşîd got: “Ev tiştêkî pir sosret e.” Lewre gelek mal û mulk ji cem xwe dan wî ciwanî û mehmizek ji jê re eyar kir.

*Dema çîrok qediya Şah Şehriyar got: “Ev çîrokek pir ecêb bû.” Şehrezadê got: “Tu ji vê çîrokê re dibêji ecêb e, de êdî ku tu çîroka ‘Terzî û Xûzik û yê Cuhû û yê Fileh’ bibihîzî tê çi bibêji gelo?!” Şah got: “Vêca çîroka wan çawa ye?”*

HEZAR Ū YEK ŐEV

CILD II



## (ÇÎROKA TERZÎ Û XÛZO Û YÊ CIHÛ Û YÊ FILEH)

*Şehrezad axivî û got:*

Şahê min ê bextewar! Ez têgihîştim ku di zemanekî kevnar de, li welatê Çînê terziyekî maldar hebû ku ji kêf û lîstikê hez dikir. Carinan ew û jina xwe bi hev re derdiketin seyranê, diçûn temaşekirina deverên erjeng û ne ji rêzê. Rojekê dîsa ji mal derketin û ber êvarkî vegehiyan malê, bi rê de li zilamekî xûzik rast hatin ku bi timtêla xwe mirovên qeherî jî dikenandin, derdên wan bi wan didan jibîrkirin. Di wê navberê de Terzî û jina xwe ber bi Xûzo ve çûn û lê temaşe kirin. Piştî jê xwestin ku bi wan re biçê malê. Gava hatin malê, Terzî ji nû ve derket çû sûkê ku êdî şev jî ketibû erdê. Xwarin danîn ber Xûzo û ew jî li ber rûniştin, şîva xwe bi hev re xwarin. Jina Terzî rahişt gepeke mezin ji goştê masî, xist devê Xûzo û kefa destê xwe danî ser devê wî û fersend neda wî ku bicû jî. Xûzo jî ew gep daqurtand, lêbelê strîyekî mezin di nav wî goştî de hebû ku di qirikê de ma û ew fetisand, mir.

*Dîsa li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birî, deng jê bilya.*

## ŞEVA BÎST Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min î bextewar, tê gotin ku gava jinikê gepa xwarinê da Xûzo û ew jî pê fetisî, mir, Terzî ji xwe re got: “Ya Rebî ya Îlahî ez ê çi bikim! Qey qedera vî belengazî li ser destê me bû ku wisa bû?” Jina wî xwe nema girt ji ber wê bêçaretiya wî û jê re got:

Tu çima wisa bêhelwest î? Qey te nebihîstiye ku helbestkarekî gotiye:

Çima bi kul û derd im îro ez  
Li ser wehm û xewn û xeyalan  
Çawa li ser agir dinivim ez  
Û ew bi qasî bişewat e agirê rivînan

Mêrê wê jê re got: “Ma ez dikarim çi bikim xatûn?” Jinikê lê vegehand û got: “Wî hilde hembêza xwe destmalekê bavêje ser wî û bide dûv min da ku em îşev derkevin, wî ji mal derxînin. Gava ku hinekan ji te pirsî jî, ji wan re bibêje: Evê di hembêza min de, kurê min e û eva han jî dayîka wî ye; ez kurê xwe dibim ser hekîm, da ku wî derman bikim.”

Gava ku Terzî ev gotin bihîst, rabû ser xwe, Xûzo hilda hembêza xwe

û da dûv jina xwe, ji mal derket. Bi rê de jina wî her car lê vedigeriya û bi dengêkî ku bête bihîstin ji Xûzo re digot: “Saxî û selametiya te be kurê min, qey ku dera te têşe?” Yên ku li wan rast dihatin, digotin belkî kurê wan gurî bûye.

Herdu bi wî hawî meşiyên heta ku hatin cem mala hekîmekî Cihû. Li derî dan, cariyeye reşik ji wan re derî vekir. Li wan temaşe kir, pişt re got: “Xêre înşelle!?” Jina Terzî lê vegerand û got: “Nexweşekî meyî hûrik heye, em dixwazin ku hekîm lê binêre. A ev ji te re ribek dînar, bide mîrzayê xwe û gazî wî bike ji bo were li kurê min binêre.

Cariyeyê da pêşiya wan, ew derbasî hûndur kirin û çû hêla din ji bo ku gazî hekîm bike. Di wê navberê de hevsera Terzî ji mêmê xwe re got: “Ka em meytê Xûzo li vir deynin û bi şûnde birevin, xwe xelas kin.” Terzî bi ya jina xwe kir, Xûzo ji hembêza xwe danî ser mînderekê û piştta wî da dîwar, ligel jina xwe herdu bi hev re ji wir derketin, çûn.

Cariyeyê çû ji hekîm re got: “Mîrzayê min jinek li hêwanê ye, kurê xwe yê nexweş aniyê, dibêje bila hekîm lê bimeyzîne û vaye ribek dînar heqê mûayeneyê jî daye min ji bo ku tu derman jê re binivîsinî.”

Çawa ku yê Cihû çav li diravan ket, kêfa wî hat û bi lez rabû ser xwe û di wê tariyê de xwe bera jêr da. Li hêwanê nigê wî li meytê Xûzo aliqî Xûzo li erdê ket, bi şûn de lê vegeriya, bala xwe dayê ku Xûzo miriye. Pir tirsîya û di dilê xwe de got: “Xwelî li serê min be! Bêhemdê xwe ez li vî nexweşî qelîbîm, rebeno li erdê ket, mir! Îcar ez ê çawa vî mirîyî ji mala xwe derxînim?”

Hekîmê Cihû, rahişt termê Xûzo û derket hewşê, rewşa qewimî ji jina xwe re got û di cihê xwe de rûnişt, ponijî. Jina wî pêde xeyidî û jê re got: “Heger heta sibehê tu wisa rûniştî bimînî di cihê xwe de, dê mala me xira bibe. Ka rabe em herdu wî bibin ser ban û ji wir ve, wî bi ser hewşa cîranê xwe yê Musulman de berdin. Jixwe ew seraşpêjê Şah e, her roj pisîk dikevin mala wî de û goşt û moştê wî dixwin. Heger şevêk tenê jî di ser re bibihûre, wê gavê dê kûçik jî di ser ban re bikevin hundur û tiştêkî têde nahêlin.”

Hekîm û jina xwe, rahiştin termê Xûzo, ew birin ser ban û bi çepê wî girtin, di ber qorsiya dîwêr re ew bi erdê re berdin, heta nigê wî gihan erdê û ew jî bi qorzîka dîwêr ve zeliqî ma. Ew jî ji ser ban daketin, bi şûn de çûn.

Seraşpêjê Şah jî, di wextê xwe de vegeheriya malê. Rahişt çira xwe û derbasî hewşê bû, bala xwe dayê ku mirovek di qorzîka mitbexê de li ser niga ye! Di dilê xwe de got: “Ev kî ye, ev çi ye gelo? Hebe nebe ew dizê mala me



ye! Bi navê Xwedê ez qira pisîk û kûçikên taxê bînim jî, dê ev segbav diziya rûn û goştê mala min bike. Diyar e ev zilam di ser ban re xwe bera hewşa min dide.”

Seraşpêj rahişt gurzekî û bi hêrs, derbek li serê wî da, ew li erdê dirêj kir. Çû ser laşê wî, lê meyzand, bala xwe dayê ku miriye! Xemgîn bû, tirseke mezin ket nav dilê wî û ji xwe re got: “Ne bi xêr û ne bi ehla be û ne jî ev goşt û dohnê ku ez îşev li ser êşiyam ku hişt mirina vî zilamî li ser destê min be!” Piştî, careke din xwe bi ser de daqûl kir, lê meyzand, dît ku ew zilam Xûzo bi xwe ye! Bi dengê hêdî di ber xwe de got: “Piştî te ya qemborî ne besî te bû, îcar te diziya rûn û goşt jî dikir?”

Derengî şevê, ew hilda ser piştî xwe û ji malê derket, ber bi sûkê ve çû. Di qorzîka sikakekê de ew li ber deriyê dikanekê danî erdê, piştî wî sipart dîwêr û xwe ji wir da alî û çû.

Di wan kêlikan de, simsarekî Fileh ji simsarên Şah di wir re dihat. Pir mey vexwaribû, serxweş ketibû, dixwest ku biçê avzêgehê, xwe di nav avê de bide, ji bo ku bi ser hişê xwe were. Çep û rast dilewlihî û bi rê ve diçû. Gava giha hinda wê dikanê û çavên wî li Xûzo ket, hêrs bû û di dilê xwe de got: “Hebe nebe ew ê ku çend seet berê kumê min dizîbû, ev e!” Qîrek da nehtorê sûkê, piştî bi hêrs xwe zer kir wî, bi herdu milên wî girt, piştî wî da erdê û bi kulma û şeqama ket ser dilê wî de. Piştî herdu destên xwe xistin qirika wî de, ji bo ku bifetisîne.

Gava nehtor pê ve hat û dît ku mirovê Fileh di ser zîkê yê Musulman de ye û lê dide, jê re got: “Ji ser dilê wî rabe!” Simsar rabû ser xwe, dev jê berda, nehtor li Xûzo meyzand, bala xwe dayê ku mêrik miriye! Ji xwe re got: “Çawa mirovekî File yekî Musulman dikuje!?”

Nehtor, mirovê File hilda binçavan, destên wî girêdan û ew bir cem walî. Kesê File jî di dilê xwe de ji xwe re got: “Xwedêyo! Bi heqê Îsa û Meryema pîroz be, min çawa tiştêkî wisa kir û çawa ev zilamê hanê bi çend şeqaman mir, jiyana xwe ji dest da?” Êdî hişê wî jî hatibû serê wî û şaşîtiya xwe dîtibû.

Ew destgirêdayî birin cem Walî û rewşa wî jê re diyar kirin. Walî xelk kom kirin û biryara mirinê di derheqê wî de da, piştî gazî leşkerên xwe kir da ku Simsarê Fileh li raserî girseyê bidarvekin. Celad ben xist stûyê wî de ji bo ku wî hildin sêdarê. Di wê keliyê de Seraşpêjê Şah ji nav xelkê derket û ber bi sêdarê ve hat, ji yê celad re got: “Vî mirovî nekujin, kujerê rastî ez im!” Walî jê re got: “Te çima ew kuşt?” Wî jî got: “Şeva borî gava ez vege-

riyam mala xwe, min dît ku Xûzo di ser banê cîranan re, xwe bera hewşa min daye, ji bo ku dizîya min bike. Min jî gurzek li serê wî da, ew jî ket erdê û mir. Ji tirsan, min jî ew avêt ser milê xwe û ew ji malê derxist, bir sûkê, li ber dikanê min ew danî û ez çûm. Vêca besî min e ku min Musulmanek kuştiye, bila Fileyek jî li ser rûyê min neyê kuştin. Kujerê rasteqîn ez im û yê ku darvekirin jî heq kiriyê ez im!”

Gava ku Walî ev gotin bihîstin, mirovê File serbest berda û ji celad re got: “Ka evê ku li xwe mukur hatiye bi dar veke!” Celad, ben xist stûyê Seraşpêj de û ew bir ber sêdarê ji bo ku wî daliqîne. Lê di wê kêliyê de Hekîmê Cihû ji nav girseyê derket, xwe da pêş û gazî celad kir, jê re got: “Wisa meke, kujerê rastî ez im! Ev kuştiyê han şeva borî hatibû mala min ji bo ku ez wî derman bikim. Di reşê de ez pê ve daketim hêwanê, lingê min lê qelibî, ket û mir.”

Li ser vê mukurhatina wî, Walî ferman da ku celad Seraşpêj berde û mirovê Cihû li dewsa wî bi dar veke. Celad ben ji stûyê Seraşpêj derxist, xist stûyê Hekîmê Cihû de da ku wî daliqîne. Lê belê di wê kêliyê de girse li bin guhê hev ket û mirovê Terzî ji nava wan pengizî, ber bi celad ve hat û jê re got: “Neheqiyê li vî zîlamî meke! Kujerê rastî ez im! Doh êvarkî, di rêya vegeerê de, ez li vî mirovê xûzik rast hatim. Serxweş bû û defa wî di destê wî de bû, bi kêf û eşq lêdida, distira. Ez lê sekinîm, min qasekî lê guhdar kir, piştî min hinek masî jî kirîn û ew bi xwe re bir malê, da ku bi me re şîv bixwe. Di şîvê de, jina min gepek nan û hinek masî di devê wî rakir, ew jî di cî de ket erdê û mir. Rabû min û jina xwe me rahiştê, ew da ber hambêza xwe û ew bir mala yê Cihû. Cariyeya wî hat derî ji me re vekir, em derbas bûn hêwanê, min ribek dînar dayê û jê re got: ‘Here ji mîrzayê xwe re bibêje vaye nexweşek hatiye cem te, dixwaze bi lezginî derman bibe.’ Cariye derket jor ji bo ku mîrzayê xwe agahdar bike, min jî Xûzo danî hêwanê, piştî wî da dîwêr ber derencê û bi lez em ji wir derketin. Nexwe çawa Hekîm xwe di derenceyê re berjêr ve berdaye, lê qelibîye, ew jî ketiyê erdê. Loma rebeno dibêje min ew kuştiye.” Terzî li Hekîmê Cihû zîvirî û axaftina xwe berdewam kir û got: “Ne wisa ye pismam?” Wî jî got: “Belê.” Terzî li Walî zîvirî û bi lavekerî jê xwest ku yê Cihû berde û wî bi dar veke.

Walî matmayî ma li vê rewşê û got: “Ev mijar pir erjeng e û divê bête tomarkirin û bikeve nav pirtûkan, da ku bibe dîrok.” Piştî li celad vegeerîya û jê re got: “Mirovê Cihû berde û yê Terzî li şûna wî bi dar veke!” Celadê reben jî şaşo maşo bû û bînavber ben ji stûyê yekî derdixist, dixist stûyê yê din.

Vêca em vegeerîya ser Şah ku ew mirovê xûzik qirdikê wî bû û herdem

li balê bû, sebra xwe pê tanî. Ji ber ku Xûzo wê êvarê pir mey vexwaribû û serxweş ketibû, nexwestibû ku wê şevê derkeve hizûra Şah û şevêkê dûri wî mabû.

A dinî rojê gava ku bû sibe û hetanî nivro jî Xûzo xuya nekir, Şah ji zîlamên xwe pirsî û got: “Ka ew qirdikê min li ku ye?” Zîlamên wî jê re gotin: “Ezbenî wî meytê wî birine cem Walî, Walî jî her ku kujerekî wî derdixîne holê û hewl dide ku wî bi dar veke, yekî din derdikeve holê û dibêje ‘Kujer ne ew ê di nav lepên we de ye, ez im kujerê wî yê rastî’ û her yek jî cûda cûda sebebên xwe jê re rave dikin.”

Gava ku Şah ev gotin bihîstin, bi ser xizmetkarê xwe de qîriya û jê re got: “Here cem Walî, bila wan tawanbaran gişan bîne û were vir.” Xizmetkar, bi lez çû cem Walî û dît ku celadê wî kindir xistiye stûyê yekî jî stûyê tawanbaran. Di cî de qîrek li celad kir û jê re got: “Raweste!”

Piştî Walî mijar ji girseyê re rave kir û ji wan re got ku mesele heta bi ber destê Şah çûye û êdî wê darizandin li ber destên wî berdeham bike. Pê re jî rabû ser xwe, mirovê Terzî, Sîmsarê Fileh, Hekîmê Cihû û Seraşpêj dane dûv xwe, ligel meytê Xûzo berê xwe dan qesra Şah. Walî hat hizûra Şah, bejna xwe li ber tewand, erd li ber nigê wî maç kir û çîroka wan tawanbaran ji serî heta binî jê re vegot. Gava ku Şah ew çîrok bihîst, ma ecêbmayî! Ferman da nivîskaran ji bo ku wê çîrokê bi ava zêr binivîsin. Piştî li girseya derdora xwe zîvirî û got: “Kê ji we çîrokek di vê astê de erjeng bihîstiye?”

Mirovê Fileh, xwe da pêş û got: “Ey Şahê Zemanan! Heger destûra te hebe ez ê çîrokekê ji te re bibêjim ku bi serê min bi xwe hatiye û gelekî erjengtir e ji çîroka evê xûzik!”

Şah jê re got: “Hela ka bibêje, em bibînin bê çi li ba te heye?”

### **(Çîroka Sîmsarê Fileh)**

Sîmsarê Fileh got:

Şahê ezîz; ez bi xwe ji Qîptiyên Misrê me. Ez li wir çêbûme û li wir jî mezin bûme. Bavê min jî mîna min sîmsar bû. Gava ez kamil bûm, bavê min çû ber rehma Xwedê û min jî karê xwe berdeham kir, ez jî bûm sîmsar. Rojekê ez li xortekî lihevhatî û çê rast hatim ku li kerekî siwar bû û kincên xweşik lê bûn. Hat gel min û silavdayîneke germ da min. Ez jî pê ve rabûm û min rêz û hurmeteke baş jê re girt. Destmalek ku hinek kuncî di nav de bûn derxist û ji min re got: “Irdibek ji vana bi çiqasî ye? Min jê re got: “Bi sed

derhemî ye.” Ji min re got: “Van kunciyan ji destê min bigire, bifiroşe û pişt-re were Bab-in Nasar, li Xana Cemalî, ez ê li hêviya te bim.” Min kuncî giş ji dest girtin û ew birin cem dikandaran, irdiba wan bi sed û bîst derheman da, ew firotin û ez vegeyiam Bab-in Nasar, min dît ku va ye li wir, li hêviya min e. Dema ku wî ez dîtîm, mexzena xwe ji min re vekir û kunciyên li ba xwe, hemû tev kêlandin ku pêncî irdib derketin û dane min. Pişt-re ji min re got: “Van jî bifiroşe û bila serê her irdibekê deh derhem ji te re bin; heqê simsariya te. Bila malê min jî li ba te be heta ku ez karê xwe biqedînim. Wê gavê ez ê li te vegerim û pereyên xwe bibim. Jixwe hemû pêncezar dirhem digire ku pêncsedê wî dê yê te be û yên mayîni jî malê min be.” Min jî tekîfa wî qebûl kir û jê re got “Bila be.” û bejna xwe li ber tewand. Wê rojê hezar dirhem ji min re ma. Piştî mehekê li min vegeyia û got: “Ka pereyên min!” Min jê re got: “Vane amade ne!” Got: “Bila niha li ba te bin, li vegeê ez ê bê wan bibim.” û çû. Ez meheke din li bende wî mam heta ku hat û ji min re got: “Kanî wan dirheman!” Min got. “Ser seran û ser çavan, de ka kerem bike were mala min em firavînekê bi hev re bixwin!” Lê wî ev vexwendina min nepejirand û got: “Bila vê carê jî pereyên min li ba te bin heta ku ez herim û dîsa werim.”

Ez mehek din jî li hêviya wî mam heta ku ew ciwamêr dîsa li min vegeyia bi cil û bergin hin xweşikîr. Min herdu destên wî maçî kirin û jê re got: “Mîrzayê min! Qey êdî tu pereyên xwe nabî?” Got: “Lezê li min neke, ka xwe ragire heta ku ez kar û barê xwe bibim serî.” Pişt-re jî rabû ser xwe û çû. Min jî di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê ku vê carê li min vegere, ez ê pir qedir û qîmetê wî bigirim.” Ji ber ku min gelek pere ji xwe re qezenc kiribûn bi pereyên wî.

Dawiya salê, dîsa li min vegeyia ku vê carê al û bergên li ser wî ji cara berê spehîtir û kubartir bûn. Min sûnd pê da xwarin ji bo ku vê carê li cem min bibe mêvan. Wî jî mazûbantiya min pejirand lê bi şertê ku çî mesrefa hebe ji pereyên wî be. Min jî got “Bila be.” Min şertê wî qebûl kir û ew derbasî mala xwe kir. Min xwarin û vexwarin jê re amade kir û sifreyeke zengîn li ber wî raxist. Pişt-re min ew dawetî ser sifreyê kir. Bismillahek kişand û destê xwe yê çepê dirêjî xwarinê kir ku vê yekê bala min kişand û ez behetî hiştîm! Gava ku xwarina xwe qedand, destê xwe şûst, min jî destmalek dirêjî wî kir da ku destê xwe pê zuha bike. Pey wê, em ketin nava gotûbêjeke dûvdirêj de. Min jê re got: “Mîrzayê min, ji kerema xwe re li min were rehmê û ji min re bibêje bê çima te bi destê çepê xwar, da ku ez ji vê mereqa xwe ya kujer xelas bibim! Ango nebe ku Xwedê neke êşek-mêşek di destê teyî rastê de hebe?”

Gava ku ew axaftina min bihîst, çend rist ji helbestekê xwendin û got:

Hogiro mepirse tu îro li min  
Mepirse li razên dilê min  
Da ku diyar nebin kulên min  
Ne bi dilê xwe'z veqetiyabûm lew  
Ji Selma ji mehbûba dil ew  
Veqetan bi zor û kotanê bû ew

Piştire, zendika şapikê xwe berjor ve kişand û destê xwe yê jêkirî şanî min da. Ez jî behetî mam! Wî got: “Behetî nemîne ku min bi destê çepê bi te re xwarin xwariye, ji ber ku ecêba mezin di sebeba destjêkirina min de ye.” Min jê re got: “Ew çi sebeb e?” Got: “Ez bexelayî me û bavê min ji mîrekan e. Gava ez mezin bûm, kamil bûm, min bihîst ku gelek tacir, seyranvan, rêhez û gerok, behsa welatê Misrê dikan. Ew yek ji min re bû kul û ket ser dilê min de, heta ku bavê min çû ser dîlovaniya Xwedê. Wê gavê min kerwanekî tîcaretê amade kir, ji qumaş û cawên mûsilî û ji Bexdê ez ketim rê de, min berê xwe da Misrê. Bi saxî û selametî ez bi rê ve hatim, heta ez giham bajarê we.” Piştî vê gotina xwe giriya û bi helbestî ev çend rist gotin:

Dibe ku korek xwe bisitirîne  
Ji kortaleke ku xwedîçav dikevênê  
Ango nezaneke xwe bistirîne  
Ji gotinek ku zana pê diçin helakê  
Ango bawermendek her bê debar be  
Li rex kafirê di nava xweşiyê de

Piştî xwendina wan ristan, hêsirên xwe paqij kirin û axaftina xwe berdewam kir, got: Ez derbasî Misrê bûm û ez hatim li Xana Mesrûr bi cih bûm. Min barên xwe danîn û çend dîrhem dan dest xulamêkî, da ku biçê xarinekê ji min re bikire, bîne û ez jî hebekî raketim. Dema ku ez ji xewê şiyar bûm, dîsa ez çûm navbera herdu qesran; dûvre, ez dîsa vegeyriyam xanê û careke din ez raketim, min şeva xwe li wir qedand. Çawa ku bû sibe, min topek ji qumaşê xwe vekir û ji xwe re got “Ka ez herim sûkê, şensê xwe biceribînim.” Min çend top qumaş da ser piştê çend xulaman û ez çûm heta sûka sergirtî ku jê re digotin Qeyseriya Circis. Li wir simsarên ku bi hatina min hesiyabûn, ez pêşwazî kirim û rahiştin qumaşên min, ew dane ber bazarê. Lê belê kesî bi qasî buhaya qumaş bi xwe jî, pere tê de nedan. Şêxê simsaran ji min re got: “Begê min, ez rêyekê dizanim ku fêdeya te tê de hebe. Tu jî mîna tacirên dîtirkê malê xwe, di hizûra şahid û serrafekî de bi deyn bide û her roja duşem û pêncşemê behrekê ji pereyên xwe bigire. Bi vî hawî, tu dê serê derhemekê yekî din qezenc bikî û di wê navberê de tê têra xwe jî li Misrê bigere û Nîla wê temaşe bikî.” Min jî got: “Ev tiştêkî rast e.” Min mezinê simsaran bi xwe re bir û ez vegeyriyam Xana Mesrûr; min malê xwe tevde ji wir bar kir, anî sûka sergirtî û hemû firot tacîrekî. Piştî ku min bawernameyek pê da îmzekirin, di hizûra seraf û noterekî de.

Dûv re, ez vegeriyam xana xwe û min xwe li bendî teqşîtên pereyên xwe ragirt. Her sibeh, min xurîniya xwe bi qedehêk mey dişkand, piştê jî min goştê sor tanî, dibiraşt û şêranî bi ser de dixwar. Bi wî hawî min rojên xwe derbas kirin heta ku dema teqşîdê dihat. Her duşem û her pêncsem jî ez diçûm li dikanên taciran rûdiniştim, seraf û noter jî diçûn behra min ji pereyan tanîn û didane min. Jiyana min wisa berdewam kir, heta rojekê ku ez çûm hemamê û ji wir jî ez derketim, çûm Xana Mesrûr, derbasî cihê xwe bûm. Sibehê, bi qedehêk mey re min taştêya xwe xwar û ez raketim. Piştê ez şiyar bûm, min mirîşkeke heşandî xwar. Dûv re min kincên xwe li xwe kirin û bêhneke xweş bi xwe dakir û ez çûm dikanêk tacîrêkî ku navê wî Bedredîn ê Bostanî bû. Çawa ku çavên wî li min ketin, xêrhatîneke germ di min de da û bi qasî saetekê bi min re sohbet kir.

Wê kêlikê jinek hat û li kêleka min rûnişt ku şara serê wê xwar bû û bêhneke xweş jê difûriya. Wê jinikê hişê min ji serê min bir bi xweşîkbûna xwe, gava ku rûpoş ji ser rûyê xwe da alî û çavên wê yên reş ketin yên min de! Silavek da Bedredîn, ew jî ji ber rabû û pê re mijûl bû. Bi guhdarkirina axaftina wê re, agir bi dilê min ket, ji Bedredîn re got: “Perçeyek caw bide min ku ji zêr hatibe hûnandin.” Bedredîn cawek derxist, da destê wê. Ew jî rabû ji Bedredîn re got: “Gelo ez dikarim vî cawî bibim û piştê heqê wî ji te re rêkim?” Tacir jê re got: “Wile ev yek ne gengaz e, xanima min; ji ber ku deynê xwediyê wî li min e.” Jinikê got: “Ev çi ye êdî? Tu jî dizanî ku ez her car perçeyekî bi çend dîrhemê dibim û piştê ez sê qatên wî ji te re dişînim.” Zilam got: “Ew jî wisa ye, lê ez îro mecbûr im ku heqê wî pêşî bigirim û dûvre bidim te.” Jinikê rahişt perçeyê caw, bi ser de avêt û got: “Hûn qedrê kesî nizanin!” Pêre jî, rabû ser xwe û berê xwe da derî ku derkeve. Wê gavê min got qey rihê min jî pêre diçe. Ez rabûm ser xwe, min ew da rawestandin û jê re got: “Xatûna min, rehmê li min bike bi nêrînekê û çend gava bi şûnde vegere, ji kerema xwe!” Jinik beşîşî û bi şûnde vegeya û got: “Ez ji bo xatirê te vedigerim!” Vegeriya û hat li hemberî min rûnişt. Min ji Bedredîn re got: “Buhayê wî cawî bi çiqasî ye? Got: “Hezar û sed dîrhem e.” Min got: “Bila sed jî kara te be, kanî kaxezekê bide min da ku ez senedekê bi hezar û dused dîrhemî ji te re binivîsinim.” Min bi destê xwe jê re nivisand û îmze kir. Piştê, min ew caw jê stand da destê jinikê û jê re got: “Cawê xwe bibe û here! Heger tu bixwazî, piştê heqê wî bine û li sûkê bide min û tu nexwazî jî bila diyariya min be ji te re.” Wê jî got: “Xwedê xêra te binivîsîne û rizqê te fireh bike, te bike stûna min!”

Wisa bû ku Xwedê duaya wê qebûl kir. Min jê re got: “Xanima min, bila ev caw ê te be û ez ê perçeyekî din jî li ser wî bidim te, tu jî tenê bihêle ku ez ji xwe re li rûyê te binêrim.” Bi ya min kir û rûpoşa xwe daxist. Gava ku min li rûyê wê meyzand, hezar axîn bi nava min ket, dilê min ma pê ve

û hişê min ji serê min çû. Rûpoşa xwe dîsa da ber çavên xwe, rahişt perçeyê caw û ji min re got: “Bêriya min meke begê min!” Piştî rabû çû.

Ez li sûkê mam hetanî piştî esir, lê heta wê gavê jî hişê min nehatibû serê min û min xwe ji evîna wê rizgar nekiribû. Gava min dît ku bêyî wê hedana min nayê, min ji tacir pirsî; wî jî got: “Ev jineke maldar e. Keça mirovekî maldar bû ku gava çû ser dilovaniya xwe, mal û milkekî baş jê re hişt.”

Min xatir ji tacir xwest û ez dîsa vegeyriyam Xana Mesrûr. Xizmetkaran şîva min anîn ber min, lê mixabin dilê min neçû xwarinê, lewre ew jinik hîna di bîra min de bû, dilê min jî li cem wê bû. Min pal da ji bo ku rakevim, lê ew jî nebû, xew li min herimî û heta sibehê ez şiyar mam. Sibehê min kincên nû li xwe kirin, bi qedehê meyê xurîniya xwe şikand û ez rabûm çûm dikana wî tacirî. Piştî qasekê, ew jinik dîsa hat wir. Kincên xweşiktir li ser bûn û cariyeyek jî pê re bû. Rûnişt û silavek da min, bêyî ku guh bide Bedredîn. Dûvre bi zimanekî xweş got: “Ka xizmetkarekî bi min re bişîne, da ku ez wî cawê te û heqê wî jî li ser bidimê!” Min got: “Ew çima û ji boyî çi?” Got: “Ji ber wefakariya te.” Ez pê re axivîm û bi çavan min îşaretek dayê. Wê jî ji min fêhm kir ku ez dixwazim xwe bigihînim wê. Lewre germahiya eşqê di dengê wê re dida der û hîn bêhtir ez pê ve didame girêdan. Bi lez rabû ser xwe, min jî da dûwê. Hîna ku ez çend gavan li dû neçûbûm, min dît ku cariyeya wê hatiye gel min, dibêje: “Mîrzayê min, xatûna min dixwaze bi te re biaxive!” Ez şaşwaz bûm, min jê re got: “Ez xerîbê ve derê me û kesî ku li vir min nas bike nîne.” Cariye got: “Te çizû jibîr kir! Xatûna min ew jina ku berî niha, li dikana Bedredîn, li gel te bû!” Ez bi cariyeyê re çûm, di fitloneka sikakê de ez li xatûna wê qelibîm. Xatûnê ez bi hêla xwe ve kişandim û ji min re got: “Delalê min! Ji gava ku çavên min bi te ketine, evîna te ketiye dilê min û ji wê kêliyê heta niha jî, ne xwarin di qirika min re derbas bûye ne jî av. Ji wê kêliyê ve ne xew bi çavên min ketiye ne jî hedana min hatiye!” Min jî jê re got: “Ê min deh qatî yê te ye xatûna min û vaye rewşa min jî li ber çavan e!” Bi dîlnazî û bergerî li min vegeyrand û got: “Delalê min, gelo ez ê bikaribim werim cem te?” Min got: “Ez xerîbê vî welatî me û ji xanê pê ve, devereke ez lê bihewim, ji min re nîn e. Vêca heger tu min li ba xwe qebûl bikî, dê kêfxweşiya min î herî mezin be.” Wê jî got: “Bila be, lê belê îşev êvara îne ye, nabe. Sibe piştî nimêjê dibe. Sibe li kerê xwe siwar bibe û were Taxa Hebabîniyê bipirse. Gava tu hatî wir, li panava Ebû-Şamê bipirse, mala min li wir e. Dereng nekeve, ez ê li hêviya te bim!”

Li wêdekê em ji hev veqetiyam. Ez vegeyriyam xana xwe, şev pê de ez şiyar mam. Çawa ku tîrêjên beyanê lêdan, ez rabûm ser xwe, min kincên xwe guhertin, bîhn bi ser xwe dakir, pêncî dînar xistin nava destmalekê û ez ji Xana Mesrûr derketim. Min berê xwe da deriyê Zewelê. Li wê dere, ez li

kerekî siwar bûm û min ji xwediyê wî re got: “Min bibe taxa Hebbabîniyê.” Ciwamêr zû ez birim wir û li ber Dergeha Muqera rawestiya. Min jê re got: “Here li panava Ebû Şamê bipirse.” Çû û piştî demekê bi şûn de vegeheriya. Hat û got: “Ka ji kerê peya bibe.” Bi meşê ez birim heta ber deriyê wê. Min ji wî re got: “Sibe jî tu yê werî min ji vir bibî.” Got: “Bi izna Xwedê!” Min ribek dinar da dest, rahiştê û çû. Min li derî da, du keçên mîna du heyvan derî vekirin û gotin: “Kerem bike hûndirû, xatûna me li hêviya te ye, şev pê de raneketiye ji ber derdê te!” Ez derbasî hêwaneke heftderî bûm ku di hawirdorên wê de şibake hebûn û bi ser bexçeyekî de vedibûn ku tijî fêkiyên curbicur, çûkên biwîtwit û awa herikbar î ku mirov awêneya xwe tê de didît. Banê hêwanê jî bi zêr û zîv xemilandî bû û li hawirdorê wê nivîsên bi lazewert neqîşkirî hebûn ku çavên mirov tijî dikirin.

*Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA BÎST Û HEFTEMÎN

*Şhrezad got:*

Şahê min ê bextewar, tê gotin ku ew xortê tacir axaftina xwe ji yê File re berdewam kir û got:

Gava ku ez derbasî hundur bûm û rûniştim, min dît ku waye ew jina delal jî ji wê ve tê, di nava xeml û xêzeke zêrîn de. Çawa ku ez dîtîm kenîya û hat bi germahî ez hembêz kirim. Piştê jî lêvên xwe danîn ser ên min, ez ramûsam û zimanê min mêt. Min jî mîna wê kir. Piştê got: “Gelo bi rastî jî evê ku niha di nav lepên min de ye tu bi xwe yî, ango ez xewnekê dibînim?” Min pê re got: “Rastî ye xatûna min û ez jî xulamê te me.” Wê jî got: “Tu ser seran û ser çavan hatiye. Bi navê Xwedê, ji roja ku çavên min li te ketine, ne xew bi çavên min ketiye û ne jî min tahmek ji xwarin û vexwarinê kiriye.” Min got: “Ez jî wisa me.” Em rûniştin ji xwe re axivîn, lê fedîbûnek li ser min hebû ez perîşan kiribûm. Qasekî şûn de, teştêk anîn, danîn ber min û misînekî avê jî pê re. Destpêkê min destê xwe şûst, piştê jî min ava gulan, misk û ember bi ser dakirin û me sohbeta xwe berdewam kir. Di wê navberê de, wêya ev herdu çarîn gotin:

Agahdar bûna em heger  
 Ji hatina we dil û ceger  
 Me dê raxista îro li ber  
 Evîna dil û çav jî li ser

Me dê hinarkên xwe raxistana  
 Bo pêşwaziya delal-cana



Da ku xweş-bêş bimeşiyana  
Li ser mijangên yar û çavana

Piştire jî kul û derdên xwe ji min re gotin, min jî yê xwe ji wê re gotin. Êdî evîna wê di dilê min de cî girtibû û malê dinyê jî bêqîmet bûbû li ber çavên min. Me ji xwe re kêf û henek û laqirdî kirin û têra xwe jî me hevdu hembêz kir û bi maçan lêvên hev xwarin û vexwarin. Piştire cariyeyan xwarin û vexwarin li ber me raxistin. Me jî xwar û vexwar, heta nivê şevê. Em bi hev şa bûn û li ser heman nivînê ez pê re raketim, heta sibehê. Di temenê xwe gişî de, ez şeveke din mîna wê şevê nejiyabûm.

Sibehê gava ez rabûm ser xwe, min ew desmala ku dînar di nav de pêçayî, xist bin balîva wê û xatir jê xwest û ez rabûm ku derkevim bi riya xwe de herim. Ew jî giriya û got: “Begê min, gelo ez ê kengî careke din vî rûyê şêrîn bibînim?” Min got: “Mereq neke ez ê êvarî dîsa li cem te bim.” Çawa ku ez derketim, min dît ku xizmetkarê min î doh, li gel kerê xwe, li hêviya min e. Ez li kerî siwar bûm û dîsa çûm Xana Mesrûr. Li wir, ez peya bûm ji kerî û min niv dînarekî din da xwediyê wî û jê re got: “Ber êvarkî, dîsa were vir!” Wî jî got: “Ser seran û ser çavan.” û piştî xwe da min û çû. Ez çûm hundur, min taştêya xwe xwar, piştî dîsa berê xwe da sûkê da ku ez hinek pereyên xwe yê din komî ser hev bikim. Dema ku min pereyên xwe girtin, min berxekî biraştî û hinek şêranî ji bo wê kirî, li ser piştî hevlekî kir û jê re şand. Ez jî dîsa li karê xwe vegeyîyam, heta ku bû êvar û xwediyê kerî hat ku min bibe, min dîsa pêncî dînar xistin nav desmalekê de, ew bi xwe re birin û ez çûm.

Vê carê çawa ku ez derbasî hundur bûm, çavên min hatin nava serê min, ez şaş û metal bûm! Her der pir paqij kiribûn, hemû tiştên baxir spî kiribûn, çira û mûm pêxistibûn, xwarin di sênîkên ferforî de rêz kiribûn li ser sifrê û mey jî li dorê danîbûn. Gava ku çavên wê li min ketin, xwe zer kir min, destên xwe li dora stûyê min gerandin û got: “Ji ber bêrîkirina te, ez mirim!”

Em li ber xwarinê rûniştin, me têra xwe xwar. Piştî, cariyeyan sifre rakirin û stran ji me re gotin. Me herduyan jî lêvên xwe danîn ser hev, bi maçan em ketin ser dilê hev de, heta nivê şevê. Dûvre jî em raketin heta sibehê, weke her car, dîsa min ew pêncî dînarên pêçayî dan wê û ez di derî re derketim, çûm. Ker û xwediyê xwe jî li hêviya min bûn. Ez lê siwar bûm û dîsa vegeyîyam xana xwe. Roja dîtirkê jî, berî ku ez êvarê herim cem wê, min şiveke baş amade kir ji birinca bi biber a ku kakilên bihîv û gûzan jî li ser raxistî bû û min qelqasên qelandî û gelek fêkî jî pê re şandin ji wê re. Êvarkî, dîsa min pêncî dînar bi xwe re bir û ez çûm cem wê. Dîsa me têra xwe xwar û vexwar û em pev şa bûn heta berê sibê. Sibehê dîsa, min ew

dînar dane wê û ez bi şûn de vegeyriyam xanê.

Bi wî hawî min berdewam kir heta ku ne dînarek bi min ve ma û ne jî dîrhemek. Wê gavê min ji xwe re got “Hebe nebe ev kar, karekî şeytanî ye.” Piştîre, min ew helbest ji xwe re xwend û got:

Feqîrê têr bi xwe re dibe nûrê  
Çawa ku roj diçilmise li ber êvarê  
Dibetile ew her roj bi kar û barê  
Gava diçe ava ew tav û rojan  
Wenda dibe ew ji ber nûra çavan  
Çaxê ku vedigere li me ew can  
Bêkes e êdî ew bi şens û eman  
Mirov ne ji ber hicretê xerîb e  
Xerîb ew e ku mirov feqîr bet

Ez derketim, meşiyam, heta ku ez giham hinda herdu qonaxan. Ji wir jî min berdewam kir heta ku ez giham Deriyê Ziwêlê. Li wir, min bala xwe dayê ku girseyeke mezin li ber derî kom bûye ku çûn û hatinê asteng dike. Gava ku min xwe di nava wan rakir, ez li leşkerekî rast hatim ku me hevdu tengav kir di meşê de. Bê hemdê min, destê min çû ser bêrika wî ya ku cuzdanekî pereyan tê de bû. Min jî destê xwe avêt cuzdanê wî û ji bêrikê derxist. Lêbelê leşker pê hesiya ku bêrika wî sivik bûye. Destê xwe avêt bêrikê, li cuzdanê xwe peland, lê tişteke nedît. Pê re jî berê xwe da min, cunehê xwe rakir û li serê min da. Xelk li me kom bûn, bi rişmeya hespê wî girtin, lome lê kirin û ji leşker re gotin: “Te çawa derbeke wisa xedar li serê vî xortî da, bê sebeb?” Leşker bi ser wan de qîriya û got: “Ev mirov mirovekî diz e!” Di wê navberê de, ez jî bi ser xwe ve hatim. Xelkê ji leşker re got: “Ev mirov zilamekî baş e, tişteke ji kesî nediziye.” Ya rastî hinekan ji wê gotinê bawer dikirin, hinekan jî bawer nedikirin. Dîsa jî xelkê ez ji nav lepên wî kişandim û xwestin ku min xelas bikin. Qedera Xwedê ew bû ku di wê navberê de, walî û gelek rayedarên xwe hatin wê deverê û girseya ku li min û leşker kom bûne, dîtin. Walî got: “Ev çi ye, çi qewimiye?” Leşker got: “Wile begê min, cuzdanekî min ê şînikî ku bîst dînar tê de bûn hebû, di nava vê qelebalixê de vî dizî ji bêrika min derxist û bir.” Walî ji leşker re got: “Kes bi te re hebû gelo?” Leşker got: “Na.” Walî, bi ser mîralayê xwe de qîrek da û jê re got: “Ka vî dizî bigirin û lêgerînekê li ser bikin!” Li min hatin hev, ez girtim, tazî kirim û cuzdan di nav kincên min de dîtin. Cuzdan vekirin, dînarên tê de jimartin, bîst heb derketin, gotina leşker jî piştrast bû. Walî qeherî û ji zilamên xwe re got: “Ka wî vir de bînin!” Zilaman ez birim ber destên wî, walî ji min re got: “Ciwane delal, ka rastiyê ji min re bibêje, te ev cuzdan dizîye an na?” Min serê xwe bera ber xwe da û ez di nava xwe de ponijîm, min ji xwe re got “Heger ez qebûl nekim jî jixwe wan cuzdan

di nav kincên min de dîtine. Lê heger ez qebûl bikim jî, dê serê min bikeve belayê!” Herî dawî, min serê xwe rakir û got: “Belê axayê min, min diziyê!” Walî şaşwaz bû, gazî şahidan kir. Şahid hatin, wan jî gotinên leşker piştrast kirin. Ev hemû li ber deriyê Ziwelê qewimîn. Di encamê de, Walî ferman da celad ji bo ku destê min ê rastê jê bike. Celad destê min jêkir, lê belê dilê leşker bi min şewitî û li ber walî geriya ji bo ku min nede kuştin. Walî jî ez berdâm û çû. Xelk li min hatin hev û qedehek mey dan min, ji bo ku ez bi ser xwe ve bêm. Ê leşker jî cuzdanê xwe, tevî bîst dînarên tê de, da min û got: “Tu ciwanekî nestêle yî, ne gengaz e ku tu diz bi.” Min jî cuzdan ji destê wî girt û ev çend beyt, di ber xwe de xwendin:

Bawer bike ne diz im birayê baweriyê  
 Ne jî kesî tu caran ev tişt li ba min dîyê  
 Lê belê çerxa felekê li serê min geriya bi lez  
 Kul û derdên min pir kirin û rût kirim ez  
 Ne ku min xwe xelaskir lê her Xwedê bû ew  
 Nexwe yê ser serê min çûkê rûmetê ye ew

Min qerpalek li destê xwe yê jêkirî gerand, xist bêrika xwe û rêya xwe berdewam kir. Rûyê min zer bûbû, xwîn di laşê min de nemabû, ez perîşan bûbûm. Bi wî halê xwe ez çûm cem jinikê. Çawa ku ez derbasî hundur bûm mîna meytekî min xwe avêt ser ciyan. Madê jinikê xerabû, ji min re got: “Çi bi te hatiye, ku derê te têşe?” Min jê re got ku serê min têşe û rewşa min nebaşê. Zîz bû li ser rewşa min û nema zanibû wê çî bike; bi dilnazî ji min re got: “Dilê min neşewitîne begê min, malê li min xera neke ez bi qurban! De ka rabe, rûnê û serê xwe rake, ji min re bibêje bê çî qewimîye? Di rûyê te de xuyaye ku tiştin qewimîne.” Min kurt birî û got: “Dev ji axaftina min berde.” Rabû dest bi girî kir û got: “Naxwe karê te bi min qediyaye, jixwe diyar e tu qet ne mîna berê yî.” Axaftin û pirsên xwe ji min re berdewam kirin, lê min bersiv nedan. Xwarin anî ber min, lê min ew jî nexwar ji ber ku ez ditirsîyam ku li milê min î jêkirî hay bibe dema ku ez bi destê çepê xwarin bixwim, loma min got: “Dilê min naçe xwarinê, ez têr im.” Wê jî got: “Xuyaye vê carê tu dilşikestî yî tu xwedî kul û derd î, vêca ka bibêje bê îro çî bi serê te hatiye?” Ji bêçaretî min got: “Bi derengiya şevê re ez ê hêdî hêdî ji te re bêjim.” Qedehek mey danî ber min û got: “Vexwe, dê ew kedera ser dilê te bibe. Divê tu vexwî ji bo tu bikaribî serpêhatiya xwe ji min re bibêjî.” Min jî got: “Heger ez mecbûrî vexwarinê bim, wê gavê ka tu bi destê xwe bide min!” Qedeh ji erdê hilda, dirêjî min kir, min jî bi destê çepê qedeh ji dest wê girt. Hêsirek ji çavê min hat xwar, min jî çend beyt ji helbestekê xwend û got:

Gava Xwedê beleyekê bi serê yekî de tîne  
 Lew ku xwedî guh û çav be bîne bîne  
 Dilê wî jê tê dizîn wî ker û kor dike

Piştire careke din dîsa lê vedigerîne  
Da ku îbret û dersan jê derbixîne

Piştire, min meya xwe vexwar û ez giriyam. Gava wê dît ku ez digirîm, qîrek pê ket û got: “Te agir berda nav dilê min ez bi qurban! De ka bêje bê çima tu digirî? Û çima tu bi destê çepê radihêje qedeha xwe?” Min jê re got: “Belalûkek di destê min de hatiye.” Got: “Kanî ez wê ji te re biteqînim.” Min got: “Hîna wextê teqandina wê nehatiye.” Piştire min vexwarina meyê berdewam kir. Wê jî da min heta ku ez ji ser hişê xwe çûm û ketim xew de. Di wê navberê de, ew jî li min dimeyzîne û dibîne ku destê min jêkirîye û cuzdanek di bêrika min de ye ku bîst dînar tê de ne. Pir xemgîn dibe li ser wê rewşa min û heta sibehê di nav qolincên êşeke dijwar de dimîne ku tu caran êşeke wisa giran nedîtiye.

Sibehê gava ez şiyar bûm, min dît ku taştiya min amade kiriye û li ber serê min daniye. Piştire qedeheke mey da ber. Min xwar û vexwar, piştire jî min cuzdanê dînanan avêt wê derê û hewl da ku derkevim. Wê jî got: “Tu diçî ku?” Min jî got: “Ez ê biçim cihekî ku bêhna xwe lê berdîm û kulên ser dilê xwe bavêjim.” Got: “Meçe, hela ka were rûnê.” Ez rûniştîm. Got: “Nexwe hezkirina te ji min re ew qas mezin bû heta giha radeyekê ku te hemû malê xwe li ser min kir û piştire jî destê xwe!? De binêr bila Xwedê şahidê me be ku ez tu caran dev ji te bernadîm û tu yê vê yekê bi çavên serê xwe bibînî. Belkî Xwedê duaya min a roja ewil qebûl kiribe ku te bike mêrê min!” Piştire, şand dû mele û şahidan û jê re got; “Mehra min li vî xortî bibire. Eva di şahîdiya we de ez eşkere dikim û dibêjim ku min qelenê xwe girtiye. Ji aliyekî din ve jî, ez dixwazim hûn şahid bin ku hemû malê min ê di vê sindoqê de, hemû mal û milk û ceriyên min jî yên wî ne, ji îro pê de.” Rabû di hizûra şahidan de, min jî ew yek qebûl kir. Hemû derketin û çûn, wê jî bi destê min girt û ez birim ber sindoqê. Devê wê li ber min vekir û got: “Binêre bê çi tê de heye!” Min bala xwe dayê ku sindoq tijî bû bi ew desmalên ku min dînar di nav wan de pêçabûn. Berê xwe da min û got: “Ev in ew pereyên ku min ji te standibûn. Her ku te pêncî dînarên pêçayî didane min, bêyî ku ez desmalê vekim, min ew davêt binê vê sindoqê. De êdî malê xwe bibe û vaye îro Xwedê Teala serbilindî daye te. Helbet di rûyê min de felek li serê te geriya, te destekî xwe wenda kir ku ez çi bikim jî nikarim vî gunehê xwe bidim efûkirin, ji ber ku hemû bi xêra te bû.” Qasek din bi şûn de, axaftina xwe berdewam kir û got: “De êdî diravên xwe bi şûn de bigire.” Min rahişt wan û hemû avêtin sindoqa xwe. Piştire, min hemû malê xwe û yê wê kirin yek û bi wî hawî dilê min rihet bû. Kul û derdên min bela bûn. Wê jî her berdewam kir û got: “Bi navê Xwedê ku ez ruhê xwe jî di ber te de bidim, dê ne bes be û kêmbimînim. Halbûkî ev tiştê ku ez dikim jî, peywira min e.”

Bêhtirî mehekê ez pê re mam, di mala wê de. Lê belê ew, roj bi roj lawaztir dibû û nexweşî lê peyde dibû. Hîna ku pêncî rojên min li cem wê neqediyabûn, çû ser dilovaniya Xwedê; rabû min ew da şuştin û di gora wê de veşart. Piştî ez pê hesiyam ku gelek dirav û mal û dikan û zeviyên wê hene. Di nav wan de gelek lodên kunciyan jî hebûn, ew kunciyan ku min hinek jî wan firotin te. Ew dema ez mijûl bûm û vala nedibûm ku bême cem te, ji ber wê yekê bû ku min ew difirotin û heta niha jî min pereyên wan negirtine. Vêca ez hevî dikim ku tu gotina min neşkinî û hebekî bêhna xwe fireh bikî, piştî ku min nanê te xwar û pereyên jî kunciyan hatin dane te. Sebeba ku ez niha bi destê çepê dixwim jî ev e. Te jî qencî bi min kir, Xwedê jî te razî be.

Piştî got: “Divê tu bi min re werî welatê me, gelo tê karibî werî?” Min jî got; erê û civanek dayê ku di serê mehê de ez pê re herim. Dûvre, min hemû mal û milkê xwe firotin û li şûnê, karwanekî ticaretê li dar xist û li gel wî ez hatim vir; hatim welatê wî, ku welatê we ye jî. Wî jî mal û milkê xwe firot, karwanekî ticaretê rakir û çû welatê Misrê. Ez jî ji bêşengiya xwe li vir mam ku îşev ev belaya hanê bi serê min de hat. Vêca Şahê min ê gewre, ev bû çîroka min û çîroka tiştê ku bi serê min de hat û tu jî dibînî ku ev serpêhatiya min jî wê qewimîna ku bi serê Xûzo de hatiye erjengtir û xerabtir e.

Şah got: “Divê hûn tevde bèn daliqandin, ji ber ku ev çîrok jî serpêhatiya Xûzo ne ecêbtir e!”

*Şeveqê dîsa lêda û Şehrezadê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA BÎST Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Gava ku Şahê Çînê ji gişan re got, divê hûn tevde bèn sêdarkirin; Seraşpêjê Şah du gavan ber bi pê de hat û got: “Heger destûra Şahê min hebe ez jî dixwazim serpêhatiyekê ya ecêb vebêjim. Serpêhatiyekê erjeng e ku berî ez wî mirovê xûzîkî bibînim, min bihîst.” Şah pê re got: “Hela bibêje, bê çî li ba te heye!” Seraşpêj got:

**(Çîroka Seraşpêjê Şah)**

Şahê min ê bextewar, şevê din ez di nav cemaetekê de bûm ku me Qûrana pîroz dixwend. Piştî ku me xitim kir, hemû xwendevan em tevde li ser sifreyê xwarinê gihan hev. Di nav wan xwarinên ku li ser sifrê bûn, xwarinek bi navê zîrbace hebû ku yekî got: “Ez wê naxwim.” Me jî sond xwar ku em wê xwarinê pê bidin xwarin, lê belê wî jî sond xwar ku wê

xwarinê nexwe û got: “Tiştî ji bo wê hatiye serê min, besî min e.” Li pey wê gotina xwe, ev herdu beyt jî xwendin û got:

Heger tu hêlekê ji hevalê xwe binguh bikî  
Qet tu nikarî hîleyan durî xwe bigirî

Em giş lê hatin hev û me jê re got: “Tu bi Xwedê kî, ka ji me re bibêje bê sebeba vê yekê çiyê û tu çima zîrbaceyê naxwî? Got: “Ji ber ku ez wê xwarinê naxwim heta ez destê xwe çil carî bi ûşman, çil carî bi sadê û çil carî jî bi sabûnê neşom; yanî bi temamî divê ez sed û bîst caran destê xwe bişom.” Mazûbanê me gazî xizmetkaran kir ji bo ku avê jê re bînin. Wî jî çawa gotibû destên xwe bi wî hawî şuştin û bêdil xwe ber bi sifreyê de da, bi tirs destê xwe avêt zîrbaceyê û bi xemgînî xwar. Me jî, behetî lê dinêrî. Ji ber ku destê wî direcifî, bala me kişand. Carekê gava ku destê xwe bilind kir, diyar bû ku tiliya wî ya beranek qût bûye û bi çar tiliyan xwarinê dixwe. Me jê pirsî û got: “Tu bi Xwedê kî çî bi vê tiliya te hatiye? Got: “Birano ne tenê beraneka vî destê min, ya destê min ê din û yên herdu nigên min jî jêkirî ne. A ji we re lê binêrin!”

Destê xwe yê dîtir û herdu nigên xwe jî nîşanî me dan, me li wan nêrî, em şaş û metal bûn li wê rewşa wî û me jê re got: “Vêca çî têkiliya tiliyên te yên jêkirî bi sed û bîst car şuştinê ya destên te û vê xwarinê re heye? Tu bi Xwedêkî ka zû vê yekê ji me re bibêje, sebir bi me re nema!” Got:

Bavê min tacirekî mezin bû ji tacirên Bexdê, di dema xelîfeyê mezin Harûn Reşîd de, pir hez dikir ji vexwarina meyê û ji guhdarkirina ûdê. Gava çû ser dilovaniya Xwedê jî, tişteke li pey xwe nehişt. Min jî ew kefen kir û bi xwendina Qûran û yasînan ew binax kir, mewlûd li ser xwendin, xêr li ser tirba wî belav kirin û gelek caran jî Quran li ber kêla wî xitim kir, bi rojan şînî li dû wî kişand. Piştî, min dikana wî ji nû ve vekir, lê belê ew jî ne hêsan bû, ji ber ku pir deyn lê hebûn. Ez çûm cem xwediyê deynan, ez li ber wan geriyam ji bo ku bêhna xwe li min fireh bikin. Dûvre min dest bi kirîn û firotinê kir û her in, min hinek ji deynên wî dan. Bi wî hawî, min ticareta xwe berdewam kir. Rojekê ez rûniştî bûm, min dît ku ciwanikek hatiye wê derê, spehîbûn weke ya wê tune. Kirasekî ku bi zêran neqîşandîbû li ser bû. Li ser piştî qantirekê siwar bû, koleyek li pêşiyê bû, yek jî li dû wê. Li serê sûkê qantira xwe sekinan, jê peya bû û wisa derbasî sûkê bû. Koleyê ku li pey wê dihat, xwe pê ve gihand û jê re got “Xatûna min xwe bisitirîne, berî ku tu agir bera nav dilê hinekan bidî.” û pê re jî destmalek avêt ser serê wê. Hinekî din bi pêş de hat, li dikanên taciran gişan meyzand, ji ya min çêtir nedît. Koleyê wê li pey wê, ber bi min ve hat. Derbasî dikanê bû û silavek da min ku heta wê rojê, min axaftineke wisa şêrîn nedîtibû. Vêca gava ku xîmar ji ser çavên xwe da alî, rûyê xwe vekir û awirên min li çavên wê ketin,

axînek bi nava min ket û wê kêlikê wê jî di nav dilê min de cî girt bi yek carê re. Min careke din lê meyzand û ev helbest xwend:

Bêje ji wê delala di xîmara gulgulî de  
Mirin çêtir e ji wî ezabê dîtina te  
Awirekê bide min ji bo xatirê bavê  
Da ku vejîn bike ew rehên jînê bi avê  
Va ye ez dirêj dikim destê xwe bo te  
Tu bi xatirê Xwedê kî bide ka destê te

Gava ku ev helbesta min guhdar kir, wê jî bi helbestekê bersiva min da û got:

Bi dar ve kir min dilê xwe  
Li ser singa sêdara eşqa te  
Hez nake dilê min ji tu kesî  
Xeynî te ey armanc û xwezî  
Heger nêrî li çavê min kesî din  
Ji bilî te ey delalê ber dilê min  
Dê mirin be wê kêliyê encama min  
Sûndxwariyê min ey delalê dil  
Nabe bê te jiyan şanabe dil  
Vexwar min bi noşî çengek evîn  
Têmwaye ku te jî vexwaribe jîn  
Yek tiştêkî dixwazim ji Xwedan  
Razîbûna wî û te ey şahê dilan

Piştire, li min zîvirî û got: “Ciwano, ka cawên xweşik li ba te hene gelo?” Min got: “Xatûna min, ez belengazekî Xwedê me, hela ka bila tacir hemû dikanê xwe vekin, ez ê tiştên li gor daxwaza te peyde bikim.” Dûvre me bi hev re sohbet kir, heta taciran dikanên xwe vekirin, wê gavê ez rabûm ser xwe, min hemû daxwazên wê peyde kirin û ez dîsa lê vegeriya piştî ku bi pênc hezar dirhem heqê wan ez bûm deyndarê dikandaran. Koleyê wê, caw ji destê min girtin, da pêşiya wê û ji sûka sergirtî derketin. Piştire, li qantira xwe sîwar bû û çû bêyî ku ji min re bibêje bê ji ku derê ye. Min jî fedî kir ku ez jê bipirsim. Bi wî halê xwe û di nav serxweşiya eşqa wê de ez vegeriya malê. Şîv anîn ber min, dilê min neçûyê, min gepek tenê xwar û devjê berda. Lewre sûretê wê ji ber çavên min nedîçû. Xew li min herimîbû û hedan li min nemabû. Ez bêhtirî hefteyekê di wî halî de mam. Taciran doza deynên xwe li min kirin, min jî mohleta hefteyêke din ji wan xwest. Piştî hefteyekê, dîsa ew ciwanik li min vegeriya. Mîna berê dîsa li qantirê siwar bû, du kole û xizmetkarek jî pêre bûn. Çawa ku awirên min lê ketin, hiş di serê min de nema û min xwe jibîr kir. Dîsa bi wê axaftina xwe ya şêrîn, bi min re axivî. Dûvre got: “Ka hinek mal ji min re bikêle.” Min wezinand û

dayê. Wê jî ji heqê min bêhtir da min û sohbeta xwe jî berdewam kir bi min re. Ez jî ji kêfan dikirim bifirim. Di wê kêlikê de, ji min pirsî û got: “Gelo jineke te heye?” Min got “Na wile ez tu jinan nasnakim.” û bi wê gotina xwe re ez giriyam. Got: “Tu çima digirî?” Min got: “Ji ber tişteki ku niha kete bîra min de.” Wê jî berdewam kir û got: “Jixwe ez aşiqê te me û ji te bêhtir ez ji te hez dikim.” Min ji xwe re got: “Naxwe ne ji bo caw tê dikana min, lê belê ji bo eşqa xwe tê, de êdî tu ji bêtirs nava xwe jê re veke!” Hîna min çend dînar li xizmetkarê wê vedigerand, ew li min vegeriya û hat li ba min rûnişt. Wê gava min jî jê re got: “Xatûna min te destûr bida vî belengazî, min ê jî derdê dilê xwe ji te re bigota!” Piştî, çî di dilê min de hebû, min jê re vegot. Ew jî dilxweş bû bi wê axaftina min û got: “Ev xizmetkarê min, dê her dem nameyên min ji te re bîne. Tu jî bi ya wî bike.” Piştî rabû û çû.

Ez jî rabûm ser xwe, min deynên taciran li gel qezenca wan teslimî wan kir û ez tenê ji wê qezencê mehrûm mam.

Gava ku ciwanik çû û demekê li min nepirsî, ez poşman bûm li wê helwesta xwe. Lê belê hîna ku çend rojên din nebûhurîbûn, min dît ku va xizmetkarê wê hatiye. Min rewşa wê jê pirsî, ji min re got ku nexweş e. Min jê xwest ku bi berfirehî rewşa wê ji min re rave bike. Got: “Ev ciwanik li ber destê Zubeyde Xatûn mezin bûye û di heman demê de yek ji cariyeyên wê ye. Jixwe tu dizanî ku Zubeyde Xatûn jî jina Harûn Reşîd e. Vêca carekê dilê wê bijiyaye gerê û izna derketina ji qonaxê xwestiye ji xatûna xwe. Zubeyde Xatûn jî izin daye wê. Piştî, gelek carên din jî çûye û hatiye heta ku baweriya wê pê hatiye û bûye dostika wê. Dûvre behsa te jî jê re kiriye û gotiye ez dixwazim pê re bizewicim. Zubeyde Xatûn jî jê re gotiye ‘Ez iznê nadim te, heta ku ez vî xortî nebînim. Heger ew jî bişibe te, ez ê zewaca we qebûl bikim.’ Vêca niha jî ez ji bo vê yekê hatime cem te. Em ê hewl bidin ku te bi dizî derbasî qonaxê bikin. Heger kes bi te nehese, tu dê bikaribî pê re bizewicî. Lê belê heger hinek bi te bihesin û tu bêyî girtin, dê serê te bifirînin. Îcar ka tu çî dibêjî ji bo vê yekê?” Min jî got: “Ez ê bi te re bêm û çawa ku te gotiye em ê tevbigerin.” Xizmetkar ji min re got: “Ka îşev here mizgefta ku Zubeyde Xatûn li qiraxa ava Dicle ava kiriye. Li wir nimêj bike û vekeve heta sibê.” Min jî got; bila be û ez çûm wir.

Bi şeveqê re, min dît ku qayikek li ser ava Dicleyê tê ber bi mizgeftê ve. Dûvre, du xizmetkar jê peya bûn û du sindoqên vala bi xwe re anîn, derbasî mizgeftê kirin û çûn. Ê ku bi giranî li dawiyê diçû, bala min kişand. Min baş lê meyizand, min ew naskir ku ew xizmetkarê qasidî dikir di navbera min û wê de ye. Seetêke din buhurî, min bala xwe dayê ku ew ciwanika min jî hat. Ez ji ber rabûm, me hevdu himbêz kir, maçî kir. Bi ser min de giriya, bêhtirî seetekê em bi hev re axivîn, piştî ez bi xwe re birim, xistim sindoqê û ser



min girt. Piştî demekê gava ku derê sindoqê ser min vekirin, min dît ku ez li qonaxa Xelîfe Harûn Reşîd im. Li wir bi qasî hezar dîrhemî eşya dane min. Piştî, min bîst cariyeyên din jî dîtî ku Zubeyde Xatûn jî di nav wan de bû û bi zorê dimeşîya di bin giraniya xeml û xêza xwe de. Gava ku giha hinda min, cariyeyên derdora wê belav bûn, çûn. Ez jî ber bi wê ve çûm, min erda ber nigê wê ramûsa. Îşaret da min ji bo ku ez rûnê. Li ber wê min çog dane erdê û ez rûniştim. Li rewşa min, li esl û fêslê min pirsî, min jî bersiva hemû pirsên wê da. Dilxweş bû û got: “Wilehî cariyeya min xortekî baş hilbijartîye! Naxwe keda ku min pê re dîtiye, bi avê de neçûye!” Hilmekê kûr kişand û axaftina xwe berdewam kir, got: “Baş bizanibe ku ev cariyeya han, mîna keça min e. Ez wê mîna emaneta Xwedê teslimî te dikim û zewaca te pê re dipejirînim.” Piştî, ji min xwest ku ez deh rojan bi wan re bimînim.

Ez li cem wan mam, lê çavê min qet li cariyeya min î ciwanik neket. Tenê car ji caran hinek ji bermaliyan sifreya xwarinê ji min re tanîn û dibirin. Piştî wan deh rojan, Zubeyde Xatûn ji bo zewaca me destûr ji Xelîfe Harûn Reşîd xwest. Wî jî pejirand û ferman da peywendîdarên ku deh hezar dînar jî bidine keçkê. Piştî, şandin pey şahidan, gazî qazî jî kirin û mehra me li hev berrîn. Şêranî û xwarineke pir û xweş anîn û sifreyeke bêserî û bêbinî li ber me raxistin. Kêf û şahî deh rojan dom kir. Piştî bîst rojan, ciwanika min birin hemamê ji bo şeva gerdekê û sifreyeke xwarinê amade kirin ku di heyata xwe de min tişteki wisa nedîtibû. Ji wan xwarinan tevan, herî pirtir min ji zîrbaceyê hez kir û ez ketim ser de heta ku min têr xwar. Piştî, min destê xwe paqij kir lê belê min jibîr kir ez wan bişom, ji ber ku sazband û defvanan dest bi muzîkê kiribûn û dengbêjan jî stranên pir xweş digotin, cariyê jî li dora bûkê diçûn û dihatin, zêr û yaqût pê vedikirin. Derengî şevê em derbasî hundur kirin û berbûyan em bi tenê hiştin. Li ser nivînê, ez ketim himbêza wê de û min maç bi ser de barandin. Lê belê hîna ku min ji hev dernexistibû bê ka ew tişt rast e an xewn e, destê min da ber pozê xwe û çawa bêhna zîrbaceyê çûyê, qîr kir û hemû xizmetkar bi ser serê me de kom kirin. Laşê wê hemû dilerizî weke pelê çilo û min jî nizanibû çima wisa dibe. Cariyê lê hatin hev û jê re gotin: “Çi bi te hatiye xwişkêcan?” Wê jî ji wan re got: “Vî dîne han ji ba min derxînin, min got belkî xortekî bîaqil e qaşo!” Min jî jê pirsî û got: “Çima ma ka min çi kiriye ku ez dîn bim?” Got: “Dîno te çima zîrbace xwariye û te destên xwe neşuştîye? Bi navê Xwedê, ez te qebûl nakim li gel vê bêaqiliya te û vî karê te yê xerabe.”

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA BÎST Û NEHEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, çîroka me bi vê şêweyê berdeyam kir. Zava got:

Cariyeya min a ciwanik ji min re got: “Ez te qebûl nakim bi vê bêaqi-liya te û bi vî karê te yê xerab.” Piştî rahîşt qamçiyekî û li nav piştî min da, heta ku ez ji ser hişê xwe çûm. Piştî ji cariyeyên xwe re got: “Wî bibin cem hekîmê bajêr, bila destê wî yê ku pê zîrbace xwariye jêbikin.” Gava ku ew gotin li ber guhên min ketin, ez bi ser hişê xwe ve hatim û min jê re got: “Ji Xwedê bitirse xatûna min! Tê çawa destê min bidî jêkirin ji ber ku min xwarin bi wan xwariye û neşuştîye?” Cariyeyên li dora wê pê ve rabûn û li ber geriyên, gotin: “Xwişkêcan ka vê carê jî lê bibore!” Wê jî got: “Bi navê Xwedê nabe û bi kêmanî divê ez devereke wî jê bikim.” Piştî jî serê xwe hejand û derket çû. Deh rojan bi ser min de nehat. Dûvre hat û ji min re got: “Rûreşo te çawa zîrbace xwar û tu hatî gel min bêyî ku tu destên xwe bişo?” Qîreke da û gazî xizmetkaran kir. Dest û lingên min girê dan û piştî jî tiliyên min ên beranekan jêkirin, çawa ku hûn niha dibînin. Ji wê demê de min sond xwariye ku ez careke din zîrbaceyê nexwim bêyî ku ez destên xwe çil carî bi ûşanan, çil carî bi sadan û çil carî jî bi sabûnê bişom. Loma gava ku we ev zîrbace anî danî ser sifreyê, rengê rûyê min hate guhertin û min di dilê xwe de got “Ev xwarin e ya ku di rûyê wê de tiliyên min hatin jêkirin!” û min nexwest ku ez wê bixwim. Lê gava ku we zor da min, min jî xwest ku ez soza xwe pêk bînim.

Seraşpêj gotina xwe berdeyam kir û got:

Rabû min jê pirsî: “Û piştî wê bûyerê çî bi serê te hat?” Got: “Piştî ku tiliyên min jêkirin, xwîn dane sekinandin û ew derman kirin, girêdan. Ciwanika min jî bêhna wê hate ber wê û bi min re li hev hat. Me jiyana xwe bi hev re berdeyam kir, wê jî ji min re got ku ‘Hayê kesî ji vê meseleyê nîne û di nava qesrê de kes nizane bê çî di navbera min û te de qewimîye. Jixwe kesî xerîb nikare derbasî hundurê qesrê bibe ji te pê ve, ku tu bi xwe jî bi saya Zubeyde Xatûn derbasî vir dibî.’ Pey wê, pêncî hezar dînar dane min û got: ‘Van dînanan bigire û derkeve derve, here ji me re xaniyekî fireh û mezin bikire.’ Ez derketim çûm, min xaniyek kirî û hemû tiştên ku wê bi salan dabûne ser hev, ji mal û kinc û entîka û firaxan, rakirin birin tê de bi cî kirin û ez û wê li wir man.” Îca Şahînsahê min, serpêhatiya xortê tacir yê ji Bexdê ev bû. Piştî dema me xwarina xwe qedand em rabûn çûn. Li pey wê jî ev çîroka Xûzo bi serê min de hat.

Şahînsah got: “Ev çîrok ji çîroka Xûza ne xweştir û ne jî erjengtir e û mîsoger divê hûn bêne darvekirin.”

*Wê gavê li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA SÎHEMÎN

*Şehrezad got:*

Vêca Şahê min î bextewar, gava ku Şahînşah ji wan re got, ez ê we tevan bi dar vekim; Hekîmê Cihû bi pêş de hat, bejna xwe li ber wî tewand, erda bin lingên wî maçî kir û got: “Ey Şahînşahê dem û dewranan! Ez ê ji te re çîrokekê bibêjim ku ji çîroka Xûzo erjengtir û balkêştir be.” Şahê Çînê jî jê re got: “Ka bibêje bê çi li cem te heye!” Yê Cihû got:

### (Çîroka Hekîmê Yahûdî)

Tiştê herî balkêş di ciwaniya min de hat serê min. Wê çaxê, ez li Şamê bûm. Ez hînî hekimîyê bûbûm û min jî li wê derê, ji xwe re pişetiya wî karî dikir. Rojekê dema ku ez li ser karê xwe bûm, min dît ku hinek ji mirekên Şamê xwestin ez bi wan re herim. Ez jî derketim, min da dûv wan heta gihan mala xwe. Ez li pey wan derbasî hundur bûm, min dît ku xortekî pir bedew, di zikê hêwanê de li ser doşekê raxistî paldaye ku bi zêr hatiye neqîşandin. Ez çûm li ber serê wî rûniştim, min dilê wî xweş kir û jê re dua kirin ku tenduristiya wî lê vegere û dîsa bi ser xwe ve bê. Wî jî bi çav û burhûyan silava min vegeand. Min jê re got “Begê min, ka destê xwe bide min.” Rabû destê xwe yê çepê da min ji bo silavê. Ez jî behetî mam miqabilî wê helwesta wî û min di dilê xwe de got “Suphan ji Xwedê re! Xortekî hêja û malmezinan e, dîsa jî wisa bênezaket tevdigere.” Min destê xwe da ser movikên laşê wî, ew kontrol kir û piştê jî li ser kaxezekê dermanek jê re nivîsand. Her wiha, min bi wî hawî rojê carekê serî lê da û li hal û wextê wî pirsî. Di roja yazdehan de, xorto baş bibû û ji min re got: “Gelo ez dikarim li hundurê malê bigerim?” Min got: “Belê.” Rabû wî gazî navmaliyên xwe kir ji bo ku wî tevli doşeka wî, derxînin qata jorîn û ji me re berxekî jî bibirêjin; xwarineke baş ji me re amade bikin û fêkiyên cûr be cûr bînin. Xizmetkaran fermanên wî pêkanîn, em herdu jî bi hev re li ser sifreyê rûniştin, me têra xwe xwar û vexwar. Gava ku min dît ew bi destê çepê dixwe, vê yekê bala min kişand. Min jê re got: “Hela çîroka xwe ji min re bibêje!” Wî jî got:

Ey mirovê zana û geriyayî! Divê tu bizanibî ez bi xwe jî Mûsilî me. Gava kalikê min çû ser dilovaniya Xwedê, deh kur li pey xwe hiştin ku bavê min jî di nav wan de bû. Tevde mezin bûn, zewicîn, ez jî ji bavê xwe re çêbûm. Lê belê apên min ên din zarok ji wan re çênebûn. Loma gava ez mezin bûm bi saxî û selametî, kêfa apên min jî hat û ji min hez kirin weke kurê xwe. Rojekê ez bi bavê xwe re çûm mizgefta mezin a Musilê ku roja îne

bû. Piştî nimêjê, herkes rabû ser xwe, çû. Bavê min û birayên xwe jî li gel hev rûniştî man û jî xwe re behsa bûyerên ecêb di welat û cîhanê de kirin, heta ku axaftina wan hat ser Misrê. Çend apên min gotin: “Tacirên ku jî wir tîn, dibêjin tu dever bi qasî Misrê xweş tune ye, li ser rûyê erdê.” Piştê jî ev helbest gotin:

Ez ê çawa veqetim îro ji Misrê  
 Ji xêr û bêr û hemû xweşiyên qesrê  
 Dê her der zor be bi min piştî Misrê  
 Dê her der êş û azar be seranserê salê  
 Dê çav û dil li bêriyê be her  
 Li hêviyê be bi vîn û kul û keder  
 Li gel birayên ku mil didine hev  
 Birayên ku bi dilsozî digihêne hev  
 Çiqasî xweş e ev welatê kevnar  
 Çiqasî rûgeş e ev roja li dar  
 Mîna şîndarên bexçeyan biran e  
 Bi hev re dost in mîna yaran e  
 Heger bistirîne Xweda Misriyan  
 Ji qeze û bele û nifirên kurmiyan  
 Dê peyamek me hebe sozdar in em  
 Bi hev re bira ne hemû dilsoz in em  
 Vêca agahê nedin bahoz û baranan  
 Da ku nedizin buhuşta perîcanan

Û bi wî hawî pesindana Misrê berdeham kirin. Min jî bi çar guhan axaftina wan guhdar dikir, jî ber ku Misrê pir bala min dikişand. Li dawiya axaftinê, hemû rabûn ser xwe û herkes çû mala xwe. Wê şevê, xewa min nehat heta sibehê. Xwarin û vexwarin jî nema di ber min de çû, jî derdê mereqa min. Piştî çend rojekê, apên min xwe amade kirin jî bo çûna Misrê. Ez jî bi ser bavê xwe de giriyam jî bo ku min jî bi wan re bişîne Misrê. Rabû barek jî min re jî amade kir, jî bo ku ez jî tev li kerwan bibim. Bi wî hawî, min xatir jî dê û bavê xwe xwest û ez tev li kerwan bûm. Em jî Mûsilê ketin rê û meşyan heta ku em gihan Helebê. Em çend rojekî li wir man, me hebekî bêhna xwe berda, piştê dîsa me rêya xwe berdeham kir heta ku em gihan Şamê. Şamê bajarekî bi dar û ber bû, çem tê re derbas dibûn û jî her cûreyê fêkî tê de hebûn, mîna buhuştê bû. Em hinek li xanên wê daketin, man, heta ku hemû malên me hatin firotin. Di firotina malê xwe de, min serê dirhemekê pênc dirhem qezenc kirin û ez bi wê yekê pir kêfxweş bûm. Piştê, apên min ez li wir hiştim û ew çûn Misrê.

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî navberek da axaftina xwe.*

ŞEVA SÎH Û YEKEMÎN

*Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir û ji Şah re got:*

Xortê ku apên wî ew li Şamê hiştibûn û ew çûbûne Misrê, vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:

Piştî ku ew çûn, ez jî li maleke bihewş û bexçe bi cih bûm ku kirya xanî, mehê du dînar bûn. Li wê derê, min ji xwe re xwar û vexwar û li kêfa xwe nêrî heta ku dîrhemek jî di bêrika min de nema. Rojekê, gava ku ez li ber deriyê hewşa xwe rûniştibûm, keçeke xweşik î kincpaqij, ber bi min ve hat. Min bela xwe tê da, wê jî teksîr nekir û hat ket devê derî de. Piştî dilê min xweş kir û derbasî hundur bû. Derî li ser me girt, rûpoşa xwe da alî û eba xwe jî ji ser xwe avêt. Spehîbûna wê bi tevayî diyar bû û pê re jî nava dilê min dagir kir. Ez rabûm ser xwe min xwarineke xweş amade kir û fêkiyên cûr bi cûr pê re anîn ser sifreyê. Me xwar û vexwar û bi hev re henek kirin û pê re jî me mey vexwar heta ku em serxweş ketin. Piştî em bi hev re raketin hetanî sibê ku şeveke bêemsal bû. Min deh dînar dane wê, lê wê sond xwar ku qebûl neke. Dûvre ji min re got: “Delalê ber dilê min, tu li bendî min be, piştî sê rojan ez ê dîsa ber êvarkî li te vegerim, werim vir. Tu jî sifreyeke mîna eva şeva borî ji me re amade bike.” Piştî xatir ji min xwest û derket çû û aqilê min jî bi xwe re bir. Piştî sê rojan, bi kincekî neqîşkirî û di nav xeml û xêzeke bêhempa de, li min vegeriya. Min jî şiveke wê amade kiribû. Mîna cara berê, dîsa me xwar, vexwar, bi hev re lîst û em raketin heta sibehê. Deh dînar dane min û dîsa civanek da min ku piştî sê rojan li min vegere û rabû ser xwe, çû.

Sê rojê din derbas bûn, dîsa hat. Vê carê bi cil û bergên hîn xweşiktir, bi xeml û xêza hîn buhatir bû, ji min re got: “Vê carê te ez çawa dîtîm delalê dilan?” Min got: “Bi navê Xwedê tu mîna ferîşteyekê yî!” Li ser vê gotina min, wê jî got: “Gelo tu yê destûrê bidî min ku cara were, ez keçeke ji xwe biçûktir û xweşiktir jî bi xwe re bînim, da ku ew jî bi me re şad û dilxweş bibe, lewre ew jî ji min dixwaze ku ez wê bi xwe re bînim?” Dûvre bîst dînar jî dane min, ji bo ku ez sifreyeke xwarinê ya mezintir amade bikim û xatir ji min xwest, derket û çû.

Roja civanê wê, min şiveke mîranî amade kir, çawa wê ji min xwestibû. Piştî muxrib, min bala xwe dayê ku wa dîsa hat û keçeke din jî pêre ye.

Dilxweşiya min zêdetir bû bi vê yekê û bi kêfxweşi min ew derbasî hundur kirin. Ew rûniştin, min mûm û qendîl pêxistin, wan jî ebayên xwe ji xwe kirin û serên xwe vekirin. Wê çaxê keça ciwanî nû, bala min kişand ku rûyê wê mîna heyva li çardan bû. Di heyata xwe de min keçeke ewqasî xweşik nedîtibû. Min xizmeteke baş jê re kir, me bi hev re xwar û vexwar. Car caran jî min qedeha meyê dida dest ya nû û ew maçî dikir. Dostika min î berê jî ji vê helwesta min aciz dibû û pêlên dixsîtiyeke veşartî di rûyê wê de xuya dikirin, li gel ku wê hewl dida vê yekê veşêre. Carekê ji min pirsî û got: “Gelo ev keçika şêrîn ji min xweşiktir e?” Min got: “Belê wile wisa ye.” Wê jî got: “Wê çaxê ji bo xatirê min gelo tu dikarî îşev bi wê re rakevî?” Min jî got: “Ser seran, ser çavan.” Rabû wê bi xwe nivîna xwe raxist, ez jî bi wê ciwanika nû re raketim. Sibehê gava ez ji xew rabûm, min dît ku destê min bi xwîn e. Min çavên xwe vekirin û ez li keçikê zivirîm ji bo ku ez wê ji xew şiyar bikim, lê min dît ku serê wê bi ser singê de gindirî! Min texmîn kir ku ya dîtirkê ev kujerî kiribe, ji ber zikreşiyê.

Bêhtirî seetekê ez wisa rûniştî mam, hizirîm li ser wê rewşê. Piştire, min biryar da ku ez xwe jê xelas bikim û ez rabûm min kincên xwe li xwe kirin, min koncalek di hewşê de kola û termê keçikê tê de bi cî kir, veşart. Dûvre ez li cihê xwe vegeyriyam, min şopxwîna li ser nivînê jî wenda kir. Lê belê gava min baliv da alî, çavên min li gerdenka wê ya zêrîn ket wê kêliyê, min rahişt gerdankê û ez seetekê bi ser de giriyam. Ez du rojan bi temamî di wî halî de mam. Roja sisiyan, ez rabûm ser xwe û çûm hemamê, min xwe şûşt, kincên xwe guhertin û ez vegeyriyam sûkê. Lê belê dîrhemek tenê jî di bêrika min de nemabû. Wê kêlikê, şeytan bi aqlê min list û bi armanca ku ez xwe ji wê tengasiyê rizgar bikim, min rahişt gerdenka zêr î bi cewher û ew bir sûkê, da destê dellalekî ji bo ku bifiroşe. Dellal gerdenî ji destê min girt, ez li gel xwe dame rûniştandin û xwe ragirt heta ku sûk geş bû bi insanan. Piştire rabû ser xwe û bi dizî gerdenî da ber bazarê. Di demeke kurt de buhayê wê ghişt hazar dînarî. Dellal li min vegeyriya û got: “Ev gerdank karê destkariya Rûman e û ji paxir hatiye çêkirin, lê dîsa jî xelk hezar dînarî pê didin, tu çi dibêjî?” Min jî got: “Rast e, me ew ji paxir dabû çêkirin, ji bo ku em henekê xwe bi yekê bikin, lê belê li cem jina min ma. Niha jî me xwest ku em wê bifiroşin, de êdî here wê bifiroşe û hezar dînarî bigire!”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA SÎH Û DUYEMÎN

*Şhrezadê got:*

Dem a xort ji dellal re got, here gerdankê bifiroşe û wî hezar dînarî bistîne; dellal tê derxist ku tiştêk di meseleyê de heye. Rabû gerdank bir cem mezinê zêrkeran. Çawa mezinê zêrkeran li gerdankê meyzand, di cî de ew naskir û wî û dellal bi hev re berê xwe dan cem walî û jê re gotin: “Ev gerdank ji cem min hatibû kirin û vaye me dizê xwe di kirasê tacirekî de dîtîye.” Walî hat di derheqê gerdankê de pirs ji min kirin, tiştê ku min ji dellal re gotibû, ji wî re jî min dúbare kir. Walî kenîya û got: “Rastiya meseleyê ne ev e.” Çawa ku ev gotin ji devê walî derketin, parazvanên wî xwe avêtin ser min, kincên min di ser min re anîn, bi gurz û qamçiyên bi min ketin. Agir bi canê min ket û min nema xwe li ber lêdanê girt. Lê belê min dizanibû ku heger ez li xwe mukur werim û bêjim ku xwediyê wê hatiye kuştin û min jî ji ser wê rahiştê, dê min bikujin. Loma min biryar da ku ez tenê diziyê bigirim ser xwe. Min gazî kir û got: “Bes li min bidin, ê diz ez im, min ev gerdank diziyê!” Walî jî hema li wê derê cezayê min dane min û destê min î rastê jêkirin û ez berdâm.

Bi wî halê xwe ez vegeyîyam malê. Çawa ku xwediyê malê çav li min ket û rewş fêhm kir, ji min re got: “Xaniyê min vala bike, ez dizan nahewînim!” Piştî berdevam kir û got: “Here cihekî din, ji xwe re maleke din bibîne.” Ez li ber geuyam, min xwe avêt bextê wî, ji bo du-sê rojan mohletê bide min, heta ku ez cihekî din ji xwe re bibînim. Negot na û derket çû. Ez jî wisa rûniştî mam û li ser halê xwe giriyam, di dilê xwe de min ji xwe re got “Ez ê çawa bi destekî li bavê xwe vegeyîm.” û yê ku destê min jêkirine bi rastiya nizanin! Bi wê ponijandinê re kedereke mezin xwe bera ser dilê min da ku êşa wê, hişê min ji serê min bir.

Du rojan ez wendayî mam di nava wê bablîsokê de. Roja sisiyan, min dît ku xwediyê malê, zêrker, delalê sûkê û garanek ji çekdarên rûpoşkirî, li ber deriyê min kom bûne. Ez derketim raberî wan da ku ez pîrsekê, xêrhatinekê li wan bikim. Lê belê rê nedan axaftina min û di cî de dest û nigên min girêdan, zincîrek avêtin stûyê min û ez bi xwe re birim, gotin: “Ew gerdanka te diziyê, ya waliyê Şamê ye û ew gerdank di stûyê keça wî de bûye; keça wî ya ji berî sê rojan ve wenda ye.” Gava min ew gotin bihistin, paqên min ricifn, çogên min fisiyan û hal di min de nema. Di dilê xwe de min ji xwe re got “Bêgûman dê min bikujin êdî! Ya baş ew e ku ez rastiya ji walî re bibêjim. Piştî jî dikuje nakuje ew dizane!”

Gava ku em hatin cem waliyê Şamê û leşkeran ez birim ber destên wî, walî bi baldarî li min meyzand û ji zilamên xwe re got: “Ev bû yê ku gerdank dizîbû û anîbû sûkê ji bo firotinê? Wele we zilmeke mezin lê kiriye!” Piştî fermanek da ku zêrker bibin zindanê. Li zêrker jî zîvirî û got: “Heqê xwîna destê wî bidêyê naxwe ez ê te bi dar vekim di ber wî gunehê te de.” Dûvre qîrek-dudu da bi ser ên mayî de jî û bera wan da ji wê dorê, da ku ew bi tenê bimîne. Gava ez û wî bi tenê man, qeyd û zincîrên min vekirin, li nav çavên min meyzand û got: “Kurê min, ka rastiye ji min re bibêje bê çawa ev gerdank giha ber destê te?” Min got: “Ezbenî ez ê rastiye ji te re bibêjim.” Dûvre min çîroka xwe ji serî heta binî jê re got; çawa ew keça ewil hate cem min, çawa ya dîtirkê bi xwe re anî û çawa ji ber zikreşiyê serê wê jêkir ew kuşt. Min ta bi derziyê vekir û hemû li ber çavên wî raxist. Ku walî ew gotinên min bihîstin, destmala xwe danî ser çavên xwe, giriya û ev helbest got:

Nexweşî giş li min kom bûne, çi ji te têt?  
 Ez ê wisa nexweş bim heta roja qiyametê  
 Li pey her hevdişînekê veqetaneke heye  
 Dostên ku ji hev veneqetin hene?

Piştî, ji min re got: “Binêre kurê min, ev keça ku destpêkê hate gel te, keça min bû. Min pir jê hez dikir û min ew pir delalî mezin kir. Gava ku kamil bû, min ew şand Misrê cem kurapê wê, dûvre li min vegehiya piştî ku ji xelkê Misrê fêrî bêsinçîtiyê bû. Sê carî hat cem te û cara çaran jî xwişka xwe ya biçûk bi xwe re anî cem te. Herdu xwişkên hev bûn û ji ber ku sirdaşên hev bûn jî pir ji hev hez dikirin. Wê şevê jî ji ber ku wê ew sirê xwe jêre gotibû, ew jî bi xwe re bir piştî destûr ji min xwest. Lê gava tenê vegehiya malê, bala min kişand û min jê pirsî. Giriya û got ‘Haya min jê nîne.’ Piştî jî çû her tişt ji diya xwe re got, li xwe mukur hat, diya wê jî bi dizî ez agahdar kirim. Waye keça min jî hîna li ser xwişka xwe digirî û dibêje heta ku ez bimirim, ez ê li ser bigirim. Ji lewra, min her tişt berê dizanibû kurê min û tu jî rast dibêji. Vêca ez ê tiştêkî ji te re bibêjim, divê tu jî bi ya min bikî. Madem tu xortekî ewqas dilsoz û durust î, ez dixwazim keça xwe ya biçûk, ya dêmariya herduyên dîtirkê bidime te û we bi hev re bizewicînim. Ez qelen jî ji te naxwazim û ez ê mûçeyekê jî bidime te. Tu jî tê li gel me bî, mîna kurê min bî.” Min got: “Tu çawa dixwazî bila wisa be ezbenî. Jixwe tu carî nediket bîra min de ku ez bigihême rade û meqamekî wisa!”

Piştî waliyê Şamê, di riya postê re, malê min ê ku ji bavê min mabû ji min re xwest, anî wir û ez jî bi wan re mam, li vê derê jiyam, di nava xêr û xweşiyê de. Vêca çîroka jêkirina destê min ev bû hekimê hêja û tu dibîne ne



ji bênezaketiyê min destê xwe yê rastê nedida te.

Hekîmê Cihû gotina xwe wiha qedand: “Şahê min î bi qudret, çîroka xortê ji Mûsilê wisa bû. Piştî wê bi demekê ez derketim rê, geriyam, dawî jî hatim vî welatê we. Mixabin li vir jî ev bûyera min û Xûzo qewimî û ev bobelat bi serê min de hat.

Şahê Çînê got: “Ev çîrok jî ji ya Xûzo ne erjengtîr û ne jî ecêbtîr bû. Loma divê ez we gişan bi dar vekim û bi taybetî jî ev ê Terzî ku serê fitneyê bûye.” Şah hilmeke kûr kişand, berê xwe da Terzî, piştî axaftina xwe ber-dewam kir û got: “Heger tu bikaribî çîrokekê ji van gişan erjengtîr bibêjî, ez ê we tevan bibexşînim.” Wê gavê Terzî du gavan pêş de hat û got:

### (Çîroka Terzî)

Ezbenî ez ê çîrokekê ji we re bêjim, ji van tevan ecêbtîr e. Berî ku ez Xûzo bibînim, ez li ser welîmekê bûm ku gelek pişesazên weke hin terzî, hesinkar, zêrker û necaran li ser amade bûn. Piştî ku xwarin hate ber me, xwediyê malê jî hat li gel xortekî bedew û qop ku silavdayînek li me kir, em jî ji ber rabûn, me silava wî vegerand. Keysa xwe lê xweş kir ku rûnê, lê belê gava dît ku berberê di nav me de ye, fikra xwe guhert û xwest ku şûnde here. Em û xwediyê malê li ber geriyam, ketin pêşiya wî, me nehişt ku here û me hêvî jê kir ku rûnê. Xwediyê malê jî li ber geriya ji bo ku sebaba wê helwesta xwe jê re bibêje. Xortê qop jê re got: “Ezbenî ez tikan ji te dikim tê pêşiya min negire û bihêle ez bi şûn de herim, sebaba çûna min ji berberê ku li vir rûniştî ye!”

Gava xwediyê malê ev gotin ji devê wî bihîstin, matmayî ma û di dilê xwe de got: “Çawa ev xort ji Bexdê ye û ji vî berberî aciz e?” Me gişan berê xwe da xort û jê xwest ku ji me re bibêje bê çima ji wî berberî aciz e. Xorto got: “Gelî dost û hogiran! Li ser vî berberî de serpehatiyeke ecêb bi serê min de hatiye li Bexdê. Jixwe sebaba ku ez wisa qop bûme û nigê min şikestiyê ew e. Loma ji wê rojê ve, min jî sond xwariye ku devera ew lê be ez lê rûnanê û bajarê ku ew lê be jî ez lê namînim. Reva min a ji Bexdê û hatina min a vir jî ji ber wî bû. Lê madem ku va ew li vir e, ez ê îşev ji vî bajarî derkevim, herim.” Me jî jê re got: “Tu bi heqê Xwedê kî, ka çîroka xwe û vî berberî ji me re bibêje!” Gava ku me ev daxwaz ji xortê qop kir, rûyê berber zer bû. Piştî, xortê qop axivî û got:

## (Çîroka Xortê Qop)

Hevalno, hogirno! Divê hûn bizanibin rehmetiyê bavê min tacirekî mezin bû li Bexdê û ji min pê ve tu zarokên wî tunebûn. Gava ku ez kamil bûm, bavê min mir û gelek mal û milk û xizmetkar ji min re hiştin. Min ji xwarina herî xweş dixwar û kincên herî xweşik li xwe dikirin. Xwedê Teala jî kîn û nefreteke jinan xistibû dilê min de ku qet min nedixwest ez li jinekê tenê jî binêrim, heta rojekê gava ez li kolaneke Bexdê dimeşiyam û min dît ku birek mirov ketin pêşiya min de da ku li min bidin. Ez jî ji ber wan reviyam û ketim sikakekê de, ji bo ku ez şopa xwe ji ber wan wenda bikim. Lê belê dawiya sikakê girtî bû û devereke ku ez pê de biçûma tunebû. Li wê derê, min tebekek li ser dikekê dît, hema ez ketim bin wê de, min xwe li wir veşart. Piştî demekê taqa dîwarê raserî min vebû û keçeke rûheyvî jê derket ku di emrê xwe de min keçeke ewqasî spehî nedîtibû. Keçikê bexçê xwe avda, çep û rast nêrî, piştî dîsa bi şûnde çû û taq li dû xwe girt. Agirek ket dilê min de û evîneke wisa xurt ez rapêçam ku wê kêlikê kîna min a li hemberî jinan nebedî bû, ji dilê min derket. Dûvre min dît ku qadiyê bajêr bi siwarî tê, xizmetkarên wî jî li pêşiyê û çend koleyên wî jî li dûv wî. Li ber derî sekinî, ji hespê xwe peya bû û derbasî heman malê bû. Bi wî hawî ez têgihiştim ku ew bavê wê keçikê ye. Bi dilekî şikestî ez vegeyriyam malê û min xwe avêt ser doşekê li gel wan kul û derdên xwe yên nû. Cariyeyên min hatin ber serê min, li min hatin hev û bi pirsan hewl dan ku derdê min fêhm bikin. Lê min, ne guh da wan ne jî bersiva wan da.

Her ku diçû rewşa min xerabtir dibû û nas û cîran jî dihatin serdana min. Carekê pîrejinek hat serdana min û li ber serê min rûnişt. Pir dilovan xuya dikir û dilê wê jî pir bi ser min ve bû. Destê xwe di ser serê min re bir û anî û ji min re got: “Kurê min, ka çîroka xwe ji min re bibêje!” Min jî serpêhatiya xwe, ji serî heta binî jê re vegot.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî axaftina xwe birî.*

ŞEVA SÎH Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Şahê min î bextewar, wî xortî gotina xwe wisa berdewam kir:

Dema min çîroka xwê ji pîrejinê re vegot, jinekê li min vegevand û got: “Binêre kurê min! Ew keçik, keça qadiyê Bexdê ye. Ew taqa ku tê re

derketiye jî, taqa odeya wê ye ku bi tena serê xwe tê de diji. Ez gelek caran diçim cem wê û ji min pê ve tu kes nikare te bigihîne wê. De êdî dilê xwe xweş bike û tewkeliya xwe bi Xwedê bîne, Xwedê hezke dê derdê te çareser bibe.” Piştî wê, ez hêdî hêdî bi ser xwe ve hatim û hêviyeke mezin bi min re çêbû. Kesên di mal de jî pir kêfxweş bûn bi vê rewşa min a nû. Pîrejin çû û piştî çend rojekê hat lê rûyê wê di erdê de bû! Ji min re got: “Kurê min, ya baş ew e ku tu ji min nepirsî bê çi bersiv daye min!” Piştre, berdewam kir û got: “Çawa ku min behsa hezkirina te jê re kir, got ‘Pîra heram heger tu devê xwe negirî ez ê nizanîm çi bi te bikim.’ Loma, divê ez careke din lê vegerim, wê bibînim.” Gava min ew tişt ji devê pîrejinê bihîst, ez dîsa vegeriyam sêra berê û halê min dîsa xerabû, nexweşiya min li min vegeyria.

Piştî çend rojekê din, pîrejin dîsa li min vegeyria û got: “Kurê min êdî ez mizgîniya xwe ji te dixwazim!” Çawa ku min ew gotin jê bihîstin, ruhê min li bedena min vegeyria, ez bi ser hişê xwe ve hatim û min jê re got: “Ka hela bêje, tu çi dixwazi ez ê bidime te!” Pîrejinê got: “Şeva borî ez dîsa çû-bûm cem keçikê. Gava wê dît ku ez çavligirî û baskîkestî me, dilê wê bi min şewitî û got ‘Metêcan tu çima wisa dilşikestî yî?’ Bi wê pîrsa wê re ez giriyam û min jê re got ‘Xatûncan ez do hatim cem te, min ji te re behsa xortekî kir ku dil ketiye te û ji derdê te dike ku dîn bibe. Niha jî li ber mirinê ye ji ber evîna te.’ Wê gavê dilê wê tenik bû û ji min re got ‘Ev xortê ku tu behsa wî dikî kî ye gelo?’ Min got ‘Ew xort kurê min î bi tenê û delalîyê ber dilê min e. Dema tu di kulekê re derketibû da ku tu bexçeyê xwe av bidî, wî jî tu dîtibû û aşiqî te bûbû. Min jî ew helwesta te ya dohîn jê re got, ew jî çawa ku bihîst, pê nexweş ket û ket nav nivînê de; Xwedê dizane ku dê felata wî tunebe.’ Bi wê gotina min re rûyê wê zer bû û bi tirs got ‘Û ev tevde li ser rûyê min hatiye serê wî?’ Min jî got ‘Erê wile di rûyê te de, ka êdî tu çi dibêji?’ Rabû ji min re got ‘Silavên min jê re bibe û jê re bibêje ku qasî hezkirina wî ez jî jê hez dikim, roja îne berî nimêja nîvro bila bê mala me, ez ê derî jê re vekim, wî bigirim hundur û heta ku xutbe biqede ez ê nêzî seetekê pê re biaxivim. Dûvre, berî ku bavê min bi şûn de vegere, ew ê jî bi şûn de here...’

Gava ku min ev gotin ji pîrejinê bihîst, êşa laşê min çû, dilê min aram bû û çawa ku min soz dabûyê, min kincên ser xwe giş dane pîrê di ber mizgîniya wê de. Wê jî spasiyên xwe anîn ziman, ji min re got “Dilê xwe xweş bike.” û derket çû. Min jî got: “Ez dilxweş im û êş li min nemaye.” Herkesê di mal de jî kêfxweş bû bi wê başbûna min.

Bêsebir ez li bendî civanê wê mam. Gava ku înan hat, pîrê hat mala min,

li rewşa û siheta min pirsî. Min jê re got: “Rewşa min baş e û kêfa min li çî ye.” Piştire, ez rabûm min kincên xwe li xwe kirin, bêhna gulan bi xwe dakir û ez mam li bendî xelkê ku biçin nimêja îne. Di wê navberê de pîrê ji min re got: “Hîna wextê te heye, tu dikarî rûyê xwe kur bikî û biçî hemamê xwe bişoyî da ku şopa nexweşiyê li ser te nemîne.” Min jî got: “Tu rast dibêjî, dê çêtir be.” Ka ez destpêkê rû û porê xwe kur bikim, piştire ez ê biçim hemamê.” Rabû, min xizmetkarê xwe şand sûkê ji bo ku berberêkî biaqil, bê-mereq û kêmaxaftin ji min re bîne, ku serê min neêşîne bi pitepitê. Xulamê min jî çû sûkê, ev kalê hanê, ev berberê li vir rûniştî ji min re anî. Gava hat silavek da min û got: “Xwedê derd û kulan ji ser te bibe û xemgîniyê dûrî te bixe.” Min jî got: “Amîn!” Got: “Mizgîniya min li te begê min, dê tendurustiya te hîna çêtir bibe!” Piştire berdewam kir û got: “Gelo tu dixwazî porê xwe bibirî angî xwîne berdî? Tê gotin ku Îbn-i Abbas gotiye mirovê ku roja îne porê xwe jêbike, Xwedê Teala heftê kulan ji ser dilê wî dibe. Û dibêjin ku gotiye, yê roja îne hicaman li xwe bide, ji gelek nexweşiyên rizgar dibe.” Min jî jê re got: “Dev ji van gotinên vala berde û ka rabe porê min jê bike, lewre ez mirovêkî nexweş im.” Rabû ser xwe, destê xwe avêt tûrikê xwe, destmalek pêçayî jê derxist, vekir, ûsturlabeke heft pêlik ji nav derxist û çû nava hêwanê sekînî, berê xwe da rojê û pir lê meyzand, piştire li min zivirî û got: “Îro roja îne ye, dehê meha Safarê, sala şeşsed û şêst û sisê ji hîcretî pêxemberê ummetê- eleyhîs selam – e. Li gora zanyariya pîvana Merîxê û rêpîvana Şemsî, heşt pile û şeş xulek ji îro bihûrine û ew jî dide xuyakirin ku birîna por di vê wextê de, baş û pêwîst e. Ev zanyariya Şemsî ji min re dibêje ku berê te, li civanê yeke bextewar e.” Min jê re got: “Te bêhna min teng kir û giyanê min fetisand. Min tenê ji te xwestibû ku tu porê min biqusînî. De ka rabe porê min biqusîne û gotinê dirêj neke!” Wî jî got: “Bi Xwedê heger te pê bizanibûya, tê dê ravekirineke hîn berfirehtir ji min bixwesta. Loma divê tu îro bi ya min bikî, ji ber ku ez li gora rêgezhesabê stêrkan fermanan didime te. Heger te rastiya vê yekê bizanibûya, te yê qet ji rêya min derneket, tê bi ya min bikira û şikir ji Xwedayê xwe re bikira, li ser vê yekê. Lewre ez alîkar û şewîrmend im bo te û ez dixwazim salekê sax di bin xizmeta te de bim. Ez heqê xwe jî ji te naxwazim.” Min jî jê re got: “Xwiya ye ku îro tê bibî kujerê min!”

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî axaftina xwe birî.*

ŞEVA SÎH Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şah re berdewam kir û got:*

Xortê qop axaftina xwe wisa berdewam kir:

Berber ji min re got: “Begê min ez ê ku xelkê navê min kiriye bêdeng ji ber kêmaxaftina min li gorî birayên min ên dinê û tu ji wisa ji min re dibêjî! Birayê min ê mezin navê wî Beqbûq<sup>4</sup> e, yê di biniyê re Hejar<sup>5</sup> e, yê sisiyan Beqbeq<sup>6</sup> e, yê çaran Kûz<sup>7</sup> e, yê pêncan Neşşar<sup>8</sup>, yê şeşan Şeqliq<sup>9</sup> û yê heftan ji ku ew ez im, navê min Bêdeng e.”

Gava ku berber axaftina xwe wisa dûvdirêj kir û kezep li min reş kir, kevirê sebrê li ba min derizî, min ji xulamê xwe re got: “Niv dînarî bide wî, bila biçê nehewceye ku ez porê xwe jêbikim.” Gava ku berber ev gotina min bihîst, li min vegeriya û got:

Begê min, bibawer im ku tu rutbeya min nasnakî. Ez, ew berberê ku destê min timî li ser serê şah û padişahan, li ser serê emîr û desthilatdaran e. Helbestkarekî di derbarê mirovekî mîna min de gotiye:

Hemû pişe cewher in cewherê bedew  
Ev berber jî cewherê cewhera ye ew  
Di ser hemû zanebûnê re ye ev mîr  
Lew di bin destên wî de ye şah û wezîr

Helbestkareke zanayî din jî, weha gotiye di vê mijarê de:

Gava zû te biryarek da di vê mijarê  
Guh bide pisporê wê û dernekeve ji rê

Piştire, gwîzan û mivrêda xwe derxist û ew sût, heta ku bêhn li min çikand. Ewqasî ez aciz kirim ku hindik mabû ez aqilê xwe wenda bikim. Dûvre, hinek ji porê min birî û dîsa dest bi xwendina helbestan kir, got:

Lezê meke bêhnfireh be di karî da  
Bi xelkê re dilovan be di her derê de  
Di ser her destî re ye tim, destê Xweda

4. *Beqbûq*: *Beqê biçûk (ajalê ku di nav avê de her dem dike qurequr)*. Bi Kurdî ye.

5. *Hejar*: *çûkeke dengxweş e (kurdî ye)*

6. *Beqbeq*: *beqbeqok (kêşandina hevokan li gor zimanê Erebi) yanî bi wateya karbeq e. Bi kurdî ye.*

7. *Kûz*: *Kûz bi Kurdî ye.*

8. *Neşşar*: *belavkar: kesê bi deng aqahiyên belav dike.*

9. *Şeqaliq*: *Ê ku diçirînê (pir derewgo) Li gora nêrîna min, ev çîrok behsa malbateke Kurd dike, lewre, navên van şeş birayan, bi Kurdî ne (wergêr)*

Ji bîr meke ku zulma zalim bahoz û ba

Wê gavê min jê re got: “Dev ji van metelokan berde û tiştê ku ne karê te be têkil nebe, lewre te bêhna min pir teng kir û hişê min ji hev belav kir.” Wî jî got: “Ez texmîn dikim ku eceleya te heye.” Min got: “Belê rast e.” Got: “Bêhna xwe fireh bike, ecele karê şeytan e û herdem mirov poşman dike. Ya rastî ev eceleya te gûmanan bi min re çêdike û ez pir mereq dikim, gelo ev leza te ji bo çi ye? Xwedê bike ku karekî xêrê be ne tiştêkî din be, lê mixabin ez ditirsim ku tiştêkî din be.” Hilmek berda û dîsa berdewam kir, got: “Eceleyê meke jixwe hîna sê set ji nimêja îne re mane.” Min jê re got: “Tu bi qedrê Xwedê kî huş be, dengê xwe bibire, te kezab li min reş kir!” Rahişt gûzanê xwe, dîsa tûj kir, sût weke cara pêşî, dûvre hinekî din jî porê min birî û got: “Fikra min giş li ser vê eceleya te ye, heger te ez hinekî agahdar bikirama di derbarê sebeba wê de, dê ji bo te baş bûya, lewre tu jî dizanî ku bavê te jî bêyî ku bi min bişêwire, tiştêk nedikir.”

Gava min dît ku xelasiya min ji nav lepên wî tune ye, min di dilê xwe de got: “Va dema nimêjê hat, divê ku ez herim berî ku xelk ji mizgeftê derkevin.” Lewre heger ez katjimêrekê dereng biketama, êdî ez nema dikaribûm derbasî cem keçikê bibama. Rabû min jê re got: “Dev ji vê mereqa xwe û van çirokên xwe yên vala berde û ka rê bide min ez biçim mêvantiya hevalên xwe yên ku ez ezimandime.” Çawa ku ew gotina min bihîst, got: “Wisa xwiyaye ku ev roja te ji bo min jî rojeke xêrê ye, lewre te got hate bîra min ku min jî, doh min hinek dost û hogirên xwe vexwendine mala xwe û min jibîr kiriye ku ez xwarinekê ji wan re amade bikim.” Min jê re got: “Qet mereqan nexwe, heger tu bilezîni û porê min zû biqusîni, hema bila xwarina di mala min de giş ji te û mêvanên te re be.” Wî jî got: “Xwedê xêra te binivîsîne, hela ka bibêje bê çi di mala te de heye ku ez bikaribim wî ji mêvanên xwe re bibim.” Min got: “Pênc cûre xwarin, deh mirîşkên qelandî û berxekî biraştî li mala min heye.” Got: “Ka wan ji min re bîne, da ku ez wan bi çavên xwe bibînim.” Ez rabûm ser xwe, min hemû jê re anîn. Li wan meyzand û ji min re got: “Mey jê kême.” Min got ku ew jî li cem min heye. Got: “Ka bîne.” Min çû ew jî anî. Got: “Tu çiqasî mirovekî comerd î! Xwedê ji te razî be, lê mixabin bixûr jê kême.” Ez çûm hêla din, min selikek bi buhayê pêncî dînarî jê re anî ku tijî misk û ned û ûd û amber bû. Dem nemabû û bêhn jî li min teng bûbû, min jê re got: “Van gişan jî bibe û de êdî qûsandina porê min biqedîne.” Wî got: “Wile heta ez lê nenêrim û ez nebînim bê çi di selikê de ye, ez wê bi xwe re nabim.” Min ferman da xulamê xwe, da ku devê selikê jê re veke, vekir. Wî jî usturlab ji destê xwe avêt erdê û hat xwe

bi ser selikê de xûz kir, li ber rûnişt û ew buharatên tê de, yeko yeko di ber çavan re derbas kirin. Hindik mabû ez biteqim û ruh ji min here. Min jê re got: “Tu bi Xwedê kî êdî bêdeng bibe, te kezeba min hêra!” Rahîşt gwîzanê xwe, dîsa ew sût û hat hinekî din ji porê min qûsand, piştê dîsa helbestek xwend û got:

Zarok her li ser rêya bavê xwe ye  
Şîndarok jî her li ser axa xwe ye

Li dû wê ristê, dîsa axaftina xwe berdewam kir û got: “Kurê min ez baş nizanîm, gelo ez spasiya xwe ji te re bikim an jî bavê te re. Lewre kesên ku min ew ezimandine mala xwe, ne layiqî van gişan e û ne jî ev xêra ku te bi min kirî. Ma te nego qey min kî ezimandiye; Zeytûno yê ku kevokan xwedî dike, guriyê qewal, ewkel ê fasûlîfiroş, Ekreşe yê beqal, Hemîdo yê sergokar û Ekarîş ê şirfiroş! Her yek ji van jî reqseke wan heye ku pê direqisin civatê dilxweş dikin.”

Gava wî ev gotin got, jî qehran re ez keniyam û min jê re got: “De ka karê xwe biqedîne, jî bo ku ez bi rêya xwe de herim û tu jî bi dostên xwe ve here, lewre ew jî niha li bendî te ne.” Wî got: “Ez dixwazim te bi wan dostên xwe bidim naskirin, hemû jî kesên bêmereq in, tu carekê tenê jî wan bi-bînî tê hemû dostên xwe yê din jibîr bikî.” Min jî got: “Xwedê we ji hevdu re bihêle û te jî bi dostaniya wan serbilind bike. Mîsoger ez ê rojekê wan dawetî mala xwe bikim.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA SÎH Û PÛNCEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min î ezîz, xortê qop çîroka xwe vegot û berdewam kir got:

Berber li min zîvirî û got: “Heger tu wisa bixwazî wê çaxê ka hebekî xwe li bendî min ragire, heta ku ez wan xwarinan bibim ji mêvanên xwe re, da ku bixwin û vexwin; ez ê jî di cî de bi şûnde vegerim û bi tenê bê cem wan dostên te, jî xwe mêvanên min jî ne xerîb in, ez dikarim wan bi tenê bihêlim û bi te re bê cem her derê.” Min jî got: “Ya rebî ya ilahî!” Û min berdewam kir, jê re got: “Tu here cem dostên xwe û bêhna xwe bi wan derxîne, ez jî herim cem ên xwe, lewre niha li bendî min in.” Berber got: “Ez nahêlim ku tu bi tenê bijî!” Min jî got: “Devera ku ez diçimê, ji min pê ve kes nikare derbasî

wir bibê.” Wî got: “Ez texmîn dikim ku tu diçî civanê jinekê, heger ne wisa bûya tê ez bi xwe re bibirama, halbukî ez ew kes im ê herî guncav î ku li deveke wisa, li gel te bê. Ez ditirsim ku tu biçî cem jinekî biyan û ruhê xwe ji destê xwe berdî, lewre Bexda bajarekî wisa ye ku mirov nikare tiştên wiha lê bike. Bi taybetî jî di van demê vê dawiyê de, piştî ku ew waliyê ceberut bûye serwerê vî bajarî.” Min gote wî: “Gava bêmirêz, ew çî gotinên çewtin ku tu wan di hizûra min de bilêv dikî?” Bêdeng bû, demekî dirêj gotin ji devê wî derneketin. Gava ku qusandina porê min qedand jî, dema nimêjê derbas bûbû û dema xûdbê jî hatibû. Min jê re got: “Rabe van xwarin û vexwarinan bibe cem dost û mêvanên xwe, ez ê jî li bendî te bim heta ku tu li min vegeerî da ku em bi hev re biçin.” Min dixwest ku ez wî bixapînim, da ku ew biçe û ez jî jê xelas bibim. Wî jî di wê yekê derxist û got: “Tu dixwazî min bixapîni da ku tu bi tenê biçî û xwe bavêjî nav bobelatekê ku xelasiya te jê nebe. Tu bi xatirê Xwedê kî neçe, heta ku ez li te vegeerim û em bi hev re biçin, da ku dilê min di cî de be.” Min got: “Bila bê lê dereng nekeve.” Xwarin û vexwarina ku min dabûyê bi xwe re bir, da ser piştê hevaleyê û derket çû alî nava sikaka de ji ber çavan wenda bû, ez jî di cî de rabûm ser xwe, min kincên xwe li xwe kirin û ez derketim çûm. Ez giham ber mala keçikê, min bala xwe dayê ku berber jî li dûv min e! Bi dizî li pey min hatibû heta wê derê. Çaxê min dît ku deriyê malê vekiriyê, ez derbas bûm hundur, gava ez derbas bûm jî, min dît ku xwediyê malê ji mizgeftê vegeeriyê û li pey min kete hundur de. Di hêwanê de li xwe zîvirî, çû derî jî li dûv xwe girt û ez di hundur de asê mam. Ew şeytanê han çima wisa zû vegeeriyabû ji mizgeftê, min jî nizanibû; tu nabêjî cariyêke wî gunehin kirine û ew jî hatiye ku ceza bide wê; bi daran pêket û lê da wê jî kir qîr û hawar. Xulamêkî wî derbasî cem wî bû ji bo ku ji nav lepên wî xelas bike. Lê qadî li wî jî da, qîrîn bi wî jî ket, dengê wî çû berber, wî got qey ez lêxistinê dixwim. Rabû wî jî dest bi qîrîn û hawarê kir, got: “Hahooo hewareeee! Hahooo hewareeee! Qadî mîrzayê min dikuje!” Vêca ne tenê qîrîn û hawar dikir, kincên xwe diqetandin, xwe di erdê dida, ax bi ser serê xwe dadikir û bênavber jî alîkarî ji yên derdora xwe dixwest ku her diçû jî xelkên li derdorê pirtir dibûn. Dûv wê berê xwe da mala min û bi rê de jî ew hawara xwe dubare kir heta ku giha malê û xelk û nasên min giş pê hesandin tev li xulam û hizmetkaran. Çend xulekên din bi şûn de min dît ku xulamên min jî hatine dora wê malê; bê navber, destên xwe li serên xwe didin û dibêjin ‘wax mîro, wax axaho!!’ Berber jî di pêşiya wan de ye û kincên xwe yên mayîn jî diçirîne û dike hawar, dibêje ‘wile ew kuştine, bile ew kuştine!’ Gava ku dengên wan hat, qadî ket hev û bi lez rabû ser xwe derî vekir. Gava ku çav li wan ket, şaş û matmayî bû û got: “Çi qewimîye xelkino!?” Xulamên min jê re gotin: “Te mîrzayê me kuştîye.” Qadî got: “Ma



mîrzayê we çî kiriye heta ku ez wî bikujim?”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA SÎH Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şah re berdewam kir:*

Qadî ji xulamên xwe re got: “Û ev berber di nav we de çî dike?” Berber ji qadî re got: “Berî çend xulekan te bi gurz lê dida û min bi xwe jî qîrîna wî guhdar dikir.” Qadî pê re got: “Vêca ew di ku re hatibû mala min, ji bo çî hatibû, dê bi ku ve biçûya û çî kiribû ku min ê ew bikuşt?” Berber got: “Pîremêrê heram, cira xwe nexweş meke, jixwe ez ji meseleyê gişî agahdar im û ez dizanim bê çîma ew derbasî mala te bûye. Rastî ew e ku keça te dil ketiye wî û ew jî bûye aşîqê wê. Ez baş dizanim ku ew derbasî mala te bû û te jî ferman daye xulamên xwe ku lê bidin, wan jî lê dan. Vêca du rê li ber te hene, ya tê mîrzayê me berdî da ku bi ehlê xwe re biçê, yan jî em ê herin cem Xelîfe giliyê te bikin.” Qadî ket ber fediyê û li ber xwe ket. Devê wî ket hev û kir nekîr gotin jê derneketin. Piştî ji berber re got: “Heger tu rast dibêjî, ka tu were hundur û wî bibîne!” Berber derbasî hundur bû. Çawa ku çavê min lê ketin, min da xwe ku ez birevim. Lê devera ku pê de biçûma tunebû. Dîsa jî şensê min hebû ku sindoqeke mezin di wê odê de hebû. Ez ketim hundurê sindoqê, min devê wê bi ser xwe de girt û hilma xwe birî. Berber hat hundurê ku ez lê bûm, li çep û rastê xwe nêrî, her der kontrol kir, ji wê sindoqê pê ve tiştê nedît, di cî de rahişt wê sindoqê, ew avêt ser piştî xwe û hewl da ku derkeve. Li hemberî rewşê, ez jî şaş û metal mabûm, hişê min sekinîbû, ew jî bi lez diçû. Min tê derxist ku min bernade. Rabû min deriyê sindoqê vekir û bi lez xwe jê avêt xwarê. Îcar wê gavê, nigê min şikest. Min berê xwe da deriyê derve, min dît ku qelebalixeke gir, li ber derî ye. Min çengek zêr bi ser wan de avêt, belav kir da ku pê dakevin û bi wî min rêyeke revê ji xwe re vekir û ez binav sikakên Bexdê ve çûm. Lê belê ez bi ku ve biçûma jî berber li pey min bû û hey wî dubare dikir û digot: “Dixwestin ku kezeba min bişewitînin û mîrzayê min bikujin, lê şîkir ji Xwedê re ku min ew ji nav lepên wan xelas kir; ev giş ji ber ecele-yê hat serê mîrzayê min, lê mixabin hîna jî tu ecelê dikî û tu bi lez diçî mîrzayê min! De binêr heger Xoce Xizir ez bi ser te de neşandama, tu ji vê belayê rizgar nedibû û heta dibû ku tu bi ber belayeke mezintir de bişemitiya ku xelasiya te jê tunebûya. Vêca ez hêvî dikim ji Xwedayê xwe ku emrê min hinekî din jî dirêj bike, ji bo ku ez bikaribim te biparêzim. Bi vê çûna te ya bi tenê û bi vê bêtevdîriya

te, hindik mabû ku tu mala min xera bikî, lê belê dîsa jî ez li te nagirim, ji ber ku tu hîna jî cahil î; ji ber ku tu kêmaqil û ecelekar î.” Min jê re got: “Qey ne besî min e ku te ewqase bele bi serê min de anîne! Heta ku derê, tê hîna jî li dûv min bê di nav van sikakên Bexdê re?” Wê kêlikê, min pir hêvî dikir ku ez bimirim ji bo ku ez jê xelas bim, lê mirin jî bi dest min nediket. Ji qehran re dîsa ez ji ber wî reviyam, bi nava sûkê de çûm û dûvre ez ketim hundurê dikanekê de, ji bo ku ez şopa xwe ji ber wî xelas bikim. Min xwe avêt bextê xwediyê dikanê, wî jî ez parastim û ez birim, derbasî embarekê kirim, di wir de veşartim. Min ji xwe re got: “Xwedê dizane ku xelasiya min ji destên vî berberî tune ye û dê şev û roj çavên wî li ser min bin!”

Min jî nema dikaribû carekê tenê jî lê binêrim. Lewre çavên min pê biketana, ez ê bimrama. Ez mecbûr mam ku ji Bexdê derkevim. Min gazî çend şahidan kir, wekîlek ji xwe re ayar kir û wasiyetek jî ji xwe re nivîsî û teslîmî wî kir da ku li merivên min binêre. Piştî, min mal û milkên xwe yên mayîn jî dan firotin û ez ji Bexdê derketim. Ji wê rojê ve jî ez rêwî me, da ku careke din çavên min li vî qewadî nekevin. Niha jî piştî ku ez hatim vî welatê we û lê bi cî bûm, bêhna min hatibû ber min û ez hebekî rehet bûbûm. Mixabin ku gava we ev welîme li dar xist û ez jî vexwendim ser û ez hatim, çavên min li vî qewadî ketin, ku di sînga odeyê de rûniştiye, ez dîn bûm! Dê çawa hedana min bê li cihekî ku ev zilam lê be, piştî ku ewqase bobelat bi serê min de hatin û nigê min şikest di rûyê wî de?

Gava me çîroka vî xortê qop î şepal û vî berberî bihîst, me ji Berber re got: “Gelo ev xort rast dibêje an na?” Berber got:

### **(Çîroka Berber)**

Ez bi zanebûna xwe wisa tevgeriyam û heke ne ji min bûya, dê mala wî xira biba, lewre ew bi xwe jî bi xêra min rizgar bû ji wê wertê. Heger Xwedê Teala bi xêra min lê nehata rehmê, li şûna nigê wî, dê ruhê wî bişikesta û çawa ku ew dibêje, heger bi rastî jî ez mirovekî wisa gotinhez bûma, min ewqase qencî pê nedikir. Ez ê niha serpêhatiyêke xwe ji we re bibêjim, hûn ê baş bibînin ku ez ne mirovekî axivhez im. Berevajî wê, ez mirovekî kêmaxaf-tin im û tu meraqa peyvandinê jî bi min re tune, mîna birayên min ên din.

Di dema Xelîfeyê mezin El-Muntasir Billah de, ez li Bexdê bûm. Ew Xelîfeyê Ebbasî jî ji xizanan hez dikir û her dem jî mirovên zana û durust li dora xwe kom dikirin, bi wan re diaxivî. Rojekê ji deh mirovan pir qeherî

û ferman da waliyê Bexdê ku wan bi qeyîkekê bîne ber destê wî. Gava min ew zilam di qeyîkê de dîtî, min ji xwe re got: “Hebe nebe ev diçin ser welî-meyekê-mûlîdekê ku dê têra xwe bixwin û vexwin. A baş ew e ku ez jî tevli wan bibim!” Rabû min xwe berda qiraxa Dîcleyê û ez jî bi wan re siwar bûm li qayîkê. Piştî, min dît ku hinek hatin qeyd û zincîr li dest û nigên me dan û ben avêtin stûyên me. Ez jî bêdeng mam di nava wan de ku ev bi xwe jî dide xuyakirin bê ez çiqasî mirovekî bêdeng im û ji axaftinê hez nakim. Ji ber ku min qebûl nekî ez bi xivim, em tevde bi hev re birin ber destên El-Muntasir Billah. Wî jî emir da ku serê deh heban ji me jê bikin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA SÎH Û HEFTEMÎN

*Şehrezad, vegotina çîroka xwe berdewam kir:*

Berber got:

Cellad serê her dehan jêkir, ez bi tenê mam. El- Muntasir bi aliyê min de zivirî, çavên wî li min ketin. Di cî de li celadê xwe zivirî û bi qehr gote wî: “Te çima serê her dehan jênekî?” Cellad got: “Ezbenî min serê deh heban jêkir!” Xelîfe El- Muntasir got: “Ez texmîn dikim ku te serê nehan jêkir û vaye yê dehan li ser nigan e, li hemberî min!” Cellad got: “Ezbenî ez bi serê we sûnd dixwim ku min serê her dehan jêkiriye.” Xelîfe ji parêzvanên xwe re got: “Hela wan bijmêrin.” Jimartin, dîtî ku deh in. Xelîfe li min zivirî û got: “Tu çima wisa bêdeng î di rewşeke wisa xeternak de û tu çawa ketiye nav van kujeran de?” Gava dengê Xelîfeyê bawermendan hate min, min jê re got: “Ezbenî ez kalepîrekî bêdeng im û zanebûneke min î baş heye ku ew jî yektabûna hiş û kûrbûna hişmendîya min, li gel vê kêmaxaftina min dibe mezyeteke bêhempa. Pişekariya min jî berbertî ye û em heft bira ne. Li ser hatina min ya vir jî; gava min dît ku ev deh zilam di qayîkê de ne, min xwe avêt nav wan, min got belkî diçin ser welîmeyekê. Lê mixabin piştî seetekê, derket holê ku kujer in. Zabî hatin, dest û nigên wan qeyd û zincîr kirin, ben avêtin stûyên wan û ez jî di nav wan de, ji ber mêraniya xwe ez neaxivîm, lewre kêmaxaftina min herdem ji giraniya min tê. Piştî, em dane meşandin heta em anîn ber destê we ezbenî. We jî ferman da serê deh heban ji me bê jêkirin. Li dawiyê ez jî mam bi tenê di nav lepên we de û min xwe bi we neda naskirin. Jixwe herdem ez wisa me, ez qenciyan dikim.” Gava ku Xelîfe gotinên min bihîstin û têgihişt ku ez mirovekî ciwamêr, giran, kêmgotin û bê mereq im, ne wek ku ev mirov min tawanbar dike bi

wan mezyetên nebaş, Xelîfe ji min re got: “Gelo her şeş birayên te ji mîna te xwedî ilm û marîfet û bêdeng in?” Min got:

Ew tevde bi qurbana min bin û haşa ku weke min bin. Ezbenî di vê yekê de te dilê min êşand gava te ez û ew dan ber hev, ji ber ku ew ji ber bênamûsî, zimandirêjî û piraxaftinê, bûn îbret ji xelkê re. Yek ji wan poz û guhên wî hatin jêkirin, yek ji herdu lêvên wî, ê din jî çavên wî. Ezbenî bila qet nekeve bîra te de ku ez pir ji axaftinê hez dikim. Lê divê ez ji te re îspat bikim ku ez ji wan bi rûmetir im. Lewre her yek ji wan, çîrokek, belayek bi serê wan de hatiye, heta ku perçeyek ji laşên xwe wenda kirine. Vêca bi izna te be ezbenî, ez ê serpêhatiyên wan ji te re bibêjim:

#### (Çîroka Birayê Berber yê bi navê Beqbûq)

Ê ewil ku qop e û li Bexdê terzîtî dikir, dikanek ji mirovekî maldar kirê kiribû û tê de dixebitî. Mala wî maldarî jî, di ser dikanê re bû. Di biniya malê re jî, aşek hebû. Birayê min î qop, rojekê gava ku li dikana xwe rûniştibûye, jineke mîna heyvê li ser şanîşeyê dibîne ku li xelkê temaşe dike. Gava birayê min wê keçikê dibîne, hinavên wî germ dibin û dil dikeve jinikê. Karê xwe berdide û ji sibehê heta êvarê lê dinêre. Roja dîtirkê sibehê, gava ku dîsa tê dikana xwe vedike, dîsa dest bi karê xwe dike. Lê belê her ku kêlekê davêje, awirekê jî davêje şanîşeyê. Bi wî hawî berdewam dike û roj tê re derbas dibin bêyî ku bi qasî dirhemekê jî dirûnê bike. Carekê xwediyê malê tê cem birê min, cawekî datîne ber wî û jê re dibêje: “Ji vî cawî çend gumlekan bidrû ji bo min.” Birê min jî dibêje ser seran û ser çavan. Hetanî derengê şevê pê ve mijûl dibe, bîst gumlekan ji wî cawî difesilîne, bêyî ku gepek nan bixwe. Gava ku maldar heqê dirûna wî jê dipirse jî, jina wî bi çavan îşaret dide birê min da ku diravan nexwaze. Ew jî naxwaze, ji ber ku dildarê wê ye. Halbukî pir xizan e û pêdiviya wî bi metelikekê tenê jî heye. Bê xwarin û vexwarin, sê rojan li ser hev dixebite heta ku dirûna wan gumlekan diqedîne. Piştî, radihije wan û jê re dibe. Tu nabêjî jinikê jî rewşa birê min giş, ji mêrê xwe re gotiye û herduyan bi hev re biryar stendine ku wî bê dirav ji xwe re bişixulînin, bêyî ku haya birê min ji tiştêkî wisa hebe. Piştî ku mêrik û jina xwe, karên xwe gişî pê diqedînin, dixwazin ku pê bilîzin û dolabeke din li serê wî bigerînin. Wî bi cariyeya xwe re didin zewicandin û di şeva gerdekê de jê re dibêjin: “Here îşev di aşê jêr de rakeve heta sibehê, dê hîn xêrtir be. Birê min jî bi nêteke baş ji wan bawer dike û diçe di aş de bi tena serê xwe radikeve. Maldarê xwediyê malê jî bi qeraş re diaxive û wî bi ser de dişîne ji bo ku di şûna ga de, wî têxe ber aş de. Qeraş

diçe, dibêje: “Wile genim pir e, xelk jî lezê li min dikin û gayê min betiliye, ez mecbûr im te bixim ber aş de û divê heta sibehê jî tu gişî biqedînî.” û wisa pê dike jî. Sibehê gava xwediyê malê tê, bala xwe didiyê ku terzî di ber aş de ye û qeraş jî bi qamçiyên lê dide. Bêyî ku têkildarî wî bibe, wî di wî halî de dihêle û diçe. Piştî jî, cariyeya ku qaşo pê re zewicandine tê, wîna ji wê îşkenceyê rizgar dike, wî bi xwe re dibe û jê re dibêje: “Ez û xatûna xwe, em pir êşiyên û xemgîn bûn bi vê rewşa te û bi vê belaya ku bi serê te de hat. Lê mixabin tiştêk ji destê me jî nehat ku em bikin. Ez hêvîdar im ku tu di min buhurî be.” Birê min jî vedigere mala xwe. Li wê derê şêxê olî yê ku mehra wan li hev biribû, tê cem wî û silavekê lê dike, dibêje: “Zewaca te li ser xêrê be, ez hêvîdar im ku te şeveke xweş derbas kiribe!” Birê min jî jê re dibêje: “Ne bi xêr û ne bi ehlan be ji wê zewaca derewîn re û ew dek û dolabên ku bi serê min de hatin. Hetanî sibehê, ez di şûna ga de, di ber aş de bûm, çî xweşî û çî hal!” Şêx dibêje: “Ka hela çîroka xwe bibêje.” Birê min jî tiştên bi serê wî de hatine, jê re dibêje. Şêx jê re dibêje: “Naxwe stêrka te û wê li hev nebaniyaye. Heger tu bixwazî, ez dikarim eqda zewaca te biguherînim.” Birê min jî dibêje: “Heger hîleyek din di destê te de hebe, bike!”

*Li Şehrezadê bû sibeh, ew jî navberêkê dide gotara xwe.*

#### ŞEVA SÎH Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê çîroka xwe berdeham dikir ji Şehriyarê gewre, ji Şahê zemanan re:*

Berber, vegotina çîroka birayê xwe berdeham dikir û digot:

Piştî ku birayê min ji şêx re dibêje heger hîleyek din di destê te de hebe bike, vedigere malê û tê dikana xwe da ku bişixule û qûtê xwe derxîne. Di wê navberê de, cariyeya ku bi xatûna xwe re ketiye nava dek û dolaban de, tê cem birê min û jê re dibêje: “Xatûna min pir bêriya te kiriye gavek berê derketibû ser şanişeyê ji bo ku te bibîne, lê tu nedît.” Birê min serê xwe radike û li şanişeyê dinêre, jinikê li wir dibîne. Jinik digirî û gazî wî dike “Çima te têkiliya xwe bi me re qut kir?” Lê birê min bersivê nade wê. Jinik jê re sûnd dixwe ku ew bûyera di aş de bi serê wî de hatiye, bêyî vîna wê pêk hatiye û dubare lêborîna xwe jê dixwaze. Gava ku birê min guh dide wan gotinên wê û li hisn û cemala wê dimeyzîne, rika ser dilê wî diçe û êşa xwe ji bîr dike. Lêborîna wê qebûl dike, silava wê digire û pê re diaxive. Piştî, dîsa li dirûn û karê xwe vedigere.

Piştî demekê dîsa cariyê tê ba wî û jê re dibêje: “Xatûna min silavan li te dike û dibêje ku mêrê min îşev nayê malê û wê li cem dostên xwe rakeve, lewre dixwaze tu îşev werî cem wê û şeveke xweş pê re derbas bikî heta sibehê.” Halbukî rastiya meseleyê ew e ku mêrê wê jê xwestibû birê min bîne ba xwe, da ku wî di ser sûc de bigire û bibe cem walî. Wê jî gotibû bila be ez ê felekekê li serê wî bigerînim ku di nav bajêr de bihetike û herkes pê bihese. Birê min î reben jî ji her tiştî bêxeber e û dek û dolabên jinan qet nasnake. Êvarkî cariyê tê cem birê min û wî bi xwe re dibe cem xatûna xwe. Çawa xatûna wê çav li birê min dikeve dibêje: “Tu li ku bûyî heta niha begê min? Bi wê Qurana Şerîf min pir bêriya te kiribû!” Ew jî dibêje: “Tu bi qedrê Xwedê kî ka zû ramûsanekê bide min, piştî em biaxivin.” Lê hîna ku birê min ew gotina xwe temam nekiriye, mêrê wê dikeve devê derî, digire ser wan û hewl dide ku birê min bi xwe re bibe, derxîne ber destê walî. Birê min pir li ber digere da ku wî nebe, lê zilam wî dibe cem walî û ceza lê dibire. Piştî jî wî li ser piştî deveyekê dike û li kolanên Bexdayê digerîne. Pê re jî, bi qayîşan bi nav piştî wî dikeve, lê dide. Xelk jî lê kom dibin, diqîrin û dibêjin “Ev e cezayê kesê ku êrişî namûsa xelkê dike!” Di wê navberê de jî birayê min ji ser piştî deveyê dikeve erdê û nigê wî dişikê. Ji wê rojê ve jî qop dibe û navê wî jî wisa dimîne. Dûvre walî wî sûrgûn jî dike ji bajêr. Ew jî derdikeve ji bajêr, lê nizane wê bi ku ve here. Ez qeherîm û ez pê ve çûm, min ew anî cem xwe û ez lê xwedî derketim heta niha.

Xelîfe kenîya û got: “Aferîn ji te re, te tiştêkî baş kiriye.” Min jî ev pesindayîna wî nepejirand û jê re got: “Ezbenî ez vê yekê ji te qebûl nakim berî ku ez serpêhatiya birayên xwe yên din ji te re bibêjim, lê belê bila nekeve bîra te de ku ez ji axaftinê hez dikim.” Xelîfe jî got: “Ka serpêhatiya hemû birayên xwe yên mayîn bibêje û dilê min xweş bike bi van çîrokên balkêş û sosret. Heta ku ji te bê jî, pilore bike van bûyerên erjeng!”

Min jê re got:

(Çîroka Birê Terzî Yê Bi Navê Hejar)

Meyzê emîrê bawermendan, birê min ê dîtirkê navê wî Hejar bû. Rojekê bi armanca pêdiviyêke xwe bi rê ve diçe. Di rê de pîrejinek derdikeve pêşiya wî û jê re dibêje: “Xorto, hela qasekî raweste! Ez ê tiştêkî ji te re bibêjim, heger bi serê te de çû, tê ji min re pêk binî.” Birê min jî li cem wê disekine. Pîrê jê re dibêje: “Ez ê tiştêkî nîşanî te bidim û te bibim ser wî jî, lê bi şertê tu zêde nepeyive!” Birê min dibêje: “Bila be, hela bêje çi ye?”

Pîrê dibêje: “Gelo tu çi dibêji, di navbera malek ku av di ber re diherike, di nav şîndarên sêv û hinaran de ku navmalî tê de pir in li gel jineke rûheyvî, hinarksor û bejinzirav ku di nav lepên te de be û tu jî ji êvarê heta sibehê, her dem li gel wê bî? De îcar tu şertên min bipejirînî, dê tu bigihîji ya xwe!” Gava ku birê min van gotinan ji pîrê dibihîze, jê re dibêje: “Pîrêcan, ji nava evqase mirovan te çima ez hîlbijartim gelo? Ma te çi di min de dîtî ku te ez ecibandim?” Pîrê dibêje: “Huş be, zêde neaxive û bi min re were!” Pê re jî rêya xwe berdewam dike, dimeşe. Birê min jî timaya wan tiştên ku pîrê behskirî dike û dide pey wê, diçe heta digihije hewşeke fire û mezin ku qesreke xweşik di nav wê de ye. Bi derenceya qesrê ve hildikişin, diçin hundur. Li wê derê, birê min çar keçan dibîne ku mîna ferîşteyan e, xweşikbûn di ser a wan re nîne û bi dengê ewqasî xweş distirên ku mirovên dilkevir jî li ber newayên wan, mest dibin. Dûvre keçek ji wan her çaran qedehêk mey vedixwe, birê min jî dibêje “Noşîcan be!” û hewl dide ku xizmeta wê bike, lê ew destûr nade wî û qedehêk mey ji wî re jî tije dike, ew jî vedixwe, keçik jî şeqamekê li piştê stûyê wî dixê. Birê min jî ji ber vê yekê diqehere, dike pitepit û ji cem wan derdikeve. Pîrejin dide dû û bi çavan îşaret dide wî, ew jî têdigihêje û bi şûn de vedigere, dîsa li cihê xwe rûdine û bêdeng dibe; heman keçik, dîsa bi şeqaman, bi hindekan li serê wî dide, heta ku ji ser hişê xwe diçe. Dûvre birê min bi ser hişê xwe ve tê, radibe ser xwe, da ku pêdiviyên xwe pêk bîne. Pîrê dîsa pê ve diçe û jê re dibêje: “Piçekî din xwe ragire, tê bigihêje meqseda xwe.” Birê min dibêje: “Heta kengî ez xwe ragirim?” Pîrê dibêje: “Heger tu xwe bigirî heta ku tu ji ser hişê xwe biçî, dê baş be.”

Birê min dîsa vedigere cihê xwe, rûdinê. Pîrê li keçikan dike gazî, ew jî her çar radibin ser xwe, bi ya wê dikin. Kincên birê min jê dikin û ava gulan bi ser dadikin. Piştê, ya herî xweşik di nav wan de jê re dibêje: “Ezîzê min, Xwedê qenciyeke bi te kir û tu derbasî mala min kir. Heger tu bi bêhnfirehî tevbigeri û şertên min bi cî bînî, tu dê bigihîji miradê xwe.” Birê min jê re dibêje: “Xatûna min jixwe ez bendeyê te me û di nav lepên te de me!” Wê çaxê keçik axaftina xwe berdewam dike û dibêje: “Xwedê Teala hezkirina muzîkê xistiye dilê min û yê ku bi ya min bike, dê bigihêje mirada xwe.” Dûvre fermanê dide cariyeyên xwe, da ku bistirên. Ew jî distirên, pey re jî şahî li dar dikeve. Di wê navberê de xatûn ji cariyekê re dibêje: “Begê xwe bibe, ewkê wî bike û wî di cî de şûn de vegeirîne.” Cariye birê min bi xwe re dibe, ew jî nizane ka wê çi pê bike. Pîrê xwe pê ve digihîne û jê re dibêje: “Bêhna xwe fireh bike, hindik maye ku tu encamê bigirî!” Birê min bi cariyeyê re diçe, pîrê jî axaftina xwe dubare dike, dibêje: “Divê tu bêhna xwe fireh bikî û por û rûyê xwe kur bikî.” Birê min dibêje: “Bi vî hawî ez ê bihe-

tikim di nav xelkê de!” Pîrê dibêje: “Na na tiştêk nabe, jinik tenê dixwaze te bê rih bibîne mîna mirovekî kose, da ku şik û guman di dilê wê de nemînin. Lewre hezkirineke te yî mezin pê re çêbûye, de êdî hinekî din jî xwe ragire, da ku tu bigihêji armanca xwe.” Birê min xwe radigire, cariyê jî serê wî gişî kur dike û bi wî hawî vedigerîne cem xatûna xwe; bê por û bê rih û bê simbêl û bê birhû! Çawa ku xatûn wî di wî halî de dibîne, dicefile, piştê jî dikene heta ku zikopiştê dibe û jê re dibêje: “Begê min, bi vî exlaqê xwe yê xweş, te dilê min dagir kir.” Piştê li ber digere da ku rabe ser xwe, bireqise. Birê min radibe, direqise. Xatûn jî li gel cariyeyên xwe, bi balîfan bi nav serê wî dikevin, lê didin heta ku ji ser hişê xwe diçe û li erdê dikeve. Dûvre, dîsa bi şeqaman bi ser çavên wî dikevin heta ku xwîn jê tê û careke din bi ser hişê xwe ve tê. Wê çaxê pîrê, jê re dibêje: “Êdî tu giha miradê xwe û lêxistin jî bi dawî bû. Tenê tiştêk li pêşiya te maye. Niha gava ku xatûn serxweş dikeve, nahêle ku tu kes xwe bigihîne wê, heta ku kiras û binkirask û delingên xwe gişan di ser xwe re neyîne û xwe şilfitazî neke. Vêca gava ku wê wisa kir, tu jî weke wê bike û li pey wê bazbide, bigere. Ew, dê li pêşiya te biçê çawa ku ji ber te bireve. Tê jî bera dû wê bidî ji odeyekê ber bi ya din ve.” Di wê navberê de xatûnê dikeve livê, kincên xwe di ser xwe re tîne û ji birê min re dibêje: “Hela xwe tazî bike!” Ew jî bi ya wê dike û hiş di serî de namîne.

*Li Şehrezadê bû sibeh, ew jî gotina xwe dibire.*

#### ŞEVA SÎH Û NEHEMÎN

*Çiroka Şehrezadê berdewam dike û Şahê Zemanan Şehriyarê Gewre jî bi dildarî li wê guhdar dike:*

Vêca xatûna tazî dibezîya û birê min jî barşewala bera dû wê dida. Keçîk qet nedisekinî; ji odeyekê diçû odeya din, ji hêwanekê ber bi hêwanekê din ve dibezîya. Birê min jî weke dînan li dû wê diçe bêrawestan, mîna ku har bûbe ji ber dilbijokiyê û serhildana ajoyên nava xwe. Bazdana xwe li pey wê, wisa berdewam dike heta ku ji nişkê ve dengêkî henûnî û germ jê dibihîze. Wê gavê, ji nişkê ve xwe di nav sikakekê de dibîne ku ew bi xwe jî sûka çermkaran bûye û dellalan bi qîr û gazî bang dikirin ji bo firotina çerman. Li wê derê, xelk, birê min di wî halî de dibînin; tazî, rûkurkirî û sor, bê rih û bê simbêl! Hemû li pey wî dikin qîr û gazî, tîqetîq bi wan dikeve, pê dikenin. Hinek jî bi qamçîyan lê didin bi halê wî yê tazî, heta ku ji ser hişê xwe diçe. Piştê wî li kerekê dikin û dibin ber destê walî. Walî dibêje: “Ev çi ye?” Xelk jî dibêjin: “Wille ev xort bi vî halê xwe yê tazî ji mala wezîr, bi ser



me de ket xwarê.” Walî jî sed qamçî lê da û ew ji bajêr derxist. Lê ez li dû wî çûm, min ew anî û bi dizî derbasî bajêr kir û anî mala xwe, ew bi xwedî kir. Heger ne ji ciwamêrîya min bûya, min ew li cem xwe qebûl nedikir.

(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Beqbeq)

Birayê min ê sisiyan jî ezbenî, navê wî Beqbeq e. Wisa diqewime ku qeder berê wî dide maleke mezin. Li derî dide bi hêviya ku xwediyê malê pê ve bê, da ku ji xwe re tiştêkî jê bixwaze. Dengê ji pişt derî bilind dibe, dibêje: “Kî li ber derî ye?” Birê min bersivê nade, li bendî vekirina derî dimîne. Dengê meşa xwediyê malê tê, ber bi derî ve tê, li ber derî jî birê min re dibêje: “Tu çi dixwazî?” Birê min dibêje: “Hema tiştêkî bide min ji bo Xwedê, çi ji destê te bê!” Ew jî dibêje: “Ma nexweşiyê te, an jî seqetiyê te heye?” Birê min dibêje: “Belê, ez mirovekî kor im.” Ew jî dibêje: “Ka destê xwe bide min!” û bi destê wî digire, wî derbasî mala xwe dike. Dûvre, ji derenceyê ber bi derenceyê din ve, wî hildikişîne heta ku wî digihîne ser banê xanî. Birê min jî dibêje qey wê xwarinekê, tiştêkî bide wî. Li ser banê xanî, ji birê min re dibêje: “Tu çi dixwazî?” Ew jî dibêje: “Xêrekê ji bo Xwedê.” Xwediyê malê dibêje: “Bila Xwedê deriyekî li pêşiya te veke bira, ma ez dikarim çi bikim!” Birê min dibêje: “Ma qey te nikaribû ev gotin li jêr jî ji min re bigota?” Ew jî dibêje: “Bêcir ê bêsinç ê rezîl, te çima bersiva min neda berî ku ez werim ber derî!” Birê min jê re dibêje: “Tu dixwazî çi bidî min?” Ew jî dibêje: “Tiştêkî ku ez bidim te li ba min nîne.” Birê min jî dibêje: “Wê çaxê ka bi xêra xwe min daxîne xwarê!” Ew dibêje: “Derence li ber te ye, tu ji xwe re dakeve jêr.” Birê min, bi derenceyê ve dadikeve lê hîna ku bîst pêlik mane ji derî re, nigên wî li hev diherbilin, dikeve û berjêr ve digindire, heta ku gêj dibe. Bi wî halê xwe, di derî re derdikeve û nizane wê bi ku de here.

Korên hevalên wî pê ve tên û jê re dibêjin: “Çi bi serê te hatiye îro?” Birê min serboriya xwe ji wan re tîne ziman û ji wan re dibêje: “Birano ez dixwazim ku ez çend dirheman ji wan diravên me yên veşartî bigirim û li xwe xerc bikim.” Wê gavê xwediyê malê jî li dû wî hatibû, lê hayê wî jê tunebû, nizanibû ku li dû wî hatiye. Gava ku birayê min derbasî cihê xwe dibe, ew zilam jî bi dizî li dû wî diçe û dikeve hundurê wî de. Birê min li hundur rûdinê û li hêviya hevalên xwe dimîne.

Gava ku hevalên wî jî tên cem wî, derî li ser xwe digirin. Birê min ji wan re dibêje: “Ka hundur baş saxtî bikin, binêrin bê kes li dû we hatiye!” Gava ku zilam wan gotinên ku birê min dibêje dibihîze, destê xwe davêje

benekî ku bi zikê xênî ve bû û xwe bi jor ve hildide. Ew jî tevde, destên xwe li derdorê dipelînin, li xanî gişî digerin, lê tiştê nabînin. Hemû tèn li rex birê min rûdinên û dîrhemên di bêrîkên xwe de dertînin û dijmêrin, dibînin ku deh hezar dîrhem in. Wî deh hezar dîrhemî li goşeyekê vedişêrin û tiştê mayî jî li hev par dikan. Piştî, xwarinê datînin navbera xwe û li ser rûdinên, dixwin. Di wê navberê de birê min, dengê dibihîze ji goşeya aliyê xwe. Ji korên hevalên xwe re dibêje: “Qey xerîb di nav me de hene?” Û pê re jî destê xwe dirêj dike bi hêla deng de. Destê wî di nigê zilam de dialiqe, qîr dike û dibêje: “Vaye yekî xerîb li vir e, ka werin lê bidin!”

*Di wê kêliyê de, li Şehrezadê dibe sibe û ew jî navberê dide axaftina xwe.*

### ŞEVA ÇELEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam dikir ji Şehriyarê gewre re:*

Temamê koran, li zilam têne hev û lê didin û li derdorê dikan gazî û dibêjin: “Cîranino, Musulmanino, dizek ketiye mala me û dixwaze diravên me bibê!” Xelk hemû, li wan têne hev. Zilam jî çavên xwe digire û çawa ew jî yekî ji koran be, xwe dixwe qilixê wan de û ew jî mîna korên din dike qîr û hawar û dibêje: “Musulmanino, xelkino! Ez dexilê Xwedê û waliyê bajêr im, ez di bextê Xwedê û bextê emîrê me de me! Şîret û daxwazê min heye, ez dixwazim ji emîrê xwe re bêjim!”

Piştî çend kêlikan, zilamên walî derdora wan digirin û wan gişan dibin meqamê walî. Walî ji wan re dibêje: “Çi mesela we ye? Zilam jî dibêje: “Ezbenî heger tu me ceza nekî, rastî dernakeve holê. Ji bo vê, heger tu dixwazî me ceza bikî, hema ji min dest pê bike û pêşiyê cezayê min bide min, piştî yê hevalên min.” Walî jî dibêje: “Ka wî bavêjin erdê û lê bidin.” Gava êşa laşê wî pir dibe, çavekî xwe vedike û dema hîn bêhtir diêşe, çavê xwe yê din jî vedike.

Walî jê re dibêje: “Ev çi hal e kuro, ev çi bêsincî ye?” Ew jî dibêje: “Bext bide min, ez ê li xwe mukur bêm û her tiştî ji te re bibêjim ezbenî!” Walî bext dide wî ku wî nekuje. Ew jî dibêje: “Em her çar jî xwe dixin qiliqê koran de, em destên xwe li ber xelkê vedikin û dikevin malên wan de, li jinên wan dimeyînin, bêbextiyan li wan dikan û bi wî hawî diravan ji wan kom dikan. Bi vê rêyê, heta niha, me gelek dirav kom kirin ku niha ew dirav gi-haye deh hezar dîrhemî, min ji hevalên xwe re got ‘Ka heqê min bidine min

ji wî deh hezarî lê wan rabûn li min dan û bi ser de jî du hezar û pêncsed dîrhemên min birin. Loma jî niha ez hewara xwe li Xwedê û li we dikim ku hûn heqê min ji wan bistînin. Heger tu ji min bawer nekî, li wan jî bide, tu dê bibînî ku çawa çavên xwe vedikin.” Wê gavê, walî emir dide, dibêje: “Ka li wan jî bidin û bi birê min dest pê dikin. Lê didin û hey lê didin, walî jî bênavber bi ser de diqire û dibêje: “Rezîlên bêwijdan! Hûn çawa xêra ku Xwedê bi we kiriye, înkâr dikin û xwe dixin qiliqê koran de?” Birê min jî dibêje: “Willehî û billehî û tillehî em tevde kor in.” Lê kes ji gotina wî bawer nake û lê didin heya ji ser hişê xwe diçe. Walî ji zilamên xwe re dibêje: “Dev jê berdin heta ku bi ser hişê xwe ve were, piştê dîsa lê bidin.” Dûvre jî fermanê dide zilamên xwe ku li hevalên wî yên din jî bidin. Her yekî ji wan sêsed darî li wan didin. Mukurvanê wan ê sexte jî bênavber bi ser wan de diqire û dibêje: “Zû çavên xwe vekin, berî ku hûn careke din lêxistinê bixwin.” Mukurvan, ji walî re jî dibêje: “Ka hinekan bi min re bişîne da ku em herin wan diravan binin, ev bênamûsên ha ji hetikandina xwe ditirsin, loma li xwe mukur nayên.”

Walî çend heb parêzvanên xwe pê re dişîne, wan diravan tînin. Ji wan diravan du hezar û pêncsed dîrhem heqê wî zilamî didinê. Pereyên mayîn jî, mûsadere dikin, birê min û herdu hevalên wî jî ji bajêr derdixînin, wan sirgûn dikin ji wir. Vêca Emîrê bawermendan! Ez jî wê çaxê li pey birê xwe çûm, lê geriyam heta ku min ew dît û careke din, min ew derbasî nav bajêr kir, anî cem xwe bi cih kir. Ji wê çaxê ve jî ez lê dinêrim, wî xwedî dikim. Ev serboriya wî jî, wî bi xwe ji min re vegotibû.

Xelîfe, bi vê serpêhatiya han jî kenîya û ji zilamên xwe re got: “Xelatekê bidine wî û bila here.” Min jî got: “Wile ez tişteki ji destê we nagirim heta ku ez serpêhatiyên birayên xwe yên mayîn jî ji emîrê bawermendan re nebêjim û jê re nedim xuyakirin ku ez zilamekî bêdeng û kêmaxaftin im.” Xelîfe got: “Wê çaxê ka guhên xwe bide min, van çîrokên xwe biderizîne û hunerên xwe yên mayî jî pêşkêş bike!” Min got:

(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Kûz)

Vêca emîrê min, birê min î çaran jî qessab bû li Bexdê. Berxik xwedî dikirin û difirotin. Mirovên giregir û dewlemend jî diçûn cem wî, goşt jê dikirin, wî jî fêdeyeke baş ji wan dikir û bi wan diravên ku qezenc dikirin, ji xwe re mal û milk û dewar dikirin. Vî birayê min, bi wî hawî demeke dirêj ew karê xwe kir û berdewam kir. Rojekê gava ku di dikana xwe de rûniş-

tîbûye, şêxekî rîhdirêj tê cem wî, hinek goşt jê dixwaze û bi qasî heqê wî jî diravan didê wî. Ew jî diravan ji dest digire û goşt dide wî. Şêx jî radihije goşt xwe û diçe malê, lê dirhemên ku şêx dan wî, bala wî dikşîni. Lewre zîvê dirhemên wî pir spî û biroqankî ye. Ew jî wan diravan ji yên din cûda digire di goşeyekê de. Ew şêx, pênc mehan tê goşt ji cem birê min dikire, ew jî dirhemên wî di sindoqeke cûda de kom dike. Piştire, dixwaze ji xwe re sewalan bikire bi wan diravan. Diçe sindoqê vedike, dibîne ku şûna dirhemên zîvînî, perçeyên kaxezên spî tenê tê de hene. Bi şeqaman bi rûyê xwe dikeve, li xwe dixê û dike qîrîn. Xelk û cîran li ser serê wî kom dibin, jê dipirsin, ew jî çîrokê ji serî ve ji wan re vedibêje. Herkes şaşwaz dibe.

Piştire, wekî her car birê min vedigere dikana xwe, beranekî serjêdike, gewdê wî dadiliqîne û hinek ji goştê wî jî li devê derî dadiliqîne û ji xwe re dibêje “Înşallah dê ew şêx dîsa were û ez ê jî bikaribim wî bigirim!” Hîna seetek di ser re derbas nebûye, hêviya wî pêk tê û şêx tê cem wî, dirhemên zîv jî pê re. Birê min jî pê ve radibe, wî digire û li derdora xwe dike qîr û hewar, dibêje: “Xelkino, Musulmanino! Werin bi min ve û çîroka min û vî bêbextî bibihîzin!” Gava ku şêx vê gotina wî dibihîze, jê re dibêje: “Ka ji van herduyan yekê ji xwe re hilbijêre, an ez ê te bihetikînim, an jî tê dev ji hetikandina min berdî, vêca tu kîjanê dixwazî?” Birê min jê re dibêje: “Ka tê bi çi min bihetikîni di nav xelkê de?” Ew dibêje: “Tu goştê mirovan li şûna goştê mîhan difiroşî xelkê!” Birê min jê re dibêje: “Tu derewan dikî, bêmirêş bêmirêş!” Şêx dibêje: “Bêmirêş ew e yê ku laşê mirovan li şûna beranan dadileqîne li dikana xwe!” Birê min jî dibêje: “Heger ev gotina te rast be, bila xwîna min li te helal be.” Şêx li dora xwe dizîvire û bi dengê bilind ji xelkê re dibêje: “Xelkino! Ev qesabê hanê mirovan serjêdike û wan li şûna mîhan li dikana xwe dadiliqîne û goştê wan difiroşe we. Heger hûn ji gotina min bawer nakin, werin, derbasî dikana wî bibin, hûn ê bi çavên serê xwe bibînin.” Xelk û cîran derbasî dikana birê min dibin, dibînin ku laşê mirovekî daliqandiye! Hemû êrîşî ser wî dikin, bi ser de diqîrin, dibêjin: “Hey kafirê bêxîret, tu çawa wisa dikî?” û bi daran pê dikevin. Nasên wî yên herî nêzîkî wî jî, bi kulman bi serê wî dikevin û ew şêx bi xwe jî kulmekê li ser çavên wî dixê, çavekî wî derdixê. Li dawiyê jî wî dibin asayîşê, şêx jî ji wan re rave dike û dibêje: “Ezbenî ev gawirê han mirovan serjêdike û goştê wan difiroşe mîna ku goştê berxikan bifiroşe. De êdî cezayê wî bidinê!”

Birê min hewl dide ku li ber xwe bide, xwe biparêze, lê serkêşê asayîşê guh nade wî û fermanê dide ku pêncsed darî lê bidin û mal û mulkê wî gişî musadere bikin. Heger ne ji malê wî yê pir bûya, belkî ew bikuştana jî.

Piştire ew ji bajêr sirgûn kirin ku êdî birê min jî şaşo maşo bûbû nizanibû wê bi ku ve here. Dawiyê diçe bajarekî mezin û li wira dibe solkar, bi çêkirina solan debara xwe dike.

Rojekê bi armanca peydekirina pêdiviyeye xwe, ji dikana xwe dertê û li kolanê dengê hîrehîra hespan dibihîze. Lê dipirse bê ka çi ye, xelk dibêjin Şah derketiye, dê biçe şîkar û nêçîrê. Birê min jî bi wir ve diçe ji bo ku wî temaşe bike, lê belê bi dilekî şikestî diçe ji ber ku pişeya wî ji qesabtiyê dake-tiye solkariyê. Gava ku Şah lê dimeyziye û awirên wî li çavên birê min î kor dikevin, serê xwe dihejîne û dibêje “Xwedê me bistirîne ji vê roja bêyom!” û rişmeya hespê xwe dikşîne, bi şûn de vedigere, naçe şîkarê. Xulam û leşker û parêzvanên wî jî, li dûv wî vedigerin. Şah ji wan re dibêje: “Herin li wî korî bidin!” Ew jî diçin lê didin, heta ku tê ber mirinê. Birê min jî nizane bê çima ew bobelat bi serê wî de hatiye. Bi wê perîşaniya xwe vedigere dikana xwe. Piştire diçe cem hinekan ji pêgirtiyên Şah û çîroka lêxistina xwe ji wan re vedibêje, gilî û gazincên xwe bi wan re parvedike. Ew jî bi wî dikenin heta ku ziko piştî dibin û jê re dibêjin: “Birawo ev Şahê me qet hez nake ku li koran binêre. Bi taybetî jî mirovê ku ji çavê xwe yê çepê ve kor be. Siûda te heye ku va ye te nekuştiye. Lewre ev Şah, mîsoger mirovên wisa dikuje.” Çawa ku birê min wan gotinan dibihîze, biryar dide ku ji wî bajarî bireve.

*Wê gavê li Şehrezadê dibe sibe û ew jî navberê dide vegotina çîroka xwe.*

## ŞEVA ÇEL Û YEKEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam dikir ji Şehriyar, Şahê Zemanan re:*

Berber, çîroka birê xwe berdewam dikir û digot:

Birê min î kor, ji wî bajarî direve, diçe bajarekî dinî ku Şah lê tunene, li wir bi cî dibe. Demeke dirêj li wir dimîne. Rojekê ji malê derdikeve, diçe seyranê, ji xwe re digere. Carekê, pêjna hîrehîra hespekê li pey xwe dike û ditirse, ji xwe re dibêje “Diyar e ku dîsa fermana Xwedê bi ser min de tê!” û ji wir direve, diçe ji xwe re li starekê digere. Gava ku deriyekî li pêşiya xwe dibîne, hema wî didehfîne ji bo ku derbas bibe. Derî dikeve, ew jî derbasî hundur dibe, dibîne ku dehlîzeke dirêj li pêşiyê xuya dike, di bin erdê de. Tê re dimeşe, diçe, carekê ji nişkê ve dibîne ku du zilaman xwe avêtiye wî û jê re dibêjin: “Xwedê kir ku me tu girt, ey dijminê Xwedê! Te em merezî kirin,

ev sê şevin ku em li pey te ne, te nehişt ku em ji xwe re seetekê rakevin, ango bêhna xwe berdin.” Birê min jî ji wan re dibêje: “Cawamêrino! Hûn bi qedrê Xwedê kin hûn ê ji min re bêjin bê derdê we çi ye?” Ew jî dibêjin: “Tu me dişopîni û tu dixwazi me û xwediyê malê bihetikîni, qey ne besî te ye ku te ew û mirovên wî xizan hiştin? Vêca ka wê kêra ku tu her roj pê zirta li me dikî, derxîne!” Piştê lê digerin, kêrê di ber newqa wî de dibînin. Ew kêr, kêra ku pê çermên şekalan jêdikir. Birê min ji wan re dibêje: “Cwamêrino, ji Xwedê bitirsîn, willehî ez xwedî serpêhatiyê ecêb im.” Ew jî dibêjin: “Ka hela serpêhatiya xwe ji me re bibêje!” Ew jî ji wan re vedibêje, bi hêviya ku bela xwe jê vekin û wî berdin. Lê qet guh nadin çîroka wî û li şûna ku lê guhdar bikin, lê dixin û kincên wî diçirînin. Gava ku kincên wî diçirînin û di ser re tînin, laşê wî tazî dibe û şopa daran di nav piştê wî de xuya dibe. Jê re dibêjin: “Ey melûnê bêedep, ev şopa daran dide xuyakirin ku te curmek kiriye!” Li ser wê yekê wî radikîn û dibin ber destê walî. Ez jî li dû wî çûm, min ew ji wir anî mala xwe û barê xwedîkirina wî jî hilda ser milê xwe.

#### (Çîroka Birayê Berber yê bi navê Neşşar)

Birayê min ê pêncan jî, yekî guhjêkirî ye ezbenî, ew jî berê xizanekî bêkêr bû, şev û roj, destên wî vekirî bûn, li ber xelkê. Bavê min jî zilamekî kalemêr bû, ji me re hefsêd dîrhem li pey xwe hiştibû. Me jî her yekî para xwe biribû, para her yekî ji me jî sed dîrhem bû. Vêca ev birê me yê pêncan gava ku sed dîrhemê xwe bir, mabû heyîrî, nizanibû wê çi bi wan bike. Piştê, dikeve bîra wî de ji xwe re bi wî sed dîrhemî cam û tîtikên bikire û bifiroşe. Ew jî diçe wisa dike. Pereyên xwe gişan dide bi tîtikên cûr be cûr, wan dixê qefesê mezî de û li ber dîwarekî datîne, ew jî li ber rûdinê da ku bifiroşe. Piştê xwe dide dîwêr, dihizire û ji xwe re dibêje: “Sermayê min sed dîrhem e. Ez ê van tîtik û qizêzan bi dused dîrhemî bidim. Piştê, ez ê bi wî dused dîrhemî gelek cam û tîtikên din bikirim û vê carê wan bi çarsêd dîrhemî bifiroşim. Her weha ez ê kirîn û firotina xwe wisa berdewam bikim heta ku ez qezenceke mezî bi dest bixim. Piştê, ez ê xaniyekî xweşik, erd û zeviyê fireh, hespîn zînzêr û têra xwe jî xwarin û vexwarinê bikirim û çiqase reqas û stranbêjên xweşik di bajêr de hebin, ez ê wan bînim mala xwe û li wan guhdar bikim. Ez ê xwazgîniyan bişînim pey keçên qral û wezîran û wan ji xwe re bixwazim, lewre min bihîstiyê ku keça wezîr pir xweşik e û qelenê wê hezar dînar e. Heger bavê wê bipejirîne, ez ê wê bi xweşkahi bînim ji xwe re, heger ne razî be jî, ez ê wê bi darê zorê ji xwe re bînim. Ji bo karê malê jî ez ê deh xulamên ciwan bikirim û ji xwe re jî kincên şah û padîşahan. Ez ê ji xwe re sercekî çêkim ku bi yaqût û mircanan

xemilandî be û ez ê wî bavêjim ser pişta hespê xwe û li ser siwar bibim û herim şikarê. Ez ê bihêlim ku navmalî, xulam, zêrevan û parêzvanên min jî li pêş û paş û kêlekên min bimeşin. Gava ku ez li wezîr biqelibim ji ber min rabe, cihê xwe bide min û ew jî li ber nigê min rûnê. Divê du xizmetkar jî li dû min bin û her yek ji wan tûrikek di stûyê wan de be û di her tûrikî de hezar dînar hebe, da ku ez hezar dînarî ji wan bidime wî weke qelenê keça wî û hezarê mayî ji weke yadîgariyê bidime wî, ji bo ku comerdiya min jê ve xuya bike û bizanibe bê dinya çiqasî biçûk e li ber çavên min. Piştê, ez ê biçim mala xwe û êdî çi kesê ku ji malbata jina min were cem min, ez ê têra wî dirhemana bidime wî, kincan lê bikim û pê re jî yadîgariyan bişînim ji wezîr re. Heger ku wezîr jî yadîgariyan ji min re bişîne, çiqasî biha bin jî ez ê wan bi şûn de lê vegehinim, da ku giraniya min bizanibe û baş bibîne ku ez yadîgariyan ji her kesî nagirim. Ez ê mala xwe jî baş raxînim û dema wextê civatgerandinê hat, ez ê kincên xwe yên herî xweşik li xwe bikim û li ser dibacê rûnim, bêyî ku ez li çep û rastê xwe binêrim da ku ez giraniya aqilê xwe nîşanî civatê bidim. Dê jina minî rûheyv jî di nava wê xeml û xêza xwe de, were cem min û ez ê jî guh nedime wê da ku kesên hazir bêjin ‘begê min, xatûna te li gel cariyeyan hatiye ber destê te, li bendî destûra te ye!’ Wê gavê ez ê jî çend awiran bavêjimê çawa ku ez xêrekê pê bikim, ew ê jî dubare erda ber nigê min maçî bike. Ez ê jî di wê kêlikê de, serê xwe rakim, salisekê lê binêrim û hew. Piştê, dê xulam rabin wê ji wir bibin, ez ê jî rabim kincên xwe biguherînim bi yekî qencîr. Heger careke din bûkê binin, vê carê ez qet lê nanêrim da ku dîsa ew bi bîra min bixînin û ez jî awirekê tenê bavêjim wê. Ez ê di wê rewşê de bimînim heta ku wê ji wir bibin...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina xwe.*

ŞEVA ÇEL Û DUYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min î bextewar! Tête gotin ku birayê berber ê pênçemîn li dû xeyalê xwe diçe û dibêje: “Piştê, ez ê fermanê bidim çend xulaman ji bo ku tûrikekî bavêjin ji xêliyên bûkê re ku pênçesê dînar tê de hebe. Gava ku ew tûrik hildin, ez ê fermanê bidim wan ji bo min derbasî cem wê bikin. Gava ku ez derbasî cem wê kirim, ez lê nanêrim û pê re naaxivim jî, da ku mezinahiya min were xuyakirin û diya wê were, dest û serê min ramûse û bêje ‘Mîrzayê min, ka li cariyeya xwe binêre, lewre dixwaze were cem te.’ Ez jî bi gotinekê tenê xatirê wê nagirim û bersivê jî nadimê. Ew ê jî bergera xwe

berdewam bike heta ku gelek caran dest û serê min maç bike û ji min re bêje ‘Begê min, keça min ciwanikek baş e û mêr berî te nedîtine, vêca gava wisa te girtî bibîne, dê dilê wê bişke, ka berê xwe bide wê û pê re biaxive!’ Piştre, dê rabe ji min re qedehêk şerab bîne, ez ê jî wê wisa li ser nigan bihêlim, bêyî ku ez têkil wê bibim, ez ê pala xwe bidim balîfên ku bi zêr neqîşandî ne û di bin çavan re lê binêrim ji mezinahiya nefsa xwe, da ku ew jî min mîna padîşahêkî gewre bibîne û ji min re bibêje ‘Mîrzayê min tu bi xatirê Xwedê bike, qedehê ji destê cariyeya xwe bigire, lewre ez cariyeya te me.’ Ez jî pê re naaxivim heta ku pir li ber min bigere û bêje ‘Bêguman divê ku tu vexwe’ û qedehê bîne ber devê min. Ez ê jî destê xwe lê bidim, qedehê bi ser çavên wê de birjînim û bi nigan jî pîhneke wiha lê bidim.” Û bi rastî jî pîhna xwe lê dide ku bê hemdê wî nigê wî li qefesa tîtik û camên wî dikeve, qefesê berjêr digindirîne û hemû tîtikên tê de, hûrhûrî dike. Ev hemû di rûyê nefsa wî ya mezin de bi serê wî de hat.

Piştre, birê min kulman li serê xwe dixwe, kincên xwe diqetîne û digirî. Xelkên ku diçin nimêja îne jî hinek ji wan lê dinêrin, hinek guh nadine wî û ew jî di wî halê xwe de, perîşan û bê pere û bê qezenc li cihê xwe rûniştî dimîne. Ji xwe re digirî hetanî ku jineke bedew di wir re derbas dibe, li ser piştê qantirekê ku serceki bi zêr xemilandî di bin de ye û berê wê li nimêja îne ye, li gel çend heb xulamên xwe. Jinik li halê birê min û li wan tîtikên şikestî dinêre, hestiyar dibe, dilê wê pê dişewite û li halê wî dipirse. Yek ji xelkên derdorê jî dibêje: “Qefeseke wî ya tîtikên hebû, pê debara xwe dikir, lê ew jî wek ku tu dibînî hûrhûrî bûye.” Wê gavê jinik gazî xulamêkî xwe dike û jê re dibêje: “Tiştê bi te re, bide vî rebenî!” Ew jî kîsikekî didiyê, birê min wî kîsikî digire û gava ku vedike, dibîne ku pêncsed dînar tê de ye. Çav û devê wî jî hev vedibin û ji kêfan dike ku bimire û dest bi duayan dike.

Piştre, maldar vedigere malê piştî xizaniyeke dûvdirêj û rûdinê diponije û kûr kûr difikire li ser rewşa xwe. Di wê navberê de derî lê dide. Radibe derî vedike, pîrejineke nenas li ber derî dibîne ku jê re dibêje: “Kurê min wextê nimêjê pir nêz bûye û ez jî bê destnimêj im, ez dixwazim derbasî mala te bibim ji bo ku ez destnimêjekê bigirim.” Birê min dibêje ‘Ser seran û ser çavan’ û wê derbasî hundur dike bi kêf û şahî, lewre wê gavê dikir bifire ji kêfa dînanan re. Piştî ku pîrejî destnimêja xwe digire û tê cihê ku birê min lê rûniştiye, du rekat nimêj dike û duayan jê re dike ji ber qenciya wî, ew jî spasiya wê dike û du dînanan dide destê wê. Gava ku pîrejî vê yekê dibîne dibêje: “Subhan ji Xwedê re! Kuro malê xwe ji destê min bigre û heger pêdiviya te pê tune be, li xwediyê wan vegeirîne; ew a ku ew dabûne te, gava



títikên te yên şikestî dîtîbûn.” Birê min jî, jê re dibêje: “Dayêcan, ez ê çawa bikaribim xwe bigihînim wê?” Pîrejin dibêje: “Kurê min dilê wê bi ser te ve ye, lê mixabin ku ew jineke bi mêr e û zilamê wê maldar e. Vêca hebûna xwe gişî bi xwe re bibe û here, gava ku te ew dît, çi gotinên xweş hebin jê re bibêje, çi karê baş hebe pê bike da ku tu têr bibe ji xweşikbûna wê û ji malê wê û tu gişî bi dest bixe.”

Birê min jî zêrên xwe gişan bi xwe re dibe û dide tengala wê pîrejinê û diçe bêyî ku rastiyeke wisa bawer bike. Jinik diçe û birê min jî li dû, heta ku digihêjin ber deriyekî mezin. Pîrejin li derî dide, cariyeye Romî derî ji wan re vedike. Pîrejin derbas dibe û fermanê dide birê min jî, ji bo ku derbas bibe. Derbasî maleke mezin dibin ku berî hertiştî çavê wî li hêwaneke raxistî, mezin dikeve ku perdeyên wê berdayîne. Birê min rûdinê, zêrên xwe dixê nav destên xwe de û kefiya xwe jî datîne ser kabokên xwe. Dûvre ji nişkê ve dibîne ku cariyek pir xweşik derbasî wir dibe di nav kincên giranbuha de, heta wê kêlikê jineke di wê timtêlê de nedîtîbû! Birê min ji ber wê radibe ser xwe. Gava ku çavên wê jî li wî dikevin, di rûyê wî de dikene, pê şa dibe û piştê diçe derî digire, dûvre li birê min vedigere, bi destê wî digire û bi hev re diçin heta ku têne odeyeye bi tenê. Derbasî wir dibin, dibîne ku odeyeye bi dibac û qesebê raxistiye di asteke jor de. Birê min rûdinê, ew jî li kêleka wî rûdinê û nêzî seetekê pê re dilîze. Piştê, radibe ser xwe û jê re dibêje: “Tu ji vir neçe heta ku ez li te vegerim.”

Jina spehî ji wir diçe û bêhtirî seetekê bi ser de nayê. Ew jî bi tenê dimîne û nizane bê wê çi bike. Hîna ku ew di wî halî de ye, evdekî reş î girs derbasî cem wî dibe û şûrekî ji kalankişandî pê re ye ku bi çirûsîna xwe, çavên mirov kor dikir. Evd ji birê min re dibêje: “Kê tu aniye vir ey mirovê rezil û ruswa, ey bêjiyê ber destê qûnekan?” Zimanê birê min nagere, devê wî dikeve hev û naghê ku bersivê bide wî. Evd wî digire, tazî dike û bi şûrê xwe lê dide heta ku heştê birînî di laşê wî de vedike. Gava ku birê min dikeve erdê û laşê wî dibe term, evd, dev jê berdide, dibêje qey miriye û qîrekê dide ku erd ji ber diheje. Piştê, dibêje “Ka şêrîna min?” û bi şûn de diçe.

Dûvre cariyeyek tê cem birê min ku sêniyeye xwê di destê wê de ye. Birê min ji tirsê, xwe tevnade, da ku kes nizanibe ku hîna sax e û wî nekujin. Cariye jî bi xwê ya di sênîkê de, hewl dide ku birînên wî bikewîne. Piştê, cariyeye diçe û evd dîsa qîrek mîna ya berê dide ku pîrejin jî li dû wî dengî tê, bi nigê birê min digire û wî li dû xwe dikişîşîne, ber bi sirdabeke kûr ve, ku pir tariye û wîna bi ser cendekên çend heb kuştîyan de davêje ku biniya wê

sirdabê(tunel) de ne. Du rojan sax, di wir de dimîne. Vêca Xwedê Teala wisa dike ku bi xêra wê xwê ya ku xwîna wî dabû sekinandin, nemir.

Gava ku birê min bi ser xwe ve tê û hêzê di xwe de dibîne, radibe ser xwe, kunekê di dîwarê serdabê de vedike û ji nav meytên wan kuştîyan derdikeve. Xwedê wî disitirîne, ew jî di nava tarîka wê dehlîzê de dimeşe û xwe tê de vedişêre, heta sibehê.

Gava ku dibe sibeh, pîrejin, dîsa derdikeve li dû nêçîreke din, birê min jî dide dû, bêyî ku wê bi xwe bihesîne. Piştî, diçe mala xwe û dermankirina birînên xwe li wir berdewam dike. Ji aliyekî din ve jî, pîrejinê roj bi roj dişopîne û wê dibîne bê mirovan çawa yeko yeko bi xwe re dibe wê mala hanê. Piştî ku birînên wî rehet dibin û bi ser xwe ve tê, kîsîkekî tîne û wî tije tîk dike û wî bi newqa xwe ve girêdide, rûpoşekê jî digire ser çavên xwe ji bo ku kes wî nasneke û kincên Eceman li xwe dike û şûrekî jî di bin de bi cih dike. Dûvre tê cem wê pîrejinê û bi devoka Eceman jê re dibêje: “Gelo mêzênêk li ba te heye ku nehse dînarî bikêle?” Pîrejin dibêje: “Kurekî min î serraf heye ku hemû mêzên li ba wî hene. Vêca ka bi min re were, em herin cem wî berî ku dikana xwe bigire, ji bo ku zêrên te bikêle.” Birê min jê re dibêje ‘Ka bide pêşîya min.’ û dide dû wê, diçe heta ku wî dibe ber wî deriyê berê. Jinik li derî dide, heman cariyeya berê derî ji wan re vedike û bi devlikenî wî pêşwazî dike.

*Di vir de li Şehrezadê dibe sibe û ew jî gotina xwe dibire.*

ŞEVA ÇEL Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min î gewre, vêca ew berber axaftina xwe berdewam dike û dibêje:

Cariye bi birê min re dikene, pîrejin jî jê re dibêje ‘Vê carê min goştêkî qelew ji te re aniyê’ û bi destê birê min digire û wî derbasî heman malê dike ku berê jî ew anîbû wir. Cariye nêzî seetekê, li gel birê min rûdinê, piştî radibe ser xwe û ji birê min re dibêje: “Ji vir neçe heta ku ez li te vegerim û diçe.” Piştî demeke kurt, evdê berê dîsa tê cem birê min û şûrê wî yê tazî jî di destê wî de. Ji birê min re dibêje: “Rabe ser xwe bêyomo!” Birê min jî radibe ser xwe û dide dû yê evd, piştî destê xwe davêje şûrê xwe yê veşartî, wî ji bin kincên xwe derdixe û li evd dide, cendekê wî li erdê rast dike. Piştî bi nigên wî digire, wî dikişîne heta sirdabê û qîrekê dide, dibêje ‘Ka şêrîna min

li ku ye?’ Cariye tê û sênika wê jî di destê wê de. Gava ku çav li birê min di-keve û şûr di destê wî de, bi şûn de direve. Birê min bera dû dide, xwe pê ve digihîne, şûr li stûyê wê dide, serê wê difirîne û qîr dike dibêje ‘Ka pîrejin?’ Gava ku pîrejin tê, jê re dibêje: “Tu min nasdikî gelo, ey pîrejina bêyom?” Ew dibêje: “Na wile mîrzayê min.” Birê min jê re dibêje: “Ez xwediyê wan dînara me, ew ê ku tu hatî te li mala wî destavek girt û li wir nimêj kir û piştî te hîle lê kir ew anî vir û te ew xist xefikê de!” Pîrejin dibêje: “Ji Xwedê bitirse lawo!” Birê min lê vedigere û bi derbeke şûr wê dike du perçe. Piştî bi dû cariyeya din de diçe. Cariye, çawa ku wî dibîne, hişê xwe wenda dike û xwe davêje bextê wî, efûya xwe jê dixwaze. Ew jî wê efû dike û jê re dibêje: “Tu çawa ketiye destê vî evdê reşik de?” Ew jî dibêje: “Ez cariyê bûm di destê hinek taciran de û ev pîrejina hanê jî, carinan dihate cem min. Rojekê hat cem min û got ku dawetek pir xweş li ba me heye, ez dixwazim tu jî werî wê temaşe bikî. Min jî got, bila be û ez rabûm û min kincên xwe yên herî xweşik li xwe kirin û min rahişt kîsikekî ku sed dînar tê de hebû û ez pê re çûm heta ez anîm vê malê û ez xistim destê vî evdê reşik ku ev sê sal in dest daniye ser min, di rûyê vê pîrejina hîlekar de.”

Birê min jê re dibêje: “Gelo tiştêkî wî di vê malê de heye?” Ew jî dibêje: “Gelek tiştên wî hene, heger tu bikaribî rahêji wan, gişan bibe.” Birê min radibe dide dû wê û diçe ser sindoqên ku tije tûrik û kîsên mal in û dimîne heyirî, nizane wê çawa bike. Cariye jê re dibêje: “Vaye ez li vir im, tu jî here hinekan bîne ku bikaribin vî malî rakin. Birê min jî diçe, deh zilaman kirê dike û tê dibîne ku derî vekirî ye! Derbasî hundur dibe, ne cariyê li hundur dibîne ne jî tûrikên mal û diravan. Tenê piçek pere û hinek caw dibîne û tê derdixe ku cariyeyê ew xapandiyê.

Li hundur digere, hemû sindoq û dolaban vedike, ji caw û diravan, ji xwe re diravan komî ser hev dike û bi bextewarî wê şevê li wê derê radikeve. Sibehê şiyar dibe, bîst leşkeran li ber derî dibîne! Çawa ku derdikeve, wî dardest dîkin û jê re dibêjin ‘Walî te dixwaze’ wî dibin ber destê walyê ku jê re dibêje, te ev caw ji ku aniye? Birê min jê re dibêje: “Bext bide min, ez ê bêjim.” Bext dide wî, ew jî serpêhatiya xwe gişî jê re dibêje ji serî heta binî. Piştî jî ji walî re dibêje: “Tu çi dixwazî, wî bibe û yên mayî jî bide min da ku ez debara xwe pê bikim.”

Walî destpêkê hemû mal û caw dixwaze, piştî ditirse ku sultan pê bihese, hinekî ji xwe re dibe û hinekî jî dide birê min û jê re dibêje: “Ji vî bajarî derkeve, nexwe ez ê te bi dar vekim.” Birê min jî dibêje ‘Ser seran û

ser çavan' û ji bajêr derdikeve û berê xwe dide welatine din. Di rê de diz wî digirin, wî dişelînin; tazî dikin, lê didin û herdu guhên wî jê dikin. Min jî ew yek bihîst, ez çûm cem, min kinc lê kirin û bi dilxweşî ew anî bajêr, li cem xwe bi cî kir û têra wî, xwarin û vexwarin dayê.

(Çîroka Birayê Berber yê bi navê Şeqliq)

Ey Emîrê Bawermendan! Birayê min ê şeşan jî, lêvjêkirî ye. Ew jî xizanekî belengaz bû ku tutişt ji malê dinyê di destên wî de tunebû. Rojekê ji mal derdikeve ji bo tiştêkî bibîne, debara xwe pê bike. Hîna ku wisa ji xwe re dimeşe, çavên wî li maleke xweşik dikeve ku hewşeke wê yî fireh û bilind heye û li ber derî jî xulam û ferman û emîr hene. Ji yekî rêbiwar dipirse, ew jî dibêje: "Ev mal ya zaroyên qralan e." Birê min jî nêzî dergevan dibe û parsê ji wan dixwaze, ew jî dibêjin: "Derbasî malê bibe, tu çi dixwazî dê wî ji destê xwediyê malê bigirî." Ew jî derbas dibe hewşê û seetekê dimeşe heta xwe digihîne malê. Maleke pir xweşik bûye ku bexçeyek di navê de bûye, kesî tiştêkî wisa nedîtibûye. Hundur jî giş mermer û perdeyên wî jî berdayî bûne." Vêca birê min jî xwe şaş dike û nema dizane bê bi ku ve here. Ber bi hêwanê ve diçe, mirovekî rûgeş û bi rîh dibîne ku di cî de pê ve radibe, pêşwaziya wî dike û li hal û wextê wî dipirse. Ew jî dibêje: "Ez xizan im û ez ji xwe re li alîkariyê digirim." Gava wan gotinan ji birê min dibihîze pir xemgîn dibe û destên xwe davêje kincên xwe, wan diçirîne û dibêje "Ez ê çawa li heman welatî bim ku tu lê birçî yî? Ez nikarim vê yekê bikşînim!" Piştî, soz dide ku xêrê pê bike û dibêje: "Mîsoger divê tu li cem min bimînî û tu sohbetê bi min re bikî." Piştî berdewam dike û dibêje: "Ciwamêr, ez mirovekî bêsebr û pir hestiyar im." Dûvre qîrekê li xulamê xwe dike û dibêje 'Kanî teştê û avê bîne vir' û ji mêvanê xwe re jî dibêje 'Xwe bi pêş de bide û destên xwe bişo' ew bi xwe jî xwe ditewîne û destên xwe tev dide wek ku dişo. Dûvre li xulamê dike gazî ji bo ku sifreya xwarinê raxin. Xulam jî diçin û tîne wek ku sênîkan deynin û sifreyê raxin. Li dawiyê jî bi destê birê min digire û wî dibe ber wê sifreya xeyalî, dide rûniştandin û destê xwe dibe û tîne, devê xwe vedike û digire, wek ku xwarinê bixwe û ji birê min re jî bênavber dibêje: "Bixwe û fedî neke, Xwedê dizane bê niha tu çiqaşî birçî yî!"

Dihêle ku birê min jî destên xwe bavêje sênîkên xeyalî û çena xwe bibe û bîne, çawa ku xwarinê bixwe û jê re dibêje: "Li vî nanî binêre! Li spîbûna vî nanî binêre!" Birê min jî di dilê xwe de dibêje; ev mirovên hanê dixwaze tinazên xwe bi xelkê bike! Piştî li mazûvanê xwe vedigere û jê re dibêje:

“Ezbenî di heyata xwe de, min spîbûn weke ya vî nanî nedîtîye û min tam jî weke ya wî xweş nedîtîye.” Ew jî dibêje: “Ev nanê hanê, carîyeke min ew pehtîye ku min ew bi pêncsed dînarî kirîbû.” Piştî qîrekê dide xulamî û dibêje: “Kuro kanî kebaban jî me re bînin! Bila jî wan kebabên ku qralan ew nexwaribûn bînin.”

Di pey re jî li birê min vedigere û dibêje: “Bixwe mêvanê min bixwe, ez dizanim ku tu pir birçî yî û pêdiviya te bi xwarinê heye.” Birê min jî çena xwe bi ser hev de dibe û tîne, çawa ku xwarinê bicû û zilam jî her car teşeyê nû jî xwarinê dixwaze û jî birê min re dibêje, bixwe. Piştî qîrekê dide xulamî û dibêje ‘Kanî wan zîxanên bi fîstîqan heşandî bînin.’ û li birê min vedigere jê re dibêje ‘Heta ku tu bikaribe bixwe.’

Birê min jî dibêje: “Begê min, xwarin mîna vê biçêj nîn in.” Ew jî destê xwe dibe ber devê birê min, mîna ku ew bi destê xwe xwarinê bide wî û babetên xwarinan jê re dijmêre bi awayekî ku dilbijokiya wî veke û ew jî birçî. Bi wî hawî birçîbûna birê min, lê hartir dibe êdî bi nanekî cehinî jî qayil dibe. Piştî xwediyê malê jê re dibêje: “Gelo te xwarin mîna van xwarinan biçêj dîtine?” Birê min jî jê re dibêje “Na begê min!” Ew jî dibêje: “Baş bixwe û fedî meke.” Birê min dibêje ‘Min têr xwariye.’ ew jî qîr dike bi ser xulamên xwe de û jî wan re dibêje ‘Ka şêraniyê bînin!’

Xulam jî diçin û tîne û xwe daqûl dikin wek ku sênîkan deynin erdê, mazûvan jî jî birê min re dibêje: “Ji vana bixwe, ev babet baş e û gepekê jî vê jî bixwe, yekê jî jî vê babetê jî berî ku şîreya wê jê were xwarê.” Birê min jî dibêje: “Xwedê mala te ava bike mîrzayê min!” Dûvre jî birê min dikeve nav de û gelek pîrsan jê dike di derbarê çêkirina wê şêraniyê de û pîrbûn û miqdarê şekir û sindikê ku dixin nava wan qedayîfan de. Ew jî dibêje: “Ev a han, çand û adetên mala min in, timî jî bo min misqalek misk û nîv misqal ember dixin nava her dilimî de.” Bi vê ravekirina wî re, birê min jî serî dihejîne, çena xwe dibe û tîne, mirçe mirç bi devê wî dikevin wek ku tama devê xwe xweş bike bi van şêraniyan.

Piştî mazûvan gazî xulamên xwe dike, dibêje: “Tebaqa fêkî bînin.” Ew jî destên xwe di hewa de dibin û tînin mîna ku tebaqa fêkî anîbin, mazûvan jî axaftina xwe berdewam dike û jî birê min re dibêje: “Ji van mûz û gûz û mewîjan bixwe û fedî neke.” Birê min jî dibêje: “Begê min, min têr xwar û êdî ez nema dikarim tutîştî bixwim.” Ew jî dibêje: “Mêvanê ezîz, heger tu bixwazî xwarinên erjeng û ecêb bixwe û wan temaşe bikî, birçî nemîne!”

Piştire birê min diponije û kûr kûr di xwe difikire li ser xwe û ev zilamê ku tinazên xwe pê dike û di encamê de jî ji xwe re dibêje “Bi navê Xwedê ez ê tiştêkî bînim serê vî zilamî ku dev ji van karên xwe berde û careke din tiştêkî wisa bi kesî neke.” Di wê navberê de mazûvanê wî ji xulamên xwe re dibêje: “Kanî şerabê bînin!” Wan jî destên xwe birin û anîn, çawa ku şerabê pêşkêşî wan bikin. Mazûban jî xwe bi ser de ditewîne û wek ku qedehekê bide dest birê min, xwe dirêjî wî dike û dibêje: “Vê qedehê bigire, tê bicibîni!” Birê min jî dibêje: “Ev ji kerema te ye begê min.” Piştire destê xwe dibe ber devê xwe û bi jor ve hildide, mîna ku vexwe. Ew jî jê re dibêje; te eciband gelo? Birê min jî dibêje: “Begê min, min ji vê şerabê xweştir nedîtiye. Ew jî dibêje: “Vexwe, noşîcan be ji bo te.” Piştire ew jî hawê vexwarina qedehekê dike û qedeheke din dide birê min. Birê min wê qedehê jî vedixwe û haweyê serxweşan dike, çawa ku şerabê li serê wî dabe. Piştire destê xwe hildide heta ku binçengê wî xwiya dike û ji wê bilindahiyê destên xwe bi ser çavên wî de dadixe, şeqamekê lê dide ku erd ji ber wê diheje. Piştire yeke din jî lê dide û yeke din jî...

*Di vir de, li Şehrezadê dibe sibe û ew jî gotina xwe dibire.*

## ŞEVA ÇEL Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Vêca Şahê min ê bextewar, tê gotin ku gava birê berber şeqaman li xwediyê malê dide, zilam jê re dibêje: “Îcar ev çi ye rezilê rezîlan?” Ew jî dibêje: “Begê min, ez evdê te me, yê ku te ew derbasî mala xwe kiriye, xêr pê kiriye û te ew têr kiriye û şeraba kevnar daye wî ku pê serxweş ketiye û êdî henekan bi te dike. Îcar meqamê te jî bilind e û di ser wê yekê re ye ku lê bigire ji ber nezaniyên wî.”

Berber ji civatê re çîroka birê xwe wiha dewam dike:

Gava ku xwediyê malê wan gotinên birê min dibihîze, tiqîni pê dikeve, dikene û dibêje: “Ev demeke dirêj e ku ez tinaz û henekên xwe dikim bi hemû kesên din, henekhez û laqirdîkaran, di nav wan de min kes nedît ku ez evqase henek pê bikim û ne jî yekî zîrekî ku pozê xwe di hemû derên min rake mîna te. Vêca niha ez te efû dikim û ez dixwazim ku tu bibî destbirakê min û li cem min bî.” Îca hinek ji wan xwarinên ku di serî de behsa wan kiribûn tîne û ew û birê min bi hev re dixwin heta ku têr dixwin. Piştire derbasî civata şerabvexwarinê dibin ku cariyeyên weke heyvan li wir, stranên cûr be

cûr ji wan re dibêjin. Dûvre, têra xwe vedixwin û dilîzin heta ku ji ser hişê xwe diçin. Zilam jî wensa wî bi birê min tê û jê hez dike mîna ku birayê wî be. Piştî ku dibe sibeh, dîsa li xwarin û vexwarinê vedigerin û bîst salan bi wî hawî berdewam dikin.

Piştê zilam dimire û sultan jî dest datîne ser mal û milkên wî, birê min jî ji bajêr derdikeve, direve. Di rê de rêbirên Ereban pêşiya wî digirin, wî dîl digirin, îşkence û lêdanê lê dikin û jê re dibêjin: “Ruhê xwe bi diravan ji me bikire, naxwe em ê te bikujin.” Birê min digrî û dibêje: “Şêxê Ereban, bi navê Xwedê ez xizanekî feqîr im û tiştêkî min tune, rêya ku diçe diravan jî ez nasnakim, vêca ez niha hêsîr im û di destê te de me, tu çi bi min dikî tu dizanî.” Koçerê Ereban kêreke pehn ji ber kemera xwe derdixê ku li stûyê deveyekî bide wê di cî de jêbike û ber bi birê min ve tê, lêvên wî jê dike û daxwaze xwe dubare dike ku diravan bide wî.

Vêca jineke ew ê Ereba hebûye, pir spehî bûye. Çi gava ku mêrê wê dîrî malê dikeve, ew jî bela xwe di birê min de dide, lê ew ji Xwedê ditirse û bi ya wê nake. Rojekê ji rojan jinik dîsa belaya xwe tê dide, ew jî bi ya wê dike û di hundur de pê re dilîze. Di wê navberê de zilam vedigere malê û wan di wî halî de dibîne, ji birê min re dibêje: “Wey bêbext, niha jî tu dixwazî exlaqê jina min xera biki!?” Zilam kêrekê derdixê, kîrê wî pê jêdike, wî li ser piştê deveyekî dike, wî dibe davêje serê çiyakî û bi rêya xwe de diçe. Piştê hinek rêwî lê rast tî, wî nas dikin, xwarin û vexwarinê didin û piştê min jî agahdar dikin. Ez çûm, min ew anî, derbasî bajêr kir, bi cî kir, pêdiviyên wî temîn kirin û piştê va ez hatim cem te ey Emîrê Bawermendan. Min nexwest ku ez vegerim malê berî ku ez te agahdar bikim.

Gava ku Xelîfe çîroka min û agahiyên di derbarê birayên min de guhdar kir, kenîya û got: “Bêdengo tu rast dibêjê, bi rastî jî tu kêmpêv û kêmmereq î, lê niha ji Bexdê derkeve û here bajarekî din.” Bi wî hawî, Xelîfe ez sirgûn kirim ji Bexdê. Ez jî çûm welatin dîtir û ji xwe re geriyam, heta ku ew mir û xelîfeyekî din hat şûna wî. Wê gavê dîsa ez vegeriyam wir û min ev xortê han dît û min qenciya herî baş bi wî kir, lewre ne ji min bûya, dê bi-hata kuştin û divê ev civata hêja giş bizanibe ku ew tiştên wî di derbarê min de gotin, ji mereq û piraxaftî û cirnexweşiyê, hemû derew û bêbingeh in.”

Piştê Terzî ji Şahê Çînê re got:

Gava me çîroka berber guhdar kir û em ewle bûn ji mereqarî û pi-

raxaftina wî û em têgihîştin ku ew xort mafdar û bêrî ye, me berber girt, ew avêt hepsê û em jî bi dilekî rehet li ser welîmeya xwe rûniştin, bi xweşî me xwar û vexwar. Em wisa rûniştî man heta ku mele ezana esir xwend. Wê çaxê ez vegeyîyam malê û bi jina xwe re rûniştim. Jina min jî got, bi roj pêde tu ji xwe re digerî û ez jî di mal de dimînim, bi vê xemgîniya xwe. Heger vî wextê mayî jî, tu min dernexînî, negerînî, evê bibe sedema veqetîna me. Rabû min ew derxist, em ji xwe re geriyan heta piştî muxrub. Dûvre em vegeyîyan û bi rê de em li evê xûz rast hatin ku serxweş bû û bêhna şerabê jê dihat û digot:

Cam tenik, meyxur tenik dibe  
Cam dibe mey mey jî cam dibe  
Cudakirina wan jî zortir dibe  
Heçku meyeke bê cam dibe  
Ango ew cameke bê mey dibe

Min ew ezimand mala xwe, wî jî qebûl kir. Piştî ez derketim, çûm ji bo masiyên qelandî bikirim û dîsa bi şûn de vegeyîyam, em bi hev re rûniştin li ser şîvê, jina min jî gepek nan û qetek jî masî xist devê wî de, ew jî fetisî û mir. Min jî rahişt wî û bi hîlekari min ew bir, avêt mala vî hekîmî, hekîm jî hîle kir ew avêt mala Seraşpêj, Seraşpêj jî hîle kir û ew avêt ser rêya evê Simsar! Çîroka me jî ev e, de êdî ev ji çîroka Xûzo ne erjengtir e?

Gava ku Şahê Çînê ev çîrok bihîst, ferman da hinekan ji dergevanên xwe, da ku li gel Terzî biçin û wî Berberî binin û ji wan re got: “Bêgûman divê ez li wî jî guhdar bikim ji bo ku bibe sebaba xelasiya we gişan û em jî meytê vî xûzî bişon û veşêrin, lewre ji doh êvarê ve wefat kiriye û divê em birdariyekê jê re çêbikin, lewre ew e yê bûye sebeb ku ez ji van xeberên ecêb agahdar bibim.”

Hina seetek di ser re derbas nebûbû, dergevan bi şûn de vegeyîyan piştî ku bi Terzî re çûn Berber ji hepsê derxistin û anîn ber destê Şah. Şah lê meyzand, dît ku berber, kalemêrekî notsalî ye, rûreş û rîhspî ye. Şah, bi vê dîmena wî kenîya û got: “Bêdengo! Ez dixwazim ku tu hinekan ji wan çîrokên xwe ji me re bibêje!” Berber jî got: “Şahê Zemanan, gelo çi karê ev ê File û evê Cihû û evê Musulman û vî Xûzîkî li cem we heye û çima ev kes hemû li vir kom bûne?” Şahê Çînê jî jê re dibêje: “Û tu çima li wan dipirsî?” Ew jî dibêje: “Ez li wan dipirsim da Şah bizanibe ku mereqkêş im û ez tenê bi tiştên ku têkildarî min in ve mijûl dibim û ez bêrî me ji wan tuhmetên wan î ku dibêjin ez pir diaxivim. Jixwe ev nasnavê Bêdeng ê ku wan li min



kiriye besî min e ji bo ku bêrîtiya min ji van gunehan diyar bike.”

Şah dibêje: “Hela çîroka wî zîlamê Xûzik ji Berber re bêjin bê şeva borî çî bi serê wî hatiye û tiştên ku ev ê File û yê Cihû û yê Terzî û yê Seraşpêj gotine, jê re rave bikin.” Ew jî çîrokên gişan ji wî re dibêjin. Berber serê xwe dihejîne û dibêje: “Bi navê Xwedê ev tiştêkî xerîb e, hela kanî meytê wî xûzikî nîşanî min bidin!” Nîşanî wî didin, ew jî li ber rûdinê, serê wî datîne ser çoga xwe û li rûçikê wî dinêre. Piştî, tîqînî pê dikeve û dikene heta ku lal dibe. Dûvre jî dibêje: “Ji her mirinekê re sebebek heye, lê mirina evê xûzik ecêb e! Divê were tomarkirin di lénûsan de ji bo bibe îbret ji xelkê re û ji nîfşên ku bê re.” Şah jî şaşwaz dibe li hember vê gotina wî û pê re dibêje: “Bêdengo, hela sebeba wan gotinên xwe ji me re rave bike?” Berber dibêje: “Şahê min, bi navê Xwedê ruh di bedena wî de heye!” Piştî, kildankekê ji ber xwe derdixe ku dohn tê de hebûye, stûyê Xûzo pê dohn dike û dipêçe heta ku xwêdan dide. Dûvre du çengelkên hesinî ji ber xwe derdixîne, bi qirika wî de berdide heta ku di wî perçeyê masî de dialiqîne, bi şûn de diqişîne û ew perçeyê masî tev li hestiyê wî, ji qirika Xûziko derdixîne. Xûzo çavên xwe vedike û piştî pişkandineke xurt, bi ser xwe ve tê. Berber destê xwe di ser rûyê wî re dibe û tîne, piştî dibêje: “Laîlaheîllallah û Muhemmed resûlullah!”

Kesên derdorê şaş û metal dimînin! Bi çav û destan lê dinêrin, da ku li dîtina xwe ewle bibin; Şahê Çînê jî dikene heta ku xwe wenda dike. Kesên li dora wî jî wisa. Dûvre Şah dibêje: “Bi navê Xwedê ev çîrokeke pir erjeng e û min çîrok mîna vêya nedîtine.” Piştî berdewam dike û dibêje: “Ey Musulmanino, ey leşkero! We qet ditiye ku kesek miriyê û piştî dîsa zindî bûye? Bi navê Xwedê, heger ne ji vî Berberî bûya, dê îro ew ji xelkên wê dinyayê bûya. Ev Berber, bû sebeb ji jiyana wî re.” Hemûçik dibêjin: “Willehî ev ecêbeke ecêban e!”

Piştî, Şahê Çînê ferman dide ku ev bûyer were tomarkirin. Tê tomarkirin û wê dixin xezîneya Şah de. Dûvre Şah cil û bergên nû li yê Cihû, yê File, yê Seraşpêj, yê Xûzik û dostikê xwe dike, terzîxaneyekê ji Terzî re vedike û navbera wî û Xûzik xweş dike û mûçeyekê ji wan re vediqetîne. Kincên nû li Berber jî dike, berberxaneyeke bi camekan jê re eyar dike, mehmizekê jê re vediqetîne û wî dike berberê Şahbanûyê û dostikê wê yê taybet. Her wiha hemûçik jî jiyana xwe di nav kêf û xweşiyê de berdewam dikin heta ku xerabkarê xweşiyê û belavkarê dostaniyê li wan vedigere.

*Şehrezad, hineki bêdeng bû, piştire berdewam kir û got “Lê belê ev çîrok ne erjengtir e ji ya herdu wezîran û wenskara civakê.” Xwişka wê jê re got: “Xwişkêcan û ew çawa ye?” Lê li Şehrezadê bû sibeh û wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA ÇEL Û PÛNCEMÎN

(ÇÎROKA HERDU WEZÎRAN Û WENSKARA CIVAKÊ<sup>10</sup>)

*Şah Şehriyar got”Û çîroka herdu wezîran çawa ye?” Şehrezad got:*

Şahê min î bextewar, tête gotin ku mîrek li Besrayê hebû ku ji xizan û feqîran hez dikir û li hemberî xelkê xwe jî dilovan bû, gelek malê xwe li ser wan xerc dikir, çawa ku helbestkarekî di derbarê wî de gotibû:

Şahekî ku gava hewar jê tê xwestin  
Dujminatiyê ji bîr dike ew bi betsin  
Di singê de şopeke xurt dihêle ew  
Dema ku bi şûr û rîman tîne ser ew  
Deryayeke ku bawanê wî şûr û rîm in  
Spî veşartiyê kelehên wî her al in  
Sûnd xwaribû felekê ku bîne yek wek wî  
Lê belê sûnda xwe xwar, ka keffarta wî!

Û navê wî mîrê mezin jî, El -Fadil Mihemed Bin Silêman El-Zeynî bû, ku du wezîrên wî hebûn. Navê yekî jî wan El-Muîn Bin Sawî bû û yê din jî El - Fadl Bin Xaqan bû. Vêca El-Fadl Bin Xaqan comerdê zemanê xwe bû, zimanşêrîniya wî evîna wî dixist dilê her kesî de û ew li dora xwe kom dikirin. Aqilmend jî herdem pê dişêwirîn. Xelkê jî dua jê re dikirin ji bo ku mîrîtiya wî dirêjtir bibe, ji bo ku xêrxwazî berdewam bike di civatê de û pêşî li xerabiyê were girtin. El-Mûîn Bin Sawî jî, mirovekî xerab bû ku ji xêrê hez nedikir û çavkaniya xerabiyê bû. Mirovekî wisa bû, çawa ku dibêjin:

Zarokên comerdan bi comerdan şêrîn in  
Lewre ji comerdan re comerd çêdibin  
Hûn jî dev ji xerab û pisxeraban berdin  
Lewre ji xeraban herdem xerab çêdibin

Û bi qudreta Xwedê xelkên deverê, bi qasî ku ji Fadl Bin Xaqan hez dikir, ji El-Mûîn Bin Saw jî diqehêrîn. Rojekê gava ku Mîr Mihemed Bin

10 . Wenskar: Bi zimanê Erebi “ENÎS, ENÎSE” tête bikaranîn ku ev nav leqebeke ji kesên kole – xizmetkar – cariyê yên ku timî li ber destê xwediyê xwe diçin û tîn, ango li cem rûdinên, sebra wî tînin. Ango ew wensa xwe bi wan tîne. Divê çîroka me de jî leqebê cariyeyekê ye. Ji ber ku min navekî resen di Kurdî de li hemberî wê nedît, mîna WENSKAR min ew bi nav kir. (wergêr)

Silêman El-Zeynî li ser erşê xwe rûniştî bû û erkdarên dewletê ji li dora wî bûn, gazî wezîrê xwe El-Fadl Bin Xaqan dike û jê re dibêje: “Ez cariyeyekê ji te dixwazim ku kes mîna wê xweşik, paqij, durust û bisinc tunebe di vî zemanî de.” Erkdarên dewletê jê re dibêjin: “Cariyeke wisa, encax bi deh hezar dînar peyde bibe.” Wê kêlikê mîr gazî xizmetkarê xwe dike û dibêje: “Rahêje deh hezar dînar, bibe mala El-Fadl Bin Xaqan. Xeznedar fermana mîr pêk tîne. Wezîr ji derket çû piştî ku Mîr ferman da wî ku her roj biçe sûkê û şîretê li simsaran bike ji bo vê yekê da ku tu cariyeya di ser hezar dînarî re tete firotin, bêyî agaha wezîr neyê firotin. Simsar li gorî vê fermanê tevgeriyan û cariyeyên di vê radeyê de bêyî wezîr nefirotin. Vê rewşa han, heta demekê wisa berdewam kir bêyî ku wezîr cariyeyekê bicibîne. Rojekê çend simsaran berê xwe dan mala wezîr El-Fadl Bin Xaqan û di rê de lê rast hatin ku bi siwarî berê xwe daye qesra Mîr. Simsarekî bi çoga wî girt û ev herdu beyt gotin:

Ey vejînkar û berhevkarê vê dewleta belawela  
Hîna jî tu yî wezîrê serkeftî û destbîala  
Te ji nû ve vejand di nav me de comerdî bi sala  
Herkes bo te spasdar e li gel Rebbê jor û ala

Dûv re jê re got: “Begê min, ew cariyeya ku fermana pîroz di derbarê wê de derketibû, amade ye.” Wezîr jê re got: “Ka wê bîne cem min!” Simsar çû û piştî seetekê bi şûn de vegeziya û cariyê jî pê re. Keçeke bejinzirav, sîngstewyayî, çavxezal, rûhinar, newqzirav û girankulimek bû. Kincên pir xweşik li ser bûn, lê belê hêtên wê di bin kiras re xweştir xuya dikirin û qama wê jî xwe eşkere dikir di bin kincan re û axaftina wê jî tenik bû weke sira bayê ku di ser gulên bîstanan re diçe, çawa ku di van beytan de jî derbas dibe:

Rûyê wê mîna hevrêşîm e beden weke mermer  
Û çav jî karîger in weke meyê li ser hiş û cewher  
Vêca hêzê bide her şev ey evîn ji bona min  
Lewre bisk mîna şevê ne li ser wê eniya rûheyv  
Heger na bila civan roja heşrê be ey sebra roj û şev

Ango çawa ku hozanekî din jî gotiye:

Her ji wê hezkiriye Xwedayê erş û îzzetê  
Wêjeyê her xewle kir ew bi peyv û hîmmetê  
Heft peykên wê hene li asîmanê zanîstê  
Û xewn û fikreke bala di ser eqlê ummetê

Vêca gava ku wezîr çav lê ket, ew pir eciband û li simsar zîvirî, jê re got:

“Buhayê vê cariyeyê çiqase ye?” Wî got: “Li ser deh hezar dînar sekiniye, lê belê xwediyê wê sûnd dixwe ku deh hezar dînar, heqê zîxanên ku xwarine û mesrefa ku li ser mamosteyên wê çûye nake. Lewre keçik fêrî xet, ziman, gramer, şîrovekarî, bingehên dîn û fiqhê, bijîşkî, teqwîmnasî û mûzîkjeniyê bûye.” Wezîr got: “Ka hela xwediyê wê bîne cem min.”

Simsar di cî de çû ew anî. Mirovekî Ecem bû, temendirêj bû û ji êş û derdan, hestî û çerm mabû. Wezîr jê re got: “Ka gelo tu razî bû ku tu vê cariyeyê bi deh hezar dînar bidî Mîr Mihemed Bin Silêman?” Ê Ecem got ku heger ji mîr re be, divê ez wê bê pere, weke diyariyekê pêşkêşî wî bikim. Wê gavê wezîr ferman da ji bo ku dînanan bînin û ji mirovê Ecem re jimartin û dane wî. Piştî, yê simsar nêzikî wezîr bû û jê re got ku destûra mîrzayê min hebe, ez dixwazim çend gotinan bêjim. Wezîr got: “Hela bêje.” Rabû wî jî got: “Ez dibêjim vê cariyeyê îro nebe cem mîr, ji ber ku keçik ji rêwîtiyêke dûr hatiye, betiliye û hewa lê hatiye guhertin. Wêna deh rojan di qesrê de li ba xwe bihêle, dê xweşiktir bibe. Piştî, wê bibe hemamê, baş bişo û kincên xweşik lê bike û bi wî hawî wê bibe cem mîr, da ku şensê te hin bêhtir hêbe.” Wezîr li ser van gotinên simsar fikirî, rastî tê de dît. Rabû cariyê bir qesra xwe, odayek da wê û hemû pêdiviyên wê yê rojane jê re amade kirin, ji xwarin û vexwarin û hwd. Keçik jî di nava wê xweşiyê de jiya. Kurekî wezîr El-Fadl Bin Xaqan hebû, mîna heyvê bû bi rûyê xwe yê şewqdêr, bi hinarkên xwe yî sorik û bi wê şana ku weke xaleke emberê bû li ser rûyê wî, çawa ku helbestkarekî jî di van ristan de gotiye:

Hinarkgul e ew, striyên ruman jî di biniyê re  
 Vêca kî diwêre bêje ez wî diçinim ji xwe re?  
 Dest nikarin qet xwe bigihînin wî bi hinava  
 Heta ku şer berdewam e li ser wî bi van çawa  
 Axîn ji wî dilê hişk û ji wê newqa tenik ra  
 Xweska te biguherta ew tenikbûn bi hişkê ra  
 Ey evîndarê evînê min bibexşîne û here  
 Cem ew kesê ku laşê wî war e ji êşê re  
 Guneh tevde yê vî dilî û van çavan e  
 Êşa mezin wile îro ji destê wan e

Û kurik çîroka wê keçikê nizanîbû. Bavê wî jî şîret li keçikê kiribû û jê re gotibû: “Keça min, rastiya meseleyê ev e ku min bi dizî, tu ji Mîr Mihemed Bin Silêman re kiriye û kurekî min ji heye ku bi tena serê xwe bi kê re dimîne, wî karî pê dike. Vêca tu jî rûyê xwe ji ber wî veşêre, bila ne rûyê te bibîne, ne jî dengê te bibihîze.” Cariyeyê jî gotibû: “Ser seran û ser çavan.” Wî jî dev jê berdabû û çûbû.

Qeder wisa ye, rojekê cariyê derbasî serşoka malê dibe û çend cariyeyên din jî wê dişon, kincên giranbiha lê dikin ku husn û cemala wê xweşiktir dike. Piştê derbasî cem jina wezîr dibe û destê wê maçî dike. Ew jî jê re dibêje “Noşiya can be, Wenskara Civatê! Rewşa te çawa ye, serşuştin ji te re baş hat?” Wê jî got: “Xatûna min, ez pir pê rehet bûm, xweska tu jî bi me re hatiba hemamê.” Wê gavê xatûn jî ji cariyeyên malê re dibêje: “Ka rabin em herin hemamê!” Wenskarê dixê odeya wê û du cariyeyên biçûk datîne ber, ji wan re dibêje ‘Lê miqate bin, nehêlin ku kes biçê ba wê.’ û ew jî tevde bi hev re derbasî serşokê dibin.

Hîna ku Wenskara Civakê di odeya xwe de rûniştiye, kurê wezîr ê ku navê wî Elî Nûredîn e, derbasî hundur dibe û li diya xwe wan dipirse. Herdu cariyeyên biçûk dibêjin, ew di serşokê de ne. Wê gavê Wenskara Civakê jî dengê Elî Nûredîn dibihîze û ji xwe re dibêje ‘Gelo ev kurê wezîr ciwanekî çawa ye ku digot keçek di taxê de nehiştiye ku pê re raneketiye?’ û dilê wê bijiya dîtina wî; rabû ser xwe û ber bi derî ve çû bi wê spîbûna xwe ya şewqdêr û li Elî Nûredîn meyzand. Dît ku ew ciwanekî mîna heyvê ye û wê nêrînê hezar hesret pê re çêkir. Ciwan jî bi heman nêrînê lê meyzand û hezar hesret bi wî re jî çêbû û herdu ketin xefkên hev de. Ciwan ber bi herdu cariyeyên biçûk ve çû û bi ser wan de qîriya, herdu jî ji tirsan reviyên û ji dûr ve lê nêrîn, bê ka wê çî bike.

Piştê dîtina ku ciwan çû derî lê vekir û derbasî cem Wenskara Civatê bû. Elî ji cariyeyê re got: “Tu yî ya ku bavê min ew ji bo min kiriye? Wê jî got: “Belê.” Wê gavê ciwanê ku wê kêlikê serxweş bû, ber pê de çû, herdu şeqên wê ji hev vekirin û ew da ber xwe. Wê jî herdu destên xwe li dora stûyê wî anîn hev û bi maçin agirîn ew pêşwazî kir; bi helkehelkê ketin hev de û zimanên hev mêtin. Kurikê keçaniya Wenskara Civatê xera kir. Herdu cariyeyên biçûk ditirsin û ber bi hemamê ve diqîrin; lêbelê mîrzayê wan î biçûk bi miradê xwe şa bûbû û ji wir derketibû, bazdabû, reviyabû, ji tirsê cezayekî ku bigire ji ber wî karê xwe.

Gava xatûna malê dengê herdu cariyeyan bihîst, got: “Ev çî deng tê ji hundur?” Piştê çû cem herdu cariyeyên ber derî û ji wan re got: “Çi qewimiye?” Wan jî gotin: “Mîrzayê me Elî Nûredîn hat li me da, em reviyên, ew jî derbas bû cem Wenskara Civatê, ew maçî kir, lê em nizanin çî pê kir. Gava me bang kir jî, ew reviya çû.” Wê çaxê xatûn çû cem Wenskara Civatê û jê re got: “Çi bûye?” Got: “Xatûna min, ez rûniştî bûm, min dît ku xortekî ciwan î spehî derbasî cem min bûye û ji min re dibêje ‘Tu ye ew a ku bavê min

ji min re kiriye.’ Min jî got: ‘Erê.’ Bi Xwedê xatûna min, min got belkî rast dibêje. Loma hat, ez himbêz kirim.” Xatûnê got: “Derveyî wê, tişteki din jî bi te kir gelo?” Got: “Erê, sê ramûsan jî ji min standin.” Xatûnê got: “Heta ku keçkaniya te ji te nestendiye, dev ji te bernedaye!”

Piştire, xatûn qîriya, porê xwe kişand, ew û cariyeyên xwe bi kulman bi serê xwe ketin ji tirs ku bavê Elî Nûredîn wî bikuje. Hîna ku ew di wî halî de bûn, wezîr kete hundur û sebba wî halê wan pirsî. Jina wî jê re got: “Sûnd bixwe ku tê li min guhdar bikî!” Got: “Bila be.” Rabû jinikê ew agahdar kir bi kiryariya kurê wî. Ew jî xemgîn bû, bi şeqaman li rûyê xwe da û rîha xwe kişkişand. Jina wî got: “Wisa neke û xwe nekuje, ez ê heqê wê, deh hezar dînar ji malê xwe bidim te.” Wê gavê serê xwe rakir û jê re got: “Tu çi dibêjî hurmet, tu pêdiviya min bi heqê wê tune ye, lê belê ez ditirsim ku ruhê min û malê min giş here.” Wê jî got: “Sebba vê yekê çi ye, begê min?” Wezîr got: “Qey tu nizanî ku dujminek li pey me ye jê re dibêjin El Mûîn Bin Sawî. Ew bêbext kengî vê meseleyê bibihîze, dê biçê cem mîr û jê re bibêje...”

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî navber da axaftina xwe.*

## ŞEVA ÇEL Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, wezîr ji jina xwe re got: “Qey tu nizanî ku dujminekî mîna El Mûîn Bin Sawî li pey me ye û kengî bi vê meseleyê bihese, dê biçê cem mîr û jê re bibêje; ‘Wezîrê te yê ku qaşo ji te hez dike, deh hezar dînarên te birin û cariyeyek bi wan dînanan kirî ku tu kes mîna wê spehî tune bû û gava ku wî ew eciband jî, ji kurê xwe re got, wê ji xwe re bibe, te ji mîr bêhtir heq kiriye.’ Dê mîr bibêje ‘Tu derewan dikî.’ Ew ê ji bibêje ‘Îznê bide min ez ê herim bi ser de bigirim û wê ji te re bînim.’ Dê mîr iznê bide wî û dê ew jî bi ser mala me de bigire û rahêje cariyeyê bibe ber destê mîr û li wêderê, dê jê bipirse û ew jî nikare înkare bike. Dê El-Mûîn jî bêje ‘Begê min ez rastiyên ji we re dibêjim lê bextê min tune ye.’ Dê mîr jî îşkenceyê bi min bike li ber çavên xelkê û ez ê biteqim, bimirim.” Rabû jina wî jê re got: “Kesî agahdar meke ji vê mijarê, jixwe her tişt bi dizî bûye. Di vê mijarê de xwe bispêre Xwedê û hew, tiştekan nabe.”

Wê gavê, dilê wezîr aram bû û sekinî. Ev ji aliyê wezîr ve wisa bû. Vêca em vegerin ser Elî Nûredîn ê ku ji cezaxwarinê ditirsiya û ji wê rojê pêde

wextê xwe li çolê, li nav bax û bistanan derbas dikir û nedihate mal heta derengî şevê ku piştî dihat cem diya xwe, li ba wê radiket û bi sibehê re jî radibû, diçû, bêyî ku kes wî bibîne. Mehekê sax bi wî hawî tevgeriya bêyî ku rûyê bavê xwe bibîne. Diya wî ji bavê wî re got: “Begê min qey tu dixwazî kurik û cariyeyê bikujî? Heger tu bi vî şiklî berdewam bikî, dê kurê me bi çolê keve.” Wî jî got: “Ma ka ez dikarim çi bikim?” Jina wî got: “Îşev li ba min xwe ragire heta derengî şevê. Gava ku hat, tu jî wî bigire û pê re li hev were û cariyeyê jî bide wî, lewre herdu ji hev hez dikin. Peryên wê jî ez ê bidime te.” Rabû wezîr şiyar ma heta derengî şevê. Gava kurê wî hate malê jî, xwest ku wî serjêbike, lê jina wî pê ve giha û got: “Ttu dixwazî çi pê bikî?” Got: “Ez dixwazim wî serjêbikim.” Kurê wî got: “Qey destê te li min digere bavocan?” Wê kêlikê çavên bavê wî tijî hêsir bûn û jê re got: “Kurê min çawa te karîbû ruh û malê bavê xwe bavêta tehlûkeyê?” Kurê ciwan got: Bavocan, binêre bê helbestvan çi gotiye:

Wan diyarî min kir, min jî kujeriyek kiriye  
 Hîna jî razekar bexşînê diyar dikin ji kujer re  
 Ma wê dijminê te çi bixwaze ji te  
 Û ew di binya te de ye di nav çamûrê de

Wê gavê wezîr, ji ser dilê kurê xwe rabû û dilê wî pê şewitî. Kurik jî rabû, destê bavê xwe maçî kir. Wezîr got: “Kurê min, heger min bizaniba ku tê ji Wenskara Civatê re baş bî, min ê ew diyarî te bikira.” Kurik got: “Bavocan ez ê çawa jê re nebaş bim?” Bav got: “Wê çaxê ez ji te dixwazim ku tu jinan neyne ser, neheqiyê lê neke û wê nefiroşe; bi van şertan ez ê zewaca te pê re qebûl bikim.” Kurik got: “Bavocan, ez sûnd dixwim ji te re ku ez jinan nayînim ser û wê nafiroşim jî.” Piştî derbasî cem cariyeyê bû û salekê jî bi wî hawî pê re jiya û Xwedê Teala jî çîroka wê cariyeyê bi Mîr da jibîrkin.

Em vegezin ser El-Mûîn Bin Sawî. Wî jî çîrok bihîstibû, lê newêribû behsa wê bikira ji ber qedrê wezîrê mezin li ba Mîr. Lê piştî salekê, wezîr El-Fadl Bin Xaqan çû hemamê, xwêdan da û bi wî halî ji hemamê derket, sermayê lê da û bû nexweşê nav nivînê. Bêxew ma û her çû lawaztir bû, heta ku giha ber mirinê. Wê çaxê gazî kurê xwe Elî Nûredîn kir û jê re got “Kurê min herkes bi rizqê xwe ye û rev ji mirinê tune. Mîsoger dê her zindî mirinê tam bike.” Piştî ev beyt xwendin:

Mirovê ku îro mirin tê bibore, sibe tê nabore  
 Her yek ji me li qiraxa gola mirinê gulek e  
 Ji xeynî ew gewreyê ku tinazê xwe pê dikir zû  
 Û buxçikek tenê jî li pey xwe nehişt û çû

Piştire, berdewam kir û got: “Kurê min tu wesiyeta min li te tuneye ji xeynî tirsra ji Xwedê û dîtina encamên wê û xweşnêrîna li Wenskara Civatê û hêviya min ji Xwedê heye ku vê yekê qebûl bike.” Piştire, eşheda xwe anî, du caran xizîn bi qirikê ket û çû ser dilovaniya Xwedê. Wê çaxê qîre-wîr bi qesrê ket û xeber çû ji mîr re jî. Niştəcihên bajêr gişan mirina El- Fadl Bin Xaqan bihîstin, pê êşiyân û zarokên di mekteban de li ser giriyan. Kurê wî Elî Nûredîn jî rabû cenazeyê wî amade kir, wezîr û gizîr û karmendên dewletê û niştəcihên bajar hatin cara dawî li rûyê wî nêrîn ku di nava wan de wezîr El-Mûîn Bin Sawî jî hebû. Gava ku darbesta El-Fadl ji qesrê derxistin, hineka ev helbest dixwend:

Ji wî zilamê ku ew dişûst re min got  
 Gelo hayê te jê heye bê wî çi kir şîret  
 Ava xwe bi ser wî de dagerîne ez qurban  
 Û wî bişo bi hêsîrên ku dibarin ji çavan  
 Ji ser wî bide alî hemû dermanên mûmyakirinê  
 Û bi qencyên wî mûmya bike tu bedenê  
 Ser piştâ zilaman giran neke bi rahiştina wî  
 Besî wan e ku giranbar in ew bi xêra wî

Hinekên din jî ev helbest dixwendin:

Gava ku ew çû nefis jî bi wî re çû  
 Min jê re got vegere, gote min kî?  
 Qey ez vegerim laşê bê can û bê xwîn  
 Ango bedena hatî tê de dikin qirçîn  
 Herdu çavên min kor bûne ji girîn  
 Û guhên min jî kerr bûne çû nabihîzin

Demeke dirêj, xemgîniya Elî Nûredîn berdewam kir li ser bavê wî. Rojekê ji rojan, gava ku li mala bavê xwe rûniştibû, deriyê wî lêda. Elî Nûredîn rabû, derî vekir, dît ku dostekî bavê wî û çend heb hevalên xwe ne. Destên Elî Nûredîn maç kirin û got: begê min, mirovê ku yekî mîna te li dû xwe hiştiye, ne miriye; jixwe mirin qedera mirovê hêjatirîn, Pêxemberê Ummetê jî bû. Vêca dilê xwe xweş bike û dev ji xemgîniyê berde. Rabû Elî Nûredîn çû odeya civatê amade kir, hemû pêdivî jî tedarîk kirin û civata xwe gerand. Cariyeya xwe da kêleka xwe û deh heb jî zarwên taciran jî li xwe kom kirin û ketin ser xwarin û vexwarinê. Bi awayekî bê pîvan xwarin û şerab vexwarin û meqam li pey meqam nû kirin û sifreyên xwarinê jî pê re. Bi comerdî dida û belav dikir li ser her kesî. Carekê weklîlê wî hat cem û jê re got:



Begê min qey te nebihîstiya ku bapîran gotiye, kesên bêhesab xerc di-kin xizan dibin? Gotina herî xweş, mirovekî bi van beytan gotiye:

Ez dîrhemên xwe diparêzim li wan miqate me  
Lew dizanim ku ew şûr û mertalên min in  
Ez wan qet nadim dijminê dijminan  
Ne jî dahatûbextewariya xwe dizivîrînim jan  
Çima bi wan bixwe û vexwe ew bi noşî  
Bêyî ku filsekî tenê ji wan ew bide kesî  
Ez ê dîrhemên xwe biparêzim li her derî  
Ji wan kesên xerab û bêbextên sencedar  
Çêtir e lewre ji min re ev helwesta han  
Ji wê deynkirina dîrhemekî bi pênc dînan  
Ji rezîlekî ku biçê û piştê xwe bide min  
Û nefsa min bike weke ya sehekî din  
Lewre zilamên bêpere gelek stûxwar in  
Lew ku mîna rojê be exlaqê wan î resen

Piştê got: “Begê min, mesrefa zêde û hunerên mezin, mirov li îflasê dixin.” Gava ku Elî Nûredîn ew gotin ji wekîlê xwe bihîstin, lê nêrî û got: “Ji hemû gotinên te tiştê neket serê min. Vî hozanî çiqasî xweş bilêvkiribû gava ku gotibû:

Heger rojekê tu maldar û ez nebûm  
Ne destê min aram dibe ne jî nigê min  
Gelo çikûzekî tenê ji rûmet bi çikûziyê ditiye?  
Ango comerdekî tenê ji bi comerdiyê miriye?

Piştê jî berdeyam kir û got: “Wekîlê hêja divê tu bizanibî heta ku têra firavîna min dirav hebin, tu qet hesabê şivê meke!” Piştî vê gotina wî, wekîl bi riya xwe de çû, Elî Nûredîn jî li comerdiya xwe vegebiya, bi heman pîvanên sincî. Dostên wî çî wî bicibanda, ji wan re digot ‘Hema bibe, bila ji te re be!’ û diyarî wan dikir. Yekî jê re bigota ‘Ew mala ta ya filan derê pir xweş e’ wî jî digot ‘Bila ji te re be!’ Sibê, êvarê rojê du caran jî civat li dar dixist û salekê sax bi vî şekî berdeyam kir. Rojekê li malê rûniştî bû gava ku cariyeya wî helbestek xwend û got:

Geşbîn bû tu ji pêşerojên ku xweş derketin ew  
Û ji qedere jî xerabtirîn kar veneşartin ew  
Şev li hev hatin bi te re, tu jî serxweş ket pê  
Lê mixabin dema ku şev aram dibin jî keder tê

Çawa ku cariyeya wî helbesta xwe qedand, deriyê wan lê da. Elî Nûredîn rabû ser xwe, ber bi derî ve çû. Yek ji dostên wî jî li pey çû, bêyî

ku haya Elî Nûredîn jê hebe. Gava ku Elî Nûredîn derî vekir, wekilê xwe li ber derî dît, jê re got: “Xêr e, çi agah hene?” Wekilê wî got: “Begê min tiştê ku ez jê ditirsiyam ku bi serê te were, qewimî.” Elî got: “Çawa?” Wekil got: “Divê tu bizanibe ku êdî dirhemek te jî nema ji malê te û ev lênûskên malê te û evên din jî lênûskên mesrefên te ne.” Gava ku ew dostê li pey hatibû ew gotin bihîstin, di cî de bi şûn de vegebiya û ji wan re got: “Hûn çi dikin, hele binêrin ez ê çî ji we re bibêjim. Elî Nûredîn îflas kiriye!” Loma gava Elî Nûredîn li wan vegebiya, xemgînî di rûyê wî de diyar bû ji wan ve. Wê kêlikê, yek ji dostên wî rabû ser xwe, li Elî Nûredîn meyzand û jê re got: “Begê min, ez dixwazim tu destûra min bidî, ez ê herim.” Nûredîn jê re got: “Bo çi îro tê herî?” Wî jî got: “Jina min îşev diwelide, ez nikarim derveyî malê biminim, ez dixwazim biçim li gel wê bim.” Elî Nûredîn destûra wî da. Yekî din rabû ser xwe û jê re got: “Begê min ez dixwazim îşev li gel birê xwe bim, lewre ew dê îşev kurê xwe sunet bike.” Û bi wî hawî hemû dostên wî ji xwe re mahne derxistin û yeko yeko izin jê xwestin, rabûn, çûn. Elî Nûredîn bi tenê ma. Wê çaxê gazî Wenskara Civatê kir û jê re got: “Tu dibînî bê çi bi min hatiye?” Piştî, tiştê ku wekilê wî jê re gotibû, jê re got. Cariyeyê got: “Begê min, hîna çend şev berê jî min xwest ku ez vî tiştî bi te re parve bikim, lê min bihîst ku tu van herdu beytan dixwînî û dibêji:

Gava ku dinya bi ser te de hat  
Comerd be pêre bi ser xelkê da  
Ne comerdî wê tune dike gava ku tê  
Ne jî xesîsî wê digire gava ku diçê

Vêca gava min bihîst ku tu vê helbestê dixwînî, ez jî bêdeng mam.” Elî Nûredîn jê re got: “Ey Wenskara Civatê, tu dizanî min malê xwe giş li ser dostên xwe xerc kir û ez texmîn dikim ku ew min bi tenê nahêlin, di vê tengahiyê de.” Wenskara Civatê got: “Bi navê Xwedê fêdeya wan bi metelikekî jî ji te re nabe.” Elî Nûredîn got: “Ez ê niha vê seetê herim li deriyê wan bidim, belkî ez tiştêkî ji wan bigirim, ji xwe re bikim sermaye, dev ji kêf û listikê berdim û ez ji xwe re pê tîcaretê bikim.” Piştî di cî de rabû ser xwe û ji mal derket û hat sikaka ku her deh dostên wî lê bûn. Li deriyê pêşî da, cariyek derket û jê re got: “Tu kî yî?” Wî got: “Ji mîrzayê xwe re bêje Elî Nûredîn li ber derî sekiniye û ji te re dibêje, bendeyê te destê te radimûse û li bendî alîkariya te ye.” Cariye bi hundur de çû, ji mîrzayê xwe re got, wî jî qîrek dayê û jê re got: “Here jê re bêje ne li malê ye.” Cariye jî li Elî Nûredîn vegebiya û jê re got: “Begê min, mîrzayê min ne li mal e.” Elî Nûredîn ji wir çû û di dilê xwe de got: “Heger evê hanê bêji be û eslê xwe înkâr kiribe jî, yên dîtirkê ne bêji ne!” Û çû ber deriyê dostekî din û dîsa heman tişt ji wî xwest, lê belê wî

ji mîna yê pêşiyê xwe înkâr kir. Wê gavê Elî Nûredîn ev rist got:

Mirov bi xwe ji mîna şîndaran e  
Heta ku berdar bin xelk li dora wan in  
Ku fêkî qediya ji ji dora wê belav dibin  
Diçin ji xwe re li şîndareke din digerin  
Xwedê bide belaya mirovên vê serdemê gişan  
Lewre min yekî tenê ji nedît ji her dehan

Piştî, bi xemgînî li cariyeya xwe vegeheriya, piştî ku kedera wî zêdetir bû. Cariyeyê jê re got: “Begê min, ma min ji te re negot ku kes ji wan bi kêrî te nayê?” Elî Nûredîn got: “Yekî ji wan rûyê xwe ji nişanî min neda.” Cariyeyê got: “Begê min, kel û pelên hundurî yeko yeko bifiroşe û debara xwe pê bike.” Rabû Elî Nûredîn bi ya wê kir û çî tiştê di mal de hebû firot, heta ku hundur rût bû û tiştê li balê nema. Wê gavê li Wenskara Civatê meyzand û got: “Niha em ê çawa bikin? Cariyeyê got: “Begê min ez dibêjim rabe ser xwe û niha di vê seetê de min bibe sûkê û bifiroşe. Jixwe tu dizanî ku bavê te ez bi deh hezar dînarî kirîbûm, belkî Xwedê ji te re li hev bine û hinekî zêdetir ji vî miqdarî bigire. Heger di qedera me de nivîsandî be jî, jixwe dîsa em ê bigihêne hev.” Elî Nûredîn jê re got: “Wenskara Civatê, ez nikarim seetekê tenê ji ji te dûrkevîm!” Wê got: “Ez ji wisa me, lê ji mec-bûritiyê re ji rêbaz hene.” Wê gavê, rabû ser xwe, Wenskara Civatê bi xwe re bir, hêsir barandin û ev bêytên han gotin:

Raweste û awirekê bide min berî firaqê  
Da ku derman kim dilê wêranbûyî bi firaqê  
Heger ew jî buha be ji bo te ey cancan  
Berde, bihêle ku ez bimrim bêyî wan

Piştî çû, ew radestî simsaran kir û ji simsarê xwe re got: “Tu dizanî bê tê bi kîjan buhayî wê derxîne bazarê?” Simsar got: “Na begê min lê belê usulên me hene. Qasekî bi şûnde jî lê zêde kir û got: “Ma ev ne Wenskara Civatê ye, ya ku bavê te ew bi deh hezar dînarî kirîbû?” Got: “Belê.” Wê çaxê, simsar derket raberî taciran, lê belê hîna hemû kom nebûbûn. Xwe ragirt heta ku tacir hemû li wir kom bûn û sûk hate dagirtin bi cariyeyên Tirk, Rûm, Çerkez, Gurcî û Hebeşî. Piştî rabû ser xwe û got: “Ey xwediya mal û dînanan! Her tiştê grover ne gwîz e û her tiştê dirêjîk jî ne mûz e. Her tiştê sor ne goşt e û her tiştê spî jî ne bez e. Her tiştê xemrî ne mey e û her tiştê esmer jî ne xurme ye. Tacirno, hûn ê destpêkê buhayê vê dura sêwî ya ku qîmetê wê bi diravan nayê pîvan bi çiqasî vekin?” Yekî got: “Bi çar hezar û pêncsed dînarî.” Di wê navberê de wezîr El-Mûîn Bin Sawî hat sûkê û çavên wî li Elî Nûredîn ket ku li wir sekiniye. Di dilê xwe de got: “Ew li vir çî dikî?”

Ji xwe tu diravên wî nemane ku were cariyeyan bikire.” Dûvre çavê wî li simsarê cariyeyê ket ku qîr dike û tacîr jî lê kom bûne. Wezîr ji xwe re got ‘Xwedê dizane ku wî iflas kiriye û cariyeya xwe aniye ji bo ku bifroşe!’ Piştîre jî berdeyam kir û got ‘Heger ev wisa be, wey li wê û dilê min!’

Piştîre Wezîr El-Mûîn Bin Sawî gazî yê simsar kir, simsar hat û erda bin nigên wî maçî kir. Wezîr got: “Ez dixwazim vê cariyeya han bikirim.” Simsar riya revê nedît û çû cariyê anî ber destên wî. Gava ku Wezîr lê nêrî bi qama wê ya zirav, bi wê xweşikbûna wê û wî dengê wê yê nazik, eciband û got: “Buhayê wê gihaye çend dînan?” Simsar got: “Çar hezar û pêncsed dînarî. Gava ku tacîrên din ev rewş dîtin, tirsîyan ku dîrhemekî tenê jî lê zêde bikin û hemû bi şûnde vekîşîyan, ji ber ku gişan zilma wî wezîrî dizanibûn. Wê gavê wezîr li simsar nêrî û jê re got: “Tu çima sekîniye, here bêje ev cariyê bi çar hezar dînarî ji min re maye.”

Simsar çû cem Elî Nûredîn û jê re got: “Begê min cariyeya te bê dirav çû.” Wî jî got: “Ew çima?” Simsar got: “Me bazara wê bi çar hezar û pêncsed dînarî vekir, lê ev zalimê El-Mûîn Bin Sawî hat sûkê û ez texmîn dikim wî fêhm kir ku cariyeya te ye. Vêca heger ji niha û pê de jî tiştêkî ji heqê wê bide te, dê ew jî ji kîsî Xwedê be. Lê belê ez wî ji zulma wî nas dikim û ez dizanim ku dê senedekê li ser hevalbendekî xwe çêke û ji wan re bêje, tiştêkî nedin wî û gava tu herî cem wan, diravên xwe bixwazî jî, dê bêjin sibe were û dê dîsa diravên te nedin te û roj bi roj dereng bixin. Tu jî pir bi rûmet î, herî dawî dê kaxeta senedê ji te bixwazin, tê bidî wan, ew jî dê kaxetê biqetînin û diravên te jî bi avê de herin.”

Gava ku Elî Nûredîn ev gotin ji simsar bihîstin, lê meyzand û jê re got: “Vêca em ê çawa bikin?” Simsar jê re got: “Ez ê şîretekê li te bikim, heger tu qebûl bikî, tê sûtê jê wergirî. Niha tê li wir werî cem min, dema ez herim nava sûkê. Tu dê cariyeyê ji destê min bigirî, pê de biqeherî û bêjî ‘Te sûnda min xera kir bi vê helwesta xwe, halbukî tu dizanî ku min tu derxist û anî sûkê, tenê ji bo ku ez sûnda xwe pêk bînim û te bixim nav destên simsar.’ Heger tu wisa bikî, dê xelk têbigihêjin ku hîle di meseleyê de heye û fêhm bikin ku te ew aniye sûkê ji bo ku tu sûnda xwe pêk bîne, ne tiştêkî din.” Elî Nûredîn got: “Tiştê rast jî ev e.”

Simsar dev jê berda, çû nava sûkê, bi destê cariyeyê girt, piştîre berê xwe da wezîr El-Mûîn Bin Sawî û got: “Begê min vaye xwediyê wê tê.” Elî Nûredîn jî hat cem simsar, cariyê ji destê wî derxist û bi qehr şelaqiyek lê

xist û jê re got: “Keçê ev çî ye, min tu anî sûkê ji bo ku ez sûnda xwe pêk-bînim, de zû here malê û careke din jî ji bin emrê min dernekeve. Lewre ez ne bi haceta firotina te me, lew ku ez mala xwe gişî jî bifiroşim. Jixwe hemû jî nabin çarîkek ji buhayê te.” Wê çaxê wezîr li Elî Nûredîn nêrî û got: “Hey loo, ma qey tişteke di mala te de maye ku tu wî bifiroşî?”

Piştî, wezîr xwest ku zulm û heqeretê li Elî Nûredîn bike. Tacîran jî lê meyzandî bi xemgînî, lewre gişan jê hez dikir. Elî got: “Vaye hûn giş dibînin bê çawa zilmê li min dike.” Wezîr gote wî: “Bi navê Xwedê ku ne ji bo xatirê we bûya, min ê ew bikuştî.” Tacîran hemûkan li hev nêrin û bi awîran, danûstandî bi hev re kirin, piştî jî wezîr re gotin: “Tu têkiliya me bi herduyan re nîne.” Wê gavê Elî Nûredîn çû ber bi El-Mûîn Bin Sawî ve ku Elî mîrxasekî hêja bû û ew jî ser piştî hespê wî kişand, li erdê da. Kodîkek hevîstranê li wir hebû û ew jî ket nava wê de; Elî Nûredîn jî ji nişkê ve pîhnêk li diranên wî da û hişt ku rîha wî di nav xwinê de bimîne. Wê kêlikê deh zilamên wezîr pê re hebûn. Çawa dîtî ku Elî Nûredîn ew lêxistin li mîrzayê wan xist, destên xwe avêtin şûrên xwe û xwestin ku êrîşî ser Elî Nûredîn bikin. Lê belê xelkên derdorê li wan hatin hev û ji zilamên wezîr re gotin: “Yek ji wan wezîr e û yê din jî kurê wezîrekî ye, sibe dusibe dê li hev bîn, hûn ê jî hem ji mizgeftê bimînin hem jî ji dêrê. Heta ku dibe derbek li yekî keve, hûn hemû tê de biçin. Loma ya baş ew e ku hûn xwe di nav wan ranekin.” Elî Nûredîn jî, piştî ku têra xwe li wezîr xist, bi destê cariyeya xwe girt û çû mala xwe.

Wezîr El-Mûîn Bin Sawî jî, bi qehr û xezeb rabû ser xwe, li xwe meyzand, kincên wî yên spî, malovaniya sê rengan kiribû: Ardê spî, xwîna sor û rengê ariyê. Vêca gava ku xwe di wî halî de dît, hîn bêhtir qeherî. Rahişt destmalekê da ber xwe, du qamçî xistin destên xwe de û meşîya heta ku giha cem qesra Mîr. Ji wir gazî kir û got: “Ey Mîrê dewr û zemanan!” Dergevanan ew bir ber destê Mîr, Mîr dît ku yê gazî wî dike, wezîrê wî El-Mûîn Bin Sawî ye. Rabû jê re got: “Kê wisa bi serê te kiriye?” Wezîr giriya û ev herdu beyt gotin:

Gelo felek zulmê li min dike di serweriya te de  
Çawa kûçîk min dixwazin û tu şêrê min î?  
Hemû nêçîrvan ji gola te vedixwin avê  
Tî dimînim ez di bin baskê te de û tu baran î

Dûvre berdewam kir û got: “Mîrzayê min, gelo çî kesê ku xizmeta te bike û jî te hez bike, dê ev êş bi serê wan de bê?” Mîr jê re got: “Û kê wisa

bi serê te kir?” Wezîr got: “Ez îro çûm sûka cariyeyan ji bo ku ez yeke xwarinpêj ji xwe re bikirim. Li sûkê min cariyek dît ku di temenê xwe gişî de min yeke weke wê nedîtibû. Simsar ji min re got ‘Ev cariyeya Elî Nûredînê Xaqan e.’ Jixwe mîrê min berê deh hezar dînar dabûnê ji bo ku cariyeyeke xweşik jê re bikire, wî jî ew cariyê kiribû, lê belê ji ber ku wî ew ecibandibû, ew dabû kurê xwe. Vêca gava ku bavê wî mir, wî jî riya îsrafê girt heta ku çî tiştê li ba wî hebû ji mal û mûl û bîstan û firaxan firotin û li ser qûna xwe rûnişt, îflas kir. Gava ku tiştê di destê wî de nema jî, cariyeya xwe bir sûkê ji bo ku wê bifiroşe û ew radestî simsar kir. Wî jî ew da ber bazarê û taciran buhayê wê li hev zêde kirin, heta ku buhayê wê giha çar hezar dînarî. Min jî got: ‘Ez wê ji mîrê xwe re dikirim, jixwe heqê wê yê berê jî ji cem wî bû.’ Vêca min got; kurê min, de ka çar hezar dînarê xwe bibe û here...

*Lê sibeh hat û Şehrezadê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA ÇEL Û HEFTEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Vêca Şahê min î bextewar, wezîr El-Mûîn Bin Sawî ji Mîr re digot: “Min ji Elî Nûredîn re got; kurê min de ka êdî çar hezar dînarê xwe bigire û here.” Li dû wê berdewam kir û got: “Gava ku min ew gotin jê re gotin, li min meyzand û got ‘Pîremêro! Ez wê bifiroşim Cihû û Filehan jî, ez wê nafiroşim te.’ Min jî got ‘Ez wê ne ji bo xwe, ji bo mîrê xwe yê sultan dikirim, ê ku em bi xêra wî dijîn.’ Gava ku ew gotina min bihîst, hêrs bû û ez ji ser piştê hespê kişandim; ez avêtim erdê bi vê kalbûna han û li min xist heta ku ez xistim vî halê ku tu dibînî. Tiştê ku hişt ez bikevim vî halî jî, tenê kirîna wê cariyeyê ji mîrê xwe re bû.”

Piştê, wezîr xwe avêt erdê û dest bi girî kir, laşê wî di nav lertzê de ma. Gava ku Mîr li wî halê wî nêrî û lê guhdar kir, xwêdanê di eniya wî re avêt û hêrs bû. Li rayedarên dewletê zîvirî û hêzeke şûrkêş ji wan xwest, wan jî di cî de çel heb şûrkêşên neqane jê re anîn ber destên wî. Mîr ji wan re got: “A niha herin ber deriyê Elî Nûredîn Bin Xaqan, mala wî talan bikin, xaniyê wî xera bikin, wî û cariyeya wî jî bigrin, destên wan girêdin, serdev wan bi dû xwe de bikşînin û bînin vê derê.” Wan jî gotin ‘Ser seran, ser çavan mîrê me.’ û çûn berê xwe dan mala Elî Nûredîn.

Navmaliyek li cem Mîr hebû bi navê Alemuddîn Sencer ku ew jî yek ji pêgirtiyên El-Fadl Bin Xaqanî yê berê bû. Gava ew fermana Mîr bihîst û dît

ku dê dujminên Elî Nûredîn herin wî bikujin, dilê wî ew yek ranegirt. Rabû li hespê xwe siwar bû û bi lez çû mala Elî Nûredîn, li deriyê wî da. Elî derî jê re vekir û di cî de ew naskir, xwest ku silavekê, xêrhatinekê tê de bide, lê wî got: “Ev dem ne wextê silavdayîn û axaftinê ye.” Elî Nûredîn got: “Çi qewimiye?” Wî got: “Zû rabe ser xwe û bireve, xwe û cariyeya xwe xelas bike, lewre El-Mûîn Bin Sawî xefkek li ber te vedaye. Kengî hûn bikevin destê wî de dê we bikuje. Waye niha ji Mîr çil heb şûrkêş ber bi we de şandine. Vêca ez dibêjim, a baş ew e ku hûn birevin û xwe rizgar bikin.”

Pêre ji Sencer, destê xwe dirêj kir, çil dînar da Elî Nûredîn û got: “Van ji bigire û bizanibe ku ji wan bêhtir heba, min ê ew ji bidana te, jixwe wextê me ji nîne ku em loman ji hev bikin.” Wê çaxê Elî Nûredîn derbasî cem cariyeyê bû û mijar pê re parvekir, jinik dîn bû. Dûvre herdu ji mal derketin û çûn derveyî bajêr, heta ku li wan bû şev û tarî kete erdê. Wê çaxê meşiyana heta ku gihan qeraxa behrê, li wê derê keştiyek dîtin ku xwe ji rêwîtiyê re amade dike û qaptanê wê gazî dike dibêje: “Kî çi pêdiviya wî mabe ji xatirxwestinê, ji xwarin-marinê, bila biqedîne lewre em ê bi rêkevin.” Rêwiyan gişan gotin: “Tu pêdiviya me nemaye reîs beg.” Wê çaxê kaptan ji gazî zilamên xwe kir û got: “Naxwe werîsan vekin û singan rakin.” Di wê kêlikê de ji Elî Nûredîn gazî kaptan kir û got: “Hûn bi ku ve diçin reîs?” Kaptan got: “Em diçin Bexdê, warê aşîtiyê.” Elî Nûredîn û cariyeya xwe ji li keştiyê siwar bûn. Kaptan bawanê keştiyê vekir, bayekî xweş dihat, keştî kete rê de.

Em vegezin ser wan her çil şûrkêşan ku Mîr ew bi ser mala Elî Nûredîn de şandibûn. Ew ji çûn mala Elî Nûredîn, deriyê wî şikandin û ketin hundur de, qul bi qul geriyana, lê tu kes nedît. Rabûn mala wî xera kirin û li mîr vegeziyan, ew agahdar kirin. Mîr got: “Li ku derê bin, wan ji wir bixwazin.” Wan ji got: “Ser seran, ser çavan.” Wezîr El-Mûîn Bin Sawî ji vegeziya mala xwe, piştî ku Mîr ew xelat kir û jê re got: “Ê ku heyfa te hilîne ez im.” Dûvre ji Mîr fermanek li nav bajêr belav kir ku tê de hate gotin: “Malîno, xelkno! Mîrê me ferman derxistiye ku kî Elî Nûredîn bigire û bîne ji Mîr re, dê xelatekî bi hezar dînarî bigire. Yê ku wî veşêre ango cihê wî bizanibe û nebêje ji, dê ew cezayekî giran heq bike.” Rabû xelkên bajêr hemû li Elî Nûredîn geriyana, lê kesî şopa wî nedît.

Em vegezin ser Elî Nûredîn û cariyeya wî, yên ku bi selameti gihiştin Bexdê û kaptan ji wan re got: “Eva ev ji Bexda ye, bajarekî ewle û germ e, piştî ku zivistanê sar di ser re derbas bû û buhar bi ser de hat bi gulên xwe û şîndarên wê çiçek dan û avên wê herikîn.” Wê gavê Elî Nûredîn û cariyeya

xwe ji keştiyê peya bûn, çûn heta ku gihan nav hinek bîstanên ku rêşkirî û paqijkirî bûn. Li herdu hêlan jî, dikên çargoşe û dirêjik hebûn, li rex wan jî niqriyên tijî av û di ser wan gişan re jî qûbeyên çargoşe hebûn, li ser dirêjiya zikakekê.

Di zikê zikakê de jî deriyekî bîstanekî hebû ku girtî bû. Elî Nûredîn ji cariyeya xwe re got: “Bi Xwedê ev cihekî xweş e.” Wê jî got: “Begê min ka em qasekî ji xwe re li ser van dikan rûnin.” Rabû, çûn li ser dikekê rûniştin, dest û rûyên xwe şûştin û li ber sura bayê pal dan, di xew re çûn. Jixwe kesî ku li wir pal bida û di xew re neçûya, ne gengaz bû. Ew bîstanê ku navê wî Bîstanê Seyran bû, qesrek jî di nav de hebû, jê re digotin Qesra Furca ku qesreke Harûn Reşî bû û dema ku bêhna wî teng dibû, dihate nav wî bîstanî û li wê qesrê dima. Heyştê heb şibakeyên wê qesrê hebûn ku her yekê qendîlek tê de hebû û di nava qesrê de şemdaneke mezin î zêrîn hebû.

Gava ku Xelîfe Harûn Reşîd derbasî vê qesrê dibû, ferman dida cariyeyan ji bo ku şibakeyan vekin û ferman dida nedîmê xwe Îshaq jî ji bo ku li gel cariyeyan bistirê, da ku bêhna wî fireh bibe û kul û kederên xwe jibîr bike. Şêxekî kal jî nehtorî li ber wî bîstanî dikir ku navê wî Şêx Îbrahîm El-Xûlî bû. Rojekê gava Şêx derketibû û çûbû pêdiviyên xwe bikire, li vegeêrê temaşevanin li nava bîstan dîtibûn ku hin bêsinc jî bi wan re hebûn; pir hêrs bûbû û mabû li bendî Xelîfe, heta roja hatibû, wî jî jê re gotibû. Xelîfe jî gotibû “Te kî li ber deriyê bîstan dît, tu dikarî her tiştî pê bikî.” Vêca wê rojê jî Şêx Îbrahîm El-Xûlî çûbû ji bo ku pêdiviyên xwe tedarîk bike. Gava bi şûn de vegeyriya, dît ku du heb insan di bîstan de raketî ne, hem jî di bin çarşefekê tenê de. Wê kêlikê di dilê xwe de got: “Qey ev nizanin ku Xelîfe izna kuştina kesên ku derbasî vir dibin daye min? Lê ez tenê hinekî li wan bidim da ku kes newêribe nêzî vî deriyê bîstanê bibe.” Piştê şivek ji dareke şîn jêkir û çû cem wan, şiva xwe berjor ve rakir heta ku binçengên wî xuya kir û nêr kir ku li wan bide, lê di kêlika dawî de şikek ket dilê wî de û ji xwe re got: “Îbrahîmo lawo tu yê çawa li wan bidî û tu nizanî bê rewşa wan çawa ye. Belkî du hebên xerîb bin, ango sêwî bin û qederê ew anîbin heta vir! Ya baş ew e ku ez çarşefa li ser çavên wan rakim, li wan binêrim, paşre tevbigirim.” Çarşef da alî ji ser rûyên wan û got: “Ev herdu jî delal in û divê ez li wan nedim!” Piştê, dîsa ser çavên wan nixûmand û çû ber nigê Elî Nûredîn û nigê wî hejand. Elî Nûredîn ji xew şiyar bû û dît ku mirovekî kal di ser wî re ye, pir ji ber xwe fedî kir, xwe komî ser hev kir û rabû li qûn rûnişt. Piştê xwe dirêjî destê Şêx kir û maçî kir. Şêx jê re got: “Kurê min hûn ji ku ne?” Elî got: “Begê min, em xerîb in.” Pê re jî hêsir ji çavên wî herikin. Şêx Îbrahîm



got: “Kurê min, pêxemberê me jî ji me xwestiye ku em qedrê xerîban bigirin.” Piştî, li gotina xwe zêde kir û pê de çû got: “Kurê min, ka rabe ser xwe, derbasî nava bistan bibe, ji bo ku tu bêhna xwe berdî.” Elî Nûredîn got: “Ezbenî ez dikarim bipirsim bê ev bistanê kê ye gelo?” Şêx got: “Ev bistan ji malbatê ji min re maye.” Bi wî hawî, xwest ku dilê wî bixe cî de, ji bo ku bi aramî derbasî nava bistanê bibe. Piştî Şêx Îbrahîm, herdu derbasî hêwana sergirtî kirin ku li wir pir kêfxweş bûn, bi tiştên erjeng î li wir.

*Li Şehrezadê bû sibeh û wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA ÇEL Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezad got:*

Vêca Şahê min î bextewar, gava ku Şêx Îbrahîm derbasî hêwanî bû û li gel Elî Nûredîn û cariyeyê çûn li kêleka şibakeyekê rûniştin, dîmenên demê berê hatin bîra Elî Nûredîn û ji Şêx Îbrahîm re got: “Bi Xwedê ev cih pir xweş e û gelek tiştan ji rabirdûyê tîne bîra min û agirê nava min dikuje.”

Dûvre, Şêx Îbrahîm xwarin da wan, xwarina xwe xwarin, destên xwe şûştin û di pey wê re jî Elî Nûredîn çû li ber şibakeyekê rûnişt û gazî cariyeyê xwe kir. Ew jî hat cem wî û êdî herduyan bi hev re temaşe kir li wan şîndarên ku tijî fêkiyên cûr be cûr bûn. Piştî Elî Nûredîn li Şêx Îbrahîm zivirî û jê re got: “Gelo şerab li ba te tune, lewre xelk piştî xwarinê şerabê vedixwin?” Rabû Şêx çû aveke şêrîn û cemidî anî, Elî got: “Şeraba ku ez dixwazim ne ev e.” Şêx got: “Qey tu meyê dixwazî?” Elî got: “Belê.” Şêx got: “Xwedê hefza me jê bike! Ev sêzdeh salên min in ku min venexwariye, lewre Pêxemberê Ummetê, lanet li kesê ku vedixwe, yê ku wê çêdike û yê ku wê difiroşe anî.” Elî Nûredîn jê re got: “Ez dikarim çend gotinan bibêjim?” Got: “Bibêje.” Elî got: “Gava ku tu ne ew kesê ku vedixwe, çêdike an jî yê difiroşe be, dê tiştê jî wê lanetê bi ser te de bê?” Got: “Na.” Elî got: “Nexwe van herdu dînanan bigire û li vî kerî siwar be here û dûr bisekine li wir. Gava te dît yek di wir re derbas dibe, gazî wî bike, jê re bibêje ‘Ha ji te re du dîrhem, here bi van herdu dînanan şerabê bikire û bîne li kerê bike.’ Bi wê şeweyê, tu nabî ne meyxur, ne çêkerê wê û ne jî kesê ku wê dikire û difiroşe û ne jî lanet bi ser te de dibarin.”

Şêx Îbrahîm di ber xwe de bişirî û got: “Bi navê Xwedê min tu kes mîna te şêrîn û dilxweş nedîtiye.” Elî Nûredîn jî got: “Êdî em jî li ser te tene hesabandin û tu jî mecbûr î bi ya me bikî, lewre tu yî yê ku hemû pêdiviyên

me tedarîk dike.” Rabû Şêx Îbrahîm jê re got: “Kurê min, vaye mifteyên hundur li ber te ne û ew jî tijî mey in, ji bo Xelîfe amadekirî ne, hema biçe hundur û têra xwe şerabê derxîne.” Elî Nûredîn rabû derbasî hundur bû, dît ku hundur tijî firaxên zêr û zîv û camên bi cewheran neqîşandî ne. Têra xwe mey ji wir derxist, bera qedehan da û wî û cariyeya xwe bi hev re vexwarin û şaşwaz bû li himberî tiştên ku di wir de dîtin.

Piştî Şêx Îbrahîm mûm ji ji wan re anîn û hebekî dûrî wan rûnişt, lewre wan hîna jî vedixwar, di nava dilxweşiyêke mezin de û wisa jî ber-dewam kirin heta ku meyê ew gêj kirin, rûçikên wan sor kirin, awirên wan li hev har kirin û hestên wan nerm kirin. Wê gavê Şêx Îbrahîm ji xwe re got: “Çima ez dûrî wan disekinim? Û ez ê çawa li gel wan rûnim? Û kîjan rojê li qesra me, du kesên wisa mîna du heyvan li hev kombûne?” Piştî, Şêx Îbrahîm nêzî wan bû û hat li qiraxa hêwanê rûnişt. Elî Nûredîn jê re got: “Mîrzayê min tu bi qedrê Xwedê kî were nêzîkî me rûnê.” Şêx Îbrahîm ber bi wan ve çû. Elî Nûredîn qedehêk dagirt, li Şêx Îbrahîm zîvirî û jê re got: “Vexwe da ku tama wê binasî.” Şêx got: “Eûzûbillah, ev sêzdeh salên min in ku min tiştêkî wisa nekiriye.” Elî guh nedayê, ew qedeh jî vexwar û xwe avêt erdê, çawa ku serxweşiyê zora wî biribe. Wê gavê Wenskara Civatê lê meyzand û got: “Şêxê min de binêre bê ev çi dike bi min?” Şêx got: “Çima çi pê hatiye xatûna min?” Wê got: “Herdem vê yekê bi min dike, seetekê vedixwe û radikeve. Ez jî bi tenê dimînim bi qedeha xwe re û kesekî ku hevaltîyê bi min re bike namîne; ne kesekî ku qedeha min dagire û ne jî li min guhdar bike dema ku ez distirêm.” Şêx Îbrahîm sist bû û hilfa wî bi ser wê de çû piştî wan gotinên wê, piştî got: “Gerek hevalê mirov ne wisa be.” Wenskara Civatê qedehêk dagirt, li Şêx Îbrahîm meyzand û jê re got: “Tu bi Xwedê kî ka vê qedehê ji destê min bigire û xatirê min neşkîne.” Şêx Îbrahîm, destê xwe dirêjî wî kir, qedeh girt û vexwar. Cariyeyê yeke din jê re dagirt, dirêjî wî kir û got: “Ezbenî ev jî ya te ye.” Wî got: “Bi Xwedê ez nikarim, tiştê ku min vexwar besî min e.” Cariyeyê got: “Bêguman divê tu vê jî vexwî!” Rabû rahişt wê qedehê, ew jî vexwar. Piştî, jinikê qedeha sisiyan jî dayê, ew jî ji dest girt û hewl da ku vexwe, lê di wê kêlikê de, Elî Nûredîn ji nişkê ve rabû ser xwe û li qûn rûnişt.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA ÇEL Û NEHEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min î bextewar, tète gotin ku Elî Nûredîn rabû ser xwe rûnişt û ji Şêx Îbrahîm re got: “Ev çi îşe Şêxê min? Seetek berê min ev tişt teklîfî te kir, te got ev sêzdeh sal in min venexwariye?” Şêx Îbrahîm ket ber fediyê de û ji Elî re got: “Willehî tu gunehê min tê de tuneye, ewê pir israr kir, ji bo ku ez vexwim.” Elî Nûredîn keniya, piştê hersê bi dostanî pev re rûniştin. Cariye li xwediyê xwe zîvirî û bi dizî jê re got: “Begê min, ê te tu vexwe û ji bo Şêx Îbrahîm teklîfê neke, tê bibîne bê wê çi bi serê wî bê!” Piştê wê ji wî re qedeh dagirtin û wî jî ji wê re û demekê wisa berdewam kirin bi hev re. Şêx Îbrahîm li herduyan nêrî û ji wan re got: “Ev çi ye û ev çi hevaltiya vexwarinê ye, qey hûn ê qedeha min jî danegirin? Qaşo ez jî bûbûm hevalê we!” Wê gavê herdu pê keniyên heta ku lal bûn. Piştê qedeha wî jî jê re dagirtin û bi hev re vexwarin.

Heta derengî şevê jî bi wî hawî berdewam kirin. Piştê, cariyeyê ji Şêx Îbrahîm re got: “Gelo bi izna te ez dikarim rabim, herim mûmekê ji wan mûman pêxim?” Wî jî got: “Rabe, lê mûmekê tenê vêxe, ne zêde.” Cariye rabû ser xwe û ji mûma yekê dest pê kir heta ya heştêyî, hemû pêxistin û dîsa hat rûnişt. Piştê, Elî Nûredîn jî got: “Ezbenî qey xatirê min jî li ba te tune ku tu destûrê bidî min ji bo ku ez rabim çirayekê ji çirayan pêxim?” Şêx Îbrahîm jê re got: “Rabe yekê tenê pêxe û tu jî xwe ji rê dernexe!” Ew jî rabû ji çiraya ewil dest pê kir, heta ya heştêyî, hemû çira pêxistin. Wê gavê her derê govend girt bi wan şewqan. Şêx Îbrahîmê ku serxweş ketibû, got: “Hûn herdu ji min qelstir in.” Dûvre rabû ser xwe û hemû şibake vekirin. Piştê dîsa hat li cem wan rûnişt û hersiyên bi hev re sohbeta xwe bi helbes-tan berdewam kirin û derdor hemû jî kêfxweş bû bi wê sohbeta wan.

Vêca Xwedê Teala bi qudreta xwe kir ku wê seetê, Xelîfeyê di qesra xwe de li ber şibakê rûniştibû, berê xwe bide derve û di bin şewqa heyvê re li hêla Dicleyê binêre. Gava li wî alî nêrî, çirûsandina mûm û qendîlan li ser rûyê ava Dicleyê ji wî ve xuya kir. Pê re jî awirên wî çûn ser qesra wî ya di nav bistan de û dît ku di nav wan mûm û qendîlan de dibiriqîne çawa agir pê ketibe. Got: “Ka hela gazî Cafer El-Bermekî bikin, bila were vir.” Di nava çend kêlikan de Cafer amade bû li ber destê Xelîfe Harûn Reşîd. Xelîfe jê re got: “Kûçikê wezîran, tu xizmetkarê min î û tu min agahdar nakî ji qewîmînên bajarê Bexdê? Cafer jê re got: “Û sebeba vê gotinê çi ye?” Xelîfe got: “Heger Bexda ji min nehatibe stendin, dê Qesra Furca ewqasî ne kêfxweş bûya bi şewqên mûm û qendîlan û dê şibakeyên wî jî giş ne vekirî bana! Gelo kî dikare van gişan bike bêyî ku xîlafetê ji destê min derbixe?”

Çogên Cafer ricifin ji tirsan, piştire got: “Û kê ji te re got ku mûm û qendilên Qesra Furca pêxistine û şibakeyên wê hatine vekirin?” Xelîfe jê re got: “Were cem min û binêre.” Cafer hat cem Xelîfe û di şibakê re li aliyê bistan meyzand, dît ku qesr mîna pêteke agir e ku ronahiya wê zora şewqa heyvê biriyê. Cafer xwest ku nehtorê wê Şêx Îbrahîm El-Xûlî biparêze, ji Xelîfe re got: “Emîrê Bawermendan, Şêx Îbrahîm di heftiya borî de ji min re got ‘Cafer Begê, ez dixwazim zarokên xwe dilxweş bikim bi saya serê te û Emîrê Bawermendan.’ Min jî jê re got ‘Û tu dixwazî çi bibêjî bi vê gotinê?’ Got ‘Ez dixwazim ku tu destûrê ji Xelîfe bixwazî ji bo ku ez qesrê nîşanî zarokên xwe bidim.’ Min jî jê re got ‘Tu çi dikî bike ji dilxweşkirina zarokên xwe û ez jî bi xêr û selamet kengî derketim hizûra Xelîfe, ez ê jê re bibêjim.’ Piştire, ew ji cem min çû û min jibîr kir ku ez te agahdar bikim.”

Xelîfe got: “Cafer gunehkî te hebû li ba min, niha ew guneh bûn du-du, lewre te ji du aliyan ve şaşî kir; ji aliyekî ve te ez pê agahdar nekirim û ji aliyê dîtirkê ve jî Şêx Îbrahîm negihand meqseda wî, lewre hatina wî ya cem te û gotina wan gotinan tenê ji bona daxwaza hinek dirav bû ku bikaribe bi wan, xwe bigihîne meqseda xwe. Lê ne te tiştêk daye wî û ne jî te ji min re gotiye ku ez tiştêkî bidimê.” Cafer got: “Min jibîr kir Emîrê Bawermendan.” Rabû Xelîfe got: “Bi tirba bav û kalên min, ez vê şeva xwe nabim dawî heta ku ez neçim cem wî, lewre ew mirovekî salih e, gelek qencên Xwedê diçine cem wî û ew jî timî wensa xwe bi hejaran re tîne û alîkariya feqîran dike. Ez dizanim ku îşev jî ev hemû li ba wî ne. Loma divê mîsoger em biçim cem wî, belkî yek ji wan duayekê ji me re bike û xêrek ji me re bêne nivîsandin li vê dinyayê an jî li wê dinyayê. Ango fêdeyeke wî ji çûna min çêbibe û ew û hezkiriyên xwe pê kêfxweş bibin.” Cafer got: “Emîrê Bawermendan, piraniyê şevê çûye û belkî civata wan jî li ser belavbûnê ye.” Xelîfe got: “Mîsoger divê em herin cem wan.” Cafer bédeng bû û di nava xwe de bêçare ma, nizanibû wê çawa bike.”

Xelîfe rabû ser xwe, Cafer û xizmetkarê wî Mesrûr jî pê re rabûn. Her sêyan kincên xwe guhertin, xwe xistin şiklekî din de û ji qesrê derketin; mîna taciran, di nav sikakan re çûn, heta ku gihan Bistanê Furca. Xelîfe pêş de çû, dît ku deriyê wî vekiriye, behetî ma û got: “Binêrin! Şêx Îbrahîm derî vekirî hiştiye heta vê seetê û ev ne ji adeta wî ye!” Piştire, hersê derbas bûn, çûn, heta gihan dawiya bistan û li ber qesrê sekinîn. Xelîfe ji Cafer re got: “Ez dixwazim bi dizî li wan binêrim, berî ku ez derbasî cem wan bibim, da ku ez bibînim bê kerametên van şêx û meşayîxan çawa ne, lewre karên wan ên xilwetan hene û va ye hûn jî dibînin ku heta niha, me tu deng

ji wan nebihîstiyê.” Di wê navberê de çavê Xelîfe li dareke gwîzan î mezin ket ku pir bilind bû. Ji Cafer re got: “Ez dixwazim herim ser vê darê, lewre şaxên wê diçin heta ber şibakeyan û ji wir ez ê bikarim li wan binêrim.” Pê re jî Xelîfe bi darê ve hilkişiya û ji ser şaxekî xwe avête ser şaxê din, heta ku xwe gihand şaxê raserî şibakeyê û li ser rûnişt. Ji wir di şibakeya qesrê re li hundur nêrî, dît ku ciwan û ciwanikek mîna du heyvan di hundur de rûniştî ne. Şêx Îbrahîm jî li cem wan rûniştiye û qedehê di destê wî de ye, ji jina li kêleka xwe re dibêje:

Meyvexwarin bêyî mûzîkê çênabe, ey xatûna rûşêrînan! Qey te nebihîstiyê ku hozan dibêje:

Biçûk û mezin bike bi qurbana wê  
Ji nav lepê heyva ronak bistîne, wê  
Bê mûzîk û awaz meyvê venexwe  
Lewre mihîn bi xwe jî li gel fikînê vedixwe

Gava Xelîfe ew fêlên Şêx Îbrahîm dît, pir hêrs bû û xwêdanê di eniyê re avêt. Ji ser darê daket û ji Cafer re got: “Min tiştêk ji kerametên salihan nedît bi qasî tiştên ku min îşev dîtî. Vêca ka tu jî hilkişe ser vê darê û tu jî meyme bike ji bo ku tu nesîbê xwe ji kerametên salihan bistîne!”

Gava ku Cafer ev gotin ji Xelîfe bihist, şaşwaz û behetî ma li helwesta wî. Rabû hilkişiya ser darê û meyzand, çavên wî li Elî Nûredîn û Şêx Îbrahîm û cariyeyê ketin. Qedehê Şêx di destê wî de bû û çawa ku Cafer ew dîmen dît, rewşa xeternak jê ve diyar bû û di cî de daket, hat li pêşberî Xelîfe sekinî. Xelîfe jê re got: “Cafer, şikir ji Xwedê re ku em xistine rêya rast, rêya şerîeta pîroz de û em durrî nebaşiya terîqetên qelp girtine.” Cafer jî ketibû ber fediyêke mezin û nema dikaribû biaxive. Xelîfe dîsa li Cafer nêrî û got: “Gelo kê ew anîne vir û ew derbasî qesra min kirine? Û ev herdu ciwanên ku di heyata xwe de, min kes wek wan xweşik, lihevhatî û şêrîn nedîtiye, çawa hatine vir?” Cafer, bi armanca ku Xelîfe razî bike got: “Tu rast dibêjî Emîrê Bawermendan.” Xelîfe got: “Cafer kanî me derxîne ser vî şaxê raserî wan, da ku em wan temaşe bikin.” Rabû herdu hilkişiyên ser darê û ji xwe re li wan temaşe kirin. Wê gavê bihistin ku Şêx Îbrahîm dibêje: “Xatûna min, êdî min dev ji wîqarê berdaye û êdî ez heban vedixwim û ev jî bêçêj e ku newa pê re tunebe.” Wenskara Civatê jî jê re digot: “Şêx Îbrahîm, heger aleteke mûzîkê hebûya, bi rastî jî dê kêfa me ya nîvco tamam biba.”

Gava ku Şêx Îbrahîm ev gotin ji devê cariyeyê bihist, di cî de rabû ser

xwe. Xelîfe li Cafer zîvirî û jê re got: “Gelo wê çi bike ev zîlam?” Cafer got: “Ez nizanîm.” Şêx Îbrahîm çû, hebekî wenda bû, piştî hat û ûdek di destê wî de. Xelîfe bala xwe dayê, naskir ku ev ûda Nedîmê wî Îshaq e. Xelîfe got: “Bi navê Xwedê ku ev ciwanîk bistirê û nizanibe baş bistirê, ez ê wan gişan hildim sêdarê û heger xweş bistirê jî, ez ê wan gişan efû bikim û te tenê li sêdarê bidim.” Cafer got: “Xwedê bike ku baş nikaribe bistirê.” Xelîfe got: “Û ew çima?!” Cafer got: “Ji bo ku tu me gişan li çarmixê bidî û em jî dilê hev xweş bikin bi vê wekhevîyê.” Xelîfe kenîya û di heman demê de jî, dît ku carîyeyê rahişt ûdê, aqorda wê kir û piştî newayek lê da ku hesin diheland. Pê re jî digot:

Dûrketin ketiye dewsa venêzîkbûna ji hev re  
 Li şûna şahiyên hevdîtina me jî zûhabûnê cî girtiya  
 Te kir û min jî kir, lê dilê me li hev hênîk nebû  
 Ne bêrikirin qediya ne jî hêsirên me zûha bûn  
 Tirsî me ne ew e ku di mal de hûn me bikujin  
 Lê belê tirsî me ew e ku hûn bi me gunehkar bibin

Xelîfe ji Cafer re got: “Cafer, di temenê xwe de, min dengêkî wisa mestkar û newayeke wisa hestiyar nebihîstîye.” Cafer di dilê xwe de got belkî hêrsa Xelîfe derbas bûbe, wî jî pê re got: “Wisa ye Emîrê Bawermendan!” Xelîfe ji ser darê daket, Cafer jî li dû wî. Piştî li Cafer zîvirî û jê re got: “Ez dixwazim herim cem wan rûnim û jî nêzîk ve li wê ciwanîkê guhdar bikim.” Cafer got: “Emîrê Bawermendan, tu herî cem wan, dibe ku ew pê biêşin. Jixwe Şêx Îbrahîm wê bimire ji tirsan.” Xelîfe got: “Cafer divê tu rêyekê nîşanî min bidî ji bo ku ez rastiya vê meseleyê fêm bikim bêyî ku ew bi rastiya me bizanibin.”

Piştî Xelîfe û Cafer ber bi qiraxa Dicle ve çûn û pê re jî li ser vê mijarê fikirîn. Li wê derê, li masîvanekî rast hatin ku di biniya şibakeyên qesrê de masî digirtin. Masîvan careke din tora xwe avêt ji bo ku masîyan din bigire û debara xwe bi wan bike. Halbûkî berê, carekê Xelîfe bi ser Şêx Îbrahîm hilbibû, bi ser de qîriyabû û gotibû ‘Ev çi deng e tê min ji bin van şibakeyên qesrê?’ Şêx Îbrahîm jî jê re gotibû ‘Ev dengê masîvanan e.’ Wî jî gotibû ‘Here, bera wan de ji wir û bela careke din neyên li wir nêçîrê nekin.’ Şêx jî çûbû ew ferman ji wan re gotibû û ji wê rojê ve, kesî masîvan nehatibû di biniya şibakeyên qesrê re nêçîra masîyan nekiribû. Lê wê şevê gava ew masîvanê bi navê Kerîm hatibû wir û dîtibû ku deriyê bistan vekiriye, ji xwe re gotibû ‘Ev ji bo min fersendeke ku ez îşev ji xwe re nêçîrê bikim li vir’ û çûbû tora xwe anîbû, avêtibû nav avê û li ber rûniştibû ji xwe re ev helbest dixwend:

Ey siwarê behr û bahoz û xeterşensan  
 Aram be êdî rizq bi livê nayête destan  
 Qey tu nabîni çawa behr û masivan li ser nigan e  
 Di şevêkê de ku stêrk hemû di reqsê de ne  
 Ew jî tora xwe davêje û pêlên avê lê dixîne  
 Çavên wî jî bênavber li ser fellîne wê ne  
 Çawa ku şa dibe û dilê xwe pê xweş dike  
 Hûtek diranên xwe diçikîne di xefka wî de  
 Xwediyê qesrê jî di kêfa şeva xwe de ye ew  
 Di nava xêr û bêrê de pir kêfxweş e iro ew  
 Piştîre hişyar dibe li dû hêz û qeweta xwe  
 Lê belê di nava mulkê wî de heye xezalek bi xwe  
 Subhan ji wî re ku dide yekî û nade yê din  
 Yek nêçîra masiyan dike û yê din jî dixwe

Dema ku xwendina helbesta xwe qedand, Xelîfe jî xwe gihandibû ber serê wî. Xelîfe ew nas kir û jê re got: “Kuro Kerîm ev tu yî!” Gava ku bi navê wî gazî wî kir, li pişt xwe zîvirî û çawa ku çavê wî li Xelîfe ket, çogên wî fisiyan û got: “Willehî Emîrê Bawermendan, ne ku ez li hemberî fermanê derketime ez hatime vir, lê pêdivî û xizaniyê ez anîme vir, wek ku tu dibînî.” Xelîfe jê re got: “Tu nêçîra xwe berdewam bike bi emrê min.” Kerîm şa bû û kêfa wî pir hat bi vê gotina Xelîfe. Keysa xwe lê xweş kir û tora xwe dîsa avêt, heta ku çû li binê avê sekinî, piştîre ber bi xwe ve kişand, ji avê derxist. Gelek celebên masiyan tê de derketin. Xelîfe jî bi wê nêçîrê kêfxweş bû û jê re got: “Kerîm hela kanî cilên xwe ji xwe bike.” Cubeyekî ku sed pîne lêbûn li ser Kerîm bû ku ji hiriyeke zivir bû û tijî spiyên biterî û kêç bûn ku mirov nikaribû pê bimeşiya li ser rûyê erdê. Kefiyek jî li serê wî bû ji berî sê salan ve ji ser xwe dernexistibû û çî gava ku paçek, terîşek bidîta jî li dora wê dipêça. Gava ku wî cube û kefi ji serê xwe kir, Xelîfe jî du kirasên ji hevrêşimê Îskenderiyê û Baalbekê di ser xwe re anîn, melûte û furciyek jî û ji Kerîm re got: “Van bigire û li xwe bike.” Piştîre wî jî cubeya masîvan li xwe kir, kefiya wî da serê xwe û rûpoşek jî da ber devê xwe û jê re got: “Ê te tu here karê xwe.” Masîvan herdu nigên Xelîfe ramûsan û ev beyt gotin:

Te qencyek kir bi min ku ranabim di bin wê de  
 Lewre tamam bûn bi wê hemû qusûrên min  
 Ez ê spasdarê te bim ta ku sax bim li dinyê  
 Gava mirim jî bila hestî spasdar bin di gorê de

Hîna ku masîvan beytên xwe neqedandibûn, sipî geriyên li ser laşên Xelîfe. Wî jî geh bi destê rastê, geh bi yê çepê ew digirtin li ser stûyê xwe û davêtin erdê. Piştîre got: “Masîvano! Ev çî sipî ne di vî cûbeyî de?” Masîvan

got: “Mîrzayê min, niha ew te aciz dikin, lê piştî ku heftiyek di ser re derbas bibe, tu nema tê derdixî û nema tên bîra te jî.” Xelîfe kenîya û jê re got: “Malneketo ez ê çawa vî cubeyî li ser xwe bihêlim?” Masîvan got: “Ez dixwazim tiştêkî bibêjim lê ez ji Xelîfe fedî dikim.” Xelîfe got: “Ka bêje bê çî li cem te heye.” Masîvan got: “Emîrê Bawermendan, ket bîra min de heger tu bixwazî pişeyekî fêr bibî û bibî masîvanek, dê ev cube jî tam li gor te be!”

Xelîfe dîsa kenîya li ser wan gotinên masîvan û bi rêya xwe de çû, ew li wir hişt, piştî ku sepeta masîyan jî bi xwe re bir û hinek giha danî ser wan, vejeriya cem Cafer. Cafer jî destpêkê ew nas nekîr û got belkî ew ê masîvan e, jê re got: “Kerîm tu û van deran? Zû xwe xelas bike, lewre Xelîfe li vir e di vê seetê de.” Gava ku Xelîfe ev gotinên Cafer bihîstin, kenîya heta zikopiştobû. Cafer got: “Nexwe tu Emîrê Bawermendan î?” Xelîfe got: “Belê Cafer belê, ez Xelîfe me û tu jî wezîrê min î û ez hatim vir, te ez nasnekirim, de êdî çawa dê Şêx Îbrahîm min nas bike bi wê serxweşiya xwe? Vêca tu li vir bisekin heta ku ez li te vejerim.” Cafer got: “Bila be ezbenî.”

Xelîfe çû ber deriyê qesrê û lêda. Şêx Îbrahîm rabû ser xwe û got: “Kî li ber derî ye?” Wî jî got: “Ez im, Şêx Îbrahîm.” Got: “Tu kî yî?” Xelîfe got: “Ez Kerîmê masîvan im, min bihîst ku mêvanên te hene ez jî hatim cem te, min hinek masiyên baş ji te re anîn.” Elî Nûredîn û cariyeya wî ji masîyan hez dikirin; çawa ku dengê navê masîyan hate wan, Şêx Îbrahîm derî vekir. Xelîfe jî di dirûvê masîvan de, derbasî hundur bû û silavek da wan. Şêx Îbrahîm silava wî girt û got: “Ser seran dizê bêtirs, ka were û masiyên xwe nîşanî me bide.” Xelîfe masiyên xwe nîşanî wan da. Wan jî lê nêrî, dîtîna ku masî hîna sax in, xwe tev didin. Cariyeyê got: “Ezbenî willeh ev masî pir baş in, lê xwezîka ku qelandî bana.” Şêx Îbrahîm jî got: “Bi Xwedê tu rast dibêjî.” Piştî li Xelîfe zîvirî û jê re got: “Masîvano, xweska te ev masî biqelandana, ka rabe wan biqelîne ji bo me û piştîrê bîne.” Xelîfe jî got: “Ser seran û ser çavan, ez ê wan biqelînim û bînim.” Şêx got: “Zû biqelîne û bîne.”

Xelîfe bi lez bi şûn de çû, heta ku giha cem Cafer û jê re got: “Cafer, ewana masiyên qelandî dixwazin.” Wî jî got: “Emîrê Bawermendan! Ka bide min ez ê biçim wan biqelînim.” Xelîfe got: “Bi tirba bavê min divê ez bi destê xwe van masîyan biqelînim.” Piştî, Xelîfe çû derbasî beşa ku Şêx Îbrahîm El-Xûlî lê dima û li wê derê her tiştê ku jê re lazim hebû, ji miqilkê hetanî bi xwê û zater û tiştên mayîn. Xwe da ber dezgeya qelandinê, miqilk danî ser tifikê û masiyên xwe baş qelandin. Piştî ew danîn ser pelên xurma, limonek jî ji bistan girt û rahişt masîyan û ew birin ber wan. Ciwan û



ciwanik û Şêx Îbrahîm lê hatin hev, xwarin û dû re rabûn destên xwe şûştin. Elî Nûredîn got: “Wele masîvano, îro te qenciyeke pir baş bi me kir.” Piştî destê xwe avêt berîka xwe û sê dînar ji ew ên ku Sencer dabûnê derxistin û jê re got: “Masîvano li qusûra min nenêre. Bi navê Xwedê berî wê bobelata ku bi serê min hat, heger min tu naskiribûya, min ê te ji wê xizaniyê rizgar bikira, lê niha ka van sê dînanan ji dest min bigire.” Û dînar bi ser Xelîfe de avêtin, wî jî rahişt wan û xistin bêrika xwe de. Lê armanca Xelîfe tenê ew bû ku ciwanik bistirê û ew jî wê guhdar bike. Loma Xelîfe jê re got: “Spas ji bo vê comerdiya we, lê min dixwest ku ev cariyê bistirê û ez jî dengê wê bibihîzim.” Rabû Elî Nûredîn ji Wenskara Civatê re got: “Tu bi Xwedê kê, ji bo xatirê vî masîvanî ku dixwaze dengê te bibihîze, tiştêkî bistirê.” Cariyeyê çawa ev gotin ji mîrzayê xwe bihistin rahişt ûda xwe, piştî dengin ceribandîne xwe lê germ kir û ev çend beyt gotin:

Tiliyên stêrkekê bi ûdê dilîstin  
 Nefs jî dihinguvî wê, xwe vedidizin  
 Bi dengekî distira ku kerran dibihîst  
 Ewqasî xweşgo bû ku lalan digot her bijît!

Piştî, li ûdê da û newayên ecêb jê derxistin. Pê re jî ev beytên han stra û got:

Bi hatina we serê me bilind bû îşev  
 Qenciyeke we jî vaye ronî kir îşev  
 Mafê min e êdî ku ez mala xwe ava kim  
 Bi misk û gulav û kafûr jî bi ser dakim

Elî Nûredîn got: “Masîvano, gelo te cariyê eciband?” Xelîfe got: “Erê welle.” Elî Nûredîn got: “Bila ew diyariya min be ji te re, diyariya comerdekî ku ji gotina xwe venagere.” Piştî rahişt destmala wê, ew avêt ber bi Xelîfe de çawa ku jê re bêje cariyeyê bibe û here, dûvre ew jî rabû ser xwe. Cariyeyê lê nêrî û jê re got: “Mîrzayê min, qey bê xatirxwestin tu yê biçî? Heger em mecbûrî vê yekê bin, ka bisekine bi kêmanî em xatir ji hevdu bixwazin.” Piştî ev çend beyt xwendin û got:

Heger tê biçî û wenda bibî ji ber çavên min  
 Wê bi te avis be herdem dil û hinavên min  
 Hêvî dikim ji Yezdan ku careke din bigihîne hev  
 Pevşake min û te lewre karê wî ye gîhanhev

Gava ku wê gotina xwe qedand, Elî Nûredîn lê vegerand û ev çend beyt gotin:

Xatir ji min xwest wê, bi êşa fûraqê

Bi girî û gazinc û lomeyên rîfaqê  
Go dûrî min tê çi bikî piştî min?  
Min jî go ev karê Yezdan e ne yê min

Gava ku Xelîfe ev gotin bihîstin, nexwest ku wan ji hev veqetîne. Li mirovê ciwan zîvirî û got: “Mîrzayê min Elî Nûredîn, hela derdê xwe ji min re bibêje!” Elî Nûredîn jî bi van beytan bersiva wî da û got:

Dosto, ez pir dûr ketime ji welatê xwe  
Derdên min jî zêde bûne ji ber dûrketinê bi xwe  
Hebû ji min re bavekî pir dilovan  
Pir zû çû ser dilovaniya Yezdan  
Li pey derd bi ser min de bariyan  
Dilê min helandin hinavên min sotin  
Cariyek ji min re kiribû weke banû  
Bi hişê xwe kamil û pir jî spehî bû  
Gava ku xizaniyê piştî min da erdê  
Bêdaxwazî min ew da ber firotinê  
Dema ku dellal ji bo wê kire gazî  
Kalekî bêcir xwest wê bibe bi dizî  
Lewre li ser wê qeherîm ez bi guman  
Û min ew rizgar kir ji destê bêbextan  
Ê bêbext jî har bû bi wê helwesta min  
Û gîrrê bêbextiyê di dil de har bû ji min  
Ji êşa dil bi nigê rastê min pîhnek li wî da  
Û bi yê din jî li ser zêde kir li serî da  
Her wiha bi saw veqeriyam malê ji tirsan  
Min xwe veşart wê şevê ji ber neyaran  
Serdarê mezin ferman da bi girtina min  
Xizmetkarekî dilsoz jî hat agah da min  
Şîret li min kir ku ez biçim ji waran  
Da ku xwe veşêrim ji ber çavên neyaran  
Ji mal derketin em di bin baskê şevê de  
Me berê xwe da Bexdê em ketin rê de  
Tiştêk li ba min nema ji mal û diravan  
Ji xeynî wê diyariya ku min daye mêvanan  
Eva ku min daye te evîna dilê min e  
Bawer bike dosto ew bi xwe dilê min e

Gava ku Xelîfe rewşa wî fêhm kir, jê re got: “Tê îşev bi ku ve biçî?” Wî jî got: “Erda Xwedê fire ye.” Xelîfe lê veqerand û got: “Ez ê kaxezekê ji te re binivîsinim, tê bibî wê bidî Mîr Mihemed Bin Silêman El-Zeynî. Gava ku ew wê kaxezê bixwîne, tu xerabiyê bi te nake.”

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA PÊNCÎYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min î bextewar, gava ku Xelîfe ji Elî Nûredîn re got ‘Ez ê kaxezekê ji te re binivîsînim da ku tu wê bibî ji Mîr Mihemed Bin Sileyman El-Zeynî re, gava ku bixwîne, zîrarê nade te.’ Elî Nûredîn got: “Qey li vê dinyayê masîvanek heye ku nameyan dinivîsîne ji mîran re? Tiştêkî wisa ne gengaz e ji binî ve.” Xelîfe jê re got: “Tu rast dibêjî, lê ez ê te agahdar bikim ji sebebê. Divê tu bizanibî ku min û wî di heman mektebê de dixwend û li wê derê ez berpirsîyarê wî bûm. Piştî Xwedê ew bextewar kir; ew kir mîr û ez jî kirim masîvan. Lê belê heta niha, wî tu qewîtîya min neşikandiye. Di rojekê tenê de ez hezar tiştî bixwazim jî, pêk tîne.” Gava ku Elî Nûredîn ev gotin ji devê wî bihîstin, jê re got: “Binivîsîne, ez ê li hêviya te bim.” Xelîfe rahişt kaxez û hibirdankê, periyek hilda destê xwe û piştî besmeleyekê, wiha pê de çû û nivîsand: “... Ev name ji Harûn Reşîdê kurê Mehdî ye, ji bo rêzdar Mihemed Bin Sileyman El-Zeynî, yê ku bi dilovaniya xwe min ew kiriye wekilê xwe li beşekê ji vî welatî. Ez dixwazim te agahdar bikim ku yê vê nameyê digihîne te, Elî Nûredîn Bin Xaqan ê wezîr e. Vêca seeta ev name gihand ber destê te, cihê xwe bide wî û wî bike Mîrxanê Besrayê. Lewre min ew kir waliyê wê devera ku min berê tu lê kiribû walî. Vêca derveyî fermana min dernekeve û silavên Xwedê li ser te bin.”

Piştî kaxet li hev pêça û da destê Elî Nûredîn. Wî jî name maçî kir, ew xist bin kofîya serê xwe de û di cî de ket ser rê de, çû, heta meqamê Mîr û bi dengê bilind gazî wî kir. Mîr ferman da ku wî derbasî cem wî bikin. Elî hat, erda bin nigê mîr maç kir û kaxet derxist da wî. Gava ku Mîr nivîsa Emîrê Bawermendan dît, nas kir, rabû ser nîgan û sê caran li ser hev name maç kir û got ‘Ez amade me li ber fermanên Emîrê Bawermendan û Xwedayê xwe.’ Piştî, her çar qazî anîn, li gel wezîr û karmendan, da ku destkêşana xwe ji kar bo wan ragihîne. Di wê kêlikê de, wezîrê wî El-Mûîn Bin Sawî jî hat. Emîr rabû kaxeta Xelîfe da wî jî. Gava ku wezîr ev name xwend, di cî de çirçîrand, di devê xwe de cût û avêt erdê. Mîr qeherî û jê re got: “Ev çi ye tu dikî û te çima wisa kir?” Wezîr got: “Vî zilamî ne Xelîfe dîtîye ne jî wezîrên wî, evê han şeytanekî fennek e, kaxeteke ku Xelîfe îmze kiriye ketîye destê wî de, wî jî pê listîye, hîle tê de kiriye û tiştên li gora dilê xwe tê de nivîsandine. Vêca çima tu dev ji mîrîtiyê berdide ku hîna Xelîfe

qasidekî xwe bi nameyeke resen ji te re neşandiye!? Û heger ev tişt rast bûya, dê Xelîfe wezîrekî xwe an jî karmendekî xwe pê re bişanda, lê ew bi tenê hatiye.” Mîr got: “Îca em ê çawa bikin?” Wezîr got: “Vî xortî bispêre min, ez ê wî bişînim Bexdê li gel karmendekî, heger gotina wî rast be, dê fermannameyeke resen ji me re bişînin û heger derew be, dê wî li gel karmend bişînin ji me re û wê çaxê jî ez ê heyfa xwe jê hilînim.”

Gava Mîr ev gotinên Wezîr guhdar kirin, baweriya wî pê hat. Gazî xulamên xwe kir, Elî avêtin erdê û têra wî lêdan heta ku ji ser hişê xwe çû. Piştî got ‘Qeydan bixin nigên wî de.’ û li zîndanker kire gazî. Gava zîndankar hat û erda ber nigê wî maçî kir – ku jê re digotin Qetêt<sup>11</sup> - Mîr jê re got: “Ey Qetêt, ez dixwazim ku tu vî bavêjî zîndaneke binerdê û şev û roj tu îşkenceyê pê bikî.” Zîndanker jî got: “Ser seran û ser çavan mîrê min!” Piştî, zîndanker ew avêt zîndanê de û ferman da ku ser dika li pişt derî paqij bikin û ser wê raxin bi merşekî û balîfek da ku Elî Nûredîn li ser rûnê. Qeyd û zincîrên wî vekirin û bi qencî nêzîkî wî bû. Li gel ku wezîr her roj ferman ji zîndanker re dişand ji bo ku lê bide û îşkenceyê pê bike, lê belê zîndanker wisa nedikir û bi başî nêzîkî wî dibû, tenê carinan hawê lêdanê dikir ji bo ku xwe pê bisitirîne û hew. Elî Nûredîn çel rojî di wî halî de ma. Roja çel û yekê, yadîgariyek ji Xelîfe hat ji Mîr re. Mîr çawa ku ew yadîgar dît, ew eciband û bi wezîran re şêwirî li ser meseleya dibêtiyê ku ew yadîgarî ji mîrê nû re be. Wê gavê wezîrê wî El-Mûîn Bin Sawî got: “Diviyabû ku hîna ji serî de te ew bikuştî di wî wextê guncav de.” Mîr got: “Baş e ku te ew anî bîra min, hema rabe here wî bikuje.” Wezîr got ‘Ser seran û ser çavan mîrê min’ û rabû ser xwe. Piştî ji Mîr re got: “Min dixwest ku qasidekî berdim nava bajêr, da ku bang bike ji bo kuştina wî û kesên dixwazin firrandina serê wî temaşe bikin, werin ber qesrê kom bibin, ji bo ku hebekî dilê min jî lê hênik bibe.” Mîr jê re got: “Tu çawa dixwazî wisa bike.”

Wezîr bi kêfxweşî ji cem mîr derket ji bo ku biçe wê fermanê li nav bajêr bide belavkirin û çû cem walî ew fermana mîr gihande wî. Gava ku xelkê ew ferman bihîst, giriyan û pir xemgîn bûn. Hetanî bi zarokên mekteban, dikandarên sûkê, hemû bi wê xeberê êşîyan û hemûçikan bazdan ber bi qesrê ve da ku cihê xwe bigirin ji bo temaşekirinê. Hinek jî çûn ba zîndanê da ku bi wî re werin. Wezîr jî li gel deh zilamên xwe, çû zîndanê. Zîndanker derbas bû cem wî, bala xwe dayê ku van beytan dixwîne:

11. Qetêt: Pişo (psîkê biçûk, ango biçûkê pisîkan) – wergêr

Kî dikare piştgiriye bide birano ev çî bele ye  
 Nexweşî ariyaye bi min derman nemaye  
 Kor kiriye fûraqê perritandiye canê min  
 Felekê ji destê min kirine dujminên min  
 Gelo heye hevaleyê di nav we de dilovan  
 Ku bersivê bide min ango şînê bikşîne li pey min  
 Lewre şêrîn bûye bi min ev mirina bi sekeratê  
 Min birrîye êdî hêviyên xwe ji heyatê

Piştîre gazî Elî Nûredîn kirin, ew agahdar kirin û jê re gotin: “Cezayê herî kêm ev e, ji bo yekî ku bi nameya Xelîfe bilîze û bine ji Mîr re.” Piştîre, ew li nava Besrayê gerandin heta anîn ber şîbakeya qesra mîr û ew di nava xwînê de hiştin. Dûvre şûrvan ber bi wî ve hat û jê re got: “Ez evdekî bendê ruh im, heger daxwazê te ya dawî hebe ji min re bêje, da ku ez ji te re pêk binim, lewre tiştê ku ji temenê te maye ew e ku Mîr serê xwe di şîbakê re derxîne.” Wê kêlîkê Elî Nûredîn li çep û rastê xwe meyzand û ev beyt gotin:

Şûr û şûrvan jî dibînim herdu li vî alî  
 Diqîrim dibêjim ax û wax ji vî halî!  
 Heye destek di nav we de gelo ku alîkar be  
 De ka bêjin bila bersiva we ji bo Xweda be  
 Temen tev borî û vaye mirin jî hat  
 Gelo dilovanek heye ku bigire çend hesenat  
 Li halê min binêre û veke derdê dilê min  
 Avê bide min bo ku kêm be êşa canê min

Xelk bi ser de giriyan, şûrvan jî rabû ser xwe, rahişt şerbîkek avê û da destê wî. Wezîr El-Mûîn ji cihê xwe rabû ser xwe û nigê xwe li şerbîka avê xist, ew şikand û piça avê ku tê de bû jî rijand. Bi ser şûrvan de jî qîriya û got ‘Serê wî jêbike!’ Wê gavê çavê Elî Nûredîn girêdan, xelkê jî dengê xwe bilind kirin û kirin qîrewîr bi ser wezîr de û xire-cir di nava wan de derket. Di wê navberê de ecacek ji dûr ve xuya kir û mezin bû heta ku erd û azman tijî kir.

Mîrê ku di qesrê de bû, çav lê ket û got: “Hela binêrin bê ew kî ne – çî ne.” Wezîr got: “Kanî berî her tiştî em serê vî jêbikin dûvre binêrin.” Lê belê Mîr jê re got: “Tu xwe ragire heta ku em binêrin bê ev çî xeber e.” Halbûkî ew toz û ecaca wezîr Xelîfe Cafer bû û zîlamên pê re, sebaba hatina wan jî ew bû ku Xelîfe hetanî sîh rojî jî çîroka Elî Nûredîn nehatibû bîra wî û kesî jî bi bîra wî nexistibû heta ku rojekê rêya xwe bi mala Wenskara Civatê xist û giriye wê bihîstibû ku pê re jî bi dengê tenik ev beyt di ber xwe de dixwend û digot:

Xeyalê te dûr dibe, nêzik dibe  
Û navê te ji ser zimanê min ranabe

Û giriyê wê ji kûrtir bûbû pê re heta ku Xelîfe derî vekiribû û derbasî cem wê bûbû û dîtibû ku Wenskara Civatê digirî. Gava ku çavên wê jî li Xelîfe ketibûn, xwe avêtibû ber nigên wî û sê caran maçî kiribû, piştî ev çend beyt gotibûn:

Ey mirovê xêrxwaz bi esl û dolan  
Ê ku şaxekî berdêr vedabû her ew ciwan  
Di bîra min de ye ew soza ku te dabû yekî  
Xeysiyetên te dê nehêlin tu wî ji bîr bikî

Xelîfe jê re gotibû: “Tu kî yî?” Wê gotibû: “Ez ew diyariya ku Elî Nûredîn Bin Xaqan dabûme te û ez dixwazim ku tu soza xwe pêk bînî û tu min jê re bişînî bi rûmetkarî, piştî ku ev sîh roj e xew bi çavê min nebûye.” A wê gavê Xelîfe ji Cafer re gotibû: “Ev sîh roj e ku min agahî ji Elî Nûredîn Bin Xaqan negirtiye û texmîn dikim ku mîr ew kuştibe. Lê belê bi serê min û bav û kalê min, heger kesî xerabiyek pê kiribe, ez ê mala wî xera bikim lew ku ew kes ezizê ber dilê min be jî û ez dixwazim ku tu niha biçî Besra û tu ji min re agahan bîne di derbarê Mîr Mihemed Bin Silêman El-Zeynî û Elî Nûredîn Bin Xaqan.”

Cafer jî li gora fermana Xelîfe Harûn Reşîd tevgeriyabû û ketibû rê de. Vêca gava Cafer nêzikî Besrayê bû û ew xirecira nav bajêr dît, ji derdorê pirsî, got ‘Ev çi qelebalix e?’ xelkê jî çîroka Elî Nûredîn jê re anî ziman. Vêca gava ku Cafer ew gotin bihîstin, bi lez berê xwe da qesra mîr. Hat meqamê wî û sebeba hatina xwe jê re got û anî ziman ku heger kesî xerabiyek bi Elî Nûredîn kiribe, dê Xelîfe mala wan xera bike. Piştî fermana girtina mîr û wezîrê wî El-Mûîn da û Elî Nûredîn Bin Xaqan jî da berdan û ew kir mîrxan li şûna Mîr Mihemed Bin Silêman El-Zeynî. Sê rojan li Besra ma bi mêvanî û gava ku roja çaran hat, Elî Nûredîn li Cafer zivirî û jê re got: “Min bêriya dîtina Emîrê Bawermendan kiriye.” Rabû Cafer jê re got: “Xwe amade bike, sibe piştî nimêja sibehê em ê berê xwe bidin Bexdayê.” Elî got: “Bila be.” Bi berbangê re nimêja xwe kirin, hemû li hespê xwe siwar bûn û li gel wezîr El-Mûîn Bin Silêmanê ku êdî poşmaniya xwe tanî ziman, berê xwe dan Bexdê. Elî Nûredîn Bin Xaqan jî li kêleka Cafer siwar bûbû.

Meşîyan heta ku gihan Bexda; warê aşitîyê. Piştî derbasî cem Xelîfe bûn û çîroka ku bi serê Elî Nûredîn hatibû jê re vegotin. Xelîfe hat cem Elî Nûredîn, şûr da destê wî û jê re got: “Serê dujminê xwe jêbike!” Elî rahişt

şûr û ber bi El-Mûîn Bin Sileyman El-Sawî ve çû û jê re got: “Ez li gorî ex-laqê xwe tevgeriyam, tu jî li gora yê xwe tevgeriyayî!” Şûr ji destê xwe avêt, li Xelîfe zîvirî û jê re got: “Emîrê Bawermendan, vî zilamî ez xapandim.” Piştî jî ev beyt xwend û got:

Wê rojê çawa ku hat wî ez xapandim  
Û mirovê azad bi gotinên xweş tê xapandin

Rabû Xelîfe ji Elî re got ‘Tu dev jê berde.’ û ji Mesrûr re got ‘Ka rabe tu serê wî bifirîne.’ Mesrûr rabû ser xwe û serê wî jêkir. Piştî, Xelîfe ji Elî Nûredîn Bin Xaqan re got: “Hela ji min re bêje bê tu çi dixwazî?” Elî got. “Ezbenî tu pêdiviya min bi mulkê Besrayê nîne û tenê ez dixwazim rûyê te bibînim.” Xelîfe jî got: “Ser seran û ser çavan.”

Piştî Xelîfe gazî cariyeya wî jî kir, ew dane gel hev û qesrek ji qesrên Bexdê da wan û mehmizex ji bo wan eyar kirin, piştî ku Elî kir dostekî civata xwe û ew li gel Xelîfe ma, heta ku mir.

*Şehrazad got: “Lê belê ev çîrok ne erjengtir e ji çîroka tacir û zarokên wî.” Xwişkê wê Dunyazad got: “Xwişkê tu bi Xwedêkî ve çîroka tacir û zarokên wî jî ji me re bibêje!” Şehrezad jê re got: “Heger Şahê min Şehriyar destûrê bide, ser seran, ser çavan.” Şah got: “Û çîroka wan çawa bû?”*

### (ÇÎROKA EYYÛB Û KURÊ WÎ GANIM Û KEÇA WÎ FITNE)

*Şehrezadê got:*

Şahê min î bextewar, têtê gotin ku di zemanekî kevn de û di demên borî de tacirek ji taciran hebû ku maldar bû û kurekî wî jî bi navê Ganim hebû ku mîna heyveke çardehîn bû û xwedî zimanekî fesih bû, ku jê re digotin Ganim Bin Eyyûb El-Mûtîm El-Meslûb. Xwişkek wî jî hebû ku navê wê kiribûn Fitne ji ber xweşikbûna wê ya zêde. Vêca gava bavê wan mir jî malekî pir ji wan re hişt li dû xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî axaftina xwe birî.*

ŞEVA PÊNCÎ Û YEKEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, gava ku bavê wan mir malekî pir ji wan re hişt. Hin ji wî malê ku hiştibû jî sed barê qoza–hevrêsim, dibac, destmalên mis-

kê û kerwanekî ticaretê yê ku berê wî li Bexdê bû. Vêca piştî ku bavê wî mir bi demekê, Ganim xatir ji dê û malbat û kesên dora xwe xwest, tewkeliya xwe bi Xwedê anî û ew barên han û ew kerwan bir û berê wî da Bexdê ku wê çaxê Harûn Reşîd Xelîfe bû. Ew jî li gel qeflek tacir rêwîti dikir û Xwedê wisa jê re li hev anî ku bi saxî û selametî gihan Bexdê. Li wê derê ji xwe re maleke xweşik kirê kir, ew raxist bi merş û balîfan, perdeyên wê berdan û ew barên xwe jî giş danîn û hemû tevde li gel wan qantir û deveyan xistin mal de û ji xwe re rûnişt ku bêhna xwe berde. Piştî hemû giregir û tacirên Bexdê xêrhatina wî kirin. Wî jî deh heb mînak ji cawên herî baş xistin box-çikekê li gel buhaya wan, ew bi xwe re bir û berê xwe da sûka taciran ku wan jî bi qedr û qîmetekî mezin pêşwaziya wî kirin û xêrhatin tê de dan. Piştî ew birin dikana şêxê sûkê ku cawên xwe li wir firotin û serê dînarekî du dînar qezenc kirin.

Ganim pir kêfxweş bû bi wê yekê û firotina cawên xwe hêdî hêdî berdewam kir bi wî hawî, heta ku saleke wî li wir qediya. Di serê sala duduyan de, rojekê hat sûkê, dît ku deriyê wê kilît kirî ye. Sebeba wê ji yekê pirsî, jê re got ku tacirek miriyê û yên mayîn jî giş çûne ji bo ku di cenazeyê wî de bimeşin, gelo tu jî dixwazî biçî bi wan re bimeşî da ku sewabekê qezenc bikî? Wî jî got, belê. Piştî cihê cenazeyê pirsî, wan jî nişanî wî dan. Ew çû tevî taciran bû û hemû bi hev re di pêşiya cenaze de meşiyên bi selewatan, Ganim jî li dû wan diçû, heta ku cenaze gihandin qebrîstanê ya li derveyî bajêr bû. Di nav goran re jî meşiyên heta ku gihan ser gora vekirî, xwediyên mirî jî li wê derê konek vegirtibûn û mûm û qendîl jî anîbûn. Piştî miriyê xwe veşartin û li ber rûniştin, Qur'an li ser xwendin. Tacir jî li wir rûniştibûn li gel Ganim Bin Eyûb ê ku ketibû ber fediye de û di nava xwe de digot 'Gelo ez dev ji wan berdim, herim, ango bi wan re bimînim?'

Rûniştî man û li Qur'anê guhdar kirin heta êvarê. Êvarê şiv dane wan û şêranî jî li dû. Xwarina xwe xwarin heta ku têr bûn û destên xwe şûştin, piştî dîsa rûniştin. Bala Ganim li ser malên wî bû, lewre ji dizan ditirsiya û di dilê xwe de, ji xwe re digot 'Ez mirovekî xerîb im û xwedî mal im. Heger ez îşev dûrî mala xwe rakevim, dê diz malên min bişêlihînin û barên min bibin!' Ganim li ser malê xwe tirsîya, rabû destûr ji civatê xwest bi mahna destavekê û ji cem wan derket çû. Di şopa xwe re vegeriya heta giha deriyê bajêr ku êdî nivê şevê jî li dû xwe hiştibû. Dît ku deriyê bajêr girtiye, ne kes diçû û dihat, ne jî dengê kesî dihat ji xeynî ewtîna kûçikan û zûrîna guran. Ganim ji xwe re got 'La hewla wela quwete illa billahi! Ez li ser malê xwe ditirsiyam û ji bo wî hatim vir, lê li vir jî derî girtiye û êdî ez li ser ruhê xwe



ditirsim!’ Piştire bi şûn de vegeriya da ku cihekî ji xwe re bibîne, lê bimîne heta sibehê. Turbeyek dît ku bi çar dîwaran pêçayî ye, darxurmeyek tê de û deriyê wî jî vekiriye. Ew jî çû derbasî wê bû û hewl da ku tê de rakeve, lê xewa wî nehat. Di nava wan goran de lerizandinekê pê girt, ew berneda. Rabû ser xwe, derî vekir û li pêş nêrî, dît ku şewqek ji aliyê bajêr ve tê. Piçekî bi pêş de çû, bala xwe dayê ku ew şewq, ber bi rêya wê tirba ku tê de ye ve tê. Ganim tirsîya û deriyê tîrbê bi ser xwe de girt. Bi lez bi dara xurmeyê ve hilperikî, pê ve hilkişîya û li ser wê xwe veşart. Şewq jî her ku diçû ber bi wî ve dihat heta ku giha ber turbeyê. Li hêla şewqê meyzand, dît ku sê evdên reşik in, duduyan ji wan radihişt sindoqekê û yê din jî tevşo û fanosêk di destên wî de hebûn. Gava ku giha ber turbeyê, yekî ji herduyên ku radihiştin sindoqê got: “Çi bi te hatiye Sewab?” Evdê dîtirkê jê re got: “Û çi bi te hatiye Kafûr?” Ê mayîn got: “Gelo gava êvarê em çûn, me ev derî vekirî nehiştibû?” Yê din got: “Belê wile me vekirî hiştibû.” Yê mayîn got: “Nexwe çima niha girtiye?” Yê sisiyan, yê ku tefşo û fanos di destên wî de got ku navê wî Bixêta bû: “Xwelî li serê we be hûn çiqasî bê aqil in, qey hûn nizanin ku xelkên Bexdê ji bo destavgirtinê têne vir, gava ku li wan dibe êvar jî derbasî vir dibin û derî li ser xwe digirin ji tîrsa reşikên mîna me ku wan bigirin û wan bibin bibirêjin û bixwin.” Herduyên mayîn gotin: “Rast e û aqlê me jî ne kêmî yê te ye.” Wî got: “Lê we bawer nedikir gava ku min ji we re got; hûnê herin yekî di turbeyê de bibînin. Ez texmîn dikim ku yê di vê turbeyê de gava ku şewq dîtiye, hilkişiyaye ser vê darxurmeyê.”

Gava ku Ganim ew gotin bihîst, di dilê xwe de got ‘Çi evdekî şeytan e, Xwedê van reşikan gurri bike Rebî! Çiqasî xerab in, çiqasî bêbextî di nava wan de heye!’ Piştire got ‘Lahewle, de êdî kî dê min xelas bike ji vê tiqanê?’ Herduyên ku rahiştibûn sindoqê ji yê din re gotin: “Ka xwe di ser dîwar re bavêje û here ji me re derî veke. Lewre em betilîn di bin vê sindoqê de. Heger tu derî ji me re vekî, soz ku li vir em yekî bigirin em ê wî ji te re biqelînin bêyî ku em bihêlin dilopek ji donê wî wenda bibe.” Sewab got: “Tiştêk tê bîra min ez ditirsim bêjim, ka em vê sindoqê ji ser stûyê xwe bavêjin hundur, lewre ew e zexîreya me.” Herduyên mayîn jê re gotin: “Em wê bavêjin dê bişikê.” Yê din got: “Ez ditirsim ku diz di hundurê turbeyê de hebin; ew dizên ku xelkê dikujin û eşyayên wan didizin. Ji ber ku gava li wan dibe êvar, derbasî vir dibin û tiştên xwe li hev par dikin.” Herduyên mayîn gotin: “Kêmaqilo, ma dikarin derbasî vir bibin?” Piştire sindoqa ser piştê xwe danîn û bi dîwar ve hilkişîyan, di ser re qevastin, çûn deriyê hewşê vekirin. Bixêt jî bi fanosa dest xwe, ronî li wan dikir û bi destê din jî satileke cibs di destê xwe de digirt.

Piştire rûniştin û derî li ser xwe girtin. Yekî ji wan got: “Birano em betilîn û westiyân ji meş û rahiştin û danîn û vekirin û girtina derî, jixwe vaye bûye nivê şevê û hal di me de nemaye ku em deriyê wê vekin û sindoqê veşêrin. Divê em bêhna xwe berdin û sê-çar seetan ji xwe re li vir rûnên, piştire rabin pêdiviyên xwe bibînin. Lê belê divê her yek ji me çîroka ehmeqtiya xwe bêje bê ka çi bi serê wî hatiye ji serî heta binî, da ku em şevê derbas bikin...”

*Li Şehrezadê bû sibe û wê ji gotina xwe birî.*

ŞEVA PÊNCÎ Û DUYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, gava hersê evdên reşik ji hev re gotin ka em serpêhatiyên xwe bêjin, yê ewilî got- ku ew xwediyê fanosê bû:-

**(Çîroka Reşikê Xesandî yê Yekemîn ji Sûdanê)**

Ez ê çîroka xwe ji we re bêjim. Binêrin birano, gava ku ez biçûk bûm, tacirekî ez ji welatê min anîm – ku wê çaxê temenê min pênc sal bûn- û ez firotim çawîşekî ku keçeke wî ya sê salî hebû û ez bi wê re mezin bûm. Gava ku min bi keçikê re dilîst, distira û jê re direqîsîm, malbata wê jî bi min dikeniyân. Wisa berdewam kir heta ku temenê min bû duwanzdeh û yê wê bû deh sal. Kirin nekirin nikaribûn ez ji wê veqetandama.

Rojekê, dema ku bi tenê bû, ez derbasî cem wê bûm. Xuyabû ku nû ji serşokê derketiye, rûyê wê weke heyva çardeşevî bû û bêhnên xweş jê difûriyan. Wê bi min list, min jî pê list heta ku ewkê min rabû ser xwe û bû mîna mifteyêke mezin. Gava ku wê ez bi paş de dehfidim, ez li ser piştê ketim, ew jî li ser zikê min siwar bû û xwe di min da heta ku ewkê min xwiya kir. Çawa ku çav lê ket, destê xwe avêtê û ew di nav şeqê xwe da. Ez jî germ bûm, kelecân hate min û min ew himbêz kir. Wê jî destê xwe li dora stûyê min pêça û hîn bêhtir xwe bi min ve zeliqand. Ji nişkê ve ewkê min kirasê wê kun kir, kete wê de û keçkaniya wê xera kir. Gava ku ew li vê yekê hay bû, bazda çû cem dê û bavê xwe. Diya wê pê ve mijûl bû û çawa ku ew di wê rewşê de dît, ji ser hişê xwe çû. Piştire bi ser xwe ve hat û rewşa keçikê ji bavê wê veşart, hetanî du mehan jî xwe ragirt. Di wan du mehan de hertim gazî min dikirin, henek bi min dikirin, bi min şa dibûn bêyî ku rewşa min ji bavê wê re bêjin, lewre ji min pir hez dikirin, heta ku ez ji wî cihê min birim

bêyî ku tişteki ji min re bêjin.

Piştire diya wê ew da xortekî ku berbertî ji bavê wê re dikir û ew nişanî hev kirin. Qelenê wê ji kîsî xwe da û rehela wê jî amade kir, bêyî ku agaha bavê wê jê hebe. Hîna ku rehela wê amade dikirin, ji nişkê ve bi bêbextî ez girtim û ez xesandim. Roja dawetê jî ez kirim destbirakê zava û ez xistim pêşiya bûkê de. Li ku bûya ez li pêşiyê diçûm; serşok bûya, mala bavê wê bûya, ku bûya ez li pêşiyê diçûm. Bi wî hawî rewşa wê veşartin û şeva gerdekê ji kevokek di dawa wê de serjêkirin. Ez demeke dirêj li gel wê mam û min dilê xwe lê hênik dikir bi temaşekirina wê spehîbûna wê, li gel maçên ku dikaribû bide min. Wisa berdewam kir heta ku ew û dê û bavê xwe mirin û beytulmalê dest danî ser min û ez hatim vê derê tev li we bûm. Sebeba jêkirina ewkê min jî ev bû û wesselam.

### (Çîroka Reşîkê Xesandî yê Duyemîn ji Sûdanê)

Evdê duyemîn got:

Birano, bawer bikin hîna ez heşt salî bûm gava ku min her sal derew li xwediyê xwe dikir û herî dawî jî xwediyê min neçar ma, ez birim radestî dellalekî kirim û ferman da wî ku min bifiroşe li gel vê qusura min. Wî jî got: “Ma qusura wî çi ye?” Got: “Salê derewekê tenê dike.” Mirovekî tacîr nêzikî dellal bû û jê re got: “Heta niha kê çiqase pere di vî koleyê de dane?” Got: “Şesed dirhem tê dane.” Wî jî got: “Ez ê bîst dirheman jî di ser de bidim te.” Dellal ew û xwediyê min gihandin hev, pere jê girtin û ez firotim wî zilamî. Dellal ez birim mala wî zilamê tacîr û bexşîşa xwe jê stand.

Tacîr cil û bergên baş li min kirin û ez li cem mam hetanî dawiya salê. Sala dîtirkê bi xêr û bêr bû û şînkahî pir bû. Tacîran jî hevdû diezimandin û rojê li cem yekî kom dibûn, heta dor hat ser xwediyê min ku dê ezîmeya xwe li Bistanê Bajêr çêbikira. Ew û tacîrên hevalên xwe çûn, hemû pêdiviyên xwe stendin ji xwarin û vexwarinê û çûn li Bîstan rûniştin. Xwarin, vexwarin û ketin nav sohbetê de hetanî nîvro. Pêdiviya mîrzayê min bi tişteki ji malê çêbû, ji min re got: “Xulamo rabe li wê qantirê siwar be û here malê ji min re filan tiştî bine û zû were.” Min bi ya wî kir û ez çûm malê.

Gava ku ez nêzikî malê bûm, min qîrîn bi xwe xist û hêsir barandin. Xelkê taxê li min kom bûn ji zarokan heta extiyaran. Dengê jina mîrzayê min û keçên wî hat, derî ji min re vekirin û ji min pirsîn bê ka sebeb çi ye. Min got: “Wile mîrzayê min li gel dostên xwe, li ber dîwarekî rûniştî bûn

û dîwar bi ser wan de ket. Ez jî di cî de li qantirê siwar bûm û hatim ku we agahdar bikim.” Gava ku jin û zarokên wî ew xeber bihîstin, qîrîn û nalîn bi wan ket, kincên xwe çirandin, bi kulman bi ser û çavên xwe ketin heta ku cîran giş li wan kom bûn. Jina wî mala xwe giş serûbin kir, refik giş anîn xwarê, sênik û mênik şikandin, şibake ji ber xistin û ji min re got: “Kuro Kafûr, hela were alî min bike û van dolaban, van firaxan giş bişkîne!” Rabû ez çûm alî wê, min refik-mefikên malê giş derxistin û çî tiştê li ser hebû şikandin, hemû dolab û tiştên tê de hûrhûrî kirin, piştîre ez çûm ser ban û min kir qîreqîr û got ‘Wax mîrzayê min! Wax mîrzayo!’ û min hemû li xwe anîn hev. Piştîre jina mîrzayê min servekirî derket ji mal û keçên wê jî pê re û gotin: “Kafûr hela were me bibe cem wî dîwarê ku mîrzayê te di bin de miriye, da ku em wî ji bin xirbê dîwar derxînin û bixin tabûtekê û bînin malê, ji bo ku em merasîmekê jê re lidarxin.” Rabû min da pêşiya wan û giriyê xwe jî berdeham kir ‘Wax mîrzawo, ax mîrzawo!’ Ew jî servekirî li dû min dihatin û waxewaxa wan bû digotin ‘Wax li min!’ Ji kal û zîlam û jin û pîr û zarokan, kes nema ku neda dû me û nehat. Hemûçikan jî li serê xwe didan û digiriyan û dinaliyan. Min ew di nava bajêr re birin. Xelkê ji min dipirsî, min heman tişt ji wan re jî digot, wan jî digotin ‘La hewle û laquwete illa billah, ka em herin vê yekê ji walî re bêjin!’

Vêca gava çûn cem walî, ew agahdar kirin bi mûsîbetê, ew jî li hespê xwe siwar bû, mûhafiz û oldar jî dan kêleka xwe û li pey me hatin li gel girseyeke mezin. Ez jî di pêşiya wan de digirîm, qîr didim, li rûyê xwe dixim û axê bi ser serê xwe dadikim. Vêca gava ez derbasî nav wî bîstanî bûm û mîrzayê min ez dîtîm, behetî ma û rengê wî zer bû, ji min re got: “Kafûr ev çî hal e û çî xeber e?” Min jê re got: “Gava te ez şandim malê ji bo ku ez pêdiviyên te bînim, ez çûm malê, min dît ku dîwarê hêwanê hemû li ser xanima min û zarokên wê de hatiye xwarê.” Wî jî got: “Û xanima te ji ber wê nefilitî?” Min got: “Na wile kes ji ber nefilitî û ya pêşî mir jî xanima min a mezin bû.” Wî got: “Û keça min î biçûk jî xelas nebû?” Min got. “Na.” Got: “Ew qantira tu pê çû çawa bû, ew jî nefilitî?” Min got: “Na mîrzayê min, dîwarê malê û yê axo hemû bi ser hev de hatin xwarê û hetanî bi mêşin û qaz û mirîşkan jî di bin de man, hemû bûn komek goşt, di bin xirban de man û tiştekan jî wan xelas nebû.” Wî got: “Mîrzayê te yê extiyar jî xelas nebû?” Min got: “Na, kes ji wan xelas nebû û aniha di vê seetê de, ne xanî maye ne jî kesek ji maliyan. Pez û qaz û mirîşkên mirî jî, hemû hatin xwarin ji qîbel pisîk û kûçikan ve.”

Gava ku mîrzayê min ew gotin ji devê min bihîstin, nûr di rûyê wî de nema û êdî nema dikaribû xwe û hişê xwe bigirta û ne jî dikaribû li ser

nigan bisekine. Mîna ku bêrek li newqê keve, pişta wî şikest. Kincên xwe qetandin, rîha xwe kişand, kofiya serê xwe avêt û bi serê xwe ket, heta ku xwînê di dev û pozê wî re avêt û deng pê ket bilind bû, got: “Ax zarokên min! Wax jina min! Ax û wax ji vê mûsîbeta ku hate serê min! Ma ka tiştekî wisa bi serê kê hatiye gelo?” Tacirên hevalên wî jî pê re şîn kişandin, kirin qîrîn, giriyan û kincên xwe çirandin. Mîrzayê min ê ku hîna jî bi kulman li serê xwe dida û bûbû mîna serxweşan ji wê lêdanê, ji nav bîstan derket.

Vêca gava ku mîrzayê min û hevalên wî di deriyê bistan re derketin, çavên wan li toz û ecacekê ket li gel qîrewîreke ku mirov aciz dikir. Gava ku bi baldarî li wê hêlê nêrîn, dîtin ku walî û haşiyeya wî ne, yên ku tèn, li gel girseyeke mezin ji mereqkêşan, temaşekeran û dost û mirov û malbata mîrzayê min, ên ku di nava xemgîniyeye mezin de digiriyan û diqîriyan. Mîrzayê min di serî de çavên wî li jina wî û zarokên wî ketin. Çawa ku ew dîtin, behetî ma û kenîya. Piştre ji wan re got: “Rewşa we çawa ye û çi bi serê we û malê hatiye?” Çawa ku wan ew dîtin, gotin ‘Hemd û şikir ji Xwedê re ku tu sax î’ û xwe bi ser wî de avêtin. Zarokên wî lê hatin hev pê girtin û kirin qîrîn û gotin: “Şikir ji Xwedê re ku tu sax î!” Jina wî jî got: “Hemd û şikir ji Xwedê re ku me tu bi silametî dît.” Matmayî mabû bi dîtina wî re û hiş di serê wê de nemabû. Jê re got: “Tu û hevalên xwe çawa xelas bûn?” Wî jî got: “Rewşa we çawa ye û rewşa xanî çawa ye?” Jin û zarokên wî gotin: “Em baş in, em bi xêr û selamet in û tiştek bi xanî û malê jî nehatiye. Lê belê koleyê te Kafûr serqot hat cem me, kincên xwe diqetandin û qîr dikir û digot ‘Ax mîrzayê min wax mîrzayê min!’ Me jî got ‘Xêr e Kafûr çi qewimiye?’ Got ‘Mîrzayê min li ber dîwarê bistan rûniştiye ji bo ku pêdiviyeye xwe pêkbîne û dîwar bi ser de ketiye, ew jî di bin de miriye...’ Wî jî got; willeh bi navê Xwedê ew jî niha hate cem min, diqîriya û digot ‘Ax xanima min! Ax û wax zarokên mîrzayê min!’ û got ku xanima min û zarok tevde mirine.”

Piştire li kêleka xwe nêrî, dît ku kofiya min ji serê min ketiye û ez jî digrîm, diqîrim û xweliyê bi serê xwe dadikim. Gazî min kir, ez jî pê ve çûm. Got: “Ev çi kar in te ew kirine ey evdê bêyom ê bêji yê lanetkar! Bi navê Xwedê ez ê çermê te di ser te re bînim û goştê te ji hestiyên te veqetînim!” Min jî got: “Wille tu nikarî tu tiştî bi min bikî, ji ber ku te ez li gel vê qusura min kirîme. Jixwe şahid jî hene ku te ez li gel vê qusurê kirîme û tu jî pê dizanî ku ev qusûra min heye û ez salê carekê derewekê dikim ku eva han niv derew e û heta dawîya salê ez ê nivê mayî jî bikim ji bo ku bibe dereweke kamil.” Bi ser min de qîriya û got: “Ey melûnê melûnan! Û tu dibêji ev niv derew e? Ev dereweke ewqasî mezin e ku derew di ser re tunene. De

êdî ji cem min bicehime, here, ez te azad dikim.” Min jê re got: “Willeh tu min berdî jî ez te bernadim heta ku sala min tamam nebe û ez niv derewa xwe tamam nekim. Gava ku min derewa xwe tamam kir, wê çaxê min bibê sûkê û dîsa bi vê eyba min, min bifiroşe û min bernede, lewre tu kar û pîşe di dest min de tune ye ku ez xwe pê xwedî bikim. Ev tiştê ku ez ji te re dibêjim, tiştêkî şerî ye, li gora şerîetê ye, zaneyên olê di pirtûkên xwe de nivîsandine, di derbarê berdan û azadkirina koleyan de.”

Hîna em wisa bi hev re diaxivîn, me dît ku xelkên taxê giş çî zilam çî jin, hemû li ser me kom bûn, li gel walî û cemaeta wî, tevan sersaxî xwestin û xemgîniya xwe nîşan dan. Lê belê mîrzayê min û tacirên hevalên wî bi walî ve çûn û ew agahdar kirin ji rewşê û jê re gotin: “Eva han niv derew bûye.” Gava ku haziran gişan ev gotin bihîstin, şaşwaz bûn û ecêbmayî man li wê derewê, lanet li min barandin û sixêf ji min re dan. Ez jî ser nigan sekinî mam û keniyam, piştî min got: “Û dê çawa mîrzayê min min bikuje û wî ez bi wê eyba han re kirrîme?”

Dema ku mîrzayê min çû malê, dît ku her der serûbin bûye, her tişt şikestiyê, her der hatiye xerakirin, ku hemû malê wî tê de. Jina wî jê re got ‘Ev cam û sênîkên çînî jî Kafûr şikandin’ û bi wî hawî qehr û hêrsa wî zêdetir bû. Piştî got: “Bi navê Xwedê, di temenê xwe de min evdek mîna vî bêjî nedîtîye ku nivdereweke wisa kiriye. Îcar dereweke tam kiriba wê çawa kiriba, belkî bajarek an jî du bajar xera kiribana.”

Bi qehr çû cem walî, ez daliqandim û li min da heta ku ez ji ser hişê xwe çûm. Di wê navberê de diçe sunetçî tîne cem min, ew jî hicaman li min dide û min dixesîne. Vêca gava ez bi ser xwe ve hatim, min dît ku ez xesandî me. Mîrzayê min jî ji min re got: “Çawa ku te dilê min şewitand li ser tiştê herî giranbuha li ba min, min jî dilê te şewitand li ser tiştê herî giranbuha li ba te.” Piştî ez birim bi buhayekî herî mezin firotim, ji ber ku êdî ez bûbûm evdekî xesandî. Ez jî hîna derewan dikim li devera ku ez lê tême firotin.

*Li vê derê, li Şehrezadê bû sibe wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA PÊNCÎ Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min î bextewar, gava wî digot hîna jî ez derew û fitneyê dikim, galgalan dibêjim û bela dikim li devera ku ez lê tême firotin; axaftina xwe

berdewam kir û got: “Û ez ji cem mîrekî diçim cem mîrekî din, ji mezinekî diçim cem mezinekî din, min bi kirin û firotinê didine hev. Herî dawî ez derbasî qesra Emîrê Bawermendan bûm ku êdî bawerîya min şikestibû, hêz di min de nemabû û gunên min çûbûn.”

Gava herdu koleyên din ev gotina wî bihîstin, kenîyan û jê re gotin: “Tu bêbext kurê bêbextan e, te dereweke pir mezin kiriye.” Piştî ji yê sisiyan re gotin: “Hela tu çîroka xwe ji me re bibêje.” Wî jî got: “Pismamino, ev tiştê ku hatin gotin vala ne. Ez ê sebeba jêkirina gunên xwe ji we re vebêjim ku bi rastî min zêdeyî wî tiştî heq dikir, ji ber ku ez bi xatûna xwe re û bi kurê xatûna xwe re jî raketim û çîroka min dirêj e; sibeh jî pir nêzîk bûye pismamino, dibe ku li me bibe sibe û ev sindoq hîna di nav lepên me de ye. Wê çaxê em ê di nav xelkê de bihetikin û serê me jî wê tê de here. Vêca ka em derî vekin û bikevin cihê xwe de, piştî ez ê sebeba jêkirina gunên xwe ji we re bêjim.”

Piştî rabû ser xwe, bi dîwêr ve hilperikî, xwe di ser dîwar re avêt, derî vekir û ketin cihên xwe de. Dûvre mûm pêxistin û koncalek kolan di navbera çar goran de, li gora wê sindoqê. Kafûr dikola, Sewab jî axa wê derdixist. Wisa pê de çûn heta ku niv qamê kolan. Sindoq tê de bi cî kirin û ax bi ser de avêtin û li dawiyê jî ji tîrbê derketin, deriyê wê li dû xwe girtin û çûn, ji ber çavên Ganim Bin Eyûb wenda bûn.

Gava ku derdor xalî bû û Ganim bi tena serê xwe ma, raza sindoqê nava wî dixidixidand û ji xwe re got ‘Gelo çî di sindoqê de heye?’ Dîsa jî bêhnna xwe fireh kir û ma heta şeveqê lê da û dinya ronî bû. Piştî ji ser darê daket erdê û ax ji ser sindoqê da alî, heta ku gihayê û ew ji bin erdê derxist. Dûvre rahişt kevîrê, pê li xilka sindoqê da heta ku ew şikand û deriyê wê vekir. Lê nêrî, dît ku keçeke jiserhişçûyî tê de raketiye, lê belê hilma wê diçe û tê. Keçeke pir spehî bû ku kes mîna wê xweşik tunebû. Stû û destên wê tijî zincîr û bazinên zêr û cewher bûn ku ji mal û mulkê sultanekî jî buhatir bûn. Gava çavê Ganim Bin Eyûb li wan gişan ket, tê derxist ku wan evdan listikek li ser wê listiye. Rabû ew ji sindoqê derxist û li ser piştê, ew li erdê dirêj kir. Gava ku ba lê da û hewa ket pozê wê de, pişkiya û piştî jî kuxwiya heta ku qursikek bhang<sup>12</sup> di devê wê re avêt ku biketa pozê filekî de, dê ew bîst û çar seetan di xew re bibira. Piştî mijangên xwe kutkutandin, çavên xwe vekirin û bi gotinên fesîh got: “Ka tu li ku yî canê, qey tu nikarî avê bidî keseke tî û wensa yeke rêwî bînî? Û kanî Çiçeka Bîstanan?” Kesî bersiv

12. Bhang: Wek narkozê, dermanek jiserhişçûnê.

nedayê. Li xwe zîvirî û got: “Sabîha?! Şîndar?! Roniya Xwedê?! Stêrka Sibê?! Ez dizanim ku hûn di seyranekê xweş de ne, ka hela biaxivin!” Lê kesî bersiv nedayê. Çavên xwe li derdorê gerandin û got: “Ey Xwedayê erd û azman, ê ku dizane çi di nava mirovan de ye û hesabê wê ji mirov dipirse roja heşrê! Kê ez ji nava qesr û qonaxan anîme nava van çar goran?”

Ev hemû li ber çavê Ganim diqewimî û ew jî hîna li ser nigan bû. Ganim jê re got: “Xanima min, ne qesr û qonax û ne jî tirb û gor, evê han evdê te Ganim Bin Eyûb e ku Xwedê ew şandiyê ji te re da ku te rizgar bike ji van kul û derdan û armaca te pêkbîne.” Keçik bêdeng bû heta ku dilê wê ket cî de, piştê got: “Eşhedû en laîlahe illellah, Mûhemmeden resûlullah!” Destên xwe danîn ser sînga xwe, li Ganim zîvirî û bi dengê xweş jê re got: “Xortê ciwan û qenc, kî ez anîme vê deverê, eva ez şiyar bûm êdî?” Ganim got: “Xanima min, sê koleyên xesandî, di vê sindoqê de tu anîn vê derê.” Piştê jê re çîrok vegot, bê çawa lê bûye sîbe, çawa û ji ber çî ew rizgar kiriyê û heger ne wisa bûya, dê di wir de bifetisiya. Piştê li hal û wextê wê, li çîroka wê pirsî, keçikê jî got: “Xorto, şikir ji Xwedê re ku wî ez avêtîm ber destê yekî mîna te, de ka rabe min dîsa bixe vê sindoqê û bibe ser rê. Gava te yekî xwediyê kerekî an jî qantirêkî dît, wê kirê bike û li ser piştê wî min bibe mala xwe. Heger ez giham mala te, ez ê xelas bibim. Wê çaxê ez ê çîroka xwe ji te re bêjim, te agahdar bikim ji rastiya xwe û tê jî ji vê yekê sûdê bigirî.”

Kêfa Ganim hat û rabû ser xwe, berê xwe da çolê. Ro jî derketibû û şewqa xwe belav kiribû li seranserê cîhanê. Xelk jî ji malê xwe derketibûn û berê xwe dabûn kar û xebatê. Ganim zilamek li gel qantira wî kirê kir û ew anî cem turbeyê. Piştê çû hundurê turbeyê, keçik xist sindoqê û rahiştê ew anî li ser piştê qantirê kir. Ji ber ku evîna wê ketibû dil û hinavê wî, bi kêf ew da pêşiya xwe. Lewre keçeke pir xweşik bû, bi deh hezar dînar diçû û xeml û xêza li ser jî, bi buhayê giran diçû. Bi bêsebrî ew gihand malê, danî erdê û devê sindoqê vekir, keçik jê derxist. Keçikê li dora xwe meyzand, dît ku maleke raxistî û baş e. Xalî û merşên rengorengo li her derê bûn û çavên wê dadigirtin. Caw û qumaşên pêçayî, barên girêdayî û gelek tiştên din jî bala wê kişandin û tê derxist ku ev xort xwedî mal û mulk e. Çadora xwe ji ser çavê xwe da alî û lê meyzand, dît ku ew jî xortekî spehî û lihevhatî ye. Çawa ku ew dît jê hez kir û jê re got: “Ka tiştêkî bîne, em bixwin!” Ganim got: “Ser seran û ser çavan.” Piştê çû sûkê, berxekî biraştî û hinek şêranî kirî; hinek meze û mûm, hinek mey û bêhn ji xwe re stendin û vegeriya malê. Gava ku keçikê ew dît li gel wan tiştan, kenîya, ew himbêz kir, maç kir û pê re list. Bi wê yekê hezkirina wê di dilê wî de zêdetir bû. Bi hev re rûniştin, xwarin,



vexwarin, heta ku şev hat. Pir jî ji hev hez kirin, ji ber ku mîna hev spehî bûn û di heman temenî de bûn.

Gava ku şev hat, Ganim Bin Eyûbê dildar rabû ser xwe, mûm û çira pêxistin, hundur ronî kir, mey anî û li gel wê rûnişt, geh wî ji wê re dagirt, geh jî wê ji wî re dagirt û bi hev re ketin kêf û henek û laqirdiyan, helbest ji hev re xwendin û kêfxweşiya wan bi hev re zêdetir bû, bêhtir ji hev hez kirin û bi hev ve hatin girêdan, vêca subhan ji wî re ewê ku dilan digihîne hev! Wisa bi hev re berdewam kirin, heta ku sibeh nêzîk bû û xewa wan hat, her kes li cihê xwe di xew re çû. Sibehê, Ganim Bin Eyûb rabû ser xwe û çû sûkê, pêdiviyên xwe kirin ji sewz û goşt û mey û tiştên mayî û vegehiya malê, dîsa li gel wê rûnişt. Têra xwe xwarin xwarin, piştî mey anî, bi hev re vexwarin û pevrevê lîstin heta ku rûçikên wan sor bûn û çavên wan reş bûn ji kel û maçê. Nefsa Ganim Bin Eyûb, xwest ku pê şa bibe û pê re rakeve heta sibehê, rabû jê re got: “Xatûna min tu destûrê didî min ku ez maçekê ji lêvên te bigirim, belkî agirê nava min vemirîne.” Wê got: “Bêhna xwe fireh bike Ganim, heta ku serxweş bikevim, ji ser hişê xwe biçim da ku bi dizî ez destûrê bidime te û ez pê nehesim ku te ez maç kirime.” Piştî rabû ser xwe û hinek kincên xwe ji xwe kirin heta ku binkiraskekî tenik û kefiyek tenê li ser ma û wisa rûnişt. Wê gavê xwîna Ganim hê bêhtir keliya û jê re got: “Xatûna min îca jî tu destûrê nadî min?” Wê got: “Bi navê Xwedê ew yek çênabe, lewre gotineke pir giran nivîsandîye li ser guhkê kirasê min.” Dilê Ganim Bin Eyûb şikest bi vê gotina wê, lê belê evîna wî xurtir bû bi bûha-bûna vê daxwazê. Piştî ev helbest got:

Min maçek xwest, ku şîfa be  
Ji bo dil ku, ew derman be  
Got wê na na, nabe nabe  
Min jî got wê, belê dibe  
Got bigire wê tu, bi dilxwazî  
Bi helalî û bi dilnazî  
Min go bi zorê, wê go nabe  
Qey tu nabîni ser al e  
Nepirs ji min çî bû niha  
Bixwaz efwê, tu ji Xweda  
Gûman bike tu bi kêfa xwe  
Evîn xweş e her ew bi xwe  
Bi tehmet û sûcên ji xwe  
Natirsim ez êdî ji xeber  
Lew ka belav be li her der

Pêre jî agir bi nava wî ket û mehbeta wê zêdetir bû di dilê wî de. Wê jî hey ber wî digirt û digot: “Tu nikarî xwe bigihînî min!” Herdu di nava evîne de diqemirîn û hey gazî hev jî dikirin. Ganim Bin Eyûb jî di nava deryaya eşqê de binav bûbû. Lê belê keçik tûjtir bûbû di bergiriyê de, heta şevê baskên xwe avêtin ser wan û wexta razanê hat. Ganim rabû mûm û çira pêxistin, rewneya hundur xweştir kir û rahişt nigên wê û ew maçî kirin; herdu nigên ku mîna penêrê ter bûn. Piştî rûyê xwe di wan da û got: “Xanima min, rehmê bike li êsirê eşqa xwe; li evê ku hatiye kuştin bi awirên te; evê pir sexlem bû berî dîtina te!” Û pê re jî giriya. Keçikê got: “Mîrzayê min, nûra herdu çavên min! Willehî ez jî aşiqê te me û bi te ve girêdayî me, lê ez dizanim ku tu nagihêjî min.” Wî got: “Û çî bend heye li holê?” Wê got: “Ez ê îşev çiroka xwe ji te re bêjim da ku tu lêborîna min qebûl bikî.” Piştî xwe bi ser wî de avêt, herdu destên xwe li dora stûyê wî gerandin, ew maçî kir, henek pê re kirin heta ku hezkirina wan ji hev re zêdetir bû; her şev li heman nivîne raketin, wî doza pevşabûnê lê dikir, wê jî li ber wî digirt, heta ku mehek li dû xwe hiştin.

Evîna her yekî ji wan, dilê yê dîtirkê dagirkir û êdî sebir bi herduyan re nemabû, hetanî şevê jî şevan ku herdu serxweş bûn û di nav nivînekê de bûn. Destê xwe dirêjî wê kir, di ser zikê wê re daket heta navika wê. Keçik li xwe hay bû, rabû li qûn rûnişt, destê xwe li xwe peland, bala xwe dayê ku cilên wê li ser in, dîsa xwe dirêj kir, palda. Ganim dîsa destê xwe di ser laşê wê re bir, heta ku giha delingê wê û bi navrana wê girt û kişand. Keçik dîsa bi xwe hesiya û rabû li qûn rûnişt. Ganim rabû li kêlekê rûnişt. Keçikê jê re got: “Tu çî dixwazî?” Got: “Ez dixwazim bi te re rakevim û ez û tu bibin yek.” Wê çaxê keçikê jê re got: “Niha ez ê rewşa xwe ji te re bibêjim da ku tu qedrê min bizanibî û raza min ji te ve bê naskirin û tu sebeba bergirtina min bibînî.” Wî jî got: “Bila be.”

Wê çaxê keçikê destê xwe avêt guhkê binkiraskê xwe, ew qetand û guhkê doxîna xwe jê re derxist û got: “Ev beşa vî alî bixwîne!” Ganim destê xwe avêt aliyekî doxîne û lê meyzand, dît ku bi zêr li ser nivîsandîye: “Ez a te me û tu yê min î, ey kurapê Pêxember!” Gava ku Ganim ew nivîs xwend, destê xwe ji ser rakir û jê re got: “Ka surra xwe ji min re bêje.” Keçikê got:

Bizanibe ku ez destgirtiya Emîrê Bawermendan Harûn Reşîd im û navê min Qûta Dilan e. Gava ku ez zarok bûm, Xelîfe ez di qesra xwe de mezin kirim. Ji ber taybetmendiyên min û ji ber spehîbûna min, pir ji min hez kir û ez birim, li odeyekê bi cî kirim û deh carîye xistin xizmeta min de

û evqase xeml û xêza li ser min jî da min. Rojekê ji rojan Xelîfe bû rêwî û çû ji welatekî welatan. Zubeyde Xanim jî hat cem hinek cariyeyên di xizmeta min de û ji wan re got: “Xanima we Qûta Dilan raket, de êdî vê morîka jiserhişçûnê bixin pozê wê de, an jî bixin nav xwarin û vexwarina wê de, ez ê têra we diravan bidime we.” Cariyeya min jî jê re got: “Li ser seran û li ser çavan.” Piştî morîka jiserhişçûnê ji destê wê girt. Pir bi kêf bû, ji ber soza diravdayîne û ji ber ku ew, berê jî cariyeya wê bû. Hat ber serê min û ew perçeyê morîkê xist pozê min de, ez jî di cî de li erdê ketim û çûm dinyayeke din. Piştî ku ev bêbextiya wê pêk hat, ez xistim wê sindoqê û bi dizî ew her sê kole anîn, gelek dirav dan wan û dergevanan û ez bi wan re şandim, di wê şeva ku tu jî li ser darxurmeyê bû. Li wir jî te dît bê çî bi min kirin û xelasiya min li ser destê te bû ku te ez anîm vê derê û te qenciyêke baş bi min kir. Çîroka min ev e û ez nizamim bê ka çî bi Xelîfe hat di xiyaba min de. De êdî qedrê min bizanibe û min nehetikîne.

Gava ku Ganim Bin Eyûb ew axaftina Qûta Dilan bihîst û lê ewle bû ku ew malê Xelîfe ye, ji tirs û sawa Xelîfe, xwe jê dûr xist û bi tena serê xwe rûnişt li goşeyekê. Lome kirin, li ser wê rewşa xwe hizirî û heyirî ma bi evîneke ku dê encam jê negirta. Rabû giriya ji ber evîn û bêrî û eşqa zêde û dest pê kir gazinc ji felekê kirin ji ber wê dujminatîya ku bi wî re dikir. Piştî, ev çend beyt xwendin û got:

Dilê evîndar li ser evîndarê bi gazine  
 Hişê wî jî ji ber husna wê bela bûye  
 Rojekê yekî ji min re got, evîn çî ye  
 Min jî got, pir xweş e lê êş tê de ye

Wê çaxê Qûta Dilan pê ve rabû, ew himbêz kir, ew ramîsa û riya ku serdest bibe di dilê wî de bi hezkirina xwe domand. Piştî ku jêre mukur hat li evîna xwe, herdu destên xwe li dora stûyê wî gerandin û ew maçî kir. Wî jî ji ber tirs û sawa Xelîfe, xwe jê dûr dixist. Dûvre bi seetan bi hev re axivîn di nava wê behra evîne de, heta ku li wan bû sibe û roj derket. Wê çaxê, Ganim rabû ser xwe, kincên xwe li xwe kirin û mîna her carê berê xwe da sûkê, ji wir pêdiviyên xwe stendin û dîsa vegeyriya malê. Çawa ku derbasî hundur bû, dît ku Qûta Dilan digirî. Lê belê çawa ku wê jî ew dît, giriyê xwe sekinand, pê re bişirî û jê re got: “Min bêriya te kiribû delalê dilan! Bi navê Xwedê, ev seeta ku tu dûrî min bû, ji min re bi qasî salekê dirêj hat. Lewre ez nikarim bêyî te debar bikim. Evaye min diyar kir bê ez çiqasî aşîqê te me û li ser te dişewitim. De ka rabe û ya di dilê xwe de pêk bîne, bi min şa bibe.” Ganim got: “Eûzûbillah! Ev tiştê han dê nebe. Ma çawa dê seh di şûna şer

de rûnê û tiştê ku ye Emîrê min e ji bo min heram e ku ez nêzîkî wî bibim.” Piştî xwe jê dûr xist û çû li kêlekikê rûnişt. Li hemberî wê nabûna wî, hez-kirina wê jê re zêdetir bû. Rabû, çû li cem wî rûnişt, pê re axivî, henek kirin û vexwarin, heta ku serxweş ketin. Agirê nava keçikê gur bû û her tiştê nava xwe jê re eşkere kir, bi van beytan:

Spehiyo qey tu kujer î îro ev çi ye  
Tu piştî xwe didî min û diçî, ev çi ye  
Ji zîrebûnê hemû wate di te de hene  
Hunerên qencyê jî hemû berhemên te ne  
Ji bo her dilî min eşqebazî diyarî kiriye  
Û xewa şêrîn ji mijankan revandîye  
Helbet dizanim ku şax berî te têne çinîn  
Ey şaxê ku tu îro kujeriyê dikî bi min  
Soz da min go bi xezalan re ye nêçîr  
Çima îro tu ji xwe re cinan dikî nêçîr  
Ecêb ew e ku ez dişewitim, tu bêagah î  
Tu nahêlî ez bigihême te bi tu halî  
Li gel wê spehîbûna te, çawa tu kujer î?

Demeke din bi wî hawî pevî berdewam kirin û tirsê nedihîşt ku Ganim xwe nêzî wê bike. Rewşa Ganimê dildar ev bû. Wêca em veşerî ser rewşa Zûbeyde, ku wê jî ew bêbextî bi Qûta Dilan re kir, di nebûna Xelîfe de û êdî mabû heyirî. Di dilê xwe de digot ‘Gava ku Xelîfe vegere û were lê bipirse, ez ê çawa bersiva wî bidim?’ Gazî pîrejînekê kir û raza xwe jê re got, ew agahdar kir û jê re got: “Ez ê çawa bikim, ez dikarim çi bikim û wî ewqasî dil daye Qûta Dilan?” Pîrejînekê jê re got: “Xanima min, divê tu bizanibî ku dema veşerî Xelîfe nêzîk bûye. Lê tu dikarî bişîni pey necarekî û fermanekî bide wî ji bo ku tabût û peykerekî çêbike û tirbekê jê re bikole, dora wê jî bi mûm û çira dagire û fermanê bide herkesê di qesrê de ku reş li xwe bikin û ji hemû cariyê û xulamên xwe re jî bêje, gava ku Xelîfe hat, bila hemû xemgîn xuya bikin. Dema ku derbas bû hundur û li wê pîrsî jî, bila jê re bêjin Qûta Dilan mir, Xwedê xêra te pê kirî qebûl bike. Rûmeta mezin jî ew e ku xatûna me ew di qesra xwe de veşartîye. Gava ku wê yekê bibihîze, dê bigirî û li ber kêla gora wê rûnê û Qur’anê bixwîne. Heger guman ketin dilê wî de û ji xwe re got ‘dibe ku dotmama min Zûbeyde zikreşîya wê kiribe û wê bi xwe Qûta Dilan kuştibe’ ango zêde bêriya wê bike û fermanê bide ji bo ku wê ji gorê derxînin, tu qet metirse! Lewre gava ku wan tîrb kola û tabût derxistin, dê binêrin ku mîna meytêkî rasteqîn bi kefenekî giranbuha hatiye pêçan û gava ku Xelîfe xwest kefen ji ser laşê wê bide alî, tu pêşîya wî bigire û bila yeke din jî bêje ku dîtina laşê wê heram e, wê çaxê dê bawer

bike û tu jî bi izna Xwedê, tê ji vê belayê xelas bibî.”

Gava ku xanim gotina wê pîrejinê bihist û dît ku rast dibêje, xelatek dayê û hinek jî dirav dane wê ji bo ku wan tiştên ku wê digot, pêk bine. Pîrejinê di cî de dest bi wî karî kir û ferman da necar ku tiştêkî bi wî hawî amade bike, çawa ku me li jor jî da xuyakirin. Piştî ku necar peyker amade kir, pîrejinê ew anî cem Zubeyde Xanimê, li wir ew kefen kirin û mûm û çira pêxistin, merş raxistin li dora gorê, reş li xwe kirin û ferman dan cariyeyan ku ew jî kincên reş li xwe bikin. Piştî her kesê di qesrê de bihistin ku Qûta Dilan miriye.

Piştî demekê Xelîfe ji rêwîtiya xwe veqetî û hate qesrê, ku wê gavê Qûta Dilan tenê di hişê wî de bû. Çawa derbas bû, dît ku xulam, xizmetkar û cariyê, hemû di nav kincên reş de ne. Sebeba wê yekê pirsî, jê re gotin ku Qûta Dilan wefat kiriye. Ew jî bi bihistina wê xeberê, ji ser hişê xwe çû û li erdê ket. Gava bi ser hişê xwe ve hat, Zubeyde Xatunê jê re got: “Wille Emîrê Bawermendan, ji ber ku ew li ber dilê min pir ezîz bû, min ew di nava gora xwe de veşart.” Xelîfe bi kincên xwe yên rêwîtiyê derbasî qesra wê bû, dît ku her der bi merş û xaliyan raxistî ye û bi mûm û çirayan ronîkirî ye. Dema ew tişt dît, spasiya xwe nîşan da ji Zubeyde Xanim re û bi şik û gumanên xwe re ma heyirî; di navbera bawerkirin û nebawerkirinê de diçû û dihat. Gava ku waswasan zora wî bir, ferman da ku tirbê vekin û laşê wê jê derxin. Dema derxistin, xwest ku kefenê wê ji ser bide alî, lê belê tirsî Xwedê ket dilê wî de. Pîrejinê got: “Wê li gorê veqetînin!” Xelîfe jî ferman da ku mele û feqeyan binin da ku Quranê li ser bixwînin. Ew jî li ber rûnişt, li ber gora wê û giriya, heta ku ji ser xwe çû. Mehekî sax ji ser tirba wê ranebû...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da çiroka xwe.*

## ŞEVA PÊNCÎ Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, vêca heta mehekê jî, serdana Qûta Dilan kir, heta rojekê gava ku mîr û wezîrên wî ji cem çûn malên xwe û ew derbasî aliyê malê bû, çû nava herema xwe, seetekê raket. Li wê derê, cariyeyek li ber nigên wî rûnişt, yek jî li ber serê wî. Piştî ku xewê zora wî bir bi demekê, carekê bi ser hişê xwe ve hat, dît ku cariyeya li ber serê wî dibêje: “Keçê Xêzeran!” A li ber nigê wî jî, lê vedigerîne dibêje: “Tiştêkî tune ye Qedîb?!” Ya ber serê wî berdewam dike dibêje: “Hayê mîrîzayê me ji tiştê ku qewimi-

ye tune ye. Heta ewqasî bê xeber e ku her şev diçe li ber tîrbekê dimîne ku tiştêk tê de tune ye ji xeynî peykerekî textikî ku necar ew çêkiribû.” Ya dîtir lê vedigerand û digot: “Gelo çi bi serê Qûta Dilan hat?” A din lê vedigerand û digot: “Divê tu bizanibî ku Zubeyde Xanim bhang da cêriyek xwe û ew şand ji bo ku wê ji ser hişê wê bixe, piştî wê jî Qûta Dilan xistin sindoqekê û ew bi Sewab û Kafûr re şandibû, ji bo wê bixin tîrbekê.” Xêzeran digot: “Ev çi ye Qedîb? Qey Qûta Dilan ne miriye?” Qedîb jî digot: “Xwedê wê û ciwaniya wê bistirîne ji mirinê, lê belê min bihîst ku Zubeyde Xanim dibêje ‘Qûta Dilan li cem xortekî tacir e ku jê re dibêjin Ganimê Şamî û ev çar mehên wê ye li gel wî ye’ û mîrzayê me jî şev pê de li ber goreke vala digirî ku mirî tê de tune ye.”

Herdu cariyeyan axaftina xwe bi wî hawî berde wam dikirin û Xelîfe jî li wan guhdar dikir. Piştî ku wan axaftina xwe qedand û Xelîfe jî mijar fêmkir û têgihîşt ku gor sexte ye û Qûta Dilan li cem Ganim Bin Eyûb e ji berî çar mehan ve, pir hêrs bû û rabû ser xwe gazî mezinên dewleta xwe gişan kir. Wê gavê wezîr Cafer ê Bermekî hat gel wî û erd maçî kir li ber destên wî. Xelîfe bi hêrs jê re got: “Cafer, çend zilaman bi xwe re bibe û here mala Ganim Bin Eyûb bipirse; bigirin ser mala wî û cariyeya min Qûta Dilan ji min re binin. Bêguman divê ez wî zilamî ceze bikim.” Cafer bersiv da û got: “Ser seran û ser çavan.”

Wê gavê Cafer û zilamên xwe, li gel walî rabûn ser xwe û berê xwe dan mala Ganim Bin Eyûb û meşiyar heta ku gihan wir. Wê kêlikê Ganim jî nû ji sûkê vegeyriyabû malê, piştî ku hinek goşt û xwarin anîbû malê û ew û Qûta Dilan li ber rûniştibûn ku bixwin. Gava serê xwe rakir, dît ku bele li dora mala wî ye; wezîr û walî û zulumkar û leşkerên ku şûrên tazî di destên wan de, mala wî dorpêç kiribûn û li dora wan diçûn û dizîvirin, mîna spîka çavan a li dora reşîka wê digire. Wê çaxê Qûta Dilan têgihîşt ku agahiyên di derbarê wê de gîhane ber destê Xelîfe û êdî filitandina wê tune ye. Rûyê wê zer bû, şikl û şemala wê xerabû, li Ganim zîvirî û got: “Ezîzê ber dilê min, ê te tu xwe xelas bike.” Wî jî got: “Ez ê çawa bikim, herim ku û hemû malên min di vê malê de ye?” Wê got: “Rabe here da ku tu neyê kuştin û malê te neçe.” Wî got: “Delala min û ronîya çavên min, ez ê çawa herim û dora malê girtine?” Wê got: “Metirse!” Piştî, kincên xwe di ser xwe re anîn û li wî kirin, şimikek kevin xist nigên wî de û beroşa ku goşt tê de bû danî ser serê wî û hinek nan û rûnê xwarinê jî xistê û jê re got: “Tu bi vê hîleya han derkeve û îşê te bi min tune ye.”

Gava ku Ganim ew gotina Qûta Dilan bihîst û îşaretên wê dîtîn, rabû ser xwe û di bin sitara perdeya wê beroşa xwarinê, di nav wan re derket derve û xwe ji xetereyê rizgar kir, bêyî ku zerar bigihêjîyê. Gava ku Cafer ê wezîr giha ber derî, ji hespa xwe peya bû û derbasî malê bû, li Qûta Dilan rast hat ku wê jî xeml û xêza xwe li xwe kiribû, xwe amade kiribû û sindoq tijî zêr û zîv û cewher û antîka kiribû; ji her tiştî yê sivik û buha tê de bi cî kiribû. Çawa ku Cafer derbasî cem wê bû, jê re got: “Bi Xwedê xanima min, wî tenê ferman daye min ez Ganim Bin Eyûb bigirim.” Wê jî lê vegerand û got: “Divê tu bizanibî ku wî karwanê xwe yê ticaretê bar kir û çû Şamê. Ji vê pê ve jî ez tiştêkî nizanim û dixwazim ku tu vê sindoqê biparêzî wê bigihîne qesra Emîrê Bawermendan.” Cafer got: “Ser seran û ser çavan.” Piştî ferman da zilamên xwe ku rahêjin sindoqê û li gel Qûta Dilan, berê xwe dan mala Xelîfe, piştî ku mal û mulkên Ganim talan kirin. Gava ku gihan cem Xelîfe, Cafer tiştên qewimîbûn, ji serî heta binî jê re got. Xelîfe ferman da ku Qûta Dilan bixin cihekî tarî û pîrejinek jî danîn ber, ji bo ku xizmeta wê bike, lewre ew difikirî ku Ganim ew xera kiriye.

Piştî fermannameyek ji Mîr Mihemed Bin Suleyman El-Zeynî re nivîsand ku ew wekilê wî yê li Şamê bû. Di wê nameya xwe de got: “Çawa ku ev name giha ber destê te, di cî de Ganim Bin Eyûb dardest bike û wî bişîne ji min re.” Gava ku ew fermanname giha ber destê Mîr Suleyman, ew maçî kir, danî ser serê xwe û li sûkê ji gel re da xuyakirin, got: “Heçî ku dixwaze talanê bike, bila berê xwe bide mala Ganim Bin Eyûb.” Gava hatin mala Ganim, dîtîn ku dê û xwişka wî tirbek ji xwe re çêkirine û li ber rûniştine, digirin. Herdu dardest kirin û mala wan talan kirin bêyî ku wan ji sedemê agahdar bikin. Herdu birin cem Xelîfe, Xelîfe ji wan pirsî û got: “Kanî Ganim li ku ye?” Herduyan got: “Bûye nêzikî salekê ku hayê me jê tune.” Rabû herdu vegerandin mala wan. Ev, di derbarê wan de bû, vêca em vegerin ser rewşa Ganim Bin Eyûb ê dildar û belengaz.

Gava ku malê Ganim ji dest hate girtin, li xwe ma heyirî û dest bi girî kir, heta ku behecî. Bêyî ku li devereke bisekine, meşîya û meşîya heta ku bû êvar û tîra xwe betilî û birçî bû. Wê gavê xwe gihand bajarekî û çû derbasî mizgeftê bû. Piştî xwe da dîwarê mizgeftê, westan û birçîbûnê qudûmên wî şikandibûn. Hetanî sibehê li wir ma ku êdî spî ketibûn canê wî de û qurê qura nava wî bû ji birçîna û ji aliyekî din ve jî bêhneke genî ketibûyê û dirûvên wî hatibûn guhertin. Sibehê, niştecihên bajêr hatin mizgeftê ji bo ku nimêja sibehê bikin, dîtîn ku mirovekî birçî û hejar li wê derê dirêjkirî ye, lê belê derba maqûlan jî pê dikeve. Hem seqemî ketibû ji sermayê û hem

jî birçî xuya dikir. Kincekî kevin lê kirin ku zendikên wî şil bûbûn û jê re gotin: “Xerîbo tu ji ku yî û tu çima wisa ji qudûm ketiyî?” Çavên xwe vekirin, li wan meyzand û giriya bêyî ku bersivê bide wan. Hinekan ji wan tê derxistin ku pir birçî bûye, çûn jê re hingiv û du nan anîn, wî jî xwar. Ew jî li dora wî rûniştin, pê re mijûl bûn heta ku ro derket, piştî rabûn çûn karên xwe.

Bêhtirî mehekê bi wî halê xwe li cem wan ma. Lawazî û nexweşiya wî lê girantir bû, dilê wan li ser êşiya, pev şewirîn li ser rewşa wî û di dawî de li hev kirin ku bibin bîmarîstanekê li Bexdê. Hîna ku ew di wê rewşê de bûn, dê û xwişk wî derbasî hundur bûn, mîna du jinên bêxwedî û feqîr bûn. Wî jî nanê li cem xwe da wan, bêyî ku wan nas bike, angû ew wî nas bikin û wê şevê li cem wî raketin. Roja dîtirkê, niştecihên wir deveyek anîn û ji xwe-diyê devê re gotin: “Vî nexweşî li ser piştî deveyê xwe bike û gava tu gihaşt Bexdê wî li ber deriyê bîmarîstanê deyne, belkî rehet bibe û xêra te jî bikeve vî karî.” Wî jî got: “Ser seran û ser çavan.”

Wan jî Ganim Bin Eyûb ji mizgeftê derxistin û di nav merşê ku li ser radiket de, ew anîn li ser piştî devê kirin. Xwişk û dêya wî jî hatin bi xelkê re lê temaşe kirin bêyî ku wî nas bikin. Lê diya wî, di dilê xwe de got ‘Dirûvê Ganimê me pê dikeve!’ Ganim jî, li ser piştî devê, nû bi xwe hesiya û dest pê kir, giriya û axîn û nalîn pê ket. Xelkê jî lê temaşe dikir, xwişk û diya wî bi halê wî digiriyan bêyî ku wî nas bikin. Piştî, xwişk û diya wî bi rêwîti çûn Bexdê. Xwediyê devê jî meşa xwe berdewam kir, Ganim bir, li ber deriyê bîmarîstanê danî, deveyê xwe girt û bi şûn de vegeheriya. Ganim jî heta sibehê li wir ma. Sibehê gava ku bajarî di wir re derbas bûn, dîtî ku hişkî hola bûye li wir. Hîna ku xelkê wisa lê temaşe dikirin, Şêxê Sûkê hate wir, xelk ji dora wî dan alî û ji wan re got: “Bi xêra vî belengazî belkî ez herim bihûştê, jixwe wî bigirin bîmarîstanê jî, di rojekê de wê wî bikujin.” Piştî ferman da zarokên xwe ku rahêjin Ganim û wî bibin malê. Li malê nivînek jê re danîn û balîfek nû xistin bin serê wî de û ji jina xwe re got: “Xizmeta wî bike û baş lê bimeyzîne.” Wê jî got: “Ser seran û ser çavan.” Piştî, zend û bendên xwe hildan, av jêre germ kir, dest û nigên wî şûştin, ew bir serşokê û kincên wî jî şûştin. Dûvre hinek kincên cariyeyên xwe lê kirin, qedehê şerap dayê û gulav bi ser wî dakir. Ganim jî bi ser xwe ve hat û evîndara wî Qûta Dilan hate bîra wî. Ew jî xemgîn û kedernak bû.

Vêca em vegeherin ser Qûta Dilan û rewşa wê. Gava ku Xelîfe pê de xeyidî û ew xist devereke tarî de, heştê rojî di wî halî de ma, heta ku rojekê Xelîfe di wir re derbas bû û dengê Qûta Dilan hate wî ku helbestan dixwîne. Piştî



ku helbest qedand jî, got: “Ey evîndarê dilê min Ganim! Tu çiqasî mirovekî baş û nefspîroz î ku te qencî bi xerabkarê xwe kir û te namûsa yekî parast ku wî bi xwe li talanê te xist û malbata te terqandin, bi çolan xistin. Bêguman, divê tu Emîrê Bawermendan derkevin raberî dadwerekî adil û tu mafê xwe jê bistîne, di rojekê de ku dê dadwer Xweda be û şahid jî ferîşte bin.”

Gava ku Xelîfe ew gotinên wê bihîstin û gilîkariya wê fêhm kir û têgihîşt ku ew bêguneh e, vegeriya qesra xwe û xulamê xwe şand pey wê. Qûta Dilan bi rûyekî xemgîn hate cem Xelîfe û silavek lê kir. Xelîfe jê re got: “Ey Qûta Dilan, ez dibînim ku tu min gunehbar dikî û min dixî şûna zaliman û tu angaşt dikî ku min xerabî kiriye bi wî kesê ku qencî bi min kiriye. Vêca ew kes kî ye ew ê namûsa min parastiye û min ya wî xera kiriye?” Qûta Dilan jê re got: “Ew kes Ganim Bin Eyûb e, lewre ew bi xerabî qet nêzîkî min nebûbû û qencî heq kiribû ji Emîrê Bawermendan.” Xelîfe got: “Lahewle wela quwete illah billah! Hela bêje Qûta Dilan, tu çî ji min dixwazî bêje, ez ê pêk binim.” Wê jî got: “Ez dildarê xwe Ganim Bin Eyûb ji te dixwazim.” Gava ku Xelîfe ev gotina wê bihîst, got: “Bi izna Xwedê, ez ê wî ji te re binim.” Qûta Dilan got: “Emîrê Bawermendan, gelo gava tu wî binî, tê min diyarî wî bikî?” Got: “Heger min ew anî, ez ê te diyarî wî bikim, diyarkirineke ku vegeer tê de tunebe.” Rabû wê jî got: “Ey Emîrê Bawermendan, heger tu destûrê bidî min, ez dixwazim lê bigerim, belkî Xwedê teala me bigihîne hev.” Wî jî got: “Tu çawa dixwazî wisa bike.”

Pir kêfa wê hat, hezar dînar girt û ji mal derket. Çû serdana şêx û meşayixan û sedeqe li ser wan belav kirin, roja dîtirkê çû cem taciran, çend dîrhem dan serkêşê sûkê û jê re got: “Wan li xerîban belav bike.” Hefteya li pey wê, ji mal derket, dîsa hezar dînar hilda gel xwe û çû sûka zêrker û cewherkeran û gazî serkêşê sûkê kir. Gava ku hat, hezar dînar da wî û jê re got: “Van dînanan weke sedeqe li ser xerîban belav bike.” Serkêşê sûkê ku di heman demê de Şêxê Sûkê bû jî, li wê meyzand û jê re got: “Gelo tu dikarî werî mala min, tu li wî xortê xerîb bimeyzênî, bê çiqasî xortekî diltenik û hêja ye ku jê re dibêjin Ganim Bin Eyûbê aşîq.” Şêx, wisa digot û nizanibû ku ew wê nas dike. Ji wî werê ku ew mirovekî feqîr û deyndar e ku malê wî jê hatiye stendin, ango aşîqekî ku ji hezkiriyên xwe dût ketiye. Vêca gava ku Qûta Dilan ew gotina wî bihîst, dilê wê mîna yê çûkekê lêda û nava wê li hev ket. Jê re got: “Kanî yekî ku min bigihîne mala te, bi min re bişîne.” Kurikekî biçûk pê re şand, ew gihand mala wî. Gava derbasî mala wî bû, silav li jina şêx kir, ew jî rabû ser xwe, erd maçî kir li ber nigên wê, lewre ew nas kiribû. Qûta Dilan jê re got: “Ka ew nexweşê li cem we?” Jina Şêx giriya bi halê wî û got: “Vaye li vir e xatûna min, lê ji dirûvê wî xuya dike ku ji malmezina ye.”

Qûta Dilan li hêla din zîvirî, dît ku waye li ser nivînê paldayî ye. Baş lê meyzand, dît ku ew bi xwe ye. Lê belê gelekî hatibû guhertin; zirav û hejartir bûbû û gîhabû radeyekê ku guman jê dikirin ku ew be. Careke din ji nêz ve lê nêrî, dilê wê pê şewitî, agir bi nava wê ket, giriya û ji xwe re got: “Xerîb xizan in, lew ku li welatê xwe emîr bin jî!” Piştî jê re şerab û derman kirin û seetekê li ber serê wî rûnişt. Dûra rabû ser xwe, çû qesrê. Rojên li dû wê rojê jî, wisa derbas bûn, Qûta Dilan her roj diçû sûkê û li Ganim digeriya. Rojekê Şêxê Sûkê, dê û xwişka Ganim da kêleka xwe û hat cem Qûta Dilan, jê re got: “Serxanima delalan, îro keç û dayikek hatine bajarê me ku dirûvê kesên maldar bi wan dikeve, lê belê kincên mû li ser wan in û her yek ji wan toqek di stûyê wan de ye û çav bi girî, dil xemgîn in û vaye min ew anîne cem te da ku tu wan bihewînî û wan bistirînî ji parsê, lewre ew ne kesin ku parsê bikin li berdestê bêbextan. Ma Xwedê belkî bibin sebeb ku tu herî bihûştê.” Wê jî got: “Begê min willehî te hişt ku ez pir mereqa wan bikim, vêca ka li ku ne?” Qûta Dilan ferman da wan ku derbas bibin hundur. Fitne û diya xwe derbasî cem Qûta Dilan bûn. Gava ku li wan nêrî û dît bê çiqasî xweşik in, li ser wan giriya û got: “Bi navê Xwedê ev kesana maldar û ji maqûlan xuya dikin.” Şêx jî got: “Em ji xizan û feqîran hez dikin ji bo xêrkariyê, evanan jî belkî hatibin şêlihandin, zulum li wan hatibe kirin û ji malên wan hatibin derxistin.”

Herdu jinik pir giriyan û gava ku Ganim Bin Eyûbê talankirî hate bîra wan, wêla wêla wan zêdetir bû û Qûta Dilan jî bi wan re giriya. Piştî dayika wî got: “Em ji Xwedê hêvî dikin ku me bigihîne wî kesê ku em lê digerin, kurê min Ganim Bin Eyûb.” Gava ku Qûta Dilan ev gotin bihîstin, têgihîşt ku ev jinik diya wî ye û ya din jî xwişka wî Fitne ye. Wê gavê ew jî giriya, heta ku ji ser hişê xwe çû. Gava ku bi ser xwe ve hat, li wan vegeriya û ji wan re got: “Baş e, ev serê bextewariya we û dawîya dilêşiya we ye, hûn ê êdî xemgîn nebin.”

*Wê gavê li Şehrezadê bû sibe û wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

## ŞEVA PÊNCÎ Û PÊNCEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, vêca Qûta Dilan ji wan re got ‘Xemgîn nebin’ û ferman da Şêxê Sûkê ku wan bibe mala xwe û ji jina xwe re bêje ji bo ku wan bibe hemamê û kincên baş li wan bike û qedr û qîmetê wan bigire û ji bo vê yekê jî qederek dirav dane wî. Roja dîtirkê Qûta Dilan siwar bû û çû mala Şêx, derbasî cem jina wî bû. Ew jî ji ber wê rabû, destên wê maçî kirin

û spasiya xwe pêşkêşî wê kir. Piştre, Qûta Dilan xwişk û diya Ganim jî dîtin ku jina Şêx ew biribûn hemamê û ew kincên perpitî ji ser wan avêtibûn ku êdî di dirûvê maldaran de xuya dikirin. Li ba wan rûnişt û nêzî seetekê bi wan re sohbet kir. Piştre ji jina Şêx pirsî bê ka rewşa xortê nexweş çi ye, wê jî got: “Di halê xwe de ye.” Rabû got: “Ka em tevde herin, binêrin bê halê wî çawa ye û vegerin.” Ew û jina Şêx û xwişk û diya wî tevde rabûn ser xwe û çûn derbasî cem wî bûn û li gel wî rûniştin.

Gava Ganim Bin Eyûb li wan guhdarî kir û bihîst ku behsa Qûta Dilan dikin, dîsa ruh pê ve hat, piştî ku hestiyên wî tenik bûbûn û laşê wî dihej-hijî. Serê xwe rakir ji ser balîfê, gazî kir û got ‘Qûta Dilan!’ Keçik lê zîvirî, bi hûrgulî lê nêrî û venêrand heta ku bi cî ew nas kir û guman pê re neman ku ew bi xwe ye û wê jî lê vegerand, got ‘Belê dilocan!’ Wî jê re got: “Hela xwe nêzîkî min bike!” Wê got: “Xwedê dizane ku tu Ganim Bin Eyûb ê aşîqê ku li talanê wî hatiye xistin?” Wî got: “Belê, ez ew im.” Wê çaxê Qûta Dilan ji ser hişê xwe çû. Xwişk û diya wî jî, çaxa ku ew guftûgoya wan bihîstin, bi kêf û eşq qîr kirin, gotin ‘Xwedêyo!’ Û pê re jî gêj bûn li erdê ketin, ji ser hişê xwe çûn. Piştre hemû bi ser hişê xwe hatin, Qûta Dilan got: “Şîkir ji Xwedayê ku ez gihandim te û xwişk û diya te û em hemû gihandin hev.” Piştre, hat li cem wî rûnişt û çî tiştê pê re qewimîbû û di navbera wê û Xelîfe de derbas bûbû, jê re got û dûra jî lê zêde kir, got: “Min jê re got ku min rastî ji te re gotiye ey Emîrê Bawermendan. Wî jî ji min bawer kir û ji min razî bû ji ber wê yekê û niha jî dixwaze ku te bibîne.” Navberek da gotina xwe û dîsa lê zêde kir, got: “Û Xelîfe ez diyarî te kirime!” Ganim pir pir kêfxweş bû bi wê agahiyê. Qûta Dilan ji wan re got: “Ji vir neçin heta ku ez li we vegerim.”

Di cî de rabû ser xwe û berê xwe da qesra xwe, çû ew sindoqa ku ji mala wî derxistibû vekir, hinek dînar jê derxistin û ew dan Şêxê Sûkê û jê re got: “Van dînanan bigire û here ji bo her yekî ji wan, çar bedlan ji cawê herî baş bikire û bîst heb destmal û pêdiviya wan bi çî hebe bistîne.” Piştre, çû Ganim û xwişk û diya wî, her sê birin hemamê û ferman da ku wan baş bişon; ji wan re bodra, ava xolincan û ava sêvan jî amade kir. Piştî ku ji hemamê derketin û kincên xwe li xwe kirin, ew dîsa vegerandin mal û sê rojên din li gel wan ma; goştê mirîşkan û şorbe da wan û ava şekir bi wan da vexwarin. Piştî sê rojan, dîsa ruh bi wan ve hat, careke din ew birin hemamê, cilên wan guhertin, ew li mala Şêx hiştin û yê wê ew çû cem Xelîfe, erda ber nigê wî maçî kir, çîrok jê re got ji serî heta binî û li dawiyê jî got: “Vaye min mîrzayê xwe Ganim Bin Eyûb ê talankirî aniye li gel xwişk û diya wî.”

Gava ku Xelîfe ew gotinên Qûta Dilan bihîstin, ji xulamê xwe re got: “Herin Ganim bînin vir.” Cafer bi lez daket xwarê û Qûta Dilan jî berî wî çûbû gel Ganim û jê re gotibû Xelîfe gazî te dike û dixwaze ku te bibîne, de êdî bi zimanekî fesîh û helwesteke resen û şêrîn derkeve miqabilî wî. Piştî cil û bergêkî baş jî lê kir, gelek dînar dane wî û jê re got: “Gava tu derbasî cem Xelîfe bû, destvekirî be û gelek dînanan belav bike li ser zîlamên Xelîfe.” Di wê navberê de, Cafer ê ku li ser piştî qantira xwe dihat giha wir, Ganim rabû ser xwe ew pêşwazî kir, silavdayînek dayê û erd maçî kir li ber nigên wî, piştî ku şensê wî lê da û bextê wî vebû. Cafer ew bi xwe re bir û çû ew bi xwe re derbasî cem Xelîfe kir. Gava ku derbasî diwana Xelîfe bûn, Ganim li wezîr û emîr û cîgir û zana û xulam û mezinên dewletê meyzand. Ganimê ku xwediyê zimanekî fesîh bû, diltenik û gotinşêrîn bû, serê xwe bera ber xwe da, hizirî, piştî li Xelîfe nêrî û ev beytana bi stranî gotin:

Bi qûrbana te bim ez, ey Şahê dilovan  
 Ê ku dike bêhesab ew, qencî û xêran  
 Xunava wî pir e, agirê wî jî her gur e  
 Di rengê tofanê de ye bûyereke bi agir e  
 Tu nav nîne êdî li ser zimanê tu kesî  
 Ji xeynî navê Xwedê Teala û navê wî  
 Hemû qral û melik tacên xwe datînin li ber wî  
 Gava ku ew wî pêşwazî dîkin li ber derî  
 Çawa ku çavên wan li yên wî dikevin  
 Ji ber heybeta wî, serdev li erdê dikevin  
 Ji bo wan xêr û bêr e ev gewresultan  
 Jidil dide ew bêpîvan mehmiz û diravan  
 Çol û beyar teng bûne êdî li leşkerê xotan  
 Ka vegire êdî çadîran li ser lûtkeyên Keywan  
 Lewre stêrk û heyv jî dikevin şopê bi rêzdarî  
 Li hember vê hebûna giyanî ew bi vîndarî  
 Te dada xwe belav kir îro li cîhanê  
 Heta ku wekhev bûn mîr û xulamên cîhanê

Gava wî helbesta xwe qedand, Xelîfe mest bû bi wê teşeya xwendina wî, zimanê wî yê fesîh û şêrîn eciband û jê re got: “Nêzikî min bibe!” Ganim ber bi Xelîfe de çû. Xelîfe jê re got: “Ka çîroka xwe bêje û rastiya xwe eşkere bike ji min re.” Hebekî din xwe nêzikî Xelîfe kir û çîroka xwe ji serî heta binî jê re vegot. Gava ku durustiya wî eşkere bû, Xelîfe ew xelat kir û jê re got: “Li min bibore, ez ê ji li te biborim.” Wî got: “Emîrê Bawermendan, jixwe kole bi hemû hebûna xwe, malê xwediyê xwe ye.” Xelîfe bi wê yekê kêfxweş bû û ferman da ku qesrekê jê re veqetînin û têra wî xulam û carîye jî danê. Ji

ber ku Xelîfe bihîstibû ku xwişka wî Fitne pir spehî ye, ew jê xwest. Ganim got: “Jixwe cariyeya te ye û ez xulamê te me.” Xelîfe spasî wî kir û sed hezar dînar da wî. Qadî û şahid anîn, mehr birîn û ew û Ganim di rojekê de zewicîn; ew bi Fitnê re, Ganim jî bi Qûta Dilan re. Gava bû sibe jî, Xelîfe ferman da dîroknûsan ku çîroka Ganim ji serî heta binî binivîsînin û bixin nav pirtûkxaneyan da ku nifşên li pey wan bixwînin û encaman jê derxînin.



HEZAR Ū YEK ŐEV

CILD III





## (ÇÎROKA OMER EN-NÛMAN Û HERDU KURÊN WÎ ŞERKER Û ŞEWQA MEKAN)

*Gava ku Şehrezadê çîroka Eyûbê Tacir qedand, axaftina xwe berdewam kir û got: "Lê belê ew çîroka han nabe tu tişt li himberî erjengtirîn çîroka Omer en-Nûman û herdu kurrên wî Şerker û Şewqa Mekan ku tijî sosretî û ecêbin!" Şahê gewre Şehriyar got: "Û ev çîroka Omer en-Nûman çawa ye gelo?"*

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Şahê min ê bextewar! Tête gotin ku beriya xîlafeta Ebdulmelik Bin Merwan, sultanek li Bexdê hebû navê wî Omer en-Nûman bû; sultanekî gewre û hêzdar bû, gelek qeyser û kesrewan têkberibûn. Ne agirekî dikaribû ew bida sekinandin, ne jî kesekî dikaribû pêre bikeve pêşbazîyê, di tu wara de. Gava ku diqeherî, birûsk ji çavên wî diçûn, agir di pozê wî re davêt. Desthilatdariya xwe, ewqasî fire kiribû ku leşkerên wî gîhabûn her çar hêlên dinyê û herkesî serî li ber wî tewandibû, ji rojhilat hetanî rojava: Hindistan, Sindistan, Çin, Yemen, Hicaz, Hebeşistan, Sûdan, Şam, Rûmistan, Diyarbekir û hetanî bi Cezaira wî aliyê avê, hemû ketibûn bin destê wî de, li gel çemên herî nasdar ên li ser rûyê dinyê, mîna Seyhûn, Ceyhûn, Nîl, Ferat û hetanî bi Dicleyê. Sultanekî wisa hêzdar bû ku qasidên wî gîhabûn welat û diyarên herî dûr û bê navber agahên rasteqîn jê re dişandin, di derbarê hemû giregirên cîhanê yên ku serî li ber wî tewandibûn û hemû xelkên ku bi qenciya wî abad dibûn! Sultanekî ku her der di nava xweşî û aramiyê de hiştibû bi mezinbûn û comerdî û dadweriya xwe! Sultanekî ku ji hemû hêlan ve diyarî û xelat jê re dihatin û ji seranserê şerq û xerbê jî, bac û qamçor distendin. Vêca kurekî wî sultanî hebû ku navê wî kiribû Şerker, ji ber ku bi rastî jî şerkarekî mezin bû; rikebir li himberî xwe nehiştibûn û qirra mêr û egîdên zemanê xwe anîbû. Loma bavê wî jî pir jê hez dikir û ew mîna welîehdê xwe nîşan dabû, ji bo ku li pey wî ew bibe sultan.

Vêca ew Şerkerê hanê, gava ku nû gihîştibû ciwaniya xwe û temenê wî gîhabû bîstan, herkesî serî li ber wî tewandibû ji ber wêrekî û îna da wî. Bavê wî Omer jî xwediyê çar jinan bû lê belê ji Şerker pê ve tu zarok jê re çênebûbûn. Ji xeynî wan her çar jinan jî sê sed û şêst cariyeyên wî hebûn ku her yek ji wan ji miletekî bû û ev hejmar bi xwe jî hejmara rojên sala qiptî bû. Dîsa, bi qasî hejmara mehên wê salê jî, diwazde heb qesrên wî hebûn ku di her qesrekê de sîh ode û di her odeyekê de cariyek bi cih kiribû ku ji wê sala xwe, rojek tenê jê re vediqetand ji bo ku pê re rakeve. Yanî her cariyek ji wan sê sed û şêst cariyeyan, salê carekê tenê dora wê dihat. Îcar Omer

en-Nûman jiyana xwe wisa berdewam dikir. Kurê wî Şerker jî, bênavber keleh û sûr û welat safî dikirin û her ku diçû hin xwirtir û zalimtir dibû.

Rojekê, qederê wisa ji Omer en-Nûman re li hev anî ku cariyeye wî avis bû û xebera xêrê gihandinê. Ew jî bi wê yekê pir kêfxweş bû û ji xwe re got: “Belkî ma Xwedê ku ev jî kur be û zuruyeta min giş nêr derkeve!” Û dîroka hemlê wê li ba xwe tomar kir û ferman jî da suxrevanan ku baş li wê cariyeyê binêrin û lê miqatebin. Ev agahî giha Şerker jî lê ew pê xemgîn bû; kul û keder ketin nava wî de...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birrî.*

ŞEVA PÊNCÎ Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Vêca şahê min ê bextewar, gava Şerker fêr bû ku cariyeya bavê wî bihemil bûye, xemgîn û kedernak bû û ji xwe re got: “Vaye yekî ku li ser qraliyeta bavê min rikeberiyê bi min re bike jî wê çêbibe!” Kî di dilê wî de çêbû û sûnd xwar ku heger ew cariyeye kurekî bîne, wê ew wî bikuje.

Ev ji aliyê Şerker ve wisa bû. Vêca em vegehin ser cariyeya ducanî ku ew bi xwe keçeke Romî bû. Qeyserê Romê ew diyarî Omer en-Nûman kiribû li gel gelek diyariyên din. Navê wê Safiye bû û cariyeya herî xweşik bû di nav gişan de. Di heman demê de jî, cariyeya herî bi rûmet, ya herî bi namûs û ya herî şareza bû jî. Loma ewê xizmeta Omer dikir û gava ku ew jî dihat, li cem wê radiket. Safiye jêre digot: “Qralê min ê bextewar! Ez hêvî dikim ji wî Xwedayê jorin ku kurekî bide min, da ku ez wî li ser terbiyeye baş bidim mezinkirin û ez bikaribim wî biparêzim ji qede û beleyan.” Qral jî kêfxweş dibû bi van gotinên wê. Dema ku mehek di ser hemlê wê re derbas bû, dev ji karê giran berda û êdi giraniya xwe da ser xiroş û îbadetê ku jixwe ew jineke salih û bawermend bû. Nimêja xwe dikir, dua ji Xwedayê xwe re dikirin ku kurekî rêrast bide wê û ew jî bi hêsanî berê xwe deyne. Qral jî xizmetkarek dabû cem wê, ji bo gava biwelide, ew were wî agahdar bike bê ka gelo keç anîye an jî kur. Şerker bi xwe jî xizmetkarek şandibû wir ji bo ku ew jî wî agahdar bike bi heman mijarê. Îcar gava ku Safiye berê xwe danî û jinên ku pîriktî jê re dikirin dîtin ku keçeke mîna heyvê jê re çêbû, bi lez der û dor agahdar kirin bi vê yekê. Qasidê qral jî bi lez çû balê ew agahdar kir bi mijarê, yê Şerker jî heman agahî bir ji wî re ku ew jî pir kêfxweş bû bi wê xeberê.

Piştî ku xizmetkarê Sultan û yê Şerker ji wir çûn, Safiye gazî kir û ji pîrejinên dora xwe re got: “Mohletê hebekî bidine min, ez his dikim ku hîna

tişteki din di nava min de heye.” Li pey vê inte int pê ket û careke din ket ber welidandinê. Xwedê Taala careke din jê re li hev anî û berê xwe yê dudan jî bi hêsanî danî; ji hev xelas bû, pîrejinên dora wê lê meyzandin, dîtî ku vê carê kurekî mîna heyvê aniye ku rûgul û enîçîçek bû! Pîr, jin, suxrekar û xizmetkar hemû giş kêfxweş bûn, deng bi wan ket tililîyên wan di qesrê de olan dan, hundur dagirtin, ji ber vê kêfxweşiya han hemû cariyeyên din jî agahdar bûn ji mijarê û zikreşî bi wan re çêbû li hemberî Safiyeyê.

Ew Agahî çû ji Omer en-Nûman re jî. Ew jî pir pê kêfxweş bû û hat, derbasî cem Safiyeyê bû, eniya wê maçî kir. Li pitikê wê nêrî, xwe bi ser de xûz kir, ew jî maçî kir. Cariye û xizmetkaran li def û daholan xistin, hemû enstûrmanên mûzîkê bi kar anîn, şahîyeke mezin li dar xistin. Sultan jî fermanek derxist ku navê wî kurê xwe bike Şewqa Mekan û navê xwişka wî jî bike Seyrana Zeman. Herkesî bejna xwe li ber wê fermanê tewand û ew herdu nav li wan zarokan kirin. Sultan jî ji bo xwedîkirin û mezinkirina herdu zarokan, suxrekar, xizmetkar, cariye û dayikên ku şîr bidine wan destnîşan kirin û ji bo gişan jî mûçe û şekir û rûn û xwarin û vexwarin û gelek tiştên din dane eyarkirin.

Xelkê Bexdê jî pê hesiyan ku kurek ji sultanê wan re çêbûye, rabûn bajar giş xemilandin bi dûmenên kêf û şahîyê. Mîr û mîrek û wezîr û gîzîrên dewletê jî hemû tevde hatin cem qralê xwe, ew pîroz kirin bi çêbûna Şewqa Mekân û Seyrana Zeman. Sultan jî spasî tevda kir; xelat li wan belav kirin bi comerdî û xêr û bêr li ser hemû kesên hazir jî belav kir.

Çar sal bi wî hawî derbas bûn ku sultan serê çend rojekî carekê, li Safiye û zarokên wê dipirsî, piştî wan çar salan, sultan ferman da ku gelek dirav û zîv û zêr û mal ji Safiye re bibin û ew şîret kir ku herdu zarokên wî baş mezin bike û li ser terbiyeke baş.

Ev hemû wisa derbas dibûn bêyî ku hayê Şerker jê hebe ku Xwedê kurekî din daye bavê wî Omer en-Nûman. Wî tenê dizanîbû keçek jê re çêbûye bi navê Seyrana Zeman, ji ber ku xebera çêbûna Şewqa Mekân jê veşartîbûn, vê yekê jî wisa berdewam kir bi salan. Şerker jî, bênavber mijûl dibû bi şer û ceng û halanê.

Rojekê gava ku Omer en-Nûman li ser textê xwe rûniştîbû, xizmetkarên wî derbasî cem wî bûn, erda ber nigê wî maçî kirin û jê re gotin: “Qralê me yê bextewar, qasidên Qeyserê Romê xwediyê Qostantîna mezin hatine vir, dixwazin derbasî cem te bibin, îcar heger hûn destûrê bidin em ê wan derbasî hundur bikin, heger na be emê wan bi şûn de bişînin.

Qral destûra wan da, ew jî hatin derbasî meqamê wî bûn û serên xwe li ber danîn. Wî jî silava wan veqerand, bi wan ve rabû, li hal û wextê wan, li sebeba hatina wan pirsî. Qasidên qeyser gotin: “Ey qralê gewre û mehriban; xwediyê destên dirêj û hêzdar! Ê ku em şandine cem te, Qeyserê Romê Efrîdon e; xwediyê welatê Yewnan û serleşkerê Krîstîyanan, yê ku li Qostantîniya gewre rûdinê. Ew dixwaze te agahdar bike ku ew niha di nava şerekî mezin de ye bi mirovekî cengawer û hêzdar re ku ew jî yekî ji xwedanên Qeyseriyê ye. Sebeba wê jî ew e ku qralalekî Ereban di dema fethê de xezîneyek ayidî zemanê Îskender dîtîye û wî jî dirav û malin bêhed û bêhesab jê derxistiye û bi xwe re biriye, ku di nava wan de sê heb morikên mezin ên bi qasî hêkên hêştirmeyê hebûne. Ew morîk jî ji gewherê spî û xwerû bûne ku gewher mîna wan tunebûne û li ser her yekê ji wan jî, razin nediyar hatibûne nivîsandin, bi zimanê Yewnanî ku gelek fêde û taybetmendî tê de hebûne. Yek ji wan taybetmendiyên wan morîkan jî ew bûye ku gava morîkek ji wan bi pitikekê ve bihata daliqandin, tu êş û xerabî nikaribû nêzikî wê pitikê bibûya. Vêca gava ku wî qralê Ereban dest danîbû ser wê xezîneyê û fêrî wan sir û razan jî bibû, biryar dabû ku çend antikeyan ji wan, li gel çend heb tiştên din ên giranbuha-ku ew her sê morîk jî di nav de bûne-weke diyarî ji Efrîdonê Qeyser re bişîne û ji bo ku wan diyariyên xwe bi saxî û selametî bigihîne ber destê Efrîdonê Gewre, du keştiyan amade dike; yek ji bo barkirina wan diyariyan û ya din jî ji bo parêzvan lê siwar bin û parastina wan diyariyan bikin li himberî qursanên deryayê, li gel ku wî texmîn nedikir tu kes wêribe têkilî wan keştiyan bibe, ji ber ku keştiyên qralek Ereban bûn û rêya wan jî di nav deryaya Qostantîniyê re derbas dibû ku ji xelkên wî pê ve tu kes li peravên wê deryayê tunebû. Îcar gava ku amadekariyên herdu keştiyan diqedin, dikevin rê de. Lê belê dema ku nêzikî welatê me dibin, hinek ji rêbirên wê herêmê dikevin pêşîya wan de, ku leşkerên xwediyê Qeyseriyê jî di nav wan de bûne û hemû dirav, antîke, zexîre û yadîgariyên di keştiyê de, li gel wan hersê morîkan jî derdixin dibin, piştî ku hemû parêzvanan dikujin. Gava ku qralê me Efrîdon ji vê yekê agahdar dibe, leşkerên xwe li pey wan dişîne, lê mixabin ew leşker bi ser nakevin. Ew jî radibe hêzeke hîn xwirtir bi ser wan de dişîne, lê ew jî bi ser nakeve û bi şûn de direve, tê. Vêca qeyserê me jî qeherî û sûnd xwar ku ew bi xwe bi artêşa xwe, bi ser wan de here û venegere hetanî ku Qeyseriyeyê xera neke û axa wî welatî giştî wêran neke. Ji bo vê yekê jî qeyserê me, ji we sultanê hêzdar Omer en-Nûman alîkariyê dixwaze! Mebesta wî ew e ku hûn hineke leşker ji cem xwe bişînin alîkariya wî, ji bo ku serbilindî û şanazîya vê serkeftinê ya we be, qralê min! Vaye qeyserê me hinek yadîgarî ji bo we şandine û tikan ji we dike ku hûn wan qebûl bikin û wî neşkinin!” Piştî, qasidan careke din erda ber nigê en-Nûman maçî kirin û yadîgariyên ku bi xwe re anîbûn, yeko yeko eşkere kirin. Di nava wan yadîgariyan de, pêncî heb carîyeyên taybet ji welatê Romê hebûn û pêncî heb koleyên ku kincên wan bi zêr û zîv û dîbac

xemilandîbûn û di guhê her yekî ji wan de jî guharekî zêr hebû. Bi her guharekî ve jî, lûlûyeke mercanî hebû ku bi buhaya hezar mîşqalên zêrîn bû. Li ser cariyeyan jî ewqase hebû û kincên gişan jî pir buha bûn.

Gava ku en-Nûman ew dîtî, bi wan pir kêfxweş bû, ew qebûl kirin û ferman da ku qedrê qasidan were girtin. Piştî çû bi wezîrên xwe şêwirî bê ka gelo divê çî bikin çî nekin? Wezîrek ji nav wan rabû ku pîrekalekî temendirêj bû û jê re digotin Dendan. Di serî de erda ber nigê en-Nûman maçî kir û got: “Qralê min! A baş ew e ku tu artêşeke mezin amade bikî, kurê xwe Şerker jî li ser wan bikî fermanî û me jî li ber destê wî bikê xulam! Başî û rastiya vê nêrîna min ji du xalan tê; ya yekê ew e ku Qeyserê Romê hewara xwe di te de anîye, qasidên xwe şandine cem te û te jî yadîgariyên wî qebûl kirine. Ya duduyan jî ew e ku dujmin newêrin bi ser welatê me de werin. Vêca gava ku leşkerên te berevaniya Qeyserê Romê bikin, bi ser kevin û dîjminên wî birevin, wê ev serkeftin ji te re bibe mal û wê nav û dengê te li hemû welatan belav bibe û bi taybetî jî gava ku ev xeber bigihêje Cezayira deryayî û xelkên Mexribê vê serkeftina te bibihîzin, wê têra te dirav û mal û antike û diyariyan ji te re bişînin.”

Gava ku qral ew gotin ji wezîrê xwe Dendan bihîstin, kêfxweş bû û rastî tê de dît, pesnê wî da û got: “Şêwra qralan bi mirovên wisa dibe! Loma divê yekî weke te di pêşiya leşkerên min de be û kurê min Şerker jî, nig be ji leşkeran re.”

Piştî, Qral ferman da ku gazî kurê wî Şerker bikin. Gava kurê wî hat, mijar ji serî hetanî binî jê re vegot û şîret lê kir ji bo ji rêya wezîr Dendan dernekeve û here amadekariyên rê û rêwîtiyê bike. Ferman jî dayê da ku here deh hezar lehengî hîlbijêre ji nav leşkerên xwe, ku wêrek û berxwedêr bin û tu kêmanîyên wan ên çekan tunebin.

Şerker di cî de rabû ser xwe, li gora fermana bavê xwe tevgeriya û deh hezar siwarên neqandî ji nav leşkerên xwe hîlbijartin û çû derbasî qesra xwe bû; têra xwe dirav û mal anîn, li ser leşkeran belav kirin û sê roj mohlet dane wan, wan jî serî li ber tewandin, erda ber nigê wî maçî kirin û derketin, çûn da ku amadekariyên xwe ji bo seferê bikin.

Şerker jî derbasî embarên çekan bû û çî tiştê jêre lazim bû ji şûr û rim û meral û cewşenan derxistin, birin, piştî derbas bû axurên hespan û têra xwe hesp neqandin. Piştî sê rojan, leşker li hevdu kom bûn li pêşiya bajêr, Omer en-Nûman jî derket derve ji bo kurê xwe bi rê bike û heft sindoq dirav dane wî. Piştî çû cem wezîrê xwe Dendan û tembîya kurê xwe Şerker û leşkeran lê kir, wezîrê wî xwe li ber tewand; erda ber nigê wî maçî kir û

got: "Fermana qralê min ser seran û ser çavan e." Qral berê xwe da kurê xwe Şerker û jê xwest ku di her mijarê de bi Dendanê wezîr bişêwîre, wî jî ew yak pejirand û erê kir. Bavê wî li bajêr vegeya, çû qonaxa xwe, Şerker jî ferman da serkêşan ku dest bi merasîma meşê bikin û leşkeran amade bikin ku hejmara wan deh hezar bû ji xeynî yê li pey wan diçûn ji bo xizmetê. Def û daholên cengê lêdan, qîrîn bi serkêşan ketin, al bilind bûn di ser serê wan re û ketin rê de, li pey qasidên ku rêzantî ji wan re dikirin. Roj pê de meşiyar hetanî şev kete erdê. Ew jî sekinîn, ji hespên xwe peya bûn vehewiyar û wê şêvê li wir raketin.

Gava bû sibe dîsa siwar bûn, barên xwe bar kirin û dîsa li pey qasidan meşiyar, rêya xwe berdeyam kirin. Bîst rojan bi wî hawî meşiyar. Roja bîst û yekê gîhan newaleke xweş û fire ku tijî şîndar bûn, şev bû, Şerker ferman da ku li wê derê rawestin û sê rojan li wir bimînin. Sekinîn, peya bûn, çadir vegirtin û leşker jî çep û rast belav bûn ji xwe re. Dendanê wezîr jî peya bû li wê nawalê li gel qasidên Efrîdon; qeyserê gewre û xwediyê Qostantînyê.

Şerker ji hespê xwe peya nebibû. Saetekê xwe ragirt hetanî leşker giş peya bûn û li hawîrdora newalê belav bûn. Piştî rişma hespê xwe sist kir û xwest ku venêrandina der û dorê bike û ew bi xwe jî nobedariyê bike; lewre ew şeva wan a ewilî bû di nav axa Romê de ku axa dujmin bû û şîretên bavê wî jî di bîra wî de bûn.

Piştî emir da suxrevaran û parêzvanên xwe ji bo biçin rex Wezîr Dendan, wî hespa xwe ajot û bi tena serê xwe di kêleka newalê re meşiya, hetanî ku çarîkek ji şevê buhurî û ew jî westiya û xewê girt ser çavên wî. Êdî nema dikarîbû hespê xwe jî bibezîne û adeteke wî jî hebû ku li ser piştê hespê di xew re diçû, wê gavê jî wisa bû û li ser piştê hespê di xew re çû. Hespê wî jî meşa xwe berdeyam kir hetanî nivê şevê ku êdî ketibû nava daristaneke tov de. Şerker jî ji her tiştî bêxeber bû hetanî hespê wî simên xwe li erdê dan û ew ji xew şiyar kir. Gava şiyar bû û xwe di nava wê daristanê de dît, şaşwaz û matmayî ma û ji xwe re got: "Lahewle û la quwete illa billâh!" Tirsiya ku ajalîna dirinde lê rast bûn, nema dizanibû bê wê bi ku ve biçê! Hînê di nava wê tirsê de bû, mêrgek li pêşiyê derket ku di bin şewqa tava heyvê de weke perçeyekî buhuştê xwiya dikir, pê re jî stran û dengê xweş, kenekî pêşkar î ku aqilê mirovan ji serê wan dibir bihîst. Şerker ji hespê xwe peya bû û meşiya heta giha qiraxa çemê. Dît ku av tê re diherike û dengê jinekê tê bi zimanê Erebi diaxive û dibêje: "Hûn bi heqê Mesîh kin hûn ê wisa nekin, ew yak ne baş e!" Lê belê her ku wê gotinek digot, şerqînî bi qamçî an jî kemberekê diket û devê wê dida girtin. Şerker jî meşa xwe berdeyam dikir ber bi cihê ku deng jê dihat, heta giha hafa avê ku çî bibîne! Av diherikî, çûkan teqle davêtin, xezalan bazdidan diraqîsîn, ajalên dirinde jî li kêfa xwe dinêrîn û

her yekê jî wan jî bi zimanê xwe şîroveyek dikir. Devereke bi gul û çiçek û gîha raxistî bû û di bin şewqa heyvê de weke rûyekî bûhiştê dikeniya!

Şerker, li wan deran nêrî dît ku dêrek li wir e û ji nava dêrê jî burcek bilind dibe ber bi perên asîmanan ve, çemek jî di bin şewqa heyvê de diherike ber bi wê bihuştê ve, jinek tê de xwiya dike ku deh heb carîye li ber destê wê ne û her deh jî mîna deh heb heyvên li çarde ne, hemû di nava xeml û xêzeke balkêş de ne ku mirovan dîn dikin.

Şerker bi hûrgulî li her deh cariyeyan meyzand, dît ku yek di nav wan de ye, mîna heyva li çardeyan e. Çavin mezin, birhûyin zirav, mijankin dirêj, enîyeke spî weke hêkê, hinarkin gulgulî û gerdeneke ji mermer li ser bû ku dil dihelandin. Bi hemû sîfatên xwe kamil bû çawa ku şair dibêje:

Diçirusîne li ber min bi şewqeke spehî  
Û bejna wê herkesî dixê ber şerm û fedî  
Xwe nîşanî me dide bi rûyekî gulferî  
Hemû cûreyên spehîbûnê hene bi wê re  
Gava ku nûra wê vedide bi rûyê wê re  
Roj dibin şev bi şewqa dêma wê re

Şerker dengê wê bihîst ku ji cariyeyên li dora xwe re dibêje: “Helâ werin ez bi we re bi gulaşê bilîzim, berî ku heyv here ava û sibeh were!” Piştî yeko yeko ber bi wê ve hatin, bi newqa wê girtin û pê re bi gulaşê lîstin, kîjana ku pê re bilîsta, wê ew diavêt erdê û bi kemera wê ew girêdida. Wisa bi wan re berdewam kir, hetanî ku zora gişan bir, carîyeke pîr î ku li kêlekê rûniştî bû, biqehr gazî wê kir û jê re got: “Qehpîka dera han, qey kêfa te tê ku te zora cariyeyan bîriye? Vaye min jî bi vê pîrbûna xwe zora çil cêrî bîriye, îcar çawa tu xwe dicibînî bi carekê tenê? Heger bi rastî jî hêza te hebe, were min bi navê, bi min re gulaşê bike. Heger tu bixwazî, ez ê niha rabim serê te bixim nav nigên te de.” Carîyeya rûheyv, pê re kenîya lê belê di nava xwe de tijî kîn û buxz bûbû ji wê, pê ve rabû û jê re got: “Xanima min a zîrek, tu bi heqê Mesîh ke bêje, bi rastî jî tu dixwazî ku tu gulaşê bi min re bikî, ango tu laqirdiyan dikî?” Wê got: “Bi rastî jî ez dixwazim gulaşê bi te re bikim.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA PÊNCÎ Û HEFTEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Vêca şahê min ê bextewar, gava ku ya pîr got: “Bi rastî jî ez dixwazim gulaşê bi tere bikim.” carîyeya rûheyv jê re got: “Heger ew hêz bi te re hebe rabe em gulaşê bikin!” Gava ku pîrê ew gotinên wê bihîstin, pîr hêrs bû û

mûyên laşê wê rabûn ser xwe mîna yên jobjîyan. Herdu bihevve rabûn, a pîr got: “Bi heqê Mesîh, ez gulaşê bi yeka mîna te qehpik re nakim hetanî ku ez xwe tazî nekim.” Piştîre destê xwe avêt kincên xwe, hemû di ser xwe re anîn û destmaleke hevrêşimî li newqa xwe gerand ku êdî bûbû mîna efrîtekê an jî weke mareke zelût! Dûra xwe bi ser cariyeyê de xwar kir û jê re got: “De êdî were de êdî were!” Ev hemû li ber çavên Şerker diqewimî. Wî jî gav bi gav ew temaşe dikirin û bi wê dîmena pîrê dikeniya û hey dikeniya. Vêca gava ku pîrê wîsa kir, cariyeya rûheyv jî delingên xwe hildan, fotoyeke yemanî hilda dest xwe û pê ve rabû, bi wê bedena efsûnîyî ku çîm wek mermerê, kulîmek wek camê bû û newq xemilandî bû bi gulbûkeke sor di nêvî de û sîngeke ku du hinarên nûhatî pê ve bûn, pîrê xwe bi ser de avêt û herduyan bi hev girtin, hevdû birinûanîn. Wê kêlikê Şerker berê xwe bi asîmanan vekir û dua ji Xwedê kirin ku cariyê zora pîrê bibe. Cariye ket bin pîrê de, destê xwe yê çepê danî ser lêva wê û yê rastê jî xist stûyê wê de û di biniya stûzincîrê re derbas kir, ew rakir ser destên xwe; pîrê hewl da ku xwe xelas bike û ji nav lepên wê filitî, lê belê li ser piştê ket, li erdê dirêj bû. Şerker pê keniya hetanî ku zikopiştî bû. Piştîre rabû ser xwe, şûrê xwe kişand, li çep û rastê xwe meyzand kes nedît ji xeynî pîra kû li ser piştê dirêj kirî bû! Di dilê xwe de ji xwe re got: “Hîlebaz çiqasî derewan dikin!” Dûvre hinekî din xwe nêzikî herduyan kir ji bo ku axaftinên wan bibihîze. Wê gavê cariyeyê destmalek hevrêşimî avêt ser pîrê, kincên wê lê kirin, lêborîna xwe jê xwest û jê re got: “Xanima zîrekan, li gel hemû tiştên ku qewimîn jî min nedixwest ez te bavêjim erdê, lê belê tu ji destên min filitî. Vêca şikir ji Xwedê re ku tu sax û selamet î.” Pîrê bersiva wê neda ji şerman, rabû ser xwe û meşîya çû hetanî ku ji ber çavan wenda bû, cariyeya rûheyv hîna li ser nigan bû û yên dîtirkê rûniştî bûn.

Şerker ji xwe re got: “Ji her rizqekî re sebebek heye û ji hatina min a vir re jî sebebek heye ku xewê zora min bir û hespê min ez anîm heta vê deverê! Kî dizane, belkî ev cariyê û yên pê re jî qîsmetê min bin!” Rabû serxwe li hespê xwe siwar bû, şûrê xwe ji kalanê wî kişand û nigê xwe li zikê hespê da, weke tîrekî ber bi wê ve çû û qîreka da got: “Allahû Ekber!”<sup>13</sup> Gava cariyeyê ew dît pê ve rabû û jê re got: “Here cem xwediyên xwe berî ku li te bibe sibe û fêris werin te ji vir bibin li ser devê rîman, lewre hêza te nîne ku tu jinan ji ser xwe bide alî. Vêca tê çawa farîsan ji ser xwe bide alî?” Şerker şaşwaz bû di nava xwe de û jê re got, piştî ku wê piştî xwe da wî û ber bi dêrê ve çû: “Xatûna min, tu diçî û tu vî bengîyê xerîb î jar î dilgerm li dû xwe dihêlî?” Cariye keniya, lê zîvirî û got: “Daxwaza te çiyê, helâ bêje, ez ê daxwaza te pêk bînim?” Şerker got: “Ka ez ê çawa pêli axa te bikim, çav li ronahiya te

13 . *Ellahû Ekber: Xwedê mezin e.*



bikevim û bi şûn de vegerim bêyî ku ez xwarineke te bixwim, piştî ku ez jî bûme xizmetkarekî te?” Cariyeya rûheyv jê re got: “Ji xeraban pêve, tukes ciwamêriyê û rûmetkariyê red nake, kerem bike were ser seran ser çavan, li hespê xwe siwar bibe û di kêleka çem re were, tu îşev mêvanê min î.” Şerker kêfxweş bû bi vê yekê, careke din li hespê xwe siwar bû û li raserî wê, di qiraxa çem re meşiya li vî aliyê avê.

Herduyan miqabil hev meşa xwe berdewam kirin heta gîhan pirekê ku ji darê gwîzan hatibû çêkirin, bi zîncîrin pola hatibû girêdan û xelexelex pevderbaskirîbûn. Gava Şerker li pirê meyzand, dît ku ew cariyeyên ku qasekî berê pê re bûn, li wê derê ne û li wî dimeyzînin. Dema rûheyv gîha cem wan, bi zimanê Romî, bi yekê ji wan re axivî û jê re got: “Pê ve rabe, bi rişma hespê wî bigire û wî werîne dêrê.” Şerker li pey wê meşiya heta pir derbas kir. Lê belê matmayî mabû li himberî wê dîmena ku li ber çavên wî bû. Di dilê xwe de got: “Xwezîka niha Dendanê wezîr jî li vir bûya, da ku wî jî bi çavên serê xwe ev cariyeyên spehî bidîtana.” Piştî li ya rûheyv zîvirî û jê re got: “Êdî ez bûme xwediyê du pîroziyan, a yekê ev rûmeta guftûgoya ku ez bi te re dikim û ya duduyan jî ya pejirandina min ji vexwendina te re û ev meşa min a ber bi mala te ve, ku êdî ez ketime bin hukmê te de. Vêca gelo tê li min werî rehmê û tê qebûl bikî ku tu jî bi min re werî welatê Musulmanan da ku tu wan şêr û pilingan bibînî û nas bikî bê ez kî me?” Çawa ku cariyeya rûheyv ev gotina wî bihîst, qeherî û hêrs bû, jê re got: “Bi heqê Mesîh min digot qey tu bîaqilî, lê niha ez lê hay bûm bê çi gemar di dilê te de heye. Çawa tu dikarî gotineke wisa bibêjî ku bêhna bêbextiyê jê difûre? Ez ê çawa bi te re werim û ez dizanim ku kengî ez bigihême cem qralê we Omer en-Nûman, ez ji wî xelas nabim ji ber ku kesek mîna min, di qesr û qonaxên wî de nîne lew ku ew xwediyê Bexdad û Xorasan be û diwazde qesrên wî hebin ku bi qasî rojên salê jî sêsed û şêst û şeş carîye tê de hebin û jimara qesrên wî jî bi qasî jimara mehên salê bin. Loma çawa ku ez bigihême cem wî, ew dev ji min bernade ji ber ku di bîr û bawerîya we de mafê wî heye ku kêfê bi yên mîna min re bike, çawa ku di pirtûka we ya pîroz de dibêje ‘çar jin û çiqasên ku bi destên we ve bân’ de îcar çawa tu van gotinan ji min re dibêjî? Ev gotina te ya ku tu dibêjî ‘tê şêr û pilingên Musulmanan bibînî’ jî ne rast e! Lewre di van herdu rojên ku derbasî axa me bûne de, min leşkerên we dîtî û min tu terbiyeya mezin û maqûlan li dora we nedît, berevajî wê min kom û komikên ezbetan dîtî ku li hev kom bûne, ew gotina te ya ku tu dibêjî ‘tê min nas bikî bê ez kîme’ jî ne di cihê xwe de ye, ji ber ku ev qencîya ku ez bi te dikim, ne ji ber nav û dengê te ye, ji bo rûmetê ye. Kesê mîna te, diviyabû gotinên wisa nebêjin lew ku tu Şerker kurê Omer en-Nûman bi xwe bûya jî.”

Şerker di dilê xwe de got: “Dibe ku wê agahî girtibin di derbarê hatina

me de û fêr bûbe ku bavê min ez li gel deh hezar leşker di hewara Qeysê Qostantîniye de şandime.” Piştî Şerker jê re got: “Xatûna min, tu bi qedrê bîr û baweriya ola xwe kî, rastiya meseleyê ji min re vebêje bê sebeb çiyê, da ku ez rast û derewan ji hev derxînim.” Wê got: “Bi heqê ola min, heger ez netirsîyama ku dê navê min derkeve weke keçeke Romî, min ê xwe bavêta agir û bi her deh hezar farisên we re şer bikira. Min ê di serî de Dendanê wezîr bikuştî û farisê wê Şerker bi dest bixista ku dê tu şerm jî tunebûya ji bo min. Lê belê min pirtûk xwendine û ji gotinên Ereban ez fêrî wêje û edebê bûme. Ez pesnê xwe bi wêrekîyê jî nadim, li gel ku te dît bê çiqase hunerên kerr û ferrê bi min re hene. Hêviya min ji Îsa Mesîh heyê ku Şerker bîne ber destên min, da ku di vê dêrê de ez raber wî derkevim di dirûvê siwarekî de û ez wî hêsir bigirim; kelemçeyan li dest û nigên wî bixim!”

Gava ku wê keça Fileh ev gotin ji Şerker re gotin, xwîna wî keliya, pozê wî şewitî û hêrsa mêraniya wî gur bû, xwest ku xwe jê re eşkere bike û wê perçe perçe bike, lê belê spehîbûna wê ya zêde ber wî girt, wî jî di ber xwe de ev rista han xwend û got:

Gava ku spehîyek gunehêkî dike  
Xweşîkbûna wê hezar carî tê diborîne

Keçik ber bi jor ve hilkişîya, Şerker jî li dû wê bû û ji paş ve lê dinêrî bê çawa kulîmekên wê li hev dikevin mîna pêlên ava behrê. Rabû dîsa di ber xwe de ev çend ristên helbestê gotin:

Di dêma wê de de şefîek heyê lêborînkare  
Hemû gunehên wê ji dil dibe bi qeder e  
Gava mirov rûyê wê temaşe dike  
Xwedêyo ew mîna heyva li çarde ye!  
Efrîtê Belqîs be jî pê re di cengê de  
Bêmehal dê bi bin bikeve di saetekê de

Meşa xwe wisa berdewam kirin heta ku gîhan ber derîyekî bi derence ku kevirên wê ji mermer bûn. Keçikê derî vekir û bi Şerker re derbasî hundurê dehlîzekê bû ku li ser deh nigan bû û ji deh çavîyên pevgerêdayî pêk dihat. Di her çavîyekê de jî fenereke ji camê pêketî bû ku mîna rokê şewq dida. Di dawîya dehlîzê de, wan cariyeyên din ew pêşîwazî kirin. Mûm di destên wan de bûn û serên wan girêdayî bûn bi zêr û heqîqe û cewherên cûr be cûr. Cariyeyên wê li pêşîyê, ew di nêvî de û Şerker jî li pey wê dimeşîya, wisa berdewam kirin heta ku gîhan dêrê. Di hundurê dêrê de, nivînin li raser hev raxistî dîtin ku bi perdeyên zêrîn dorpêçkirî bûn, nava dêrê jî bi kevir û mermerên spehî raxistîbû û di nivê wê de jî birkeke avê hebû ku bîst û çar çavîyên zêr tê de bûn û avê di wan re dida der mîna volkanan, di zikê hêwanê de jî nivîneke melekî raxistî bû ku ji hevrêşim bû.

Keçikê ji Şerker re got: “Biçe ser vê nivînê mîrzayê min!” Şerker hilkişiya ser nivînê, keçik jî çû ji ber çavan wenda bû. Rabû ji hinek suxreवान li wê pîrsî, jê re gotin: “Ew çûye ketiye koza xwe de ji bo ku razê û em jî li vir in ji bo xizmeta te. Piştî gelek cûreyên xwarinê jê re anîn, wî jî xwar heta ku têr bû. Li pey wê jî teşt û misîneki ji zêr anîn, wî jî dest û rûyê xwe şuşt. Leşkerên wî hatin bîrê, mitala wan kir, lewre nizanîbû bê rewşa wan çîye, pê re jî şîreta bavê wî hate bîra wî, poşman bû li ser wê hatina xwe û heyyirî ma, nema dizanîbû wê çi bike, çawa bike? Hetanî ku şeveqê lê da û ro derket jî, ew di nava wan fikaran de û di dilê xwe de ev helbest dixwendin:

Hîn jî bi biryar im ez lê belê çare çî ye?  
 Hebûya heger yekî ku pêşiya dil bigire  
 Min ê bikarîba dev ji her tiştî berda  
 An jî bigota dilê te di nav şaşitîyê de ye  
 Min ê hêvî ji Yezdan bikira ku hêzê bide

Gava ew helbesta xwe qedand, bala xwe dayê ku dengê qelebalixeke mezin tê. Serê xwe rakir lê meyzand, dît ku bêhtirî bîst cariyeyên weke heyvan li dora wê cariyeya rûheyv in, mîna peykên li dora tavê. Ew jî dibaceke milûkî bi ser bejna wê de ye, kemerek li newqa wê ye ku bi cewher û anqûdan neqîşandîye, newqê lê ziravtir kiriye û hiştîye ku kulîmekên wê hîn bêhtir xwiya bikin, mîna kulîmekên camînî di bin rûpoşeke zîvînî de, li gel wan herdu hinarên bi sînga wê ve!

Gava çavên Şerker pê ketin, hişê wî jî serî çû, wezîr û leşkerên xwe jî jibîr kirin. Bi hûrgulî li serê wê nêrî, dît ku taceke ji lûlû û mircan li ser serê wê ye ku bi cewherên cûr be cûr hatiye neqîşandin, cariyeyên din jî li çep û rastên wê bûn, bi kêlekên dibacê wê girtibûn û wê jî bi narînî xwe dihejand. Wê kêlikê Şerker ji cihê xwe xwe çeng kir, rabû ser herdu nigan li himberî heybeta cemala wê û qîrek da, got: “Wey lawo!” Û ev beyt jî li pey wê gotin!

Bi telkî diçe girankemax e ew  
 Stûmermer û sîng hilû ye ew  
 Veşarî ne hemû ajo di nava wê de  
 Lê nikarim ez veşêrim ên xwe

Keçikê awirên xwe li ser Şerker kom kirin û dirêj dirêj bi hûrgulî lê meyzand, ji serî heta nigan ew raçav kir hetanî ku dilê wê kete cî de û ew baş nas kir. Piştî jê re got: “Bi hatina te re hundur ronak bûye Şerker! Şeva te çawa derbas bû gelo, piştî ku me dev ji te berda û em çûn?” Piştî axaftina xwe berdewam kir û got: “Derew şerm in ji qralan re û wan biçûk jî dixin û bi taybetî jî ji bo qralên mezin ku tu jî Şerker kurê Omer en-Nûman î, îcar xwe û eslê xwe înkâr neke û xwe ji min veneşêre, ji niha û şûn ve jî, ji rastiye pê ve tişteki ji min re nebêje, lewre derew tenê buxê û dujminatîyê li dû xwe

dihêlin. Dadê di derbarê te de biryara xwe da, de êdî tu jî pê qayil bibe û xwe radestî dadê bike!” Gava ku Şerker ew gotinên wê bihistin, ji mukurhatinê û eşkerekirina rastiye pê ve tu rê neditin li pêşiya xwe, ji wê re got: “Belê ez Şerker im kurê Omer en-Nûman, ê ku felekê eş xist dilê min de û ez xistim vê dera hanê. De êdî tu çî dixwazî, wê bi min bike!”

Keçikê serê xwe bera erdê da û demeke dirêj ponijî, piştê lê vegeriya û jê re got: “Aram be û bila dilê te jî di cî de be, lewre tu mêvanê min î û êdî nan û xwê di nav me de heye; em dostên hev in. Tu niha di mala min de yî û ez ji te berpirsiyar im. Bi heqê Îsa Mesîh heger dinya giş li te bê hev ji bo tehdeyekê bidine te, ez nahêlim destê kesî bigihêje te lew ku ruhê min jî têde here. Jixwe ku nêta min û xerabiyekê hebûya, min ê niha li vir tu bikuştâ.” Piştê çû ber sifrê û ji her cureyeke xwarinê gepek xwar, Şerker jî li pey wê dest bi xwarinê kir, kêfa wê hat û wê jî pêre xwar heta ku herduyan têr xwar. Di pey wê re destên xwe şuştin. Keçikê ferman da cariyekê ku here, rîhan û qedeh û zerik û tasên ji zîv û zêr û camê bîne, li gel şerabên cûr be cûr, wê jî çû ew tevde anîn, danîn ber wan. Keçika rûheyv, destpêkê qedehêk vexwar, piştê da wî çawa ku di xwarinê de jî kir. Wî jî vexwar. Keçikê jê re got: “Musulmano! De binêre bê tu çawa di nava xweşî û bextewariyê de yî!” Bi wî hawî, pêre vexwar hetanî ku Şerker ji ser hişê xwe çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA PÊNCÎ Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Şahê min ê gewre û bextewar, keçikê hem vexwar û hem jî dayê hetanî ku Şerker ji ser hişê xwe çû ji ber xweşikbûna wê û şerabê. Wê gavê keçikê ji cariyekê re got: “Mercana! Kanî amûrên mûzîkê ji me re bîne.” Cariyeyê got: “Ser seran, ser çavan.” Dûvre rabû ser xwe çû, piştî qasekê ûdeke celqî, çengeke Ecemî, neyêke Teterî û qanûneke Misrî bi xwe re anî û hat. Keçikê rahişt ûdê, ew akord kir û dest pê kir stra, bi dengê nerm û tenik mîna sira bayê sibê xweş û mîna ava selsebilê şêrîn:

Xwedê çavên te efû ke ji wê xwîna te rijandî  
Çendîn kêlî û salîsan tu rizgar kir ji tîran  
Divê tenik be mirovên heram di bêrîkan  
Xweşî be ji wan çavên te yên di xew dan  
Sed car helal be ji dilê teyî evîndar re  
Ku te ez kuştim û tu bûyî xwedan ji dil re  
Tu bûyî xwedan ji ruh re xwedan ji dil û can re

Li pey vê cariyêke din rabû ser xwe û amûra wê ya mûzîkê pê re, bi

zimanê Romî stranek li ser rûheyvê got ku Şerker pê mest bû. Piştî ewê bi xwe carek din straya ji Şerker re got: “Musulmano, gelo tu têgihîşt bê min çî got?” Wî jî lê vegerand û got: “Na wile min fêhm nekîr, lê belê bi van tiliyên te ez mest bûm.” Keçîk kenîya û got: “Lê ku ez bi Erebi jî te re bistirêmtê çî bikî?” Wî got: “Ezê hişê xwe wenda bikim.” Rabû keçîkê dîsa rahişt ûda xwe, neweyake nû lêda û ew ristên han gotin bi stranî:

Çêja veqetanê tehl e ka ew sebir?  
 Sisê derketin raberî min kîjan li ser?  
 Himberî an gîhaştin an jî hicran e ew  
 Çawa ez bi hiştim vê evîne bi şêranî?  
 Û hicran jî ewqasî tehl e bi giranî!

Gava wê helbesta xwe qedand, bala xwe dayê ku Şerker jî ser xwe çûye û di nav wan de wisa dirêjkirî ma bêhtirî seetekê. Piştî dîsa bi ser xwe ve hat û stran anî bîra xwe û careke din mest bû. Dûvre ew û Şerker dîsa li şerabê vegeyriyan, bi ser xwe dakirin û kêf û laqirdiyên xwe bi hev re berdewam kirin, hetanî ku ro çû ava û şevê baskên xwe avêt ser dinyê. Wê çaxê, keçîk rabû çû ser cihê xwe jî bo ku rakeve. Qasekî din bi şûn de Şerker lê pirsî, jê re gotin: “Ew çûye ketiye koza xwe de.” Wî jî got: “Bila di sitara Xwedê de be!”

Sibehê cariyek hat lê vegeyriya û jê re got: “Begê min xatûna min te dixwaze.” Şerker rabû ser xwe û da dû wê, pê re çû. Bi rê de, cariyeyan bi def û stranan li gel wî meşîyan heta ku gîhan ber deriyekî mezin î ku bi dur û cewheran hatibû xemilandin. Gava ku di wî derî re derbas bûn, dît ku maleke pir mezin e. Eywaneke mezin di sînga malê de hebû ku bi hemû cûreyên hevşîm raxistî bû. Li hawîrdora eywanê jî şîbakeyên vekirî hebûn ku bi ser şîndar û avên herikî de vedibûn. Di malê de wêneyin bi qelafet hebûn ku ba diket nava wan de û di hundurên wan de amûrin dilivandin, mirov digot belkî diaxivin. Keçîka keybanû jî li wê derê rûniştî bû. Çawa ku ew dît, pê ve rabû û bi destê wî girt, ew anî li kêleka xwe da rûniştandin û li xewa wî ya şeva borî pirsî. Wî jî spasîyên xwe jê re diyar kirin û dest bi sohbetê kirin. Keçîkê jê re got: “Gelo tu tiştina di derbarê evîndar û aşîqan de dizanî? Got: “Belê, ez hinek helbestan dizanim.” Wê got: “Ka hinekan jî wan jî min re bibêje!” Şerker jî ev helbest got:

Evîna Ezza eşkere nakim îro ez  
 Min hem peyman daye wî hem jî soz  
 Keşîşên olê ne kesên bê soz û ehd in  
 Lewre rûniştî digirîn ew jî tîrsa qels in  
 Eger wan jî bibihîsta wekem dengê wê  
 Dê çog bidana erdê û biketna xiroşê

Gava keçikê ev beytên wî bihîstin, jê re got: Xwiyaye ku evê ev beyt gotine pir zana bûye, di ziman û belaxetê de ku dikarîbû bi vî şiklî pesnê Ezza bide, çawa ku di van beytan de jî dibêje:

Heger Ezza rojê jî bide dadwerkirin li gel xwe  
Misogêr dê qezenc ke ew bi husna ji ba xwe  
Bihîst min ku jin şermende ne ji ber wê  
Xwedan dêmên wan kirine pêlav ji bo wê

Piştê keçikê axaftina xwe berdewam kir û got: “Tête gotin ku Ezza pir xweşik û spehî bûye.” Navberê da gotina xwe û piştê dîsa berdewam kir û got: “Ey kurê qral, heger tu helbestên wisa xweş bizanibî, bêje!” Şerker got: “Ji her cûreyekî ez yekê dizanim.” Dûv re ev beytên hanê gotin:

Tu kuştina min dixwazî bêgûman ne tiştêkî din  
Ez jî tutiştî naxwazim bêgûman ji te pêve

Gava wê ev beyt ji devê wî bihîstin, got: “Her bijî kurê qral, gelo tu dizanî bê Bûseyna çî ji Cemîl dixwest gava ku jê re digot: “Tu kuştina min dixwazî bêgûman ne tiştêkî din?” Şerker jê re got: “Xatûna min ew jî tiştê ku tu ji min dixwazî dixwaze lê belê tu bi vê yekê qayil nabî.” Ew jî bi vê gotina wî kenîya û dîsa vexwarina şeraba xwe bi hev re berdewam kirin hetanî ku şev kete erdê û dinya tarî bû; keçik rabû çû ser cihê xwe raket, Şerker jî li ser ê xwe raket heta ku dîsa bû sibe. Gava ji xewa xwe rabû, cariyeyan bi def û stranên dîsa pê ve hatin û jêre gotin xatûna me gazî te dike mîrzayê me, de ka fermo kerem ke em herin balê. Şerker rabû û li gel wan meşîya, ewan jî bi deflêdan û stranên pê re çûn hetanî ku ew birin maleke hîn mezintir ji ya berê ku tijî peyker û sûretên teyr û ajalên dirinde û tiştin din î ku nayên we-sifdan. Şerker ma şaş li hemberî wê dîmenê û dest pê kir, ev çend beyt gotin:

Rikeberên xwe diçinim ji berên zincîrên xwe  
Mezintirîn stêrka sibê li mizgeftê raxistiye ew  
Avazê jî diherike ji çavkaniyên zîvînî ew  
Dêmên gulî sîma rûyên zeberced e ew  
Mîna ku morereng şîna çavan bi kil ve gotibe

Gava keçik çav li Şerker ket pê ve rabû, bi destê wî girt û ew li cem xwe da rûniştandin. Jê re got: “Tu kurê Qral Omer en-Nûman î, gelo tu bi kişikê zanî?” Got:

Belê, lê tu jî nebe mîna ewa ku helbestkar di derbarê wê de gotiye:

Henasên min bidijwarî min disojin  
Nehla min jî ji mêrgevînê awdidî min  
M’kişik anî danî ber wê ku bilizîne  
Weku şah be li filî bi mizgîne

Ça dinêrim li dêma wê ez kêlikê  
Dide erdê, min dikuje bi awirên xwe

Piştire keçikê kişik da ber wî û pê re lîst, Şerker jî her ku li rûyê wê dinêrî û destê xwe davêt kevirên xwe, hesp datanî şûna fil, fil jî datanî şûna hespê. Keçik kenîya û got: “Heger lîska te ev be nexwe tu tişteki nizanî.” Wî got: “Ev destê ewil e, tu wî nehesebîne.” Gava ku wê destê ewil zora wî bir, kevirên xwe ji nû ve rêz kirin û lîska xwe berdeyam kirin, lê belê wê cara dudan jî zora wî bir; cara sisyan, a çaran û ya pêncan jî. Piştire keçikê lê zîvirî û got: “Di her tiştî de tu binkeftî yî.” Wî jî got: “Xatûna min, bi yeke mîna te re tiştê herî xweş ew e ku ez binkeftî bim.” Dûv re keçikê ferman da ku xwarinê bînin. Xwarin hat, têra xwe xwarin, destên xwe şuştin, piştire şarab xwestin. Ew jî hat, têra xwe vexwawrin, piştire keçikê rahişt qanûnê ku pir xweş li wê amûrê dida û dest pê kir ev çend bêyt bi stranî gotin:

Felek tu geh deşt î bo wî geh jî çiya  
Dem jî geh digindirî geh dişemitî  
Êdî vexwe bo wî heger tu bikaribî  
Ji min veneqetî bi rûyekî şuştî

Bi wî hawî bi hev re man, heta ku şev hat. Ew roj ji roja berî wê çêtir bû. Gava ku şev hat, keçik çû ser cihê xwe û Şerker jî rabû çû ser ê xwe, raket hetanî sibê, sibehê carîye pê ve hatin bi çeng û def û awaz û mîna her car ew bi xwe re birin cem keçikê. Gava çavên wê li wî ketin, rabû ser xwe, bi destê wî girt, ew li rex xwe da rûniştandin û xewa wî jê pirsî. Wî jî spasiya xwe jê re anî ziman û hêviya temenekî dirêj jê re kir. Piştire keçikê rahişt ûdê û ev çend beyt gotin:

Min mespêre hîcranê tew  
Tişteki çêjetehle ew  
Her ku roj diçe ber awa  
Zor dibe ji êşa fûraqê ew

Hîna ew di nava wê sohbeta xweş de bûn, dengê xirecîrekê hate wan, li xwe zîvirîn ber bi derî ve, dîtî ku birrek xort û zîlam bi ser wan de tîn ku pîrraniya wan şovalye bûn, şûrên wan di destê wan de bûn û qîr dikirin bi zimanê Romî û digotin: “Me tu zeft kirî vê carê Şerker! Xelasa te ji nav lepên me tuneye vê carê!” Gava Şerker ev gotin bihîstin, di dilê xwe de got: “Belkî vê carîyeya spehî ez xapandibim, dek û dolab li serê min gerandîbin û ez ragirtibim li vê derê hetanî ku ev şovalyeyên wê yên ku ez bi wan ditirsandim, gîhan ser me! Lê belê çibe jî, min bi serê xwe kir û min ew jî bi xwe re avêt xeterê!” Li keçikê zîvirî ji bo ku gazina jê bike, dît ku rûyê wê zer bûye û mehdê wê hatiye guhertin. Tam di wê kêliyê de keçikê rabû ser nîgan û ji wan re got: “Hûn kîne? Serkêşê şovalyeyan got: “Şahbanûya bi rûmet û durra sêwî, qey tu nizanî bê ew ê li ba te rûniştî kî ye?” Wê got:

“Ez nizanîm kîye.” Wî berdewam kir û got: “Ev e fêrisê fêrisan, xerabkarê welatan! Ev e Şerker kurê Omer en-Nûman ê ku kelehan vedike û çî cihêkî asê hebe dixê destê xwe de. Xebera wî ji bavê te Herdûbê Qral re çûye û wî ew agah ji ba pîra şareza piştrast kiriye ku ev agaheke rast e û vaye te ji bi girtina vî reşikê bêmirês, serkeftinek mezin daye dest leşkerên Romê!” Gava keçikê ev gotinên serşovalye bihîstin, lê meyzand û jê re got: “Navê te çî ye?” Wî got: “Navê min Masûra kurê Evdik Mewsûra kurê Kaşerd ê şovalyeyê şovalyeyan.” Wê got: “Û tu çawa derbasî vir bûye bêyî destûra min?” Wî got: “Şahbanûya min, gava ku ez gîham ber derî, kesî ber min negirt ji dergevan û suxrevanên te. Bervajî wê, hemû dergevan ji rabûn ser xwe û dan pêşiya me. Halbûkî adeta me ew bû ku gava yek dihat, ew li ber derî didane rawestandî hetanî destûra derbasbûna wî dihat. Lê belê niha ne dema dirêjkirina axaftinê ye, ji ber ku Qral li hêviya vegera me ye ji bo em vî qralê Musulmanan jê re bibin, da ku wî bikuje û leşkerên wî ji bi şûn de bişîne devera ku jê hatine, bêyî ku em şerekî giran bikin, an jî bi wan re bibetilin. Lewre ev bi xwe ye ew ê ku pizotê leşkerên Îslamê ye.”

Gava ku keçik ev gotinên wî bihîstin, jê re got: “Ev tişt nayê qebûlkirin, Pîra Şareza derewan dike û rastiya mijarê nizane. Bi heqê Îsa Mesîhê bi tenê, ev ê ku li ba min ne Şerker e û min jî ew negirtiye. Lê belê zilamek bû xwe li me girt, me jî ew bi mêvanî li cem xwe qebûl kir. Heger em baş nas bikin ku ew Şerker bixwe ye jî û gûman bi me re nemînin jî, ne layiqî rûmeta min e ez wî bidim destê we, piştî ku bûye mêvanê min. Vêca nehêlin ez bêbextiyê bi mêvanê xwe re bikim û min nehetikînin di nav xelkê de. De êdî tu bixwe vegere cem bavê min î qral û jê re bêje rewş ne wek ku Pîra Şareza rave kiriye; rewş cûda ye.” Masûreyê Serşovalye got: “Îbrîza, ez nikarim li Qral vegirim bêyî ku ez rikeberê wî jî bi xwe re bibim.” Keçikê çawa ku ev gotin bihîst, jê re got: “Ev mijar bi vî şiklî nabe, tişteki bêwijdanî ye ku hûn sed şovalye li zilamekî tenê werin hev. Heger hûn pir dixwazin, yeko yeko pê re dakevin meydana şer, da ku qral jî fêr bibe bê kîjan ji we leheng e!”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî.*

## ŞEVA PÊNCÎ Û NEHEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Şahê min ê bextewar, vêca gava Îbrîzaya Şahbanû ji şovalye re wisa got, wî jî got: “Bi heqê Îsa Mesîh tu rastiye dibêjî, lê belê dê kes ji min pêve, pêre nekeve cîdalê.” Îbrîza jî got: “Xwe hebekî ragire heta ku ez herim cem; mijarê pê bidim fêmkirin û fikra wî jî bigirim. Heger ew jî bêje erê pîrsgirêk nîne, heger na nabe, ji xwe ez û cariyeyên li vir û her kesên di dêrê de em ê xwe di ber wî de bikin cangorî û em nahêlin hûn xwe bigihînin wî.”



Îbrîza çû cem Şerker û bûyer jê re ragihand, Şerker beşîşî û tê derxist ku wê rastiya wî ji wan re negotiye, lê belê xebera hatina wî belav bûye di nav xelkê de heta ku gîhaye ber guhên wan jî, ji ber wê, dîsa lome li nefsa xwe kirin û ji xwe re got: “Çawa min xwe avêt nav axa Romê!” Piştî ji keçîkê re got: “Şerkirina yeko yeko bi wan re neheqî ye ji bo wan, gelo çênabe ku ew deh deh ji min re dakevin meydanê?” Piştî xwe çeng kir, rabû ser nigan û berê xwe da wan, şûr û mertalê wî jî pêre bû. Gava ku serşovalye ew dît êrîş kir ser wî, Şerker jî mîna şêrekî li himber wî derket û şûrek li nav milê wî da, di nav roviyên wî re da der û biriqand. Gava ku çavên Îbrîza li wê dîmenê ket, qedrê Şerker hîna bilindtir bû li balê û tê derxist ku wê ne bi hêza xwe zora wî biribû, lê belê bi spehîbûna xwe zora wî biribû. Piştî derket raserî şovalyeyan û ji wan re got: “Heyfa mezinê xwe hilînin!” Birê yê kuştî xwe berra meydanê da ku ew jî ciwamêrkî mêrxas û bihêz bû. Êrîş kir ser Şerker, lêbelê wî derfet nedayê û di cî de şûrek li nav milê wî da kû di zikê wî re da der û biriqand. Wê gavê keçîkê dîsa gazî şovalyeyan kir û ji wan re got: “Xirîstiyano! Heyfa xwediyê xwe hilînin!” Ew jî yeko yeko jê re daketin meydanê û Şerker jî bi şûrê xwe ew dihêran weke aşekî, hetanî ku pêncî heb ji wan kuşt û keçîkê jî li wan temaşe dikir. Yên mayîn jî tirs kete dilê wan de û zû daneketin meydana şer. Herî dawî her pêncî yên mayîn hemûçikan bi hev re êrîşî ser Şerker kirin. Ew jî bi dilekî kevirî derket raberî wan û ew tevde perçiqandin, aqil û hişê wan ji serê wan bir û ew bê ruh hiştin. Îbrîza li cariyeyên xwe kir gazî û got: “Kî di dêrê de ma?” Wan jî got: “Ji dergevanan pê ve tu kes nema.” Îbrîza Şahbanû bi çoš Şerker pêşwazî û himbêz kir. Şerker jî pêre derket qesrê, piştî ewqase şer û ceng ku tukes ji wan nehiştibû ji xeynî çend hebên ku xwe di goşeyên dêrê de veşartibûn. Gava ku Îbrîza çav li ew en filitî ket, bi şûn de vegeriya, cewşen û gilinsûyek li xwe kir, şûrek xist destê xwe û dîsa li Şerker vegeriya û got: “Bi heqê Îsa Mesîh ez çikûziyê di ber mêvanê xwe de nakim, ez devjê bernadim û ji bo ku kes henekê xwe bi min neke jî ez li welatê Romê namînim.” Piştî şovalye hemû raçav kirin, dît ku heyştê ji wan hatine kuştin û bîst heb jî reviyane. Gava wê dît bê wî çî bi serê xelkê kiriye, li Şerker zivirî û jê re got: “Fêrisên mîna te pesnê xwe didin!” Şerker destê xwe avêt şûrê xwe, xwîna li ser paqij kir û ev çend beyt gotin:

Çendîn xelebe hatin ew bi ser min da  
 Min meytên wan da ber şêran di şer da  
 Li min bipirsîn ger hûn dixwazîn şerê min  
 Ji xelkê gişan fêr bibin hêz û bazên min  
 Min şêr û lehengên wan kuştin di şer da  
 Cendekên wan jî avêtin kolan û berda

Gava helbesta xwe qedand, Îbrîzaya Şahbanû hat destê wî maçî kir bi rûyekî devliken û cewşenê li ser xwe jî derxist. Şerker got: “Xatûna min, te

çima ev cewşen li xwe kiriye û ev şûr hildaye destê xwe, jixwe tişteke tuneye wî?” Wê got: “Ji ber tirsê li ser te ku ev bêmirweta tişteki bi te bikin.” Piştre, xatûnê gazî dergevanan kir û ji wan re got: “Çawa we destûr da zîlamên qral ku derbasî cem min bibin bêyî izna min?” Wan jî gotin: “Şahbanûya hêja, ne ji adetê bû ku em iznê ji te bigrin di derbarê derbasbûna qasidên qral de û bi taybetî jî serşovalyeyê mezin!” Wê jî ji suxrewanên xwe yên din re got: “Evanan, cezayekî mezintir ji heq dikin.”

Dûvre li Şerker veşerîya û jê re got: “Niha, tiştê veşartî ji te re jî eşkere bû, êdî ez jî çîroka xwe ji te re bêjim. Divê tu bizanibî ku ez Îbrîza me, keça Herdûbê qralê Romê. Ew pîrejina ku jê re dibêjin Pîra Şareza jî dapîra min e; yanî diya bavê min e û ewê bavê min agahdar kiriye bi hatina te. Bêgûman niha ew fen û fûtin din amade dike ji bo kuştina min û bi taybetî jî piştî were bihistin ku ez derbasî hêla Musulmanan bûme û min şovalyeyên bavê xwe dane kuştin. A baş ew e ku ez vir terk bikim madem ku Pîra Şareza li pey min e. Lê belê ez dixwazim ku tu jî qenciyeke bi min bikî çawa ku min jî bi te kir. Dûjminatî kete navbera min û bavê min, êdî guh mede gotinên min û bizanibî ku ev giş ji bo te bû, ne ji bo tutiştê din!” Gava ku Şerker ev gotin bihistin, baskên wî çêbûn ji kêfa re û bêhna wî pir fireh bû. Ji keçîkê re got: “Bi navê xwe tukes nikare xwe bigihîne te, heta ku ruh di laşê min de hebe. Lê belê gelo deyx bi te re heye ku tu bikaribî ji bavê xwe dûr bikevî? Wê got: “Belê.”

Herduyan jî hev re sûnd xwarin soz û peyman bi hev re dan. Wê gavê Îbrîza got: “Niha dilê min rehet bû, lê şertekî min ê din jî ji bo te heye.” Wî got: “Ew çi ye?” Wê got: “Şertê min ew e ku tu li gel leşkerên xwe, vegere welatê xwe.” Şerker got: “Xatûna min, bavê min Omer en-Nûman ez şandime ji bo ez bi bavê te re şer bikim ji ber wî malê ku biriye û bi taybetî ew her sê morîkên ku pîrozî di wan de heye.” Îbrîza got:

Bila dilê te rehet be û nava te aram be, va ez ê ji te re behsa wan bikim û sedema dujminatîya me bi qralê Qostantîniyê re çi ye jî, ez ê ji te re rave bikim. Li vir li cem me cejneke salane heye, em jê re dibêjin Cejna Dêrê ku qralên hemû deveran, mezinên wan, keç û kurên wan û taciran tê de li hev kom dibin û heft rojan bi hev re derbas dikin ku ez bi xwe jî yek ji wan im. Vêca gava ku dûjminatî di neqeba me de çêbû, bavê min çûna wê cejnê li min qedexa kir, heta heft salan.

Salekê ji wan salan û di wê cejnê de keçên mezinan ji her hêlê de, li hev kom bûbûn di dêrê de, mîna her car. Di nav ew ên ku hatibûn de keça qralê Qostantîniyê jî hebû ku navê wê Safîye bû. Şeş rojan man û di roja heftan de herkes bi rêya xwe de çû. Safîye jî got: “Ê min ez venagerim Qostantîniye

ku ne di rêya deryayê re be.” Rabû jê re keştiyek amade kirin. Ew jî li gel suxrevan û cariyeyên xwe lê siwar bû, bavanê xwe berdane û bi rê ketin. Bi rê de bayekî ecêb li wan rabû û keştî jî rêya wê derxist. Vêca bi hukmê Xwedê, wê gavê keştiyek Filehên Girava Kafûr li wê deverê bûye ku pêncsed heb Frengên çekdar tê de bûne û ew demeke wan bû ku di nava behrê de bûne. Îcar gava ku çavên wan li bavana gemiya Safiye ketiye, di cî de girtine ser wan, di seetekê de xwe gîhandine wan, çengel avêtine keştîya wan, bavanê wê daxistine û li pey xwe kişandine ber bi girava xwe ve. Hîna ku zêde ji wir dûr neketine, careke din ba li wan qulupiye û ew ber bi me ve anîne, piştî ku bavanê keştîya wan tiştîşî kiriye. Gava ku nêzikî me bûn û me ew dîtîn, em bi wan ve derketin, me dît ku xêreke û hatiye ber deriyê me! Me jî ew kuştin û çî tiştê ku bi wan re hebû jî mal û dirav û antikeyan me dest danî ser wan. Di keştîyê de çil heb cariyê jî hebûn ku Safiye jî yek ji wan bû. Me jî cariyê birin radestî bavê min kirin bêyî em bizanibin ku Safiye ya keça qralê Qostantîniye Efridon jî di nav wan de ye. Bavê min jî deh heb ji wan jî xwe re hilbijartin ku Safiye jî di nav de bû û yê mayîn jî li derdora xwe belav kirin. Ji wan deh cariyeyên li cem xwe jî, pênc heb ji wan veqetandin ku Safiye jî di nav de bû û ew mîna dîyarî jî bavê te Omer en-Nûman re şandin, li gel hinek cawê hirî û hevrêşimê Romî û qûmaşin dîtirkê. Bavê te jî yadîgarî qebûl kirin û ji nav wan cariyeyan Safiye jî xwe re hilbijart ku keça Qral Efridon bû.

Serê vê sala han, bavê wê nameyek jî bavê min re şand ku tiştin tê de anîbûn ziman, mirov nikare wan bêje. Di wê nameyê de hem bavê min tehdît dikir hem jî erza wî dişkand û digot: “Beriya du salan we keştiyê min biriye ku di destê birreke dizên Frengan de bû û di wê keştîyê de şêst heb cariyê hebûye ku keça min Safiye jî di nav wan de bû. We jî kesek ji min re neşand ku min agahdar bike bi wê yekê û ez jî newêrim behsa xebera wê bikim ji tîrsa ku keça min bihetike di nav qralan de û min mijar veşartî hişt hetanî îsal. Pêhesana min jî bi şiklekî weha çêbû: Min ji wan dizan re nîvîsand û min keça xwe ji wan pîrsî û min ji wan xwest ku lê bigerin û ji min re bêjin bê ka wan ew firotiye kîjan qralê Cezayirê. Wan jî sûnd xwarin bi Xwedê ku ew dernexistine derveyî sînorê welatê min.”

Vêca di heman nameyê de jî, ji bavê min re gotibû: “Heger tu naxwazî dujminatîya min bikî û ne jî min û keça min bihetikînî, nuh ev nameya min gihîşt ber destê te, keça min a li cem we, di cî de ji min re bişîne. Heger hûn guh nedin vê nameya min û ji rê derkevin, bêgûman ez ê cezayekî giran bidim we li ser vê xerabkariya we.” Îcar gava ew name gîha ber destê bavê min û wî ew xwend û têgihîşt bê çî çawa bûye, tengav bû, pê êşîya û poşman bû, lewre wî nizanîbû ku Safiye keça qral jî di nav wan cariyeyan debûye. Îcar heyyirî ma û nizanîbû wê çawa bike. Piştî wê dema dirêj, nikarîbû ji nû

ve bişîne ji bavê te Omer en-Nûman re jî ku wêya ji wî bixwaze. Bi taybetî jî piştî fêr bû ku zarok ji wî re çêbûne ji Safiye keça Efrîdon. Gava em van tamam fêr bûn, me nas kir ku beleyeke mezin bi serê me hatiye û em ketine wertakê de. Tu çare jî di destê bavê min de nemabû ji xeynî wê yekê ku nameyek ji Efrîdon re nîvisand û jê re sûnd xwar ku wî nizanibû keça wî di nav wan cariyeyan de bûye. Di heman demê de jî jê re da xwiyakirin ku wî ew şandiye ji Qral Omer en-Nûman re û li wir jî zarokin jêre çêbûne.

Îcar gava nameya bavê min digihêje ber destê qralê Qostantîniye Efrîdon, hêrs dibe, diqehere, kufekuf pê dikeve û dibêje: “Çawa keça min dikin cariye, bi nav lepên qralan de berdidin û destdirêjiyan li ser dikin bêyî eqd û zewacê? Bi heqê Mesîh û vê ola pîroz, ez ê bêdeng nemînim li himberî vê şermê û gûman tê de tuneye ku ez ê tola vê yekê hilînim bi awayekî ku bibe îbret di dinyê de û herkes jî pê bipeyive.”

Îcar ew li ser wê fikra xwe wisa berdewam dike heta ku bi fen û fût û bêbextiyê, pilangeriyeke mezin çêdike û qasidan dişîne cem bavê te Omer en-Nûman û ew tiştên te bihîstine jê re dibêje, ew jî dibe sebeba ku bavê te ew artêş amade kir û di bin femandariya te de ber bi wî ve kete rê de, da ku te û leşkerên te dîl bigire. Ew morîkên ku behsa wan ji bavê te re kiriye jî, tişteki bêbingeh e, rastî jê re nîn e. Ew morîk bi keça wî Safiye re bûn û bavê min ew jê stendibûn, dabûne min û waye hîna jî li cem min in. Vêca tu here, bigihêje leşkerên xwe û wan bi şûn de bişîne, berî ku bikevin kûrahiya axa welatê Freng û Roman. Lewre heger hûn bi kûrahî pê de herin, dê rê li ber vegera we jî bigirin û heyfê ji we hilînin, jixwe ez pê dizanim ku artêşa we hîna li cihê xwe yê ewilî ye, ji ber ku te ferman dabû wan ku sê rojan li wir bimînin, li gel ku wan tu wenda kiriye di van sê rojan de û nizanin bê ka wê çi bikin.

Gava ku Şerker ev gotin bihîstin, tasewas pê re çêbûn û hişê wî li bin guhê hev ket, destê Îbrîza ya şahbanû ramûsa û got: “Şikir ji Xwedê re ku yeke weke te ji min re şand û tu kirî sebeba xelasiya min û kesên bi min re. Lê belê veqetana ji te, dê min pir biêşîne li gel ku ez nizanim bê wê çi bi serê te bê, piştî min.” Wê got: “Hîn ku hûn nêzikî welatê xwe ne tu niha here leşkerên xwe bi şûnde vegerîne û heger ew qasid hîna jî bi wan re bin, wan dardest bikin da ku hûn rastiye bibînin. Ez jî piştî sê rojan, ez ê xwe bigihînim we û em ê bi hev re derbasî Sûriyeyê bibin.”

Gava Şerker xwest ku here jî, Îbrîza jê re got: “Soz û peymanî di neqeba me de heye ji bîr neke!” Û pê re rabû ji bo xatirxwestinê. Bi germahî û kelecaneke mezin Şerker himbêz kir, ew ramûsa û bi hestiyariyeke ku keviran dihêline bi ser wî de giriya, hêsir barandin mîna baranê, ji bo ku wî

agirê dilê xwe vemrîne. Gava ku wî ew girî û kelecana bi wê re dît, henasî bû û dilê wî bi şida lêda. Piştî ev çend beyt gotin:

Xatir jê xwest û destekî min li ser hêsiran  
Destê din jî ji bo himbêz û ramûsanana  
Got min tu natirsî qey ji hetkê, min got na  
Roja xatirxwestinê roja hetkê ye bo aşiqan

Û ji wê veqetîya ji dêrê derket, hespê wî pê ve gîhandin, ew jî lê siwar bû û berê xwe da pirê. Di ser pirê re derbasî nava wan şindaran bû, piştî ku ew daristan li dû xwe hişt hate wê mêrgê û li wê derê çav li sê siwaran ket. Şûrê xwe kişand, tevdira xwe stend û berjêr ve daket. Gava ku nêzîkî wan bû, li hev nêrîn hevdu nas kirin. Dendanê wezîr bû û du emîr jî pê re bûn. Çawa ku wan ew nas kirin, ji hespên xwe peya bûn, silav lê kirin, piştî Dendanê wezîr sebeba derengketina wî jê pirsî. Rabû wî jî çîroka xwe û Îbrîza a şahbanû ji serî hetanî binî jê re vegot. Dendan got: “Şikir ji Xwedê re ku tu bi selamê li me vegerand.” Piştî ji Şerker re got: “Zû me ji vî welatî bibe, berî ku xerabîyek bi serê me de bê û bigrin ser me, lewre ew qasidên ku bi me re bûn, çûne û dê qralê xwe agahdar bikin bi hatina me.”

Şerker, fermana vegeêrê da leşkerên xwe û hemû tevde rabûn ser xwe, ketin rê de. Meşa xwe berdewam kirin heta ku gîhan serê newalê. Qasid jî çûbûn cem qralê xwe û ew agahdar kiribûn bi hatina Şerker û leşkerên wî. Qral jî artêşek amade kiribû û ferman dabû wan ku wî û leşkerên wî dîl bigirin. Ji aliyê qasidan û qralê wan ve rewş wisa bû, vêca em vegeerî ser rewşa Şerker û leşkerên wî.

Şerker leşkerên xwe dan dû xwe û bîst û pênc rojan meşîyan, hetanî ku gîhan sînorê axa welatê xwe. Gava ku gîhan wê derê, ewle bûn û navber dan meşa xwe, ji bo ku vehesin û bêhna xwe berdin. Xelkê wê deverê jî bi wan ve rabûn, qedr û qîmetên wan girtin û pez û deve ji wan re serjêkirin. Piştî du rojan dîsa rabûn ser xwe, kar û barê xwe kirin da ku biçin cî û warên xwe. Şerker li gel sed heb siwarî xwe bi şûn de hişt û Dendan kir emîr li ser artêşê û rojekê berê, ew li pêşîya xwe şandin, ew kirin rê de. Piştî, ew û her sed siwarên pê re jî ketin rê de, piştî meşa du fersexan gîhan rêbiwareke teng di neqeba du çîyan de. Li wir toz û ecacok li pêşîya wan derket ku nedihîşt hespên wan bi pêş de herin. Bêhtirî seetekê xwe ragirtin, heta ku ew toz û ecac belav bû û sed heb faris ji bin wê derketin, xwiya bûn! Hemû jî weke şêran bûn, di nava cewşen û qelensûyên hesinî de bûn. Çawa ku nêzî Şerker wan bûn, bi ser wan de qîriyan û gotin: “Bi heqê Yûhenna û Meryem, êdî em gîhan aramanca xwe! Li pey we, em bi şev û roj meşîyan hetanî ku me li pêşîya we xist û me xwe gîhand vê derê. De êdî ji hespên xwe peya bibin, çekên xwe bidin me û xwe jî radestî me bikin, da ku hûn ruhê xwe xelas

bikin.” Gava Şerker ew gotin bihîstin, rûyê wî sor bû û agir ji çavan çû, ji wan re got: “Ey kûçikên Filehan, hûn çawa diwêrin bi ser me de bèn û derbasî nav axa me bibin? Qey ev nebes e ku niha jî hûn bi vî şiklî bi me re diaxivin? Qey hûn texmîn dikin ku hûn ji nav lepên me xelas bibin û bi şûn de vegerin malên xwe?” Piştî li her sed siwarê xwe kire gazî û ji wan re got: “Êriş bikin van kuçikan, ew jî bi heman hijmara we ne!” Û wî jî şûrê xwe kişand û bi ser wan de çû. Frengan jî bi dilekî hesinî ew pêşwazî kirin û fêris û leheng ketin pêxêla hev de û hevdû birin û anîn. Şer germ bû, toz û dûman bi ser serê wan ket, ceng ewqasî mezin bû ku êdî bi gotinan nedihate wesifdan, şingêşinga şûr û rîman bi ser cewşen û mertalan de digiha ber perên ezman. Wî şerê wan wisa berdewam kir heta roj çû ava û tariya şevê bi ser wan de hat. Dûra ji hevdû veqetiyên, herkes vegeyriya cihê xwe. Şerker siwarên xwe giş li dora xwe kom kirin, li wan meyzand, kesî birîndar di nav wan de tunebû, jî xeynî çar hebên ku birîndariya wan pir sivik bû. Şerker ji wan re got: “Ez di nava pêlên deryaya şer û cengê de mezin bûme, lê ez bi navê Xwedê kim, hetanî roja îro min mêr weke van lehengan şerker û berxwedêr nedîtine!” Siwarên wî jî jê re gotin: “Qralê meyî hêja, siwarek di nav wan de heye ku herdem li pêş e, siwarekî fêris û wêrek e û derbên wî jî kujerin. Lê belê kîjan ji me dikeve ber destê wî de jî, ew wî nakuje û wî berdide. Bi navê Xwedê, heger wî bixwesta me bikuje, kes ji me li ser nigan nedihîşt.” Şerker li vê gotina han ecêbmayî ma. Piştî got: “Sibe em ê yeko yeko bikevin pêxêla wan de. Em sed in ew sed in, em ê serkeftinê ji Xwedayê xwe bixwazin.” Wê şevê, li ser wê gotinê peyman bi hev re dan û raketin.

Siwarên Frengan jî li dora serkêşê xwe kom bûn û jê re gotin: “Me îro keysa xwe li van neanî û kes ji wan nekuşt.” Serkêş got: “Sibe, em ê bikevin rêzê û yeko yeko bi wan re şer bikin.” Hemûçik li ser wê gotinê bûne yek û wê şevê ji xwe re raketin.

Gava bû sibe û rojê şewqa xwe da serê çiya û baniyan û silav da Mûhemmedê xweşiktrîn mirovê ser rûyê dinyê, Şerker û her sed siwarên xwe li hespan siwar bûn û daketin qada şer. Li wir dîtin ku Freng ketine rêzê de, ji bo şer. Şerker ji zilamên xwe re got: “Dujminên me ketine rêzê, de êdî diranên xwe li wan bisûn û fersendê ji destê xwe bernedin!” Wê kêliyê yekî ji Frengan gazî kir û got: “Em dixwazin ku şerê xwe yê îro yeko yeko bi hev re bikin, farisek ji me û yek ji we.” Wê kêliyê farisekî ji yên Şerker xwe da pêş û qîrek da, got: “Kesî ku bi min re dakeve meydanê heye? Bila yekî bêkêr û sistovisto dernekeve miqabilî min!” Hîna wî ev gotina xwe neqedandibû, siwarekî Frengan li himberî wî derket ku kincin ji zêr lêbû; di nava çekan de bû û li ser piştê hespekî boz bû, siwarekî ku milên wî rût û bê mû bûn. Hespera xwe ajot, daket nava meydanê û bi şûr û rimê kete êrişê de. Hîna seetek derbas nebibû, yê Frengî keys lê anî û bi derba rimê re ew ji ser piştê

hespa wî anî xwarê, ew hêsîr girt û bi stûxwarî ew bi xwe re bir. Siwarên wî pê kêfxweş bûn û nehiştin ew careke din vegere meydanê. Li şûna wî yekî din şandin meydanê, ji Musulmanan jî yek li himberî wî daket meydanê ku ew jî birayê yê ku hêsîr ketibû. Herduyan nêzikê seetekê hevdû birinûanîn, piştî yê Freng pişt jê stend û bi piştî rimê li yê Musulman da, ew jî ser piştî hespê anî xwarê û ew hêsîr girt, bi xwe re bir.

Siwarên Şerker yeko yeko dadiketin meydana şer û yê Frengan jî ew hêsîr digirtin û dibirin, hetanî bû êvar û roj çû ava, reş kete erdê. Hetanî wê gavê, bîst heb ji Musulmanan hêsîr hatibûn girtin. Wê yekê êşeke mezin di da Şerker û ew pir tengav dikir. Zilamên xwe yê mayîn kom kirin û ji wan re got: “Ev çi bi me hatiye? Sibe ez ê dakevim meydanê û ez ê ji serkêşê wan bixwazim ku ew were himberî min, da ku ez têbigihêjim bê ji bo çi hatine ser axa me û ez ê wî hişiyar bikim ji bo ku şer neke. Heger ew bixwaze, em ê li hev bîn heger ew nexwaze jî em ê şerê hev bikin.” Li ser vî esasî raketin û man li hêviya sibehê.

Dema bû sibe û rokê şewqa xwe da ser dinyê, herdu civat jî rabûn ser xwe, xwe girêdan, li hespên xwe siwar bûn daketin meydana şer û li raserî hev rêz bûn. Piştî Şerker xwe da pêş û daket meydana şer, dit ku nivê siwarên Frengan ji hespên xwe peya bûne, dane pêşiya siwarekî ji wan û pê re tèn hetanî nivî meydanê. Şerker baş li wî siwarî nêrî û tê derxist ku ew e serkêşê wan. Ebyayek şînî ji etles bi ser milên xwe dakiribû ku rûyê wî mîna heyvê di nav de xwiya dikir. Zirixpûşekî hûnayî di serî de bû ku çavikên wî pir teng bûn, şûrekî kalanî di dest de bû û li ser piştî hespekî gemer bû ku perçeyekî weke dîrhemekî jî bi enîya wî ve daliqandî bû, zend û bendên wî siwarî jî rût û bê mû bûn. Nigê xwe li binê zikê hespê xwe xist, daket nivê meydanê û ji wir qîrek bi ser siwarên Musulmanan de da û bi zimanekî Erebiyî fesih, ji wan re got: “Ey Şerker! Ey kurê Omer en-Nûman ê ku keleh û sûr û welatan safî dike bêtirs! Vaye meydana şer li ber te ye! De ka were, dakeve meydanê û şer bike li himberî yekî mîna min dadwer ku asta me herduyan jî yek e. Tu mezinê qewmê xwe yî û ez jî mezinê qewmê xwe me. Di vî şerî de, kî ji me zora yê din bibe, bila ew wî û siwarên wî gişan bi xwe re bibe û bixe bin destê xwe.” Hîna wî ew gotina xwe neqedandibû, Şerker derket raberî wî bi dilekî tijî kîn û xezeb hespê xwe ajot û çû, hetanî ku giha ber ewê Frengî. Wê gavê, siwarê Frengî mîna şêrekî êrîşî ser wî kir. Herdu farîsên leheng, ketin pêxêla hev de. Rim û mertalên xwe rakirin, hespên xwe rakirin ser nigên dawî û sînga wan dane hev, mîna du çiyar, mîna du pêlên ava deryayan li bin guhê hev ketin. Bi kerr û ferr li ber hev dan ji sibê hetanî êvarê, lê belê kesî ji wan keysa xwe li yê din neanî. Gava ku şev hat û tarî kete erdê, herdû ji hev veqetiyar û vegeriyan cem hevalên xwe.

Şerker siwarên xwe li dora xwe kom kirin û ji wan re got: “Min faris weke vî farisî mêr û jêhatî nedîtine! Ez qet nizamim bê wê çî bi serê min û wî bê. Ez hêvî dikim ku hinek mîna wî, di nav hevalên min de jî hebin.”

Şerker wê şevê raket û sibehê bi şewqa rojê re dîsa rabû ser xwe, xwe girêda û daket meydana şer. Careke din kerr û ferr li hev kirin hetanî êvarê û careke din ji hev veqetiyên, veqetiyên cem hogirên xwe, bêyî ku kes ji wan derbê li yê din bîne. Wê şevê, her yekî ji wan çî dîtibû ji reqîbê xwe, ji hevalên xwe re vegot. Ê Frengî ji hevalên xwe re got: “Sibe, dê her tişt bi dawî bibel!”

Wê şevê jî raketin û roja din dîsa rabûn ser xwe, amedekariyên xwe kirin. Her yekî ji wan li hespê xwe siwar bûn û careke din jî hevdû re daketin qada şer. Ketin pêxêla hev hetanî nîvro, bêyî ku kes ji wan derbê li yê din bîne. Ji wê û pê de, yê Frengî hîleyek kir; nigê xwe li bin zikê hespê xwe da û rişmeya wî şidand, hesp lukumî û xwediyê xwe di ser stûyê xwe re, avêt erdê. Şerker jî di cî de xwe bi ser de avêt û şûrê xwe rakir ji bo ku wî bikuje û fersendê nedêyê ku bi ser xwe ve bê. Lê belê yê Frengî qîr kir û got: “Şerker! Ev kar ne karê lehengan e, karê jinên binketî ne.” Gava ku Şerker ev gotin bihîstin, çavên xwe vekirin û baş lê meyzand; dît ku ew siwar Îbrîza Şahbanû bi xwe ye, ya ku ew ji dêrê rizgar kiribû! Çawa ku ew nas kir, şûrê xwe ji destê xwe avêt û erda bin lingê wê maçî kir û jê re got: “Te çima û ji bo çî wisa kiriye?” Wê jê re got: “Min xwest ku ez te li meydana şer biceribînim û hunerên te nas bikim. Heger hespê min nelukumîya, te yê hêz û sebata min di şer de bidîta.” Şerker kenîya bi wê gotina wê û got: “Şikir ji Xwedayê min re ku bi xêr û selametî em gîhane hev û carek din jî min tu dîtî ey şahbanûya zeman!”

Îbrîzaya Şahbanû gazî cariyeyên xwe kir ji bo ku wan bîst hêsîrên di destê xwe de berdîn û emrê vegerê da wan ji bo ku bi şûn de herin. Cariyeyan erda bin nigê wê maçî kirin û fermana wê pêk anîn. Şerker jê re got: “Ên ku qralan ji tengasiyê rizgar dikin hûn in û yên mîna we ne.” Piştî îşaret da siwarên xwe ji bo ku werin silavê lê bikin. Ew jî hemû ji hespên xwe peya bûn û hatin erda bin nigê Îbrîzaya Şahbanû maçî kirin, piştî siwar bûn û ketin rê de, şeş roja meşiyên heta ku gîhan welatê xwe. Li wê derê, Şerker ji Îbrîza û cariyeyên wê xwest ku wan kincên Frengan ji xwe bikin.

*Li Şehrezadê bû sibe, ew jî bêdeng bû û navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA ŞÊSTEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*



Îcar Şahê min î bextewar, wek ku min got, Şerker ferman da Îbrîzaya Şahbanû ji bo ku ew û cariyeyên xwe kincên ser xwe bavêjin û li şûna wan kincên keçên Romîyan li xwe bikin, wan jî wisa kir. Piştî beşek ji zilamên xwe şandin Bexdê, ji bo bavê xwe agahdar bike bi hatina xwe û Îbrîzaya Şahbanû, keça Qeyserê Romê, da ku ew jî hinekan bişîne pêşiya wan, ji bo wan pêşwazî bikin.

Sibehê Şerker û zilamên xwe rabûn, xwe girêdan, şahbanûyê jî xwe girêda li gel cariyeyên xwe û hemû bi hev re ketin rê de, berê xwe dan bajêr. Li pêşiya bajêr Dendanê Wezîr, ê ku qral Omer en-Nûman ew peywirdar kiribû, li gel hezar heb leşkerên xwe ew pêşwazî kirin; erda ber nigên wan maçî kirin û xêrhatineke germ nîşanî wan dan. Piştî, dîsa li hespên xwe siwar bûn û gişan bi hev re berê xwe dan bajêr, derbas bûn û çûn qesra qral. Şerker derbasî cem bavê xwe bû, ew jî pê ve rabû; hevdû hembêz kirin, ramûsan û li halê hev pirsîn. Şerker jî tiştê ku ji Îbrîza bihîstibû, tiştê ku bi serê wî de hatibû, çawa şahbanûyê alîkariya wî kiribû û çawa ji bav û ehlên xwe veqetiyabû, pê re hatibû, hemû ji bavê xwe re êşkere kirin û got: “Wê hatina bi me re hîlbijart û xwest ku were li cem me bimîne. Qeyserê Qostantînyê xwestibû ku hîleyekê li me bike, ji ber keça xwe Safiye. Ji ber ku Qeyserê Romê ew agahdar kiribû bi çîroka wê û sebaba ku ew mîna diyariyekê ji te re şandibû, jê re gotibû: “Min nizanibû ku ew keça Efrîdon ê Qeyserê Qostantînyê ye, nexwe min ew ji Omer en-Nûman re nedîşand û min ê ew li bavê wê veqeranda.” Şerker ev hemû gotin û li dawîyê jî ev li ser gotina xwe zêde kir: “Ya ku em ji van fen û hîleyan gişan xelas kirin jî Îbrîza keça Qeyserê Romê bû ku min tukes mîna wê wêrek nedîtiye.”

Piştî çîroka xwe û wê bi dirêjahî ji bavê xwe re vegot bêyî ku wê mijara gulaşê jî jibîr bike. Gava ku Omer en-Nûman ew gotin ji kurê Şerker bihîstin, Îbrîza hîna mezintir bû li ber çavên wî û daxwazeke hîn mezintir pê re çêbû di dîtina wê de. Rabû ji kurê xwe xwest ku wêna bibîne. Şerker veqerîya cem Îbrîza û jê re got: “Qral dixwaze te bibîne.” Wê jî got: “Ser seran, ser çavan.” Berî Şerker wê derbasî hundur bike, bavê wî yê li ser textê xwe rûniştibû, ferman da ku herkesê li wir derkeve derve. Hemû derketin, ji xizmetkaran pê ve tukes li eywanê nema. Şahbanû Îbrîza derbasî cem wî bû, erda ber nigê wî maçî kir û silaveke germ dayê bi gotinin pir şêrîn. Qral, li wî zimanê wê yê fesîh matmayî ma! Spasdariya xwe nîşanî wê da ji ber wê qenciya ku wê kiribû bi kurê wî, piştî destûra rûniştinê dayê, ew jî rûnişt û perdeya ber rûyê xwe jî da alî. Gava ku Qral çav li rûyê wê ket, hişê xwe xwar.

Di pey wê yekê re Qral, Îbrîza pir nêzikî xwe kir, qesrek ji wê û cariyeyên wê re veqetand û ji her yekê re jî mûçeyek da ayarkirin. Piştî, ew her

sê morîkên ku berê behsa wan hatibû kirin jê pirsîn. Wê jî got: “Ew morîk bi min re ne, ey qralê dem û dewranan!” Li dû wê yekê Îbrîza vegeriya meqamê xwe, sindoqeke xwe vekir, qutîkek jê derxist, ew vekir, yeke biçûktir î zêr ji nava wê derxist û her sê morîk jê derxistin, anîn da Qral Omer en-Nûman û bi şûn de vegeriya qesra xwe; dilê Qral jî bi xwe re bir!

Dûv re, qral gazî kurê xwe Şerker kir. Kurê wî hat, Omer en-Nûman morîkek ji wan da wî. Şerker li herduyên din pirsî, wî jî got: “Kurê min herduyên mayîn, yek ji wan ji bo birayê te Şewqa Mekan e û ya din ji bo xwişka te Seyrana Zeman e.” Şerkerê ku tenê dizanîbû xwişkeke wî heye bi navê Seyrana Zeman, çawa bihîst ku birayekî wî jî heye bi navê Şewqa Mekân, li bavê xwe zîvirî û got: “Bavocan, qey kurekî te yî din heye ji xeynî min?” Qral got: “Belê heye û niha temenê wî bûye şeş sal.” Piştê ew agahdar kir ku Şewqa Mekân û Seyrana Zeman cêwîyên hev in. Pir zora Şerker çû û pê aciz bû, lê belê her tişt di nava xwe de hişt û ji bavê xwe re got: “Xwedê wan bisitirîne, Xwedê temenekî dirêj bide wan.” Piştê morîk jî ji destê xwe avêt û kincên xwe dawêşandin. Qral jê re got: “Çi bi te hat? Çima rewşa te wisa xerabû gava ku te ev xeber bihîst, li gel ku tu qral û xwedanê vî welatîyî piştî min ku min soz û peymanê vê yekê da hemû mezinên dewletê û ev morîk jî heqê te ye ji nava her sê morîkan!” Şerker serê xwe bera ber xwe da û fedî kir ku bi bavê xwe re bikeve nîqaşekê. Piştê bi hêrs rabû ser xwe û ji wir derket bêyî ku bizanibe wê çi bike ji qehran.

Şerker meşa xwe berdewam kir heta ku ket qesra Îbrîza de. Gava ku derbasî cem wê bû, ew jî ji ber rabû bi rêzdarî, spasdariyên xwe pêşkêşî wî kirin ji ber nêzîkahîya wî û ji wî û bavê wî re dua kirin. Dûvre rûnişt û ew jî li kêleka xwe da rûniştandin. Piştî maweyekê, hêrsa di nav çavên wî de dît û sebeba qehra wî jê pirsî. Wî jî jê re got: “Du zarokên Omer en-Nûman ji Safiye çêbûne ku navê yekî kiriye Şewqa Mekan û navê ya din jî kiriye Seyrana Zeman û ji wan morîkan dudu dane wan. Yek ji wan jî da min, min ya xwe li wir hişt û ez hatim, ji ber ku ez nû ji wan gişan agahdar bûme, hêrs û qehra nava min dike min bifetisîne. Tişteki ku ez ji te veşêrim nîne, ew sebeba qehra min e û ez ditirsim bi te re jî bizewice, lewre min nîşaneyên vê yekê tê de dîtî, vêca tu çi difikire di vê xalê de?” Wê got: “Binêr Şerker, divê tu bizanîbî ku tu hukmê bavê te li ser min nîne û nikare bêyî rizamendiya min bi min re bizewice. Heger bixwaze min bi zorê bibe jî, ez ê xwe bikujim. Ew mijara hersê morîkan jî, min qet jê hêvî nedikir ku tişteki ji wan bide zarokên xwe. Min got belkî wê wan jî bavê xezîneya xwe û ji xwe re hilîne, mîna malên dîtir. Lê daxwazeke min ji te heye, heger bi dilê te be ez dixwazim ew morîka ku bavê te daye te, tu wê bidî min.” Şerker got: “Ser seran, ser çavan.” Îbrîza jê re got: “Metirse!” Piştê bêhtirî seetek din pê re axivî û jê re got: “Ez ditirsim bavê min bibihîze ku ez li ba we me û min ji we bixwaze,

an jî ew û Qeyser Efrîdon li hev bîn ji bo keça wî Safiye û herdu bi ser we de werin bi artêşeke giran û qiyamet li pey me rabe.” Gava ku Şerker ev gotina wê bihîst, jê re got: “Keybanûya min, heger mana te ya vir bi dilê te be, qet guh nede kesî ji wan. Hemû hêzên derya û bejahiyê li me kom bibin jî, em ê zora wan bibin.” Îbrîza got: “Înşallah ji xêrê pê ve tiştê nabe. Heger hûn ji min re baş bin, ez ê li vir bimînim; heger na jî ez ê ji cem we herim.” Piştî ferman da cariyeyên xwe ji bo ku xwarinê ji wan re bînin. Sifre li ber wan raxistin, Şerker tenê çend gep xwarin û li gel kul û derdên xwe, bi xemgînî berê xwe da mala xwe...

Ji aliyê Şerker ve wisa bû, vêca em veşerî ser bavê wî Omer en-Nûmanê ku çawa kurê wî Şerker ji cem wî derket, çû û rahişt wan morîkan û derbasî cem cariyeyên xwe Safiye bû. Gava ku cariyeyê ev dît, ji ber wî rabû û li ser nigan ma hetanî ku ew rûnişt. Piştî zarokên wî Şewqa Mekân û Seyrana Zeman hatin cem, wî jî ew herdu maçî kirin û her yek ji wan morîkek bi wan vekir. Wan jî destên wî maçî kirin û li diya xwe veşerîyan. Diya wan jî pir dilxweş bû û dua ji qral re kir ku Xwedê temenekî dirêj bide wî. Qral jê re got: “Safiyecan! Madem ku tu keça Qralê Qostantîniye Efrîdon bûyî, çima te ez ji vê yekê agahdar nekirim ku min bêhtir qedrê te bigirta?” Gava ku Safiye ew tişt bihîst, jê re got: “Qralê min, ma ji vê zêdetir min ê çî bixwesta û ji vî qedr û qîmetê bilindtir min ê hêvîya çî din bikira? Va ez di nava xêr û bêra te de me û Xwedê Teâlâ jî kur û keçek ji te daye min.” Omer en-Nûmanê Qral, pir kêfxweş bû bi wan gotinên wê yên tijî aqil û baldarî û zarafeteke ku lûtkeya edeb û zanîneke hêja nîşan dida.

Qral ji cem Safiye derket û çû jê re qesreke erjeng veqetand ku qesr weke wê tunebûn. Piştî ji bo wê û herdu zarokên wê, têra wan xizmetkar, suxrevan û zanyar û hekîm û astrolog û bîjîşk dane cem wan û şîret li wan kir ku zarokên wî baş bidine mezinkirin, piştî ku têra wan mûçe û xelat li ser wan belav kirin. Dûra veşerîya meqamê xwe, ji bo ku li dozên xelkê binêre...

Ji aliyê tekiliya wî ya bi Safiye û zarokên wê re, rewş wisa bû. Lê ji aliyê rewşa wî ya li gel Îbrîzaya Şahbanû, rewş pir cûda bû, lewre agirê evînê pêketibû di dilê wî de û êdî şev û roj bi wê ve mijûl dibû. Her şev derbasî cem wê dibû, pê re diaxivî û nîşanin ji tiştê di dilê xwe de pê re parvedikir, lê wê tu bersiv nedidan wî, şûna wê jê re digot: “Qralê dem û dewranan, ê min niha tu meyla min bi ser zilaman de tune.” Gava ku qral ev giranî li aliyê wê dît, hîn bêhtir pê ve hate girêdan û hiş û sewdanê xwe pê re wenda kir. Îcar gava ku pir bêhal ket ji ber wê mijarê, gazî wezîrê xwe Dendan kir û tiştê ku di dilê wî de bû, di derbarê evîna Îbrîzaya Şahbanû ya keça Qral Herdûb de eşkere kir û jê re got ku ew bi ya wî nake û evîna wê jî wî dikuje,

bêyî ku tiştekan bi destê wî bikeve.

Gava Dendanê wezîr, ew gotin ji qralê xwe bihistin jê re got: “Gava ku şev kete erdê de, piçeke benc(hişbir) bi xwe re bibe û derbasî cem wê bibe, pê re şerabê vexwe. Gava tu têra xwe pê re axivî û te sohbeta xwe ber bi encamê ve bir, qedeha dawî bide destê wê piştî tu wê piça bencê bavêje nav. Vêca gava ku vexwar û pêde, hîna ku neçûye odeya xwe, dê hukmê bencê li ser bibe û tê jî bigihêje miradê xwe. Çareya li ba min ev e.” Qral jê re got: “Fikra herî baş ji bo min ev a ku tu dibêji.” Piştî, di cî de rabû ser xwe, çû xezîneya xwe vekir û perçeyek benc jê derxist ku filekî jî ew hilda nava xwe, dê salekê di xew de bima. Ew benc xist bêrika xwe, hebekî din jî xwe ragirt, piştî çû qesra Îbrîza û derbasî cem wê bû. Çawa ku Şahbanû ew dît pê ve rabû û ew derbasî hundur kir. Ew da rûniştandin û ew jî li kêlekê rûnişt û jê re behsa şerabê kir. Rabû Şahbanûyê sifreya şerabê jê re raxist, qedeh rêz kirin, mûm pêxistin û ferman da cariyeya xwe ku fêkî û mêkî jî bîne. Dûv re Qral jî pê re şerab vexwar û sohbet pê re kir hetanî ku Şahbanû Îbrîza serxweş ket. Wê kêliye Omer en-Nûman, perçeyê bencê ji bêrika xwe derxist, xist nava tiliyên xwe, qedehê jî xwe re dagirt û vexwar, piştî ya din jî dagirt, perçeyê bencê jî destê xwe avête nav bi dizî û jê re got: “Bigire, vexwe!” Şahbanûyê qedeh jî destê wî girt û vexwar. Hîna ku seetek têre derbas nebûbû, hukmê bencê li ser wê giran bû û bi temamî jî ser hîşê xwe çû, piştî ku derbasî odeya xwe bû.

Wê gavê jî Qral derbasî cem wê bû û dît ku li ser piştê vezilandîye. Delingên xwe jî xwe kiribûn û sura bayê jî binkiraskê wê jî ser dabû alî. Mûmek pêxistî li ber serê wê bû û yek jî li hinda nigên wê bû ku ronîya wê dida nav şeqên wê. Gava ku qral ew di wî halî de dît, hişê wî jî serî çû û şeytan ket dilê wî de. Nema xwe girt, şerwalê xwe jî xwe danî û xwe bi ser wê de avêt, ew jî keçkanî de xist. Dûra rabû ser xwe û çû derbasî cem cariyeya wê bû ya ku navê wê Mercanê bû û jê re got; here cem xatûna xwe û pêre biaxive! Cariye rabû çû derbasî cem xatûna xwe bû, dît ku li ser piştê vezilandîye û xwîn jî nav şeqên wê diherike. Destê xwe avêt destmalekê û xwîna xatûna xwe pê paqij kir.

Gava li wan bû sibe, Mercanê çû cem xatûna xwe, dest û rûyê wê şûşt, nig û paqên wê paqij kirin, piştî ava gulan anî û careke din ser çavên wê pê şûşt, li dora devê wê bir û anî heta ku xatûn pişkîya. Piştî vereşîya û ew perçeyê bencê jî di devê xwe re avêt. Îbrîza bi ser hîşê xwe ve hat, dev û destên xwe şuştin û ji Mercanê re got: “Ka ji min re bêje bê çî bi serê min hatiye?” Mercanê jê re got: “Xatûna min, tu li ser piştê vezilandî bûyî û xwîn jî nav şeqên te dihat.” Şahbanû Îbrîza tégihîşt bê Omer en-Nûman çî pê kiriye û çî fen û hîle li serê wê gerandine. Pîr xemgîn bû bi wê yekê û nema

ji malê derket. Şîret li cariyeyên xwe jî kirin û ji wan re got: “Hevdîtina kesî qebûl nekin û kê li min pirsî, ji wan re bêjin ‘xatûna me nexweş e’ ka hetanî ku em binêrin bê wê Xweda çi bike bi min.” Xebera nexweşiya wê giha qral Omer en-Nûman jî. Wî jî dest pê kir û bênavber jê re şîrûb û şekir û acin şand. Ew jî bi mehan ji mal derneket û kes negirt mala xwe. Qral jî êdî jê sar bibû û agirê wî vemiribû. Îbrîza jî ji wî bihemil bibû. Gava ku meh di ser re çûn, zikê wê mezin bû û hemle wê eşkere bû, dinya li serê wê teng bû. Rabû ji cariyeya xwe Mircane re got:

Divê tu bizanibî ku min ev zulum li xwe kir, ne kesî din. Min dev ji dê û bavê xwe, dev ji welatê xwe berda. Ez ji jiyane aciz bûm, kul û kerbên min duqat mezin bûne, hêz û qeweta di min de nemaye ez pir giran bûme. Berê ez dikaribûm li hespa siwar bibûma, niha ez nema dikarim wê jî bikim û kengî ez hemlê xwe li vir deynim, ez ê bibim pêkenok û benîştê devê carîye û xizmetkarên qesrê, ji ber ku hemû jî dizanin wî bekareta min rakiriyê û bi darê zorê. Vêca ku ez vegerim cem bavê xwe, bi çi rûyî ez ê derkevim miqabilî wî? Ezê çawa lê vegerim? Çiqasî rast gotiye ew helbestkarê ku gotiye:

Tê çawa dil xweş bike bê ehl û weten  
Bê dost bê xizim bê iskan û seken?

Mercanê jê re got: “Ferman ya te ye xatûna min, tu çi bibêjî ez ê wîsa bikim.” Îbrîza jê re got: “Niha ez dixwazim bi dizî ji vir derkevim û herim cem dê û bavê xwe. Lewre dema ku goşt genî dibe, ji xwediyê wî pêve tukes lê xwedî dernakeve. Xwedê, alîkarê min be. Divê ji te pê ve jî tukes bi derketina min nizanibe, te go erê? Mercanê got: “A herî rast tu dikî şahbanûya min.”

Amadekariyên xwe kirin û her tişt bi dizî kir. Bi rojan xwe ragirt û bi sebir tevgeriya hetanî ku rojekê Qral derket seyde û nêçîrê, kurê wî Şerker jî çûbû kelehekê ji bo ku demekê li wir bimîne. Îbrîza çû ji cariyeya xwe Mercanê re got: “Ez dixwazim îşev bikevim rê de, lê ez çi bikim ji qederê ku dema welidandina min nêzîk kiriye? Heger ez çar-pênc rojin din jî xwe ragirim, ez ê li vir biwelidim û êdî ez ê nema karibim biçim welatê xwe jî, qey ev qedera min bûye û ji berê de li ser eniya min hatiye nivîsandin.” Qederê seeteke din jî ponijî, piştî ji Mercanê re got: “Zilamekî ji me re bibîne ku bikaribe bi me re bê û alîkariya me bike bi rê de. Lewre ez nikarim rahêjim şûr û mertalan û ne jî şer bikim.” Mercanê got: “Xatûna min ez kesî nasnakim ji xeynî koleyekî reş î ku navê wî Xedban e û ji koleyên Omer en-Nûman e. Yekî wêrek e û dergevanê qesra me ye. Qral ew dabû ber derî ji bo ku xizmeta me bike û me jî hetanî niha ew di nav qenciyan de hişt. Îcar va ye ez ê herim li ser vê mijarê pê re biaxivim û soza hineke dirav bidime wî û ez ê jêre bibêjim heger tu dixwazî li gel me bimînî, kîjana ku tu wê bixwazî ez ê

te pê re bizewicînim, jixwe berê ji karê rêbirtiyê kiriye. Îcar heger wî got erê, em ê bixwe jî bikaribin xwe bigihînin armancê xwe, xwe bigihînin welatê xwe.” Wê jî got: “Ka hela gazî wî bike ji bo ku ez pê re biaxivim.”

Mercanê çû cem û jê re got: “Xedbano! Xwedê xêra te nivîsandiye ku xanima min dixwaze bi te re biaxive!” Bi vê gotinê re jî, bi destê wî girt û ew derbasî cem Şahbanûyê kir. Çawa Xedban Şahbanû dît, bejna xwe jê re tewand û erda ber niyê wê maçî kir. Îbrîza jî çawa çav lê ket dilê wê xeliya, hinavên wê li hev ketin. Lê wêya ji xwe re got “Neçarî jî regezên wê hene!” û hewl da ku pê re biaxive, li gel ku di dilê xwe de pir jê aciz bû. Îbrîza jê re got: “Xedban! Gelo tu dikarî alîkariya me bikê di tengasiyan de? Gelo ez rewşa xwe ji te re bibêjim, tê karibî alîkariya min bikî?” Xedbanê kole çawa ku çav lê ket, agir bi dilê wî ket ji ber xweşikbûna wê û jê re got: “Xatûna min, tu çi bibêji ez ji rêya te dernakevim.” Îbrîza got: “Ez dixwazim ku niha tu min û cariyeya min Mercanê bibî û tu du hespan ji hespên qral ji me re girêbidî, xurcîk û zînen wan bavêji ser wan, hinek mal û xwarin tê de bi cî bikî û tu jî bi me re werî welatê me. Heger tu bixwazî ku tu li wir bi me re bimînî jî, kîjan cariyeya ku tu wê bixwazî ez te pê re bidim zewicandin. Na heger tu bixwazî vegeerî welatê xwe jî, tu çi bixwazî em ê wî bidin te, li gel mal û diravin pir em ê te bi şûn de bişînin.” Xedban, pir kêfxweş bû bi wê gotinê û jê re got: “Ez ê li ser çavên xwe we bibim! A vaye niha jî ez ê herim du hespan ji we re amade bikim.”

Bi kêf ji wir derket û di dilê xwe de got: “Tiştê ku min ji herduyan jî dixwest, pêk hat. Heger bi ya min nekin ez ê herduyan jî bikujim û pereyên wan bibim û herim, bêyî ku ez ji kesî re bibêjim.” Piştê çû du hesp anîn, ew jî li yekê siwar bû û hat li şahbanûyê û cariyeya wê vegeerîya. Şahbanû bi êş û azareke mezin li hespa xwe siwar bû, Mercanê jî li ya xwe. Xedban jî ew herdû dan dû xwe û ket rê de, bi şev û roj meşîyan hetanî ku gîhan çiyê û di navbera wan û welatê wan de meşa rojekê tenê ma. Li wê derê, qolinc hatinê û ket ber zayîne de. Êdî nema dikarîbû li ser piştê hespê bimîne, ne jî xwe pê ve bigire. Rabû ji Xedban re got: “Kanî min deyne erdê, qolincên min têne min.” Li Mercanê jî zîvirî û jê re got: “Ka tu jî were li ber nigên min rûnê, min biwelidîne.”

Wê gavê Xedban ji hespê xwe peya bû, Mercanê jî ji yê xwe. Rişmeya herdûyan girêdan û Îbrîza jî daxistin erdê ku ew jî êdî ji ser hişê xwe çûbû ji ber dijiwariya êşa nava xwe. Gava ku li erdê awirên Xedban pê ketin, şeytan ket dilê wî de, şûrê xwe kişand û ji Îbrîza re got: “Xanima min, li min were rehmê û bihêle ku ez bi te şa bibim!” Gava ku Şahbanûyê ev gotina wî bihîst, berê xwe da wî û jê re got: “Piştî ku ez bi qralên leheng qayil nedibûm, îcar dora ebîdên reş e!”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî axaftina xwe birî.*

ŞEVA ŞÊST Û YEKEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Vêca Şahê min ê bextewar, gava ku Îbrîza jê re got “Îcar dora ebdê reş e!” bi Xedban de xeyidî û giriya. Piştî jî jê re got: “Ev çi gotine ku tu dibêji bêmirês? Tişteki wisa nebêje di hizûra min de û baş bizanibe ku ez tişteki wisa qebûl nakim, lew ku ez bême kuştin jî. Xwe ragire hetanî ku ez hemlê xwe deynim; bi ser xwe ve bêm û piştî heger bi destê te ve bê, tu çi dixwazi bi min bike. Bi kêmanî hebekî bêdeng bibe vê kêliyê, nexwe ez ê xwe bikujim ji bo ku ez ji van gotinên te xelas bibim.” Dûvre, ev çend beyt jî di ber xwe de got:

Xedbano bes e jixwe felek jî li min geriyaye  
Xwedê jî rêyên nebaşiyê her heram kiriye  
Cihên wan kesan agir e çawa wî gotiye  
Ez jî bê nêtim naxwazim bikim xerabiyê  
Tu awirên gunehkar bide alî ji ser min  
Destê xerabiyê jî bi lez rake ji ser min  
Heger na ez ê qîr û hewar bikim Yezdê min  
Ji şerq û xerbê mirovên xwe kom kim li ser te  
Da ku biparêzin namûs û sincê min  
Lew ku şûr perçe perçe bike laşê min  
Qet rê nadim ez destdirêjîya bêşerman  
Lew ku pir mezin bin ew mirov bi nava  
Vêca çawa ez ê rê bidim bêjî û bendan!

Gava Xedban ew helbest ji devê wê bihîst, pir hêrs bû û qeherî. Çavên wî tijî xwîn bûn, rûyê wî tarî bû, lêvên wî veziliyan, rehên wî nepixîn, kufekuf pêket û ev çend beyt got:

Îbrîza Xanim min neke kujerê eşqa xwe  
Dilê min perçe bûye îro ji dûrbûna te  
Laşê min dilerize, sebîr qet nemaye  
Xweşdengiya te hişê min sêwî hiştiye  
Ajo hey tîn, aqil û sewdan ji min çûye  
Lew ku tu leşkerên dinyê gişan li min bicivîne  
Kes nikare pêşîya min bigire vê kêliyê

Gava Îbrîza ev gotina wî bihîst, giriya û got: “Wey Xedbanê dola zinê, qey rewş gihaye vê yekê ku tu bi vê şeweyê bi min re biaxive?” Xedban hêrs bû û ber pê de hat, şûrek li serê wê da ew kuşt. Piştî hespê wê jî da ber xwe, tev li mal û diravan û ber bi çiyê ve reviya.

Îca em vegerin ser rewşa Îbrîzaya ku li erdê dirêj bibû. Îbrîza welidîbû û kurikek anîbû. Mercanê rahişte wî û ew da ber himbêza xwe. Piştî qîrîn û waqîn pê ket, porê xwe kişand, kincên xwe qetandin, xwelî bi ser serê xwe dakir û bi lapûşkan rûyê xwe kişand, heta ku xwînê di hinarokên wê re avêt. Pêre jî bê navber ditewirand û digot: “Wey li minê, wey li minê! Çawa koleyekî reşik xatûna min a fêris kuşt!?”

Hîna ew wisa digiriya û dinaliya, toz û ecaceke ku bi azmanan ve hildi-perikî ji dûr ve xuyakir, dûra ew toz ji hev ferikî û artêşeke mezin di bin de xwiya kir, ku leşkerên bavê Îbrîza, Qeyserê Romê bûn. Lewre wî jî bihîstibû ku keça wî reviyaye, çûye Bexdê li gel cariyeyên xwe û li cem Qral Omer en-Nûman bi cih bûye. Vêca piştî bihîstina wê xeberê, bavê wê û parazvanên xwe derketibûn derve ji bo ku di derheqê wê de saloxan bigirin ji rêwîyan. Hinek mêvanên ku ji cem Omer en-Nûman hatibûn ew salox gîhandibûnê, ew jî li gel hinek parêzvanên xwe derketibû ku biçin ji wan bipirse bê ji ku tên, ji bo cih û warê keça xwe tesbît bike. Wê gavê, ji dûr ve ew hersê dîtîbûn: Keça xwe, Xedbanê Kole û cariyeya wê Mercanê. Berê xwe dabû wan ji bo pirsîyarê ji wan bike. Lê çawa ku Xedbanê kole ew dîtibûn, ji tîrsa xwe bazdabû, xwe xelas kiribû, lewre kujerê keça wî bû êdî ew.

Gava bavê wê bi ser de hat, dît ku keça wî li erdê dirêj kirîye û cariyeya wê li ser digirî, xwe ji ser piştî hespê xwe avêt erdê ji bo pêve biçin, lê ew jî ji ser hişê xwe çû û li erdê dirêj bû. Wezîr û gizîr û parêzvanên pê re jî ji hespên xwe peya bûn, çadirên xwe vegirtin û ji bo qeyserê xwe Herdûb jî qubeyek vegirtin, hemû li derdorê kom bûn. Îcar gava Mercanê çav li qeyserê xwe ket di wî halî de, girîyê wê lê girantir bû û kûrekûr pê ket. Gava Qeyser bi ser hişê xwe hat, ji Mercanê pirsî, wê jî çîroka bi serê wan de hatîbû jê re vegot û ew agahdar kir ku yê keça wî kuştîye koleyekî reş ji koleyên Qral en-Nûman ê. Dîsa, tiştê ku Qral en-Nûman bi keça wî kiribû jî jê re vegot û ew agahdar kir ji rewşê. Dema Qeyser Herdûb ew gotin bihîstin, dinya li ber çavên wî reş bû, pir girîya û ferman da ji bo darbestekê binin. Piştî rahişt termê keça xwe û bi şûn de vegehiya welatê xwe, ew anî qonaxa xwe. Dûvre derbasî cem diya xwe ya şareza bû, jê re got: “Ma qey mafê Musulmanan heye ku wisa bi keça min bikin? Eva qralê wan Omer en-Nûman bi darê zorê keça min xera kiriye û piştî jî evdekî reşik ew kuştîye. De binêre bi navê Xwedê û heqê Mesîh, ya ez ê tola keça xwe hilînim û namûsa xwe paqij bikim, yan jî ez ê bi destê xwe xwe bikujim.”

Dîsa, demeke dirêj biêş giriya. Diya wî ya şareza jê re got: “A ku keça te da kuştin Mercanê bi xwe bû, lewre wê pir zikreşî davêtê ji berê ve.” Hebekî bêhna xwe berda, piştî dîsa li kurê xwe zîvirî û axaftina xwe berdewam kir, got: “Xeman mexwe kurê min, bi heqê Mesîh, hetanî ez heyfa keça te



hilneynim û ez Qral Omer en-Nûman û zarokên wî nekujim, ez dev ji wan bernadam. Ezê werîsekî wisa li dora stûyê wî bigerînim ku şarezayên dinyayê giş lê ecêbmayî bimînin û li çarmedorên cihanê bibe çirokeke ku ji ser zimanan nekeve. Lê belê ji bo ku tu bigihêje van armancên xwe, divê di her mijarê de tu bi ya min biki." Qeyser Herdûb got: "Bi heqê Mesih, di gotînekê tenê de ji ez derveyî axaftina te dernakevim." Diya wî ya şareza got: "Wê gavê ka rabe ji min re keçikin sipehî bîne û here çend zana û hekimên zemanan peyde bike, mal û milk û yadîgariyan bi ser wan de bibarîne û ji wan re bêje bila van keçikan fêrî zanîn, wêje û axaftina bi qralan re bikin. Bila wan fêrî helbest û şîret û şeweya axaftinê bikin û bila ev hekim û mamoste Musulman bin da ku keçikan fêrî çanda Ereban, dîroka xelîfeyên wan û qralên rabirdû bikin. Tu jî bêhna xwe fireh bike û mohleta çar salan bide min, lewre hinek Ereb jî dibêjin ku heger mirov heyfa xwe piştî çil salî hilîne jî, zû ye. Vêca kengî me ev keçikên xwe fêrî van tiştan gişan kirin, em ê bigihên armancên xwe û keysê li dujmin binin. Lewre ev dujminê me hatiye ceribandin bi hezkirina wî ji cariyeyan re ku sêsed û şêst heb li balê hebûn û piştî ewên ku bi rehmetiya keça te re çûbûn jî li wan zêde bûn. Vêca piştî ku keçik fêrî wan zanînan bûn, ez ê wan bi xwe re bibim û herim."

Dema Herdûb ev gotin ji devê diya xwe ya şareza bihîst, pir kêfa wî hat, enîya wê maçî kir û rabû ser xwe, di cî de qasid û nûnerên xwe xist rê de û berê wan da çar hêlên cihanê, ji bo ku hekim û zanayên Musulmanan jê re binin. Gava çûn jê re ew hekim û zana anîn, wî jî qedrê wan girt, ew xelat kirin bi mal û mulk û cariyeyan û mûçeyên mehane ji wan re veqetandin û soza xelatin mestir da wan ku heger ew peywirên xwe bi serkeftî pêk binin. Piştî ferman da ku wan keçikên xweşik bidin ber destên wan û ji wan xwest ku wana fêrî zanîn û wêjeyê bikin. Wan jî ferman erê kirin û dest bi mamostetiye kirin.

Vêca em vegerin ser Qral Omer en-Nûman û rewşa wî. Dema Omer en-Nûman ji seyde û nêçîrê vegeriya û derket qesrê, li Îbrîza ya Şahbanû pirsî û ew nedît, pir hêrs bû. Lê pirsî, kesî ku bi rewşa wê zanibe li dora xwe nedît. Hêrstir bû û got: "Çawa cariyeyên min ji qesrê derdikevin û kes bi wana nizane? Heger halê qesra min ev be, naxwe rewş pir xerab e û kesekî ku sererast bike jî nîne. Madem wisa ye, ez jî nema diçim nêçîrê bêyî ku ez nobedaran li ber malê deynim." Pir xemgîn bû û bêhna wî teng bû ji ber çûna Îbrîza. Hîna ew wisa di wî halî de bû, kurê wî Şerker ji ceng û seferê vegeriya. Wî jî çîrokê jê re rave kir û got ku dema ew li seyde û nêçîrê bûye, jinik û cariyeya xwe reviyane. Şerker jî pir xemgîn bû bi wê agahê.

Omer en-Nûman jî êdî her roj bi zarokên xwe ve mijûl dibû, serî li wan dida û zana û hekim jî bo wan dianîn, mûçe didane wan ji bo ku keç û kurê

wî fêrî îlm û îrfanê bikin. Gava ku çavên Şerker li wê rewşê ket, dixsîtiya xwişk û birayê xwe kir û gelekî qeherî, bi qasî ku ew rik û qehr di rûyê wî re jî bide der û wî nexweş bixîne, mehdedayî û lawaz bike! Rojekê ji rojan bavê wî jê re got: “Xêr e kurê min, çima tu wisa roj bi roj lawaz û rûzer dibî?” Şerker jê re got: “Bavocan, her ku ez dibînim tu bi xwişk û birê min re mijûl dibî û bi wan dadikevî, zikreşî û dixseke min li himberî wan çêdibe, ez di-tirsim ku ev zikreşiya min zêdetir bibe û wan bi min bide kuştin û ji ber wê kujeriyê jî tu jî min bikujî. Loma wisa xwîn ji rûyê min kişiyaye û ez hejar bûme. Vêca ez dixwazim ku tu bi wê comerdiya xwe kelehêkê ji kelehên xwe bidî min ku ez temenê xwe yê mayî li wê derê biqedînim. Çawa ku pêşiyên me jî gotine; dûrbûna ji hezkiriyên çêtire, lewre ne çav dibînin û ne jî dil diêşe.” Dûvre serê xwe bera ber xwe da û bêdeng bû.

Gava Qral Omer en-Nûman ev gotin ji devê kurê xwe bihîstin, tê gihîşt ku derdê wî çî ye û çima wisa bi serê wî hatiye. Hebekî li ber dilê wî çû û hat û jê re got: “Daxwaza dilê te çî be, dê ew bibe kurê min. Di nav mulkên min gişî de, keleha herî mezin keleha Şamê ye. Hema ji niha ve ew ya te jî.” Piştî gazî mîr û mîrekan kir, şahid û kâtip anîn û di huzûra gişan de ferman da ji bo binîvîsinin ku kurê wî Şerker bûye walîyê Şamê. Dûv re gazî Dendanê Wezîr kir ku ew jî pêre here û berpirsiyariya siyasî bigire ser xwe.

Piştî Şerker xatir ji bavê xwe û mîr û gizîran xwest û li gel leşkerên xwe kete rê de û meşîya çû, heta ku gîha Şamê. Dema gîha wê derê, xelkê Şamê jî bi merasîmeke biheybet, bi kêf û eşqeke mezin ew pêşwazî kirin; bi def û zurne û dîlan.

Em dîsa vegerin cem Omer en-Nûman. Piştî çûna Şerker bi demekê, hekîm û zanayên qesrê hatin cem wî û jê re gotin: “Qralê me yê birûmet, keç û kurê te têra xwe fêrî wêje û zanîne bûne. Wê kêliyê, kêfa Qral Omer en-Nûman pir hat û ji bo wê jî gelek xêr û bêr bi ser wan hekîm û mamosteyan de barand û xelat li wan belav kirin. Lewre kurê wî Şewqa Mekan mezin bibû, çarde sal li pey xwe hiştibûn, fêrî siwarbûna hespê bibû, meyla wî bi ser ol û îbadetê ve diçû û ji xizan û zana û hafizan hez dikir. Xelkên Bexdê jî bi jin û mêrên xwe ve jê hez dikirin.

Rojekê kerwanê hecciyên ku berê wan li Mekkeya Şerîf bû, di Bexdê re derbas bûn û çavên Şewqa Mekân lê ket, dilê wî xwest ku ew jî biçê heccê. Rabû derbas bû cem bavê xwe û jê re got: “Ez hatime destûrê ji te bixwazim ji bo ku ez biçim heccê.” Bavê wî nehîşt û jê re got: “Xwe ragire hetanî sala bê, ez û tu em ê bi hev re biçin heccê.”

Gava Şewqa Mekân dît wê mijar dûdirêj bibe, derbasî cem xwişka xwe

Seyrana Zeman bû, dît ku ew di ser nimêjê de ye, xwe li bendî wê ragirt hetanî nimêja xwe qedand, piştîre jê re got: “Daxwazekî pir mezin di dilê min de çêbûye ku ez biçim heccê û gora Pêxemberê Ummetê ziyaret bikim, lê mixabin bavê min destûr neda min. Çare ew e ku ez hinek dirav bi xwe re bibim û bi dizî herim, bêyî ku ez bavê xwe jê agahdar bikim.” Xwişka wî jê re got: “Tu bi qedrê Xwedêkî min jî bi xwe re bibe û min mehrûm neke jî dîtina gora Pêxember.” Şewqa Mekân jê re got: “Çawa ku tarî ket erdê, di vir re derkeve û kesî agahdar neke.”

Çawa ku şev kete erdê, Seyrana Zeman rahişt hineke dirav, kincên xortan li xwe kirin û derket. Ew û Şewqa Mekân di heman temenî de bûn. Birê wê deveyên xwe jî berê ve amade kiribûn. Ew li yekê siwar kir, wî jî xwe avêt ser hodeca yeke din, lê siwar bû û meşiyar, çûn tev li kerwanê heccîyan bûn. Meşa xwe wisa berdewam kirin û Xwedê jî wan re li hev anî ku bi saxî û selametî gihan Mekkeya Şerîf, derketin serê Girê Erefeyê û pêdiviyên heccê hemû pêkanîn, dûra çûn ser gora Pêxember eleyhîssalam jî.

Piştîre nêt kirin ku bi kerwanê heccîyên Îraqî re vegerin welatê xwe. Lê di wê kêlikê de Şewqa Mekân jî Seyrana Zeman re got: “Xwişkê ez dixwazim biçim Qudus a pîroz û gora Îbrahîm eleyhîssalam bibînim.” Xwişka wî jê re got: “Ez jî dixwazim wêderê bibînim.” Herduyan li hev kirin û çûn jî xwe re du deveyên bihodec kirê kirin, amadekariyên xwe temam kirin û bi kerwan re ketin rê de. Hîna di şeva pêşî de xwişka wî ta girt û nexweş ket. Lê zû bi ser xwe ve hat, baş bû. Piştîre ew jî nexweş ket. Xwişka wî pê ve mijûl bû û hewl da ku dilê wî xweş bike. Dûra meşa xwe berdewam kirin hetanî gihan Qudsê. Lê her ku diçû nexweşiya wî lê girantir bû, bedena wî lawaz û bêtaqet dibû; wisa berdewam kir hetanî ku ji dest xwe çû. Seyrana Zeman pir xemgîn bû bi vê rewşa birê xwe. Ew bir xanekê û li ber wî rûnişt, xizmeta wî kir û li bende başbûna wî ma. Lê şûna başbûnê, her ku diçû rewşa birê wê xerabtir dibû. Malê xwe giş li ser xwe û wî xerckir hetanî ku derhem tenê jî pê re nema. Rabû gazî kurikekî xizmetkar ê di xanê de kir û perçeyek jî qumaşê xwe dayê, kurik çû ew firot û çend dînarên heqê wî jê re anîn, ew jî li ser birê xwe kirin, xerc kirin. Piştîre perçeyekî din û yekî din jî firot. Bi wî hawî tiştên li ba xwe firotin heta ku ji tejiyekê pê ve tiştek di dest de nema. Li ser wî halê xwe giriya û jî xwe re got: “Emrê min jî Xwedê re!” Piştîre birê wê jê re got: “Xwişkê ez his dikim ku ez baş bûme û dilê min diçe goştê biraştî.” Wê jî jî birê xwe re got: “Bi Xwedê birawo tutişt di destê min de nemaye. Lê bi xêr û selamet, sibe ez ê biçim maleke mezinan, jî wan re xizmetê bikin, çend derheman bi dest bixim û ez ê xwe û te pê xwedî bikim.” Qasekî din jî fikirî û axaftina berdewam kir got: “Pir zora min diçe ku ez te di vî halî de bihêlim û herim, lê belê ez mecbûr im wisa bikim jî bo ku em jiyana xwe berdewam bikin.” Birê wê jê re got: “Û piştê wê serbilindiyê

tê biçî nav perîşaniya xizmetkariyê? Lahewle qûwete îlla billah!” Di pey re giriya, xwişka wî ji giriya û jê re got: “Birawo em xerîb in li vir, ev bû saleke me û hîna kesî li deriyê me nedaye, ma qey em ji birçîna bimirin? Tu çare nayê bîra min ji xeynî ku ez herim xizmetê ji hinekan re bikim û xwarinekê deynim ber te ji bo ku tu ji vê nexweşiya xwe pak bibi û em bikaribin dîsa vegerin welatê xwe.”

Nêzîkî katjimêrekê giriya, piştî rabû ser xwe, perçeyekî ebaya xwediyê deveyan-ku li cem wan ji bîr kiribû-li dora serê xwe gerand, eniya birê xwe maçî kir, ser wî nuxumand û bi girî ji cem wî derket, bêyî ku bizanibe bê bi ku ve diçe. Birê wê hetanî êvarê li hêviya wê ma, lê ew nehat. Şev borî, sibeh hat, dîsa jî nehat. Bi wî hawî, du rojan li hêviya wê ma, lê xwişka wî venegeriya. Dilê wî lerizî û birçîbûnê ew dorpêç kir. Ji odeya xwe derket û gazî sîpeyekî xizmetkar ê xanê kir û jê xwest ku rahêje wî û wî bibe sûkê. Sîpe rahiştê û ew bir, avêt sûkê. Xelkê Qudsê lê hatin hev û bi ser de giriyan ji ber wê rewşa wî. Hinekan ji wan gotin: “Ka xwarinekê jê re bînin.” Rabûn çûn ji taciran çend derhem kom kirin û hinek xwarin pê kirrîn, dane wî û rahiştênê ew birin hundurê dikanekê, piştî ku bin wî raxistin û misînekî avê danîn ber serê wî.

Gava ku şev hat, xelkên li derdora wî giş bela bûn, çûn malên xwe li gel xem û derdên wî. Nivê şeve, xwişka wî hat bîra wî, êşa ser dilê wî girantir bû û mehdê wî qut bû ji xwarin û vexwarinê û ji ser hişê xwe çû. Xwediyên sûkê, bêhtirî sîh derhemî ji taciran kom kirin û bi wanan jê re deveyek kirê kirin û ji xwediyê deve re gotin: “Vî ciwanî bar bike, wî bibe Şamê û bavêje bîmaristanekê belkî ji nexweşiya xwe pak bibe.” Wî jî got: “Ser seran, ser çavan.” û di dilê xwe de ji xwe re got: “Ez ê çima wî bibim û ew li ber mirinê ye?” Piştî ew bir û ma li bendî şevê. Gava ku şev hat, ew bir û ew avêt ser xweliya tifika hemamekê û bi rêya xwe de çû.

Dema ku bû sibeh, tifikvanê hemamê ji mala xwe derket û berê xwe da karê xwe. Hat, dît yekî li ser piştê dirêjkirî li wê derê ye. Di nava xwe de got: “Ma qey cî tunebû ku mirî bavêjin vê derê?” Pê re jî nigê xwe lêda. Gava ku nigê xwe lêda, wî xwe tevda! Tifikvan pê de qîriya û got: “Hema hûn piçek heşîş dixwin û li ku be jî hûn xwe davêjin erdê.” Piştî li rûyê wî meyzand, dît ku ciwanekî nûhatî û pir spehî ye. Dilê wî pê şewitî û tê derxist ku nexweşekî xerîbe. Ji xwe re got: “Lahewle wela quwete îlla billah, ez çawa ketim gunehê vî ciwanî û pêxemberê me em şîret kiribûn ku em qedrê xerîban bigirin û bi taybetî jî yên nexweş ji wan!” Piştî rahiştê, ew bir mala xwe û jina xwe şîret kir ku pê ve rabe û cihekî jê re raxîne. Jinikê doşekê jê re danî û balîfek da ber serê wî. Piştî avek jê re germ kir, dest û nigên wî, dev û rûyê wî şuştin. Tifikvanê hemamê jî derket, çû sûkê jê re

hinek şekir û ava gulan anî; hinek li ser çavên wî kir û hinek jî şekir tê de heland û dayê, pê da vexwarin. Şalekî paqij jî jê re anî, lê kir ku êdî bêhna rehetiyê jê dihat. Wê gavê Şewqa Mekan jî bi ser xwe ve hat û rabû pala xwe da balifê. Tifikvan pir kêfxweş bû bi wê yekê û got: “Şikir ji Yezdanê dilovan re ku ev kurik dîsa sax kir! Xwedêyo ez xwe tavêjim te ku tu vî kurikî li ser destê min rehet biki!”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navberek da vegotina çîroka xwe.*

## ŞEVA ŞÊST Û DUYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar! Vêca ew Tifikvan sê rojan pê re mijûl bû, ava şekir, ava xel û ava gula dayê, bi dilovanî lê meyzand û pê dilşad bû hetanî ku rehetî di rehên wî de geriya, laşê wî zindî bû û çavên xwe vekirin. Carekê Tifikvan hat derbasî cem wî bû, dît ku rûniştîye û bi ser xwe ve hatiye; jê re got: “Niha tu çawa yî, kurê min?” Şewqa Mekân got: “Ez baş im.” Tifikvanê hemamê dîsa şikir ji Xwedayê xwe re kir û rabû ser xwe çû sûkê, jê re deh mirîşk kirin û hat ji jina xwe re got: “Rojê du heban jê re serjêbike, yekê sibehê û yekê jî êvarê.” Jinikê rabû yek jê re serjêkir, ew perritand, çermê wê di ser re anî ew pijand û anî da wî. Şewqa Mekân jî goştê mirîşkê xwar û merga wê vexwar. Jinikê ava germ jê re anî, wî jî destên xwe şuştin û serê xwe danî ser balifê, pal da. Jinikê lihêfek bi ser dakir û ew jî raket, hetanî esir. Piştî jinik rabû mirîşka din jî jê re serjêkir, pijand, goştê wê jihevexist, danî ber wî û jê re got: “Bixwe kurê min.” Hîna ku wisa wî dixwar, mêrê jinikê hat û li ber serê wî rûnişt û jê pirsî, got: “Vêca niha tu çawa yî kurê min? Rewşa te baş e?” Şewqa Mekan got: “Şikir ji Xwedê re ez baş im, Xwedê xêra te binîvisîne!”

Tifikvan kêfxweş bû bi wê yekê û çû şirûba mor a nava gulan jê re anî û dayê ji bo ku vexwe. Tifikvan ê ku rojane bi pênc derhemî di hemamê de dişuxulî rojê derhemek dida bi mirîşkan, je re tanî û pê dadiket, pê re mijûl dibû hetanî ku mehek di ser re derbas bû û tendurustiya wî vegeriya, şopên nexweşiyê jê dûr ketin. Di encamê de Tifikvan û jina xwe pir kêfxweş bûn bi rehetbûna Şewqa Mekan û jê re got: “Kurê min, gelo tu bi min re nayê, em biçin hemamê?” Got: “Belê.” Rabû çû sûkê, jê re kerek kirê kir, anî ew lê siwar kir alîkariya wî kir hetanî ew gîhand hemamê ew derbasî hemamê kir, da rûniştandin û dîsa çû sûkê; jê re beşkir, sabûn anîn û dest pê kir, bi lûfik laşê wî şuşt. Di wê navberê de berberê ku begê hemamê ew şandibû, derbasî hundur bû û dît ku Tifikvan nigên Şewqa Mekan dişo. Berber jê re got: “Ev neheqî ye, ji xwe karê te heye, hewce nedikir ku begê me vî karî jî bi te bike.” Tifikvan got: “Jixwe qencyên begê me li ser me pir in, em çi bikin jî

kêm e.” Berber porê Şewqa Mekan kur kir, piştire wî û Tifikvan jî xwe şûştin.

Piştire Tifikvan ew vegerand mala xwe, şal û kincekî bedew lê kir, şare-ke xweşik li dora serê wî gerand û kembereke baş jî li newqa wî. Jina wî jî du mirîşk serjêkiribûn û goştêkî xweş amade kiribû. Vêca gava Şewqa Mekan amade bû û bi wî halê xwe yê lihevhatî hat, li ser doşekê rûnişt, Tifikvan pê ve rabû, jê re şekir heland di nav ava gulana de û dayê, piştire jî ew dawetî ser sifrêya xwarinê kir û hêdî hêdî goştê mirîşkê jî hev xist û da ber wî hetanî ku têr xwar. Piştire, Şewqa Mekan destê xwe şûştin, şikir ji Xwedayê xwe re kir û ji Tifikvan re got: “Xwedê tu ji min re şand û nexweşiya min li ser destê te rehet kir.” Tifikvan got: “Dev ji van gotinan berde û ka ji me re bibêje bê tu ji ku deverêyî û tu çawa hatiye vî bajarî, lewre ez elametên esaletê di rûyê te de dibînim!” Şewqa Mekan jê re got: “Ka destpêkê tu ji min re bibêje bê tu çawa li min rast hatiye, piştire ez ê çîroka xwe ji te re bibêjim.” Tifikvan got: “Eva han basît e; şeveqê gava ku min berê xwe da kar, min bala xwe dayê ku tu li erdê dirêj kirîyê di nav tirafa tîfika hemamê de. Min jî tu ji wir anî malê û hew. Çîroka dîtina min ji te re hemû ev e.” Şewqa Mekan got: “Subhan ji wî re, ew ê ku hestîyan ji nû ve vejîn dike! Kekê min ê delal, welehî te qencî bi xwediyê wê kirîye û tu dê encama vê qencyê jî bigirî.” Hilmek kişand û bi pîrsekê axaftina xwe berdewam kir, got: “Gelo ez niha li kîjan welatî me?” Tifikvan jê re got: “Tu li bajarê Qudûsê ye.” Wê keliyê xerîbiya Şewqa Mekan û veqetana wî ya xwişka wî hate bîra wî. Girîya hetanî ku surrê xwe ji Tifikvan re eşkere kir û serpêhatiya xwe jê re vegot. Piştire jî ev helbest got:

Di evîné de barek dane ser milê min  
Girantir bû ew ji hêz û taqeta min  
Ji bo wan ew qedere hate serê min  
Gelo dûr ketine hûn ji dilbêriyên min  
Tenik bû û pîr êşiya piştî wê ev dilê min  
Ji bo awirekê be jî iznê bidine min  
Da ku kêm bibe hinekî ev êşa min  
Min sebir xwest ji te ey dilê min  
Te jî got sebir ne ji adeta min e dilê min

Pêre jî kûrekûra wî dirêj kir û giriyê wî zêde bû. Tifikvan jê re got: “Megrî, şikir ji Xwedê re ku tendurustiya te li te vejeriya û êdî va tu li ser xwe yî.” Şewqa Mekan, jê re got: “Gelo em çiqasî dûr in ji Şamê?” Tifikvan got: “Bi qasî meşa şeş rojan.” Şewqa Mekan got: “Gelo tu dikarî min bişînî wir?” Tifikvan got: “Begê min ez ê çawa bihêlim ku tu bi tena serê xwe biçî û tu sîpeyekî nûhatî yî! Heger tu bixwazî biçî Şamê, ez ê te bibim wir û heger jina min nebêje na, ez ê wê jî bi me re binim, da ku em jî li wir bimînin. Lewre ez qet naxwazim ji te veqetim.”

Piştire, Tifikvan li jina xwe zîvirî û jê re jî got: “Gelo tu dixwazî bi min re werî Şamê, ango li vir bimîni hetanî ku ez mîrzayê xwe bigihînim wir û dîsa li te vegerim? Lewre ew dixwaze here wira û destê min lê nagere ku ez wî bi tenê bişînim, ji bo wî ez ditirsim ji ber eşqiya û rêbiran.” Rabû jina wî jê re got: “Ez jî dixwazim bi we herduyan re werim.” Tifikvan got: “Şikir ji Xwedê re ku em hemfikir in di vê mijarê de.” Rabû çû mal û mulkê xwe û yên jina xwe firot, kerek ji sûkê kirrî, anî Şewqa Mekan lê siwar kir û hersê bi hev re ketin rê de. Piştî rêwîtiya şeş rojan gîhan Şamê û ber êvarê derbasî nava bajêr bûn, li xanekê peya bûn. Tifikvan çû sûkê hinek xwarin û vexwarin kirrî û hat, pênc rojan bi wî hawî man. Piştî deh mehan, jina Tifikvan nexweş ket û di nava çend rojekî de çû ber dilovaniya Xwedê. Ew jî pir xemgîn bû li ser wê û êşeke mezin li pey wê kişand. Gava Şewqa Mekan dît ku xemgîniya Tifikvan kûr e li ser jina wî, vegeriya û jê re got: “Xemgîn mebe, em ê hemû di wî derî re derbas bibin.” Tifikvan serê xwe rakir û lê vegerand, got: “Xwedê xêra xwe li te bike, kurê min. Ew e yê ku şûna wendahiye me dadigire û xemgîniyê ji dilê me derdixe. Vêca kurê min, tu dikarî me derîni derve da ku em bêhna xwe derxînin bi temaşekirina Şamê?” Şewqa Mekan got: “A herî rast jî ew e.”

Tifikvan rabû ser xwe, destê xwe xist ê Şewqa Mekan û derketin, di tengala hev de meşiyar hetanî ku gîhan nêzîkî penavekê. Li wê deverê li kerwanekî deveyan rast hatin ku barkirî bûn bi sindoqên caw û qumaş û merş û xalîçe û gelek tiştên din li gel hesp û mihînen zînkirî, kole û cariyên xemilandî û gelek mal û mulk. Xelk jî bi xirûcir bûn li dorê diçûn û dihatin û bi baldarî temaşe dikirin. Şewqa Mekan got: “Gelo ew mal û deve û qumaş giş ên kê ne?” Piştire heman pirs ji hinek xulaman kir, wan jî jê re got: “Ev diyariyên emîrê Şamê ne ku li gel baca wîlayetê dişîne ji qral Omer en-Nûman re.” Gava ku Şewqa Mekan ew gotin bihîstin, şewq ji çavên wî çû, tijî hêsir bû û wî jî di ber xwe de got:

Em gazinan ji xelkê bikin em ê çawa bikin  
 Em di nava bêriyê de biqewirin em ê çawa bikin  
 Ango em li qasidinan rast werin ku werger bikin  
 Û van daxwazên evîndaran jî bilêv bikin  
 An jî em xwe ragirin gelo û sebir bikin

Piştire hilmek kişand û dîsa berdewam kir û wiha got:

Ey evîndarê wenda ji ber mijankên min  
 Tu di nav dilê min de ye her dem  
 Lê ne sal te didin jibîrkirin ne jî bêrî  
 Heger Xwedê rojekê me bigihîne hev  
 Ez ê hesreta xwe bişkînim bi goftûgoyekê

Piştî ku Şewqa Mekan ew helbesta xwe qedand dîsa girîya û hêsirên xwe rijandin. Tifikvan jê re got: “Kurê min, me bawer nedikir ku tu ji nexweşiya xwe pak bibî, niha jî tu digrî. Dilê xwe xweş bike û megrî, ez di-tirsim ku nexweşiya te dîsa li te vegere.” Dûvre li ber dilê wî çû û hat, dilê wî xweş kir, henek pê re kirin da ku bêhna wî fireh bike. Şewqa Mekan jî bêhna xwe berdida û keser dikşandin li ser xerîbiya xwe û veqetana ji xwişka xwe. Herî dawî jî ev çend beyt gotin:

Barê xwe hilgire, tê bar bikî ji vê dinyayê  
 Bawer bikî ku mecal nîn e dê mirin were  
 Xweşiya te ew e li vê dinyê pozbilindî û bêrî ye  
 Aşiq û hevrêyê te jî neçarî û negergazî ye  
 Ev e dinya şûneke mêvanî û rêwî ye  
 Bi şev bibe mêvan li ba te sibehê ew rêwî ye

Bi van beytan re, Şewqa Mekan dîsa dest bi girî û wêlê wêlê kir ji ber xerîbiya xwe. Tifikvan jî pê re bû heval û li ser jina xwe giriya. Lê belê mijûliya xwe jî berdeham kir bi Şewqa Mekan re, hetanî ku tîrêjên beyanê lê dan û bû sibeh. Gava ku roj derket, Tifikvan li Şewqa Mekan zîvirî û jê pirsî, got: “Qey welatê te hatiye bîra te?” Wî jî got: “Belê, welatê min hatiye bîra min û êdî ez nema dikarim li vir biminim. De êdî bi xatirê te, ez ê bi vî kerwanî re herim welatê xwe.” Ê Tifikvan jî jê re got: “Ezê jî bi te re bêm, ez nikarim ji te veqetim. Min qenciyeke bi te kiriye û ez dixwazim vê qenciya xwe bibim serî.” Şewqa Mekan got: “Xwedê xêra te binivîse.”

Şewqa Mekan pir kêfxweş bû bi wê biryara Tifikvan ê ku di cî de çû kerek kirî, xurcikek lê kir û têra xwe zad û qût jî rakir û piştê ji Şewqa Mekan re got: “De êdî li kerê siwar be, gava tu aciz bibî jî tu dikarî peya bibî û bimeşe.” Şewqa Mekan got: “Xwedê ji te razî be û ji min re jî alîkar be da ku rojek were ez bikaribin bersiva vê qenciya te bidim.” Şev kete erdê, wan jî kerê xwe bar kirin û bi kerwan re ketin rê de.

Vêca em veqetin ser rewşa xwişka wî Seyrana Zeman. Ew jî gava ku ji birê xwe veqetiya û ji wê xana ku lê diman li Qudsê derket, piştî ku ebayek li xwe gerand, ji bo biçê li cem yekî bixebite, xizmeta wî bike û bi wan diravên ku qezenc bike jî hinek goşt ji birê xwe re bikire; bêçare bi rê de giriya, bêyî ku bizanibe wê bi ku ve biçê. Ji alîyekî ve hişê wê li ser birê wê bû û ji alîye din ve jî, dilê wê bi ser xwediyên wê û welatê wê ve bû. Xwe sipart Xwedê, bê navber dua kirin û pê re jî ev beyt di ber xwe de gotin:

Dîn bûye tarîdinya û êşa bêriyê jî seqem e  
 Livand bi xwe re vê bêriyê hemû eşên min  
 Bêdeng kiriye êşa vê firqetê hinavên min  
 Ev çi bêrî ye ku bi dizî tune dike min



Xemgînî dixê qelaqê û bêrî jî disojîne min  
 Hêsirên min jî eşkere dikin razên evîna min  
 Lêbelê rê li ber min nînin ku ez xwe bigihînim te  
 Ji bo ku rabin ev kul û derd û xem ji ser dilê min  
 Agir di dilê min de rivîn dide her pêketiye ew  
 Bi pêtên xwe dihelîne hemû berf û seqem  
 Ey ew ê ku loman ji min dike di vî halî de  
 Bi qasî ayetên pîroz min xwe lê ragirt di dil de  
 Sed sond û peyman be li min ez qet ji bir nakim  
 Dizanî tu ku evîndar nagerin qet li mehneyan  
 Ey şeva reş vebêje evîné û ragehîne bo wî agahan  
 Şahid be bo min ku xew neketiye van çavan

Di pey wê yekê re, Seyrana Zeman meşa xwe berdewam kir, li çep û rastê xwe nêrî û bi pêş de çû. Di wê navberê de kalemêrekî koçer li gel pênc Ereben din di wir re derbas bûn. Kalemêr li Seyrana Zeman meyzand, dît ku keçeke xweşik e û ebeyeke perpîtî lê ye. Di dilê xwe de got: “Ev keçik spehî ye, lê belê xizan xwiya dike. Lê ew ji vir be jî, xerîba vir be jî ez ê wê bi dest xwe bixim!” Hêdî hêdî da dûv wê û ew şopand, hetanî ku ket rêyeke teng de. Wê gavê gazî wê kir, li halê wê pirsî û jê re got: “Keçkoka delal, gelo tu yeke hur e yan cariyeya hinekan î?” Çawa ku ev gotina wî bihîst, Seyrana Zeman lê meyzand û jê re got: “Tu bi qedrê Xwedêkî, birînen min nû neke û êşa min kûr neke.” Kalemêr jê re got: “Şeş keçên min hebûn, pênc ji wan mirin û ya biçûka wan bi tenê maye li malê. Loma min xwest ku ez ji te bipirsim bê ka gelo tu ji vî bajarî yî yan xerîba vir î, da ku ez te bibim cem wê û ew jî sebra xwe bi te bîne û her pênc xwişkên xwe ji bîr bike. Û heger kesî te tunebe, ez ê te bikim mîna yekê ji wan û tê jî bibî yek ji ewladên min.”

Gava ku Seyrana Zeman ew gotina wî bihîst, di dilê xwe de, got: “Dibe ku ez ji xwe re ewlehîyekê li cem vî kalemêrî bibînim.” Ji şerman serê xwe bera ber xwe da û jê re got: “Apocan, ez keçeke xerîb im û birayekî min ê nexweş heye. Ez ê bi te re bêm, bi şertê ku ez bi roj li ba te bim û bi şev vegerim cem birê xwe. Vêca heger tu şertê min qebûl bikî, ez ê bi te re bêm, lewre ez keçeke xerîb im. Ez berê ji maldaran bûm û niha jî ez bûme ji xizanan. Ez û birayê xwe, em ji Hîcazê hatine vir û ez ditirsim ku birê min cihê min nasneke.” Gava ku kalemêrê koçer ev gotinên wê bihîstin, di nava xwe de got: “Ez gîham armanca xwe!” Piştî jî keçikê re got: “Jixwe tiştê ez jî dixwazim ev e ku tu bi roj sebra keça min bînî û bi şev jî biçe cem birê xwe. Heta heger tu dixwazî, wî jî bîne mala me.”

Kalemêrê koçer xweşkirina ber dilê wê berdewam kir bi gotinê şêrîn hetanî keçikê qebûl kir ku xizmeta mala wî bike. Da pêşiya wê û meşiya, wê jî da dûv. Kalemêr, berê xwe dabû cem hevalên xwe yên ku deve amade di-

kirin û barên wan li wan dikirin li gel zad û av û xwarina rêwîtiyê. Lewre ew rêbirekî xayîn bû û xwediyê fen û fûtan bû, ne kurên wî hebûn, ne ji keçên wî. Ew gotinên wî tevde derew bûn, tenê ji bo keçikê bixapîne wisa gotibû.

Kalemêr bi keçikê re axivî û ew mijûl kir hetanî ji bajarê Qudsê derketin û gîha cem hevalên xwe yên ku deveyên xwe giş amade kiribûn. Kalemêrê Koçer, li deveyekê siwar bû, keçik jî li pişt xwe siwar kir û şev pê de meşiyar. Seyrana Zeman, têgihîşt ku gotinên kalemêr derew bûn û bi armanca xapandina wê bûn. Giriya di ber xwe de û wêlewêl pê ket di wê rêya ku berê xwe dabûn çiyar, ji tirsar ku kes wan bibîne. Berê sibehê ji deveyan peya bûn, kalemêr hat cem Seyrana Zeman û jê re got: “Bajarvanîyê, ev çi girî ye? De binêr bi navê Xwedê, heger tu dev ji girî bernedî, ez ê li te bidim heta ku tu bimri! Bajarîka heram!” Seryana Zaman jî jê re got: “Ey kalemêrê xerabîye û dojhê, ez ê çawa li te ewle bibim û tu wisa min dixapîni?” Gava Kalemêr ev gotina wê bihîst, jê re got: “Bajarîka heram, qey zimanê te ewqasî dirêj e ku tu bersivê didî min?” Piştê pê ve rabû û bi qamçiyar lê da û jê re got: “Heger tu bêdeng nebî, ez ê te bikujim!” Seyrana Zeman bêdeng bû, di birê xwe de fikirî, di nexweşiya wî de û bi dizî di ber xwe de giriya.

Roja dîtirkê, li Kalemêrê Koçer zîvirî û jê re got: “Te çawa ez xapandim ji bo ku tu min bînî nava van çol û çiyar û ji bo çi?” Çawa ku kalemêr ev gotinên wê bihîstin, har bû û jê re got: “Şermûta bajarî, qey zimanê te heye ku tu wisa bi min re diaxivî?” Destê xwe avêt qamçiyê xwe û bi nav piştê wê ket hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Keçikê xwe avêt ber nihên wî, herdu nigên wî maçî kirin, wî jî lêdan sekinand û dest bi sixêfan kir, jê re got: “Şermûta bajarî, de binêre bi heqê Tartûrî heger dengê giriye te were min, ez ê zimanê te jêbikim û bixim te de!” Wê gavê keçik bêdeng bû û bersiva wî neda. Êşiyabû ji ber lêxistinê, loma li qeleviska rûniştibû, serê xwe xistibû nav çogên xwe û ji xwe re difikirî li ser rewşa xwe û rewşa birê xwe, bê ka çawa ji hebûnê vegeriyabûn tunebûnê. Gava nexweşiya birayê xwe û tenêmayîna wî li xerîbîyê anî bîra xwe, hêsir ji çavan herikîn bi ser hinarkên wê de û dest pê kir, helbestek got:

Çerxa felekê geh li jêr e geh li jor e  
Ji kesî re nabe ev dinya her tişt bi dor e  
Dawîyek heye ji her tiştî re bêgûman  
Diqede ew temenê herkesî jî bêgûman  
Çiqas biêş û kul û derd im ji dil  
Wax û ax ji vê jiyana bi derd û kul  
Bextewar nekîr Xweda rojên serbilindîyê  
Ën ku vedişart di nav qermîçokên xwe de zul  
Hêvî û armancên min çû û bi bin ketin

Qutqutî bûn hemû yeko yeko ji hev ketin  
Ey qasidê ku rêya xwe bi xwedîmalan dixê  
Ji wan re bêje ku hêsirên min timî dibarin

Gava Kalemêrê Koçer ev helbesta wê guhdar kir, hestiyar bû û dilê wî lê hate rehmê, hebekî li ber dilê wê çû û hat, hêsirên wê paqij kirin, nanekî cehînî da destê wê û jê re got: “Ez naxwazim ku tu kes bersiva min bide di dema bêhtengiya min de. Tu jî bersiva min nede bi van gotinên zivir. Ez ê te bifiroşim zilamekî baş mîna xwe, ku qencîyê bi te bikî, çawa ku min jî bi te kir.” Keçikê got: “Bila be.”

Çaxê ku şev bihurî û birçîbûnê ew tengav kir, Seyrana Zeman hinek ji wî nanê xwe yê cehînî xwar. Nîvê şevê, Kalemêrê Koçer ferman da zilamên xwe ku bikevin rê de. Deveyên xwe bar kirin, ew jî li deveyekî siwar bû, keçik jî li pişt xwe kir û ketin rê de.

*Li Şehrezade bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe sekinand.*

ŞEVA ŞÊST Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar! Vêca çawa ku Kalemêr û zilamên xwe ketin rê de, sê rojan li ser hev meşa xwe berdewam kirin, hetanî ku gîhan Şamê. Li kêleka Babil Melîk, li Xana Essultan daketin. Seyrana Zeman a ku rengê wê hatibû guhertin ji westana rêwîtiyê û xemgînîya dil, dest bi girî kir. Kalemêrê Koçer hate gel wê û jê re got: “Bajarîka heram! Bi heqê navê Tartûrî, heger tu dev ji girî bernedî, ez ê te bifiroşim yekî Cihû.” Piştî rabû ser xwe, bi destê wê girt, ew xist hodecê de û berê xwe da sûkê; rêya xwe bi tacirên kole û cariyeyan xist û ji wan re got: “Cêrîk li cem min e, min ew bi xwe re anîye. Birakî wê jî heye nexweş e, min ew şandiye cem ehlên xwe li Qudsê, da ku wî rehet bikin. Nêta min heye ez wê bifiroşim, lê belê ji gava birayê wê nexweş ketiye, ew li ser digirî û pir xemgîn bûye li ser veqetana ji wî. Loma ez dixwazim ku yê wê ji min bikire, pê re nerm be û jê re bibêje; birê te li ba min e, li Qudsê. Ez ê jî buhaya wê jê re kêr bikim.” Wê keliyê tacirek rabû ser xwe û pirsî, got: “Temenê wê çiqas e?” Koçer got: “Keçek e gîhîştî û biaqil e, pir spehî ye û xwedî hişmendîyeke xwîrt e ku ji wêje û zanîstê jî biagah e. Lê ji gava ku min birê wê şandiye Qudsê xemgîn bûye, ketiye qelaqê, laşê wê hezhizî û xweşikbûna wê çûye.” Gava yê tacir ew gotin ji wî bihîstin, jê re got: “Binêre Kalemêr û Şêxê Ereban! Ez ê bi te re werim û vê cariyeya ku tu pesnê wê didî ji te bikirim û buhaya wê bidim te lewre tu pir pesnê xweşikbûn, zanebûn û hûnerên wê didî. Lê ez ê şertinan bidim ber te, heger te qebûl kir, ez ê pereyên wê bidim te, heger nabe jî, ez ê wê

li te veđerînim.” Kalemêrê Koçer jê re got: “Tu dixwazî wê derxîne huzûra Sultan û çî şertên ku tu dixwazî bavêje ber min. Ez texmîn dikim heger tu wê bibî cem Qral Şerker, kurê Qral Omer en-Nûman, Qralê Bexda û Xorasanê jî, dê dilê wî tenik bibe, wê biyecibîne û dê zêdetirî heqê wê bide te, tê qezenckeke mezin tê de biki.” Tacir jî jê re got: “Jixwe daxwazeke min jî ji Sultan heye ku nameyekê ji bavê xwe Omer en-Nûman re binîvisîne, da ku çavên wî li ser min bin. Vêca heger vê cariyeyê ji destên min bigire ez ê bi qasî giraniya wê diravan bidim te.” Yê Koçer got: “Min şertê te qebûl kir.”

Dûra herdu bi hev re meşîyan û hatin devera ku Seyrana Zeman lê bû. Kalemêrê Koçer deriyê hucreyê vekir û gazî wê kir, got: “Nacıye!” Lewre wî ew nav lê kiribû. Gava ku Seyrana Zeman dengê wî bihîst, giriya û bersiv nedayê. Koçer ji Tacir re got: “Eva ew li ber te ye, de êdî lê binêre û çawa ku min ji te re got, dilê wê xweş bike.” Tacir nêzîkî wê bû, dît ku pir spehî û lihevhatî ye û bi zimanê Erebi jî dizane. Tacir ji Koçer re got: “Heger wek te gotiye xusûsiyetên wê yên din jî wisa bin, tiştê ku ez ji Sultan hêvî dikim, ez ê bi dest bixim. Li keçîkê zîvirî û jê re got: “Silav li ser te be keça hêja, tu çawa yî?” Seyrana Zeman lê zîvirî û got: “Ew di qedera min de nîvisandîbû.” Piştê li zîlam nêrî dît ku mirovekî bi rûyekî xweşik e û kamil xiyadike. Di dilê xwe de got: “Ez texmîn dikim ku ev hatiye min bikire! Vêca heger ez rû nedim wî, ez ê li cem vî zalimê Koçer bimînim ku dê bi lêxistinê min bikuje. Çi dibe bila bibe, bi kêmanî ev zilamekî rûgeş e û hêvî jê tene kirin, ne mîna vî Koçerê zivir e. Dibe ku hatibe aqil û zanîna min bikêle. Loma divê ez bersivin baş bidim wî.” Seyrana Zeman wisa bi xwe re diponijî û awirên wê di erdê de bûn. Serê xwe rakir û bi zimanekî şêrî got: “Silava Xwedê û qencên wî li ser te be jî mîrzayê min. Pêxemberê me eleyhîselam, wisa ji me xwestiye ku em bersivê bidin. Pirsê te ya di derbarê rewşa min de jî, heger tu dixwazî bersiva wê fêr bibî ez dikarim bêjim! Xwedê wî tiştî bi serê dujminê te de jî neyne!” Û bédeng bû. Gava ku tacir ev gotinên wê bihîstin, aqilê wî ji serî firîya ji kêfan. Li Kalemêr zîvirî û jê re got: “Keçeke bi rûmet e, buhayê wê çiqaseye gelo? Koçerê Kalemêr qeherî û jê re got: “Te hişê cariyeya min xera kir bi van gotinan! Tu çima dibêjî bi rûmet e, li gel ku ew kesên ji rêzê ye? Temam, ez wê nafroşim te.” Gava ku tacir ev gotin ji wî bihîst, tê derxist ku ew zilamekî kêmaqil e. Jê re got: “Dilê xwe rehet bike û bêhna xwe jî fireh bike, li gel vê qusûra wê, ez ê wê ji te bikirim.” Koçer jê re got: “Û tê çiqasî tê de bidî?” Tacir got: “Bav nav li zarokên xwe dikin, ka tu bibêjî bê tu çiqasî dixwazî!” Koçer got: “Ê ku bipeyive tu yî!” Tacir di nava xwe de got: “Ev zilam koçerekî serhişk û bêaqil e û ez jî nizanim bê buhayê wê çiqase ye. Lê belê vê keçîkê bi xweşikbûn û zimanşêrîniya xwe dilê min vekir û heger xwendin û nivîsandina wê jî hebe, dê nîmetek be ji bo wê û ji bo yê ku wê bikire. Lê belê ev Koçer jî buhayê wê nizane!” Dûv re lê veđerîya û got: “Şêxê Ereban, ez ê du sed dînarê kamil bidime te ji xeynî xelat û xerca

ser qanûna Sultan.” Kalemêr, qeherî bi vê gotina wî re û bi ser de qîrîya, got: “Rabe ser xwe biçê, lewre tu du sed dînarî bidî bi vê ebeya perpitî ya ser wê jî ez nadim te. Ez wê nafroşim, ez ê wê li cem xwe bihêlim, bela hevîr bistirê û here ber deveyan.” Di cî de jî gazî keçîkê kir û got: “Were vir genîka dera han, ez te nafroşim!” Dûv re li Tacir jî zîvirî û got: “Min digot belkî tu mirovekî zana yî, de binêr bi heqê navê Tastûrî, heger tu niha ji vir neçî, ez ê tiştin nexweş ji te re bêjim.” Tacir, di nava xwe de got: “Ev koçer dîn e û qîmetê wê nizane. Divê ez niha tişteki di derbarê heqê wê de jê re nebêjim, jixwe ku aqilê wî hebûya, nedigot bi heqê navê Tartûrî. Bi navê Xwedê ev keçîk pir hêja ye û buhaya wê bi qasî sindoqeke cewhera ye û ewqase dirav jî bi min re nin in, lê belê ku wîna hemû malên min bixwesta jî, min ê tê de bida.” Îca li Kalemêrê Koçer zîvirî û got: “Bêhna xwe fireh bike ey Şêxê Ereban û ka ji min re bibêje bê çiqase qumaşê wê li ba te heye?” Koçer got: “Û ev cariyeya hanê dê çi bike ji qumaşan? Jixwe ev ebaya li ser wê jî zêdeyî wê ye.” Tacir got: “Bi iza te be ez dixwazim perdeya ser rûyê wê rakim û lê binêrim, weke adeta hemû tacirên ku cariyeyan dikirin.” Ê Koçer jê re got: “Waye li ber te ye, Xwedê ciwaniya te bisitirîne! Hema tu çawa dixwazî wisa lê binêre, wê zikopiştî bike û heger tu dixwazî wê şilfitazî jî bike.” Tacir got: “Estexfirellah! Tenê ez dixwazim li rûyê wê binêrim.” Piştî, tacir nêzîkî wê bû û ket ber fediyê de ji ber spehîbûna wê. Jê re got: “Navê te çiye, xatûna min?”

*Wê gavê li Şehrazad bû sibe û wê jî dengê xwe birî.*

## ŞEVA ŞÊST Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar! Gava tacir ji keçîkê re got ‘navê te çiye xatûna min?’ wê lê vegerand û got: “Gelo tu li navê min ê kevn dipirsî, angî li navê min ê nû?” Wî jî pê re got: “Ma qey navekî te yê kevn û yekî nû heye?” Keçîkê got: “Belê, navê min ê kevn Seyrana Zeman e û yê nû jî Belqitiya Zeman e.” Gava ku yê tacir ev gotina wê bihîst, çavên wî tijî hêsir bûn û got: “Û birayekî te yê nexweş jî heye?” Wê got: “Erê willeh begê min, lê belê felekê em ji hev veqetandin û ew wisa nexweş li Qudsa Şerîf ma.” Tacir behetî ma ji ber wê axaftina wê ya ji kezebê û ji xwe re got: “Naxwe Koçero rast gotibû.”

Seyrana Zeman jî di wê kêlikê de pir hestiyar bû ji ber bîranîna birê xwe, nexweşiya wî, veqetana wê ji wî, hiştina wî di wî halî de û bêagahiya wê di derbarê wî û rewşa wî de. Dîsa tiştê ku bi serê wê de hat ji destê ev ê Koçer û dûrketina wê ji dê û bav û warê wê, hişt ku çavên wê bibin kaniyên hêsirî û bi ser hinarkên wê de bibarin. Keserî vedan û ev çend beyt jî gotin:

Tu li ku derê bî Xwedê te bisitirînî lo  
 Ey rêwiyê ku ji dil qutnabî to  
 Xwedê cîran be ji te re li ku dibî to  
 Biparêze te ji qeze û beleyan her ro  
 Tu çû û kulbêrî man di van çavan  
 Hêsir ji heyirî man di nava pirsan  
 Xweziya min her ew e cihe ku tu lê  
 Ku dibe bila bibe li vir an jî li wê  
 Dost û nasin ku ava heyatê vedixwin  
 Lê hebin û vexwarina min ji her hêsir bin  
 Xwedê zanî tu bêxewî anha li wê derê  
 Di nava lihêfeke agirîn de li ser doşekê  
 Ji xeynî firaqê her tişt hêsan e bi min  
 Ew tenê zor e pir zor e li ber dilê min

Gava tacir ev beyt ji devê wê bihîstin, girya û destê xwe dirêj kir ji bo ku hêsirên wê paqij bike. Lê belê wê berçavka xwe berda ser rûyê xwe û got: “Estexfirellah, begê min!”

Di wê kêliya ku wê ser çavên xwe girt ji bo yê tacir hêsirên wê paqij neke, Kalemêrê Koçer jî lê dinêrî, jê were ku ber wî digre û nahêle lê binêrê. Loma di cî de bi ser hîlbû û rişmeya deveyan a di destê xwe de li nav milê wê da. Lêdana wî ewqasî xurt bû ku hişt ew li ser dev bikeve erdê. Buxurekî ku ji erdê pekiya jî hat li birhûyê wê ket, birîndar kir û hişt ku xwîn bi ser çavan de were xwarê. Qîrîneke xurt pê ket, ji ser hişê xwe çû û giriya. Tacir jî pê re giriya û ji xwe re got: “Misoger divê ez vê cêryê ji vî zalimî bikirim, lew ku bi qasî giraniya wê ez zêran bidim jî.” Pê re jî sixêf ji yê Koçer re dan, heta ku keçik bi ser xwe ve hat, wê çaxê hêsirên wê zuha kir, xwîna ser çavên wê paqij kir û birîna wê girêda. Wê jî herdu destên xwe ber bi jor ve vekirin, dua ji wî re kirin û ev çend beyt gotin:

Dilovanî ji bo rûmetdareke tengav  
 Ku sertewandî bûye ji dil û hinav  
 Digirî û hêsirên dibarîne weke baran  
 Soz dide û dibêje bêfen e ev peyman

Piştî ku ew helbesta xwe got, li yê tacir zivirî û bi dengekî hêdî jê re got: “Tu bi xatirê Xwedêkî, min li cem vî zalimê xwedênenas nehêle. Ez baş dizanim ku heger ez îşev li cem bimînim, ez ê bi destê xwe xwe bikujim. Min ji vî xelas bike, bila Xwedê jî te ji xerabîyê vê dinyê û wê dinyê xelas bike.”

Tacir rabû ji Kalemêrê Koçer re got: “Ey Şêxê Ereban, eva hanê ne li gora te ye, bi buhaya ku tu dixwazî, wê bifiroşe min.” Koçer got: “Wê bibe û heqê wê bide min, nexwe ez ê wê bi xwe re bibim ji bo ku here ber deveyan

û bişkulên wan kom bike.” Tacir got: “Ez ê pêncî hezar dinarî bidime te.” Kalemêr got: “Bi rêya xwe de here.” Tacir got: “Heftê hezar dînar.” Kalemêr got: “Rêya te vekirî be, ev diravên ku tu behsa wan dikî, heqê nanê cehînî yê ku min daye wê dike nake, lewre bi nehse hezar dînar min nanê cehînî daye wê.” Tacir got: “Te û malbat û êla xwe, we tevan di seransera temenê xwe de bi evqase dirav nanê cehînî nexwariye. Gotineke min bi tenê heye, heger tu vê jî nepejirînî, ez ê giliyê te li cem qesrê bikim û ew dê bi zorê ji te bistînin.” Koçer got: “Beje!” Tacir got: “Ez ê sed hezar dînar bidim te.” Koçer got: “Min firot te bi vê buhayê, ez ê jî ji xwe re xwê bikirim bi van diravan.” Tacir bi wan gotinên wî kenîya û çû mala xwe, jê re ew dirav anîn û dan wî. Kalemêrê Koçer jî diravên xwe girtin û di dilê xwe de got: “Bêgûman divê ez herim Qudsê, belkî ez birê wê jî li wir bibînim û wî binim li vir bifroşim.”

Li deveyê xwe siwar bû û berê xwe da Qudsê. Giha wir, çû li wê xana ku birê wê lê bû, pirsî, lê belê ew li wir nedît.

Vêca em vegezin ser Tacir û Seyrana Zeman. Tacir çawa ku ew kirrî, cilin xwe lê kirin û keçik bir mala xwe.

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û navber dayê.*

## ŞEVA ŞÊST Û PÛNCÊMÎN

*Şehrezadê got:*

Vêca Şahê min ê bextewar, çawa ku Tacir ew keçik kirrî, kincin xwe lê kirin û ew bir mala xwe. Li malê kincên herî xweşik lê kirin, piştê ew bir sûkê, li wir jî tilî, dest û gerdena wê tijî zêr û cewher kirin, buxçikek ji atlas jî tijî kir da dest wê û jê re got: “Ev hemû jî ji bo te ne û ez tiştêkî tenê ji te dixwazim ku gava tu derketî raber Sultanê Şamê, tu wî agahdar bikî bê min tu bi çiqasî kirriye û ez çawa nêzikî te bûme û jê bixwaz ku nivîseke sultanî ji bo min binivîse ji bavê xwe Omer en-Nûman, qralê Bexdê re, da ku nehê-le tukes baca qumaşî ji min bistîne di ticareta min gişî de.”

Gava ku Seyrana Zeman ev gotina wî bihîst, girîya û li çogên xwe xist, wêlewêl pê ket. Tacir jê re got: “Xatûna min xêr e, çi heye gelo ku çi gava ez behsa Bexdê dikim hêsir ji çavên te dibarin, qey hezkiriyin te li wir he-ne? Heger ew kes tacirek an jî yekî din be bêje, ez hemû tacir û kesên wê derê nas dikim û heger tu bixwazî ez dikarim nameyên te jî bigihînim wî.” Keçikê got: “Wile tu nasdariya min bi tacir û maciran re nîne, lê naskirina min bi Qral Omer en-Nûman, xwedanê Bexdê re heye.” Çawa ku tacir ev gotina wê bihîst beşişî, pir kêfa wî hat û di dilê xwe de got: “Bi navê Xwedê ez giham armanca xwe!” Piştê jê re got: “Qey berê jî tu derxistibûn raber

wî ji bo firotinê?” Wê got: “Na wele, lê belê ez li ber destê wî mezin bûm. Ez keça wî bûm, ez delala ber dilê wî bûm û hezkirin û rêzdariyeke wî heye li himber min. Vêca heger karê te ketiye cem Qral Omer en-Nûman, kanî hibrê û kaxezê ji min re bîne, ez ê nameyekê ji te re binivîsim û gava ku tu çû Bexdê, tu bi destê xwe vê nameyê bide Qral Omer en-Nûman û jê re bêje ‘Xizmetkara te Seyrana Zeman felek û dewran lê geriya, hate firotin ji cihêkî ber bi cihêkî din ve û niha ji silavên xwe ji te re dişîne.’ Gava wî ez ji te pirsîm jî, jêre bêje ku ez li cem Sultanê Şamê me.”

Tacir li vê axaftina wê ya tijî aqil ma behetî! Hîn bêhtir ji wê hez kir û jê re got: “Ez nizamim bê çawa zilaman bi vî aqilê te lîstin û tu bi pereyan firotin! Gelo te Qurana Pîroz jî jiber kirye?” Seyrana Zeman got: “Belê, ez hikmetê, zanîna bijîşkî, mûqeddîmeya zanînê, şiroveya Beşên Ebûqirat, Calînosê zana û şiroveya wî jî dizanim. Min Tezkîre jî xwendîye, şiroveya El-Burhan û zargotinên Ebnîl Beytar jî, dîsa min şirove li ser El-Qanûn a Îbn-î Sîna kirîye, min sembol û remz ji hev vekirine û şeklên giyometrî bi cî kirine û ez li ser endezyariyê axivîme û min agahîyên di derbarê werzîşê de komkirine, dîsa min pirtûkên di derbarê Şafî de, ên hedîs û zimanzanîyê de jî xwendine. Ez bi zanyaran re ketime mûnazereyan de û di derbarê hemû zanîstan de ez axivîme û min berhem dane di zanista mentiq û ziman û cêdelê de û min Rûhanî û Elmîqatî jî nas kir û min ev zanîn hemû fêhm kirine.” Piştî berdeyam kir û got: “Kanî kaxez û hibrekê bide destê min, ji bo ku ez nameyekê ji te re binivîsim û bi te re bibe alîkar di rêwîtiya te de û zor û zehmetiyan ji pêşîya te rabike.”

Gava yê Tacir ew gotin ji devê wê bihîstin, qîr pê ket û got: “Wax wax wax! Xwezî bi wî ew ê ku tu di qesra wî de bî!” Piştî çû jê re kaxez û hibir anî danî ber û pênuşeke paxirî da destê wê û erd maçî kir di nav destê wê de, bi armanca nîşandana rêzdariyê. Seyrana Zeman rahişt kaxezê, pênuş hilda destê xwe û ev beyt nivîsandin:

Çima xeydîye xew ji çavên min  
 Te ew fêrî seherê kirin gelo dilê min  
 Birîna te agir berdaye kezêba min  
 Gelo giş wisa ne qedera evîndaran  
 Çiqasî zor in ev roj ka ew ên buhurî  
 Ew ên ku min çêj ji wan nedîtî  
 Ji bayê tikan dikim ew bêhnê tîne  
 Ji boy min an jî agahan bi xwe re tîne  
 Evîndarek ji te gazinan dike bêxwedî ye  
 Êşeke fûraqê pê re heye ku kevîran diderizîne

Piştî vê helbestê ev çend gotin nivîsandin:



Ji ew a ku fikaran ew dorpeçkiriye û xew lê herimîye û dinya lê tarî bûye ku nema şewqekê dibîne û ne jî roj û şevan ji hev derdixe. Xwe diqulubîne vî alî wî alî li ser nivîna fûraqê û çavên xwe kil dike bi tehliya ereqê (bêxewiyê) ku hîna jî rikeberiya stêrkan dike, hizr û raman wê diheline û ravekirina rewşa wê dûdirêj e, tu alîkar pê re nîn in ji xeynî ah û keseran û van beytan:

Çi gava ku bulbul dixwîne bi şeveqa sibê re  
Kujerê bêriyê jî dilive di nav dilê min de  
Bê bandor e hemû şahiyên kêfê li ser min  
Tenê zêde dikin ew xemgîniya dilê min  
Gazinan ji eşqê dikim li ber destê zulmê  
Ku pir caran ruhê min vediqetîne ji dilê min

Pêre hêsirên wê dîsa herikîn û ev beyt jî nivîsandin:

Mixabin evîne beleyek bi serê min de anîye  
Di rojeke biharî de veqetand mijank ji xewê  
Bedena min çûye bûye komeke gemarê  
Heger min gazî te nekira te ez nedidîtîm

Piştire, bi van gotinan nameya xwe qedand: “Ev nivîs, ji destê ya ku dûrî xizm û warê xwe ketiye derketiye, ya dilkovan û hinav biêş Seyrana Zeman.”

Dawî kaxez pêça û da destê Tacir. Wî jî rahişt kaxezê, ew maçî kir û lê meyizand, xwend û nas kir bê çi tê de nivîsandiye. Dilxweş bû û pir kêfa wî hat, mîna ku dinya giş bûbe ya wî û jê re got: “Subhan ji afrînerê rûyê te!” Û êdî hîn bêhtir qedrê wê girt û roj pê de pê mijûl bû. Gava şev hat ji malê derket û berê xwe da sûkê, çû jê re xwarinek anî dayê û piştire ew derbasî serşokê kir û jineke serşoker jê re anî û ji serşokerê re got: “Ggava ku te serê wê şûşt, kincên wê jî lê bike û piştire gazî min bike.” Wê jî got: “Ser seran, ser çavan.”

Tacir xwarina wê jî amade kir, danî ser sifreyekê, fêkî jî da ber, mûm pêxistin û sifre bir danî ber deriyê serşokê, li serê dikê bi cî kir. Gava ku jina serşoker ew paqij kir û kincên wê lê kirin, ji serşokê derket, dît ku xwarin jî amade kirîye li ser dikê. Wê û serşokerê bi hev re xwarin û yê mayîn jî ji nobedara serşokê re hiştin. Îca keçîk çû raket hetanî sibê, tacir jî li cihekî cûda raket. Gava ku ji xew şiyar bû, çû Seyrana Zeman jî ji xew rakir û çû jê re fistan û kofiyeke bi hezar dînarî û xeftanekî bi zêr neqîşandî anî, li gel pêla-veke ku bi zêrê sor û durr û cewheran neqîşandî. Guharin lûlû xistin guhên wê de ku bi buhaya hezar dînarî bûn û zincîreke zêrîn jî xist gerdena wê de ku bi ser sêngê de dadiket hetanî bi navîka wê. Di wê zicîrê de deh giroverk

û neh heyv hebûn ku di nava her heyvekê de jî perçeyekî yaqût hebû û di nava her giroverkê de jî perçeyekî belxeş hebû û buhaya wê zincîrê sê hezar dînar bû. Tiştên ku lê kiribûn bi giştî serweteke mezin dikir. Li dawî jî tacir ferman da wê ku xwe baş bixemilîne. Piştî da pêşiya wê, wê jî da dû wî û meşyan. Dema ku çavên xelkê pê ketin, behetî man ji ber spehîbûna wê û gotin: “Subhan ji wî afirînerî û xwezîya mirov bi ew ê ku xwediyê vê ye!”

Ew li pêş û keçik jî li dû wî, meşa xwe berdewem kirin hetanî ku derbasî cem Sultan bûn. Erda ber nigên wî maçî kir û jê re got: “Qralê min ê bextewar, min diyariyek ji te re anîye ku erjeng û bê timtêl e di vî zemanî de. Spehîbûn û qencîyê herduyan jî dike yek di şexsê xwe de.” Qral got: “Ez dixwazim bi çavên xwe bibînim.” Tacir çû ew anî, li ber wî da sekinandin. Gava Şerkerê Qral ew dît, xwîna wî bi ser xwîna wê de çû. Ew berê nedîtibû û ji dûr ve bihîstibû ku xwihek jê re çûbûye bi navê Seyrana Zeman û birayekî bi navê Şewqa Mekan û çawa ku me li jor jî da xwiyakirin, Şerker ji bavê xwe pir qeherîbû û ji Bexdê durketibû hatibû li Şamê bi cî bibû. Vêca gava ku yê Tacir keçik pêşkêşî wî kir, jê re got: “Ey qralê zeman! Li gel vê spehîbûna wê ya bê timtêl ku keçik mîna wê xweşik tunene di vî zemanê me de, hemû zanînen olî, gerdûnî, siyasî û metamatîkî jî dizane.” Qral jê re got: “Buhayê wê çi be bigire û bi rêya xwe de biçê.” Tacir got: “Ser seran, ser çavan, lê kanî bawernameyekê ji min re binivîse da ku ez nema baca uşrê bidim di ber tîcareta xwe de.” Qral got: “Ez ê wê bidim te, lê hela ji min re bibêje bê te ew bi çiqasî kiriye?” Tacir got: “Min ew bi sed hezar dînarî kiriye û sed hezar jî lê kiriye.” Gava ku qral ew gotin bihist, jê re got: “Ez ê ji ewqasî jî zêdetir bidime te.” Gazî xeznedarê xwe jî kir û jê re got: “Sê sed hezar dînarî bide vî tacirî û bîst hezarê din ji li ser, bila fêdeya wî bibe sed û bîst hezar dînar.”

Piştî Şerker gazî her çar qazîyan kir û ji wan re got: “Ez di şahidbûna we de vê cariyeya xwe azad dikim û ez dixwazim pêre bizewicim.” Her çar qazîyan nivîsa azadkirina wê nivîsandin, eqda zewaca wan jî danîn û misk û zêr belav kirin bi ser serê haziran de. Zarok û xizmetkaran jî zêrên ku qral bi ser wan de davêt kom dikirin. Qral bawernameyek ji wî tacirî re nivîsand ku ne baca uşrê ji ser tîcareta wî bê stendin û ne jî kes jê re bibe berbend, di seranserê welêt de. Li gel wê, xelateke salane jî da wî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina xwe.*

ŞEVA ŞÊST Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, wê gavê Qral Şerker emir da ku herkes ji wir bi-

ferrike here, ji xeynî her çar qazîyan û tacirî. Ji qazîyan re got: “Ez dixwazim hûn vê keçikê di ezmûnekê re derbas bikin da ku em bibînin bê gotinên vî tacirî çiqasî rast in û keçik çend beşên zanînan dizane.” Wan jî gotin: “Bila be.” Piştî perdeyek xist neqeba xwe û civata xwe ji aliyekî ve û ji aliyê din ve jî keçik û kes û karên pê re ku li wî aliyê perde man û hemûçikan dest û nigên wê ramîsan, piştî ku bû jina qralê wan. Dûra li der û dora wê çûn û hatin, xizmeta wê kirin û barê kincan ji ser wê sivik kirin; ji xwe re li bedewî û spehîbûna wê temaşe kirin. Di pey wê re, hemû jinên mîr û gizîran fêr bûn ku sultanê wan Şerker cariyek ji xwe re kirriye bi buhaya sêsed hezar dînarî ku kes weke wê xweşik û zana tune, jineke ku bi hemû ilmên wêje, civat û siyasetê dizane ku Sultan ew azad kiriye, mehra xwe lê birriye, her çar qazî anîne ji bo ku ezmûnekî li dar bixin û wê bidin ber pîrs û şîroveyan da ku asta zanîna wê eşkere bikin. Loma jinan destûr ji mîrên xwe stendin û çûn qesra ku Seyrana Zeman lê bû.

Dema derbasî cem wê bûn, dîtî ku xizmetkar li ber destê wê diçin û tîn. Gava dît ku jinên mîr û gizîran derbasî cem wê bûne, bi rêzdarî ji ber wan rabû, ew pêşwazî kirin û cariyeyên wê jî li pey wê rabûn ser xwe. Bi devlikenî hemû li cihên wan dane rûniştandin, mîna ku bi wan re mezin bûbe. Hemû li xweşikbûna wê û aqilê wê, li terbiye û nezaketa wê behetî man û ji hev re gotin: “Ev a han ne cariyeye, ev banû keça şahbanûyan e.” Îcar wan jî qedrê wê pir girtin û jê re gotin: “Xatûna me, te bajarê me ronî kir û te welatê me rûmetdar kir, welat welatê te ye û qesir qesra te ye û em giş jî cariyeyên tene. Vêca tu bi qedrê Xwedêkî me mehrûm neke ji qenciya xwe û spehîbûna xwe.” Wê jî spasdariya xwe nîşanî wan da ji bo wê nêzîkahîya wan. Ev giş wisa diqewimî û perde di navbera Seyrana Zeman û jinên li cem wê jî aliyekî ve û Şerker û her çar qazî ji aliyê din ve.

Piştî Şerker Sultan gazî wê kir û got: “Ey cariyeya ezîz di seranserê vî zemanî de! Vî tacirî pesnê te bi zanînan û edebê da û angaş kir ku tu bi hemû ilman dizanî, hetanî bi ilmê rêziman jî. Ka hela ji her beşekê çend sergotinan ji me re bibêje.”

Gava wê ev gotina Sultan bihîst, got:

Ser seran û ser çavan, qralê hêja. Beşa sereke, di derbarê siyasetên qraliyetê û peywîr û meziyetên erkdarên rewayî û pêdiviyên wan ên sincî yên baş de. Qralê hêja, divê tu bizanibî ku armancên xelkê ol û دنیا ye. Lewre kes nikare bigihêje olê bîyî dinyayê. Loma, دنیا rêyeke baş e ji bo gîhaştina axîretê. Kar û barên dinyê jî sererast nabin bîyî kar û xebatên xwediyên wê. Kar û barên xelkê jî bi çar hêlan de, têne dabêşkirin: Rêvebirî, ticaret, çandîna û pîşesazî.

Ji bo rêveberiyê siyaseteke kamil û hişmendiyêke durust jê re divê. Ji ber ku rêveberî, şopa avadaniya vê dinyayê ye û rêyêke ku diçe axîretê ye. Lewre yezdanê dilovan, ev دنیا kiriye zad û qût ji bo xelkê da ku bikaribin rêwîtiya xwe berdewam bikin ber bi armancên xwe ve. Divê herkes bi qasî pêdiviya xwe ya ku wî bigihîne Xwedê, ji vê dinyayê rake û nede dûv nefsa xwe ya xerab û timakar ku li ser pevkevin û mecbûr bibin ku biçin cem sultanekî ji bo ku wan li hev bîne û karên wan sererast bike. Tew heger sultanekî ku wan li hev bîne tunebe, dê hêzdarên wan kesên bêhêz bixwe.

Ji Sasanîyan Ezdeşêrê Yekemîn gotiye; ol û qral cewîyên hev in. Ol define ye û qral jî nobedarê wê ye. Rê û rêbazên hiş û civatê jî peyitandiyê ku divê xelk ji xwe re qralekî eşkera bikin ji bo ber zaliman bigire, mazlûman biparêze, heqê yê qels ji yê hêzdar bistîne û ber xerabî û neqenciyê bigire. Vêca qralê hêja divê tu bizanibî ku dewr û zeman jî li gora sinc û exlaqê qral teşeya xwe digire. Pêxemberê me, eleyhîsselam jî gotiye: “Du tişt hene ku gava ew baş dibin, xelk jî baş dibin û gava ku ew xera dibin, xelk jî xera dibin: Mirovên zana û emîr.”

Hinek hekîman jî gotiye, qral sê teşe ne; qralek olî ye, yek rûmetparêz e û yek jî li gora kêfa xwe ye. Qralê olî, fermanê dide xelkê ku bidin dû şopa olê û ew jî hewl dide ku oldarê sereke ew be da ku xelk bidin du şopa wî û gotina wî guhdar bikin û li gora şerîetê bimeşin. Lê belê ew li şûna rizamendiya xelkê, qederê esas digire li gel zordariye. Qralê ku parêzvaniya rûmetan dike jî, bi herdu karan radibe; hem karê vê dinyayê û hem jî yê wê dinyayê. Ji xelkê dixwaze ku bidin dû şerîetê û rûmeta xwe biparêzin û ew bi wî şûr û zanistê tîne ba hev. Kî ji ser rêya rast derkeve, nigê wî diçerixe û bi heza şûr jî tê rastkirin û bi wî hawî dadwerî belav dibe li seranserê welat. Qralê ku li gorî kêfa xwe diçe jî, tu dîn û ol pêre nînin û ew herdem li gorî kêfa xwe diçe. Ne tirs a wî ji Xwedê heye û ne jî baweriyêke ku wî bisekinîne. Loma welatê wî ber bi wêranbûnê ve diçe û dûmahiya wî jî wêran e.

Hekîmên zemana dibêjim ku qral bi hewceyî gelek mirovan e û mirov jî bi hewceyî kesekî tenê ne. Loma divê qral bi cûdahiyên wan bizanibe da ku pirsgirêkên wan bikaribe çareser bike û bi dadwerî serweriya wan bike û wan di nava qenciya xwe de bihêle.

Ey qralê hêja, divê tu bizanibî ku Ezdeşêr qralê Sasanîyan ê yekemîn e û sêyemîn qralê Farisan e ku serwerî li hemû herêman kir û qraliyeta xwe kir çar perçe û ji bo her perçeyekî jî mohrek çêkir: Mohra ewil, a derya û asayîş û parêzvanîyê bû ku “Berdevk” li ser hatibû nivîsandin. Mohra duduyan, a îxracatê û komkirina bacê ku “Avadanî” li ser nivîsibû. Mohra sisiyan a qût bu ku “xweşî” li ser hatibû nivîsandin û a çaran jî mohra neheqîyan

ku “Dad” li ser hatibû nivîsandin. Ev teşeya rêveberiyê wisa berdewam kir hetanî ku Îslam derket holê.

Kesra jî ji kurê xwe yê ku serleşkeriya artêşê dikir re nivîsandibû, gotibû: “Rehetiya zêde nede artêşa xwe da ku pêdiviya wan bi te hebe...”

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA ŞEST Û HEFTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar; kesra ji kurê xwe re gotibû: “Rehetiya zêde nede artêşa xwe da ku pêdiviya wan hebe bi te û zêde hişk jî bi ser wan de neçe, da ku ji te aciz nebin. Bi pîvan bide wan û xelatên baş li ser wan belav bike. Têra wan bide wan û zêde tengayê mede wan.”

Tê gotin ku koçerekî Ereban hatiye cem El-Mensûr û jê re gotiye: “Bihêle ku sehê te bide dûv te.” El-Mensûr jî ji yê koçer qeherîye gava ku ew gotin ji devê wî bihîstiye, wê gavê Ebûl-Abbas El-Tûssî jê re gotiye: “Dibe ku yekî din nanekî nîşanî wî bide û seh jî dev ji te berde û bide dû wî.” Wê gavê bêhna El-Mensûr hatiye ber wî û têgihîştîye ku gotina ew ê koçer rast bûye. Rabûye xelatek daye wî.

Dîsa dibêjin, hatiye gotin ku Ebdul-Melîk bin Merwan ji birayê xwe Ebdul-Azîz Bin Merwan re nivîsandiye, gotiye: “Venêrîna nivîskar û berdestê xwe bike, lewre nûçeyên rast ji wan têne girtin û yê ku kêfa mirov tîne, berdestkê mirov e. Yê ku artêşa mirov bi mirov dide naskirin jî kesê ku ji cem mirov derdikeve.” Omer Binxetab jî gava ku bermaliyek digirt, çar şert davêtin ber wî. Digot: “Divê li keran siwar nebe, kincên biha li xwe neke, xwarina xwe li ber siyê nexwe û nimêja xwe di wextê wê de bike.”

Tê gotin ku tu mal ji aqil çêtir tune, tu aqil ji tevdîr û biryariyê çêtir tune, tu biriyarî ji baweriyê rast çêtir tune, tu nêzikahî ji sinc û terbiyaya baş çêtir tune û tu mêzên ji edebê, tu fêde ji rêya vekirî çêtir tune, tu ticaret jî karê salih çêtir tune û tu qezenc ji razibûna Xwedê çêtir tune û tu girêdana bi Yezdan re ji sekna ser sînorê suneta Pêxember eleyhîsselam çêtir tune û tu zanîn weke hizrê baş tune, tu îbadet weke fezan û tu bawerî weke jiyane baş tune û tu paye mîna dîlnizmiyê, tu rûmet mîna zanistê qenc tune. Vêca serê xwe biparêze bi hişê ku tê de ye û zikê xwe biparêze bi qasî ku nemire û mirin û beleyan jî herdem bi bîra xwe bîne.

Hezretê Elî-Xwedê jê razî be-gotiye: “Jinan biparêzin û hûn jî bi tevdîr

bin li himberî wanan. Ne bi wan bişêwirin û ne jî qencyê ji ser wan kêmbikin, ji bo ku çavên xwe bera bêbextiyê nedin.” Û gotiye: “Yê ku dev ji debarê berde, aqlê wî bêçare dibe.”

Omer Binxetab jî-Xwedê jê razîbe-gotiye: “Jin sê cûre ne: Yeke Musulman û bawermend û şêrîn e ku alîkariya mêrê xwe dike li himberî qede û beleyên felekê ne ku alîkariya felekê dike li himberî mêrê xwe. Yeke din jî zarokan tîne û yeke mayîn jî Xwedê wê dike toqa naletê û dixê stûyê kesê ku ew dixwaze. Zilam jî sê cûre ne: Yek ji wan bi aqil e gava ku bi ya xwe dike, yê din ji wî jî biaqiltir e ji ber ku dema beleyek bi serê wî de tê û ji bin dernakeve, diçe bi zanayên meseleyê dişêwîre û bi ya wan dike. Yê sisyan jî zilamekî bêbiryar û heyirî ye, ne rêyeke rast dizane ne jî bi gotina zanayan dike.” Û ji her tiştî re dadwerî lazim e. Cariye bi xwe jî daxwaza dadê dikan. Rêbirên çol û beyaran bi xwe jî, li gel ku jiyana wan li ser zulm û zorê tete meşandin, dîsa jî gava ku di nava xwe de dadweriyekê nedin sazkin, dê pergala wan ji hev bela bibe. Bi giştî jî taca exlaqê mirovan comerdî û sinckarî ye ku helbestkar di vê mijarê de dibêje:

Bi ked û dilsoziya xwe bû taca serê gel  
Û heger tu jî weke wî bikî tê bi tac bî

Û yekî din jî gotiye:

Sinckarî baş e û lêborînkari jî mezin e  
Dilsozî xelasrê ye ji bo kesên rastgo  
Kesên ku comerdiyê jî zêde bike li wê  
Dê cihê xwe çêbike li ser dika rûmetê

Piştî Seyrana Zeman, behsa siyaseta qralan kir bi dûdirêjî hetanî ku kesên hazir gotin: “Me nedîtiye ku tukes bi vî şiklî axivîye di warê siyasetê de, mîna vê cariyeya han! Gelo dikare behsa beşin din jî biki ji beşên zanînê?”

Seyrana Zeman, gotina wan bihîst û têgihîst bê çî dixwazin. Rabû got:

Mijara terbiyeyê û edebê mijareke fire ye, ji ber ku ew e dayika hemû kemalîyan. Tê gotin ku zarokên Temîm li El-Ehnef Bin Qeys, hatine cem Mûawîye. Xizmetkarê Mûawîye jî derbasî cem wî bûye ji bo ku destûrê ji bo derbasbûna wan bixwaze û jê re gotiye: “Ey Emîrê bawermendan! Xelqên Îraqe hatine, dixwazin derbasî cem te bibin da ku derdê xwe ji te re bibêjin.” Mûawîye jî gotiye: “Kî li ber derîye?” Xizmetkarê wî jî gotiye: “Zarokên Temîm in.” Wî jî gotiye: “Bila derbas bin hundur.” Derbasî hundur bûn, li gel El-Ehnef Bin Qeys. Mûawîye, jê re gotiye: “Bavê Derya, hela nêzikî min bibe ji bo ku ez dengê te bibihîzim.” Piştî jî gotina xwe berdewam kiriye

û gotiye: “Gelo te ez çawa dîtîm û fikra te di vê derbarê de çi ye?” Wî jî gotiye: “Ey Emîrê Bawermendan, porê xwe veke, simbêlên xwe biquşîne, neynûkên xwe jêbîke, mûyên binçengên xwe rake, ên navranê kur bike û sîwakê jî herdayîm bixebitine ji ber ku heftê û du fêde tê de hene û her in jî xwe bişo di ber du înan de.”

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî gotina xwe birrî.*

## ŞEVA ŞÊST Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, vêca Seyrana Zeman vegotina xwe berdewam kir û got ku El-Ehnet Bin Qeys ji Mûawîye re gotiye: “Serşûştina roja inê edakirina gunehên di navbera herdu înan de ye.” Mûawîye jî jê re gotiye: “Û tu çawa tevdigerî?” Wî jî gotiye: “Ez nigê xwe bi hêdika datînim ser erdê û bi çavên xwe jî ez wî dişopînim.” Mûawîye jê re gotiye: “Û gava tu derbasî cem yekî ji êla xwe dibî ku ne emîr be, tu çawa dikî?” Wî jî gotiye: “Ez bi şermkarî silavê lê dikim, hindikî diaxivim û tiştê ku ne karê min be, ez têkil wî nabim.” Mûawîye gotiye: “Û gava tu derbasî cem yên mîna xwe dibî, tu çawa tev digerî?” Wî jî gotiye; gava ku biaxivin ez wan guhdar dikim û gava ku bi ser min de bêm ez bi ser wan de naçim. Mûawîye gotiye; û gava tu derbasî cem emîrên xwe bibî, tu çawa tevdigerî? Wî jî gotiye: “Ez silavê didim bêyî liv û tevgerê û ez li hêviya bersivê dimînim. Heger nêzîkbûnê bixwazin, ez nêzîkî wan dibim û heger dûrbûnê bixwazin jî ez dûrî wan dikevin.” Piştî Mûawîye gotiye: “Û nêzîkahiya te bi jina te re çawa ye?” Wî jî gotiye: “Min ji vê bersivê bibexşîne, Ey Emîrê Bawermendan!” Mûawîye gotiye: “Tu bi qedrê Xwedê kî ji min re bêje!” Wî jî gotiye: “Ez bi dilgermî û bi exlaqê baş nêzîkî wê dibim û bi comerdî li ser xerc dikim, lewre jin ji parsûyê zilaman çêbûye.” Mûawîye gotiye: “Û gava tu pê şadîbî tu çawa dikî?” Wî jî gotiye: “Ez bi zimanekî şêrîn pê re diaxivim hetanî ku daxwaz pê re çêdibe, piştî ez wê radimîsim hetanî ku geş dibe, piştî ez wê li ser piştê dirêj dikim û gava ku tov jî di rawestgeha xwe de bi cî dibe, ez dibêjim Xwedêyo tu vê zarokê pîroz bikî û wê dûrî êş û azarê bigiri; wê xweşik û şêrîn biafirîni û piştî ez ji ser zikê wê radibim, diçim xwe dişom, avê bi ser xwe dadikim û ez spasdariya xwe ji Xwedê re dikim li ser wan nîmetên ku dane min.” Mûawîye jê re gotiye: “Te bersivin baş dan, de êdî daxwaza te çi ye, wê ji min re bêje?” Wî jî gotiye: “Daxwaza min ev e ku tu ji rêya Xwedê veneqete û tu dadweriyê û wekhevîyê bixe neqeba xelkê.” Piştî jî rabûye ser xwe û ji cem Mûawîye derketiye. Piştî ku çûye, Mûawîye gotiye: “Heger ev tenê jî li Îraqê bimîne, besî wan e.”

Piştî Seyrana Zeman axaftina xwe berdewam kir û got:

Ez ê mijara edebê berdewam bikim, qralê hêja. Di dema xîlafeta Omer Binxetab de, Mêqebek hebû, xebatkarê Beytil-Mal bû. Rojekê kurê Omer dibîne û derhemekî ji yê Beytil-Mal dide wî. Mêqeb dibêje: “Piştî ku min ew derhem dayê, kurik çû mala xwe. Hîna ku ez wisa rûniştî bûm, min dît ku qasidê Omer tê, ez pê ve rabûm û pê re çûm cem Omer, min dît ku ew derhem di destê wî de ye. Gava ez ghiştim ba wî, ji min re got: Wax Mêqeb wax! Min tiştê di nefsa te de dît! Min got: Û ew tişt çi ye, Emîrê Bawermendan? Got: Tu dujminahiyê bi ometa Mihemed re dikî bi vî derhemî, di roja qiyametê de.”

Carekê jî Omer Binxetap ji Ebî Mûsa El-Eşêrî re nivîsandiye û wiha gotiye: “Gava te ev nameya min girt, behra xelkê bide wan û tiştê mayîn jî ji min re bîne.” Wî jî wisa kiriye. Piştî gava ku Osman bûye xelîfe, wî jî herman tişt jî Ebî Mûsa re nivîsandiye. Wî jî dîsa peywira xwe kiriye û Ziyad bi bacê re şandiye cem Osman. Vêca gava ku Ziyad xerac û bac biriyê ber destê Osman, kurê Osman tê, derhemekî jê distîne. Ziyad jî digrî. Osman jê re dibêje: “Çi qewimiye Ziyad?” Ew jî dibêje: “Carekê min bac anîbû ber destê Omer û kurê wî jî derhemek ji destê min girtibû, lê Omer ferman dabû û ew derhem ji destê kurê xwe derxistibû. Kurê te jî derhemek bir, lê min kes nedît ku wî derhemî ji destê wî derxine, an jî tiştêkî jê re bibêje.” Osman jê re gotiye: “Em ê yekî mîna Omer li ku bibînin!”

Zeyd Îbnî Eslem jî behsa bavê xwe kiriye û gotiye: “Bavê min gotiye: Rojekê ez bi Omer re derketim venêrînekê. Em meşiyane hetanî ku em gîhane cihekî ku agirek ji me ve xwiya kiriye. Wê gavê Omer got: Ey Eslem, ez texmîn dikim ku ev rêwî bin û sermeyê zorî dabe wan! Ka em herin cem wan! Rabû me berê xwe da wan, hetanî ku em gîhan cem wan. Me dît ku jinekê agirek dadaye, beroşek daniye ser û zarokin li dora wê ne, dilerizin. Omer ji wan re got: Silav li ser we be ey xwediyên şewqê û nexwest ku bêje xwediyên agir. Dûra berdewam kir û got: Rewşa we çawa ye? Jinikê got: Sermeya şevê em êşandine. Omer got: Û ev zarok çima wisa dilerizin? Wê got: Ji birçîna. Omer got: Û ev çi beroş e? Wê got: Min avek xistiye wê de, da ku ez wan pê haş bikim. Înşallah dê roja qiyametê, Xwedê teala hesabê vî tiştî ji Omer Binxetab bipirse. Omer lê vegerand û got: Omer çi zane bi halê wan? Wê got: Wê çaxê çima berpirsiyarîya xelkê digire ser xwe û hayê wî ji wan tuneye? Omer li min vegeriya û got: Ka bilezîne em herin! Rabû em herdû bi bazdan vegeriyan, em çûn nûsîngeha masrafgûzariyê. Omer tûrekî ard, beroşeke ku rûn tê de hebû derxist û got: Ka vanan bide ser piştî min. Min jê re got: Bihêle ku ez rahêjim wan ey Emîrê Bawermendan! Wî got: Ma qey tu dikarî roja qiyametê jî rahêjê gunehên min? Rabû min ew alav dan ser piştî wî û bi bazdan em li wê jinikê vegeriyan, em hatin cem. Li wê derê, hinek ard ji tûrik derxist û jî jinikê re got: Rê bide min û pif kir



agirê bin biroşê. Ji ber ku rîheke wî ya dirêj hebû, bê navber dixan ji nav wê derdiket, hetanî ku xwarin kelîya. Wê gavê hinek dohn ji avêt nav û ji jînikê re got: Ez ê ji wan re sar bikim û tu jî bide zarokan. Bi wî hawî xwarin dane zarokan hetanî ku têr xwarin. Xwarina mayîn jî li wir hişt û li min vegeriya got: Ey Eslem, min dît ku birçîbûnê ew dane girî, min jî nexwest ez herim hetanî ku ez sebeba wê şewqê fêm nekim.”

Û tê gotin ku carekê Omer mîhek ji şivanekî kirrîye. Şivan jê re gotiye: “Mîh ne ya min e.” Wî jî gotiye: “Meqseda min tu ye.” Piştî mîh kirriye û dîsa ew berdaye û gotiye: “Xwedêyo! Çawa ku tu vê azadkirina biçûk dikî para min, wê azadkariya mezin jî bike para min!”

Û tê gotin ku Omer şîr dida xizmetkarên xwe û wî jî nanê tisî dixwar, kincên nerm li wan dikir û yên hişk jî li xwe dikirin. Mafê kê çi bûya, ew dida wan û hinek jî lê zêde dikir. Carekê çar hezar derhem da yekî û hezarê din jî lê zêde kir. Rabû xelkê jê re got: “Çima mîna ku tu zêde didî vî kesî, tu nade kurê xwe jî?” Got: “Ê vîna bavê wî rojekê tenê jê re nexebitiye.”

El-Hesen jî got ku gava rojekê Omer malekî pir anî, keça wî Hefse hat jê re got: “Ey Emîrê Bawermendan, kanî behra xizmên te?” Wî got: “Ey Hefse, yê min ez malê xwe didim xizmên xwe, lê ez malê Musulmanan qet nadim wan. Ey Hefse, te bi vê helwesta xwe dilê xizmên xwe xweş kir, lê te dilê bavê xwe şikand.” Wê gavê Hefse, serê xwe berra ber xwe da û ji wir çû.

Îbn-î Omer jî got: “Min hêvî ji Xwedayê xwe kir ku salekê ji salan bavê min nişanî min bide ku xwêdan ji eniya wî biherike. Gava ku min ew di wî halî de dît jî, min jê re got: Rewşa te çawa ye bavocan? Got: Heger ne ji dilovaniya Xwedê bûya, dê mala bavê te xira bibûya.”

Piştî Seyrana Zeman axaftina xwe berdewam kir û got:

Qralê min ê bextewar! Beşa dudan ji qîsmê duduya, beşa edeb û helwestên qenc e û çirok û serpêhatiyên eshabeyên qenc in. Di vê mijarê de, Hesenê Besrî gotiye: “Mirov ji vê dinyê bar nake, berî ku li ser sê tiştan poşman nebe: Baş ne guhdarkirina tiştên ku bihîstine, baş ne têgihiştina tiştên ku hêvî kirine û ne amadebûna wî ji rizqêkî fire re ku berê wî lê bûye.”

Ji Sufiyan re gotine: “Mirovekî ku maldar be, dibe zahîd gelo?” Wî jî gotiye: “Belê, dema ku bele bi serê wî de bîn sebir bike û dema ku bide wî jî şikir bike.”

Û tê gotin ku dema Abdullah bin Şeddad hate ber mirinê, gazî kurê xwe Mihemed kir û şîret lê kir got: “Kurê min, va ez dibînim ku Îzraîl gazî

min dike. Vêca bi ya Xwedê bike; çi êşkere be çi bi dizi û spasîya xwe pêşkêşî Xwedê bike ji ber nîmetên ku dane te. Lewre spasdarî rê dide zêdebûna nîmetan û tirsra ji Xwedê jî, zadê herî baş e ji bo roja mewûd.”

*Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA ŞÊST Û NEHEMÎN

*Şhrezadê got:*

Ey şahê min ê bextewar! Vêca di berdewamiya axaftina Seyrana Zeman de, tê gotin ku Abdullah Bin Şeddad şîret li kurê xwe kir û got: Tirsra ji Xwedê, sermayeya herî baş e, çawa ku yekî gotiye:

Bextewarî ne di komkirina diravan de ye  
Bextewarê rastîn kesê ku di rêya Xwedê de ye  
Bi rastî jî hezkirina Xwedê qûtê baştirîn e  
Li cem Xwedê inçex mirov her tiştî dibîne

Seyrana Zeman berdewam kir û got: “Bila qral vê çîroka han jî bibihîze, ev çîrok a ji qismê dudan ji beşa yekê.” Wî got: “Û ew çi çîrok e?” Wê got: Gava ku Omer Bin Ebdilezîz bû xelîfe, li ser xizmên xwe geriya, çi di destên wan de hebû, ji wan stend û bir xist Beytil-Malê. Rabû Benî-Ummeye (zarokên Ummeye) çûn xwe li metika wî Fatîme keça Merwan girtin û hewara xwe birin cem wê. Rabû Fatîme qasidek şand cem Omer Bin Ebdilezîz, got: “Misoger ez dixwazim te bibînim.” Li ajalekê siwar bû û bi şev çû balê. Gava derbasî ba wî bû û rûnişt, Omer Bin Ebdilazîz jê re got: “Metê ka tu biaxive, lewre tu bi meqsedekê hatiye ba min, kanî daxwaza xwe ji min re bêje.” Wê got: “Tu çêtir dizanî ey Emîrê Bawermendan û hizra te bersiva tiştê negotî ye jî.” Rabû wî got: “Xwedê ji me re Hezretê Mihemed şand ku bibe rehîm û dilovanî ji hemû cihanê re û bibe êş ji qewmekî din re. Dûra ew li gel qinyata xwe çû û ji xelkê re çem hişt ku avê jê vexwin. Li dû wî, Ebûbekir bû xelîfe. Ew jî di rêya Xwedê de meşîya û çem jî mîna berê herikandina xwe berdewam kir. Piştî Ebûbekir jî Omer hat, xêr û qencî kirin û dadweriya ku kesî nikarîbû bikira pêkanî. Lê gava ku Osman hate şûnê û bû xelîfe, avek ji wî çemî veqetand. Piştî Mûamîye hat, wî jî aveke din ji çem veqetand. Piştî Yezîd û zarwên Merwan Ebdilmelik û Silêman jî av ji wî çemî veqetandin hetanî ku dor hate ser min û ez bûm xelîfe. Min jî xwest ku ez ava çem lê vegehinim û wî bikim mîna berê.” Rabû metika wî jê re got: “Min tenê dixwest ez bi te re sohbetê bikim. Vêca madem gotina te jî ev e, ne hewce ye ku ez tiştêkî din bibêjim.” Dûvre vegehiya cem Benî Ummeye û ji wan re got: “Guneh ew e ku we ez bi Omer Bin Xetab re zewicandime! De êdî hûn razî bin bi vê encamê.”

Dibêjin, gava Omer Bin Ebdilezîz li ser doşeka mirinê bû, gazî zarokên xwe kir û ew li dora xwe kom kirin. Wê gavê Mûslîme Bin Ebdilmelik jê re got: “Ey Emîrê Bawermendan! Tu çawa van zarokên xwe wisa xizan dihêlî û diçî? Çi bû berband di jiyana te de û nehişt ku tu ji Beytil-Mal hinekî bide wan jî da ku muhtacî kesî nebin? Bi kêmanî dê ev yek çêtir bûya ji wê ku tê her tiştî bispêrî xelifeyê li dû xwe.” Omer Bin Ebdilezîz bi awirin qeherî li Mûslîme nêrî û jê re got: “Ey Mûslîme, di jiyana xwe de min ew bextewar kirin. Veca çawa ez ê êşe bidime wan di mirina xwe de? Du rê li ber zarokên min hene, ya wê bibin xwedênas û wê Xwedê rêya wan vekirî bihêle, an jî wê ji rê derkevin û ez jî nikarim alîkariyê bidim wan di xerabiyê de. Ey Mûslîme! Piştî ku ez û tu çûbûn, me hinek ji zarwên Merwan veşartibûn, wê gavê min ew di xew de ditibû ku ji min re behsa karên Yezdanê dilovan dikir. Ez jî ketibûm bin bandora sawekê û min soz ji Xwedê re dabû ku ez mîna wî kurê Merwan nekim. Loma, di seranserê jiyana xwe de min têkoşîneke mezin da di ber rastî û dadê de. Ez hêvîdar im ku ez di ber rehma Xwedayê xwe kevim!”

Mûslîme got ku: “Gava Omer Bin Ebdilezîz mir, ez tev li cenazeyê wi bûm û çavên min lê ketin, min dît ku rûyê wî wisa aram e ku mirov digot qey kincin spî lê ne û di nava buhuştekekê de ye ku ava çeman lê diherike. Wê gavê ji min re digot: Ey Mûslîme! Bila xelk ji bo vê bixebitin û kedê bidin.” Çîrok û serpehatiyên mîna vêna pir in.

Mirovekî ku mirov bi gotina wî bawer dibe, got: “Di dema xîlafeta Omer Bin Ebdilezîz de, min pez didot. Ez li şivanekî rast hatim ku gurek an jî çend gur bi pezê wî re bûn. Min jî got belkî seh in, lewre min heta wê gavê jî gur nedîtibûn. Min ji Şivan re got: Tu çi dikî bi van sehan? Got: Ev ne seh in, ev gur in di nav pezê min de û zîyan ji wan nayê.” Piştî lê zêde kir û got: Gava ku hiş rast be, beden jî rast tevdigere!”

Dibêjin Omer Bin Ebdilezîz li ser mînbereke ji herîyê diaxivî û digot: “Hemd û şikir ji Yezdanê dilovan re. Xelkino, camêrno! Tiştên xwe yên veşartî û nuxumandî sererast bikin, da ku tiştên ji birayên we ve tene xwiyakirin jî rast bin û jiyana we jî bi qinyat be. Divê hûn bizanibin ku di navbera kesî û Adem de, kesên zindî tunene di nav miriyan de. Ebdilmelik û yên berî wî mirin. Dê Omer û yên li pey wî jî bimrin.” Wê gavê Mûslîme jê re got: “Emîrê Bawermendan, bi kêmanî me ji te re palpiştekek çêbikira, ji bo ku tu li ser rûništa û te hinekî bêhna xwe berda!” Wî got: “Ez ditirsim ku di rehetiyê de gunehek hebe ji bo min, di roja qiyametê de.” Piştî xîzê bi qirika wî ket û ji ser hişê xwe çû, li erdê ket. Fatîme got: “Meryem! Merahim, lawo hûn li ku ne? Ev zilam ji ser hişê xwe çû, werin lê binêrin!” Piştî Fatîme hat avek li ser çavên wî kir û bi ser de giriya hetanî bi ser hişê

xwe hat û dît ku Fatîme digirî. Jê re got: “Tu çima digrî Fatîme?” Wê got: “Ey Emîrê Bawermendan! Min dît ku tu di nav lepên me de diçî û mirina te ya di nav lepên Xwedê de hat ber çavên min û çûna te ya ji vê dinyayê. Tiştê ku ez dame girî ew bû.” Wî jî pê re got: “Tu kamil bûyî Fatîme, de wisa meke!” Piştî hewl da ku rabe ser xwe, lê dîsa ket. Fatîme ew himbêz kir û jê re got: “Bi serê dê û bavê min, em giş li te bêne hev jî em nikarin bi te.”

Seyrana Zeman, ji qral û her çar dadweran re û ji tacir re got:

Niha jî ez ê beşa dawî, ji qismê duduyan ji were rave bikim. Rojekê ji rojan Omer Bin Ebdilezîz ji xelkên Elmewsîm re nameyek nivîsand û got: “Di van rojên pîroz de û di vê roja heccê de, li ser navê Xwedê ez sond dixwim ku ez bêrî me, ji wê zulm û dujminahiya ku bi we re hatiye kirin û ji wan kesên ku ev zulm li we kirine. Ne min fermaneke wisa daye wan û ne jî hayê min ji wan heye. Ez hêvî dikim ku ev yek bête bexşandin, lewre min izin nedaye tu kesî ku biçê zulmê bike, li kesî din. Ê berpîrsiyarê mazlûman jî ez im. Loma kîjan karmendên min ji rêya rastiyê derketibin û bê ferman û emrê Qur’anê tevgeriyabin, tu hukmê wan li ser we tune, hetanî ku heqîya wan li min vegere.”

Tê gotin ku Xwedê jê razîyo gotiye: “Ez naxwazim ku êşa mirinê sivik bibe li ser min ji ber ku xêra ku herî dawî bi bawermend were kirin ew êş e.” Yekî ku bawerî pê tê jî got: “Gava ez derbasî cem Emîrê Bawermendan Omer Bin Ebdilezîz bûm, min dît ku duwazde derhem di nav lepên wî de ne û fermanê dide ku wan bibin bavêjin Beytil-Malê. Min jê re got: Emîrê Bawermendan, te zarokên xwe xizan hiştin ka tiştê wan nemaye. Hema te fermanek bida ku tiştê bidana wan û feqîrên di malê de, dê baş bûya! Wî jî got: Hela nêzîkî min bibe! Ez nêzîkî wî bûm, wî got: Gotina te ya ku min zarokên xwe xizan hiştine û divê ez fermanê bidim ku pêdiviyên wan û xizanên malê bêne dayîn, gotineke ne rast e, ji ber ku Xwedê ye yê ku berpîrsiyarê zarok û xizmên min û ew wekîlê wan e. Ew jî du rê li ber wan hene; an wê bibin mirovin xwedênas û wê Xwedê fereca xêrê li wan veke, an jî wê bibin kesin gunehkar û ez jî nikarim hêzê bidim wan di gunehkariyê de. Piştî şand dût zarokên xwe û ew giş li dora xwe kom kirin ku duwanzde kur bûn. Li wan nêrî û çavên wî tijî hêsir bûn, piştî ji wan re got: Ez bavê we me û ez di neqeba du tiştan de me; ya hûnê maldar bibin û wê bavê we bikeve nav agir de, yan jî hûnê feqîr bimînin û wê bavê we bikeve cennetê de. Çûna cennetê li ba bavê we, çêtir e ji maldarbûna we. De êdî rabin, min hûn spartin Xwedê.”

Xalid Bin Sefwan jî got:

Yûsif Bin Omer ez birim cem Hîşam Bin Ebdilmelik ê ku li gel xizm û navmalîyan derketibû seyranê û çadir jê re hatibûn vegirtin. Vêca gava ku herkesî cihê xwe girt û civat geriya, ez ji nav şekalan derketim û min lê nêrî. Gava ku çavên me ketin hev de, min jê re got: “Xwedayê me bi elba mezin daye te Emîrê Bawermendan û rêyeke rast daye ber te, bi vê erka ku daye destê te û nehiştiye xerabîyek bigihêje te. Vêca Emîrê Bawermendan, ez dixwazim şireteke ku li qralên berî te hatiye kirin, bi bîra te xim.”

Gava ez diaxivîm ew paldayî bû bi kêlekê de. Xwe rast kir û got: “Ka bêje bê çi li cem te heye Bin Sefwan?” Min jê re got: “Emîrê Bawermendan, berîya te bi salekê, qralekî din jî mîna te hatibû vê derê. Rabû wî jî ji civata xwe re got: Hûn dibînî bê ez di çi halî de me? Qey kes dide bi qasî ku ez didim? Vêca wê gavê zilamek jî li cem hebû ku yek ji gazîyên hilgavtina Huccet û piştgeriya xizanên di rêya rast de bû. Wî ji qral re got: Qralê min, te pirseke giran kir, gelo tu destûrê didî min ku ez bersivê bidim? Got: Belê. Wî jî got: Gelo tu dibînî ku ev tiştê tu di nav de ye, tiştêkî tuneye, ango dê tune bibe? Qral got: Ev tiştêkî ku wê tune bibe. Zilam got: Naxwe çima ez te dibînim ku tu bi dirêjî behsa tiştêkî dikî ku di demeke kurt de dê tune bibe û çima tu ewqasî pê ve mijûl dibî? Qral got: Kanî reva ji vê yekê û kanî ew daxwaz? Zilam got: Çarê ew e ku tu di nava mulkê xwe de bimîne, bi ya Xwedayê dilovan bikî û jê re bikevî xiroşê hetanî ku emrê Xwedê were û te bide ber rehma xwe. Gava bibe şeveq jî, ez ê bi ser te de werim.”

Xalîd Bin Sefwan got ku: “Zilam di dema şeveqê de, li deriyê qral xist, derbas bû, dît ku taca xwe daye serê xwe û xwe amade kiriye ji bo derkeve seyranê mezin.” Got: “Wê gavê Hîşam Bin Ebdilmelik giriya hetanî ku rîha wî şil bû.” Piştê ji xezmetkaran re got: “Va kincan ji min bikin.” û dîsa di qesra xwe de ma ji ber şîreta wî zilamî. Dûra xizmetkar û navmalî çûn cem Xalîd Bin Sefwan û jê re gotin: “Te çima wisa bi serê Emîrê Bawermendan kir û jiyana wî lê kir jehr?”

Piştê Seyrana Zeman ji Şerkerê Qral re got: “Di vê beşê de gelek şîret û dûrik hene, lê ez nikarim hemûçkan di yek carê de bînim ziman...”

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA HEFTÊYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, Seyrana Zeman axaftina xwe berdewam kir û ji Şerker û qazîyan re got: “Şîret û dûrikên di vî beşê de pir in û ez nikarim gişan di rûniştinekê tenê de vebêjim. Lê belê bi berdewamiya rojan re, dê çê-

bibe inşallah.” Qazîyan gotin: “Qralê hêja, ev cariyeya han ecêbeke zemanê xwe ye û yekane jina vî wextî ye, lewre hetanî roja îro me qet nebihîstîye jineke di vê radeya zanebûnê de.” Piştîre, dua ji qral re kirin û rabûn ser xwe, ji wir çûn.

Wê gavê Şerker, li xizmetkarên xwe zîvirî û ji wan re got: “Amadekariya dawetê bikin û ji hemû teşneyan jî xwarinê çêbikin.” Di cî de bi ya wî kirin û rabûn ser xwe, hemû cûreyên xwarinê amade kirin. Di heman demê de ferman hate dayîn ku jinên mîr û wezîr û gizîrên dewletê ji wir belav nebin, hetanî ku bûk bê guhertin.

Piştî nîvro, sifreyeke dirêj ji xwarinên xweş rêz kirin, raxistin. Hemûçkan xwar, hetanî ku têr xwarin. Îca qral ferman da ku dengbêj û mûzîkjenên Şamê binin. Ew jî anîn û cariyeyên wî bi xwe jî, yên ku stran dizanibûn, hemû li qesrê kom kirin.

Dema ku bû êvar, şev kete erdê û dinya tarî bû, ji deriyê kelehê hetanî deriyê qesrê, mûm û çira pêxistin, li çep û rastê rê û emîr û wezîr û gizîr jî meşîyan, hetanî ku hatin ber destê Şerkerê Qral.

Ciwanikan, rahiştin şeh û berbîskan û çûn bûkê bixemilînin, xweşik bikin, lê tu xweşikbûna ku lê zêde bikirina nedîtin, lewre pêdiviya wê jî bi wê yekê tunebû. Di wê navberê de, Şerker jî derbasî hemamê bibû. Çawa ku derket, çû li ser text rûnişt. Piştîre bûk jî anîn wê derê û kincên wê yê zêde jê kirin, ew sivik kirin û şîretên ku li keçan têne kirin ji bo şeva ewil, jê re gotin û ew derbasî cem Şerker kirin. Şerker rûyê wê hilda nav lepên xwê û pêre raket. Wê şevê keçik jê bihemil bû, wê ew agahdar kir bi wî tiştî. Ew jî pir kêfxweş bû û ji hekîman re got: “Dîroka hemlê wê tomar bikin.”

Roja dîtirkê, Şerker çû li ser textê xwe rûnişt. Mezinên dewletê jî hatin ew pîroz kirin. Şerker gazî nivîskerê xwe kir û ferman dayê ku nameyekê ji bavê wî Omer Ennûman re binîvisîne û wî agahdar bike ku Şerker cariyeyeke zana û biedeb kirriye ku hemû huner û marîfet li cem hene û dixwaze wê bişîne Bexdê ji bo ku birayê wî Şewqa Mekan û xwişka wî Seyrana Zeman bibîne. Dîsa ji bavê wî re bêje ku Şerker ev cariyeya xwe azad kiriye û pê re zewicîye û jinik ji wî bihemil bûye. Ku nivîskar name nivîsand, Şerker name mohr kir û bi qasidekî re şand ji bavê xwe re.

Qasid çû û mehekê ma. Piştîre lê vegeriya û bersiva nameyê jî bixwe re anî. Şerker rahişt bersivê, vekir, ew xwend. Name bi vî şeklî bû:

Bi navê Xwedê yê dilovan û mihreban. Ev name yê kesê bi kul û derd e

ku zarokên xwe wenda kirine, ya Omer en-Nûman e ku ji kurê xwe Şerker re nivîsandiye. Bizanibe kurê min ku piştî çûna te, dinya li min teng bûye, êdî sebir û hedana min nemaye û ez nema dikarim razekê jî veşêrim. Sebeba vê jî ew e; ez derketibûm seyde û nêçîrê û roja berî wê jî Şewqa Mekan izin ji min xwestibû ji bo ku biçê heccê, ez jî li ser tirsiyabûm ji qede û beleyan û min izin nedabûye, min jê re gotibû: “Bila bimîne sala bê an ji saltira dinî ku bê.” Vêca bi çûna nêçîrê re ez mehekê ji mal dûrketim. Gava ku ez vege-riyam, ez nû pê hisiyam ku xwişk û birayê te hinek dirav bi xwe re birine û ew jî bi dizî tev li kerwanê heccîyan bûne, çûne. Ez mam li bendî vege-riya heccîyan bi hêviya ku ew jî vege-riya. Lê belê gava ku heccî vege-riyan û min ji wan pirsî, kesî tu agahî di derbarê wan de neda min. Min jî ji bo wan kincên şînê li xwe kirin û aniha dilê westiyaye, ez bê xew im û çav bi hêsir im.

Li dû wan gotinan jî ev helbest nivîsandibû:

Xeyalên wan ji ber çavên min qet naçin  
Herdu jî di nava min de ne ew ji dil naçin  
Nedijiyam ez ku ne ji hêviya vege-riya wan ba  
Ruh di min de nedima ku ne ji xeyalê wan ba

Herî dawî jî nameya xwe bi van gotinan kuta kiribû: Ez silavên xwe ji re û civata te re dişînim û ez dizanim ku tu van agahan belav nake, lewre ev yek şermeke mezin e ji bo me.

Gava ku Şerker ev nameya bavê xwe xwend, xemgîn bû bi xemgîniya wî re, lê belê kêfxweş bû bi windakirina xwişk û birayê xwe re. Piştî rahişt nameyê û derbasî cem jina xwe bû, bêyî ku bizanibe ew xwişka wî ye. Jixwe wê jî nizanibû ku ew birê wê ye, li gel ku şev û roj li ba wî bû.

Rewşa herduyan wisa berdeham kir, hetanî ku neh mehên wê temam bûn û kete ber welidandinê. Li ser kursiya welidandinê rûnişt, Xwedê jî jê re li hev anî û bi hêsanî welidî, Xwedê keçek dayê. Wê jî gazî Şerker kir, gava ku hat, jê re got: “Ev keça te ye, de êdî navekî lê bike li gora dilê xwe.” Şerker got: “Adeta xelkê ew e ku di roja heftan de nav li zarokên xwe bikin.” Piştî, Şerker xwe bi ser keça xwe de tewand û ew maçî kir. Wê kêlikê çavên wî lê ketin û dît ku morîkek ji wan hersê morîkên ku Îbrîza Şahbanû ji welatê Romê anîbûn, di stûyê wê de ye! Gava ku baş li wê morîka stûyê keça xwe nêrî, hişê wî ji serê wî çû û pir hêrs bû. Ziq li wê morîkê nêrî hetanî ku baş ew nas kir û gûman pê re neman. Li Seyrana Zeman meyzand û jê re got: “Ev morîk ji ku derê hat ji te re cariyeyê!?” Gava ku ew gotin ji Şerker bihis-tin jê re got: “Ez şahbanûya te û hemû kesên di qesrê de me! Qey tu fedî nakî ku tu ji min re dibêji cariyê û ez şahbanûya keça qrala me? Niha rewş eşkere bû û her tişt hate fêmkirin. Ez Seyrana Zeman im, keça Qral Omer

en-Nûman im!”

Gava ku Şerker ew gotin bihîstin, laşê wî ricifi û serê xwe li erdê xist...

*Li Şehrezadê bû sibeh û wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA HEFTÊ Û YEKEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, vêca çawa ku Şerker ew gotin bihîstin, dilê wî lêda rengê wî zer bû, laşê wî lerizî, serê xwe li erdê da û nas kir ku ew xwişka wî ye, pê re jî ji ser hişê xwe çû. Gava ku bi ser xwe ve hat jî, lê ma ecêbmayî çawa ku ew bi cî nas nekiribe. Rabû jê re got: “Xatûna min, qey tu keça qral Omer en-Nûman î?” Got: “Belê.” Wî got: “Û çima tu ji bavê xwe veqetiya û tu hatî firotin?”

Keçikê çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot û ew agahdar kir ku wê birayê xwe di nava nexweşîyê de li Qudsê hiştiye, ji ber ku kalemêrekî koçer ew revandiye û aniye, firotiye wî tacirî. Gava ku Şerker ew gotin bihîstin, baş bi cî têgihişt ku ew xwişka wî ye. Ji xwe re got: “Ez çawa bi xwişka xwe re zewicîme? Divê ez wê li xizmetkarekî xwe mehr bikim û ji xelkê re bêjim ku min ew ji şeva ewil ve berdaye û bi xizmetkarê xwe re mehr kiriyê.” Pir xemgîn bû, serê xwe rakir û jê re got: “Ey Seyrana Zeman, bi rastî jî tu xwişka min î û em ketine gunehekî mezin de, lewre ez jî Şerker kurê qral Omer en-Nûman im. Vêca em hêvî dikin ku Xwedê vî gunehê me bibexşîne!” Wê kêlîyê Seyranê jî bi hûrgulî lê meyzand û ew naskir. Gawa ku ew nas kir jî, ji ser hişê xwe çû. Girîya, porê xwe kişand û got: “Naxwe em ketine gunehekî mezin de. Vêca em çi bikin? Ez ê çi ji dê û bavê xwe re bêjim, gava ku bêjin te ev keçik ji ku aniye?” Şerker got: “Ya baş ew e ku ez te bi xizmetkarekî xwe re bidim zewicandin û tu jî keça min di mala wî de mezin bike, bêyî ku kes pê zanibe tu xwişka min î. Em çawa bikin, qey ev jî qedera Xwedê bû bi serê me de hat. Sitara me ew e ku ez te bi xizmetkarekî re bizewicînim û kesî pê nehisînim...” Piştî enîya wê maçî kir û li ber dilê wê çû û hat. Seyranê jê re got: “Tê çi navî li keçikê bikî?” Got: “Ez ê navê wê bikim Qeza Bû.” Piştî, Şerker ew bi xizmetkarê xwe re zewicand û ew û keça xwe birin li mala wî bi cî kirin. Di wê malê de, keça wî li ser destên cariyeyan mezin bû bi şekir û şêranî.

Îcar di vê dema ku ev bûyer giş bi serê Seyranê de hatin, birê wê Şewqa Mekan jî hîna li Şamê bû. Rojekê qasidek ji Bexdê hat, ji cem qral Omer en-Nûman û nameyeke ku ji destê wî anîbû da destê Şerker. Şerker rahişt nameyê, vekir xwend, dît ku piştî besmelê, bavê wî jê re dibêje:



Ezîzê min, divê tu bizanibî ku ez pir xemgîn bûm, piştî min herdu zarakên xwe wenda kirin. Xew li min herimî û eş ji canê min derneket. Niha ji ez vê nameyê ji te re dişînim, çawa ku te ew stend bacê ji me re bişîne, pê re ew cariyeya ku te kirriye û tu pê re zewicîye ji bişîne, lewre min xwest ku ez wê bibînim û lê guhdar bikim bê ka çiqasî zane ye? Ji ber ku van rojan pîreke dilsoz ji welatê Romê hatiye ku pênc heb keçên ciwan û xweşik pê re ne, pir zana ne di ilm û edeb û wêje û hûner û hikmetê de. Ya rastî mirov nikare bi ziman wesfê vê pîrê û keçên pê re bide. Lewre wan têtgihiştineke kûr bi dest xistine di gelek beşên zanînê de ku gerek mirov fêrî wan bibe. Çawa min ew dîtin min ew girtin cem xwe, ji ber ku min dixwest ew milkên min bin û di mala min de bin, lewre kesî weke wan tune ye li cem hemû qralan. Vêca gava ku min buhaya wan ji pîrê pirsî, got: “Ne bi baca Şamê be ez wan nadim te.” Ez bi xwe jî, bi navê Xwedê ez baca Şamê ji hindik dibînim di ber wan de, lewre yek bi tenê ji wan jî, buhatir e ji wî malî. Rabû min jî daxwaza pîrê qebûl kir û min her pênc keçên cariyê hildan cem xwe. Vêca kanî wê bacê ji me re bişîne, ji bo ku pîrê biçê welatê xwe û wê cariyeya xwe ji bişîne, ji bo ku bi van re bikeve pêşbaziyê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

## ŞEVA HEFTÊ Û DUYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Îcar Şahê min ê bextewar, gava Qral Omer en-Nûman, di nameya xwe de got “Ka wê cariyeya xwe bişîne, ji bo ku li ber çavdêriya aliman bi van re bikeve pêşbaziyê, heger zora wan bir ez ê wê û baca Bexdê gişî, li gel hev ji te re bişînim.” Şerker çû cem xizmetkarê xwe û jê re got: “Ka wê cariyeya ku min ew bi te re da zewicandin bîne.” Xizmetkar çû ew anî. Şerker nameya bavê xwe da dest û jê re got: “Xwişkêcan, ka fikra te çi ye, em bersiveke çawa bidin vê nameyê?” Wê got: “Tu çawa dixwazî, em wisa bikin.” Dûra hat bîra wê bê çiqasî bêriya dê û bavê xwe, bêriya welat û ehlê xwe kiriye; axaftina xwe berdewam kir û got: “Jixwe min pir bêriya wan jî kiriye, ka min bi mêrê min re bişîne, da ku ez çîroka xwe ji bavê xwe re vebêjim û wî agahdar bikim bê çawa Kalemêrê Koçer ez revandime, firotim wî tacirî û wî tacirî jî ez firotim te, te jî ez azad kirim û bi wî xizmetkarî re dame zewicandin.” Şerker jê re got: “A rast ew e.”

Piştê keça xwe Qeza Bû bir, da cariyê û navmalîyan û çû bacê amade bike. Ji xizmetkarê xwe jî xwest ku cariyeyê û bacê bi xwe re bibe û biçê Bexdê. Xizmetkar got: “Ser seran ser çavan.” Dûra ferman da ji bo hodecekê ji wî re, yek jî ji cariyeyê re amade bikin, da ku bi rê de tê de rûnin û bêhna xwe berdin. Şerker nameyek nivîsand radestî xizmetkar kir, xatirê xwe ji

Seyranê xwest û ew morîka navdar ji jê stend û li gel zincîreke zêr xist stûyê keçîka xwe. Xizmetkar ji wê şevê kete rê de.

Vêca Xwedê wisa ji wan re li hev anî ku Şewqa Mekan û Tifikvanê dostê xwe jî, wê şevê bi wî kerwanî re ketin rê de û berê xwe dan Bexdê, piştî li kerwan pirsîn û fêr bûn ku ew kerwan ê baca Şamê ye û di bin berpirsiyariya serxizmetkarê qesrê de diçe cem Sultan Omer en-Nûman.

Bi rê de, Şewqa Mekan ji dostê xwe yê Tifikvan re digot: “Heger bi xêr û silamet em gîhan Bexdê û min malbata xwe dît, tê bibînî bê ez ê çawa wan qenciyan te li te verînim.”

Meşa xwe wisa berdewam kirin bi kerwan re, hetanî ku ro derket û bû sibe. Gava ku dinya germ bû li wan, serxizmetkarê kerwan bi rê ve dibir ferman da ku navber bête dayîn. Sekinîn, peya bûn, deveyên xwe avdan, bêhna xwe berdan û piştê dîsa ferman da ku kerwan bikeve rê de. Piştî pênc rojan xwe gîhandin bajarê Hemayê. Li wir sekinîn û sê rojan lê man. Îca serxizmetkar dîsa ferman da ku bikevin rê de. Meşiyên hetanî ku gîhan bajarekî din. Sê rojan li wir jî man û rêwîtiya xwe berdewam kirin hetanî ku gîhan Diyarbekrê. Jê û pê de sirra bayê Bexdê li wan da pê re jî xwişk û dê û bav û warê Şewqa Mekan hatin bîra wî. Dê çawa bêyî xwişka xwe Seyranê li bavê xwe vegeriya? Giriya, gilî û gazinek xwe ji xwe kirin, hestiyar bû, bêriyê ew kewand û ev çend beyt di ber xwe de gotin:

Dosto ev çi sebr û xweragirtin e wanî  
Ne qasidek hat ji bo te ne agahek anî  
Lê belê çend rojê min ma ku ez werim  
Ka ku ev çend roj jî xurtir bibana  
Bigirin bi destê min, dilşewat bin li ser min  
Giyân nemaye, laş helîyaye êdî li min  
Heger hûn bêjin ji bîr bike ez dibêjim  
Bi Xwedê heta heşrê jî ez ji bîr nakim

Tifikvan jê re got: “Dev ji vî girî û nalînê berde, em nêzikî konê serxizmetkar in.” Şewqa Mekan got: “Divê ez helbestan bixwînim, ji bo ku agirê dilê min hebekî vemre.” Tifikvan jê re got: “Tu bi Xwedêkî dev ji şînê berde hetanî ku tu bigihêjî warê xwe. Piştê dilê te çawa dixwaze wisa bike. Tu li ku be jî, ez ê herdem bi te re bim.” Şewqa Mekan got: “Bi Xwedê ez nikarim bêdeng bimînim!” Piştê berê xwe da aliyê Bexdê û li dûr nêrî, di bin ronîya tava heyvê re.

Wê gavê Seyrana Zeman jî di qelaqê de bû û xew lê herrimîbû, bi halê xwe digiriya. Hîna ku ew di wê rewşê de bû, dengê birê wê Şewqa Mekan

hate wê ku ev beyt digotin:

Birqa şewqdêr çirûsk didin  
Dil û hinavên min ên xemgîn  
Ji ber çûna yar û dîlbera min  
Ku şûşeya noşê dide dest min  
Ey çirûska birqê gelo tu dê  
Vegerîne li min rojên dîdariyê?  
Dostino nekin hûn loman li min  
Yezdanê dilovan belayek daye min  
Bi evîndareke ku wenda bûye  
Bi zemanekî ku har û hêrs bûye  
Gava ku pišta xwe da min û çû  
Seyrana dil jî pê re çû  
Kul û derd wê ji min re hiştin  
Bi peyalan min ew vexwarin  
Dibe ku ez bimrim bi erzanî  
Berî ku ez bigihême wê bi saxî  
Ey zemanê kes û karan  
Zû were tu bi hêvî û resman  
Bi dilşadî were tu bi bextewarî  
Ji wê serdema ku ez avêtime derî  
Were di hewara kurê xerîb de  
Ew metirsîdarê di xewnê de  
Dilbikulê ku xemgîn bûye  
Bi xerîbsalên li vî welatî  
Ê ku serwer lê bûne bêjî

Piştî ku ev helbesta xwe got, qîrîn pê ket û ji ser hişê xwe çû, li erdê ket.

Vêca wê şevê di heman seetê de Seyrana Zeman jî şiyar bû, ji ber ku birê wê hatibû bîra wê û xewa wê lê herrimî bû. Vêca ji ber ku konê wan nêzikî yê Şewqa Mekan bû, dengê wî bihîst û dilê wê xweş bû bi wan beytan. Rabû ser xwe, hebekî hejiya û gazî xizmetkar kir. Wî jî jê re got: “Çi lazimiya te heye xatûna min?” Wê got: “Rabe ser xwe û here ev kesê ku van beytan dibêje, bîne vêderê!”

*Li Şehrezad bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA HEFTÊ Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Şahê min ê bextewar, îcar gava ku Seyrana Zeman ew helbesta birayê

xwe bihîst, gazî serxizmetkar kir û jê re got: “Ka here evê ku vê helbestê dibêje bine vir.” Wî jî got: “Min qet nebihîst tiştekî wisa û kesekî şiyar jî min nedît, herkes raketîye.” Wê jî got: “Baş binêre, kî şiyar be wî ew helbest gotiye.” Rabû çû, geriya, kes şiyar nedît ji wî zilamê Tifikvan pê ve. Lewre Şewqa Mekan, hîna jî bi ser xwe ve nehatibû. Gava Tifikvan dît ku serxizmetkar di ser serê wî re sekiniye, jê tirsiya. Serxizmetkar jê re got: “Gelo bêjerê wê helbesta ku xatûna me guhdar kir, tu bûyî?” Tifikvan tirsiya ku xatûn ji deng aciz bûbe, jê re got: “Bi Xwedê ne min gotiye ew helbest.” Ê din got: “Naxwe kê digot? Ka tu wî nişanî min bide, lewre tu şiyar bûyî.” Tifikvan li ser Şewqa Mekan tirsiya û ji xwe re got ‘Dibe ku serxizmetkar zirarekê bide wî!’ Piştî got: “Ez nizanîm.” Serxizmetkar jê re got: “Bi Xwedê tu derewan dikî, lewre tu şiyar bû û tu dizanî bê ew kî bû.” Ê din got: “Ez rastiyê ji te re dibêjim. Yekî ku bi rêbiwarî di vir re derbas bû ew helbest got û ez jî ji xew şiyar kirim, ez aciz kirim. Xwedê cezayê wî bide wî rebbî!” Serxizmetkar got: “Heger tu wî nas dikî, wî nişanî min bide, ez ê wî bigirim û bibim konê ku xatûna min lê dimîne. Ango tu bi xwe, wî bigire û bine.” Tifikvan got: “Tu here, heger min ew girt ez ê wî binim ber destê te.” Serxizmetkar dev jê berda û çû, derbasî cem xatûna xwe bû û ew ji rewşê agahdar kir, got: “Kesî ew nasnekir, ji ber ku kesekî rêbiwar bûye.” Xatûn jî bédeng bû.

Dema Şewqa Mekan bi ser hişê xwe ve hat, dît ku heyv di zikê asîmanan de ye. Bayekî efsûnî lê rabû, koza dilê wî tevda û êş û janên wî gur kirin. Daxwaz dîsa pê re çêbû ku helbestekê bixwîne. Tifikvan jê re got: “Tu dixwazî çi bikî?” Got: “Ez dixwazin çend ristan ji helbestekê bêjim ji bo ku ez rivîna agirê dilê xwe hinekî bitemirînim.” Tifikvan pê re got: “Qey tu haydar nebû bê çi qewimî? De binêr bi navê Xwedê, heger min ber serxizmetkar negirta, dê serê te tê de biçûya.” Şewqa Mekan got: “Çima çi bûye? Ka bêje û min jê agahdar bike!” Wî got: “Begê min, serxizmetkar hat cem min û darekî bihîvan ê dirêj di destê wî de bû. Tu jî li erdê dirêjkirî û ji ser hişê xwe çûbû. Çavên xwe li derdorê, li ser xelkên raketî digeland û digot ‘Kê ew helbest xwendîye?’ Ji min pê ve kesî şiyar jî nedît û hat ji min pirsî, min jî jê re got ‘Yekî rêbiwar bû.’ Ew jî çû û Xwedê ez jê sitirandim, nexwe dê ez bikuştama. Ji min re got: Heger te careke din ew dît, wî bine cem min.”

Gava Şewqa Mekan ew gotin bihîstin, giriya û got: “Kî dikare pêşiya min bigire û nehêle ku ez helbestan bêjim? Êdî ez nêzîkî warê xwe bûme û ez ê bêjim, çi dibe jî bila bibê!” Tifikvan jê re got: “Ê te armanca te ew e ku tu xwe bi kuştin bidî, ne tiştekî din.” Şewqa Mekan got: “Bêgûman ez ê helbestan bixwînim.” Tifikvan got: “Ji vir û pê de, êdî em ê ji hev veqetin. Halbûkî min dixwest ez hevaltiya te bikim hetanî ku tu bigihêje bajarê xwe û dê û bavê xwe bibîne. Tu jî dizanî ku ev sal û nêveke tu li gel min e û hetanî niha tu zirara min negîhaye te. Vêca çî sebeb heye ku niha tu rabî helbestan

bibêji piştî vê meş û westanê ku xelk hemû ketine xew de û dixwazin istîra-  
hetê bikin?” Şewqa Mekan got: “Ez ji ya xwe venagerim.”

Piştîre kul û derdan ew hejand, wî jî dest pê kir û got:

Bîçe ba şûnwaran û silavê bide her çaran  
Ger ku şevê bi hovîtiya xwe kujeriyek da  
Ango di şevtarîka xwe de agir-çirûskê da  
Lew ku ew ber bigire tu agahekê bidî  
Ne tişteki erjeng e ku tu xêrekê bi min bikî  
Ey bihuştê ku ez jê veqetiyam bi serbilindî  
Lew ku ber dilê min negire bihuşt ez im kuştî  
Em hebûn, roj û meh di xizmeta me de bûn  
Civat jî geriyabû wê gavê em li welat bûn  
Gelo kî bû ji hezkiriyên min li wan deran?  
Şewqa Mekan bû li gel wî Seyrana Zeman!

Dema ew ristên helbesta xwe qedandin, sê qêrîn pê ketin û paş re  
ji ser hişê xwe çû, li erdê dirêj bû. Tifikvan jî rabû, cilikek kişand ser, ew  
nixumand.

Îcar gava Seyranê ev helbesta ku navê wê û yê birê wê tê de derbas dibû  
bihîst, kul ketin dilê wê de û xemgîniya wê girantir bû. Gazî xizmetkar kir  
û jê re got: “Pepûko, ew kesê ku gava din helbest dixwend, niha dîsa xwend  
û dengê wî jî ji nêzik ve tê. Bi navê Xwedê ku tu neçe wî neynî, ez ê gazî  
serxizmetkar bikim û ew ê ji dê li te bide û berra te de ji van deran. Vêca  
a ji te re ev hezar dînarê ha û here bi bergerî wî bîne vê derê. Heger qebûl  
nekir jî hezar dînarî bide wî, heger dîsa qebûl nekir, pişeya wî û cih û warê  
wî fêr bibe û zû bi şûn de vegere, dereng nekeve.” Xizmetkar derket, çû li  
nav xelkên razayî geriya, pê li cendekên wan kir, lê belê kesî şiyar nedît.  
Herî dawî gîha cem Tifikvan, dît ku ew rûniştî ye û serê wî vekirî ye. Bi her-  
du destên wî girt û jê re got: “Gelo tu bû yê ku helbest dixwend?” Tifikvan  
tirsîya û got: “Na wile begê min, ne ez bûm.” Xizmetkar got: “Ez dev ji te  
bernadim hetanî ku tu wî helbestvanî nîşanî min nede, lewre ez nikarim  
li xatûna xwe vegerim bêyî ku ez wî bi xwe re bibim.” Gava ku Tifikvan ev  
gotina wî bihîst, li ser Şewqa Mekan tirsîya û bû kûrekûra wî, girîya û ji xiz-  
metkar re got: “Wilehî billehî ne ez im ê ku helbest dixwend. Yekî rêwî bû û  
derbas bû, dê êdî gunehê min nexe stûyê xwe de, lewre ez xerîbekî ku ez ji  
Qudsê hatime.” Xizmetkar jê re got: “Ka rabe, tu bi xwe were ji xatûna min  
re bibêje, lewre min ji te pê ve kesî şiyar nedîtîye.” Tifikvan got: “Ne vaye  
te cihê min naskir û te dît bê ka ez li ku rûniştî me. Jixwe kes nikare xwe ji  
cihê xwe tevbidê û yê ku xwe tevdide jî nobedar wî digirin. Îcar tu jî here  
cihê xwe, heger vê carê kesî helbest xwend, dûr nêzik ferq nake, ez ji wîna

berpirsiyar im.” Piştire serê xizmetkar maçî kir û dilê wî xweş kir.

Xizmetkar dev jê berda fitlek da xwe, li wan deran geriya, newêribû ku destvala bi ser xatûna xwe de vegeriya. Li cihekî nêzikî Tifikvan xwe veşart û li wir ma. Tifikvan rabû, Şewqa Mekan agahdar kir û jê re got: “Ka rabe ser xwe rûnê ez ji te re bêjim bê çi qewimîye.” Piştire, bûyer ji serî hetanî binî jê re vegot. Şewqa Mekan got: “Dev ji min berde, kî çi dike bila bike, jixwe ez nêzikî warê xwe bûme.” Tifikvan jê re got: “Tu çawa wisa li gora kêfa xwe tevdigerî û ji kesî natirsî? Ez ji li ser giyanê xwe û te ditirsim. Tu bi qedrê Xwedê bikî bes helbestan bixwîne, heta ku em bigihêjin warê te. Min qet nizanibû ku rewşeke te yî wisa heye. Qey tu nizanî ku te bi dengê xwe jina serxizmetkar aciz kirîyî? Qey tu nizanî ku ew ji rêwîtiyê westiyaye û ev çend carin ku xizmetkar li pey dengê te dişîne ji bo ku te bigire?” Şewqa Mekan, guh jî lê nekir û cara sisiyan jî dîsa dest bi xwendina helbestekê kir û got:

Min dev ji gazinan berdaye ji gazinkaran  
Ê ku min xetebar dike ew çi dizane canan  
Gelacan gotin dîn e ew dînê çol û beyaran  
Min got ji ber evîne ye evîna dost û yaran  
Gotin çiqasî zindî yî tu hem jî spehî ye  
Min got begûman ew jî ji ber evîna wî ye  
Gotin çi ye gelo ku wî wisa xurt û ezîz dike?  
Min got bêgûman bêçaretî û bêhêzî ye  
Qet terka wî nakim ez lew ku dilêş bim ez!  
Nabe tew, çawa bi ya gazinkaran bikim ez  
Di mijara evîn û eşq û evîndariyê de ez?

Wê kêliyê xizmetkar jî ew guhdar dikir û di bin simbêlan re dikeniya. Çawa helbesta xwe qedand, dît ku xizmetkar di ser serê wî re sekinîye. Dema çavên Tifikvan li wê rewşê ket, reviya û çû dûrî wî sekinî, ji wir ve ew temaşe kirin. Xizmetkar jî Şewqa Mekan re got: “Silav li ser te be mîrzayê min!” Şewqa Mekan got: “Silava Xwedê li ser te jî be.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA HEFTÊ Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar! Îcar gava Şewqa Mekan silava wî lê vegerand, xizmetkar jê re got: “Mirzayê min, di vê şevê de, ev sê carin ku ez li pey te tîm, lewre xatûna min dixwaze te bibîne.” Wî got: “Û ev kûçika ku dixwaze min bibîne kî ye? Xwedê wê û mêrê wê mesex bike rebbî!” Piştire sixêfên xwe berdewam kirin. Xizmetkar jî nikaribû lê vegeranda, ji ber ku xatûna

wî jê re gotibû: “Têkilî wî nebe û bila bi daxwaza xwe were, heger nehat jî wî hezar dînarî bide wî.” Ji ber wê yekê, xizmetkar xwe pê re nerm kir û jê re got: “Kurê min, şaşitî ya min bû, tu kêmaniya te nîn e. Mijar ew e ku tu bi çend gavên xwe yên pîroz bê cem xatûna me û bi xêr û selamet vegere cihê xwe. Ji bo vê jî mizgîniyeke min ji te re heyê!” Piştî vê gotinê Şewqa Mekan rabû ser xwe û pê re meşiya. Tifikvan jî li pey wî diçû û awirên wî li ser wan bûn, di dilê xwe de jî digot: “Heyfa ciwantiya wî, dê sibe wî bi dar vekin!” Li pey wan çû hetanî ku gihan cihê xatûnê. Li wir dîsa jî xwe re got: “Dê zilamekî xerab be heger li ser min jî bêje! Qaşo wî gotibû, ez nema helbestan dibêjim.”

Îcar em vegerin ser Şewqa Mekan. Çawa ku me got; li pey xizmetkar çû, hetanî ku derbasî cem xatûna wî bûn. Xizmetkar jê re got: “Xatûna min, tiştê ku te dixwest min ew ji te re anî. Vaye xortekî lihevhatî û ji maqûlan xwiya dike.” Çawa ku Seyranê ev gotin bihîstin, dilê wê lêda û jê re got: “Ka fermanekê bide wî bila helbestekê bixwîne, ji bo ku ji nêzîk ve ez wî guhdar bikim. Piştî ez ê navê wî û welatê wî jê bipirsim.” Xizmetkar dîsa bi şûn de vegeriya, çû pişt perdeyê û jê re got: “Ka hela helbestekê bixwîne da ku xatûna min ji nêz ve te guhdar bike, lewre ew jî vaye li kêleka te ye. Piştî jî navê xwe, navê welatê xwe û rewşa xwe jî diyar bike.” Wî jî got: “Ser seran, ser çavan. Te navê min ji min pirsî lê êdî ew jî helîyaye mîna rû û bedena min. Serborîyeke min heyê ku divê bi serê derzîyê li ser bibîka çavan were nivîsandin û niha jî va tu dibînî ku ez ketime şûna serxweşekî ku şerap pir vexwariye û kul û kerb bi ser de bariyane; ew jî xwe wenda kiriye û neçar maye, ketiye nav deryaya hizr û fikaran.”

Gava ku Seyranê ev gotin bihîstin, qîrîn û nalîn pê ket û dest bi girî kir, ji xizmetkarê xwe re got: “Ka jê re bibêje, gelo kesekî ku bi qasî dê û bavê xwe jê hez dikir wînda kiriye an na?” Xizmetkar heman pirs jê kir, Şewqa Mekan got: “Rast e, ez ji wan gişan qut bûme û ya ku herî bêhtir mi jê hez dikir, xwişka min a ku felekê ez û wê ji hev veqetandin.”

Çawa ku Seyrana Zeman ev gotin bihîstin, got: “Xwedê we careke din bigihîne hev.” Piştî jî xizmetkarê xwe re got: “Ka bila hinek helbestên li ser fûraqê ji me re bibêje.” Xizmetkar pirs xatûna xwe ji wî kir, wî jî keserek veda û wisa got:

Xwezîka we bizanîya bê ew xwediye dilekî çawane  
 Û dilê min jî bizanîbûya bê ew bi ku ve çûne  
 Gelo niha ew aram in ango di nav belan de ne?  
 Hezkirî tev şaşwaz û metal ew bêçare mane!

Gava ku wî ev ristên xwe xwendin, Seyranê guhkê perdeya navbera

xwe û wî da alî û lê meyzand. Çawa ku awirên wê pê ketin, di cî de ew nas kir û çîrek da, got: “Birê min, Şewqa Mekan!” Wî jî serê xwe rakir û lê meyzand, ew nas kir. Gazî wê kir û got: “Xwişka min Seyrana Zeman!” Seyranê xwe bi ser de avêt, wî jî ew hilda himbêza xwe û di wê kêliyê de herdû jî ji ser hişê xwe çûn. Xizmetkarê ku li wan temaşe dikir jî behetî ma li himber wê dîmenê! Potikek bi ser wan de avêt, ew sitirandin, hetanî ku bi ser hişê xwe ve hatin. Seyranê pir kêfxweş bibû û kul û xemên xwe ji bîr kiribûn. Bextewar bû û dest bi xwendina helbestan kir, ev çend rist gotin:

Êdî hevdîtin û wîsal ketiyê şûna dûrketinê  
 Jiyanêke bextewer jî ketiyê şûna êş û janê  
 Sal û meh çûn bêyî ku baskên me bigihên wîsalê  
 Ne hêsir rawestiyar neji bêrî bi dawî bû li vê malê  
 Hêrsa neyaran ji ber avdana me ya bi evînê bû  
 Lewra nifir li me kiribûn û felek jî li gel wan bû  
 Zemanê ku em dikenandin ez jibîr kiribûm li mawe  
 Careke din li min vegeriya min got qey wê bigirîne

Gava Şewqa Mekan ev gotin jî devê xwişka xwe bihîstin, ew himbêz kir û ew jî ji ber kelecana kêfê girîya û dest pê kir, got:

Poşman bûm ez li ser wê belavbûna civanda  
 Poşmaniyêke ku hêsir nehiştin di çavan da  
 Min sond xwariye ku ezê bidim qurbanekê  
 Ger ku dîsa rojekê qedêr me li hevdu bicivînê  
 Bextê min vebû êdî û bextewarî bi ser min de hat  
 Ewqasî xweşî hat ku bi kêfê re girî hat

Bi qasî katjimêrekê li gel hev rûniştin. Piştî Seyranê ji birê xwe re got: “Ka derbasî cem min bibe û çîroka xwe ji min re vebêje, bê çî bi serê te hatiye piştî veqetana me û ez ê jî ya xwe ji te re bêjim.” Şewqa Mekan jê re got: “Hela tu ya xwe ji min re bêje!” Wê jî çîroka xwe ji serî ve jê re got, ji gava ku ji hev veqetiyabûn, hetanî wê kêlikê çî bi serê wê de hatibû jê re vegot; çawa ew zîlamê koçer ew revandibû û çawa yê tacir jî ew jê kirribû, ew biribû cem birayê Şerker û ew firotibû wî û Şerker jî çawa di cî de ew ji cariyetîyê azad kiribû û mehra xwe lê birribû, pê re zewicibû û çawa bavê wê salox jê girtibûn û ji Şerker xwestibû ku wê jê re bişîne. Li dawîyê jî gotina xwe bi van hevokan qedand: “Spas ji Xweda re ku careke din em gîhandin hev û niha jî em ê dîsa bi hev re vegerin cem bavê xwe, çawa ku em bi hev re ji cem wî derketibûn. Jixwe birayê min Şerker ez bi vî serxizmetkarî re zewicandim ji bo ku ew min bigihînin cem bavê min. Çîroka min hemû ev e. Vêca ka êdî tu ya xwe ji min re bibêje!”

Wî jî çîroka xwe ji serî ve jê re vegot; bê çawa Xwedê jê re li hev anî û



ew Tifikvanê Hemamê bi ser de şand ku hemû malê xwe li ser kir û pê re ket ser rêyan û bi şev û roj xizmeta wî kir hetanî ku ew gîhand wir. Piştî lê zêde kir û got: “Xwişkêcan, ev Tifikvanê ku ez behsa wî dikim, qenciyeke wisa bi min kir ku bav bi kurê xwe nake. Wî xwe birçî dihişt û ez têr dikirim, ew peya dimeşiya û ez siwar dikirim. Bawer bike ku ez bi xêra wî sax mame.” Seyranê jî got: “Xwedê hez bike, tê qenciya wî lê vegerîni û di ber van gişan de wî xelat biki!”

Piştî Seyrana Zaman gazî xizmetkar kir, ew jî hat wir, destê Şewqa Mekan maçî kir. Seyranê jê re got: “A ji te re xelata te, ey zilamê xêre! Li ser destê te ez û birê xwe gîhan hev, îcar bila hema ew diravên di kîsik de hemû ji te re bin. De êdî biçê û gazî serkêşê xwe bike, bila zû were wir.” Zilam di cî de ji wir derket û çû cem serxizmetkarên xwe û gazî wî kir ji bo ku were cem xatûna wî. Ew jî hat û derbasî cem jina xwe Seyranê bû, dît ku zilamek li cem wê ye ku nizanîbû ew birê wê ye. Lê pirsî, Seyranê çîroka xwe û birê xwe ji serî hetanî dawî jê re got û gotina xwe weha bi encam kir: “Serxizmetkarê hêja, êdî bizanibe ku jina te ne carîye ye, keça Qral Omer en-Nûman e! Ez Seyrana Zaman im û ev jî birayê min Şewqa Mekan e.”

Gava ku serxizmetkar çîroka wan guhdar kir û ji rastîyê serwest bû û tê derxist ku êdî ew zavayê Omer en-Nûman e, di dilê xwe de got: “Di encama vê çîrokê de, dibe ku ez jî bibim walîyê welatekî!” Piştî li Şewqa Mekan zîvirî û dilê wî xweş kir ku ew û xwişka xwe dîsa gîhane hev. Piştî ferman da xizmetkaran ku çadirekê ji bo Şewqa Mekan amade bikin û hespên herî baş jî bixin xizmeta wî de. Seyranê jî jê re got: “Wisa xwiya dike ku em nêzikî warê xwe bûne. Vêca destûrê bide min ku ez û birê xwe bi tenê bimînin, ji bo ku em kul û derdên xwe ji hev re bêjin û ji hev têr bibin piştî vê veqetana dûvdirêj.” Wî jî got: “Dilê we çawa dixwaze, wisa bikin.”

Serxizmetkar ji cem wan derket, piştî ji wan re mûm û gelek teşeyên şêranîyê şandin, ji bo Şewqa Mekan jî sê bedil ji kincên herî baş şandin. Dûv re bi şûn de vegeriya, hat heta ku dîsa gîha cem çadira wan, piştî ku qedrê xwe his kir. Seyranê jê re got: “Kanî gazî xizmetkar bike, bila biçê wî Tifikvanî bibîne, bîne û hespêkê jî jê re veqetîne û hemû pêdiviyên wî yên rêwîtiyê jê re amade bike li gel taştê û şîva rojane û bila tembiyê lê bike da ku ji me veneqete.”

Serxizmetkarê mêrê wê got: “Ser seran, ser çavan.” Û rabû xizmetkarên xwe dan dûv xwe û çû li Tifikvan geriya, hetanî ku li dawîya kerwan lê rast hat ku wî jî wê kêlikê barê kerê xwe girêdida û amadekariya xwe dikir ku bireve. Di wê kêlikê de hêsir ji çavên wî dibariyan, xemgîn bû ji ber ku ji Şewqa Mekan vediqetiya û di heman demê de jî di nava tirseke mezin de

bû, ji xwe re digot: “Min çiqasî şîret lê kirin feyde nekir, gelo niha ew di çî halî de ye?” Hîna wî ew gotina xwe kuta nekiribû, xizmetkar di ser serê wî re sekinîbû û xulaman jî ew dorpêç kiribûn. Çawa ku Tifikvan li xwe zîvirî, dît ku xizmetkar di ser serê wî re ye û xulam jî li dora wî ne! Rengê wî zer bû û tîrsa nava wî mezintir bû!

*Li Şhrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe bîrrî.*

## ŞEVA HEFTÊ Û PÛNCÊMÎN

*Şhrezadê got:*

Vêca Şahînaşahê min ê bextewar, wek ku min gotî, gava Tifikvan barê xwe li ser piştê kerê girêda jî bo bireve û di ber xwe de got “Gelo niha ew li ku ye?” dît ku xizmetkar di ser serê wî re sekiniye û xulaman jî derdora wî girtiye. Çogên wî fisiyan û qudûm lê şikestin ji tîrsan. Li kerê xwe siwar bû û bi dengê bilindtir di ber xwe de got: “Vî ciwanî qenciya ku min pê kiribû fêma nekir û wisa xwiya dike ku çûye giliyê min li cem vî xizmetkarî kiriye û ez jî kirime şîrikê sûcê xwe!” Di wê kêlikê de xizmetkar lê kir gazî û jê re got: “Kê ew helbest dixwendin bavê derewan? Te çawa digot ez nizanim û yê ku helbest dixwendin hevalê te bû? De binêr willehî ez ji vir hetanî Bexdê dev ji te bernadim û qedera hevalê te çî be, dê ya te jî wisa be.”

Gava Tifikvan ev gotin bihistin, di dilê xwe de got: “Tiştê ku ez jê ditirsiyam, bi serê min de hat!” Piştê jî ev ristehelbest xwend û got:

Tîrsa min ew bû ew jî bi serî de hat  
Xelasi li ba Xwedê ye ji bo wî imdat

Xizmetkar bi ser xulaman de qîriya û got: “Wî jî kerê daxînin û hespekî jê re bînin.” Hespêk jê re anîn, ew lê siwar kirin û di nav xwe de ew dane meşandin bi kerwan re. Çavên xulaman hemûyan jî li ser wî bû. Xizmetkar jî ji xulaman re got: “Lê miqatebin û xerabîyê jî pê re nekin, mûyekî wî here wê yek ji we jî here.”

Gava yê Tifikvan ew xulam li dora xwe dîtîna bêhêvî bû û li xizmetkar zîvirî, jê re got: “Serkirdeyê delal, ez mirovekî bi tenê me. Ne bira ne jî merivên min hene. Ev xortê han jî ne merivê min e û ne jî ez xizmê wî me. Ez Tifikvan bûm di hemamê de û min ev xort di nav sergoyê wê de dît di rewşeke xerab de ku bi nexweşiyek giran ketibû.” Piştê dest bi girî kir û di nava xwe de, jî nû ve dest bi hesabekî din kir. Xizmetkar jî di tengala wî de dimeşîya bêyî ku rastiyê jê re bêje, jê re digot: “Çawa tu li ser xwe neditirsiya û bi vî xortê han re te helbest digotin û xatûna min aciz dikir?” Jê re wisa digot û di dilê xwe de pê dikeniya. Dema ku navber didan meşê

û disekinîn jî, xizmetkar bi Tifikvan re rûdinişt û di heman sênîkê de, pê re xwarin dixwar. Piştî xwarinê jî, ferman dida xulaman ji bo ku şerbetê binin. Wan tanî, wî vedixwar û pirraniya mayî jî dida yê Tifikvan. Lê belê dîsa ji çavên wî zuha nedibûn ji hêşiran û dilê wî vala nedibû ji xemgîniyê ji ber veqetana wî ya ji Şewqa Mekan û qede û beleyên ku bi serên wan de hatin, di xerîbiya wan de. Meşa xwe bi wî hawî berdewam kirin. Xizmetkar jî geh diçû hinda çadira Şewqa Mekan, kurê Omer en-Nûmanê Qral û keça wî Seyrana Zeman, da ku xizmeta wan bike û geh jî li Tifikvan vedigeriya ji bo ku çavdêriya wî bike.

Û bi wî hawî herdû xwişk û bira gilî û gazinên xwe bi hev kirin û soh-beta xwe berdewam kirin hetanî ku nêzîkî cî û warê xwe bûn. Tenê sê roj mabûn ji wan re ku xwe bigihînin warê xwe, gava ku kerwan dane sekinandin ji bo ku hebekî bêhna xwe vedin.

Piştî bêhnvedanê raketin û bi berê sibehê re ji xew rabûn, amadekariyên xwe kirin ji bo rêwîtiya xwe berdewam bikin. Tam di wan kêlîyan de, pêleke toz û ecaceke mezin li wan rabû ku azman girt û dinya tarî bû wek ku şev li wan vegeriya be. Serxizmetkar li wan kire gazî û got: “Xwe ragirin niha û barên xwe bar nekin!” Ew û xizmetkarên xwe siwar bûn û ber bi ecacê ve çûn. Gava ku nêzîkî wê toz û ecacê bûn, dîtin ku di bin wê de artêşeke weke pêlên behrê xwiya dike, ku al û dahol û siwarên hespan û leheng di pêşiyê de bûn. Serxizmetkar matmayî ma li himber wê dîmenê! Gava ku ew artêş giha nêzîkî wan bi qasî pêncsed Farisî jê veqetiya û ber bi serxizmetkar ve hatin, dora wî û hevalên wî pêçan, her xizmetkarek ji aliyê pênc Farisan ve hatin dorpêçkirin. Serxizmetkar ji wan re got: “Çi qewimiye û çima bi van siwaran we em dorpêç kirine?” Wan jî got: “Tu kî yî, tu ji ku tê û tê bi ku ve biçî?” Serxizmetkar got: “Ez serxizmetkarê Emîrê Şamê, Şerkerê kurê Omer en-Nûmanê qralê Bexdê û Xorasanê. Ez bac û diyariyên Mîrê xwe dibim Bexdayê ji bo ku radestî bavê wî bikim.”

Ku ew gotin ji devê Serxizmetkar bihîstin, hemûyan destmalên xwe bi ser çavên xwe de berdan û dest bi girî kirin. Piştî jê re gotin: “Wele Omer en-Nûman miriye û mixabin bi jehrkirinê hatiye kuştin. De êdî ka were bi wezîrê wî Dendan re rûnê!”

Dema Serxizmetkar ew agahî bihîst, kûrekûr pêket û giriya, got: “Xwelî li serê min û vê rêwîtiya min be!” Û wî û hevalên xwe giriye xwe berdewam kirin û li gel leşkeran çûn da ku Wezîr bibînin. Gava ku gihan cem Wezîr Dendan, Wezîr ferman da ji bo ku konekî vegirin, piştî Serxizmetkar derbasî konê xwe kir û di sînga dîwanê de, li ser doşekê da rûniştandin û çend pîrs jê kirin. Serxizmetkar jî jê re got: “Ez peywirdarê Emîrê Şamê

me, min bac û diyariyên Mir anîne.” Gava Wezir Dendan ew gotin bihîstin, giriya û jê re got: “Qral Omer en-Nûman bi jehrê ket, mir û li pey mirina wî jî nakokî ket navbera xelkê, pevketin û mirov jî hevdu kuştin. Lê belê mir û gizîr, mezinên civatê û her çar qaziyan pêşiya kuştinê girtin. Hemû li hev hatin û hevpeymanek di nav xwe de çêkirin ku kes li ber biryara her çar qaziyan dernekeve, çî biryarê bidin herkes qebûl bike. Vêca niha berê me li Şamê ye, em ê herin wir ji bo ku em kurê wî Şerker bikin qral li şûna wî. Hinek jî dixwazin ku kurê wî yê din li şûna wî bibe qral. Dibêjin: Navê wî kurê wî Şewqa Mekan bûye, pênc sal berê ew û xwişka xwe Seyrana Zeman çûne Hicazê û ji wê çaxê ve, kesî tu agahî ji herduyan negirtiye.”

Gava Serxizmetkar ew aqahî bihîstin tê derxist ku gotina jina wî rast bûye. Pir xemgîn bû ji ber xebera mirina Qral, lê belê di heman demê de ji pir kêfxweş bû û bi taybetî jî ji ber ku pê hesiya ku dê Şewqa Mekan li Bexdê bibe Sultan, li şûna bavê xwe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

## ŞEVA HEFTÊ Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, gava serxizmetkarê Şerker ew gotin ji devê Dendan bihîstin û bi mirina Qral Omer en-Nûman hesiya, xwe nêzî Wezîr kir û jê re got: “Ev bûyera tu behs dikî pir erjeng e! Lê divê tu bizanibî ku lihevraştatina we ya ji min re li vê derê, şensekî mezin e ji bo we. Lewre bi vê lihevraştatinê, hûn ji bin barekî mezin rizgar bûne. Wisa xwiya dike ku Xwedê Teala ji we re li hev anî, Şewqa Mekan û xwişka wî Seyrana Zeman li we vegerand û li vê derê derxist pêşiya we!”

Gava wezîr ew gotina han bihîst, pir kêfa wî hat û jê re got: “Serxizmetkarê hêja, hela kanî ji min re serpêhatiya wan bibêje, bê çî bi serê wan de hatiye û çima ewqase sal nebedî bibûn!” Di serî de jê re behsa serpêhatiya Seyranê kir û çawa bû jina wî. Piştî çîroka Şewqa Mekan jê re vegot, ji serî hetanî dawî.

Gava serxizmetkar vegotina xwe qedand, Wezîr Dendan gazi mîr û beg û wezîr û rêvebirên dewletê kir û ew ji wê rewşê agahdar kirin. Hemû û tevde pir kêfxweş bûn bi wê yekê û şaşwaz bûn ji ber wê lihevraştatina han. Hemû li wir kom bûn û hatin huzûra Serxizmetkar, erda ber wî maçî kirin û spasî ji Xwedayê xwe re kirin ku ev cwamêr bibû wesîleya vê qencyê.

Wê rojê, Serxizmetkar jî civateke mezin li bin konê xwe gerand û hemû

mîr û gizîr vexwendin ser xwarineke xêrê û giş yeko yeko li gorî asta wan, ew dane rûniştandin. Ew jî çû di zikê diwanê de, li kêleka Wezîr Dendan, li ser text rûnişt. Piştîre şekir bi ser ava gulîan dakirin û li ser wan gerandin.

Dûra mîr û mîrek hemû li hev rûniştin ji boyî şêwrê û ferman dan artêşê ku ew hêdî hêdî bi pêş de herin, da ku ew piştî şêwrê xwe bi wan ve bigihînin. Li ser vê fermanê, yekîneyên artêşê alên xwe rakirin, siwar bûn û ketin rê de. Mîr û mîrekan jî piştî ku şêwra xwe qedandin, li hespên xwe siwar bûn û xwe gîhandin artêşê. Di wê navberê de serxizmetkar xwe gîhand Dendanê wezîr û jê re got: “Heger ez li pêşiya we biçim û sultanê nû ji hatina we agahdar bikim, dê baş be. Bi kêmanî ji bo ku bikaribe bi amadekariyeke baş pêşwaziya we bike û ew jî haydar bibe ku we ew weke sultan hilbijartîye ji bo xwe.” Dendanê wezîr got: “Ev tiştê tu dibêji, pir rast û di cihê xwe de ye!”

Serxizmetkar rabû ser xwe ji bo ku biçê, Wezîr jî pê re rabû ser xwe, rûmetek mezin dayê û diyarî pêşkêşî wî kirin, piştî ku da sundê ji bo ku wan qebûl bike. Gava ku Wezîr wisa kir, mîr û gîzîrên din jî pê ve rabûn, diyarî û hediyeyên xwe jê re pêşkêş kirin û jê hêvî kirin ku ji bona wan bi sultanê nû re biaxive da ku wan ji postên wan nede alî. Wî jî got: “Ez ê li ser daxwazên we bisekinim.” Û piştî ferman da xizmetkaran ku bikevin rê de. Dendanê wezîr jî kon û çadîrin mezin bi Serxizmetkar re şandin û ferman da xizmetkaran ku wan nêzî bajêr vegirin; piştî ku meşa rojekê di neqeba wan û bajêr de bimîne.

Bi dilxweşiyeke mezin Serxizmetkar rêya xwe berdawem kir û di dilê xwe de got: “Ev rêwîtiya me pir bi oxir û xêrbar derket!” Jina wî jî li ber çavên wî pir nîrxbar û mezin bibû ku êdî ew li ser serê xwe datanî! Di nava wê kêf û eşqê de meşa xwe berdewam kir, hetanî bi qasî meşa rojekê nêzîkî bajêr bûn. Li wê derê peya bûn ji bo ku bêhna xwe vedin û cihekî rûniştinê ji Sultanê nû, kurê Omer en-Nûman re amade bikin.

Hetanî wan kon vegirtin û cih amade kirin, kerwanê bacê yê ku li dû wan dihat jî gîha cem wan. Serxizmetkar, xulamêkî xwe şand cem xanima xwe Seyrana Zeman ji bo destûrê jê bixwazin da ku derbasî cem wê bibe. Xulamê wî destûr jê re anî, ew jî derbasî cem wê û birê wê bû û ew ji mirina bavê wan agahdar kirin. Piştî agah dayê ku hemû mîr û mîrekan ew li şûna bavê wî kirin sultan û ji bo vê yekê jî ew pîroz kirin. Herdu giriyan li ser mirina bavê xwe û sebeba mirina wî jê pirsîn. Wî jî ji wan re got: “Dendanê wezîr vê yekê dizane û agahî li ba wî ne. Ji xwe sibe, ew û artêş giş dê bigihin vê derê. Vêca Sultanê min, du rê li pêşiya te nîne ji xeynî ya ku tu bi ya wan bike, lewre wan gişan bi hev re tu helbijartîne mîna Sultan li ser serê xwe.

Jixwe heger tu neke jî, dê yekî din li şûna te bikin Sultan. Kî bê şûna te jî, tu nikarî li wan ewle bibî li ser nefsa xwe. Lêwre dibe ku navbera we xera bibe, an jî te bikuje.”

Şewqa Mekan serê xwe berra ber xwe da û bêhtirî seetekê ponijî. Piştî got: “Min qebûl e, jixwe ez nikarim dev ji vê yekê berdim jî.” Şewqa Mekan bawer kir ku Serxizmetkar fikra herî baş jê re dibêje. Loma jê re got: “Apocan! Gelo bi birayê xwe Şerker re ez ê çawa tevbigirim?” Serxizmetkar bersiva wî da û got: “Kurê min, jixwe birayê te Sultan û Mîrê Şamê ye, tê jî yê Bexdayê be. De êdî bawerî û vîna xwe xwirt bike û ji vî barî re amade be!” Wî jî ew yek qebûl kir.

Piştî, Serxizmetkar bedlek kincên qralan ê ku Wezîr Dendan dabûyê, lê kir û nemşeya bi zêr neqîşandî ya nîşana sultantiyê da destê wî û ji cem wî derket, çû. Dûra ji xulamên xwe re got: “Cihekî xweş û bilind bibînin ji bo ku hûn konekî mezin li ser vegirin ji Sultan re, da ku tê de rûnê û mîr û gizîran pêşwazî bike.” Fermanek da aşpêjan jî ji bo ku xwarineke xweş çêbikin û bînin. Fermaneke din jî da peywirdarên avê ji bo avdestxaneyan saz bikin.

Piştî seetekê ‘ilorek bi ezmanan ket, tozeke ecêb bilind bû ji erdê û bi ser wan de hat. Gava ew toz û ‘ecac nêzîkî wan bû, artêşeke gewre di bin de xwiya kir ku mîna pêlên deryayeke bêdawî dihatin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA HEFTÊ Û HEFTEMÎN

*Şehrezad got:*

Şahê min ê bextewar! Vêca piştî ku ‘ecac nêzîkî wan bû û arteşeke gewre dibin de xuya kir, tê derxistin ku ew artêş artêşa Bexda û Xorasanê ye û Wezîr Dendan jî di serê wê de ye. Hemû jî pir kêf xweş û bextewar bûn bi Sultanê xwe yê nû Şewqa Mekan ê ku bi kincê qraliyetê dê derketa pêşwazîkirina wan, li gel mifrezeya parastinê.

Serxizmetkar hespa wî jê re anî, Şewqa Mekan jî lê siwar bû û ew û hemû kesên di konan de tevde bi hev re derketin, çûn hetanî bin qubeya mezin. Derbasî hundur bû, rûnişt û nemşeya xwe ya Sultaniyê danî ser herdu çogên xwe. Serxizmetkar jî li ser lingan sekinî di xizmeta wî de, parêzvanên wî jî şûrên xwe kişandin, mertalên xwe dan ber sîngên xwe û di devê deriyê qubeyê de rawestiyên.

Leşkerên artêşa Bexdayê hatin û destûr xwestin ji bo ku derbasî cem

Sultan bibin. Serxizmetkar ji hat balê daxwaza wan jê re ragihand. Şewqa Mekan izna derbasbûna wan da û got: “Bila deh deh werin hizûra min.” Serxizmetkar got: “Ser seran, ser çavan.” Leşker hemû ketin rêzê de li devê derî û deh deh derbas bûn cem Sultan. Dehê pêşî çawa ku dan dût Serxizmetkar û derbasî cem Şewqa Mekan bûn, çav lê ketin, hemû lerizîn ji ber heybeta wî. Sultan ji bi xêr û xweşiyeye mezin ew pêşwazî kirin û sozê xwedîderketina li wan da. Wan ji Sultanê xwe pîroz kirin, duakariya xwe anîn ziman, girêdana xwe pê ve eşkere kirin û sond xwarin ku li himberî tu fermanên wî dernekevin. Talî bejna xwe li ber wî tewandin û bi şûn de vegeriyan.

Dehên din ji li pey wan derbasî cem bûn. Sultan bi heman şêweyê ew ji pêşwazî kirin. Çûn û hatina wan bi vî hawayî berdewam kir hetanî ku leşker tev qediyên û Wezîr Dendan tenê ma. Dendan ji derbasî cem wî bû û bejna xwe li ber tewand. Şewqa Mekan ji ber wî rabû, ber pê de hat û jê re got: “Tu ser seran û ser çavan hatiye bav û wezîrê hêja! Karê ku te kiriye, karekî rast û nixbar e. Teqdir ji di destê Xwedê de ye.”

Wê kêlikê Serxizmetkar derket derve, gazî çend xizmetkaran kir û ferman da wan ji bo ku merş û kulavan raxînin, da ku leşker rûnin, xwarin û vexwarin amade bibe. Piştî leşkeran firavîna xwe xwarin, Sultan Şewqa Mekan ji Dendanê wezîr re got: “Fermanê bide leşkeran bila deh rojan bêhna xwe vedin, hetanî ku tu ji min ji sedema mirina bavê min agahdar bikî.” Wezîr serê xwe li ber Sultan tewand û got: “Bêgûman tu rast dibêji begê min!” Wezîr derket, çû nav çadirên leşkeran û ferman da wan ku deh rojan îstîrahat bikin li wê deverê û sê rojan ji xwe dûrî Sultan bigirin û kesî ji xizmetkaran ji derbasî cem wî nebe. Her kesî destên xwe berjor ve rakirin û temenekî dirêj ji bo wî niyaz kirin ji Xwedê.

Wezîr li Sultan vegehiya û tiştê hatibû kirin, jê re vegot. Wî ji bêhna xwe fireh kir û xwe ragirt hetanî ku şev kete erdê. Wê gavê rabû ser xwe, çû cem xwişka xwe û jê re got: “Naxwe te kuştina bavê min bihîstiye û tu nizanî bê çawa hatiye kuştin?” Wê jî got: “Na wile, ez nizanî çawa û ji bo çî hatiye kuştin.” Piştê perdeyek kişand û xwe da pişt perdeyê da ku zilam wê nebînin. Şewqa Mekan ji gazî xizmetkarê xwe kir û jê re got: “Here gazî wezîrê min Dendan bike, bila were vir.” Gava Dendan hat cem wî, Şewqa Meka jê re got: “Ez dixwazim sebaba kuştina bavê xwe yê qral fêr bibim.” Dendanê wezîr, jê re got:

Begê min, wê rojê, nuh bavê te ji nêçîrê vegehiya û hat bajêr li we herduyan pirsî û fêr bû ku hûn çûne heccê. Çawa ku ew xebera we bihîst bêhna wî teng bû, dilê wî şikest û pir xemgîn bû. Bêhtirî şeş mehan, tiştê nekîr ji

xeynî ger û pîrsa di derbarê we de, bi hêviya ku agahiyekê di derbarê we de bigire. Lê mixabin tu agahî bi dest nexist û kesî tiştek jê re negot, di derbarê we de.

Piştî wendabûna we bi salekê, carekê gava ku em li ber destên wî bûn, me dît pîreke rû bişewq hate balê ku pênc cariyê pê re bûn; her pênc jî nû-hatî bûn û mîna heyvên li çardehan bûn, bi xweşikbûna xwe. Ziman bêçare dima di wesfê wan de. Li gel wê xweşikbûna xwe jî, baş Qur'an dixwendin û mîna hekîman dîroka civatan û serdemên rabirdû dizanîbûn. Wê pîra han izin ji bo derbasbûnê xwest, bavê te jî izin dayê. Ew derbas bû hundur, bejna xwe li ber bavê te tewand û erda ber nigê wî maçî kir; ez jî li kêleka wî rûniştî bûm.

Dema pîrê derbasî cem wî bû, rengê xwedênas û zahidan di rûyê wê de xwiya kir û nûr ji rûyê wê bariya. Ango li ber çavên me wisa hate xwiyakirin. Pîrejinê berê xwe da bavê te û jê re got: “Ey qralê hêja! Pênc hep cariyê bi min re hene ku cariyeyên mîna wan di destê tu qralan de tunene. Lewre xwedî husn û cemaleke bêhempa ne, pîr jîr û serwext in, Qur'anê dixwînin, çîrok û serpêhatiyên dizanin, dîroknas û xwedî agahî ne di derbarê civat û dewletên rabirdû de û ji zanistê jî agahdar in. Ev cariyeyên han jî niha li ber destên te ne Sultanê min. Vêca heger tu dixwazî wan di azmûnan re derbas bike, tê jî rastiye bibînî. Lewre azmûn in ên ku mirov rezîl dîkin an jî serbilind.” Rehmetyê bavê te, pîr kêfxweş bû bi dîtina wan û ji cariyeyan re got: “Ka hela her yek ji we beşekê ji dîroka civat û gelên rabirdû ji min re bibêjin...”

*Li Şhrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina xwe.*

## ŞEVA HEFTÊ Û HEYŞTEMÎN

*Şhrezadê got:*

Vêca şahînsahê min ê bextewar, tê gotin ku Dendanê wezîr, axaftina xwe ji Sultan Şewqa Mekan re berdewam kir û got:

Wê gavê yek ji wan cariyeyan ber bi rehmetyê bavê te ve hat, erda ber nigê wî maçî kir û jê re got:

Qralê min ê bextewar! Divê mirov xwedî mezîyetên baş be û ne xwedî mereq be. Divê mirov karên ku dikevin ser milê xwe bike û pozbilindiyê neke. Divê mirov xwe ji wan xesyetan dîr nexîne û bizanibe heger mirov jê dîr bikeve, dê mirov bihelike. Bingeha vê terbiyeyê jî, rewîşt û exlaqê baş e. Divê were zanîn ku pîrrianiya sedemên jiyane, daxwaz û vîna jîinker e.



Meqseda min ji jiyane ji, xwiroşi û îbadeta Xweda ye. Loma divê cira mirov xweş be bi xelkê re. Divê mirov adil be û ji şopa Pêxember dernekeve. Mirovê herî xeternak ew e yê ku pêdiviya wî bi nan û zikê heye û gepek nan li ba tune. Ên wisa, herî zêde pêdiviya wan bi qral heye. Divê mirov li ser vê bingehê, keda xwe di rêya Xwedê de xerc bike û temenê xwe gişî di vê rêyê de xerc bike.

Divê bê zanîn ku dujmin neyarê mirov e û divê mirov bi hîlekarî pê re şer bike û li himber wî bi tevdir be. Dostê mirov jî, pir nêzikî mirov e û tu dadwer di navbera mirov û wî de nîne, ji xeynî exlaqê baş. Lewre dostê xwe hilnebijêre heta ku tu wî neceribîne. Vêca heger ev dost hevalê te yê axîretê be, bila yekî şopdarê şerîetê û nasdarê cewherê wê be. Heger ku ew dost ji hevalên dinyê be jî, bila ne yekî cahil û şerxwaz be. Bila yekî azad û rastgo be. Lewre kesê cahil be, dê û bavê wî jî jê direvin. Kesê derewgo jî nabe dost, ji ber ku dostanî bi xwe ji rastiyê tê, ku ev bi xwe jî ji dilsoziyê tê. Vêca çawa wê bibe dost û derew li ser zimanê wî? Divê bê zanîn ku şopdarê şerîetê û rastiyê, ji dostê xwe re baş in. Îcar heger birayê te jî wisa be, qet dev jê bernede lew ku kêmaniyên wî çêbibin jî. Lewre ew ne mîna jinê ye ku tu wê berdî û piştê dîsa wê vegebin ser mehra xwe. Ew mirovekî diltenik e û zû dişke mîna camê, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Dilan ji êşê biparêzin hûn lew  
Piştî rikeberiyê zû li hev nabanin ew  
Gava hezkirina wan bizîvire rikê  
Zû dişikin û nema dicebirin weke camê

Di dawîya gotina xwe de, carîyeyê em destnîşan kirin û got:

Mirovên aqilmend dibejin ku, birayên herî baş ew in ên di şîretkarîyê de hişkin û karên herî baş jî ew in ku encama wan xêrxwazî ye. Pesindariya herî baş ya li ser lêvên zilaman jî ew e. Tê gotin ku divê kole pesindariya Xwedê ji bir neke ji ber du tiştan: Hiş û tenduristî.

Û tê gotin ku; jixwehezkirina zêde bînpêkirina navnîşanêye. Mirovê ku beleyên biçûk li ber çavên wî mezin bibin, Xwedê beleyên mezin bi ser wî de tîne. Kesê ku bi ya ajoyên xwe bike, dê mafên xwe wînda bike û kesê ku bi ya fesadan bike, wê dostên xwe wînda bike. Û kesê ku xêrxwazê te be, dê dostaniya te piştrast bike. Kesê ku di dijminahiyê de sînor nasneke, dê bikeve gunehan û kesê ku bi tevdir nêzî tolhildanê nebe, nikare xwe ji şûr biparêze.

Niha jî ez ê beşekê ji ruweştê dadgeran vebêjim. Kralê min ê bextewar! Divê tu bizanibî ku desthiladariya mafdar, bêyî hukmekî erênî pêk nayê.

Divê dadwer wek hevîyê bixe nava mirovan, da ku mîr û wezîr zilm û zorê nekin û jar û feqîr ji bê dad nemînin. Divê dadger angaştên angaşivanan hemûyan zelal bike û kesên ku înkâr dikin, sûndxwarînê bi wan bike. Aşîtî rêbaza herî baş e di nav Musulmanan de, ji xeynî ya ku helal bixe şuna heram de, an jî heram bixe şuna helal de. Tiştê ku îro gumanê bi te re çêdike; wî baş di ber çavan re derbas bike, da ku tu vegeerî ser rîya rast. Lewre heq ferz e û vegeerî ser heqîyê çêtir e ji berdewamkirina zulmê. Serlêdankaran weke hev bigre û di navbera dijminan de jî wekhevîyê saz bike û bila çavên te timî li ser pîvana heq be. Piştî jî xwe bispêre Xwedê û pêytandinê ji angaştîkaran bixwaze. Heger îspatên xwe pêşkêş kirin tê heq bidî wan, heger na tê bihêlin ku angaştîkar sund bixwe, lewre hukmê Xwedê wisaye. Dujmînen Musulmanan dikarin li ser hevdu şahidîyê bikin, lewre xudayê dilovan ferman daye ku dadger li gora pîvanên berçavî hukum bidin û tiştên di dilan de ji wî re bihêlin. Divê dadwer di dema êş û birçibunê de, an jî di dema xwendina razan de, dadwerîyê neke û divê armanca wî ji wî karî qesta rîya Xwedê be. Lewra kesên nêtpak û yên ku bi xwe re aram in, Xwedê ji wan razî ye û aramîya navbera xelkê jî, bi destê wan saz dike.

El-Zehrî dibêje: “Sê tişt dihêlin ku dadwer bi tena serê xwe bimîne: Gava ku hurmetê ji dilxiraban re bike û gava ku ji pesindariyê hezbike û gava ku ji hejaran biqehere.” Tê gotin ku gava Omer Bin Abdulazîz dadwerek ji peywîrê girt, dadwer jê re gotiye: “Çima te ez ji peywîrê derxistim?” Omer jê re gotiye: “Min bihist ku pesindariya te ji maqamê te mezintir e.”

Tê gotin ku Îskender ji dadwerê xwe re gotiye: “Min peywirek wisa daye te ku, min ruh û şanazî û mirweta xwe jî radestî te kirîye. Vêca vê payê ji nefis û aqlê xwe re bigire.” Û jî aşpêjê xwe re jî gotiye: “Tu serwerê laşê min î. Vêca li nefsa xwe miqate be.” Û jî nivîskarê xwe re jî gotiye: “Tu serdestê hişê min î. Vêca min biparêze bi wan tiştên ku tu li ser min dinivîsînî.”

Cariyeya yekem bi şûn de vekîşîya û ya duduyan bi pêş de hat...

*Li Şehrezadê bu sibe, wê jî vegotina xwe birî.*

ŞEVA HEFTÊ Û NEHEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min ê bextewar, tê gotin ku Dendanê wezîr ji Şewqa Mekan re axaftina xwe berdewam kir û got:

Gava cariyeya pêşîn bi şûn de vegeerîya ya duyemîn bi pêş de çû, bejna xwe li ber bavê te yê qral tewand, erda ber lingê wî heft carî maçî kir û got:

Loqman ji kurê xwe re gotiye: “Sê kes hene tenê di sê cihan de têne naskirin: Mirovê xwedî sinc û dilovan di dema qehirandinê de têne naskirin; mirovê wêrek di cengê de û mirovê birra jî, dema ku pêdiviya mirov li cem wî çêdibe.” Û têne gotin ku zalim herdem poşman e, lew ku xelk pesnê wî jî bidin û mazlum jî dilaram in, lew ku xelk zimandirêjîya wî bikin. Xwedayê dilovan jî dibêje: “Qet bawer nekin ku ew kesên kêfxweşin bi karên xwe û dixwazin ku bi karên xwe bêne pesindan, dê ji azarê bifilitin; ew in ên ku wê azarekê mezin bikşînin.” Pêxember jî-silavên Xwedê lê bin-gotiye: “Kral li gora nêtan e û qismetê herkesî jî li gora nêta wî ye.”

Qralê hêja! Tiştê herî erjeng di insan de, dilê wî ye. Ji ber ku ferman-darê insan dilê wî ye. Lewre çawa ku timahî dikeve dilê wî û dexesî pê re çêdibe, mala wî xira dike. Gava ku xemgînî û keder jî dikeviyê, êşa wê wî dike û gava ku bêhteng dibe jî, ser û bin dibe. Dema ku bextewar dibe bi razîbûnê, ji qehrê têne parastin. Gava ku tirs wî dagir dike bi xemgîniyên ve mijûl dibe û gava ku musîbetik bi serê wî de têne bi tevdîrê xwe diparêze. Gava ku mal û milkê wî çêdibe jî Xwedê jî bîr dike. Gava ku tunebûnek wî gez dike, kul û derdên wî pir dibin û gava ku bêhêvîti wî diwestîne, ji hal dikeve û rûdinê. Di hemû rewşan de, tu xelasîya wî tune ye ji xeynî zikrê Xwedê û mijûlbûna wî ya ji bo debar û rasterîya jîyana xwe.

Têne gotin ku pîrs ji hinek zanistan hatîye kirin û gotine: Gelo kîjan rewş xelkê berbend dike? Wan jî gotine: Kesê ku dilbijokîya wî zora şanazîya wî bibe û bi keda xwe ber bi jor ve hilkişe û zanîna wî fireh bibe û hêcet pêre nemînin, çawa ku Qeys gotîye:

Rêya min qet pê nakeve ew kesê ku  
Xelkê şaş dibîne û ew bi xwe şaş e  
Mal û mulk û sinc hemû kinc in ji mirov re  
Lê rastî her veşartî ye ew di dil de  
Gava derbasbûna te ne di derî re be  
Tê şaş bikî rê, lewre rêya rast di derî re ye

Piştî carîyeyê berdewam kir û got:

Di warê agahîyên derbarê zahîdan de jî Hîsam Bin Buşr gotîye: “Min ji Am Bin Ubeyd re gotîye; rastîya zahîdan çîye gelo?” Wî jî min re got: “Pêxemberê Xwedê-silavên Xwedê li ser bin-gotiye: Zahîd ew kesên ku tîrb û belayan ji bîr nakin; ew kesên ku tiştên baqî di ser tiştên fanî re hildibijêrin û siberojek bi tenê jî ji rojên wan nemaye ku soza mirinê ji nefsa xwe re nedane.”

Têne gotin ku Ebû Zer El-Xefarî gotîye: “Ji maldariyê bêhtir ez ji xizaniyê

hezdkim û nexweşî jî ji tenduristiyê behtir li min tê.” Hinek ji guhdarên wî gotine: “Xwedê Ebû Zer bide ber dilovanîya xwe, ez jî dibejim ku kî kîjan bijarên Xweda hilbijêre, dê razî be bi wê bijareya xwe.”

Hinek kesên pêbawer gotine ku gava Îbnû Ūbaruk heta pêşî ji nimêjê sibehê bi me da kirin, di serê wê de “Ya eyyûhel Mudessir”<sup>14</sup> xwend, heta ku giha gotina Xwedayê dilovan a ku dibêje: “Feîza neqere finna qûrî”<sup>15</sup> Ū di cî de ket erdê û mir.

Tê gotin ku Sabit El Benanî giriyaye heta ku çav pêve nemane û kor bûye. Zilamek anîne ji bo ku wî derman bike. Wî jî gotiye: “Heger bi ya min bike ez ê wî derman bikim.” Sabit jî gotiye: “Di çi de?” Zilamê bijişk jî gotiye: “Di mijara girî de. Divê tu bi ya min bikî û negrî.” Sabit jî gotiye: “Naxwe çi feyde di çavên min de heye gava ku negrîm?” Zilamekî jî ji Muhammed Bin Abdulah re gotiye...

*Li Şehrazadê bû sibeh û wê jî navber da gotina xwe.*

ŞEVA HEYŞTÊYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Vêca Şahînsahê min ê bextewar, gava ku Dendanê Wezîr vegotina xwe ji Şewqa Mekan re berdewam kir, got:

Cariyeya dudan ji rehmetiyê bavê te re got ku:

Zilamekî ji Muhammed Bin Abdullah re gotiye: “Ez şîretê li te dikim ku tu li dinyê zahidekî ji mal û mulk bireve û li axretê jî mirovekî temakar û çavbirçî bî!”

Xews Bin Abdulah jî gotiye: “Du birayên hev hebûne ji Benî-Îsraîlan, yekî ji yê din re gotiye ‘Gelo karê herî metirsîdar ê ku te kirîye çi ye?’ Wî jî gotiye: ‘Rojekê min rêya xwe bi koxeke mirîşkan xistiye û çîçîkek jê girtiye û min ew avêtiye wê mala han. Tiştê herî metirsîdar ê ku min kirîye, ew e. Vêca ka te çi kirîye?’ Yê mayîn jî gotiye; yê min karê herî metirsîdar ji bo min ew e ku gava ez radibim nimêjê, ez ditirsim ku nimêj kirina min ji ber tirsê ji cezayê Xwedê be, ne ji ber hezkirina wî be!’ Bavê wan jî wê gavê li wan guhdar dikir. Wî jî ji Xwedayê xwe re gotiye ‘Xwedêyo! Heger herdu rastgo bin, wan bigire cem xwe.’ Hinek aqilmend dibêjin; xwedêgiravî

14 . Ey yê ku xwe rapêçaye (navê sûreta 74’an ji Qurana pîroz e.)

15 . Gava ku Îsrafil pif bike sûrê (Roja qiyametê)

zarwên herî baş, herdu law bûne.”

Seîd Bin Cebîr jî gotiye: Min hevaltî bi Fedale Bin Abîd re dikir, min jê re got: “Ka şîretê li min bike!” Wî jî got: “Van herdu şîretan ji bîr neke; xwe neke şîrikê Xwedê di tu tiştî de û zerarê nede tu zindiyên ku Xwedê ew afirandine.” Piştî ev her çar beyt gotin:

Tu çawa dibî bibe, Xweda her keremdar e  
Kul û derdan berde û herdem geşbîn be  
Tenê nêzikî du tiştan nebe tu şiyar be!  
Nebe şîrikê wî û ji herkesî re bê zirar be!

Çiqasî rast gotiye ew helbestkarê ku gotiye:

Dema ku di tûrikê te de teqwa tunebe  
Û li wê dinyê tu li yekî maldar rast werî  
Tê poşman bibî bê çima tu ne wek wî yî  
Û tu jî mîna wî çima ne teqwabarî!

Piştî cariyeya sisyan bi pêş de hat û ya duduyan xwe bi şûn ve da. Ya sêyemîn ji rehmetyê bavê te re got:

Deriyê îbadetkaran pir fire ye. Lê belê ez ê hinek gotinên pêşyan tenê bêjim ên ku di bîra min de mane. Tê gotin ku mirovekî salih gotiye: “Mirin hertim di bîra min deye û ev yek jî rehetiye ji min re nahêle. Lê belê ez fêr bûme ku mirin dikeve navbera mirov û karê mirov de. Vêca ez hêvî dikim karê başiyê zêde be û yê xerabiyê were birrîn.”

Tê gotin ku Ata-El Selemî wa’z û şîret dikirin û di pey re jî digirya û hey digirya û pê re jî diricifî. Xelkê jî jê re digot: “Çima tu wisa dikî?” Wî jî digot: “Piştî wa’zan ez berê xwe didim cihekî herî pîroz; ez derdikevim raserî Xwedayê xwe ji bo ku ez li gora wan wa’zên xwe tevbigirim.”

Dibêjin, gava ku Alî Zeynelabîdîn Bin El-Huseyn radibû nimêjê, her derên wî diricifî. Xelkê seba wê yekê jê pirsîye, wî jî gotiye: “Hûn dizanin bê ez li himberî kê radibim û rûdinê û ez bi kê re diaxivim?” Wê kêlikê jî li kêleka yekî kor bûye ku jê re digotin Sufiyan Es-Sewrî. Mirovekî ku di dema rojiyê de li pêşya xelkê nimêj dikir û bêdeng dima. Vêca gava Sufiyan Es-Sewrî ew gotina Alî Zeynelabîdîn bihistiye, gotiye: “Roja qiyametê quraxwendan tînin ji bo ku xwedîxêran ji yên din veqetînin.” Tê gotin ku wî Sufiyanî gotiye: “Heger nefsa mirov di nava dil de ci bigire çawa ku tê xwestin, ji kêf û bêrikirina buhuştê dike ku bifirre û ji tirsê agirê dogehê jî xemgîn dibe.” Dîsa tê gotin ku Sufiyan Es-Sewrî gotiye: “Şaş e ku mirov li rûyê zalim binêre!”

Piştire cariyeya sisyan ji xwe bi şûn de da û ya çaran bi pêş de hat û got:

Va ez ê ji hineke gotinên salihan ji we re bêjim. Tê gotin ku Buşra Bin El-Hafî gotiye: “Min bihîst ku Xalid dibêje: Xwe dûrî fikarên şirkê bikin. Min jî jê re got: Fikarên şirkê çi ne? Got: Ew e ku yek ji we di ser nimêjê de xiroşê dirêj bike hetanî ku destmêja wî xera bibe.”

Hinek kesên salih gotine: “Xêrkarî nebaşiyên mirov dibin.” Dibêjin yekî gotiye: “Min hinek razên heqîqetê ji Bûşrul Hafî girtine û wî bi xwe ji min re gotiye: Kurê min, divê mirov zêde nekeve efra vê dinyê de.” Îbrahîm Îbnî Edhem jî gotiye: “Gotinên wî xweşiya min çûn û min jî qencî pê kir. Gava ku ez rabûn nimêjê, min bala xwe dayê ku ew jî nimêj dike. Rabû ez çûm, min li pey wî nimêj kir, hetanî ku mûezin azana xwe xwend. Wê gavê zilamekî bi kincên perpitî rabû ser xwe û got: Xelkino! Baldar bin li himber rastiyên zerarker, derewên sûdwer jî ne xerab in, di dema mecbûriyê de, jixwe şensê mirov ê hilibijartinê tuneye. Di dema tunebûnê de jî feyda axaftinê nîne û zerara bêdengiyê jî nîne di dema hebûna hebûnê de.”

Dişa dibêjin Îbrahîm Bin Edhem gotiye: “Min dît ku mirovek ji qudûm ketiye ji birçîbûnê. Ez jî pêve rabûm û min derhemek dayê, wî jî got: Min navê. Rabû min jê re got: Ev ji malê min ê helale. Wî got: Ez xweşiyên axretê bi yêrî dinyayê naguherînim!”

Dişa tê gotin ku xwişka Bûşrul Hafî çûye cem Ehmed Îbnî Hambel...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî.*

ŞEVA HEYŞTÊ Û YEKEMÎN

*Şehrezadê got:*

Vêca Şahênşahê min ê bextewar, Dendanê wezîr vegotina xwe ji Şewqa Mekan re berdewam kir û got:

Cariyeyê ji bavê te re got ku:

Xwişka Bûşrul Hafî çûye cem Ehmed Bin Hambel û jê re gotiye: “Ey îmamê ola pîroz! Em bi şev li ser ban di karê tevnê de dişuxulîn û bi rojê jî debara xwe dikin. Vêca dibe ku serkirdeyên Bexdê bi şev di ber me re derbas bibin bi findên xwe û em jî di wî halî de gelo ev heram e ji bo me?” Îmam jî gotiye: “Tu kî yî?” Gotiye: “Ez xwişka Bûşrul Hafî me.” Wî jî gotiye: “Xelkino! Hîna ez tîrsa Xwedê ji dilên we deyn dikim!”

Hinek mirovên salih gotine: “Gava Xwedê bixwaze xêrê bi yekî bike, deriyê karekî jê re vedike.” Dîsa tê gotin ku, gava Malik Bin Dînar di sûkê re derbas dibû û tiştêkî ku dilê wî dibijiyayê didit, ji nefsa xwe re digot: “Sebir bike ey nefsa, ez tev li daxwaza te nabim.”

Pêxemberê Ummetê jî gotiye: “Aramiya nefsa, di dijberiya wê de ye û malwêraniya wê jî di şopandina wê de ye.”

Mensûr Bin Ammar gotiye: Min xwest ku ez herim heccê, rabû ji hêla Kûfeyê min berê xwe da Mekkeyê. Di nava şeveke tarî de, min bala xwe dayê ku yek gazî dike û dibêje: “Xwedawo! Bi wî navê te yê şêrîn, tu nêta min tunebû ku ez li himberî te derkevim bi wê gunehkarîyê. Lewre ez ne mirovekî xwedênenas im. Lê belê qedera te bû ku te ew li ser enîya min nivîsandibû ji berî ezelê ve. De êdî li min bibore, lewre ji nezaniya xwe ez ji rêya te derketim.” Dûvre gava ku ew lavekariya xwe qedand, ev ayeta han xwend û got: “Ey bawermendino! Nefsa xwe û mirovên xwe biparêzin ji agirekî ku sotemeniya wê insan û kevir in!” Piştî repînek hat, min tê dernexist bê çî ye ne çî ye. Roja dîtir gava em bi şûn de vegehiyan di heman rêyê re, me cenazeyek dit ku pîrejinek li pey diçe. Min ew cenaze jê pirsî, got: “Ev cenazeyê zilamekî ye ku doh di ba me re derbas bû, dema ku kurê min limêj dikir û ayetek ji Qurana pîroz dixwend. Zilam jî, çawa ku ew ayet bihîst, ziravê wî qetiya û got rep li erdê ket û mir.”

Piştî cariyeya çaran jî xwe bi şûn de kişand û ya pêncan bi pêş de hat û got:

Va ez ê jî çend gotinan ji gotinên pêşiyên bêjim. Muslime Bin Dînar digot ku sererastkirina wîjdanî, gunehên biçûk û mezin dide efûkirin. Gava ku mirov biryarê bide ji bo dev ji gunehan berde, rêya serkeftinê ji mirov re vedibe. Çi xweşîya ku mirov nêzikî Xwedê neke, beleya serê mirov e. Lewre tiştin hindik ji vê dinyayê mirov mehrûm dikin ji gelek tiştên wê dinyayê.

Tê gotin ku xelkê ji Ebû Hazim pirsîne, gotine: “Kî ye mirovê herî serkeftî?” Gotiye: “Ew kesê ku temenê xwe di îbadeta Xwedê de xerc kiriye.” Piştî jê re gotine: “Mirovê herî debeng kî ye?” Gotiye: “Ew kesê ku axreta xwe, bi dinyaya yekî din firotiye.”

Tê gotin ku gava Hezretî Mûsa tê ser ava Medyen, li wir disekine û lavan ji Xwedê dike, jê re dibêje: “Xwedêyo tu li xizanê xwe were rehmê!” Yanî alîkariyê ji Xwedê dixwaze û ji xelkê naxwaze. Wê kêlikê du keç di wir re derbas dibin, ew jî avê dide wan. Gava ku herdu keç vedigerin cem bavê xwe Şûayb û wê rewşa wî jê re dibêjin, bavê wan dibêje belkî mirovekî birçî

ye. Piştire ji yekê ji wan re dibêje: “Here gazî wî bike, bila bê cem me xwarinê bixwe.” Keçik li pey wî diçe, gava digihêje cem wî, ser çavên xwe dinuxumîne û jê re dibêje: “Bavê min te dawetî mala me dike û dixwaze qenciyê bi te bike di ber wê ava ku te da me.” Mûsa aciz dibe bi wê gotina wê û naxwaze ku pê re here, lê belê li pey wê diçe. Keçik jineke spehî û li hevhatî ye. Ba ji ji paş ve li kirasê wê dida û kulîmekên wê graver nîşan didan. Mûsa jî çavên xwe digirtin. Piştire ji keçikê re got: “Tu bidî dût min.” Keçikê da dût wî û çûn hetanî ku derbasî cem Şûayb bûn; şiv ji amade bû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê ji gotina xwe birrî.*

ŞEVA HEYŞTÊ Û DUYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahînaşahê min ê bextewar, Dendanê wezîr axaftina xwe berdewam kir û got ku:

Cariyeya pêncan gotiye, gava ku Mûsa derbasî cem Şûayb bûye-silavên Xwedê li ser herduyan be- Şûayb ji Mûsa re gotiye: “Ey Mûsa! Ez dixwazim heqê wê ava ku te dayê herdu keçên min bidim te.” Mûsa jî jê re gotiye: “Ez ji malbatekê me ku em tiştêkî ji wê dinyayê nafiroşin bi hemû ziv û zêrên vê dinyayê.” Şûayb jî jê re gotiye: “Xorto, tu mêvanê min î û ji adeta min û bav û kalê min e ku ez mazûbaniya mêvanê xwe bikim û xwarinê bidime wî.” Mûsa jî rûniştiye, xwarina wî xwariye. Piştire Şûaybe ji Mûsa xwestiye ku heyşt salan jê re bixebite û ew jî li şûna heqê wî keçeke xwe bide wî, çawa ku Xwedê jî di pirtûka xwe ya pîroz de gotiye: “Ez dixwazim yeke ji van herdu keçên xwe li te mehr bikim bi şertê ku tu ji heyşt salan ji min re bixebitî. Heger tu deh salan ji min re bixebite, dê ew qenciya te be, heger nebe jî, ez naxwazim te biêşînim.”

Tê gotin ku mirovekî ji hinek dostên xwe re gotiye-ku ji demeke dirêj ve ew nedîtine- “Min pir bêriya te kiriye, ji ber ku ji zû ve min tu nedîtîye, lewre ez bi kurê Şehab ve daketibûm. Gelo tu wî nas dikî?” Wî jî gotiye: “Belê, ew cînarê min e ji beriya sîh salî ve, lê belê ez pê re nepeyivîme.” Yê din jê re gotiye: “Naxwe te Xwedê ji bîr kiriye ku te cînarê xwe jî ji bîr kiriye. Heger te ji Xwedê hez bikira, tê ji cînarê xwe jî hez bikira. Qey tu nizanî ku heqê cînar li ser cînarê wî heye bi qasê yê merivê wî?”

Hûzeyfe jî gotiye: “Ez û Îbrahîm Bin Edhem derbasî Mekke bûn ku Şeqîqê Belxî jî wê salê hatibû heccê. Di dema tewafê de em li hev rast hatin. Îbrahîm ji Şeqîq re got: Rewşa we çawa ye, li welatê we? Şeqîq got: Gava ku rizqê me hebe, em dixwin û gava tunebe jî, em sebir dikin. Îbrahîm jî got:



Kuçikên Belxê ji wisa dikin, lê yê me gava ku rizqê me çêdibe em wî qebûl dikin û gava ku em birçî dibin jî, em spasiya Xwedê dikin. Wê gavê Şeqîq li ber destê Îbrahîm rûdinê û jê re dibêje: Tu mamosteyê min î!”

Muhammed Bin Omran jî gotiye ku, mirovekî ji Hatemê kerr pirsîye, gotiye: “Çi nêrîna te heye li ser xwesipartina Xwedê?” Wî jî gotiye: “Di du mijaran de ez xwe dispêrim Xwedê, lewre ez dizanim ku kes nikare rizqê min bixwe ji min pê ve û ez dizanim ku ez ne bêagahîya Xwedê hatime dinê, loma ez ji ber wî fedî dikim.”

Piştî cariyeya pêncan jî xwe bi paş de anî û pîrejî bi pêş de hat, bejna xwe li ber bavê te tewand û neh caran erda ber nigê wî maçî kir û got:

Qralê hêja! Te bihîst bê çawa hemû cariyeyan ji te re behsa zuhdê kirin. Ez ê jî bidim dî şopa wan û hinek gotinên pêşiyên salih ji te re vebêjim.

Tê gotin ku Îmamê Şafîî-Xweda jê razî be-şev dikir sê beş: Beşa serî ji bo zanînê, beşa duduyan jî ji bo xewê û ya sisiyan jî ji bo xebatê. Îmam Ebû Hanîfe jî nîvek ji şevê vediqetand ji bo îbadetê. Carekê gava ku ew dimeşîya, mirovek wî destnîşan dike û ji xelkê re dibêje: “Ev mirov şev pê de îbadetê dike.” Gava gotina wî zilamî dibihîze, ji ber xwe fedî dike û dibêje: “Ez fedî dikim ji Xwedê gava ku yek pesnê min dide bi tiştêkî ku di min de nîne.” Loma, piştî wê yekê, êdî şev pê de îbadet kir.

Rabî jî digot ku El-Şafîî, di meha rojîyê de heftê carî Qur’an xitim dikir, hem jî di ser nimêjê de. El-Şafîî bi xwe jî-Xwedê jê razî be-gotiye ku deh salên wî tê nexwariye, ji nanê cehînî. Ji ber ku têrxwarin dil hişk dike, zîrekîyê dibe, xewê tîne û xwediyê xwe giran dike ku nema dikare rabe ser xwe.

Tê gotin ku Abdullah Bin Mûhammed El-Sukerî gotiye: “Ez û Omer bi hev re diaxivîn. Wî ji min re got: Min zimanê kesî mîna yê Mûhammed Bin Îdrîs El-Şafîî fesîh nedîtiye. Rojekê ez û El-Hars Bin Lebîb Essafar ê ku şagirtê El-Meznî bû, bi hev re derketin. Dengê wî jî pir xweş bû. Vêca ayeta ‘Haza yewmon la yentîqûne wela yûezînûne lehom feya’tezîrûn.’<sup>16</sup> xwend. Wê gavê min dît ku rengê Îmamê Şafîî hate guhertin, laşê wî xwîrya, dilê wî li hev ket û di encamê de ji ser hişê xwe çû. Piştî gava dîsa bi ser xwe hat, got: ‘Xwedê min bisitirîne ji hemû rîpên derewkaran û fenên aqilmendan! Xwedêyo! Ji bo te dikevin xiroşê hemû dilên zanayan! Xwedêyo! Gunehên min bibexşîne bi comerdiya xwe û min spehî bike bi stara xwe û kêmaniyên

16. Ev rojeke ku nikarin tê de biaxivin û ne ji destûr ji wan re tê dan. Ew jî lêborînê dixwazin.

min bibexşîne bi comerdiya rûyê xwe.’ Piştire ez rabûm, ji wir çûm.”

Hinek ku bawerî bi wan tê, gotin: “Gava em derbasî Bexdayê bûn, Şafî jî li wir bû. Em jî çûn ser ava çem ji bo ku desmêjê bigirin û xwe ji nimêjê re amade bikin. Di wê kêlikê de mirovek di ber min re derbas bû û ji min re got: ‘Ciwano! Destmêja xwe baş bigire, wê Xwedê qedrê te li vê dinyê û li wê dinyê jî baş bigire.’ Ez lê zîvirîm, min dît ku ew axavgêr kesekî ku cemaet li dû wî ye. Min jî lez da destmêja xwe û bi lez da dûv wî. Li min zîvirî û got: ‘Tu pêdiviyên te hene?’ Min got: ‘Belê, ez dixwazim ku çi tiştê Xwedê fêrî te kiriye, tu jî wî fêrî min bikî.’ Got: ‘Bizanibe ku kesê sadiq bi Xwedê re, herdem rizgar dibe. Yê ku bi ser ola xwe de dilovan be jî, ji qede û beleyan tê parastin. Ê ku guh nede malê vê dinyayê jî, wê çavên wî ronî bin li wê dinyayê. Ez hinekî din jî fêrî te bikim?’ Min jî got: ‘Bike.’ Got: ‘Li dinyayê zahîd be û li axretê daxwazkar be. Di hemû karên xwe de rasto be, dê Xwedê te rizgar bike.’ Piştire çû. Min ji yên derdora xwe pirsî, gotin; Îmamê Şafî ev bixwe ye!”

Dibêjin Îmamê Şafî’î gotiye: “Min dixwest ku xelk hemû sûtê ji vê gerdûnê wergirin, li şûna ku tişteki min tê de hebe...”

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA HEYŞTÊ Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê got:*

Vêca Şahînsahê min ê bextewar, Dendanê wezîr axaftina xwe berdewam kir ji Şewqa Mekan re û got:

Pîrejînê ji bavê te re got ku Îmamê Şafî’î gotiye: “Xwezî herkesî sût wergirta ji vê dinyayê û bila tişteki min tê de tunebûya.” Dîsa tê gotin ku wî gotiye: “Min kî dîtibe, misoger ku min xwestiye Xwedê wî serkeftî bike, alî wî bike û wî bigihîne ser rêya heq. Û min kî dîtibe, misoger min xwestiye ku heqîqet di rûyê wî re bide der, bêyî ku ez guh bidimê bê ev heqîqet li ser zimanê min tê yan jî yê wî.” Dîsa tê gotin ku Xwedê jê razîyo gotiye: “Gava tu ji zanîna xwe ya erjeng bitirsî, kesê ku tu razîbûna wî dixwazî werîne bîra xwe, xweşjiyana ku tu dixwazî û cezayê ku tu jê ditirsî bîne bîra xwe.”

Tê gotin ku hinekan ji Ebî-Hanîfe re gotiye: “Emîrê Bawermendan Cafer El-Mensûr, tu kirîye qazî (dadwer) û mûçeyekî bi qasî deh hezar dîrhem ji te re veqetandîye.” Roja ku dê mûçeyê wî jê re bîniyana, nimêja sibehê kir, kirasê xwe li xwe kir û bédeng ma. Qasidê Emîrê Bawermendan dirav jê re anîn û derbasî cem wî bû, pê re axivî, lê belê ew dîsa bédeng ma

û lê venegerand. Qasîd jê re got: “Ev dirav helal in.” Wî jî got: “Ez dizanim ku malekî helal e, lê ez naxwazim dostaniya hêzdarên bikeve dilê min de.” Qasîd got: “Lê ku tu derbasî cem wan bibî û xwe ji dostaniya biparêzî nabe?” Got: “Qey mirov dikare bikeve behrê û kincên xwe şil neke?!”

Û Şafî’î jî gotiye:

Ey nefsa min razî be tu bi gotina min!  
Ger ku wisa bî tu, herdem tê ezîz bî  
Berde wan hêvîyên tamakar naza min!  
Çendîn hêvî mirin anîne ji xwedî re!

Sufîyanê Sewrî şîretin li Elî Bin Hesên El-Selemî kirine û jê re gotiye: “Rastgo be tu herdem û dûr keve ji derew û bêbextî û durûtî û nelirêtîyê. Lewre Xwedê Teala, karê salih bi yekê ji van dixemilîne. Ola xwe jî ji yekê dilêşê dînê xwe be bigire, ne ji kesî din û bila destbirakê te yekî ku berê te bide zuhdê, mirinê bîne bîra te be. Her dem lêborîna xwe jî Xwedê bixwaze û tendurustiyê jê bixwaze ji bo temenê xwe yê mayî û çî bawermendê ku pîrsê ji te bike, jê re bêje bila li ola xwe miqate be. Tu caran bêbextiyê bi bawermendan neke, lewre bêbextiya bi bawermendekî re, bêbextiya bi Xwedê û Pêxemberê wî re ye. Û dûrî nîqaşên bêwate bikeve, bila dudilî bi te re çênebe û gûman nekevin dilê te, lewre gûman bawerixwir in. Tiştê baş bike û dûrî tiştê xerab bikeve, da ku tu bibî evîndarê Xwedê. Hemû tiştên veşartî, ên nava xwe baş bike, ji bo ku Xwedê rûyê te spî bike. Kesên ku lêborînê ji te dixwazin, lêborîna wan qebûl bike û ji Musulmanan buxze neke. Kesên ji te xeyidîbin, dilê wan xweş bike û kesên ku neheqî li te kiribe jî, di wan de bibuhure da ku tu bibî refîqê enbiya (pêxemberan). Bila dilê te vekirî be û pala xwe bide Xwedayê xwe, çî eşkere çî veşartî û ji Xwedê bitirse ew tîrsa kesê ku dizane wê ew bimire û dîsa vebijî di roja heşrê de û wê here ber deste Xwedayê Cebbar û ji bîr neke ku dê çarenûsa te yan cenetî be yan jî dogehî.”

Pîştî, pîrejin çû li kêleka cariyeyan rûnişt. Gava rehmetiyê bavê te ew gotinên wan bihîstin, tê gihîşt ku ew cariyeyên han, baştirîn kesên zemanê xwe ne. Spehîbûn û edeba wan çavên wî dagirtin û meyla wî bi ser wan ve çû. Qedr û qîmetê pîrejinê girt û qesra ku berê Îbrîzeyê Şahbanû lê dima ji wan re vala kir, ew lê bi cî kirin û hemû pêdiviyên wan tedarik kirin, dane wan. Bi qasî deh rojan jî li cem wan ma ku di wê demê de her cara derbasî cem pîrejinê dibû, didît ku jinik di ser nimêja xwe de ye; şev û roj îbade-ta xwe dike. Bi vê yekê hîn bêhtir jê hez kir û ji min re got: “Ey Dendanê Wezîr! Ev pîrejin ji salihan e û cihê wê di dilê min de çêbûye.”

Di roja yanzdehan de, bavê te pêre rûnişt ji bo ku buhaya cariyeyan

bide wê. Pîrêjinê jê re got: “Ey qral û desthilatdarê welat! Buhaya van cariyayan ne li gorî xelkên ji rêzê ne. Loma ez heqê wan ne bi zêr û zîvan ji te dixwazim û ne ji bi cewheran.” Qral ma şaş bi vê gotina wê û jê re got: “Naxwe heqê wan çi ye xanima delal?” Pîrêjinê got: “Ez wan nafiroşim te, heger tu mehekê sax li ser hev rojî negire û bi şev jî li rûyê Xwedan xiroşê nekî. Vêca heger tu wisa bikî, wê ev cariyê ji mulkên te bin û tu çawa dikî, tê wisa bi wan bikî.”

Qral, pir şaşwaz bû li himberî vê bawermendî û olkariya pîrêjinê û hîn bêhtir li ber çavên wî mezîn bû û di dilê xwe de got: “Xwedê lutfek bi ser min de şandiyê!” Piştê şertên pîrê qebûl kirin û li hev hatin ku ew mehekê sax rojîyê bigre. Pîrêjinê jî jê re got: “Ez ê jî bi duayên xwe alîkariya te bikim, de êdî ka kûzekî avê ji min re bîne!” Kûzek av jê re anîn, jinikê li ser xwend û bû himehima wê, bêhtirî katjimêrekê axivî, bi zimanekî ku me jê fêm nedikir. Potikek jî avêt ser, kûz nuxumand, da dest bavê te û jê re got: “Piştî ku te deh rojên ewil girtin, fitara xwe bi ava vî kûzî veke. Ev av, dê hezkirina dinyê ji dilê te derxîne û li şûna wê, dê dilê te bi nûra îmanê dagire. Ez ê jî sibe herim ji bo ez birayên xwe yên cinî bibînim, lewre min bêriya wan kiriye. Piştî ku her deh rojên pêşî biqedin, ez ê dîsa li te vegerim.”

Bavê te rahişt kûzê avê û rabû çû goşeyêke tenha ji qesrê, li wir ket xelwetê de û kilîta deriyê xelwetxaneyê kir bêrika xwe. Gava bû sibe jî Qral dest bi rojiya xwe kir; pîrejin jî derket, çû bi rêya xwe de.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

## ŞEVA HEYŞTÊ Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahînsahê min ê bextewar, vêca Derdanê Wezîr vegotina serpehatiya xwe berdewam kir ji Şewqa Mekan re û got:

Çawa ku bû sibe, Qral dest bi rojiya xwe kir û pîrejin jî bi rêya xwe de çû. Qral deh rojên rojiya xwe qedandin, di roja yanzdehan de jî kûzê avê vekir û têra xwe jê vexwar, dil û hinavên wî pê xweş bûn. Piştî bavê te yê qral deh rojên din jî rojî girt, pîrejin dîsa hat ku vê carê helaweke kesk pîre hebû mîna pelên şindaran bû. Derbasî cem bavê te bû, silavek lê kir, ew jî ji ber rabû û bi germahî silava pîrejina salih girt. Pîrejinê jê re got: “Cinî silavan li te dikin, lewre min behsa te ji wan re kir, ew jî pir kêfxweş bûn bi wê yekê û ev helawa han bi min re şandin ji te re ku helawa wê dinyê ye.” Bavê te pir pir kêfxweş bû bi vê yekê û got; şikir ji wî Xwedayî re ku ji wê dinyaya wî alî jî bira ji min re çêkirine!” Dûra spasdariya xwe ji pîrejinê re pêşkêş kir û

gelek qedrê wê û cariyeyan girt.

Piştî bavê te bîst rojên xwe qedandin, pîrejinê jê re got: “Ey Qralê Hêja! Divê tu bizanibî ku min behsa dostaniya xwe û te ji cinîyan re kir û min ji wan re got ku min ew cariyê ji te re hiştine, ji ber ku ew çawa te dibînin duayên pêkwer ji te re dikin, bê rawestan. Loma ez dixwazim wan careke din bibim cem cinîyan ji bo hilmên wan bikşînin. Dibe ku ew piştî vê hatinê destvala li te venegerin û defîneyeke zêr û zîvan bi xwe re binin ji te re. Tu jî piştî ku tu rojîya xwe biqedînî, tê bi wa ve mijûl bibî bi xêz û xemla wan ve û wan zêran ji li ser wan bikî ji bo ku tu bi wan şa bibî.”

Gava bavê te ew gotina wê bihîst, spasiya xwe jê re pêşkêş kir û got: “Heger ez ne tirsiyama, min ew defîne û tiştên ku tu behs dikî qebûl nedikir. Lê gelo ka tê kengî wan bi xwe re bibî?” Wê got: “Ez ê wan di şeva bîst û heftan de bibim û di dawîya mehê de ez ê wan li te vegezinim. Wê gavê tê ji rojîya xwe bi dawî bikî, êdî tê wan heq bikî û ew jî wê bibin malê te; tu jî dizanî ku her yek ji wan hêjaye hemû mal û mulkê te.” Wî jî got: “Ez wê yekê dizanim ey jina salih û oldar!” Piştî, pîrejinê jê re got: “Divê tû yeke rûmetdar ji malbatê jî bi wan re bişînî, da ku wensa wan bîne û bereketê ji ber destê cinîyan wergire.” Bavê te got: “Cariyê min a Romî heye, navê wê Safiye ye ku keç û kurekî min jê heye, lê mixabin du sal berê herdu jî wenda bûn. Wêna bi xwe re bibe, belkî Xwedê li wê were rehmê û bereketekê bigire ji ber destên wan cinîyan...”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

## ŞEVA HEYŞTÊ Û PÛNCÊMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahînsahê min ê bextewar, Dendanê wezîr vegotina serpêhatiyê ji Şewqa Mekan re berdeham kir û got:

Îcar bavê te jî ji pîrejinê re got: “Safiye bi xwe re bibe, belkî Xwedê li wê jî bê rehmê û bereket bikeve şensê wê de û ew mirovên cinî duayan jê re bikin, belkî herdu zarokên xwe bibîne.” Pîrejinê jî jê re got: “Tiştê herî rast ev e!”

Piştî, gava ku rojîya bavê te gîhaşt roja bîst û heftan, pîrejinê ji bavê te re got: “Ka kurê min Safiye bîne, ez ê herim cem mirovên wê dinyayê.” Bavê te di cî de gazî xulaman kir, wan jî di cî de Safiye anîn, ew teslîmî pîrejinê kirin. Wê jî ew tev li her pênc cariyeyên xwe kir. Dûvre derbasî xelwetgeha xwe bû, îskaneke devgirtî anî teslîmî bavê te kir û jê re got: “Gava te rojîya

roja sîhemîn girt, here hemamê û were bikeve xelwetxaneyâ xwe ya di qesrê de, vê îskanê vexwe û rakeve. Bi wê yekê re, tê bigihêje armancên xwe.”

Qralê bavê te, pir kêfxweş bû bi wê yekê, spasîyên xwe jê re anîn ziman û destê wê ramûsa. Pîrejinê xatir jê xwest, wî jî got: “Ey xatûna salih, gelo ez ê kengî te bibînim, bawer bike ez ê nikarim firaqa te ragirim?” Jinikê dua jêre kirin û bêyî ku bersivê bide pirsê wî, carîye û Safîye jî dan kêleka xwe û ji wir çû.

Bavê te sê rojên din rojî girt, meha xwe temam kir û piştê çû hemamê, xwe şûşt û dîsa vegeriya qesra xwe, ket xelwetê de û ferman da hemû xizmetkaran ku kes derbasî cem wî nebe. Derî li ser xwe girt, îskana avê vexwar û raket. Em jî heta êvarê li bendî wî man, lê ji xelweta xwe derneket! Me jî got qey westiyaye ji ber rojî, îbadeta şevê û çûna hemamê û ji ber wê ji raketî maye. Me rojêke din jî xwe li bendî wî ragirt, lê belê dîsa jî ji hundur derneket. Rabû em çûn ber deriyê xelwetgeha wî û bi dengê bilind em axivîn ji bo ku deng here wî û şiyar bibe, lê dîsa jî deng jê nehat. Rabû me derî ji ber xist û derbasî cem bûn, me dît ku goştê laşê wî perçe perçe bûye û hestiyên wî hûr bûne.

Em bi wê dîmenê gelekî êşiyân û em çûn, me rahîşt îskanê, lê meqzand, me dît ku kaxezek li ser qapaxa wê heye ku li ser nîvisandîye: “Dilovanî ji bo xerabkaran nabe û ev cezayê kesên ku fena li keçên qralan bike û wan xera bike. Her kesê ku vê kaxezê bibîne, divê bizanibe ku gava Şerker hat welatê me, Şahbanûya me Îbrîza xera kir. Ew jî têra wî nekir, rabû Îbrîza ji cem me bir, anî vir û piştê jî ew bi koleyekî reş re şand. Kolê jî ew li çolekê kuşt, laşê wê li wir hişt û reviya çû, me jî laşê wê li naverastekê dît. Ev kar ne karê qralan e û ev ceza jî heqê kesên wisa ye. Hûn jî kesî tawanber nekin ji ber kuştina wî. Lewre kujera wî qehpikek jêhatî ye ku jê re dibêjin ‘Dayika Zîrekan’. Û vaye min jina qral Safîye jî bi xwe re bir cem bavê wê Efrîdon, qralê Qostantînîye. Misoger ku em ê rojêke bigrin ser we, li talanê we bixin, we bikujin û vî welatî ji we bîstînin, we tevan serûbin bikin heta ku yek ji we nemîne ku pif bike agirekî û herkes îbadetê ji xaçê re bike.”

Gava me ew kaxez xwend, em têgihîştin ku wê pîrejinê em xapandine û hîleya wê çûye serî. Wê çaxê wêlewêl bi me ket, em giriyan û me li kabokên xwe xist, rûçikên xwe bi neynûkan birindar kirin. Lê belê girî ji me re nebû çare û leşker xwe bixwe li telê hev ketin ji ber mijara ku wê kî bibe sultanê wan. Lewre hinek ji wan dixwazin tu bibî sultan li ser serê wan û hinek jî birayê te Şerker dixwazin. Ev gengeşîya han mehekê sax berdewam kir di navbera me de. Dûra em li hev kom bûn û me li hev kir ku em biçin cem birê te Şerker û em ketin rê de hetanî em hatin li te qelibîn. Sebeb û

mirina Qral Omer en-Nûman jî bi vî hawî bû.

Gava Dendanê wezîr serpêhatîya bavê wî û sebeba mirina wî jê re got, Şewqa Mekan giriya, xwîşka wî Seyrana Zeman û serxizmetkarê mêrê wê jî pê re giriyan û li çogên xwe dan. Piştê serxizmetkar ji Şewqa Mekan re got: “Ey qralê min ê hêja! Grî ne çare ye, çare û xelasî ew e ku tu dilê xwe xwîrt bikî û vîna xwe komî ser hev bikî û vî welatî bi rê ve bibî. Jixwe kesê ku yekî weke te li dû xwe hiştibe, mirî nayê hesêb.”

Wê gavê Şewqa Mekan haş bû û giriye wî sekinî. Piştê ferman da ku nivîna wî li derveyî çadirê raxin û gazi leşkeran bikin da ku li raserî wî rêz bibin.

Serxizmetkar li kêleka wî sekinî, parêzvanên wî jî li pişt wî. Denedanê Wezîr jî li pêşiya wî sekinî û hemû mîr û wezîr û gizîrên dewletê jî li gora rutbeya di rêzê de sekinîn. Piştê Şewqa Mekan ji Dendan re got: “Ka ji min re bêje bê çiqase mal û mulkên bavê min heye?” Wî jî got: “Ser seran, ser çavan qralê min.” Piştê jê re xezîneyên bavê wî hejmartin û dirav, cewher û malên tê de yeko yeko jê re hejmartin û cihê wan nîşanî wî da. Şewqa Mekan jî dirav li leşkeran belav kirin bi qasî ku pêdiviya wan hebû û xelatek baş da Dendan jî.

Piştê ji Dendan re got: “Tê dîsa wezîr be û li ser karê dewletê be.” Dendan jî erda ber lingan maçî kir û dua jê re kirin ku Xwedê temenê wî dirêj bike.

Xelat û diyarî dan mîr û mîrekan jî û herî dawî li serxizmetkar zîvirî û jê re got: “Ka ew baca ku te ji Şamê anîye, bîne vir!”

Serxizmetkar çû jêre sindoqên mal û mulk û cewheran anî, danî ber wî. Wî jî ew giş li ser leşkeran belav kir.

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA HEYŞTÊ Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê got:*

Ey Şahînahê min ê bextewar! Îcar Şewqa Mekan ew xeraca Şamê hemû li leşkeran belav kir û tiştê jê nehişt. Leşkeran, mîr û mîrekan tevan bejna xwe li ber tewandin, erda ber nigê wî maçî kirin, temenekî dirêj bo wî ji Xweda hêvî kirin û gotin: “Me qet qralekî mîna te comerd û destvekirî nedîtiye!” Piştê, rabûn ser xwe û çûn çadirên xwe.

Serê sibehê amedekariyên xwe kirin û dîsa bi rê ketin. Piştî rêwîtiya sê rojan, xwe gîhandin Bexdayê û ketin nav bajêr, dîtin ku bajar hemû hatiye xemilandin. Sultan Şewqa Mekan ji çû li qesra bavê xwe bi cî bû û li ser textê wî rûnişt. Leşker û Dendanê wezîr û serxizmetkarê Şamê jî, li ber destê wî sekinîn. Wî ji ferman da sernivîskarê xwe ku nameyekê ji birê wî Şerker re binivîsîne û serpêhatiyê ji serî hetanî binî jê re vebêje û di dawiyê de ji jê re bêje “Çawa ku te ev name girt, di cî de xwe amade bike û ligel leşkerên xwe were vir, ji bo ku em herin şerê kafiran, heyfa xwe hilînin û vê şermê ji ser xwe bavêjin!”

Piştîre name ji destê sernivîskar girt, ew pêça, morkir û ji Dendan re got: “Kes nikare vê nameyê bibe ji wî re ji xeynî te. Lê belê divê tu bi zimanekî şêrîn pêre biaxivî û tu jê re bibêjî “Heger tu dixwazê bikevî şûna bavê xwe, bila sultanî ji te re be. Wê gavê birê te jî dê li şûna te bibe hakimê Şamê.”

Dendan rahişt nameyê û çû amadekariyên xwe kirin ji bo ku bi rê keve. Şewqa Mekan jî fermanek da ku mal û xaniyekî baş bidin Tifikvanê hemamê yê ku ew ji nexweşiyê xelas kiribû li Qudsê û hundurên wî jê re raxistibûn bi merşên ecemî ku çîroka vî Tifikvanî bi xwe mijareke dûvdirêj e.

Rojekê Şewqa Mekan derket nêçîrê. Piştîre dîsa vegeriya Bexdayê. Hinek mîr û gizîran jî, weke diyarî jê re hesp û mihîn û cariyeyên spehî pêşkêş kirin, ku ziman nikare pesnê wan bide! Yekê ji wan cariyeyan bala wî kişand û dilê wî bijiya wê. Rabû wê şevê pê re raket û di heman seetê de cariyê ji wî hemil girt.

Piştî demekê Dendanê wezîr ji rêwîtiya Şamê vegeriya û jê re got: “Birayê te Şerker tê cem te, divê tu jî derkeve pêşiya wî.” Şewqa Mekan jî got, dibe û ew û çend maqûlên dewletê rabûn ser xwe, bi qasî meşa rojekê çûn pêşiya wî û li wir konên xwe vegirtin û man li bendî hatina birayê xwe.

Bi şeveqê re birayê wî Şerker gîha wir, li gel artêşa xwe ya giran ku hemû mêrxas û şêrên Şamê bûn. Gava ku alên wan li ba kirin û kerwanê wan xwiya kir, Şewqa Mekan û zîlamên xwe jî çûn pêşiya wan. Gava pêrgî hev bûn, Şewqa Mekan hewl da ku ji hespê xwe peya bibe. Ew bixwe jî hat raserî wî û ji hespa xwe peya bû û ber bi Şewqa Mekan ve meşiya. Gava ku gîha cem wî, Şewqa Mekan xwe bi ser de avêt, ew himbêz kir û kûrekûr pê ket, giriya. Piştîre, herduyan jî sersaxî ji hev re xwestin.

Dûvre, dîsa li hespên xwe siwar bûn û li gel leşkerên xwe meşiyên heta



gihan Bexdayê û li wir dîsa peya bûn. Li wir Şewqa Mekan û birayê xwe Şerker çûn qesra bavê xwe û wê şevê li wir man.

Roja din sibehê, Şewqa Mekan ferman da ku bangeşî were kirin ji bo hemû leşkeran da ku ji çar hêlên welat werin, kom bibin li wir, ji bo herin şer û cihadê bikin. Ew bi xwe jî ma li hêviya hêzên leşkerî yên ku ji çar hêlên welat dihatin û kîjanê ku dihat bi qedr û qîmeteke mezin dihat pêşwazîkirin.

Pêşwazîkirina hêzan bi wî şeklî berdewam kir hetanî mehekê. Leşker, qefil bi qefil hatin hetanî artêşeke erjeng li hev kom bû ku serê wê hebû û dawî jê re tunebû. Di wê navberê de Şerker ji birê xwe re got: “Ka çîroka xwe ji min re bêje!” Wî jî ta bi derzîyê vekir û ji serî hetanî binî jê re vegot. Qenciya ku wî Tifikvanî pê re kiribû li Qudsê, bi awayekî taybet jê re vegot. Şerker jê re got: “Û te çi qencî pê kir li himberî wê qenciya wî?” Şewqa Mekan jî got: “Wele keko hîna min qenciya wî lê venegerandiye! Lê piştî ku em ji cengê vegeirîn, ez ê vê yekê bikim...”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.*

ŞEVA HEYŞTÊ Û HEFTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahînşahê min ê bextewar! Vêca Şerker ji birayê xwe Şewqa Mekan re got: “Û te çi xelat da wî li himberî wê qencîyê?” Birê wî got: “Wele keko hîna min tiştê nedaye wî. Lê piştî ku ez ji cengê vegeirîm, ez ê wî xelat bikim.” Wê kêlikê Şerker têgihîşt ku xwişka wî Seyrana Zeman her tişt jê re rast gotiye. Loma her tişt di nava xwe de veşart û ew tiştên ku di navbera wan de qewimîbû negot. Piştê di rêya mêrê wê yê serxizmetkar re silav jê re şandin û li halê wê pirsî. Wê jî bi mêrê xwe re silav lê vegerandin, bû duakara wî û keça xwe “Qeza Bu” jê pirsî. Wî jî got ku, rewşa wê baş e û tendurستیya wê di cî de ye. Seryana Zeman jî dilê wê ket cî de, bêhna wê derket û spasiya xwe ji Xweda re kir.

Piştê Şerker li birayê xwe vegeiriya û pê şewirî di derbarê amadekariya şer de û jê re got: “Gelo wê kengî Ereba werin û hêzên leşkerî hemû li hev kom bibin?” Piştê ferman da ku mîre û zexîreyê bînin.

Dema hêzên artêşê hemû gihan ser hev û amadekariyên şer temam bûn, her tişt têkûz bû, Şewqa Mekan ferman da, artêşa wî jî ket rê de û bi qeflan li pey hev rêz bûn. Di nava wê artêşa ecêb de serokê leşkerên Deylemiyana Rustem bû û serokê yên Tirkan jî Behram bû. Şewqa Mekan jî

di nava arêşê de dimeşiya. Li aliyê wî yê rastê birayê wî Şerker hebû û li aliyê çepê jî zavayê wî Serxizmetkar hebû.

Mehekê sax bi wî hawî meşyan. Her in li cihekî disekinîn, sê rojan îstirahet dikirin, piştîre dîsa rêya xwe berdewam dikirin ji ber ku xelk pir bûn. Meşa xwe wisa berdewam kirin hetanî gîhan welatê Romê. Gundîmindîyan ji ber wan bazdan, rêbir û hemû kesên li çolan ji ber wan reviyar û berê xwe dan Qostantîniye.

Gava ev agahiya nexweş ji Herdûb ê qral re hat, berê xwe da cem “Dayika Fenekar” lewre ew bûbû sedema vê mûsibetê, cariyeyên xwe bi xwe re biribûn, çûbû Bexdayê û wê Melek Omer en-Nûman kuştibû û li gel cariyeyên xwe û Şahbanû Safiye vegeyriyabû cem kurê xwe Herdûb, jê re gotibû: “Bila êdî çavên te ronî bibin, me tola te hilanî û heyfa keça te Îbrîza stend û Safiye jî bi xwe re anî, de êdî rabe û biçe cem qralê Qostantîniyeyê, lewre ez texmîn dikim ku dê Musulman werin şerê te bikin.” Wî jî gotibû: “Bêhna xwe fireh bike, bila nêzî welatê me bibin, piştîre ez ê herim belkî hetanî wê gavê em jî amadekariyên xwe bikin.

Dûv re zilamên xwe li hev kom kiribûn, amadekariyên xwe kiribûn û gava ku xeber ji wan re hatibû “Dayika Fenekar” jî bi xwe re biribû, dabû pêşiya leşkerên xwe û berê xwe dabû Qostantîniye, cem Efrîdon ê Qral.

Qral Efrîdon jî ew pêşwazî kiribû bi germahiyeke mezin. Piştîre bi hev re rûniştibûn û Efrîdon sebaba hatina wî pirsibû. Herdûb jî tiştê ku diya wî-Dayika Fenekar-kiribû; çawa qralê Musulmanan kuştibû û Safiye ya şahbanû rizgar kiribû, hemû jê re rêz kiribûn û ew agahdar kiribû bi liv û tevgera Musulmanan û komkirina wan ji leşkerên xwe re.

*Li Şehrezad bû sibe û wê jî axaftina xwe birrî.*

ŞEVA HEYŞTÊ Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Qralê Qostantîniyê Efrîdon jî ji Herdûb re got: “Madem Musulman hemû hêzên xwe didin ser hev û bi ser me de tîn, em ê jî destên xwe bikin yek û li himberî wan derkevin.” Wê çaxê bêhna Efrîdon fire bû û bi derengî be jî, kêfxweş bû bi kuştina Qral Omer en-Nûman û rizgarbûna keça xwe. Piştîre, ji çar hêlên welat re xeber şand û ji wan xwest ku di hawara wî de bîn, pê re jî xebera kuştina Omer en-Nûman ji wan re ragihand. Gava Filehan ev xeber bihîstin, hemû di hawara Efrîdon de hatin.

Di nava sê mehan de, artêşên Romê bi ser hev de hatin. Leşkerên Frengan ji welatên Frensis, Nems, Dwêr, Curna, Cenova, Bندوق û Benîl Asfer di hewarê de hatin. Gava ku artêş hemû gihan ser hev, çol û beyar li wan teng bûn ji pîrbûna wan. Qralê mezintirîn Efrîdon, ferman da wan ku hemû biçin Qostantîniyê. Ew jî ketin rê de û bi qasî deh rojan meşîyan, hetanî ku gihan newaleke fireh û mezin li nêzîkî deryayê, li wê derê rawestîyan, sê rojan bêhna xwe vedan. Roja çaran, berî ku dîsa bi rê kevin, xeber ji wan re hat ku artêşa Musulmanan ber bi wan ve tê. Rabû sê rojên din li wê newalê man. Roja heftan, dîtîna ku ilora tozekê ber bi wan ve tê ku digihê ber perên azmanan. Piştî ku seetek din derbas bû, ew ewrê toz û dûmanê ji hev ferikî û belav bû û ji bin wî ewrî serên rîman derketin û biriqandin mîna şewqa rûavê û pê re jî alên mûhemmedî li ba bûn di destên siwarên ku qefil bi qetîl dihatin mîna pêlên deryayê.

Piştî, herdu artêş mîna pêlên du behran li binguhê hev ketin, çav bi çavan, sêng bi sêngan, li himber hev çikilîn û ketin pêxêla hev de. Di serê artêşa Musulman de Dendan ê wezîr xwiya dikir ligel sîh hezar siwarên ku leşkerên wîlayeta Şamê bûn. Li kêleka wezîr jî serkêşê leşkerên Deylemî Rustem û yê Tirkan Behram, li gel bîst hezar leşkerên xwe.

Di wê navberê de, leşkerin ji pişt wan; ji hêla deryayê ve xwiya kirin ku cewşên hesinî li wan bûn û weke hevyên di şevên reş de dibiriqandin.

Piştî qîr û halan bi leşkerên Filehan ketin, bi navê Îsa û Meryem gazî kirin, xaçên xwe bi hewa xistin û li Dendanê wezîr hatin hev. Ev bi xwe jî pilansaziya “Dayîka Fenekar” bû. Lewre Herdûb, berî ku berê xwe bide qada şer, çûbû cem diya xwe û jê re gotibû: “Ya ku ev bobelat bi serê me de aniye tu yî. Vêca ka bêje em çawa bikin?” Wê jî gotibû: “Ey Qralê gewretirîn û kahîne dijwar! Ez ê rêbazeke şer ji te re bibêjim ku nayê bîra şeytanan ji...”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çiroka xwe.*

## ŞEVA HEYŞTÊ Û NEHEMÎN

*Şehrezadê vegotina çiroka xwe berdewam kir û got:*

“Dayîka Fenekar” ji Herdûb re got: “Ez ê rêbazeke şer ji te re bibêjim ku nayê bîra şeytanan û heger ew îblîs be jî dê nikaribe tevdira xwe li himber vê rêbazê bigire. Divê tu pêncî hezar leşkerî bi keştiyan di deryayê re bişînin ber bi çiyayên mîjdûmanî ve, bila li wir bin hetanî ku alên artêşa Musulmanan bibînin. Wê çaxê em ji pêşiya wan ve, ji aliyê bejahîyê ve û ew jî ji aliyê deryayê ve, em ê wan bigirin nava xwe û di nav diranên xwe de wan biperçiqînin. Bi wî hawî dê yek tenê jî ji wan xelas nebe.” Herdûb jî ew

pilansazî pejirandibû û gotibû fikira herî rast ev e.

Loma gava artêşa Musulmanan di wê newalê re êrîş kiribûn, ji xafil ve Romîyan ji hêla deryayê ve êrîşî wan kiribûn; çadirên wan şewitandibûn û ew dabûn ber şûr û rîman, leşkerên Dendan perîşan kirin. Lê belê Şewqa Mekan zû di hewara wan de hat bi artêşa xwe ve ku ji sed û bîst hezar leşkerên Bexda û Xorasan pêk dihat. Leşkerên Filehan ji hêla deryayê ve li wan zîvirîn da ku wan dorpêç bikin. Lê Şewqa Mekan li wan hay bû, ferman da artêşa xwe û got: “Ey endamên partiya Mûhemmedî! Li wan kafiran vegerin û bi izna Xwedê wan bi mirinê şa bikin, wan bişînin dojehê!”

Hejmara leşkerên Filehan bi qasî sed û şêst hezarî bû, yê Musulmanan jî bi qasî sed û bîst hezaran bû. Leşkerên Musulmanan mil dane hev, dilên xwe kirin yek û bi yek dengî qîriyan û gotin: “Xwedê soza serkeftinê daye me û soza binkeftin û rûşeyê daye Filehan!”

Piştî halan bi wan ketin û herdû artêş li bin guhê hev ketin mîna du behran û bû çînge çînga şûr û rîman. Şerker jî mîna tîrekê di nav wan de çû û şerekî dijwar kir ku zarok ji ber wesfê wî extiyar dibin. Kî biketa pêşiya wî de, Xwedê jê distend û serê wî ji nav milan difiriya erdê, digindirî mîna gogê. Di encamê de artêşa Filehan ber bi behrê ve şikand û laşên wan li erdê raxist, ala Musulmanan bilind kir. Hemû leşkerên wî, mîna serxweşan şer dikirin wê rojê, wê rojê di şer de çel û pênc hezar ji Filehan û sêhezar û pêncsed jî ji Musulmanan hatin kuştin. Wê şevê ne Şerker ê şêrê olê û ne jî birê wî yê qral Şewqa Mekan raneketin, nenivîyan. Herdu li ser leşkerên xwe geriyan, rewşa birîndarên xwe raçav kirin û mizgîniya serkeftinê dane wan, xêr û sewabê roja qiyametê bi bîra wan xistin û ew pîroz kirin ji bo keda wan.

Li aliyê Musulmanan rewş bi vî hawî bû. Îcar em vegerin ser Herdûb Qralê Roman û diya wî “Dayika Fennek”. Wan jî serleşkerên xwe li hev kom kirin û ji wan re gotin: “Welew ku me dilê xwe li wan rehet kir jî, lê belê baweriya me ya bi hejmara me ya pir, em têk birin. Piştî pîrejina dayika wî got: “Divê hûn baweriya xwe nû bikin û hûn xwe nêzikî Mesîh bikin. Bi navê wî yê şêrîn, tiştê ku hêzê dide leşkerên Musulmanan, tenê ew şeytanê Şerker e. Heger hûn wî jî holê rakin, misoger hûn ê bi ser kevin.” Herdûb bersiv da diya xwe û got: “Min biryar daye ku sibe, ez artêşê bixim rêzê û farîsê me Lûqa Bin Şemlût derxînin pêşiyê, bila meydanê bixwîne ji Şerker re. Gava ew pê re daket tirada hespê, misoger dê Lûqa wî bikûje û piştî jî kesî ji wan nahêle. Jixwe min îşev ferman daye ku pîrozkirina gewretirîn buxûrê, ji we re bête lidarxistin.”

Çawa ku ev gotina Herdûb bihîstin gişan bejna xwe li ber tewandin û erd maçî kirin. Rahibê herî mezin seramonî li dar xist û buxûr bi ser wan de hejand. Ew bi hev re ketin pêşbaziye û bi ser de çûn ji bo ku bêhnekê ji wê bixûrê bigirin û pîrozîyek bikeve nava hinavên wan de, da ku mirin nikaribe nêzikî wan bibe.

Ew rahibê wan yekî pir navdar û qedirbûha bû, di nava hemû rahiban de. Li seranserê welatê Romê digeriya di nava kincên hewrêşimî, yên ku di nava misk û emberê de dihatine şuştin. Gava ku diçû cem qralan jî derhemekî wî, bi hezar dînarî jê dikirîn. Carinan jî qralan dişand pey wî ji bo di dawetan de, buxurê li dar bixe û hinekî jê jî bixe nav kilên çawan. Hinekan jî li gora baweriya xwe, nexweşên xwe pê derman dikir.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî axaftina xwe birî.*

## ŞEVA NOTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Çawa ku bû sibe û şewqa rojê da ser çiyar û baniyan, Qral Herdûb bi parazanê xwe ve li rahîp û serkirdeyên dewletê vegeriya, ew hemû xelat kirin û xaç li ser eniya wan neqîşand, careke din ew buxûra han bi ser wan dakir, dûra gazî Lûqa Bin Şemlût kir ku jê re digotin “Şûrê Mesîh û Bûxûra Wî” û ew jî pîroz kir. Lûqa siwarê herî navdar bû di nav welatê Romyê de. Kes ji wî mezintir tunebû; ne bi avêtina tîr û rîman, ne jî bi derbên şûr û kêran. Yekî bêmirês bû ku rûyê wî mîna yê keran bû û tîpa wî mîna yê qirdikan bû. Lê belê rikeberekî bi heybet bû ku çûna ber bi wî ve û nêzîkbariya wî zortir bû ji veqetana ji dîlberê. Reş bû mîna tariya şevê û bêhna buxûran jê dihat, bi wê bejna dirêj ve. Lûqa, ber bi qral Herdûb ve çû, bejna xwe li ber wî tewand, lingên wî maçî kirin û piştê di cihê xwe de rawestiya, ma li bendî fermana wî. Herdûb jê re got: “Ez dixwazim ku tu bi Şerker ê qralê Şamê û kurê Omer en-Nûman re dakevî tirada hespê û me ji vê bindestî û ruswabûnê rizgar bikî.” Wî jî got: “Ser seran, ser çavan.” Qral Herdûb xaçek li ser eniya wî çêkir û got: “Serkeftina me nêzik e.”

Piştê Lûqa ji cem qral çû, li hespekî kej siwar bû ku kincekî sor pêdakirî bû, zînekî bi zêr û cewheran xemilandî li ser piştê bû. Rimeke ku sê serî lê diketin jî xist destê xwe ku êdî bûbû mîna îblisê şeva dek û dolaban. Piştê li gel zîlamên xwe bi rê ketin mîna ku berê wan li agir be. Yekî ji wan jî gazî dikir û bi Erebi digot: “Ey ometa Mûhemmed! Ji nav we şûrekî Îslamê tenê dertê, ew jî Şerker ê Qralê Şamê ye!” Çawa ku ew gotin ji devê wî derketin, xume xumek bi derdorê ket û dengê belav bû ku herkesî bixist. Pê re jî sefên pêşî bûn du şeq û xelk hemû çep û rast bazdan, mîna roja Henîne!

Gava Şewqa Mekan ew bêmirûzê han li meydanê dît û gaziya han ji bihist, li birê xwe veşerîya û jê re got: “Ew gazî te dikin li meydanê.” Şerker jî got: “Heger wisa be, hîn çêtir e.”

Îcar dema mijar fêmkirin û bihîstin ku yê li meydanê dibêje ‘ez tenê dixwazim bi Şerker re şer bikim’ nas kirin ku mêrxas û lehengê Roman ew e, yê ku digot: “Ez sûnd dixwim, ez ê Musulmanekî tenê li ser rûyê erdê nehêlim.” Ew bû yê ku kezebên dayikên leşkerên Deylem û Tirk û Kurd şewitandibû û tirs xistibû dilên wan de. Wê çaxê Şerker, mîna şêrekî qeherî derket himberî wî, li ser piştê hespekî kihêl ku mîna pezekî kovî bû wê kêlikê. Hespê xwe bi ser Lûqa de ajot û rima di destê xwe de mîna marekî hejand û ev çend beyt gotin:

Kejhespêkî min heye delûdîn dibe  
Çi gava ku tu rişmeya wî berde  
Zana ye wek ku xwedî hiş be  
Tirskar e çawa ku mirin li ser piştê be  
Û şûrekî ku har dibe dema derkeve ji kalan  
Diçirusîne çawa ku birq lê bidin ber çavan

Lûqa ne ew gotin fêmkirin, ne jî ew navtêdan. Ê wî bi lepan li ser çavên xwe da ji ber rêzdariya li himber xaçê ku li ser eniya wî xêzkirî bû, ew maçî kir, rima xwe kişand û bi lez êrişî ser Şerker kir. Piştê şûnikê tîra xwe bi destê girt û bêyî ku bihêle kes bibîne ew derbasî destê xwe yê din kir mîna sihibazan û ber bi Şerker ve avêt. Tîr, mîna tîrêjeke agir ji destê wî derket. Herkes li ser Şerker tirsîya û behetîmayî li tîrê nêrin.

Gava tîr nêzikî wî bû, Şerker li hewa ew girt. Herkes ma şaş himberî wê dîmenê! Piştê Şerker ew tîr di destê xwe de hêjand wek ku wê bavêje Lûqa, lê bi hewa de avêt, çû hetanî ku ji ber çawan wenda bû, piştê bi destê din dîsa ew girt di salîsekê de û qîrek da ji dil û got: “Bi heqê wî Xwedayê ku heft asîman xuluqandine, ez ê bihêlim ev ê lanet bibe îbret ji xelkê re.” Û di cî de ew tîr avêtê. Lûqa jî hewl da kû mîna Şerker bike û destê xwe avêt tîrê ji bo ku li hewa bigire. Lê Şerker tîreke din avêt wî, li nivê xaça ser eniya wî ket û Xwedê Teala bi lez ew bi agirê cehnemê şa kir.

Gava Filehan dîtin ku Lûqa Bin Şemlût hate kuştin, wêlewêl bi wan ket, hewara xwe birin ba rehîban û bi şeqaman bi rûyên xwe ketin, li xwe xistin...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî axaftina xwe birî.*

## ŞEVA NOT Û YEKEMÎN

*Şehrezadê got:*

Şahînaşahê min ê bextewar, vêca gava Roman dîtin ku Lûqa Bin Şemlût hate kuştin, bi lepan li ser çavên xwe dan û weyle weyl bi wan ket giriyan, hewara xwe di rahiban de dan û gotin: “Ka ew xaçên di stûyên rahîban de?” Dûra dîsa hemû li hev kom bûn, bi qebzeya şûr û mertalan girtin û careke din ketin êrişê ji bo şer û cengê. Pêlên leşkeran li bin guhê hev ketin, dil ketin bin sawa gummin û reperepa simên hespan û şûr û rim bûne serdest, zend û bend jî qels ketin li ber wan. Dahola şer û cengê her berdeyam kir hetanî ku dest betilîn, ro çû şev hat bi tarîbûna xwe. Wê gavê, herdu artêş ji hev veqetiyên ku êdî her lehengek, bûbû mîna serxweşan ji giraniya ker û fera şer û cengê. Erd, bi laşên kuştîyan hatibû raxistin û birîndarên di nav wan de ji mirîyan nedihatînin cudakirin.

Şerker bi birê xwe Şewqa Mekan re hatin cem hev, wezîrê xwe Dendan û Serxizmetkar jî tev li xwe kirin û herçar bi hev re civiyên. Şerker got: “Xwedayê mezin deriyek ji me re vekir ku em van kafiran tune bikin. Îcar şikir ji Xwedayê me re.” Şewqa Mekan jî ji birê xwe re got: “Em ê herdem spasiya xwe ji Xwedê re bikin ku kul û derdên Erebb û Ecmaman derman kir û ez bi bawer im ku dê xelk hemû jî cî bi cî behsa vê bûyera kuştina Lûqa bikin û te çi bi serê wî kir, ev lanetê ku Încil guhertiye û te çawa tîr li hewa girtiye û avêtiye wî dujminê Xwedê, ew kuştîye. Hetanî roja qiyametê jî dê xelk behsa vê yekê bikin.” Piştî Şerker got: “Ey Serxizmetkarê wêrek ê leheng!” Got: “Libê ezbenî!” Şerker got: “Wezîr Dendan û bîst hezar leşker bi xwe re bibe û ber bi deryayê ve biçin bi qasî heft Fersexan<sup>17</sup> û bi lez herin da ku hûn xwe bigihînin nêzîkî behrê, bi qasî ku du fersex di neqeba we û dujmin de bimînin. Xwe di qelşên erdê de veşêrin da ku hûn dengê ximexima dujmin bibhîzin, gava ku ji keştîyan peya bibin û bikin qîrewîr. Jixwe di neqeba me û wan de dar hene. Îcar gava we dît ku leşkerên me bi şûn de direvin çawa ku di şer de bin ketibin û kafir jî li pey wan tên ji hemû hêla ve, divê hûn li wan baldar bin û bi taybetî jî leşkerên ku dê di qiraxa peravê re werin ji bo ku çadir û konan bişewitînin. Vêca gava te alek dît ku “La îlahe îlallah” li ser nivîsiye, ala kesk bilind bike û bang bike, bêje “Ellaहु Ekber!” û ji paş ve êrişî ser wan bike û hewl bide ku tu nehêle dujmin bikeve navbera leşkerên ku bi şûn de direvin û peravê de.” Wî jî got: “Ser seran, ser çavan!” Wê kêlikê li hev kirin, li ser wê mijarê û rabûn ser xwe, xwe amade kirin. Serxizmetkar jî, wek ku Şerker ferman dabû, bîst hezar leşker bi xwe re bir û ew û Dendan ketin rê de, çûn.

---

17. Fersex: Qeyaseke pîvanê ye, bi qasî 5685 metroyî dirêj e.

Gava ku bû sibe, artêşa Roman xwe girêdan bi şûr û mertalên xwe û di bin giraniya wan cewşenên hesinî de li keştiyan siwar bûn û bi rê ketin. Keşîş û rahiban jî serê xwe vekirin û xaç li ser keştiyan bilind kirin, himehim bi wan ket û dengê duayên wan bi bixûran re ber bi erşan ve bilind bûn. Ji her hêlê ve berê xwe dan kenarên deryayê, hespên xwe li bejahiyê peya kirin û biryar dan ku ji paş ve, bi fen û hileyan li wan bidin. Şûr ji kalanan kişandin, rîman biriqandin, mertalan çirusandin û aşê mirinê li ser serê leheng û qehremanan dest pê kir geriya; serî firiyan, zîman lal bûn, çav ziq man, şûran goşt birrî, zik rijîyan erdê, zend û bend jêbûn, bi rihên hev girtin kişikşandin û hespên wan di nava xwinê de man. Leşkerên Musulmanan bênavber qîr dikirin û selewat li ser Pêxemberê Ummetê û sûlaleya wî dixwendin û tikan ji Xwedayê xwe re dikirin ku serkeftinê diyarî wan bike. Her ku diçû şer û ceng girantir dibû, laşên kuştiyan di bin simên hespan de diperçiqîn, dihatin cûtin weke benîştan. Herî dawî qîrîn bi nav Filehan ket û bi navê Îsa Mesîh gazî kirin û gotin: “Serkeftin ji we re diyar bû êdî ey şopdarên rêya heq! Leşkerên Musulmanan dest pê kirine direvin, dê êdî pey wan ve herin û bi şûn de venegerin. Bila şûrên we bênavber serên wan bifirrine nexwe wê Îsayê Meryemê destê xwe ji we bişol!”

Li himberî vê dîmena reva Musulmanan, Herdûb pir kêfxweş bû û welê jê ve hate xwiyakirin ku artêşa wî biserketiye û tê dernexist ku Musulmanan xefîk li ber wan vedane. Loma qasidê xwe ji qralê Romê re şand û mizgîniya serkeftinê da wî û jê re got “Bêgûman ev serkeftin bi saya bixûrên serkeşeyê mezin bû. Ez sûnd dixwim bi hemû pîrozîyên Meryema pîroz ku ez ê mûcahîdeki Musulmanan bi tenê jî sax bernedim!”

Çawa ku Herdûb qasidê xwe bi rê kir, qîrek bi ser artêşa Filehan ket û gotin: “Tola Lûqa hilînin!”

*Di wê navberê de li Şehrezadê bû sibe û wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

#### ŞEVA NOT Û DUYEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şahîşahê mezin Şehriyar re berdewam kir û got:*

Herdûb qîr da artêşa xwe û got “Tola Lûqa hilînin ey şêrên Îsayê Mesîh!” Qeyserê Romê jî ji aliyê xwe ve qîr dikir û digot “heyfa Îbrîzeyê hilînin lehengino!”

Di wê navberê de Şewqa Mekan jî ket liv û tevgerê û ji leşkerên xwe re got: “Bi rîman li Roman bidin ey oldarên Xwedayê Rehman!” Bi vê gotina



Şewqa Mekan re, artêşa Musulmanan li Roman veşeriyân û bi şûr û rîman ketin nav wan de û kafir bi dojhê ve dane şakirin.

Ji nişkê ve Şerker û egîdên xwe mîna şêran êrîşî ser Roman kirin, li wan zîvîrîn û rêya revê ji ber wan girtin. Ket nav refên şervanên xwe, nav di wan da û ew li dujminan sor kirin. Di wê navberê de, ji nişkê ve siwerek ji nav refên wan bi pêş de çû, ket nav dijmin de û bi şûr û rîma xwe ket nava dujmin de û weke birekê serî ji gewdeyên wan birrîn, heta ku erd raxist bi cendekên wan. Bi du şûr û bi du rîman şer fikir, yek li wan dida, yê din bi şûn de dikişand û bi qeflan leşkerên Romê li erdê rêz dikirin, çawa ku helbestkar gotiye:

Gava şûrê xwe kişand min pê re got  
Xezeba te bes e, ew şûr e ji bo wan  
Wî ji got şûrê keliyê ji bo evîndaran e  
Yê min jî ew ji bo kesê ne evîndar e

Gava ku Şerker ew siwar dît û egîdiya wî temaşe kir, got: “Eûz û bîlleh û bi ayetên rehman! Egîdo, tu kî yî? Bi vî şerî û bi vê cengê te Xweda razî kir, lewre te kafir têk birin, zora zaliman bir û gotina Xwedayê me bilind kir!” Siwar gazî wî kir û got: “Te ev şîret li min kirin, çi zû te ji bîr kir?” Piştî rûyê xwe vekir û destmala xwe da alî, hetanî ku rûyê wî giş xwiyakir û diyar bû ku Şewqa Mekan e. Şerker pir kêfxweş bû bi wê yekê, lê di heman demê de ji bo wî tirsîya, lewre rikeberên wî û gelek farisên dujmin li ser wî kom bûbûn û ew jî hîna biçûk bû bi temenê xwe û diviyabû tiştek pê nehata ji bo ku textê qraliyet û sultaniyê bihata parastin. Loma jê re got: “Ey Melek û Qralê min! Te xwe avêtîyê xetereyê, ka hespê xwe bispêre yê min, lewre ez ditirisim ku dujmin keysê li te bînin. Ez dixwazim te ji vê tengahiye rizgar bikim ji bo ku tu gelek dujminên din bikuje bi wan tîrên xwe yên kujer.” Şewqa Mekan jê re got: “Min xwest ku ez û tu wekhev bibin di ceng û cîdalê de. Û min nexwest ku ez bibim bar li ser te.”

Piştî leşkerên Îslamê, Romî dorpêç kirin ji her çar hêlan ve û bi şûr û rîman li wan dan hetanî ku ew şikandin, ala kufr û zulmê bînpê kirin û gotina heqiyê serdest kirin. Herdûb çawa dît ku leşkerên wî şikestin, xemgîn bû û dilê wî êşiya. Hemû direviyan û filtî-filtî bazdidan ber bi keştiyên li qiraxa avê. Ji nişkê ve Dendan û lehengên xwe ji hêla deryayê ve di pêşiya wan re derketin û ew dan ber derbên şûr û rîman, li kêlekê jî Behramê Emîr bi bîst hezar şêrê xwe ve.

Bi wî hawî Romî ketin nav diranên kelbetan de, lewre leşkerên Muslumanan ji pêş û paş ve li wan didan, serî li ser milan nedihîştin. Hinekan ji Musulmanan berê xwe dan keştiyan û Romiyên di wir de jî dan

ber şûr û xenceran. Ên ku filitîn xwe di behrê werkirin û di nav avê de fetisîn. Bi wî hawî, bêhtirî sed hezar leşkerî ji Romiyên hate kuştin. Pir hindik ji wan xelas bûn. Ew jî li bîst gemiyan siwar bûn û reviyên, piştî ku hemû gemiyên xwe yê dagirtî li pey xwe hiştin. Wê rojê Musulmanan talanek bi dest xwe xistin ku di dîrokê de tiştekî wisa çênebûbû. Ji nava wan tiştên ku di wî şerî de bi dest xistibûn: Pêncî hezar hesp, ji xeynî çek û zexîre û mal û mulkê ku nedihate hesabandin. Loma Musulmanan pir kêfxweş bûn bi wê serkeftina ku Xwedê ji wan re kiribû nesîb.

Ev ji aliyê Musulmanan ve wisa bû. Îcar em vegehin ser Romiyên binkeftî û perîşan. Ew jî reviyên hetanî ku hatin Qostantîniyeyê. Jixwe di serî de hebera serkeftina wan li pêşiya wan gîhabû Qostantîniyeyê; diya wî “Dayika Fen û Fûtan” gotibû “Min dizanibû ku kurê min, Qeyserê Romê bi bin nakeve. Lewre tu tirsî wî ji artêşên Musulmanan tune ye û ew xwedî biryar e ku xelkên dinyayê gişan vegehin ser ola filetiyê.” Loma di cî de emir dabû qralê mezin ku bajêr bixemilîne û xwarîn û vexwarinê belav bike. Lê belê hîna ku ew wisa di nava wê kêf û pîrozbahîyê de bûn dengê bûm bilind bûn û xebera reş bi ser wan de hat, piştî ku her bîst keştî bi leşkerên reviyayî ve gihan wir. Bi êş û xemgîniyê mezin Efrîdonê Qral ew pêşwazî kirin li qraxa avê û ji wan fêr bû bê Musulmanan çî bi serê wan kiriye. Giriya wan zêde bû û wêyle wêyl bi gişa ket, li çogên xwe dan û di cî de xebera serkeftinê hate guhertin bi xebera binkeftinê a reş. Di encamê de fêr bû ku Lûqa Bin Şemlût jî hatiye kuştin.

Mîna ku ferman li Herdûbê qral rabûbe, êdî bawerî pê re nemabû ku bikaribin ji nû ve xwe bi ser hev de bînin. Şîna xwe li dar xistin û ewrê êş û xemgîniyê li ser serê wan kom bû û dev ji wan berneda. Êdî li her derê şîna û girî serwer bûbû. Gava Qralê Romê derbasî cem Efrîdon bû û rastiya mijarê jê re got, bê çawa Musulmanan bi fen û fûtan zora wan biriye û tu leşker ji wan ên ku hatine pê ve nefilitîne, Efrîdon ji ser hişê xwe çû, gêj bû û got reş û li erdê ket, pozê wî hate ber nigê wî.

*Wê gavê li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî.*

## ŞEVA NOT Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir û got:*

Dema Efrîdon bi ser hişê xwe hat, giliyê xwe li cem “Dayika Fen û Fûtan” kir. Ew jinik jî pîreke efsûnger û falger bû. Efsûnkarî baş dizanibû û gelekî hîlekar, bêbext û xedîrkar bû. Devê wê mîna şikeftêkê bû, mijankên wê sor, rûçikên wê zer bû. Rûspîçolkî, awirbeq û laşkurmî bû, porspî, piştxûzik û mehdedayî bû. Lê pirtûkên Îslamê hemû xwendibûn û çûbû mala

Xwedê, bûbû heccî. Ew hemû kiribû ji bo fêrî Quranê û olan bibe. Lewre du salan li Qutsa pîroz mabû ji bo ku fêrî fikr û ramanê bibe. Loma ew bûbû beleyek ji beleyan û baweriya wê xerabibû. Bi piranî li ba kurê xwe Herdûbê qral dima ji bo nêçîra cariyeyên ciwan, lewre wê ji pevşabûnê pir hez dikir û gava ku jê dût diket dîn dibû. Kijan cariyê biyecibanda, ew fêrî hikmetê dikir, zehferan didayê heta ku ew ji ser hişê wê dibir û pê şadibû hetanî ku ji ser xwe diçû. Yên ku bi ya wê dikirin, qencî bi wan dikir û dihişt ku dilê kurê wê bibije wan. Ên ku bi ya wê nedikirin jî, mala wan xera dikir. Ji ber wê bû ku hîle bi cariyeyên Îbrizeyê Mercanê, Rihane û Etrîce dikir û hewl dida ku mala wan xera bike, lewre Îbrîze ji pîrê aciz bû û nedixwest pê re rakeve. Ji ber ku mûyên wê di bin çengê wê re derdiketin, bêhna wê genî bû mîna ya bereteyekî û laşê wê zivir bû mîna lûfik û dixwest ku yên pê şadibin, bi xeml û xêz û zane bin. Îbrîzeyê Şahbanû jî, her dem xwe jê bêrî dikir û lavan ji Xwedayê xwe dikir, digot:

Ey hebûna ku maldar rezil dikî!  
 Ey hebûna ku xizanan bilind dikî!  
 Xerab xerabiya xwe zêdetir dike  
 Bi komkirina derheman xwe tune dike  
 Bêmirêsan jî qet ew xweşik nake!

Vêca em dîsa vegerin fen û hîleyên pîrejînê. “Dayika Fen û Fîtan” mezin û serkirdeyên Filehan dan dût xwe û berê xwe da leşkerên Musulmanan. Efrîdon jî çû cem Herdûb Qeyserê Romê û jê re got: “Ey qralê hêja! Êdî tu pêdiviya me bi keşeyê mezin û duayên wî nîn in, a baş ew e ku em bi ya ‘Dayika Zîrek’ bikin û em xwe li hêviya encamên fenên wê ragirin, bê ka gelo wê çi bi leşkerên Musulmanan bike. Lewre ew bi hêza xwe dê xwe bigihînin me. Jixwe di demeke nêzîk de, wê dora me bigirin.” Gava ku Herdûb ew gotin bihîstin, tirsra di dilê wî de mezintir bû. Di cî de rabû ser xwe ji çar hêlên welatê Filehan re ferman nivîsî û ji wan re got: “Divê kes bi şûn de nemîne û herkes were vir, bi taybetî jî yên di keleh û hîsaran de; divê her kes bi zarok û jin û mêrên xwe ve werin vê derê bi lez, berî ku tiştê nebûyî bê serê me. Lewre leşkerê Musulmanan ketin axa welatê me.”

Îcar em dîsa vegerin ser rewşa pîrejîna zîrek “Dayika Fen û Fîtan”. Ew jî li gel wan zilamên xwe derket derveyî bajêr, kincên tacirên Musulmanan li wan kirin. Sed heb qantir jî anîn û barên teciran li wan kirin ji qumaşên Antakî, atlasê Madenî, dîbacê melekî û gelek cûrequmaşên din. Nameyek ji Efrîdonê Qral jî bi xwe re rakirin ku tê de digot: “Ev tacirên Şamê ne, li welatê me bûn hetanî roja îro û niha jî vedigerin welatê xwe, divê kes têkildarî wan nebe, xerabiyê bi wan neke, bacê û gumrikê ji wan nestîne, hetanî ku bigihên welatê xwe û bikevin ewlehîyê. Lewre tacir avakerên civata ne, ne şerker û xerabkarên welata ne.”

Piştire “Dayika Xap û Rîpan” ji hevalbendên xwe re got: “Ez dixwazim xefkekê li ber Musulmanan vedim û mala wan xera bikim!” Wan jî jê re got: “Dayika me ya Şahbanû! Tu çi fermanê bidî me, em amade ne li ber destên te, em ê pêk binin. Îsa Mesîh alîkarê te be di vî karî de.”

Jîrika fenekar, kincin spî yî ji hirîyê li xwe kirin û eniya xwe firkanî û dohnek tê da hetanî ku şewqeke ecêb jê da der. Pîrejina ku ji pozê şeytan ketibû, pir hejar û zêf bû, herdu çavên wê jî di kortikan de bûn. Nigên xwe ji bazinan ve qeyd kirin û bi wî halî meşiya hetanî gîha cem nêzîkî manîngeha leşkerên Musulmanan. Li wê deverê qeydên nigên xwe vekirin û ferman da zilamên xwe ku bi daran lê bidin û piştire wê bixin sindoqekê. Wan jî got: “Xatûna me, em ê çawa li te bidin û tu dayika fen û fûtan, dayika qralê me yî?”

Pîrejina zîrek got: “Gazin li mecbûriyê nabin, tu kes jî nikare tiştêkî neyînî ji wan re bibêje. Gava ku mecbûrî hebe, qedexe jî radibin. Piştî we ez xistim sindoqê de, wê sindoqê jî bixin nav mulk û malên xwe de û li ser piştî qantiran bikin û di nava leşkerên Musulmanan re derbas bibin bêyî ku hûn ji tiştêkî bitirsin. Gava ku hinekan ji Musulmanan rêya wê birrîn û zorî dan we, qantirên xwe tev li barên wan bidin wan û herin cem sultanê wan Şewqa Mekan, xwe bavêjin bextê wî û alîkariyê ji wî bixwazin û jê re bêjin: Em li welatê Romê bûn kesî tiştêkî ji me nestend, heta qralê wan nameyek ji me re nîvisand û mora xwe lêxist da ku kes zararekê nede me. Gava ji we re got: Ka çi qezenca we çêbû li welatê Romê? Bêjin: Me rizgarkirina mirovekî weliyê Xwedê qezenc kir yê ku panzde salên wî çêbûbû di hêsîriya bin erdê de bi hewar û gazî, bêyî ku kes di hewara wî de here, di nava îşkence û lêdana kafiran lê dikir de, bi şev û roj. Li gel ku em demekê li Qostantînîyeyê man jî, em pê nehisiya bûn. Piştî ku me malê xwe firot û li şûna wan me malên Qostantînîyeyê kirîn, em li hev kom bûn û me ji xwe re behsa çûna û rêwîtiya xwe kir. Dûra em raketin û gava ku em sibehê ji xew rabûn, me dît ku wêneyek li ser dîwêr xwiya dike. Gava em ber bi wê ve çûn jî, me dît ku dilive. Piştire jî axivî û ji me re got: Musulmanino! Qey yekî bawermend di nav we de tune? Me jî got: Çawa tune? Wê wêneyê got: Xwedê ez dame axaftin ji bo ku baweriya we qewîn bibe bi Xwedê û ola wî û hûn ji welatê kafiran derkevin herin nav leşkerên Musulmanan, ku mîrzayekî dilovan û lehengê zeman Qral Şerker di nav wan de ye. Ew qralê ku dê Qostantînîyê veke û Filehan gişan têk bibe. Îcar piştî ku hûn meşa sê roj û sê şevan biçin, hûn ê perestgehekê bibînin, bi nêteke paqij xwe lê bigirin û bi vîneke mezin hewl bidin ku hûn bikevine wê de. Lewre ebîdekî salih bi navê Ebdullah tê de heye ku ji her kesî oldartir e û kerametîna pê re hene ku kinc û libasan ji ser mirov radikin. Lê hinek keşîşan ew xapandiye û ew avêtine binê zindanekê, di wir de ku demek dirêj di ser re derbas bûye. Heger hûn bikaribin

wî ji wir rizgar bikin, wê Xwedê vî karê we pîroz bike û hemû gunehên we bide efûkirin, lewre ev kar, ji hemû rengên cîhadê pîroztir e.”

Piştî ku pîrejîne li ser wê yekê bi zîlamên xwe re li hev kir, ji wan re got: ...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA NOT Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê dîsa vegotina çîroka xwe berdemam kir ji Şehriyar re û got:*

Gava ku pîrejîne bi zîlamên xwe re li hev kir, ji wan re got:

Vêca gava Şerker guh da we, hûn jî bêjin: Çawa ku me ew gotin ji wê wêneyê bihîstin em têgihîştin ku ew Abid zana û weliyekî Xwedê ye! Rabû em meşîyan û me sê rojan rêwîti kir hetanî em li dêrekê rast hatin. Em çûn wê dêrê û mîna hemû taciran me hinekî kîrrîn û firotin kir hetanî ku bû êvar û şev kete erdê. Gava tarî kete erdê em çûn wê perestgeha ku zindan di binê wê de. Li wir me dengê bihîst ku van ristan dibêje:

Êşa bêbextiyekê sînga min teng dike  
Dilê min difetisîne di nav behra xeman de  
Heger nebe rizgarî, mirineke lezgîn dixwazim  
Lewre kevok naziktirîn balindeyên min in  
Ey Birûsk, heger tu hatî welatê min carekê  
Û bi şewqa xwe te mizgînî da xelkên wê  
Ez ê jî çawa bikaribim te bibînim gelo  
Di pişt evqase deriyên hesinî û diwaran de?  
Wê gavê hezkiriyên agahdar bike û ji wan re bêje  
Ku ez girtî me niha, di perestgeha Romê de

Pîrê piştî axaftina xwe berdewam kir û got: “Vêca gava we ez gîhandim nava artêşa Musulmanan, ez ê heq ji wan derkevim bi hîlekariyekê û ez ê hemûyan bidim kuştin.”

Gava Filehên dorê ev gotina pîrê bihîstin, destên wê ramûsan û ew xistin sindoqê de, piştî ku têra wê lêdan lê dan ji bo pêkanîna fermana wê, ku ew yek weke îbadetê ditînin. Dûra jî berê xwe dan manîngeha leşkerên Musulmanan.

Îcar em vegerin ser rewşa leşkerên Musulmanan. Ew jî çawa ku Xwedê serkeftinek diyarî wan kir û zora dujminê xwe birin, mal û mulkên di keştîyan de hemû talan kirin, ji xwe re rûniştin û ketin nava sohbetêke germ de.

Carekê Şewqa Mekan ji birê xwe Şerker re got: “Xwedayê gewre ev serkeftin da me ji ber edalet û lihevguhdarkirina me. Vêca ka tu ji li min guhdar bike di îbadeta Xwedê de!” Şerker got: “Ser seran, ser çavan.” Û pê re jî destê xwe dirêji yê birê xwe kir û axaftina xwe berdewam kir, got: “Heger kurek ji te re çêbibe, soz, ez ê keça xwe ‘Qeza Bû’ lê mehr bikim.” Ew ji bi vê soza wî kêfxweş bû û careke din serkeftina xwe li hevdu pîroz kirin. Dendan ê wezir jî, herdu pîroz kirin û ji wan re got: “Jibîr nekin qralên min, Xwedayê mezin ev serkeftin da me ji ber ku me dev ji xwediyên xwe, dev ji welatê xwe berda û em hetanî vir hatin ji bo ku em gotina heqqiyê serdest bikin û dujminên xwe ji holê rakin. Vêca heger hûn bixwazin, hûn li van keştiyan siwar bibin, em ê ji di behahiyê re bimeşin û cenga xwe berdewam bikin hetanî ku em koka wan rakin.” Piştêre ji bo ku wan li şer germ bike jî, ev çend ristên han gotin:

Qenciya qençtirîn şerê bi dujminan re ye  
 Siwarbûna hespan û hêjandina şûr û mertala ye  
 Tew gava ku qasidek civanê evîndarekî bîne  
 Û ew evîndar jî li bendî mirov be li wî civanî

Piştêre, ev çend rist jî gotin:

Ger ku temen dirêjtir bibe hîn bêhtir  
 Helbet ez ê cengê ji te re bikim dayik  
 Şanazîya serkeftinê jî bikim birader  
 Semherî jî ji bo te bikim bav û bapîr  
 Li gel herkesên ku mirinê bi rûgeşî pêşwazî dikin  
 Çawa ku di kuştina xwe de vejînê bibînin

Dema ristên helbesta xwe qedandin, lê zêde kir û got: “Subhan ji wî re ku serkeftineke pîroz ji cem xwe diyarî me kir û em di nav zîv û zêr û îbrîzan de hiştin!”

Piştî vê axaftina Dendan, Şewqa Mekan ferman da leşkeran ku bi ser Qostantîniyê de biçin. Leşker jî meşîyan hetanî mêrg û çayireke xweş ku ajal û dirinde lê diçêryan û xezalan baz didan. Şeş rojên wan gediabûn di meşê de, pir westiyabûn û ew şeş roj bê av derbas kiribûn. Vêca gava li wê çayirê û li wan kaniyên avê rast hatin û ew darên fêkiyan li dorê dîtin, baskên wan çêbûn ji kêfan. Lewre xwe di nava buhuştikê de dîtin ku şaxên xwe bi ser wan de berdida, di nava wîwêwîta çûkan û bayekî hênîk de ku hiş di serê mirov de nedihîşt, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Her der buhuşta buhuşta narîn e çawa ku  
 Keskahîyeke zêrîn reşandî be li her derê  
 Çiqasî çav bigerîni, misoger tu rast tê  
 Li sûlaveke mîna xewn û nîgaşekê

Çawa ku her dem di nava bexçeyekî de be  
Mîrov çiqasî dimeşe, her bexçe ye dora mirov

An jî çawa ku helbestkarekî din gotiye:

Çem hinarûyekî şewqşikên e mîna heyvê  
Siyên şîndar û gulan jî tê de direqîsin  
Av jî her wekî bazin e li dora şaxan  
Kulîlkên sipî jî her ew in mîna tacan

Gava ku Şewqa Mekan li wan şîndar û li wan gul û kulîlkên mêrgan nêrî, gazî birayê xwe Şerker kir û jê re got: “Binêr birawo, cihekî wisa li Şamê gişî nîn e! De êdî em sê-çar rojan li vir bin, hetanî em bêhna xwe lê derxînin. Belkî bi vê yekê leşkerên me jî baştir bi ser xwe ve bîn û bikaribin hîn çêtir şerê kafiran bikin.”

Hîna ew di wî halî de bûn, dengin ji dûr ve hatin wan. Şewqa Mekan li wan dangan pirsî, yawerên wî jê re gotin: “Kerwanekî tacirên Şamê ne, li vir sekinîne ji bo ku bêhna xwe berdîn. Dibe ku hinek leşker li wan rast hatibin û hinek tişt ji wan stendibin, lewre ew ji welatê Qostantîniye tîn.” Seetekê bi şûn de jî ew tacir, bi qîrewîr û carecar hatin û hewara xwe di qral dan. Gava ku Şewqa Mekan ew yek bihîst, ferman da û xwest ku wan bînin cem wî. Hatîn ber destê wî û jê re gotin: “Sultanê şerq û xerbê! Em li welatê kafiran bûn, kesî em talan nekirin. Vêca çawa birayên me yên Musulman me talan dikin û em di nav wan de? Lewre çawa ne leşkerên we dîtin, em hatin cem wan bi bêrikirineke mezin, lê mixabin leşkerên te em şelihandin.” Piştî nameya ku Qeyserê Qostantîniye nivîsandibû jî dan destê Şewqa Mekan û gotin: “Va me rewş ji te re got, de êdî tu dizanî qralê me!”

Şewqa Mekan ji wan re got: “Tiştên ku leşkerên min ji we stendine, em ê wan li we vegeirînin. Lêbelê gerek we malên welatê Roman nayinana ji min re.” Wan jî got: “Mîrzayê me û ronahîya çavê me! Xwedê Teala rêya me bi wir xist û me tiştê ji wir bi dest xist ku tukesî tiştêkî wisa bi dest nexistiye. Heta we bi xwe jî bi vê şer û cenga xwe, we tiştêkî wisa biqîmet bi dest nexistiye.” Şewqa Mekan got: “Û we çi bi dest xistiye?” Gotin: “Em nikarin vê yekê ji te re bêjin ku em ne bi tenê bin, ji ber ku heger ev mijar li nav xelkê belav bibe, dibe ku hinek jê serwext bibin û ev yek dê bibe sedema malxerabîyekê ji bo me û ji bo hemû kesên Musulman ên ku werin welatê Romê.”

Wan jî sindoqa ku pîra zîrek tê de, baş veşartibûn. Şewqa Mekan û Şerker, herduyan gazî wan kirin û tenê bi wan re hatin cem hev. Wan jî çîroka yê Abîd ji wan re gotin û pê re jî giriyan, heta ku ew herdû jî bi xwe re dane girî.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê ji vegotina çîroka xwe birrî.*

## ŞEVA NOT Û PÛNCEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Melîk Şehriyar re berdewam kir û got:*

Şahînsahê min ê bextewar! Vêca ew Romên di dirûvên taciran de, dema ku bi girî û gazin çîroka wî Abidî ji herduyan re rave kirin û ew ji dane girî, dilê Şerker ê dilovan li ser wî Abidî şewitî û meyla wî bi ser de çû. Rabû ji wan re got: “Gelo we ew abid ji wê perestgehê derxist, ango hîna di binê zindanê de ye?” Gotin: “Na wele me ew ji wir xelas kir û me xwediyê dêrê jî kuşt ji tîrsa xwe. Piştîre bi lez em ji wir reviyân. Hinek ku baweriya me bi wan dihat jî, gotin: Gelek sindoqên zêr û zîv û gewheran di wê dêrê de hene.”

Piştîre ew sindoq anîn û ew pîra sihirbaz jê derxistin ku mîna darikekî hişkolek xwiya dikir ji ber hejarî û qermîçokên dest û nigên wê, di nava wan zincîr û qeydan de. Gava ku Şewqa Mekan û yên derdorê li wê nêrîn, gotin belkî zilamekî zahîd û abid e, bi taybetî jî ji ber wê biriqandina eniya wê ya bi dohn. Li himberî wê dîmenê Şewqa Mekan û birê wî Şerker herdu jî giriyan û pir tesîr li wan bû. Ji ber wê rabûn, dest û nigên wê maçî kirin û li xwe dan. Lê belê wê îşaret da wan bi destê xwe û ji wan xwest ku dev ji girî berdin. Wan jî bi ya wê kirin û dev ji girî berdan. Piştîre pîrejinê ji wan re got: “Bizanibin ku ez razîme ji vî tiştê ku Xwedê ew bi serê min de anîye. Lewre ev ji boyî min ezmûneke ku Xwedê ew daye ber min. Jixwe kesê ku nikaribe li himberî zor û zehmetiyan li ber xwe bide, nikare bigihêje buhuşta xalid. A rastî min nedixwest ku ez ji ber beleyan xwe bidim alî û werim welatê xwe. Min dixwest ku ez di ber simên hespên mûcahîdan de bimirim; ew mûcahîdên ku piştî şehîdbûna xwe namirin tucarî.”

Piştîre bi helbestî ev çend rist gotin:

Keleh tûrê Sîna ye û agirê cengê li dar e  
Tu jî Mûsa yî û êdî va dem li dar e  
Darê xwe bavêje bila hemûyan daqurtîne  
Qet metirse tu ben û werîsê wan ne mar e  
Tu rêzên neyar di roja cengê de her bixwîne  
Lew ew şûrê te ye ayetên di stûyên wan de

Gava ku pîrê ev ristên xwe qedandin, hêsir ji çavên wê hatin xwarê û eniya wê ya dohnkirî mîna şewqdêrê dibîriqî. Şerker rabû serxwe, careke din destê wê ramûsa û ferman da; xwarin jê re anîn. Lê belê wê xwarin nexwar û got: “Ev panzde roj in ku xwarin bi devê min neketiye. Vêca ez ê çawa niha xwarinê bixwim û Xwedê ez ji nav lepên Roman rizgar kirime di



vê seetê de û ez ji êş û azarekê xelas kirime ku ji azabê dojhê jî girantir bû. Ka bila bimîne hetanî êvarê.”

Gava ku bû êvar û wextê şîvê hat, Şerker û Şewqa Mekan pê ve hatin û xwarin jê re anîn, jê re gotin: “Bixwe ey Abidê Salih!” Wê jî got: “Ev ne dema xwarinê ye, ev dema îbadetê ye ji bo Xwedayê jor.” Piştî rabû ket mîhrabê û nimêj kir hetanî ku şev hemû buhurî.

Sê şev û sê rojan li ser hev, bi wî halî berdewam kir, bêyî ku rûnê ji xeynî dema silawdayîna nimêjê. Gava ku Şewqa Mekan ew di wî halî de dît, dilê wî lê vebû û baweriya wî hîn bêhtir pê hat. Rabû ji Şerker re got: “Konekî ji vî Abidê han re vegire û xizmetkarekî bide ber destê wî.”

Roja çaran incex doza xwarinê kir. Wan jî xwarinên şiklo şiklo û pir xweş jê re anîn. Lê belê wê, tenê nan û xwê xwar û nêta xwe li rojîyê anî. Gava ku şev hat, dîsa rabû nimêjê. Şerker ji Şewqa Mekan re got: “Ev Abidê han tam zahideke û destê xwe ji dinyayê şuştîye. Heger ne ji vê ceng û cîhadê bûya, minê bida dû wî û minê xizmet jê re bikira ji bo Xwedê. Ya rastî min dil heye ku ez bikevim çadira wî û seetekê pê re sohbetê bikim.” Şewqa Mekan got: “Ez jî dixwazim, lê tu dizanî ku em sibe diçin ser Qostantîniye û ji vê seetê pê ve jî dema me nîn e.” Dendan jî got: “Ez jî dixwazim vî zahidî bibînim. Belkî ji min re duayekê bike ji bo ku ez di vê cenga pîroz de şehîd bikevim û herim hizûra rebê xwe, lewre min jî destê xwe ji dinyê kişandiye.”

Gava baskên şevê bi ser wan de ketin xwarê, derbasî cem wê sihirbazê bûn. Ew jî di ser nimêjê de bû. Nêzikî wê bûn dest pê kirin giriyan li ber rehma wê. Lê belê ew li wan jî nezîvirî hetanî ku nebû nivê şevê. Wê çaxê, nû silava xwe da û hat cem wan, silavek da wan jî û ji wan re got: “Hûn ji bo çi hatine?” Wan jî got: “Zahidê Xwedê, qey te dengê giriyê me nedikir li kêleka xwe?” Wê got: “Kesê ku bikeve navbera min û xwedayê min de tu hebûn jê re namîne, êdî ez ê çawa dengê wî bikim, ango ez ê çawa wî bibînim?”

Dûra jê re gotin: “Em dixwazim ku tu ji me re behsa sebeba hêsirtîya xwe bike û tu çawa ketiye destê Roman de. Di dawî de jî em dixwazin ku tu îşev ji me re duayan bikî, lewre ev yek wê çêtir be ji me re, ji bidestixistina Qostantîniye.” Gava ku ew gotina wan bihîst, got:

Bi navê Xwedê yê şêrîn, heger hûn ne Emîrên Musulmanan bûna, min ev yek ji we re nedigot. Lewre ne ji adeta min e ku ez derveyî Xwedayê xwe, gazinên xwe ji kesî bikim û ne jî giliyê xwe li cem kesî bikim. Lê êdî va ez ê sebeba hêsirtîya xwe ji we re bêjim. Ligel hinek evdal û kesên din ez li

Qudsê bûm û min xwe li serê wan mezin nedikir, ji ber ku Xwedê dîlnizmî kiribû para min. Şevkê wisa li hevhat ku min berê xwe da deryayê û ez hi-nekî li ser avê meşiyam, ji nişkê ve ez li xwe ecêbmayî mam û min ji xwe re got ‘Gelo kes mîna min dikare li ser avê bimeşe?’ Ji wê rojê ve dilê min hişk bû û Xwedê Teala hezkirina rêwîtiyê xist dilê min. Ez rabûm, min berê xwe da welatê Roman û ez saleke sax li nava bajarên wan geriyam. Min cihê nehişt ku min îbadet lê nekir û navê xwe lê neanî ziman. Vêca gava ez hatim vê heremê û ez bi vî çiyayê hanê ve hilkişiyam ku dêrek tê de ye, keşîşê wê ez dîtîm û bi min ve derket, hat destên min maçî kirin, piştî nîgên min jî maçî kirin û got: “Ji roja ku tu derbasî welatê Roman bûye, çavên min li ser te ne û bi xêra te mereqa welatê Musulmanan ketiye dilê min, ez dixwazim herim wir.” Bi destê min girt û ez derbasî wê dêra han kirim, piştî ez birim odeyeke tarî û bibêbextî ji nişkê ve deriyê jûrê li min girt û ez çil rojî di wir de hiştîm, bê av û bê xwarin. Meqseda wî ew bû ku hêdî hêdî min bikuje. Carinan serkeşeyekî bi navê Deqyanûs derbasî wê dêrê dibû ku deh xulam û keçeke bi navê Temasîl pê re bûn, keçik pir spehî bû û yek mîna wê li ser rûyê erdê tunebû.

Carekê gava ku ew serkeşe derbasî dêrê bû, keşe jê re got ku ez li wirim. Serkeşe got: “Kanî wî ji wir derxînin lewre êdî tu goşt pê ve nemaye ku teyr bixwin.” Wan jî derî li min vekirin û dîtîn ku di wê odeya tarî de ez di ser nimêjê de me û ji xwe re duayan û lavan ji Xwedayê xwe dikim; serkeşe got: “Evê hanê efsûngerek e!” Gava ku yên mayîn ew gotina wî bihîstin, hemû derbasî odeya min bûn. Deqyanûs û xulamên xwe bi awayekî dijwar li min xistin. Wê gavê min xwest ku ez bimrim û min ji xwe re got: “Ev e cezayê kesê ku xwe diêcibîne û pozbilind dibe bi hunerên ku Xwedê dide wî. Qey tu nizanî ku jixwerazîbûn Xwedê diqeherîne, dilê mirov hişk dike û mirov dixê nav agir de?”

Piştî wan ez qeyd û zincîr kirim û ez dîsa xistim wê odeya min de ku ew zindanek bû di bin erdê de. Her roj carekê, tenê qepek nanê cehînî û qurtek av didane min. Her serê mehekê-dudan jî, serkeşe dihate wir. Keça wî Temasîl a neh salî jî êdî mezin bibû, piştî ku panzde sal di ser mana min re derbas bûn. Keça wî bibû bîst û çar salî û spehîbûna wê sînor derbas kiribûn. Bavê wê jî ditirsiya ku qral keça wî jê bistîne, bibe. Lê belê keçikê dixwest bibe rahîbe û di rîya Mesîh de bimeşe. Balkêş bû ku keça wî kincên zilaman li xwe dikirin weke fêrisan ku tukes mîna wê lihevhatî tunebûn. Lê kesî nizanîbû ku ew keç e.

Bavê wê jî hemû zêr û zîv û hebûna xwe di wê dêrê de vedişart. Min jî gelek gewher, lal, zîv, zêr û tuhfe yên wî bi çavên xwe dîtîbûn, ku nedihatî jimartin. Vêca hûn xwediyên wan xezîne û gewheran bana çêtirbû ji wan

kafirana. Hema herin wê dêrê, wan xezîneyan bibin û li ser Musulmanan belav bikin, bi taybetî jî li ser mucahidan belav bikin.

Îcar dîsa ez vegerim ser mijarê. Gava ku ev tacirên Şamî hatin Qostantîniye û barên tîcareta xwe firotin, di rêya wêneyekê re bi wan re axivîm bi emrê Xwedê, ew jî hatin dêrê, li wî serkeşeyî xistin, cezayê wî danê piştî ku bi rîha wî girtin û ew bi dûv xwe de kişkişandin ji bo ku cihê min nişanî wan bide. Piştî ez jî wir rizgar kirim û bi lez jî wir derketin, reviyana berî ku Romî li wan werin hev.

Sibe, mîna her car dê Temasîl were wê dêrê li gel xulamên xwe. Vêca heger hûn bixwazin, min bibin wir ez ê wan xezîneyan radestî we bikim. Lewre min li wir dît çawa bi qedehên zêr şerabê vedixwin û di sênîyên zîv de jî xwarinê dixwin. Li cem wan cariyekê ku bi Erebi distira jî hebû. Vêca heger hûn bixwazin, min bibin wir û li wir bimînin hetanî ku Deqyanûs û Temasîl werin ji bo ku hûn wê jî bi xwe re bibin. Lewre ew keçik tenê layiqî yekî mîna Şerker û Şewqa Mekan e.

Hemû bi vê gotina wê kêfxweş bûn, tenê Dendanê Wezîr kêfxweş nebû û fikar pê re çêbûn ji ber wan gotinên wê. Jixwe jî serî ve gotinên wê bi serê wî de nedîcûn, lê belê ji bo xatirê sultan û birê wî, bi wê re diaxivî. Loma bi wan gotinên dawî re, mehdê wî pir hate guhertin û dijberiyekê di nav çavên wî re da der. Pîrê got: “Ez ditirsim ku serkeşe were û van leşkeran li vir bibîne û ji tîrsa nekeve dêrê de.” Sultan ferman da leşkerên xwe ji bo ku berê xwe bidin Qostantîniye. Şewqa Mekan got: “Ez dixwazim li gel sed siwarî û sed heb qantirî herim wî çiyayî û wan xezîneyên di dêrê de bar bikim û bînim.”

Dûra di cî de şand dû serxizmetkarê xwe. Ew jî di cî de hat ber destê qral, li gel pêşrewên xwe yên Tirk û Deylem û Kurd. Sultan jê re got: “Hûn ê sibe berê xwe bidin Qostantîniye û tu dê di şûna min de ferman bidî û leşkera bi rê ve bibî. Rustem! Tê jî di şûna birê min de bî û di dema şer de tê serleşkertiye bikî. Lê belê divê hûn vê yekê ji kesî re nebêjin û bila kes nizanibe ku em ne bi we re ne. Sê rojan bi şûn de, em ê xwe bighînin we.”

Piştî sed faris ji nav siwaran neqand. Dûvre, ew û birê xwe û Dendan, her sed siwarên neqane dan dûv xwe, ew sed qantir û tîra xwe sindoq jî bi xwe re birin û çûn ji bo ku wan xezîneyan bînin.

*Li Şehrezadê bu sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA NOT Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehriyar re berdewam kir û got:*

Şahînşahê min ê bextewar! Çawa ku bû sibe, Serxizmetkar fermana meşê da leşkerên xwe û ketin rê de, bêyî kes bizanibe Sultan û birê xwe ne bi wan re ne, ango çûne dêrê.

Vêca em vegerin ser rewşa Şerker û birê wî Sultan Şewqa Mekan û wezîrê wan Dendan. Ew jî hetanî êvarê li wir man. Zilamên pîra sihirbaz ên di qilixê taciran de jî, dest û nigên wê maçî kirin, izina çûnê jê xwestin û bi dizî ji wir çûn, piştî ku şîretên dawî ji pîrê guhdarî kirin.

Gava ku tarîya şevê ket erdê de, pîrê ji Şewqa Mekan re got: “De êdî ka rabin, ber bi çiyayê dêrê ve biçin û çend heb leşkeran jî bi xwe re bibin.” Wan jî bi ya wê kirin; pênc heb siwar li cem wê hiştin, li qontara çiyê û ew jî berjor ve hilkişyan. Di wê navberê de kêfxweşî û zindîbûna ku di rûyê pîrê de xwiya dikir, bala wan kişand. Şewqa Mekan ji xwe re got: “Subhan ji wî Xwedayî re ku ev zindîbûn daye vî zahidê hezhizî.”

Pîrê jî di derbara rewşê de nameyek nivîsandibû û bi bin baskê kevokekê ve girêdabû, ji Qeyserê Qostantîniye re şandibû, ew ji her tiştî agahdar kiribû û jê re gotibû: “Ez dixwazim ku tu deh hezar egîdên wêrek ji farîsên Romê hîlbijêre û di piştî çiya re wan bîni dêrê ji bo Musulman wan nebînin. Bila di dêrê de bimînin hetanî ku ez wan bibînim an jî qasidekî ji wan re bişînim. Heger ez bikaribim wan bixapînim, ez ê Sultanê Musulmanan û birê wî û wezîrê wî û sed siwarî tenê bi xwe re bînim wir. Helbet ji bo ku baweriya wan bi min bê û ewle bibin, ez ê xaç û xezîneyên dêrê bidim wan û ez ê bihêlim ku keşê me jî bikujin ji bo xapa me êşkere nebe. Vêca ku hîleya me çû serî, jixwe wê herkesê Musulmanan vegere welatê xwe û wê keşeyê me jî bibe canbexşê gelê Fileh. De êdî ma hêviya me Xwedê û Îsa Mesîhê me!”

Gava ku nameya wê gîha Qostantîniye, peywirdarê birca kevokan, name ji Efrîdon re anî. Dema ku Efrîdon kaxet xwend, di cî de artêşa xwe amade kir, her yekî ji wan hespek, qantirek, barek û têra wan zad jî da wan û ferman da wan ku biçin wê dêrê.

Vêca em vegerin ser rewşa Sultan Şewqa Mekan, birê wî Şerker û wezîrê wî Dendan û leşkerên wan. Ew jî çawa ku gîhan dêrê, derbasî hundur bûn, dîtî ku keşe derketiye pêşwaziya wan. Pîra sihirbaz çawa çav lê ket, ji Şerker re got: “Vî keşeyê mel’ûn bikujin.” Şûrek li stûyê wî xistin, serê wî firandin, ew bi dojhê şa kirin. Piştî pîrê da pêşiya wan, ew birin cihê ku xezîne tê de bûn. Şewqa Mekan û zilamên xwe lê nêrin, bala xwe danê,

dîtin ku bi qasî pîrê behs dikir bêhtir zêr û gewher tê de hene. Hemû xistin sindoqan de û li ser piştta qantiran kirin.

Temasîl û serkeşeyê bavê wê ji tirsra Musulmanan nehatin. Şewqa Mekan vê rojê li hêviya wê ma hetanî êvarê, lê dîsa jî nehat. Rojeke din û yeke din jî ma, xwe ragirt lê dîsa jî nehat. Şerker got: “Wellehî hişê min li ser leşkerên Musulmana ye û ez nizamim niha ew di çi rewşê de ne.” Birê wî jê re got: “Va me evqase mal û xezîne ji xwe re bir, de êdî ka em herin, piştî ew şikestina ku bi serê artêşa Romê hat, ez texmin nakim ku êdî ne Temasîl were vir, ne jî kesî din. Em êdî herin belkî Xwedê rêya Qostantîniye jî li ber me veke.”

Dûra ji dêrê derketin û ji çiyê berjêr ve daketin. Dayika fen û hîleyan jî nexwest li himber wan derkeve, ji bo ku xapa wê eşkere nebe. Loma tevde meşiyar hetanî ku gihan devê newalê. Li wê derê dîtin ku artêşekê pêşiya wan girtiye! Gava ku her sed leşkerên Musulmanan hatin dorpêçkirin, Şewqa Mekan, birê wî Şerker û wezîrê wî Dendan bi şaşwazî li hev nêrin û gotin: “Kê cihê me ji van re gotiye, ew ji hebûna me agahdar kirine gelo?” Şerker got: “Birawo! Niha ne dema axaftinê ye, dema lêxistina bi şûr û rim û kevanan e. De êdî vîna xwe xwirt bikin û dilê xwe qewîn bikin. Ev newal mîna rêyan e, du dev jê re hene. De binêrin bi serên bav û bapiran, heger cih ne teng bûya, min ê hemû bi mirinê şa bikirana, lew ku sed hezar siwar bana jî.” Şewqa Mekan got: “Heger me bizanîba ku tiştêkî wisa li pêşiya me ye, me yê pênc hezar siwar bi xwe re bianiya.”

Dendan got: “Di vî cihê teng de, deh hezar siwarên me hebana jî, fêdeya wan ji me re tunebû. Vêca Xwedê alîkarê me be. Ez vê newala teng bi hûrgulî nas dikim, lewre di dema xezwa Sultan Omer en-Nûman de jî ez hatibûm vê derê, dema ku me Qostantîniye dorpêç kiribû. Em di vê newalê de jî mabûn. Aweke sar tê de heye ku ji helandina berfê diafire. De êdî zû rabin ser xwe ji bo ku em ji vê newalê derkevin berî ku pirtirîn leşkerên Romê li me werin hev û herin serê çiyê bigirin û kevîran bi ser me de bigindirînin, em nikarin tutiştî bikin.”

Bi lez hewl dan ku ji wê newala teng derkevin. Pîrejina ku xwe xistibû dirûvê zahidekî de, li wan nêrî û ji wan re got: “Jixwe hûn canbexşên rêya Xwedê ne. Îca ev tirsra han ji ber çi ye? Ez pazdeh salan di bin erdê de qeydkirî mam, min carekê tenê lome li Xwedayê xwe û qedera xwe nekîr. De êdî şer bikin di ber ola Xwedê de, kî hatin kuştin jixwe cihê wî buhuşt e û yên sax bimînin jî dê şanazê vê rêyê bin.”

Gava ev gotin ji Zahid bihîstin, tirsra ser dilên wan rabû, wêrekiya wan

li wan vegeriya û di cihê xwe de man, hetanî ku dujmin li wan hatin hev û ji her hêlê ve êrîşî ser wan kirin. Hêlê hêl bi wan ket, şûran serî firrandin, şingînî bi rim û mertalan ket, hîrehîra hespan bi azmanan ket û leşkerên Musulmanan ketin nav şerekî giran de, di ber rêya pîroz de. Şewqa Mekan jî siwar ji ser piştê hespan dianîn xwarê û piştê lehengan dişikand, serên dujminan sê-sê, çar-çar dibirîn, serên wan wisa bi qeflan birrî hetanî ku bi sedan ji wan kuşt û meytên wan nema hatin jimartin.

Hîna ku Şewqa Mekan bi wê lehengîyê şer dikir, pîra efsûnger jî bê navber îşaret dida zilamên xwe ji bo ku Şerker bikujin, ew nîşanî wan dida. Ew jî ref bi ref bi ser Şerker de diçûn, lê hertim bi bin diketin û nikaribûn derbê lê bînin. Ew jî herdem bi ser diket û jê werê ku ew bi xêra wî zahidî bi ser dikeve; di dilê xwe de digot: “Vî Abidê Zahid bi duayên xwe hêz da min û vîna min xwirtir kir li himberî van kafirên ku êdî ji min ditirsin û newêrin bi ser min de werin. Yek piştî yê din direve, bêyî ku li pey xwe binêrin.”

Piştê şerê xwe berdewam kirin, hetanî êvarê. Gava ku tarî kete erdê, ew jî bi şûn de vekîşyan û çûn xwe li şikeftêkê girtin. Hemû li hev kom bûn, hevdu jimartin, di encama şerê wê rojê de çil û pênc kes ji wan hatibûn kuştin. Çavên xwe li zahidê xwe yê temendirêj gerandin lê ew nedîtîn û bi vê yekê pir xemgîn bûn; ji hev re gotin: “Dibe ku şehîd ketibe!” Şerker got: “Min dît ku ew nav di siwaran de dide û bi îşaretin rebbanî hêz dida wan.”

Hîna ew wisa di nav xwe de dipeyvîvîn, pîra efsûnger kete cem wan û serê serkeşeyê mezin di destê wê de ku ew zilam weke efrîteki bû û serkêşiya bîst hezar leşker dikir û ji aliyê Tirkekî ve hatibû kuştin.

Vêca gava Roman kuştina wî lehengî dîtibûn, bi hemû hêza xwe êrîşî ser kujerê lehengê xwe kiribûn û bi şûran ew parî parî kiribûn, lê dîsa ji Xwedê bi buhuştê xwe şa kiribû. Wê çaxê pîrejina şeytan çûbû serê wî serkeşeyî jê kiribû û wê kêlikê jî ew anî, avêt ber destê Şerker, Şewqa Mekan û Dendanê Wezîr. Çawa ku Şerker çav lê ket, çeng bû ji cihê xwe û pê ve rabû, got: “Şikir ji Xwedê re ku careke din min tu dît, ey Zahidê Abid!” Wê jî got: “Kurê min, min dixwest ku ez şehîd bikevim îroj loma min xwe bi ser Romîyan ve davet, lê ew ji min ditirsyan û direviyan. Vêca gava hûn ji min veqetiyan, xîretê ez rapêçam û min êrîşî ser serkeşeyê mezin kir ku serkêşê wan bû û bi deh hezar mêrî dihate hesêb, min serê wî firrand û kes ji dujminan a xwe tê de medît ku bi ser min de were. Min jî serê wî ji we re anî.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî.*

## ŞEVA NOT Û HEFTEMÎN

*Şehrezadê ji Şehriyar re vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Îcar Şahînsahê min ê bextewar, jinika fennek û sihîrbaz ji Şewqa Mekan re got: “Min serê wî ji we re anî ji bo baweriya we xwirtir bibe û bi şûrên xwe hûn Xwedayê xwe razî bikin. Ez dixwazim bêjim ku ez jî dixwazim bi we re bikevim cîhadê û herim xwe bigihînim leşkerên we yên di rêya Qostantîniyê de, da ku bi bîst hezar leşker werin van dujminên vir tune bikin.” Şerker got: “Ey zahîdê Xwedê! Tê çawa xwe bigihîni leşkerên me û newala pêşiya me tijî leşkerên dujmin in?” Pîra sihîrbaz got: “Wê Xwedê min bisitirîne ji ber nêrînên wan, wê min nebinin. Ê ku min bibîne jî, newêre bi ser min de were. Lewre di rewşeke wisa de, ez bi Xwedê re dibim yek û ew li şûna min şer dike bi kafiran re.”

Şerker got: “Tu rast dibêji zahîdê Xwedê, lewre min bi çavên xwe ew tişt dît îro. Vêca heger tu ji serê şevê ve biçî, dê çêtir be ji me re.” Wê jî got: “Ez ê aniha bikevim rê de û herim. Heger tu jî dixwazî bi min re werî ji bo ku kes te nebîne, rabe serxwe, tu jî were! Heger birê te jî dixwaze, bila ew jî bi me re were, lê em nikarin kesî din ji xeynî wî bi xwe re bibin. Lewre weliyê min, nikare zêdî du kesan bistirîne ji çavên dujmin.” Şerker got: “Ê min ez dev ji şervanên xwe bernadim, lê heger birê min bixwaze dikare bi te re here ji bo ku ji vê tengasiyê xelas bibe, lewre ew keleh û taca gelên Musulman e. Û heger ew bixwaze, dikare Dendan ê wezîr jî bi xwe re bibe, an jî kîjan hîlbijêre. Bila bi te re werin û piştî deh hezar leşker ji me re bişînin, da ku em ji kafiran heq derkevin.”

Piştî pîrê got: “Ka mohletekê bidin min hetanî ku ez herim rewşa dujmin raçav bikim bê ka gelo raketî ne an şiyar in, dûra ez ê werim.” Wan jî gotin: “Ne bi te re be, em dernakevin bi tu deverê de.” Pîrê got: “Heger min bi ya we kir loman li min nekin, loman li xwe bikin. Lê heger hûn bi ya min dikin, mohletekê bidin min hetanî ez herim keşfa wan bikim.” Şerker got: “Here cem wan, lê di vegeerê de dereng nekeve, lewre em ê li bendî te bin.” Wê çaxê “Dayika Fen û Futan” ji cem wan derket û çû. Piştî çûna wê Şerker ji birê xwe re got: “Heger ev zahîd ne xwedî keramet bûya, nikarîbû ev serkeşê hêzdar bikuşt. Ev bi xwe kerametên di destê wî de diyar dike. Wisa xwiya dike ku mêraniya Romîyan jî bi kuştina vî serkeşî şikest, lewre ev zilam serdarekî wan ê cebbar bûye.”

Hîna ku wan wisa behsa kerametên wê dikir, pîrê careke din li wan vegeriya û derbasî cem wan bû, soza serkeftinê da wan. Wan jî spasiyên xwe jê re anîn ziman bêyî ku tê derbixin ev kemîn e. Piştî pîrê ji wan re got: “Kanî Qralê Hemdem Şewqa Mekan?” Wî jî got: “Va ez li vir im.” Pîrê jê re got:

“Wezîrê xwe bi xwe re bîn û bidin dûv min, da ku em biçin Qostantîniye.” Jixwe wê jî çûbû fena xwe ji wan re gotibû û ew jî pir kêfxweş bûbûn bi wê yekê û gotin: “Tişteki tenê dilê me eşand, ew jî kuştina serkeşe bû, lewre ew mêrê me yê herî wêrek bû.” Gava ku pîrê ji wan re got: “Ez ê Sultanê Musulmanan ji we re binim.” Wan jî got: “Heger tu wî binî, em ê wî bibin cem Efridonê Qeyser.”

Pîrê da ser piştî xaçerêkê, Şewqa Mekan û wezîrê wî Dendan jî dan dû wê. Pîrê ji wan re got: “Bimeşin li ser daxwaza Xwedayê dilovan!” Wan jî got: “Ma Xwedê û bextekî vekirî!”

Pîrê ew birin û meşiya, hetanî ku ketin nava leşkerên Romê û derbasî wê newala teng bûn. Leşkerên Romê jî li wan dinêrîn, bêyî ku têkildarî wan bibin; ji ber ku wê şeytana han ew şîret kiribûn. Vêca gava Şewqa Mekan û wezîrê wî Dendan li leşkerên Romê nêrîn û tê derxistin ku wan jî ew dîtine bêyî ku têkilî wan bibin, Dendan got: “Bi navê Xwedê rast e û ew bi xwe jî kerameta vî Zahîdî ye ku bêgûman wê ew ji nasên Xwedê be.” Şewqa Mekan jî got: “Hebe tunebe ew kafirana kor in, loma em wan dibînin û ew me nabînin.”

Hîna ku wan wisa pesnê wê û kerametên wê didan bê çiqasî zahideke salih e, leşkerên Romê di cî de êrişî ser wan kirin û ew destgîr kirin û ji wan re gotin: “Ka kesekî din bi we re heye ku em wan jî bigirin?” Dendan ji wan re got: “Qey hûn ev zahîdê li pêşiyê dimeşiya nabînin?” Romîyan got: “Bi heqê Îsa Mesîh û hemû keşe û metranên pîroz, ji we herduyan pê ve em tu kesî nabînin!” Şewqa Mekan got: “Welehî nexwe ev tiştê ku bi serê me de hat, cezayek ji ba Xwedê bû!”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birî û navber da axeftina xwe.*

## ŞEVA NOT Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Piştî ku Romîyan ew girtin, qeyd û zincîr xistin nigên wan û ew avêtin cihekî û nobedar danîn ber wan, wan jî ji hev re got: “Dema ku mirov bi ya zahidekî neke, tiştin ji vê xerabtir jî tîn serê mirov û ev tengahîya han a ku hat serê me jî, cezayê me bû.”

Vêca em vegerin ser rewşa Şerker û hevalên wî. Ew jî wê şevê li cihê xwe raket û gava ku bû sibe, rabû ser xwe nimêja sibehê kir, dûra wî û şervanên xwe, xwe amade kirin ji bo şerê Romîyan. Şerker nav di wan da, dilên



wan qewîn kir û soz da wan ku dawiya wan xêr û xweşî be.

Piştire, meşiyân hetanî ku gîhan nêzîkî dujminê xwe. Gava ku Romiyan ji dûr ve ew dîtîn, ji wan re gotin: “Musulmanino! Me Sultanê we û wezîrê wî hêsîr girtine ku ew serkêşên we ne. Îcar heger hûn şerê me bikin, em ê we gişan bikujin û li ser koka we rûnin. Lê belê heger hûn xwe radestî me bikin, em ê we bibin cem qeysêrê xwe ji bo ku em li hev werin, şer bisekinînin û hûn vegerin welatê xwe û em jî sultanê we berdîn, bêyî ku em dersê bidin hevdû. Vêca heger hûn vê pêşniyara me bipejirînin, wê şensê we baş be û heger hûn qebûl nekin jî hûnê bêne kuştin. Gotina me ya dawî jî ev e.”

Gava Şerker ev yek bihîst û lê ewle bû ku birayê wî û Dendan, herdu hatine girtin, dilê wî êşiya, girîyê wî hat, çogên wî fisiyan û hêz tê de nema. Tê derxist ku felata wan nemaye. Di dilê xwe de got: “Gelo çima û çawa hatin girtin? Gelo tu xerabiya wan çêbûye li himberî wî Zahidî?”

Piştire hêrs bû û rabû ser xwe, şerê kafiran kir hetanî ku hejmareke mezin ji wan kuşt, wê rojê wêrek û newêrek hişkere bûn, şûr û diran bi xwînê sor bûn û dujmin mîna mêşên ku bi ser dimsê de dibarin li wan hatin hev ji hawîrdorê.

Lê belê Şerker û hevalên xwe hîna jî mîna pêlewanên ku ji mirinê natirsîn şer dikirin û av li kesî venedixwarin, keys li kê tanîn serê wan difirandin. Hetanî xwîn di wê newalê re herikî û erd bi cendekan heta raxistin. Gava bû êvar, herdû artêş ji hev veqetiyân û her yek ji wan vegeriyan cihê xwe. Musulman jî dîsa vegeriyan şikefta xwe ya berê. Wê rojê sîh û pênc siwar ji wan hatibûn kuştin ku hemû jî serdar û mîrên navdar bûn û bi hezaran Romî kuştibûn. Êdî pir hindik mabûn. Gava ku Şerker ev rewşa dawî da ber çavên xwe, sêng li dilê wî teng bû, ji hevalên xwe re got: “Îcar em ê çî bikin, çawa bikin?” Hevalên wî jî gotin: “Tiştê ku Xwedê dixwaze, betal nabe.”

Roja dîtirkê, Şerker ji leşkerên xwe yên mayîn re got: “Heger hûn biçin şer, vê carê yek tenê jî ji we namîne, lewre av û xwarina me jî pir hindik maye. Ez texmîn dikim rêya rast ew e ku hûn şûrên xwe ji kalan bikşînin û di devê şikeftê de bisekinin, kî bi ser we de bê hûn wî bikujin; incex bi wî hawî hûn bikaribin xwe biparêzin. Belkî bi wî hawî em demê dirêj bikin û Zahidê me jî di wê navberê de xwe bigihîne leşkerên Musulmanan û li gel deh hezar leşker di hewara me de were û alîkariya me bikin li himberî van kafiran. Lewre dibe ku kafiran ew neditibe û rêya derbasbûnê di nava wan re dîtibe.” Hevalên wî jî gotin: “Rê û rêbaza herî rast ev e.”

Leşkerê Şerker bi ya wî kirin û rabûn çûn di devê şikeftê de sekinîn. Kîjan Romîyê ku hat, ew di wir de, di devê şikeftê de kuştin. Kî hat, ew bi şûn de şikandin, an jî kuştin, hetanî ku li wan bû êvar û şev kete erdê de.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî.*

ŞEVA NOT Û NEHEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Gava ku tariya şevê ket erdê, di destê Şerker de tenê bîst û pênc şervanê wî man.

Tiştê ku li hêla Şerker û şervanên wî qewimîbû ew bû. Vêca em vegehin ser rewşa Romîyan. Wan jî ji hev re gotin: “Em betilîn di vî şerî de, gelo wê kengî dawîya vî şerî bê?” Wê gavê hinekan ji wan gotin: “Rabin em êrişî ser wan bikin, jixwe tenê bîst û pênc heb mane. Heger em nikaribin bi wan jî em ê agir berdin wan. Heger xwe sipartin me, em ê wan hêsîr bigirin û bi xwe re bibin. Heger teslîm nebûn jî bila bibin komir di nav agir de, da ku bibin îbret ji xelkê re.”

Piştê Romîyan êzing hilgirtin, birin ber deve şikeftê û agir berdanê. Şerker û hevalên wî tê derxistin ku êdî felata wan nemaye. Di koşeyekê de asê mabûn û ji xweradestkirinê pê ve rê li ber wan nemabû. Di wê navberê de keşe û serdarê Romîyan li gel qeflek leşker li raserî wan derketin. Serleşker hewl da ku wan bikuje, keşe bi îşaretekê ew da rawestan û got: “Heger kuştinek wan hebe, divê li ber destên Efrîdon be, da ku dilê xwe li wan hênik bike. Loma divê em wan hêsîr bigirin li ba xwe û sibe wan bi xwe re bibin Qostantîniye û li wir wan teslîmî Qral Efrîdon bikin. Ew çawa dixwaze, bila wisa bi wan bike.” Wan jî got: “Ev e rêya rast.” Piştê ferman da wan ji bo ku Şerker û zilamên wî girêbîdin û nobedaran deynin ber wan. Leşkeran jî fermana keşîşê xwe pêk anîn, hêsîrên xwe girêdan, ew birin cem herdu hêsîrên din: Şewqa Mekan û Dendanê wezîr û nobedar danîn ber wan.

Gava şev bi pêş de çû, leşkerên Romê jî bi kêf û henek û laqirdiyan ve mijul bûn. Hem dixwarin û hem jî mey vedixwarin. Piştî demekê gava ku vexwarina meyê zede kirin, hişê wan ji serê wan çû û ji dest xwe çûn. Şerker û Şewqa Mekan û hemû hevalên xwe girêdayî bûn. Piştî ku awirek avêtin hev û li hev nêrîn Şerker ji birê xwe re got: “Birawo xelasî di ku de ye?” Şewqa Mekan got: “Welehî ez jî nizamim, em bûne mîna çûkên di qefesê de.” Şerker hêrs bû û keserek kûr veda û bi hemû hêza xwe destên xwe ji hev kişandin. Pêre jî benên destên wî qetiyar û rabû ser xwe, çû mifte jî bêrika

sernobedar derxistin. Qeyd û zincîrên xwe û Şewqa Mekan vekirin. Piştê destên hemû hevalên xwe yên hêsîr vekirin. Dawiyê jî li Şewqa Mekan û Dendan vegeyriya û jî wan re got: “Ez dixwazim va her sê nobedaran bikujim da ku em hersê cilên wan li xwe bikin û di nava wan re derbas bin herin, lewre dê me nasnekin bi wan kincan. Bi wî hawî em ê xwe bigihînin leşkerên xwe.” Şewqa Mekan got: “Ev rêbaz ne guncav e, lewre di dema kuştina wan de, dibe ku deng ji wan derkeve û leşker bi me bihesin. Ya rast ew e ku em xwe ji wan vedizin û derkevin derveyî vê newalê.” Gotin: “Tu rast dibêji.” Rabûn bi ya wî kirin û bi dizî tevgeriyan, meşiyên hetanî ku ji wê newalê derketin û dûrî leşkerê Romê ketin. Hinekî din meşiyên rastî hespin girêdayî hatin ku xwediyê wan raketî bû. Şerker ji birê xwe re got: “Divê her yek ji me ji xwe re hespekê ji van hespan bigirê û lê siwar be.” Hejmara wan bîst û pênc bûn, wan jî bîst û pênc hesp ji wan girtin û rêya xwe bi siwarî berdewam kirin. Jixwe ji serî ve şûrên Romîyan bidest xistibûn û êdî çekên wan jî hebûn. Xwedê teala jî wê şevê xeweke giran avêtibû ser çavên Romîyan, ku yek ji wan bi xwe nehisiyabû.

Gava ku tibabekî ji kafiran dûr ketin û xwe gihandin cihekî ewle, Şerker ji leşkerên xwe re got: “Edî netirsin Xwedê Teala em sitirandin. Lê pêşniyariyeke min heye.” Gotin: “Çiye?” Wî gotina xwe berdewam kir û got: “Ez dibêm, em hemû bi hev re derkevin serê vî çiyayî û bi yek dengî biqîrin, bêjin ‘Allahû Ekber! Eva leşkerên Musumanan hatin we!’ Wê çaxê dê hemû şaşo maşo bibin, bitirsin û ji hev bela bibin. Lewre hemû serxweş in û wê bêjin qey leşkerên me ji çar hêlan ve ew dorpêç kirine. Ew dê li bin guhê hev bikevin ji tirsan û em ê jî bi şûr û rîman bikevin nav wan de, em ê gişan bibirin.” Şewqa Mekan got: “Ev ne tiştê rast e. Ya rast ew e ku em bêdeng bimeşin hetanî ku em xwe bigihînin artêşa xwe. Lewre heger em bi tekbîrê biqîrin, dibe ku cihê me tesbît bikin, wê çaxê yek ji me nafilite.” Şerker got: “Bi navê xwe nikarin tutiştî bi me bikin. Ez dixwazim ku tu vê nêrîna min erê bike, willehî dê encama wê xêr be.” Şewqa Mekan bi ya wî kir. Hemû derketin serê çiyê û bi yek dengî qîriyan gotin “Allahû Ekber!” Gava gotin “Xwedê mezin e!” çiya û dar û ber jî mezin bûn ji heybeta Xwedê, kafiran jî dengê wan bihîstin û qajeqaj bi wan ket.

*Li Şehrezadê bû sibe wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SEDEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Vêca gava bû qîreqîra kafiran û gazî hev kirin, gotin: “Bi heqê Mesîh, Musulman ji her hêlê ve êrîştî me kirine û ketine ser dilê me de.” Piştê xwe bi xwe ketin pêxêla hev de û şûrên xwe di zikên hev rakirin, hezar ji hevdû

kuştin wê şevê.

Gava ku bû sibe li hêsîrên xwe geriyan, kes ji wan nedîtin! Serekê wan ji wan re got: “Wisa xwiya dike ku yê ev bobelata han aniye serê we, ew hêsîr bi xwe ne. De êdî zû di pey wan kevin û wan bi cehnemê şa bikin! Zû bilezînin û bila tirs li we tunebe.”

Hemû li hespên xwe siwar bûn û bi pey wan ketin, piştî demekê ew dîtî û li wan hatin hev, ew dorpêç kirin. Şewqa Mekan tirsîya û ji birê xwe re got: “Wisa xwiya dike ku tiştê ez jê ditirsîyam bi serê me de hat. Êdî ji berxwedanê pê ve, tu rê li ber me nemaye.” Şerker bédeng ma. Şewqa Mekan ji serê çiyê ve xwe berjêr re berda bi ser dujminan ve. Şervanên wî jî bi wê helwesta wî gelekî kêfxweş bûn, baweriya wan xwirtir bû, hêlehêl bi wan ket. “Allahû Ekber” ên wan ber bi erşan ve hilatin û wan jî xwe li pey wî berjêr ve berdan. Tam di wê navberê de, hêlehêlek ji aliyê din ve hat û dengên “Tekbîr” ên wan bi ezmanan ketin. Li hêla deng nêrin, dîtî ku leşkerên Musulmanan qefil bi qefil ber bi wan ve tên.

Çawa ku çavên wan li artêşa wan ket, dilê wan hîn xwirtir bû û baweriya wan bi wan hat, her yekî weke şerekî bi ser dujminan de çû û di serê wan de jî Şerkerê ku bênavber digot “Allahû Ekber” û fikir hêlehêl. Erd di bin wan de hejiya û leşkerên Romê weke noka ku tu li kevir bixe, ji hev belabûn ji ber wan. Lê Musulman bi pey wan ketin û yeko yeko ew kuştin. Şewqa Mekan û hevalên xwe, hetanî ber êvarê jî şûr li stûyê kafiran, rim jî di sîngên wan rakirin.

Gava ku şevê baskên xwe avêt ser wan, Musulman jî bi ser hevdû de hatin û serkeftina xwe li hev pîroz kirin. Tev gava ku li Şewqa Mekan rast hatin, hemû ji hespên xwe peya bûn, silav lê kirin û erda bin nigên wî maçî kirin. Piştî xezwa xwe li hev pîroz kirin ji ber ecra ku dê Xwedê di roja qiyametê de bida wan.

Vêca sebaba ku artêşa Musulmanan hatibû wir ew bû ku Behram û Rustemê emîr, gava ligel serxizmetkar ketin pêşîya artêşê û alên xwe bilind kirin û berê xwe dan Qostantîniye û gîhan wir, dîtî ku Romî derketine ser sûrên bajêr, li birc û keleşan bi cî bûne û amadekariya cengê kirine, lewre wan jî hatina wan bihîstibû. Loma wan jî ji ser burc û sûran, artêşa Musulmana ku mîna kulî bi ser wan de dihatin temaşe dikirin, reqereqa çek û mertalên wan, hêlehêla wan jî bi tirseke mezin guhdar dikirin.

Ê ku leşkerên Romê ji hatina Musulmanan agahdar kiribû jî, pîra sihîrbaz “Dayika Fen û Fûtan” bi xwe bû. Wê bi şeytaniya xwe, ew şiyar ki-

ribûn û rê û rêbazên amadekariyê nişanî wan dabû û hiştibû ku artêşeke mezin ji siwar û peyan bigihînin hev ku bibû mîna pêlên ava behrê. Gava ku Emîrê Tirkî çav li wê hêza Romîyan ket, ji Emîrê Deylemiyan re got: “Serkêşê Deylem, êdî em di rewşeke xeternak de ne li himberî van, dujmin li ser sûran, ew ên di bûrcan de û ev ên ku mîna pêlên ava deryayê, bê serî û bê binî ne! Wisa xwiya dike ku dujminên me sed carî ji me pirtirin. Mirov qet ewle nabe ku casûsek, sixurek here ahagiyê bide wa di derbarê jimara me de, bi vê hejmara hindik li himberî hejmara wan a bêdawî û alîkariya ku ji wan re tê bê navber. Bi taybetî jî ku pê bihisin Şerker û Şewqa Mekan û Dendanê Wezîr ne bi me re ne, dê ya xwe di me de bibînin û bi şûran bikevin nav me de, yekî tenê ji sax bernadin. Loma ya baş ew e ku tu bîst hezar siwarî ji Mûsilî û Tirkî bineqînî û biçî wê dêra han, bi hewara Sultanê me ve û emîrên pê re. Heger Romîyan ew tengav kiribin, ango ew girtibin, hûnê wan xelas bikin. Vêca heger hûn bi ya min bikin, zû herin û bi lez ji li me vegerin. Lewre biryarkarî, herdem çêtir e ji erê-nayê.”

Emîrê Deylemiyan fikara wî pejirand, rabû ser xwe, bîst hezar siwar hilibijartin û ketin rê de, berê xwe dan ew mêrga ku jê hatin û ew dêra ku Şerker-wan çûbûnê. Ev ji aliyê artêşa Musulmanan ve.

Vêca em bîst ser wê pîra sihirbaz. Wê jî bi fen û fûtên xwe, Şerker, birê wî Şewqa Mekan û wezîrê wî Dendan xistibûn destê Romîyan de. Ew jî li hespekê siwar bibû û ji Romîyan re gotibû: “Ê min ez ê hewl bidim xwe bigihînim artêşa Musulmanan li Qostantînîyê û hewl bidim ku ez wan tune bikim bi xapan. Ez ê ji wan re bêjim ku sultanê we û birê wî hatine kuştin, ew ê jî wê jihev bela bibin û kerê wan li korê wan biqelibe, dê mala wan xera bibe. Ez ê jî piştî herim cem Efrîdon qralê Qostantînîye û kurê min Herdûb, Qeyserê Romê û ez ê vê xeberê bidim wan. Ew ê jî bi artêşa xwe êrişî ser Musulmanan bikin û koka wan biqelînin.”

Piştî, bi hespê xwe ketibû rê de û şev pêde meşiyabû hetanî ku lê bibû sibe. Sibehe gava dinya ronî bibû, ji dûr ve leşkerên Behram û Rustem dîtibû û wê jî xwe ji ber wan dabû alî, di nava daristanê de xwe veşartibû. Di wê navberê de hebekî ponijbû li ser vê rewşê û ji xwe re gotibû: “Gelo dibe ku ev li Qostantînîyê şikestibin û bi şûn de vegeriyabin?” Gava ku hinekî din nêzikî wê bûn û baş li wan nêrî, dît ku alên wan ne daxistîne û tê derxist ku ew di şer de neşikestine û tirs jî li wan nîne.

Gava ku di wê mijarê de zelal bûbû, bi lez ber bi wan ve çûbû û bi awayekî şeytanî, xwe nêzikî wan kiribû û ji wan re gotibû: “Bilezîn bilezîn ey leşkerên Rehman! Bilezînin ber bi cihadê ve li himber partiya şeytanan!”

Demâ Behram çav lê ketibû, di cî de ji hespa xwe daketibû û pê ve çûbû, erda ber destên wê maçî kiribû û jê re gotibû: “Ey weliyê Xwedê, kanî çi li ba te heye?” Wê jî gotûbû: “Qet mepirse ji min ew rewşên canêş û xerab. Lewre Sultanê me, gava xezîneyên di wê dêrê de anîn û hatin ber bi Qostantîniyeyê ve, li arteşeke mezin a Romîyan rast hatin.”

Piştî ku navberek dabû axaftina xwe, dîsa berdewam kiribû û gotibû: “Pirraniya wan hatin kuştin û di encamê de, tenê bîst û pênc heb ji wan filitîn.” Behram lê vegerandibû û pirsîbû: “Û tu kengî ji wan veqetiya ey Zahîdê Salih!?” Wê jî gotibû: “Îşev.” Behram gotibû: “Subhan ji wî re ku hêz daye te û tu ji wî erdê dûr gîhandiye hetanî vir bi vê hespa belangaz! Lê belê jixwe ev elametên ewliyayên Xwedê ne!”

Piştê dîsa li hespê xwe siwar bibû, di nava şaşwazî û heyrangoriyeke mezin de ji ber wan tiştên ku ji devê pîrê bihîstibû û di ber xwe de got: “Lahewle wela qewete îla billa! Keda me bi avê de çû, mala me xerabû û sultanê me jî hêsr ket destê dujminan bi wezîr û serleşkeran.” Dûra bi lez û bez meşa xwe berdewam kirin, şev û roj nesekinîn. Şeveqa dîtir xwe gîhandin serê wê newalê û li wê derê li Şewqa Mekan û birê wî Şerker qelibîn ku wan jî “Tekbîr” digotin û hêlehêla wan, silav û selewat li ser Pêxemberê Ometê dixwendin. Hemû li wir gîhan hev û mîna lehîyê li Romîyan hatin hev û qîrîn li wan kirin ku çiya ji ber wî dengê wan hejiya.

Piştî ku roj qamekê bilind bû û dinya ronî bû, wan jî rûyên hev baş dîtin û yeko yeko hevdu nas kirin, hemû hatin cem Şewqa Mekan, erda ber nigên wî maçî kirin û kêfxweşiya xwe anîn ziman. Dûvre jî tiştên ku di şikeftê de hatibû serê wan, ji wan re gotin. Hemû şaş man bi wan qewimînan. Li dawiyê jî Şewqa Mekan got: “Ka em bilezînin biçin Qostantîniyê, lewre me leşkerên xwe li wir hiştine û dilê me bi ser wan ve ye.” Hemû rabûn ser xwe, tewkeliya xwe bi Xwedê anîn û ketin rê de.

Bi rê de, Şewqa Mekan hewl dida ku wêrekiyê bide Musulmanan û baweriya wan xwirtir bike û bi dengê dawidî helbest ji wan re dixwend û digot:

Spas ji te re ey layiqê hemû spasîyan  
Tu alîkarê min î hem rehîm û hem jî rêzan  
Ê ku serkeftin da min tu bûyî Yezdan  
Te da min mal û mulk, erd û ewtan  
Şûrê wêrekiyê, te ew da destê min  
Te ez kirim desthilatdar û him jî sultan  
Te ez hiştim di nav xêr û bêrê de rehman  
Li himberî her misîbetekê te tevdîrek da min

Wezîrekî şewîrmend û şewreke rast da min  
 Bi xêra te min êrîşî ser Romîyan kirî  
 Hemû gevizîn di nav xwîna xwe de  
 Di serî de te binkeftinek dabû min  
 Di pey wê de mîna şêran li wan vegeyîyam  
 Mîn hemû keleh û keştî girtin dest xwe  
 Termên dujminan li erdê rêz kir bi egîdî  
 Desthilatdariya xwe dirêj kir behr û bejahî  
 Te zahîdê xwe şand ji me re ligel kerametên  
 Kerametên ku nav û deng da li cîhanê  
 Ji bo tolhildanê em tev hatin ser Romîyan  
 Şehîdên me jî her ew buhuştî ne AMÎN!

Piştî Şewqa Mekan ev helbesta xwe qedand, birê wî Şerker ew pîroz kir li ser wê yekê û li ser serkeftinên wî. Dûra bi dilxweşî, meşa xwe berdewam kirin.

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî vegotina çîroke xwe birrî û navber dayê.*

ŞEVA SED Û YEKEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û ji Şehriyarê Şahînşah re got:*

Vêca em vegeyîrin ser rewşa pîra şareza û efsûnger. Ew jî piştî ku li leşkerên Behram û Rustem rast hat, vegeyîra daristanê, hespê xwe ji wir derxist, lê siwar bû û bi lez çû hetanî xwe gihand artêşa Musulmanan a ku gîhabû dora Qostantîniyê. Piştê ji hespê xwe peya bû, bi rişmeya wî girt û çû li rêza serxizmetkar geriya. Gava ku serxizmetkar çav lê ket, destê xwe jê re rakir û gazî kir, got: “Tu bi xêr hatî Zahîdê Xwedê!” Piştê jê pirsî bê çi heye, çi tune ye. Wê jî derewên xwe li hev anîn û jê re got: “Dilê min bi ser Rustemê Emir û Behram ve ye. Di rê de, ez li wan rast hatim, ligel bîst hezar leşker di hewara Sultan de diçûn, lê hejmara dujminan ji wan pirtir in bi gelekî. Divê tu niha zû hinek leşkerên din li pey wan bişîni ji bo ku neçin helakê.” Dûvre jî, li ser hev dúbare kir û got: “Lez, lez û lez, bikin!”

Gava serxizmetkarê Musulmanan ev gotinên wî bihîstin, dilê wan êşîya, giriyan û qudûmê wan şikest ji tirsan. “Dayîka Fen û Fûtan” got: “Baweriya xwe bi Xwedê xwirt bikin û li ser şopa ometa Mûhemmed herin. Lewre qesr û qûnaxên buhuştê ji bo şehîdên cîhadê hatine amadekirin. Jixwe mirin li pêşîya me gişan e û mirina bi wate ya di cîhadê de ye.”

Dema Serxizmetkar ew gotina wê bihîst, gazî birayê Behram kir ku jê

re digotin Turkaş û zilamekî wêrek bû. Deh hezar siwarên neqane jî dan kêleka wî û di wê şevê de ew xist rê de, ji bo ku di hewara kekê xwe-wan de here. Ew jî bi roj û şev meşiyar hetanî ku gîhan nêzikî Musulmanan. Roja dîtir gava bû sibe û wan jî rêya xwe berdewam kir, Şerker ji dûr ve toz û ecaca ku bi ser wan ketibû dît, tirsîya û ji hevalên xwe re got: “Vaye artêşek ber bi me ve tê. Ya artêşa Musulmanên me ye, heger ew bin dê serkeftin a me be, an jî artêşa dujminan e û heger ew be jî dê qedera me be. De êdî em û şensê xwe!”

Dûra hat cem birayê xwe Şewqa Mekan û jê re got: “Qet metirse birawo, ez ê xwe di ber te de feda bikim. Lê heger ev leşkerên me bin dê ronahîya me û xelasiya me bin. Heger leşkerên dujmin bin jî, bêgûman ez pir dixwazim ku bi wan re şer bikim, lewre Zahîd ji min re dua kiriye û ez jî dixwazim ku şehîd bim.”

Hîna ew wisa bi hev re diaxivîn, alên ku li ba dibûn ji wan ve xwiya kirin û “La îlahe illallah, Mûhemmeden Resûlûllah” li ser wan alan berz bû. Şerker qîrek da û got: “Rewşa Musulmanan çawa ye gelo?” Wan jî ji dûr ve bersiv dan û gotin: “Şikir ji Xwedê re ku em pir başin. Em ji bo we tirsîyan, loma em bi şûn ve hatin.” Piştî, Turkaş ji hespa xwe peya bû, erda ber nigê Şerker maçî kir û got: “Gelo Sultanê me û wezîrê wî Dendan û Rustem û birayê min Behram çawa ne? Gelo hemû başin?” Got: “Hemû bi xêr û selametin. Lê ka bêje ji me re, kê agahî da we di derbarê rewşa me de?” Turkaş got: “Zahîd agahî da me, wî got ‘Min Rustem û birayê te Behram dîtiye û min ew şandine hewara Sultan, lewre ew di tengahîyê de ne û dujminan dor li wan girtiye.’ Tiştê ku niha li ber çavên min xwiya dike jî, berevajî wê yekê ye û vaye hûn serkeftî ne.” Şerker got: “Û Zahîd çawa gîha cem we?” Got: “Li ser nigan dimeşîya, peya hatibû û di şev û rojekê de meşa deh rojan a bi hespê kuta kiribû.” Şerker got: “Bêgûman dê ew welîyê Xwedê be. Vêca ka ew li ku ye?” Gotin: “Me ew li cem leşkerên xwe hişt. Ew jî nav di wan dide û îmana wan xwirt dike ji bo biçin ser dujminan.”

Şerker pir kêfxweş bû bi wê agahîyê û şikir ji Xwedayê xwe re kir ku Zahîd sax e û tiştêk pê nehatiye. Piştî rehme li miriyên xwe anî û got: “Hemû tê nivîsandin di pirtûka wî de!”

Dûra meşa xwe bi hev re berdewam kirin û bi rêya xwe de çûn hetanî ku ji nişkê ve dîtin tozeke mezin xwiya dike li pêşîya wan û şewqa rojê girtiye. Şerker lê nêrî û got: “Ez ditirsim dujminan leşkerên Îslamê şikandibin, lewre vê toza han navbera şerq û xerbê dagirtiye.” Piştî stûneke tarî di binîya wê tozê re xwiya kir ku ji şevên zivistanê tarîtir bû û ber bi wan ve hat, mîna ku qiyamet rabûbe. Hesp û siwarî pê ve çûn bi bezê ji bo ku bibînin bê



sebeba wê çi ye. Gava nêzik bûn, dîtin ku ew Zahîdê han bi xwe ye! Hemû lê kom bûn ji bo destê wî ramûsin, wî jî gazî dikir û digot: “Ey dola xêr û xweşi û ronahiyê! Romîyan bêbextî bi Musulmanan re kirin. De êdî xwe bigihînin leşkerên Xwedê û wan rizgar bikin ji destên xeraban. Lewre di bin çadira de êrişti ser wan kirine û malik li wan xera kirine.”

Gava Şerker gotina Zahîd bihîst, dilê wî mîna yê çûkekî lêda, ji hespa xwe peya bû û bi heyrangoriyeke bêtimtêl çû dest û nigên jinika şareza ya ku xwe xistibû qilixê zahîdan de, maçî kir. Piştî, birê wî Şewqa Mekan û leşkerên din jî dest û nigê wê maçî kirin, tenê Dendan ji hespê xwe peya nebû û got: “Bi navê Xwedê rik û kîna min li himber vî zahîdî heye, lewre min hetanî niha xêr di kesên ku olê wisa pilore dike de nedîtiye, ji xeynî fitne û fesadiye. De êdî dev ji wî berdin û zû xwe bi Musulmanan ve bigihînin. Lewre ev kesên wisa hatine avêtin ji nav rehma Xwedê. Ma qey ez hindik car bi rehmetiyê Sultan Omer en-Nûman re hatime van deran!” Şerker jê re got: “Van gûmanên vala deyne hêlekê, qey te nedît bê çawa wî nav di bawermendan dida ji bo ku şer bikin, bêyî ku ji tîr û şûran bitirse? De êdî paşgotiniya wî neke, ji ber ku paşgotin gunêhe û goştê salihan nayê xwarin. De ka tu guh bide wî bê çawa nav di me dide û me li dujminan sor dike! Heger hezkirina Xwedê di dilê wî de tunebûya, evqasî nediket pêxêla Romîyan de piştî ewqase ezabê ku pê hatibû kirin û bi zorê jê hatibû rizgarkirin.”

Piştî Şerker ferman da leşkeran ji bo qantireke mêşînî bidin ê Zahîd ji bo lê siwar bibe û ji Zahîd re got: “Lê siwar be ey zahîdê qencê Xwedê!” Lê belê wê qebûl nekir, lê siwar nebû û bi wî hawî bala herkesî kişand û giha armanca xwe, çawa helbestkar jî gotiye:

Nimêj kir û rojî girt ji bo armancekê  
Gava armanca wî pêk hat jî her tişt berda  
Ne rojî ne nimêj, ne sewm û selatek!

Lewma Zahîdê wan jî bi nigan meşa xwe berdewam kir di nav hesp û leşkeran de, mîna rovîyê ku li nêçîrekê bigere. Hem dimeşiya, hem jî Quran dixwend bi dengê bilind û selewat dikşandin. Meşa wan wisa berdewam kir hetanî ku gihan artêşa Musulmanan. Li wê derê, Şerker dît ku artêş di şer de şikiyaye, Serxizmetkar jî li ber revê ye û şûr jî diçe û tê di navbera bedenên pîroz û yên gemarî de...

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û DUYEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û ji Şehriyarê Şahînşah re got:*

Vêca sebeba şikestina Musulmanan ew bû ku pîra fenakar gava dît ku Behram û Rustem li gel leşkerên xwe diçin hewara Şerker û Şewqa Mekan, ew çûbû Turkaşê Emir û deh hezar siwar ji artêşa Musulmanan veqetandibû ji bo wan qels bike û ji wir jî çûbû Qostantîniye, gazî serkeşe û serleşkerên Romê kiribû û gotibû: “Kanî ji ser bircan benekî ji min re bavêjin, ez ê nameyekê pê ve girêdim, hûn jî wê bigihînin qralê xwe Efrîdon da ku ew û Qeyserê Romê Herdûb bixwinin û li gora wê tevbigerin û tevdîrên xwe bistînin.”

Jê re benek avêtibûn, wê jî nameyek pê ve girêdabû ku ev tişt tê de hatibû nivîsandin: “Ji pîra şareza ya mezin û dayika fen û fûtên bêdawî, bo qral Efrîdon! Bila dilê we rehet be, min hîleyek saz kiriye kû dê Musulmanan tîk bibe. Lewre min sultan û wezîr û mêrxasên wa hêsîr dane girtin û piştire ez çûm min artêşa wan pê agahdar kir ji bo ku hêza wan perçe perçe bibe û qels bikevin. Jixwe min leşkerên dorpêça Qostantîniye xapandin û min deh hezar ji wan bi Turkaş re şand hewara hêsîran. Niha pir hindik mane li dora Qostantîniye. Vêca tiştê ji we tê xwestin ku hûn bi hemû hêzên xwe ji sûran derkevin û bi roj êrîşî ser wan bikin di konan de. Lê belê divê hûn giş bi hev re derkevin û wan tevan bikujin, lewre çavên Îsa Mesîh li ser we ye û dilê Meryema Megdelanî bi ser we ve ye. Ez hêvî dikim ku Îsa Mesîh ev karê min kiriye ji bîr neke!”

Gava ku nameya wê gîhabû Qral Efrîdon, pir pir kêfxweş bibû û di cî de şandibû pey Qeyserê Romê. Û çawa ku hatibû, nameya diya wî “Dayika Fen û Hîleyan” jê re xwendibû. Qeyserê Romê Herdûb jî pir kêfxweş bibû bi wê nameyê û gotibû: “Te dît bê çawa fenên diya min, pêdiviya bi şûr ji holê radike û agahîyeke wê, tîrsa herî mezin ji ser mirov radike!” Efrîdon jî gotibû: “Îsa Mesîh tu qet bê par nehiştiye, ne ji dirûvên wê û ne jî ji fen û fûtên wê.” Dûra gazî keşe û serleşkeran kiribû ji bo ku derkevin derveyî sûrên bajêr. Xeber di cî de belav bibû li nav Qostantîniye û leşkerên Filehan li gel al û xaçên xwe derketibûn derveyî bajêr, piştî ku şûr û rimên xwe hildabûn û mertalên xwe li xwe kiribûn û bêjeyên kufrê bilêv kiribûn bi dengê bilind.

Vêca çawa ku serxizmetkar li wê dîmenê nêribû, gotibû: “Romî pê hesiyane ku sultanê me ne li cem me ye, loma wisa bi ser me de tî. Lewre dibe ku êrîşî ser me bikin û pirraniya leşkerên me yê bijare çûne di hewara sultanê me Şewqa Mekan de.” Serxizmetkar pir qeheribû bi wê yekê û bi hêrs qîr kiribû bi ser leşkerên xwe de û ji wan re gotibû: “Ey leşkerên ola Îslamê! Heger hûn birevin, hûnê tune bibin û heger hûn li ber xwe bidin, hûnê bi ser kevin. Baş bizanibin ku wêrekî sebr û xweragirtina seetekê ye. Û piştî her tengahîyekê, firehîyek heye. Îcar Xwedê we pîroz bike û we di

ber rehma xwe xe...”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî.*

ŞEVA SED Û SÎSÊYAN

*Şehrezadê ji Şehriyar re got:*

Ey Şanîşahê min ê bextewar! Vêca gava Serxizmetkar ew gotin gotibûn, tekbîrên Musulmanan gîhabûn arşan û şerekî giran dest pê kiribû, aşê mirinê geriyabû bi hemû hêza xwe. Şûr û rûm li ba bibûn û xwin rijiyabû li her derê. Keşe û qesîsan êdî li naqosan dabûn, xaçên xwe bilind kiribûn û zinarên newqa xwe girêdabûn. Musulmanan jî tekbîr kişandibûn bi nave Xwedê û ayetên Qur’ana pîroz xwendibûn, bi coş û hest. Wê gavê partiya rehman û ya şeytan li bin guhê hev ketibûn, serî ji ser beden firiya bûn û melaîket li azmanan kom bûbûn li ser serê şopdarên wê ola pîroz û Pêxemberê wê yê hîlbijartî. Şingîna şûr û rîman berdewam kiribû hetanî ku şev ketibû erdê. Di wê navberê de Romîyan Musulman xistibûn dorpêçê de û keys li wan anîbû, pişt ji wan girtibûn; sibehê gava rojê dabû der, serxizmetkar û leşkerên xwe li hespên xwe siwar bibûn û hêvî ji Xwedê kiribûn ku serkeftinekê bike para wan. Careke din herdu artêş li hev ketibûn mîna du pêlên behran û bûbû şinge şinga şûr û mertalan. Ên wêrek bi pêş de çûbûn û yên tîrsonek jî xwe negirtibû di cihê xwe de bazdabûn. Dadgerê mirinê jî bê navber biryar dabiribûn di derbarê xelkê de.

Îcar tam di wê rewşê de Şewqa Mekan û Dendanê Wezîr bi wan ve gîhabûn li gel leşkerên xwe yên neqane.

Vêca çawa Şerker êrîşî ser kafiran kir, Şewqa Mekan, Dendanê Wezîr, Rustemê Emîrê Deyleman, Behramê Emîrê Tirkan û birayê wî Turkaş jî li pey çûn û mîna şêr û pilingan êrîşî ser wan kirin, leşkerên wan jî li dû wan bû. Wek ku hemûçik dîn bûbûn; ango xwîn ji çavên wan rijiyabe, bêtirs bi ser Romîyan de diçûn, bêyî ku li pey xwe binêrin. Toz û ecaceke mezin bi ser wan ketibû, mîna ewrekî ber şewqa tavê girtibû. Di encamê de kafir şikandin û herdu artêş ên Şerker û Serxizmetkar gîhan hev û bûne yek. Şerker Serxizmetkar pîroz kir li ser sebr û berxwedana wî û dilxweşiya xwe anî ziman. Hemû leşkerên Musulmanan jî pir kêfxweş bûn û dilê wan qewîn bû bi wê yekîtîyê û êdî bi hêz û baweriyeke hîn xwirtir, bi ser dujminên xwe de çûn.

Gava ku Romîyan li wan alên mûhemmedî nêrîn û “la îlahe illallah” li ser dîtin, hewara xwe di keşe û papazan de anîn û wêlewêl bi wan ket, navê Henna, Meryem û Îsa bilind kirin, hewara xwe anîn ziman û heta ku ji wan

hat xwe dane şer û cengê. Qral Efrîdon û Qeyserê Romê Herdûb, herdû gihan hev, yekî serkêşiya milê rastê yê artêşê kir û yê din ji serkêşiya milê çepê kir. Lehengekî wan ê bi navê Lawî hebû, wî di navbera herduyan de cî girt û leşkerên xwe giş xistin rêzê de. Musulmanan jî li raserî wan ên xwe xistin rêzê de.

Wê çaxê, Şerker hat cem birê xwe Şewqa Mekan û jê re got: “Ey Sultanê zeman û meknan, wisa xwiya dike ku dujmin dê mûbarezeyê bixwazê û em ê yeko yeko bi hev re dakevin tirada hespê. Jixwe tiştê ku em dixwazin jî ev e. Loma ez dixwazim ku leşkerên di pêşiyê de hemû leheng û pêlwan bin, da ku şikestina me tunebe. Çawa ku tu jî dizanî, tevdir nivê serkeftinê ye.” Sultan lê vegerand û got: “Tu dixwazî çî bibêjî şarezayê min?” Şerker got: “Ez dixwazim ez di nêvî de bim raserî dilê artêşa kafiran û Dendan li pey min be, Emîr Behram li çepê min be, Rustem li rastê min be û tu jî di nava alên me de be ey Sultanê Welatan! Lewre tu stûna me gişan î û divê em giş xwe bikin bi qurbana te.”

Şewqa Mekan spasiya xwe jê re diyar kir ji bo vê rêzdarî û hezkirinê. Piştî hêlehêl bi wan ket û hîrehîr bi hespên wan ket. Hîna ew di wî halî de bûn, siwarekî Romîyan ji nav wan derket û ber bi Şerker-wan ve hat. Gava ku nêzikî wan bû, rewşa wî jî diyar bû. Siwarek li ser piştî qantirekê bû ku di bin xwediyê xwe de dilewlihi. Perdeya ser wê ji hevrêşimekî spî bû û si-cadeyê keşmîrî li ser bû. Siwarê wê bi xwe jî extiyarekî bedew û bi heybet bû, şalekî hirî û spî li ser wî bû. Gava ku nêzikî leşkerên Musulmanan bû, ji wan re got: “Ez qasidê im ji bo we û peywira qasidan tenê agahdarkirin e. De êdî bext bidin min da ku ez vê agahiyê bidim we.” Şerker jê re got: “Bext ji te re, ewlehî li ser te ye, ji şûr û mertalan netirse.”

Wê gavê, zilamê extiyar ji qantira xwe peya bû, xaçê di stûyê xwe de daxist û bejna xwe li ber tewand, mîna parsekekî daxwazkar. Şerker jê re got: “Ka bêje bê te çî agahî ji me re aniye?” Wî got: “Ez qasidê Qral Efrîdon im û ji cem wî tîm. Min şîret lê kir ku van sûretên insanî hemûçikan xera neke û afrîndeyên rehmanî tune neke û min jê re got: Ya rastî ew e ku pêşiya xwinrijandinê bê girtin û tenê du leheng dakevin meydana şer. Wî jî bi ya min kir û ji we re dibêje: Yê min ez ê canê xwe di ber artêşa xwe de bidim, bila qralê Musulmanan jî wisa bike û xwe di ber artêşa Musulmanan de feda bike. Gava ez bême kuştin, leşkerên min nema li ber xwe didin û gava ku qralê Musulmanan jî were kuştin dê arteşa wan ji hev belav bibe.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî axaftina xwe birri û bêdeng bû.*

ŞEVA SED Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehriyar re berdewam kir û got:*

Gava ku qasidê Qral Efrîdon ew peyama ji wan re got, Şerker lê vege-  
rand û got: “Ey rahîbê hêja, bersiva me jî ji qralê te re heman tişt e. Tiştê  
rast û dadwer jî ew e. De êdî here û jê re bêje; me teklîfa wî qebûl kiriye û  
yê ku dê li himber wî dakeve meydanê ez im. Lewre ez lehengê Musulmana  
me û ew jî yê Romîyan e. Heger ew min bikuje, ji revê pê ve tiştê li ber  
Musulmanan namîne. De êdî bi şûn de vegere û ji qralê xwe re bêje; bila  
sibe ji min re dakeve meydanê. Lewre em ji rêwîtiyeke dûr hatine û pêwes-  
tiya me bi bêhvedanekê heye. Piştî bêhvedanê, êdî kes loman ji kesî nake.”

Qasid bi kêfxweşîyeke mezin bi şûn de vegeriya, çû cem Efrîdon û  
Qeyserê Romê û ji wan re got ku Şerker pêşîniyara te qebûl kiriye. Efrîdon  
pir dilxweş bû bi wê agahiyê û xemgîniya nava xwe belav kir. Di dilê xwe de  
got: “Bêgûman Şerker zana û jêhatiyê wan e di xebata şûr û rîman de. Heger  
ez wî bikujîm, dê vîna wan bişke û hêza wan qels bibe.”

Jixwe “Dayika Fen û Fûtan” jina sihirbaz ew tişt ji Qral Efrîdon re ni-  
vîsandibû û gotibû “Şerker siwar û lehengê herî wêrek û navdar e di nav  
Musulmanan de.” û Efrîdon hişiyar kiribû di vê mijarê de. Lê Efrîdon jî  
lehengekî mezin bû û bi hemû rêbazên şer û cengê dizanibû, ji avêtina tîr  
û keviran hetanî rim û bivir û şûr û hesindar; siya tîrsê jî newêribû nêzikî  
wî biba. Loma gava ji qasid bihîst ku dê Şerker pê re dakeve tirada hespê,  
hindik mabû ku ji kêfan re bifire! Lewre ew li xwe pir bi bawer bû û baş  
dizanibû ku kes nikare pê.

Wê şevê Romî hemû di nava dilxweşî û bextiyareke mezin û di nav  
mey û şerabê de raketin.

Roja din sibehê, siwar bi rimên esmer û bi mertalên gewr daketin saha  
şer. Çawa ku li wir kom bûn, dîtîni siwarek li meydanê ye, li ser piştê hes-  
pekî qeşeng û nigzirav. Cewşenekî hesinî lê bû ku şerkariyeke wî yî giran  
dida xwiyakirin û di sînga wî de jî awêneyeke ji gewheran, di destên wî de jî  
şûrekî tûj û cunehekî erjeng ji karê ifrencan hebû. Siwarê leheng çû û hat li  
meydanê, piştê rûyê xwe vekir û qîrek da, got: “Heçê ku min nas dike, nas  
dike, yê ku min nasnake jî dê gaveke din min nas bike. Ez Efrîdon ê ku bi  
bereketa ‘Dayika Fen û Fûtan’ hatiye pîrozkirin.”

Gava Efrîdon gotina xwe qedand, lehengê Musulmanan jî derket ra-  
berî wî. Ew jî li ser piştê hespekî qemer bû ku buhaya wî hezar zêrê sor bû  
û zînek li ser piştê wî bû ku bi durr û gewheran xemilandî bû. Şûrekî hindî  
yî ji gewher ku stû jêdikirin û karê zehmet bi serkeftî dibir serî. Hespê xwe

di neqeba du rêzan re dibir, siwaran jî bi heyrangorî lê dimeyzand. Piştire gazî Efrîdon kir û jê re got: “Ey melûnê bêmirê! Qey ji te werê ku ez jî mîna lehengên din, ez ê xwe li ber te negirim li meydana şer?”

Piştire herduyan êrîşî ser hev kirin û mîna du çîyan li binguhê hev ketin, weke pêlên du behran sînga xwe dane hev, geh pêş de çûn, geh jî paş de vekîşîyan. Geh bi şûr, geh bi rimê li hev dan, lê belê kesî ji wan keys li yê di neanî. Pîkoliya hespên wan, zîvirandina wan li dora hev û kerr û fer-rên ku bi seetan berdeyam kirin jî encam neda û kesî ji wan keys li yê din neanî. Temaşekirina herdu artêşa jî li wan berdeyam kir hetanî ku li wan bû êvar û tîrêjên şewqa rojê çûne ava. Hinekan digot wê Şerker bi ser keve, hinekan jî digot wê Efrîdon bi ser keve, lê kes bi ser neket û gava ku bû êvar jî Efrîdon gazî Şerker kir û jê re got: “Bi navê Îsa Mesîh tu siwarekî wêrek û lehengekî pir jêhatî yî, lê belê tu bêbext î û helwestên te ne yên sinckar û maqûlan e. Ji ber ku ez dibînim tevgera te ne paqije, şeweya şerê te ya zaliman e û qewmê te jî dibêjin ku tu ji dola koleyan e û vaye wan ji te re hespekî din dane bin te, da ku tu pê şer bikî ji xeynî hespê te. Bi rastîya xwe şeweya şerê te, ez betilandim û derbên te ez bêtaqet xistim. Vêca heger tu dixwazî îşev dakeve meydanê û bi min re şer bikî, ne hespê xwe, ne jî çek û kincên xwe neguherîne, da ku hemû leheng ciwamêriya te di şer bibînin.”

Gava ku Şerker ev gotin bihîstin, hêrs bû ji Musulmanên xwe, ji ber wan gotinên ku di derbarê wî de gotine û ew gîhandine dola koleyan. Loma li paş xwe zîvirî ji bo ku li wan binêre û ji wan re bibêje ji min re hesp û çekan amade nekin, lê belê kes ji wan li pişt xwe nedît. Şerker tê derxist ku Efrîdon hîle lê kiriye, bi lez rûyê xwe zîvirand û weke biraqê xwe ji ber tîra Efrîdon da alî, xwe xûz kir hetanî ku bi piştê hespê ve bû yek. Ji ber wê jî tîr di peralêla laşê wî de hat, destpêkê pê ve xijiqî, piştire li sînga wî ket û pê re dengê axîneke xurt jê derket û ji ser hişê xwe çû. Efrîdonê melûn kêfxweş bû bi wê yekê û tê derxist ku wî ew kuştîye. Rabû gazî kafirên xwe kir ji bo ku kêfê li dar bixin. Romî şa bûn û xwediyên baweriyê jî girîyan, bi wê yekê.

Gava Şewqa Mekan dît ku birayê wî bi ser hespê de xiliyaye û li ber ketinê ye, siwar ber bi wî ve şandin. Ew jî bi hev re ketin pêşbaziyê û bi lez çûn ew anîn. Kafira jî laqirdiyên xwe bi Musulmanan kirin û êrîşî ser wan kirin. Herdu artêş ketin pêxêla hev û bi şûr û rîman li hev dan. Kesê ku di serî de xwe gihand Şerker, Dendan ê wezîr bû...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dev ji vegotina çîroka xwe berda.*

ŞEVA SED Û PÛNCEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehriyar re berdeyam kir û got:*

Vêca Şahînşahê min ê bextewar, gava Sultan Şewqa Mekan dît ku tî-ra Efrîdon li birayê wî ket, fêris û lehengên xwe pê ve şandin. Dendan di pêşiya herkesî de xwe pê ve gihand. Li pey wî jî Behramê Emîrê Tirkan û Rustemê Emîrê Deyleman. Hemûçikan xwe pê ve gihandin û ew anîn cem birê wî Şewqa Mekan, xîzmetçi dan ber ji bo ku lê binêrin û ew jî dîsa bi şûn de vegeryan şer û cengê.

Meydana şer germ bû, şûr û rim li hev ketin, çingêçing bi mertalan ket, xwîn rijiya, stû xiliyan, hûr rijiyên û şer giran bû, gîha astekê ku ziman nema dikarîbû wesfê wî bida. Nivê şevê derbas bû, herdu alî jî westiyan û gazî hev kirin, şer rawestandî. Herkes vegeriya hêla xwe, çûn bin çadirên xwe. Romiyan jî hemûyan berê xwe dan cem Qralê xwe Efrîdon, erda ber nigên wê maçî kirin. Keşe û rahîban jî serkeftina wî ya li himberî Şerker pîroz kirin.

Dûra Efrîdon û keşe û serkêşên xwe derbasî Qostantînîyê bûn, çû li ser textê xwe rûnişt. Piştî Qeyserê Romê Herdûb jî hat cem wî û jê re got: “Duayên dayika min î salih ‘Dayika Fen û Fûtan’ hatin qebûl kirin û Îsa Mesîh alîkariya te kir, te zora wî bir, te ew kuşt. Jixwe êdî ez bawer nakim ku Musulman bikaribin xwe li ser nigan bigirin piştî Şerker.” Efrîdon lê vegerand û got: “Sibe wê dawî be, em ê encamê bigirin. Çawa min Şerker kuşt, ez ê sibe Şewqa Mekan jî bixwazim ku dakevî meydana şer û ez ê wî jî bikujim; bê gûman dê wê çaxê leşkerê wan jî ji hev belav bibin û birevin.” Tiştên ku li aliyê Romîyan qewimibû, ev bûn. Vêca em vegerin ser Musulmanan.

Dema Şewqa Mekan vegeriya bin çadirê, ji birê wî Şerker pê ve, tişteke di bîra wî de tunebû. Çawa ku derbasî cem wî bû, dît ku Şerker di rewşeke pir xerab de ye. Rabû gazî Dendan û Behram û Rustem kir, ji bo ku bi wan bişêwire. Çawa ku hatin cem wî, bi wan şêwirî û di encamê de gazî hekîman kirin ji bo ku birîna wî derman bikin. Bi ser de giriyan û gotin ku di dîrokê de mêr weke wî nehatine dinyê.

Wê şevê li ber serê wî man û hewl dan ku dilxweşiyê bidine wî. Derengî şevê, Zahîd hate cem wan. Digiriya, hêsir ji çavên wê dihatin û tikan ji Xwedê kir ku wî sax bike. Çawa ku Şewqa Mekan çav lê ket, ji ber wî rabû. Zahîd li ber rûnişt, destê xwe di ser laşê Şerker re bir û anî, çend ayetên Qur’anê li ser xwendin û dua lê zêde kirin.

Hetanî sibehê li ber serê wî man. Gava bû sibeh Şerker bi ser xwe ve hat û şiyar bû, çavên xwe vekirin, zimanê wî geriya, dest bi axaftinê kir. Şewqa Mekan bi vê pêşketinê pir kefxweş bû û got: “Duayên Zahîd, di hewara wî de hatin û ew sax kirin.” Şerker got: “Şikir ji Xwedê re ku ez başim. Rewşa

min niha baş e. Wî melûnê Efrîdon bêbextî bi min re kir, hîle li min kir; heger min tevdîra xwe negirta û bi lez tevnegeriyama, dê ew tîr di nivê sînga min de biçûya û dê xelasiya min tunebûya. Vêca şikir ji Xwedê re ku ez xelas kirim. Gelo rewşa leşkeran çawa ye?”

Şewqa Mekan got: “Hemû xemgîn in û digrîn li ser te.” Şerker got: “Lê ez baş û li ser xwe me, kanî Zahîd li ku ye?” Wî got: “Li ber serê te ye.” Şerker lê zîvirî, destên wî ramûsa. Zahîd got: “Kurê min bêhna xwe fireh bike. Sebîr tişteki baş e û ji ba Xwedê ye.” Şerker got: “Duakar be ji bo min!”

Gava ku bû sibe û dinya ronî bû, Musulman daketin meydana şer, kafiran jî xwe amade kirin ji bo şer û cengeke giran. Piştî Musulmanan şûrên xwe ji kalan kişandin û ber bi kafiran ve hatin û meydana şer ji wan xwestin. Sultan Şewqa Mekan û Efrîdon li hev kirin ku li himberî hev dakevin meydanê. Gava ku Şewqa Mekan daket meydanê, Dendanê Wezîr û Serxizmetkar û Behram jî li pey wî çûn, jê re gotin: “Em fedayîyên te ne.” Wî jî li wan vegerand û got: “Bi heqê navê xwe û mala wî ya pîroz, ez rûnanê hetanî ku ez bi ser vî elokî de neçim.”

Gava ku Şewqa Mekan daket meydana şer, bi şûr û rima xwe lîst bi awayekî ku herkes ecêbmayî hişt. Piştî bi dengê bilind qîr da û got: “Kanî Efrîdon li ku ye, ji bo ku ez wî bi mirineke tal şa bikim.” Efrîdon hewl da ku ji wir here, lê belê Şewqa Mekan sûnd pê da xwarin ji bo ku ji meydanê neçe û jê re got: “Doh te bi birê min re şer kir, îro jî tê bi min re şer bike, lewre ez bêminetiya te û mêraniya te didim.”

Piştî, ber bi wî ve meşîya, şûr û mertalê wî di dest de bû û hespeke edhem di bin de bû ku mîna Enter xwiya dikir. Çawa ku helbestkar jî gotiye:

Weke awirekê li pêşîya awirekê xist  
Mîna ku bixwaze xwe bigihîne qederê  
Hem qemir hem jî qer e ev hespê tarî  
Mîna tarîstaneke şevê ye qet nayê zeftê  
Hîre hîra wî her tirsê dixê dilê neyarî  
Weke birq û birûskê diçe bi rê ve ew  
Ba jî nagihêjê ew her li pêş diçe bi lez  
Weke birûskê ye û herdem li pêş e ew

Piştî, herdu pêlewan ketin pêxêla hev de û daketin tirada hespê, li nava meydanê. Herdu jî pir bi tevdîr bûn li himberî hev, kerr û fer dikirin û çî hunerên veşartî di nava wan de hebûn, derxistin holê. Pevçûna van herdu fêrisan bi vî hawî berdewam kir hetanî ku çavên li ser wan bûn qerimîn û sebîr bi wan re neman. Tam di wê wextê de Şewqa Mekan qîr da û êriş kir



ser Efrîdon û derbek lê da, serê wî birrî, nefesa wî qut kir.

Çawa ku kafiran ev tişt bi çavên xwe dîtin, gişan bi hev re êrîşî ser Şewqa Mekan kirin, wî jî ew hemû bi derbên şûr pêşwazî kirin û serî jêkirin hetanî ku xwîn mîna ava çeman heriki. Pê re jî hêlehêl bi Musulmanan ket, tekbîr kişandin û selewat li ser Pêxemberê Ummetê kirin û bi hemû hêla xwe ketin nava şer de. Di encamê de, Musulmanan serkeftin bi dest xistin û kafir bi bin ketin. Dendan gazî kir Musulmanan û got: “Tola Sultan Omer en-Nûman hilînin! Tola kurê wî Şerker hilînin!” Piştî kofiya serê xwe derxist û careke din gazî kir got: “De heydê lê bidin Tirkino!” Wê gavê bîst hezar siwarên Tirkan li gel wî hebûn. Hemûyan bi hev re xwe dan êrîşê û bi ser Romîyan de çûn, wan jî ji revê pê ve rê nedîtin li ber xwe. Di revê de jî gelean ji wan hevdû perçiqandin di devê deriyê sûrê de. Dûra di cî de derî li dû xwe girtin û ji tirsan derketin ser sûrên bajêr. Musulman jî bi serbilindî vegehiyan çadir û konên xwe. Di encama wî şerî de bêhtirî pencî hezar leşkerên Romê hatin kuştin û ewqas jî hatin dilgirtin.

Li dawiyê Şewqa Mekan derbasî cem birê xwe Şerker bû, dît ku ew di rewşeke pir baş de ye. Spasî ji Xwedayê xwe re kir û piştî derbasbûyîbûn jê re xwest. Şerker jê re got: “Em giş deyndarê vî Zahîdê Xwedê ne, bi xêra wî em bi serketin û bi xêra duayên wî Xwedê dengê me bihîst, rê ji me re vekir. Hetta niha jî rûniştîbû dua ji Musulmanan re dikir ji bo ku bi ser kevin.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA SED Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Şerker ji birayê xwe re berdewam kir û got: “Jixwe gava dengê tekbîrên we hatin min, min tê derxist ku we zora dujminên xwe bîriye û hûn bi ser ketine. De êdî çî qewimî be ka ji min re bêje?” Rabû Şewqa Mekan çîroka şerê xwe û Efrîdon jê re got û nîşanî wî da bê çawa wî ew kuşt û bi dogehê şakir. Şerker jî ew pîroz kir û spasiyên xwe jê re pêşkêş kir.

“Dayika Fen û Fûtan” a ku di dirûvê zahîdê Xwedê de li wir rûniştî bû, çawa ku kuştina Efrîdon bihîst rûyê wê zer bû, çavên wê tijî bû û hêsir jê bariyan. Lê belê dîsa jî wê ew êş di nava xwe de veşart û bi hawê ku ew jî kêfxweş bûbe bi serkeftina Musulmanan, ji wan re got: “Ez ji ber kêfa zêde digirîm.” Di nava xwe de jî ji xwe re got: “Bi heqê Îsa Mesîh, tu xêr di jiyana min de jî nema, ji xeynî ku ez jî bihêlim dilê wî li ser birê wî Şerker bişewite, çawa ku wî dilê min şewitand li ser Efrîdon ê ku serleşker û qralê Xiristiyanan tevda bû!” Lê belê wê ev giş di zikê xwe de hiştin.

Şewqa Mekan, Wezîr Dendan û Serxizmetkar li cem Şerker man hetanî ku jê re merge çêkirin, merhem li birîna wî kirin, dermanê wî danê û ew jî bi ser xwe ve hat, baş bû. Wê çaxê Şewqa Mekan ew jî bi başbûna wî kêfxweş bûn, leşker jî ji vê pêşketinê agahdar kir û ji wan re, gotin: “Sibe wê Şerker jî li hespa xwe siwar bibe û ew jî dê tev li dorpêçkirina bajêr bibe.”

Piştî Şerker ji hersiyar re got: “We îro pir şer kiriye, divê hûn niha rabîn herin cihê xwe, rakevin û zêde şevbuhêrkê nekin.” Wan jî bi ya wî kirin û her yek ji wan çû ser cihê xwe. Tenê çend heb xulam û Zahîdê Xwedê bi tenê man li cem Şerker. Hebekî bi Zahîd re axivî, derengî şevê çû ser nivîna xwe xwe pal da, raket. Xulamên wî jî di xew re çûn û xew ji bo insanan mirin e.

Şerker û xulamên xwe raketin, lê “Dayika Fen û Fûtan” ya ku di teşbîha Zahîdê Xwedê de bû, wê kêlikê rabû ser xwe û şiyar bû. Li Şerker meyzand, dît ku di xeweke giran de ye. Di cî de çeng bû ji cihê xwe û rabû ser xwe, xencereke ku serê wê jehrînî bû ji ber xwe derxist û hat ber serê Şerker, xencer danî ser stûyê wî û ew şerjêkir, serê wî ji nav milê wî qut kir. Dûra çû serê xulamên raketî jî jêkir ji bo ku pê nehedin. Li dawiyê jî ji wir derket û çû çadira Sultan, dît ku nobedar şiyar in. Çû çadira Dendanê Wezîr, dît ku şiyar e û Qur’anê dixwîne. Di wê navberê de awirên wî lê ketin rabû gazî wê kir û got: “Merheba û ehlen bi Zahîdê Xwedê!” Çawa ku dengê Dendan bihîst, dilê wê lêda û ricifî. Piştî bersiv da û got: “Sebeba ku di vê seetê de ez hatime van dera ew e ku min dengê weliyekî Xwedê bihîst û berê min li wî ye, ez pê ve diçim.” Piştî çû û ji ber çavan wenda bû.

Dendanê Wezîr ji xwe re got: “Bi navê Xwedê ez ê vê şeva han, vî Zahîdî bişopînim!” Rabû ser xwe û da pey wê. Gava ku dengê meşekê bihîst, wê jî tê derxist ku wezîr li pey wê ye. Tirsîya ku rastiya wê eşkere bibe, ji xwe re got: “Heger ez hîleyekê lê nekim, dê rastiya min derkeve holê.” Rabû lê vegehiya, hat cem wî û got: “Ey wezîrê hêja! Yê min ez li pey vî weliyê Xwedê me ji bo ku ez wî nas bikim. Piştî ku min ew naskir, ez ê destûrê jê bixwazim ji bo ku tu jî werî cem wî. Ez ditirsim ku heger bê destûra wî tu bi min re werî cem wî, ew ji min biqehere.”

Wextê Wezîr ew gotina wê bihîst, fedî kir ku lê vegehiya, devjê berda û vegehiya çadira xwe û xwest ku rakeve. Gava xilmaş bû û xewa wî hat, wek ku dinya lê hatibe hev bêhna wî çikiya. Rabû ser xwe, ji çadirê derket û di dilê xwe de got: “Ya baş ew e ku ez herim cem Şerker û bi wî re biaxivim hetanî sibê.” Meşîya hetanî ku gîha çadira Şerker, derbasî hundurê wê bû; çawa derbas bû dît ku xwîn diherike mîna cokê û Şerker û xulamên wî giş jî serjêkirî ne! Di cî de qîrek da ku erd û azman pê re hejiyan û herkes ji

xew şiyar bû. Kijanê ku ji xew rabû jî berê xwe da cihê deng û hatin li wê xwinê rast hatin; ew jî tev li qîrîn û nalînê bûn û bi wî hawî dengêkî ecêb bi wan ket.

Di wê navberê de xeber ji Şewqa Mekan re çû û ew jî ji xew şiyar bû. Jê re gotin: “Birayê te Şerker û xulamên wî hatine serjêkirin.” Bi lez rabû ser xwe û bi wir ve bazda, çû ket çadirê, dît ku Dendan diqire û laşê birayê wî jî bê serî li erdê dirêjkirî ye. Çawa çav li wê dîmenê ket, ji se hişê xwe çû û ket erdê. Hemû leşker li derdora wî kom bûn û li ser wî giriyan behtirî seetekê hetanî ku Şewqa Mekan bi ser xwe ve hat û rabû ser xwe rûnişt, ji nû ve li ser Şerker giriya û hey giriya. Dendanê Wezîr û Behram û Rustem jî pê re digiriyan. Serxizmetkar jî di heman rewşê de bû, herî dawî hewl da xwe ku rabe here, ji ber ku nema dikaribû li wê dîmenê binêre. Lê berî ku ji wir here, Sultan Şewqa Mekan jê pirsî û got: “Gelo hûn dizanin kê ev tişt bi serê birê min kiriye û Zahîdê Xwedê ka çûye ku gelo?” Dendanê wezîr got: “Ji xwe ev fêlên genî giş karên wî Zahîdê Şeytan in û hemû ji bin serê wî derdikevin. Bi navê Xwedê hîna ji roja ewil ve û hetanî niha rika min li himberî vî zilamî hebû û ez jê aciz bûm. Ji ber ku ez baş dizanim ev ên ku dîn û olê bi kar tînin, hemû genî û nêtxerab in.”

Xirecir bi her kesî ket, dengê wan bilind bû û dua ji Xwedê kirin ku wî Zahîdê Şeytan bide dest wan ji bo ku cezayê wî bidinê. Piştê laşê Şerker şuştin, nimêja wî kirin û laşê wî li ser wî çiyayî veşartin piştî ku xêr û qençiyên wî anîn ziman...

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û HEFTEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Herî dawî Şewqa Mekan li ber kêla birayê xwe sûnd xwar û got: “Bi soz û peyman ez ji ser van Romîyan venagerim hetanî ez Qostantîniyê xera nekim û hemû qral û mezinên wan nekujim û heyfa birayê xwe Şerker ji wan hilînim. Heger ez mirim jî, ez ê ji vê dinyaya pîs xelas bibim.” Piştê jî ferman da ku herin wan zêr û zîv û gewherên ku ji dêrê derxistibûn bînin, wanan li ser malbatên leşkeran belav bikin û xeberê bidin malbatên xwe yên li welat û ji wan re bêjin ku ew di dorpêça Qostantîniyê de ne û dê ve-negerin welat hetanî ku bajêr xera nekin, an jî di wê oxirê de bimrin, lew ku bi salan jî berdewam bike ev dorpêç.

Piştê ferman da Dendanê wezîr ji bo nameyekê ji xwişka wî Seyrana Zeman re binîvisîne û jê re got: “Tiştê qewimîye jê re binîvisîn, rewşa me

jî jê re diyar bik û jê re bêj bila li kurê min miqate be, lewre gava em ji wir bi rê ketin, jina min li ber zayînê bû û misoger niha kurek aniye, çawa ku li ber guhê min ketiye. Vêca ku ew xeber rast be, zû agahiyeke saxlem ji min re bine.”

Ev ji aliyê Musulmanan ve wisa bû, vêca em vegerin ser rewşa Romîyan. “Dayika Fen û Fûtan” piştî wê hîleya xwe ya mezin, rahişt pênûs û kaxezê û dest pê kir nivîsand: “Ez Dayika Fen û Fûtan, ji bo we Musulmanan dinî-visînim. Bila hayê we jê hebe ku min hûn xapandin û ez derbasî welatê we bûm û di destpêkê de min sultanê we yê berê Omer en-Nûman di hundurê qesra wî de kuşt. Di wî şerê newalê û yê şikeftê de jî, min gelek mêrên we kuştin, herî dawî jî bi jîrektî û zanebûna xwe, min Şerker û xulamên wî jî kuştin. Û heger demê têra min bikira û şeytan jî alî min bikira, min dê sultanê we Şewqa Mekan û wezîrê we Dendan jî bikuşt. Ez im a ku di dirûvê zahîdekî de ez hatim cem we û min ewqase hîle li we kirin. Vêca heger hûn dixwazin xwe xelas bikin, zû ji vir herin, na heger hûn dixwazin werin kuştin, li vir bimînin. Lê baş bizanibin ku heger hûn bi salan jî bimînin, hûn ê nikaribin bi me!”

Piştî ku ew name nivîsand, kete şînê de û sê rojan li ser hev êşa Efrîdon kişand û ket nava xemgîniyê. Roja çaran gazî şervanekî kir, ew name da wî û jê xwest ku wê nameyê li tîrekî bipêçe û bi kevan bavêje ji Muslumanan re. Dûra vegeriya, çû ket dêrê û dîsa giriyê xwe berdewam kir li ser Qral Efrîdon. Dûvre ji Qralê nû re-yê ku hatibû şûna Efrîdon-got: “Divê ez Şewqa Mekan û hemû emîrên Musulmanan bikujim.”

Vêca em dîsa vegerin ser rewşa Musulmanan. Wan jî sê rojan şîn kişandin û roja çaran li hêla sûrên bajêr nêrîn, dîtî ku şervanekî Romî li ser sûrê ye, tîr û kevanê wî pê re û hewl dide ku nameyekê li tîr bipêçe û ji wan re bavêje. Xwe li bende wî ragirtin hetanî ku ew name ji wan re avêt. Name hat, Sultan ji Dendan re got: “Ka ji me re bixwîne bê Romî çi dibêjin!” Gava name jê re xwend û naveroka wê fêm kir, hêsir ji çavên wî bariyan û borebor pê ket, qîriya û tengav bû ji ber fêlekariya wê şeytanê. Wezîrê wî Dendan jê re got: “Bi navê Xwedê, ji roja ewil ve dilê min li wê venedibû û ez jê aciz bûm.” Sultan got: “Û vê bêsinca han, çawa dikarîbû du caran li ser hev me bixapîne? De bi navê Xwedê ez nema ji vir diçim hetanî ku ez navşeqê wê bi risasa helandî danegirim û wê mîna teyrikekî nexim qefesekê û li dawî jî bi porê wê ve daliqînim di ser deriyê Qostantîniye re.” Dûvre dîsa birayê wî hat bîra wî û dest bi girî kir.

Kafir hemû pir kêfxweş bûbûn gava “Dayika Fen û Fûtan” ji wan re behsa kuştina Şerker kir. Musulman jî bi hemû hêza xwe ji nû ve li dorpê-

çikirina Qostantîniye vegeriyan, lewre Sultanê wan soz da wan ku heger ew bajar vekin, dê hebûna bajar gişî li ser wan bi wekhevî belav bike. Lê belê Sultan Şewqa Mekan hîna jî xemgîn bû û hêsir dibarandin li ser birê xwe. Di nava wê xemgîniyê de, her ku diçû hejar û lewaz dibû. Carekê Dendan derbasî cem wî bû û jê re got: “Bêhna xwe fireh bike û dilê xwe aram bike Sultanê min, lewre birayê te bi ecela xwe çû û fêde jî di şînê de tune ye, çawa ku helbestkar jî gotiye:

Tiştê tune be jixwe ew tune ye  
Tiştê ku hebe jî jixwe ew heye  
Tiştê ku dê bibe jî hey dê bibe  
Di wextê xwe de her ew dê bibe  
Birê nezaniyê jî her dê poşman be

De êdî dev ji girî û şîniyê berde û dilê xwe xwirt bike ji bo ku tu rahêje şûrê xwe.” Şewqa Mekan got: “Wezîrê min! Dilê min pir bi êş e li ser bira û bavê min û ji ber vê dûrketina ji welat jî hişê min li ser nas û kesên min e.” Dendan bi vê gotina wî re giriya. Piştî jî hemû pê re giriyan.

Musulmanan dorpêça Qostantîniye heta demeke din jî berdewam kirin. Di wê navberê de agahî ji Bexdê hatin. Emîrekî wî ji Bexdê hat û jê re got ku jina te kurek anîye û xwişka te Seyrana Zeman navê “Hebû-Tunebû” lê kiriye û ji te re dibêjin ku: “Dê ew kurik bibe navdarekî meşhûr, lewre bi hatina wî re gelek bûyerên ecêb qewimîne. Loma zana û aliman ferman dan ku li ser mînberan û di pey her nimêjê re dua ji wî re bikin. Em giş baş in û baran jî pir bariyaye û dostê te yê Tifikvan jî pir baş e û di nava xêr û xweşiyê de ye, gelek xizmetkar û xulamên wî jî hene. Lê belê ew pir mereqa te dike. Ligel silav û rêzan.”

Gava Şewqa Mekan ew agahî ji devê emîrê xwe yê qasid bihîstin, got: “Niha piştî min xwirt bû êdî û kurek ji min re çêbû, navê wî “Hebû-Tunebû”...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir û ji Şehriyar re got:*

Şahînsahê min ê bextewar. Îcar Sultan Şewqa Mekan ji wezîrê xwe Dendan re got: “Ez dixwazim dev ji vê şîn û ji vê xemgîniyê berdim û hinek xêran li birayê xwe bidim.” Wezîr got: “Tu çawa dixwazî bila wisa be.” Piştî ferman da ku kon werin vegirtin li ser tirba birê wî û leşker li wir kom kirin. Hinekan ji wan Qu’ran dixwend, hinekan jî selewat dixwendin û bi wî hawî

berdewam kirin hetanî sibehê. Piştire Sultan çû ber tirba birê xwe û ev rist ji devê wî herikîn:

Herkes li pey wî digiriya bi carecarê  
Û şeqamek dixwar mîna Mûsa li Torê  
Kî hat li pey wî mîna miriyan xwiyabû  
Lewre di dilê gişan de ew her kolayî bû  
Min qet hêvî nedikir ku ez bibinim  
Laşê te li ser desta diçe weke şewq û tavê  
Ne jî bawer dikir ku rojekê ji rojan  
Stêrk binax bibin bi veşartina laşê te re

Piştire kûr kûr giriya û hemû kesên li wir jî pê re giriyan. Dûvre xwe avet ser tirba wî, bêyî ku bizanibe wê çi bike. Rabû Dendanê Wezîr jî ev rist li pey wî gotin:

Min li dû xwe hiştin hemû tiştên ku namînin  
Hemû tiştên ku dimînin jî bi dest xwe xistin  
Bi hezaran mirov mîna te çûn û hey çûn  
Te xwe diparast herdem ji tîr û şûran  
Çi gava ku şer derdiket li wan qadan  
Xweda ji te hez kir ku tu girtî cem xwe  
Li buhuştê bi cî kir tu wî her tu bi xwe

Piştî ku wezîr ev ristên xwe qedandin, kûrekur pê ket û bi girîyekî tehl giriya. Piştî wî, nasekî Şerker ber bi wî ve hat û ew jî kûr kûr giriya û qala qencî û başiyên Şerker kir. Piştire wî jî helbestek xwend. Herî dawî jî herkes çû çadira xwe û ji hev belav bûn. Sultan û wezîrê xwe li ser mijara şer û cengê sohbet kirin bi şev û roj hetanî çend rojan. Lê her ku rewş bi wî hawî diçû, bêhna Sultan teng dibû û kedereke mezin nava wî dagir dikir û pir aciz dibû. Dawî ji wezîr re got: “Ez dixwazim tu ji min re behsa serborîyên xelkê, gotinên qralan û çîrokên aşiqan bikî, belkî Xwedê aramîyekê bixe dilê min û min ji van kul û derda xelas bike.” Wezîrê wî jê re got: “Heger kul û kederên nava te bi çîrokên qralan, gotinên pêşiyên û serpêhatiyên aşiqan derbas bibin, ev yek hêsan e. Lewre dema ez bi rehmetiyê bavê te re bûm, karê min û Şerker ev bû. Îşev jî ez ê ji te re behsa çîroka aşiq û maşiq bikim, ji bo ku bêhna te fireh bibe.”

Gava ku Şewqa Mekan ew gotinên wezîrê xwe bihîstin, hişê wî ma li ser wê çîroka ku dê ji wî re bibêje û tiştêkî din nema hat bîra wî. Bi bêsebrî ma li bendî hatina şevê. Gava ku şev hat jî, ferman da ji bo ku xulam findan û mûman pêxin û têra wan xwarin û vexwarin û bixûrê binin. Xulam jî rabûn, her tişt amade kirin. Îca şand pey Dendan, ew jî hat. Dûvre şand pey Behram, Rustem, Turkaş û Serxizmetkar; ew jî hatin.

Gava hemû hatin civata wî, berê xwe da wezîrê xwe Dendan û jê re got: “Eva tu dibînî ku şev hat û baskên xwe avêtin ser me. Vêca em dixwazin tu soza xwe pêk binî û wan çîrokên xweş ji me re bibêjî.” Wezîr jî got: “Ser seran, ser çavan.”

*Li Şehrazadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

ŞEVA SED Û NEHEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Gava Şewqa Mekan ji wezîrê xwe re got, kanî wan çîrokan ji me re bêje, Dendan got; ser seran, ser çavan û dest bi çîroka xwe kir got:

Sultanê min ê bextewar! Di demên borî de, bajarek li pişt çiyayên Esfehan hebû, navê wî Bajarê Kesk bû. Qralek li wî bajarê hebû, jê re digotin Suleyman. Mirovekî comerd, dadwer, destvekirî, ewle û bi xwe bawer bû. Loma ji çar hêlên dinyayê, xelkê xwe lê digirt û navê wî li hemû welatan belav bibû. Demeke dirêj di wî bajarî de mabû, di nava şanazî û ewlehîyê de. Lê belê ne jinên wî hebûn, ne jî zarokên wî. Wezîrekî wî jî hebû, dişibiya wî di xisletan de.

Rojekê gazî wezîrê xwe kir û jê re got: “Ey wezîrê min î hêja! Bêhna min teng bûye û êdî ez nema dikarim li ber xwe bidim li himberî vê rewşa bê jin û bê zaroktî û ev jî ne halê qral û hakimana e ku mîna rêbiran bin. Divê mirov kêfxweş bibe bi hebûna zarokan li dû xwe û pîrbûna wan. Lewre Pêxemberê me-silavên Xwedê li ser wî bin-gotiye ‘Bizewicin, zarokan çêbikin û pir bibin, lewre di roja qiyametê de ez ê bi we serbilind bim di nav xelkê de.’ Vêca ka tu çi dibêjî di vê mijarê de û tu çi şîretê li min dikî?”

Çawa ku wezîr wê gotina wî dibihîze, hêsir di çavan re davêjin û jê re dibêje: “Xweska ez bikarîbama biaxivîma sultanê min, di xeysiyetên Xwedan de. Qey tu dixwazî ku ez biçim dogehê ji ber qehra wî?” Qral jê re got: “Wezîrê delal, divê tu bizanibî ku gava qral cariyekê dikire, ne eslê wê dizane ne jî fêslê wê. Ew xerabiya eslê wê nizane ku xwe jê biparêze û ne jî şanaziya wê ku kêfa xwe pê bîne. Gava ku pê re rakeve jî, dibe ku ji wîna ber bigire û kurekî zalim, xwînaxwar û fêsiq jê re çêbibe. Mîna axa herîşî ku gava tu tiştêkî tê de biçînî, ne wî di nava xwe de digire, ne jî başiyekê didê wî. Dibe ku ew zarok lêxistin xwaribe ji xwediye xwe û bi ya wî neke. Loma ji bo ku ez ji yekî wisa re nebim sebeb, ez cariyekê nakirim. Lê belê ez dixwazim ku tu keçekê ji keçên qralan ji min re bixwazî ku eslê wê diyar be û spehî be. Vêca heger tu yeke wisa di rê de û xwedî esil û fesil ji min re bibînî, ez ê wê bixwazim û pêre bizewicim, li ber destên şahidan, da ku bi

emrê Xwedê be.”

Wezîr jê re got: “Naxwe Xwedê ya di dilê te de pêk anî û tu gîhand daxwaza te.” Qral got: “Çawa?” Wî jî got: “Min bihist ku keçeke Zahir Şah, qralê erda gewr heyê ku pir spehî û jêhatî ye. Ziman nikare wesfê wê bide. Di vê heyamê de, keç mîna wê tunene, ji ber ku pir kamil e, giran û biaqil e. Çavin mîna yê xezalan, porekî dirêj, newqeke zirav û kulîmekin giran li ser in ku gava tê mirov serxweş dixê û gava diçe mirov dikuje, çav û dil bi xwe re dibe.”

Gava wezîr pesindariya wê keçikê qedand ji Suleyman Şah re got: “Tu bi ya min dikî şahê min, qasidekî zîrek î zana û azmûnwar bişîne cem bavê wê, ji bo wê ji te re bixwaze. Lewre keç mîna wê nînin li seranserê vê dinyayê. Tê bi wêna rûyekî geş qezenc bikî û Xwedê jî bi vê yekê wê ji te razî bibe. Tê gotin ku Pêxemberê me gotiye; rahiptî di Musulmantiyê de nîn e.”

Wê gavê bextewariya herî mezin ket nava qral de, dilê wî aram bû û kul û derdên wî nebedî bûn. Ber bi wezîr ve hat û jê re got: “De binêr wezîrê min, ji te pêve tukes nikare vî karî bike. Lewre yê jîr û yê kamiledêp jî tu bi xwe yî. De êdî rabe here mala xwe, kar û barê xwe bike û sibe bikeve rê de, here vê keçikê ji min re bixwaze. Lewre hişê min ma li ser vê keçikê. Vêca tu jî here û bêyî wê bi ser min de venegere.” Wî jî got: “Ser seran, ser çavan.”

Wezîr çû malê û diyariyên guncaw jî qral xwestin; ji gewheran hetanî bi ber û kincan, çi tiştên sivik û buha hebûn, xwestin. Dîsa, hespên erebî, mertalên dawidî, sindoqên mal ên ku ziman nikarîbû wesfê wan bida. Hemû li ser piştê deve û qantiran kirin û li gel sed heb kole û sed heb cariyê, wezîr ket rê de. Çawa ku ew ket rê de, Şah Sulayman jî sebir pê re nema û wek ku li ser agir be, nema xwe girt. Lewre şîret li wezîrê xwe kiribû ji bo ku bi lez vegere.

Wezîr bi şev û roj meşiya, çol û beyar derbas kirin û hetanî mesafeya meşa rojekê nêzikî wê banê ku keçik lê bû, bû. Li wê derê, li qiraxa çemekî sekinî û navber da meşa xwe. Ji wê deverê zilamek li pêşiya xwe şand cem Zaher Şah, da ku wî agahdar bike ji hatina xwe.

Qasidê wî bi lez çû bajêr. Di wê navberê de, wisa li hev hat ku Zaher Şah jî derketibû seyrane, li derveyî bajêr. Gava qasid dît, tê derxist ku ew zilamekî xerîb e. Rabû ferman da xulamên xwe ji bo herin zilam binin cem wî. Gava qasid anîn cem jê pirsî, qasid jî jê re got: “Wezîrê qralê gewre Suleyman Şah, xwediyê erdê kesk û çiyayê Esfehnan tê cem te.” Qral kêfxweş bû bi wê xeberê, xêrhatina wî kir û ew li gel xwe bir, berê xwe da qesra xwe.



Piştire jê pirsî: “Li ku derê, tu ji wezîr veqetiyayî? Got: “Li qiraxa çem ez jê veqetiyame û sibe ew jî dê bigihêje vir, bi izna Xwedê.” Rabû Zaher Şah ferman da ku hinek wezîr û zilam û xizmetkar û çîgir û rayedarên wî herin wezîrê Qral Suleyman pêşwazî bikin, lewre hukmê wî pir fire bû.

Vêca em vegerin ser wezîrê Suleyman Şah, ew jî hetanî nivê şevê li qiraxa wî çemî ma, piştire rabû ser xwe rêwîtiya xwe berdeyam kir ber bi bajêr ve. Gava roj derket û lê bû sibe, çol û beyar xwiya kirin, dît ku wezîrê Zaher Şah û çîgir û mîr û mezinên dewletê tên wî pêşwazî bikin. Li nêzikî bajêr gihan hev û silav dan hev.

Piştire bi hev re meşa xwe berdeyam kirin, hetanî ku derbasî bajêr bûn û hatin ber qesra Qral Zaher Şah. Di deriyê hefta re derbasî hundur bûn, lewre bi siwarî di wir re kes derbas nabe, ji ber ku wir nêzikî qral e. Wezîr li wir peya bû ji hespa xwe û meşiya hetanî gîha holeke bilind ku di sînga wê de textekî ji mermer hebû, bi durr û gewher hatibû neqîşandin û çar nigên wî hebûn ji diranên fil û li ser textê raxistî jî etleseki kesk ê bi zêr neqîşandî hebû û li ser jî balîfin neqîşandi bi durr û gewher. Qral Zaher Şah jî li ser wî textî rûniştibû û rayedarên dewleta wî jî, li ser nigan sekinibûn, li raserî wî.

Gava wezîrê Suleyman Şah derbasî cem bû, li himberî wî sekinî û bi zimanekî fesîh û bi şeweya wezîran axivî, zimanê xwe serbest berda û got:

Bi dilsozî hatim û min bejin li ber wî tewand  
Bi dilnazî çawa ku ez xunavê hildim ji erdê  
Hêvîdarim ku mazûban loman li min nekin  
Li gel dûrbûna rê qet ez venegeriyam ji meşê  
Lew ku dilê min lawaz bû di bin bar de  
Lew ku seyîs di xizmetê de bi qusûr bû  
Ji ber ku berê min li qralêkî wisa bû ku min  
Temenek sax xerc bikira jî bes bû dîtineke wî.

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî gotina xwe birrî, bêdeng bû.*

ŞEVA SED Û YANZDEHEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehriyar re berdeyam kir û got:*

Vêca Şahînsahê min ê bextewar! Piştî ku wezîrê Suleyman Şah xwendina helbesta xwe qedand, Qral Zaher Şah bi germahî pêşwaziya wî kir û ew li kêleka xwe da rûniştandin, pê re bişirî û bi gotinin şêrîn ew şanaz kir û dilê wî xweş kir. Sohbeta xwe bi wî hawî berdeyam kirin hetanî sibehê. Piştire taştê anîn wê hêwanê û hemûçikan xwar, hetanî ku têr xwarin. Dûra sifre rakirin û her kes rabû ser xwe çû, tenê kesên nêzikî qral li wir man.

Gava wezîr dît ku diwan vala bûye û rewş musaîd e ji bo axaftinê, rabû ser xwe, pesnê qral da û bejna xwe li ber wî tewand, erda ber nigê wî maçî kir. Piştê got: “Ey qralê gewre û mîrzayê dijwar! Ez bi mebestekê hatime cem te, ku xêr û xweşiya te tê de heyê. Ez weke qasidê Suleyman Şah; qralê adil û ewle, xwediyê qencî û ciwamêriyê, qralê erdê kesk û çiyayê Esfehan, hatime ku keça te ya esîl jê re bixwazim. Ew dixwaze mervantiyê bi te re bike û vaye gelek entîke û diyariyên giranbiha ji te re şandine. Gelo tu ji mervantiya wî dixwazî?”

Piştê bêdeng bû û ma li bendî bersiva wî. Gava ku Zaher Şah ew gotin bihîstin, rabû ser nigan û erd maçî kir bi rêzdarî. Her kesê li wir şaşwaz bû ji ber wê sertewandina qral li himberî qasid, lewre aqilê wan tiştêkî wisa nedigirt. Dûra qral pesnê Xweda da û axaftina xwe li ser nigan berdewam kir, got: “Ey wezîrê hêja û mîrzayê comerd! Guhdar bike bê ez ê çî bibêjim. Em pêgirtiyên Suleyman Şah in û em şanaz in bi mervantiya wî û esaleta wî. Keça min jî, incex carîyeke ji carîyeyên wî û tenê daxwaza min ew e ku li min ewle be.”

Piştê gazî şahid û qazîyan kir û şahdebûna xwe dan ku Suleyman Şah wezîrê xwe kiriye wekilê xwe ji bo zewacê, Zahir Şah jî bû wekilê keça xwe û bi kêf û xweşî mehra keça xwe li Suleyman Şah birî di huzûra şahidan de.

Wê gavê wezîr jî rabû ser xwe û çû ew diyarî û hediyan qralê xwe anîn û ew pêşkêşî Zaher Şah kirin. Zaher Şah jî, dirahoma keça xwe amade kir û qedrê wezîr girt û welîme li dar xistin, xwarin belav kirin û hemû feqîr û maldar ezimandin ser xwarinê. Û kêf û şahî li dar xistin hetanî du mehan. Hemû cûreyên şahî û dilxweşiyê pêk anîn. Piştî ku cihazê bûkê tamam kirin, Şah ferman da ku kon werin vegirtin li pêşiya bajêr. Piştê cawo xistin sindoqan de, carîyeyên Romî amade kirin û xatûnên Tirkan jî bi wan re peywirdar kirin. Ji bûke re jî gelek gewher û zêr û zîv, li gel taceke ji zêrê sor ê ku bi durran hatibû xemilandin amade kirin û ji bo meşê jî deh qantir ji wê tenê re veqetandin. Ew xistin hodecek bê timtêl û li deveyekê siwar kirin ku êdî mîna hûriyekê xwiya dikir.

Piştê zexîre, mûne, mal û diyariyên xwe li deve û qantiran bar kirin û ketin rê de. Zaher Şah jî bi qasî sê fersexan bi wan re rêwîti kir, piştê keça xwe bi rê kir û xatir ji wezîr û mayîyeta wî xwest û bi şûn de vegehiya welatê xwe, bi dilxweşî û ewlekari. Wezîrê Suleyman Şah jî keça Zaher Şah bir, ket rê de û çol û beyar qut kirin....

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

## ŞEVA SED Û YANZDEHEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Wezîr keça Zaher Şah bi xwe re bir û çû. Bi şev û roj meşiya, çol û daristan derbas kirin, hetanî ku sê roj meş di navbera wî û bajêrê wî de ma. Ji wê derê, qasidek li pêşiya xwe şand, ji bo ku bi lez here û Suleyman Şah agahdar bike ji hatina xwe û bûkê. Qasid jî bi lez çû û xeber da Şah ku bûk bi rê de tê. Şah Suleyman pir kêfxweş bû, qasid xelat kir û ferman da leşkerên xwe ku bi karwanekî mezin derkevin pêşiya bûkê ji bo ku wê pêşwazî bikin bi heybetî û alan bilind bikin di ser serên xwe re û coşdariyekê pêşkêş bikin.

Ji bo pêkanîna fermana Şah, bangekarekî li nav bajêr gazî kir ji bo ku hemû xort û keç û pir û kal derkevin pêşwaziya bûkê û xizmetkariya wê dema ku wê bînin qesrê. Rayedarên dewletê jî biryar dan ku rê û qadan bixemilînin û hemû li kêlekên rê bisekinin hetanî ku bûk di wan re derbas bibe, li gel xizmetkar û cariyeyên xwe û bi wan diyariyên kû bavê wê pê re şandine.

Gava ku bûk hat, leşker jî li çep û rastê kerwanê wê meşiyar li gel kerwanê xêliyan pê re hatin, hetanî ku gihan nêzikî qesrê. Hetanî wir, kes nema ku derneket derve ji bo lê temaşe bike. Dengê daholan bilind bû, qîrîn bi nay û bilûran ket, al bilind bû û bêhnên xweş bi ser bajêr de ketin, siwar ketin pêşbazîyê bi hev re û rimên wan lewlihîn li hewan û wisa hatin hetanî ku gihan qesrê. Xulaman rahiştin hodeca bûkê û ber bi deriyê qesrê ve çûn. Der û dor bi şewqa wê ronî bû û zîneta wê şewq da derdorê.

Gava şev ket erdê, xizmetkaran deriyê qesrê vekirin, ketin herdu hêlên derî û li wir rêz bûn. Piştî bûk hat di nava cariyeyan de ku mîna heyva di nava stêrkan de bû an jî mîna durreya tekane di nav rêzeke lûlû de. Piştî derbasî odeya xwe bû ku nivîna wê li ser textekî mermer ê bi cewheran xemilandî raxistî bû rûnişt. Li wê derê Suleyman Şah derbasî cem wê bû û çawa ku çavên wî lê ketin jê hez kir û evîna wê ket dilê wî. Piştî pê re raket û ji qelaqa dilê xwe xelas bû, aram bû. Mehekê sax pê re ma di wê odayê de, hetanî ku ber girt û avis bû.

Piştî mehekê ji cem bûkê derket û dîsa hat ser textê qraliyetê rûnişt ji bo ku kar û barê gelê xwe bi dadwerî bide meşandin, hetanî ku her neh mehên hemlê wê biqedin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî û bêdeng bû.*

## ŞEVA SED Û DUWAZDEHEMÎN

*Şehrezadê axaftina xwe berdewam kir û got:*

Vêca wisa tê gotin ku, Suleyman Şah li ser textê memleketê xwe rûnişt hetanî ku neh mehên hemla jina wî tamam bûn. Di dawiya meha nehan de, qolincên zayînê hatênê bi şeveqa sibehekê re. Piştî ku li kursîya zayînê rûnişt, Xwedê hêsanî jê re çêkir û kurikekî rûgeşî delal dayê. Gava Şah çêbûna kurê xwe bihîst, pir kêfxweş bû û xelateke mezin da mizgînîdanê xwe û bi dilxweşî çû cem pitik û ew maçî kir ji nav çavên wî; li sipehîbûna wî behetî ma û gotina helbestkarekî ket bîra wî ku digot:

Xwedê şopên bilindbûnê nîşanî wî bide  
Şêr e ew her stêrka mîrîtiyê nîşan dide  
Ji ber heybeta wî li ber xwe dikeve herkes  
Ji dost û cîranan, leşker û hem ji heres  
Li ber sîngan negirin wî bila her siwar be  
Li ser piştê hespan, li dest jî hefsar be  
Zû ji şîr bigirin vî çêlikê pilingan  
Xwina dujminan şîr e ji bo wî her an

Piştê, pîrikan kurik birin navika wî birîn û çavên wî kil kirin, dûvre navê wî kirin “Tac el-Milûk<sup>18</sup>, XARAN”û bi delalî mezin bû û hate xwedîkirin bi şanazî.

Roj û şev, meh û sal derbas bûn, hetanî ku temenê kurik bu heft sal. Wê gavê Suleyman Şah, gazî zana û hekîman kir û ferman da wan ji bo ku kurê wî fêrî rastnivîs, wêjê, sinckarî û zanîne bikin. Ew jî du salan pê ve mijûl bûn hetanî ku têra xwe fêr bû. Piştê jê re olzan, mamoste û fêrkarê siwarbûna hespê anîn. Wan jî ew fêrî wan tiştan kirin, hetanî ku temenê wî bû çarde sal.

Wê çaxê, dema derdiket derve, kê ew bidîta hişê xwe wenda dikir ji ber spehîbûna wî...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birrî.*

## ŞEVA SED Û SÊZDEHEMÎN

*Şehrezadê ji Şehriyar re got:*

Vêca Şahînşahê min ê bextewar! Gava kurê Suleyman Şah, Xaran ê

---

18 . Tac el-Milûk di Kurmancî de tê maneya Taca Milûkan. Loma em ê Taca Milûkan bikar binin.

Taca Milûkan mezin bû û ji hemû hemtemenê xwe bêhtir fêrî siwarbûna hespan û pêlewaniyê bû, bejna wî jî kamil û lihevhatî bû ku êdî çi gava ji malê derdiket, çavên kê lê biketana, ew diecibandin. Heta giha astekê ku helbest li ser wî dinivisandin û gelek keçên azad bi evîna wî xwe dihetikandin, çawa ku helbestkar gotiye:

Çawa min ew himbêz kir ez mest ketim  
Ji bêhna gulan ji şaxê dilan serxweş ketim  
Ne serxweşê meyê bûm ez serxweşê dîtinekê  
Sipehîbûnê razek dabû wî ku êdî razber bû ew  
Dîl digirt wî dilên ciwan yeko yeko  
Bi navê Xwedê ez wî ji bîr nakim tu car  
Heta sax bim ez li vê dinyê dê ew be ar  
Heger jîn be bila evîna wî be para min  
Heger mirin be jî bila bo xatirê wî be  
Û çawa ku helbestkarekî din jî gotiye:  
Xweşikbûn ji Yûsiv re bibû nişanek  
Ku herkes jê ditirsiya dema didît  
Were bi min re da ku tu jî wî bibînî  
Û ew ala reşxîlafetê li ser rû bibînî

Vêca gava temenê wî bû hijdeh sal û zilamtiya wî kamil bû, spehîbûna wî hîn geştir bû û bejn û bala wî hîn bêhtir li hev hatin. Dost û hevalê Taca Milûkan Xaran çêbûn û êdî kî nêzikî wî bû, xwest ku ew bibe sultan û qral piştî wefata bavê wî û ew bibe emîr li gel wî. Piştê bi seyd û nêçîrê ve hate girêdan û nema seetekê tenê jî dûrî wê ket. Bavê wî Suleyman Şah jî li ser ditirsiya ji ajal û dirindeyên çolê û hewl dida ku wî dûr bixe ji nêçîrê. Lê belê wî guh nedida wan hişiyariyên bavê xwe. Rojekê Taca Milûkan ji xizmetkarê xwe re got: “Têra deh rojan êm bi xwe re hazir bikin.” Wan jî bi ya wî kirin û ewqase êm bi xwe re rakirin. Vêca gava bi dostên xwe re derket nêçîrê, bi hêla berrîyê ve çûn. Çar rojan meşiyên hetanî ku gîhan çayir û daristaneke xweş ku ajalin erjeng û şîndarin fêkî û kanîyên aveke xweş tê de hebûn. Taca Milûkan ji dostên xwe re got: “Xefîkan li vir vedin û giroverka wan fireh bikin. Civanê me jî dê li serê çemberê be, li wê xala hanê.” Wan jî bi ya wî kir, xefîkên xwe vedan û çembera xwe fireh girtin ku gelek teşeyên dirinde û xezalan tê de kom bûn, hetanî ku ajalên dirinde ji hev aciz bûn û pev ketin di rûyên hespan de. Kujerên dirindeyan kuştin û ber bi dawîya çemberê ve çûn. Gelek jî wan ajalan girtin û hinek ji wan jî reviyân.

Piştê Taca Milûkan daket ser avê û nêçîr par kir. Ajalên herî baş ji bavê xwe Suleyman Şah re veqetandin û ji wî re şandin. Hinek jî li ser rayedarên dewletê belav kirin û wê şevê li wir ma.

Sibehê, kerwanekî mezin bi ser wan de hat ku tijî xulam û kole û cariyê û tacir bûn. Ew kerwan jî hatin ser wê avê û li nava wê şinkahîyê peya bûn. Gava Taca Milûkan ew dîtî, ji dostekî xwe re got: “Ka here agahîyekê ji van bîne bê gelo çima li vî cihî peya bûne?” Qasid çû ji wan re got: “Zû bersivê bidin bê ka hûn kî ne?” Gotin: “Em tacirin û ji bo bêhnvedanê em li vir sekinîne. Rêya me dûr e û ji ber ku em li Sultan Suleyman Şah û kurê wî ewle dibin, em li vir sekinîne. Lewre em baş dizanin ku kî li erdê wî bisekine, dê di nava ewlehî û aramîyê de be. Cawin baş bi me re hene, me ew jî ji bo kurê wî anîne.”

Qasid li Taca Milûkan vegeriya û rastiya mijarê jê re vegot. Wî jî got: “Heger tiştin ji bo min bi xwe re anîbin, ez jî ji vir naçim hetanî ku nebînim.” Piştê li hespê xwe siwar bû û meşiya. Dost û hevkarên wî jî pê re meşiyar hetanî ku gîhan cem kerwên. Tacir jî ji ber wî rabûn, ew vexwendin ba xwe û jê re dua kirin bo serkeftin û qencî û berdewamiya şanazî û bextewariya wî. Piştê, jê re çadirek ji etlesê sor ê rêsayî bi durr û gewheran û jê re textekî sultanî raxistin bi hevrêşim û zumrud. Ew jî li ser rûnişt û xulamên wî jî li ber destên wî sekinîn. Dûra ferman da taciran ku hemû malên xwe bînin wir.

Çi bi taciran re hebû, anîn wir. Wî jî çî tiştê ku jê re dibû rahiştê û heqê wan da. Piştê dîsa li hespê xwe siwar bû û xwest ku biçê. Lê wê kêlikê, ciwanekî ji nav kerwanê taciran bala wî kişand û sekinî. Ciwanekî spehî û kincpaqij bû, derba maqûlan pê diket. Rûheyvî û enîgul bû; lê belê zerbûnek pê ketibû ji derdê hîcrana hezkiriyên wî ku spehîbûna rûyê wî hemû guhertibû...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina çîroka xwe birrî û bêdeng bû.*

HEZAR Ū YEK ŐEV

CILD IV





ŞEVA SED Û ÇARDEHEMÎN

**(Çîroka Taca Milûkan û Ezîzê Ciwan )**

*Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir û ji Şehriyar re got:*

Şahînşahê min ê bextewar! Tê gotin ku dema Taca Milûkan li kerwanê ticaretê nêrî, xortekî hêja û lihevhatî dît ku dirûvên maqûlan pê diketin. Lê belê rûyê wî zer bibû û elametên janeke firaqê li ser xwiya dikirin ku bala mirov dikişand! Êş û janeke watedar ji mijankên wî dihatin xwarê gava ku di ber xwe de bi dengêkî hêdî digot:

Fûraq dirêj bû û derdên min berdewam in  
Hêsir û êş jî di çavên min de kom in  
Ji wê rojê ve hinav tune êdî bédil im  
Tenê mame ez bêhêvî û bê mil im

Piştî ku xortê ciwan ew helbesta xwe xwend, bi qasî seetekê di ber xwe de giriya, hetanî ku ji ser hişê xwe çû. Vêca gava Taca Milûkan çav li wî halê wî ket û di wê rewşê de dît, berê xwe da wî û ber bi wî ve çû. Îcar gava ciwan bi ser hişê xwe ve hat û dît ku Taca Milûkan di ser serê wî re sekiniye, rabû ser xwe û erda ber nigê wî maçî kir. Taca Milûkan jê re got: “Çima tu naxwazî malên ticareta xwe nîşanî me bide?” Xortê ciwan got: “Mîrzayê min, tu tişteki ku li gora te be di nava malên min de nîne, loma min nexwest ku ez nîşanî we bidim.” Taca Milûkan got: “Bêgûman divê tu malê xwe nîşanî min bide û tu çîroka xwe ji min re bibêje. Lewre vaye ez dibînim ku tu çavşil û dil bi kovani. Vêca heger zulmek li te bûbe, em ê wê zulmê ji ser te rakin û heger deynek li te hebe em ê deynê te bidin, lewre dilê min pir bi ser te ve ye, ji kêlika ku ez çav li te ketime.”

Piştî vê pirsê Taca Milûkan ferman da xizmetkaran ji bo ku kursiyekê jê re binin. Xizmetkar çûn jê re kursiyekî ji ebenos anîn ku bi zêr û zîv neqîşandî bû. Tejikek ji hevrêşim jî li ber raxistin ji bo ku ciwan li ser rûnê. Piştî ku Taca Milûkan li ser kursiya xwe rûnişt û ciwan jî li ser tejikê da rûniştandin, jê re got: “De ka îcar malên xwe yên ticaretê nîşanî min bide.” Xortê Ciwan dîsa got: “Ezbenî malên min ne li gorî te ye.” Taca Milûkan jê re got: “Ne gengaz e ku tu şanî min nekî!” Pêre jî ferman da xulamên xwe ku malên wî bi zorê ji dest bigirin û nîşanî wî bidin. Li himberî wê rewşê, xortê ciwan dîsa hêsir barandin, gazin û nalîn pê ketin û di ber xwe de got:

Li gel wê kujeriya kilê çavên te  
Li gel hemû sipehîbûna bejn û bala te  
Li gel sermestkariya wan meylêvên te

Û hemû hest û dilovaniya dilê te  
Tu her dem ewlegeh û hêviya min î  
Li himberî hemû tirs û xofên demê

Piştî xortê ciwan boxçikên xwe li ber Taca Milûkan vekirin û malên xwe li ber wî raxistin yek bi yek, kinçekî etles ê ku bi zêr xemilandîbû û buhayan wî hezar dînar derbas dikir, ji nav wan derxist da ku li ber mîrza raxîne. Lê çawa ku wî kinc ji hevdû vekir, potikek ji nava wî hat xwarê. Bi lez destê xwe avêt potik û ew di bin çoga xwe de veşart. Lê belê çavên mîrza lê ketin û jê re got: “Ka wêna nîşanî min bide!” Xortê ciwan got: “Mîrzayê min, jixwe ji ber vê min nedixwest ez barê xwe nîşanî te bidim!” Taca Milûkan jê re got: “Ew çi potik e? Ka wêna nîşanî min bide!”

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA SED Û PAZDEHEMÎN

*Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir û got:*

Vêca gava xortê ciwan got “Tu pêwîstiya te bi vê potikê nîne.” û nexwest ku wê potikê nîşanî wî bide, Taca Milûkan jê re got: “Çi dibe bila bibe, divê ez wê potikê bibînim.” Ji bêmecalî destê xwe avêt potikê, ew ji bin çoga xwe derxist û pê re jî giriya, dest bi gazin û lavan kir û di ber xwe de got:

Loman lê meke lome wî disotînin  
Tu rast dibêjî lê belê xelk nabihîzin  
Min xatir xwest û ez bi çolê ketim  
Lê li pêy min heyvek ma ew her hiltê  
Min dixwest ku jiyan jî xatir bixwaze  
Ji min, lê mixabin destê min jê nabe  
Çiqasî bi min şewitî dilê wê roja firaqê!  
Û çiqasî min hêsir barandin wê rojê!  
Derew li ba min nîne Xwedan jî dizane pê  
Ne xew li min dibe ne jî hedana min tê  
Felek me li hev bîne jî bêşensî her vediqetîne  
Çi gava ku ez qurtekê li qedeha kulan dixim  
Zeman her wê ji nû ve dadigire

Taca Milûkan ji xort re got: “Ez bala xwe didim te ku rewşa te pir aloz û tevlihev e! Ka bêje ji min re bê sebeba girî û fixana te çiyê û çima tu dîsa dest bi girî dikî çi gava ku tu li vê potikê dimeyîzî?” Xorto keserek veda û got: “Ezbenî çiroka min a bi vê potikê ve ecêb e û rewşa min jî erjeng e, bi xwedîya vê potikê û van peyker û nexşeyên di nav de.”

Bi wê axaftina xwe re, potik jî ji hev vekir û tiştên di nav de li ber Taca

Milûkan raxist ku nexşeyê xezalekê tê de hebû. Nexşe bi zîv neqîşandibû û toqek ji zêrê sor û sê dirêjkên zebercedî di qirikê de bûn.

Gava Taca Milûkan ew huner û zanebûn di wî xortî de dîtîn, di dilê xwe de got: “Subhan ji wî Yezdanê dilovan re ku mirov hînî tiştên ewqasî erjeng kiriye!” Piştî li wî zîvirî û jê re got: “Kanî çîroka xwe û xwedîya vê xezalê ji min re bibêje!”

Xortê ciwan got:

Mirzayê min ê hêja! Bavê min tacirekî mezin bû, lê Xwedê zarok nedabûne wî ji min pê ve. Keçeke apê min ji hebû ku bi min re mezin bibû, di nav mala me de, ji ber ku bavê wê çûbû ser dilovaniya Xwedê. Vêca beriya ku biçê ser dilovaniya xwe, wî û bavê min li hev kiribûn ji bo ku me bi hev re bizewicînin. Gava ez mezin bûm û gihiştim û ew jî kamil bû, bû jineke bedew, ez û wê ji hevdû veneqetandin û em bi hev re man. Piştî bavê min bi diya min re axivî û jê re got: “Em ê îsal Ezîz û Ezîze bi hev re bizewicînin.” Piştî wî û diya min li hev kirin, bavê min dest bi amedekariya xwarin û welîmeyan kir. Ez û dotmama xwe Ezîze jî, em hîna bi hev re radiketîn di nava heman nivînê de û me nizanîbû çî çawa ye. Lê belê ew ji min zana û jêhatîtir bû.

Gava bavê min amedekariyên dawetê hemû kirin û mehrkirin tenê ma, got: “Em ê mehrkirinê di roja îne de, piştî nimêjê bikin.” Piştî çû cem dost û nasên xwe ji tacir û maqûlan, diya min jî çû cem jinên nas û mirovan ji bo ku wan vexwendî dawetê bike.

Gava ku înan hat, eywana mezin şuştin û mermerên wê paqij kirin, ji bo mêvanan û hundurê malê giş raxistin, hemû pêdivî tedarik kirin û cawê biroqankî bi dîwaran ve berdand û yê mayîn jî boyax kirin. Vexwendeyên me jî di pey nimêja îne re hêdî hêdî hatin û li mala me kom bûn. Bavê min jî teyîk û sênîkên şekirok û şêrinahiyê amade kirin. Êdî tenê mehrbirîna me mabû. Diya min jî di wê navberê de ez şandim hemamê û bedlikî kincên nû li pey min şand ku kincin pir giranbuha bûn. Ez jî çawa ji hemamê derketim, min ew bedlê nû li xwe kir û ez ketim ser rêya vegeerê. Kincên min misk pê de hatibû dakirin û bîhnek ji wan difûriya ku sikak li ber xwe dibir. Min xwest ku ez herim mizgeftê, piştî hevlekî min hate bîra min û min xwest ez herim pey wî da ku ew jî were daweta min û min di dilê xwe de ji xwe re got “Hetanî wî çaxî jî dê dema nimêjê bê.” Piştî ez ketim sikakekê ku cara yekê bû ez tê re diçûm. Xwedanê jî di her derê min re davêt, ji ber germa hemamê, ya ku hîna li ser min bû û ew kincên nû. Bêhna xwedana min û miska kincên min tevlihev dibû û bi awayekî ecêb ji min difûriya. Li serê sikakê ez rawestiyam ji bo ku ez bêhna xwe berdim û min destmalka

xwe ya neqîşkirî avêt ser qurmekî daran ji bo ku ez li ser rûnim. Lê piştî ku ez li wir rûniştim, dinya germtir bû û xwêdana ku di eniya min re davêt bi ser çavên min de hat xwarê. Ji ber ku min destmalka xwe di bin xwe de raxistibû, tiştêkî ku ez xwêdana xwe pê paqij bikim ji di destê min de tunebû. Herî dawî min nêt kir ku ez xwêdana xwe bi guhkê kirasê xwe paqij bikim. Lê belê hîna ku min destê xwe neavêtibû guhkê kirasê xwe, min dît ku ji jor ve destmalkeke spî bi ser min de hat xwarê ku ji sura bayê sibehê teniktir û ji lêvên hingivîn nermtir bû. Wê gavê, çavên min li çavên xwediya vê neqşexezalê ketin û awirên me yên tazî li hev qelibîn.

*Li Şhrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û ŞAZDEHEMÎN

*Şhrezadê berdewam kir û got:*

Vêca Şahînsahê min î bextewar, xortê ciwan ji Taca Milûkan re got:

Çawa ku min serê xwe ber bi berjor ve rakir ji bo ku xwediya destmalkê bibînim, awirên min li awirên xwediya vê nexşexezalê ketin ku di şibakeyêke paxirî re li min dinêrî, keçeke wisa spehî bû ku zimanê min nikare wesfê wê bide! Dema dît ku ez li wê dimeyzinim, tiliya xwe xist devê xwe de, piştê jî tiliya xwe derxist, herdu tiliyên xwe bi hev re kirin yek û di rasta herdu memikan de danî ser sînga xwe, piştê serê xwe bi şûn ve kişand, deriyê pencereyê girt û çû. Wê gavê agirek bi nava min ket ku ez helandim, bi wê awira xwe. Ji aliyekî din ve jî ez heyyirî mam û min nizanîbû ez ê çi bikim, çawa bikim! Lewre ne min jê fêm kiribû bê çi gotiye, ne jî min wateyek da wê îşareta wê. Careke din min serê xwe berjor ve rakir û li şibakê nêrî, lê şibake girtî bû û kes nexuyabû. Hetanî ku ro çû ava jî ez li wir mam, bi hêviya ku ez careke din wê bibînim. Lê êvar jî hat û min careke din ew nedît û ne jî pêjna kesî kir li wir.

Piştî ku min hêviya xwe ji dîtina wê birrî, ez rabûm ser xwe min ew destmalka wê jî bi xwe re bir û bi rê de vekir, lê nêrî. Bêhneke misk û rihanan jê dihat ku ez sermest kirim, mîna ku ez di buhuştê de bim. Vêca gava min destmal vekir, kaxezeke nazenîn ji nav wê ket erdê. Min xwe daqûl kir, ew ji erdê rakir, lê nêrî. Min bala xwe dayê ku bêhna miskê jê tê û ev çend riste li ser nivîsandî ne:

Bi nivîseke şewtenik min jê re nivîsî  
Giliyê xwe min kir gazinên xwe ji wî  
Ji ber vê êşa dil û elema bêbinî  
Dosto jî dixwend û digot ev çi nivîse  
Çima wisa zirav û ewqasî tenik e

Min jî got ew ji ber ziraviya min e  
Ji xwe nivîsên dildaran timî wisa ne

Piştî xwendina wan beytan bi çavekî kirîne min careke din li kaxetê meyzand, min dît ku di koşeyekê de ev beyt nivîsandine:

Nivîskara van hestan keçeke ezêb e  
Hinarûyekî wê rihan e yê din gul e  
Her ku dertê heyv ji ber wan çiqas bêkermal e  
Çiqasî bişerm e ji ber van çiqasî bêmecal e

Li goşeya dîtirkê jî ev çend beyt nivîsandibûn:

Keç ezêb bi emberê dinîvîsinin li ser kaxezan  
Çawa ku rêz dikin razan li ser xuncesêvan  
Çi gava ku mijang radibin ji ser hev  
Herdu çavên kujer li zengil didin li gel hev  
Şekir li ser hinarkan e ne li ser destan e

Vêca gava min ew helbestên ser kaxezê xwendin, agirê nava min hîn gurtir bû, rivînên wî agirî laşê min giş dagir kirin, hest û ramanên min jî tevde zîvirandin bêrikirineke bêsinor. Min rahişt destmalkê û kaxezê û min ew birin malê, bêyî ku ez bizanibim ez ê çawa xwe bigihînim wê, angû ez ê şiroveyeke çawa ji eşq û sipehîbûnê re pêş de bixim!

Gava ez gîham malê, dinya bibû şev. Dema ez derbasî hundur bûm, min dît ku dotmama min rûniştiye, digirî. Nuh çav li min ket hêsirên xwe paqij kirin û ber bi min ve hat, kincên min ji ber min xistin û ji min re got ku hemû mîr û wezîr û tacir û gizîr li mala me kom bûne, qadî û şahid jî amade bûne, xwarina xwe xwarine û giş li hêviya min mane ji bo ku mehrê bibirin, lê belê piştî ku hêviya xwe ji hatina min qut kirine, hemû rabûne ser xwe û çûne malen xwe. Piştî ji min re got: “Bavê te jî pir hêrs bûye û sûnd xwariye ku êdî ew nema mehra me dê bibire hetanî sala bê, ji ber ku malekî pir li ser vê dawetê kiriye.” Herî dawî jî, bi lomekarî ji min pirsî û got: “Çi bi te hat ku tu îro ewqasî dereng ket û ewqase pirsgirêk derketin ji ber wê derengketina te?” Rabû min ta bi derziyê vekir û tiştên ku bi serê min hatibûn yeko yeko jê re vegotin. Helbet min destmalkê û kaxezê jî nîşanî wê da û min helbestên ku li ser nivîsandî bûn jê re xwendin. Wê gavê hêsir ji çavan hatin xwarê bi ser rûçikên wê ve û ev herdu rist bi deng xwendin û got:

Kî bibêje eşq û evîn bi destê mirov e  
Bawer meke tu lewre ev bi xwe derew e

Piştî ji min re got: “Û wê keçikê çî ji te re got û çî rê nîşanî te da?” Min jê re got: “Tiştêk ji min re negot, lê belê wê tiliya xwe xist devê xwe de, piştî derxist û tiliya xwe ya navê jî pêre kir yek û herdu tiliyên xwe danîn

ser sînga xwe, erd nîşanî min da û piştîre serê xwe bi şûn de kişand û deriyê şibakê li pey xwe girt. Ew çû û dilê min jî bi xwe re bir. Piştîre jî min ew qet nedît. Ez li bende wê mam bi hêviya ku careke din di şibakê re binêre, lê nenêrî. Piştî ku min hêviya xwe jê birî, ez jî ji wir rabûm û hatim, lewre şev ketibû erdê. Tiştê ku bi serê min hatiye ev e û ez ji te dixwazim ku tu alîkariya min bikî û tu min ji vê tengasiyê xelas bikî.” Wê jî berê xwe da min û got: “Pismamo, weleh tu ronîya çavên min bixwazî jî ez ê çavên xwe derxînim û wan bidime te. Bila tu gûman bi te re çênebin, misoger ez ê alîkariya te bikim û we herduyan jî bigihînim miradê we. Lewre xwiya dike ku tu aşiqî wê û ew jî aşiqî te bûye.”

Rabû min jê re got: “Û te çi fêhm kir ji vê helwestê?” Wê got: “Ma ne te got, wê tiliya xwe xist devê xwe de, ev jî tê wê wateyê ku ji te re gotiye tu mîna ruhê min nêzikî bedena min î. Ji xwe çawa ku te gez bike tiliya xwe gez kiriye. Destmalka ku daye te jî, tê wateya silavdayîna dildaran. Jixwe ew helbestên ku li ser kaxezê nivîsandine baş diyar dike bê çiqasî bi te ve hatiye girêdan. Wateya wan herdu tiliyên ku danîne ser sînga xwe jî ew e ku, ji te re dibêje du rojên din bi şûn de dîsa were vir ji bo ku ez hesreta xwe bişkînim bi dîtina te. Vêca di encamê de pismamcan, ez dixwazim ji te re bibêjim ku ev keçîk dil ketiye te û pir bi te bawer e. Tiştê ku min ji helwesta wê fêhm kiriye ev e! Heger ez bikaribûma derketama derve bêguman, di demeke pir kurt de, min ê hûn bigihandana hev û min ê hûn di bin dawa xwe de veşartana.”

Gava min ew gotin ji devê dotmama xwe bihîstin, ez pir bextewar bûm, min spasiyên xwe jê re anîn ziman û di nava xwe de ji xwe re got “Ez ê bikaribim du rojan xwe ragirim.” Min serê xwe danî ser çoga dotmama xwe û ez du rojan di mal de mam, bêyî ku ez bixwim û vexwim an jî xwe tevbidim. Wê jî bênavber li ber dilê min diçû û dihat û digot: “Hêza xwe bi ser hev de kom bike, xweragir be, wêrek û bêhnfireh be.”

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û HIFDEHEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe dîsa berdewam kir û ji Şehriyar re got:*

Şahînsahê min ê bextewar, wî xortê ciwan vegotina serpêhatiya xwe ji Taca Milûkan re berdewam kir û got:

Piştî ku du rojên min li malê qediyam, dotmama min ji min re got: “De êdî rabe ser xwe, kincên xwe li xwe bike, baweriya xwe nû bike û here civanê wê!”

Piştire ew bi xwe rabû ser xwe, kincên min anîn, ew li min kirin û bixûr bi ser min dakir. Min jî dilê xwe xurttir kir, baweriya xwe nû kir û ez di derî re derketim. Ez meşiyam û ez çûm hetanî ku ez gîham sikaka wan. Li wê derê, ez çûm dîsa li ser wî qurmikî rûniştim. Piştî seetekê şibakeya wê vebû. Çawa ku min lê nêrî û çavên min pê ketin, ez ji ser hişê xwe çûm û bêruh li erdê ketim. Gava ez bi ser xwe ve hatim, min dilê xwe xwirt kir û careke din lê nêrî, lê dîsa hişê min ji serê min çû û ez li erdê dirêj bûm. Piştire careke din bi ser xwe ve hatim û min dîsa lê nihêrî, vê carê min dît ku destmaleke sor û eynikek pêre ye. Çawa ku wê ez dîtîm, zend û bendên xwe hildan, her pênc tiliyên xwe ji hev vekirin û kefa destê xwe li sînga xwe da. Piştire herdu destên xwe rakirin û av nîşanî min da di şibakê re. Dûvre rahişt destmala sor û di avê dakir. Îca destmal ji nav avê derxist û ew di şibakê re derxist, sê caran bi ser sikakê de dawêşand. Piştire ew guvaşt, ew pêça, serê xwe hejand û xwe bi şûn de kişand, şibake jî li pey xwe girt û çû. Gotinek tenê jî ji min re negot! Ez di nava şaşwazî û behetîmayîne de hiştîm û çû bêyî ku ez tişteki ji wan îşaretên wê fêm bikim. Ez li wir mam hetanî ku tarî kete erdê. Ez dîsa bi şûn de vegeyiyam malê, nivê şevê ez gîham malê, min dît ku dotmama min destên xwe dane ber rûyê xwe û van ristan dibêje, li gel hêsirên dibarîne:

Ey şewqa ku dil ji min vedizî û çû!  
 Rê nîne ji vê eşqa nûhatî û xwerû  
 Awirin kujerin ku hinavan disojin  
 Barekî evînê dane ser milên min  
 Giranbarekî ku ez di bin de ranabim  
 Û ez jî ne xwedî sebr ne jî hedan im  
 Ji ber gunehbarkirinê hêsir li min bûne xwîn  
 Bênavber diherikin ji nav mijankên xemgîn  
 Xwezîka dilê min mîna yê te bûya  
 Laşê min jî zirav e ew mîna dara biya  
 Mîrzayê min, awirin te wisa hene ku  
 Zordar in li ser min ew zalim in her ku  
 Bi navê Xwedê derewkar in hemû kesên  
 Ku dibêjin hemû spehîbûn di Yûsiv de ye!  
 Rast ew e ku çend Yûsiv li ser hev  
 Nabin yekî mîna te mîrzayê min!

Gava min ew helbesta wê guhdar kir, kul û xemên min duqat bûn, dilê min xemgîntir bû, li kêleka xanî ez li erdê ketim û ji ser xwe çûm. Ew jî bi min ve rabû, rahişt min, ez li qûn dame rûniştandin, ber min vekir, rûyê min bi zendika xwe paqij kir û piştire ji min pîrsî bê ka çi bi serê min hatiye? Rabû min hemû tiştên ku bi serê min de hatibûn jêre gotin. Wê gavê berê xwe da min, li nav çavên min nêrî û ji min re got: “Binêr pismamo!

Îşareta kefa destê wê û her pênc tilliyan, tê wê wateyê ku dibêje, pênc rojan bi şûn de were. Îşareta wê ya bi oynikê û derxistina serî di pencerê re, tê wê wateyê ku dibêje, li dikana boyaxker bisekine, hetanî ku ez qasidê xwe ji te re bişînim.”

Gava min ev şîrove ji devê dotmama xwe bihîstin, agir bi dilê min ket. Min jê re got: “Tu rast dibêjî dotmamêcan, lewre min dikana boyaxkerekî Cihû di wê sikakê de dît.” Piştî ez giriyam. Wê got: “Baweriya xwe xwurt bike û hêza xwe komî ser hev bike. Xelk bi salan dişewitin bi agirê evînê, yê te tenê hefteyeke te çêbûye. Îcar çima ev bêhêvîti bi te re çêdibe?”

Piştî li ber dilê min çû û hat û hewl da ku bi gotinên xweş hêz û baweriyê bide min. Di pey wê re jî çû xwarin ji min re anî, şerab danî ber min ji bo ku ez derdên xwe jibîr bikim. Lê min kir nekir xwarin di ber min de neçû. Ez ji xwarin û vexwarinê, ji xewa şêrîn qut bûm, rûyê min zer bû û dirûvên min hatin guhertin wek ku derdên dinyayê giş ên min bin. Lewre cara yekê bû ku ez dibûm evîndar û ez germahiya eşqê dijiyam. Her ku diçû ez hejar û lawaztir dibûm û dotmama min jî di rûyê min de hejar dibû. Ji bo ku dilê min xweş bike, her şev çîrok û serpêhatiyên aşiqan ji min re digotin hetanî ku ez di xew re diçûm. Çi gava ku ez şiyar dibûm jî, min didît ku ew li ber serê min e û hêsirên wê bi ser hinarkên rûyê wê de diherikin, li ser min digirî.

Pênc rojên min bi wî hawî derbas bûn, piştî dotmama min rabû av germ kir, serê min şûst û cilên min li min kirin, ji min re got: “De êdî here cem wê, vê carê wê Xwedê te bigihîne meqseda te û tê bi dildara xwe şa bibe.” Ez jî rabûm çûm û di heman rêyê re meşiyam heta ku ez giham serê sikakê. Ji ber ku, wê rojê roja septê bû, dikana boyaxker girtî bû. Dîsa jî ez çûm li ber dikanê rûniştim. Nîvro buhurî, mele azana êsirê xwend, lê ew xwiya nekir. Piştî ro çû ava, şev hat, tarî ket erdê dîsa jî pêjna wê nehat, ne jî qasidek li şûna xwe şand. Ez li ser xwe tirsiyam, lewre ez bi tenê bûm li wir. Loma ez rabûm û weke serxweşan dîsa ketim ser rêya vegeerê û çûm malê. Çawa ku ez derbasî hundur bûm, min dît ku dotmama min Ezîze jî li ser piyan e, destekî xwe avêtiye stûna malê û yê din daye ber rûyê xwe û van beytan dibêje:

Keçeke Ereban nedît ku bavê wê şînas be  
Bêriya rindekeçên Hicazê nekir ku şa be  
Bi meriveke xwe re her dişêwire bênavber  
Pêtên agirê eşqê jî di çavan re dide der  
Jê werê min guneh kirine di heqê wî de  
Hâlbukî alîkarî bo wî ye di dilê min de

Gava helbesta xwe qedand, li min zîvirî, dît ku ez jî digirîm. Hêsirên



min û xwe paqij kirin bi hûçikê xwe, bi min re kenîya û ji min re got: “Pismamcan, madem Xwedê daye te, tu çima îşev li cem dildara xwe nema û te xwe negîhand meqseda xwe?” Çawa ku min ew gotin ji devê wê bihîstîtin, ez hêç bûm û min pîhnek avêt şînga wê, ew bi ser eywanê de qulupand. Gava ku serserkî qulupî, enîya wê li darîkekî ket, birîndar bû û xwinê tê re avêt. Pêre jî bêdeng bû û nema gotinek tenê jî kir. Di cî de rabû ser xwe, çû potîkek şewitand, pişoyê wê danî ser birîna xwe û ew baş girêda. Piştî xwîna ku bi ser çavên wê de hatibû paqij kir, a ku bi ser merş de jî herîkîbû şûşt û mîna ku tiştê nebûbe dîsa bi rûkenî li min vegeyriya û bi zimaneke şêrîn ji min re got: “Pismamo! Bi Xwedê ne ji bo ku ez te biçûk bixim û ne ji ji bo ku ez henekê xwe bi te bikim min ew gotin kirin. Na! Niha jî ez hebekî bi birîna enîya xwe daketim, loma ez di pîrsê de hinekî dereng ketim. De ka êdî ji min re bibêje bê îro te çi kir, te çawa kir û çi qewimî?”

Min jî ta bi derziyê vekir û her tiştê ku qewimîbû jê re vegot. Piştî wê gotina min, ew giriya û got: “Pismamo! Mizgîniya min li te! Hêviya te pêk hatiye û tu gihîştîye armanca xwe, lewre ev tiştên ku tu dibêji nîşanên qebûlkirina wê ne. Loma nehatiye cihê civanê xwe û xwestîye asta hezkirin û dilsoziya te bipîve û bê ka tu çiqasî ji dil û xwedî sebr e. Vêca sibe sibehê dîsa here wî cihê han û binêre bê ka çi îşaretên nû dide te, lewre rojên te yê şahiyê pir nêzîk bûne û dê kul û xemên te, dev ji te berdin êdî.” Lê belê wê gotina wê jî bandor li ser min nekir û êşa dilê min berdeyam kir. Ew jî rabû, çû ji min re xwarin anî, danî ber min. Lê li şûna ku bêhna min fireh bibe, ez hartir bûm û min lingê xwe li sifreya xwarinê da û got: “Hemû aşiq dîn in, tengezar in, bêmedal in. Ne dikarin rakevin, ne jî dilê wan diçe xwarinekê.”

Li ser wê helwest û wê gotina min, keça apê min Ezîze ji min re got: “Bi Xwedê pismam, ev bi xwe jî nîşaneyên eşq û evîne ne!” Hêsirên wê herîkî, rabû ser xwe ew rûnê rijîyayî paqij kir, der û dor da hev û dîsa hat li cem min rûnişt, hewedariya min kir û hewl da ku min haş bike. Min jî bênavber lave ji Xwedêya xwe dikirin ku zû bike sibeh.

Çawa ku bû sibe û roniyê şewqa xwe avêt ser dinyayê, ez rabûm ser xwe û min berê xwe da heman sikakê bi hêviya dîtina wê. Ez ketim heman sikakê bi lez û ez çûm li ser heman qurmê darê rûniştîm. Min dît ku şibake vebû û serê xwe di şibakê re derxist. Dikenîya, bi şûn de çû, piştî dîsa vegeyriya ber bi şibakeyê li gel eynîkekê, kîsek, leganeke tijî gîhayê şî û çirayek jî di destê wê de.

Tiştê ku wê gavê di serî de kir, ew bû ku eynîka destê xwe kir kîs de, ew girêda û piştî ew avêt hundurê malê. Dûvre porê xwe bi ser çavên xwe de berda û çira xist nav legana gîhayê şî de, dawî jî rahişt gîşan, ew bi xwe re birin, şibake jî li pey xwe girt û çû. Dilê min peqiya ji ber wê rewşê; ji ber

wan sembol û îşaretên wê yên veşartî ku mirov ditirsandin. Gotinek tenê ji ji min re negot. Bi wê helwesta wê re, hem evîna min jê re xurtir bû û hem jî ez bêhtir li ser wê dîn û har bûm.

Bi çavin tijî hêsir bi dilekî xemgîn ez dîsa bi şûn de vegeriyam malê, weke çûkekî baskşikestî. Nuh ez derbasî hundur bûm, min bala xwe dayê ku dotmama min berê xwe daye dîwêr û bi dilekî şewitî di cihê xwe de rûniştiye, di nava hestên xemgîniyê û xîretê de tê biraştin. Lê belê ji ber wê rewşa min, dilê wê rê nedidayê ku min agahdar bike ji eşq û evîna xwe. Lewre asta eşqa min a dînker didît û nedixwest ku dilê min biêşîne.

Min lê meyzand, min dît ku du paçik li dora serê xwe gerandine. Yek ji wan a ser birîna eniya wê bû û ya dîn jî dabû ser çavên xwe yên ku kul bûbûn ji hêsir û girînê. Di wê rewşa pir xerab de, ev çend beyt di ber xwe de digotin û dinaliya:

Tu li ku bi jî êdî tu ne ewle yî  
Ey rêwiyê ku ji dil dernayê!  
Tu çû û bêrîkirina te ez kuştim  
Hêsir nema li çavan te ez birîstim  
Xweska bizanîba min niha tu li ku yî?  
Gelo tu gîhişte wê û li cem bi cî bûyî?  
Bîranînên te weke lehiyan li dil didin  
Hêsirên çavan jî hibr in dadiwerivin  
Her tişt xweş e ji xeynî furqeta te  
Xewa ser kêlekê jî her zor e bêyî te

Gava helbesta xwe qedand, bi çavên şil li min nêrî û ez dîtîm. Hêsirên xwe paqij kirin û bi min ve rabû, lê ji ber wecda ku ew tê de bû, nekarî bi-axive. Heta demekê wisa bêdeng ma, piştî axivî û got: “Pismamo de ka êdî vê carê ji min re bibêje bê çî di neqeba te û wê de qewimiye?” Min jî ji serî hetanî binî jê re got. Wê jî bersiv da û got: “Hebekî din jî bêhnfireh be pismamo! Hindik maye tu bigihêjî armancên xwe, hindik maye tu bi dildara xwe şa bibe. Helwesta wê ya ku eynik nîşanî te da û xist kîs de, tê wê wateyê ku ji te re dibêje, xwe ragire hetanî ku roj biçe ava û berdana por bi ser çavan de jî tê wê wateyê ku ji te re dibêje, bila ronaya rojê here û tariya şevê bikeve erdê, piştî were. Ew legana ku şinkahî tê de jî, tê wê wateyê ku ji te re dibêje, gava tu hatî were nav wî bexçeyê di dawiya sikakê de û ew çiraya ku nîşanî te da jî, tê wê wateyê ku ji te re dibêje, gava tu hatî nav bîstan, tê de bimeşe heta ku tu çirayekê bibînî, gava te şewqek dît, here li balê rûnê û li bendî min bimîne hetanî ku ez werim cem te, lewre evîna te ez kuştîme.”

Gava min ew gotinên dotmama xwe guhdar kirin, qîrin bi min ket ji kêfan re! Rabû dotmama min ji min re got: “Vêca li pêşiya te tişteki hindik

maye, tenê divê tu nîvrojêke din xwe ragire hetanî dîsa roj here ava û tarîka şevê bikeve erdê; wê çaxê tê bi serkeftin xwe bigihîni wê û tê bigihêje armanca xwe. Gotina rastî jî ev e.” Piştî ev çend beyt gotin:

Roj û şevan digindirîne da ku ew jî bigindire  
Lewre malhayê kul û derdan her berxwedêr e  
Dibe ku daxwaza tiştêkî bi te re gur bibe  
Di dema xelasê de tê bi xwe pê şa bibe

Piştî hat cem min û bi gotinên şêrîn hewl da ku dilê min xweş bike. Lê belê ji ber ku ditirsiya ez careke din bertekan nîşanî wê bidim, vê carê xwarin ji min re neanî. Dûvre hat kincên min ji min kirin û ji min re got: “Pismamo ka li gel min rûnê, ez ê behsa mijarên xweş bikim da ku sebra te bê û roj sivik derbas bibe bi ser te de. Înşelleh çawa ku şev bikeve erdê, tê dildara xwe bibîne û hûn ê bi hev şa bibin.”

Rabû min jî guhê xwe da wê sohbeta wê ya xweş û min hewl da ez derdê xwe jibîr bikim, da ku zû bibe êvar û şev bê. Di dilê xwe de jî, bênavber min xwe diavêt Xwedê da ku zû rojê bibe ava. Vêca gava bû êvar û şev kete erdê, dotmama min giriyekî ecêb kir, hêsir barandin û hebeke xwerû ji miskê da min û ji min re got:

Pismamo vê bigire û wê bixe devê xwe de. Gava te ew dît, te daxwaza wê guhdar kir û tu pê şa bû; van ristan jî jê re bixwîne:

Aşiqno! Hûn bi xatirê Xwedê kin min agahdar bikin

Gava eşq giran dibe li xorto, çi dike gelo?

Piştî ez maçî kirim û ez dam sûndê ku ez van ristan jê re nexwînim hetanî ku ez ji cem wê dernekevim. Min jî got “Bila be.” û ez ji malê derketim. Ez meşiyam hetanî ku ez giham bexçe. Min bala xwe dayê ku deriyê bexçe vekirî ye. Ez tê re derbas bûm û min meşa xwe berdewam kir hetanî ku min şewqek dît. Min berê xwe da wê şewqê û ez çûm balê, min dît ku cihekî bi hevrêşim raxistî ye ji bo rûniştinê. Her derê wê bi zêr û zîv xemilandî bû. Qubeyeke ji ac û darên ebenos di ser re vegirtî bû ku çirayek bi zikê wê ve daliqandî bû û di biniya wê re jî şemdanêke zêr hebû ku mûmeke mezin tê de bû. Fisqîyeke avê jî di nîvê wî cihê de bû ku peşkên avê bi rengên cuda cuda jê dipengizîn. Li kêleka wê fisqîyeyê jî sifreyeke xwarinê hebû ku bi fotoyêke hevrêşimî ser hatibû girtin. Li rex wê jî denekî mezin hebû ku tijî mey bû û qedehêke camînî tê de bû ku bi zêr hatibû neqîşandin. Sênîyêke zîvînî mezin jî li rex gişan bû ku ew jî sergirtî bû. Gava min ser wê vekir, min dît ku tijî hinar, hejîr, tirî, narin û fêkîyên cûr be cûr e. Di nav wan de jî hinek cûreyên rîhan, nêrgiz, nesrîn, as û yasemîn hebûn. Ligel

wan jî gelek cûreyên gîhayên bêhnok. Bi kurtahî, ez hatibûm cihekî erjeng ku ez mest kiribûm bi her tiştê xwe. Lê belê min tu kes li vî cihê xweş nedît.

*Li Şehrezadê bû sibê, wê jî vegotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û HÎJDEHEMÎN

*Şehrezadê ji Şehriyar re got:*

Şahînsahê min ê bextewar, vêca wî xortî vegotina xwe ji Taca Milûkan re berdewam kir û got:

Min tu kes li wê derê nedît; ne cêriyek, ne koleyek, ne xizmetkarek, ne jî tu kesê din. Ez jî li wir rûniştim û ez mam li hêviya dildara xwe. Seetek, dudu, sisê derbas bûn, lê dildara min nehat. Ez pir birçî bibûm û wê gavê jî ez nû li birçibûna xwe hay bûbûm. Lewre çend rojek bûn ku min xwarin nexwaribû ji ber derdê evinê. Lêbelê gava ez hatim wî bexçeyî û gotinên dotmama min rast derketin, êdî dilê min aram bûbû û min jî birçibûna xwe ferq kiribû. Wisa xwiya dikir ku piştî baweriya min bi dîtina wê hat û pê de, êdî bêhna xwarina li ser sifrê ez dikişandim û dilê min li xwarnê vebibû, bi awayekî ku êdî min nema dikaribû xwe bigirta. Ez ber bi sifreyê ve çûm û min ser wê vekir, min dît ku sêniyeke mezin di nava sifreyê de ku çar mirîşken biraştî û bi biharat têde ne. Çar tasik jî li rex wê sêniyê bûn ku di yekê de şêranî di ya din de libên hinaran, di ya sêyan de peqlawe û di ya çaran de jî qedayif hebû. Hinek tirş, hinek jî şêrîn bûn. Min hinek qedayif, hinek goşt xwar, piştê jî hinek peqlawe, hineke din ji şêraniyê bi qasî çend kevçiyekî. Li dawî jî min dîsa hinek ji mirîşkê xwar û çend gepên peqlawê jî avêtin devê xwe.

Piştî ku zikê min tijî bû, xavbûn ket hemû movikên laşê min û ez sist bûm, min nema dikaribû xwe li qûn bigirim. Loma, çawa min destên xwe şûştin, min serê xwe danî ser balîfekê û min xwe dirêj kir. Lê belê xewê zora min bir, ez di xew re çûm û jê pê ve jî ez nema zanim çi bi serê min hat. Gava ez ji xew şiyar bûm, min dît ku germa rojê dike min bişewitîne. Çend roj bûn ku ez bi hesreta xeweke wisa xweş bûm. Loma bêhemdê xwe ez di xew re çûbûm. Vêca gava ez şiyar bûm, min dît ku potikek û hinek komir li ser zikê min e. Ez li xwe zivîrîm, min çep û rastê xwe nêrî, min kesek li dora xwe nedît. Min bala xwe dayê ku ez li ser kevirekî mermer raketim, ne li ser nivîn û balîfê! Ez li hişê xwe mam heyirî bê çawa tiştêkî wisa qewimîye! Ez rabûm ser xwe min kincên xwe dawîşandin, xwe ji komirê paqij kir, di nava êş û xemgîniyeke mezin de ku bûbû sebeba girî û barandina hêsirên min. Di nava wê malwêraniyê de, min berê xwe da malê. Çawa ez giham malê min dît ku dotmama min digirî, bi kulman li sînga xwe dide û hêsir

dibarinê weke baranê, pêre jî van beytan dibêje:

Surra bayê hat ji warê xec û cananan  
Dil jî lêda pêre hilavtî ji hinavan  
Were ey bayê ciwaniyê bi min ve were  
Di vê rêyê de herkes rêwiyê rêya xwe ye  
Heger qedera me eşq û evîn be ev e  
Em jî dê himbêz kin hevdû ji kezebê  
Piştî rûyê pismamê min heram be li min  
Hemû rengên jiyan û şahî û xweşiyê  
Gelo dilê wî jî niha mîna yê min e?  
Ê wî jî heliyaye gelo ji pêtên eşq û evînê?

Gava wê ez dîtîm, bi lez rabû ser xwe û hêsirên xwe paqij kirin, piştîre bi zimanekî şêrîn axivî û ji min re got: “Pismamo! Xwedê bi dilovaniya xwe eşqek daye te ku hûn herdu jî ji hevdû hez dikin. Ez jî, gerek kes loman ji min neke ji ber girî û hêsirên ku ez dibarînim li ser çûna te. Xwedê jî li te negire ji ber vê rewşa min.”

Piştîre bi min re kenîya, mîna ku bixwaze hêrsa xwe veşêre, henek bi min re kirin, kincên min ji min kirin, ew bêhn kirin û piştîre ew raxistin û got: “Bi navê Xwedê ev bêhn, ne ya kesê ku dildara xwe dîtibe, vêca pismam ka ji min re bibêje bê çi çawa çêbûye?” Min jî jê re ta bi derziyê vekir û ji serî hetanî binî jê re got. Careke din bi awayekî qehrok bi min re kenîya û got: “Dilê min tijî êş e, Xwedê temen nede kesê ku dilê te biêşîne. Wisa xwiya dike ku ev jinik pozbilindiyan li te dike û ez ji bo te ditirsim ji wê ku felaketekê bi serê te de bîne. Binêr pismam, tefsîra îşaretên wê jî wehane: Ew mijara xwê, tê wê wateyê ku tu mirovekî xewar î û delaliyê xwarinê yî ku divê ew nefsa te ya çilek were pakkirin. Loma divê tu werî xwêkirin ji ber ku angaştî te ew e ku tu mirovekî aşîq î û xew ji mirovê aşîq re herame. Ev jî tê wê wateyê ku eşqa te derew e û ya wê jî derew e, lewre wê tu şiyar nekiriye gava ku tu razayî ditiye. Heger ji te hezkiriba, wê tu şiyar bikira. Ew komira ser sînga te jî, tê wê wateyê ku Xwedê rûyê te reş kiriye ji ber wê angaştî te ya derewîn. Di encamê de, ew dixwaze ji te re bibêje ku tu mirovekî biçûk î û tu derdê te nebûye ji xeynî xwarin û vexwarin û razanê. Wateya îşaretên wê ev e. De êdî Xwedê te ji wêna xelas bike rebî!”

Gava min ew gotina wê bihist, min bi destan li singa xwe da û got: “Bi navê Xwedê tu rast dibêjî û ya rast jî ev e; ji ber ku ez li wir raketim û aşîq ranazên. Ê ku zulmê li min dike jî ez bi xwe me, ne xwarin û vexwarin e. Îcar ez ê çawa bikim?”

Piştîre ez giriyam, min li xwe da û ji dotmama xwe re got: “Tu bi qedrê Xwedêkî rêyekê bide ber min, nexwe ez ê biteqim!” Dotmama min got: “Ser

seran, ser çavan pismamcan, lê belê tu dizanî ku her car min ji te re digot min bi xwe re bibe, ez ê di demeke kurt de we bigihînim hev û bi guhkên xif-tanê xwe we bisitirînim. Mebesta min jî bi vê yekê ew bû ku ez dilê te xweş bikim û te razî bikim. Heger Xwedê bêje erê, ez ê bi hemû hêza xwe hewl bidim ku we bigihînim hev. Vêca gotina min guhdar bike û here heman cihî, li wê derê rûnê. Lê baldar be û gava dema şivê hat, qet tiştêkî nexwe û venexwe, lewre yê ku xewa mirov tine jî xwarin e. Divê tu qet ranekevî jî, lewra hetanî ku çariyeke şevê neçe, nebuhure, ew nayê wir. Xwedê Teala te bisitirîne ji destên we.”

Gava min ew gotina wê bihîst, bêhna min hate ber min û dilxweşiya min li min vegehiya û êdî min dua kir ku şev zû were. Ku dema çûna min hat, dotmama min ji min re got:

Gava te ew dit, vê ristê jê re bibêje:

Dildarino ji bo Xwedê ji min re bêjin!

Gava giran bibe eşq li xortekî bila çi bike?

Min jî jê re got: “Bila be.” Vêca gava ez çûm, min dît ku ew bexçe dîsa mîna berê ye û weke cara ewil hatiye amadekirin. Xwarin, vexwarin, mumê bêhndan û hwd. her tişt amadekirî bû li wir. Ez çûm li meclisê runiştim. Bêhna xwarinên xweş av bi devê min dixist. Her car min li ber xwe da û xwe dûrî xwarinê girt. Lê herî dawî min nema dikarîbû li ber xwe bida; ez çûm ber sifreya xwarinê, min perdeya ser wê rakir, min dît ku sêniyeke mirîşkek qelandî di nevî de ye û li dora wê jî çar tepsikên çar xwarinên cuda hebûn. Li gel wan jî şêrînahiyên cûr be cûr. Rabû min ji her cûreyeke xwarinê gepik xwar, perçek goşt ê qelandî û hinek şêranî jî bi ser de. Piştî min têra xwe zerde vexwar bi ser de, lewre tama wê pir xweş bû. Di encamê de, min zikê xwe dagirt.

Piştî, qapaxên çavên min hêdî hêdî bi ser hev ve hatin. Min balîfek da bin serê xwe û palda. Lê min texmîn nedikir ku ez di xew re herim, lewre nêta min a xewê tunebû. Lê belê çawa ku min çawên xwe girtin, bê hemdê xwe ez di xew re çûm û ez bi xwe nehesiyam hetanî ku rokê neda der. Wê gavê min dît ku li ser zikê min kabeke hestî, fereke gogê, navikeke xurmeyan û bizrekî xernûban heye. Merş, tej û doşek-moşek jî li wan deran tunebûn, mîna ku ji doh êvarê ve tiştêk li wir tunebe. Ez rabûm ser xwe, min ew hemû ji ser xwe avêtin, kincê xwe dawîşand û bi hêrs ez ji wir dûr ketim. Gava ez hatim malê, min dît ku piffin bi dotmama min ketiye û di ber xwe de dibêje:

Bedeneke hejar û dilekî birîndar

Girîyekî bêdawî û hêsirêşên bêwar

Dildarekî cirnexweş û zor gelek reftar  
Lê belê dildar çî bike bimirov xweş e  
Erê pismamo te dil dagirt bi evîne  
Bi firaqê bi hêsirên tîr bi êşbirînê

Ez bi keça apê xwe de xeyidim û min sixêf jê re dan. Ew jî giriya, piştî hêsirên xwe paqij kirin û hat ez himbêz kirim, ez ramûsam. Min jî bê navber xwe jê dûr dixist û hewl dida ku ez wê dûrî xwe bigirim, bi lomekarî. Wê jî got: “Pismamo, wisa xwiya dike ku tu îşev jî raketiye?” Min jê re got: “Rast e, gava ez şiyar bûm jî min dît ku kabekê mezin, fereke gogê, navikeke xurmeyê û bizreke xernûbê li ser zikê min in. Îcar ez nizanîm çima wê ew tişt bi min kir?” Dûra ez giriyam, min xwe avêt himbêza wê û jê re got: “Ka ji min re vê yekê şîrove bike û bejê bê ka ez çî bikim û alîkariya min bike di vê hêlê de.” Wê jî got: “Ser seran, ser çavan. Ew fera gogê ya ku danibû ser zikê te, tê wê wateyê ku ji te re dibêje, eşq ne wisa ye û tu jî xwe ji aşiqan nehesibîne. Navika xurmeyan jî tê wê wateyê ku, heger tu aşiq bûya dê dilê te şewitî bûya û dê xew dûrî te bûya. Lewre çêja evîne mîna tovekî dê agir bi dil bixista. Bizrê xernûbê jî dide xwiyakirin ku, dilê evîndar jê hatiye dizîn û dixwaze ji te re bibêje, xweragiriye bike li firaqê wê û bila sebra te mina ya Eyyûb be.”

Gava min ew gotina wê bihîst, agir bi dil û hinavê min ket û êşên min zêdetir bûn. Qîrek bi min ket û min got: “Ji ber ku bextê min xerabe Xwedê Teala xewê li serê min dike bele. Îcar dotmamê canê, tu bi qedrê Xwedêkî tê rêyekê, şeweyekê ji min re bibînî da ku ez bikaribim xwe bigihînim wê.” Ew jî bi ser min de giriya û got: “Binêr pismamo cano! Dilê min mişt e bi hestan û ez nikarim biaxivim. Lê belê îşev dîsa here wî cihê û pir baldar be, ranekeve. Wisa diyar dibe ku tê îşev bigihêje miradê xwe.”

Piştî dotmama min rabû, xwarin ji min re anî û got: “Niha têr bixwe da ku tiştêk di bîra te de nemîne.” Min jî têr xwar. Gava ku şev dîsa hat, dotmama min bedlek kincên pir xweşik anî, ew li min kir û ez bi sûndxwarin dam ku ez jibîr nekîm wan ristên ku şeva berê ji min re gotibûn, ji wê re bêjim. Li gel wê, careke din ez pir hişiyar kirim da ku ez ranekevim.

Ez ji cem dotmama xwe derketim û min dîsa berê xwe da wî bexçeyî. Li wir bê navber min serê xwe hejand û bi destên xwe mijangên çavên xwe girtin da ku neyên ser hev.

*Li Şerezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û NOZDEHEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û ji Şehriyar re got:*

Veca Şahê min ê bextewar, wî ciwanî serpêhatiya xwe ji Taca Milûkan re berdewam kir û got:

Êdî min bi destên xwe çavên xwe vedikirin ji bo ku xew nêzikî wan nebe. Lê her ku şev dereng diket ez ji dest xwe diçûm û birçîbûna min jî bêhtir zorî dida min li ber bêhna wê xwarinê xweş. Herî dawî min nema xwe girt, ez çûm ber sifreya xwarinê û min kitan ji ser da alî û ji her cûreyeke xwarinê min hinek xwar. Piştî ez hatim ber denê şerabê û min ji xwe re got “De qedehekê ji vê jî vexwe!” Lê piştî ku min qedehek vexwar, ez tamişkî bûm û min yeke din ji vexwar. Piştî yeke din û yeke din jî hetanî ku min deh qedehek vexwarin ez nesekinim. Pêre surra ba jî li bin çengê min xist û ez weke meyetkî li erdê ketim bêyi ku hayê min ji min hebe.

Ez di wî halî de mam hetanî ku rojê li min da û bû sibeh. Wê çaxê ez li xwe hay bûm û min dît ku ez li derveyî bexçe me û li ser zikê min jî gwizanekî kevn û derhemekî hesinî heye. Ji hêrsan laşê min tevde lerizî. Min rahişt herduyan û bi lez ez vegeyîyam malê. Min dît ku dotmama min gazinan dike û dibêje: “Ez di vê malê de hejareke perîşan im û ji girî pê ve tukes li derdê min napirse, alîkariya min nake.” Çawa ez ketim hundur de, min gwîzan û derhemê hesinî ji destê xwe avêtin û ez ji ser hişê xwe çûm, li erdê ketim. Piştî ku ez bi ser xwe ve hatim, tiştê ku bi serê min de hatibû min jê re vegot û lê zêde kir got: “Ez negîham miradê xwe.” Li hemberî vê rewşê, dotmama min pir xemgîn bu li ser min, bi taybetî jî gava dît ku ez digirîm. Dûra ji min re got: “Hingî min tu şiyar kir û got ranekeve, mû bi zimanê min ve hatin, lê te şîreta min guhdar nekir. Wisa xwiya dike ku gotina min tu fêdê li te nake.” Min tikan jê kir, xwe avêt bextê wê ji bo ku wateya wê kêra givîzanî û derhemê hesinî ji min re şîrove bike. Wê jî got: “Ev derhema hesinî îşareta çavê wê yê rastê ye û ew dixwaze ji te re bibêje “Bi navê Xwedê yê şêrin û vî çavê min ê rastê, heger tu careke din vegeyî vir û tu rakevî, ez ê bi vî gwizanî te şerjêkim. Loma ez ditirsim ku ev şeytana han tiştêkî bi te bike. Vêca ez nikarim zêde biaxivim ji. Îcar heger tê dîsa lê vegeyî divê tu pir baldar bî û tu qet ranekevî. Heger tu bi xwe bawer bî ku tê bikaribî bi xwe, tê bigihêje miradê xwe. Lê heger tu bi xwe ne bawer bî û tu herî li wir rakevî dê ew te şerjê bike.” Rabû min jê re got: “Û çare di ku de ye dotmam?” Tu bi qedrê Xwedê bikî alîkariya min bike û min ji belayê xelas bike.” Wê jî got: “Ser seran, ser çavan pismamcan, ez ê alîkariya te bikim, lê belê divê tu gotina min guhdar bikî û bi ya min bikî.” Min jî got: “Bila be, ez ê bi ya te bikim û gotinên te guhdar bikim.” Dotmama min got: “Dibe, naxwe gava dema çûna te bê ez ê ji te re bibêjim bê tê çawa bikî.” Piştî ez himbêz kirim û ez danîm ser nivînê û enîya min firmand hetanî ku ez di xew re çûm. Ew jî wisa li ber serê min dimîne û bawêşînkê li min dike ji bo ku ez ji xewê şiyar nebim, hetanî êvarê.



Ez seranserê rojê raketim, êvarê jî wê ez ji xew rakirim. Ez çawa şiyar bûm, min dît ku ew hîna li ber serê min e bawêşînkê li min dike û digirî. Hêsirên wê bi qasî ku kincên wê şil bikin barîyabûn. Lê çawa min çavên xwe vekirin, wê jî dev ji girî berda û hêsirên xwe zuha kirin. Rabû çû ji min re hinek xwarin anî lê min ne xwar. Wê gavê ji min re got: “Ka qaşo te yê gotinên min guhdar bikirana?” Rabû min gotina wê guhdar kir û xwarin xwar. Wê dixist devê min û min jî dixwar, me wisa berdewam kir hetanî ku zikê min tijî bû. Piştê ava tirî da min hetanî ku min têr vexwar, dûra me destên xwe şuştin û bi destmalekê ew zuha kirin. Hinek ava gulên bi ser min dakir û di nava rehetiyêke baş ez li kêleka wê rûniştim. Piştî ku tarî kete erdê û wê jî rabû kincên min li min kirin, ji min re got: “Pismamo, qet meraqan meke û here tê di seranserê şevê de şiyar bimînî. Lewre ew jî vê carê wê di dawîya şevê de were cem te. Heger Xwedê bêje erê îşev tê pêre rûnê û bighêje miradê xwe, lê tu wesiyata min jibîr nekî!” Piştê bi ser min de girîya. Dilê min li ser wê êşîya ji ber wî giriyê wê. Min jê re got: “Ew çî vesiyet bû ku te li min kiribû gelo?” Got: “Gava tu ji cem wê rabû, ew rista helbesta ku min berê ji te re gotibû jê re bibêje.”

Bi kêf û bi dilekî xweş ez ji cem derketim û min da rê. Ez dîsa çûm nav wî bexçeyî û bi zikêkî têr ez çûm li ser doşeka raxistî rûniştim. Dem pir giran derbas dibû û şev li ber çavên min dibû weke salekê. Lê dîsa jî min xwe girt hetanî derengî şevê. Hindik mabû ji sibehê re, lê belê ajoya birçîbûnê dîsa ez dorpêç kiribûm û hilma xwarinê hemû malikên laşê min dagir kiribû. Herî dawî min nema xwe girt û ez çûm li ser sifrê rûniştim û min têra xwe xwar û vexwar. Dîkan bandabûn û hindik mabû ji sibehê re, lê bi têrxwarinê re laşê min xav bûbû û serê min gêj bûbû, daxwazeke xewê ya xwirt ez girtibûm û bernedida. Min nêt kir ku ez razê, lê di wê navberê de dengê xirecîrekê hate min. Ez rabûm ser xwe, min destên xwe şuştin, av di devê xwe werda û çend qurîncek ji laşê xwe dan ji bo ku ez di xew re neçim. Parek bi şûn de min dît ku ew hat, ligel deh cariyeyan ku ew mîna heyvekê bû di nav wan de, kincekî ji etlesê kesk li ser bû ku bi zêrên sor hatibû xemilandin, çawa ku helbestkar jî dibêje:

Porê xwe berdaye wê pêl dide li ber bayê  
 Ber kirasê xwe vekiriye bi wê bejn û balê  
 Aşiqan sermest dike ew bi wê xeml û xêzê  
 Bitirs min jê re got xatunê nav çîye?  
 Got ez im ya ku dilê aşiqan şewitandiye  
 Min gilî û gazinek xwe lê kir ji ber êşê  
 Got ji kevir dîlekî re tu gilî dikî bê agah  
 Min got heger bi rastî jî dilê te kevir be  
 Bila Xwedê erdhejekê bi ser de berde!

Çawa ku wê ez dîtîm, ji min re got: “Tu çawa şiyar ma û xewê zora te nebir? Madem ku şev pê de tu şiyar mayî, naxwe bi rastî jî tu aşiq î. Lewre ji xesyetên aşiqan e ku ji êşa bêrikirinê şev pê de şiyar bimînin.” Piştî li cariyeyên xwe zivirî çavek da wan, ew jî di cî de derketin çûn. Îca ber bi min ve hat ez himbêz û maçî kirim. Min jî ew maçî kir. Wê lêva min a jêr, min jî ya wê ya jor mêt û piştî min destê xwe avêt newqa wê û ew bi ser xwe de ecîqand. Em herdu bi hev re li erdê ketin piştî ku devlingên wê berjêr hatin xwarê. Li erdê me hevdû bir û anî, em ketin ser dilê hev bi maç û ramûsanê, bi gez û qurîncekan, bi rakirina çîm û hêtan û tewafa hec û girikan, hetanî ku em ji hal de ketin û movikên laşên me hemû sist bûn û em di xew re çûn. Ew şev şeva dilan û şahiya çavan bû çawa ku helbestkar jî gotiye:

Ji hemû şevan tenê şeveke şahîye heye  
 Ji bo aşiqan ji bo dildaran şevê tenê heye  
 Wê şevê destê min qet ji piyala meyê nebû  
 Wê şevê min xew ji çavên xwe dûr girtibû  
 Bi ah û oh min bazin û xirxal li hev civandibûn

Gava bû sibeh min xwest ku ez herim, lê wêna bi destê min girt û got: “Ka bisekine hetanî ku ez tiştêkî ji te re bibêjim û wesiyetekê li te bikim.” Ez sekinîm, wê jî destmalek vekir û ew potika ku niha min li ber we vekir jê derxist û li ber min raxist. Min li potik nêrî, min dît ku destmaleke desta ye û sûretê xezalekê li ser e. Min ew sûret pir eciband, min ew girt cem xwe û soz pê re da ku her şev ez werim wêna li nav wî bexçeyî bibînim. Wê jî heman soz da min û got: “Ev neqşa han xwişka min çêkiriye.” Min jî got: “Navê wê çiyê?” Got: “Navê wê Nûrûlhûda ye, de êdî li wê destmalkê miqate be û li cem xwe bihêle.” Min got “Bila be.” û bi kêf ez ji cem wê derketim, min berê xwe da malê bêyî ku bê bîra min ez wê helbesta ku dotmama min wesiyet kiribû jê re bixwînim.

Ez hatim malê, min dît ku keçapa min raketîye, ango ji min ve wisa xwiyakir. Lê çawa ku pêjna min kir, rabû serxwe û wê çaxê hêsrên wê ji min ve xwiya kir û nû ez lê hay bûm ku digirî. Ber bi min ve hat, sênga min maçî kir û ji min re got: “Gelo te ew wesiyeta min pêk anî û te ew riste xwend an na?” Min jî jê re got: “Welehî di rûyê wêneya vê xezala han de, min jibîr kir ez wê helbestê jê re bixwînim.” û min ew destmalk avêt ber wê. Rabû ser xwe û dîsa rûnişt bêyî ku gotinekê tenê jî bibêje. Tengav bû, êşa nava wê di rûyê wê re da der û hêsrên wê bûn lehî û herikîn. Piştî ew çend riste ji helbestekê xwendin û got:

Xwe ragire ey daxwazkarê çûn û firaqê  
 Bi maç û ramûsan mexape bi laqê  
 Di tebê zemanan de bêbextî heye  
 Qey tu nizanî ku li dawiyê firaq heye?

Piştî ew riste xwendin, axaftina xwe berdewam kir û got: “Pismamo, ka vê destmalkê bikê diyarî û bide min.” Min jî destmalk da wê, wê jî rabû destmalk li ber xwe raxist û nerînek avêt ser nîgara xezalê ya ku li ser hatibû neqîşandin. Dûra gava ku dîsa dema çûna min hat, ji min re got: “Pismam, bi selameti here û were, lê belê jibîr neke vê gavê, gava tu jê veqete wê rista ku min berê ji te re gotibû û te jibîr kiribû, jê re bixwîne.” Min got: “Ez jibîr nakim, lê ka dîsa careke din dubare bike.” Ew rista helbestê disa li ber guhên min dubare kir. Ez ji malê derketim û min berê xwe da bexçeyê dildara xwe.

Ez çawa hatim cihê civanê xwe, min dît ku keçik li wê derê li hêviya min e. Wê jî çawa ku ez dîtîm bi min ve rabû, ez maç û himbêz kirim, piştî jî ez li tengala xwe dame runiştandin. Me bi hev re xwar û vexwar û têra xwe jî kêf û laqirdî kirin. Veca gava bû sibe, beriya ku ez herim min ew ristên ku dotmama min gotibû jê re gotin, çawa ku ew riste bihîstin, hêsir ji çavan hatin xwar û ev riste ji nav lêvên wê derketin:

Hewedariya wî dike û raza wî vedişêre  
Xweragirtin di her mijarê de mîna zêr e

Min jî ew riste ezber kir û bi dilxweşî ez bi rê ketim ber bi malê ve. Ez hatim, min dît ku dotmama min Ezîze raketîye. Diya min jî li ber serê we runiştî bû û digiriya li ser halê wê. Çawa ez derbasî hundur bûm diya min got: “Xwelî li serê te be, te çawa dotmama xwe nexweş û bi tenê hiştiye bêyî ku tu lê bipirsî?” Dotmama min Ezîze jî ku ez dîtîm rabû ser xwe, runişt û serê xwe rakir, got: “Ezîz gelo te ew rista min jê re got?” Min got: “Belê, min jêre got û wê çawa ku ew beyt bihîst, giriya û rîstek ji helbestekê xwend.” Got: “Gelo te ew beytê wê ji ber kir?” Min got: “Belê min ew ji ber kirîye.” Got: “Ka hela wî beytî ji min re bixwîne.” Min jê re xwend, ew jî giriya bi şid û got:

Sebra delal jî qediya û me çare jê re nedît  
Ji xeynî dilekî şikestî û mîjdûmanî

Dûra got: “Gava mîna her car tu dîsa çû çem wê, vê beytê han jê re bixwîne.” Min jî got: “Ser seran, ser çavan.” Piştî mîna her car ez dîsa çûm civanê xwe û min dîsa ew li wir dît, di nava xeml û xêzeke ku nayê wesifdan. Tiştê wê şevê di nav me de qewimî nayê vegotin! Gava ez rabûm ji bo çûnê jî, min ew beytê dotmama xwe Ezîze jê re xwend. Wê jî dema ew gotin bihîstin, hêsir barandin û ev risteya han xwend:

Heger sebrê nebîne ji bo veşartina raza min  
Ji mirinê pê ve tu çare nîne li gel min

Min ev beytê wê ji ber kir û min berê xwe da malê. Gava ez gîham malê, min dît ku dotmama min li erdê dirêjkirî ye, ji ser hişê xwe çûye û diya min jî li ber serê wê ye. Lê çawa ku dengê min çûye û pêjna min kir,

çavên xwe vekirin, ji min re got: “Ezîz, gelo te ew beyta min jêre xwend?” Min got: “Erê min ew beyt jê re xwend.” Piştî jî min ew beytê ku dildara min gotibû (heger sebrê nebîne...) jêre got. Nuh ew beyt bihîst, ji ser hişê xwe çû. Gava bi ser hişê xwe ve hat jî, got:

Me ferman bihîst serî tewand û em mirin  
De êdî silavên me bigihînin qasidan

Piştî mîna her car, çawa ku dema civanê me hat, ez çûm bexçeyê wê û li wir min dît ku keçik li heviya min e weke her car. Em li gel hev runiştin, me xwar û vexwar û têra xwe kêf û laqirdî kirin. Dûra em ji xwe re raketin hetanî sibehê. Bi sibehê re gava min xwest ku ez herim, min ew beytê ku dotmama min xwestibû jê re xwend. Çawa ku bihîst qîrek ecêb pê ket, qeherî û ji min re got: “Bi navê Xwedê, ev kesa ku ev beyt gotiye, niha miriye! Gelo çi mervantiya te bi wê re heye?” Min jê re got: “Dotmama min e.” Got: “Tu derewan dikî, heger dotmama te bûya te yê jî bi qasî hezkirina wê ji wê hez bikira. Te ew kuştîye Xwedê te kuştî! Wilehî heger min bizaniba ku keçapeke te heye, min nedihîst ku tu nêzikî min bibî.” Min jî jê re got: “Jixwe ew bû ya ku liv û tevgera te, îşaret û helwestên te ji min re rave dikir û rê nîşanî min dida bê ez çawa tevbigirim da ku ez xwe bigihînim te. Jixwe ne bi alîkariya wê bûya min nikaribû xwe bigihanda te.” Wê got: “Û te ez bi wê dame naskirin?” Min got: “Belê.” Wê got: “Xwedê ciwaniya te ji dest te bigire, çawa ku te ciwaniya wê jê dizî! De êdî here cem wê lê binere.”

Hişê min tevlihev bû, bi dilekî şikestî min berê xwe da malê. Dema ez ketim sikaka mala me de, dengê qîrîn û nalînê ji hela mala me dihat. Min ji rêwîyan pirsî, gotin: “Me Ezîze mirî dîtiye li pişt deriyê malê.” Bi dilêşîyeke mezin ez derbasî hundur bûm. Diya min ji min re got: “Gunehê wê di stuyê te de û tu berpîrsiyar e ji mirina wê. Xwedê ji te re nehêle rebî!”

*Li Şehrezadê bu sibe, wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û BÎSTEMÎN

*Şehrezadê vegotino çîroka xwe berdewam kir û got:*

Şahînaşahê min ê bextewar, veca ciwanê me vegotina serpehatiya xwe ji Taca Milûkan re berdewam kir û got:

Piştî ku diya min ew nifir li min kirin bavê min jî hat, me bi hev re amadekariyên rakirina cenazeyê xwe kir û em çûn me ew defin kir; nav û dîroka wefata wê li ser kêla tîrbê nivisand û em sê rojan li ser mezelê wê man, me yasîn û Qûr’an li ser xwendin.

Piştî bi dilekî xemgîn ez vegehiyam malê, dilê min li ser wê pir diêşî-

ya. Carekê diya min hat ji min re got: “Ez dixwazim fêm bikim bê ka te çi pêkir ku wisa nexweş ket û mir? Binêr kûrê min, her car ez dihatim cem, min jê dipirsî bê ka sebeba nexweşiya wê çiyê; lê belê wê ez agahdar nekirim û tiştek ji min re negot. Îcar tu bi qedrê Xwedê kî ka ji min re bibêje bê te çi pêkir ku ew wisa bi êşa mirinê ket û çû.” Min jî got: “Min tiştik pê nekiriye.” Diya min got: “Dê Xwedê heqê wê ji te re nehêle. Mixabin wê tiştek ji min re negot, raza xwe veşart û bi dilê xwe çû, gava mir jî ez li cem bûm. Berî ku bimre, çavên xwe vekirin û ji min re got: ‘Binêre amojnê! Ez heqê xwe li pismamê xwe helal dikim û ji ber hemû tiştê ku bi min kiriye ji ez tê de dibuhurim, lewre vaye Xwedê min ji vê dinyaya fanî dibe wê dinyaya ebedî.’ Wê kêlikê min jê re got: ‘Wisa mebêje keça min, Xwedê xêr û selamê bide te.’ Piştî min sebebên nexweşiya wê dîsa jê pirsîn, lê belê wê tiştek negot. Dûvre bişirî û got: ‘Amojnêcan, heger kurê te bixwaze biçê wî cihê ku elimîye wî, jê re bibêje; dema çû û rabû ji bo ku vegere, bela van herdu gotinan bibêje: Dilsozî baş e û bêbextî xerab e! Ev bi xwe jî, ji bo ku ez bi wî re dilovan bim, dibêjim.’ Piştî tiştek da min û ez bi sûndxwarin dam ji bo ku ez wî tiştî teslîmî te nekim, heta ku tu li ser negirî.” Min ji diya xwe re got: “Ka ew tişt çiyê, nişanî min bide?” Lê min kir nekir nişanî min neda.

Piştî ez bi kêf û zewqa xwe daketim û min mirina dotmama xwe zû jibîr kir. Lewre ez ciwanekî nûhatî bûm û aqlê min di ser kum re bû. Min dixwest ku şev û roj ez li ba dildara xwe bim. Bi bêseabriyeke mezin ez li hêviya şevê mam, hema çawa bû şev ez jî rabûm ser xwe û min berê xwe da bexçe. Ez çawa gîham wir, min dît ku keçik li ser agir e ji ber bendewariya wê ya dûvdirêj. Nuh ez dîtîm, xwe çem kir stûyê min û li dotmama min pirsî. Min jî jê re got: “Wele mir û me jî ew veşart, me sê şev û sê rojan li ser xwend û va îşev jî şeva çaran e.” Gava ku ew gotin ji devê min bihîstin, giriya û qîr kir, got: “Qey min negot tê wê bikûjî? Heger berî mirina wê te ez agahdar bikirama, min ê xelatek bidayê ji ber wê qenciya ku wê bi min kiribû. Wê alîkarî bi min re kir ez gîhandim te. Heger ne ji wê bûya, ez nedigîham te. Loma ez ditirsim ji gunehên wê tiştek bi serê te bê.” Min got: “Berî bimre heqê xwe li min helal kir.” Piştî tiştê ku diya min gotibûn min ji wê re anîn ziman. Wê jî got: “Tu bi Xwedêke biçê cem diya xwe û ji wê fêr bibe bê ka ew tişt çiyê.” Rabû min jê re got: “Diya min got ku, dotmama te gotiye, gava kurê te çû wî cihê ku her car diçe wir, bila van herdu gotinan bibêje: Dilsozî baş e û bêbextî jî xerab e!”

Dema keçikê ew gotin bihîstî got: “Rehma Xwedê lê be, welehî wê tu ji nav lepên min xelas kir! Lewre min nêr kiribû ku ez xerabiyê bi te bikim. Lê êdî ez nema xerabiyê bi te dikim.” Ez matmayî mam li himber wê gotina wê û min jê re got: “Û te dixwest ku tu çi xerabiyê bi min bikî gelo, piştî ewqase dilsozîya ku di navbera me de çêbû?” Wê got: “Tu dil ketiye min, lê

temenê te pir biçûk e û dilê te paqij e, tu xerabiyê nasnake, fen û fûtên jinan nizane. Heger dotmama te sax bûya, dê bi te re alîkar ba û dê tu bisitiranda ji talûkeyan. Niha jî ez dixwazim şîretekê li te bikim û bêjim, divê ji îro û pê de tu bi tu kesên mîna me re neaxive û ne ji nêzikî wan bibe. Ne mezin û ne ji biçûk, divê tu nezîkî tu kesî nebe, lewre tu fen û fût û bêbextiyên jinan nasnakî û ya ku razên wan ji te re şîrove dikir jî êdî tune. Ez ditirsim tu bikeve tora yeke xerab û kesekî mîna dotmama te, te xelas bikî jî tunebe.”

Navberek da axaftina xwe, piştî berdeyam kir û got: “Ax ji kerbê wê dotmama te! Xwezîka berya ku bimra te ez agahdar kiribama, da ku min ew qenciya wê lê vegeranda bi xelatekê. Rehma Xwedê lê be, lewre wê raza xwe veşart û bi kesî re parvenekir û ji gişî girîngtir, wê ez gîhandim te. Loma ez ê tiştêkî ji te bixwazim.” Min jî got: “Hela bêje bê daxwaza te çi ye?” Got: “Ez dixwazim ku tu min bibî ser gora wê, da ku ez serlêdana ruhê wê bikim û ez çend ristan ji helbestekê li ser kêla wê binîvisînim.” Min jî jê re got: “Xwedê hez bike, sibehê ez ê te bibim ser gora wê.”

Wê şevê ez pê re raketim. Wê jî serê her seatê ji min dipirsî bê dotmama min berî mirina xwe tiştêk gotiye an na. Rabû min jê re got: “Dotmama min herî dawî got: “Dilsozî baş e û bêbextî xerab e! Gelo ev gotin tene çi wateyê?” Lê wê bersiv neda pîrsa min.

Serê sibehê, dildara min rahişt tûrikekî tijî dînar û ji min re got: “Ka rabe gora wê nîşanî min bide da ku ez çend gotinan li ser kêla wê binîvisînim, qûbbeyekê li ser bidim avakirin, xêran li ser belav bikim.” Min jî got: “Ser seran, ser çavan.” û min da pêşiya wê, me berê xwe da ser mezelan. Bi rê de, ew jî li kê rast hat, dînarên di tûrikê xwe de li ser wan belav kirin û her car got: “Ev sedeqeya ser ruhê Ezîzeyê ye, ya ku raza xwe veşart hetanî mirinê û ji kesî re negot.”

Hetanî em gihan ser mezêlê wê jî dildara min ew dînarên tûrikê xwe kirin sedeqe û li ser xelkê belav kirin û her car jî got: “Li ser ruhê Ezîze ya dilsoz û helwestkar.” Gava em gihan ser gora Ezîze, dildara min jî dînarên xwe qedandin. Çawa ku min gor nîşanî wê da, wê jî xwe bi ser gorê de avêt û kûrîn pê ket, girîya û hey girîya. Piştî keskiyekî ji pola û çakûçekî biçûk ji tûrikê xwe derxist û bi nivîseke spehî ev çend risteyên helbestî, li ser kêla wê ya kevirî kola:

Min rêya xwe bi goreke ciwan xist  
Ku bi nûra buhuştê tijî bû ew mişt  
Çend çiçek û heft heb qurnifil  
Li ser dilîstin li gel qefleke gul  
Min gazî kir got, ev gora kê ye?

Got, bi edep be ev gora firaqê ye  
 Min got, Xwedê te bisitirîne giyan  
 Bila cennet be cihê te ez qurban  
 Aşiqên hejar her bê şens û bext in  
 Gava binax dibin ji ser wana ax in  
 Ger bişêm ez ê bihuştê raxim ser te  
 Bi hêsirên xwe ez ê av bidim gulên te

Di pey wê re, dîsa giriyeke biêş kir û rabû ser xwe. Ez jî pê re rabûm û me berê xwe da bexçeyê wê. Bi rê de, ji min re got: “Tu bi qedrê Xwedêki, tê qet ji min qut nebî. Herdem were serdana min!” Min jî got: “Tu çawa dixwazî, bila wisa be, daxwazên te li ser serên min, li ser çavên min in.”

Çûna min a cem wê, bi wî hawî berdewam kir. Her ku ez diçûm cem, qedr û qimetê min pir digirt û her car jî wateya wan gotinên ku dotmama min Ezîze ji diya min re gotibûn, ji min dipirsî û min jî ew gotin li ber guhên wê dubare dikir. Bi wî hawî çûn û hatina min a cem wê berdewam kir, her car jî min dixwar, vedixawr, xwe dişûst, kincên xwe diguhertin, di nava kêf û şahiyê de, di nava zewq û sefayê de min jiyana xwe berdewam kir, hetanî ku ez pir qelew bûm. Êdî min dotmama xwe Ezîze jî jibîr kiribû.

Min salekê sax wisa berdewam kir. Di serê salê de, ez çûm hemamê min xwe şûst, por û rûyê xwe kur kir, kincekî nû û buha li xwe kir; piştê ez derketim hatim, min ava gulan bi xwe dakir û çend îskan şerab vexwarin hetanî ku ez serxweş ketim. Piştî ku şev kete erdê, min bêriya wê kir. Bi wî halê xwe yê serxweş, ez rabûm ser xwe û min berê xwe da bexçeyê wê û ez meşiyam bêyî ku ez bizanim bê ez bi ku ve diçim. Ji ber ku ez sermest bûm, min rêya xwe şaş kir û ez ketim sikakekê ku jê re digotin Sikaka en–Neqîb. Gava ez di wê sikakê de dimeşiyam, min pîrejinek dît ku di destekî wê de mûmeke pêxistî û di destê din de jî nameyek li hev pêçayî hebû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê ji vegotina çîroka xwe birrî.*

ŞEVA SED Û BÎST Û YEKEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Şahî şahê min ê bextewar! Vêca ev xortê me Ezîz, vegotina serpêhatiya xwe ji Taca Milûkan re berdewam kir û got:

Îcar gava ez derbasî Sikaka Neqîb bûm, çavên min li pîrejinekê ket ku di destekî wê de mûmek hebû û di destê din jî nameyek. Di ber xwe de ev riste dixwendin û digot:

Xwedê qencyê bide mizgînkare min

Ku agah anî îro û bi xweşî da min  
Ku mizgînî qebûl bikira wî ji min  
Minê dilekî wisa hestiyar bida wî  
Ku kêliya xatirxwestinê biteqîne

Di pey wan ristan re çend ristên din jî xwendin û got:

Tu bi xêr hatiye vir ey qasidê mêvan  
Axaftina te çiqasî xweş e ji bo dilan  
Ey mehdîyê hezkir ê dil û hinavan  
Silava Xwedê li ser te bi hemû caran

Vêca gava wê pîrejînê ez dîtîm, ji min re got: “Kurê min gelo tu dizanî bixwînî?” Min got: “Belê Xaltîcan.” Wê jî got: “A ji te re ev name û ka wê ji min re bixwîne.” Pêre jî name da destê min. Min rahişt nameyê ji destê wê, min ew vekir û jê re xwend. Naveroka nameyê mirov dikare bibêje ku “ji warê wendahî û xerîbiyê silav li ser dildaran” bû.

Gava wê ew gotin ji devê min bihîstin, dilxweş bû dûa ji min re kir û got: “Xwedê tengahîya te derbas bike çawa ku te jî ya min derbas kir!” Piştî, nameya xwe dîsa ji destê min girt û çû. Hîna du gavan ji min dûr neketibû, malmîzka min bi awayekî ecêb zorî da min. Ez jî di cihê xwe de rûniştîm, ji bo ku ez mîza xwe bikim. Dûvre ez dîsa rabûm ser xwe, min kirasê xwe berda, lê hîna ez birêve neçûbûm, ew pîrejîn dîsa li min vegeheriya, hat destê min maçî kir û got: “Mîrzayê hêja û dilovan! Xwedê te bisitirîne û te bi ciwanîya te şa bike û qusûrên te veşêre. Ez ricê ji te dikim ku tu çend gaveki bi min re bê hetanî ber wî deriyê hanê, lewre min naveroka wê nameya ku te ji min re xwend ji wan re got, lê wan ji min bawer nekirin. Vêca tu bi min re bihata hetanî ber derî û te ew name ji piş derî ve ji wan re bixwenda dê baş bûya.” Min jî jê re got: “Gelo çi çîrok li pey vê nameyê heye?” Got: “Kurê min, ew name ji destê kurê min ê wenda hatiye; ji beriya deh salan ve, bi kerwanekî ticaretê re çû xerîbiyê û êdî me nema tu agahî jê girtin. Me got belkî çûye rehetê, piştî jî ev nameya wî hat. Vêca xwişkê wî heye ku ji roja çûna wî ve bi şev û roj li ser digrî. Piştî ku ev name hat ez çûm min agahî dayê û min jê re got, birê te dijî û rewşa wî baş e, lê belê wê ji min bawer nekir û got: ‘Misoger divê tu herî wî kesê ku name xwendiyê binî vir, da ku ew bi devê xwe bibêje û dilê min bikeve cî de.’ Vêca kurê min tu jî dizanî ku dildar timî bi gûman in û zû bi zû ji mirov bawer nakin. De êdî qencîyekê bi min bike û were vê nameyê ji pişt perdeyê ve bixwîne, da ku xwişka wî guhdar bike, dilê wê bikeve cî de û tu jî bibî xwedî xêr. Lewre kesê ku li vê dinyayê kuleke yekî rehet dike, Xwedê jî li wê dinyayê derdên wî çareser dike, wek ku Hz. Mûhammed jî gotiye ‘Ê ku li vê dinyayê kuleke yekî rehet dike, Xwedê Teala jî heftê û du kerbên wî çareser dike li wê dinyayê.’ Êdî min jî xwe li te girtiye û tu jî min neşkîne!” Min jî got: “Ser seran, ser çavan.”



Piştire, wê da pêşiya min, min jî da pey wê û ez çûm hetanî em gihan ber deriyê malek mezin î biheybet, ku ji paxirê sor bû. Ez li ber derî rawestiyam, pîrejînê jî bi zimanekî Îranî gazî kir. Bi dengê wê re, di cî de keçeke ciwan bi lez daket xwarê. Çawa ku ez dîtîm jî, bi zimanekî Erebi yî şêrîn axivî ku min deng mîna yê wê nebihîstibû, got: “Belê dayêcan, ev e gelo yê ku hatiye nameyê bixwîne?” Pîrê jî got: “Erê.” Wê gavê wê destê xwe direjî min kir ji bo ku nameyê bide min. Li wî aliyê derî bû û bi qasî gav û nîvekê mesafe di navbera me de hebû. Min ser û milên xwe di derî re derbas kirin û min destê xwe dirêj kir ji bo ku ez nameyê ji destê wê bigrim. Jixwe ez ji wê bêhtir nezîkî derî bûm. Di wê navberê de hew min dît ku pîrejînê destê xwe daniye ser piştî min û min bi hundur de didehfine. Hetanî ez li xwe zîvirîm, min bala xwe dayê ez di hundurê malê de me. Pîrejîn bi lez derbas bû hundur û derî li pey min girt û xiliqand. Keçik jî di cî de bi min ve hat û hişt ku pîrê bide pêşiya me û mûm jî di destê wê de. Me jî da dû wê û em çûn hetanî ku me heft derî û heft hêwan derbas kirin. Herî dawî em derbasî eywanekê kirin ku çar dîwan tê de hebûn, li wê derê ez bi tenê hiştîm û çûn eywaneke ji mermerê ku hemû dîwan û perdeyên wê ji hevrêşim û dibac bû. Hemû mînder û balifên wê jî wisa. Du dikên ji paxirê zer û textekî razanê ku ji zêrê sor bû û bi dûrr û gewheran hatibû xemilandin. Li derveyî wan, gelek cihên rûniştinê, xaliyên raxistî, ber goşeyên bextewariyê ku tenê li qesrên qiralên mîna te peyde dibin. Piştire keçik hat cem min, ez himbêz kirim û ji min re got: “Ezîz! Gelo tu dixwazî bimirî, an jî bijî?” Min jê re got: “Ez dixwazim bijîm.” Wê got: “Heger tu bixwazî bijî, wê çaxê bi min re bizewic!” Min got: “Ez naxwazim bi yeke mîna te re bizewicim. Wê ji min re got: “Heger tu bi min re bizewicî, tê ji keça Delîleya hilekar xelas bibî. Min jê re got: “Û ew keça Delîleya hilekar kî ye?” Keniya û got: “Çawa tu wê nasnakî û hetanî niha tu bêhtirî sal û çar mehan pê re mayî. Xwedê beleya xwe li wê bide, wilehî tu kes bi qasî wê hilekar nîne. Xwedê dizane bê ka çi qase mirov kuştine beriya te û çi qas xerabî kirine. Tu jî demeke evqasî dirêj pêre ma, gelo çawa tu bi saxî ji destên wê filitî?”

Gava min ev gotinên wê bihîstin, ez mam şaş û min jê re got: “Xatûna min û te çawa ew naskir gelo?” Wê got: “Çawa ku felek hemû bobelatên xwe dizane, ez jî wisa wêna nas dikim. Lê belê ez dixwazim tu serpêhatiya xwe û wê ji min re vebêje, da ku fêr bibim tu çawa ji nav lepên wê xelas bûye.” Rabû min ji serî hetanî binî, serpêhatiya xwe û wê û dotmama min Ezîze jê re vegot. Dema serpêhatiya min bihîst û mirina dotmama min fêr bû, çavên wê tijî hêsir bûn, destên xwe danîn ser hev û got: “Xwedê wê wendahiye bi daneke din li te vegeirîne Ezîz! Xwedê wê bide ber dilovaniya xwe, bi xêra wê tu ji destê keça Delîleya hilekar rizgar bû. Heger ne ji wê bûya, tê av û av biçûya. Niha jî ez ditirsim ji bo te, ji ber fen û bêbextiyên wê. Lê belê ez nikarim biaxivim jî.” Min jê re got: “Bi navê Xwedê tu rast dibêji, lewre ew

tişt hemû qewimîn.” Wê jî serê xwe hejand û got: “Di roja îro de keseke mîna Ezîze peyde nabe.” Min got: “Gava ku mir jî wesiyeteke ji min re hişt ku ji du gotinan pêk dihat: “Dilsozî baş e, bêbextî jî xerab e !”

*Li Şehrezadê bû sibe , wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û BÎST Û DUYEMÎN

*Şehrezadê ji Şehriyar re got:*

Şahînşahê min ê bextewar! Ezîzê ciwan serpêhatiya xwe ji Taca Milûkan re vegot û berdewam kir:

Dema keçikê ew gotinên min bihîstin, got: “Ezîz! Bi navê Xwedê tiştê ku tu rizgar kiriye ev herdu gotin in, van gotinan tu rizgar kiriye ji mirinê. Bi Xwedê min jî pir dixwest ku carekê tenê be jî ez te bibînim, lê ez bi ser neketim hetanî roja îro ku min hîleyek li te kir û bi serkeftî tu anî hetanî vir. Lewre tu nûgihîştî yî û tu fen û fûtên jin û pîrejinan nizanî.” Min jê re got: “Na wele ez nizanîm.” Wê jî got: “Bila serê te sax be, yên mirî mirine û yên sax jî divê jiyana xwe berdewam bikim. Tu jî xortekî ji dil û hêjaye û ez jî tenê li ser qewlê pêxember û şerîetê te dixwazim, ne bi awayekî din. De êdî bêhna xwe fireh bike û bila dilê te aram be. Jixwe ez ê tu tiştêkî ji te nexwazim û tu çi bixwazî ji mal û milk, xwarin û vexwarin û kinc û pêdiviyên, di cî de ez ê ji te re bînim. Ez dixwazim ku tu tenê weke dikekî bî li ba min.” Min jî got: “Û dik çi dikin gelo?” Bi vê pîrsa min re destên xwe li hev xistin û tîqetiq pê ket, kenîya hetanî ku ziko-piştê bû. Piştê got: “Qey tu nizanî bê dik çi dike?” Min jê re got: “Bi navê Xwedê ez nizanîm bê karê dik çiyê çi dike.” Wê got: “Karê dik ew e ku bixwe vexwe û bazde ser mirîşkan!” Min fedî kir ji ber wê gotina wê, lê dîsa jî min pîrsî û got: “Gelo ev e karê dik?” Got: “Belê ev e û niha jî ez tenê ji te dixwazim ku tu newqa xwe bişidîni, vîna xwe xwirt bikî û bi min şa bibî.”

Piştê, destên xwe li hev xistin û got: “Dayê hela wan ên cem xwe bîne hundur!” Di cî de pîrejîne derbasî hundur bû ligel çar şahidan û di destê wê de jî destmaleke hevrêşimî hebû ku ew bi ser serê keçikê dakir û çar mûm jî pêxistin. Şahidan silav li min kirin û rûniştin, keçikê hinek ji wan kirin wekilê xwe ji eqda zewacê û ên mayîn jî bûn şahid û katib. Keçikê di eqda zewacê de da diyarkirin ku wê qelenê xwe hemû stendiye û bi qasî deh hezar dînarên min di stûyê wê de ne. Herî dawî jî kirya şahidan da wan û ew bi şûn de şandin. Wê gavê keçikê çû kincên xwe ji xwe kirin, binkirasekî tenik î ku bi zêr neqîşandî bû li xwe kir û hat bi destê min girt, ez birim ser nivîne û ji min re got: “Tiştê helal şerm tê de nîne.” Piştê xwe li ser piştê dirêj kir û ez bi ser xwe ve kişandim. Hilma wê bideng çû û hat, binkirasekê xwe bi joy

ve hilda hetanî ser memikên xwe û qurîncokêk ji min da. Gava min ew di wî halî de dît, êdî min nema dikarîbû xwe bigirta bêyî ku ez dest bavêjê. Çawa min xwe bi ser de avêt û lêvên wê metin, ah û oh pê ketin, geh giriya, geh axîn pêket, hetanî ku qîrîna me giha derve û em jî bi ser ketin û gihan lûtkeya bextewariyê. Dûvre jî xweberî em di xew re çûn.

Sibehê dema em şiyar bûn, min xwest ku ez rabim herim. Lê ew bi devlikenî derket pêşiya min û got: “Qey tu dibêjî derketina ji hemamê weke derbasbûna wê hêsan e? Ez texmîn dikim ku tu min jî weke keça Delîleya hîlebaz dibînî? Ez te hişyar dikim ku tu wisa nefikire, lewre tu tenê mêrê min ê bi qewlê şerîetê yî. Vêca heger tu serxweş bî, bi ser xwe ve were û hişê xwe bixe serê xwe de! Divê tu bizanibî ku ev mala tu têde yî, tenê ji salê carekê deryê wê vedibe. Tu dixwazî rabe here li deriyê derve binêre, da ku tu bi çavên serê xwe bibînî bê ez çi dibêjim.”

Ez rabûm ser xwe û ez çûm, min li deriyê mezin nêrî, min dît ku bizmarkirî ye. Ez lê vegeyriyam û min jê re got: “Rast e, derî bi temamî girtî ye.” Wê jî ji min re got: “Ezîz, bi qasî ku bi salan têra me bike ard, nîsk, nok, fêkî, şekir, goşt, pez, mirîşk û hwd. li cem me hene. Loma ji niha hetanî saleke din, dê deriyê me neyê vekirin.” Min got: “Lahewle welaqewete îla billa!” Wê jî got: “Ma tengasiya te çiyê mago? Ji xwe tu karê dikan baş dizane!”

Bi wê gotina xwe re keniya, ez jî pêre keniyam û ez tev li nêrina wê bûm, min bi ya wê kir. Ez li cem mam û êdî tenê min dixwar, vedixwar û ez pê şa dibûm, hetanî ku salek sax di ser re derbas bû. Gava diwazde meh bi temamî derbas bûn, Xwedê zarokêk dayê û êdî ez jî bûm bavê zarokêkî. Roja serê salê, deriyê malê vebû û xulama dest pê kir bi çewalan kak, ard û şekir derbasî hundur kirin. Min jî xwest ku ez derkevîm, lê belê wê ji min re got: “Xwe ragire hetanî eşayê, da ku çawa tu hatiyî bi heman şeweyê jî tu derkevî.” Gava ku şev hat û min xwest ez derkevîm jî, tirseke ecêb ketibû nava min de û laşê min giş diricifi. Wê gavê, ji min re got: “Bi navê Xwedê, ez nahêlim ku tu îşev derkevî, hetanî tu soz nedî ku tê di heman şevê de vegeyriyê, berî ku derî were girtin.” Min ew şertê wê erê kir, wê jî bi min sûnd da xwarin bi Xwedê û Qur’an û telaqê jinberdanê.

Piştê, ez ji cem wê derketim û min berê xwe da bexçe, weke berê. Ez pir qeherîbûm û saleke min çêbûbû ku ez nehatibûm wir. Lê dîsa jî, min bala xwe dayê ku deriyê bexçe vekirî ye. Di dilê xwe de, min ji xwe re got: “Piştî salekê, ez wisa ji nişka ve hatim vir, gelo wê dildara min hîna mîna berê be, li cihê xwe be an na? Hîna dinya eşa bû, lê ez mecbûr bûm ku destpêkê riya xwe bi vir xînim, beriya ku ez herim diya xwe bibînim. Piştê, ez derbasî bexçe bûm.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da axaftina xwe, hetanî ku dîsa şev bikeve erdê.*

## ŞEVA SED Û BÎST Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji qiralê gewre Şehriyar re berdewam kir û got:*

Şahînşahê min ê bextewar, tê gotin ku Ezîzê ciwan vegotina serpêhatiya xwe ji Taca Milûkan re berdewam kir û got:

Ez derbasî nava bexçe bûm û ez çûm hetanî ku ez gîham cihê civanê me yê her car. Li wir, min dît ku keça Delîleya hilebaz rûniştî ye, serê wê di ber wê de ye û destê wê jî di bin çena wê de ye. Rûyê wê pir hatibû guhertin û koncalên çavên wê kûr bûbûn. Gava serê xwe rakir û çav li min ket, got “Şikir ji Xwedê re ku tu bi selameti hatî.” û da xwe ku bi min ve rabe, lê belê bi kelecane ket erdê. Ez jî ketim ber fediyê, min serê xwe li ber wê tewand û ez pê ve çûm, min ew maçî kir û jê re got: “Te çawa dizanîbû ku di vê seetê de ez ê werim cem te?” Wê got: “Tu agahî bi min re tunebû di vê derbarê de. Lê belê wille ev saleke ku xew bi çavên min nebûye. Ji roja ku tu ji cem min derketiye hetanî vê kêliyê, her şev ez wisa şiyar dimînim li bendî hatina te. Belkî tê bîra te, ew roja ku tu ji vir derketî, te ew bedlê cilan ê nû li xwe kiribû û te gotibû ez ê vegerim. Lê belê ne şeva ewil, ne ya duduya ne ya sisya tu nehat û ez jî li hêviya vegera te mam, hetanî roja îro. Jixwe aşiq jî wisa tevdigerin. Lê ez dixwazim ku niha tu sebebê wendabûna xwe ya salekê ji min re bibêje.”

Rabû min çîroka xwe jê re vegot. Gava agahdar bû ku ez zewicîme, rûyê wê zer bû û mehdê wê xerabû. Min jê re got: “Ez niha hatime cem te û beriya şeveqê jî divê ez herim.” Wê jî got: “Qey ne bes bû ku hîlê li te kir, bi te re zewicî u tu salekê jî li cem xwe girtî hişt, bêyî ku bihêle tu min û diya xwe bibîni? Qey ev giş ne besî wê bû ku tu bi telaqê jinberdanê daye sûndxwarin ji bo tu beriya şeveqê vege? Naxwe dûrketina te ya şevê ewqasî pê zor tê, lê belê gelo ew dizane bê çi halê ew a ku salekê li hêviya te maye, piştî ku dilê wê tu naskiriye? Rehma Xwedê li Ezîzeyê be, ji xwe tiştê ku bi serê wê hat, bi serê tu kesî nehatiye. Sebra ku wê nişan da, tu kes nikare sebreke wisa nişan bide, di mijareke wisa de. Di ser wê gişî re jî, ji qehra te re mir û wê tu parast. Min digot belkî tê werî min tu berda, naxwe min dikarîbû tu girtî bihişt û tu bikuşt a jî.”

Piştî girya, hêsir barandin, hêrs bû û bi awirin tûj li min nêrî. Gava min ew di wî halî de dît, çogên min fisiyan û tirs ket dilê min de. Êdî mîna ku ez li ser agir bûm, qûna min erd nedigirt. Di wê navberê de ji min re got:

“Piştî ku tu zewicî û zarokek ji te re çêbû, êdî tu fêde di te de nemaye! Lewre tu nema dikarî hevaltiya min bikî. Kesê zewicî çet nikarin nêzîkî min bibin, tenê xort dikarin şevbuhêrkê bi min re bikin. Te jî çûye ez firotim bi wê qehpîka hanê! De binêr wellehî ez ê wisa li te bikim ku êdî tu ji tu kesî re nebî, ne ji min re û ne ji wê re.”

Dûvre, ji nişkê ve qîrek da û bi wê qîra wê re deh carîye derbasî hundur bûn û bi yek carê re ez avêtim erdê. Wê jî çû rahişt kêrekê û got: “Ez ê weke nêriyekî te serjêbikim. Ev jî dê cezayê te yê herî sivik be, ji ber wê bêbextiya ku te bi dotmama xwe re kirî.”

Gava min ew hemû di ser xwe de dîtî û rûyê min di nav axê de ma û min kêr jî di destê wê de dît, ez têgihiştim ku ez ê bême kuştin. Min xwe avêt bextê wê û lave jê kirin, da ku li min bibhure. Lê belê her ku diçû, ew hartir dibû. Loma di cî de ferman da cariyeyan, wan jî dest û nigên min girêdan, ez li ser piştê dirêj kirim û li ser zikê min rûniştin. Du cariyeyan bi serê min girtin, dudan bi serê nigên min girtin û dudan jî bi teşkên min. Ew jî rabû ser xwe û ferman da du cariyeyan ji bo ku li min bidin. Herduyan li min dan, hetanî ku ez ji ser hişê xwe çûm û deng ji min bilya.

Gava ez careke din bi ser hişê xwe hatim, min ji xwe re got “Ez bimrim, ji vê lêdanê çêtir e!” Û wê kêliyê ew gotina dotmama min hate bîra min, ya ku digot, xwe ji şerê wê biparêze. Gava ku ew gotina Ezîzeyê hat bîra min, min qîr dan û ez li ber geriyam ji bo ku min efû bike. Wê jî kêr tûj kir û ji cariyeyan re got: “Wî tazî bikin!”

Di wê kêliyê de, îlhamek ji ba Xwedê ket dilê min de û gotineke din ya dotmama min hat bîra min, di cî de min bi lêv kir û got “Dilsozî baş e û bêbextî jî xerab e!”

Çawa ku wê ew gotin bihîst, qîrek da û got: “Rehma Xwedê li te be ey Ezîze! Bi wê ciwaniya xwe te giyan da pismamê xwe, di saxî û mirina xwe de jî.” Piştê, ji min re got: “Bi xêra van herdu hevokan, tu ji mirinê filitî. Lê belê divê ez tiştêkî bi te bikim ku bibe ders ji wê qehpîka ku nehişt tu bê ba min.” Di pey wê re gazî cariyeyan kir û ferman da wan ji bo ku li min siwar bin û herdu nigên min bi hev ve girê bidin. Piştê ji ser min rabû û çû beroşek paxirî danî ser agir û hinek ‘sîrca’ vala kirê û penêr pê qeland. Di pey re hat cem min, ewkên min bi benekî girêdan, ben da destê wan cariyeyan û ji wan re got: “Bikşînin!” Çawa ku ben kişandin, êşeke ecêb ket nava min de û ez çûm dinyake din. Dûvre destê xwe hilda û ewkê min ji qurm ve jêkir, ez kirim mîna jinan. Cihê jêkirî kewand, derman danî ser û girêda. Ez jî ji ser hişê xwe çûm. Gava ez bi ser xwe ve hatim, xwîn sekinibû. Qedehek mey da min û ji min re got: “Niha êdî rabe, here cem ew a ku bi te re zewicîbû û dil

ji te tunebû ku ji bo şevêkê tenê jî te bidî min. Bila rehma Xwedê li dotmama te be ku ewê tu xelas kir ji nav lepên min! Divê tu bizanibe ku heger te ew herdu hevokên wê ji min re negotana, min ê tu bikuşt. De rabe here, tu kê dixwazî here cem wan. Jixwe tiştê ku ji min re lazim bû, min ji te stend û êdî tu pêwîstî û daxwaziya min bi te nema. Zû rabe, destava xwe bigire û duayekê ji dotmama xwe re bike.” Piştî, bi nigê xwe pîhnek li min xist û ez di devê derî re derxistim. Êşa nav şeqên min dijeniya û min nikaribû ez bimeşim. Ez hêdî hêdî meşiyam, hetanî min xwe gîhand malê. Derî hîna vekiribû, bi lez min xwe avêt hundur û ez ji ser hişê xwe çûm. Dûvre jina min hat ez dîtîm. Rahişt min, ez birim hundur û li min meyzand ku ez bû-me mîna jinekê. Di wê navberê de ez di xewre çûm û gava ez bi ser xwe ve hatim jî, min dît ku ez li ber deriyê bexçeyê keça Delîleyê me...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA SED Û BÎST Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê ji Şehriyar re got:*

Şahînsahê min ê ezîz, Dendanê Wezîr vegotina çîroka xwe ji Şewqa Mekan re berdewam kir û got ku, Ezîzê ciwan ji Taca Milûkan re got:

Gava ez bi ser xwe ve hatim, min dît ku ez li ber deriyê bexçeyê keça Delîleya hîlebaz im. Ez rabûm ser xwe û bi bêhtengiyeke mezin, min berê xwe da mala bavê xwe. Ez hatim, derbasî hundur bûm, min dît ku diya min digrî. Çawa ku ez dîtîm, ruh bi rûyê wê ve hat û qîr kir, got: “Ev tu yî kurê min! Ka tu li kîjan erdê Xwedê yî malneketo!”

Ez ber bi wê ve çûm û min xwe bi ser de avêt. Wê jî ji nêz ve li min nêrî û tê derxist ku rewşa min ne asayî ye, lewre rûyê min giş soro-moro bûbû û nûr di çavên min de nemabû.

Wê kêlikê dotmama min hat bîra min û ew qenciya ku wê bi min kiri-bû hat ber çavên min û careke din ez têgihîştim û min bawer kir bê hezkirina wê ji min re çiqasî pir û jidil bû. Çavên min tijî hêsir bûn û ez giriyam, diya min jî bi min re giriya û ji min re got: “Kurê min wele bavê te jî miriye!” Dema min mirina bavê xwe bihist, kûrîn bi min ket û ez bihêrs giriyam hetanî ku ez ji ser hişê xwe çûm. Gava ez bi ser hişê xwe hatim, çavên min li cihê ku dotmama min rûdinişt ket û careke din ez giriyam hetanî ku ez ji ser xwe çûm. Ew rewşa min wisa berdewam kir, hetanî nivê şevê. Diya min, ji min re got: “Bavê te beriya deh rojan wefat kir.” Min jê re got: “Ji xeynî dotmama xwe pê ve, ez di tu tiştî de nafikirim. Lewre wê ji min pir hez dikir û min qîmetê wê nizanibû û tiştê ku niha bi serê min de hat jî, di heqê min

de ye.” Wê jî got: “Û çî bi te hatiye?”

Rabû tiştê ku bi serê min hatibû, min jê re got, ji serî hetanî binî. Ew jî seetekê li ser wê rewşa min giriya û piştî rabû, xwarin ji min re amade kir. Piştî ku min hinek xwarin xwar û hinek şerab vexwar, min ew bobelata ku dawiyê bi serê min de hatibû, bi hûrgulî jê re got, wê jî got: “Şikir ji Xwedê re ku tu nehatiye kuştin.” Di pey re, birîna min derman kir û li min meyzand heta ku ez bi ser xwe hatim. Dûvre ji min re got: “Kurê min, niha êdî ez dikarim wê emaneta dotmama te nîşanî te bidim, lewre ew ya te ye û wê ez bi sûnd dabûm ku ez nedime te hetanî tu wê bi bîr neynî, li ser wê xemgîn nebî û têkiliyên xwe bi yê din re qut nekî. Niha jî, min ev hemû di te de dîtî.” Di pey vê gotina xwe re, rabû sindoqa xwe vekir û ew destmalka ku sûretê xezalê li ser neqîşandî bû -ku beriya niha min dabû te- jê derxist û da min. Min lê meyzand, min dît ku ev helbest tê de nivîsandîye :

Te dilê min rakir ser piyan û tu rûniştî  
Te xew ji çavên min revand û tu nivîstî  
Çawa tu hatî te di hinavan de cî girtî  
Ne dilê min te ji bîr dîke ne jî ronîya çavan  
Te gotibû ez ê veşêrim eşqa te bi soz û peyman  
Lê belê gotegotkaran tu ji rê derxistin niyan  
Te got û wan got, lê ya ku li holê ma Ezîzecan  
Heger rojekê ez mirim ey gelî dost û hevalan  
Ji kerema xwe re li ser kêla min binivîsîn  
Ev gora li ber çavên we, gora jineke şeyda ye

Vêca gava min ev helbest xwend, giriye min hat, min hêsir barandin û bi kulman ez bi rûyê xwe ketim, min li xwe da. Piştî gava min destmal baş ji hev vekir, min kaxezeke din jî tê de dît; li ser nivîsandî “Pismamo, bizanibê ku min heqê xwe li te helal kiriye û ez hevî dikim ji Xwedayê xwe ku te û hezkiriya bi hev şa bike û jiyana we bextewar bike. Lê belê heger belayek bi serê te hat, divê tu ne li wê Delîleya hîlekar vegere û ne jî li kesek din. Tenê hewl bide ku tu bi sebr û aram be li himberî beleya xwe. Îcar şikir ji Xwedayê mehrîban re ku hişt mirina min berî ya te be û tu hîna bi selamet î. Ev destmalka ku sûretê xezalê li ser e, li cem xwe bigire û wê biparêze. Lewre ew sûret bû a ku ber dilê min digirt, di dema çûna te de û heger te zora wê kesa ku ev sûret çêkiriye bir, dûrî wê bikeve, nehêle ew nêzikî te bibe û pê re nezewice. Lê belê heger tu nikaribî bi wê û tu rêyekê jê re nebînî, divê tu nêzikî tu jinan nebî, piştî wê. Divê tu bizanibe ku ya ev sûret çêkiriye, her sal yeke din çêdike û dişîne hêleke welat, da ku huner û navê wê belav bibe. Lewre ev kes nikare mîna wî resmên weha çêbike. Ew Delîleya hîlebaz jî, gava ew resmê xezalê bi dest xist, nîşanî her kesî da û got: ‘Xwişkek min heye van resman çêdike.’ Lê baş bizanibe ku ew gotina wê derew e. Xwedê

wê bihetikînî. Ji ber ku ez dizanim wê dinya li te teng bibe piştî mirina min. Belkî di rûyê wê de, tu ji mal biterqî bi çolan ve û li seranserê welat tu bigerî û tu bixwazî xwedîya vî resmî bibinî ji. Heger wisa bibe, divê tu bizanibî ew a ku ev resim çekiriye, keça qiralê Cezayirê El-Kâfûr e.”

Gava min ew nivîsa wê xwend û min rastiya mijarê fêr kir, hêsir ji çavên min hatin xwarê û êşeke dijwar ket nava min de, girî û êşa min hetanî şevqê berdewam kir, bi wî hawî. Diya min jî her car bi min re digiriya. Nêzikî salekê ez di wî halî de mam; tenê min li wê nivîsa dotmama xwe dinêrî û ez digiriyam. Piştî tacirên bajêr, yên ku em bi hev re dixebitîn, dest bi amadekariyên xwe kirin ji bo ku bikevin ser rêya ticaretê. Diya min ji min re got: “Tu jî amadekariyên xwe bike û bi wan re here, belkî rêwîti û ticaret derdê te bi te bide jibîrkirin. Ji xwe rêwîtiya kerwan dibe ku du-sê salan berdewam bike. Dibe ku di wan salan de tu hebekî bi ser xwe ve werî.”

Diya min pir li ber min geriya, hetanî ku ez qanix kirim û amadekariyên min kirin, ez bi wan re xistim rê de. Lê bi rê de jî, hêsirên min her dibariyan û êşa dilê min berdewam dikir. Her cara ku em digihan bajarekî, rawestgehekê û em disekînin, min ev destmalka xwe li ber xwe radixist, li vî sûretî dinêrî, dotmama xwe bi bîr tanî û ez li ser digiriyam, çawa ku niha jî ez dikim. Lewre wê pir ji min hez dikir û ji derdê min mir. Ligel ku wê timî qencî bi min kir, min jî tenê neheqî lê kir. Her car ez bi taciran re derdiketim seferê û piştî salekê-duduyan ez dîsa vedigeriyam, lê belê xemgîniya min li şûna ku kêr bibe, zêdetir dibû.

Tiştê ku ez bêhtir diêşandim jî çûna min a Cezayira Kafûr bû û tiştên ku min li wir dîtibûn. Lewre ez çûbûm serdana Cezayira Kafûr û Keleha Tîtikî (ya ji camê) ku min tu keleh mîna wê nedîtine. Ew der bi xwe, heft Cezayir in û qiralê wan ‘Şehrîman’ bû ku keçek wî hebû bi navê ‘Dunya’. Vêca ji min re gotin ku ew e ya ku sûretê xezalan çêdike û a destê min bi xwe yek ji wan e. Îcar gava ew agahî giha min, bêrîkirineke dijwar ez rapêçam, hestî agirî nava min dagir kirin û ez ketim nava fikarî kûr û xemgîniyêke dilbîş. Ez li ser xwe û rewşa xwe giriyam, ji ber ku êdî ez bûbûm mîna jinan û ‘ewkê’ min hatibû jêkirin û tu çare jî di destên min de tûnebûn. Ji ber wê yekê ve, ji roja ku ez ji Cezayira Kafûr veqetyame, hêsir ji çavên min dibarin û êş ji dilê min dernakeve. Ev demeke ku ez di vî halî de me û ez baş nizamim bê ka ez dikarim vegerim welatê xwe û herim li wê derê, li cem diya xwe bimrim an na! Lewre jî vê dinyayê têr bûme.

Piştî, Ezîz vegotina xwe birrî û dîsa dest bi girî û gilî û gazinan kir. Hem li neqşa sûretê xezalê dinêrî û hem jî hêsirên xwe paqij dikirin. Pêre jî ev helbest digot:



Yekî ji min re digot bêgûman dê riyek hebe  
Lê gelo ji hêsrên min re jî dê çareyek hebe?  
Wî got: Erê, piştî kurt-demekê dê ew bibe  
Min got, û kî ye yê ku dê baweriyê bide?

Dûvre dişa hêsir bi ser hinarkên wî de hatin û dişa axivî, ev helbest di ber xwe de xwend û got:

Xwedê jî dizane ku piştî çûna te ez pir giriyam  
Ez wisa giriyam hetanî ku min hêsir deyn kirin  
Wê gavê yekî ji min re got, metirse dostê min!  
Hinekî xwe ragire bêgûman tu dê bi ser bikevî  
Min jê re got dosto, kanî ew xweragirtin kanî!

Piştî jî Ezîz got: “Çiroka min jî ev e qiralê min.” Îcar gava Taca Milûkan ew serpêhatiya wî xortî guhdar kir, agir bi dilê wî ket. Bi taybetî jî gava ku spehîbûna Dunya Xatûn bihîst û pê de.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navberek da vegotina çiroka xwe.*

ŞEVA SED Û BÎST Û PÛNCÊMÎN

*Şehrezadê berê xwe da Şehriyar û jê re got:*

Veca Şahînsahê min ê bextewar, tê gotin ku Wezîr Dendan, vegotina çiroka xwe ji Qiral Şewqa Mekan re berdewam kir û got:

Îcar Taca Milûkan ji Ezîzê ciwan re got: “Tişte ku bi serê te de hatiye bi serê tu kesî de nehatiye! Lê ev jî teqdîra îlahî ye û min dixwest ku ez pirsra tiştêkî ji te bikim!” Ezîz got: “Û ew tişt çîye gelo?” Taca Milûkan got: “Ez dixwazim tu ji min re bibêji bê ka te çawa ew keça nîgarkêşa vê xezalê dît?” Ezîz got:

Mîrzayê min, ez bi rêya hîleyekê gîham wê. Gava ez bi kerwan re derbasî bajarê wan bûm, car ji caran ez derdiketim û ez ji xwe re li nav bexçe û bistanan digiriyam. Nobedarê bexçeyan jî kesekî pîrekal bû. Min jê re got: “Kalocan, ew bexçe yên kê ne?” Got: “Ûn Dunya Xatûn a keça qiral in, ji xwe qesra wê jî vaye di ser me re ye. Vêca heger tu bixwazî li bexçeyan temaşe bikî, tu dikarî di wî deriyê veşartî re derbas bibî û têra xwe binêrî û bêhna gul û çiçekan bikşîni nava xwe.” Min jî je re got: “Tu bi Xwedêki destûrê bidî min ku ez li nava vî bistanî bimînim, hetanî ku xatûn di vir re here, belkî awirên min pê kevin.” Wî jî got: “Dibe.” Gava ku ew helwesta erênî nişan da, min derhem dane wî û min jê re got: “Here tiştin xwarinê ji me re bikire!”

Ew jî bi wan derheman kefxweş bû, derî ji min re vekir, ez bi xwe re

derbasî hundur kirim. Em bi hev re meşîyan hetanî ku em gihan cihekî xweş. Li wir hinek fêkiyên xweş danîn ber min û ji min re got: “Li vir be hetanî ku ez herim û werim.” Ez li wir hiştim û ew çû. Piştî seatekê bi şûn de hat ku va berxekî biraştî bi xwe re anîye. Me bi hev re xwar hetanî ku em têr bûn û ez ji bê sebir bûm li bendî dîtina xatûnê.

Hîna em wisa rûniştî bûn, me dît derî vebû. Wî jî di cî de got: “Xwe veşêre!” Ez rabûm min xwe veşart. Wê kêlikê xizmetkarekî reş serê xwe di derî re dirêj kir û ji kalemêrê nehtor re got: “Kalocan, gelo tu kes li cem te heye?” Got: “Na.” Wî jî got: “Naxwe derî bigire!” Pîrekalê nehtor rabû ser xwe, deriyê bexçe girt. Di vê navberê de jî Dunya Xatûn di derî re derket.

Gava min ew dît, min got qey heyv daketiye ser erdê. Ez bi dîtina wê mest bûm û agirek ket nava min! Bi qasî seetekê li wir ma û piştê dîsa bî şûn de vegeriya qesrê û derî li dû xwe girt. Ez jî mîna tîyekî ku li avê binêre û destê wî negihêjêyê ez ji bexçe derketim û min berê xwe da mala xwe. Piştê ez têngihiştim ku ez nikarim xwe bigihînim wê hetanî ku ez nebim yek ji zilamên wê û bi taybetî jî piştî ku ez bibûm mîna jinan. Min di dilê xwe de got “Ew keça qiralan e û ez jî zilamekî tacir im, îcar ez ê çawa bikaribim xwe bigihînim wê?” Loma gava kerwanê me amade bû û zilamên min amadekariyên xwe bi dawî kirin, ez jî bi wan re ketim rê de ji bo ku em bîna vî bajarî û gava em gihan vir jî em li we rast hatin. Çîroka min jî ev e û rehma Xwedê li dê û bavê te û gûhdaran be.

### (Çîroka Taca Milûkan û Dunya Xatûn)

Gava Taca Milûkan serpehatiya Ezîzê ciwan guhdar kir, dil ket Dunya Xatûnê û hişê wî çû ser wê. Qasekî bi şûn de li hespê xwe siwar bû, Ezîz jî da rex xwe û vegeriya bajarê bavê xwe. Li wê derê maleke ku lê bimîne jê re veqetand û çî pêdiviyên wî yên jiyaniyê hebûn jî tê de bi cî kirin, ew jî li wir hişt û çû qesra xwe. Tiştê di derbarê Dunya Xatûn de bihîstibû gelek bandor lê kiribû, mîna ku bihîstin li cem wî zîvirîbe dîtina û destdayîna, xeyalê keçikê ji ber çavên wî nedîçû û ew jî hey digiriya û hêsir dibarandin.

Taca Milûkan di wî halî de ma hetanî bavê wî hat balê û dît ku rengê wî hatiye guhertin, ketiye nav çayira kul û derdan. Rabû jê re got: “Kurê min, ka ji min re bibêje bê çî bi serê te hatiye heta ku rengê te ewqasî hatiye guhertin?” Taca Milûkan jî çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot, bê ka çawa qala Duniyayê jê re hatiyê kirin û çawa ew jî dilketiye wê de bîyî ku wê bibîne. Bavê wî jê re got: “Kurê min bavê wê qiral e û welatê wî jî dîrî vir e. De êdî dev jê berde û here qesra diya xwe. Pêncsed heb cariyê tê de ne, hemû mîna heyvan e. Te kîjan eciband, wê ji xwe re bîne. Na heger te yek jî ji wana neciband, were em ji te re keçeke qiralan bixwazin û tu jî dev ji

Dunya Xatûn berde.” Wi jî got: “Bavocan, ji wê pê ve ez tukesî naxwazim. Ew e ya ku sûretê wê xezalê neqîşandiye. Divê ez xwe bigihînim wê, yana ez ê dîn bibim û bi çolan kevim, yan jî ez ê xwe bikujim.” Rabû bavê wî jê re got: “Naxwe mohletê bide min hetanî ez qasidekî bişînim cem bavê wê û wê ji te re bixwazim, te bigihînim miradê te, çawa ku ez û diya te jî gihan hev. Heger bavê wê qebûl neke jî ez ê artêşekê bi ser wî de bişînim ku serê wê li ba wî be û binê wê li ba me be, da ku dunyayê bi ser serê wî de bînim xwarê.”

Piştî, bavê wî gazî Ezîz kir û jê re got: “Gelo tu rê nas dikî kurê min?” Ezîz got: “Belê.” Bavê Taca Milûkan jê re got: “Ez ji te dixwazim ku tu bi wezîrê min re bikeve rê û biçî wir.” Ezîz got: “Ser seran, ser çavan.” Suleyman Şah jî gazî wezîrê xwe kir û jê re got: “Bi vî xortî re biçe Cezayira Kafûr û keça qiralê wê ji kurê min Taca Milûkan re bixwaze.” Wezîr got: “Ser seran, ser çavan.” Taca Milûkan bi şûn de vegeriya qesra xwe û ket nava xemgînî-yeke kûr de. Gava şev bi ser de hat jî, dest bi girî kir û ev helbest di ber xwe de xwend:

Şev dîn bûye û hêsirên min bêdawî dibarin  
 Rivînên agirê bêriyê jî di nava min de hildibin.  
 Ji şevan bipirsîn ew dê ji we re bibêjin  
 Bê ka gelo çi karê min heye derî kûl û derdan  
 Edî şev pê de ez bûme şivanê stêrkan  
 Hêsir jî mîna teyrokê ji çavên min dibarin  
 Bi tenê mame ez êdî bê kes û bê kûs im  
 Mîna dareke hişk bêxwedî û bê kes im

Piştî Şah, Ezîz û wezîrê xwe amade kirin, mal û mulk diyarî dane wan û ew bi rê kirin. Şev û roj meşîyan hetanî ku xwe gihandin nêzîkî Cezayira Kafûr. Li qiraxa çemekî sekinîn, wezîr jî qasidek li pêşîya xwe şand bajêr ji bo ku qiralê wir agahdar bike ji hatina wan. Hîna nîv roj derbas nebûbû di ser çûna qasidê wan re, ji nişkê ve dîtî ku emîr û xizmetkarên qiral ji dûrbûna fersexekê hatine pêşwaziya wan. Bi germahî ew pêşwazî kirin û dan pêşîya wan ew derbasî bajêr kirin û piştî jî ew birin cem qiralê xwe; wan jî diyarî û hediye yên xwe pêşkêşî Qiral kirin û sê rojan di mêvantiya wî de man.

Gava ku roja çaran hat, Wezîr jî derbasî cem Qiral bû, çîroka xwe û sedemên hatina xwe jê re vegot, Qiral jî bêçare û tengav bû li himberî vê daxwaza wan, ji ber ku keça wî nedixwest bizewice. Serê xwe bera ber xwe da û seetekê sax bêdeng ma. Piştî serê xwe rakir û ji xizmetkarekî xwe re got: “Her cem şahbanûya xwe Dunya Xatûn û tiştê ku te bihîstîye jê re bi-bêje.” Tiştên ku Wezîr bi xwe re anîn jî, bîne ziman û wê baş agahdar bike. Xizmetkar rabû ser xwe çû û bi qasî seetekê nebedî bû. Piştî vegeriya û ji Qiral re got: “Şahînahê erd û ezmên! Mîna ku te ferman da ez çûm derbasî

cem Duyna Xatûn bûm û tiştê ku min bihistibû min jê re got, lê ew pir qeherî û bi daran êrîşî ser min kir ji bo ku serê min bişkîne. Lê bi revê min xwe xelas kir. Ji min re got: Heger bavê min, bi darê zorê min bide mêr ez ê mêrê xwe bikûjim.”

Qiral li Ezîz û Wezîr zîvirî û ji wan re got: “Silavên min li Şahê xwe bikin û wî agahdar bikin bêjin ku keça min naxwaze bizewice.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navberek da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û BÎST Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehriyar re berdewam kir:*

Veca gava ew gotin ji wan re hate gotin, Wezîr û heyeta xwe li gel Ezîz, kolîpoşman û destvala vegeriyan welatê xwe. Nuh gîhan, çûn hizûra Şahê xwe û rewşa heyî pê re parve kirin. Şah jî hêrs bû ji ber wê bersiva qiralê Cezayira Kafûr û ferman da serleşkerên xwe ji bo ku amadekariyên şer û cengê bikin. Rabû wezirê wî jê re got: “Wisa meke ey sultanê cîhanê! Tu gunehên wî qiralî nîn in, lewre her tişt li ber çavên me qewimî û keça wî çawa ku ew daxwaza me bihîst, got: Heger bavê min bi darê zorê min bizewicîne, ez ê xwe û mêrê xwe jî bikûjim.”

Dema Şah ev gotinên Wezîr bihîstin, li ser kurê xwe Taca Milûkan tirsîya û got: “Naxwe heger ez şer bi bavê wê re bikim û keça wî bi zorê bînim jî dê keçik xwe bikuje!” Şah hinekî ponijî, piştî rabû çû rastiya meseleyê ji kurê xwe re vekir û hewl da ku pê bide fêmkirin. Taca Milûkan ji bavê xwe re got: “Bavocan, ez nikarim bêyî wê debar bikim. Lew ku ez bême kuştin jî ez ê herim û xwe bigihînim wê. Ji vê yekê pê ve, tu tişt di dilê min de nîne.” Bavê wî got: “Û tê çawa herî cem wê?” Got: “Ez ê xwe bikim tacir û herim cem wê.” Şah jê re got: “Heger ji vê pêve çare nebin, wê çaxê Wezîr û Ezîz jî bi xwe re bibe.”

Şah xizaneyên xwe vekirin û kerwanekî ticaretê ji kurê xwe re da amadekirin ku buhaya wî digiha sed hezar dînar û radestî wî kir. Gava bû şev jî, Taca Milûkan Ezîz da tengala xwe û çû mala wezîr da ku wê şevê li ba wî rakevin. Lê belê ji ber ku Taca Milûkan dilbibirîn bû nedikaribû xwarinekê bixwe û ne ji rakeve. Fîkr û gûmanên cûr be cûr lê hatin hev, ket nava gerînokeke serêşiyê ku dev jê bernedida. Pir bêriya dildara xwe ya nedîti dikir û hedana wî nedihat. Carekê dîsa dest bi girî kir, hêsir barandin û ev çend beyt di ber xwe de gotin:

Gelo gengaz e dîtina me li gel vê dûrî û qutbûnê?  
Da ku rave bikim ji te re vê behra gilî û gazinê

Şev dirêj bû, bêdawî, çawa ku tu hatî bira minê  
Xelk hemû di xew de ne û ez jî wisa di vî halî de

Dema ku dengê giriye wî çû Ezîz, ew jî pêr giriya û dotmama wî Ezîze hate bira wî. Herdu bi hev re giriyan hetanî şeveqê.

Sibehê Taca Milûkan kincên xwe li xwe kirin, xwe ji bo rêwitiyê amade kir û derbasî cem diya xwe bû. Diya wî li hal û wextê wî pirsî, wî jî rastiya meseleyê jê re got. Rabû diya wî pînsed hezar dînar da wî û ew himbêz kir. Wî jî xatirê xwe jê xwest û li ber dengê dûayên wê di derî re derket, çû cem bavê xwe. Destûra rêwitiyê jê xwest, wî jî hem destûra çûnê, hem jî pînsed hezar dînar dayê û ferman da peywirdaran ku konekî mezin li derveyî bajêr jê re vegirin. Li wir jî du rojan man, piştî bûn rêwî û berê xwe dan Cezayira Kafûr.

Bi rê de Taca Milûkan kul û derdên xwe bi Ezîz re parve kir û jê re got: “Birawo ê min ez nema dikarim li ber xwe bidim, ji ber vê êş û jana bêrîkirinê.” Ezîz jê re got: “Ez jî wisa me birawo û ez dixwazim li ber nigên te bimrim. Lê belê yê min êşa min ji ber bêrîkirina diya min e.” Taca Milûkan jê re got: “Zêde xwe meêşîne, inşelleh dê dawîya me xêr be.”

Wezîr jî her car şîret li Taca Milûkan dikir ji bo ku bêhna xwe fireh bike. Ezîz jî jê re helbest dixwendin, jê re behsa bûyerên dîrokî û qewimandinan dikir. Lê belê dîsa jî rê dirêj dibû li Taca Milûkan û êşa firaqê dilê wî disot. Du mehan sax meşa wan bi wî hawî berdewam kir. Bi şev û roj dimeşîyan da ku zû bigihêjin wir. Gava nêzîkî bajêr bûn, bêhna Taca Milûkan hate ber wî û dilxweş bû, giraniya barê xemgîniyê ji ser xwe avêt.

Derbasî bajêr bûn û meşa xwe berdewam kirin hetanî gihan sûka caw û merşan. Gava taciran Taca Milûkan dît, man şaş û bi heyranî li bejn û bala wî nerîn û ji hev re gotin: “Gelo deriyê buhuştê vebûye ku ev xortê ewqasî spehî û lihevhatî jê derketiye û hatiye vir!? Hinekan jî digot: “Belkî ev milyaketekî Xwedê ye!”

Dema hatin cem taciran li dikana Şêxê Sûkê pirsîn, wan jî ew nişanî wan dan. Çûn dikana Şêx; gava ketin hundur de, bi rêzdarî hemû ji ber wan rabûn û xêrhatineke germ li wan dan. Herî zêde jî wezîrê temendirêj û rihspî bala wan kişand. Bêdeng ji hevdû re digotin “Bêgûman dê ev ê extiyar, bavê wan herdu xortên lihevlatî be.”

Di serî de Wezîr axivî û ji wan pirsî got: “Kîjan ji we Şêxê Sûkê ye?” Gotin: “Ha ev e.” Wezîr lê nêrî, dît ku mirovekî li ser xwe, navser û xwedî heybet e. Gelek xûlam û xizmetkarên wî hebûn. Wî jî bi germahî xêrhatina wan kir, qedrê wan girt û ew li kêleka xwe dan rûniştandin. Piştî ji wan re

got: “Gelo daxwazî û pêdiviyên we çine?” Wezîr got: “Ez mirovekî extiyar im û ev herdu ciwan jî bi min re ne. Min ew li gelek welat û bajarên gerandine û em diçin ku jî, em salekê sax li wir dimînin da ku ev ciwan têra xwe lê bigerin, her tiştî bibînin û baş nas bikin. Niha jî em hatine welatê we, em dixwazin demeke dirêj li vir bimînin. Loma em dixwazin dikaneke baş ji te bikirin, da ku herdu ciwan tê de rûnin, ticareta xwe bikin, li nav bajêr bigerin, sinc û çanda gelê vir fêr bibin û ji nêz ve nas bikin.” Şêxê Sûkê got: “Baş e, ez ê dikaneke baş ji we re peyda bikim ku hemû bajar jê ve xwiya bike.” Piştî awirek avêt ser herdu ciwanan, li wan meyzand û pir ji wan hez kir, kêfxweş bû bi hebûna wan; jixwe meyla wî jî mîna her car bi ser ciwanan de bû, ne bi ser keçikan ve bû. Vêca çawa ew herdu ciwanên spehî û lihevhatî dîtî, ji xwe re got: “Subhan ji wî re ku ev herdu nefsên xweşik afirandine ji wê avika pîsik!” Piştî weke xizmetkaran li ber destên wan çû û hat.

Piştî li ser rênîşandana Wezîr, Taca Milûkan û Ezîz maleke raxistî û fireh kirê kirin ku hemû pêdiviyên wan pêk dianî. Wezîr û Ezîz jî li dora Taca Milûkan diçûn û dihatin ji bo ku wî aram bikin, lê aram nedibû. Şêxê Sûkê jî wek ku soz dabû wan, dikaneke xweş û mezin di nîvê sûkê de ji wan re peyda kir ku ji baştirîn dikanên wî bajarî bû, pir fireh û paqij bû. Refikên wê ji ac û ebanos bûn, stûnên wê hemû neqîşandî bûn. Gava ku çû mifteyên dikanê teslîmî wezîr -ku wî ew tacir dinasî- kir jî, jê re got: “Xwedê bextê herdu kurên te veke û vê dikanê ji wan re bike wesîleya xêr û xweşiyê.”

Dema Wezîr mifteyê dikanê stend, gazî xulamên xwe kir û çû malên xwe hemû birin dikanê ji hev derxistin, cawên xwe li ser refikan bi cî kirin û xwe ji bo kirîn û firotinê amade kirin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û BÎST Û HEFTEMÎN

*Şehrezadê vegotina xwe berdewam kir:*

Malên ticaretê yên ku di dikana Ezîz û Taca Milûkan de hatibû bicîhkirin ewqasî pir bû ku bi qasî xezîneyan dirav digirtin.

Wê şevê li wir man û serê sibehê wezîrê kal, Taca Milûkan û Ezîz birin hemamê, ew paqij kirin û derketin. Herdu xortên ciwan jî pir spehî û lihevhatî bûn. Loma çawa ku ji hemamê derketin, bibûn mîna du çirayan, şewq ji wan diçû. Rûçikên wan sor bûbûn, çavên wan reş; weke du heyvan bûn êdî.

Bi rê de li Şêxê Sûkê rast hatin -ku ew jî li bendî wan bû- piştî silavdayînekê Şêxê Sûkê ji wan re got: “Ciwano serşûştina we sihhet û xweşî

be!” Taca Milûkan bi zimanekî şêrîn got: “Xweska tu jî bi me re bûya!” Piştî, herdu ciwanan destên wî ramûsan û dan pêşiya wî, meşyan da ku biçin dikanê. Şêxê Sûkê jî çawa dît ku kulîmekên wan dihejin, ajoyên wî serî hildan, fişfiş pê ket û sebir pêre nema. Bi herdu çavan ziq li wan nêrî û got:

Dil pîşeyê çî be li deriyê wî dinêre  
Beşên ku ne têkildarên wî bin qet nanêre  
Bila ew bihejin ya girîng terka neqeba wan e  
Çawa diçin û tèn mîna gemiyên di avê de!

Dema ku herduyan ev gotinên wî bihîstin, sûnd xwarin ku wî jî bi xwe re bibin û dîsa vegehin hemamê ku wezîrê kal jî li wir hiştibûn. Şêxê Sûkê da dûv wan û dîsa vegehiyan hemamê. Wezîr jî dengê hatina wan kir û ji xelwetê derket û pêve hat, ji bo ku wî bişo. Lê Taca Milûkan beriya wezîr bi destê Şêxê Sûkê girt û sûnd xwar ku dê ew wî bişo. Ezîz jî sûnd xwar ku dê ew avê li serê wî bike. Li himberî vê helwesta herdu ciwanan, wezîr ji wî re got: “De bila be, jixwe mîna zarokên te ne.” Şex jî got: “Xwedê wan ji te re bihêle. Bi hatina we û zilamên we, xêr û bereket bi ser bajarê me de bariya.” Piştî ev çend beyt gotin:

Ciwamêr tu hatî û te hemû balayî bi xwe re anî  
Hemû kolan û gulîstanên me jî bi çiçekan kemilî  
Erdê bejna xwe tewand li ber we û giran axivî  
Tu bi xêr hatî ey dildar tu li ser seran hatî

Hersiyan spasiyên xwe jê re diyar kirin li ser van gotinan. Piştî Ezîz av lê kir û Taca Milûkan jî ew şûşt. Heta ku şûştina serê wî qedandin jî, wî digot belkî di buhuştê de ye! Dua ji herdu ciwanan re kir û çû li tenîsta wezîr rûnişt, da ku pê re bipeyive qaşo. Halbûkî meqseda wî ew bû ku têra xwe li Ezîz û Taca Milûkan binêre, çavên xwe nerm bike.

Di wê navberê de xulaman pêşgir û destmal ji wan re anîn ji bo ku xwe zûha bikin. Wezîr li Şêxê Sûkê zîvirî û jê re got: “Şêxê min, serşok nîmeteke ji ba Xwedê!” Şêx jî got: “Xwedê ji te û zarokên te razîbe û herduyan jî ji nezera çavên xerab bisitirîne. Gelo tiştêkî ku zanayan di derbarê hemamê de gotiye di bîra we de heye?” Taca Milûkan got, ez ê çend beytan ji we re bibêjim:

Jiyana hemamê jiyanêke pir xweş e  
Giyana û beder tê de her mîna buhuşt e  
Behetî dimînim li malekê şax e  
Û di bin de jî her gur dibe agir û pêt e  
Kî bi dest bixe bextewartir kes ew e  
Li gel ku yê hêsiran bi ser de dibarîne dîwar e

Piştî vê helbesta Taca Milûkan, Ezîz got:

Ez jî çend beytan dizanim di derbarê vê mijarê de û pê de çû, got :

Maleke ji kevir e lê her keviroke jê gul e  
Tu agir bidî derdora wî jî her ew paqij e  
Mîna dogehê diyar bike jî her buhuşt ê  
Herî zêde jî gerestêrk û heyv tê de hene

Piştî vê axaftina Ezîz jî, Şêxê Sûkê li ziman û zîrebûna wan ma behetî!  
Ji herduyan re got:

Welehî we hunerên hozankaran nişanî min dan, ka êdî ez jî çend beytan ji we re bixwînim:

Çi agirekî ku ezabê wî jî buhuşt e!  
Ruh û beden pê dibe yek çî serpereşt e!  
Buhuşteke ku mirov nexwaze bikevê ye  
Dojeheke ku ketina wê pir zor xweş e

Gava ku ev gotin ji Şêx bihîstin, lê man behetî. Şêxê Sûkê ew vexwendin mala xwe û rû li ser wan danî ji bo ku pêre herin. Lê wan qebûl nekir û çûn malê ji bo behna xwe vedin û îstîrahet bikin. Li malê têra xwe xwarin, vexwarin û raketin hetanî sibehê, di nava xweşî û bextewariyeke bêtimtêl.

Şeveqê ji xew rabûn, destava xwe girtin, nimêja xwe kirin û gava ro derket bû sibeh jî, sûk û dikan vebûn, ew jî ji malê derketin û berê xwe dan sûkê. Çûn dikana xwe vekirin ku xulaman bi awayekî pir baş ew raxistibûn û ji wan re amade kiribûn. Du cihên rûniştinê ji wan re çêkiribûn ku mînderên ji hevrêşimê danîbûn ser wan û giroverek zêrîn jî li ser pişteka wan bi cih kiribûn. Taca Milûkan li ser yekê rûnişt û Ezîz jî li ser a din. Xulam jî li ber destên wan amade bûn.

Xelkê jî ew bihîstin û bi ser wan de hatin, li ser serê wan kom bûn. Wan jî cawên xwe firotin û têra xwe danûstendin kirin ku navê Taca Milûkan jî bi wê yekê re li nav bajêr belav bû. Herkesî zîrekî û husn û cemala wî bihîst.

Demeke dirêj ew rewş bi wî hawî berdewam kir. Her roj xelk bi ser de dihatin, kîrîn û firotin ji cem wî dikirin. Rojekê wezîr çû cem Taca Milûkan û şîret lê kir ji bo mijara xwe ji xelkê veşêre. Şîret li Ezîz jî kir ji bo ku baldar be û hayê wî jê hebe. Piştî çû malê ji bo ku nexşeya karin din çêbike da ku sûd vergirin herdu xortên ciwan. Taca Milûkan û Ezîz jî xwe bi xwe man û ketin nava sohbetêke germ de. Taca Milûkan digot “Gelo wê tu kes ji aliyê Dunya Xatûn ve neyê?”

Taca Milûkan bi rojan, bi şevan, di nava wê bendevariye de ma, bêtî ku xew bikeve çavên wî. Dildarî û evîn bûbûn serwerên wî û edî ne xwarinek



di ber wî de diçû ne jî vexwarinek. Ew bejn û bala wî her ku diçû hejar û zeîf dibû. Rojekê gava ew dîsa wisa rûniştîbû di dikana xwe de, pîrejinê derbasî cem wî bû ku du carîye jî li pey wê dihatin. Pîrejinê bi çavekî kîrrînê lê nerî, gava çav li spehîbûna wî ket, laşê wê ricifî û di ber xwe de got: “Subhan ji wî re ku tu afirandiye ji avikeke pisîk û tu kiriye dilbijokîya hemû kesî.” Qasekî din jî lê nerî û axaftina xwe berdewam kir, got: “Xwedê dizane ku ev ne ins e, melaîket e!”

Piştîre hat li ber wî sekinî û silavek dayê, wî jî silava wê lê vegerand, ji ber rabû û pê re kenîya. Ev helwest hemû nîşan da, bi xêra îşareta ku ji serî ve Ezîz dabû wî. Piştîre, ew li kêleka xwe da rûniştandin û pêre mijûl bû, hetanî ku dilê wê aram bû. Wê gavê pîrejinê ji Taca Milûkan re got: “Kurê min ê kamil di wesf û wateyê de, gelo tu ji xelkê vî welatî yî?” Taca Milûkan bi zimaneke fesiîh û şêrîn jê re got: “Bi Xwedê xatûna min, ev cara yekê ye ku ez tême vî welatî û armanca min jî ew e ku ez têra xwe lê temaşe bikim û bigerim.” Pîrejinê got: “Şanazî û comerdî ya te be kurê min, tu li ser seran û li ser çavan hatiye vir. Ka gelo te çi caw bi xwe re anîne? Kanî hineke baş nîşanî min bide, ji baş başan bi xwe re tîne.”

Taca Milûkan bi wê gotina jinîkê hestiyar û mest bû lê belê tê negihîşt bê dixwaze çi bibêje. Di wê navberê de Ezîz, bi dest û çavan îşaret dayê û pêre bû alîkar da ku tê bigihêje. Taca Milûkan jî tiştê di serê xwe de sererast kir û ji Pîrejinê re got: “Çi tişt û babetên ku tu dixwazî li cem min heye, her babetên ku daxwazên qîralan û keçên wan in; vêca ka bibêje bê te çi divê, da ku ez babetên guncav nîşanî te bikim?” Bi wî hawî dixwest ku armanca gotina wê fêhm bike. Pîrejinê got: “Ez cawekî baş dixwazim ji bo Dunya Xatûn, keça Qîral Şehrîman.”

Gava ku navê hezkiriya wî di nav axaftina wê de derbas bû, dilê Taca Milûkan lêda û hestiyariyeke erjeng ew rapêça. Li Ezîz zîvirî û jê re got: “Kanî babetê caw ê herî baş bîne!” Ezîz çû buxçîkek anî û danî ber wî, vekir. Taca Milûkan jî pîrejinê re got: “Ev babetên caw li cem kesî tunene, de edî li gora dilê xwe hîlbijêre!” Pîrejinê çend perçe caw hîlbijartin ku buhaya wan digîha hezar dînarî. Piştîre got: “Ev bi çiqasî ye gelo?” Wî got: “Ma qey ez bazarê bi te re dikim li ser vî tiştê bê qîmet? Naskirana te tenê ji bo min bes e. Şikir ji wî re ku ez bi te dame naskirin.” Pîrejinê jê re got: “Tu xortekî pir sipehî û lihevhatî yî, Xwedê vî rûyê te yê şêrîn ji çavê xeraban bisitirîne rebbî! Xwezî bi ya ku di himbêza te de radikeve, te himbêz dîke û her sibeh çaven xwe vedîke bi vî rûyê te yê şêrîn. Tew ku ew jin bi xwe jî mîna te spehî be!”

Taca Milûkan kenîya hetanî ku zîkê wî qetîya û got: “Subhan ji wî re ku daxwazên mirov bi destê pîrejinan pêk tîne! Pîrejinê got: “Kurê min, navê te çiye?” Wî jî got: “Navê min Taca Milûkan e.” Wê got: “Ev navê han, navê

qiralan e û tu jî tacir î, ev çawa li hev dike!” Eziz lê zivirî û jê re got: “Ji ber ku delalê ber dilê dê û bavê xwe bû, ev nav lê kirine.” Pîrejinê got: “Sedeq, te rast got. Xwedê we bisitirîne ji şer û xerabiya zikreşan ku dilê wan dê were guvaştin bi ditina spehîbûna we!” Dûvre rahişt cawê xwe û behetî ji dikanê derket meşîya, hetanî ku hat cem Dunya Xatûn û jê re got: “Xatûna min! Min cawekî pir baş û spehî ji te re aniye, ji cem tacirekî ku kes mîna wî spehî û lihevhatî tune ye.” Xatûnê got: “Kanî nîşanî min bide!” Pîrejinê caw da destê wê û got: “A ji te re, de îcar li hev biqulipîne û baş lê binêre.” Gava Dunya Xatûn lê meyzand, got: “Dadêcan ev cawê hanê pir baş û xweşik e û cawên mîna wî me li vî bajarên me nedîtine!” Pîrejinê got: “Xatûna min, firojkerê vî cawî ji wî spehîtir û gelekî xweşiktir e. Gava mirov wî dibînî, mirov dibe qey deriyê buhuştê vebûye û ew jê daketiye xwarê. Xwezî îşev bihata cem te û di himbêza te de raketa! Ne gengaz e ku mirov wî bibîne û dilê xwe ji dest bernede. Dibêje, ez hatime vir ji bo ger û seyranê.”

Dunya Xatûn kenîya bi wan gotinên han...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û BÎST Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:*

Dunya Xatûn bi gotina wê kenîya û ji pîrejina xizmetkar re got: “Xwedê cezayê te bide te, xurufiya bêaqil!” Berê xwe jê guhert, dûvre dîsa lê vegeerîya û axaftina xwe berdewam kir, got: “Hela wî cawî bide destê min, da ku ez baş raçav bikim!” Pîrê jî qûmaş dîsa da destê wê. Careke din bi hûrgulî lê meyzand û ma behetî! Lewre wê di temenê xwe gişî de, cawekî wisa spehî nedîtibû. Li pîrê vegeerîya û jê re got: “Gelo te jê pirsî bê ka tu pêdivîyeke wî heye ku jê re pêk binin?” Pîrê serê xwe hejand û got: “Xwedê te û vê zîrekîtiya te biparêze, helbet pêdiviyên wî hene, ma qey kes bê pêdivî dibe?” Dunya Xatûn got: “Naxwe vegeer cem wî, silavan lê bike û jê re bibêje ku, wî rûmet daye me bi hatina xwe û çî pêdiviyên wî hebin jî, em ê wan jê re temîn bikin ji dil û can.”

Pîrejin di cî de vegeerîya cem Taca Milûkan, çawa ku wî ew dît, bask pê ve çêbûn ji kêfan re, pê ve rabû ser nigan û bi destên wê girt, ew li kêleka xwe da rûniştandin. Piştî ku li cem Taca Milûkan rûnişt û bêhna xwe vekir, tiştê ku Dunya Xatûn jê re gotibûn ji wî re anî ziman û got: “Dibeje, çî pêdivîya wî hebe, bila bêje.”

Ku Taca Milûkan ev gotin bihistin, dilê wî ji kêfan bi şid lê da û nema di sînga wî de hilat. Hilmeke kûr kişand û di dilê xwe de got “Jixwe te

pêdiviya min pêk anî pîra çavmar!” Piştîre ji pîrê re got: “Heger tu bikaribî nameyekê bigihîni ber destê wê û tu bersiva nameyê jî binî, dê pir baş be!” Wê jî got: “Li ser herdu çavên min.” Çawa ku Taca Milûkan ew gotin ji devê wê bihistin, bi kêf gazî Ezîz kir û jê re got: “Kanî kaxez û hibr û pênuşeke paxir ji min re bîne!” Ezîz di cî de anîn, wî jî dest pê kir nivîsand:

Ez nameyekê dinivîsînim ji giyana xwe re  
 Li gel êşa fîraqe ku dev ji min bernade  
 Di asta yekemîn de ez ê agirê dil binivîsim  
 Di asta dûyem de ez ê evîna xwe binivîsim  
 Di asta sêyem de ez ê bêjim sebra min nema  
 Di asta çarem de ez ê bêjim bêrikirin mezina  
 Di asta pêncem de ez ê bibêjim dîtî kengî ye?  
 Di asta şeşem de jî ez ê bibêjim ka tu li ku ye?

Piştî ew helbest nivîsand, bi van çend gotinan jî berdewam kir: “Ev name, ji destê dilekî hestiyar di zindana evînê de -ku baweriya wî bi ghiştina te tune, lew bi xeyalê te re be jî- ji te re tê. Divê tu baş bizanibî ku xwediyê vê nameyê êşeke giran dikşîne ji ber fîraqa hezkiriyên xwe!” Pêre jî înzaya xwe avêt binê wê û dest bi girî kir, hêsir barandin. Piştîre jî ew çend beytên din lê zêde kirin:

Min ji te re nivîsand û hevok jî bi rê ve diçin  
 Hêsir bi ser çavan de bêrawestan ew dibarin  
 Dîsa jî bêhêvî nînim ez ji hêza rebê xwe  
 Dibe ku rojekê me bigihîne hev li gel xwe

Û kaxeza xwe li hev pêça, mor kir û da destê pîrejinê, jê re got: “Vê nameyê bigihîne Dunya Xatûn.” Wê jî got: “Ser seran, ser çavan.” Taca Milûkan jî hezar dînar da wê û jê re got: “Vê diyariyê jî ji min qebûl bike!” Wê jî dirav ji destê wî girtin, jê re dua kirin û kete rê.

Pîrê meşa xwe berdewam kir hetanî ku hat cem Dunya Xatûnê. Nuh Dunya Xatûn çav lê ket, jê re got: “Hê dadêcan, ka çi pêdiviyên wî hene ku em jê re pêk binin?” Pîrê jê re got: “Xatûna min, wele nameyek ji te re şandiye, ez nizanîm bê çi tê de nivîsandiye.”

Pîrê, bi wê axaftina xwe re, name jî da destê wê û serê xwe bera ber xwe da, mîna bizanibe dê biqehere. Xatûnê name vekir, xwend û têngişt bê çi dixwaze. Piştîre bi hêrs li pîre vegeriya û got: “Çi di navbera min û vî tacirî de heye ku wisa nameyan ji min re dişîne?” Pêre jî şeqamek li rûyê da û got: “Heger tîrsa min ji Xwedê tunebûya min ê ew li ber dikana wî bi dar vekira!” Pîrê got: “Qey çi divê nameyê de hebû ku tu ewqasî aciz kiriye? Gelo behsa gilî û gazincan kiriye, ango diravên heqê cawê xwe dixwaze?” Dunya Xatûn got: “Ev çi gotinî pîreboka heram! Tenê eşq û evîn tê de heye û ev

hemû ji ji bin serê te derketiye. Heger na, dê çawa vî şeytanî bizanîba tişteki wisa binivîsîne?” Pîrê jê re got: “Li min bibhure xatûna min! Ji xwe tu di qesra xwe de rûniştiye ku destên çûkan nikarin xwe bighînin te, de êdî ki çi bibêje ji dê weke ewt ewta kûçikan be, ne zêdetir. Bawer bike ez nizanîm bê ka çi di nameyê de nivîsandîye, lê dîsa jî ya rast ew e ku, tu bersivêkê jê re binivîsinî û tu wî bi kuştinê tehdîd bikî da ku careke din ehmeqtiyeke wisa neke û bi wî hawî tê jê xelas bibe û wê mesele ji xelas bibe.” Xatûnê got: “Ez ditirsim ku tamişkî bibe bi vê nivîsa min.” Pîrê got: “Heger tu zirta lê bike dê devjê vî dîniştîya xwe berde.” Xatûnê got: “Ka pênuş û kaxezê ji min re bîne!” Gava ku pîrê kaxiz û hibir û pênuş jê re anî, xatûnê dest pê kir, ev helbest nivîsand:

Ey angaştvane eşq û evînê  
 Ey belayê seher û roj û şevînê  
 Ê ku eşbar ew ji ber meraqê  
 Qaso ji ber kul û derd û firaqê

Pozbilindo tu çawa ji min dixwazî civan  
 Çawa dixwazî rûheyva keça qiralan  
 Ma qey kes dikare xwe bigihîne heyvan  
 Ji bo toberêkirinê de êdî bigire şîretan

Xetereyeke mezin li ser te heye niha  
 Loma li ser te ferz e veger ji van gotinan  
 Divê bi lezgînî tu tobe bikî li gunehan  
 Nexwe dê tîk biçe mala te bi navê yezdan

Piştî kaxez li hev pêça û da dest pîrê, jê re got: “Vê kaxezê bide wî û jê re bibêje, bila dev ji vê helwesta xwe ya bêoxir berde.” Pîrejînê got: “Ser seran, ser çavan xatûna min.” Piştî bi kêf rahişt kaxezê û çû mala xwe, wê şevê li mal raket. Nuh bû sibe jî, berê xwe da dikana Taca Milûkan. Li wir dît ku ew jî li hêviya wê ye û çawa ku ew dît jî pir kêfa wî hat kir ku bifire. Loma bi kelecânî pê ve rabû û ew li kêleka xwe rûniştand. Wê jî kaxez ji paşila xwe derxist, da destê wî û jê re got: “Ka hela bixwîne bê çi tede nivîsandîye. Ji xwe gava Dunya Xatûn nameya te xwend pir qeherî, lê belê ez li ber geriyam, min ew nerm kir, da kenandin, hişt ku dilê wê bi te bişewite û bersivê ji te re binivîsîne.”

Li ser vê axaftina wê, Taca Milûkan spasdariya wê kir û ferman da Ezîz ji bo ku hezar dinarî bide wê. Piştî, nameya wê xwend, naveroka wê fêhm kir û bû kûrkûra wî giriya. Dilê pîrejînê pê eşiya û pir bandor lê bû bi wî girî û nalenala wî. Piştî jê re got: “Kurê min, gelo çi di wê kaxezê de hebû ku giriyê te anî û tu xist vî halî de?” Taca Milûkan jê re got: “Xatûna te bi

kuştinê min tehdîd dike û ji min dixwaze ku ez jê re nenivîsînim û heger ez binivîsînim jî, dê malxerabûna min be. Halbûkî mirina min a rastî bi neni-  
visandinê pêk tê. Veca ez ê bersivê jê re binivîsînim û tu jî jê re bibe, dilê  
wê çawa dixwaze ji bila wisa bike.”

Pîrê jê re got: “Bi Qûr’ana kerîm, heger serê min jî tê de here ez ê alî-  
kariya te bikim hetanî ku tu bigihêje armanca xwe.” Taca Milûkan jê re got:  
“Ez yek qenciya te jibîr nakim û ez ê li ser her qenciyeke jî xelatekê bidim te.  
Lewre tu hostayeke sîyasetê, rêvebireke bîaqil î û tu devê qolana<sup>19</sup> baş vedikî  
û digirî; tu devtengan baş derbas dikî û rêçên asê hêsan dikî.”

Piştî rahişt kaxezekê û ev çend beyt nivîsandin:

Êdî bi êş û kuştinê min tehdîd dike  
Lê kuştin jî qedere ew aramiya min e  
Mîrin çêtir e ji jiyanê qedexeyê  
Bo xatirê Xwedê were wî ziyaret ke  
Evîndarekî bêkes im ez koleyê te me  
Xatûna min dilovan bî li ser aşiqê xwe  
Mazûr e ewê ku dibe aşiqê heyvrûyê

Piştî bi dilekî xemgîn, dîsa giriya û kûrêkûr pê ket, hetanî ku pîrejin  
jî pê re giriya. Li dawiyê pîrejinê kaxez ji destê wî girt û jê re got: “Aram be  
û bila dilê te di cî de be. Bêgûman ez ê te bigihînim meqsed û miradê te.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û BÎST Û NEHEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Çawa ku me got, pîrejinê Taca Milûkan li ser agir hişt û çû, berê xwe  
da qesra Dunya Xanim. Gava hat cem wê, dît ku rengê wê hatiye guhertin  
û hêrs bûye ji ber wê nameya berê. Loma gava ew nameya din jî da dest  
wê, hêrsa wê xwirtir bû, ji pîrê re got: “Te dît? Min ji te re negot, vîna çav  
berdaye me?” Pîrê got: “Ma vî kûçikî çî di te de dîtîye ku çav berdaye te?”  
Dunya Xatûn got: “Here jê re bêje, heger tu nameyan berdewam bikî, dê  
serê te jêbike.” Pîrê hilmek kûr kişand û got: “Vê gotina xwe di kaxezekê  
de binivîsîn, ez ê jê re bibim, da ku hîn bêhtir bitirse.” Dunya Xatûn rahişt  
pênûs û kaxezekê û ev çend beyt nivîsandin:

Ey xafilê bê agah û bê xeber ji bûyeran  
Ey bêaqilê îro, sibe û herdu dinyan  
Hetanî niha tu kesî xwe negîhandîye min

19. Qolan: *Tûrikên pereyan*

Pozbilindo! Qey tu bawer dikî bighêji min  
Baş bizanibe ku tu carî tu nagihêji min  
Xwe nexapîne, qet neke hêviya wîsalê  
Qet nefikire ku tê bixî destê xwe sînga delalê  
Edî dev ji vê meqseda xwe berde bi lez  
Baş bitirse ji şûrê min ê dudevî bi gez

Piştire kaxeza xwe pêça û da destê pîrê. Wê jî bi lez berê xwe da cem Taca Milûkan. Ew jî çawa çav li pîrê ket, bi kelecânî pê ve rabû û got: “Xwedê Teala hêz û qewetê bide te li gel tenduristiyeke bêqusûr!” Pîrê got: “A ji te re bersiva nameya tel!” Wî jî bi hêviyeke nû destê xwe avêt kaxezê û vekir, xwend. Piştire jî hêsir barandin, giriya û got: “Ez dixwazim ku yek niha min bikuje, lewre mirin ji ji vî halê ku ez têde me çêtire.” Dûvre rahişt pênûs û kaxezê û ev çend beyt nivîsandin:

Ey êşa dil û kujera min a wenda  
Te ez kuştim bi firaq û hesretan  
Dilê xwe yê kevirî nerm bike ji bo Xwedê  
Ez evîndarê te yê rasteqîn im bawer bike  
Ne mirovekî hişk im ez giyanazad im bi te

Dûvre kaxeza xwe pêça û da dest pîrê, jê re got: “Bela sebeb min tu betiland.” Piştire li Eziz zîvirî û ferman dayê ji bo ku hezar dînarî bide wê. Di pey wê re jî axaftina xwe berdewam kir û ji pîrê re got: “Dayêcan, bi vê nameya min re, ya dê qutbûna dawî çêbibe, yan jî danûstendineke rasteqîn.” Pîrê jî got: “Kurê min, wellehî ez dixwazim ku miradê we bi hevdû bibe û hûn di nav xêr û xweşiyê de bin. Lewre tu heyveke bi şewq e û ew jî rojeke bi nûr e. Heger ez nikaribim we bigihînim hev, dê temenê min giş bê wate be. Not salê temenê min di fen û fût û hileyân de çû, veca çawa ez nikarim du kesan bi dizî bînim cem hev?”

Pîrê dilê wî xweş kir, xatir jê xwest û çû, kete rê de. Kaxeza ku Taca Milûkan dabûyê, di nav perê xwe de veşart û wisa derbasî cem Dunya Xatûn bû. Dema ku li rex wê rûnişt, serê xwe xwirand û piştire jî got: “Xatûna min, li qusûrê nenêre, lewre ev demeke dirêj e ku ez neçûme hemamê, xura serê min jî ji ber wê ye.”

*Li Şehrezadê bû sibe. Wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û SÎHEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir:*

Gava pîrê wisa got, Dunya Xatûn zendikên xwe ber bi jor ve hildan, şara pîrê ji serî danî, porê wê vekir da ku lê meyze bike. Wê gavê kaxezek

ji nav porê wê ket ku Dunya Xatûn ew dît. Ji Pîrê re got: “Ev çi kaxeze?” Pîrê got: “Dibe ku dema ez li dikana tacir rûniştî bûm ketibe nav porê min. Kanî wê bide min da ku ez bibim lê vegeřinim.” Dunya Xatûn kaxez vekir û xwend, fê m kir bê çi dibêje, loma pir qeherî û hêrs bû. Ji pîrê re got: “Ev hemû ji bin serê te derdikeve. Ez nizamim bê ev şeytan ji kijan welatî derket û bi ser min de hat. Hetanî niha tu kesî newêribû tişteki wisa bike. Ez ditirsim ku ev çiroka me eşkere bibe, him jî bi zilameki ne li gori min û ne jî ji xelkê me ye. De binêr bi navê Xwedê, heger ne tu bûya ya ku ez mezin kirime, min ê tu bikuştta!” Pîrê got: “Kes newêre gotinên wisa ji te re bêje, ji ber tîrsa te û heybeta bavê te. Loma divê tu bersivêkê bide vî zilamî.” Dunya Xatûn got: “Dadêcan, tu çawa wisa dibêjî û ev şeytanê han ji hêz û desthilatdariya sultan natirse? Ez mame şaş li rewşa vî zilamî. Ez wî bidim kuştin ne tişteki raste û ez dev jê berdim jî, dê hartir bibe.” Pîrê got: “Jê re nameyekê binivîsine belkî were ser rê.” Dunya Xatûn pê nûs û kaxezek jê xwest û dest pê kir nivîsand:

Loma û gazincan em werkirin di zinaran  
 Betilîn destên min ji nivîsandina helbestan  
 Baş bizanibe ku tu li pey bûmekî bê oxir diçî  
 Gelo tê bîra te bê tu çawa bi vir de hatî  
 Li pey wî bê oxirî hetanî vir tu gindirhatî  
 Bêgûman mirina te hatiye û kurtedemek maye  
 Ku tu û bêoxirê xwe herdu bi hev re binax bibin  
 Ey mexrûrê ku bi poşmanî dê vegete ji xwediyean

Dûvre kaxeza xwe li hev pêça û da destê pîrê. Wê jî name bir da Taca Milûkan. Gava Taca Milûkan name xwend, baş têgihişt ku ew keçeke diljikevir û bê rehm e. Baş fê m kir ku ew bi vê şêweyê nikare xwe bigihîne wê. Rabû çû cem wezîr, ew ji rewşa dawî agahdar kir û jê xwest ku çare û rêyeke baş bibîne. Wezîr hebekî ponijî, piştî jê re got: “Tu rê li ber te nemane ji xeynî wê ya ku tu nameyekê tijî nifir jê re binivîsine. Taca Milûkan gazî Ezîz kir û jê re got: “Ka birawo, tu çawa dizanî nameyekê wisa jê re binivîsine li ser zimanê min.” Ezîz rahişt kaxezekê û ev beytana nivîsandin:

Xwedêyo min rizgar bikî ji vê belayê  
 Tu bi qedrê pêncên pîroz bikî li semayê  
 Kalîna min bibihîze û dilê kafirê nerm bike  
 Vaye tu dibînî bê çiqaşî li min zulmê dike  
 Dihelim ez û xulek li min dibine sal û naqedin  
 Ne alîkar hene ne jî dostin ku min xelas bikin

Ezîz çawa nivîsandin qedand, kaxez da destê Taca Milûkan. Wî xwend, eciband û piştî da destê pîrê. Wê jî rahişt nameyê û berê xwe da cem Dunya Xatûn...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê ji axaftina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û SÎH Û YEKEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Pîrê nuh gîha cem Dunya Xatûn, kaxeza Taca Milûkan da dest wê. Gava Dunya Xatûn name xwend, kûrahiya mijarê fam kir û pir qeherî. Bi hêrs got: “Her tişt ji bin serê vê pîrabokan han derdikeve.” Piştîre, bi ser carîye û xizmetkaran da qîrîya û ji wan re got: “Bi şîmik û şekalan li vê pîra hîlebaz bixin û cezayê bêbextiya wê bidine wê!” Wan jî bi şîmikên xwe lê dan hetanî pîrê ji ser hişê xwe çû. Di pey re, gava pîrê bi ser xwe hat, xatûnê jê re got: “Bêmirêsa xerab! Welehî ku ne ji tîrsa min î ji Xwedê baya min ê tu bikuşt.” Dûvre li xizmetkaran vegeriya û gotina xwe berdewam kir ji wan re, got: “Dîsa lê bidin!” Dîsa lê dan hetanî ku pîrê careke din ji ser hişê xwe çû. Wê gavê jî ferman da wan ku wê ji hundur derxînin û wê bavêjin derve. Wan jî bi cendekê wê girtin, ew kişkişandin derve û di derî re avêtin.

Gava pîrê bi ser hişê xwe hat, rabû ser xwe û meşîya hetanî gîha mala xwe. Êşa laşê wê berdewam dikir, laşê wê reş û şîn bûbû ji lêdanê. Merhemek amade kir, di laşê xwe da û palda, raket hetanî sibehê. Dema ro derket rabû ser xwe çû cem Taca Milûkan û çî hatibû serê wê ji serî hetanî binî jê re got. Ew jî pir xemgîn bû û pê êşîya, jê re got: “Êşa te êşa min e dayêcan, lê belê her tişt bi qeza û qederê ve girêdayî ye. Wê jî got: “Xeman mexwe kurê min dîsa jî ez ê hevl bidim ku we bigihînim hev. Bêgûman ez ê te bigihînim vê qehpîka ku bi lêdanê laşê min reş û şîn kir.”

Taca Milûkan jê re got: “Hela ji min re bibêje bê çîma ev keçîk ji zilaman bi rik e?” Pîrê got: “Wê xewnek dîtibû ku wê xewnê ev tişt bi serê wê de anî.” Taca Milûkan got: “Û ew çî xewn bû?” Pîrê got: “Şevêkê gava raketibû, di xewna xwe de dît ku nêçîrvanekî xefk li ber çûkan veda û hinek genim avêt ber û li kêlekekê xwe ragirt. Di wê navberê de çûk hatin li ser wî genimî kom bûn ku di nava wan de du heb kevok jî hebûn. Yek ji wan nêr bû û ya din mê bû. Gava ku nigê kevokê nêr kete xefkê de, hemû çûkên derdorê firriyan, kevoka mê bi tenê lê vegeriya û bi nikilê xwe li benê nigê mêrê xwe da hetanî ku ew ji xefkê xelas kir û bi hev re firriyan. Piştîre nêçîrvan li xefka xwe vegeriya û ew ji nûve veda. Qasek bi şûn de, dîsa çûk li ser xefikê kom bûn û vê carê kevoka mê ket xefikê de. Lê gava ku çûk ji derdora ya mê firriyan çûn, kevokê nêr jî firriya çû beyî ku li ya mê vegere. Neçîrvan jî li xefîka xwe vegeriya û ew kevoka mê jê derxist, bir malê, ew serjêkir. Ew jî li ser wê dimenê ji xew vedicîniqe, şiyar dibe û dibêje: “Hemû giyanwerên nêr mîna vî ne, tu xêr di wan de tune. Zilam jî wisa ne. Tu xêr di wan de tune. Ji bo jinan.”



Piştî ku pîrêjinê ew çîroka xewna xatûnê jê re got, Taca Milûkan ji pîrê re got: “Dayêcan, heger bi mirina min be jî, ez dixwazim carekê tenê wê bibînim. Vêca te hileyek ji min re bîdîta da ku ez wê bibînim.” Pîrê got: “Wê çaxê divê tu bizanibî ku bexçeyekî wê, cihê bêhvedanê heye, di biniya qesrê de. Mehê carekê derdikeve nava wî bexçeyî, ji xwe re digere û hetanî deh rojan di nav bexçe de dimîne. Di navbera qesrê û bexçe de jî deriyekî veşartî heye ku di wir re derdikeve nava bexçe. Veca niha wextê derketina wê ya nav bexçe hatiye; heger tu bixwazî wê bibîni, were wir, ez ê rêyekê nîşanî te bidim bê tê çawa wê bibîni. Tu jî hewl bide ku tu ji nava bexçe dernekevi da ku te bibîne û bi hûsn û cemala te ve bê girêdan. Levra hezkirin tenê dikare mirov bigihîne hev.”

Taca Milûkan got: “Temam e, ez ê wisa tevbigirim.” Piştî ew û Ezîz rabûn, pîrê jî bi xwe re birin û mala xwe pê dane naskirin. Dûvre Taca Milûkan ji Ezîz re got: “Birawo, êdî pêdiviya min bi dikanê nemaye. Ez wêna bi hemû malê tê de diyarî te dikim. Lewre tu jî li ser rûyê min ji welatê xwe xerîb ket.” Ezîz ew diyariya wî qebûl kir û her weha bi hev re rûniştin, ketin nava gûftûgoyeke kûr û fireh de. Taca Milûkan pirsra ehwalên dinyê û serpêhatiyên wî jê dikirin, Ezîz jî hewl dida ku bersiva wî bide.

Di pey re, herdu hatin cem wezîr û ew agahdar kirin ji biryarên xwe û pêşketinên dawî û jê re gotin: “Ji niha û pê ve êdî em çawa tevbigerin gelo?” Wezîr got: “Naxwe ka rabin em herin nava wî bexçeyî!” Bi vê gotina wezîr re, hersê jî rabûn ser xwe û kincên xwe yên herî xweşik li xwe kirin, sê heb kole jî bi xwe re birin û berê xwe dan wî bexçeyî. Gava gîhan wir, dîtin ku deverek bi dar û ber e û av tê re diherikin. Natorê bexçe jî li ber derî rûniştî bû, silavek dane wî, wî jî silava wan vegerand. Wezîr sed hezar dînar da dest û jê re got: “Ez dixwazim ku tu vê bexşîşê ji destê min bigire û bi xêra xwe herî xwarinekê ji me re bikirî, lewre em xerîbên vir in û ez hatime vî bajarî ji bo ez van zarokên xwe li vir derxînim seyranê.” Nator ew dînar ji dest wan girtin û got: “Hema vir giş milkê we ye, derbas bin hundur û li gorî kêfa xwe tê de bigerin hetanî ez herim ji we re xwarinê bînim û bêm.”

Nator wisa ji wan re got û di cî de rabû ser xwe, çû sûkê ji bo ku xwarinê bîne. Wezîr, Taca Milûkan û Ezîz jî derbasî nav bexçe bûn. Piştî seetekê Nator li wan vegehiya û berxekî biraştî xist nav lepê wan. Ew jî li dorê kom bûn, têr xwarin, destên xwe şuştin û rûniştin ji hev re axivîn. Wezîr ji natorê kal re got: “Extiyar, ev bexçe yê te ye ango te ew kirê kiriye?” Nator got: “Na, ne yê min e, bexçe yê Dunya Xatûn e.” Wezîr jê re got: “Tu mehekê çiqase dirav digirî?” Got: “Ez dinarekî tenê digirim, ne zêde.” Wezîr li derdora xwe nêrî, çar hêlên bexçe raçav kirin, dît ku qesreke bilind û kevnar tê de heye. Li Nator zivirî û jê re got: “Ez dixwazim qencyekê bi te bikim ji bo ku bi wê tu min bîni bîra xwe.” Nator got: “Tu dixwazî çi biki?” Got: “A ji te re

vî sêsed dînarî bigre, bila xêra min be. Lê belê ez dixwazim vê qesra kevn û jihevketî biedilînim û ji nû ve wê bi zêr û zîvan bixemilînim, da ku navê min bide jiyankirin.”

Gava ku kalê nator navê zêran bihîst, dînar ji destê wezîr girtin û jê re got: “Begê min, înselleh tê karekî xweş di vê qesra xerabe de bikî.”

Piştî ku ev mijar jî zelal kirin, hemû rabûn ser xwe û vegeyriyan mala xwe, bi şev li wir raketin. Roja dîtir hemû pêdiviyên nûkirina qesrê amade kirin, ji neqqaş, hoste, xebatkar û pişesazên herî baş, li gel pêdiviyên wan ji kils, boyax, zîv, zêr û lazewerd. Dûvre berê xwe dan nava bexçeyê Dunya Xatûn, çûn cem wê qesra xerabe û ji neqqaşan re got: “Vê qesrê nû bikin bi zêr û zîv û lazewerdan, vê beraya eywanê jî bi sipî boyax bikin û nêçîrvanekî li ser bineqîşînin ku xefk li ber çûkan vedabe û mêkevokek jî ketibe xefkê de. Li ser vê bereya eywanê ya din jî neqşa heman nêçîrvanî çêbikin ku bi kevokê girtiye, ew serjê kiriye û li azmanê wê jî nexşeya teyreki baz ku kevoka nêr li ezmanan girtiye û bi lapûşkên xwe ew perçe kiriye.”

Piştî ku xebatkaran avahî giş nû kirin, boyax kirin û neqşên wê jî çêkirin, wezîr –wan jî xatirê xwe ji Nator xwestin û bi şûn de vegeyriyan.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina xwe.*

ŞEVA SED Û SÎH Û DUYEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:*

Wezîr, Taca Milûkan û Ezîz vegeyriyan malê û ji xwe re ketin nava soh-beteke dûdîrej î ku bi dehan nexşe û pîlangêrî tê de nîqaş dikirin.

Îcar em wan li wir bihêlin û em vegeyriyan ser rewşa pîrê ku ew jî di malê de mabû û nema dikaribû derkeve derve. Lêbelê ji ber ku Dunya Xatûn bêriya derketina nav bexçe kiribû û nikaribû bêyî wê ji qesra xwe derketa, şand dû wê, pê re li hev hatin, dilê wê dîsa xweş kir û jê re got: “Ez dixwazim herim nav bexçe, hebekî bêhna xwe berdim bi temaşekirina çiçek û daran.” Pîrê got: “Ser seran, ser çavan. Lê ka destpêkê ez herim malê, van kincên xwe biguherînim û piştê werim cem te.” Xatûnê got: “Here û dereng nekeve.”

Pîrê ji cem wê derket û berê xwe da cem Taca Milûkan, jê re got: “De êdî rabe kincên xwe yên herî xweşik li xwe bike û here nav bexçe, xwe tê de veşêre, wê xatûn jî were wir.” Taca Milûkan got: “Dibe.” Pîrê jî îşaretê diyar kir di nav xwe û wî de, piştê berê xwe da malê ji bo ku kincên xwe biguherîne û here cem Dunya Xatûn.

Piştî ku pîrê ji cem wan derket, Taca Milûkan jî rabû ser xwe, kincên xwe yên herî buha li xwe kirin ku hemû libasên qiralan bûn û bi hezarên dînanan nedihatî kirin. Kemereke hevrêşimî ku bi zêr û zîv xemilandîbû jî da newqa xwe û berê xwe da nav bexçe. Gava gihast wir, dît ku Nator li devê deriyê bexçe rûniştiye. Nator nuh ew dît, bi rêzdarî ji ber wî rabû deriyê bexçe jê re vekir û got: “Derbas be û li gorî kêfa xwe li nav bexçe bigere û temaşe bike.”

Nator bê agahdar bû û nizanîbû ku keça qiral jî wê rojê dê derkeve temaşekerina nava bexçe.

Taca Milûkan bi hêdîka derbasî nav bexçe bû û ji xwe re li nav geriya. Qederê seetekê bi şûn de, dengê xirecîrekê hate wî û ji nişkê ve dît ku qefleke xizmetkar û cariyê di deriyê bexçe re derbasî hundur bûn!

Di wê keliyê de, Natorê Kal jî dibezîya û bi lez ber bi Taca Milûkan ve diçû, ji bo ku wî ji hatina xatûna xwe agahdar bike. Gava gîha cem wî, jê re got: “Begê min, li gel ku ne di hesab de bû xatûna min were nav bexçe, vaye ew û cariyeyên xwe ber bi vir ve tîn. Îcar em ê çawa bikin gelo?” Taca Milûkan got: “Qet metirse! Ez ê xwe di nav bexçe de veşêrim û ez nahêlim ku ew min bibîne. Ji vî alî ve bila dilê te aram be.” Natorê bexçevan jî jê xwest ku baldar be û xwe baş veşêre, piştî bi lez ji wir çû.

Dunya Xatûn û cariyeyên xwe dan tengala pîrê û bi nav bexçe de çûn. Pîrê li rewşê meyizand û di nava xwe de got: “Welle ku ev cariyena bi me re bin em ê nikaribin bighên armancên xwe!” Di pey re li keça qiral zîvirî û jê re got: “Xatûna min, ez ê tişteki ji te re bibejim ku rehetiya dilê te têde hebe.” Dunya Xatûn pê re got: “Ka hela bêj bê çi li cem te heye?” Pîrê got: “Xatûna min, di van keliyan de tu pêdiviya te bi van cariyê û xizmetkaran tune ye û heta ew li vir bin jî dê aramî nekeve dilê te de. Ya baş berra wan de ji vir, bila herin.” Xatûnê got “Tu rast dibêji” û piştî ew ji wir şandin.

Meşa xwe, wisa bi tenê berdewam kirin. Taca Milûkan jî lê dimeyîzand bêyî ku hayê wê jê hebe, spehîbûna wê ewqasî dijwar bû ku her wî lê dinêrî, ji ser hişê xwe diçû. Pîrê jî xatûn dida axaftin û ew bi xwe re dimeşand, hetanî ku ew gihand cem wê qesra ku wezîr ew nû kiribû. Çawa ku çavên xatûnê li wan nîgar û neqşên li ser qesrê ket û awirên wê li ser wî nêçîrvan û kevok û bazî sekinîn, axînek pê ket û got: “Subhan ji Xwedê re! Ev wêne, dîmena tiştên ku min ew di xewna xwe de dîtine!” Piştî zîq li wan nêrî û axaftina xwe berdewam kir, got: “Binêre dadêcan, hela binêre çawa nêçîrvan kevoka mê digire û yê nêr jî pê ve tê ji bo wê rizgar bike, lê teyrê baz wî bi rê de digire û wî perçe dike!”

Lê belê pîrê xwe li xeşimî danî, wek ku hayê wê ji tişteki tunebe, sohbe-  
ta xwe li ser mijarên ditirkê pê re berdewam kir û hêdî hêdî ew ber bi cihê  
ku Taca Milûkan lê veşartî bû bir, ji aliyekî ve jî îşaret da wî ku here li ber  
şibakeyên qesrê bimeşe.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina xwe.*

ŞEVA SED Û SÎH Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:*

Di wê navberê de awirên Dunya Xatûn li Taca Milûkan ket û matmayî  
ma li wê spehîbûn û lihevhatina bejn û bala wî, ku hetanî wê rojê tu xort  
di wê asta spehîbûnê de nedîtibû. Li pîrê vegeriya û jê pirsî, got: “Dadêcan,  
ew xortê nestêle kî ye gelo?” Pîrê got: “Mixabin ez wî nasnakim, lê belê  
ez texmîn dikim ku qiralekî hêja be, lewre pir bi bejnûbal e û xweşik e.”  
Rindbûna wî bandoreke ewqasî mezin li ser Dunya Xatûn kir ku, nigên wê  
nema dikarîbûn rahêjin bedena wê, laşê wê hemû lerizî û pêlên ajoyan ew  
dagir kirin. Li pîrê vegeriya û jê re got: “Dadêcan, ew xortê han xortekî pir  
xweşik e û lihevhatî ye.” Pîrê got: “Tu rast dibêji.”

Piştire, pîrê dîsa îşaretek da Taca Milûkan ji bo ku here mala xwe, wî  
jî bi ya wê kir û berê xwe da malê, piştî ku agirekî sotîner di dilê wî de gur  
bû, ji ber eşq û evîna Xatûnê ku êdî hemû hebûna wî dakir kiribû. Xatûnê  
jî ji pîrê re got: “Tu çi dikî bike, lê min bi vî xortî re bîne cem hev.” Pîrê lê  
vegerand û got: “Lahewle û laqewete îlla billah! Îcar ev ji ku derket xatûna  
min? Tu ya ku tu ji hemû rengên zilaman direvî, tu çawa dil ketiye vî zilamî  
û çawa dewran wisa li te geryaye? Lê willeh dîsa jî heqqê te heye, ji ber ku  
tu kes ne layiqî te ye ji vî xortî pê ve.” Dunya Xatûn kelecانى bû, laşê wê  
lerizî, berê xwe ji pîrê guhert û got: “Dadêcan, ji ber vê daxwaza min li min  
bibhure! Tenê hezar dînar li ser min heye. Ez wî jî diyarî te dikim lê divê tu  
baş bizanibî ku heger tu min û wî negihîne hev, mîsoger ez ê bimrim.” Pîrê  
got: “Tu herî qesra xwe, ez ê li ser vî karî rawestim. Heger canê min jî tê de  
here, ez ê we bigihînim hev.”

Dûvre Dunya Xatûn berê xwe da qesra xwe, pîrê jî çû cem Taca  
Milûkan. Gava çav li pîrê ket, bi rêzdarî ji ber wê rabû û ew li kêleka xwe de  
rûniştand. Pîrê jî bi dilxweşî jê re got: “Tevdîra me pêk hat û leyistoka me  
çû serî!” Piştire bi berfirehî tiştê ku di neqeba wê û Dunya Xatûn de qewimî-  
bû jê re vegot. Taca Milûkan got: “Û kengî ez ê wê bibînim gelo?” Pîrê got:  
“Sibe.” Rabû Taca Milûkan hezar dînar weke bexşîş dayê û bi buhaya hezar  
dînarî jî zînet dayê. Wê jî rahişt herduyan û rabû ser xwe çû, vegeriya cem  
Dunya Xatûn. Gava giha cem, Xatûnê got: “Dadêcan! Gelo tu agahî li cem

te nînin di derbarê evîna min de?” Pîrê got: “Hîna min cihê wî dîyar nekiriye, lê bi xêr û selamet sibe ez ê wî binim cem te.” Dunya Xatûn pir kêfxweş bû bi wê xeberê û rabû hezar dînar weke bexşîş û zîneteke bi buhayê hezar dînarî dayê. Pîrê jî rahişt diravên xwe û berê xwe da mala xwe, wê şevê li mala xwe ma û bi sibê re rabû çû cem Taca Milûkan. Piştî ku pilana xwe pê da fêmkirin, kincên jinan lê kirin û jê re got: “Li pey min were û hewl bide ku tu xwe bihêjîne û hêdîka bimeşe. Qet li xwe nezîvire û bi kesî re jî nexave.”

Piştî ku pîrê çend şîretên din jî lê kirin, ew da dû xwe û ji malê derket. Bi rê de jî hişiyariyên xwe ji Taca Milûkan re dubare kirin û teşeya ku divê ew di liv û tevgera xwe de bişopîne jê re anî ziman, ji bo ku şaşitiyan neke. Bi wî hawî meşa xwe berdeyam kirin hetanî ku gîhan ber deriyê qesra Xatûnê. Li wir, pîrê bi xwînsarî derbas bû û ew jî li dû. Şeş derî li dû xwe hiştin, gava gîhan deriyê heftan, li Taca Milûkan zîvirî û jê re got: “Dilê xwe xwirt bike, aram be û gava ez bi ser te de qîrîyam û min got ‘Bilezîne cariyeya sistik.’ tu jî bilezîne û gava em ketin devtengê de, li hela xwe ya çepê binêre, tê hêwaneke mezin bibînî ku heft derî tê de hene. Tu jî di deriyê şeşan re derbas bibe, li wir tê bighêje miradê xwe.” Taca Milûkan got: “Û tu, tê bi ku ve herî?” Pîrê got: “Ez bi tu derê ve naçim, lê belê dibe ku ez hebekî dereng bikevim ji ber ku ez ê riya xwe bi serxizmetkar bixim.” Piştî, meşa xwe berdeyam kir hetanî gîha deriyê ku serxizmetkar tê de bû. Gava serxizmetkar Taca Milûkan di nav kincên jinan de pê re dît, ji pîrê re got: “Çi karê vê cariyeya han bi te re heye?” Pîrê got: “Ev cariyeye hûnerkar e û Dunya Xatûn ew bihîstîye, loma dixwaze wê bikire.” Wî jî lê vegerand û bi hêrs got: “Welle ez cariyê mariyê nasnakim û çawa ku qiral ji min re gotiye, hetanî ku ez wê di lêgerînê re derbas nekim, ez kesî di vir re derbas nakim.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina xwe.*

ŞEVA SED Û SÎH Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê vegotina xwe ji Şehriyar re berdeyam kir:*

Pîrê xwe qeherand û bi ser de çû, ji serxizmetkar re got: “Wisa xwiya dike ku tu bêaqil û bê edeb î! Veca heger tu bixwazî ez dikarim ji xatûnê re bejîm ku, tu têkilî cariyeya wê bûyê?” Piştî bêyi ku li hêviya bersiva wî bisekine, bi ser Taca Milûkan de qîrîya û got: “De ka tu jî derbas bibe cariyeya bêaqil!” Wê gavê, Taca Milûkan jî bi ya pîrê kir û di wir re derbas bû; serxadim jî bêdeng ma. Taca Milûkan jî gava gîha deriyê şeşan, tere derbas bû û li wir dît ku Dunya Xatûn li ser nigan e, li bendî wî. Wê jî çawa ew dît, naskir û ew himbêz kir. Di wê navberê de pîrê jî gîha wir û derbasî cem wan bû. Pêre jî hîle li xizmetkarên xatûnê kir û ew jî wir dûr xistin. Xatûnê jî pîrê

re got: “Hema tu nobetê ji me re bigire û bibe dergevanê me.”

Bi wî hawî Dunya Xatûn û Taca Milûkan bi tena serê xwe man, di nava maç û ramûsan û himbêzkirina sing bi sing, zik bi zik û hêt bi hêt ku weke maran li hev geriyar hetanî şevqê. Bi sibehê re Xatûnê ew xist odeyeke kêlekê de, derî lê girt û vegeyriya odeya xwe, mîna her car li cihê xwe rûnişt. Cariyeyên wê hatin, pêdiviyên wê pêk anîn û li wan deran çûn û hatin. Xatûnê ji wan re got: “Êdî hûn dikarin derkevin derve. Ez ê behna xwe berdim.” Cariye derketin, wê jî çû Taca Milûkan ji odeya din anî cem xwe. Pîrê jî çû têra wan xwarin û vexarin ji wan re anî û mîna roja ewil derî li ser wan girt û çû. Ew jî dîsa ketin ser dilên hev û bi hevdu şa bûn hetanî seherê. Bi wî hawî mehek sax derbas kirin.

Vêca em vegeyriya ser rewşa Wezîr û Ezîz. Wan jî piştî dîtina ku Taca Milûkan ket Qesra Dunya Xatûn û nema jê derket piştî derbasbûna ewqase roj, metirsiyên wan mezintir bûn û di dilê xwe de gotin “Begûman dê di wir de were kuştin û filitandina wî nîn e!” Herî dawî Ezîz ji Wezîr re got: “Bavocan, êdî em ê çî bikin?” Wezîr jê re got: “Kurê min ev pirsgerê mezîna e, veka heger em vegeyriya cem bavê wî û em wî agahdar nekin, dê qiralê me pîr lomeyan ji me bike.”

Herduyan kar û barên xwe kirin û di cî de ketin ser rêya vegeyriyê û berê xwe dan erda şîn û textê Qiral Suleyman Şah.

Bi şev û roj meşiyar, deşt û newal derbas kirin hetanî ku gihan warê xwe û derbasî cem Suleyman Şah bûn û ew ji her tiştî agahdar kirin. Gava jê re gotin kurê te ji gava ku derbasî cem wê bûye derneketiye, dinya li ber çavê wî reş bû û qîrek da ku bangeşîya cîhadê li hemû niştecîhên welêt kir. Leşker derxistin derveyî bajêr, çadir û kon ji wan re vegirtin û ew jî li ser çardaxekê rûnişt hetanî artêşên wî yên ku ji çar hêlên welat dihatin, gîhane hev. Jixwe ji ber comerdî û dadweriya wî, hemû gelê wî jê hez dikir û di rojên teng de lê xwedî derdiketin. Piştî, da pêşîya artêşa xwe û di hewara kurê xwe de çû, kete ser rê de.

Îcar em vegeyriya ser rewşa Taca Milûkan û Dunya Xatûnê. Wan jî, bi wê teşîya jiyana xwe ya bi dizî niv sal li pişt xwe hiştin. Evîn û hezkirina wan jî roj bi roj zêdetir dibû. Taca Milûkan, ji eşq û şahiyê sermest bibû. Rojekê dema ku dîsa di nava kelecana wê evînê de bû, ji Dunya Xatûn re got: “Binêre delala ber dilê min, bi navê Xwedê her ku diçe dilê min bi te ve hîn bêhtir tete girêdan. Lê belê hîna jî ez bi temamî negihame miradê xwe.” Wê jî got: “Û tu çî din dixwazî nûra çavan?”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî vegotina xwe birî.*

## ŞEVA SED Û SÎH Û PËNCEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir:*

Dunya Xatûn jê re got: “Tu çi din dixwazî ronîya çavan? Heger maç û himbêz û lihevbadana çîman têra te nake, tu dikarî li gora dilê xwe tevbigeri û tiştê tu dixwazî bi min bikî. Lewre Xwedê jî ne şîrikê me ye. Taca Milûkan lê vegerand, got: “Meqседа min ne ev bû, min dixwest ku rastiya xwe ji te re bêjim. Lewre ez ne tacir im, ez kurê Suleyman Şahê Mezin im; ew Sultanê ku wezîrê xwe qasid şandibû cem bavê te, ji bo ku te ji min re bixwaze û te jî berra wî dabû.” Piştî çîroka xwe ji serî hetanî binî jê re vegot û li dawiyê jî pê de çû, got: “Loma ez dixwazim herim cem bavê xwe û jê re bibêjim, ji bo ku qasidekî bişîne cem bavê te û te ji min re bixwaze, da ku em aram bibin û dilê me rehet bibe.

Gava Dunya Xatûn ev gotin ji devê wî bihîstin, pir kêfxweş û şanaz bû ji ber ku ew bixwe bû daxwaza wê û êdî ew jî hatibû ser wê daxwazê. Piştî ku li ser wê yekê li hev kirin, serê xwe danîn ser heman balgîfê û bêhemdî xwe di xew re çûn. Cara yekê bû ku wisa di xew re diçûn.

Serê sibehê mîna her roj, bavê wê Qral Şehrîman li ser textê xwe rûniştî bû û mîr û wezîr û gizîrên wî jî li dora wî bûn; pîrgirêk û mijarên welatê xwe nîqaş dikirin. Di wê navberê de mezinê zêrkeran derbasî cem wî bû, qotîkeke mezin î xweşik di destê wî de bû. Hat ber Qral û qotîk jê re vekir ku gewher û yaqût û zumridin tê de hebûn, bi buhayêke ku tu şahî nikarîbû bikiriya. Nuh Qiral çav li wan gewheran ket ma şaş ji ber spehîbûna wan û di cî de gazî kir serxizmetkarê xwe Kafûr, jê re got: “Vê qotîkê bigire û bibe cem xatûna xwe Dunya.”

Serxadim rahişt qotîkê û çû ber odeya xatûnê, dît ku derî girtiye û pîrê jî li ser derencê raketîye. Serxadim qîr kir û got: “Qey hetanî vê seetê ji hûn raketî ne?” Pîrê çawa ku ji xew şiyar bû û li rewşa heyî hay bû, tirsîya ku raz hişkere bibin û malik lê xera bibe. Jê re got: “Ka hela xwe ragire, hetanî ez herim mifteyê binim. Piştî bi lez ji wir derket, çû. Serxadim jî tê derxist ku pîrê derewan dike û tiştê di meseleyê de heye. Loma li bendî wê nesekîni, xwe li derî da û derbasî hundur bû; dît ku Dunya Xatûn û Taca Milûkan di himbêza hev de raketîne. Ma heyirî û nema dizanîbû wê çawa tevbigere. Nêt kir ku vegere cem Qiral, lê wê kêlikê Dunya Xatûn şiyar bû û ew dît. Rûyê wê zer bû, tirsîya û bi zimanekî tikankar jê re got: “Kafûr min bisitirîne, Xwedê te bisitirîne!” Kafûr got: “Ez nikarim tiştêkî ji Qiral veşêrim.” Piştî, derî li ser wan girt û bi şûn de çû.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

## ŞEVA SED Û SÎH Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehriyar re berdewam kir:*

Serxadim çawa derî li ser wan girt, vegeriya cem Qiral. Qiral jê re got: “Gelo te ew qotîk da xatûna xwe?” Serxizmetkar got: “Va qotîk bi min re ye, jixwe ez ê nikaribim tiştêkî ji te veşêrim. Lewre gava ez derbasî odeya Dunya Xatûn bûm, min dît ku xortekî rind û lihevhatî li ba wê raketiye, li ser heman doşekê.”

Qiral ferman da ku biçin, herduyan bînin hizûra wî. Gava xizmetkaran çûn ew anîn, Qiral ji wan pirsî û got: “Ev çi karê ku we kiriye?”

Hêrs bûbû û pir qeherîbû. Bêyî ku li bendî bersiva pirsê xwe bimîne, rahişt şûrekî û bi ser Taca Milûkan de çû. Keça wî ket navberê û xwe avêt ser bavê xwe, jê re got: “Berî wîna, min bikuje!” Qiral pê de xeyidî û ferman da xizmetkaran ku wê bibin odeya wê.

Dûra li Taca Milûkan zivirî û bi hêrs jê re got: “Tu kî yî, tu kurê kî yî ku tu natirsî nêzîkî keça min bibî?” Taca Milûkan jê re got: “Qiralê hêja divê tu bizanibî, heger tu min bikujî tê poşman bibî, lewre tu û xelkê te hemû hûnê perîşan bibin û têk herin.” Qiral got: “Û ew çawa ye?” Wî got: “Ji ber ku ez kurê Sultan Suleyman Şah im ê ku her kêlî dibe raserî te derkeve li gel artêşa xwe.”

Gava Qiral Şehrîman ew gotinên wî bihîstin, xwest wî bixe zindanê de û kuştina wî dereng bixe ji bo rastiya wan gotinên wî hîn bibe. Hîna neaxivîbû, wezîrê wî jê re got: “Qiralê Zemanan, heger tu bi ya min bikî vî sakûleyî zû bikuje, lewre wî destdirêjiya keça qiralan kiriye.”

Bi vê gotina Wezîr re, Qiral gazî şûrvanê xwe kir û jê re got: “Serê vî xayînî bifirîne!”

Şûrvan ew bir, dest û nigên wî girêda. Piştê yeko yeko ji emîr û wezîran pirsî bi meqsêda ku kuştina wî dereng bixe. Gava ku wê helwesta wî bala Qiral kişand, berê xwe dayê û bi ser de qîrîya, got: “De serê wî zû bifirîne, ma tê hetanî kengî şêwrê bike bi wezîran re? Heger tu careke din bişêwîre, ez ê serê te bifirînim.” Piştî vê hişyariya Qiral, şûrvan rahişt şûrê xwe û ber bi hewa ve rakir hetanî ku mûyên bin çengên wî xwiya kirin. Tam di wê kêlikê de qîrîn û xumexumek bi nav bajêr ket, xelkê dikanên xwe girtin. Qiral ji şervan da sekinandin, got: “Xwe ragire!” û xizmetkarin şandin nava bajêr, ji bo ku agahiyekê bine di derbarê wê xirecirê de.

Piştî demeke kurt, qasidê Qiral bi şûn de vegeriya û got: “Artêşek me-



zin ber bi bajêr ve tê, mîna pêlên ava behrê. Hespên siwaran çargavî û bi reperep tèn ku erd ji ber nigên wan diheje, lê kî ne ne kî ne ez nizamim.”

Bi vê agahiyê re Qiral tirsîya ku mal û milkê wî ji dest here; li wezîrê xwe zîvirî û got: “Gelo leşkerên me jî li himberî vê artêşê derneketine?” Hîna bersîva vê pîrsa xwe nestendibû, hacibên wî derbasî hundur bûn li gel qasidê sultan û wezîrê wî, yê ku bi silavdayîne dest bi axaftina xwe kir. Qiral Şehrîman jî ji cihê xwe rabû, ber bi wan ve çû, sebaba hatina wan pîrsî. Ji nava heyeta qasidan, Wezîr axivî û bersîva pîrsa Qiral da, got: “Divê tu bizanibî ku ev artêşa han a ku hatiye ser erdê te, ne weke artêşa qiral û sultanên din e.” Şehrîman got: “Û ev qiral kî ye?” Wezîr got: “Ev qiral, Sultan Suleyman Şahê xwedî nav û deng, ê dadwer û aştîhez, xwediyê erda hişîn û çiyayên Esfehanê yê ku ji dad û wijdankariyê hez dike û ji zulm û zorê aciz e û ji te re dibêje ku kurê wî li bajarê te û li cem te ye. Ev kurê wî jî kezeba wî ya bi tenê ye. Vêca heger wî kurê xwe sax û salîm bibîne, meqseda wî pêk tê û spasiya xwe ji te re nîşan dide û heger ew wenda bûbe li ser axa te, ango tiştêk pê hatibe, wê çaxê divê tu bizanibî ku wê welatê te ser û bin bibe, were xerakirin û wê bibe kavlên ku bûm û qijak li ser dixwînin. Bi wî hawî min peyama Sultanê xwe gîhand te, li gel silav û rêzan.”

Gava Qiral Şehrîman ew gotinên qasid bihîstin, neqrîsk ketin dilê wî de, bêhna wî çikiya û tirsîya ku qiraltiya wî jî ji dest here. Qîrîya bi ser dergevan û wezîr û hacibê xwe de û gazî wan kir. Gava ku hatin hizûra wî, ji wan re got: “Kanî bi lez wî xortî binin û tiştêkî pê nekin.”

Taca Milûkan jî di nav lepên şûrvan de bû. Carekê awirên qasidan pê ketin, dîtîna ku serê wî li ber şûr e. Ew nas kirin, Wezîr pê ve çû û xwe bi ser wî de avêt. Ezîz û qasidên mayîn jî li pey wî çûn. Dest û nigên wî vekirin, ew azad kirin, Taca Milûkan jî çavên xwe vekirin, Wezîr û Ezîz nas kir û ji kêfan ji ser hişê xwe çû.

Qiral Şehrîman jî behetî mabû di nava tirs û metirsîyan de, ji ber hatina vê artêşa xerîb li pey vî xortê han! Bê hemdî xwe meşîya ber bi Taca Milûkan ve, çû eniya wî maçî kir, hêsir li ser barandin û jê re got: “Kurê min, li min megre û ji ber vê extiyariya min li min bibore û li min were rehmê, welatê min xera meke!”

Taca Milûkan ber pê ve çû, rahişt destê wî maçî kir û jê re got: “Tiştêk bi te nayê, qet mereq meke. Jixwe tu di şûna bavê min de yî. Lê belê ez ditirsîm ku tiştêk bi dildara min Dunya were.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

## ŞEVA SED Û SÎH Û HEFTEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:*

Rabû Qiral Şehrîman li Taca Milûkan vegerand û jê re got: “Qet ji bo wê metirse, lewre ew dê di nava kêf û şahiyê de be.” Dûvre lêborîna xwe jî jê xwest û dilê wî xweş kir. Ji aliyekî din ve jî lêborîna xwe jî wezîrê Suleyman Şah xwest û soz dayê ku mal û mulkekî pir bide wî heger ev tiştê dîtiye ji Suleyman Şah veşêre. Piştê jî ferman da zilamên xwe ji bo ku Taca Milûkan bibin hemamê û kincên nû yê qiralan lê bikin û bi lez wî bi şûn de bibin. Wan jî bi ya wî kirin, ew birin hemamê, ew paqij kirin û bedlikî kincên ku Qiral Şehrîman jê re veqetandibû lê kirin û bi lez ew bi şûn ve anîn. Gava ew derbasî cem Qiral Şehrîman kirin, Qiral û hemû mezinên dewleta wî ji ber wî rabûn bi rêzdarî û ketin ber xizmeta wî de.

Piştê Taca Milûkan hat li cem wezîrê bavê xwe û Ezîz rûnişt, tiştê ku bi serê wî hatibû ji wan re vegot. Wezîr û Ezîz jî jê re gotin: “Em jî di wê navberê de çûn, me xwe gihand bavê te û me ew agahdar kir ji rewşa te, me jê re got ku tu derbasî qesra keça qiral bûye û jê derneketiye; em jî di nava gûmanê de hiştin, loma em hatine cem te. Îcar gava wî ew gotina me bihîst, artêş amade kir û bi lez em hatin vê derê ku bi hatina me re jî xêr û xweşî hat û dilê me gişan aram bû.” Taca Milûkan jî ji herduyan re got: “Hîn jî xêr û xweşî li ser destên we ji min re tê, jixwe ji serî ve jî wisa bû. Xwedê xêra we binivîsîne.”

Di wê navberê de Şehrîmanê Qiral jî derbasî cem keça xwe bû û dît ku serê şûrekî xistiye nava sînga xwe de, xwe bi ser şûr de xûz kiriye, li ser Taca Milûkan digrî û ji xwe re dibêje “Teqez divê ez xwe bikujim û ez piştî wî nejim!” Dema bavê wê ew di wê rewşê de dît, pê de qîrîya û got: “Ey şah-banûya keçên hemû qiralan! Vê yekê bi xwe neke û li bavê xwe were rehmê, li xelkên welatê xwe were rehmê!”

Piştê, hinekî din ber bi wê ve çû û axaftina xwe berdewam kir: “Baldar be û bila xerabiyek bi bavê te neyê di rûyê te de.” Piştê tiştên ku qewimîbûn, hemû jê re gotin û pê de çû, got: “Evîndarê te, kurê Suleyman Şah, dixwaze bi te re bizewice û êdî erênaya wê jî di destê te de ye!”

Dunya Xatûn kenîya û got: “Ma qey min ji te re negot ku ew kurê sultan e? Wele ez ê bihêlim ku te li ser darekî bi du derheman bixe çarmixê de!” Bavê wê jê re got: “Ji Xwedê bitirse û li bavê xwe were rehmê keça min!” Dunya Xatûn jê re got: “Ku tu here cem wî û wî bîne vir.” Wî jî got: “Ser seran, ser çavan.”

Bi lez ji cem wê derket û çû cem Taca Milûkan û daxwaza keça xwe jê re anî ziman. Ew jî rabû ser xwe û pê re çû cem keça wî. Çawa ku Dunya Xatûn ew dît, li pêş bavê xwe ew himbêz kir, maçî kir û jê re got: “Min pir bêriya te kiribû!”

Piştî li bavê xwe vegebiya û jê re got: “Mirov dê çawa xortekî wisa ji dest xwe berde û ew qiral kurê qirala ye?!”

Wê gavê Şehrîman ji cem wan derket, derî li wan girt û çû cem wezîrê bavê Taca Milûkan û qasidên wî. Ferman da wan ku biçin ji bavê wî re bêjin, kurê te Taca Milûkan bi xêr û selamete û di nava jiyaneke bextewar de ye. Dûvre li xizmetkarên xwe jî vegebiya û ferman da wan ku diyarî û ûlûfatan ji bo leşkerên Suleyman Şah derxînin li gel xelatekê ku ji hespekî bi zîn, sed mihîn, sed deve, sed kole û sed cariyeyî pêk tê, jê re bixin rê de.

Piştî ew û wezîr û gizîrên xwe jî li hev kom bûn û derketin pêşiya bajêr, ji bo pêşwazîkirina Sultan Suleyman ê ku kurê wî Taca Milûkan û wezîrê wî nû çûbûn ew agahdar kiribûn. Loma ew bixwe jî pir bextewar û dilaram bibû û gotibû “Hemd û şîkir ji Xwedê re ku kurê min bextewar kiriye û ew parastîye!”

Dema gîhan hev, Sultan Suleyman Şah Şehrîman himbêz kir bi germahî û piştî ew li kêleka xwe da rûniştandin, herdu bi hev re ketin nav sohbetê germ de. Dûvre xwarin û vexwarin jî ji wan re anîn, li dora sifrê rûniştin, têra xwe xwarin. Di pey wê re şêrînahî jî ji wan re pêşkêş kirin, ew jî xwarin. Di wê navberê de Taca Milûkan jî hate wir û bi wê bejn û bala xwe ya balkêş derbasî cem wan bû. Nuh çavê bavê wî lê ket, pê ve rabû û bi kelecaniyeke mezin ew himbêz kir. Piştî hemû kesên li wir, ji ber wî rabûn bi rêzdarî. Ew jî bi qasî seetekê di nav wan de rûnişt, bi wan re axivî. Wê çaxê Sultan Suleyman Şah ji Qiral Şehrîman re got: “Di hizûr û şahidiya van cwamêran de, ez dixwazim keça te ji kurê xwe re bixwazim û aniha li vir, mehra wan bibirrim.” Wî jî got: “Ser seran, ser çavan.” Û şand dûv qadî û şahidan, ew jî anîn wir û mehra wan birrîn. Leşker jî pir kêfxweş bûn. Qiral Şehrîman jî dest bi amadekariyên keça xwe kir.

Taca Milûkan got: “Ezîz, cwamêrekî comerd û fedakar e; xizmeteke mezin ji min re kir. Rêwîtiyeke dirêj bi min re kir, ked da, xwe êşand hetanî ku ez gihandim miradê min. Bi sebreke dirêj li gel min ma hetanî ku min encam girt. Du salan sax dûrî welatê xwe ma, ji bo ku alîkariyê bi min re bike. Loma divê di demeke nêzik de em kerwanekî ticaretê jê re amade bikin û ber bi welatê wî ve, wî bixin rê de.” Bavê Taca Milûkan jê re got: “Tiştê herî rast jî ev e.”

Li gorî wê yekê jê re sed bar ji caw û qumaşên herî buha amade kirin. Taca Milûkan ji hat ew bi rê kir û xatir jê xwest, jê re got: “Birê min ê delal, ev jî diyariyeke min a biçûk e ji bo te.” Wî jî ew diyarî qebûl kir ji destê wî û erda ber nigê wî û ya ber nigê bavê wî Suleyman Şah maçî kir û bi rê ket. Taca Milûkan ji bi qasî sê rojan rêwîti pê re kir. Piştî Ezîz sûnd xwar ku dê nehêle hîn zêdetir pêre were û ew bi şûn de da vegerandin, piştî ku jê re got: “Ne ji diya min bûya ez ji te venediqetiyam, lewre ezê pir bêriya te bikim. Tu bi Xwedêkî, min bê agah nehêle ji xwe!”

Ezîz xatir ji Taca Milûkan xwest û vegeriya welatê xwe. Gava vegeriya malê, dît ku diya wî gorek jê re çêkiriye di nivê malê de û ew jî li dorê diçe û tê. Porê xwe vekiribû, bi ser tîrbê de belav kiribû, hêsir dibarand û digot:

Tu bi Xwedêkî gorê, bibêje ew çawa ye?  
Gelo hîna jî ew mîna berê, wer spehî ye?  
Mixabin gorê, tu dîsa wisa bê bersiv î  
Li gel ku tu ne bîstan û ne jî eflak î  
Gelo li ba te çawa kom dibin ligel hev?  
Ew bedrehev û gul, herdu têne gel hev?

Hilmeke kûr kişand û dîsa berdewam kir, got:

Ez rêya xwe bi mezelan dixim bi silavdayînekê  
Li gora dildarê min nade min tek bersivêkê  
Dildêr digote min ez ê bersivê çawa bidim te  
Û ez wisa di nava diranên ax û avê de  
Xwariye îro vê axê hemû delaliyê min  
Lewre dûrî we me ez, hûn hemî jibîr kirin

Li pey wê têra xwe giriya û dîsa berdewam kir, got:

Bi sebr im ez li himberî hemû bûyeran  
Lê belê zivêr dibim ez ji hemû dûriyan  
Kî dikare bêhnfireh be li hember veqetînê?  
Kî dikare bisebir be dema jê bêagah dimînê?

Dema ev helbesta xwe ya dawî qedand, serê xwe rakir û dît ku Ezîzê wê ketiye hundur de, di ser wê re sekiniye! Matmayî û di nava çoş û kelecaneke bêsînor de, pê ve rabû û xwe êriş kirê, ew himbêz kir û sebeba vê wendabûna wî ya duvdîrêj jê pirsî. Wî jî ji serî hetanî binî çiroka serpêhatiya xwe giş jê re vegot û jê re anîne ziman bê çawa Taca Milûkan sed barê caw û ticaretê diyarî wî kir. Diya wî jî pir kêfxweş bû bi wê yekê.

Ezîz jî êdî li cem diya xwe ma, di nava wê şaşwaziya wî ya li himber wê bobelata ku keça Delîla ya sihirbaz anîbû serê wî.

Vêca em Ezîz li cihê wî bihêlin û em vegerin ser rewşa Taca Milûkan.

Ew jî wê şevê derbasî cem dildara xwe Dunya Xatûn bû û pê şabû hetanî sibehê, di nava bextewariyeke bê tarîf de. Roja dîtirkê bavê wê Qiral Şehrîman jî amadekariyên keça xwe kirin, ji bo ku wê rê bike bi mêrê wê re, ber bi welatê wî ve. Jê re diyariyên cûr be cûr, xwarin û hemû pêdiviyên wan bar kirin û ew bi rê xistin. Ew jî meşa sê rojan bi wan re çû, piştîre Taca Milûkan û bavê wî Suleyman Şah sûnd xwarin ku dê nehêlin hîn bêhtir bi wan re bê û bi wî hawî xatir jê xwestin û ew bi şûn de şandin.

Taca Milûkan jî ligel bavê xwe û jina xwe, riya xwe berdewam kirin. Bi şev û roj meşiyên hetanî ku gihan welatê xwe. Xelkên wan, bajar ji wan re xemilandibûn û hemû li hêviya hatina wan bûn wê rojê.

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û SÎH Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê ji Qiralê Mezin Şehriyar re got:*

Şahî şahê min ê bextewar! Gava Sultan Suleyman Şah gîha welatê xwe, li ser textê xwe yê sultanî rûnişt û kurê xwe Taca Milûkan jî li kêleka xwe da rûniştandin. Piştîre lêborîneke giştî derxist û hemû zindanî serbest berdan û cara duduyan dawetek ji kurê xwe re li dar xist ku vê şahiya dududan bi qasî mehekê berdewam kir, bi reqs û stran û kêf û şahî. Hemû jin û cariyê û xizmetkar jî li derdora Dunya Xatûn hatin hev û bi heyrangorî li spehîbûna wê meyzandin.

Taca Milûkan jî bi dê û bavê xwe şewirî, piştîre derbasî cem jina xwe bû û jiyana xwe bi bextewarî berdewam kirin bi hev re, hetanî dawiya emrê xwe.

### **(Çîroka Şewqa Mekan û Dorpêça Qostantîniye)**

Wê gavê Şewqa Mekan ji wezîrê bavê xwe re, ji Wezîr Dendan re got: “Herbijî ji te re şarezayê zana! Încez kesên mîna te biaqil bibin şewirmendên qiralan û di civata wan de rûnên, bi fikir û hebûna xwe tevdîrên wan xwirtir bigirin.”

Bi wî hawî Şewqa Mekan û leşkerên xwe dorpêça Qostantîniye çar salan berdewam kirin, hetanî ku aciz bûn ji dorpêçê û ji wî şerê ku şev û roj berdewam dikir bêyî bigihe tu encamê. Ligel wê yekê jî hemûyan bêriya welat û meriv û nasên xwe kirin û agirekî bêsebrîyê di nava wan de pêketîbû ku nikarîbûn vemirandana. Di wê rewşê de Şewqa Mekan ji navmalîyên

xwe xwest ku gazî hersê fermandarên wî Behram, Rustem û Turkaş bikin. Xulam çûn, gazî wan kirin. Gava hersê fermandar hatin hizûra Qiral, Şewqa Mekan ji wan re got: “Ev bû çend sal ku em vê dorpêçê berdeyam dikin, lê hîna jî em negihane armancên xwe. Berevajî wê, kul û xem û derdên me pirtir bûne. Qaşo em hatin ji bo ku em tola Qral Nûman hilînin, birê min Şerker hate kuştin û me ew jî li ser kir; bi wê yekê êşa me bû du êş û hesreta me bû du hesret. Hemû ji destê wê pîra Dayika Zîrekan a ku qiralê me di mala wî de kuşt, jina wî Safiya jî vedizî, bir û bi wê ji têr nebû, hetanî ku hat hîle li me kir û birê min serjêkir. Hûn jî dizanin ku min sîndeke giran xwar ku ezê tolê ji wê hilînim. Wêca ka hûn çî dibêjin? Baş bifikirin li ser vê mijarê û bersivê bidin min?”

Her sêyan serên xwe bera ber xwe dan, bêdeng man û ew peywira han jî avêtin ser stûyê Wezîr Derdan, Wezîr jî ber bi Şewqa Mekan ve çû û jê re got: “Qiralê Zemanan! Bawer bike tu fêde di mana me ya vir de nemaye, rêya herî baş ew e ku em vegezin welatê xwe, em hesreta xwe derbas bikin, demekê li wir bimînin hetanî em xwe bi ser hev din, heta xwe komî ser hev bikin û piştê em dîsa vegezin vir û bi ruhekî nû em êrişî ser van kafiran bikin.” Qiral hinekî ponijî, piştê serê xwe rakir û got: “Rêya herî baş ew e, lewre xelkê bêriya jin û zarokên xwe kirin û ez bi xwe jî pir bi fikarim li ser kurê xwe Kan Mekan û keça birê xwe Qeza Bû, ya ku li Şamê ye û ez nizanîm bê niha ew di çî rewşê de ye.”

Gava leşker bi wê biryara qiralê xwe hisyan, pir kêfxweş bûn û dua ji Dendanê Wezîr re kirin. Qiralê wan Şewqa Mekan ferman da gazîkaran ji bo ku banga amadekariyê di nav leşkera de bikin, da ku di nava sê rojan de xwe ji çûnê re amade bikin. Wan jî amadekariye xwe kirin û di roja çaran de al hatin bilindkirin û daholan lê dan, leşker li pey hev rêz bun û ref bi ref li erdê belav bûn. Dendanê Wezîr ket peşîya artêşê, Qiral Şewqa Mekan jî ket nava wê de û bi wî havî dest bi meşê kirin, artêş kete rê de. Qiral û leşkerên xwe bê rawestan şev û roj meşîyan hetanî ku gihan Bexdê. Xelkên wan pir kêfxweş bûn bi hatina wan, hesreta salan şikandin û hemû kul û xemên xwe li pey xwe hiştin. Her emîr û serleşkerek çû mala xwe, Qiral jî derbasî qesra xwe bû; çû cem kurê xwe Kan Mekan ê ku bûbû heftsalî û edî dikaribû li hespan siwar bibe.

Piştî ku Qiral bêhna xwe berda û westina rêwîtiyê ji ser xwe avêt, ew û kurkê xwe Kan Mekan çûn hemamê xwe şuştin, xwe baş paqij kirin û bi şûn de vegeziya ser textê xwe runişt. Gazî wezîrê xwe Dendan kir. Dendan hate rex wî, piştê jî hemû mîr û gizîr û mezinên dewletê seferber bûn, hatin xizmeta wî de. Wê gavê Şewqa Mekan ferman da hizmetkarên xwe ku herin ew tifikvanê ku di rêya Qudsê de pêre bûbû alîkar, jê re binin. Xizmetkaran çûn ew anîn ber destên wî. Dema Şewqa Mekan ew dît, pêve

rabû xêrhatina germ lê kir û ew li kêleka xwe da rûniştandin. Jixwe qiral ji wezîrê xwe Dendan re behsa qencîya wî zilamî kiribû û ji ber wê jî qedrê wî zilamî mezin bûbû li ba Dendan. Zilamê Tifikvan jî ji ber rehetî û pir xwarinîya dema borî, pir qelew bûbû. Stuyê wî bûbû mîna yê berazekî û zikê wî jî bûbû mîna yê filekî. Hebekî jî bûbû mîna serxweşan, ji ber ku ew qet ji malê dernediket. Loma gava ku hat hizûra Qiral ji ew nas nekir di destpêkê de. Dema ku qiral bi devlikên ew pêşwazî kir û jêre got: “Te çi zû ez jibîr kirim?” Wî ji nûve bi hûrgulî li nav çavê Qiral nêrî, ew nas kir û li himberî wî rabû ser niga û jêre got: “Kê tu kirîye Qiral?”

Wê gavê Qiral bi wê gotina wî kenîya. Wezîr Dendan pêve rabû û serpêhatiya qiralê xwe ji serî hetanî binî jê re got. Piştî lê zêde kir û got: “Zilame tê yê berê bû, birakê te bû û niha jî bûye sultanê cîhanê û qiralê welatê me. Begûman dê fêdeya wî bigihêje te jî. Loma ji niha ve ez dixwazim şîretê li te bikim. Heger Qiral ji te re got ku tiştêkî ji min bixwaze, divê tu tiştêkî pir girîng bixwaze, ne tiştêkî ji rêzê. Lewre tu mirovekî pir binirx î li ber dilê wî.” Tifikvanê himamê lê vegerand û got: “Ez ditirsim ku ez tiştêkî wisa girîng jê bixwazim, ew nede min, ango nikaribe bide min.” Wezîr jê re got: “Metirse heyran tu çi bixwazî ew ê bide te.” Zilam jî got: “Naxwe çi dibê bela bibe, misoger ez ê tiştê di serê xwe de jê bixwazim. Ezê her roj izna wê yekê jê bixwazim hetanî ku ewî bike.” Wezîr got: “Kul û xeman nexwe, wellehî tu wîlayeta Şamê cihê birayê wî bixwe bixwaze jî, wê bide te.”

Wê gavê Tifikvan rabû ser xwe ji bo ku here, Şewqa Mekan bi destan îşaret dayê ji bo ku rûnê, lê belê wî qebûl nekir û got: “Bi navê Xwedê ez ê êdî herim, lewre dema mēvantiya min li vir qediya.” Qiral jê re got: “Na wele mēvantiya te hîna berdewam e, lewre ez çi bikim jî ji bo te ez ji bin deyndariya te dernakevim. Lewre tu bû yê ku te ez ji mirinê xelas kirim û heger niha ez li ser vî textê seltanatê bim jî, ev yek bi xêra te ye. Loma tu her tiştî heq dîke û niha jî ez dixwazim ku tu tiştêkî ji min bixwaze.” Zilam got: “Begê min, ez ditirsim ku ez tiştêkî bixwazim, tu nikaribî binî cih, ango tu wî nedî min?” Sultan kenîya û got: “Tu nivê vî welatî bixwazî jî ez ê wî bidime te, de êdî bixwaze û tiştêkî din nefikire!” Zilam got: “Ez ditirsim ku hêza te negihêje pêkanîna daxwaza min.” Qiral qeherî û jê re got: “Çi daxwaz di dilê te de hebe bibêje!” Zilam got: “Ez dixwazim ku tu nameyekê ji min re binivîsîne da ku hemû tifikvanên Qudsê, min nas bikin.”

Bi wê gotina wî re, hemû kesên li wê derê kenîyan. Qiral jê re got: “Derveyî wê yekê, tiştêkî din bixwaze.” Tifikvan got: “Ma min negot ez ditirsim ku tu daxwaza min pêk neyîne, an jî nikaribe pêk binî!” Wezîr sê caran çav dayê ji bo ku daxwaza xwe biguherîne, lê her car wî ji qiral re digot “Ez dixwazim tu min bikî serokê paqijkarên zibil û gemarê li Qudsê.” Carinan jî digot “Min bike serokê zibilkarên Şamê.” Hemû kesên di dîwana

qiral de ziko-pišto bûn ji kenan, li himberî vê daxwaza wî. Wezîr Dendan, nema xwe girt, lê da. Ew jî lê vegeriya û got: “Tu kî yî ku tu li min didî? Û çî gunehê min heye ku tu li min didî? Ma qey ne te ji min re gotibû tiştêkî girîng ji Qiral bixwaze?” Herî dawî jî got: “Ka min berdîn, bihêlin ez herim welatê xwe.”

Wî çaxî Qral têgihîşt ku laqirdiyan li wan dike. Piçekî din bêhna xwe li wan fireh kir, piştî çû cem wî, jê re got: “Birawo! Ka daxwaza tiştêkî ji min bike ku layîqî maqamê min be.” Zilam jî Qiral re got: “Naxwe kanî min bike sultanê Şamê li şûna birê xwe.” Qiral Şewqa Mekan jî rabû fermaneke sultanî bi wê mijarê jê re nivîsand, îmze kir û ji wezîrê xwe Dendan re got: “Ji te pê ve, tukes nikare pêre here. Tu pêre here û gava tu vegeriya jî, keça birê min Qeza Bû jî bi xwe re bîne!” Wezîr got: “Bila be qiralê min, ser seran, ser çavan.”

Di pey wê re Wezîr, Tifikvan bi xwe re bir û çû ji bo ku xwe amade bike, ji bo rêwîtiyê. Şewqa Mekan jî fermanek da ji bo ku textekî nû ji Tifikvan re amade bikin û taximekî sultanî jî li gel wî bişînin. Ji hemû mîr û gizîran re jî got: “Kesê ku ji min hez dike, bila diyariyekê jê re bîne.” Piştî jî navê wî kir Zeblekan ê Sultan û nasnavê wî jî kir “Elmucahîd”.

Hemû amadekariyê wî û yê rêwîtiyê, di nava mehekê de hatin qedandin. Zeblekan jî rabû ser xwe çû cem Şewqa Mekan ji bo ku xatir jê bixwaze. Hat meqamê wî, serê xwe jê re danî û kete hizûra wî. Şewqa Mekan jî ew himbêz kir, şîret lê kirin û jê xwest ku dadwerkar û dilbirehm be bi gelê xwe re. Dîsa, jê xwest ku piştî du salên din amade be ji bo cîhad û fethê û di encamê de jî xatir ji hev xwestin û ji hev veqetiyên. Zeblekan jî Dendanê Wezîr girt gel xwe û kete rê de. Kerwanê Zeblekan ê ku êdî bi nasnavê Mucahid ê Sultan hatibû binavkirin, pir qelebalix bû, ji ber mîr û mîrekan pir xelat û diyarî dabûne wî ku hijmara kole, cariye û xizmetkarên wî gîhabû pênc hezarî. Ji bo birêkirina wî jî, serkêşê Deyleman Behram, serkêşê Kurdan Rustem û serkêşê Tirkan Turkaş jî bi qasî sê rojan pêre rêwîti kirin; piştî ew vegehiyan Bexdê, wan jî rêya xwe berdewam kir ber bi Şamê ve.

Jixwe hîna ew bi rê de bûn, xebera çûna wan a Şamê li ser baskên kevokan gîhabû wir û herkesî bihîstibû ku Şewqa Mekan sultanekî nû peywîrdar kiriye ji bo Şamê ku navê wî Zeblekan e û bi nasnavê Elmucahîd tête naskirin. Loma berî ew bigihêjin wir, bajarê Şamê hatibû xemilandin û xelk hemû derketibûn pêşiya sultanê xwe yê nû, ji bo pêşwazîkirinê.

Sultan Elmucahîd derbasî Şamê bû di nava coş û pîrozbahîyin mezin de. Piştî derbasî keheha bajêr bû û çû li ser textê sultanî rûnişt. Dendanê wezîr jî ket xizmeta wî de, malên mîr û mîrekan û astên wan pê da naskirin.



Ew jî yeko yeko derbasî cem Sultan bûn, destê wî maçî kirin û dua jê re kirin bi temendirêjîyê. Zeblekan ê Elmucahîd jî xelat û diyarî li wan belav kirin. Dûvre ferman da ku xezîneyê dewletê vekin û diravan li hemû leşkeran belav bikin. Her wiha desthilatdariyeke rast û dadiyane meşandin û hişt ku xelkê bajêr hemû jê razî bin.

Di wê navberê de Zeblekan dest bi amadekirina şandina keça Sultan Şerker, Qeza Bû kir û jê re hodeceke ji ebrîşimê da amadekirin. Pêdiviyên Wezîr Dendan jî dane amadekirin û têra wî dirav jî dane wî. Lê belê Dendan ew diravên pir qebûl nekirin û jê re got: “Tu dostê Qiral î, van diravan li gel xwe hilîne, lewre dibe ku ew diravan ji te bixwaze, an jî ji bo şer û cîhadê ji te re lazim bibe.”

Piştî Wezîr Dendan xwe ji rêwîtiyê re amade kir, Sultan Zeblekan pê ve rabû ji bo ku herin Qeza Bû jî binin. Sultan deh cariyeyên neqane dan kêleka wê ji bo ku di rêwîtiyê de lê binêrin û bi kar û barê wê rabin.

Sultan Zeblekan, Wezîr û Qeza Bû bi rê kirin û dîsa bi şûn de vegeriya ji bo ku welatê xwe bi rê ve bibe. Giraniyeke taybet jî da ser çek û pêdiviyên şer û cengê û ma li bendî wê roja ku Qiral Şewqa Mekan gazî wî bike ji bo cîhad û cengê.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navberek da vegotina çîroka xwe û bêdeng bû.*

ŞEVA SED Û SÎH Û NEHEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şahînşahê Mezin Şehriyar re berdewam kir û got:*

Wezîr Dendan û kerwanê xwe rêwîtiya xwe berdewam kirin. Di nava mehekê de xwe gîhandin Er-Rehbê. Piştî meşa xwe berdewam kirin hetanî gîhan nêzikî Bexdê. Ji wê deverê, qasidek li pêşiya xwe şandin Bexdê û Şewqa Mekan agahdar kirin bi hatina xwe. Ew jî derket pêşiya wan û li derveyî bajêr ew pêşwazî kirin. Dendanê Wezîr hewl da ku ji hespa xwe peya bibe, lê belê Şewqa Mekan sûnd xwar û nehişt ku peya bibe. Ew jî bi siwarî hate ba Qiral û li gel wî meşiya. Gava Qiral pirsî Elmucahîd jê kir jî, Dendan got ku ew baş e û ji hatina Qeza Bû jî ew agahdar kir. Dema Qiral bihist ku keça birê wî Şerker jî hatiye, pir kêfxweş bû û ji wî re got: “Naxwe ez izna sê rojan didime te, here ji xwe re îstîrahet bike, piştî dîsa were balî min.” Dendan got: “Ser ser û çavan.”

Dendan çû mala xwe, Şewqa Mekan jî vegeriya qesra xwe û çû derbasî cem keça birê xwe Qeza Bû bû. Ew jî hîna keçeke heyşt salî bû. Gava ew dît, hem pir kêfa wî hat, hem jî pir xemgîn bû ji ber nebûna bavê wê û ew di

wî temenî de. Gelek zêr û cewher pê vekirin, kincên herîr lê kirin û ji xizmetkarên xwest ku wê bibin cem kurapê wê Hebû Tunebû da ku bi hev re mezin bibin. Piştî hat xwiyakirin ku Qeza Bû keça herî zîrek, jêhatî û spehî bû di nav ekranên xwe de. Lewre serê wê pir dişuxulî û gelekî ji bi tevdir bû li himber bûyeran. Hebû Tunebû jî kurikekî sinckar û dilsoz bû, lê belê pir hestiyar bû û zêde guh nedida encama tiştan. Bi wî hawî herdu bi hev re mezin bûn û temenê herduyan bû deh sal.

Di wê navberê de Qiral jî kar û barên xwe kirin û amadekariyên ceng û cîhadê qedandin. Gazî wezîrê xwe Dendan kir û jê re got: “Min nêt kiriye ku ez kurê xwe Hebû Tunebû bizewicînim û wî li şûna xwe bikim sultan da ku bi saxiya xwe ez pê dilşad bibim. Ez ê jî bi navê wî şer bikim hetanî mirinê. Gelo tu çi dibêjî di vê mijarê de?” Dendanê Wezîr erda bin nigê wî ramûsa û ji Şewqa Mekan re got: “Qiralê min ê bextewar û xwediyê ray û bîra giran! Tiştê ku ketiye bîra te baş e, lê belê di vê wextê de ne guncav e ji ber du sedeman; sedema yekê ew e ku kurê te Hebû Tunebû pir biçûk e, ya duduyan jî ew e ku ji serboriyan hatiye teqezkirin ku kesê di jiyana xwe de kurê xwe dike sultan, pir kurt diji û zû dimre. Tiştê ez tê de difikirim ev e.”

Qiral got: “Lê belê em ê serxizmetkarê xwe jî li ser wî bikin wasî, jixwe êdî ew jî ji me ye, lewre bi xwişka min re zewiciye û ew jî mîna birayê min e.” Dendan got: “Tu çawa guncav dibînî wisa bike, em jî di emrê te de ne.”

Şewqa Mekan şand dûv Serxizmetkar, ew anî qesrê û gazî mîr û gizîran jî kir û ji wan re got: “Ev kurê min Hebû Tunebû ye û hûn wî nas dikin bê çi fêrîsekî zemanê xwe ye ku kes mîna wî tune. Di hizûra we tevan de ez wî dikim sultan û ez Serxizmetkar jî weke wasîyê wî destnîşan dikim.”

Serxizmetkar got: “Ey Qiralê Zemanan! Ez tenê şîndarek im ku we ez çandime di nav bexçeyê xwe de, ez ê çawa bikaribim vî barî hilgirim?!”

Qiral got: “Ey Serxizmetkar! Tê heq jê derkevî, ez bi te bawer im. Ev kurê min Hebû Tunebû û Qeza Bû pismam û dotmamê hev in, min ji niha ve ew bi hev re zewicandine û ez we gişan jî şahidên vê yekê diyar dikim.”

Piştî wê, Qiral mal û milkekî pir ji kurê xwe re veqetand ku mirov nikare bîne ziman. Dûvre jî çû cem xwişka xwe Seyrana Zeman û ew ji wê yekê agahdar kir. Ew jî bi wê agahiyê pir kêfxweş bû û got: “Herdu jî zarokên min in, Xwedê temenê te dirêj bike ji bo wan.” Wî jî lê veqetand û got: “Xwişkêcan, ê min, min karê xwe li vê dinyayê qedand û min dilê xwe jî xiste cî de li ser kurê xwe. Lê belê dîsa jî divê hişê te li ser wî û diya wî be û tu li wan miqate be.” Di pey wê re, hinek şîretin din li Seyrana Zeman û mîrê wê Serxizmetkar kirin û ji wan xwest ku çavên wan li jin û kurê wî

be. Jixwe wî êdî baş his dikir ku rojên wî yê li dinyayê hindik mane. Lewre ketibû nav nivînê û nema dikaribû serê xwe ji ser balifê rake.

Êdî Serxizmetkarê ku navê Sasan girtibû, bûbû sultan û bi kar û barê dewletê dadiket, pîrsgirêkên xelkê bi şêweyeke adîlane çareser dikir.

Piştî salekê Şewqa Mekan gazî kurê xwe kir û gazî wezîrê xwe Dendan jî kir anî wir û li cem wî ji Hebû Tunebû re got: “Binêr kurê min, ev wezîrê min wê ji te re bibe bav piştî mirina min, lê belê kulek tenê di dilê min de maye ku ez hêvî dikim ji Xwedayê xwe, vê kula min jî li ser destê te rehet bike.”

Kurê wî jê re got: “Û ew kula di dilê te de maye çiye bavocan?”

Bavê wî got: “Kurê min ez ê bimrim û min tola kalkê te Omer En-Nûman û tola apê te yê Qiral Şerker ji wê pîra ku jê re dibêjin Dayika Zîrekan hilneanî. Vêca heger rojekê Xwedê serkeftin kir para te, ji bir neke ku tu tolê ji wê pîrê hilîne û eyba me paqij bike. Divê hayê te ji te hebe û tu nekeve xefkên wêpîraboka zalim. Hertim guh bide gotinên Wezîr Dendan, lewre ew e yê ku bûye stûna serweriya me ya salan.

Kurê wî jî got: “Bila be bavocan, ser seran, ser çavan, ez ê wisa tevbigirim.”

Şewqa Mekan dest bi girî kir û hêsir ji çavên wî hatin xwarê. Pêre jî hin bi hin rewşa wî xerabtir bû û nexweşiya wî lê girantir bû. Kar û barê welêt jî êdî bi temamî ket dest zavayê wî Sasan de, yê ku serweriya xwe asêtir kir li ser xelkê û dest bi derxistina ferman û fermannameyan kir. Bêhtirî salekê bi wî awayî rêveberiya welat berdewam kir. Şewqa Mekan jî bi nexweşiya xwe daketibû. Ew rewşa han hetanî çar salan bi wî awayî berdewam kir.

Di nava wan çar salan de, Hebû Tunebû jî tenê bi siwarbûna hespan, bi lîska rim û tîr û kevan daketibû û hemû zemanê xwe bi wî hawî derbas dikir. Keçapa wî Qeza Bû jî bi heman şêweyê tevdigeriya. Herdu bi hev re derdiketin ji serê sibehê hetanî êvarê, ji xwe re dilîstin. Bi şev gava vedigeriyan malê jî, her yek ji wan diçû cem dayîka xwe. Gava Hebû Tunebû derbasî cem diya xwe dibû, didît ku li ber serê bavê wî rûniştî ye û bi ser de digirî û şev pê de jî di xizmeta wî de dimîne. Dema ku dibe sibe jî, dîsa ji malê derdiket mîna her car, ew û dotmama xwe diçûn lîskê. Her ku diçû, êşa Şewqa Mekan lê girantir dibû û nexweşiya wî kûrtir dibû. Hetanî giha asteke ku êdî nema debar dikir, digiriya û digot:

Ez bêhêz ketime û temen li min qediya  
Va tu jî dibînî bê ez ketime çî halî

Lew ku di hebûna xwe de ez serkêş bûm  
 Hem cengawer û hem ji rêber bûm  
 Piştî wê maldariyê niha ji ez xizan im  
 Bêhêz, sernişûv û ruswa û bêkêr im  
 Gelo beriya mirinê ez ê bibinim kurê xwe  
 Ku bûye sultanekî gewre li ser textê xwe  
 Şer dike bi dujminan re ji bo tolhildanê  
 Bi şûr û mertal û rimbaziyêke lêdanê  
 Ez ji wisa bêçare me ne çav hene ne guh  
 Ne şîfa heye ne ji heq distîne ji min ruh

Piştî vê helbesta xwe, serê xwe danî ser balîfa xwe û raket. Di xew de yekî jê re got: “Ez mizgîniyê didime te, kurê te bûye qiralê welatê te û serwe-riyêke dadiyane dide meşandin ku hemû xelkê wî jê razî ne.”

Bi dilekî xweş ji xew şiyar bû wê rojê. Piştî çend rojekî jî çû ser dilovaniya xwe. Xelkê Bexdê jî pir êşyan û xemgîn bûn bi mirina wî re. Herkes li ser wî girya çî feqîr çî maldar. Lê belê pir zû hate jibirkirin. Rewşa kurê wî Hebû Tunebû jî hate guhertin û xelkê Bexdê dev jê berdan, ew û diya wî bi tenê hiştin di maleke bi serê xwe de.

Piştî demekê, diya Hebû Tunebû dît ku rewşa wan xerab e û mecbûr ma serî li xizmetkarê mezin Sasan bide ji bo alîkariyêkê jê bixwaze.

Serê sibehê dayika Hebû Tunebû ji mala xwe derket û berê xwe da qesra sultan...

*Li Şehrezadê bû sibe û wê ji navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û ÇELEMÎN

### **(Çîroka Hebû Tunebû û Qeza Bû)**

*Şehrezadê, ji Şehriyarê gewre re got:*

Şahînsahê min ê bextewar! Tê gotin ku dayika Hebû Tunebû çû mala serxizmetkarê berê yê ku bûbû sultan û êdî navê Sasan bikar tanî. Çawa derbasî qesrê bû dît ku Sultan Sasan li ser nivîna xwe ye. Rabû derbasî cem jina wî Seyrana Zeman bû û jê re got: “Miri bêxwedî ne, Xwedê we muhtacî tukesî neke ya rebel alemîn! Jixwe vaye hîna hûn bi awayekî dadiyane desthilatdariya xwe berdewam dikin di nav hemû kesî de, çî giştî, çî taybet. Tu ji dizanî û te bi çavên xwe dît bê berê em çiqasî maldar, serbilind, xwedî rûmet bûn û jiyanêke me ya çawa hebû. Lê piştê felekê dujminahiya me kir û zeman li me qulupî, em xistin vî halî û ez jî niha hatime ber deriyê te, alîkariyêkê ji te dixwazim. Lewre ku zilam dimrin, jin û keçên wan rezil û

ruswa dibin di pey wan re.” Piştire ji ev çend beyt gotin:

Bes e lo mirin e yê ku nîşanî mirov dide  
Hemû rewşên xerab û erjeng nîşan dide  
Ev rojên hanan jî tenê ew pêwan in  
Çavdêrkên wan jî bi xwe her ew kul in  
Dilê min qet ne êşiyaye wisa tu caran  
Mîna vê cara ku birîn gihaye hestîyan

Gava Seyrana Zeman ev gotina wê bihîst, birayê wê Şewqa Mekan hate bîra wê û kurê wî yê bi tenê Hebû Tunebû. Loma pê ve rabû, ew himbêz kir û jê re got: “Niha jî ez a maldar im û tu ya xizan î. Lê bi navê Xwedê ev bêdengiya me yî li himberî we, tenê ji ber ku me nedixwest dilê we bişkê û tiştê ku em bidin we mîna sedeqeyê neyê fêmkirin. Li gel ku ev hebûna me ya niha hemû bi xêra te û mêrê te bû. Loma ez dixwazim tu mala me mîna mala xwe bibînî. Lewre çî me hebe, yê we ye jî.”

Piştire, kincin giranbuha diyarî wê kirin û di qesrê de cihek jê re veqetandin, ew jî li wir bi cî bû û bi serbilindî, di nava xêr û xweşiyê de, bi wan re jiya li gel kurê xwe Hebû Tunebû. Lewre mûameleya kesên sultan bi wan re kirin û gelek cariyê û xizmetkar dan ber destê wan. Piştî demekê jî, Seyrana Zeman çû cem mêrê xwe û ew gotinên jinbira xwe jê re gotin. Ew jî pê hestiyar bû, hêsir ji çavên wî bariyan û jê re got: “Heger tu cihekî baş li wê dinyê hêvî bikî, li vê dinyê alîkariya kesên din bike û qedr û qîmet ji wan re bigire.”

Ev ji hêla Seyrana Zeman, mêrê wê û jinbira wê ve. Vêca em vegerin ser rewşa Hebû Tunebû û dotmama wî Qeza Bû. Ew herdu jî bi hev re mezin bûn mîna du şaxên daran û temenê wan gîha panzde salan. Qeza Bû bibû xweşiktirîn keça dema xwe, bi rûyekî gewr û spehî, bi newqa xwe ya zirav a mîna camavê û bi wî laşê xwe yê sivik û jêhatî ku mîna helbestkarekî jî gotiye:

Meyxûr diherikî bi ser gerden û xalan  
Gewheran jî dur diçinîn ji ser lêvan

Spehîbûna wê ewqasî mêrkuj bû ku, Xwedê Teala hemû hunerên xwe di bedena wê de bikar anîbûn ku gul û çiçekan ji ber wê fedî dikirin û dawa lêborînê ji hinarkên wê dikirin. Bêhna wê jî hiş û dil mest dikirin. Çawa ku helbestkar gotiye:

Sipehîwesf e ew, kamil e bi xweşîkbûnê  
Mijangên wê, kil dihetikînin bi rengbûnê  
Çavên wê tûjawir in çawa ku şûr bin  
Kûr diçin di dilê aşîqan de mîna ku rim bin

Kurapê wê Hebû Tunebû jî, pir spehî û lihevhatî bû. Gelekî mêrxas û wêrek bû jî. Dilê herkesi bi ser wî ve diçû û meyla ciwanikan herdem bi ser wî de bû û helbest li ser wî digotin, ev jî yek ji wan e:

Qusûra min xwiya kir çawa ku min ew dîtî  
Şev rêwî bûn li ser rûçkên wî bi şanazî  
Çav lukumîn, dilan lêdan bi dîtina wî  
Jibîr nakim ew awirên vederhatin ji çavên wî

Carekê gava Qeza Bû çûbû eydaniya hinek kes û nasên xwe, ji bo pîrozkirina cejna wan, bi wê spehîbûna xwe ya ku gul ji rû û lêvên wê di-deqîşin û binefşan jî dilan digirt ji hinarkên wê re, Hebû Tunebû jî nema xwe girt û mîna heyvekê li dora wê çû hat. Herî dawî jî, evîna wê ew mest kir û îlhameke dijwar da wî, zimanê wî bi van beytan listandin:

Dê çawa têr bibe dilê nêzik ji dûrbûnê  
Dê çawa bikenin lêvên tî ji bêavbûnê  
Gelo dikarim carekê tenê wê bibînim  
Şevêkê tenê pêre bi yek bim li ser nivînê

Gava Qeza Bû ev helbest ji devê wî bihîst, pir lome jê kirin û soz da ku cezayekî giran bide wî. Hebû Tunebû jî hêrs bû li himberî vê helwesta wê û jê xeyîdî, rabû ser xwe vegeriya Bexdê. Qeza Bû vegeriya qesra bavê xwe û giliyê Hebû Tunebû li ba diya xwe kir. Diya wê jî jê re got: “Keça min dibe ku tu nêta wî tunebe ku zerarekê bide te, jixwe sêwiyekî reben e. Dîsa jî tiştekî ku tu ji ber şerm bikî ji te re negotiye. Loma tu jî hişiyar be û behsa vê yekê ji kesî re meke, heger xebera vê yekê bigihêje ber guhê Sultan, dê emrê wî biqesifîne, mala wî xera bike û ûcaxê wî vemrîne, wî binax bike.”

Dîsa jî agahiya derbarê evîna Hebû Tunebû û Qeza Bû li nava Bexdê belav bû û jinan ew agahî mîna çîrokekê ji hev re gotin di nava mereqeke mezin de. Li himberî vê rewşê, bêhna Hebû Tunebû pir teng bû, hişê wî tevlihev bû û bala wî jî şev û roj li ser wê ma. Herî dawî xwest ku eşqa xwe jê re eşkere bike, lê ji bertekên wê tirsîya û ev beytên han gotin:

Ger carekê bitirsim ez ji lewmên wê  
Ji veguhertina sinc û exlaqê wê  
Ezê bêhnfireh bim mîna êşbazekî  
Di bin êşa hîcama agirê wê de

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û ÇEL Û YEKEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:*

Di dawî de, Sultan Sasan çîroka hezkirina Hebû Tunebû ji Qeza Bû

bihîst û poşman bû ji bo ew herdu dane cem hev ku di heman malê de bijîn. Rabû çû derbasî cem jina xwe Seyrana Zeman bû û jê re got: “Xetereya herî mezin ew e ku mirov ar û ardû bine cem hev. A din jî divê bawerî bi zilaman neyê, gava ku çavên wan li bedenên spehî û singên têgihîştî bikeve. Kurê birê te Hebû Tunebû ji bûye zilam û êdî ji îro pê de, divê derbasbûna nav keç û jinan lê were qedexekirin. A girîngtir jî ew e ku tu nehelî keça te derbasî nav zilaman bibe, lewre yê nîna wê divê werin hîcapkîrin.” Jina wî jî lê vegerand û got: “Tu rast dibêji ey qiralê şareza û xwedîbiryarê bi rûmet.”

Gava bû sibe, mîna her car Hebû Tunebû derbasî cem metika xwe Seyrana Zeman bû û silavdayînek lê da, wê jî silava wî girt û jê re got: “Ez ê tiştêkî ji te re bibêjim ku qet min nedixwest ez wê bibêjim. Lê ji mecbûrî ez ê ji te re bejim.” Wî jî got: “Û ew tişt çiyê metêcan?” Seyrana Mekan jê re got: “Sultan bi evîna te û Qeza Bû hisyaye û ferman da ku wê bixe hîcabê û ji te dûr bixe. Vêca heger pêdivî an jî peyamekî te ji wê re hebe, bide ez ê bigihînim wê, tu derbasî cem wê nebe.” Çawa ku Hebû Tunebû ew gotina wê bihîst, di cî de bi şûn de vegeya bîyî ku gotinekê tenê bibêje, çû cem diya xwe û ew agahiya nû da wê jî. Diya wî jê re got: “Ev hemû ji bin serê te derket. Tu pir neaxiviya kesî nedibihîst û xebera eşqa te li nav xelkê belav nedibû. Ya din jî tu çawa hem nanê wan dixwî û hem jî çav berdidî keça wan?” Wî jî lê vegerand û got: “Ez dixwazim pêre bizewicim, lewre ew dotmama min e û ez ji herkesî bêhtir xwedî maf im.” Diya wî jê re got: “Bêdeng bibe û bila dengê te neçe Sultan, nexwe wê ev yek bibe sebaba xemgîniyeke mezin ji bo te û belkî bibe sebaba ku îşev şîva me jî ji me re neşînin. Ji xwe heger em ne li vir bûna, belkî em bibana parsek û ji birçîna bimirana.”

Dema ku Hebû Tunebû ev gotin bihîstin, hestiyar bû û dilê wî ji hesretê lêda, got:

Kêm bike van lomeyên ku kêm nabin ji min  
 Dilê min dûr ketiye îro ji wê evîna min  
 Sebrê ji min nexwaze qet ji binî ve  
 Evê sebrê pir dirêj kir, axî ji dil ve  
 Heger lomekaran ez şermezar kirim ji ber vê  
 Bêje wan, va ez li vir im li gel doza evîne  
 Rê li ber min girtin bi zorê evan zordaran  
 Xwedê jî dizane ez ne fasiqim lê belê dilovan  
 Çawa ku hestiyên min pêjna wê dikin  
 Mîna kevoka ku başoke li pey be zû difirin  
 Tikan dikim ji wan lomekaran re bêjin  
 Evîndarê dotmama xwe me ne tiştêkî din

Piştî ew helbesta xwe got, berdewam kir û ji diya xwe re got: “Tu cih ji min re nema, ne li cem meta min, ne jî li cem van mirovan. Ezê ji vê qesrê

derkevim û herim kêleka bajêr ji xwe re li nav berdoş û rêbiran bijîm, çêtir e.” Piştî rabû ser xwe, ji wê qesrê derket, çû nav rêbiran û çawa ku digot, wisa kir. Diya wî ji pê re bû. Lê her car diçû mala Sultan ji bo qûtê xwe ji wir bîne û xwe pê xwedî bikin. Carekê gava dîsa diya wî çûbû wir, Qeza Bû ew xewle kir û jê re got: “Amojinê, rewşa kurê te çawa ye?” Diya Hebû Tunebû got: “Herdem dilbikil û çav bi hêsir e. Tu xelasiya wî ji evîne tuneye, herdem aşîqê te ye.”

Qeza Bû, giriya û got: “Bi navê Xwedê min nedixwest wisa bibe, lê belê ez ditirsyam ku dujminên wî tiştêkî pê bikin, zerarekê bidine wî; loma min xwe dûrî wî xist. Heger ne ji zimanê wî bûya, bavê min jî destê qenciye ji ser wî ranedikir û destê wî lê nedigeriya ku wisa xizan bibe. Dîsa jî Xwedê mezin e û sebir jî baş e. Belkî sedemên ku em ji hev veqetandine, dîsa me binin ba hev û van êşên me vegeirînin şahiyêke bêdawî.”

Piştî dîsa kûrekûr pê ket, hêsin barandin û got:

Bi Xwedê ez nema guh didim gotinên kesî  
Jixwe min eşkere kiribû awateya dilî  
Ewa ku ez dixwazim jî êdî dûr e ji min  
Çavên di xew de jî ew her şiyarin li min

Diya Hebû Tunebû spasiya wê kir û rabû ser xwe ji mala wan derket, vegeirî malê û çû ew hemû ji kurê xwe re gotin. Kurê wê pir hestiyar bû bi wê helbesta dotmama xwe, helbestek li ser wê got û ji diya xwe re jî got: “Ez wê nadim bi du hezar horiyan!”

Şev û roj derbas bûn, hetanî ku temenê Hebû Tunebû bû hivde sal. Lê ew her li ser agir bû û rojên wî pir giran derbas dibûn ku her yek ji wan lê dibû salek. Şevêkê dîsa xew lê herimî mîna her car, wî jî ji xwe re got: “Her ku diçe laşê min dihele û ez jî nagihê miradê xwe? Tiştêkî ji min kêmbê jî tuneye, ji xeynî nav û deng û maldariyê. Lê belê her tişt di destê Xwedê de ye û gava ku ew bixwaze, kes nikare pêşiyê bibire, misoger mirov digihêje miradê xwe. Loma divê ez ji vî warê wê derbider bibim, biterqim da ku ew bigihêje miradê xwe, an jî bimre.”

Dûvre nav di xwe da û helbestek xwend, got:

Berde coşa min bila her li ser pêlên dil be  
Veger ne ji adeta min e bila her ew li paş be  
Lêborîne dixwazim ji ber ku dilê min tenike  
Bêgûman dê hêsir li ser rûpelan her biherike  
Vaye dota min hiltê mîna heyvhoriyekê  
Ma kê nedît bê awirên wê çiqasî ji dil in  
Loma dildarên wê tu carî jê rizgar nabin



Ez ê bi xurbetê ve biterqim û xelas bikim  
Vê nefsa xwe ji tunebûnê ezê rizgar bikim  
Bi dilxweşî ezê vegerim hem ji bi daxwaz  
Ez ê şer bikim li himber dujminan her serfiraz

Hebû Tunebû pêxwas ji qesrê derket û çû. Li ser bedena wî kincin perpitî û li ser serê wî jî, kumekî hirî yî kevn ku heft sal bûn bi kar tanî. Di tûrikê wî de jî nanekî sar hebû ku sê roj tê de derbas bûbûn. Di nava tariya şevê de meşîya, hetanî ku giha deriyê Bexdê, li wê derê sekinî. Nuh derî hate vekirin, kesê ewil ji Bexdê derket ew bû. Piştî rojê pê de jî meşîya, çol û beyar li pey xwe hiştin.

Şeva dîtir, wexta diya wî pêjna wî nekir rabû lê geriya, lê belê ew nedît. Dilbikul bû û bêhna wê teng bû ji ber bêçaretîyê, f'am di jiyana û hebûna wê de nema. Rojekê dudan li hêviya wî ma, hetanî deh rojan jî sebir kir, di wê bendewariyê de, lê dîsa tu agahî jê negirtin û çavên wê pê neket. Bêhna wê tengtir bû, giriya, hêsir barandin û qîr kir, got: "Ey sebra dilê min! Tu çû û te ez di nava êş û azarê de hiştim kurê min! Te terka warê xwe kir, tu çûyî û ez nizanim bi kû ve herim û li kû derê li te bigerim? Gelo kîjan welat te dihewîne?"

Dûvre axaftina xwe bi helbestî berdewam kir, got:

Bele bi me de bariyan piştî çûna te  
Êşa min jî her berdewam e bi firaqa te  
Tu çû û te ez birîndar hiştim li pey xwe  
Li ber xwe didim ez di nava êşeke bê çare  
Kevokek hat di bin baskên şevêk tarî de  
Bi kalîn û nalîn giriya bi ser min de  
Min jê re got, raweste hebekî xwe ragire!  
Heger tu jî mîna min dilkovan bûya  
Ne toq diket stûyê te ne jî ziya  
Gişan dev ji min berdan van dost û hogiran  
Mam bi tenê dostê van kul û derdan

Piştî dev ji xwarin û vexwarinê berda, şev û rojê li çogên xwe da bi girî û gazin. Girî û nalîna wê di nav xelkê de hate bihîstin, dilên wan li ser êşîya û êdî di nav xwe de gotin: "Ey Şewqa Mekan! Kanî ku tu li vir bûya û te bi çavên serê xwe bidîta bê çî bi serê Hebû Tunebû hatiye ku hat radeya ji welatê xwe derkeve û terkedinya bibe, piştî ku bavê wî tî û birçî têr dikirin û serweriya xwe bi qencî û dadwerî dikir."

Piştî demekê, agaha rewşa Hebû Tunebû giha Sasan ê qiral û mîr û emîrên ku çûn cem Sasan jê re gotin: "Ew kurê qiralê me û ji dola Melik Omer En-Nûman e, me bihîst ku ji welat terqiyaye û bi xerîbiyê de çûye."

Gava Sultan Sasan ev xeber bihîst, pir aciz bû û qeherî û qencyên ku bavê Hebû Tunebû pê kiribûn hatin bîra wî. Dîsa wesiyeta ku bavê wî lê kiribû hat bîra wî. Li ser wê rewşa Hebû Tunebû pir xemgîn bû û ji karbi-destan re got: “Divê li seranserê welatan lê were gerîn û bê dîtin.” Piştî, serdarê xwe Turkaş û sed siwar di pey wî de şandin ji bo ku wî binin. Ew jî çû da dû şopa wî û bi rojan lê geriyan. Piştî dîsa bi şûn de vegeriya û got: “Welehe ne şopek wî diyar bû, ne jî agahiyek ket destê me di derbarê wî de.”

Sultan Sasan, pir xemgîn bû û diya wî jî pir perişan bû, nema hedana wê dibû. Vêca em vegezin ser rewşa Hebû Tunebû ku ew jî çawa ji Bexdê derketibû, mabû heyyirî û nema dizanibû wê bi ku ve here, sê rojan li ser hev meşiyabû bêyî ku li siwarekî rast bê, ango li kesî biqelibe. Xew lê herimî, ruhê wî tengezar bû, hişê wî çû ser malbata wî, bêriya nas û welatê xwe kir. Nan û ava wî jî nemabû û êdî her ku birçî dibû, çavên xwe li derdorê dige-  
rand, bi gîha û meyweyan debara xwe dikir. Gava ku tî dibû jî, ji ava çeman vedixwar. Di dema germê de jî xwe tavêt bin siya daran.

Rojekê rêya xwe guhert û bi rêyeke din de çû. Sê roj û sê şevan meşiya, di roja çaran de gîha çayireke xweş ku gelek teşeyên sewzeyan lê hebûn û mîna xewneke mijdûmanî di nava dengên kevok û qûmriyan de direqisî û welatê bavê wî yê mîna buhuştê anî bîra wî, pir hestiyar bû û helbestek ji xwe re xwend, got:

Ez ji malê derketim bi hêviya vegerekê  
Lê belê hîna jî ne diyar e bê gelo rojekê  
Ez ê bikaribim vegerim welatê xwe an na!  
Ez ê van beleyan jî ser xwe bavêjim an na!

Piştî bi xwe hisya ku birçî bûye. Rabû ser xwe, çû hinek gîha xwar ji ber avê, piştî jî destnimêja xwe girt, nimêja xwe kir û li ser gîha rû-  
nişt. Roja xwe giş li ser wî gîhayî derbas kir û gava şev ket erdê jî, li wir raket. Nivê şevê li ser dengêkî ji xew veciniqî, şiyar bû. Mirovekî helbestek dixwend û digot:

Jiyan çîye ku evîndareke te tunebe ew  
Lêvagir, rûgirover û mêrkujek be ew  
Mîrin hêsantir e bo min ji hîcranê  
Xeyalê wê naqere ji min roj û şevanê  
Xweziya min bi wan kesên xeyalwekhev  
Ën ku têne gel hev aşiq û maşûqên hev  
Di bihara gul û çiçekan de rastî hev tîn  
Di pêşbaziya eşqê de li hev dibanin û zû tîn

Gava Hebû Tunebû ev helbest bihîst, hestiyar bû, bêriya dotmama xwe kir û xemgîn bû di nav êşa giyanê xwe de. Hêsirên wî bi ser hinarkên wî de

hatin xwarê mîna ava çeman û agir bi dilê wî ket, çavên xwe li derdora xwe gerand, lê tukes nedît di nava wê tarîkê de. Hinekî qeliqî, piştî rabû ser xwe, berjêr ve daket û di ber qiraxa çem re meşîya, hetanî ku careke din jî dengê bihîst ku dibêje:

Heger tu dilnaziyeke hêvî dikî ji eşqê  
Hêsirên xwe serbest berde wê çaxê  
Di navbera min û dîlberê de ehdek heye  
Dê min bêrîkar bihêle heta ku ew heye  
Tî û birçî bim jî her aram e dilê min  
Newaya wê li dil dide her ku tê bîra min  
Gelo xwedîya xilxalan min bi bîr tîne?  
Sozekî me hebû berî fûraqê, gelo bi bîr tîne?  
Gelo ew dilên tî û birçî wê bêne cem hev?

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û ÇEL Û DUYEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe ji Şehriyar re berdewam kir û got:*

Gava Hebû Tunebû cara dudan dengê heman zilamî bihîst û xwedîyê deng nedît, têgihîst ku gotarê wan beytan jî dildarekî bêçare ye mîna wî, yekî ku hatiye berbenckirin û negîhaye evîna xwe. Di dilê xwe de got “A baş ew e ku ez û wî bigihêjin hev û kul û derdên xwe ji hev re bibêjin, bêhna xwe fireh bikin. Ji bo min jî dê bibe destbirayekî baş li vê xerîbiyê.”

Piştî xwe kar kir û gazî wî kir, got: “Ey mirovê ku di nava tarîka şevê de digere! Were cem min û çîroka xwe bi min re parve bike, belkî ez bikarî-bim alîkariya te bikim û bi wî hawî tu jî ji wê belaya xwe xelas bibî.”

Gava xwedîyê wî dengî, ew gaziya Hebû Tunebû bihîst, bersiv da wî û jê re got: “Ey guhdarê helbestên min! Gelo tu kîjan faris î û ji kê yî? Gelo tu ins î an cin î?”

Herduyan bersivên hev dan, lê kes ji wan neçû cem yê din. Her yekî ji cihê xwe axivî, ketin nav guftûgoyeke hestiyar ku hêsir ji çavan barandin û bi ser hev de giriyan hetanî ku şevê lêda û roj derket, şev li pey xwe hişt. Wê gavê Hebû Tunebû lê meyzand, dît ku ciwanekî di temenê wî de ye, ji Ereben çolê yên koçer î ku kincin perpîtî li ser wî bûn û xemgîniyeke kûr li ser rûyê wî xwiya dikir. Çû cem wî û silavek lê kir. Wî jî silava Hebû Tunebû girt, lê belê bi çavekî biçûk lê meyzand ji ber biçûkbûna temenê wî û jê re got: “Kanî piştî xwe bide min, naxwe ez ê te perîşan bikim!”

Li himberî vê daxwaza wî ya biçûkxistinê, Hebû Tunebû kenîya û jê re

got: “Qey wijdan û exlaq bi te re tuneve, ez ê çawa pišta xwe bidime te? Qey tu natirsî ji Ereban gava ku bibihîzin te xulamek hêsîr girtiye bi nemerdiyê bêyî ku wî biceribîni di meydana şer de bê ka gelo siwarekî mêrxas e, an tirsonekekî ber destan e?”

Ciwanê koçer ê ku navê wî Sabah bû, keniya û got: “Wey wey! Tu di temenê zarokan de ye, lê tu gotinên mezinan dikî, lewre ev gotinên wisa qelew tenê ji devê farisan derdikevin.” Hebû Tunebû lê vegerand û got: “A rastî heger tu dixwazî min hêsîr bigirî û bi xwe re bibî, divê tu şûr û mertalê xwe deynî hêlekê û tu werî em bi navê bilîzin, kê zora yê din bir, bila wî ji xwe re bike xulam.” Sabah keniya û got: “Bi navê Xwedê ev gotinên te yên qelew, tenê nêzîkbûna qedera te diyar dikin!”

Piştê çek û mertalên xwe danîn, zend û bendên xwe hilgavtin û ber bi Hebû Tunebû ve hat. Herdu ketin pêxêla hevdû û hevdû birin û anîn. Piştî çend hewldanan Sabah dît ku herdu nigên wî mîna du minareyan, mîna du çiyayan di erdê de çikandîne û nayêne lebitandin, zû têgihişt ku ew bi çeplên xwe yên kinik nikare zora wî bibe. Li wê biryara xwe poşman bû û di dilê xwe de got “Xwezî bi çeka xwe ez pê re daketama meydanê!”

Di wê navberê de Hebû Tunebû keys lê anî, pişt jê stend û ew hejand. Sabah hîs kir ku roviyên wî qetiyane di nava wî de. Pêde qîriya û got: “Kuro destên xwe ji newqa min bixşîne!” Lê Hebû Tunebû guh neda wî, ew ji erdê bilind kir û berê xwe da ava çem. Sabah dîsa qîr kir û bi dengê tikanbar jê re got: “Meqseda te çi ye lehengê hêja û tu dixwazî çi bi min bikî?” Hebû Tunebû got: “Ez dixwazim te bavêjim vî çemî, ew ê te bigihîne Dîcleyê, Dicle jî wê te bigihîne Çemê Îsa, Çemê Îsa jî wê te bigihîne Çemê Ferat û Ferat jî dê te bigihîne welatê te. Li wir jî dê qewmê te te bibîne, te nas bike û bi mêranî û dilsoziya te bihesin.” Sabah dîsa qîriya û bi bergerî jê re got: “Ey fêris û mêrxasê serdemê, tu ciwamêrekî baş î, kare nebaşan meke. Min bide xatirê wê dotmama xwe ya ku tu pir jê hez dikî û min berde, ez vê qenciya te hetanî roja qiyametê jibîr nakim.”

Hebû Tunebû pir hestiyar bû bi vê bergera wî, rabû ew dîsa danî erdê û fikra xwe guhert. Sabah jî çawa xwe li erdê dît û ji nav lepên wî rizgar bû, çû bi lez rahişt şûr û mertalê xwe û di dilê xwe de bi xwe şewirî û got “Gelo ez êrişî wî bikim an na?”

Di wê navberê de Hebû Tunebû tê derxist bê çi di dilê wî de heye û li ser çi pilangeriyê diponije, loma jê re got: “Ez dizanim bê çi di dilê te de heye, te çawa rahişt şûr û mertalê xwe, ket bîra te de ku tu wî şûrî li ser serê min bilewlihîne. Heger niha tu li ser pišta hespekî bûya, bi dibêtiyeke mezin tê şûrê xwe li ser serê min bihejanda. Madem ku wisa ye, ez dixwazim

tiştê di dilê te de pêşniyar bikim ji bo te, tu jî vê yekê qet înkâr meke. Ka wî mertalî bide min û tu jî bi şûrê xwe êrişî ser min bik, kî kê dikuje bila ji kîsê xwe here!”

Sabah mertal ji Hebû Tunebû re avêt, şûrê xwe ji kalanê wî kişand û êrişî ser kir. Hebû Tunebû jî bi destê rastê rahişt mertal û xwe pê parast. Tiştêkî ku wî jî pê lê bida, pêre tunebû. Loma tenê bi wî mertalî parastina xwe dikir, li himberî derbên şûrê Sabah ên ku mîna birq û birûskê bi ser de dihatin. Demeke dirêj Sabah lê da hatanî ku milê wî westiya û hêz tê de nema. Hebû Tunebû jî tê derxist ku taqet pêre nemaye, di cî de êrişî ser wî kir ji paş ve û ew avêt erdê, pêl pišta wî kir û destên wî girêdan. Piştê bi nigê wî girt û ew ber bi qiraxa çem ve kişand, Sabah bi zimanekî lavekar gazî wî kir û jê re got: “Tu dixwazî çî bi min bikî, ey lehengê zamanan û ey farisê meydanan!” Wî jî lê vegerand û got: “Ma min ji te re negotibû ez ê di avê re te ber bi malbata te ve bişînim ji bo ku zêde mereqa te nekin û tu jî dereng nekevî ji daweta keça apê xwe!” Sabah pir tengav bû, tirsîya, giriya û lave kirin, got: “Min bi te kir tu bi min meke ey lehengê zamanan! Hema min bike xulamekî xwe û min nekuje!” Li gel wan lavan hêsir barandin û ev çend beyt gotin:

Bi xerîbiyê de terqiyam ez û tenê mam  
Gelo qedera min e ku ez bi tenê jî bimrim?  
Ez ê koç bikim ji vê dinyê bêyi yek agahdan  
Bêyi yek xatirxwestin ji dost û hevalan

Hebû Tunebû, dîsa hestiyar bû bi vê helwest û bergera wî, rehm ket dilê wî de û xerabiya Sabah di cî de jibîr kir. Destên wî vekirin û dîsa ew berda, piştî ku soz û peyman jê stendin ku pêre rêwîtiyê bike û bibe hevalrê yê wî. Sabah jî xwest ku destên wî ramûse ji ber vê nêzikahî û comardiya wî. Lê Hebû Tunebû nehişt ku destên wî maçî bike. Piştê Sabah tûrikê xwe vekir, sê nanên ceh jê derxistin û ew danîn ber Hebû Tunebû û herduyan bi hev re li qiraxa avê nanê xwe xwarin. Dûvre jî destnimêja xwe girtin û nimêja xwe kirin. Li dawî jî herdu bihev ketin sohbeteke kûr û dûr, her yek ji wan li ser serpehatiyên xwe rawestiya û tiştên ku felekê bi serê wan de anîbûn, ji yê din re anîn ziman. Ji wê guftûgoyê Hebû Tunebû têgihîşt ku ew jî mîna wî dil ketiye dotmama xwe, lê ehlên wê qelenekî wisa giran dan ser pišta wî ku kes nikaribe di bin de rabe. Bi wî hawî jî nehiştine ku bi dotmama xwe re bizewice. Loma Hebû Tunebû jê re got: “Çîroka te jî mîna ya min e. Lê niha tê bi ku ve herî?” Sabah lê vegerand û got: “Ez ê herim Bexdê, herim warê te û li wir bixebitim hetanî ku Xwedê Teala bi qasî wî qelenî diravan bixe destê min.” Hebû Tunebû di dilê xwe de fikirî, ji xwe re got “Ez ê çawa bi vî halê xwe yê xizan û ruswa vegerim Bexdê? Bi navê Xwedê ez venagerim hetanî ku ez çareseriyekê nebînim!” Piştê li Sabah zîvirî û jê re got: “Rêya te vekirî be!”

Koçerê Ereb xatir jê xwest, ket ser rêya Bexdê û meşîya çû. Hebû Tunebû jî çû destava xwe girt, piştîre çar rikêt nimêja xwe kirin. Gava ku kete sucûdê û eniya xwe danî erdê, gazî xwedayê xwe kir û got: “Ey xwedanê hemû zindiyan, ê ku baranê dibarîne û rizqê kurmikên di nava tehtan de ji ji wan re dişîne! Tu bi heqê resûlê xwe kî, rizqê min ji min re bişîne û min jî bide ber dilovaniya xwe!”

Hîna wî wisa ji xwe re çep û rast dinêrî û çavên xwe li derdorê digeland, dît ku ji dûr ve siwarek ber bi wî ve tê, ku rişmeya hespê xwe berdaye û xwe li ser piştê wî xilandiye. Li ser qûna xwe rûnişt û bi mereq ma li bende hatina wî. Bi qasî seetekê şûn ve, siwar gîha cem wî di rewşeke pir xerab de ku nefesên xwe yên dawî didan. Lewre bi xedarî birîndar bû û gelek xwîn jê çûbû. Çawa ku gîha cem Hebû Tunebû, hêsirên wî mîna baranê bariyan, devê xwe mîna devê meşkekê vekir û jê re got: “Ey rûyê Ereban ê geş! Kanî min weke dostekî bigire gel xwe, ez ê pir sadiq bim bi te re û tu yê yekî mîna min nebînî. Vêca ka qurtek av bide min ji kerema xwe re, lew ku ez dizanim av ji birîndaran re nebaş e. Baş bizanibe ku heger ez sax bimînim, ez ê mal û mulkekî bidim te bi qasî ku tu ji vê feqîriyê xelas bibe û heger ez mirim jî, tu û şensê xwe dimînî.”

Hespek di bin wî de bû ku mirov lê behetî dima ji ber xweşîkbûna wî. Ne ziman dikarîbû ew spehîbûna wî bianiya ziman, ne jî çav ji nêrîna wî têr dibûn; çîmên wî mîna çar stûnên mermerî bûn, te digot qey ji roja cenga giran re hatiye amadekirin. Loma çawa ku çavên Hebû Tunebû li wî hespî ketin, hiş di serê wî de nema û ji xwe re got “Di vî wextî de hespekî mîna vî, li vir peyda nabe.” Piştî rabû ser xwe û ew ji ser piştê hespê danî erdê. Lê meyzand û hinek av da wî. Hebekî bêhna xwe lê fireh kir, hatanî ku hebekî bi ser xwe ve hat, piştîre jê re got: “Kê wisa li te kiriyê?”

Siwarê birîndar got:

Ez ê rastiya mijarê ji te re bibêjim. Ez mirovekî diz im. Di temamê temenê xwe de hertim min hesp didizîn. Bi şev û roj min hesp didizîn. Loma ji min re digotin Xesan ê afeta hespan. Lewre min afet ji hespan re tanî. Rojekê min bihîst ku ew hespê hanê, li welatê Roman e, li cem Qiral Efrîdûn e, ku navê Qanûn lê kiribû û bi leqeba ‘Dîno’ gazî wî dikir. Rabû ez çûm Qostantînîyeyê ji bo wî û min ew xist bin çavdêriya xwe û li her derê min ew şopand. Vêca hîna min ew wisa dişopand, min bala xwe daye ku pîreke mezin di nav Roman de ye û gotina wê pir giran e li ba wan, jê re digotin ‘Pîra Zîrek, Diya Fen û Fûtan’. Ev hesp jî li ba wê bû, li gel deh koleyên ku tenê xizmet ji vî hespî re dikirin. Berê xwe dabû Bexdê û dixwest ku here cem Qiral Sasan, da ku lihevhatinekê pêre çêbike rehmê jê bixwaze. Min jî da pey wê bi armanca ku ez wî hespî ji destê wê derxînim. Demeke dirêj

ez li pey wan çûm, beyî ku ez keysê li wan bînim. Lewre kole pir miqate bûn li hespê. Ez li pey wan çûm hetanî welatê Qiral Sasan û ez tirsiam ku ew derbasî Bexdê bibin û hîna min keys li wan neaniye. Hîna min bi xwe re nîqaş dikir li ser wê mijarê bê ka gelo ezê çawa wî hespî ji wan bidizim, min dît ku firtoneyeke qûmê li wan rabû û ew di nav de hişt. Dûvre bahoza qûmê sekini û pêncî siwar ji nav derketin, xwiya kirin. Hemû rêbir bûn û serkêşê wan Kurdaş bû, ku di şer de mîna şêrekî bû, kesî nikaribû xwe li ber wî bigirta...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û ÇEL Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê çîroka xwe berdeyam kir û got:*

Siwarê birîndar ji Hebû Tunebû re got:

Wê gavê Kurdaş û zilamên xwe der û dora pîrejîne û koleyên wê girtin û hirehîr û wêlewêl bi wan ket, agir ji devê wan çû. Di nava seetekê de dest û nigên pîrê û her deh koleyên wê girêdan, hespê xwe jî ji dest wan girt û bi kêf ew bi xwe re bir û çû. Mîn jî ji xwe re got “Têba min giş bertelef çû û hesp ji deste min çû.” Piştê min xwe ragirt û ez li bende mam bê wê çî bibe çî nebe.

Gava pîrejîne xwe di nava wê hêsirtiyê de destgirêdayî dît, giriya û ji Kurdaş re got: “Ey siwarê leheng ê bêtirs û mêrxas! Ka tê çî bikî bi min û deh koleyan, ez a ku nîgekî min li derve yek di gorê de. Jixwe waye te hesp ji xwe re bir, êdî çima tu me bernadî?”

Pîrejîna zîrek, bi zimanê xwe yê şêrîn Kurdaş qanix kir û jê re sûnd xwar ku heger wê berde, dê jê re hespin din bîne. Wî jî ew berdan li gel koleyên wê. Wan jî da dû wî û li pey wî û zilamê wî meşiyar hetanî ku gîhan vî welatî û ez jî li pey wan, raçavkirina wan dikim. Li vê derê min keys li wan anî, min hesp ji wan dizî, ez lê siwar bûm û min qayişek ji piştê xwe vekir, min lê da û min bazda. Lê ew bi min hesiyar û bi pey min ketin, xwe gîhandin min û derdora min girtin. Bi tîr û kevanan hewl dan ku min bikujin, ji ser piştê hespê bixin û wê jî bi saxî û selametî ji nav lepên min xelas bikin. Lê belê hespê bi herdu nigên xwe yê pêşî êrîşî ser wan kir, ez parastim û li dawî jî ez ji nav wan rizgar kirim û mîna birûskê kete rê de, lê belê min çend tîr xwaribûn û ez birîndar ketibûm. Ev sê roj û sê şevî ku ez li ser piştê wê hespê me, bi vî halê xwe, bê nan û bê av. Mîn qet bawer nedikir ku ez rizgar bibim, lê vaye bi xêra Xwedê û bi saya serê te ez xelas bûm. Ez vê qenciya te bê bersiv nahêlim. Lê belê tu jî, li gel ku elametên mîrekan li ser çavên te xwiya dikin, tu tazî, bê kinc î, hem jî tu perîşan xwiya dikî! Gelo navê te çî

ye? Û tu kî yî?

Wî jî got: “Ez Hebû Tunebû me, kurê Şewqa Mekan, qiralê navdar, kurê sultanê mezin Omer En-Nûman. Bavê min mir û ez yetîm mezin bûm. Piştî bavê min, zilamekî rezîl û bêwijdan ket dewsa wî û bû qiral li ser serê vî gelê perîşan.” Piştî jî çîroka Sasan û pêkûtiyên wî ji serî hetanî binî jê re vegot. Mirovê diz hestiyar bû û dilê wî pê şewitî, got: “Bextê te vekiriye û tu xortekî pir hêja yî. Bêgûman dê rê li ber te vebe û tê bibî fêrisê herî navdar di vê serdemê de. Vêca heger tu bikaribî li pey min siwar bibî û min bigihîni welatê min, tê li vê dinyê şerefê û li wê dinyayê jî razibûna Xwedê qezenc bikî. Lewre hêz bi min re nemaye ku ez bikaribim li ser piştî hespê xwe bigirim. Heger di rê de ez bimirim jî, tê bibe xwediyê vî hespî, lewre ji herkesî bêhtir te ew heq kiriye.”

Hebû Tunebû jê re got: “Ne ji bo vî hespî, lê belê heger bi destê min ve bê, li ser piştî xwe be jî ez ê te bigihînim malê. Heger bi destê min ve bihata jî, bawer bike min ê nivê temenê xwe bida te, lewre ez ji qencîkirinê pir hez dikim û ez mirovekî alîkarhez im, di hewara herkesi de diçim û ji xêrkariyê hez dikim. Ji ber ku ez bi bawer im ku Xwedê Teala vê qenciyê jibîr nake.”

Hebû Tunebû nêt kir ku wî li hespê siwar bike û wî bibe welatê wî. Zilam got: “Hebekî xwe ragire.” Piştî çavên xwe girtin, herdu destên xwe ber bi jor vekirin û got: “Eşhedû en laîlahe îllallah we eşhedû enne Mûhemmeden resûlûllah.” Dûvre ev çend beyt gotin:

Min zulum li herkesî kir û ez pir geriyam li dinyê  
Min temenê xwe giş buhurand bi meyxwirê  
Ez ketim ser rêya diziya mihîn û hespan  
Min xera kir mala xelkê bi ser wan de ey can  
Û bi vî hespî rizgar bibim jî çavnebariya xwe  
Di temamê ‘emrê xwe de her min hesp dizîn  
Dawî gotina min jî ew e ku êdî ez betilîm,  
Bila ev hespê min jî ji te re be ey xortê helîm!

Piştî ku ew helbesta xwe qedand, çavên xwe girtin, devê xwe vekir, hilmeke dawî bideng kişand û giyana xwe ji dest da, çû ser dilovaniya xwe. Hebû Tunebû jî, gorek jê re kola û ew tê de binax kir. Piştî rûyê hespê xwe paqij kir û destê xwe di ser serê wî re bir û anî, dît ku hespekî wisa di destê Qiral Sasan de jî tuneye.

Rojên li pey wê bûyerê derbas bûn û pê de, tacirên ku ji Bexdayê hatin û di wir re derbas bûn, agahiyên berfireh jê re anîn di derbarê bûyerên ku li pey wî qewimîne. Agahiya herî giring a ku Hebû Tunebû bi dest xistibû ev bû: Nakokiyeke mezin di navbera Qiral Sasan û wezîrê wî Dendan de der-



ketiye. Wezîr Dendan li himberî Sasan derketiye û nivê artêşê jî li cem wî cih girtiye û sûnd xwariye ku ew jî Hebû Tunebû pê ve, tukesê din li ser serê xwe qiral qebûl nakin. Dendan destpêkê hemû leşkerên xwe li ser wê yekê bi sûndxwarin daye, piştî çûye Cezayira Hind û Berberan; çûye Sûdanê û destek jî wan jî xwestiye. Ji wir jî bi hezaran leşker tev li wan bûne û artêşa ku li pey wî hatiye, bûye mîna ava behreke ku ne serî jê re heye ne jî dawî. Li gora heman agahiyê jî, Dendan şûrê cengê hildaye û sûnd xwariye ku kî li himber derkeve dê wî bikuje û dê şûrê xwe venegerîne kalanê wî hetanî ku Hebû Tunebû nebe qiralê welat.

Gava ku Hebû Tunebû ew agahî stendin, ket nava fikarên dûr û dirêj. Ji aliyekî din ve Sasanê Qiral jî têngihîşt ku artêş û rayedarên dewletê lê qûlipîne û xelk hemû jî ji heftsalîyan hetanî heftêsalîyan li himber wî derketine. Bi wê yekê pir xemgîn bû û ket nava behra kul û xeman de. Pir ponijî û di encamê de deriyên xezîneyên dewletê vekirin û mal û milk li karmendên dewletê belav kir û hêviya xwe ji gişan re anî ziman ku Hebû Tunebû were da ku wî di nav qencî û hebûnê de bihêle û wî bike serokê artêşa ku hîna jî di bin serkêşîya wî de ne û bi hatina wî re dê pê bibin agir û pêt.

Piştî ku Hebû Tunebû ev agahiya vê dawiyê jî ji taciran bihîst, li hespê xwe yê nû siwar bû û bi leza bablîsokê vegeriya Bexdê. Qiral Sasan ê ku heyyirî mabû, gava bihîst ku Hebû Tunebû vegeriya Bexdê, hemû leşker û mezinên dewletê yên li Bexdê derxistin pêşwaziya wî. Hemû bi kelecaneke mezin çûn pêşîya wî, bi germahî ew pêşwazî kirin û dan pêşiyê ew anîn qesrê. Qasidan jî bi lez çûn mizgîniya hatina wî dan diya wî. Ew jî hat ew ji nav çavên wî maçî kir. Hebû Tunebû jî diya xwe re got: “Dayêcan, ka bihêle ez herim cem apê xwe yê Sultan Sasan ê ku ez di nav xêr û bêrê de hiştîme, da ku ez spasiya xwe jê re pêşkêş bikim.”

Karmendên dewletê jî hemû mabûn şaş û behetî li wî hespî û li wî siwarê ku nedihate wesifdan. Ji Qiral Sasan re gotin: “Sultanê gewre! Bawer bike me siwar mîna vî siwarî bi heybet nedîtine!”

Sasan jî çû silavdayîneke germ lê kir. Hebû Tunebû jî pê ve rabû, dest û nigên wî maçî kirin û hespê xwe jê re kir diyarî û pêşkêşî wî kir. Qiral Sasan xêrhatineke germ tê da û got: “Kurê min Hebû Tunebû, tu bi xêr û xweşî hatiye, ser seran ser çavan hatiye ji wir heta vir. Bi navê Xwedê dinya li me teng bûbû piştî çûna te. Şikir ji Xwedê re vaye tu bi saxî û selametî hatiye.” Piştî li hesp nêrî-ku navê wî Qanûn bû- û nas kir ku ew heman hesp e ya li Qostantîniyeyê dîtîbû, di dema dorpêçê de, gava ew bi xwe jî di bin ferman-dariya bavê wî Şewqa Mekan de çûbû wir û ketibû wê dorpêça ku apê wî Şerkan tê de hatibû kuştin. Piştî hişê wî bi salan paş ve çû û ew zeman hatin bîra wî, li Hebû Tunebû zîvirî û jê re got: “Heger bi dest bavê te biketa, dê ev

hespê han bi hezar hespî bikiriya. Lê belê vaye niha vegeriya cem xwediyê xwe yê rasteqîn. Min jî ev diyariya te qebûl kir û ez bi xwe wê dîsa diyarî te dikim, lewre lehengê lehengan tu yî û yê ku wî heq dike jî tu yî.”

Dûvre Sultan Sasan ferman da ji bo mehmizeke salane ji Hebû Tunebû re were tomarkirin. Ya herî xweş jî qesir vala kir ji bo wî, xelat û diyarî bi ser de barandin û qeflek hesp jî dane wî; ew di nava xêr û bêran de hişt, mal û mulkekî mezin da wî û qedrekî giran ji jê re girt, lewre di nava tirseke mezin de bû ji ber xezeba wezîrê xwe Dendan ê ku serî li ber rakiribû.

Hebû Tunebû pir kêfxweş bû bi wê nêzîkahiya Sasan, lewre rojên xizani û tunebûnê li pey xwe hiştibûn. Bi coş derbasî mala xwe bû û çû ji diya xwe re got: “Dayêcan, hele biçe cem wê û jê re bibêje, belkî ew jî li min were rehmê û piştî vê dûrketina dirêj, carekê tenê be jî were xwe nîşanî min bide, da ku ew agirê hesreta wê hinekî vemire di dilê min de.” Diya wî jê re got: “Tamakariyên wisa stûyê mêran xwar dikin, vêca tu jî dev ji vê hewesa xwe berde da ku bele bi serê te de neyên. Ez ne diçim cem Qeza Bû, ne jî van gotinan digihînim wê.”

Gava Hebû Tunebû ev gotin ji devê diya xwe bihistin, mijar guhert û jê re behsa gotinên wî dizê hespê kir, ê ku digot pîra zîrek, dayika fenekan hatiye vî welatî û hewl dide ku bikeve Bexdayê. Piştê ji diya xwe re berdewam kir û got: “Ew e ya ku kalkê min û apê min kuştiye. Bêgûman divê ez heyfa xwe jê hilînim û namûsa xwe paqij bikim.”

Diya xwe li wir hişt û ji mal derket, çû cem jinikek xapînok û şermût ku hemû karen nelirê dikirin û navê wê Sadanê bû. Çû cem û derdê xwe jê re vegot di derbarê eşqa dotmama xwe Qeza Bû de û jê xwest ku here cem dotmama wî, silavên wî bigihîne wê û daxwaza wî jê re bîne ziman. Jinikê jê re got: “Ser seran, ser çavan.” Piştê ji cem wî rabû û berê xwe da qesra Qeza Bû. Çû cem wê, li ber geriya da ku daxwaza wî bipejirîne û dîsa lê vegeriya û jê re got: “Qeza Bû silavan li te dike û dibêje nivê şevê ez ê werim cem wî.” Ew jî bi vê agahiyê pir kêfxweş bû.

Dema ku nivê şevê hat, keçik di nava ebayeke reş de, bi dizî derbasî cem wî bû û ew jî xew şiyar kir, jê re got: “Tu çawa dibêji ez aşiqê wê me û wisa bi hişekî vala tu ketiye vê xewa bêbinî?” Û gelek lome jê kirin. Wî jî got: “Bi Xwedê sebra dilan, tenê ji bo ez te di xew de bibinim min pal dabû.” Qeza Bû dîsa lome jê kirin û ev beyt jê re bi lêv kirin:

Heger tu rast bûya di angaştê evînê de  
Çavên te nediçûn ser hev di nivînê de  
Ey peyvdarê dildariya eşqa min  
Gelo çima naçê ser hev ên min?

Li himberî van beytên wê, Hebû Tunebû pir li ber xwe ket û rûyê wî sor bû ji fediyar. Piştî hevdu himbêz kirin, gilî û gazinên xwe li hev kirin û êşa fûraqê ya giran, êşa bêrikirina ku giyana wan li wan diherimand ji hevdû re vegotin û her wisa berdewam kirin hetanî ku şeveqê lêda û tîrêjên şewqa sibehê da hundur. Wê gavê Hebû Tunebû pir giriya, piffin pê ket û bi helbestî ev riste gotin:

Ey mêvana vî dil û canê biêş!  
Ey lêvhingîvîna ku hinav ji ber diêş!  
Rû bi rû mam her ez lêv li ser lêv  
Şev pê de her min maç kir ew rûsêv  
Heta li me da ronahiya rojê bi xwe  
Şûr jî her kişandî ma ji kalanê xwe

Gava ev helbesta xwe qedand, xatir ji hev xwestin û Qeza Bû vegehiya odeya xwe. Lê belê çend cariyeyan ew dît û yekê ji wan çû giliyê wê li cem Qiral Sasan kir û ew ji mijarê agahdar kir. Qiral hêrs bû, şûrê xwe ji kalanê wî kişand û berê xwe da odeya Qeza Bû, da ku serê wê bifirîne. Lê belê di wê navberê de jina wî Seyrana Zeman derbasî cem wî bû û jê re got: “Zararê nede keça xwe! Heger tu zararekê bide wê, dê xelk meselê bibihîzin û tê rezil bibî di nav xelkê de û di nav qiralên dinyê de. Heger Hebû Tunebû xwedî namûs û nirx be û tiştêkî şerm neke, lezê lê meke û bêhna xwe lê fireh bike. Jixwe her kesê di qesrê de û hemû gelen Bexdê bihistine ku Dendanê wezîr ji hemû welatan leşker kom kirine û ber bi Bexdê ve tê ji bo Hebû Tunebû bike qiral.”

Qiral Sasan ji jina xwe re got: “Divê ez Hebû Tunebû bixim belayekê ku qet jê xelas nebe. Jixwe qenciya min pê kir û mal û milkên min dane wî jî, tenê ji bo meyla xelkê Bexdê bi ser de neçe. Serê xwe meêşîne, tê bibînî bê ez ê çi bînim serê wî.”

Piştî qiral dev jê berda, çû diwana xwe ji bo kar û barê xwe bide meşandin.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî navber da vegotina çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û ÇEL Û ÇAREMÎN

*Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir:*

Eva han ji aliye Qiral Sasan ve, vêca em vegehin ser rewşa Hebû Tunebû. Ew jî rojekê çû cem diya xwe û jê re got: “Dayêcan! Min nêt kiriye ku ez riyar bibirim, êrişan bikim û têra xwe diziya mal û mulkên xelkê bikim, dest deynim ser kole û cariyê û hespên wan, hetanî ku ez baş maldar bibim û piştî ez ê herim keça apê xwe Sasan bixwazim.” Diya wî jê re got: “Kurê

min, mal û mulkên xelkê ne bêxwedî ne. Di piş vî karî de serjêkirin, destjêkirin heye. Rimbaz û şûrvanin cengawer hene ku heyfa xwe di zikê şêran de nahêlin.” Hebû Tunebû keserek kûr veda û got: “Dîsa jî hetanî ez negihême miradê xwe, ez ji vê biryara xwe venagerim.”

Piştî ew jinika sihirbaz şand cem Qeza Bû da ku jê re bibêje, dê pismamê te bi çolan keve ji bo qelenê te kom bike. Di heman demê de ev tenbî kir, got: “Jê re bibêje, misoger bersivêkê ji te dixwaze.”

Jinik çû cem Qeza Bû, peyamên pismamê wê gîhandinê; yên wê jî guhdar kirin û bi şûn de vegeriya cem Hebû Tunebû, jê re got: “Nivê şevê, dê li cem te be.”

Ew jî şiyar ma hetanî nivê şevê. Carekê ji nişkê ve derbasî cem wî bû û got: “Ruhê min bi qûrbana te bûyo, tu hîna şiyar î? Ew jî pê ve rabû û got: “Ey hêviya dilan, bila ruhê min bi qurbana te be. Xwedê te bisitirîne ji hemû rengên xerabiyên, rebbî!”

Piştî wê silavdayîna germ û wan gotinên jiagir, Hebû Tunebû ya dilê xwe jê re got û anî ziman bê çawa dixwaze here qelenê wê ji keleşiyê kom biki û were. Keçik giriya û bû kûrekûra wê, wî got: “Megrî dotmam, ez hêvî ji wî xwedayê ku dê me ji hev veqetîne dikim, ew me bigihîne hev jî.”

Çend rojan bi şûn de, Hebû Tunebû dest bi amadekariyên xwe kir û çawa ku qedand çû cem diya xwe, xatir jê xwest. Piştî rûpoşek girt ser çavên xwe, rahişt şûr û mertalê xwe li hespa xwe siwar bû û ji mal derket, bi kolanên Bexdê de çû mîna heyvekê. Gava giha deriyê bajêr, dît ku hevalê wî yê demekê Sabah Bin Remmah jî derî derbas kiriye, bi der ve de diçe. Paniya xwe li zikê hespê da û bi lêz xwe pê ve gîhand, silavek dayê. Sabah jî silava wî girt û lê zêde kir pê de çû, jê re got: “Brawo tu çawa wisa halxweş bûyî û yê min hîna jî tiştêk di destê min de tune ye ji vî şûrî pê ve?” Hebû Tunebû got: “Her nêçîrvan li gora nêta xwe û bi qasî hêviyên xwe nêçîrê digire. Ez jî piştî ez ji te veqetiyam bi seetekê, min ev hemû bi dest xistin. Gelo tê jî bi min re werî ku em bi wê beriyê ve herin û bibin destbirakê hev?” Devê Sabah ji hev çû, diranên wî qîç kirin ji kêfan û got: “Bi heqê navê Xwedê, ji îro û pê de tê herdem mîrzayê min bî, serkêşê min bî!”

Sabah şûrê xwe xist kalanê wî, tûrikê xwe avêt milê xwe û ket pêşiya hespê Hebû Tunebû û da ser rê. Herduyan meşa xwe ya li wê beriyê çar rojan berdewam kirin. Di wan çar rojan de, her ku birçî bûn bi goştê xezalan têr xwarin û her ku tî bûn jî ava kaniyan vexwarin. Di roja pêncan de gihan ser girekî ku di binyê de çayireke fireh hebû. Di nava wê çayirê de jî keriyên pez û deve û hesp û çêlekên diçêriyan û wan dera tijî dikirin bi hejmara xwe ya mezin. Çawa ku Hebû Tunebû çav li wê dîmenê ket, kêfxweş û dilşa

bû û nêta xwe lê xera kir ku şer bike û wan keriyên gişan ji xwediyên wan bistîne. Ji rêzanê xwe re got: “Ka me bibe cem van terş û sewalan, da ku em xwediyên wan gişan bikûjin û malen wan ji xwe re bibin.” Sabah got: “Mîrzayê min xwediyên wan terşan pir in û gelek mêr û mêrxas di nav wan de hene ku gelek ji wan jî leheng û fêrsin, hêzdar in ku piştta wan nagihêje erdê. Vêca em niha herin xwe bavêjin nav diranên van şêran, dê xeteriyêke mezin li ser me çêbibe.”

Hebû Tunebû nas kir ku zilamê wî tirsonek e. Keniya, dev ji wî berda, ew li wir hişt û hespê xwe ajot, xwe berjêr ve berda, ber bi çayiran ve çû. Coş bû û biryar da ku êrîş bike ser wan bi tena serê xwe û ev çend beyt gotin:

Dola Nûman in em xwediyên şad û şûdan in  
Bi kerr û ferr in em herdayîm li ser kar in  
Mirovin wisa ne ku em dema coş dibin  
Dujminên xwe diperçiqînin di bin nigan de  
Li gel me tê incex xewa birçiyên di şevan de

Piştê, mîna deveyê ku hêç dibe êrîşî ser wan keriyên pez û garanên dewaran kir, mîh û hesp û çêlek û deve hemû dan ber xwe. Şivan û gavan û koleyên ku parazvaniya sewalan dikirin jî bi şûr û rimên dirêj û di bin femandariya farisekî Kurd de bi ser wî de çûn. Farisê Kurd pir jêhatî bû di şer û cengê de, weke pilingekî êrîşî ser Hebû Tunebû kir bi şûrê xwe yê giran û jê re got: “Diyar e ku tu nizane bê ev terş malê kê ye, yana te tişteki wisa nedikir. Jixwe ez baş dizanim bê hûn vî terşî ji kê re dibin. Hûn wîna ji wan çetekarên Rom û Çerkezên re dibin. Ew çeteyên ku çend lehengên kurmî di nav wan de hene û bi şîretên wan lehengan ji rêya hemû qiral û sultanên derketine, karê diziyê û talanê dikin. Jixwe wê dema han hespekî qiralê me jî dizibûn û sûnd xwaribûn ku bêyî wî hespî ji vî welatî dernekevin, neçin.”

Gava Hebû Tunebû ew gotina wî bihîst, gazi wî kir û jê re got: “Ew hespê ku tu behsa wî dikî, ev bi xwe ye, evê di bin min de ye. Madem hûn dixwazin ji bo wî şer bikin, hemû bi yek carê re werin ser min, em binêrin bê kî berx e kî beran e!”

Hebû Tunebû wisa got û piştê qîrek da di guhê hespê xwe de. Hesp jî weke bablîsokê bi ser wan de çû, wî jî xwe bi ser farisê Kurd de berda û rimek li nava wî da, gurçikên wî di piştta wî re dane der. Dûvre xwe bi ser ê din ve da, ew jî kuşt. Piştê yê sisyan û yê çaran jî da erdê. Gava ku koleyan ew dîmen dîtî, tirseke mezin ket dilê wan û qudûmê wan şikest. Hebû Tunebû ji wan re got: “Piçino, bêjîno! Ka vî terş û telanî li pey min bajon, naxwe ez ê xwîna we jî vexwim!”

Koleyan bi ya wî kirin û keriyên ajalan dan pêşiya xwe û li pey wî

çûn. Şev pê de meşîyan hetanî ku li wan bû sibeh. Kêfa Hebû Tunebû hat û bêhna wî hate ber wî. Lê ji nişkê ve toz û ecaceke erjeng ji dûr ve xwiya kir ku her diçû, ew ewrê tozê mezin dibû û ber bi wan ve dihat, dinya tarî dikir. Gava nêzikî wan bû, ew ewrên tozê ji hev ferikîn û sed siwar di bin wê de xwiya kir ku her yek ji wan mîna pilingekî bû. Çawa ku Sabah çav li wê dîmenê ket, dev ji Hebû Tunebû berda û ji wir reviya, çû serê gir û ji wê derê bûyer temaşe kir û di dilê xwe de got “Ê min ez lehengê listik û henekan im, ne lehengê şer û cengê!”

Ew her sed faris li dora Hebû Tunebû hatin hev û ew xistin çemberê de. Piştî yek ji wan ber bi wî ve çû û jê re got: “Tu vî terş û talanî bi ku ve dibî?” Hebû Tunebû bersiva wî da û got: “Kerem bike meydana şer û bila hayê te jê hebe, şêrekî cengawer li vê derê heye ku şûrek di destê wî de ye, çawa dizîvire, serîyan jêdike!”

Serkêşê wan siwaran ê ku navê wî Kurdaş bû gotina wî guhdar kir, têgihişt ku ew mirovekî leheng û bêtirs e. Lê belê rûyê wî mîna heyveke li çardeyan bû. Bi wê spehîbûna xwe, pir dişibiya dildara wî ya bi navê Fatin ku mîna heyvekê bû û Xwedê Teala spehîbûnek dabûyê nayê ser zimanan. Fatin keçeke mêrkûj bû bi xweşikbûna xwe, loma tu farisî newêribû lê binê-riya. Ligel wê xweşikbûna xwe, ewqasî jî mêrxas û şerker bû ku tirseke mezin xistibû dilê hemû faris û mêrxasên herêma xwe de. Vêca Fatina bi heybet sûnd xwaribû ku bi kesî re nezewice ji xeynî ew farisê ku pê re dakeve tirada hespê û piştî wê bide erdê. Kurdaş bi xwe jî yek ji xwazgîniyên wê yên çeleng bû. Îcar gava bavê Fatinê şertê wê yê qebûl kirina zewacê jê re gotibû, Kurdaş tirsîyabû ku bi keçekê re bikeve şer û bi wendakirinê re bihetike di nav xelkê de. Ligel ku hinek dostên wî jê re gotibûn “Tû xortekî pir spehî û lihevhatî yî, heger ew ji te xurtir be jî dê bikeve bin bandora lihevhatîbûna te û tu dê şer qezenc bikî” lê dîsa jî wî qebûl nekiribû. Roj di ser re derbas bûbûn, Fatin jî spehîbûna Kurdaş bihîstibû û aşîqî wî bûbû, lê belê bêyî pêkanîna wî şertê xwe, pê qayil nedibû. Gelek dost û hogirên Kurdaş jî çiqasî ketin navberê û şîret lê kirin ji bo ku şertê Fatinê qebûl bike û pêre dakeve tirada hespê, ewî qebûl nekir û ma hetanî wê roja Hebû Tunebû li himber wî derket di sûretê Fatinê de. Ne tenê bi dev û rûyê xwe, bi sergirêdana xwe jî Hebû Tunebû pir dişibiya Fatinê. Wî jî digot ew e û nema debar kiriye ji êşa dilê xwe, hatiye li himber wî derketiye, ji bo ku şertê xwe pêk bîne û piştî şerekî dijwar, bi wî re bizewice. Loma nuh Kurdaş ew li raserî xwe dît jê re got: “Wax Fatin wax! Naxwe tu hatiye vir ji bo ku tu hunerên xwe yên şer nîşanî min bidî? Kanî hela ji hespê xwe peya bibe û were ez tişteki ji te re bibêjim. Binêre, min ji bo te evqase terş û talan kom kirine û min rê biriye li hemû siwar û xweşmêran. Ji bo ku ez bibim layiqî te û wê spehîbûna te. Vêca ka were bi min re bizewice, da ku tu mîna keybanûyan bijî û hemû carîye û xizmetkar bikevin xizmeta te û navê te belav bibe li seranserê welêt.”

Gava ku Hebû Tunebû ev gotin ji devê wî bihistin, hêrs bû û agir bi nava wî ket. Awirin tûj tê vedan û jê re got: “Ey Eceme bêaqil û ey kûçikê kurê wî kûçikî! Dev ji Fatin û matîne berde û were bi min re dakeve meydana şer, meydana bi çingêçinga şûr û rîman, lewre çend xulek şûn de dê cendekê te li erdê raxistî be.”

Piştî hespê xwe rakir ser herdu nigên dawî, lingên xwe li bin zikê wî da, ew birûanî, hîrehîr pê xist û doza şer li Kurdaş kir. Lê belê çilo Kurdaş lê nêrî, tê derxist ku şaş fikiriye û ev leheng mêrxasekî bêtirs û pir jêhatiye di şerê xwe de. Li piş xwe zivîrî û ji hevalên xwe re got: “Ka hele yek ji we derkevin û bi vî zilamî re dakevin meydanê, helbet şerê sed zilamî bi yekî tenê re şerm e ji bo me. Loma ew Rustemê Zal be jî yek tenê herênê!”

Wê gavê siwarek ji wî sed siwarî nigê xwe li bin zikê hespa xwe xist û mîna dêwekî daket meydana şer. Siwarekî ku agir ji çavên wî diçû û hespeke kumêt di bin de bû. Mirov newêribû lê bimeyzanda ji ber heybeta wî. Hespên wan bi firefir û hîrehîr meydan ji hev re xwendin û bû şingêçinga şûr û rîmên herduyan, li wê naverastê. Şerek di navbera herdu xweşmêran de qewimî ku nayê wesifdan. Lê belê di encamê de Hebû Tunebû piştî jê stend û şûrek tê werkir ku serê wî bi yek carê re firand, li gel kofiya wî. Gewdeyê wî jî mîna serkulekê ji ser piştî hespa wî gindirî erdê. Piştî wî, siwarê duduyan daket meydanê, lê ew jî mîna yê pêşî hate kuştin. Hebû Tunebû, siwarê sisyan û yê çaran jî bi heman şeweyê kuşt. Jê û pê de siwarên mayîn hemû bi hev re hatin ser wî bi tirseke mezin, piştî ku dîtîna bê çî bi serê hevalên wan hat. Lê dîsa jî fêde nekir û di nava seetekê de Hebû Tunebû ew hemû kuştin.

Gava Kurdaş çav li wê rewşê ket, pir tirsîya û naskir ku ew fêrîsekî dil ji pola ye û texmîn kir ku evê serkirdayê herî mezin ê lehengan be. Hebekî fikirî, piştî ji Hebû Tunebû re got: “Ez di xwîna te û di xwîna hemû zilamên xwe de jî dibuhurim. Têra xwe terş û sewalan jî bibe û bi rêya xwe de here. Min tu dayî xatirê ciwantiya te. Yekî mîna te, layiqî jiyane ye ne mirinê.”

Hebû Tunebû lê vegerand û got: “Mirweta comerdan bi te nakeve. Dev ji van gotinan berde û zû bireve ji vir, xwe xelas bike. Ji lomeyan û ji piçûketinê qet metirse û nexe bîra xwe de ku tê bibî hevbeşê malên vê talanê. Ya baş ji bo te, wek min di serî de jî got, rêyeke rast ji bo xelasiyê ji xwe re hilbijêre, ji gişî çêtir e.” Kurdaş bi vê gotinê pir hêrs bû. Çavên wî sor bûn û di asta dînitîyê de ji ser hişê xwe çû. Qîr da û ji Hebû Tunebû re got: “Heger te bizanîbûya bê ez kîme, te ev gotinên xav li ber guhên min nedigotin. Ez şerê har, Battaş im. Ez bi Kurdaş tême zanîn. Min mîr û gîzîr û qîral şelihandine û min rê biriyê li ber hemû təcîr û kerwanan, min malên wan talan kiriye. Ev hespê di bin te de jî, malê min e û ez dixwazim tu çîroka bidestxistina wî

ji min re bibêje da ez bizanim te çawa ew peyda kiriye.”

Hebû Tunebû got: “Ev hespê han di bin pîrejinekê de bû û diçû cem apê min Sasan ê Qiral. Ew pîrejin jî kujera kalkê min ê Qiral Omer En-Nûman û apê min Sultan Şerker bû. Hîna me tola xwe jî jê hilneanibû.”

Kurdaş lê vegerand û got: “Wey wey û kî bavê te ye?” Hebû Tûnebû got: “Ez kurê Qiral Şewqa Mekan im û navê min Hebû Tunebû ye, yanî ez torinê Omer En-Nûman im.” Gava Kurdaş ev gotin ji devê wî bihîstin, got: “Divê neyê inkarkirin ku tu mirovekî kamilî û te werekî, mîrxasî û spehîbûn aniyê ba hev di şexsê xwe de, subhan ji wî re yê ku tu xuluqandiyê! De êdî here rêya te vekirî be, jixwe bavê te jî xwedîxêrekî mezin bû û qedrê wî li ba min hebû.” Hebû Tunebû lê vegerand û got: “Lê belê ez rêzê ji te re nagirim ey mirovê rezil ê bêşeref!”

Kurdaş pir hêrs bû li hemberî vê gotina Hebû Tunebû û di ci de hespê xwe bi ser de ajot. Herdu siwar mîna du çîyan li bin guhê hev ketin, toz û ‘ecac ji ber nigên hespên wan rabû, pozên wan mîna qulên kewaran fireh bûn, guhên xwe berjor ve miç kirin û teriyên xwe berjor ve hildan mîna ku ew bi xwe hêrsên xwediyên xwe bînin ziman. Hîrehîr bi wan ket li ber dengê şingêşinga şûr û mertalan, pevçûna wan ewqasî xwirt bû ku carekê herduyan jî gotin belkî ezman bi ser wan de hatiye xwarê, herî dawî jî mîna du berana poş li hev dan, rimên xwe di hevdû werkirin, Kurdaş hewl da ku piştê jê bistîne û derbeke rimê avêtê, lê Hebû Tunebû xwe ji ber derbeya wî filitand û di ci de lê zivirî keys lê anî û derbek li sînga wî da. Serê rimê di nav piştê Kurdaş re derket û di nava xulekekê de ji ser piştê hespê xiliya û gêr bû erdê, termê wî li ser axê dirêj bû.

Hebû Tunebû hemû hesp û terş û talan dane ser hev û qîr kir li koleyan, gazî wan kir got: “De êdî keriyên sewalan bajon!” Wê gavê, Sabah hate ba wî û jê re got: “Herbijî ji te re fêrisê fêrisan û cengawerê zemanê xwe! Wellehî min dua jî te re kiribûn û vaye duayên min hatin qebûlkin!”

Dûvre Sabah çû serê Kurdaş jêkir. Hebû Tunebû jê re got: “Wey! Sabah, naxwe tu jî zîlamê şer û cengê ye!” Sabah lê vegerand, got: “Koleyên xwe jî bê par nehêle ji vê xenîmetê mîrzayê min, belkî bi xêra wê ez jî bighêjim mirazê xwe û bi dotmama xwe Necme re bizewicim.” Mirzayê wî got: “Misoger dê para te jî tê de hebe. Tenê li kole û sewalan miqate be û îşê te pê tune!”

Piştê, Hebû Tunebû berê xwe da welatê xwe û bi şev û roj meşîyan hetanî gîhan Bexdayê. Di wê navberê de herkesî terş û keriyên sewalan pêre dîtî û serê Kurdaş ê ku bi serê rîma Sabah ve bû jî ji ber çavên wan nerevîya, lewre pîrrianiya taciran Kurdaş nas dikirin û çawa têgihîştin ku ew hati-



ye kuştin, pir pê kefxweş bûn. Lewre Kurdaş rêbirekî navdar bû û pir êş kişandibûn ji destê wî. Hemûçkan şikirya xwe ji Xwedayê xwe re kirin ku ew ji wî xelas kirine û bengawazî li kerwankaran kirin da ku bêtirs kerwanên ticaretê dîsa amade bikin, ji bo ku bikevin ser rêyan de. Xelkê Bexdayê ji pê re derketin û bi meroqek mezin agahiyên bûyeran şopandin, bi çavên serê xwe mal û mulkên li pêşiya Hebû Tunebû bû dîtîn. Mêr û mêrxas hemû jê tirsîyan û xelkê jî bi heybet dane dûv wî û pêre meşîyan hetanî ew gîhandin ber deriyê Qesrê. Li wê derê, Hebû Tunebû rima ku serê Kurdaş pêve bû li ber derî çikiland û gelek hesp û deve jî weke xelat li xelkê belav kir. Bi wê yekê, xelkê Bexdê jî jê hez kir û dilên wan bi ser wî ve çû.

Dûvre Sabah gelek cihên fireh nîşanî wî dan, ji bo mal û mulk û sewalên xwe lê bi cih bikin. Piştî jî çû serdana diya xwe û ew agahdar kir ji hemû karên ku kiribûn di wê rêwîtiya xwe de.

Gava Qiral jî bi wan bûyeran hisya, bi lez û bez şewirmendên xwe komî ser hev kirin, civînek bi wan re li dar xist û ji wan re got: “Ji ber van kiryarên Hebû Tunebû, ez naçarim a dilê xwe ji we re bînim ziman û girîngiya rastiya heyî li ber çavên wê raxim. Divê hûn jî baş bizanibin ku malwêraniya me dê ji destê Hebû Tunebû be. Lewra wî çûye Kurdaş kuştîye û hûn jî dizanin ku hemû êlên Kurdan li pey wî ne. Jixwe pîrraniya artêşa me jî ji merivên wî ne. Ji aliye din ve jî, hûn agahdar in bê Dendanê Wezîr çawa nankorî bi min re kiriye û çûyê li welatan digere û leşkeran kom dike ji bo were bi darê zorê Hebû Tunebû bike qiral li şûna min, bi mahneya ku sultantî ya bav û kalê wî bû. Bêgûman dê were û şerekî giran jî bi me re bike. Ji bo vê yekê vêca hûn çî dibêjin?”

Şewirmendên wî gotin: “Welehî ne ji bo xatire te bûya, kesî ji me ev yek jê re nedihîşt û qebûl jî nedikir. Lewre ev sêwlekê han ji zû ve sînoran derbas dike. Vêca qiralê me yê hêja, em hemû xulamên te ne, tu çawa dixwazî em ê ji wisa bikin. Tu bibêjî wî bikujin em ê wî bikujin, tu bibêjî wî ji vir nefî bikin em ê wî nefî bikin û berra wî bidin ji vir.

Gava Qiral ev gotina wan bihîst, got: “Hûn rast dibêjin, lêbelê beriya hûn wî bikujin ez dixwazim peymanekê bi we re deynim û sozekê ji we bigrim.”

Qiral di dilê xwe de digot “Heger Hebû Tunebû were kuştin û Dendan jî vê yekê bibhîze, dê bêhêvî bibe û nema dikare bi hêzdarî li hemberî min şer bike.” Loma piştî ku soz û peyman ji şewirmendên xwe girt, hediye û xelatên giranbûha li wan belav kirin û gelekî jî qedr û qîmetên wan girt. Piştî civata xwe belav kir û ew jî çû cem jina xwe.

Piştî vê helwest û pilangeriya Qiral Sasan, gelek leşker ji pey Dendan

vegeriyan û agahiyên di vê derbarê de çûn ji Qeza Bû re jî. Ew jî pir xemgîn bû bi wan agahiyan û şand dût wê pîrejina ku herdem jê re xeber û agahî tanîn ji cem pismamê wê. Gava pîrejin hate cem wê, ferman da wê ku biçe cem pismamê wê û wî agahdar bike bi wan agahiyên nû. Pîrejin jî di cî de rabû ser xwe û bi rê ket. Dema gîha cem wî silavek lê kir û agahiyên ku Qeza Bû dabûne wê, yeko yeko bilev kirin li ber guhên wî. Wî jî ji pîrê re got: “Silavên min bibe ji dotmama min re û jê re bibêje, erd û mulk hemû yên Xwedê ne û ew kê bixwaze, ji wan re dihêle.”

Pîrejin jî bi lez vegeriya bi şûn de û ew gotina wî gihand dotmama wî û jê re got: “Hebû Tunebû di bajêr de ye û Sasan ê Qiral jî maye li bende derketina wî ya ji bajêr, ji bo kujeran li pey wî bişîne da wî bikujin.”

Rojekê Hebû Tunebû ji bajêr derket, çû seyd û nêçîrê. Sabah jî bi wî re bû, lewre şev û roj ji wî qut nedibû. Di wê nêçîrê de deh xezal girtin ku yeke çavmor jî di nav wan de bû, ew xezala han, bênavber li çep û rastê xwe dinêrî û derdora xwe raçav dikir. Vê yekê bala Hebû Tunebû kişand û rabû ew berda. Sabah jê re got: “Te çima ew xezala han berda?” Hebû Tunebû jî keniya û rabû ser xwe hemû xezalên mayin jî berdan û jê re got: “Meranî û ciwamêrî ew e ku mirov xezalên xwedî çêlik berde. Heger karxezala wê xezala çavmor tune bûya, ewqasî li derdora xwe nedinêrî. Loma min ew berda û yên mayîn jî ji bo xatirê wê min berdan.” Sabah pê re got: “Naxwe ka min jî berde da ku ez herim mala xwe, nav malbata xwe!” Hebû Tunebû keniya û qûndaxa rimê li serê wî da, weke marekî ew li erdê dirêj kir, di nav êşê de. Hîna ew wisa di pêxêla hev de bûn, bala xwe danê ku ji dût ve toz û ‘ecaçek bi ezmanan dikeve û ber bi wan ve tê. Her ku diçû nêzîktir dibû û hin hespin bezayî û siwarin fêris ji bin wê tozê derdiketin. Tu nabêjî çawa Qiral Sasan dibihîze ku Hebû Tunebû derketiye nêçîrê, wî jî mîrekî Deylemiyân bi navê Camî, li gel bîst siwaran li pey wî şandiye ji bo wî bikûjin. Bi derengî be jî Hebû Tunebû tê derxist û çawa Camî û zîlamên xwe bi ser de hatin, ew jî bi ser wan de çû û ew hemû kuştin, laşê wan bi ser hev de avêtin û rêya xwe berdewam kir li gel destbirakê xwe Sabah.

Sasan ê Qiral jî bi mereqeke mezin li pey zîlamên xwe yên kujer hatibû hetanî ew cihê ku lê hatibûn kuştin. Dema çav li cendekê wan hetibû, şaş û matmayî mabû, nema zanîbû wê çi bike. Bêçare û bi tirs bi şûn de çûbû, lê bi rê de li xwedî û merivên wan zîlamên xwe rast hatibû. Wan jî Qiral derdest kiribûn, dest û nigên wî girêdabûn û ew bi xwe re biribûn.

Hebû Tunebû rêwîtiya xwe ya nêçîrvaniyê, li gel Sabah berdewam kir, hetanî ku li gundekî qelibîn û hatin cem xortekî ku li devê deriyê mala xwe ew pêşwazî kirin, xêrhatina wan kir û çû hundur ji wan re du sênî xwarin anîn; yek tijî mast bû û ya din jî tijî helîse bû ku rûn ji qiraxên

wê pêl dida. Herdu sênî danîn ber Hebû Tunebû û jê re got: “Kerem bike, bixwe!” Lê Hebû Tunebû xwarina wî nexwar. Xort jê re got: “Tu çima naxwî ciwamêr?” Wî ji lê vegerand û got: “Wele sûndeke min heye, hetanî pêk neyê, ez xwarinê naxwim.” Xort jê re got: “Sûnda te li ser çi ye?” Wî ji got: “Sasanê Qiral mal û mulkê bav û kalê min desteser kiriye û ji ber ku gava bavê min miriye ez biçuk bûme, wî li şûna min xwe kiriye qiral û li ser textê bavê min rûniştiye. Loma min got; bi soz û peyman be, hetanî ez tola xwe ji dujminê xwe hilneynim, ez xwarina kesî naxwim.” Xortê ciwan jî jê re got: “Mizgîniya min li te be, sûnd û peyman te pêk hatiye. Sasanê Qiral hatiye girtin û niha li cihekî ye, ez texmîn dikim ku lê nabe sibe.” Pir kêfa wî hat û bi çû jê re got: “Gelo tu dizanî bê ew li kû derê girtî ye?” Xortê ciwan avahî-yeq li raserî xwe nîşanî wî da û got: “Di wê qubeya han de girtî ye.”

Hebû Tunebû li wê qubeya bilind nêrî, dît ku xelk li pey hev derbasî hundurê wê dibin, bi dorê li Sasanê girtî didin û dîsa bi şûn de derdikevin. Rabû ser xwe çû cem wê qubeyê, wê derê raçav kir û dîsa vegeriya cihê xwe li ser xwarinê rûnişt û têra xwe xwar. Goştê mayî jî xist tûrikê xwe û li cem wî xortî rûniştî ma hetanî şev kete erdê û dinya tarî bû. Gava mazûbanê wî raket, ew jî bêdeng rabû ser xwe û berê xwe da ew qubeya ku Sasanê tê de girtî bû.

Nobedarên qubeyê kûçik bûn û çawa pêjna wî kirin, bi ser de hatin. Wî jî destê xwe avêt tûrikê xwe û her yekî ji wan perçeyek goşt avêt ber wan, ew bêdeng kirin û wisa xwe gihand wir. Derbasî hundur bû û çû destê xwe danî ser serê Qiral Sasan...

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birî û navber da vegotina çîroka xwe.*

## ŞEVA SED Û ÇEL Û PÛNCÊMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:*

Gava Hebû Tunebû destê xwe danî ser serê Sasan ê Qiral, wî jî serê xwe rakir û bi dengê bilind jê re got: “Tu kî yî?” Hebû Tunebû jî bersiva wî da û got: “Ez im, ez Hebû Tunebû me, yên tu li pey wî hat da ku tu wî bikujî û te birek jê re kola, lê Xwedê Teala tu kor kir û hişt tu bi xwe bikevî wê bîra ku te ji min re kolabû. Qey ne besî te bû te mal û mulk û desthilatdariya bav û kalê min bir û te xwest ku tu min jî bikuje?”

Sasan sûnda herî giran xwar ku wî nexwestiye wî bikuje û ew gotina ku di derbarê wî de hatiye gotin ne rast e. Bi vê sûndxwarina wî re Hebû Tunebû dest û nigên wî vekirin û jê re got: “Bide dû min!” Sasan got: “Ez pir bêtaqetim û ez nikarim gavekê tenê jî birêve herim.” Hebû Tunebû got:

“Naxwe ez ê herim du hespan bînim û em ê li wan siwar bin û wisa ji vir birevin.”

Hebû Tunebû wisa kir, du hesp anîn ew li yekî siwar bû, Sasan jî li yê din û herdu ji wir bi rê ketin, meşiyên hetanî ku tava sibehê li wan da. Nimêja sibehê kirin û dîsa ketin rê de, meşa xwe berdewam kirin hetanî gîhan bîstanekê. Li wir navberek dan meşê, ji hespên xwe peya bûn û li bin siya daran rûniştin, ketin nav sohbeteke dûvdirêj. Li wir Hebû Tunebû ji Sasan re got: “Hîna jî aciziyê te li himberî min heye?” Sasan got: “Na wile.” Li ser vê yekê li hev kirin ku herdu bi hev re vegerin Bexdayê. Sabahê koçer ê destbirakê wî got: “Ka ez li pêşiya we herim da ku mizgîniyê bidim xelkê bajêr.” Wan jî got: “Dibe.”

Sabah li pêşiya wan çû Bexdê û mizgînî da jin û mêran ku Qiralê wan Sasan û Hebû Tunebû bi hev re têne bajêr. Xelkên Bexdê jî bi def û zurneyan derketin pêşwazîya wan. Qeza Bû jî di hodeceke girtî de ket pêşiya wan de û mîna heyveke li çardeyan bi ser Hebû Tunebû de çû. Wî jî bi bêrîkirineke nayê wesifdan û mîna tîyekî ku bi hesreta avê be, ronahiya wê pêşwazî kir û ew di nava dilê xwe de da rûniştandin.

Piştî xelkê Bexdê hemûçkan çîroka wan bihîstin, herkesî got: “Divê Hebû Tunebû vegere ser textê seltenetê û şûna bavê xwe bigire. Lewre ew tene layiqî vî textê seltenatê ye.”

Sasan jî derbasî cem Seyrana Zaman bû, jina wî çawa ku fersenda axaftinê bi dest xist, jê re got: “Ez bala xwe didimê, van rojan herkes behsa Hebû Tunebû dike û pesnê wî didin bi awayekî ku nayê ziman.” Sasan jê re got: “Her tişt ne mîna ku tê xuyakirin e, min jî ew dît û tiştêkî were pesindan tê de xuya nekir, ne jî wek ku xelk dibêjin kesekî ewqasî kamil e jî. Lêbelê xelk ji hevdû dibihîzin û mîna hev diaxivin. Xwedê jî jê re li hev anîye ku hinek pesnê wî didin û dihêlin dilê xelkên Bexdayê bi ser wî de here. Wezîr Dendan ê xayin jî ji seranserê welatan leşker û artêş li hev kom kirin. Ma qey kes dixwaze di bin siya desthilatdariya qiralekî sêwî û bêhêz de be!” Piştî vê gotina wî Serana Zaman jê re got: “Û tu giha kîjan biryarê?” Wî jî lê vegerand û got: “Ez gîham biryara ku ez wî bidim kuştin û hêvîyên wî xayinê Dendan di dilê wî de vemrînim da ku polîpoşman bi şûn de vegere û dîsa bikeve bin xizmeta min de û tu karekî din neke.” Jina wî jê re got: “Bêbextiya bi xerîban re kirê e, vêca ya bi dost û nasan re çawa ye? A rast ew e ku tu keça xwe Qeza Bû pêre bizewicîne û tu guh bide wan gotinên ku gel di derbarê wan de dibêje.”

Gava Sasan ew gotin ji devê wê bihîstin hêrs bû, kuffînî pêket û got: “Bi Xwedê heger min baş nizanîbûya ku tu ne laqirdiyan dikî, min ê serê te bi

vî şûrî bifirrande û nefesa te qut bikira!” Seyrana Zaman lê vegarand û got: “Min henekek li te kir, tu evqasî qeherî!” Piştî xwe avêt himbêza wî, dest û serê wî ramûsa û berdewam kir, got: “A rast biryara te ye. Ez û tu em ê bi hev re li ser fenekê bifikirin ji bo kuştina wî.”

Sasan kêfxweş bû bi wê gotina jina xwe û jê re got: “De ka zû hîleyekê bibîne ji bo kuştina wî û dilê min rehet bike. Lewre ez pir teng bûme û tiştek nayê bîra min.” Wê jî lê vegeand û got: “Ez ê hîleyekê lê bikim ku kêf û şahî lê biherrime.” Sasan got: “Çawa?” Wê got: “Bi rêya cîrana me Bakon ez ê malê lê xera bikim, lewre ev jinik bi fen û fûtên xwe têtê nasîn, ev Bakon pîrejina herî dijwar e di vî bajarî de. Yeke wisa ye ku mirov dibêje qey fen û bêbextî perçeyekê ji xwezayê wê ne. Ew bû ya ku Hebû Tunebû û Qeza Bû mezin kirin. Loma meyla Hebû Tunebû herdem bi ser wê de bû û destê wî jê nedibû, diçû li ber nigên wê rûdinişt û li wir di xew re diçû.”

Gava Qiral Sasan ev gotin ji jina xwe bihîstin, gazî Bakon a cariyê kir û mijar pê da fêmkirin, jê xwest ku here wî bikuje û soz dayê ku dê xelatin giran bide wê û qîmetê wê bigire. Bakon a pîrejin jî got: “Ser seran ser çavan, lê ez dixwazim tu xencerekê bi jehr bidî min, da ku ez zû wî bişînim wê dinyê.” Sasan ê Qiral got: “Ev hêsan e.” Piştî jê re xencerek ku bi ava jehrê hatiye şûştin anî û da destê wê.”

Pîrejina ku pir çîrok û helbest û bûyer û metelok dizanîbûn, xencer ji destê Qiral girt û di nava fikarin kûr de ji qesrê derket. Berê xwe da cem Hebû Tunebû û di hişê xwe de hûnandina pilangeriya derbarê kuştina wî de berdewam dikir.

Hebû Tunebû jî bi bêsebrî li bendî civanê Qeza Bû bû ku pir bêriya wê kiribû û di nava agirê wê de dipertitî. Çawa ku çav li Bakonê ket jê re got: “Tu Hatî?” Wê jî got: “Edî dema gihaştinê hatiye û dema veqetanê li pey me maye!” Hebû Tunebû bi meraq got: “Rewşa Qeza Bû çawa ye?” Wê bersiv da û got: “Ew bi agirê te disoje!”

Bi wê gotina wê re, Hebû Tunebû kelecandar bû û pê ve rabû, qeflek kinc û diyarî dane wê û jê re got: “Bêgûman ez ê qenciyin din ji bi te bikim.” Bakonê got: “Ez ê îşev li cem te biminim û ji te re behsa jiyangeriya evîndarên ku eşqê ew nexweş xistine bikim.” Hebû Tunebû got: “Ji min re behsa meselena bike ku dilxweşiyê bi min re çêbikê û bêhna min fireh bike.” Bakonê got: “Ser seran ser çavan.”

Bakon li ba wî rûnişt û xencera wê jî di bin çengê wê de veşartî bû. Piştî dest bi vegotina serboriya yekî kir û got:

(Çiroka Efyonkêş)

Hetanî niha çiroka herî xweş a ku min bihistiye, çiroka mirovekî evîndar ê ku ji jinên spehî hez dikir û malê xwe giş li ser wan kir hetanî ku xizan bû û tiştek di dest wî de nema. Dinya lê teng bû û nema dizanî wê çi bike. Edî bi kolanan de dimeşiya û çavên xwe li derdorê digerland da kurtêlekî, gepek nan peyde bike û ji nêza nemire. Carekê gava ew dîsa wisa li nava sûkê digeriya, bizmarek di tiliya nigê wî de çû û xwîn jê hat. Rûnişt, xwîna nigê xwe paqij kir û tiliya xwe gireda. Piştî rabû ser xwe meşiya û bi ax û oxan xwe gihand hemamekê, kincên xwe ji xwe kirin û derbasî hundurê wê bû, dît ku hemameke paqij e. Çû li ber fiskeyê rûnişt û av li serê xwe kir û hey kir, hetanî ku betilî. Piştî çû hêla bêmê, dît ku ava sar nîne û kes jî tê de nîne. Bi tena serê xwe rûnişt û perçeyeke ji heşîşê derxist, ew avêt zelûma xwe û daqurtand. Piştî demekê bandora heşîşê gîha ser hişê wî û ew bir dunyayeke din. Êdî li ser piştê veziliyayî bû û di nava mijdûmana serê xwe de bû. Ji nişkê ve dît ku yek laşê wî bi lûfik difirkîne û du xulam jî di ser wî re sekinîne; yek bi tasê avê lê dîke û yê din jî sabûn di destan de ye û destmalk li ser milan e. Gava çav li wê dîmenê ket, ji xwe re got “Mirov dibêje qey va cwamêran xwe şaş kiriye û nasnakin ku ez heşîşvanim!” Lê belê ew rewşa han pir li xweşiya wî çûbû. Nigên xwe dirêj kirin û laşê xwe sist kir, ji bo ku çêja wê serşûştinê derxîne. Piştî dît ku xulamê tas di destan de jê re dibêje: “Mîrzayê min, dem pir buhurî û îro roja te ya berpirsariyê ye.”

Ew jî kenîya û ji xwe re got “Maşele ji heşîşê re!” Piştî rabû ser qûna xwe rûnişt û bêdeng ma, xulam destmalek hevrêşimî li newqa wî gerand û ket bin çengê wî de, ew rakir ser nigan û ew da meşandin. Xulamên din jî li pey wî çûn, li gel tas û sabûn û pêdiviyên şûştinê yên din. Pêre meşiyar hetanî ew derbasî hêwanekê kirin ku tijî fêkî û bêhdank bû. Li wir ew dane rûniştandin, buxûr berdan û petêkek jê re şikandin, danîn ber wî. Di wê rewşê de jî serşokar dîsa lûfik di ser laşê wî re bir û anî û xulamên din jî bi tasê av li destê yê mayî kirin. Piştî ku laşê wî baş firmand û ew paqij kirin, jê re gotin: “Noşican be mîrzayê me.” Di pey wê re jî, hemû ji hêwanê derketin û ew bi tenê hiştin û derî li ser girtin. Ew jî rabû ser xwe, destmalka ku li newqa wî pêçayî bû vekir, ew li ba kir û ji xwe re kenîya hetanî ji ser hişê xwe çû. Bêhtirî seetekê kenîya, piştî ji xwe re got “Gelo çima mîna wezîran gazî min dikin û ji min re dibêjin ‘Mîrzayê min’? Gelo ew jî di vê seetê de tevlihev dikin? Piştî, dema ku bi rastiye bihesin, dê têra min li min bidin? Bi tirs berê xwe da derî, ew vekir û ji hêwanê derket. Li ber derî, dît ku sê xizmetkar û evdekî ku buxçikek di destê wî de ye, sekinîne. Çawa ku evd çav lê ket, buxçika xwe vekir û sê destmalkên hevrêşimî jê derxistin. Yek avêt ser serê wî, ya dîtir avêt ser milên wî û ya mayî jî li newqa wî gerand. Xizmetkarekî jî cotek qepqapî danî ber nigên wî. Piştî hemû zilamên wî lê hatin hev, ketin bim milên wî de û dane meşandin hetanî ku ew derbasî

odeyeke raxistî kirin ku nivîneke mîranî tê de bû, ji qiralan pê ve tukes newêribû nêzikî wê bibûya. Li wir, xulam lê hatin hev û ew hildan ser nivîne û laşê wî firmandin hetanî ku di xew re çû. Di xew de dît ku keçeke rindik di himbêza wî de ye. Herdu nigên xwe li kulîmekên wê anîn hev, şidand û bi ewkê xwe girt, berê wî da nava wê û ew bi ser xwe de kişand. Di wê kêliyê de dengê yekî bihîst ku dibêje: “Baldar be! Di xew de şeytan bi te dikene. Çavên xwe vekirin, dît ku di wê bêrma cemidî de ye û qeflek mirov li dora wî ne, pê dikenin. Lewre destmalka ku li newqa wî pêçayî bû, jê ketibû û barşewala li holê mabû. Tê derxist ku her tişt dûrî rastiye bûn û hemû tev xeyalên wê serxweşiya heşîşê bûn. Pir hêrs bû û ji wî zilamê ku ew şiyar kiribû re got: “Te nikaribû hinekî din jî xwe ragire, hetanî min bixistayê, piştî te gazî min bikira?” Zilamê derdorê pê de xeyidîn û gotin: “Heşîşkarê bêfedî, qey şerm bi te re nîne ku tu di xew de ye û ewkê te rabûyî ye?” Piştî lê xistin hetanî ku piştî stûyê wî sor kirin û ji wir çûn. Wî jî ta’ma bextewariyê tenê di xew de dît.

Gava ku Hebû Tunebû ev çîrok bihîst, keniya hetanî ku ji dest xwe çû. Piştî ji Bakonê re got: “Dadêcan, wele ev çîrokek erjeng bû ku tu caran min çîrokên mîna wê nebihîstine. Gelo hineke din jî li ba te tune?” Bakon got: “Belê”

Bakonê vegotina çîrok û serpêhatî û metelokan berdewam kir hetanî ku Hebû Tunebû di hew re çû. Ew jî li ber serê wî ma hetanî nivê şevê. Wê çaxê, ji xwe re got “Êdî fersend ev fersend e!” û rabû ser xwe, xencera xwe ji ber xwe derxist û êrişî ser kir, ji bo wî serjêbike. Lê di wê kêliyê de diya wî derbasî hundur bû û çavên wan li hev ketin. Bakon pê ve çû, ew pêşwazî kir di nava metirsî û heyirandineke mezin de. Laşê wê tev dilerizî mîna ku ketibe tayê. Dayîka Hebû Tunebû behetî ma ji ber wê rewşa Bakonê û bi lez çû kurê xwe ji xew rakir. Wî jî çawa çavên xwe vekirin, dît ku diya wî li ber serê wî ye. Rabû ji diya xwe re got: “Dayêcan, tu di wextekî pir baş de hatiye cem min ku pîrika min Bakon jî li vir e.” Piştî li Bakonê zîvirî û axaftina xwe berdewam kir, got: “Tu bi qedrê Xwedê ke Dadêcan, heger çîrokin din li cem te hebin, tê wan jî ji min re bibêj!”

Bakonê got: “Ma çawa li ba min nîn in, ên ji ew ê din gelekî xweştir jî li cem min hene. Lê belê ez ê wan çîrokan di demeke din de ji te re bibêjim, ne niha. Lewre ez dereng ketime û divê ez rabim herim.” Bakonê qet bawer nedikir ku bikaribe xwe bi hêsanî ji wê bobelatê rizgar bike. Loma hîna di fersenda ewil de rabû ser xwe û xatir ji wan xwest, di derî re derket. Hebû Tunebû jî jê re got “Oxir be!” bêyî ku rastiya mijarê bizanibe. Lê belê diya wî rastiya meselê dizanibû û bi wê armancê jî bi lez di wê seetê de hatibû wir ji bo kurê xwe ji mirinê xelas bike û kiribû jî. Lewre, çend kêliyan beriya hatina wê, Qeza Bû hatibû cem û jê re gotibû “Amojnê! Zû xwe bigihîne

kurê xwe, berî ku ew pîra şeytanî wî bikuje!” û plangeriya bavê xwe ji serî hetanî binî jê re hişkere kiribû.

Çawa ku Bakonê di derî re derket, diya wî lê vegeriya û jê re got: “Kurê min, ev şeva han şeveke pîroz e ji bo te. Lewre Xwedayê mezin tu ji nav lepê wê pîremara bêwijdan xelas kir.” Hebû Tunebû ma şaş û got: “Ew çawa?” Diya wî rabû çîrok ji serî ve jê re got, hem ji bi heman hevokên ku Qeza Bû jê re anîbû ziman. Wî jî lê vegerand û got: “Dayêcan, qedera me di destê Xwedê de ye û hetanî ku ew ruhê mirov nestîne, tukes nikare mirov bikuje. Lê dîsa jî ya baş ji bo me ew e ku em ji vir bar bikin û ji wan dujminên xwe dûr bikevin. Ê mayî jî Xwedê mezin e!”

Bi sibehê re, Hebû Tunebû ji bajêr derket û çû xwe gihand Dendanê Wezîr da ku pê bişêwîre. Di wê navberê de û piştî derketina wî ji bajêr, gelek bûyerin din di navbera Sasanê Qiral û jina wî Seyrana Zeman de qewimîn û vê yekê hişt ku ew bixwe jî mecbûr bimîne ji bajêr derkeve û xwe bigihîne cem Dendan û Hebû Tunebû. Piştî ew û hemû mezinên seltenata Sasan ên ku li himber wî bûn, li hev kom bûn û bi hevdu şewirîn ji bo tevdir û plangeriyekê. Di encamê de biryar dan ku bi ser qralê Romê de bigirin û heyfa xwe jê hilînin.

Berê xwe dan welatê Romê, lê di rê de hêsîr ketin destê Qiral Romezan.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

#### ŞEVA SED Û ÇEL Û ŞEŞEMÎN

*Şehrezadê çîroka xwe berdewam kir û got:*

Roja din Romezan ê qral ferman da xulamên xwe ku biçin Hebû Tunebû û Dendan û zilamên wan bînin hizûra wî. Xulaman çûn ew anîn û li kêleka wî dane rûniştandin. Wan di destpêkê de, di dil xwe de digotin “Belkî dê me bibin cem celad ji bo me bikujin” lê piştî dîtî ku rewş cuda ye, dilê wan aram bû. Romezan ê qiral ji wan re got: “Min xewnek dît û min xewna xwe ji keşîşan re got da ku ji min re wê şîrove bikin. Lê keşîşan gotin, tukes nikare vê xewna te şîrove bike ji Dendan ê wezîr pê ve. Loma min xwest we bînin hizûra min.” Dendanê Wezîr got: “Xêr be inşele Qralê Zemanan!” Qral jê re got: “Ey wezîrê hêja! Di xewna xwe de min dît ku, ez di koncalekê de me û li kêleka bîreke tarî. Hinekan êş û azar bi min dikirin. Min xwest ku ez ji wir derkevim. Ez rabûm ser xwe, lê min kir û nekîr min nikaribû ji wê koncalê derkevim. Piştî min destê xwe li derdorê peland, min dît ku du heb kemerên zêr li wir in. Min rahişt wan û herdu jî li newqa xwe girêdan, ew şidandin. Wê gavê min dît ku herdu bûne yek li ser newqa min. Xewna min ev e, wezîrê hêja.”



Dendan ê wezîr, jê re got: “Binêre mîrzayê min! Xewna te dide xuyakirin ku rikeberêkî te heye, çavên wî li desthilatdariya te ye û ev rikeber qet ne dûrî te ye. Ya birayekî te ye, an jî kurekî birayê te ye. Dibe ku pismamekî te be jî. Ez baş tê dernaxim, lê ez baş dibînim ku ev mirov ji xwîna te ye.”

Dema Qral ev şîroveya xewnê guhdar kir, hişê wî çû cihekî dûr û dîsa bi şûn de vegeyiya. Awirên xwe li ser Dendan, Hebû Tunebû, Seyrana Zeman, Qeza Bû û hemû hêsîrên bi wan re gerand, dûvre ji xwe re got “Heger ez serê wan gişan bifirînim, dê ziravê leşkerên wan biqete ji tirsan û wê têk biçin. Ez ê jî hîn zûtir vegerim welatê xwe berya ku tiştêk li wir biqewime û qiraltiya min ji dest min here!”

Piştî di wê biryara xwe de zelal bû, gazî celladê xwe kir û jê xwest ku di cî de serê Hebû Tunebû bifirîne. Lê di wê navberê de dadika ku Qiral mezin kiribû derbasî cem wî bû û jê re got: “Ey Qralê Bextewar! Gelo te biryar da bê tê çilo bike?” Wî jî lê vegerand û got: “Min biryar da ku ez wan hêsîrên di dest xwe de bikujim û serê wan bi ser leşkerên wan de bavêjim û êrîşî ser wan bikim û zû wan bişkînim, da ku ez dereng nekevim di vegera welatê xwe de, beriya ku bûyerin li wir biqewimin.”

Gava dadika wî ew gotin jê bihîstin, bi ser de çû û bi zimanê Fregan jê re got: “Tu çawa dikarî kurê birê xwe, xwişka xwe û keça xwişka xwe bikuje?” Qiral pir hêrs bû bi van gotinên wê û jê re got: “Laneta Xwedê li te bî, qey tu nizanî ku diya min hatiye kuştin û bavê min jî bi jehrdayînê hatiye kuştin. Ma ne te morîkek dabû min û te ji min re gotibû, ev morîk a bavê te ye, çima tu rast ji min re nabêjî?”

Dadika wî jê re got:

Çi tiştê min ji te re gotiye rast e, lê belê halê min û te ne tu hal e, halê min û te pir erjeng e. Navê min Mercanê ye û navê diya te Îbrîza ye. Diya te jineke pir spehî bû, pir jî mîrxas bû ku xelkê ew weke mînak destnîşan dikir. Bavê te jî, Qral Omer En-Nûman bû, qiralê Bexdayê û Xorasan. Tu şik û gûman di vê yekê de nîne. Bavê te kurê xwe Şerker şandibû hinek şer û cengan, li gel vî wezîrê han(Dendan) û ew bûyerên han bi serê wan de hatin. Lewre rojekê gava şev ketibû erdê û birê te Şerker bi tena serê xwe derketibû keşfê, rêya xwe şaş kiribû û ketibû nav bexçeyên qesra diya te ku wê şevê ez û wê û bîst cariyeyên din em derketibûn derveyî qesrê û li nav heman bexçeyî me bi navê dilîst. Li wê derê li me rast hat birê te Şerker û bi diya te re bi navê lîst. Lê belê ji ber jêhatbûn û xweşikbûna diya te Şerker bi bin ket. Piştî diya te ew vexwend qesra xwe û pênc rojan li ba xwe kir mêvan. Lê ew pîrejina Şewahî ku bi navê Dayika Fen û Hîlan dihate nasîn, xeber gihand bavê wê. Diya te jî ji ber ku li ser destê Şerker bûbû Musulman,

li gel wî bi dizî çû Bexdayê.

Wê çaxê ez û Rîhanê û bîst cariyeyên din em pêre bûn. Em giş bûbûn Musulman li ser destê Şerker ê qiral. Vêca gava em gîhan Bexdayê û em derbasî cem bavê te Omer En-Nûman bûn û çavê wî li diya te ketin, dil ketê; şevkê dema ku bi tenê bû, derbasî cem wê bû û pêre raket. Ew jî ji wî bihemil bû. Wê gavê sê morikên efsûnî bi diya te Îbrîza re hebûn. Hersê jî dan bavê te Omer En-Nûman. Wî jî yek ji wan morikan da keça xwe Seyrana Zeman, a dudan da birayê te Şewqa Mekan û ya sisiyan jî da birayê te Şerker. Diya te Îbrîza ya Şahbanû jî ew morîka Şerker ji destê wî girt û ji te re hilanî. Piştî dema çêbûna te nêzik bû, diya te bêriya ehlê xwe kir û gazî min kir, ew sir û raza xwe bi min re parvekir. Ez çûm cem koleyekî reşik ku navê wî Xedban bû, min mesele jê re vekir û min got; em dixwazin li gel te bikevin rê de. Xedban bi me re hat û em ji bajêr derxistin. Diya te jî li ber welidandinê bû. Di rê de û piştî ku em ketin eqarê welatê xwe de, elq hatin diya te û ket ber welidandinê. Di wê kêliyê de şeytan ket dilê Xedban û dawa wê yekê li diya te kir. Diya te pir hêrs bû û qîreke ecêb da ku bi wê qîrînê re hemlê xwe danî û tu hate dinyayê. Wê kêliyê jî hêla welatê me jî 'ecaca binê nigên hespên qefleke siwar bi ezmanan diket û ber bi me ve dihat. Xedban jî ji tirsê xwe, bi hêrs şûrê xwe kişand, li stûyê diya te da ew kuşt û li hespa xwe siwar bû çû, reviya.

Piştî ku ew koleyê reşik ji me dûr ket, 'ecac jî nêzikî me bû û ji bin wê 'ecacê kalkê te Herdûb ê qralê Roman û zilamên xwe derketin. Çawa hat, dît ku keça wî hatiye kuştin û cendekê wê li erdê dirêjkirîye. Pir pê êşiya û pir jî xemgîn bû. Sebeba kuştina wê, sebeba derketina wê ya bi dizî ji malê û çûna Bexdê hemû ji min pirsîn; min jî çîroka wê ji serî hetanî binî jê re vegot. Jixwe ji wê çaxê ve, sebeba dujminahiya di navbera welatê Romê û xelkên Bexdayê jî ev e.

Wê gavê me cenazeyê diya te Îbrîza bi xwe re bir û me ew di hewşa qesra wê de veşart. Tu jî li gel min ma, min tu mezin kir û ew morîka diya te bi te vekir. Gava tu mezin bû û tu bû zilam jî, min nikarîbû ez vê rastiye jî te re bibêjim. Lewre wesiyeta kalkê te yê qiral Herdûb bû ku ez wê rastiye jî te veşêrim, ji bo şer di navbera we de dernekevin. Sebeba ku min ev rastî jî te veşart jî ev bû, yan na min dikarîbû ji te re bigota ku Qiral Omer En-Numan bavê te ye. Vêca ez mecbûr mam niha ez vê rastiye jî te re eşkere bikim ey Qiralê Zemanan. Êdî tu çêtir dizanî û biryar a te ye.

Hêsîran tevan jî ew axaftina Mercanê guhdar dikirin. Loma çawa ku Seyrana Zeman ew gotin bihîstin, qîreke bêhawe pê ket û got: "Naxwe birayê min Romezan ê qiral ev e! Ev e kurê Îbrîzaya Şahbanû û bavê min ê qiral Omer En-Nûman! Jixwe ez vê Mercane ya cariyê jî baş nas dikim."

Gava Romezan ê qiral ew gotinên Seyrana Zeman bihîstin, hem hêrs bû hem tengav bû û nema dizanîbû wê çî bike. Piştî ferman da ku Seyrana Zeman binin gel wî. Xizmetkaran fermana wî bi cih anîn û Seyrana Zeman anîn ba wî. Nuh awirên wan li hev ketin, li hev baniyan û xwîna wan bi ser hev de çû. Ji wê xwest ku çîroka xwe jê re bibêje, wê jî jê re vegot. Qiral dît ku gotinên wê û ya dadika wî Mercanê hevdû digirin û baş têgihişt ku ew ji xelkê Îraqê ye û bavê wî Omer En-Nûman e. Di wê mijarê de tu gûman pêre nema. Di cî de rabû ser xwe û benê destên xwişka xwe vekir. Seyrana Zeman jî ber bi wî ve çû, destên wî ramûsan û dest bi giri kir, hêsr barandin. Bandora wê li Qiral jî bû û ew jî pêre giriya. Dilovaniya biratiyê ew rapêçabû û pir hestiyar bûbû. Ji ber heman hestan dilê wî bi ser kurê birê wî Hebû Tunebû de çû û rabû ser xwe, çû cem celadê ku li ber wî sekinîbû û şûrê celad ji dest girt. Wê kêlikê hemû hêsr tirsîyan ku wî şûrî li stûyê wan bide û serê wan bifirîne. Lewre Qral ferman da ku hemûçikan yeko yeko binin ber destê wî.

Qiral destê gişan vekir û ji dadika xwe Mercane re got: “Ka hela ew tiştên ku te ji min re gotin, ji vê civatê re jî bibêje.” Mercane got: “Qiralê min ê hêja! Ev kalê extiyar, Dendanê Wezîr e û ew şahidê rastiyan gişan e.” Piştî li civatê vegeriya û behsa bûyer û qewimînên wê pêvajoya borî kir; kîjan qiralên Romê, kîjanên Frengan çûne û hatine, hemû anîn ziman. Dendan ê wezîr û Seyrana Zeman jî gotinên wê piştrast kirin.

Piştî Mercane axaftina xwe qedand, çavên wê li morîka stûyê Hebû Tunebû ket û bala wê pir kişand, lewre ew morîk yek ji wan hersê morîkên Îbrîzaya Şahbanû bû. Di cî de ew morîk nas kir û qîrek da ku erd û ezman pêre hejand û got: “Ev morîka di stûyê hêsr de, cêwîka morîka di stûyê te de ye qiralê min û ew hêsr kurê birê te ye, Hebû Tunebû bixwe ye.”

Piştî, Mercane li Hebû Tunebû zîvirî û jê re got: “Ey Mirê Zemanan, hela ji kerema xwe re wê morîka xwe bide min!”

Hebû Tunebû morîk ji stûyê xwe derxist û da destê Mercaneyê. Wê jî morîk ji destê wî girt û çû cem Seyrana Zeman, pîrsa morîka sisyan jê kir. Seyrana Zeman jî ya di stûyê xwe de da dest wê. Gava Mercane herdu morîk girtin, ew dan destê Qiral Romezan. Wî jî baş li wan morîkan nêrî û dilê xwe xist cî de. Lewre ew teqezkirineke bêgûman bû ku ew apê Hebû Tunebû bû û bavê wî Qiral Omer En-Nûman bûye. Wê gavê di cî de rabû ser xwe û çû Dendanê Wezîr himbêz kir, piştî jî Hebû Tunebû himbêz kir. Pêre jî kêf û şahiyêke bêtimtêl bû serwer di civatê de û deng bi her kesî ket.

Mizgîniya wê xebera xweş di nav herkesî de belav bû û çingîni bi qedehan ket, deng bi dahol û zirneyan ket û şahiyêke fireh hate lidarxistin ku

herkes tevlê bû.

Leşkerên Şamê û Iraqê jî dengê wê şahiya Roman bihîstin. Hemû li hespên xwe siwar bûn û dan pey serleşkerê xwe Zeblekan. Zeblekan ê qiral di dilê xwe de got “Gelo sebaba vê şahiya di nav leşkerên Rom û Frengan de çi ye?”

Di wê navberê de, hemû leşkerên Şamê û Iraqê daketin meydana cengê û xwe ji şer re amade kirin. Li meydanê çûn û hatin û şûrên xwe li ser newayên cengê hejandin. Vê yekê bala Romezan ê qiral jî kişand û sebaba vê yekê jî zilamên xwe pirsî. Wan jî sebeb jê re ragihandin. Rabû di cî de ferman da Qeza Bû, keça birayê xwe Şerker da ku di cî de biçê leşkerên Iraq û Şamê û wan agahdar bike bi rêkeftina di nav wan de çêbûye û ji wan re bibêje ku Qiral Romezan apê Hebû Tunebû derketiye.

Seyrana Zeman xemgîniya xwe li pey xwe hişt û bi kêfxweşiyê mezînetê ketê rê de û berê xwe da leşkerên Iraq û Şamê. Çawa ku gîhaşt cem Qiral Zeblekan, silav lê kir û çî qewimîbû hemû yeko yeko jê re anî ziman û got ku Qiral Romezan apê min û Hebû Tunebû ye. Zeblekan ê ku dilê wî tijî metirsî bûn li ser Dendan û Hebû Tunebû, pir bextewar bû bi wê agahiyê û di cî de berê xwe da cem mîr û mîrekên xwe û ev rewşa nû ji wan re şirove kir û ew agahdar kirin. Bi wê yekê kêf û şahiyê mezînetê di nav hemû leşkeran de belav bû û kul û derdên xwe li pey xwe hiştin. Piştê Qiral Zeblekan li hespa xwe siwar bû, hemû mîr û gizîrên xwe jî dan kêleka xwe û Şahbanû Qeza Bû jî da pêşiya wan û berê xwe dan çadirên Qiral Romezan.

Gava derbasî cem wî bûn, dîtî ku ew û kurê bire xwe Sultan Hebû Tunebû ligel hev rûniştî ne. Jixwe wan di nav xwe de nîqaş kiribû, ew û Hebû Tunebû û Dendan ê wezîr û gîhabûn biryarekê ku mîna berê Qiral Zeblekan li ser Dîmeşqa Şamê bihêlin û ew jî derbasî Iraqê bibin. Loma gava Zeblekan hat û bi hev re rûniştin, dîsa ew kirin qiralê Dîmeşqa Şamê û ferman dane wî ji bo ku here wir. Gava ku Zeblekan û leşkerên xwe amade bû û ketin rê de, ew jî bi qasî meşa seetekê bi wî re çûn, piştê dîsa vegeyran cihê xwe. Dûvre jî gazi leşkerên xwe kirin û ferman dane wan ji bo xwe amade bikin, da ku berê xwe bidin welatê Iraqê.

Leşker hemû li hev kom bûn, mîr û mîrek jî hatin gel hev û ji hev re gotin: “Dilê me nakeve cî de hetanî em neçin heyfa xwe ji pîrejî a Şewahî ku bi nasnavê ‘Dayika Fen û Fûtan’ tete nasîn, hilneynin û eyba xwe ji holê ranekin.” Li gora wê yekê jî Qiral Romezan da pêşiya mîr û gizîr û mezînetê dewleta xwe û meşîya.

Hebû Tunebû jî pir kêfxweş û bextewar bû bi naskirina apê xwe yê Qiral Romezan û gelek dua û niyaz ji Mercaneya carîye re kirin, ji ber ku

wê ew û apê wî bi hev dane naskirin.

Meşa xwe berdewam kirin hetanî gîhaştin erdê welatê xwe. Di wê navberê de Sasan jî hatina wan bihîst û ew jî derket pêşwaziya wan û çû destê Qiral Romezan ramûsa û yadîgarî pêşkeşî wî kirin.

Romezan ê qiral rûnişt kurê birê xwe Hebû Tunebû jî li kêleka xwe da rûniştandin. Wê gavê Hebû Tunebû ji apê xwe Romezan re got: “Apocan ev textê sultaniyê tenê layiqî te ye.” Wî jî lê vegerand û got: “Na kurê min, ne hedê min e ku ez têkilî mulkê te bibim.”

Di wê mijarê de Dendan ê wezîr ket navbera wan û pêşniyar kir ku herdu bi hev re li ser desthilatdariyê bin û rojê yek ji wan qiral be. Wan jî qebûl kir û bi wê pêşniyarê razî bûn.

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û ÇIL Û HEFTEMÎN

Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir:

Vêca wek me got, Romezan û Hebû Tunebû li hev kirin ku her rojê yek ji wan qiraltiyê bike û li ser textê desthilatdariyê be. Ji bo vê hevpeymanê jî pîrozbahiyek li dar xistin. Pez û deve serjêkirin, xwarin û vexwarin li erdê rêz kirin û şahiyê ewqasî mezin li dar xistin ku di dîrokê de tişteki wisa çênebûbû.

Hîna ew wisa di nav kêf û şahiyêde bûn, ji nişkê ve hêlewêlek bi derdorê ket û ‘cacokeke ku gîhabû ber perên azmanan, ber bi wan ve hat. Piştê jî dengê hewara tacirekî ku gazî dikir û digot: “Ey qiral û melîkên zemanan! Mîrov çawa li welatê kafiran aram dibe û li welatê we tete şelihan-din, qaşo welatê we welatê dad û edaletê ye!”

Qiral çû pêşiya wî û li rewşa wî pirsî, yê tacir got: “Ez tacirek ji tacirên vî welatî me û ev bîst salên min in ku dûrî vir im, di nav sefer û rêwîtiyê de me. Destûrnameyek bi min re heye ku rehmetyê Şerker ê Sultan nivîsandiye, min jî cariyeyek diyarî wî kiribû bi vê mebestê. Ez li gel sed barên xwe di rê de bûm, hemû barên min jî malên Hind û Sindê bûn û ez dihatim Bexdayê. Bexdaya ku di bin sewriya we de ye, ew serweriya bi aramî û edaleta xwe tete nasîn. Lê mixabin di rê de hinek Erebb û Kurdên ku ji hemû welatan li hev kom bûbûn pêşiya me girtin, zilamên min kuştin û malên min talan kirin, birin. Ez jî wisa perîşan hiştim. Dêdê min jî ev e.”

Tacir hem derdê xwe ji qiral re rave dikir, hem gilî û gazinên xwe pê di-kirin û hem jî digiriya. Romezan ê qiral jî bi wê rewşa wî hestiyar bû û dilê

wî pê şewitî. Dilê Hebû Tunebû û Hewqel jî pir pê şewitî. Hemûçik li ber dilê wî çûn û hatin û sûnd xwarin ku heyfa wî hilînin û heqê wî lê vegezin. Herkes rabû ser xwe, bi sed farisî ketin rê de ku her siwarekî wan bi hezar siwarî bû. Tacir jî weke rêzankî da pêşiya wan û rê nîşanî wan da. Bi şev û roj meşiyar, hetanî gîhan çoleke mezin î bi dar û ber ku çemek tê re derbas dibû. Li wir, şopên rêbiran ji hev veqetiyabûn û li wir barên tacir li hev par kiribûn. Lê hinek ji wan jî hîna li wir bûn. Di cî de wî sed fêrisî derdora wan girtin. Romezan û Hebû Tunebû li wan qîriyan û gazî wan kirin, ji bo xwe radest bikin. Di nava seetekê de hemû hêsîr girtin û li gora îfadeya wan bi dûv ên din ketin, ew jî girtin. Bi temamî sê sed rêbirên ji Erebên koçer bûn. Dest û nigên gişan girêdan û malên dizîye yê bi wan re bû dest danîn ser û berê wan dane Bexdê. Piştî gîhan Bexdayê, Romezan û pismamê xwe Hebû Tunebû bi hev re li ser textê sultaniyê rûniştin li rex hev û gazî hemû hêsîran kirin, ew anîn raber xwe, lêpirsîna wan kirin û ji wan pirsin bê ka mezinên wan kî ne. Wan jî bi yekzimanî gotin: “Tenê sê mezinên me hene. Em her yek ji welatekî ne û wan em komî ser hev kirine.” Rabû Romezan û pismamê xwe ji wan pirsin û gotin: “Ka wan hersê serkêşên xwe bi dest nîşanî me bidin.” Wan jî her sê destnîşan kirin. Herdu qiralan jî ferman dan zilamên xwe ku hersêyan bigirin û ên mayî serbest berdin, piştî ku hemû malên bi wan re radestî wî tacirê mexdûr bikin.

Mêrik ê tacir malên xwe di ber çavan re derbas kir, dît ku ji çaran yek jê nebedî bûye. Herdu qiralan soz dane wî ku wî malê wî lê vegezin ango li şûna wî, mal jê re bibînin. Wê gavê tacir du sened-nivîs ji ber xwe derxistin ku yek bi destê Şerker û ya din jî bi destê Seyrana Zeman hatibû nivîsandin. Jixwe ew tacir bû yê Seyrana Zeman bi cariyetî ji wî rêbirê Ereb kiribû, li Qûdsê û ew li Şamê firotibû birê wê Şerker ê ku hayê wî jê tunebû ku xwişka wî ye û ew bûyera malûm di navbera wan de qewimibû.

Gava Hebû Tunebû li wan herdu nameyan nêrî, destnivîsa apê xwe Şerker naskir û çîroka metika wî Seyrana Zeman hate bîra wî. Rahişte wê nameyê û çû, derbasî cem metika xwe bû û çîroka wî tacirî jê re vegot, ji serî hetanî binî. Seyrana Zeman destnivîsa xwe nas kir û ew tacir jî hat bîra wê. Loma ew ezimand mala xwe û tembiya wî tacirî li birayê xwe Romezan û biraziyê xwe Hebû Tunebû kir. Birayê wê ferman da ji bo mal û mulk û cariyê û xulaman bidine xizmeta wî, Seyrana Zeman jî sed hezar derhem, pêncî bar ji malen ticaretê û gelek diyariyên din jî dane wî û xulamên xwe şandin pey wî ji bo ku bê serdana wê. Gava hat mala wê, silav lê kir û jê re got: “Ez keça Omer En-Nûman im, xwişka Qiral Romezan û metika Hebû Tunebû.”

Ê tacir jî pir dilxweş bû bi wê yekê û kêfxweşiya xwe anî ziman bi saxî û selametiya wê û bi hevgihaştina wê û birayê wê. Wê û biraziyê wê jê re got: “Welehî qenciya ku bi te tê kirin, wenda nabe.” Piştî derbasî mala wê bû.

Sê rojan li cem wê ma, piştîre xatirê xwe ji wan xwest û berê xwe da Şamê.

(Çiroka Hemmadê Bedewî)

Di pey wê re, Qiral gazî hersê serkêşên rêbiran kir û yeko yeko li rewşa wan pirsî, îfadeya wan girt. Ê pêşî pêş de hat û got: “Ez koçerêkî Ereban im. Ez rêyan dibirim, kur û keçên biçûk direvînim û wan difiroşim taciran. Ev demeke dirêj e ez vî karî dikim, hetanî niha a rast, şeytan ez xapandim û ez bi van herdu sakûleyan re bûm yek û me sakûleyên Ereban komî ser hev kirin ji bo rêbirîne û talankirina kerwanên taciran.”

Herdu qiralan jê re got: “Ka hela çiroka xwe ya balkêş di revandina kur û keçan de ji me re vebêje.” Rêbir got: “Bûyera herî balkêş a ku ji bîra min naçe, beriya bîst û du salan li Qudsê qewimî. Li wê derê min keçek pir xweşik revand û spehîbûna wê nayê pesindan. Lê belê kincên ser wê gelekî perpîtî û qetiyayî bûn. Êbayek bi ser xwe dakiribû gava ku ji xanê derket. Nuh ji xanê derket, min ew revand bi hîleyekê û min ew li deveyekî kir û bi xwe re bir. Di serî de mebesta min ew bû ku ez wê bi xwe re bibim malê ji bo gavantiya deveyan ji me re bike. Lê belê ew girya û xwe da erdê. Min jî têra wê lêda û min ew bi xwe re bir Şamê. Li wir, tacirêkî ew dît û ew pir eciband ji ber spehîbûn û zîrebûna wê û zimanê wê yê şêrin. Xwest ku wê ji min bikire û buhayê wê zêde kir û hey zêde kir hetanî gîha sed hezar derhemî. Min jî ew firote wî bi wê buhayê, piştîre min bihîst ku wî tacirî cil û bergin baş li wê keçikê kiriye û ew pêşkeşî Sultanê Şamê, Şerker ê qiral kiriye, wî jî duqatên buhaya kîrîna wê, daye wî. Bûyera herî erjeng a di serê min re derbas bûye û ji bîra min naçe, ev e. Ez bi bawer im ku ew buhaya dawî jî hindik bû ji bo wê keçikê.”

Herdu qiral man şaş li himberî wê bûyerê û pir jî bala wan kişand. Lê belê yê Seyrana Zeman, çawa ku ew çîrok bihîst ber çavên wê reş bû, bi hêrseke mezin qîr kir û ji birayê xwe Romezan re got: “Bê şik û gûman, Erebe ku ez ji Qudsê revandibûm ev bi xwe ye, ne kesî din.” Piştîre, wê bi xwe jî çiroka rêwîtiya xwe û birê xwe ya ber bi heccê ve ji wan re rave kir û çî tiştê li Qudsê bi serê wê hatibû ji zor û zehmetî û tunebûn û bindestiyê yeko yeko vegot. Li dawiyê jî got: “Niha jî heqê min heye ez wî bikujim û heyfa xwe jê hilînim.” Pêre jî destê xwe avêt şûrekî û ber bi yê rêbir ve çû ji bo wî bikuje. Qîrîn bi rêbir ket û got: “Ey sultanên zemanan, nehêlin ev jinik min bikuje, ez ê çî ecêbên ku bi serê min de hatine, ji we re bibêjim.” Birazîkê wê Hebû Tunebû li metika xwe zîvirî û jê re got: “Metêcan ka bila wan çîrokên xwe jî me re bibêje, piştîre wî bikuje.” Bi vê gotina Hebû Tunebû re, Seyrana Zeman dev jê berda û bi şûn de vegehiya. Rêber hilmêke kûr kişand û ji herdu qiralan re got: “Heger ez bûyerên erjeng û ecêb ji we re vebêjim, hûn ê min bibexşînin gelo?” Wan jî got: “Belê.”

Wê bersiva qiral hêviyek mezin bi rêbir re çêkir. Ji dil û can dest bi vegotina serboriyên xwe kir û got:

Carekê xew li min herimî û canê min xuriya mîna ku morî ketibine wî. Wê şevê bi zor û heft beleyan min derbas kir hetanî ku li min bû sibe. Çawa ku roj derket, ez rabûm ser xwe, min rahişt şûrê xwe û ez li hespê xwe siwar bûm, min destê xwe avêt rima xwe jî û ez derketim seyde û nêçirê. Bi rê de ez li komek zilam rast hatim, ji min re gotin: “Tu bi ku ve diçî?” Min got: “Ez diçim nêçirê.” Wan jî gotin: “Em jî hevalê te ne.” Rabû em giş bi hev re çûn. Hîna em wisa bi rê ve diçûn, hêştirmeyek ji ber me rabû û bazda. Em ketin pey wê û me berra dût da. Wê jî perikên xwe vekirin û ji ber me bazda. Em li pey wê çûn hetanî nîvro. Li wir me bala xwe dayê ku em gîhane çoleke rût û hişk î hola ku pêjna zindiyekî lê nedihat, ne ji insan û ne jî ji cinan. A li wê deverê, hêştirme ji ber çavên me ket û me ew wenda kir. Ji mecbûrî me serê hespên xwe zivirandin ji bo em bi şûn de vegerin. Lê piştê me tê derxist ku vegera di wê germahiya han de ne gengaz e, lewre em hem tî bibûn û hem jî pir birçî bûbûn. Jixwe hespên me jî, nema birêve diçûn. Loma em tirsyan ku mirin bi ser me de bê.

Hîna em di nava wê kefteleştê de bûn, me dît ku ji dût ve çayirek şên xwiya dike; xezal cirîdan lê davêjin û çadirek jî di nava wê de lidarxistî ye ku hespek li kêlekê girêdayî ye û serê rimekê jî diçirusîne. Bi wê dîmenê re hêviyek nû di dilê me de vejiya û bêhna me hate ber me. Di cî de me berê hespên xwe da wê çadirê û me meşa xwe berdeyam kir, ez jî di pêşiya hevalên xwe de bûm. Çawa em gîhan wê çayirê, me dît ku kaniyek li wir e. Em çûn ser kaniyê, me têhna xwe şikand û têra xwe av vexwar. Piştê me hespên xwe jî av dan. Di wê navberê de mêrantîyeke ehmeqiyê ez girtim û min berê xwe da deriyê wê çadirê. Ez çûm, min dît ku ciwanekî mîna heyvê li wir e û li kêleka wî keçek narîn, mîna guleke buharî heye. Dema awirên min li wê keçikê ket, agir bi dilê min ket û hezkirina wê ket nava min de. Min silavek li wî xortî kir, wî jî silava min vegerand. Min jê pirsî û got: “Birayê Ereba, gelo ez dikarim te nas bikim û bizanibim bê ev keça han çî te ye?” Xorto serê xwe bera ber xwe da û piştî seetekê nû axivî û got: “Hela tu ji min re bibêje bê tu kî yî û ev çî hesp e bi te re ye?” Min jê re got: “Ez Hemmad Bin El-Ferrarî me, farisê bi nav û deng ê ku di nav Ereban de bi pêncsed siwarî ye. Em ji mal derketibûn nêçirê lê gava em tî bûn, min xwe li vê çadira we girt, min got belkî ez avekê vexwim.” Dema ew gotina min bihîst li wê keça rindik zivirî û jê re got: “Avekê ji bo vî zilamî bîne. Çi xwarina hazir hebe jî bîne.” Keçik rabû ser xwe û çû aliyê malê. Bi meşa wê re, guhikên xeftanê wê li ba dibûn, xişexiş bi xirxalên nigên wê yên zêr diket û car caran jî keziyên porê wê yên bi erdê ve diçûn diherbilîn. Piştî çend kêliyan, bi şûn de vegeriya û di destê wê yê rastê de taseke zivîn tijî av û di destê çepê de tepsîyeke ku goşt û mast û xwarin li ser bûn hebûn. Ji ber spehîbûna keçikê, min tîbûn



û birçîbûna xwe jîbîr kir! Lewre ewê bi wê spehîbûna xwe laşê min dagir kiribû û hişê min pûç kiribû. Çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Li ser kefa destê wê xêr û bêr e  
Mîna çûkekî ku li ser berfê be  
Ro û heyv di rû de diyar in  
Bi tirs ew li himber hev in

Piştî min têra xwe xwar û vexwar, min ji wî xortî re got: “Ey birayê min ê Erebb! Min rewşa xwe ji te re got, lê te ya xwe negot. Gelo em dikarin we nas bikin?” Wî jî got: “Ev keça han, xwişka min e.” Rabû min jê re got: “Ez dixwazim bi xweşkahi pê re bizewicim û heger vê yekê nepejirînî, ez ê bi zora xwe pê re bizewicim.”

Bi wê gotina min re, xortê ciwan serê xwe bera ber xwe da û piştî se-etekê nû rakir, çavê xwe xistin ên min de û got: “Te rast got gava te ji min re got, ez lehengekî bi nav û deng im, ez şêrê çolê me. Lê belê heger hûn bi bêbextî êrîşî ser min bikin; min bikujin û xwişka min bi zorê bibin, dê ev şermezariyek be ji bo lehengên mîna we. Vêca heger bi rastî jî hûn leheng- gin cengawer bin, hûn ê ji şer netirsîn û hûn ê mohletekê bidine min ji bo ez kinc û amûrên xwe yên şer li xwe bikim, rahêlim şûr û rima xwe û ez li hespê xwe jî siwar bim da ku ez dakevim meydana şer bi hevsengiyekê; wê çaxê gava ku we ez kuştim jî, dê xwişka min ji we re be.”

Gava min ew gotina wî bihîst, min got: “Ev tiştê tu dibêjî di cî de ye û ya rast jî ew e.” Piştî min berê hespê xwe bi şûn de da û ez vegeriyam cem hevalên xwe, piştî ku kula wê keçikê di dilê min de cî girt. Dema ez gîham cem hevalên xwe, min ji wan re qala spehîbûna wê keçikê kir, dîsa min qala wêrekî, lihevhatin û çawamêriya birê wê jî kir ji wan re. Lewre gotibû, ez dikarim bi hezar siwarî re şer bikim. Piştî min ji wan re behsa tiştên di bin çadirê de veşartîne kir; ji entîke, cewher û pereyan. Min ji hevalên xwe re got: “Heger ev xort ne şerkerekî dil ji pola bûya, bi tena serê xwe li vê çolê nedima. Vêca kî ji we bikaribe wî bikuje, dê xwişka wî jî jê re be.” Wan jî got: “Baş e, em bi vê yekê razî ne.” Dûvre ew jî rabûn ser xwe, xwe girêdan bi şûr û mertalan. Bi wî hawî em tevde li hespên xwe siwar bûn û me berê xwe da cem wî xortî. Em çûn, me dît ku wî jî xwe girêdaye û li hespê xwe siwar bûye û xwişka wî jî bi çogên wî girtiye, digirî û hêsiran dibarîne. Dûra ji tirs kuştina birê xwe avêt ser wî û nahwirand, got:

Bi kul û keder ez li ba wî dikim giliyê xwe  
Da ku van zaliman têk bibe bihikmeta xwe  
Lewre bi nêteke xerab dixwazin te bikujin  
Bi nêteke xerab dixwazin bêgunehêkî bikujin  
Halbûkî dinya tev dizane bê çi cengawer î  
Tu çiqasî mêrxas û çiqasî bi xwe bawer î

Lewre tu şer dikî ji bo rûmeta xwişka xwe  
Ya ku bêsinor lavan dike ji xwedayê xwe  
Ku hêza te bi ser bixîne û wan bike rûreş  
Soz û peyman min heye îro ez im dilxweş  
Piştî te najim ez lew ku buhuşt be cihê min

Gava birayê wê ew helbesta wê guhdar kir, hestiyar bû û giriya. Berê hespê xwe da wê û lê vegeriya, hat cem wê û bi helbestî got:

Binêre li min ez ê çî bikim bi serê wan  
Li şad û şûdên min binêre, ne li wan  
Baş baldar be dema ez êriş bikim wan  
Dema ez rima xwe biçikînim dilê wan  
Sûnd û peyman ji bo te ey xwişka ciwan  
Şêre wan jî were ser min, ez ê pesindar bim  
Ji wî re, ji bo bêhtir xwe bigire li ber min

Gava helbesta xwe qedand, berdewam kir û got: “Xwişkêcan guhdar be li min ez ê çend gotin û wesiyetan li te bikim!” Xwişka wî got: “Ser serê min, ka bêje biracan!” Wî jî jê re got: “Heger ez hatim kuştin, nehêle ku kes ji wan destê xwe yê gemarî bide te.”

Gava xwişka wî ew gotin ji devê wî bihîst, bi kulman li rûçkê xwe da û got: “Na birayê min, na! Çawa dê meytê te li erdê be û ez ê destûrê bidim dujminan ku dest bavêjin min!”

Wê gavê, xortê ciwan destê xwe avêt rûpoşa wê û ji ser çavan da alî. Rûyê wê, mîna rokekê çurusand ji nav xumamê. Ew ji herdu çavan ve maçî kir û xatir jê xwest. Piştî li me zîvirî û ji me re got: “Gelo hûn mêvan in an hûn şer û cengê dixwazin? Heger hûn mêvan bin, li ser serê min cihê we heye. Na heger hûn hatine vê heyva li çardan dixwazin, wê çaxê yeko yeko ji min re dakevin vê meydana şer.”

Bi wê gotina wî re, siwarekî ji yê me, xwe berda meydana. Xortê ciwan jê re got: “Navê te û yê bavê te çî ye, lewre min sond xwariye ku kesê bi navê xwe û bavê xwe nekujim. Loma heger navê mîna yê min be û yê bavê te jî mîna yê bavê min be, ez ê bê şer vê keçikê radestî te bikim. Siwarê me jê re got: “Navê min Bîlal e.” Xortê ciwan jê re got: “Te derew kir ey Bîlal. Tu hem derewîn û hem jî bêbext î. Heger tu xwedî rûmet bî, li gotina min guhdar bike û baş bizanibe ku lehengî di meydana şer de diyar dibe û madenê mirovan jî di cengê de derdikeve holê. Êdî xwe ragire li himberî van derbên min ên ku çiyayan dihejînin.”

Di pey re, herdu daketin tirada hespê û şûr û rimên xwe li hevdû hejandin. Piştî mûbarezeyê kurt, xortê ciwan rima xwe di sînga Bîlal de

çikand û di pişta wî re derxist.

Farisêkî din li himber xortê ciwan sekinî. Xorto ji wî re jî got: “Ey sehê nicis î heram! Sehê ku ji tunebûnê li serê me bûye zilam. Baş bizanibe ku şerê rasteqîn, ew e yê ku di cengê de nakeve etra ruhê xwe.”

Xortê ciwan, ew siwar jî di nava çend kêlikan de li erdê raxist. Di nava xwîna xwe de vegevîzî û di cî de mir. Xortê ciwan gazî me kir û got: “Gelo kesî din heye ku dakeve meydana şer?”

Siwarekî din daket meydana şer û ji wî xortî re got: “Ez bi ser te de tîm û dilê min tijî agir e. Ew agir min bi ser te de didêhîne û bawer bike xelasa te ji destê min nîne. Lewre min îro gelek mîrên Ereban kuştine bi heman agirî.”

Xortê ciwan lê veğerand û got: “Te derew kir, ey bêbextê bê qedr û qîmet! Îro tê dawîya derewên xwe bibine bi serê vê rîma min!” Bi vê gotîna xwe re, rîma xwe di sînga wî de çikand û ew ji hespê anî xwar. Dûvre dîsa gazî me kir û got: “Kesî din î ku dakeve meydana şer heye gelo?”

Bi wê pîrsa wî re, siwarekî din jê re daket meydana. Xortê ciwan navê wî pîrsî, got; “Navê min Hilal e.” Xort jê re got: “Te şaşitiyeke dîrokî kir bi daketîna meydana û barekî derew û bêbextî bi xwe re anî. Ez im ê ku bi helbestên xwe tîme nasîn, ez im ê ku ruh distîne bêyî ku xwediyê wî pê bihese.”

Pîştî, herdu daketîna meydana şer û ketîna pêxêla hev de mîna du şêran. Herduyan jî bi hev re keys li hev anîn û rîmên xwe di hevdu werkirin, lê derba xortê ciwan zûtir cihê xwe girt û farisê çaran jî ji ser pişta hespê wî anî xwarê, ew li erdê dirêj kir. Yanî kî daket meydana, hate kuştin. Gava min ev rewş dît, min ji xwe re got: “Heger ez bi vî re şer bikim jî ez nikarim pê, heger ez ji ber birevim jî ez ê bihetikim di nav Ereban de. Lê belê hîna min biryarek nedabû û hişê xwe zelal nekaribû, xort bi min ve hat, ez ji ser pişta hespê kişandim û ez li erdê dam. Piştî, şûrê xwe hilda ji bo ku serê min jê bike. Bi lez min bi dawa wî girt û xwe avêt dexilê wî ji bo ku min nekuje. Şûrê xwe xist kalanê wî de û bi destekî rahişt min, ez bi hewa xistim mîna çûkekî. Gava xwişka wî ez di wî halî de dîtîm, pîr kêfxweş bû û hat eniya birayê xwe maçî kir.

Piştî, ez teslîmî xwişka xwe kirim. Wê jî toqên cewşenê min xistin stûyê min û mîna kûçîkekî ez bi dûv xwe de kişandim, ez birim hundurê çadirê. Li wir kincên cengê ji birayê xwe kir û qatek kincên nû lê kirin û kursiyekî acî da bin wî. Piştî jê re got: “Te rûyê me sipî kir, Xwedê temenê te dirêj bike.” Xort jî lê veğerand û got: “Te dît bê çawa şewq ji şûrê min diçû di şer de û çawa serê rîma min diçûrûsand, ey xwişka delal! Ev wêrekî ji bo

Xwedê ye bêgûman, loma şêrên çolê jî nikarin pišta wî bidin erdê, wek tu dibînî. Jixwe li her çar hêlên welêt ez tême nasîn bi lehengiya xwe.”

Gava min ew gotinên wî guhdar kirin, ez şaşwaz û matmayî mam. Min li xwe û li wê rewşa hêsîrtiya xwe nêrî, dilê min bi min şewitî û baweriya min bi min nema, ez perîşan bûm. Piştî min li spehîbûna xwişka wî nêrî û min ji xwe re got “Çi bi serê min hatibe, di rûyê vê û xweşîkbûna wê de ye!” Ez mest bûm bi xweşîkbûna wê, min êşên xwe jî jibîr kirin û min ev beyt ji xwe re gotin:

Hevalo, loman li min meke  
Hişê min îro li dereke din e  
Xezalekê ez hêsîr girtim ji dil de  
Û bi spehîbûna xwe ez kuştim  
Birê wê jî fikir ku min bikuje  
Lê belê dilovan derket cwamêro

Piştî, keçîkê xwarin ji birayê xwe re anî û wî jî ez vexwendim ser sifra xwarinê; pir kêfa min hat bi wê helwesta wî û ez têgihiştim ku êdî nema min dikuje. Piştî xwarinê, xwişka wî çû jêre şerab anî. Wî jî vexwar, hetanî serê wî sincirî û rûyê wî sor bû. Li min zîvirî û ji min re got: “Kuro Hemmad, tu çima wisa melûl î? Ez Temîm Kurê Salebe me û va tu dibînî, bi saya Xwedê tu sax ma û tê daweta xwe jî li dar bixî!”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî dengê xwe birî.*

ŞEVA SED Û ÇEL Û HEYŞTEMÎN

*Şehrezadê got:*

Hemmad ê Bedewî vegotina serpêhatiya xwe berdewam kir û got:

Xortê ciwan ji min re got: “Hemmad lawo, ez Temîm Kurê Salebe me û Xwedê Teala tu xelas kirî li ser destê min. De êdî ka vê îskanê vexwe ligel vê mizgîniya xweş û noşecaniya xwe!” Min jî îskana şerabê ji destê wî girt û ew vexwar. Piştî yeke din dagirt û da destê min, min ew jî vexwar. A sisyan, a çaran jî min vexwar û ez pê re ketim nava sohbetêke ji dil. Di encamê de em bûn destbirakê hev, wî ji min re sûnd xwar û min jî hezar û pêncsed carî jê re sûnd xwar ku ez ê bi destbiratiya wî ve girêdayî bim û ez tucarî bêbextiyê pê re nakim, ez ê hertim pê re bibim alîkar. Wê gavê wî jî ferman da xwişka xwe, çu ji min re deh heb bedlên ji hevrêşim anî, ev kincê li ser min jî yek ji wan her deh bedlan e. Dîsa deveyeke herî xweşîk da min û barekî giran lê kir ji xwarin û vexwarin û tiştên giranbuha. Hespekî qemer jî diyarî min kir ku nayê wesifdan. Wê çaxê ez sê rojan li gel wî mam, di nava mêvandariyeke pir xweş de. Ew diyariyên ku wê çaxê dane min, hîna jî li gel min in.

Vêca piştî mana wan sê rojan, Temîm ji min re got: “Birayê Hemmad, êdî em birayê hev in û ez dikarim xwe bispêrim te. Niha tu şiyar bimîne ez ê jî hebekî rakevim. Heger hîrehîra hespinan hat, qet metirse. Lewre ev kesanan misoger dê siwarin ji malbata Salebe bin ku hatina şerê min bikin.”

Piştî xwe xist bin balîfa xwe û raket. Dema xew lê giran bû, şeytan ket dilê min û kuştina wî ket bîra min û di cî de ez rabûm ser xwe, min şûrê wî ji bin serê wî kişand û bi yek carê re li stûyê wî xist, serî ji laşê wî veqetand. Di wê kêliyê de xwişka wî pê hesiya û bi min ve hat, xwe bi ser birayê xwe de avêt, porê xwe kişand û kincên xwe çirçirandin bi wêlewêl, pêre jî bi helbestî got:

Xebera reş her dê bigihêje dost û mirovan  
Kes nikare bireve ji qedera xwe û çarenûsan  
Êdî tu kuştî yî birawo lê rûyê te her dikene  
Mîna heyveke li çardeyan ew her diçiruse  
Rojeke xerab bû ew roja ku em li wan qelibîn  
Neşikest rima te di şer de, mixabin di mal de  
Û di nav hestên biratîyê de şikest bi bêbextî  
Îcar wê çawa sebra Siwan bê di xiyaba te de?  
Û wê dayik çawa zarokan binin piştî te?  
Hemmad jî bi nemerdi bû kujer û qatîlê te  
Qaşo bi vê rêbazê dê bigihêje armanca xwe  
Lê belê şaş e ew her laneta Xwedê li wî be

Piştî ew helbesta xwe qedand, li min zîvirî û ji min re got: “Ey melûnê vê dinyê û wê dinyê, te çima bêbextî bi birayê min re kir, piştî wî dixwest ku di serê mehê de daweta min û te li dar bixîne û me bizewicîne!”

Piştî rahişt şûrekî, qebzeya wî danî erdê û serê şûr danî ser sînga xwe û bi hemû hêza xwe, xwe bir ser de da hetanî serê şûr di nav piştî wê re da der û piştî gindirî erdê, mir. Li himberî wê dîmenê, ez pir poşman bûm û xemginiyek ket nava min de. Lê êdî tişteki nema fêde dikir û ne jî ew şûn de vedigerand. Ez rabûm ser xwe û li binê çadirê geriyam. Çi tiştê buha û sivik hebû, min rahişt wan û ez bi rêya xwe de çûm. Ji ber lez û beza xwe û ji tîrsa dilê xwe, min hevalê xwe jî li wir jibîr kirin û bêyî ez rêya xwe bi wan xim, ez ji wir veqetiyam. Heta nehat bîra min ku ez laşê wê keçikê jî veşêrim û ne jî laşê Tenîmê ciwan. Helbet ev serpêhatiya min erjengtîr bû ji ya ewil; a wê keça ku min ew li Qudsê revandibû.

Gava Seyrana Zeman ew gotin ji devê Hemmadê Bedewî bihîst, nûr di çavên wê de nema. Rabû ser xwe, şûr ji kalanê wî derxist û bi hemû hêza xwe li stûyê Hemmad xist, serê wî firand. Her kesên derdorê jê re gotin: “Te çima ew wisa zû kuşt?” Wê got: “Şikir ji Xwedê re ku ev fersend da min û

hişt ez tola xwe bi destê xwe hilînim.” Piştire ji xulaman re got: “Wî ji nigên wî ve bi dûv xwe de bikişînin û cendekê wî bavêjin ber kûçikan!”

Piştire vegeyriyan ser herdu rêbirên mayîn ku yek ji wan evdekî reş bû. Jê re gotin: “Gelo navê te çi ye û çîroka te çawa ye, hela rastiya xwe ji me re vebêje bêyî ku tu derewan bikî.” Rêbir got: “Navê min Xedban e.” Dûvre çîroka xwe û Îbrîza ya Şahbanû, keça Herdûbê qiralê Romê û ji wan re rave kir bê çawa wî ew kuşt û reviya. Hîna Xedban ev serpêhatiya xwe neqedandibû, Romezanê qiral şûrê xwe avêt stûyê wî û serê wî ji nav milên wî anî xwarê. Pê re jî got: “Hemd û sena ji wî xwedayî re ku ez sax hiştim hetanî min heyfa diya xwe bi destê xwe stend.” Di wê navberê de ji wan re got ku, daykoka wî Mircanê, berê ew ji fêlê Xedban agahdar kiribû.

Piştire, dor hat ser rêbirê sisyan ku yekî xwediyê deveyekî barkêş bû. Ji wî re jî gotin, ka hela serpêhatiya xwe ya herî balkêş ji me re bibêje bêyî ku tu derewan bikî.

Zilam çîroka xwe û Şewqa Mekan ji wan re got, çawa xelkê Qudsê ew kirê kiribûn ji bo ku Şewqa Mekan ê nexweş li deveyê xwe bike û wî bibe bîmaristanekê li Şamê û çawa wî jî ew bir li ser sergoyê hemamekê avêt û bi şûn de vegeyriya; hemû ji wan re vegot, ji serî hetanî binî. Dema wî ew serpêhatiya xwe qedand, Sultan Hebû Tunebû rahişt şûrê xwe û serê wî firand. Piştire got: “Şikir ji Xwedê re ku ez sax hiştim hetanî min serê vî xayînî jêkir û min tola bavê xwe bi destê xwe hilanî. Lewre min ev serpêhatiya han ji bavê xwe bi xwe bihîstibû.”

Herî dawî hemûçikan ji hev re got: “Peywirek tenê li ber me maye, ew jî ku kuştina wê pîra şareza ku bi navê ‘Dayîka Fen û Hîleyan’ tête nasîn. Lewre ew bi xwe bû sebaba van beleyên bi serê me de hatin. Bêgûman dilê kesî ji me aram nabe hetanî em heyfa xwe ji wê pîrê hilneynin.” Qiral Romezan, apê Hebû Tunebû got: “Misoger divê em wê bigrin!”

Ev peywîr jî ji bo Qiral Romezan pir hêsan bû. Lewre jinik pîrika wî bû. Hema di cî de jê re nameyek nivîsand û bi lez ji wê re şand. Di nameya xwe de ji pîra sihirbaz re got: “Min artêşên Şam, Mûsil û Îraqê têk birin û qiralên artêşa Musulmanan hemû dîl girtine. Loma divê bi lez û bez tu û Şahbanû Safiya ya keça Qiralê Qostantîniye Efrîdûn werin vir. Kîjan mezin û serkirdeyên fileyan bixwazin bi we re werin, bila ew ji bî. Ji aliyekî din ve jî qet hewce nake hûn leşkeran bi xwe re binin, lewre welat di nav aramiyê de ye.”

Çawa ku nameya wî gîhaşt ber destê pîra ‘Dayîka Fen û Fûtan’ lê meyzand, xwend û di cî de destnivîsa Romezan ê neviyê xwe nas kir. Pir şad û bextewar bû bi vê serkeftina wî û di cî de xwe amade kir ji bo ku ew û Safiya,

dayîka Seyrana Zaman û civata xwe biçin Bexdayê.

Bi lez û bez ketin rê de û nesekinîn hetanî gîhaştin Bexdayê. Destpêkê qasidên xwe li pêşiya xwe şandin, ji bo Qiral Romezan ji hatina xwe agahdar bikin. Nuh agahî gîhaşt Romezan, ji derdora xwe re got: “A rast ew e ku em kincên Roman li xwe bikin û wisa derkevin pêşwaziya wê da em xwe ji fen û fûtên wê bisitirînin.” Wan jî gotin: “Rast e.” Hemû rabûn ser xwe, kincên xwe danîn û kincên Roman li xwe kirin û ligel hezar siwarî derketin pêşwaziya pîra fenek. Gava nêzikî hev bûn û çavên wan li hev ketin, Romezan ji hespa xwe peya bû û ber bi pîrika xwe ve çû. Dema nêzikî wê bû, pîrê jî ew nas kir û ji hespa xwe peya bû, çû ew himbêz kir. Lê Romezan di himbêzkerinê de, herdu destên xwe li newqa wê gerandin û ew şidand hetanî qirçînî bi hestiyên wê ket. Pîrê got: “Ev çi ye?” Û ma şaş, dema Hebû Tunebû û Dendanê Wezîr jî li raber xwe dîtin. Her hezar siwarên wan jî di cî de derdora kerwan girtin, cariyê û xulam hemû hêsîr girtin û ew birin nava Bexdayê.

Piştî, Romezanê Qiral ferman da ku sê roj û sê şevan şahî werin lidarxistin. Bajar hate xemilandin û şahî jî li seranserê Bexde hatin lidarxistin. Di vê navberê de, tacek ji sergînên keran xistin serê Dayîka Fen û Fûtan, ew li kerekê siwar kirin û di nava bajêr de gerandin û bi dengê bilind gotin: “Ev e dawîya kesên ku destdirêjîya qiralan bike.” Li dawiyê jî jinik hildan çarmixê û li devê deriyê Bexdayê daliqandin. Dema kesên ku pê re hatibûn ew rewşa wê dîtin, hemûyan ola xwe guhertin û bûne Musulman.

Hebû Tunebû û apê xwe Romezan şaşwaz bûn li himber vê serpêhatiya ku hîşê mirovan nedigirt. Piştî hinekî bi hev şewirîn, ferman da nivîskarên ku wê serpêhatiyê tomar bikin, binîvisînin ji bo wenda nebe; neyê jibîrkirin û nîşên li dû wan jî bixwînin.

Piştî Hebû Tunebû, apê wî Romezan, metika wî Seyrana Zaman û wezîrê wan Dendan, dem û jiyanê bextewar bi hev re derbas kirin hetanî ku ew xweşî û rehetiya kujer, a ku mirovan ji hev qut dike û civatan ji hev belav dike bi ser wan de hat. Ev e encama çîrok û serpêhatiya Qiral Omer En-Nûman û kurê wî Şerker û kurê wî Şewqa Mekan û kurê wî Hebû Tunebû û Seyrana Zeman û Qeza Bû.

*Hetanî wê gavê jî, Melîk Şehriyar bi baldarî çîrokên Şehrezadê guhdar dikir. Gava Şehrezadê bêdeng bû, Şahîşahê Gewre Şehriyar jê re got: “Ez hez dikim tu hinek çîrokên çûk û teyran ji min re bibêjî.” Wê jî got: “Ser seran, ser çavan.” Dûvre, xwişka wê Dunyazad ew xewle kir û jê re got: “Hetanî niha, cara ewil e ku îşev min dît bêhna Şah fireh bûye û aramî ketiye dilê wî de. Ez hêvî dikim ku dûmahîya te li ba wî xêr be!” Şehrezadê got: “Metirse*

*xwişkêcan!*"

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birî.*

ŞEVA SED Û ÇIL Û NEHEMÎN

(ÇÎROKA TEYR Û TILÛRAN BÎ ÎNSANAN RE)

*Şehrezadê got:*

Şahê min ê bextewar, tê gotin ku di qedimê zemanan de û di serdemên borî de Tawisek hebû, ew û jina xwe li kêleka deryayê dijiyan. Li wê deverê gelek hirç û şêr û dirrinde hebûne. Gelek çem û daristan jî li wir hebûne. Ew Tawis û jina xwe jî ji tirsarî dirindeyan, li ser darekê ji wan daran diman hetanî ku şev diqediya û bi rojê jî li dûv rizqê xwe digeriyan. Jiyana xwe wisa berdewam kirin hetanî rojekê ku ji ewlehiya cihê mana xwe gûman kirin. Wê çaxê dev ji wê dara xwe berdan û çûn ji xwe re li cihêkî ewle geriyan. Di nava wê lêgerîna xwe de, carekê li giravekê rast hatin ku tijî dar û bîstan û rûbar bûn. Ew jî ji xwe re li wê giravê man; ji fêkiyên wê xwarin û ava wê vexwarin bi azadî, bêyî ku kes mineta li wan bike, angû tirseke bikeve dilê wan de. Lê carekê ji nişkê ve Werdekek bi ser wan de hat ku kezebqetiyayî bibû ji tirsarî. Çawa ku Werdekê li ser dara wan danî, Tawis dilê wê xweş kir, li hal û wextê wê pirsî hetanî bêhna wê hate ber û dilê wê hebekî aram bû. Tawis tê derxist ku ew Werdek xwedî serpêhatiyeke erjeng e. Jê pirsî bê ka sebaba tirsarî wê çi ye, Werdekê got: "Ez nexweş im ji ber xemgîniyê û sebaba tirsarî min jî insan in. Êdî hûn jî pir bi tevdîr bim li himberî insanan." Tawis jê re got: "Piştî ku tu hatî vir, êdî nehewceye tu bitirsî." Werdekê got: "Şikîr ji Xwedê re ku tirsarî ser dilê min rakir bi dîtina we. Bi rastî ez jî dostaniya we dixwazim."

Di wê navberê de Tawisa mê daket cem Werdekê û jê re got: "Tu bi xêr û xweşî hatî, ser çavan hatî. Qet metirse xwişkêcan, ma wê insan ji kû derê werin vir û em di nava vê girava di nava deryayê de? Bila dilê te rehet be, lewre mirov ji bejahiyê nikarin xwe bigihînin vir û di behrê de jî tunene. De êdî ka ji me re bibêje bê te çi kişandiyê ji destê insanan?"

Werdekê got:

Xwişka Tawisê, min hemû temenê xwe li vê giravê derbas kir, di nava aramiyê de, bêyî ku zararek bigihêje min. Lê şevêkê ji şevan, min xeyala insanekî di xewna xwe de dît. Ez û wî bi hev re diaxivîn, lê yekî jî gazî min dikir û digot; li xwe miqate be û baweriyê bi gotinên insanan neyne û nehêle nêzîkî te bibin. Ji ber ku fen û fûtên wan pirin û bêbextiyê bi mirov re dikin, çawa ku helbestkarekî gotiye:



Bi zimanê xwe, şêrîn û nestêle ye  
Bi kare xwe jî her wekî rovî ye

Xwişkêcan, insan hîlebazekî ewqasî fenek e ku hûtan ji deryayê derdixîne û derbê li teyran dixê bi tivingên ji herîyê û filan dixê dehîkan, lewre tu teyr û tilûr, tu ajal û dirinde ji xerabiya destên wî rizgar nabin. Vêca ez jî bi tirseke mezin ji wê xewna xwe şiyar bûm û min ji wir bazda, di nava heyirandineke mezin de û dil lê dida ji tirsra ku min jî bixê xefîkek xwe û min bike nêçîr. Hîna nivê rojê neçûbû, qewet di min de nema. Min bêriya xwarin û vexwarinê kir. Ez rabûm ser xwe û ez meşiyam hetanî ez gihîştîm serê çiyayekî. Li wir, min dît ku çêlîkeke şêran di devê şikeftêkê de rûniştî ye. Rengê wî zer bû. Çawa ku ez dîtîm, pir kêfa wî hat û rengê min jî eciband. Gazî min kir, got: “Hela vir ve were, hebekî nêzik bibê!” Gava ez çûm nêzikî wî, ji min re got: “Tu kî yî, tu ji kîjan regezê ye?” Min got: “Ez werdek im û ez ji malbata teyr û tilûran im.” Piştî min axaftina xwe berdewam kir û min jî jê pirsî, got: “Tu çima li vê derê rûniştî yî û hetanî vê dema han?” Çêlikê Şêran got: “Sebeb ew e ku bavê min bi rojane min hişiyar dike li himberî insanan û dibêje; li xwe baş miqate be ku xerabiyekê bi te nekin. Di wê navberê de min xewnek dît ku insanek tê de hebû.” Piştî xewna xwe vegot, xewna wî jî mîna ya min bû, wek ku gavek berê min ew ji te re vegot. Vêca gava min ew gotin ji wî bihîstin, min jê re got: “Şêrocane, wile ez jî hatime cem te ji bo tu di hewara min de werî û tu wî insanî bikujî. Lewre ez pir ji wî mexlûqî ditirsîm û ev tirsra min jî duqat dibe gava ez dibinim yekî weke te jî ji wî ditirsî û tu sultanê hemû ajalan î.”

Vêca xwişkêcan, min ew şîret û daxwaza xwe ji wî Çêleşerî re berdewam kir, hetanî jî cihê xwe rabû û kete pey insan de. Min jî da dû wî bi hêviya ku em li kurekî insanan rast bîn. Çêleşêr ê rengzer teriya xwe bilind kiribû bi ser piştî xwe de û bi bawerî ketibû ser rê de, ez jî li pey wî. Em wisa meşiyar hetanî devrêyekê. Li wê derê em li tozeke ecêb qelibîn. Gava toz ji hev bela bû, me dît ku kerekî tazî ji rê ve tê bi bazdan. Geh direve û geh jî di nava tozê de digindire. Dema Çêleşêr çav lê ket, gazî wî kir û got: “Ey ajalê totikvala, tu çî yî û tu çima hatiyî vir?” Wî jî got: “Ey kurê şêran, ez ker im û ji malbata keran im. Sebeba hatina min jî reva ji ber kurên insan e.” Çêleşêr jê re got: “Qey tu ditirsî ku insan te bikujin?” Ker got: “Na sultanê min, na. Lê belê ez ditirsîm min bixapîne û li min siwar bibê. Lewre tişteki wî heye jê re dibêje ‘kurtan’ ku wî davêje ser piştî min û tişteki din heye jê re dibêje ‘qûş’, wî di bin teriya min de derbas dike, tişteki din jî heye jê re dibêje ‘navteng’ wî jî di bin zikê min re derbas dike û dişidîne, hesinekî dixê devê min de ku jê re dibêje ‘gem’ û bi hefsarekî wî dikşîne, êşeke mezin dide min ku nayê wesifdan û bi wê êş û azarê her tiştî bi min dike. Vêca xwezî bi wê tenê jî bima; her ez dilukumim, lanetê li min tîne û her ez dizûrim jî sixêfan ji min re dide. Gava ez extiyar bibim jî, lingekî textikî wê ji min re çêkin û

min radestî avkêşan bikin û ji sibê hetanî êvarê wê avê bi min bikşînin û bi wî hawî ez ê di nava wê merezê de bimînim hetanî mirinê. Gava ez bimrim jî, mîna dê û bavê min, dê min bavêjin ber kûçikan. De êdî kîjan rewş ji vê kamaxtir e? Û kîjan mûsîbet ji vê mûsîbetê girantir e?”

Vêca Tawisa min a delalî, gava min gotinên wî kerî bihîstin, nav dilê min li hev ket û hemû movikên laşê min lerizîn û min ji Çêleşêr re got: “Ey Mirzayê hemû ajalan! Kerê me mafdar e û van gotinên wî tîrsa nava min mezintir kir.” Çêleşêr ji ker re got: “Tu bi kû ve diçî?” Ker got: “Berî roj derkeve, ez çav li insanekî ketim, hem jî ji dûr ve. Wê gavê di cî de min biryar da ku ez jê birevim û di heman kêliyê de ez ketim rê de, ji tîrsa wî. Niha jî ez ê meşa xwe berdewam bikim belkî ez cihekî ewle ji xwe re bibinim ku destê insan negihêje min, lewre ew ajalekî pir bêbext û pir jî xedar e.”

Hîna Ker wisa diaxivî û xatirê xwe ji me nexwestibû, toz û ‘ecacek ji dora me rabû. Ker zûriya û li hêla tozê nêrî û pê re jî tireke ecêb kir ku dengê wê olan da li derdorê. Piştî demekê toz belav bû û hespekî seglawî ji bin derket ku bejna wî pir dirêj û bilind bû û nigên wî zirav bûn. Bi hîrehîr meşa xwe berdewam kir, hetanî gîhaşt ber destê Çêleşêr. Çêleşêr bi heybet lê nêrî û jê re got: “Cînsê te çi ye û tu ji kîjan malbatê yî ey ajalê spehî û rind? Û tu çima wisa dibezî li vê çola han?” Hesp got: “Ez hesp im, ey mîrzayê hemû ajalan; sebeba bazdana min jî ew e ku ez ji insanan direvim.”

Çêleşêr behetî ma ji ber wê gotina hespê û jê re got: “Şerm e ji te re ku tu wisa dibêjî. Çawa tu ji insan ditirsî bi vê bejna xwe ya bilind û bi vî qelafetê xwe yê girs û bi vê beza xwe ya mîna babîsokê? Û ez jî bi vî qelafetê xwe yê biçûk min biryar daye ku ez herim insan bikujim û goştê wî bixwim, da ku tîrsa vê werdeka reben nemîne, dilê wê aram bibe û vegere welatê xwe. Tu jî bi vê helwesta xwe hat û te ziravê min qetand; te ez ji biryara min vegerandim. Vêca heger insan ligel vî qelafetê te û vê heybeta te zora te biribe, ez ê çawa zora wî bibim! Halbûkî bi lotikekê te dikaribû ew bikuşta bêyî bikaribe nêzikî te jî bibe.”

Bi wê gotina Çêleşêr re Hesp kenîya û got: “Ka, xweziya min bi wê yekê! Na sultanê min na, bila qelafetê min te nexapîne ku ez ê bikaribim zora insan bibim. Lewre ew yekî fennek û xapînok e. Tiştêk li cem wî heye jê re dibêje ‘şekal’ ku ji mû û hiriyê têtê çêkirin. Her çar nigên min dixê şekalan û bi werîsan min girêdide bi beşteki bilind ve çawa ku yekî li çarmîxê bidin, ez wisa li ser nigan dimînim bêyî ku ez bikarim xwe tev bidim, an jî xwe dirêj bikim, rakevim. Gava dixwaze li min siwar bibe jî tiştêkî çermînî heye jê re dibêje ‘zîn’, wî davêje ser piştê min û bi du heb navtengan wî dişidîne di bin sînga min re. Hesinekî ku jê re dibêje ‘gem’ jî dixê destê xwe de, dema ku bixwaze min bi rê ve bibe, rişmê dikşîne û berdide, êşeke bêtarîf dide

min û bi kabokên xwe li min dide, carinan jî zextan li min dide hetanî xwîn di kulîmekên min re davêje û bi wî hawî li gora kêfa xwe min tajo. Carna jî hesinan li bin nigên min dixê ku ew jê re dibêje ‘nal’ mala min xeradike û êş jî simên min dernakeve. Gava ez kal dibim û edî ez nema dikarim bibezim, min difiroşe aşvan ku ew jî min dide ber aş ji bo ez kevirê wî bigerînim. Ez jî bi şev û roj wî kevirê aş digerînim hetanî ez dikevim û taqet di min de namîne. Wê gavê jî min difiroşe qesabekî ku ew ji min serjêdike. Çermê min difiroşe koşkeran, goştê min difiroşe xelkê û mûyên teriya min jî difiroşe çêkerên moxil û serradan, bezê min ê mayîn ji dike dan.”

Gava Çêlikê Şêran ew gotinên Hesp bihîstin, hêrs û xemgîniya wî duqat bû û ji Hesp re got: “Tu kengî ji insan veqetiyaye?” Got: “Nava rojê ez jê veqetiyame û niha ew li pey min e.”

Hîna Çêleşêr ew gotina xwe ya bi Hesp re neqandibû, toz û dûmanek ber bi wan ve hat û bala wan kişand. Piştî demekê ew toz ji hev belav bû û deveyek di bin de xwiya kir ku pir kelecânî bû û bê rawestan simên xwe li erdê didan bi hîrehîr û di nava sergêjayîkeke berbiçav de. Bi wî halê xwe hat hetanî gîhaşt ba me. Vêca gava Çêleşêr çav li wî qelafetê wî yê tirtire ket, got belkî insan ew e û hewl da ku êrişî ser wî bike. Lê min jê re got: “Kurê Sultan! Ev ê han ne insan e. Ev deve ye û wisa xwiya dike ku ev jî ji ber insanekî reviyaye.” Vêca xwişkêcan, hîna ez bi Çêleşêr re diaxivîm, min bala xwe daye ku deve hat cem Çêleşêr û silavek dayê, wî jî silava wî vegerand û jê pirsî, got: “Ji ber çi tu hatiya vir?” Deve got: “Ez ji ber insanekî reviyam û hatim vir.” Çêleşêr jê re got: “Tu çawa bi vî qelafetê xwe û bi vê bejna xwe ya bilind ji însanekî ditirsi? Te lotikek tenê lê bida tê ew bikuşt!” Devê got: “Kurê Sultan, divê tu bizanibî ku fen û fûtên insan pir in û ji mirinê pê ve tu tişt nikare pê. Lewre ew tayekî di pozê min re derbas dike ku navê wî dike ‘xizêm’ û li ser serê min jî cihêkî ajokariyê çêdike ku zarokêkî biçûk li wir rûnê jî, dikare bi benekî wê xizêma min bikişîne û li gora dilê xwe min bajo. Di her îşî de min bi kar tînin; çi biçûk, çi mezin. Barên giran li min dikin û min dibin rêwîtiyên dûvdîrêj ku dawî jê re nayê. Çi karen giran û zehmet hebin bi min dikin û gava ez extiyar dibim jî, xwediyê min, min difiroşin qesabekî ku min şerjê dike û goştê min difiroşin aşpêjan, çermê min difroşin koşkeran. Dêrdê min giran e û tu jî qet ji min nepirse bê ez çi dikîşînim ji destê insanan!”

Şêrê biçûk jê re got: “Û tu kengî ji insana veqetiyaye?” Deve got: “Ber êvarê, dema roj kete zerika xwe ez ji insan veqetiyam. Ez texmîn dikim ku dema vegere û min nebîne, dê li dû min bê; îcar sultanê min, ka destûra min bide ez herim bi van çol û çîyan ve, belkî ez xwe ji nav lepên wî rizgar bikim.” Çêleşêr jê re got: “Ey deve, hela hebekî xwe ragire bila ew insan were vir, da ku tu bibinî bê ez çawa wî perçe perçe dikim, goştê wî dixwim

û xwîna wî vedixwim.” Deve got:

Sultanê min, ez ji bo te ditirsim ji wî zalimî. Lewre bêbextekî fennek e ew, wek ku helbestkarekî jî gotiye:

Gava ku zordar ketin erdê qewmekî  
Xelkê wir tenê dikarin bar bikin

De êdî destûrê bide min da ku ez herim.

Lê hîna wan ew gûftûgoya xwe kuta nekiribûn, toz û dûmaneke ku ber bi perên ezmanan ve diket bi ser wan ve hat, piştî demekê ew toz gîha cem me û ji hev belav bû; kalekî bejinkurt û çermtenik ji bin derket ku zarokin di destên wî de bûn, buxçikek li ser serê wî bû û hinek amûrên necariyê jî li ser milên wî bûn û bi bazdanê ber bi me ve dihat. Gava nêzikî me bû û çavên min lê ketin, ziravê min qetiya xwişkêcan! Lê Çêleşêr ber bi wî ve çû û ew pêşwazî kir, xêrhatinek dayê. Yê Necar ji nuh çav li Çêleşêr ket, rûgeş bû û pê re kenîya, piştê bi zimanekî vekirî got: “Êvara te bi xêr be ey sultanê gewre û destdirêj! Xwedê Teala wêrekî û hêza te zêdetir bike rebbî! Xwedê dizane bê çi bi serê min hatiye, lê belê ji te pê ve min tu kes nedît ku ez xwe lê bigirim û hewara xwe bigihînim wî.” Piştê li raserî Çêleşêr sekinî û di nava xiroleke bêtimtêl de giriya û hey giriya. Gava Çêleşêr giriye wî dît û gilî û gazine wî guhdar kirin, jê re got: “Bêtirs bibêje, kê zulm li te kiriye û tu çi taba ye gelo bi vî sûretê spehî yî ku di hemû temenê xwe de min mexlûqekî ewqasî spehî nedîtiye?” Mirovê Necar got: “Ey qiralê dirindeyan ez bi xwe necar im û yê ku zulm li min kiriye insan e. Ez bi bawer im ku ew insan bi berbanga sibehê re dê li vir be û li raserî te be!”

Gava Çêleşêr ew gotina Necar bihîst, ronî di çavên wî de nema, xirexirek pê ket, çirûsk ji çavên wî veder bûn û qîrek da, got: “Willehî ez ê şev pê de şiyar bimînim hetanî sibehê û ez li bavê xwe venagerim hetanî ez vê biryara xwe pêk neynim!”

Çêleşêr li Necar zîvirî û jê re got: “Gavê te biçûk in û beza te dereng e û ez ji naxwazim xatirê te bişkînim, lewre ez mirovekî xwedî rûmet û xwedî bext im. Û ez texmîn dikim ku tu nikarî ligel dirindeyan û bi leza wan bazbidî. Vêca niha tu bi kû ve diçî gelo?” Necar got: “Ez diçim cem wezîrê bavê te, cem piling; ji ber ku wî xeberek ji min re şandibû bi navgîniya hinek ajalan ji bo ez herim jê re malekê çêbikim ku bikaribe xwe ji dujminê xwe biparêze. Lewre ji gava ku bihîstiye insan hatine vê erdê, tirseke mezin ketiye nava wî de. Loma min ev text dane ser milê xwe da ku herim cem wî û xaniyekî jê re çêbikim.”

Gava Çêleşêr ev gotinên Necar bihîstin, zikreşî avêt piling û xwest ku Necar wê mala ku behsa wê dike, ji wî re çêbike, ne ji piling re. Loma jê re

got: “İlleh billeh divê beriya tu herî malekê ji Piling re çêbikî, gerek tu yekê ji min re çêbikî. Kengî te malek ji min re çêkir, wê çaxê tu dikarî rêya xwe berdewam bikî û biçî.”

Gava Necar ev gotina Çêleşêr bihîst, bersiva wî da û got: “Wele şêrê min, heta ez neçim malekê ji piling re çênekim, ez nikarim tu tiştî ji te re çêbikim. Ezê herim a wî çêbikim û piştê ez ê werim û li gora daxwaza te bikevim xizmeta te û malekê ji te re çêbikim ku te biparêze ji dujminê te.”

Lê ev gotina wî bi serê çêleşêr de neçû. Çêleşêr jê re got: “Bi navê Xwedê ez nahêlim tu ji vir biçî, hetanî tu malekê ji min re çênekî.”

Bi wê gotina xwe re jî Çêleşêr xwe çeng kir ser wî ji bo ku henekan pê bike û lapûşkên xwe lê da. Amûrên ser milên Necar ketin erdê û ew bi xwe jî ji cihê xwe pengizî, ket erdê. Çêleşêr keniya û jê re got: “Wey Necaro, tu çiqasî qels û bêhêz î! Naxwe tu ne neheqî gava tu ji insanan ditirsi!”

Gava Necar li erdê ket, pir hêrs bû û ji Çêleşêr pir qeherî. Lê ew hestên xwe avêtin nava xwe û rastiya xwe ji Çêleşêr veşart, lewre pir jê ditirsiya. Çû li raserî wî rûnişt û bi rûkenî jê re got: “Temam şêrê min, ez ê niha malekê ji te re çêbikim.”

Necar textên xwe danîn erdê, dirêjahî û pehnahiya wan li gora qelafetê şêr pîva û ew birrîn. Piştê ew li hev dan bi bizmaran û cihêkî mîna sindoqê çêkir ku tenê deriyê wê vekirî hiştibû. Piştê hinek kun jî tê de vekirin û ji Çêleşêr re got: “Ka hela bikeve hundurê wê û li ser nigên xwe rûnê!” Çêleşêr bi ya wî kir û ket hundurê sindoqê, lê teriya wî li derve ma, hewl da ku paşoşin ji sindoqê derkeve, lê Necar jê re got: “Ka hela rawest e, da ku em bibinin bê teriya te jî tê hiltê an na?” Çêleşêr bi ya wî kir û sekinî.

Necar teriya wî li hev pêça û ew jî xist sindoqê de, dûvre jî bi lez deriye wê lê anî hev û ew bizmar kir. Çêleşêr gazî Necar kir û jê re got: “Ey Necar! Ev çi maleke teng e ku te ew ji min re çêkiriye? Ka hela deriye wê veke, ez jê derkevîm.” Necar got: “Heyhat! Lê poşmanî jî nema fêde dike, lewre êdî derketina te ji wê ne gengaz e! Tu dirindeyekî bêhawe yî û min tu xistiye qefesê de!” Çêleşêr got: “Birawo ev tu bi çi zimanî bi min re diaxive?” Necar got: “Sehê bêmirê, divê tu bizanibî tu ketiye wê rewşa ku tu jê ditirsiya. Qedera te ev e û fêdeya tevdîrê jî nîne.”

Vêca xwişkêcan, dema Çêleşêr ew gotina wî bihîst, naskir ku ew ê li raserî wî insan e, ew insanê ku bavê wî şev û roj ew hişyar dikir ji bo nekeve xefikên wî de. Ez bi xwe jî gîham wê encamê ku ew bi xwe ye ew insanê ez jê ditirsiyam. Loma tirsî min pir mezin bû û min xwe jê dûr xist, lê belê ez zêde dûr neçûm ji bo ez binêrim bê ka çi dike bi wî Çêleşêrî. Vêca xwişkê-

can, min dît ku insan li wî cihî koncalek kola li ber sindoqa Çêleşêr, piştire sindoq avêt wê koncalê û hin pûş avêtin ser wî û agir berdayê, ew şewitand. Bi wê yekê re tirsî nav dilê min bû bi qasî çiyayekî û di cî de min ji wir bazda û ev du roj in ku ez baz didim di nava tirsê de.

Gava Tawisa mê, ev gotin ji Werdekê guhdar kirin...

*Li Şehrezadê bû sibe û wê jî vegotina çîroka xwe da rawestandî.*

ŞEVA SED Û PÊNCÎYEMÎN

*Şehrezadê berdewam kir û got:*

Gava wê Tawisê ew gotin ji Werdekê bihîstin, pir pir şaş bû û ma behetî! Bi axaftinek qutqutî jê re got: “Qet metirse xwişkêcan û bila dilê te aram be. Lewre tu metirsiya insanan li ser me tuneye hetanî em li vê girava di nava behrê de bin. Ji xwe tu karê insanan jî li vir tuneye. Em ê bi hev re li vir bin, hetanî Xwedê Teala rêyekê xêrê ji me re veke.” Werdekê dîsa dubare kir û got: “Ez ditirsim hinek ji wan bi ser me de bîn û qedereke wisa bi serê me de jî bê!”

Hîna wan di nav xwe de ew nîqaş dikir, bala xwe danê ku toz û ‘ecaceke ecêb ber bi wan ve tê. Werdekê di cî de xwe avêt nav avê, got: “Tevdîr baş e, tevdîrgirtin rêbaza yekane ye ji insanan.” Tozeke ecêb bû, gava nêzikî wan bû û toz ji hev bela bû, pezkoviyek ji bin derket. Pê re jî dilê herduyan aram bû. Tawisê ji Werdekê re got: “Xwişkêcan, bila dilê te rehet be, vaye ev ê ku bi ser me de dihat Pezkovî derket û Pezkovî jî gîha dixwin, tu zerar ji wan nayê. Çawa ku tu ji malbata teyran î, ew jî ji malbata ajalên bêzerar e, qet jê metirse û xeman mexwe, lewre xem mirov dihêlinin.”

Hîna Tawisê gotina xwe neqedandibû, Pezkovî gîhaşt cem wan. Silavek li wan kir û ji wan re got: “Ez îro derbasî vê giravê bûm û min tu der mîna vê derê bi mêrg û gîha nedîtiye! Vê derê cihekî pir xweş e, kanî em li vir bi hev re bijîn!” Gava Tawisê û Werdekê dilsoziya pezkoviyê dîtî, meyla wan bi ser de çû û xwestin hevaltiyê pê re bikin, soz bi hev re dan û bûn dostên hev. Gera wan, rabûn û rûniştina wan, xwarin û vexwarina wan, her bi hev re bû.

Wisa bi hev re jiyan, di nava xêr û bêr û aramiyeke xweş de, hetanî rojekê ku gemiyeke serberdayî, yeke ku rêya xwe şaş kiribû di wir re derbas bû û li nêzikî girava wan rawestiya, rêwî ji keştiyê peya bûn û li ser giravê belav bûn. Di wê navberê de li Pezkovî, Tawis û Werdekê jî rast hatin û ew dîtî. Nuh ew dîtî, Pezkovî bi lez reviya bi çolê de û xwe ji ber çavan wenda kir. Tawisê jî di cî de baskên xwe li hev xistin, bi hewa ket û di nava şinahiya

asîmanan de şopa xwe wenda kir. Lê belê Werdek ziravqetiyayî bibû hişê wê qet nedîsuxulî, mîna ku gêj bibe. Nêçîrvanan dan dû wê û dev jê bernedan hetanî ew girtin. Wê kêlikê qajînek bi Werdekê ket û got: “Tevdirê jî ez ne-parastim ji vê qedera min!”

Nêçîrvanan Werdek jî bi xwe re birin keştiya xwe û ji wir dûr ketin, çûn. Gava Tawisê ew rewşa Werdekê dît, baskên xwe lê da û ji wê giravê çû. Di dilê xwe de ji xwe re got “Wisa xwiya dike ku qedera herkesî li bendî wî ye. Heger ne ji hatina vê keştiyê bûya, ez û vê Werdekê ji hev qut nedibûn. Heval û dosta min a herî baş bû û wendakirina wê êşeke mezin e ji bo min.”

Tawisê firiya û çû hetanî li Pezkoviyê rast hat. Silav lê kir û dilxweşiya xwe anî ziman bi xelasiya wê û rewşa dawî ya Werdekê jê pirsî. Tawisê bersiv da û got: “Dujminan ew bi xwe re birin.”

Mana li wê giravê pir pê giran hat, piştî ew tiştê ku bi serê Werdekê de hat. Dilxemgîn bû û li ser veqetîna xwe ya ji Werdekê ev çend riste gotin:

Roja firaqê dilê min perçe perçe bû  
Xwedê Teala dilê wan jî perçe bike!

Bi çûna Werdekê re Pezkovî pir xemgîn bû û bi wê yekê nehişt ku Tawisê jî ji wê giravê biçê. Herdu bihev re li wê derê jîyan û bihev re xwarin û vexwarin. Lê belê xemgîniya wan berdewam kir li ser çûna Werdekê. Rojekê Pezkoviyê ji Tawisê re got: “Xwişkêcan, ez dizanim ku ew insanên ji keştiyê peya bûn, ew bûn ên ku bûn sebaba veqetîna me ji Werdekê û malwêraniya wê. Loma tu jî pir şiyar be û bi tevdir be li hember insanan ji bo tu nekeve xefik û dehfikên wan fennekan. Tawisê got: “Ez pir bi bawer im ku terka wê ji tesbîhan bû sebaba helaka wê. Wê çaxê jî carekê min jê re got: “Te tesbîha Xwedê berdaye û ez ji bo te ditirsim ji ber vê yekê. Lewre hemû zindî, hemû giyanwer tesbîhê ji xwedayê xwe re dikin û yê ku nake jî rastî cezayê xwe tê.”

Dema Pezkoviyê ew gotina Tawisê bihist, jê re got: “A rehme li wî bavî be! Welehî tu rast dibêji û tu ji Qur’anê dipeyive.” Piştî wê jî dest bi tesbîhê kir û got: “Subhan ji wî Xwedayê hêzdar û gewre re ku sultanê sultanane!”

*Di dawîya çîrokê de, Şehrezadê got: “Ev çîrok pir balkêş bû, lê ne bi qasî çîroka şivan e.” Xwişka wê Dunyazadê jê re got: “Xwişkêcan, tu bi Xwedê kî ka çîroka wî şivanî ji me re vebêje!” Şehrezadê got: “Heger şahînsahê min iznê bide, ez ê bibêjim.” Şehriyar got: “Şehrezad hela ka bibêje, em bibînin bê çî li cem te heye!”*

## (ÇÎROKA ŞIVAN Û ABID)

*Şhrezadê vegotina xwe berdewam kir û got:*

Tê gotin ku di zemanekî derbasbûyî de hinek ji abidan, ji bo xuroşkariya wan xera nebe, diçûn îbadeta xwe li çiyê dikirin. Veca Abidek bi heman mebestê çû li çiyayekî bi cî bû ku li wî çiyayî cotek kevok jî hebû û meskenê wan li wir bû. Wî Abidî jî hêza xwe û dema xwe kiribû du beş. Beşek jê ji bo xwedîkirin û lênerîna wan kevokan û beşa din jî ji bo xwe û îbadeta xwe. Abid, herdem dua ji wan kevokan re dikir ku neslên wan pir bibe û bi rastî jî neslên wan pir bûn. Hemû jî li Abidî kom dibûn û ji wî çiyayî venediqetiyayin. Ji ber ku kevokan jî mîna wî Abidî, ji Xwedayê xwe re pir tesbîh dikirin û di tesbîha xwe de digotin: “Subhan ji afirînerê afirîndeyan re! Subhan ji ew ê ku rizq dişîne re! Subhan ji ew ê ku asîman ava kirine û erd raxistiye!”

Ew cotê kevokan li gel hemû zarok, neví û nevíçirkên xwe di nava jiyanekê bextewar û têr û tijî de man li wî çiyayî, hetanî ew Abid çû ber dilovaniya Xwedê. Bi mirina wî Abidî re, refê kevokan jî ji hev belawela bû, li ser çiya û gund û bajarên.

Tê gotin ku li çiyakî ji wan çiyayan jî, şivanekî salih û bawermend hebûye ku pir oldar û xwedî sinc bûye. Keriyeke pez ê wî hebûye ku xwe li ser şîr û mast û penêr û hiriya wan xwedî dikir. Vêca li wî çiyayê wî, şîndar û gîha û av pir bûye. Ajalên li wî çiyayî jî, qet têkildarî şivên û pezê wî nedibûne. Loma ew jî bêxem û dilaram bûye di jiyana xwe de.

Rojekê Şivan bi nexweşiyê giran dikeve, mecbûr dibe biçê li şikeftê bi cî bibe. Piştî ku li wir bi cî dibe, pezê wî jî fêr dibe ku bi rojê here çêrê û bi şev jî vegere şikeftê, cem şivanê xwe.

Carekê Xwedê Teala, xwest ku wî Şivanî di azmûnekê re derbas bike, da ku rastiya îbadeta wî û radeya sebra wî bipîve. Loma şeytanek jê re şand di sûretê jineke spehî de. Jinik çû li kêleka Şivan rûnişt. Çawa ku Şivan ew li kêleka xwe dît, bedena wî giş lerizî û dilê wî li hev ket. Ji jinikê re got: “Jinê tu çima hatiye gel min û tu pêdiviya te bi min tuneye, ne jî mervantiyek di neqeba me de heye?” Wê jî lê veğerand û got: “Merivê Xwedê, qey tu bêhna min a xweş nakşîni? Qey tu nizanî ku pêdiviya zilaman bi jinan heye? Gelo çi pêşiya te digire û nahêle tu bigihêjî min?” Şivan got: “Ew tiştê tu behsa wê dikî, min xwe jê dîr xistiye û nema kêfa min jê re tê. Her tiştê ku di te dide der jî, min ji wî parastiye. Lewre ez dizanim ku tu xapînokeke bêbext î û soz û peyman bi te re nîn e. Xwedê dizane bê tu çiqas pîsîtiyan vedîşêrî di bin wê spehîbûnê de û tu çiqase xerabiyên rûpoş dikî bi wî zimanê xweş. Xwedê dizanî bê te çend mirovên salih jî ji rê derxistine bi wê dilbijokiya xwe ku hemû jî xemgîn û poşman bûne li tiştên ku kirine.”



Piştî wê gotinê, eba xwe jî avêt ser çavên xwe ji bo ku wê nebîne û navê Xwedayê xwe anî ser zimanê xwe bi zikir û tesbîh. Gava Xwedê Teala ew helwesta wî ya xiroşker û salihane dît, berra şeytan da ji ber wî. Şivan jî wê şevê xewnek dît ku yekî di xew de jê re digot: “Li filan cihê mirovekî dadwer heye, here cem wî û li ber destê wî be, ji rêya wî dernekeve.”

Gava bû sibe, Şivan berê xwe da wî gundê ku zilamê salih lê bû. Lê bi rê de dinya lê germ bû, ew jî li ber serê kaniyek avê, li binya darekê rûnişt da ku bêhna xwe berde. Hîna ew li wir rûniştî bû, hinek ajal û teyr û tilûr hatin ser kaniyê ji bo ku avê vexwin. Lê belê çawa ku ew li wir dîtî, hemû cefilîn û bi şûn de vegeyriyan. Wê kêliyê şivan ji xwe re got “Bêhnvedana min li ser vê kaniyê, bû eziyet û êş ji van ajalan re! Gelo ez ê çawa lêborîna xwe ji Xwedê bixwazim û xwe bidim efûkirin ji ber vê neheqîya ku min li ajalan kir? Lewre ez bûm sebeba vegeza wan ji ser kaniyê û terqandina wan bi çolê de, di vê germa han de.”

Şivan ket ber fedî û şermeke mezin li hemberî Xwedayê xwe, ji ber wê kêmaniya xwe pir hestiyar bû û ev beyt bi helbestî gotin:

Heger xelkê baş bizanîbûna çima çêbûne  
Bêgûman dê herdem şiyar bûna ne xafilane  
Jixwe jiyan her ev e mirin û ji nû ve jîn e  
Şaşitî, rexne, bûyer û gelek poşmanî ne  
Em jî heger çî red bikin an jî erê bikine  
Û mîna ehlil-kehf î her bi hev re bimînin

Di pey wê re jî kûrekûr pê ket û giriya li ser wê rewşa xwe, bê çawa li ser wê kaniyê rûniştîye û bûye sebeba ku teyr û tilûr bê av bimînin. Piştî mîna har û dînan serê xwe li erdê da û li ser dev xwe avêt erdê, wisa ma hetanî ku ew mirovê salih hate cem wî û silav lê kir, ew himbêz û maç kir û li gel wî rûnişt. Şivan jê re got: “Kê tu aniye vê devera ku nigê ins û cinan pê nakeve?” Abidê salih got: “Min di xewna xwe de dît ku yek fermanê dide min ji bo ez bême cem te, piştî ku cihê te ji min re tarîf kir û da nasîn. Yanî ez bi wê fermanê hatime gel te, da ku dostaniya te bikim û em herdu bi hev re bijîn.”

Şivan dostaniya wî qebûl kir û êdî herdu bi hev re di wê şikeftê de û li wî çiyayî jiyan di nava xiroşkarî û îbadeta Xwedê de. Jiyana xwe ya rojane jî, bi goşt û şîr û mastê pezê xwe berdewam kirin dûrî civatê, dûrî hemû insanan û bê mal û mulk û zarok û jin. Wisa jiyan hetanî ku bawerî û yeqînîya wan pêk hat. Çîroka wan jî ev bû.

### (ÇÎROKA TEYRÊ AVÊ Û KÎSO)

*Melikê Mezin Şehriyar got: “Şehrezad, bi van çîrokê xwe te hişt ku dilê*

*min bimîne ji mal û milkê min û bi ser de jî ez poşman bibim li ser kuştina ewqase keç û jinan. Gelo tu dikarî di derbarê çûkan de bibêjî?*” Şehrezadê got:

Belê, çawa nikarim şahîşahê min ê bextewar! Tê gotin ku carekê teyrek firiyaye ber bi azmanan ve û bilind bûye hey bilind bûye. Piştî xwe berjêr berdaye û hatiye li ser zinarekî daniye ku di nava avê de bûye. Di ber zinar de jî meytek hebûye ku bala wî kişandiyê. Teyr li wî meytî nêriye, dîtîye ku laşê insanekî kuştî ye û şûna derbên şûr û rîman li ser laşê wî xwiya dike. Teyr di dilê xwe de gotiye “Wisa xwiya dike ku ev ê kuştî mirovekî cîrnexweş û zalim bûye, loma hinek lê hatine hev û ew kuştine, ji bo ku ji zulm û zora wî xelas bibin.”

Teyrikê avê, di nava matmayîneke bêdawî de, li wî meytî nêriye û wisa maye hetanî qertel û êlo li dora wî meytî hatine hev û bi nukulan ketine ser cendekên wî. Wê gavê Teyrikê Avê pir tirsiyaye û ji xwe re gotiye “Ez nikarim xwe li cihekî wisa ragirim û ne gengaz e ku ez ji îro û pê de li vir bimînim jî.” Piştî ji wir firiyaye û çûye ji xwe re li cihekî din geriyaye. Fira xwe berdewam dike hetanî ku çemekî dibîne ku şîndarek di nava wî de ye. Li ser wê darê datîne, di nava wê êşa dûrketina ji welatê xwe de, xemgîniya wî dev jê bernade û ji xwe re dibêje “Êş û xemgîniya min dev ji min bernade. Halbûkî gava min ew meyt dîtibû, bêhna min hatibû ber min. Lê ew teyrên laşxwir lê hatin hev û ew perçe perçe kirin; vêca ez ê çawa dilaram bim li vê dinyayê û ez ê çawa aşîtiyê tê de bixwazim! Ji xwe mezinên me ji gotine ‘Dinya mala kesên bêmal e’ tenê kesên bêaqil pê kêfxweş dibin û xwe qurre dikin bi mal û mulk û zuriyetên xwe hetanî ku dikevin bin axa vê erdê û laşên heskiryên wî jî dadîqurtîne. Lê ji sebrê pê ve tiştêk di destê min de nîne, piştî ku min dev ji nasên xwe berda û ez ji welatê xwe dûr ketim, bêyî daxwaza xwe.”

Hîna ew wisa di nava fikar û ponijandinê de bû, kîsoyekî nêr ber bi wî ve hat û silavdayînek lê kir. Piştî jî jê pirsî, got: “Gelo ji ber çî tu dûrî welatê xwe ketiye?” Teyrikê Avê got: “Ji ber ku dujmin ketin welatê min û ne gengaz e ku tu kes bibe cîranê dujminê xwe.” Kîso got: “Heger rewşa te wisa be-ku ez bawer dikim wisa ye-naxwe ez ê ji bi te re heval û dost bim, di xizmeta te de bim hetanî tu bi ser xwe ve bê. Lewre tê gotin, tu bêrikirin nabe mîna bêrikirina kesê ku dûrî nas û hezkiriyê xwe, dûrî welatê xwe ketiye. Herî zêde ji dema ku yekî salih û bêguneh xerîb dikeve ji welatê xwe û kesî ku li ber dilê wî here û bê li gel wî tunebe, kesekî ku kul û derdên wî pêre parve bike û êşa dilê wî kêmkirî bike. Ez hêvî dikim ku destbiraktiya min bi te re, bibe wesîleyeke bi vî şêklî.”

Gava Teyrikê Avê ew gotinê Kîso bihîstin, lê vegerand û got: “Tu rast dibêjî dosto. Di seranserê salên temenê xwe de, êş û xemgîniya herî giran ji

bo min, ev êşa ku niha ez wê dijîm piştî dûrketina min ji dost û warê xwe; êşa bêrîkirina bira, xwişk û kes û karên xwe. Bi rastî jî veqetîna ji dost û welat, ders û îbretê baş e ji bo kesên ku dixwazin îbretê bigirin ji jiyana xwe. Bi taybetî jî, dema mirov kesekî ku ber dilê mirov bigire li gel mirov tunebe. Di rewşeke wisa de ber çavên mirov reş dibe û dilê mirov zivir dibe, dilovanî tê de namîne, xerabî dikeve nava mirov de. Çareyek tenê li pêşiya kesên hişmend heye di rewşên wisa de: Sebr û berxwedan, li himberî derd û kulên ku felek bi ser mirov de tine. Di rewşeke wisa de, hebûna dostekî li gel mirov, bêhna mirov derdixîne û sebrê bi mirov re çêdike.” Kîso lê vegerand û got: “Baldar be û hewl bide ku vîna te neşike û hêviya te berdewam bike di jiyana de . Yan na wê jiyana te veguhere êşeke bêdawî û rûmetê bi te re nahêle.”

Guftûgoya wan wisa berdewam kir hetanî ku Teyrikê Avê jê re got: “Lê belê hîna jî ez ji bêbextiya felekê û ji kul û derdên vî zemanî ditirsim.”

Gava Kîso ev gotina Teyrik bihîst, ber bi wî ve çû û ji nav çavên wî ew maçî kir û jê re got: “Naxwe hîna jî civata çûk û teyrikan sûdê ji civata te û van fikr û ramanên te digire. Ji ber vê, diviyabû te kul û xemên xwe li dû xwe bihiştana.”

Piştî wê sohbetê, Teyrikê Avê jî wir firiya û dîsa vegeyriya cem wî bere-teyê li ber wî zinarî. Dema hat, dît ku ne qertelên laşxur li wir in û ne jî te-bayên din. Meytê li wir jî tiştê jê nemabû ji xeynî çend hestiyar. Bi kêf dîsa li Kîso vegeyriya û jê re got: “Dujmin ji warê min çûye û ez dixwazim dîsa vegeyrim welatê xwe, cem dost û merivên xwe. Lewre tu jî dizanî ku mirovê durust nikare fikra welatê xwe ji serê xwe bavêje. Kîso pê re got: “Tu mafdar î bi vê daxwaza xwe û heger bi dilê te be, ez jî dixwazim bi te re bêm wê de-verê.” Teyrik jî bi vê daxwaza Kîso pir kêfxweş bû û herdu bi hev re ketin rê de, berê xwe dan welatê teyrik û çûn wê girava wî ya xweş û di nav aramiyê de bi hev re jiyar. Bi vê yekê, dilê Teyrik rehet bû û ev çend beyt gotin:

Dibe ku mirov carinan desteng bibe  
Lê fereca xêrê her ji ba Xwedê ye  
Gava rê li min hatin girtin bi giştî  
Min qet texmîn nedikir rêyek nû vebe

Teyrik jiyana xwe di nava ewlehî, aramî û hebûneke zengîn de li wê giravê berdewam kir bê tirs û metirsi hetanî ku rojekê qertelek birçî lê rast hat û bi lapûşkên xwe ew girt û ew perçe perçe kir. Gava ku qedera wî hat, tevdirên wî jî fêde lê nekirin û ew ji destê qederê xelas nekirin.

Tê gotin ku sebeba kuştina wî ew bû ku xwe jibîr kir û tesbîhên xwe yên rojane nekişandibûn û mîna her car negotibû “Subhan ji wî Xwedayê

ku herdem bi teqdîr û bi tevdîr e. Subhan ji wî xwedayê ku feqîr jî dike û maldar jî dike.”

*Ev jî çîroka Teyrikê Avê bû. Melîk Şehriyar got: “Şehrazad! Bi van çîrokê xwe her ku diçe tu asoya hişê min bêhtir vedike! Gelo hîn jî çîrokên heywan û ajalan li ba te hene?”*

*Şehrezadê got:*

Ser seran, ser çavan Şahînşahê min ê bextewar...

ŞEVA SED Û PÊNCÎ Û YEKEMÎN

(ÇÎROKA ROVÎ Û GUR)

Şahînşahê min, tê gotin ku Rovî û Gurek fêrî kunekê bibûn û herdu bi hev re tê de diman. Demeke dirêj, wisa bi hev re berdewam kirin. Gur herdem serdestê Rovî bû. Rojekê Rovî ji Gur xwest ku dev ji fitne û fesadiyê berde û hebekî din dilsoz be. Di dawiya axaftina xwe de jî jê re got: “Heger tu vê zordariya xwe wisa berdewam bikî, dibe ku Xwedê Teala li te bê xezebê û belaya insanekî bi ser te de bişîne. Însan, ew mexlûqê ku bi fen û fût û bêbextiyê tete nasîn, afirîndeyekî ku çûkan ji asîmanan tîne xwar, masiyan ji deryayê derdixîne û çiyayan qul dike. Heta tiştinan dike ku aqilê mirov nagire. Loma ya baş ew e ku tu dev ji zordestiyê û xerabiyê berde, da ku gepa nanê te bi selameti di ber te de here.”

Lê belê Gur ew gotinên Rovî qebûl nekirin û bi awayekî êrîşkar bersiva wî da û got: “Tu mafê te tune ye ku tu di mijarên mezin û girîng de biaxive.” Piştî şiqamêk li rûyê wî xist, agir ji ber çavên wî bir û ew li erdê dirêj kir. Gava Rovî bi ser hişê xwe ve hat û rabû ser xwe jî, bi gur re kenîya û lêborîna xwe jê xwest ji ber wan gotinên xwe yê tewşomewşo û bi helbestî got:

Heger gunehêkî min çêbûbe di derbarê te de  
Heger bi xerabiyê min bersiva qencyê te dabe  
Ez lêborînê dixwazim lewre ez tobedarê te me  
Efûya te jî ewqasî fire ye ku gunehên min jî radigire

Gur jî lêborîna Rovî qebûl kir û nema bi ser de çû. Lê ji bîr nekir ku hişiyariyekê lê bike û bibêje: “Tiştê ku ne karê te be pê nepeyive, da ku tu jî peyvên nexweş nebihîze.” Rovî got: “Ser seran, ser çavan, ez vê şîreta te qet ji bîr nakim û ez ê tucarî tiştên ku tu jê ne razîbe nekim. Jixwe zanayekî gotiye “Tiştê ji te neyê pirsîn, nebêje û devera tu lê neyê vexwendin, neçe wir; tiştê ne karê te be, têkil wî nebe û şîretan li xeraban neke da ku nebin xerabî û li te venegerin.”

Gava Gur ew gotin ji devê Rovî bihîstin, pêre kenîya lê di dilê xwe de rik û kîn li himber wî his kir û ji xwe re got “Mîsoger divê ez rojekê vî Rovî bi cehnimê şa bikim!”

Rovî jî bêhna xwe fireh kir û metanet nişan da himberî zulma Gur û ji xwe re got “Pozbilindî û îftîra, malxerabûnê ji mirov re tînin, dest û lîngên mirov li hev digerin. Tê gotin ku kê zulm kiriye, wînda kiriye û kî bi nezani tevgeriyaye, di dawiyê de poşman bûye, yê ku tirsîyaye jî xwe radest kiriye. Dadwerî jî xisletên rûmetkaran e, sinckarî jî qezenca herî birûmet e. Loma divê ez hebekî hewedariya vî zilamî bikim, hetanî belaya serê xwe bibîne. Mîsoger dê were kuştin.”

Rovî ji Gur re got: “Xwedê Teala li evdê xwe dibuhure gava ku gunehan dike. Vêca min jî kêmanî û genehek kir di derbarê te de, lê te şeqameke ewqasî xurt li min xist ku, ez bawerim te pê bizanîbûya bê min çiqase êş kişandiye bi wê şeqama te, tê bizanîba ku filek jî nikare xwe li ber wê êşê bigire. Dîsa jî ez tu gilî û gazinan nakim ji ber vê şeqamê, lewre di encamê de ez kêfxweş bûm. Hekîm jî dibêjin, lêxistina mamosteyê edeb û sincê di serî de bi êş be jî, di encamê de mîna hingiv şêrîne û ya min jî ev bû.”

Gur got: “Min gunehê te efû kir û dan û stendina xwe jî bi te re kêmkir. Vêca hêza min bixe hesabê xwe, ji bîr neke û ji min re bibe evd û kole. Te baş nas kir bê ez hêzdarê çawa me li himberî dujminê xwe.”

Li ser vê gotina Gur, Rovî serê xwe jê re danî û ket xiroşê û jê re got: “Xwedê temenê te dirêj bike û zulma te kêmkir ji ser serê dujminê te.”

Rovî wisa berdewam kir bi Gur re, di nava tirseke veşartî û şelafîyê berçavî de ku dixwest nêta xwe pê veşêre.

Rojekê rovî çû nav rez û di rêya xwe de kumîkek axê dît, lê ket şik û gûmanê! Di dilê xwe de got “Bêgûman tiştêk di piştê vî yekê de heye û hinekan bi erdê lîstîye. Jixwe di nav xelkê de jî tê gotin ku gava mirov morîkek cam li erdê bibîne û xwe ji ser nede alî, ango bi dilbijokî destê xwe bavêje wê, dê felaket bi serê wî de werin. Jixwe min jî gelek carî bihîstîye ku insan, rovîkên ji paç û textikan çêdikin û datînin nav rezan û xefikan li ber vedîdî, ji bo ku roviyên din jî werin wir û bikevin wê xefikê. Ez texmîn dikim ku ev kumîka axê jî xefîkek e li pêşîya min! Tevdîrgirtin jî nivê wêrekîyê ye, ez ê jî tevdîra xwe bigirim.” Rovî bi tevdîr nêzîkî wê kumîka axê bû û dît ku koncaleke kûr di bin de heye û ser wêna hatiye girtin da ku yê pêlê bike, bikeve nava wê de. Rovî di cî de xwe bi şûn de vekîşand û ji xwe re got “Şikir ji Xwedê re ku ez ji vê xefîkê parastim û ez hêvîdarim ku dujminê min Gur bikevêyê, da ku ez jê xelas bibim û bi tena serê xwe di nav rez de bijîm, di nava ewlehî û aramiyê de. Pêre jî serê xwe hejand û bi dengê bilind kenîya

û helbestek xwend, got:

Xwezî bin di vê koncalê de gurek bidîta  
Madem ku wî kezeba min reş kir bi derd û kula  
Xwezî ez bimama û gurê min zû bimira  
Û ev rezê tirî hemû tev bi min tenê bima

Gava helbesta xwe qedand, bi lez kete rê de û li Gur vegeriya, çû jê re got: “Xwedê Teala ji te re çêkiriye û rêçikek baş û xweş vekiriye di çûna nav rez de. Ev jî dê bibe sedema bextewariya te bêgûman. Bela pîroz be li te ev pêşketina xweş! Subhan ji wî re yê ku rizqê te fire dike!” Gur ji rovî re got: “Ka çi qewimiye ku tu vê yekê dibêji?” Rovî got: “Ez çûm nav rezê tirî, min dît ku xwediyê wî miriye. Ez derbasî nav rez bûm, min bala xwe dayê ku dar şîn bûne û tijî tirî bûne.” Gur, tu gûman nekirin ji wê gotina Rovî. Girêza wî herikî û di cî de rabû ser xwe û berê xwe rez. Gava giha cem wê kumika axê yê di nivê rê de, Rovî ji Gur re got: “Bi kedeke mezin min sênc û dîwarê rez xera kir û êdî wek ku tu dibînî, rê vekirî ye. De kerem bike, bi rehetî derbas bibe nava rez, bêyî ku tu xwe bibetilîne bi qevastineke zehmet, di ser dîwar re.”

Gur, pozê xwe bilind kir û bi qurretî di rê re derbas bû, lê çawa ku pê li wê kumika axê kir, di koncalê werbû. Rovî hem pir kêfxweş bû û kelecaneke mezin ew girt û hem jî metirsî û panîkeke veşartî ket nava wî de. Ji kêfan nema dizanîbû wê çi bike. Bê hemdê xwe helbestek di ber xwe de got:

Dilê felekê bi min şewitî şewitî  
Gava ku xweziya min ji min pirsî  
Û li gora dilê min da min ev tirî  
Ev xweziya xweş û di dil de veşartî  
Êdî rez rezê min tenê ye bê şîrikatî

Piştî çû ser devê koncalê û li Gur nêri, dît ku pir xemgîn e li ser rewşa xwe. Rovî şelafiya xwe berdewam kir û bi awayê ku ew jî bi wî re xemgîn dibe, pê re giriya. Gur serê xwe rakir û ji Rovî re got: “Gelo ji ber dilovaniya xwe tu bi min re digrî, ey mirovê dilsoz?” Rovî got: “Na, bi navê wî Xwedayê ku tu xistiye vê koncalê, na. Lê belê ez digrim li ser wî temenê te yê dirêj ku hetanî roja îro tu maye û tu neketiye vê koncalê! Heger berî hevnasîna me tu biketa vê koncalê, min ê ewqasê êş û azar nekişandana. Lê belê tu mayî hetanî roja îro, li bendî ecel û qedera xwe ya nivîsandî.” Gur jê re got: “Xerabkaro, here cem diya min û wê agahdar bike ji vê belaya ku bi serê min de hatiye, belkî çareyekê ji min re bibîne û min ji mirinê xelas bike.” Rovî lê vegerand û got: “Çi hatibe serê te, ji ber wê temakariya te û tevdîra te ya zêde bû. Niha jî tu ketiye koncalekê ku filitandina jê tuneye. Ey gurê bêhiş, qey te nebihiştiye ku pêşiyên me gotine: Ê ku di encama karê xwe de nefikire, serê wî dikeve belayê.” Gur jê re got:

Ey mirovê dilsoz! Qaşo te heskirina xwe ji min re nişan dida, te dostanî bi min re dikir û tu ji hêza min ditirsya; vêca ev kîna te ya ku niha tu wê nîşanî min didî çiyê? Ji bîr neke ku kesê dilsoz û efûkar tête xelatkirin ji qîbel Xwedê ve, çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Qencyê biçîne welew ku ne di cihê wê de be  
Ji ber ku qîymetê tu qencyê qet wenda nabe  
Lew ku çiqase zeman di ser re bibhure jî  
Kesê ku ew çandiyê incex piştire wê biçîne

Rovî jê re got:

Ey dirindeyê herî nezan li ser rûyê vê dinyayê! Qey te pozbilindî û zordariya xwe ji bîr kiriye? Tu li gorî dostaniyê qet tevnegeriya, çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Zulmê meke gava tu desthilatdar bî kekê  
Lewre dawîya zulumkariyê her poşmanî ye  
Çavên te raketî, yên mazlûman jî her vekirî ne  
Nifiran li te dikin her ew bi dua ne

Gur ji Rovî re got:

Ey mirovê dilsoz, li min negire ji ber guneh û xetayên buhurî û baş bizanibe ku lêborîn karê cwamêran e, qencî jî sermayeya herî watedar e ji bo kesên dilovan, wek ku helbestkar jî gotiye:

Qencyê bike çî gava tu bikaribî  
Lewre her car tu dê nikaribî

Gur, bi berdeyamî devê xwe li ber Rovî xwar kir û li ber geriya, got: “Ez texmîn dikim ku tê çareyekê bibînî û min ji mirinê xelas bikî.” Rovî lê vegerand û got: “Ey zilamê zivir! Ez bi vê neta te ya xerab û zimanê te yê şêrîn, te dişibînim Baz û Kewê.” Gur pirsî û got: “Ew çawa ye?” Rovî got: “Rojekê ez ketim nav rezekî, ji bo ez hinek tirî bixwim. Hîna ez li wir bûm, min dît bazekî êrîşî ser kewekê kir û ew zeft kir, lê piştire kewê xwe ji nav lepên wî rizgar kir û reviya, ket kuna xwe de. Baz çû ber kuna wî û banga wî kir, jê re got: ‘Nezano! Min ji deştê genimek ji te re anîbû û min tu girtî ji bo wî genimî bidime te, lê tu reviya û ez nizanîm çima. Ka hela rûyê xwe nişanî min bide û vî genimî bibe û here, lewre ez dizanim bê çiqasî tu birçî ye.’ Kewê ji vê gotina wî bawer kir û serê xwe ji kunê xwe derxist. Baz jî lapûşkên xwe avêt û ji serê wî ve ew zeft kir. Kewê jê re got: ‘Ev bû yê ku ji deştê te ew ji min re anîbû! De here Xwedê vî goştê min bike jehr û wî bike nava te rebî!’ Gava Baz Kew xwar, periyekî wî ket qirikê û Baz fetisand, ew kuşt. Îcar ev jî rewşa te ye. Binêr Guro, kî ji birayê xwe re bîrekê bikole, ew dê bikeve wê bîrê. Te destpêkê bêbextî bi min re kir û niha jî ev hat serê te.”

Gur got: “Dev ji van gotin û metelokan berde û xerabiyên min ên kevn ji neyne bira min. Ev rewşa ez tê de me, besî min e. Lewre mirov tişteki wisa ji dujminê xwe re jî naxwaze, êdî çawa ji dostê xwe re bixwaze. Rêyekê xelasiyê ji min re bibîne û tu bibe xelaskarê min! Heger di vî karî de zehmetiyek ji te re hebe jî, divê tu bizanibî ku dost zoriyên herî mezin didin ber çavên xwe ji bo dostê xwe rizgar bikin. Tê gotin ku dostê dilovan çêtir e ji birayê herî nêzik. Vêca heger tu min xelas bikî ji vê xefikê, ez ê têra te amûran bidime te û ez ê te fêrî gelek rê û rêbazan bikim ku tu bi hêsanî bikaribî bikevî rezên herî xweş. Êdî bila dilê te rehet be, ji vê hêlê ve.”

Rovî keniya û got: “Zaneyan çiqasî tiştên xweş û balkêş gotine di derbarê nezanên mîna te de!” Gur got: “Çi gotine wan zaneyan?” Rovî got: “Ew zane dibêjin; kesên ku gewdeyên wan mezin bin, zivir in di tebê xwe de û ji aqil jî dûr in, her dem li aliyê nezaniyê ne. Tu jî ehmeqekî fenek î, tu dibêjî dost zehmetiyê dikşîne di ber dostê xwe de, ev rast e. Lê belê te ez bi kêmaqiliya xwe dame naskirin, êdî ez ê çawa piştgiriya bidim xayînekî mîna te? Gelo te ez mîna dostê xwe didîtim, ango mîna dujminekî xwe te henekê xwe bi min dikir? Loma heger hiş bi te re hebûya, te yê tê derxistibûya ku ev gotinên te mîna tîran di nava min de çûn. Ji aliyekî din ve jî tu dibêjî, ez ê têra te kelepûran bidime te û ez ê gelek huner û fenên derbasbûna nav rezan nîşanî te bidim. Heger hunerên te yên wisa hebin, çima tu nikarî xwe ji vê xefikê rizgar bikî? Çawa ku tu fêdeya te ji te re nîne, ez jî ji binî ve bawer nakim bi van gotinên te. Îcar heger fen û fût û aqilekî te hebe, hewl bide ku tu xwe bi wan fenan ji vê rewşa xerab xelas bike. Ev rewşa ku ez hêvî dikim tu dê qet jê xelas nebî. Vêca wek ku min got, heger aqilekî te hebe, hewl bide ku tu bi wî aqilê xwe, xwe ji mirinê xelas bikî berî tu hineke din rizgar bikî. Rewşa te ya niha, mîna rewşa ew nexweşê ku xwe dike şûna hekimêkî û diçe ser nexweşekî ku bi nexweşiya wî ketiye û dixwaze wî derman bike, jê re dibêje ‘Ka ez te derman bikim?’ Ew jî dibêje ‘Hela tu here destpêkê xwe derman bike, piştî were min derman bike.’ Ew jî serê xwe bera ber xwe dide û polîpoşman bi şûn de vedigere. Vêca ev jî rewşa te ye Guro, dev ji min berde û li halê xwe bipirse.”

*Li Şehrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û PÊNCÎ Û DUYEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Gava Gur ew gotinên Rovî bihîstin, têgihîşt ku tu xêr tê de tune ye û nikare tu alîkariyê ji wî bigire. Li ser wê rewşa xwe ponijî, giriya û got: “Ez di xefleteke mezin de bûm û min rêya neheqiyê dimeşand. Heger Xwedê li min were rehmê û vê carê min ji vê belayê rizgar bike, êdî ez nema ji rêya



rastiyê derdikevim û ez ê herdem rêzdar bim ji kesên ji min lawaztir. Ez ê kincên hirî yên zivir li xwe bikim û ez ê bi biratî nêzîkî hemû ajalan bibim û herdem ji xwarinê bidim feqîr û xizanan.” Piştî dest bi girî kir, porê xwe kişand û li çogên xwe da.

Gava Rovî ew helwesta wî dît û dengê lave û giriyê wî hate wî, hestiyar bû û dilê wî pê şewitî. Bi kêf xwe çeng kir ser kêleka koncalê, herdu nigên xwe baş dane erdê û teriya xwe bi koncalê de berda. Gur jî rabû ser herdu nigên xwe yên dawî û herduyên pêşî avêtin teriya Rovî û zeft kir, piştî hewl da ku xwe bi jor ve bide ji bo ku ji koncalê derkeve. Lê li şûna ku ew berjor ve hilkişê, Rovî hate xwarê ê ew jî ket koncalê de.

Wê gavê Gur ji Rovî re got:

Ey Roviye bêrehm û bêwijdan, te çawa henekê xwe bi min dikir û hetanî çend seetan berê jî tu dostê min bû, di ber rehma min de bûyî? De binêr, vaye tu jî bi min re ket koncalê û ez ê jî bi lez cezayê te bidime te! Jixwe mirovên zana gotine “Gava ku yekî ji we xwest ku birayê xwe biçûk bixe û jê re bibêje ‘Te şîrê kûçîkê xwariye’ ew bixwe dikeve şûna wî de. Çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Gava ku çerxa feleke di ser me re biçê  
Dê yê dawiyê di serî de biperçiqîne  
Kî wî kesî biçûk bibîne û pê bikene  
Dê paş re xelk û alem bi wî jî bikene

Piştî Gur ji Rovî re berdewam kir û got: “Divê ez pir zû te bikujim berî ku tu mirina min bibînî.” Wê gavê Rovî di dilê xwe de got:

Ez bi vî zilamî re ketim vê koncala mirinê û êdî ji bo xelasiyê hîle û bêbextî lazim in. Tê gotin ku jin zêrê xwe ji bo roja daweta xwe hiltîne. Gotinên pêşiyar jî dibêjin “Min hemû hêsirên xwe ji bo tengasiyê veşartine.” û ez baş dizanim ku heger ez fen û xapekê li vî zilamî nekim, wê min bikuje. Helbestkarekî pir rast gotibû gava gotibû:

Tu jî bixapîne hetanî ku tu bikaribî  
Lewre ev zeman dewrana şêr û guran î  
Xap û rîpan her biafirîne da ku tu bijî  
Berheman jî her kom bike da ku tu bijî

Rovî ji Gur re got: “Ey zalimê hêzdar, lezê nede kuştina min, da ku tu poşman nebî. Ey hêzdarê mezin, heger tu bêhna xwe fireh bikî û tu guh bidî tiştê ku ez ji te re bibêjim, tê mêqseda min fêhm bikî. Heger bi lez tu min bikujî jî, tu fêde ji te re nîne û em ê tevde di vir de bimrin.” Gur got: “Ey fennek û xapînokê navdar, gelo tê çî bibêjî di derbarê rizgariya min û xwe de ku tu vê daxwazê ji min dikî? Kanî qesda xwe ji min re bibêje?”

Rovî got: “Heger tu meqseda min fêm bikî, mîsoger tê xelatekê bidî min, lewra gava dengê te hate min û min bihîst ku tu li ber destê Xwedê to-be dikî û tu sûnd dixwî ku heger tu ji belayê xelas bibî, tê dev ji zulm û zora li ser dostên xwe berdî, tê dev ji xwarina tirî û fêkiyan berdî û dest bi parêzê bikî, tê neynûkên xwe bibirî û diranên xwe ko bikî, kincên hirî li xwe bikî û bikevî silûkê de; gunehê min bi te hat û dilê min bi te şewitî, li gel ku min mirina te dixwest. Gava min ew soz û peyman ku te ew li xwe birrî dît, min xwest ku ez te xelas bikim û min teriya xwe bi koncalê de berda, lê te pir bi şida pê girt û kişand, te ez jî xistim koncalê de. Yanî li gel wê soza xwe jî, te dev ji zordariya xwe berneda û tu di xelasiya xwe û hevalê xwe de nefikirî, te em herdu anîn ber mirinê. Ji bo xelasiya min û te, tiştê tenê maye. Heger tu bibêjî erê, ez û tu em ê bi xelasiyê kevin. Piştê jî divê tu soza xwe pêk binî û ez û tu em bibin dostê hev.”

Gur jê re got: “Û ew tiştê ku ez ê wî erê bikim çiyê?” Rovî got: “Heger tu rabî ser nigên xwe yên dawî û bi awayekî rast, bi dîwarê koncalê ve bisekinî, ez ê jî bi te ve hilkişim û ji ser serê te xwe bavêjim derve. Piştê jî ez ê amûrekî bibînim ji bo ku ez te ji vê deverê derxînim.” Gur got:

Ez nikarim baweriyê bi gotina te binîm, lewre mirovên zana gotine “Di dema kîndarî û hêrsê de, bawerî şaş e.” Dîsa, tê gotin ku “Baweriyê bi kesê bêbawer, jirêdertin e û ceribandina kesê ku hatiye ceribandin jî, poşmaniyê bi xwe re tine.” Kesê ku li gora dibêtiya rewşên cuda cuda hesabê xwe neke û li gora rewşekê tenê xwe eyar bike jî, dê şensê wî pir kêm be di serkeftinê de û dê serêşiyên mezin jê re çêbibin; çawa ku helbestkarekî jî gotiye:

Nêtxerabiya te bêgûman ne şaş e  
Lewre xerabnêti jî xesyeteke baş e  
Kuştina mirovan jî timî ji nêta baş e

Ango çawa ku yekî din jî gotiye:

Ji bo tu xelas bî, ji nêtan her bi gûman be  
Ji bo ku çavên te nekevin xewa şevê  
Dujminê xwe pêşwaz bike bi rûkenî  
Li pêşiya wî jî herdem xefikan deynî

Rovî ji Gur re got: “Nêta xerab û gûmanbariya nebaş, tiştê ne rast e. Nêzikahiya bi dilpakî, ji karekterê mirovê kamil e û encama wê jî herdem xelasî û rizgarî ye. Vêca Gurê hêja, divê tu jî li ser xelasiya me bifikire, da ku em giş ji mirinê xelas bibin. Dev ji zikreşiyê û hêrsê berde û bi nêteke baş nêzî min bibe. Heger tu wisa bike, du rê li ber min hene; yan ez ê tiştê jî te re binim ku tu xwe pê bigirî û ji wir derkevî, yan jî ez ê bêbextiyê bi te re bikim û ez ê dev ji te berdim, herim ku ev jî ne gengaz e. Lewre ez naxwazim têkevim rewşa te de, bibim zalim û piştê jî cezayê wê bêbextiyê bikşînim.

Jixwe di metelokên me de ji derbas dibe û tê gotin ku dilsozî baş û spehî ye, xedir û bêbextî jî pir pîs û xerab e. Loma divê tu bawerya xwe bi min binî, lewre ez jî ne cahilim di zanîna bûyerên dirokê de. Îcar tu jî şensê xelasiya me zêde derengtir nexîne.”

Gur got: “Li gel ku baweriya min bi te kêm e, ez têgihîştim bê çî di hişê te de derbas bûye ku te xwestiye min xelas bikî, dema ku te tobeya min bihîstiye. Wê kêliyê, min jî ji xwe re got ‘A ev Rovî dixwaze xerabiya xwe jê bibe bi qenciyeke wisa, xwe bide efûkirin; an jî fena li min dike û ew jî dê cezayê xwe ji Xwedayê xwe bibîne.’ Îcar niha jî, va ez wî şertê te qebûl dikim û ez ê daxwaza te pêk bînim. Heger tu bêbextiyê bi min re bikî, dê ev bêbextiya te bibe sedema helaka te.”

Piştê Gur rabû ser herdu nigên xwe yên dawî, Rovî rakir ser milên xwe û ew berjor ve hilda, hetanî ew gihand asta rûyê erdê. Rovî jî ji ser milên Gur xwe çeng kir ser rûyê erdê û xelas bû.

Gur, gazî Rovî kir û jê re got: “Dosto, tu rewşa min ji bîr nekî û tu dereng nekevî ha!” Tîqînî bi Rovî ket, keniya û lê vegerand, got: “Ey pozbilindê bêaqil! Tiştê ku ez xistim destê te de, ne hewldana rizgarkirina te bû, na. Tiştê ku ez xistim destê te ew bû ku min xwest ez henekê xwe bi te bikim. Gava min tobeya te bihîst, dilxweşiyekê ez girtim ku êdî min nema dikarîbû xwe bigirta. Ez rabûm ser xwe, reqisim wê gavê bê hemdê min teriya min bi ser te de hat, te jî ez kişandim û ez ji ketim cem te. Piştê Xwedê ez ji nav lepên te xelas kirim. Ma min ê çawa alîkariya te bikira di xelasiyê de û tu ji partiya şeytên î? Jixwe doh jî min di xew de dîtibû ku ez di dawetekê de direqisim. Min xewna xwe ji rêbwarekî re got, wî jî ji min re got: ‘Ev tê wê wateyê ku dê serê te bikeve belayekê lê tê xwe rizgar bikî.’ Loma gava ez ketim destê te de, min ji xwe re got ‘Ev e tefsîra xewna min.’ Tu jî baş dizanî ey cahilê pozbilind ku ez dujminê te me, vêca çawa tu hêviyê ji min dikî ku ez alîkariya te bikim, piştî wê dujminahiya ku te bi min re kirî? Min ê çawa alîkariya te bikira û zana dibêjin ‘Mirina nebaşan, paqijbûna erdê ye û aramiyeke baş e ji bo xelkê.’ û heger min baş nizanîbûya ku êşa dilsoziya bi te, ji êşa xayintiya bi te re girantir e, min ê hewl bida ku ez te xelas bikim.”

Gava Gur ev gotinên Rovî bihîstin, li gel êşa qolincên poşmaniyeke tûj, dev milên xwe kir.

*Li Şehrezadê bû sibeh, wê jî gotina xwe birrî û navber da çîroka xwe.*

ŞEVA SED Û PÊNCÎ Û SÊYEMÎN

*Şehrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Gava ku Gur ew gotinên Rovî bihîstin, dev milên xwe kir bi poşmanî. Piştîre şêweya axaftina xwe pêre guhert û gotinên xwe nerm kirin. Jixwe mecbûr bû ku wisa bike. Bi dengêkî hêdî û nizim jê re got: “Hûn qewmê roviyan, hûn ji herkesî bêhtir şêrînziman û cirxweş in. Ez dizanim ku ev gotinên te jî henek û laqirdî ne, lê belê herdem û li her derê jî henek nabin.” Rovî lê vegerand û got: “Cahilo, nezano! Sinorek ji henekan re heye, lê ew jî xwediyên wan derbas nake. Vêca bawer neke ku dê Xwedê Teala alîkariya te bike li himberî min, piştî ku wî ez ji destê te rizgar kirim.” Gur jê re got: “A baş ew e ku tu li gora biratî û dostaniya me ya berê tevbigere û hewl bidî ku tu min rizgar bikî ji vê koncalê. Heger tu min xelas bikî, bêgûman ez ê te xelat bikim.”

Rovî got:

Hekîm û zana dibêjin; biratiyê bi nezanê berradayî re nekin da ku hûn jî mîna wî xera nebin û bi yê derewîn re nekin, lewre ew dê qencyên te veşêre û tenê behsa xerabiyên te bike. Dîsa min bihîstiyê ku zana dibêjin; ji her tiştî re çare hebe jî, ji mirinê re tune. Hemû xerabî jî têne sererastkirin, ji xeynî xerabûnê cewher ku nayê paqijkirin. Qedera mirov jî her dem li pêşiya mirov e. Di derbarê wê xelata ku tê wê bidî min de jî, ez dikarim bêjim ku tu mîna wî marê ku ji ber dikandar direve û diçe li zilamekî diqelibê. Zilam jê re dibêje “Xêr e, çima tu wisa qutufiyê?” Mar dibêje “Ez ji ber dikandar direvim û heger tu min veşêrî ji ber wî û min xelas bikî, ez ê xelatekê bidim te.” Zilam dixwaze hem xêran bike û hem jî xelata mar qezenc bike. Radihêje Mar û wî davêje binê bêrika xwe, wê ji ber dikandar vedişêre.

Gava dikandar diçe û tîrsa ser Mar radibe, zilam jê re dibêje “Va tu xelas bû, de ka êdî tê çî xelatê bidî min?” Mar ji zilam re got: “Kanî ez bi kîjan amûra laşê te vedim û tu jî dizanî ku xelatên mara vê yekê derbas nakin!?” Piştîre di cî de pê veda û ew kuşt. Vêca min tu jî bi wî marî da pênasekirin.

Gur jê re got: “Ey zimanşêrîne rûgeş û dilsoz! Rewşa min baş bizanibe û tîrsa xelkê ji min bîne ber çavên xwe. Jixwe tu baş dizanî bê ez çawa êrişî ser kelehana dikim û dêliyan ji kokên wan ve radikim. Vêca ya baş ew e ku tu bi ya min bike û gotinên min guhdar bike, mîna evdê ku bi ya mîrzayê xwe dike.” Rovî got: “Ey ehmeq û debengê bêxîret! Ez behetî dimînim li vê ehmeqtiya te ku hîna tu fermanan didî min, mîna ku ez koleyê te bim, ango xizmetkarê ber destê te me. Lê belê tê niha bibînî bê ez ê çawa serê te bipelixînim û diranên te yên xayîn bişkînim bi kevîran!”

Piştîre Rovî çû ser girekî û gazi xwediyên rez kir hetanî ku gundî giş pê ve hatin. Gava ku gihan nêzîkî wan, Rovî reviya û çû. Gundî çûn ser xefikê û dîtî ku Gur tê de ye. Hemûçikan bi kevîrên mezin êrişî ser Gur kirin û

bi dar û beran lê dan, serê rîman di nava parxwanê wî de çikilandin û ew kuştin. Piştîre dîsa bi şûn de vegeyriyan malên xwe.

Ber êvarê, Rovî dîsa li koncalê vegeyriya û hat ser Gur, dît ku miriye û cendekê wî werimîye. Serê xwe hejand, xwe li erdê da, reqîsî ji kêfan û bi helbestî ji xwe re got:

Felek li Gur hate xezebê ruh bir ji ber  
Laşekî perpitî û perîşan maye li der  
Ey bavê Serhan ev çî hal e, çî xeber  
Çawa bayê mirinê li te daye xweber  
Koncal jî bûye gor ji te re ey birader

Piştîre Rovî bi tena serê xwe ma di nava wî rezî de û bêtirs di nava aramiyekê de jiya. Çîroka Gur û Rovî jî ev bû.

### (ÇÎROKA MIŞK Î SÎNCAB)

Tê gotin ku Mişk û Sîncabek(sihor) bi hev re bûbûn heval û ketibûn malekê de ku xwediyê wê malê jî mirovekî xizan bû û hinek dostên wî nexweş ketibûn, wî jî ew biribûn ser textor û textor jî weke derman, qewîtîya kunciyên qeşartî lê kiribû. Hinek kuncî dabûne wî, bi wê mebestê. Wî ew kuncî dabûn jina xwe, jê xwestibû ku wan biqeşêre. Jina wî jî ew kuncî birin û bi kutanê ew qeşartin, ew sipî kirin. Vêca gava çavên Sîncab li wan kunciyên ket, hêdî hêdî ew kişandin kuna xwe. Gava pîraniya wan kişandin kuna xwe, jinikê tê derxist ku kunciyên wê kêmbûne. Li ber wan rûnişt û çavdêrî kir ji bo ku sebaba vê yekê fêhm bike. Di wê navberê de, Sîncab jî dîsa ji kuna xwe derket û mîna her car vegeyriya cem kunciyên ji bo ku hinekî din bikişîne. Lê belê gava nêzî kunciyên bû, dît ku jinik li ber wan rûniştîye û tê derxist ku çavdêriyê li wan dike. Hebekî ponijî, piştîre di dilê xwe de got “Wisa xwiya dike ku encamên vî karê min, dê nebaş bin! Ez ditirsim ku şik û gûmanên vê jinikê di derbarê min de çêbûbin! Xuyaye ku heger bi pêşbînî mirov nêzîkî bûyeran nebe, bobelat bi ser mirov de tî. Divê ez niha karekî baş bikim li ber çavên vê jinikê, da ku hemû xerabiyên min werin jibîrkirin.”

Sîncab li kuna xwe vegeyriya û hêdî hêdî ew kunciyên ku bi zor û heft beleyan derbasî kunê kiribûn, dîsa bi şûn de bir ser kunciyên din. Jinikê ew tevgera Sîncabê dît û bi baldarî ji xwe re got “Ev ne sebaba kêmbûna kunciyên min e, lewre ew kunciyên ji kunê tîne û datîne ser yên din. Ev karê ku Sîncab dike qencî ye û bersiva qenciyê jî divê bi qenciyê be. Lê divê ez çavdêriya xwe berdewam bikim hetanî ez sedema kêmbûna wan fêhm bikim.”

Sîncabê fêhm kir bê çî di hişê jinikê de digere. Rabû ser xwe û bi lez çû cem Mişkê, jê re got: “Dostika min î rindik, bawer bike ku tu xêr di cîrantiyê de tune, gava ku germahî û dostaniyeke xwîrt di navbera mirov de tune

be!” Mişkê got: “Rast e dostika min, jixwe ez xêr û bêrekê xweş di cîrantiya te de dibînim, de êdî tu çima van gotinan ji min re dibêji?” Sincabê got: “Xwediyê malê kuncî anîne û wî û jina xwe ji têra xwe jê xwarine û yên mayî jî avêtina dera han û dev jê berdane. Herkesî jî jê xwariye û tu tenê mayî ku te nexwariyî, halbûkî ya ku di serî de heq dike tu yî.”

Ew fikra han bi serê Mişkê de çû. Reqisî, teriya xwe hejand û xwe li erdê da. Ta’ma devê xwe xweş kir û di cî de rabû ser xwe û ji kuna xwe derket. Çawa derket, dît ku kuncî sipî dikin û jinik jî li ber rûniştiye. Mişk, bi lez ket hereketê, bêyî ku di encamê de bifikire. Çû ser kunciyên û dest bi xwarina wan kir. Jinikê jî ji berê ve mîrkutê xwe amade kiribû û li kêleka xwe danîbû. Çawa ku mişk dît, keysa xwe lê anî, mîrkutek lê xist û ew bi erdê ve perçiqand. Timaya Mişkê û nefikirina pêşbînîyê, mala wê xera kir.

*Şehriyar got: “Şehrezad, ev çîroka te xweş bû. Gelo hinek çîrokên di derbarê dostaniyê de li ba te hene? Dostaniya ku di demên zor û zehmet de tête parastin û ji talûkeyê rizgar dike.” Şehrezadê got: “Belê, Melikê min ê bextewar.” Şehriyar got: “Hinekan ji wan çîrokan ji me re vebêje!”*

## (ÇÎROKA KITIK Û QIJAKÊ)

*Şehrezadê got:*

Ser seran, ser çavan Şahîşahê min ê bextewar. Tê gotin ku Qijakê û Pisîkek Kovî bûbûn destbirakên hev û li gel hev di binya darekê de dijiyan. Hîna ew di wê rewşê de bûn, rojekê pilingek ber bi wan ve hat. Lê hayê wan jê tunebû. Gava Piling nêzikî wan bû, ew dîtin. Qijak di cî de firiya, çû ser serê darê û Pisîk li wir ma, nema dizanîbû wê çi bike, çawa bike. Rabû tikan ji Qijakê kir û got: “Dosto, gelo tê bikaribî çareyekê xelasiyê ji min re bibînin?” Qijakê got: “Jixwe biratî ew e ku di demên teng de mirov xwedî derkeve li hev, lew ku zerar jî bigihêje mirov di vê xwedîderketinê de.”

Li nêzikî wê dara wan, şivanek hebû ku kûçikin bi wî re bûn. Qijak bi lez firiya û çû pêşiya wan kûçikan, baskên xwe li erdê dan û qajewaj pê ket. Kuçikan, çawa ku ew di wî halî de, bera dûv dan. Ew jî nizim firiya wek ku birîndar be û nikaribe bifire. Loma kûçikan bi lez bera dûv dan, ji bo ku wê bigirin. Ew jî, tenê bi qasî ku ji nav lepên wan bifilite difiriya, da ku wan tamişkî bike û wan bi dûv xwe de bixşîne. Gava ku şivan ew Qijak di wî halî de dît, wî jî da dûv kûçikan û bi wir ve çû. Kûçik li dûv Qijakê çûn hetanî ku gihan bin darê û pilingek li wir dîtin. Nuh çav li piling ketin, di cî de xwe bi ser de avêtin. Lê Piling bi lez reviya û xwe ji nav lepên wan xelas kir, ji wir dûr ket. Bi wî hawî jî, Pisîk rizgar bû ji nav lepên Piling, bi alîkariya Qijakê.

Şahê min ê ezîz, ev jî dide xwiyakirin ku dost û destbirak bi hev re rast

bin, dikarin hevdû ji xetereyan rizgar bikin.

### (ÇÎROKA ROVÎ Û QIJAKÊ)

Û tê gotin ku li çiyakî, Roviyeke hebû ku kuna xwe li wir çêkiribû. Her ku çêlikek jê re çêdibû û hinekî mezin dibû, wî Rovî çêlika xwe dixwar ji birçîna. Jixwe ku çêlika xwe nexwara, dê li wê derê ji birçîna bimira.

Li serê wî çiyayî, Qijakek jî hebû. Rojekê ji xwe re got “Ez ê dostaniyekê bi vî Rovî re deynim, da ku ez wensa xwe pê bînim û ez ji êşa vê tenêtiyê xelas bibim û di mijara debara jiyana de jî, ez alîkariyekê jê bigirim. Lewre hêza wî pir e û tiştên ku dikare bike, ji yê min pirtir in.” Lê hîna qijakê ew fikra xwe pêk neanibû, rojekê Rovî ber bi Qijakê ve hat û nêzîkî wê bû, bi qasî ku dengê xwe bigihînyê. Piştî jê re got: “Cîranê! Ma qey tu nizanî heqê cîranan li hev hene ku bi hev re dost û alîkar bin. Jixwe tu jî cîrana min î û heqê te li min heye. Li gel wê yekê, hez kirina te jî di dilê min de heye û ev demeke dirêj e ku min nêzîkî kiribû ez biratiyekê teklîfî te bikim. Gelo tu çi dibêjî di vê xalê de?”

Qijakê ji Rovî re got: “Gotina herî xweş, a rast e. Belkî tiştê ku di dilê te de nîne tu wî bi zimanê xwe dibêjî û ez ditirsim ku biratiya tu behsa wê dikî jî tenê bi gotinê be û di dilê te de dujminahiya min hebe. Lewre tu dirinde yî û ez jî xwarina dirindeya me. Loma divê ku heskirin û dostaniyên me ji hevdû cuda bin. Vêca çi hişt ku tu daxwaziya tiştê dikî derveyî têgihîştina te yî û vîna te jî têra wî nake û ji bîr neke ku tu ji malbata ajalên dirinde yî, ez jî ji teyrikan im û biratiyeke wisa di navbera me de çênabe?”

Rovî got: “Kesên ku cihê comerdîyê nas dikin, bijartinên baş jî pêk tînin û hetanî bi biratiyê jî diçin. Min jî hez kir ku ez nêzîkî te bim û wensa xwe bi te bînim, da ku em herdu jî ji hev re bibin alîkar. Bêgûman dê dostaniyeke wisa, rê li ber serkeftin û serfiraziyê jî veke. Li cem min gelek çîrok û serpêhatiyên di derbarê dostaniya baş de hene. Heger tu bixwazî, ez dikarim wan ji te re bibêjim.” Qijakê got: “Ez iznê didime te ku tu wan vebêje, ji bo ku ez armancên wan fêm bikim.”

Rovî got: “Dostê min, tiştê ku di derbarê kelmêş û mişkekî de têtê gotin, vê gotina min piştrast dike.” Qijakê got: “Û ew çawa ye?” Rovî gotina xwe berdewamkir û pê de çû, got:

Tête gotin ku di mala Tacirê dewlemend de Mişkek hebû. Rojekê Kelmêşek çû ser nivîna wî Tacirî û dît ku laşekî şayîtok û nerm li ser wê nivînê ye. Kelmêş jî pir tî bû, rabû ji xwîna wî vexwar. Êş bi canê Tacir ket, ji xew şiyar bû, rabû li qûn rûnişt û gazî xizmetkarên xwe kir. Ew jî bi lez pêve hatin, zend û bendên xwe badan û li Kelmêşê gerîyan. Çawa Kelmêşê dît

ku lê digerin, ji wir reviya çû, li kuna Mişkekî rast hat. Derbasî hundur bû; Mişkê ew dît, jê re got: “Çi hişt ku tu bikevî kuna min de? Tu ne ji famîliya me yî û ne ji xwîna me hevdû digire, ne jî ez li te ewle dibim.” Kelmêşê lê vegerand, got: “Ji bo ku ez xwe ji mirinê xelas bikim, ez ji mala xwe derketim û ez hatim vir, min xwe avêt bextê te. Loma, ne dilê min di mala te de heye û ne ji zerareke min digihêje te, ango tengasiyeke ku bihêle tu ji mala xwe derkevî. Ez hêvîdarim ku ez ê karibim ji vê qenciya te re bibim bersiv. Xwedê hez bike, tê razî bî ji encama hatina min.”

Gava ku Mişkê ev gotina Kelmêşê bihîst...

*Li Şhrezadê bû sibe, wê jî gotina xwe birrî.*

ŞEVA SED Û PÊNCÎ Û ÇAREMÎN

*Şhrezadê vegotina çîroka xwe berdewam kir û got:*

Gava ku Mişkê ew gotina Kelmêşê bihîst, lê vegerand û got: “Heger mijar wek ku tê behskirin be, naxwe pirsgirêk tune û tu dikarî li vê derê bimînî. Bila dilê te di cî de be û qet mereqan nexwe; li mala min, ji xêrê pê ve tu tutiştî nabînî. Ez dostaniya te qebûl dikim û tu jî qet poşman mebe li vexwarina xwîna wî Tacirî. Lewre ew qûtê te ye û tu jî mafdar î ku tu li qûtê xwe bigerî. Tiştê ku bi destê te ve hat jî, pê qayîl bibe û bitiriyar meke. Min bihîst ku şairekî navdar gotiye “Ez bi tena serê xwe, min da dûv qenaatê û min temenê xwe giş bi qenaetek mezin derbas kir, bi gepeke nan û taseke avê. Xwedê çî rizq ji min re şand, ez pê qayîl bûm û bi wî hawî ez gîham bextewariyê.”

Gava Kelmêşê ew gotina Mişkê bihîst, lê vegerand û got: “Xwişkêcan, min şîreta te şopand û bi ya te kir û tu nêta min tune ye ku ez li hemberî te derkevim, hetanî ku temenê min bi dawî bibe, li ser vê nêta baş.” Mişkê lê vegerand û got: “Nêta baş bes e, ji bo avakirina dostaniyeke baş.”

Piştî ji hev hez kirin û dostaniyek di nava xwe de danîn. Kelmêşê jî êdî her şev rîya xwe bi nivîna Tacir dixist, tîbûna xwe dişkand, xwîna wî vedixwar û bi rojê jî li mala(kuna) Mişkê dima, di nava aramiyê de.

Rojekê bi şev, Tacir hat mala xwe, li gel tibabeke dînar û dirav, ku ke- te ser wan de û bû mirçe-mirça wî dînarên xwe maçî kirin. Vêca gava ku Mişkê dengê dînanan bihîst, serê xwe ji devê kunê derxist û lê nêrî hetanî dît ku Tacir ew dînarên xwe xistin bin serê xwe û raket. Wê gavê Mişkê jî Kelmêşê re got: “Ev suûd şensekî mezin e ji bo me. Gelo hîleyek li ba te tune ye, ka em xwe bigihînin wan dînanan?” Kelmêşê got: “Ez dikarim wî ji malê derxînim.”



Kelmêş rabû çû ser nivîna Tacir û bi awayekî xwirt pê veda û çû di cihê ewle de xwe veşart. Tacir jî bi hêrs ji xew şiyar bû û dest pê kir li Kelmêşê geriya. Lê ew nedît û dîsa vegeriya ser nivîna xwe, pal da ji bo ku dîsa rakeve. Lê Kelmêşê careke din pê veda, hem jî bi awayekî hîn xwirttir. Tacir hêrstir bû û ji ser nivîna xwe rabû û çû li hêwanê raza û bi xwe şiyar nebû hetanî sibehê. Di wê navberê de Mişkê jî ew dînarên wî hemû derbasî kuna xwe kirin. Gava bû sibeh û Tacir dît ku dînarên wî ne di cihê xwe de ne, xelkên derdorê gunehbar kir û gûman ji wan kir.

Piştî vê çîrokê, Rovî ji Qijakê re got: “Ey qijaka zîrek, zana û pêşbîn! Min ev çîrok ji te re got, ji bo ku qenciya te jî bigihêje min, wek ku qenciya Kelmêşê jî gîha Mişkê, li himberî qenciya wê bixwe. Jixwe te dît bê Kelmêşê çawa qenciya Mişkê lê vegerand, hem jî bi hawayekî hêja.” Qijakê got: “Mîrov bixwaze, dikare qencyê bike; nexwaze jî, nake. Lewre qencî ne mecbûrî ye ji bo kesê ku ji keriyê xwe vediqete. Vêca ligel ku tu dujminê min e û ez qencyê bi te bikim, wê gavê ez ê rehên xwe bibirrim. Tu jî rovî ye, tu xwedî fen û fût e û ewlehî bi te nayê ji bo min. Ê ku ewlehî pê neyê, peyman jî pêre nayê danîn. Jixwe min bihîst ku demek berî niha, te bêbextî bi dostê xwe yê Gur re kiriye û bi xap û rîpan te ew biriyê mirinê. Li gel ku ew jî mîna te ji dirindeyên ajalan bûn, te ev bêbextî pêre kiriye. Dîsa, li gel ku te demeke dirêj hevaltî pêre kiriye, te biriyê helakê. Vêca ez ê çawa bawer bikim bi şîretên te? Vêca heger tu vêya bi hemcînsên xwe bikî, gelo bi dujminê xwe tê çawa bikî? Ez texmîn dikim ku ev çîroka te ya bi min re, mîna mesela baz û qertela ye.” Rovî got: “Û ev çîroka baz û qertelan çawaye gelo?”

Qijakê got:

Tê gotin ku di demeke berê de Bazekî wêrek, xwirt û jêhatî hebû ku hemû ajalên bejahî û deryayî jê ditirsyan û hesabê wî dikirin. Lewre tukes ji ber destê wî Bazî nedifilîtî û herkesî ji destê wî dikişand. Gelek çîrok û serpêhatî, di vî warî de dihatin gotin. Vî Bazî, bi taybetî jî tade li teyr û tilûran dikir.

Vêca gava ku sal û zeman di ser re buhurîn, kal bû û ji hêzê ket. Pêre jî birçî bû. Piştî hêza wî qels bû, mecbûr ma ku pir hewl bide û duqat bixebite ji bo rizqê xwe bibîne. Lê dîsa jî nema dikaribû xwe têr bike. Pir pir fikirî û ponijî û di encamê de gihaşt biryarekê ku balindeyan gişan di ber çavan re derbas bike û qelsên wan bixwe. Êdî geh bi hêza xwe, geh bi hîleyan, keys li kijan balindeya qels û nexweş bianiya, ew dixwar. Îcar tu jî wisa xwiya dikî Rovî! Devera ku hêza te têr nekêyê, tu xapên xwe dixî dewreyê û bi wî hawî tu dixwazî encam bigirî. Ez bi bawer im ku ev dostaniya tu dixwazî wê bi min re bikî jî, perçeyek e ji wan hîleyên te. Ez jî ne yek ji wan ên ku dê destê xwe bixe yê te de. Lewre yezdan baskin dane min ku pêdiviya min bi hêza

kesî nîne û hişiyariyek daye giyanê min ku bêyi hişiyariya nobedaran ez bi tehlîkeyê dihesim. Çavin jî dane min ku ji dûr ve dibînim. Li min binêre Rovîcan! Divê tu bizanîbî ku kesê dixwaze bişibe kesekî ji xwe xwirttir, dibe ku malik lê xera bibe. Tiştê ku ez ji te re bibêjim ev e. De êdî ji min dûr bikeve û bila tu bi xêr bî, ez bi selamet.

Gava hêviyên Rovî şikestin û tê derxist ku Qijak dostaniyê pêre nake, kolîpoşman bi şûn de vegeyriya di nava ax û waxan de. Diranên xwe bi ser hev de qiriçandin û kûrekûr pê ket giriya. Gava Qijakê pêjna dengê girîyê Rovî kir û çav li kul û keder û êşa nava wî ket, jê re got: “Rovî, tu çima diranên xwe bi ser hev de diqiriçîne?”

Rovî got: “Ji ber ku min dît tu ji min bêhtir hîlekar î û tu nayê xapandin.” Piştê bazda û vegeyriya kuna xwe.

*Mîrzayê min ê hêja, çîroka Qijakê û Rovî jî bi wî hawî bû.*

*Şehriyar got: “Şehrezad! Gelo çîroka herî xweş li ba te kîjan e? Tu dikarî çend hebên wisa xweş ji min re bibêjî?”*

...